ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

# “GULZAR” SÎYERA MENZÛM A ŞÊX TAHIRÊ ŞÛŞÎ (METN Û TEHLÎL)

**Yasin DURAN**

**TEZA DOKTORAYÊ**

**Şêwirmendê Tezê**
**Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY**

**Bîngol – 2025**

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER VE LEHÇELER ENSTİTÜSÜ**

**KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**

# "GULZAR" ŞEYH TAHİR-İ ŞÛŞÎ'NİN MANZUM SİYERİ (METİN VE TAHLİL)

**Yasin DURAN**

**DOKTORA TEZİ**

**Danışman**

**Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY**

**Bingöl – 2025**

# BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım ***“Gulzar” Sîyera Menzûm a Şêx Tahirê Şûşî (Metn û Tehlîl)*** adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunû beyan ederim.

05 / 09 / 2025

İmza

Yasin DURAN

# TEZ ONAY SAYFASI

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER VE LEHÇELER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

***Yasin Duran*** tarafından hazırlanan ***"Gulzar" Sîyera Menzûm a Şêx Tahirê Şûşî (Metn û Tehlîl)*** başlıklı bu çalışma, *05.09.2025* tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda *oybirliğiyle* başarılı bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı* Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

**TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)**

| | | |
|---|---|---|
| **Başkan** | : Prof. Dr. Zahir ERTEKİN | İmza: ………………….. |
| **Danışman** | : Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY | İmza: ………………….. |
| **Üye** | : Prof. Dr. Abdurrahman ADAK | İmza: ………………….. |
| **Üye** | **:** Doç. Dr. Yakup AYKAÇ | İmza: ............................. |
| **Üye** | **:** Dr. Nevzat EMİNOĞLU | İmza: ............................. |

# NAVEROK


BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ ........ I
TEZ ONAY SAYFASI ........ II
NAVEROK ........ III
KURTE ........ XXIV
ÖZET ........ XXV
ABSTRACT ........ XXVI
PÊŞGOTIN ........ XXVII
KURTEBÊJE ........ XXIX
LÎSTEYA TABLOYAN ........ XXX
LÎSTEYA ŞIKLAN ........ XXXI
DESTPÊK ........ 1
A. Metodoloji ........ 1
A. 1. Mijar û Çarçoveya Xebatê ........ 1
A. 2. Armanc û Giringiya Xebatê ........ 1
A. 3. Rêbaza Xebatê ........ 3
A. 4. Çavkanîyên Xebatê ........ 4
B. Nerînek Giştî li Ser Mesnewîyên Kurdî ........ 6
B. 1. Nirxandineke Giştî li ser Mesnewîyên Kurdî ........ 6
B. 2. Mesnewîyên Dînî û Dîdaktîk ên Kurmancî ........ 10
C. Sîyer di Edebiyata Kurdî da ........ 15
C.1. Geşedana Sîyerê Wekî Cureyeke Edebî ........ 16
C.2. Sîyerên Menzum ên Kurdî ........ 17
C.2.1. Sîyerên ku Armanca Wan Vegotina Tevahîya Jîyana Pêxemberî ye. ........ 17
C.2.1.1. Gulzar ........ 17
C.2.1.2. El-Cewahîru’r-Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewiyye ........ 18
C.2.1.3. Jiyana Piroz ........ 18
C.2.1.4. Kurtejîyannamey Pêxember be Honrawe ........ 19
C.2.1.5. Mewlûda Sîyer a Xerxurî ........ 19
C.2.1.6. Jêgirtiyên bi Zefer, ji Xebata Pêxember ........ 21
C.2.1.7. Jîyannameyî Pêxemberî Pêşewa be Honrawe ........ 21
C.2.1.8. Sîyerê Nebî bi Ziwanê Dimilî ........ 21
C.2.1.9. Sîreta Resûlê Xweda ........ 21

C.2.1.10. Misk û Enber: Nezma Heyata Hezretî Pêxember (s.x.l) .............21
C.2.1.11. Zatu'l-Şîfa ..........................................................................22
C.2.2. Sîyer di Nav Cureyên dî da ..........................................................22
C.2.2.1. Rewdu'n-Ne'îm ..........................................................................22
C.2.2.2. Mîrac-Name ..........................................................................23
C.2.2.3. Mîracname..........................................................................23
C.2.2.4. Mîracname..........................................................................23
C.2.2.5. Wafatu'n-Nebî (Wefata Nebî) ..........................................................24
C.2.2.6. el-Menzumetu'l Mî'racîyye ..........................................................24
C.2.2.7. El-Hemaîlû Fîş Şemaîlî..........................................................24
C.2.2.8. Tezkîretu'l-Exyar: Wefatname..........................................................25
C.2.2.9. Mehzûnu'l Qulûb..........................................................25
BEŞA YEKEM: SERDEM, JÎYAN Û KESAYETÎYA EDEBÎ YA ŞÛŞÎ ..............29
1.1. Nêrînek Li Ser Serdema Şûşî ..........................................................29
1.1.1. Rewşa Erdnîgarî û Dîrokî ya Gundê Şûşê ..........................................29
1.1.2. Rewşa Sîyasî û Civakî ya Serdema Şûşî ..........................................30
1.1.3. Rewşa ʿIlmî û Edebî ya Derdora Şûşî ..........................................31
1.1.3.1. Seyfîyê Şûşî..........................................................32
1.1.3.2. Selmanê Şûşî: ..........................................................33
1.1.3.3. Şêx Enwerê Şûşî ..........................................................33
1.2. Jiyana Şêx Tahirê Şûşî ..........................................................33
1.2.1. Cih û Sala Jidayîkbûna Wî ..........................................................34
1.2.2. Nav û Mexlesa Wî..........................................................34
1.2.3. Malbata Wî ..........................................................34
1.2.4. Perwerdehîya Wî..........................................................35
1.2.5. Melatîya Wî û Feqîyên Wî ..........................................................36
1.2.6. Kesayetîya Wî ya ʿIlmî û Civakî ..........................................................37
1.3. Kesayetîya Wî ya Edebî..........................................................39
1.3.1. Kesên ku Bandor li Şûşî Kirîn ..........................................................39
1.4. Xettatîya Wî ..........................................................43
1.5. Berhemên Şûşî..........................................................44
1.5.1. Berhemên Xweser ên Menzûm..........................................................45
1.5.1.1. Gulzar (Rîyadê Nûr)..........................................................45
1.5.1.2. Pend û Şîret..........................................................45

1.5.1.3. Îsra û Mîrac û Muʿcîzatên Pêxemberî - س (sîn)....................................46
1.5.1.4. Helbestên Wî....................................................................................47
1.5.1.6. El- Şerhe-l Menzum ʿElî er- Cewze-l Şêx Meʿrûf el- Nodehî el-Barzencî ...........................................................................................61
1.5.1.7. Fen el- Serwa ....................................................................................61
1.5.2. Berhemen Pexşanî ..............................................................................61
1.5.2.1. Behdînan fî Muzekkerat eş-Şêx Tahir eş-Şûşî..................................61
1.5.2.2. Feraîd el-Mînhac ..............................................................................61
1.5.2.3. El-Muntexeb fî Zîkrî Mîlad Muhemmed Fexruʿl – ʿEcem wel-ʿEreb...................................................................................................62
1.5.3. Berhemên Înstînsax, Perawêz û Şerh..................................................62
1.5.3.1. Nivîsîn û Binecihkirina Dîwana Mela Ehmedê Cizîrî ......................62
1.5.3.2. Nivîsîn û Binecihkirina Tefsîra Îşarat el-Îʿcaz fî Mîzan el-Îcaz ya Mela Seîdê Nûrsî ....................................................................................62
1.5.3.3. Mîn Hîkemîyat en-Nûrsî..................................................................62
1.5.3.4. Istînsaxên Wî ....................................................................................62
1.5.3.5. Resaîlu'n-Nûr....................................................................................62
1.5.3.6. Perawêzên li ser Hin Kitêban............................................................63
1.6. Mirina Wî.................................................................................................63
BEŞA DUYEM: ANALÎZA GULZARÊ ....................................................65
2.1. Danasîna *Gulzara* Şêx Tahirê Şûşî.........................................................65
2.1.1. Destxeta Resen....................................................................................65
2.1.2. Navê Berhemê......................................................................................65
2.1.3. Cureya Berhemê...................................................................................66
2.1.4. Sedema Nivîsandina Berhemê ............................................................68
2.1.5. Sedema Giştî ya Nivîsandina Berhemê ..............................................68
2.1.6. Sedema bi Kurdî Nivîsandina Berhemê .............................................70
2.1.7. Dîroka Nivîsandinê .............................................................................71
2.1.8. Hejmara Beytan ..................................................................................71
2.2. Taybetiyên Ruxsarî....................................................................................74
2.2.1. Teşeyê Nezmê......................................................................................74
2.2.2. Kêşa Erûzê...........................................................................................75
2.2.2.1. Zîhaf...................................................................................................77
2.2.2.2. Îmale ..................................................................................................77

2.2.2.3. Wesl ....................................................................................77
2.2.2.5. Şedde..................................................................................78
2.2.2.6. Qesr....................................................................................78
2.2.3. Serwa......................................................................................79
2.2.3.1. Serwaya Bêpaşserwa...........................................................79
2.2.3.2. Serwaya Bipaşserwa ...........................................................79
2.2.3.3. Serwaya Mucerred...............................................................80
2.2.3.4. Serwaya Murekkeb ..............................................................80
2.2.3.4.1. Serwaya Murdef ..............................................................80
2.2.3.4.2. Serwaya Muqeyyed .........................................................80
2.2.3.4.3. Serwaya Muesses ............................................................81
2.2.3.5. Serwa li Gorî Dengan ..........................................................81
2.2.3.5.1. Serwaya Lawaz ...............................................................81
2.2.3.5.2. Serwaya Asayî.................................................................81
2.2.3.5.3 . Serwaya Zêdebar ............................................................82
2.2.4. Paşserwa .................................................................................82
2.2.4.1. Paşserwaya Qertaf ..............................................................82
2.2.4.2. Paşserwaya Qertaf û Bêje...................................................83
2.2.4.2. Paşserwaya Bêje û Kombêje ..............................................83
2.2.5. Tertîb/Plansazî ........................................................................83
2.2.5.1. Beşa Dîbaceyê .....................................................................84
2.2.5.1.1. Bîsmîllah..........................................................................84
2.2.5.1.2. Sena .................................................................................87
2.2.5.1.3. Neʿt..................................................................................89
2.2.5.1.4. Al û Eshab........................................................................91
2.2.5.1.5. Çar Xelîfe.........................................................................92
2.2.5.1.6. Armanc ............................................................................95
2.2.5.1.7. Qurana Mecîd...................................................................98
2.2.5.1.8. Dînê Xwedê Îslam..........................................................103
2.2.5.1.9. Pêşgotina Mêrga Êkê.....................................................108
2.2.5.2. Beşa Sereke .......................................................................111
2.2.5.3. Beşa Xatîmeyê...................................................................113
2.2.6. Sernav...................................................................................113

2.2.6.1. Sernavên Beşa Muqeddîmeyê ........ 113
2.2.6.2. Sernavên Rewdeya Yekem ........ 115
2.2.6.3. Sernavên Rewdeya Duyem ........ 117
2.2.6.4. Sernavên Rewdeya Sêyem ........ 122
2.2.6.5. Sernavên Rewdeya Pêncem ........ 126
2.3. Taybetmendîyên Ziman û Vegotinê ........ 130
2.3.1. Taybetmendîyên Zimanî ........ 131
2.3.1.1. Hêmanên Devoka Behdînî ........ 131
2.3.1.2. Hêmanên Erebî ........ 134
2.3.1.3. Hêmanên Farisî ........ 136
2.3.1.4. Hêmanên Tirkî ........ 138
2.3.1.5. Hêmanên Zimanên Ewropî ........ 139
2.3.1.6. Peyvên Resen ên Kurdî ........ 140
2.3.2. Rêbaz û Teşeyên Vegotinê ........ 143
2.3.2.1. Cihê Vegoter ........ 144
2.3.2.2. Cureyên Vegotinê li Gorî Vegoter û Kesan ........ 144
2.3.2.2.1. Vegotina li Gorî Devê Kesê Yekem ........ 145
2.3.2.2.2. Vegotina li Gorî Devê Kesê Duyem ........ 145
2.3.2.2.3.Vegotina li Gorî Devê Kesê Sêyem ........ 146
2.3.2.3 Rêya Vegotinê ya Pirrjimar ........ 147
2.3.2.4. Teşeyên Vegotinê ........ 148
2.3.2.4.1. Vegotina Raveker ........ 148
2.3.2.4.2. Vegotina Çîrokbêjî ........ 148
2.3.2.4.3. Vegotina Teswîrî ........ 149
2.3.2.4.4. Vegotina Nîqaşker ........ 149
2.3.2.4.5. Vegotina Lîrîk ........ 150
2.3.2.4.6. Vegotina Hindekar / Didaqtîk ........ 151
2.3.2.4.7. Vegotina Epîk ........ 151
2.4. Hunerên Edebî di *Gulzarê* da ........ 152
2.4.1. Teşbîh (Şibandin) ........ 152
2.4.2. Mecaz ........ 153
2.4.3. Mecaza Mursel ........ 153
2.4.4. Îstîare ........ 154

2.4.5. Kînaye ....................................................................................................155
2.4.6. Tecrîd.....................................................................................................156
2.4.7. Întak / Teşxîs.........................................................................................157
2.4.8. Îqtîbas ...................................................................................................157
2.4.9. Tezat.......................................................................................................158
2.4.10. Telmîh..................................................................................................159
2.4.11. Nîda .....................................................................................................161
2.4.12. Rucû .....................................................................................................162
2.4.13. Leff û Neşr...........................................................................................162
2.4.14. Tenasûb................................................................................................163
2.4.15. Husnê Teʿlîl ........................................................................................164
2.4.16. Mubalexe .............................................................................................164
2.4.17. Tecahula ʿArif......................................................................................165
2.4.18. Îstîfham................................................................................................165
2.4.19. Tarîx .....................................................................................................166
2.4.20. Îrsala Mesel.........................................................................................166
2.4.21. Sîhra Helal ..........................................................................................167
2.4.22. Tekrîr...................................................................................................167
2.4.23. Asonans ...............................................................................................168
2.4.24. Alîterasyon..........................................................................................168
2.4.25. Tersîʿ ...................................................................................................169
2.4.26. Teşrîʿ (Zul Kafiyeteyn)........................................................................169
2.4.27. Teʿrîz ...................................................................................................170
2.4.28. Cînas.....................................................................................................171
2.4.29. Îştîqaq ..................................................................................................171
2.4.30. Muwazene.............................................................................................172
2.4.31. Redulʿecuz ʿElessedr..........................................................................172
2.4.32. Îade.......................................................................................................173
2.5. Şewaza Zanistî di *Gulzarê* da...............................................................173
2.5.1. Qurana Kerîm.........................................................................................173
2.5.2. Hedîs.......................................................................................................175
2.5.2.1. Îbnû Wehb (Ebdullah b. Muslîm, w. 197/812) ...........................175
2.5.2.2. Seʿîd b. Menşur (w. 227/842) ......................................................175
2.5.2.3. Ehmed b. Henbel (w. 241/855) ....................................................176

2.5.2.4. Darimî (Ebdullah b. Ebdurrehman, w. 255/869) ........................176
2.5.2.5. Îmam Buxarî (Muhemmed b. Îsmaîl, w. 256/870) ......................176
2.5.2.6. Îmam Muslîm (Muslîm b. Heccac, w. 261/875) .........................177
2.5.2.7. Ebû Dawûd es-Sîcîstanî (w. 275/889) .......................................177
2.5.2.8. Îbn Mace (Ebû Ebdillah Muhemmed b. Yezîd Mace el-Qazwînî, w. 273/887) ..........................................................................................177
2.5.2.9. Tirmizî (Ebû Îsa, w. 279/892) ...................................................178
2.5.2.10. Bezzar (Ebûbekir Ehmed b. Emr el-Bezzar, m. 292/905) ..........178
2.5.2.11. Nesaî (Ebû Ebdurrehman, w. 303/915) ....................................178
2.5.2.12. Teberanî (Sûleyman b. Ehmed, w. 360/971) ............................179
2.5.2.13. Ebul Hesen bîn Xalîb (Ebul Hesen Tahir b. Ebdulmûnîm b. Ubeydullah b. Xalîb el-Helebî el-Misrî, w. 1009) ..................................179
2.5.2.14. Hakim en-Nîşaburî (Muhemmed b. Ebdullah, w. 405/1014) .....179
2.5.2.15. Îbnû Murdeweyh (Îbnû Merdûye) (w. 1020) ............................179
2.5.2.16. Şêxê Newewî (Îmam Newewî) (Ebû Zekeriyya Yahya b. Şeref, w. 1277) ............................................................................................180
2.5.2.17. Celaleddîn es-Suyûtî (w. 911/1505) .........................................180
2.5.3. Sîyer û Dîrok ...................................................................................180
2.5.3.1. Îbnû Îshaq (Muhemmed b. Îshaq, w. 151/768) ...........................181
2.5.3.2. Îbnû Hîşam (Ebû Muhemmed Cemaluddîn Ebdulmelîk b. Hişam, w. 218/833) ........................................................................................181
2.5.3.3. Îbnul Esîr (Îzzedîn, w. 630/1233) ..............................................181
2.5.3.4. Muhemmed Huseyn Heykel (1888-1956) ..................................182
2.5.4. Şemaîl û Delaîlu'n-Nubuwwe .........................................................182
2.5.4.1. Îbnû Şahîn (Omer b. Ehmed, w. 995) .........................................182
2.5.4.2. Beyheqî (Ehmed b. Huseyîn, w. 1066) ......................................182
2.5.4.3. Bexewî (Huseyîn b. Mesud, w. 1122) .........................................183
2.5.4.4. Îbnû Seb'i (w. 520/1126) ...........................................................183
2.5.4.5. Qadî Îyaz (Îyaz b. Musa, w. 1149) .............................................183
2.5.4.6. Yûsuf en-Nebhanî (1849-1932) ..................................................183
2.5.5. Tefsîr û Zanistên Quranê ................................................................184
2.5.5. 1. Fexreddîn er-Razî (Muhemmed b. Omer, w. 1209) ...................184
2.5.5.2. Beydawî (Ebdullah b. Omer, w. 1286) .......................................184
2.5.5.3. Seîdê Nûrsî (w. 1960) ................................................................184

2.5.5.4. Muhemmed Ebdûlezîm Zurqanî (w. 1948) ................................185
2.5.5.5. Muhemmed Tahîrê Kurdî (1903-1980).....................................185
2.5.6. Kelam û Eqaîd.....................................................................185
2.5.6.1. Îbnû Hecer El-Heytemî (w. 974/1567).....................................185
2.5.6.2. Muhemmed Reşîd Riza (1865-1935)........................................186
2.5.7. Fiqih.................................................................................186
2.6. Taybetmendîyên Naverokî..........................................................190
2.6.1. Ayetên Quranê ....................................................................190
2.6.2. Hedîs.................................................................................193
2.6.3. Navên Xwedê......................................................................195
2.6.4. Melek................................................................................200
2.6.5. Pêxember ...........................................................................201
2.6.6. Dîn û Kitêbên Pîroz..............................................................203
2.6.7. Mucîzeyên Pêxemberan .........................................................205
2.6.7.1. Mucîzêyên Pêxemberên Berê (Berahîk) .....................................205
2.6.7.2. Mucîzêyên Muḥemmedî (s.x.l) ...................................................207
2.6.8. Taybetmendîyên Pêxemberî (Şemaîl û Hîlye).....................................210
2.6.9. Gotinên Pêşîyan û Biwêj .........................................................212
2.6.10. ʿEdet, orf û Çand................................................................215
2.6.10.1. ʿEdetên Jidayikbûnê..........................................................215
2.6.10.2. Zewac ...........................................................................217
2.6.10.3. Helbest .........................................................................218
2.6.10.4. Cejn.............................................................................219
2.6.11. Kesayetên Giring................................................................219
2.6.11.1. Rostem .........................................................................220
2.6.11.2. Muqewqes .....................................................................220
2.6.11.3. Kîsra............................................................................220
2.6.11.4. Qeyser .........................................................................221
2.6.11.5. Necaşî...........................................................................221
2.6.11.6. Muradê Çarê...................................................................221
2.6.11.7. Şêx Ebdulqadirê Geylanî (jdb. 1077 - m. 1166)...........................222
2.6.11.8. Ehmedê Rifayî (1118-1182).................................................222
2.6.11.9. Eḥmed Bedewî (1200-1276) ...............................................222

2.6.11.10. Îbrahîm ed-Dûsûkî (1235-1277) ..... 223
2.6.11.11. Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî ..... 223
2.6.12. Netew û Ziman ..... 224
2.6.13. Xwarin û Vexwarinan ..... 226
2.6.14. Fêqî – Nebat ..... 227
2.6.15. Av ..... 227
2.6.16. Ajal ..... 229
2.6.17. Çîya ..... 229
2.6.18. Cih û War ..... 230
2.6.19. Dua ..... 235
2.6.20. Nifîn ..... 237
2.6.21. Dijûn û Tajang ..... 237
2.6.22. Gazinde û Rexne ..... 238
2.6.22.1. Rewşa Civaka ʿEreban Berî Îslamê ..... 238
2.6.22.2. Rewşa Misilmanan ..... 240
2.6.22.3. Rewşa Kurdan ..... 241
2.6.22.4. Rewşa Şûşî ya Xirab ..... 241
2.6.22.5. Şert û Mercên Dijwar ên Zewacê ..... 242
2.6.23. Şîret ..... 243
BEŞA SÊYEM TRANSKIRPTSIYONA GULZARÊ ..... 252
3.1. Rêbaza Transkriptsiyona Gulzarê ..... 252
3.2. Metna Gulzarê ya Transkirîbekirî ..... 254
EL-MUQEDDÎME (DESTPÊK) ..... 254
ER-RAWDETU'l-ULA (MÊRGA ÊKÊ) ..... 282
ER-RAWḌETÛ'S- SANÎYETÎ (MÊRGA DUYÊ) ..... 334
Mîn Buʿs̠etîhî Îla Hîcretîhî ʿEleyhî's-Selam (Ji Dema Bûyî Peẋember Heta Mişextbûna Wî) ..... 334
EZ-ZEHRATU'L-ÛLA (KULÎLKA ÊKÊ) ..... 334
Fî Matlaʿîr Rîsaletîhî (Di Despêka Pêxemberîya Wî da) ..... 334
Ewwelu Şeyʾîn Furîde ʿEleyhî's-Selam (Yekem Kar Ferz Bûy Li Ser Wî (s.l.w.) ..... 336
Ewwelu Men Amene Bîhî ʿEleyhî's-Selam (Yekem Kesa Bawerî bi Wî (s.l.w.) Înay ..... 336
El-Muʾmînûn-es Sabîqûne (Bawermendên Pêşiyê) ..... 337
Qureyşûn wel Muslîmûne (Qureyş û Musilman) ..... 338

Emrullahî bîîzharîd Deʿwetî Fîl ʿAmîr Rabîʿî Mînel Buʿs̱etî (Fermana Xwedê ya Aşkerekirina Deʿwê di Sala Çarê Pêxemberîyê da) ....................................339
Îcmaʿû Qureyşîn ʿEla Muʿadatîhî (Tifaqa Qureyşîyan Bo Dijayetiya Wî) ......340
EZ-ZEHRATU'Ṣ- ṢANÎYETÛ (KULÎLKA DUYÊ)......................................343
Fî Teʿzîbîl Mustaḍʿefîne Wel Welmustaḍʿefat (Ṛencdana Belengazan)..........343
1. Bîlalu Ḥebeşîyyî (Bîlalê Ḥebeşî) ..........................................................344
2 – 3 – 4. ʿEmmarun we Walîdahû (ʿEmmar û Deybabên Wî) ....................344
5. Xebbab-ubnu el-Erettî (Xebbabê Kuṛê Erettî) .......................................346
6. Ṣuheyb-ubnu Sînan-ur Rûmîyyî (Ṣuheybê Kuṛê Sînanê Romî) ...............346
7. ʿAmîr-ubnu Fuheyretî (ʿAmîrê Kurê Fuheyrey) ....................................347
8. Ebû Fukeyhetî (Babê Fukeyhey)...........................................................347
9. Lebînetu (Lebîne).................................................................................348
10. Zînnîretu (Zînnîre)..............................................................................348
11 – 12. En-Nehdîyyetu we Ummu ʿUbeysîn (Nehdîya û Deyka ʿUbeysî)..349
EZ-ZEHRATU'Ṣ- ṢALÎṢETÛ (KULÎLKA SÊYÊ)..........................................349
Fî Zîkrî el-Mustehzîîne we Men Kane Eşedde Ezen Lînnebîyyî S.ʿA.W. (Tiṛaneker û Xirabkarên Derḥeqê Peyẋemberî (s.l.w.)..................................349
1-2. ʿEmmuhu Ebu Lehebîn Wemraetuhu Ummu Cemîlîn (Mamê Wî Ebûleheb û Jinka Wî Ummû Cemîl) .......................................................................350
3. Ebu Cehlîbnî Hîşamîl Mexzûmî (Ebûcehlê Kurê Hîşamê Mexzûmî) ..........350
4. Eswedubnu ʿEbdî Yeẋûs (Eswedê Kuṛê ʿEbdî Yexûsî)..............................351
5. El-Ḥers-ubnu Qeysî es-Sehmîyyî (Ḥarisê Kurê Qeysê Sehmî)....................352
6. El-Welîd-ubnu'l-Muẋîretî (Welîdê Kurê Muẋîrey) ...............................352
7-8. Umeyyetu we Ubeyy-ubna Xelefîn (Umeyye û Ubey Kurêt Xelefî).....353
9.Ebul Qeys-îbnîl Fakîh (Babê Qeysî Kurê Fakihî)....................................353
10. El-ʿAs-ubnu Waîlîn Walîdu ʿEmr-ubnu'l--ʿAsî (ʿAsê Kurê Waîlî Babê ʿEmrê Kurê ʿAṣî) .......................................................................................353
11.Nedr-ubnu'l- Ḥers-îbnî ʿElqemetî (Neḍrê Kurê Ḥerisê Kurê ʿElqemey).354
12 - 13. Nubeyhun we Munebbîhun Îbna el-Ḥeccacî (Nubeyih û Munebbih Kurêt Ḥecacî)...........................................................................................354
14. ʿUqbetubnu Ebî Muʿeyṭî (ʿUqbe Kurê Babê Muʿeyṭî)..........................354
15. Zuheyrubnu Ebî Umeyyetî (Zuheyr Kurê Babê Umeyyey)....................355
16. El-Eswed-ubnu'l- Muṭṭelîbî (Eswed Kurê Muttelibî) ............................355
17. Muṭʿîm-ubnu ʿEdîyyu (Muṭʿîm Kurê ʿEdîy) ........................................356
18. Malîk-ubnu'l-Ṭulaṭîletî (Malikê Kurê Ṭulaṭîlihî)..................................356

19. Rîkanet-ubnu ʿEbdîyezîd (Rîkane Kuṛê ʿEbdîyezîdî) ............................356
EZ-ZEHRATU'R-RABÎʿETÛ (KULÎLKA ÇARÊ)..........................................357
Fî Hîcratîl Esḥabîl Îlel Ḥebeşetî el-Hîcretu'l-Ûla Fîs-Senetîl Xamîsetî Minel Buʿs̱etî (Her Du Koçên Sehabîyan bo Ḥebeşê Koça Êkê di Sala Pêncê ji Pêxemberîyê)...........................................................................................357
El-Hîcretus̱ S̱anîyetî îlel Ḥebeşetî (Koça Duyê Bo Ḥebeşê) ........................359
Sefaretu Qureyşîn Îlen Neccaşîyyî fî Reddîl Muhacîrîn (Qasidê Qureyşîyan bo Necaşî ji bo Vegerandina Koçberan) ........................................................360
Sefîra Qureyşîn îlen Neccaşîyyî (Her Du Qaṣidên Qureyşîyan bo Necaşî) ..361
Hîcretû Ebî Bekrî eṣ-Ṣiddîq (Koça Ebû Bekrê Ṣiddîq)...............................364
EZ-ZEHRATU'L-XAMÎSETU (KULÎLKA PÊNCÊ) .....................................365
Fî Îslamî Ḥemzetu ʿEmmîn Nebîyyî We ʿUmer-îbnîl Xettabu We Muʿcîzetu Înşîqaqîl Qemerî (Musilmanbûna Ḥemzey Mamê Peyẋemberî û ʿUmerê Kuṛê Xeṭṭabî û Seyra Şeqbûna Heyvê)..................................................................365
1.Îslamu Ḥemzete (Musilmanbûna Ḥemzey) .............................................365
Axîru Muḥaweletî Qureyşîn Meʿen Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam Fîl Keffî ʿen Deʿwetîhî (Dumahîk Bizava Qureyşîyan digel Pêxemberî (s.l.w.) bo Hêlana Deʿwê)...........................................................................................367
2. Îslamu ʿUmer-ubnu'l- Xeṭṭabî (Musilmanbûna ʿUmerê Kurê Xeṭṭabî) ....368
3. Muʿcîzetû Înşîqaqîl Qemerî (Mucîzeya Kerbûna Heyvê) ........................371
Sualun we Cewabûn (Pirs û Bersiv) .......................................................372
EZ-ZEHRATU'S-SADÎSETÛ (KULÎLKA ŞEŞÊ)..........................................372
Fî Emrîṣ Ṣeḥîfetî we Neqḍîha we Ẋeyru Ẕalîke îla Mewtî ʿEmmîhî we Zewcîhî Eleyhîs Selam (Beḥs̱ê Peymana Qureyşan û Têkdana Wê û Beḥs̱î Mirina Mam û Jinka Wî Silav lê Bin) .............................................................................372
1. Emruṣ Ṣeḥîfetîl Meşʾunetî ʿAmu (7) Mînel Buʿs̱etî (Beḥsê Peymana Kirêt a Qureyşîyan Sala 7ê Pêxemberîyê) ...........................................................372
2. Muʿadatu Qureyşîn Bîddîʿayetî (Dijminîya Qureyşîyan bi Propagandayê) ...........................................................................................................374
El-Welîd-ubnu'l-- Muẋiretî (Welîdê Kurê Muẋîrey) ..............................375
Dîʿayetu Neḍr Îbnî-l Harîs (Propagandaya Neḍrê Kurê Harsî)................375
Cebr-un Neṣranî (Cebrê Neṣranî) ..........................................................375
Et-Tufeyl-ubnu ʿEmrî ed-Dewsîyyu (Ṭufeylê Kurê ʿEmrê Dewsî) ..........376
3. Keyfîyyetu Naqdîṣ Ṣeḥîfetî ʿAmu (10) Mînel Buʿs̱etî (Awayê Têkdana Wî Rûpelî li Sala Dehê Pêxemberîyê) ............................................................376

4. Wefatu Zewcîhîş Ṣîddîqetî We ʿEmmîhîl Bar (Mirina Kabaniya Wî Xedîcayê û Mamê Wî yê Çak) ....379
a. Xedîcetu Bîntî Xuweylîdî ʿAmun (10) Mînel Buʿs̱etî (Xedîca Kiça Xuwelîdî Sala Dehê Pêxemberîyê) ....379
b. Wefatu ʿEmmîhî Ebî Ṭalîbîn (Mirina Mamê Wî Ebû Ṭalibî) ....380
EZ-ZEHRETU'S-SABÎʿETÛ (KULÎLKA HEFTÊ) ....383
Fîl Îsraî wel Mîʿracî Beʿdel Beʿs̱î bî Xemsî Sînîn (Îsra û Mîʿrac Piştî Pêxemberîyê bi Pênc Salan) ....383
1. Nebzetû ʿEn Keyfîyetîl Mîrʿacî bî Rîwayetîl Buxarî bî Zîyadatîn Yesîretîn Mîner Rîwayatî (Kurteyek li Ser Çawaniya Mîʿracê ji Zarê Buxarî digel Çen Rîwayetên Zêde) ....384
2. Eyḍan Rîwayetul Buxarî (Dîsa Rîwayeta Buxarî) ....388
3 Rîwayetul Beyheqîyyî (Rîwayeta Beyheqî) ....389
4 Eyḍan Rîwayetul Beyheqîyyî (Dîsa Rîwayeta Beyheqî) ....389
5. Rîwayetut Ṭeberanîyyî wel Bezzarî (Rîwayeta Ṭeberanî û Bezzarî) ....389
6. Rîwayetul Beyheqîyyî Eyḍan (Rîwayeta Beyheqî Dîsa) ....393
7. Rîwayetul Beyheqîyyî Eyḍan (Rîwayeta Beyheqî) ....394
8. Rîwayetut Ṭeberanîyyî (Rîwayeta Ṭeberanî) ....394
9. Rîwayetun ʿEn Enes-îbnî Malîkîn (Rîwayetek ji Enesê Kurê Malikî) ....395
10. Rîwayetul Beyheqîyyî (Rîwayeta Beyheqî) ....395
11. Rîwayetu Îbnî Macehe (Rîwayeta Îbnû Mace) ....396
12. Rîwayetut Tîrmîẕîyyî (Rîwayeta Tirmiẕî) ....396
13. Rîwayetûn ʿEn Ehlîl Ḥedîs̱î (Rîwayetek ji Ehlê Ḥedîs̱ê) ....396
14-15. Rîwayetanî ʿEn Îbnî ʿEbbasîn (Du Rîwayet ji Kurê ʿEbbasî) ....397
A (1) Qîble ....399
DIST BIKARIYA NIVÊJÊ Û NIHÊNIYÊT WÊ ....400
Nihêniya Nivêja Cumʿê û Cemaʿetê ....401
Ḥukmê Nivêjnekerî ....402
EZZEHRETUS̱ S̱AMÎNETU (KULÎLKA HEŞTÊ) ....403
Fî Ẕîkrî Nîkahî Sewdete We ʿAîşete We ʿErḍî Nefsîhî ʿEla Qebaîlîl ʿErebî (Beḥs̱ê Înana Sewde û Aîşayê û Gehandina Deʿwa Xwe bo Hozên ʿEreban) ....403
1. Nîkahû Sewdete Bîntî Zemʿetî (Zewaca Wî li gel Sewdeyê) ....403
2. Zewacû ʿAîşetu Bîntî Ebî Bekr (Zewaca Wî ligel Aîşayê) ....403
3. ʿErḍu Nefsîhî ʿElel ʿErebî (Gehandina Deʿwa Xwe bo Hozên ʿEreban) ....404

Xurucîhî Îleṭ Ṭaîfî (Çûna Wî bo Ṭaîfê)....................................................404
Îla Beʿḍî Qebaîlîl ʿErebî (Ber bi Çend Hozên ʿEreban) ..........................407
EZ-ZEHRETU'T-TASÎʿETU (KULÎLKA NEHÊ) ..........................................408
Fî Ewwelî ʿErḍî Nefsîhî ʿEleyhî's-Selam ʿEla Enṣarî We Beyʿetî ʿEqebetî (Yekem Xwepênaskirina bo Enṣarîya û Her Du Peymanên ʿEqebê) ..............408
1. Suweyd-ubnuṣ Ṣamîtî'l-Ewsî (Sûweydê Kurê Ṣamitê Ewsî)..................408
2. Ebul Heyser Enes-îbnî Rafîʿîn el-Ewsî (Babê Heyserî Enes Kurê Rafiʿê Ewsî)...........................................................................................409
3. Îmanû Cemaʿetîn Mînel Enṣarî ʿAme (11) Mînel Buʿs̱etî (Bawerîînana Komeka Enṣarîya Sala Yazdê ji Pêxemberîyê) ........................................410
4. Beyʿetul ʿEqebetîl Ûla Senete (12) minel Buʿs̱etê (Beyʿeṭa ʿEqeba Êkê Sala Duwazdê ji Pêxemberîyê)...................................................................410
5. Îslamu Seʿd-îbnî Muʿazîn we Useyd-îbnî Ḥuḍeyrî Seyyîdey Benîl Eṣhelî (Musilmanbûna Seʿdê Kurê Meʿazî û Useydê Kurê Ḥuḍeyrî Mezinên Benî Eṣhela) .....................................................................................412
6. Beyʿetul ʿEqebetîs̱ S̱anîyetî Fîssenetî 13 Mînel Nubuwwetî (Beyʿeta ʿEqebeya Duyê li Sala S̱êzdeyê Pêxemberîyê) ..........................................414
Ewwelu Men Yetekelleme Huwel ʿEbbasu ʿEmmun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam (Yekemîn Axiftinker ʿEbbas Mamê Pêxemberî (s.l.w.)................415
Cewabul Enṣarî (Bersiva Enṣaran) ........................................................415
Kelamun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam (Axiftina Pêxemberî Silav lê Bin).....415
Ewwelu Men Yeteqeddeme lîl Beyʿetî (Yekem Kesê bo Beyʿetê Diaxivît) ..............................................................................................................415
Kelamu Ebîl Heys̱em-îbnît Teyyîhan (Axiftina Babê Heys̱emê Kurê Teyîhanî) .........................................................................................416
Cewabun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam (Bersiva Peyẋemberî Silav lê Bin)....416
Kelamul ʿEbbas-îbnî ʿUbadetî (Axiftina ʿEbbasê Kurê ʿUbadey) ............416
Cewabul Enṣarî we Tetabîʿuhum ʿElel Beyʿetî (Bersiva Enṣaran û Beyʿeta Wan)...........................................................................................417
Neqbaul Enṣarî (Rêberên Enṣarîyan).....................................................417
ʿÎlmu Qureyşîn Bîşeyʾîn Mînel Beyʿetî (Pêhesyana Qureyşîyan bi Beyʿetê) ..............................................................................................................418
7. Muameretu Qureyşîn ʿEla Qetlîn Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam (Pîlana Qureyşîyan bo Kuştina Pêẋemberî Silav lê Bin) ........................................420
Reʾyu Ebîl Buxturî (Nêrîna Buxturî) .....................................................421
Reʾyu Ebî Cehlîn (Nêrîna Ebû Cehlî) ....................................................421

Îcmaʿuhum ʿEla Reʾyî Ebî Cehlîn (Razîbûna Wan li Ser Nêrîna Ebû Cehlî) ....................................................................................................421
Îxbarullahî Teʿala Nebîyehî bîhazîhîl Muameretîd Denîyyetî (Agehdarkirina Peyẋemberî ji Alîyê Xwedê Derbarê vê Pîlana Pîs)................................422
Xîtamur Rawḍatîṣ-Ṣanîyetî (Dumahîka Mêrga Duyê) .............................422
ERRAWḌATUṢ ṢALÎSETU (MÊRGA SÊYÊ) ................................................424
EZ-ZEHRETUL ÛLA (KULÎLKA ÊKÊ).......................................................424
Fî Hîcretîhî (Koça Wî) ..........................................................................424
1. Sebebu Hîcretîn Nebîyyî (Sedema Koça Wî Silav lê Bin) .......................424
2. Keyfîyyetu Seferîl Hîcretîl Meymunetî (Awayê Koça Wî).......................425
Fî Leyletîl Hîcretî (Şeva Derketinê) .......................................................426
Teftîşû Qureyşîn we Xeybetuhum (Lêgeryana Qureyşîyan û Şermezarîya Wan).....................................................................................................427
Nesîcul Enkebûtî We îwaîl Hemmameteynî we Tedellîyîş Şeceretî (Tevinbîrk û Her Du Hêlîn û Şorbûna Darê)..........................................428
Keyfe Kane Halen Nebîyyî Esnae Teftîşûl Xarî (Rewşa Pêxemberî di Şikeftê da Dema Lêgeryana Qureyşîyan) ...............................................428
Fî Leyalîl Ẋarî (Şevên Şikeftê)...............................................................429
3. Muẋaderetuhul Ẋarî Îla Medînetîl Ensarî (Derketina Wî ji Şekiftê bo Bajêrê Enṣaran).................................................................................................429
Suraqetubnu Malîkîl Mudlîcîyyî Fî Ṭelebîhîm Suraqe (Kurê Malikî li Dûv Wan da ye) ..........................................................................................430
Lîqauhum ez-Zubeyre Fî Rekbîn Mînel Muslîmîn (Dîdara Wan Digel Zubeyrî di Nav Komeka Musilmanan) ..................................................432
4. Îla Beytî ʿAtîketî Ummu Meʿbedîn el- Xuzaʿîyyetî (Ber bi Mala ʿAtîka Xuzaʿî).................................................................................................432
Îla Qebîletî Benî Sehm (Ber bi Hoza Benî Sehim)..................................434
5- Întîẓarû Ehlîl Medînetî we Îstîqbalûhum (Jivana Xelkê Medînê û Pêşwaziya Wan) .............................................................................................434
Nuzûlun Nebîyyî bî-Qubaî fî Benî ʿEmr-îbnî ʿEwfîn (Gehiştina Peyẋemberî li Qubayê di Nav Benî ʿEmr b. ʿEwf).....................................................435
Meqdemu ʿElîyyîn (Hatina ʿElî) ............................................................435
Ewwelu Mescîdîn Ussîse ʿElet Teqwa (Yekem Mizgefta ku li ser Bingeha Teqwayê Hatîye Avakirin).......................................................................436
6. Duxûlun Nebîyyî ʿEleyhî’s-Selam el-Medînetel Munewwerete (Gehiştina Pêxemberî Silav lê Bin ya Bajêrê Medînê) ................................................436

Îla Beytî Ebî Eyyube Xalîdîbnî Zeydîn el-Ensarî (Bo Mala Babê Eyyubê Enṣarî) ....................................................................................437
Îslamû Ebdîllah-îbnî Selam (Musilmanbûna ʿEbdullahê Kurê Selamî) ....437
EZ-ZEHRETUS SANÎYETU (KULÎLKA DUYÊ)..........................................439
Fî Zîkrî Makane Mînel Umûrî Ewwele Senetîn Mînel Hîcrîyyetî (Ew Bûyerên di Sala Êkê Koçî da Qewimîn) .......................................................................439
1. Bînau Mescîdî Quba (Avakirina Mizgefta Qubayê) ...............................439
2. Bînau Mescîdî-hîş Şerîfî (Avakirina Mizgefta Pêẋemberî)......................439
3. Bînau Buyutîhî ʿEleyhî’s-Selam (Avakirina Xanîyên Wî Silav lê Bin)....440
4. Ferîḍatû Selatîl Cenazetî (Ferzbûna Nivêja Mirî) ..................................441
5. Meşrûʿîyetu el-Cemaʿetî wel Azanî wel Îqametî we Zîyadetu Rekʿeteynî ʿEla Selatîl ʿEsrî (Binechkirina Nivêja Cemaʿetê û Bangî û Qametê û Zêdekirina Du Rekʿeṭa ser Nivêja Êvarê)..................................................441
Sîrrul Azanî wel Cemaʿetî (Nihêniya Bang û Cemaʿetê) .........................441
6. Îslamu Selman-el Farîsîyyî (Musilmanbûna Selmanê Farisî)..................442
7. El-Muaxatû Beynel Muhacîrîne wel Enṣarî (Birayîniya Navbera Muhacir û Enṣaran)..........................................................................................443
Feḍlû Ensarî we Mezayahum (Senga Enṣariya û Çakîya Wan)................443
Husnu Senîʿîhîm Meʿel Muhacîrîne (Çakiya Wan Gel Muhaciran) .........444
Ewwelu Mewludîl Muhacîrîne (Jidayîkbûna Yekemîn Zarokê Muhaciran) ..................................................................................................447
8. Bînaun Nebîyyî ʿEleyhî’s-Selamî Bîʿaîşete Bîntî Ebî Bekrîn (Veguhaztina Aîşaya Kiça Ebû Bekirî bo Pêẋemberî Silav lê Bin) .................................447
Mîn Huneynîn el-Muhacîrîne İla Mekketel Mukerremetî (Ẋerîbiya Muhaciran bo Mekkeya Pîroz) ............................................................448
9. Ewwelu Lîwaîn ʿEqedehu ʿEleyhî’s-Selamî Lîʿemmîhî Ḥemzetî (Alaya Yekemîn a ku Pêẋemberî Silav Ser Bin bo Mamê Xwe Ḥemzeyî Girêday) .448
Serîyyetu Ḥemzetîbnîl Muttelîbî (Serîya Ḥemzey) ................................449
10. Serîyyetu ʿUbeydet-ubnu’l- Ḥarîs̱î (Serîya ʿUbeydê Kurê Ḥarîs̱î) .........449
11. Serîyyetu Seʿd-îbnî Ebî Weqqaṣîn (Serîya Seʿdê Kurê Babê Weqqaṣ) ..449
12. Ẋezwetu Weddanî Wehuwe Ewwelu Mexazîhî Sellellahu ʿEleyhî We Sellem (Yekemîn Ẋezwa Peyẋemberî Silav lê Bin Ẋezwa Weddan)...........449
13. Wefatû Hazîhîs Senetî (Mirinên vê Salê) .............................................450
EZZEHRETU’S̱-S̱ALÎSETU (KULÎLKA SÊYÊ) .............................................450
Fî Ḥewadîsîs-Senetîs̱- S̱anîyetî Mînel Hîcretî (Bûyerên Sala Duyê Koçî) .......450

1. Ẋezwetu Buwaṭîn (Ẋezwa Buwaṭê) ....................................................451

2. Ẋezwetu ʿUşeyretî (Ẋezwa ʿUşeyre)....................................................451

3. Ẋezwetu Bedrîn eṣ- Ṣuẋra (Ẋezwa Bedra Biçuk)..................................452

4. Serîyyetu ʿEbdîllahîbnî Ceḥşîn (Serîya ʿEbdullahê Kurê Ceḥşî).............452

5-6. Ferḍuṣ Ṣîyamî we Ṣerfûl Qîbletî Îlel Keʿbetî (Ferzbûna Rojiyê û Wergêrana Qîblê bo Keʿbê) ..................................................................454

7. Ẋezwetû Bedrîn el-Kubra (Ẋezwa Bedra Mezin) ....................................454

Tecehhuzu Qureyşîn Lîl-Mesîrî (Xweamadekirina Qureyşîyan bo Cengê) ..........................................................................................455

Xurûcun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam Îla Bedrîn (Derketina Peyẋemberî Silav lê Bin bo Bedrê)..........................................................................455

Îstîşaretuhu ʿElehîs Selamî Bîeşḥabîhîl Kîramî (Şêwra Pêẋemberî Silav lê Bin li gel Hevalên Hêja).......................................................................456

ʿÎru Qureyşîn we Nefîruhum (Karwanê Qureyşîyan û Derketina Wan)....456

Teheyyîetu en-Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam lî Meʿreketîl Qîtalî (Xweberhevkirina Pêẋemberî Silav lê Bin bo Cengê).............................457

Emru Qureyşîn Beʿde Nuzulîhîm bîl ʿUdwetîl Quswa (Karê Qureyşîyan Paşdabezîna Wan li ʿUdwa Nêzîk) ........................................................458

En-Nuzulu Îlel Meydanî wellahul Musteʿanî (Dabezîna Musilmana bo Meydanê bi Harîkarîya Xwedê) ............................................................459

Îltîqaʾul Cemʿeynî (Vêkketina Her Du Layan) .......................................459

El-Hucûmu (Hêriş û Despêka Şeṛî) .......................................................460

Beʿdel Hezîmetî (Piştî Şikestinê) ..........................................................461

Însîrafuhu ʿEleyhî's-Selamî Îlel Medînetî (Vegeryana Wî Silav lê Bin bo Medînê) ..........................................................................................464

Neʿyu Qureyşîn Bîmeîsatî Bedrîn (Şîna Qureyşîyanan bi Şikesta Bedrê).465

8. Meşruʿîyyetu Selatul ʿÎydîl Fîtrî (Binecihbûna Nivêja Cejnê û Remezanê û Zekata Fitrê)..........................................................................................468

9. Ferḍîyyetu Zekatîl Malî (Ferzbûna Zekata Malî)...................................468

10. Ẋezwetû Benî Qeynuqaʿîn (Ẋezwa Benî Qeynuqaʿê)...........................468

11. Serîyyetû ʿUmeyrîbnî ʿEdîyyîn (Seriya ʿUmeyrê Kurê ʿEdî)................469

12. Ẋezwetul Kudrî (Ẋezwa Kudrê) .........................................................469

13. Serîyyetû Ẋalîbîbnî ʿEbdîllahî el- Leyṯî (Seriya Ẋalibê Kurê ʿEbdullahê Leyṯî) r.158.........................................................................................469

14. Serîyyetu Salîm-îbnî ʿUmeyrîn (Seriya Salîmê Kurê ʿUmeyrî) .............469

15. Ẋezwetu Sewîqîn (Ẋezwa Sewîqê) ......................................................470
16. Meşruʿîyyetu ʿÎydîn Nehrî wel Uḍhîyyetî (Binecihbûna Cejna Qurbanê) ..............................................................................................................470
17. Tezwîcuhu ʿEleyhî’s-Selamî Faṭîmetez Zehraî mîn Seyyîdîna ʿElîyyîn K.W. (Zewaca Faṭîmayê bi ʿElî Raḍîbîna Xwedê li Ser Bît) .......................470
Ewladu Faṭîmatîz Zehraî mîn Seyyîdîna ʿElîyyîbnî Ebî Ṭalîbîn (Zarokên Faṭîmayê ji ʿElîyê Kurê Ebû Ṭalibî) ......................................................474
18. Wefeyatul Hazel ʿAmî (Mirinên vê Salê)..............................................475
EZ-ZEHRETU’R-RABÎʿETÛ (KULÎLKA ÇARÊ) ..........................................475
Fî Ḥewadîsîs̱ Senetîs̱ S̱alîs̱etî (Bûyerên Sala Sêyê Koçî)................................475
A/أ Serîyyetu Muḥemmed-îbnî Meslemetî (Seriya Mihemedê Kurê Meslemey) ..............................................................................................................475
B/ب Ẋezwetu Ẋeṭefan (Ẋezwa Ẋeṭefanê) ..................................................476
C/ج Ẋezwetu Buḥranî (Ẋezwa Buḥranê)....................................................477
D/د Serîyyetu Zeydîbnî Ḥaris̱etî (Serîya Zeydê Kurê Ḥaris̱ey) ....................477
E/ه Serîyyetu ʿEbdîllahîbnî ʿEtîk (Serîya ʿEbdullahê Kurê ʿEtîkî bo Kuştina Babê) .....................................................................................................477
F/و Ẋezwetu Uḥudîn (Ẋezwa Uḥudê) .......................................................478
Mesîru Qureyşîn Îla Uḥudîn (Çûna Qureyşîyan Bo Uḥudê).....................479
Îstîşaretûn Nebîyyî ʿEleyhî’s-Selamî bî Esḥabîhîl Kîramî (Şêwra Pêẋemberî Silav lê Bin li gel Hevalên Xwe) ..........................................................479
Xurûcuhu ʿEleyhî’s-Selamî Îla Uḥudîn (Derkeftina Peyẋemberî Silav lê Bin bo Uḥudê)............................................................................................480
Teheyyuul Ceyşeynî (Xweamadekirina Her Du Leşkeran) ......................480
En-Nuzûku îlel Meʿreketî (Dabezîn bo Meydana Cengê) ........................481
ʿÎsyanu Emrîn Nebîyyî ʿEleyhî’s-Selamî (Neguhdana Fermana Pêẋemberî Silav lê Bin)...........................................................................................482
Cerhun Nebîyyî ʿEleyhî’s-Selam (Birîndarbûna Pêẋemberî Silav lê Bin) 482
Qetlu Ḥemzetebnî ʿEbdîl Muṭṭelîbî (Kuştina Ḥemzey Kurê ʿEbdulmuṭṭelibî) .............................................................................................................484
Mîmma Kane Xîlalel Qetlî (Tiştên ku di Dema Cengê da Qewimîn) .......484
Beʿde Xumudîl Qîtalî (Piştî ku Şeṛ Verevî) ............................................486
ʿEwdu Resûlîllahî Îlel Medînetî (Zivirîna Pêxemberî bo Bajarê Medîneyê) .............................................................................................................488
G/ز Ẋezwetu Ḥemraul Esedî (Ẋezwa Hemraê Eṣed)..................................489

H/ح Serîyyetu Ebî Selemete ʿEbdîllahîbnî ʿEbdîl Esedî (Serîya Babê Selemey ʿEbdullahê Kurê ʿEbduleṣedî) ....................490
Î/ى Tezewwecuhu ʿEleyhî's-Selamî Ḥefsete bînte ʿUmer we Tezwîcuhu Umme Kulṯumîn Mîn ʿUṯmanîn (Zewaca Wî Silav lê Bin bi Hefsa Kiça ʿUmerî û Daneşûya Kiça Xwe Ummû Kulṯûmê bi ʿUṯmanî ra) ....................490
J/ك Wîladetul Hesen-îbnî ʿElîyyîn R.ʿE. (Jidayîknûna Hesenê Kuṛê ʿElî Xwidê jê Razî Bît)....................491
K/ل Teḥrîmul Xemrî Nîhaîyyen (Ḥeramkirina Meyê bi Êkcarî) ....................492
L/م Meḍarul Xemrî we Exûha Qîmar (Ziyanên Mey û Qimarê)....................493
M/ن Ḥukmu Şarîbîl Xemrî (Sizayê Ereqvexwerî) ....................494
EZ-ZEHRETUL XAMÎSETU (KULÎLKA PÊNCÊ) ....................494
Fî Hewadîṯîs Senetîr Rabîʿetî Mînel Hîcretî (Bûyerên Sala Çarê Koçî) ....................494
ER-REWḌETU'L- XAMÎSETU (MÊRGA PÊNCÊ) ....................494
EZ-ZEHRETU'L-ÛLA (KULÎLKA ÊKÊ) ....................494
Fî Beyanî Xelqîhî We Ṣûretîhî ʿEleyhî's-Selam (Derbarê Şirovekirina Xwerûya Wî û Sûratê Wî Silav lê Bin)....................494
EZ-ZEHRETU'Ṣ-ṢANÎYETU (KULÎLKA DUYÊ) ....................497
Fî Xuluqîhî we Sîretîhî (Derbarê Rewşit û Jiyana Wî)....................497
Serdu Şeyîn Mîn Şîyemîhîş Şerîfetî (Çendek ji Rewşitên Wî) ....................498
Haluhu Fî Ehlîhî ʿEleyhî's-Selam (Rewşa Wî di Mala Wî da Silav lê Bin).....500
ʿEqluhu we ʿEmeluhu ʿEleyhî's-Selam (ʿAqil û Pêzanîna Wî Silav lê Bin) ....501
Ṣebruhu we Hîlmuhu ʿEleyhî's-Selam (Dilfirehî û Nermîya Wî Silav lê Bin) 501
Sexauhu We ʿEṭauhu (Dan û Merdîya Wî) ....................503
Quwwetuhu we Şecaʿetuhu (Şiyan û Çelegîya Wî) ....................505
Zuhduhu we ʿÎşetuhu (Zuhd û Jiyana Wî) ....................506
Zîkru Ma Sebete Ennehu Eleyhîs Selamî Ekelehu (Ew Tiştê Binecihbûy ku Pêxemberî Xwarî) ....................509
Muştehîyatuhu Eleyhîs Selam Mîn Leẕaîẕîd Dunya (Ew Tiştên ku Pêxemberî Hejêkirî ji Xûşîyên Dunyayê)....................509
ʿÎbadetuhu we Mucahedetuhu (Peristin û Xwemandîkirina Wî)....................510
Mîzaḥuhu we Ḍeḥîkuhu (Tirane û Keniya Wî) ....................511
Teṭeyyubuhu we Teḥsînu Heyʾetîhî Eleyhîs Selam (Bêhnxweşî û Cewankariya Wî Silav lê Bin) ....................512
Beqîyyetun Mîn Xuluqîhî we Adabîhî ʿEleyhî's-Selam (Çendek ji Rewşit û Cankarên Wî Silav lê Bin) ....................513
EZZEHRETU'Ṣ-ṢALÎSETU (KULÎLKA SÊYÊ) ....................516

EZ-ZEHRETU’R-RABÎʿETÛ (KULÎLKA ÇARÊ) ........................................519
1. Feḍaîluhu ʿEleyhî’s-Selam (Fazîletên Wî Silav lê Bin)..............................519
2. Xesaîsuhu ʿEleyhî’s-Selam (Taybetmendîyên Wî Silav lê Bin) .................521
b. el-Muḥerrematu wel Mekruhatu (Tiştê Ḥeram û Mekruh).......................521
c. el-Mubaḥatu (Tiştê Durist)..................................................................522
d. Ṭeharetu Feḍelatîhî (Pakijiya Bermayê Wî) ..........................................523
EZ-ZEHRETUL XAMÎSETU (KULÎLKA PÊNCÊ) .......................................524
a. Ezwacuhuṭ Ṭahîratî (Xêzanên Wî)............................................................524
1. Xedîcetu Bîntu Xuweylidî (Xedîca Kiça Xuweylidî) .............................524
2. Sewdetu Bîntu Zemʿetî (Sewda Kiça Zemʿey) .......................................526
3. ʿAîşetu Bîntu Ebî Bekrîn (ʿAîşa Kiça Ebû Bekirî) ...............................526
4. Ḥefsetu Bîntu ʿUmer (Ḥefṣa Kiça ʿUmerî)............................................527
5. Ummu Seleme Hîndubnetuhu Ebî Umeyyetî (Ummû Seleme, Kiça Ebî Umeyye, Hînd).......................................................................................528
6. Zeynebun Bîntu Xuzeymetî el-Hîlalîyyetî (Zeyneba Kiça Xuzeymey) ....528
7. Cuweyrîyetu Bîntû Ḥarisî (Cuweyrîya Kiça Ḥarisî) ...............................528
8. Ummu Ḥebîbetî Remletu Bîntu Ebî Sufyanî (Ummû Ḥebîbe Remla Kiça Babê Sufyanî)...........................................................................................529
9. Zeynebu Bîntu Ceḥşî (Zeyneba Kiça Ceḥşî) ..........................................530
10. Ṣefîyetu Bîntu Ḥuyey el-Xeyberî (Ṣefiya Kiça Ḥuweyyê Xeyberî) .......530
11. Meymûnetu Bîntu el-Harîsî (Meymûna Kiça Harisî)............................531
12-15. ʿAliyetun Bîntu Ẓebyanî we Esmau Bîntul Nuʿmanî we Ẋezîyetu Bîntu Cabîrî we Şenbau Bîntu ʿEmrîn (ʿAliya Kiça Ẓebiyanî û Esma Kiça Nuʿmanî û Ẋezîya Kiça Cabirî û Şenba Kiça ʿEmrî) ................................................531
b. Serarîhî ʿEleyhî’s-Selam (Carîyên Wî Silav lê Bin)..................................532
1. Marîyetu Bîntu Şemʿûnî el-Qibṭî (Mariya Kiça Şimʿûnî Ya Qibṭî)..........532
2. Reyḥanetu Qureẓîyetî (Reyḥana Qureẓî)................................................532
3 – 4. Îḥdahuma Hedîyetun wel Uxra Ṣebaha Fî Sebyî (Êk Dîyarî, Ya dî Bara Cengê)...................................................................................................532
c. Ewladuhu ʿEleyhî’s-Selam (Zarokên Wî Silav lê Bin)...............................532
Ewladuhuẕ Ẕukurî (Zarokên Nêr)..........................................................532
Benatuhul Fuḍleyatî (Kiçên Wî yên Pirr Seng) ..........................................533
1. Zeynebul Kubra (Zeyneba Hêja) ........................................................533
2 – 3. (Ruqeyyetu we Ummu Kulsûmîn (Ruqeyya û Ummû Kulsûm)......534

4. Faṭîmetuz Zehraî (Faṭîma Zehra) ....................................................... 534
EZ-ZEHRETU'S-SADÎSETÎ (KULÎLKA ŞEŞÊ) ........................................... 535
1. Eʿmamîhî (Mamên Wî) ................................................................................ 535
a/أ ʿEmmuhu Ḥemzete (Mamê Wî Ḥemze) ................................................... 535
b/ب ʿEmmuhu ʿEbbasu (Mamê Wî ʿEbbas) .................................................. 536
2. ʿEmmatuhu ʿEleyhî's-Selam (Metêt Wî Silav lê Bin) ............................... 536
3. Îxwetuhu we Exewatuhur Reḍaîyyetî we Muraḍîʿuhu (Xwîşk û Birayên Wî yên Şîrî û Dayînên Wî) ............................................................................... 536
EZ-ZEHRETU'S-SABÎʿETU (KULÎLKA ḤEFTÊ) ......................................... 537
1. KuttabuhuʿEleyhî's-Selam (Nivîserên Wî Silav lê Bin) ............................. 537
2. Mueẕẕînuhu ʿEleyhî's-Selam (Bangderên Wî Silav lê Bin) ........................ 538
3. Şuʿerauhu we Xeṭîbuhu ʿEleyhî's-Selam (Hozanvan û Xuṭbexwînên Wî ).. 538
4. Xedemuhu we Ḥeresuhu ʿEleyhî's-Selam (Sepan û Zêrevanêt Wî) ............ 538
5. Mewalîhî we Îmauhu (Koleyêt Wî) .......................................................... 539
6. Men Yeḍrîbul Eʿnaq Beyne Yedeyhî (Ewên Sizavan û Serbir) .................. 539
EZZEHRETU'Ṣ-ṢAMÎNETU (KULÎLKA HEŞTÊ) ....................................... 539
El-Muqeddîmetu (Berahîk) .......................................................................... 539
a/ا Numûzecun mîn Muʿcîẕatîhî es-Semawîyyetî (Nimûnek ji Muʿcîẕatên Esmanî) ................................................................................................... 541
1. Kewnuhu Ummîyyen (Nexwendewariya Wî) ....................................... 541
2. el-Qurʾanul Muʿcîẕul Beyanî (Qurʾana Piṛṛ Hiner û Aşkera) ............... 541
3. Înşîqaqul Qemerî (Kerbûna Heyvê) ..................................................... 545
4. Redduş Şemsî ʿEleyhî's-Selamî we Ḥebsuha Mînel Xurûb (Vegeryana Rojê bo Pêxemberî û Gîrobûna Wê ya Avabûnê) ................................... 546
b/ب Tesbîḥut Teʿamî wel Ḥesa Fî Keffîş Şerîfî (Tesbîḥatî Zadî û Berka di Destê Pak da) .............................................................................................. 546
c/ج Teslîmul Ḥecerî ʿEleyhî's-Selamî we Ṭaʿetul Cemadatî Lehu (Silavkirina Bera û Ṭaʿetê Bêruḥa Ser Wî Silav lê Bin) ............................................... 547
d/د Kelamuş Şecerî Lehu we Selamuha ʿEleyhî we îṭaʿetuha Lehu (Axiftin û Silav û Guhdana Dara bo Wî Silav lê Bin) ................................................ 549
e/ه Ḥuneynul Cîzʿî Şewqen Îleyhî ʿEleyhî's-Selamî (Nalîna Qurmê Darê bo Peyemberî Silav lê Bin) ........................................................................... 551
f/و Qelbul Eʿyanî Lehu ʿEleyhî's-Selam (Guherîna Tişta bo Wî Silav lê Bin) ........................................................................................................... 552

g/ز Kelamul Ḥeyewanatî we Taʿetuha Lehu ʿEleyhî’s-Selam (Axiftina Giyanewera û Guhdariya Wan bo Wî Silav lê Bin) ....................................553

h/ح Nebʿul Maî Tuhurî Beyne Esabîʿîhîş Şerîfetî (Zêyîna Ava Bijûn di Nav Tiblêt Wî yêt Pakij da) ..........................................................................557

i/ط Tefcîrul Maî Bîbereketîhî Wenbîasîhî bî Messîhî we deʿwetîhî (Zêyîna Avê bi Bereketa Wî û Zêdebûna Wê bi Destkirin û Daxwaza Wî) ..............559

j/ى Tekṣîrut Teʿamîl Qelîl Bîbereketîhî (Zedebûna Xwarineka Kêm bi Bereketa Wî) ................................................................................................560

ENCAM ......................................................................................................562

ÇAVKANÎ ....................................................................................................564

PÊVEK.........................................................................................................574

Pêvek 1: Şêx Tahirê Şûşî (1917-1961) ..........................................................574

Pêvek 2: Helbesta Şûşî ya bi Farisî ...............................................................575

Pêvek 3: Helbesta Şûşî bi Soranî ..................................................................577

Pêvek 4: Sê Texmîsên Şûşî li Ser Helbestên Melayê Cizîrî ...............................578

Pêvek 5: Wêneyên Bergên *Gulzar*ê ..............................................................583

Pêvek 6: Bi Xettatî Nivîsandina Bîsmîllahê ......................................................584

Pêvek 7: Rûpelê Duyem ê Destxetê. ...............................................................585

Pêvek 8: Rûpelê Sêyem ê Destxetê ................................................................586

Pêvek 9: Dîyarîkirina Pirtûkê bo Telebeyên Nûrê .............................................587

Pêvek 10: Di Destxetê Da Rûpela Plansazîya *Gulzar*ê .....................................589

Pêvek 11: Rûpelê Çavkanîyên *Gulzar*ê ...........................................................590

Pêvek 12: Rûpela Yekem a Beşa Muqeddîmeyê ................................................591

Pêvek 13: Rûpela Dawîya *Gulzar*ê ................................................................592

Pêvek 14: Helbesta Şûşî ya Şêweyê Gulê (Moma Dilî) .....................................593

KURTEJIYAN ..............................................................................................594

# KURTE

## "*Gulzar*" Sîyera Menzûm a Şêx Tahirê Şûşî (Metn û Tehlîl)

*Gulzar*, sîyereke menzûm e ku di sedsala 20an da ji alîyê Şêx Tahirê Şûşî ve bi herfên erebî-kurdî bi şêweyê mesnewîyê wek destxet hatiye nivîsîn. Ev tez li ser transkrîpsiyon û analîza vê destxetê ya hatiye amadekirin û ji sê beşên sereke pêk tê. Di beşa yekem da agahîyên berfîreh ên derbarê serdema Şûşî, jîyana wî û berhemên wî, di beşa duyem da agahîyên berfireh ên derbarê danasîna *Gulzar*ê, taybetmendîyên wê yê ruxsarî û naverokî, di beşa sêyem da jî metna transkrîbekirî ya *Gulzarê* cih digire. Du armancên sereke yên vê tezê hene. Armanca yekem ew e ku bi rêya trasnkrîpsiyonê vê berhema hêja bigehînîn ber destê wan kesan jî ku tenê dizanin bi herfên latînî berhemên kurmancî bixwînin da ku ew jî ji vê berhema hêja sûd wergirin. Armanca duyem jî ew e ku bi analîzeke kûr û berfireh nirxê berhemê yê edebî, zanistî û folklorî derbêxîn holê. Di encama xebatê derkete holê ku *Gulzar* mesnewîyeke netamambûyî ye û bi vî halê xwe jî ew ji 10154 beytan pêk tê û bi vî awayî dibe mesnewîya herî mezin a zimanê kurdî. Dîsa derkete holê ku *Gulzar* ji alîyê edebî û naverokî ve berhemeke gelekî têr û tijî ye û dikare bibe mijara gelek lêkolînên akademîk ên serbixwe.

**Peyvên sereke:** Şêx Tahirê Şûşî, Gulzar, Sîyername, Destxet

# ÖZET

**"*Gulzar*" Şeyh Tahir-i Şûşî'nin Manzum Siyeri (Metin ve Tahlil)**

*Gulzar*, 20. yüzyılda Şêx Tahirê Şûşî tarafından Arap-Kürt harfleriyle mesnevi biçiminde kaleme alınmış manzum bir siyerdir. Bu tez, söz konusu el yazmasının transkripsiyonû ve analizi amacıyla hazırlanmıştır ve üç ana bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde, Şûşî'nin yaşadığı dönem, hayatı ve eserleri hakkında kapsamlı bilgi sunulmuştur. İkinci bölümde ise *Gulzar* adlı eserin tanıtımı ile şekil ve içerik özellikleri ele alınmıştır. Üçüncü bölümde ise eserin transkribe edilmiş metni yer almaktadır. Tezin iki temel amacı bulunmaktadır: İlki, bu değerli eseri transkripsiyon yoluyla yalnızca Latin harfleriyle Kürtçe okuyabilen araştırmacıların ve okuyucuların da erişimine açmak; ikincisi ise, eseri edebi, bilimsel ve folklorik açılardan analiz ederek taşıdığı değeri ortaya koymaktır. Araştırma sonucunda *Gulzar*'ın tamamlanmamış bir mesnevi olduğu, mevcut haliyle 10.154 beyitten oluştuğu ve bu haliyle Kürtçede yazılmış en hacimli mesnevi niteliği taşıdığı tespit edilmiştir. Ayrıca eser, biçimsel ve içeriksel açıdan son derece zengin ve yoğun bir yapı arz etmekte; bu yönüyle bağımsız akademik araştırmalara konû olabilecek potansiyel taşımaktadır.


**Anahtar Kelimeler:** Şeyh Tahir-i Şûşî, Gulzar, Siyername, El Yazması

# ABSTRACT


**"*Gulzar*: The Poetic Biography (Sira) of Sheikh Tahir al-Shushi (Text and Analysis)"**

*Gulzar* is a versified sira (biographical account of the Prophet Muhammad) composed by Şêx Tahirê Şûşî in the mid-20th century using Arabic-Kurdish script, written in the traditional mesnevi form as a manuscript. This thesis is based on the transcription and analysis of this manuscript and is structured into three main parts. The first part provides a comprehensive overview of Şûşî's historical period, his life, and his literary works. The second part focuses on the introduction of *Gulzar*, examining its formal structure and thematic content. The third part presents the transcribed version of the original text. The thesis has two primary objectives. The first is to make this significant literary work accessible to those who can only read Kurmanji written in Latin script, thereby expanding its readership. The second is to conduct a thorough and in-depth analysis that highlights the literary, scholarly, and folkloric value of the work. The study concludes that *Gulzar* is an unfinished mesnevi consisting of 10,154 couplets, making it the longest known example of this genre in Kurdish literature. It also reveals that *Gulzar* is a rich and densely layered text in terms of both literary style and content, and holds substantial potential for future independent academic research.



**Keywords:** Şêx Tahirê Şûşî, Gulzar, Sira, Manuscript.

# PÊŞGOTIN

Edebiyat, yek ji wan awayên herî giring ên vegotinê ye ku nasname, dîrok û cîhana ramanê ya çandan nîşan dide. Edebiyata klasîk jî, têgehiştina estetîkî, sîstema nirxan û berhevkirina zêhnî ya rabirdûyê digehîne roja me û bi vî awayî wekî bîreke dîrokî tevdigere. Ji ber vê yekê, ji nû ve lêkolînkirina metnên edebî yên klasîk, ne tenê ji aliyê dîroka edebiyatê ve lê di heman demê da ji aliyê dîroka ziman, çand û civakê ve jî xwedî giringiyeke mezin e.

Hewesa min a li ser sîyerê û helbesta kurdî ya klasîk, bû motîvasyona bingehîn ku ez dest bi vê xebatê bikim. Bi taybetî, berhemên ku di nuqteya têkiliyê ya kevneşopiya edebiyata îslamî û helbesta klasîk a kurdî da cih digirin, ji bo têgehiştina her du kevneşopiyan xwedî giringiyeke krîtîk in. Di vê xalê da, *Gulzara* Şêx Tahirê Şûşî hem ji aliyê naverokê xwe hem jî ji aliyê şêweyê xwe ve ji bo min bû qadeka xebatê ya taybet.

Armanca vê tezê ew e ku *Gulzar*a Şêx Tahirê Şûşî, ku domdarê têgehiştina estetîkî ya klasîk a edebiyata kurdî ye, transkrîbe bike û analîzeke berfireh jê re bike. Di vê xebatê da, avahiya zimanî û naveroka wêjeyî ya berhemê bi awayekê kûr û rexneyî hatiye lêkolînkirin. Armanc ew e ku ev metna hêja bigehe ber destê dorhêlek akademîk û xwendevanên gelemperî.

Ez spasên xwe yên dilpak pêşkêşî gelek kesên ku di vê xebatê da keda wan heye dikim. Spasiyên xwe yên herî dilpak ji şêwirmendê xwe yê hêja Doç. Dr. Bedrettin Basuğuy ra dikim, ku di her qonaxa xebata min da rehberîya min kir û çi caran derê xwe li min negirt. Spasdarê Prof. Dr. Zahir Ertekin im ku ev mijar pêşnîyarî min kir û wek endamê Tîkê rêberîya min kir. Dîsa spasdarê Prof. Dr. Abdullah Kıran im ku ew jî endamê Tîkê bû û bi nirxandinên xwe rêberîya min kir. Dîsa spasîya endamên jûrîya xwe Doç. Dr. Yakup Aykaç û Dr. Nevzat Eminoğlu dikim ku nîşeyên wan ji bo teza min giring bûn. Spasîyeke dilgerm bo Prof. Dr. Abdurrahman Adak dikim ku wekî endamê jûrîyê, teza min bi hûrgulî nirxand û ji bo pêşvebirina tezê gelek pêşnîyarên giring dane min. Gelek spasîya kurê Şêx Tahirê Şûşî, Hemzeyê Şûşî dikim ku di temamkirina biyografiya Şûşî û beşên winda yên destnivîsê da û gelek tiştên dî da harîkarîya min kir. Ji bo harîkarîyên wî yên di pêvajoya transkrîpsiyonê da û

peydakirina çavkaniyan spasîya Xalid Sadinî, ji bo peydakirina destnivîsê spasîya Tehsîn Îbrahim Doskî, ji bo harîkarîya wî ya çareserkirina metnên erebî spasîya Mela Adnan û ji bo harîkarîyên pêvajoyên teknîkî yên xebatê û dilsozîya wî spasîya Îhsan Akın dikim. Herwiha, spasîya Bewar Abdullah Salih dikim ku bi agahiyên xwe yên li ser herêma Başûrî harîkarîya min kir.

Di dawiyê da, ez spasên xwe yên dilgerm pêşkêşî hevjîna xwe ya delal dikim ku di vê pêvajoyê da bi sebr, piştgirî û evîna xwe her dem li kêleka min bû.

**Yasin DURAN**
**Bîngol – Mûş 2025**

# KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| **cm** | sentîmetre |
| **hwd.** | her wekî dî |
| **bnr.** | binêre |
| **b.** | bîn |
| **b:** | beyt |
| **r.** | rûpel |
| **m.** | miladî |
| **s.x.l.** | silavên Xwedê lêbin |

# LÎSTEYA TABLOYAN

**<u>Hejmara Tabloyê</u>** **<u>Rûpel</u>**

Tablo 1: Çend Mesnewîyên Zimanê Kurdî ........................................................... 7
Tablo 2: Hejmar û Cureyên Sîyeran Kurdî û Dabeşbûna Wan li Gorî Lehçeyan ......16
Tablo 2. 1: Hejmara Beytên Gulzarê ...................................................................73
Tablo 2. 2: Ji Alîyê Hejmara Beytan ve Berawirda Gulzarê Li gel Çend Mesnewiyên Kurdî ......................................................................................................................73
Tablo 2. 3: Plansazîya Şûşî ya Gulzarê..................................................................84
Tablo 2. 4: Berawirda Dîbaceya Gulzarê li gel Çend Mesnewîyên Kurmancî ........109
Tablo 2. 5: Dabeşbûna Beşa Sereke ya Gulzarê ....................................................111
Tablo 2. 6: Sernavên Beşa Muqeddîmeyê............................................................114
Tablo 2. 7: Sernavên Rewdeya Yekem .................................................................115
Tablo 2. 8: Sernavên Rewdeya Duyem.................................................................117
Tablo 2. 9: Sernavên Rewdeya Sêyem .................................................................122
Tablo 2. 10: Sernavên Rewdeya Pêncem .............................................................126
Tablo 2. 11: Di Gulzarê da Hejmara Sernavan......................................................130
Tablo 2. 12: Li gorî rêza kronolojîk çavkanîyên Gulzarê. .....................................186
Tablo 2. 13: Tekilîya Beytan Li Gel Ayetên Quranê.............................................190
Tablo 2. 14: Têkilîya Beytan li gel Hedîsan..........................................................193
Tablo 2. 15: Navên Xwedê di Gulzarê da .............................................................199
Tablo 2. 16: Pêxemberên Ku Navên Wan di Gulzarê da Derbas Dibin ..................203
Tablo 2. 17: Gotinên Pêşiyan di Gulzarê da..........................................................213
Tablo 2. 18: Biwêjên di Gulzarê da ......................................................................214
Tablo 2. 19: Cografîk a Navên Cih û Waran..........................................................230
Tablo 3.1: Latînîza Tîpên Erebî û Farisî.................................................................252

# LÎSTEYA ŞIKLAN

**Hejmara Şiklî** **Rûpel**

Şikil 1. 1: Gundê Şûşê Li Ser Nexşê ..................................................... 29
Şikil 1. 2: Îcazeta ku Muhemed Tahirê Kurdî bo Şûşî nivîsandî........... 43
Şikil 1. 3: Mînakên Xettatîya Şûşî ........................................................ 44

# DESTPÊK

## A. Metodoloji

Di beşa metodolojîyê da em li ser mijar û çarçoveya xebatê, armanc û giringîya wê, rêbaz wê û çavkanîyên wê sekinîne.

### A. 1. Mijar û Çarçoveya Xebatê

Şêx Tahirê Şûşî alim, helbestvan û xetatekî giring ê sedsala 20an e. Di 44 salên umrê xwe da gelek berhemên ilmî û edebî nivîsandîne û gelek îstinsax kirîne. Piranîya berhemên wî bi erebî ne û çendek jî bi kurdî ne. Yek ji berhemên Şûşî yên kurdî jî *Gulzar* e. *Gulzar* sîyereke menzûm e ku bi awayê mesnewîyê hatiye nivîsin.

Heta niha ji alîyê Hemzeyê Şûşî ve "*Pend û Şîret*, *Gulzar* û *Îsra û Mî'rac û Mu'cîzatên Pêxemberî*" wek sê berhemên serbixwe yên Şûşî bi herfên erebî-kurdî li başûr hatîne çapkirin. Me di lêkolînê da dît ku her çend bi heman qalibê erûzê hatibe nivîsîn jî *Pend û Şîret* di nav destxeta resen a Şûşî da cih nagire û ji wê cuda hatiye nivîsîn, ji xwe mijara wê jî ji ya *Gulzarê* cuda ye û yekser li ser şîretan e. Ji ber vê yekê *Pend û Şîret* ji derveyî sînorên xebata me dimîne. Lê herçend wek berhemeke serbixwe hatibe çapkirin jî berhema *Îsra û Mî'rac û Mu'cîzatên Pêxemberî* bi temamî di nav destxetê da heye ji ber vê yekê ev berhem di nav sînorên xebata me da ye. Bi kurtî ji berhemên Şûşî "*Gulzar* û *Îsra û Mî'rac û Mu'cîzatên Pêxemberî*" mijar û çarçoveya xebata me ye.

Di vê lêkolînê da peşîyê em dê metna *Gulzarê* transkrîbe bikin û paşê jî dê li ser analîza metnê bisekinîn. Lêkolîna me ji destpêk, sê beşên sereke û ji encamekê pêk tê. Di destpêkê da dê li ser metodolojiya xebatê, mesnewînûsîya kurmancî û sîyerên kurdî bisekinîn. Di beşa yekem a xebatê da dê li ser serdem, jîyan û berhemên Şûşî, di beşa duyem da dê li ser danasîna destxetê, taybetmendîyên wê yên ruxsarî, zimanî û vegotînî, naverokî û hunerî bisekinîn. Di beşa sêyem da pêşîyê em dê behsa rêbaza transkrîpsiyona *Gulzar*ê bikin paşê jî metna transkrîbekirî ya *Gulzarê* bidin. Di dawîyê da jî bi encamê dê xebata xwe xilas bikin.

### A. 2. Armanc û Giringiya Xebatê

*Gulzar*, bi herfên erebî-kurdî ve hatiye nivîsîn û bi çend beşên kêm heta niha du caran bi herfên erebî-kurdî ya hatiye çapkirin. Lê ev berhem heta niha bi herfên

latînî nehatiye çapkirin û ev jî ji bo qismekê mezin ê kurdan bi taybet jî yên li Tirkîyê dijîn pirsgirêk e ji ber ku piranîya wan tenê bi herfên latînî dizanin bixwînin. Yek ji armanca sereke ya vê tezê transkrîpsiyona destxeta *Gulzarê* ye. Bi xêra vê transkrîpsiyonê kesên ku tinê dizanin bi herfên latînî bixwînîn bi awayekê hêsanî dê bikarin vê metnê bixwînin. Dîsa bi xêra transkrîpsiyonê xwendekar bi hêsanî dê bikarin bizanin ka reseniya peyvên destxetê bi çi awayî hatîne nivîsîn.

Armanceke sereke ya dî ya vê tezê jî bi hûrgulî analîzkirina metnê ye. Ji bo ku bi awayekê hûrgulî em bişên metnê analîz bikin em dê li bersivên van pirsan dê bigerin:

- Şûşî kî ye, di kîjan serdemê da jîyaye, çi berhemên wî hene, di atmosfereke çawa da mezin bûye û berhema xwe nivîsandîye?
- Cihê *Gulzarê* di nav mesnewîyên kurdî da çawa ye?
- Rewşa desxeta *Gulzarê* ya resen çawa ye, çend nusxe hene, çend caran çap bûye û nusxeya resen niha li ku derê ye?
- Dîroka nivîsandina berhemê kengî ye, cureyê berhemê çi ye, bo çî hatiye nivîsîn û hejmara beytên wê çend in?
- Berhem bi kîjan teşeyê nezmê ve hatiye nivîsîn, kêş û serwaya wê çawa ne.
- Plansazîya berhemê çawa ye û Şûşî şîyaye li gorî vê planê berhema xwe binivîse yan ne?
- Taybetmendîyên zimanî yên berhemê çawa ne, berhem di bin bandora kîjan zimanan da maye?
- Şûşî di nivîsandina berhemê da kîjan rêbaz û teknîkên vegotinê bi kar anîne?
- *Gulzar* ji alîye hunerên edebî ve çawa ye û kîjan huneren edebî di *Gulzarê* da hatîne bikaranîn?
- Di *Gulzarê* da ayet û hedîs çawa hatîne bikaranîn?
- Kijan navên Xwedê, melekan, Pêxemberan û dinan di *Gulzarê* da derbas dibe?
- Şûşî bi çi awayî cih daye mucîzeyên Pêxemberî û şemaîla wî?
- Kîjan gotînên pêşîyan û bîwêj di *Gulzarê* da derbas dibin û Şûşî di *Gulzarê* da çawa cih daye wan?
- Kîjan orf, edet û çand di *Gulzarê* da derbas dibin?
- Navên kîjan kesayetan, netewan, xwarinan, nebatan, avan, çîyayan û cih û waran di *Gulzarê* da derbas dibin?

- Kîjan peyvê resen, dua, nifîn û dijûn di *Gulzarê* da derbas dibin?
- Şûşî di *Gulzarê* da rexneyan li çi diket?
- Şûşî di *Gulzar*êda kîjan şîretan li xwînerên xwe dike?
- Çavkanîyên nivîsandina *Gulzarê* kî ne, Şûşî di *Gulzarê* da ew çavkanî çawa bikaranîne?

Bi bersivdana van pirsên kûr û berfireh, em ê bikarin *Gulzarê* hem ji aliyê şêwaz û avahiya wê (form), hem jî ji aliyê naverok û peyama wê ve bi awayekê tam û têr binasîn. Ev analîz dê derxîne holê ku *Gulzar* ji kîjan aliyan ve bi hêz e û kîjan aliyên wê hewceyî vekolîneke kûrtir in. Dîsa, bi rêya bersivên van pirsan, em ê bikarin cihê Şûşî di nav helbestvanên mesnewînûs ên kurd da diyar bikin û asta wî ya helbestvaniyê bi awayekê zelal fêm bikin. Ev lêkolîna kûr û sîstematîk dê ji bo lêkolînên pêşerojê yên li ser mesnewiyên kurmancî, bi taybetî jî yên li ser Şûşî û berhema wî *Gulzarê,* bibe bingeheke zexm û rêberekî bingehîn.

### A. 3. Rêbaza Xebatê

*Gulzar* wekî destxet bi herfên erebî-kurdî ve hatiye nivîsîn ji ber vê yekê pêşîyê me dest bi transkrîpsiyona metnê kir. Ji bo vê yekê pêşîyê lazim bû ku me xwe gehandiba destxetê. Destxeta resen yek nushe ye û li def Hemzeyê Şûşî tê parastin. Tehsîn İbrahîm Doskî wêneyê destxetê hemûyê kêşabûn me bi rêya Xalid Sadinî ew wêne jê daxwazkirin û wî jî bo me virêkirin. Me ew wêne ji ber ku bi awayekê hêsantir xebatê li ser bikin wergerandin pdfyê û xebata xwe li ser wê pdfyê çêkir. Di nav wêneyên ku bo min hatî çend rûpel kêm bûn ew jî ji alîyê Hemzeyê Şûşî ve bo me hatin virêkirin.

Piştî bidestêxistina destxeta *Gulzarê* li gorî alfabeya transkrîpsiyonê ya standart me ji serî heta dawîyê *Gulzar* transkrîbe kir. Berhem bi devoka behdînî hatiye nivîsîn ji ber vê yekê gelek taybetmendîyên vê devokê di nav xwe da dihewîne û me jî ew taybetmendî hemû di transkrîpsiyonê da parastin. Wekî mînak di kurmancîya standart da “xwe” di *Gulzarê* da wek “xû” hatiye nivîsin me jî di trasnkrîpsiyona wê da wek “xû” nivîsand. Hin cihên destxetê bo me tevlîhev û zehmet hatin me neşîya bixwînîn ji bo xwendina van cihan Hemzeyê Şûşî harîkarîya me kir. Di *Gulzarê* da hemû Sernav, rûpelên îzahatê û jêrenotên Şûşî bi erebî hatîne nivîsîn.  Ji bo wergera cihên erebî hevalê min Mela Adnan harîkarîya min kir.

Piştî transkrîpsiyona metnê xilas bû me dest bi analîza wê kir. Di vê beşê da pêşîye me derbarê serdem û jîyan Şûşî da agahî dan. Paşê bi rêzê ve em bi hûrgulî li ser danasîna *Gulzar*ê, taybetmendîyên wê yên ruxsari, ziman û vegotinî, hunerên edebî û taybetmendîyên naverokî sekinîn. Bi vî awayî me hewil da ku hemû taybetmendîyên *Gulzarê* yên giring derxîn holê.

**A. 4. Çavkanîyên Xebatê**

- Derbarê Şûşî û berhemên wî herî zêde li Başûr lêkolîn hatîne kirin. Bi taybet ji alîyê Hemzeyê Şûşî, Tehsîn Îbrahîm Doskî û Muhsîn Doskî ve. Dîsa li başûr ji alîyê Zîrek Cemaleddîn Hesen ve bi soranî tezeke lîsansa bilind "*Hesen, Z. C. (2022). Şêx Tahirê Şûşî (Jîyan û Şi'r û Berhem). Teza Masterê. Zankoy Koye."* li ser jîyan û berhemên Şûşî hatiye nivîsîn. Li Tirkîyê lêkolînên derbarê Şûşî û berhemên wî kêm in. 2010an da Tehsîn Îbrahîm Doskî di kovara Nûbiharê da gotarek li ser Şûşî nivîsandîye. Abdurrahman Adak di 2020an da gotareka bi navê "*Gulzara Şêx Tahirê Şoşî Mesnewîyeke Xweser a Edebiyata Kurdî Ya Klasîk û Taybetmendîyên Wê yên Avahîya Derekî*" nivîsand ku ev gotar lêkolîna herî berfireh bû ku li ser *Gulzarê* hatiye kirin. Dîsa li Tirkîyê li Zanîngeha Wanê ji alîyê Bewar Abdullah Salih ve di 2021an da tezeke lîsansa bilind li ser Şûşî û berhemên wî hatiye nivîsîn. Herî dawî ji alîyê Nurettin Etekin ve di 2024an da gotarek li ser helbesta Şûşî ya "*Mûma Dilî*" hatiye nivîsîn. Ji bilî van lêkolînan di teza Fahri Titiz (2020) û pirtûka Zahir Ertekîn ya bi navê "*Kürtçe Siyer Yazılığı*" da jî derbarê Şûşî agahî hatîne dayîn.

Di vê lêkolînê da ji gelek çavkanîyan sûd hatiye wergirtin. Çavkanîyên di vê lêkolînê da sûd jê hatiye wergirtin wiha ne:

- "Şûşî, Ş. T. (1957-1961) "*Rîyaḍu'n-Nûr el-Menzûme el-Kurdîyye fî Sîretî Seyyîdîna Muḥemmed we Ḥeyatihî eş-Şerîfe ez-Zekîyye*". Destxet. Pîrtûkxaneya Şexsî ya Hemzeyê Şûşî" Ev berhem destxeta Şêx Tahirê Şûşî ye û mijara lêkolîna me ye.

Ji bo agahîyên derbarê jîyana Şûşî û berhema wî *Gulzarê* ji van çavkanîyên jêrîn sûd hatiye wergirtin.

- Şûşî, Ş.T. (2012), *Gulzar*, ber. Hemze Tahir Şûşî, Êkîtîya Nivîserên Kurd, Duhok
- Şûşî, H. (2021). *Behdînan fî Mezkîrat el Şêx Tahir el Şûşî*. Tehran: Çengel

➢ Şûşî, Ş. T. (2022). *Îsra û Mî'rac û Mu'cîzatên Pêxemberî*. (berhevkar: Hemze Tahirê Şûşî). Zaxo: Senterê Zaxo bo Vekolînên Kurdî.

➢ Şûşî, H. (2023) "Zana û Nivîser û Hozanvan û Xetxoşê Kurd Şêx Tahirê Şûşî" *Kovara Badînan*, h. 2, 2023, Duhok

➢ Duskî, T. Î. (2000). "Eş-Şeyx Tahir eş-Şûşî: Muḥeqqîqen li Dîwan eş-Şeyx el-Cezerî" *Kovara Metîn*, r. 140-145.

➢ Duskî, T. İ. (2010). "Ji Çelengê Şagirdên Rîsaleyên Nûr: Şêx Tahirê Şoşî û Kitêba Wî *Gulzar*.". (Latînizekirin: Ayhan Geverî). *Kovara Nûbihar*. Hejmar: 112. R. 45-47.

➢ Adak, A. (2020). **"***Gulzar*a Şêx Tahirê Şoşî Mesnewîyeke Xweser a Edebiyata Kurdî Ya Klasîk û Taybetmendîyên Wê yên Avahîya Derekî." *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*. Cilt:12 Sayı:4 (29). r:1506-1533.

➢ Hesen, Z. C. (2022). *Şêx Tahirê Şûşî (Jîyan û Şi'r û Berhem)*. Teza Masterê. Zankoy Koye.

➢ Salih, B. A. (2021). *Şêx Tahirê Şoşî (1917-1962) Di Edebiyata Kurdî de*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Wan Yüzüncüyılê.

➢ Axiftinên Yasin Duran li gel Hemze Tahirê Şûşî

- 24.01.2024. siet: 23:19 20dq 21s. (axiftin)
- 10.07.2025. siet: 12:51 46dq 37s. (axiftin)
- 18.07.2025. siet: 15:30 23dq 8s. (axiftin)

Ji bo sazkirin û analîzkirina naveroka tezê ji van lêkolînan sûd hatiye wergirtin:

➢ Gündüz, H.-Seyhan, M. (2015). *Qurana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî*. İstanbul: Weşanên Serokatiya Karûbarên Diyanetê.

➢ Çavkanîyên Hedîsan (*Buxarî, Muslîm, Kutubî Sîtte û hwd*. http://www.enfal.de/index.htm )

➢ TDV İslam Ansiklopedisi

➢ Adak, A. (2014). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. Stenbol: Weşanên Nûbihar

➢ Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezme di Edebiyata Klasîk a Kurdî de*. Stenbol: Nûbihar

➢ Ertekin, Z. (2022). *Kürtçe Siyer Yazıcılığı*. İstanbul: Siyer Yayınları.

➢ Şulul, K. (2021). *Sîyer Usûlü*. İstanbul: Sîyer Yayınları.

➢ Demircan, A. (2014). *Bir Bilim Olarak Sîyer ve Kaynakları*. İstanbul: Sîyer Yayınları.

➢ Saraç, M.A. (2019). *Klasik Edebiyat Bilgisi*. Türk Dil Kurumu Yayınları. İstanbul.

➢ Tok, V. A. (2011). *Edebi Sanatlar Ansiklopedisi*. Konya: Literatürk.

➢ Ilı, A. (2019). *Hunerên Edebî di Dîwana Hadî (Seydayê Licî) de*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Mardîn Artukluyê. Mêrdîn.

Ji bo plan û rêbaza tezê ji van lêkolînan sûd hatiye wergirtin:

➢ Gezer, S. (2023). *Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kendûleyî (Metın-Lêkolîn)*. Teza Doktorayê. Zanîngeha Bîngolê.

➢ Ay, Ü. (2007). *Münîrî (Öl. 1521?)'Nin Manzum Siyer-İ Nebî'si Cilt.1 (İnceleme-Metin)*. Doktora Tezi. Marmara Üniversitesi. İstanbul.

➢ Özfırat, B. (2016). *15. Yüzyıl Şairlerinden Muhammed'in Sîretü'n-Nebî'si*. Doktora Tezi. Marmara Üniversitesi. İstanbul

➢ Kavaklıyazı, A. (2018). K*astamonulu Yûsuf'un Muhammediye'si (İnceleme-Metin)*. Doktora Tezi, Selçuk Üniversitesi. Konya

➢ Titiz, F. (2020). *El-Cewahîru'r Reşadîye Fî Sîretî'n-Nebewîyye ya Mela Nûrûllahê Godişkî*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Bîngolê.

➢ Yılmaz, H.(2019). "*Dîwana Laxer Mela Umerê Aşiq (Metin û Lêkolîn)",* Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Artukluyê.

➢ Aykaç, Y. (2015). *Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng).* Teza Lisansa Bilind. Zanîngeha Bingolê.

➢ Ertaş, H. (2024). *Dîwana Mela Hesenê Sofyanî: Metin û Lêkolîn. Teza Lîsansa Bilind*. Zanîngeha Mardîn Artukluyê.

## B. Nerînek Giştî li Ser Mesnewîyên Kurdî

Di vê beşê da pêşîyê em dê bi giştî li ser mesnewîyên kurdî bisekinîn û derbarê wan da agahîyên giştî bidin. Paşê jî bi taybet em dê li ser mesnewîyên dînî-dîdaktîk ên kurmancî bisekinîn û derbarê wan da çend agahîyên giştî bidin.

### B. 1. Nirxandineke Giştî li ser Mesnewîyên Kurdî

Mesnewî, peyveke erebî ye ji peyva "mesna" (cot, duqatî) tê û wek cureyeke edebî di edebiyata farisî da cihêkî giring digire. Di edebiyata farisî da, helbestên dirêj

yên ku her beytê xwe bi xwe serbixwe serwadar e û bi awayekê eruzî têne nivîsîn, wek mesnewî têne binavkirin. Ev şêweya helbestê ji beytan pêk tê û her du misreyên beytê jî bi hev re serwadar in. Her weha, hemû beyt bi heman qaliba eruzê têne nivîsandin (Çiçekler, 2004, r. 320). Mesnewî bi gelemperî du kategoriyan têne dabeşkirin: mesnewiyên serbixwe (yên ku wek berhemekî tenê ne) û mesnewiyên dîwanan (yên kurtir û di dîwanan da cih digirin) (Adak, 2019, r. 245-246). Mesnewiyên serbixwe, bi taybetî ji bo vegotina bûyerên dîrokî û çîrokên dirêj, gelek guncaw in.

Yekem mesnewîyên edebî di sedala XIem da bi zimanê farisî hatine nivîsîn. Firdewsî (1020) bi "Şahname"ya xwe bingeheke xurt bo mesnewiyên epîk, Nîzamî Gencewî (1211) bi "Xemse"ya xwe bingeheke xurt bo mesnewiyên evînî çêkir. Ji bilî van helbestvanên wekî Ferîduddînê ‘Ettar (m. 1221), Mewlana Celaledînê Rûmî (m. 1273) û Se‘dîyê Şîrazî (m. 1291) mesnewî gihandine asteka bilind a hunerî (Çiçekler, 2004, r. 320-322). Vê asta bilind a hunerî bandor li edebiyatên îslamî kir.

Edebiyata kurdî jî di derbarê mesnewîyan da di bin bandora farisî da ma ye. Yekem mesnewîya edebiyata kurdî *Perîşanname* di sedsala 14-15an da ji alîye Mela Perîşanê Dîneweri ve bi goranî hatiye nivîsîn. Yekem mesnewîya kurmancî Eqîdeya Îmanê di sedsala 17an da ji alîyê Ehmedê Xanî, yekem ya soranî *Ferhenga Ehmedî* di sedsala 19an da ji alîyê Şêx Me’rufê Nodehî û yekem ya zazakî *Mewlûdname* ji alîyê Melayê Xasî di sedsala 20an da hatiye nivîsin (Adak, 2019, r. 252-258). Mesnewî di kurdî da herî zêde bi zaravayên kurmancî û goranî hatîne nivîsîn zaravayên soranî û zazakî di mesnewîyan da zêde pêş neketîye. Di tabloya jêrîn da çend mesnewîyên kurdî li gorî zarava, sedsal û cureyê mesnewîyê hatîne dabeş kirin. Helbet hejmara mesnewîyên kurdî gelek zêdetir in lewra hêj di roja me da jî mesnewîyên kurdî têne nivîsîn û gelekên ku hatîne nivîsîn jî wek destxet in û nehatîne tespît kirin.

**Tablo 1: Çend Mesnewîyên Zimanê Kurdî**[1]

| Navê Helbestê | Navê Nivîskar | Zarava | Sedsal | Cûre |
|---|---|---|---|---|
| Perîşanname | Mela Perîşanê Dîneweri | Goranî | 15 | Dînî |
| Xusrew û Şîrîn | Xanayê Qubadî | Goranî | 18 | Lîrîk |

[1] Ji bo amadekirina vê tabloyê ji (Adak, 2014), (Adak, 2019), (Jahany, 2020) û (Ertekin, 2022) sûd hatîye wergirtin.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Leyla û Mecnûn | Xanayê Qubadî | Goranî | 18 | Lîrîk |
| Yûsif û Zuleyxa | Xanayê Qubadî | Goranî | 18 | Dînî |
| Sultan Ibrahîm | Xanayê Qubadî | Goranî | 18 | Dînî |
| Nûşaferîn | Xanayê Qubadî | Goranî | 18 | Lîrîk |
| Îskendername | Xanayê Qubadî | Goranî | 18 | Didaktîk |
| Heftbendî Xanî Qubadî | Xanayê Qubadî | Goranî | 18 | Lîrîk |
| Nadirname | Elmas Xanê Kendoleyî | Goranî | 18 | Didaktîk |
| Şehnamey Kurdî[1] | Elmas Xanê Kendoleyî | Goranî | 18 | Epîk |
| Xurşîd û Xawer | Mula Nûrullah Xanê Kendoleyî | Goranî | 18 | Lîrîk |
| Heyder û Senewber | Mîrza Kewkeb Goranî | Goranî | 19 | Destanî |
| Weraq û Gulşah | Paşa Celîlyan Rustem | Goranî | 19 | Lîrîk |
| Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemalê | Mîrza Şefîê Kulyayî | Goranî | 19 | Lîrîk |
| Şêx Senan[2] | Nenas | Goranî | 19 | Lîrîk |
| Mem û Zîn | Nenas | Goranî | 19 | Lîrîk |
| ‘Eqîdeyê Merzîye | Mewlewî Tawegozî | Goranî | 19 | Dînî |
| Eqîda Îmanê | Ehmedê Xanî | Kurmancî | 17. | Dînî |
| Mem û Zîn | Ehmedê Xanî | Kurmancî | 17. | Lîrîk |
| Yûsif û Zuleyxa | Selîmê Silêman | Kurmancî | 18 | Dînî |
| Leyl û Mecnûn | Sewadî | Kurmancî | 18 | Lîrîk |
| Seyfulmulûk | Sîyapoş | Kurmancî | 18-19 | Lîrîk |
| Mewlûdname | Melayê Bateyî | Kurmancî | 18 | Dînî |
| Nehculenam | Mela Xelîlê Sêrtî | Kurmancî | 18-19 | Didaktîk |

[1] Di edebiyata goranî da di bin bandora Şehnameya Firdewsî nêzîkî 30 şehnameyên bi şêweyê mesnewî yên hatîne nivîsîn (Adak, 2019, r. 253)
[2] Alkaç, 2018 https://kovarabir.com/13461/5018-2/

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Rewdu'n Neîm | Şêx Abdurrehmanê Aqtepî | Kurmancî | 19 | Dînî |
| Leyla û Mecnûn | Şêx Mihemed Can | Kurmancî | 18-19 | Lîrîk |
| 'Idê Dûrfam | Şêx Eskerî | Kurmancî | 18-19 | Dînî |
| Sirru'l- Mehşer | Feqe Reşîd | Kurmancî | 18-19 | Dînî |
| Cîhanşah | Feqe Reşîd | Kurmancî | 18-19 | Dînî |
| 'Huneynîye | Mela Yasînê Alikî[1] | Kurmancî | 20 | Dînî |
| *Gulzar* | Şêx Tahirê Şûşî | Kurmancî | 20. | Dînî |
| Pend û Şîret | Şêx Tahirê Şûşî | Kurmancî | 20. | Dîdaktîk |
| Şerefnameya Menzûm | Cegerxwîn | Kurmancî | 20. | Didaktîk |
| Leyla û Mecnûn | Hecî 'Ebdulfettahê Hezroyî | Kurmancî | 20 | Lîrîk |
| Leyla û Mecnûn | Mela Muhemedê Hezanî | Kurmancî | 20 | Lîrîk |
| Mersiyename Derheqê Îmam Huseyn | Mela Mihemed Nurîye Ewhedî | Kurmancî | 20 | Dîni /Mersîye |
| Nuzhetu'un-Nufûs fi'n Nesaih | Mela Mihemed Nurîye Ewhedî | Kurmancî | 20 | Dîdaktik |
| el-Menzûmetu'l Mi'raciyye | Mela Mihemed Nurîye Ewhedî | Kurmancî | 20 | Dinî |
| el-Hemail fi'ş Şemail | Mela Nurullahê Godişkî | Kurmancî | 20 | Dinî |
| el-Cewahiru'r Reşadiye | Mela Nurullahê Godişkî | Kurmancî | 20 | Dinî |
| Es-Sebaîk Fîl Menasîk | Mela Nurullahê Godişkî | Kurmancî | 20 | Dinî |
| Çenta Yetîman | Mela Nurullahê Godişkî | Kurmancî | 20 | Dinî |

[1] Karak, 2023, r. 91

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Kufrul Kebaîr | Mela Nurullahê Godişkî | Kurmancî | 20 | Dinî |
| Sefîna Kurdan | Mela Ebdulcelîlê Botî | Kurmancî | 20 | Tarîx |
| Tûbe'z Zeman | Mela Mihemed Heldaî | Kurmancî | 20 | Lîrîk |
| Rewdu'l Heyat | Mela Yasînê Yusrî | Kurmancî | 20 | Dinî |
| Leyla û Mecnûn | Mela Mihemedê Hezanî | Kurmancî | 20 | Lîrîk |
| Leyla û Mecnûn | Seydayê Hecî | Kurmancî | 20 | Lîrîk |
| Kardukname | Şükrü Ekinci | Kurmancî | 20 | Epîk |
| Mewlûda Sîyer a Xerxurî | Ebdurrehmanê Xerxurî el-Perwarî | Kurmancî | 21 | Dînî |
| Jêgirtiyên bi Zefer, ji Xebata Pêxember | Mela Mehmûd Mustafa Yusuf | Kurmancî | 20-21 | Dînî |
| Jiyana Piroz | Mela Eladînê Kopî | Kurmancî | 20-21 | Dînî |
| Ferhenga Ehmedî | Şêx Marif Nodêhî | Soranî | 20 | Didaktîk |
| Durişte | Mela Ebdulkerîmê Muderrîs | Soranî | 20 | Dînî |
| Jiyannameyî Pêxemberî Pêşewa be Honrawe | Ferhad Cevher Biradostî | Soranî | 21 | Dînî |
| Kurtejiannamey Pêxember bo Honrawe | Muhsin Ahmed Mustafa | Soranî | 20 | Dînî |
| Mewlûdname | Melayê Xasî | Zazakî | 20 | Dînî |
| Mewlûdname | Osman Efendî Babij | Zazakî | 20 | Dînî |
| Raro Raşt û Me'lûmatê Dînîye | Mihemedê Şêx Ensarî | Zazakî | 20 | Dînî |

### B. 2. Mesnewîyên Dînî û Dîdaktîk ên Kurmancî

Mesnewîyên wekî munacaatname, mewlûdname, şemaîlname û mîracname ku mijara wan bi Xwedê an Pêxemberî ra têkîldar e wekî mesnewîyên dînî; pendname,

eqaîdname, fiqihname û sîyername ku armanca wan şîrovekirin û belavkirina prensîbên exlaqî û dînî, zanist û hizr jî wekî mesnewîyên dîdaktîk tên pênasekirin (Adak, 2019, r. 329/398). Di kurmancî da mesnewîyên dînî dîdaktîk gelekî berbelav in.

Ji mesnewîyên dînî, mewlûdname, şemaîlname û mîracnameyên serbixwe di kurmancî da yên hatîne nivîsîn. Yekem mewlûdanemeya kurmancî di sedala 18an da ji alîye Melayê Bateyî ve hatiye nivîsîn (Şemrexî, 2011, r. 8). Ji wê rojê heta roja me gelek mewlûdameyên dî yên kurmancî yên hatîne nivîsîn û di roja me da jî hêj dewam dike. Derbarê mewlûdanemyên kurdî da çend lekolînên wekî Ertekin Z.- Ertekin, N. (2017), Arslan (2021) û Ertekin (2022) hatîne kirin. Li gorî lîsteya ku di dawîya pirtûka xwe ya bi navê "Kürtçe Siyer Yazıcılığı" 48 mewlûdên kurmancî yên menzûm hene. Ji van mewlûdan 46 telîf û 2 jî tercûme ne.

Şêmaîl ew berhem in ku tê da behsa şikl û şemala Pêxemberî, taybetmendîyên wî û exlaqê wî tê kirin. Di edebiyata kurdî ya klasîk da şemaîl wek cureyek edebî derketîye pêş (Adak, 2019, r. 333). Bi kurmancî bi şêweyê mesnewîyê hem berhemên serbixwe yên wekî *Rewdun-Ne'îma* Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî û *El-Hemaîlû Fîş Şemaîlî* ya Mela Nûrûllahê Godişkî hem jî wek beşek ji sîyernameyên wekî *Gulzara* Şêx Tahirê Şûşî hatîne nivîsîn. Şûşî di *Gulzar* ê da cihekê gelekî berfireh daye şemaîla Pêxemberî. Di rewdeya pêncem da di bin 4 Sernavên sereke û 27 seranavên jêrîn û bi 982 beytan behsa şemaîla Pêxemberî dike. Çend mînak ji şemaîla *Gulzarê:*

*Teṭeyyubuhu we Teḥsînû Hey'etîhî ʿEleyhîs Selam (Bênxûşî û Cewankariya Wî Silav lê Bin)*

*Bêhna wî keçî nekarê ʿenber*
*Dem dem xû dikir cewan muʿeṭṭer*

*Nê bênê di xûş diden serî huş*
*Lew red ne dikir çi yê bihên xûş*

*Hêşta ku ji durve wan dizanî*
*Bêhna wî ḥebîbê ruḥ û canî*

*Ew menbeʿê ʿîṭr û hem beha yê*
*Zur xûş diviya gula xenayê*

*Wî cilk û giyan di pak û xav în*
*Qeṭ ney bû qirêj ḥeta bi havîn*

*Çavêt wî wekî ji xû di ṛeş bûn*
*Kil tê diwerand du hinde geş bûn*

*Pirça bi serê wî ṛeş bû mişkîn*
*Car care wî dun dida çi rengîn*

*Çen carê misik dikir di destî*
*Pê malî birû w ridîn duristî*

*Car car diquṣand bi çen cewanî*
*Carek li dirêjî car li panî*

*Qebḍek bû dirêj cewan û sengîn*
*Ew çendî ṛeş e du hinde rengîn*

*Bîst mû jê sipî bibûn eger wî*
*Car care didayê rengê zer wî*

*Simbêl diquṣandî car bi care*
*Ta lêv ji wî ṣur dibûn diyare*

*Şaşik xir û xir dibestî piṛṛ nûr*
*Lifka wê di nêv milan dikir şûr*

*Royê wî çu meh bejin çu ʿerʿer*
*Neybûn wî li heyv û rojê sêber*

*Ew ṛehberê tazehî û çakî*
*Daîm wî emir dikir bi pakî*

*Ava ye wekî wî gûtî îslam*
*Ser pakijîyê di ḥukm û eḥkam*

*Her kes ne bijun û pak û qişt e*
*Ney ehlê seʿadet û biheşte*

*Wek cilk û giyan û tişt û xanî*
*Pakij ke demaẋ û qelb û canî*

*Ya Reb tu wesan bikey me pake*
*Çirkîn me nebey bû jêrî xake* (*Gulzar*, b: 8543-8561)

Di edebiyata klasîk a îslamî da menzûmên ku behsa îsra û mîraca Pêxemberî dikin wek mîracîye têne pênase kirin. Bi kurmancî mîracname hem wekî berhemên serbixwe hem jî wekî beşek ji berhemên sîyernameya hatîne nivîsîn. *Mîracname* ya Mela Mahmud Bilge û *el-Menzumetu'l Mî'racîyye* ya Mela Muhemmed Nûrî berhemên serbixwe yên mîracnameya ne. Di sîyernameyên wekî *Rewdun-Ne'îm* a Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî, *Gulzara* Şêx Tahirê Şûşî û *El-Cewahîru'r-Reşadiye Fî Sîretî'n-Nebewiyye* ya Mela Nûrullahê Godişkî wekî beşeke serbixwe behsa mîraca Pêxemberî tê kirin. Di berhema mijara lêkolîna me *Gulzar* ê da di kulîlka heft a "Rewdeya Duyê" da behsa mîraca Pêxemberî di bin 17 Sernavan da bi 561 beytan ve tê kirin. Mînakek ji beşa mîracnameya *Gulzarê:*

**3 Rîwayetul Beyheqîyyî (Rîwayeta Beyheqî)**

*Zanî me ji Beyheqîyê enwer*
*Ḥîna diçû aseman peyember*

*Ewwel digehîn cihek gulistan*
*Piṛṛ xurme û qesb û baẋ û bîstan*

*Cibrîlî gûtî: Peya be lêre*
*Du rekʿe nivêj dikey ku xêr e*

*Gûtê ku nivêj dikir temame*
*Ev ʿerḍe Medîne xûş meqame*

*Her we digehin cihek sipî xak*
*Hem lêre gûtî nivêj dikey çak*

*Ev ʿerḍe gû Medyena delal e*
*Musa bû li vêre çen ji sale*

*Dîsa digehîne Beytê Leḥme*
*Hem gûtî nivêj dikey ne zeḥm e*

*ʿÎsa ye di vî mekanê xûş xak*
*Peyda bû ji dayke Meryema pak* (*Gulzar*, b: 4519-4526)

Bi kurmancî gelek mesnewîyên dîdaktîk ên wekî pendname, eqaîdname û fiqihname yên hatîne nivîsîn. Yekem helbestvanê kurd ê ku di helbestên xwe da cih daye şîretan, Baba Tahîrê Uryan e (Ertekin – Basuğuy, 2018, r. 149). Piştî wî jî, helbestvanên wekî Mela Xelîlê Sêrtî (1750-1843) di *Nehcu'l-Enamê* da, Şêx Mihemedê Kerbelayî (m. 1939) di *Mîrsadu'l-Etfalê* da û Şêx Muşerref Xinûkî (1926-2008) di helbestên xwe yên kurmancî da cih daye şîretan (Sönmez, 2018, r. 51). Ji bilî wan jî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Seyîd Elîyê Findikî û Mela Ehmedê Nalbend jî di helbestên xwe da cih daye şîretan (Duran, 2021, r. 105). Lê bi şêweyê mesnewîyê û wek berhemeke serbixwe di kurmancî da pendname kêm in. Ji bo vî babetî mînak a herî baş *Pend û Şîret*a Şêx Tahirê Şûşî ye. Şûşî di *Gulzar*ê da jî şîretan gelek bi kar tîne di dawîya her beşekê da şîretan li xwînerên xwe dike. Lê Pend û Şîret wek berhemeke serbixwe di sala 1997an da ji alîyê Hemzeyê Şûşî ve hatiye çapkirin. Pendnameyeke dî ya kurmancî jî *Nuzhetu'n Nufûs fî'n Nesaîh* ya Mela Muhemmed Nurî ye ku ji alîyê Zeynelabidîn Amedî ve li Dîyarbekirê hatiye çapkirin (Dündar, 2021, r. 366).

Di kurmancî da gelek eqaîdname jî hatîne nivîsîn. Yekem eqaîdnameya kurmancî *Eqîdeya Îmanê* di sedsala 17an da ji alîyê Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn. *Eqîdeya Îmanê* û *Nehcu'l Enam* a Mela Xelîlê Sêrtî di nav medreseyên kurdan da gelek belav bûne. Lê ji bilî van her duyan gelek eqîdenamyên dî yên kurmancî jî hene. Bolelli – Ertekin (2017) di lêkolîna xwe da behsa 29 eqîdenameyên kurmancî, Bardak (2021) di lêkolîna xwe da behsa 63 eqaîdnameyên kurmanci dike (Bardak, 2021, r. 324). Nivîsandina eqaîdnameyên kurmancî hêj di nav kurdan da dewam dike.

Dîroka nivîsandina berhemên fiqihnameyên serbixwe yên kurmancî heta dewra mîrektîyan diçe. Yekem fiqihnameya serbixwe ya kurmancî di texmînî di sedsala 18. da hatiye nivîsîn. Navê berhemê "*Şurûtu's-Selat*" e lê nivîskarê vê berhemê dîyar nîne (Acar, 2023, r. 708). Di lêkolînên Adak (2015), Acar (2016) û Arslan (2021) da behsa 14-15 fiqihnameyên serbixwe yên kurdî dikin lê di nav wan da tenê yên kurmancî nîn in. *Sefîna Kurdan*a Mela Ebdulcelîlê Botî, *Kurtiya Fiqha Şafi'î bi Sual û Cewab û Nezma Kurmancî* ya Mela Ehmedê Zinarexî, *el-Fiqhu'l-Menzûm* a Mele Arif b. Yusiv Dêrsilavî, *Rewşen*a Mele Mihemed Şefîq Aksu, *Delaîlu's-Selat 'Ela Mezheb el-Îmam el-Şafi'î* ya Mele Se'îdê Taxikî çend mînakên fiqihnameyên kurmancî ne.

Bi kurmancî wekî qadên dî yên zanistên îslamî di qada tecwîdê da jî menzûme yên hatîne nivîsîn. Acar, (2025) di lêkolîna xwe da behsa 10 tecwîdnameyên kurmacî dike. *Rîsala Tecwîdê* ya Mela Xelîlê Sêrtî (1750-1843), *Kîtabu'd-Durri'l-E'la fî Îlmî't –Tecwîd*a Mela Muhemmed Hadî (1852-1911-12), *Tecwîda Quranê* ya Mela Ebdulfettahê Hezroyî (1892-1975), *Menzûmeya Tecwîdê* ya Mela Yusufê Zivingî û *Tecwîda Mermerî* ya Mela Mehmûdê Mermerî mînakên tecwîdnameyên kurmancî ne (Acar, 2025, r. 5-8).

**C. Sîyer di Edebiyata Kurdî da**

Peyva "sîyer" pirjimara peyva "sîret " e û di ferhengê da tê wateyên wekî "rewş, hal, tevger, rêvebirin, rê, livîn û meşîn" (Yaman, 2009, r. 316). Her çend di gelek qadên wekî Quran, hedîs, hiqûq, sîret û têkilîyên navneteweyî di wateyên cuda da bê bikaranîn jî bi gelemperî *sîyer* û *sîret* wekî têgeh ji bo jiyana Muhemmed Pêxemberî, ji bo zanista ku jiyana wî dike mijar û ji bo berhemên ku di vê zanistê da hatîne nivîsandin tên bikaranîn (Fayda, 2009, r. 324). Ji ber ku misilmanan gelek ji Pêxemberê xwe hez kirîye û ji bo bicihanîna pratîk a gelek babetan hewce ne ku Pêxemberê xwe baş binasin di qada sîyerê da ji berê heta niha gelek berhem nivîsandîne.

Di serdema Tabiʿîyan[1] da, hin kesayetên sereke wekî pêşengên nivîsandina sîyerê derketine holê. Urwe b. Zûbeyr (w. 643 m.), Ebban b. Osman (w. 724 m.), Wehb b. Munebbîh (w. 729), Şurahbîl b. Sad (w. 741) û Îbnî Şîhab ez-Zûhrî (w. 742 m.) di nav wan da ne (El-Bûtî, 2016, r. 32). Li gorî Zehebî (w. 1348 m.), Mûsa b. Ukbe yekem kes e ku li ser Mexazî (şerên Pêxemberî) berhemeke bi navê *Kîtabu'l Mexazî* nivîsandiye (Öz, 2006, r. 19). Di warê nivîsandina sîyerê da, berhema Îbnû Îshaq (w. 767 m.) ya bi navê *El-Mexazî* wekî yek ji xebatên herî sîstematîk û bingehîn tê qebûlkirin. Her çend orîjînalê wê negihîştibe roja me jî, Îbnû Hîşam (w. 833 m.) bi sererastkirin û sehîhkirina wê di nav pêncî salan da, ew gihandiye me (Şulul, 2021, r. 238). Li gel vê pirtûkên dîrokê yên giştî, wekî *Tarîxu'l-Ûmem we'l-Mûlûka* Teberî (w. 923 m.), derfetê didin ku bûyerên sîyerê di çarçoveyeke dîrokî û civakî ya firehtir da cih bigirin û bi kûrahî bên fêmkirin (Şulul, 2021, r. 70). Ev berhem, bingeheke zexm

[1] Ew kesên ku Pêxember nedîtî lê sehabîyên wî dîtîn

ji bo lêkolînên siyerê pêşkêş dikin û lewma jî, nivîskarên siyerê gelek sûd ji van çavkaniyên dîrokî werdigirin.

### C.1. Geşedana Sîyerê Wekî Cureyeke Edebî

Sîyer wekî cureyeke dînî-edebî, di nav edebiyata Îslamî da geşbûneke cuda û balkêş nîşan daye. Di edebiyata erebî da, ji serdemên pêşîn ve sîyer ji nivîseke dîrokî pêtir, bi belaxet û helbestî derketîye pêş. *Sîretu'n-Nebî* ya Îbnû Îshaq, her çend bi pexşanî hatiye nivîsîn jî, bi uslûba xwe ya edebî ku di bin bandora zimanê edebî yê Quranê da maye derdikeve pêş. Versîyona Îbn Hîşam jî, mînakeke klasîk a pexşana erebî tê hesibandin. Di edebiyata Farisî da, *Şewahîdu'n-Nubuwwe* ya Camî jî bi awayekê lîrîk hatiye nivîsîn. Lêbelê, Osmanîyan ev her du kevneşopî sentez kirine û formeke orjînal çêkirine. Di berhemên wek *Tercema Sîyera Nebî* ya Darîr da bandora çavkaniyên erebî diyar e, lê di berhemên wek *Durreu't-Tac*a Weysî da uslûba edebî ya Farisî hatiye pejirandin. Ji aliyê dî ve berhemên helbestkî yên wekî *Muhammedîye* ya Yaziciğlu wekî berhemên edebî yên dînî derketîne holê (Uzun, 2009, r. 324-326). Bi kurtasî, di edebiyata Îslamî da, Sîyer hem wekî cureyeke ku xwedî naverokeke dînî û hem jî wekî cureyeke xwedî bedewiyeke edebî pêş ve çûye.

Li ser sîyerên kurdî heta niha lêkolîna herî berfireh di 2022an da bi navê *"Kürtçe Siyer Yazıcılığı"* ji aliyê Zahir Ertekin ve hatiye kirin. Ertekin di vê lêkolîna xwe da li ser siyerên menzum, mensûr û tercemeyên kurmancî, soranî, zazakî û hewramî bi hûrgulî sekinîye.

Li gorî Ertekîn, bi lehçeyên soranî, kurmancî, zazakî û hewramî bi giştî 141 berhemên sîyêrê yên menzum, mensur û terceme hatîne nivîsîn (Ertekin, 2022, r. 134). Di sala 2023an da ji alîyê Halit Ertaş ve gotareka bi navê "*Jiyana Pîroz*a*" Mela 'Eladînê Kopî: Siyereke Menzûm di Edebiyata Kurdî de"* hate nivîsandin û bi vê gotarê berhemeke dî ya menzûm a sîyerê ya kurmancî li sîyerên kurdî zêde bû (Ertaş, 2023, r. 15). Bi vê berhemê hejmara sîyerên kurdî dibin 142 lib. Ji van berheman 86 lib bi soranî, 51 lib bi kurmancî, 3 lib bi zazakî û 2 lib jî bi hewramî hatiye nivîsîn. Ji van 142 berheman 115 mensur, 25 menzum û 2 li jî menzum – mensur in (Ertekin, 2022, r. 134). Li gorî van agahîyan dabeşbûna sîyerên kurdî li gorî lehçeyan bi vî şiklî ye:

**Tablo 2:** Hejmar û Cureyên Sîyeran Kurdî û Dabeşbûna Wan li Gorî Lehçeyan

| Taybetmendî | Hejmar | Ji Sedî (%) |
|---|---|---|

| | | |
|---|---|---|
| Bi Soranî | 86 | 60.6% |
| Bi Kurmancî | 51 | 35.9% |
| Bi Zazakî | 3 | 2.1% |
| Bi Hewramî | 2 | 1.4% |
| Mensur (Pexşanî) | 115 | 81% |
| Menzum (Helbestkî) | 25 | 17.6% |
| Herdu (Menzum-Mensur) | 2 | 1.4% |
| **Tevahî Berhem** | **142** | **100%** |

Ji 86 sîyerên soranî 75 sîyer mensur, 9 menzum û 2 jî menzum-mensur in. Ji 51 sîyerên kurmancî, 37 sîyer mensur û 14 jî menzum in. Ji 3 sîyerên zazakî 2 mensur û 1 menzum e dîsa ji 2 sîyerên hewramî 1 mensur ya dî jî menzum e. Ji ber ku berhema lekolîna me *Gulzar* berhemeke menzum a kurmancî ye di vê lêkolînê da em dê tenê sîyerên menzûm ên kurmancî şîrove bikin.

**C.2. Sîyerên Menzum ên Kurdî**

Di vê beşê da em dê li ser sîyernameyên kurdî bisekinîn. Sîyernameyên ku behsa tevahîya jîyana Pêxemberî dikin di beşekê da û yên ku tenê behsa beşek sîyera Pêxemberî dikin jî di beşeke dî da hatine kom kirin.

**C.2.1. Sîyerên ku Armanca Wan Vegotina Tevahîya Jîyana Pêxemberî ye.**

Di vê beşê da em dê li ser sîyerên kurdî yên ku armanca wan ji serî heta dawîyê nivîsandina sîyerê ye bisekinîn.

**C.2.1.1. Gulzar**

Ji alîyê Şêx Tahirê Şûşî (1917-1961) ve di sedsala bistemîn da hatiye nivîsîn. Şûşî di sala 1957an da dest bi nivîsandina vê berhemê kirîye û heta 1961ê ku wefat kirîye nivîsandina berhema xwe domandîye (Şûşi, 2023, r. 73). Li gorî agahîyên berdest *Gulzar*, ji alîyê qewarê ve siyernameya herî mezin a zimanê kurdî ye (Adak, 2020, r. 1517). Ev Berhem ji muqeddîmeyek, pênc rewde û xatîmeyekê pêk tê. Di *Gulzarê* da bin van beşan da 43 sernavên sereke û 355 seranavên jêrîn bi giştî 398 sernav hene. Ji ber ku Şûşî, zû wefat kirîye neşîyaya berhema xwe bi temamî binivîse.

Di beşa duyem a tezê da di bin sernavê “Danasîna *Gulzar*a Şêx Tahirê Şûşî” da derheqê wê da agahîyên berfireh dê bêne dan.

### C.2.1.2. El-Cewahîru’r-Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewiyye

Ji alîyê Mela Nûrullahê Godişkî (1921-2003) ve di sala 1967an da hatiye nivîsîn. Godişkî di vê berhemê da bi awayekê kronolojîk behsa jîyana Pêxemberî dike. Berhem ji 5024 beytan pêk tê. Destxeta orîjînal a berhemê ji aliyê şagirtê wî Mela Fadil ve di 20ê nîsana 1978an da hatiye kopîkirin û ji 220 rûpelan pêk tê, hin beşên wê jî bi destxeta Mela Nûrullahê xwe ve hatine nivîsandin (Titiz, 2020, r. 28). Berhem bi wezna erûzê, bi qaliba *"Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun"* hatiye nivîsandin û xwedî zimanekî herikbar û edebî ye. Di berhemê da taybetmendîyên zaravayê devera serhedê tê dîtîn. Dîsa, terkîbên erebî û farisî jî ji ber bandora perwerdehiya medreseyê di berhemê da tên dîtin (Ertekin, 2022, r. 30). Ev berhem wiha dest pê dike:

*Be navê wî Xwedayê layezalî*
*Emê ḥemd û sena ken zatê ‘alî*

*Ṣelat û hem selamê bênîhayet*
*Li ser qafîle salarê rîsalet*

*Digel al û ṣehabê wî kîramî*
*Şefî’ bin ew temam bo me temamî*

*Rîca ken ew ji rebbîl ‘alemînî*
*Ku ev şuġla me nivîşkan nemînî*

*Li wechê xêrê ew bête nîhayet*
*Be wechek ehsen û mubdî kiramet*

*Şerefbexş û şerefaz û şerefnam*
*Lî wechîllahîw bîl îfa û îtmam...* (Titiz, 2020, r. 76)

### C.2.1.3. Jiyana Piroz

Ji alîyê Mela Eladînê Kopî (j. 1937) ve hatiye nivîsîn. Berhem ji 175 rûpelan pêk tê û tê da bi tevahî 39 helbest hene. Ji van 36 mesnewî, 1 qeside, 1 murebbe û 1 jî

muxemmes e. Ev berhem di demeka dîyar da nehatiye nivîsîn. Mijara berhemê jiyana Pêxemberî ye. Di berhemê da behsa jidayîkbûna Pêxemberî heta dawîya serdema Mekkê tê kirin. Ji ber ku behsa tevahîya jîyana Pêxemberî nehatiye kirin berhemeke netamambûyî ye (Ertaş, 2023, r. 16). Çend mînak ji Jiyana Piroz:

*Sername namê Ellah*
*Bi wî pîroz e wellah*

*Pirtûk bi wî digîhje*
*Ne ew be xêv û gêj e*

*Bi polekî nahêje*
*Bêsûd e xêrnerêj e*

*Ne navê wî be name*
*Demî ye bêdewam e* (Ertaş, 2023, r. 18).

#### C.2.1.4. Kurtejîyannamey Pêxember be Honrawe

Siyernameyeke zaravayê soranî ye. Nivîskarê wê Muhsîn Ehmed Mustefa ye. Nivîskar di vê berhema xwe da bi awayekê kurt behsa jîyana Pêxemberî dike. Nivîskar dibêje min ji berê da hez dikir ku ez bi kurdîya şirîn sîyereke menzûm binivîsim da ku xwîner bi hêsanî bikarin vê sîyerê bixwînin. Ev berhem heta niha gelek caran hatiye çapkirin û dibe ku çapa wê ya ewil çapa 1993an be (Ertekin, 2022, r. 72).

#### C.2.1.5. Mewlûda Sîyer a Xerxurî

Ji alîyê Mela Ebdurrehmanê Xerxurî el-Perwarî ve di 2009an da hatiye nivîsîn û di 2013an da jî di nav weşanên Duayê da hatiye çapkirin. Ev berhem wekî mewlûdên dî yên klasîk kurt nîne û ji wan cudatir behsa jîyana Pêxemberî ya heta hîcretê jî dike. Berhem ji 15 beşan û 910 beytan pêk tê (Ertekin, 2021, r. 128-129). Wekî mînak beşek ji dawîya berhemê wiha ye:

*Çengeki axê Resûl avêt dema*
*Derketî çavê wan ronî lê nema*

*Nazilê erdê bû Cibrîlê emîn*

*Anî bû wehya îlahê 'alemîn*

*Ya Resûlûllah bike tu hîcretê*
*Emrê hicret daye Rebbê 'izzetê*

*Ya 'Elî gotî Muḥemmed min divê*
*Nav livînê min bimîne vê şevê*

*Emrê min hat dê bikim ez hicretê*
*Bêguman kes nade te qet ezyetê*

*Tu bide xwedya emanet çi hene*
*Der Medînê em li wir hêvya tene*

*Çûye ba mala Ebû Bekrê Siddiq*
*Lê ji şahina girî ew dil reqîq*

*Çûn şikefta Sewrê mane sê şeva*
*Wan Xweda parêst ji dîna ber çeva*

*Dû kevok çêkirne hêlîn ketnê da*
*Tevne pîri kûn li ser şkeftê veda*

*Çûn şikefta sewrê muşrîk ber derî*
*Kes tine gotin werin em dagerî*

*Çûn Qûreyşî li hev civîn û şêwirîn*
*Çar teref rîbarê Mekkehê birîn*

*Sed deve gotin xelat û hediye*
*Ki Muhemmed bigre bîne jê re ye...* (el-Perwarî, 2013, r. 59)

### C.2.1.6. Jêgirtiyên bi Zefer, ji Xebata Pêxember

Ji alîyê Mela Mehmûd Mustafa Yusuf ve hatiye nivîsîn. Berhem ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem da di bin sernavê “Jêgirtiyên bi Zefer, ji Xebata Pêxember” bi awayekê kronolojîk û kurt behsa jiyana Pêxemberî dike. Ev beş ji 55 rûpelan, 49 sernavan û 540 beytan pêk tê. Di beşa duyem da di bin sernavê “Kurdistan Piştî Sala 1974” behsê rewşa Kurdistanê tê kirin û di beşa sêyem da jî di bin sernavê “Jiyana Min” behsa jîyan û serborên xwe dike (Ertekin, 2022, r. 31-32). Berhem bi vî şiklî sê mijarên ji hev cuda di heman berhemê da kom dike û bi vî awayî ji berhemên dî yên sîyere cuda dibe.

### C.2.1.7. Jîyannameyî Pêxemberî Pêşewa be Honrawe

Siyernameyeke zaravayê soranî ye. Ji alîyê Ferhad Cewher Biradostî ve di navbera 1988 û 2001an da hatiye nivîsîn. Ev berhem ji 57 sernavan pêk tê û nivîskar di vê berhemê da bi awayekê kronolojîk ji jidayikbûnê heta wefatê behsa tevahîya jiyana Pêxemberî dike. Ev sîyername di sala 2007an da hatiye çapkirin (Ertekin, 2022, r. 71).

### C.2.1.8. Sîyerê Nebî bi Ziwanê Dimilî

Sîyernameyeke zazakî ye û ji alîyê Mila Cimoyê Babij ve hatiye nivîsîn (Babij, 2009, r. 4). Bi zazakî ji bilî vê berhemê çi sîyernameyên dî heta niha nehatîne nivîsîn (Ertekîn, 2023, r. 103). Berhem ji 23 beşan û 918 beytan pêk tê. Babij, behsa jîyana Pêxemberî ya piştî Pêxemberîyê heta wefata wî dike.

### C.2.1.9. Sîreta Resûlê Xweda

Ji alîyê Mela Muhammed Emîn Batmanî (Mehmet Ekmen) ve di sala 2010an da hatiye nivîsîn. Ji 31 rûpel û 340 beytan pêk te. Berhem bi taybetî ji bo ku zarok bi hêsanî fêrî jîyana Pêxemberi bibin hatiye nivîsîn (Ertekin, 2022, r. 33-34).

### C.2.1.10. Misk û Enber: Nezma Heyata Hezretî Pêxember (s.x.l)

Ji alîyê Mela Ebdurrehîm Şemrexî ve hatiye nivîsîn. Berhem ji 51 beşan û nêzîkî 1700 beytan pêk tê, Di berhemê da 3 qasîde û esmau’l-husnayeke ji 63 beytan pêk tê heye. Berhem di sala 2021an da di nav weşanên Nûbiharê hatiye çapkirin (Ertekin, 2022, r. 34).

**C.2.1.11. Zatu'l-Şîfa**

Tercumeya menzumeya Îbn-î Cezîrî ya bi navê "*Zatu'l Şîfa-i fî Sîretu'l-Mustefa*" ye û derbarê nivîskarê vê berhemê da çi agahî nînin. Di vê berhemê da derbarê jîyana Pêxemberî û çar xelîfeyan agahî hatîne dayîn. Nivîskarî ev berhem di sedsala 13. a hîcrî (m. Sedsala 19-20.) da nivîsandîye. Ev berhem niha di "Kutuphane-yî Dar'ul-Maarîf-e Bozorg-e Îslamî Tahran" da heye (Bideki, 2018, r. 215). Li gorî agahîyên berdest ji bilî vê berhemê çi sîyernameyên dî yên tercume nînin.

**C.2.2. Sîyer di Nav Cureyên dî da**

Di vê beşê da em dê li ser wan berhemên sîyerê yên kurdî bisekinîn ku li ser mijarên wekî, miraç, şemaîl, exlaq û wefata Pêxemberî hatîne nivîsîn.

**C.2.2.1. Rewdu'n-Ne'îm**

*Rewdun-Ne'îm,* mesnewiyeke dîdaktîk a Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî ye ku taybetmendiyên fizîkî û ruhî yên Pêxemberî (hilye) û çîroka mîracê bi detayên xwe vedibêje. Ev berhem, bi 35 beşan, eskatolojiya îslamî, jiyana piştî mirinê û rêwîtiya miracê bi awayekê wêjeyî û hêjayî rave dike (Tek, 2021, r. 28). Di sala 1888an[1] da bi şêweyê mesnewîyê hatiye nivîsandin û ji 4513 beytan pêk tê. Di nav van beşan da, beşa 29an bi awayekê taybet hatiye veqetandin ji bo vedîtina şehîdbûna Hesen û Huseyn, nevîyên Pêxemberî (Ertekini, 2022, r. 23). Bi wezna erûzê û bi tef'îleyên "*Fe'ûlun, Fe'ûlun, Fe'ûlun, Fe'ûl*" hatiye nivîsîn. Mînakek ji dawîya berhemê:

*Ji teqrîrê rawî, bi nuqtê selîs*
*Nezim bû di silkê çu durre nefîs*

*Di behsa lîbasê Resûlê Melîh*
*Mu'en'en bi ruwwatê qenc ê fesîh*

*Ehebbê libasan li nik zatê Wî*
*Ji hemyan qemîsek delal ê sipî*

---

[1] Ertekin 2015, Ertekin, 2021, Titiz, 2020 û Yıldız, 2020 dibêjin ku berhem di sala 1884an da hatiye nivîsin lê Ertekin di pirtûka xwe ya ku di 2022an da nivîsandî dibêje di sala 1888an ev berhem hatîye nivîsin.

*Qemis çun dipûşî, Nebîyê çu gul*
*Heta ku'ê desta, dihat, herdu mil*

*Heta ke'bê, payî dihat, zeylê Wî*
*Nebû ser libasê dirêj, meylê Wî*

*Di libsê dirêj, kîbr û xeyla heye*
*Di kîbrê de îsyanê Mewla heye*

*Di teb'e Hebîbî, tekebbur nebû*
*Li nik zatê wî, her tekessur hebû* (Hîvîdar, 2021, r. 241)

Ertekin diyar dike ku ev berehem di sala 1966an da ji aliyê Mela Ehmedê Qoxî ve cara yekem hate çapkirin. Piştre, Mela Zeynelabîn Amedî (Çiçek) di sala 1986an da nivîsa orîjînal ji nû ve nivîsand û şerheke erebî jî li ser zêde kir. Di sala 1988an da, Zeynelabîdîn Zinar (Kaya) ew li Swêdê bi alfabeya latînî çap kir. Herî dawî jî, di sala 2011an de, ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve li Dihokê hate weşandin (Ertekin, 2021, r. 124).

#### C.2.2.2. Mîrac-Name

Berhema Şems Kureyşî ye û derbarê mîraca Pêxemberî da ye. Yekem car di sala 1922an da cara duyem jî di sala 1966an da li Senendecê hatiye çapkirin. Di "Kutuphane-yî Meclîs-î Şura-yê Îslamî Tahran" da tê parastin (Bideki, 2018, r. 217).

#### C.2.2.3. Mîracname

Ji alîyê Mela Ebdusselam Heyderî ve bi soranî hatiye nivîsîn. Ev berhem yekem car di sala 1952an da hatiye çapkirin. Ev berhem derbarê bûyera mîraca hatiye nivîsîn û ji 540 beytan pêk tê (Ertekin, 2022, r. 73).

#### C.2.2.4. Mîracname

Ji alîyê miftîyê Cizîrê Mela Mahmud Bilge (1904-1974) ve di sala 1964an da hatiye nivîsîn. Behsa mîraca Pêxemberî dike. Ji 39 rûpelan û 206 beytan pêk tê. Ev berhem wek destxet e û di malpera fermî ya înternetê ya Ebdulreqîp Yusif da heye (Ertekin, 2022, r. 26).

### C.2.2.5. Wafatu'n-Nebî (Wefata Nebî)

Di sala 1967an ji alîyê Seyîd Mela Elî kurê Seyyîd Mela 'Ebdu'r-Rezzaq ve li Wanê hatiye nivîsîn. Navê berhemê bi erebî wek "Wafatu'n-Nebî" li ser desxetê hatiye nivîsîn. Berhem ji 12 beşan û 415 beytan pêk tê. Mijara wê wefata Pêxemberî (s.x.l) ye. Di berhemê da behsa nexweşîya Pêxemberî, rêbaz û rêçikên îslamî, exlaqê îslamî, buyerên beriya wefata wî, nivêja li pêşîya sehebîyan û mesela sehabeyekê bi navê Ukkaş, hatina Ezrail û Cebraîl bo def Pêxemberî, piştî wefatê definkirin, nimêja li ser Pêxemberî (s.x.l) û şuştîna wî bi awayekê kurt ji xwendevanan ra hatiye gotin (Çağmar, 2021, r. 30,44). Çend mînak ji vê berhemê wiha ne:

*Bêje ey bulbul di 'işqê bêje her*
*Te li dil da hene sed derd û keder*

*Gul vebûye here tu ser da bixûn*
*Derdê 'işq û muhbetê dil kirye xûn* (Mele Elî,-:1)
...
*Hûn emanet bin li Rebb*-el *'alemîn*
*El wîda' ey al û eshab ecme'în*

*Hûn bizanin dê herim bal Rebbê xwe*
*Bû me 'aşiq bo liqaa Rebbê xwe* (Mele Elî,-:9) (Çağmar, 2021, r. 31-32).

### C.2.2.6. el-Menzumetu'l Mî'racîyye

Di sala 1970an da ji alîyê Mela Muhemmed Nûrî ve hatiye nivîsîn. Berhem ji 10 Sernavan û 2448 beytan pêk tê. Tê da bi hûrgulî tenê behsa mîracê tê kirin. Di sala 1990an da ji alîyê Zeynelabîdîn Amedî ve hatiye îstinsax kirin û çapkirin (Ertekin, 2022, r. 29).

### C.2.2.7. El-Hemaîlû Fîş Şemaîlî

Ji alîyê Mela Nûrûllahê Godişkî ve di sala 1983an da hatiye nivîsin. Ji 789 rûpelan û 5569 beytan pêk tê. Mijara wê exlaq û şemaîla Pêxemberî ye (Ertekin, 2022, r. 30). Di berhemê da, exlaq û reftara wî, awayê cil li xwe kirina wî, nivînên wî, rabûn û rûniştina wî, îbadet û rojiya wî, ken û girî, axaftin, xwarin û vexwarina wî bi hûrgilî tê vegotin. Herweha navên Pêxemberî, jin û zarokên wî, xulam, mam û metên wî, alav

û heywanên wî û tewra xîm û xaniyê wî jî di berhemê da hatine dîyarkirin (Titiz, 2020, r. 27). Ev berhem li 2007an da ji aliyê Zeynelabîdîn Zinar ve hatiye latînîzekirin û di nav weşanên Dozê da hatiye çapkirin. Çend mînak ji vê berhemê wiha ne:

*Ji bona Muhemmed şemaîl bike*
*Li zendê rîsalet Hemaîl bike*

*Bi durrê di şehwarê Kurdî bin ew*
*Gelek goşîwarê di rindî bin ew*

*Bila seh biken kurdî ji xas û ʻam*
*Şemaîl çi ne yê di Xeyr-îl Enam* (Werqanisî, Elhemaîlû, r. 30)

**C.2.2.8. Tezkîretu'l-Exyar: Wefatname**

Ev berhem ji alîyê helbestvanekê bi navê Nûrî hatiye nivîsîn. Ji 13 beşan û 235 beytan pêk tê. Mijara wê wefata Pêxemberî ye. Ev berhem wekî pêvek di dawîya pirtûka Mela Muhemmed Meʿsûm Berwarî "*Ronahiya Çava: Heyata Hedretî Muhemmed Mustefa (s.x.l"* da cih digire ku 2020an da ji alîyê Nûbiharê ve hatiye çapkirin (Ertekin, 2022, r. 26).

**C.2.2.9. Mehzûnu'l Qulûb**

Ji alîyê Abdullah Atabey ve hatiye nivîsîn. Mijara wê wefata Pêxemberî ye. Nusxeya li ber dest neya orijînal e nusxeya Zeynelabidin Amedî ye. Heta niha hêj nehatiye çapkirin (Ertekin, 2022, r. 33). Wekî mînak beytek ji vê berhemê:

*Çi ku ez dibînim ku pur talib in*
*Li hubba Nebiyê xwe pur xalib in* (Werqanisî, 2007, r. 30)

**Tablo 3:** Sîyernameyên Kurdî

| | **Berhem** | **Nivîskar** | **Dîroka Nivîsandinê** | **Hej. Beytan** | **Zarava** |
|---|---|---|---|---|---|
| **Sîyernameyên Behsa Tevahîya Jîyana Pêxemberî Dikin** | | | | | |
| 1. | *Gulzar* | Şêx Tahirê Şûşî | 1961 | 10154 | Kurmancî |
| 2. | El-Cewahîru'r-Reşadiye Fî Sîretî'n-Nebewiyye | Mela Nûrullahê Godişkî | 1967 | 5204 | Kurmancî |
| 3. | Jiyana Piroz | Mela Eladînê Kopî (j. 1937) | Sedsala 20. | - | Kurmanci |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| 4. | Mewlûda Sîyer a Xerxurî | Mela Ebdurrehmanê Xerxurî | 2009 | 910 | Kurmancî |
| 5 | Jêgirtiyên bi Zefer, ji Xebata Pêxember | Mela Mehmûd Mustafa | 2013 (çap) | 540 | Kurmancî |
| 6 | Misk û Enber: Nezma Heyata Hezretî Pêxember (s.x.l) | Mela Ebdurrehîm Şemrexî | 2021 (çap) | 1700 | Kurmancî |
| 7 | Sîreta Resûlê Xweda | Mela Muhammed Emîn | 2010 | 340 | Kurmancî |
| 8 | Kurtejîyannamey Pêxember be Honrawe | Muhsîn Ehmed Mustefa | 1993 | - | Soranî |
| 9 | Jîyannameyî Pêxemberî Pêşewa be Honrawe | Ferhad Cewher Biradostî | 2001 | - | Soranî |
| 10 | Sîyerê Nebî bi Ziwanê Dimilî | Mila Cimoyê Babij | 2009 | 918 | Zazakî |
| 11 | Zatu'l-Şîfa | - | Sedala 19-20. | - | Hewramî (Tercume) |
| **Berhemên ku Behsa Tevahîya Jîyana Pêxemberî Nakin** | | | | | |
| 1 | Rewdu'n-Ne'îm | Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî | 1888 | 4513 | Kurmancî |
| 2 | Mîracname | Mela Mahmud Bilge | 1964 | 206 | Kurmancî |
| 3 | Wafatu'n-Nebî | Seyyîd Mela Elî | 1967 | 415 | Kurmancî |
| 4 | el-Menzumetu'l Mî'racîyye | Mela Muhemmed Nûrî | 1970 | 2448 | Kurmancî |
| 5 | Mehzûnu'l Qulûb | Abdullah Atabey | Sedsala 20. | - | Kurmancî |
| 6 | El-Hemaîlû Fîş Şemaîlî | Mela Nûrûllahê Godişkî | 1983 | 5569 | Kurmancî |
| 7 | Tezkîretu'l-Exyar: Wefatname | Nûrî | 2020 (çap) | 235 | Kurmancî |
| 8 | Wefatnamey Mela Bîlalî Hêroyî | Mela Bîlal | 1902 | 386 | Soranî |
| 9 | Wefatnamey Pêxember | Elî Kemal Bapîr | 1930 (çap) | 329 | Soranî |
| 10 | Mîracname | Mela Ebdusselam Heyderî | 1952 | 540 | Soranî |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| 11 | Mewlûdname û Mîracname | Mela Ebdulkerîm Muderrîs | 1969 (çap) | - | Soranî |
| 12 | Mîracname: Şewî Ronak | Mela Ebdusselam Heyderî | 1952 (çap) | 540 | Soranî |
| 13 | Wefatnamey Resûlê Nazdar | - | 1955 | - | Soranî |
| 14 | Wefatnamey Resûlî Nazdar | Muhemmed Emîn Esrî | 1972 | 221 | Soranî |
| 15 | Mîracnamey Rastî | Şêx Muhemmed Kesnezanî | 1983 (çap) | - | Soranî |
| 16 | Riştey Pêxember | Mela EhmedAwa | 2001 (çap) | 220 | Soranî |
| 17 | Wefatnamey Pêxember | Ebbas Xerîb | - | 220 | Soranî |
| 18 | Mîrac-Name | Şems Kureyşî | 1922 | - | Hewramî |

Di tabloya jorîn da tê dîtin ku 11 sîyerên menzûm ên kurdî hene ku behsa tevahîya jîyana Pêxemberî dikin. Ji van berheman 7 bi kurmancî 2 bi soranî, 1 bi zazakî û yek jî bi hewramî hatiye nivîsîn. Ev yek nîşan dide ku di nav zaravayên kurdî da sîyername herî zêde bi kurmancî hatîne nivîsîn. Ji van berheman 5, yên sedsala 20. û 6 jî yên sedsala 21. in ev yek jî nîşan dide ku sîyername di nav edebiyata klasîk a kurdî da cureyeke gelekî kevin nîne.

Di kurdî da berhemên ku behsa mijareka taybet a sîyerê dikin ji sîyernameyên ku behsa tevahîya jîyana Pêxemberî dikin zêdetir in. Di tabloya jorîn da tê dîtin ku hejmara van cure berheman 18 ne.[1] Ji van berheman 7 bi kurmancî, 10 bi soranî û yek jî bi hewramî ye û ev yek jî nîşan dide ku di van cure berheman da herî zêde bi soranî û paşê jî bi kurmancî berhem hatîne nivîsîn. Ji van berheman tenê *Rewdu'n-Ne'îm* ya sedsala nozdemîn e û yên mayî piranî yên sedsala bîstemîn in ev yek jî dibe delîl ku ev cure berhem jî di edebiyata kurdî ya klasîk da gelek kevin nînin. Ji van berheman 7 mîracname, 8 wefatname, 2 şemaîlname û 1 jî nesebname ye. Tê dîtin ku herî zêde li ser wefata Pêxemberî û mîraca wî ev cure berhem hatîne nivîsîn.

[1] Divê neyê jibîrkirin ku ev hejmar tenê ew berhemên hate niha hatine tespîtkirin dihewîne ji ber vê yekê dibe ku ji bilî van hêj berhem hebin ku nehatîne tespît kirin.

# BEŞA YEKEM: SERDEM, JÎYAN Û KESAYETÎYA EDEBÎ YA ŞÛŞÎ

## 1.1. Nêrînek Li Ser Serdema Şûşî

Erdnîgarî, derdor, rewşa sîyasî, civakî û edebî bandorê li ser nivîskarî dike. Ji ber vê yekê ji bo ku em bikarîn nivîskarekî baş fam bikin pêdivî ye ku em van taybetmendîyên herêma wî bizanîn. Di vê beşê da em dê li ser her sê sernavên jêrîn bisekinîn.

### 1.1.1. Rewşa Erdnîgarî û Dîrokî ya Gundê Şûşê

Gundê Şûşê, li herêma Behdînan a Kurdistanê ya Iraqê, di navbera bajarê Duhokê û qezaya Akrê da cih digire. Ev gund bi qasî 20 kîlometre li rojavayê navenda qezaya Akrê, li ser rêya Duhokê-Akrê ye (Salih, 2021, r. 9). Cihê gundê Şûşê di nexşeya jêrî da bi awayekê zelal hatiye destnîşankirin:




**Şikil 1. 1:** Gundê Şûşê Li Ser Nexşê

Ev gund, li herêma Zêbarîyê, di nav deşteka fireh a berzayî da, li binê zincîra çiyayên Akrêyê hatiye bicîkirin û bi xweşikiyên xwezayî yên xwe tê nasîn. Şûş, dikeve navbera gundên Şerminê û Gundkî ku ev herême wekî “Berbînê” tê nasîn û girêdayî eşîra Zêbarîyan e. Dîmenên çiyayî, mêrg, rez, bax û kanîyên sar ên li dora wê, taybetmendiyên erdnîgarîya gundê Şûşê ne (Şûşî, 2012, r. 6).

Gundê Şûşê ji aliyê dîrokî ve jî cihekî giring e û di bûyerên Mîrnişîna Behdînananê da (ku di sala Miladî 1262ʿan da hate damezrandin) rolekî berbiçav lîstiye. Cîhê wê yê stratejîk, bandoreke mezin li ser warên aborî, erdnîgarî û leşkerî kiriye. Di serdema îslamê da, bi avakirina navendên zanistî û dînî, Şûş bûye navendekî şaristaniyê û çandê (Salih, 2021, r. 9). Tekyeya ku di serdema XVIem da ji aliyê Şêx Şemseddînê Şûşî ve hatiye damezirandin, di jiyana dînî û zanistî ya gundî da cihekî giring girtiye. Ev tekye piştî wî ji aliyê neviyên wî ve hatiye rêvebirin û kevneşopiya qebûlkirina xwendekar û dilsozan dom kiriye. Di vê serdemê da alim û şêxên ku derketine, nav û dengê Şûşê di warên zanistî û manewî da belav kirine (Şûşî, 2011, r. 12).

Ji alîyê aborî ve gundê Şûşê bi axa xwe ya berzayî û çavkaniyên avê yên zêde tê nasîn. Gund di çandiniyê û baxçevaniyê da pêş ketiye û fêkiyan wekî hêjîr, zeytûn, gûz û aneg û tahilên wekî birinc, genim û ce hilberandiye (Salih, 2021, r. 9). Di heman demê da nebatên cihêreng ên li eraziyên çiyayî, Şûşê kirîye navendeke bazirganiyê û bûye cîhê danûstandinê.

Gundê Şûşê bi mekanên xwe yên dîrokî û çandî yên giring tê nasîn. Kela Şûşê, ku li ser nîştekî bilind bi awayekê stratejîk hatiye avakirin, yek ji sembolên wê yên sereke ye. (Şûşî: 2017, r. 35). Her weha, tekyeya Şêx Şemseddîn Şûşî û dibistana wê ya zanistî, bi pirtûkxaneyeke dewlemend, roleke giring di jiyana zanistî ya herêmê da lîstiye (Salih: 2021, r. 26). Bi mizgeftên xwe yên kevn, tekyeyên dîrokî û baxên xweşik, Şûş wekî navendeke çandî û tûrîstîk derdikeve pêş.

### 1.1.2. Rewşa Sîyasî û Civakî ya Serdema Şûşî

Şêx Tahirê Şûşî li gundê Şûşê yê herêma Behdînanê, di nav çandeke dewlemend a ilmî û tasawufî de mezin bû. Ev herêm bi sedan salan wekî navendek îlmî û rewşenbîrî dihat nasîn û zanyar û şêxên mezin beşekî çalak ê jiyana rojane bûn. Şêx Tahir di vê hawîrdora çandî de perwerde bû û xwe wek zanayekî serbixwe û ramangerekî civakî pêşkêş kir.

Di bîranînên xwe yên bi navê “Behdînan fî Muzekkerat eş-Şêx Tahir eş-Şûşî” de, ew behsa gera sîyasî ya salên 1930-1960an dike. Di vê serdemê de şerên berbelav di navbera hêzên Barzanî û hikûmeta Êraqê da çêbûn û gelek kes ji her du aliyan jiyana xwe ji dest da. Her wiha, şer jî di navbera hikûmeta Êraqê û gelê Asûrî da derketin û

birîndarî û mirin çêbûn. Serhildanên li dijî Îngilîzan di salên 1930an de serneketin. Piştî ku rejîma Qralî di sala 1958an de hilweşiya, hikûmeta General Ebdulkerîm Qasim bi siyaseta xwe ya erebkirinê, mafên kurdan binpê kirin. Di sala 1959an da şer di navbera Barzanîyan û Zebarîyan de derket. Bûyereke sîyasî ya girîng a vê serdemê di sala 1946an avakirina Komara Mehabadê bû. 10 mehan piştî avakirinê ev komar ji aliyê Îranê ve hate rûxandin û rêberên wê yên wekî Qazî Mihemed hatin îdamkirin (Şûşî, 2021, r. 43-111).

Di vê demê da gelê kurd li Iraqê di bin zilm û zextê dijîn (Yıldız 2004, r. 29). Lê ne tenê dewletê zilm dikir; axa, beg û sofiyên nepak jî zilm li xelkê xwe dikirin. Di nav endamên hikûmetê da rişwet gelekî belav bû. (Şûşî, 2021, r. 51-52). Di vê rewşa giran da, Şêx Tahir hem li dijî zilmê dewletê û hem jî li dijî zordariyên axa, beg û sofiyên nepak sekinî û alîkariya bêkesan û feqîran kir. Wî têklîfên meqaman ji aliyê gelek axa û desthilatan wergirt, lê wî çi caran qebûl nekir ku bikeve pozîsyoneke wisa ku neşêt mafê feqîran û bindestan biparêze (Şûşî, 2012, r. 21).

Di serdema Şûşî da çend rêxistinên sîyasî û dînî jî hebûn, lê Wî her tim xwe ji wan dûr xist û beşdarî wan nebû. Wekî mînak, rêxistena "Îxwanu'l-Mislimîn" ji wî daxwaz kir ku beşdarî wan bibe û li Mûsilê bi cih bibe, lê wî ev têklîf qebûl nekir. Wî xwest ku li cihê xwe bimîne, xizmeta gelê xwe bike û mafên wan biparêze (Şûşî, 2012, r. 24). Bi vê ramana xwe wî xwe nêzîkî tevgera Seîdê Nûrsî ya li Tirkiyê didît û bi rêya nameyan têkilî li gel Nûrsî hebûn.

Bûyereke dî ya bibandor a vê serdemê avakirina dewleta Israîlê bû. Şêx Tahir diyar kir ku ev dewlet bi piştgiriya Amerîkayê û Îngilîzan di demekê kurt da bi hêz bû û li dijî dewletên misilmanên derdorê rawesta. Wî got ku vê dewletê "dijminatî, bêtifaqî, kerb û înat" xiste navbera dewletên misilmanan û ew ji hev cuda kirin (Şûşî, 2021, r. 79-80).

Bi kurtasî Şûşî, di serdemeka wisa da jîyaye ku tê da hem krîzên navxweyî yên Êraqê, hem jî tehdîdên herêmî û têkoşîna kurdan heye.

### 1.1.3. Rewşa ʿIlmî û Edebî ya Derdora Şûşî

Şûşî, helbestvanekê sedsala bîstemîn e. Di vê sedsalê da gelek nûnerên edebiyata kurdî ya klasîk hebûne. Seyîd Elîyê Findikî (1892-1967), Mela Ebdulfetahê

Hezroyî / Fethî (1892-1975), Seyîd Qedrîyê Haşimî / Îrfanî (1898-1961), Mela Beşîrê Bedewî, / Bêxew, Mela Nezîrê Bedewî (1933-1982), Selahedînê Wanî, Mela Eladînê Kopî (j. 1937), Pîremêrd (1868-1950), Mela Mihemedê Koyî (1867-1943), Zîwer (1875-1948), Bêhûd (1878-1955), Sebrî (1881-1944), Selam (1892- 1959), Ehmed Muxtar Caf (1896-1935) û Qanê Muhzer (1898-1960) çend helbestvanên serdema Şûşî ne.

Gundê Şûşê bi xwe jî navendeke giring a çandî û edebî bûye. Di vî gundî da, gelek helbestvan, zana û şêxên navdar rabûne. Edebiyata Şûşê bi taybetî li ser helbest, çîrok û mijarên dînî pêk hatiye û bandoreke mezin li ser edebiyata kurdî ya herêmê kiriye (Şûşî, 2011, r. 16). Gundê Şûşê xwedî gelek helbestvan û nivîskarên navdar bûye. Şêx Şemsedîn el-Qutub el-Şûşî (sedsala 15-16ê m.) yekem şêxê navdar ê tekyaya Şûşê ye. Berhemên wî yên li ser tesewuf û zanistê bandoreke mezin li ser edebiyata kurdî kiriye. Piştî wî, Şêx Izedîn, Şêx Şemseddîn, Şêx Ebdulwehab, Şêx Yûnus, Şêx Ebdurrehaman û Şêx Îslam jî ji vî gundî rabûne (Salih, 2021, r. 16-20). Ji bili şêxan gelek helbestvan jî ji gundê Şûşê derketîne. Çend helbestvanên gundê Şûşê em dikarîn wiha rêz bikin:

#### 1.1.3.1. Seyfîyê Şûşî

Navê wî Ebdulletîf Kurê Şêx Yunisê Şûşî ye û mexlesa wî Seyfî ye (Salih, 2021, r. 20). Nevîyê Şêx Şemseddînê navdar e. Ji destxeta ku helbestên wî tê da ne dîyar e ku ew hebestvanekê sedsala 18an e. Di destnivîsa Muhemmed Teyyar Paşayê Amêdî ku di sala 1821ê hatiye nivîsîn da du helbestên Seyfî hene (Sezer, 2016, r. 136). Seyfî bi zimanê erebî, farisî û kurdî helbest nivîsandîne. Helbestên wî ji alîyê Tehsîn İbrahîm Doskî û Muhsin İbrahîm Doskî ve di sala 1999an da hatîne çapkirin. Di vê çapê da 10 helbestên wî yên kurdî hene (Adak, 2014, r. 294). Mînakek ji helbesteke Seyfî:

*“Dilo rabe bihar kamil*     *dilo rabe bihar kamil*
*Xilas bo feslê nîsane*     *çîmen şînbûn hemî bûn gul*
*Çi xoş bû wextê seyran*     *çi xoş bo wextê dilsoje*
*Fula sor dane bijkoj*     *enî spêda şefeq roje*
*`Erosa textê sultane*     *hesda çav bibon boze*
*Reqîb daîm bikr tuze*     *reşandin dor û mercane*
*Reşandin biskê tatare*     *bi misk û enbera sare”* (Duskî T.-M, 2014, r. 9).

#### 1.1.3.2. Selmanê Şûşî:

Navê wî Selman Reşîd e. Di sala 1938an li gundê Şûşê ji dayîk bûye. Gelek helbest nivîsandîne. Mîjara helbestên wî bi piranî welatperwerî, sîyasî û evîn e. Wekî mînak:

"*Ez selmanim selmanê Şûşî me*
*Di eslê xwe de yê Herkî me*
*Fîdayê barzanî me*" (Salih, 2021, r. 22).

Gelek helbest bi malbata Barzanîyan ra jî gotîne (Salih, 2021, r. 22). Di sala 1993an da wefat kirîye û gelek helbestên wî niha li nik xwarzayê wî Ebas Îslam hatîne parastin (Salih, 2015, r. 25).

#### 1.1.3.3. Şêx Enwerê Şûşî

Di sala 1937an li gundê Şûşê ji dayîk bûye. Ji malbata Şêx Şemseddînê Şûşî ye ku di nav wê malbatê da gelek şêx û alim û helbestvan derketîne. Şêx Enwer di bin bandora helbestvanên berîya xwe da maye û hêj di ciwanîya xwe da dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Wî di van helbestan da mexlesên "*Enwer, Şûşî û Cebelî*" bikarînane (Şûşî, 2011, r. 23). Di sala 1956an da du helbestên wî di kovara Hettaw da hatine weşandin. Mînakek ji helbestên wî:

*"Hecîyan zemzem divêtn me lew `eyîd û berat*
*kelek û fulik vebestin me li ser nîl û firat*

*Çi xeta min hey bîje ya çi bê emrê te dikem*
*gotî Şûşî nê xetayan li te girtîne welat*" (Amêdî, 1980, r. 63).

Her çend Gundê Şûşê xwedî mîraseke dewlemend a edebî be jî, piraniya berhemên edebî yên Şûşê di vav şert û mercên şer û wêranbûnê da berze bûne. Hin berhem hêj jî di destên şexsan da ne û nehatine weşandin (Salih, 2015, r. 25). Ji bo parastina vê mîrasê, pêdivî bi lêkolîn û weşandina berhemên mayîn heye.

### 1.2. Jiyana Şêx Tahirê Şûşî

Şûşî helbestvan û alimekê giring ê sedsala 20an e. Di vê beşê da em dê li ser jîyana Şûşî û berhemên wî bisekinîn. Di vê beşe da dê behsa ji dayîk bûna wî, nav û mexlesên wî, malbata wî, perwerdehîya wî, kesayetîya wî ya ʿilmî û civakî, kesayetîya

wî ya edebî, kesên ku bandor li wî kirîn, xettayîya wî û berhemên wî bê kirin. Bi vî awayî em dê bişên helbestvanê xwe baş binasîn.

### 1.2.1. Cih û Sala Jidayîkbûna Wî

Şêx Tahirê Şûşî di pirtûka jîyannameya xwe "Behdînan fî Muzekkerat eş-Şêx Tahir eş-Şûşî" da dîyar dike ku ew di sala 1917an da li gundê Şûşê ji dayik bûye (Şûşî, 2021: 30). Şûş[1] gundekê girêdayê qezaya Akrê ye û dikevîte navbera Akre û Duhokê. Ev gunde ji aliyê alim û helbestvanan ve gelekî dewlemend e.

### 1.2.2. Nav û Mexlesa Wî

Navê wî yê resen Tahir e. Navê babê wî Mihemed û navê bapîrê wî jî Tahir e. Di nav xelkê da wekî Şêx Tahirê Şûşî hatiye nasîn. Di berhemên xwe da nasnavên "*Tahir*", "*Şûşî*" û "*Tahirê Şûşî*" bi kar înane (Şûşî, 2012: 18). Şêx Tahirî di *Gulzarê* da nasnavê "*Tahir*" 34 caran û nasnavê "*Şûşî*" jî 12 caran bikarînaye lê nasnavê "Tahirê Şûşî" bi kar neanîye.

"***Ṭahir*** *te feqîr û jar e ya reb*
*Reḥma te wî pişk û bare ya Reb*" (*Gulzar*, b: 4)

"*Şermûnde ye pirr gunahê* ***Şûşî***
*Settar î Xudê tu lê bipûşî*"(*Gulzar*, b: 10)

Wekî mînak di van beytan û di gelek beytên dî da jî nasnavên "*Tahir*" û "*Şûşî*" hatîne bikaranîn.

### 1.2.3. Malbata Wî

Malbata Şûşî, malbateke şêx û aliman e. Şêx Tahirê Şûşî kurê Mihemed e, Mihemed kurê Tahir e, Tahir kurê Şêx Îslam e, Şêx Îslam kurê ʿEbdilrehman e, ʿEbdilrehman kurê ʿEbdila ye, ʿEbdila kurê Şêx Yunis e û Yunis jî kurê Şêx Ebdilrehmanê Şûşî ye (Şûşî, 2021, r. 21). Bapîrê Şûşî, Şêx Îslamê Şûşî di nîveka yekem a sedsala XIXem da întîsabê Şêx Nûredînê Birîfkanî kirîye û di tekyaya xwe da li ser rêka Xelwetîtî û Qadirîtîyê da çûye (Adak, 2020; 1509). Şûşî di pirtûka xwe ya bi navê "Mûcez Tarîx Heyatî we ma Şahedtuhu Mineʿl-Hewadis el-Muhîmme" da tîne ziman ku ew ji binemala Şêx Şemseddînê kurê Şêx ʿIzaldînê Qutb e. Şêx

---

[1] Di beşa Rewşa Erdnîgarî da bi perfîrehî behsa cih û taybetmendîyên gundî hatiye kirin.

Şemseddîn, 400 sal berî niha di navbera çerxê neh û dehê koçî da jîyaye û binemala wî digehît Fedlê kurê ʿEbbasî mamê Pêxemberî. Malbata Şûşî, niha ji 120 mala zêdetir e û li gelek deveran belav bûye. Babkekê vê binemalê li gundê "Boselê" li devera Sindîya akincî bûne û wekî "Şêxêt Boselê" berniyas bûne. Çend malek ji wan jî veqetîyane û li Kurdistana Bakur da akincî bûne (Şûşî, 2012: 18-19).

Binemala Şûşî, binemaleke ayînperwer bûye, bi dehan zana, mela, şêx û helbestvan jê rabûne. Ev kesene bi ilm û îrfanê mijûl bûne û gelek feqîyan di medreseya wan da li ber destê wan xwendîye. Şûşî di vê atmosfera ilm û îrfanî da xwendîye û mezin bûye.

Şûşî di jîyannameya xwe da dibêje ku wî 2 xwîşk û 2 bira hene û birayê wî Şêx Îslam hêj nebûye 30 salî wefat kirîye (Şûşî, 2021, r. 22). Şûşî, di sala 1949an da bi keça Mela Mihemedê Kurê Ebdulxaliqê Akreyî Eyşê re zewicîye. Şûşî ji vê zewacê du kur û çar keç çêbûne (Şûşî, 2023: 71-72).

### 1.2.4. Perwerdehîya Wî

Şûşî hêj di umrekê biçûk da dest bi perwerdehîya xwe kiriye. Ew pêşîyê li def babê xwe Şêx Mihemed fêrî xwendin û nivîsandina herfên erebî bûye û Quran li def babê xwe xwendîye (Şûşî, 2021, r. 33). Paşê li def Şêx Mehmûdê Şûşî dest xwendina kitêbên sereta kiriye. Li gundên derdora gundê xwe Swîna, Gundkî û Bakirman xwendina xwe berdewam kiriye. Şûşî di 14 salîya xwe da (1931) ji bo ku perwerdeya xwe berdewam bike çûyê deverên dûrtir. Li alîyê Soran çûye Hewlêrê, Koyê, Rewandîzê, Hîranê, Helewê, Sîsawê, Belingê û Celdîyanê; li alîyê Behdîna jî çûye Akrê, Başqala Axay, Xwîlê, Mikêrsê, Zêwka Kendalan, Nisra û Bagêra û li van deveran xwendina xwe berdewam kirîye. Şûşî li ser tefsir, hedîs, fiqih, mentiq, serf û nehw, belexat, erûz û hwd. gelek kitêb xwendîne. Wî, hin kitêb ji ber kirîne, hin jî bi destxeta xwe ji nûve nivîsandîne û li def xwe parastîne. Şûşî di dawîya xwendina xwe da careka dî diçe def seydayê xwe Mela ʿEbdilayê Bêtwateyî û di sala 1947-1948an da bawernameya xwe duwazde ʿilmî ji wî wergirtîye (Şûşî, 2021, r. 84). Piştî bawernameya xwe digire li gundê Sîsina dest bi melatîyê dike.

Şûşî di perwerdehiya xwe da li ber destê gelek seydayan xwendiye. Li jêrî navên seydayên Şûşî li gorî herêma Behdînan û Soran hatiye dabeş kirin:

Seydayên Wî;

Behdînan

- Şêx Mihemed (Babê Şûşî ye)-Şûş
- Şêx Memdûhê kurê ʿEbdulwehabê Şûşî-Şûş
- Mela Mihemedê Akreyî-Akrê
- Mela ʿUmerê kurê Seyidê Sîrçî-Akrê
- Miftî Efendî-Akrê
- Mela Pîrê Kadanî Başqala Axay
- Mela Şemseddînê kurê Yunusê Şûşî-Celdiyan
- Mela Ehmedê Hostanî-Mikêrs
- Mela Hisênê Marînisî-Bagêra

Soran

- ʿEbdulezîz kurê kak Mistafay-Hîran
- Mela Tahayê Korî-Korê
- Batasî û Mela ʿEbdilmecîdê Hertelî-Bêlinge
- Mela Salihê Kozepankî-Xaneqa
- Şêx Meẓherî û Mela Meʿsumê Koyî-Koyê
- Mela ʿEbdilayê Bêtwateyî-Hewlêr

### 1.2.5. Melatîya Wî û Feqîyên Wî

Şûşî di bîranîn xwe da tîne ziman ku wî di sala 1946an da li Gundê Sîsina ku dikevîte rojavayê Akrê dest bi melatîyê kirîye (Şûşî, 2021, r. 74). Piştî ku Şûşî dest bi melatîyê kir gelek kes hatine û li def wî dest bi xwendina ilmî kirine. Hemzeyê Şûşî (Kurê Şêx Tahirê Şûşî ye) navê feqeyên babê xwe wiha dîyar dike:

- Şêx Mihemedê Mêrsîdî
- Şêx 'Ebdurrehmanê kurê Mihemed 'Elîyê Pîr Çawşî
- Mela Silêman 'Elî Berdereşî
- Mela 'Ebdulhekîmê kurê Cesîmê Mizîrî
- Mela 'Ebdulrehmanê Mîr Serdiryê Herkî
- Mela Xalidê Cêbrî
- Şêx Îslamê kurê Mela Mihemedê Şoşî
- Mela Mihemed Emînê Cêbrî
- Mela Hisênî Gwîzî
- Mela Salihê kurê Keremê Goveyî

- Mela 'Ebdulmuxnisî kurê xelfeyê Duberdanî
- Şêx Hesen kurê Cemîlê Etrîşî
- Mela Şakirê Taqî yê Akreyî
- Mela Îbrahîmê Gurgavayî Zêbarî
- Seyîd 'Ebdulqaharê Barzanî
- Mela Sabirê kurê Kamilê Xêlekiyan
- Mela Salihê kurê Mehmûdê Barzanî
- Mela Sadiqê Mizîrî
- Feq Ehmedê kurê Mela Hemîdê Şoşî (Şûşî, 2012, r. 33-35).

### 1.2.6. Kesayetîya Wî ya ʿIlmî û Civakî

Şûşî hêj di biçûkatîya xwe da zarokekê gelekî zîrek û çeleng bûye. Wî gelek hez ji xwendinê kirîye û umrê xwe di rêya ʿilmî da borandîye. Şûşî, di feqetîya xwe da ʿilmên nehw û serf, mentiq, belaxet, îstîare, hîkme, kelam, ʿerûz, hîsab, felek, fiqh, ûsul, hedîs, tefsîr û ʿulûmu’l-Quran xwendîne û di derbarê van ʿilman da berhem nivîsandîne (Şûşî, 2012: 39). Şûşî ji bilî zimanê xwe yê kurdî fêrî zimanên erebî, farisî û tirkî jî bûye. Bi zimanên kurdî, erebî û farisî berhem nivîsandîne (Salih, 2021, r. 52). Her çend wî zû (44) wefat kirîbe jî di vî umrê kin da gelek berhemên ʿilmî û edebî nivîsandîne.

Şûşî misilman û kurdperwerekê hişyar bûye. Haya wî ji rewşa misilmanan û taybet jî ji rewşa kurdan hebûye. Wekî mînak Şûşî di biranînên xwe da ji alîyekî behsa avakirina dewleta cihûyan li Filistînê dike û vê rewşê gelek rexne dike û dibêje ev dewleta cihûyan tîfaqa misilmanan xirab dike û wan dike dijminên êk. Ji alîyê dî jî behsa rewşa xirab a kurdan û şerê navxweyî yê wan dike. Dîsa Şûşî rewşa medreseyên serdema xwe û helwesta dewletê ya li hemberî wan rexne dike. Dibêje li her derî mektebên dewletê hene û di van mekteban da gelek mamosteyên ku dilê xwendekaran ji dînê îslamê sar dike hene û dewlet gelek piştgirîyê dide wan. Li alîyê dî medrese gelek bê qîmet bûne û hêdî kesê nevêt zarokên xwe virêke wan ji ber ku piştî ku medrese xilas kirin nikarin bibin xwedî şol (Şûşî, 2021, r. 79-111). Têkilîyên wî yên xurt li gel derdora wî jî hebûne. Wekî mînak têkilîyên Şûşî li gel bajarên Mekke, Qahîre, Riha (Urfa) Cizîr, Mêrdîn, Telʿefer, Bexda, Mîsil, Rewandiz, Koy, Hewlêr û Duhokê hebûne (Şûşî, 2023, r. 72). Şûşî çûye çendek van bajêran yên ku neçûyê jî bi rêya nameyan têkilîyên wî di gel alim û zanayên wan bajêran çêbûye.

Şûşî her çend di derbarê rewşa civakê kesekê hişyar û xemxûr jî be qet nexwestîye ku li nav rêxistinên hizbî û sîyasî cih bigire. Her dem xwestîye li nav xelkê xwe bimîne, xizmeta wan bike û gotinên xwe bi awayekê azad bibêje û ji kesê nede paş. Şûşî, xwedî ruheke azad bûye û çi caran xizmeta serdestan nekirîye. Ew her dem bûye piştgirê kesên feqîr, hejar, bindest û li hemberî zaliman sekinîye. Ji ber ku wî xwestîye gelê xwe hişyar bike berhemeke bi navê "Pend û Şîret" nivîsandîye (Şûşî, 2012, r. 40). Di vê pirtûkê da bi bikarînana ayet, hedîs û gotinên pêşîyan gelek şîret li xwînerên xwe bi taybet jî li kurdan kirîne.

Ji bilî zanistên dînî dîrokê jî gelek bala Şûşî kêşandîye. Ji ber vê yekê wî çend berhemên dîrokê nivîsandîne. Wekî mînak pirtûkeke dîrokê a bi navê "Behdînan fî Muzekkerat eş-Şêx Tahir eş-Şûşî" bi erebî nivîsandîye ku tê da behsa jîyana xwe û bûyerên jîyana xwe dike. Ji bilî van çend berhemên dî yên dîrokê jî hene. Berhema ku mijara lêkolîna me *Gulzar* bi xwe jî pirtûkeke dîrokê ye ku tê da behsa bûyerên jîyana Pêxemberî dike.

Şûşî, serê her tiştî ji ber ku dilsozê dînê xwe bûye, umrê xwe bi ilmen îslamî borandîye û ji ber ku gelekî dilsozê zimanê xwe û miletê xwe jî bûye, xwestîye di van ilmên îslamî da zimanê xwe yê kurdî bikarbîne. Şûşî di sedema nivîsîna berhema xwe ya "*Gulzar*"ê da vê çendê bi aşkerayî wiha tîne ziman:

*Beḥs̱ê wî diken bi her zubanan*
*Medḥa wî diken li her mekanan*

*Emma me ḥeta nihû nedîne*
*Jîna wî bi kuṛdîya şirîne* (*Gulzar*, b: 421-422)

Şûşî di bawerîya xwe ya îslamî da xwedî boçûneka navend bûye, ji hizrên tund û xûrafî dûr bûye. Ew kesayetekê sofî û mutesewif nebûye belê melayekê xwedî ilm bûye. Bi rêya nameyan gelek têkilîyên wî digel zana, hizirvan û alimên misilmanan ên deverên wekî Misr û Tirkîyê çêbûne. Ji hemîyan pêtir jî têkilîyên wî bi Mela Seîdê Nûrsî çêbûne. Dema Şûşî feqe bû li devera Hîran û Nazenîna, namilkeka Nûrsî bi destê wî ketibûye. Şûşî dema vê namilka Nûrsî dixwîne gelek jê hez dike. Dema ew li gundê Sîsina akincî bûye, nameyekê bo Nûrsî dişîne û ji wî daxwaz dike ku wî jî yek ji telebeyên xwe qebûl bike. Ji bilî Seîdê Nûrsî peywendîyên wî yên giring digel mamosteyê wî yê xetxweşîyê Muhemed Tahirê Kurdî û rewşenbîrê kurd Hemzeyê

Muksî jî hebûne. Ji bilî van kesan jî peywendên wî digel gelek zana û alimên Mîsil, Misr û Bexdayê jî hebûne (Şûşî, 2012, r. 41).

### 1.3. Kesayetîya Wî ya Edebî

Ji binemala Şûşî û derdora wî gelek helbestvan derketîne. Muhemmed Xerîb[1], Seyfîyê Şûşî, Selmanê Şûşî û Şêx Enwerê Şûşî çend helbestvanên derdora wî ne (Şûşî, 2012, 42-43). Yek ji mezintirîn helbestvanê vê deverê jî Şêx Tahirê Şûşî bi xwe ye.

Şûşî jî wekî gelek helbestvanên kurd ên klasîk zimanên kurdî, erebî, farisî û tirkî dizanî. Ev jî bûye sedem ku ew bişêt berhemên edebî û ʿilmî yên van zimanan bixwînît (Şûşî, 2012, r. 40). Wî berhemên xwe yên peşxan û menzûm herî zede bi erebî û kurdî nivîsandîne. Wî helbestên xwe bi zimanên erebî, kurdî û farisî nivîsandîne. Bi erebî li ser kurteya Şêx Meʿrûfê Nodihîyê Berzincî şiroveyek ku ji 535 beytann pêk tê vehandîye. Dîsa bi erebî li ser hunera serwayê jî menzûmeyaka ji 98 beytann pêk tê nivîsandîye. Şûşî bi farisî helbestek tenê nivîsandîye û di vê helbestê da spasîya seydayê xwe Mela Hisênê Marînisî dike.

Şûşî li gel kurmancîyê zaravayê kurdî yê soranî jî baş dizanî. Di sala 1943an da dema ku li Hewlêrê dixwend bo Şêx Mistefa helbesteke soranî nivîsandîye ku di vê helbestê da medhên wî dike (Salih, 2021, r. 35).

Şûşî ji bilî berhemên *Gulzar, Pend û Şîret* û *Muʿcîzatên Pêxemberî* çend helbestekên dî jî bi kurmancî nivîsandîne. Wekî mînak gava tûşî nexweşîyeke giran bûyî û demekê dirêj li nexweşxaneyan da mayî çend beyt derbarê nesaxîya xwe da nivîsandîne. Şûşî bi kurmancî sê helbestên Melayê Cizîrî texmîs kirine û helbesteke kurdî-erebî bi şêweyê gulê nivîsandîye. Helbestên Şûşî di bin Sernavê "Helbestên Wî" da bi hûrgulîtir hatine şîrovekirin.

#### 1.3.1. Kesên ku Bandor li Şûşî Kirîn

Şûşî ji bo perwerdeya xwe li ber destê gelek seydayên ji deverên cuda ders xwendîne, ev jî bûye sedem ku bandora wan seydayan li ser Şûşî çêbe. Ji van seydayan pêşîyê bandora babê wî Şêx Mihemedî li ser wî çêbûye ji ber ku Şûşî li def wî dest bi xwendinê kiriye (Şûşî, 2012, r. 29). Ew bi taybetî di bin bandora seydayê xwe Mela Hisênê Marînisî da maye. Herweha wî gelek qîmet daye Mela Hemzeyê Xanî, Mela

[1] Muhemmed Teyyar Paşa (Xerîb)

Ebdilayê Bêtwateyî û Mela Mihemedê Akrê jî (Adak, 2020, 1510). Ji bilî van seydayên navên wan borî Şûşî ji aliyê ʿilmî û edebî ve di bin bandora çend kesên dî da jî maye.

Her çend ku rûbirû qed nedîtibe jî seydayekê ku bandoreke herî mezin li ser Şûşî kirî Mela Seîdê Nûrsî ye. Şûşî rûbirû ders li def Seîdê Nûrsî nexwendîne lê bi rêya nameyan têkilîya wan çêbûye. Şûşî, Seîdê Nûrsî wekî seydayê xwe û xwe jî wekî telebeyekê wî qebûl kirîye û gelek nameyên wî bi destxeta xwe nivîsandîne (Doskî, 2000, 144) ku ev jî bandora Nûrsî li ser wî nîşa dide. Bandora Nûrsî ya li ser Şûşî di *Gulzarê* da jî bi awayekê aşkere tê dîtin. Wekî mînak navê *Gulzarê* "Rîyadun Nûr" bi xwe nezîreyek e bo berhema Nûrsî ya bi navê "Rîsaletu'n-Nûr" (Adak, 2020, r. 1513). Şûşî di rûpela ku tê da behsa çavkanîyên *Gulzarê* dike dîyar dike ku *Îşaratu'l Îʿcaz* yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye (*Gulzar* Destxet, Rûpela Çavkanîyên *Gulzar*ê[1]). Ev yek jî nîşan dide ku Şûşî di bin bandora Nûrsî da maye. Dîsa Şûşî di nav beytên *Gulzarê* jî cihî dide Nûrsî û methên wî dike. Wekî mînak di van beytên jêrîn ên *Gulzarê* da Şûşî behsa Nûrsî dike:

*Ya Reb tu min û xulamê Qurʾan*
*Seydayê mezin melayê kuṛdan*

*Seydayê heman Seʿîdê meşhûr*
*Ustaẕê me cumle Ṭalibê Nûr*

*Hemyan me bikey fîdayê tenzîl*
*Aza me bikey bi sayê tenzîl*

*Çil salî me ew pitir li heştê*
*Ya Reb me heman bibey biḥeştê*

*Vêkra tu min û ewan ʿefû key*
*Dilxûş bi lîqayê ẕatê xû key* (*Gulzar*, b: 612-616)

Şûşî ji ber ku erebî, farisî û kurdî gelek dizanî bi hêsanî dikarî berhemên edebî yên van zimanan jî bixwîne. Ji ber vê yekê tiştekê gelekî siruştî ye ku Şûşî di bin bandora wan berhemên xwendî da mabe. Helbet ji bo ku yek bi yek bê tespîtkirin ka

[1] Bnr. Pêvek 8

Şûşî di bin bandora kîjan kesan û berheman da maye lêkolîneka serbixwe ya kûr lazim e. Di vê derê da em dê li ser bandorên aşkere tenê bisekinîn.

Helbestvanekê ku bandora wî bi awayekê aşkere li ser Şûşî tê dîtin Melayê Cizîrî ye. Şûşî ji ber hezkirina Cizîrî du caran dîwana wî bi xetê xwe yê xweş nivîsandîye. Tişta herî giring ku bandora Cizîrî li ser Şûşî nîşan dide jî sê texmîsên Şûşî[1] ne ku li ser helbestên Cizîrî nivîsandîn. Weki mînak parçeyek ji texmîsa Şûşî ku li ser helbesta Cizîrî nîvîsî wiha ye:

*"Min digû seyrî tu Tahir serî nadey bi tela*

*Hû bi sehlî ketye dava dîwan û bisk û bela*

*Ma nizanî te ji dil birbû dema qal û bela*

***Munserif ma dibûyîn em bi du sed cara mela***

***Lew bi ekser û îḍafa dax û mecrûr agirîn"*** (Dawîya Texmîsa Yekem)

...

*"Di dema qal û bela yar bi me bexşî fereḥek*

*Lew me dil sefḥeya elmas e wekî ʿişqa meḥek*

*Bi me ra dax û gehişt Tahirî qet nînin fereḥek*

***Ji ezel heq bi Melê daye ji ʿişqa qedeḥek***

***Ta ebed mest û xeramîn ji meya û qedaḥa"*** (Dawîya Texmîsa Sêyem)

Dîsa delîlekê dî yê ku bandora Cizîrî li ser Şûşî nîşan dide jî ew e ku Şûşî ji alîyê wate û tegehan ve beyteka gelekî dişibe beyta Cizîrî nivîsandîye. Pêşîyê em li beyta Cizîrî binêrîn:

*Bêzê dikir ji qencan ji remz û naz û xencan*
*Qedrê gulan çi zanît kerbeş divêt kerê reş* (Zêrevan, 2004, r. 113)

Cizîri di vê beytê da di rêzika duyem da têgehên *gul*, *kerbeş* û *kerê reş* bi kar tîne û dibêje kerê reş ji ber ku gelekî bê fehm e qedrê gulê nizane û tenê heş kerbeşan dike. Beyta Şûşî jî wiha ye:

*Babet niye her kesî gula geş*

[1] Metna her sê texmîsîn Şûşî wek pêvekê hatîne dayîn. Li pêveka 2 yê binêre.

*Kerṭeb'î nevêt ji ẋeyrî kerbeş* (*Gulzar*, b: 6126)

Şûşî jî di vê beytê da heman têgehên ku Cizîrî di beyta xwe da bikaranîye *gul, kerbeş* û *kerteb'* bi kar tîne. Di têgehan da tenê cudahîyeke biçûk heye ew jî ew e ku Şûşî li şûna *kerbeş,* kerteb' bikartîne lê wateya giştî naguhere. Li gorî van beytan em dişên bibêjîn ku Şûşî di vê beytê da hem ji alîyê têgehan hem jî ji alîyê wateyê di bin bandora Cizîrî da maye.

Helbetsvanekê dî yê ku bandora wî li ser Şûşî çêbûye jî Ehmedê Xanî ye. Bandora Xanî ya li ser Şûşî wekî ya Cizîrî aşkere nîne. Berhema Xanî, *Mem û Zîn* li ber destê Şûşî hebûye[1], Şûşî ev berhem xwendîye û ji alîyê qalibê erûzê yê *Gulzarê* ve di bin bandora Xanî da maye. Her çend ku qalîbên erûzê yên Mem û Zîn û *Gulzarê* bi tef'îleyên cuda ve hatibine formulekirin jî her du qalib hem ji alîyê jimara heceyan ve hem jî ji alîyê nirxên heceyan ên kurtî û dirêjî wekî hev in (Adak, 2020, r. 1518-1519). Xanî di *Mem û Zînê* da qalibê *mef'ûlu mefa'ilun fe'ûlun* bi kar înaye (Adak, 2019, r. 254-255). Şûşî jî di *Gulzarê* da qalibê *fe'lun fe'elun fe'el fe'ûlun* bi kar înaye. Wekî mînak ji *Mem û Zînê* û *Gulzarê* beytekê li gorî qalibên wan em dişên wiha berawird bikin:

*Namê te ye lewhê nameya 'eşq*

(- - + + - $\bar{+}$ - + - - )

*Îsmê te ye neqşê xameya 'eşq (Mem û Zîn, Şemrexî, 2013, r. 15)*

(- - + + - $\bar{+}$ - + - - )

*Wî dest di Muḥemmedî werandî*

(- - + + - + - + - - )

*Quwwet ku ḥeta ji wî birandî* (*Gulzar,* b: 2658)

(- - + + - + - + - - )


Di van beytên jorîn da tê dîtin ku qalibên Xanî û Şûşî bikaranîn ji aliyê hejmara heceyan, kurt û dirêjîya heceyan wekî hev in tenê tef'îleyên wan ji hev cuda

[1] Ev berhem niha jî di pirtûkxaneya taybet a Hemzeyê Şûşî (Kûrê Şêx Tahirê Şûşî) da tê parastin.

ne. Ev yek jî delîl e ku Şûşî di çêkirina qalibê *Gulzarê fe‘lun fe‘elun fe‘el fe‘ûlun* da di bin bandora Xanî da maye.


### 1.4. Xettatîya Wî

Taybetmendîyeke resen a Şûşî xettatîya wî ye. Hunera xetxweşiyê, di jiyana Şûşî da, cihekê taybet girtiye. Mamosteyê Şûşî yê xetxweşîyê jî Muhemmed Tahirê Kurdî bû (Şûşî, 2012, r. 46). Muhemmed Tahir, alim, dîroknas, mufesîr, zimannas û xettatekê giringê Erebîstana Siûdî bû (Şûşî, 2021, r. 77). Pisporê hunera xetê bû û yekem kes bû ku li Erebîstanê dersên xetê bi awayekê fermî dida (Özel, 2019, r. 110-112). Şûşî rû bi rû ew qet nedîtibû lê bi rêya nameyan têkilîyan hebû. Şûşî xetên xwe ji wa ra şandibûn wî jî ew gelek ecibandibûn û di sala 1946an da bi awayekê xîyabî îcazeta hunera xetê dabû Şûşî (Şûşî, 2021, r. 77). Îcazeta ku Muhemmed Tahir bo Şûşî nivîsandî wiha ye:


بسم الله الرحمن الرحيم
الحمد لله الذي علم بالقلم علم الانسان ما لم يعلم وصلى الله على نبينا محمد وآله وصحبه وسلم وبعد فلقد طلب مني حضرة المحترم
ملا محمد طاهر الشوشي بمدينة اربيل بالعراق الحبيبة في الخط العربي بعد ان بعث الي الشيء من كتابة يده فرأيته اهلا لذلك
ورجى له التقدم والفلاح فكتبت له هذه الاجازة سائلا الله تعالى له التوفيق والرضا والحياة السعيدة
والختم على الايمان الكامل بجاه وفضله انه سميع مجيب الدعاء
كتبه محمد طاهر بن عبد القادر الكردي بمكة المشرفة عام الف وثلاثمائة وست وستين ١٣٦٦
وتوقيع تبركا ختم

**Şikil 1. 2:** Îcazeta ku Muhemed Tahirê Kurdî bo Şûşî nivîsandî (Şûşî, 2021, r. 78)

Şûşî bi xetê xwe yê xweş gelek berhem û name nivîsandîne. Çend nimûne ji xettatîya Şûşî bi vî şiklî ne:




**Şikil 1. 3:** Mînakên Xettatîya Şûşî

### 1.5. Berhemên Şûşî

Şûşî, di warê ʿilmî û edebî da kesekê şareza bûye û her çend di umrekê biçûk da wefat kirîbe jî (44) di gelek warên ʿilmî da berhem nivîsandîne. Li ser tefsir, nesîhet, siyer, kêş û serwa û ʿerûzê berhemên wî hene. Her wiha wî berhemên edebî, dîrokî

nivîsandînê û gelek berhem jî bi rêya xetê xwe yê xweş întînsax kirîne. Şûşî, berhemên xwe bi zimanê kurdî, erebî û farisî nivîsandîne. Berhemên wî em dişên wiha dabeş bikin:

### 1.5.1. Berhemên Xweser ên Menzûm

Şûşî bi zimanê kurdî, erebî û farisî berhemen menzûm nivîsandîne. Berhemên Şûşî yên menzûm bi vî awayî ne:

#### 1.5.1.1. Gulzar (Rîyadê Nûr)

Giringtirîn berhema Şûşî ye ku ev berhem mijara teza me ye. Sîyereke menzûm e ku ji 10154 beytann pêk tê. Bi vê taybetîya xwe wekî mesnewîya herî mezina zimanê kurdî ye. Li ser jîyana Muhemmed (s.x.l) hatiye nivîsîn. Ev berhem heta niha du caran bi herfên erebî-kurdî hatiye çap kirin. Cara yekem di sala 1987an da ji aliyê Emîndarî Giştî Roşenbîrî û Lawanî Kurdistan ve hatiye çap kirin (Hesen, 2022, r. 61). Li gorî gotina Hemzeyê Şûşî di vê çapê da çend beşên kêm hebûne. Bo cara duyem ev berhem di sala 2012an da ji alîyê Hemzeyê Şûşî bi danasîneke berfireh a derbarê Tahirê Şûşî bi navê "*Gulzar, Dastana Dîroka Misilmanetîyê û Jîyana Pêxemberî Silav li Ser Bin*" li Duhokê hatiye çap kirin. Di beşa duyem da ev berhem bi hurgîlî dê hête nasandin.

#### 1.5.1.2. Pend û Şîret

Ji alîyê şiklîve wekî *Gulzarê* ye lê bi naveroka xwe ji *Gulzarê* cuda dibe. Naveroka vê berhemê bi temamî ji pend û şîretan pêk tê. Bi gelemperî ayet, hedîs û gotinên pêşîyan tê da diborin û ji nêzîkê hizar beytan pêk tê (Şûşî, 2012, r. 36). Şûşî ev berhem wek parçeyek ji *Gulzarê* nivîsandîye lê neêxistîye nav bergên destxeta *Gulzarê* da. Kurê wî, Hemzeyê Şûşî jî *Pend û Şîret* ji ber ku xwedî mijareke taybet e di nav *Gulzarê* da nehesibandîye û di di sala 1997an da wekî berhemeke serbixwe weşandîye. Wekî mînak çend beyt ji Pend û Şîretê wiha ne:

*Nûshek ji te ra dibêm bi çakî*
*Guhdê re ji min bi qelbê pakî*

*Gulçînek e min ji bax bijarî*
*Ez bu te dibêm di rahê Barî*

*Ekser ji hedîs û ayet in ew*
*Yan qewlê xudan dîrayet in ew* (Şûşî, 2012, r. 62)

### 1.5.1.3. Îsra û Mîrac û Muʿcîzatên Pêxemberî - س (sîn)

Şûşî ev berhem jî digel *Gulzarê* nivîsandîye anku beşek ji *Gulzarê* ye lê kurê wî Hemzeyê Şûşî ji ber ku babetê Muʿcîzatan ji babetê *Gulzarê* cûda dîtiye nexistîye nav *Gulzar*a ku di sala 2012an da li Duhokê çap kirî. Ev berhem wekî berhemeke serbixwe di sala 2022an da li Zaxo hatiye çap kirin (Şûşî, 2022, r.1). Ji 1260 beytan pêk tê û ji van beytan 732 derbarê muʿcîzatan e û 528 jî derbarê îsra û mîracê da ne. Naveroka vê berhemê bi temamî di destxeta *Gulzar*ê ya resen da di navbera beytên 4313 – 4873an da heye. Wekî mînak ev mijar di Gulzarê da wiha derbas dibe:

*Şêxê me Buxarî piṟṟ dîrayet*
*Bû me ji Enes diket rîwayet*

*Fermuye peyẋemberê Xudayî*
*Ev qîṣṣe ji ser ḥeta dumayî* (*Gulzar*, b: 4372-4373)
...
*Çûm Beyte Muqeddes û munewwer*
*Cemyane li wê hemû peyember*

*Wî pêşî peyemberan temamî*
*Du rekʿe ewî kirin îmamî*

*Mîʿrac bû me çêkirin bi teʿcîl*
*Serkeftime gel birayê Cibrîl* (*Gulzar*, b: 4393-4395)
...
*Her pênc bi cewanî û temamî*
*Gel weqtê di wan kirin bi ʿamî*

*Gel cumle şirut û rukn û sunnet*
*Fêr kir wî nebî ewî jî ummet* (*Gulzar*, b: 4872-4873)

Di destxeta *Gulzarê* da di navbera beytên 9423 – 10154an da bi 732 beytan behsa mucîzeyên Pêxemberî tê kirin. Çend mînak derbarê mijara mucîzeyên Pêxemberî ji *Gulzarê* wiha ne:

*Bê perde kirin peyemberî wan*

*Ba her çî ku hate serserê wan*

*Tu bûyî bû wan bi harîkare*
*Çen muʿcîze dane wan bijare* (*Gulzar*, 9439-9440)
...
*Xaşma bi resûlê xûy Muḥemmed*
*Çen muʿcîze nê te danê bê ḥed*

*Nîşanê peyemberî ne yekser*
*Dilmurde ye çî neînî bawer* (*Gulzar*, 9463-9464)
...
*Ez sundê dixwum bi navê Barî*
*Ew bûn bi jimarê yek hizarî*

*Rabûye nebî li du hemane*
*Wek xû bû hevîr û şîv û nane* (*Gulzar*, 10153-10154)

#### 1.5.1.4. Helbestên Wî

Şûşî bi, farisî, soranî û kurmancî helbestên xweser nivîsandîne. Bi erebî du berhemên bi şêweyê mesnewîyê nivîsandîne lê çi helbestên xweser ên erebî nenivîsandîne. Şûşî hemû berhemên xwe yên menzûm bi bi şêweyê mesnewîyê nivîsandîne lê di nav helbestên xweser da helbestek bi şêweyê mesnewîyê, yek bi şêweyê gulê, sê jî helbest bi şêweyê texmîsê nivîsandîne.

Şûşî bi farisî helbestek tenê nivîsandîye û di vê helbesta xwe da spasîya seydayê xwe dike. Metna helbestê di pêvekê da hatiye dayîn.[1] Wekî mînak çendek ji helbestê wiha ye.

*Dila ta key lîbasî huzn pûşî*

*Şod aya dersî tefrîh kursî*

---

[1] Bnr. Pêvek 2-3.

*Meger dil xerqe deryayî mestî*

*Weyaxud bende xeflet payî mestî*[1]

...

*Hirof çend ez gelkî zebanem*
*Bi nezdê Şêx û ustadem resanim*

*Kinuzî hîkmet û deryayî teqrîr*
*Şefîq û ewreq û mela pîr.* (Şûşî, 2017, r. 37)

Şûşî bi soranî jî helbestek tenê nivîsandîyê. Ev helbest bi şêweyê mesnewîyê nivîsandîye û di vê helbesta xwe da methên Şêx Mistefa dike. Metna helbestê di pêvekê da hatiye dayîn.[2] Wekî mînak çendek jî helbestê wiha ye:

*Temam waye xem û xoslî rehakem*
*Sîfatî xaneqay Şêx Mistefa kem*

*ʿEcaîb mewqîʿî ke dil goşade*
*Weku baxî îrem xoş xak û bade*

*Le rox şare nenêw şare pir xirore*
*Kesî dîn meqsedî bê bê qosore*

*Heqîqet rewdeye îkî pir neqawe*
*Muselsel awî wekî firmêskî çawe*

*Le her ca pirteqal westan mûqabil*
*Gilopî kehrebane ya hewqane dil* (Hemze Şûşî: 2017, r. 37).

Şûşî herî zêde bi kurmancî helbestên xweser nivîsandîne. Şûşî li dûmahîka dîwana Melayê Cizîrî ku wî teḥqîq kirîye texmîsa sê helbestên Cizîrî kirine. Ev helbeste ji aliyê Muhsin Doskî ve di sala 1989an da di kovara “Rewşenbîrî Nwê” da

[1] Bnr. Pêvek 2
[2] Bnr. Pêvek 3

hatîne weşandin (Şûşî, 2023: 75). Metna her sê texmîsan di pêvekan da hatiye dayîn[1]. Ji her sê texmîsan wekî mînak çend bend hatîne nivîsîn:

*"Min digû seyrî tu Tahir serî nadey bi tela*

*Hû bi sehlî ketye dava dîwan û bisk û bela*

*Ma nizanî te ji dil birbû dema qal û bela*

*Munserif ma dibûyîn em bi du sed cara mela*

*Lew bi ekser û îḍafa dax û mecrûr agirîn"* (Dawîya Texmîsa Yekem)

*"Yara ji fîraqa te ji dij teng nefesim ez*
*Der raha gulan sîne tijî xar û xestim ez*
*Her zendî dikujim ku bide min bi resim ez*
*Cana ji cemala te muqeddes qebesim ez*
*Ger ḥûr û perîzade nezer key te besim ez."* (Destpêka Texmîsa Duyem)
...

*"Di dema qal û bela yar bi me bexşî fereḥek*

*Lew me dil sefḥeya elmas e wekî ʿişqa meḥek*

*Bi me ra dax û gehişt Tahirî qet nînin fereḥek*

*Ji ezel heq bi Melê daye ji ʿişqa qedeḥek*

*Ta ebed mest û xeramîn ji meya û qedaḥa"* (Dawîya Texmîsa Sêyem)

Şûşî bi şêweyekê xweser û balkêş helbestek nîvîsandîye. Ev helbest bi şêweyê guleka girûvir a xwedî gelek per hatiye nivîsîn. Di her perekê gulê da beytek heye ku misraya yekem bi kurmancî ya dûyê bi erebîye[2] (Şûşî-Yasin, 2025). Di nîveka gulê da herfa (ل ) Lamê heye û ev herf hem di serê hem jî di dawîya hemû beytan da heye (Ertekin, 2024, r. 467). Helbest wiha ye:

*Li mûma dilê min taze şu'lek welê hil bû*
*Bi wecdin elîmin min ḥebîbin mucemmelî*

---

[1] Bnr. Pêvek 4.
[2]Orjiînala helbestê dî pêvekan da hatîye dayîn.

*Li mecmer hewayê yarê bê luţf û bê meylê*
*Li yebkî fûadî bi'd-dumu'il muselselî*

*Li selsalê xwûn ber şefḥeê rûyê min sayil*
*Yelûḥû 'eleyha resmû ḥebîbin bi cedwelî*

*Lew di cefaya min çu bulbul bi nalan im*
*Nemûcû we neştaqû li ezharî kelkelî*

*Li gulgul qebayê nazikê min 'ecaîb dîn*
*Yenûṭ û 'ele'l-ẖed'deynî min ḥebbî felfelî*

*Li fulful du ẖalên 'enberîn bûn û sîm bazû*
*Zewaîbûha mislu'l-ḥerîrî'l- mufettelî*

*Li tev misk e wê dêm şubhê mahê ku de şefa*
*Fe eḥsin bî şudxî min musna we murselî*

*Li ser mil diẖwûnin ţûţî ser ţayê qedserwê*
*We yermî sîhamen min 'uyûnin mukeḥḥelî*

*Li ḥukmê te cana dil cigersûj û xemnak im*
*Kema teḥrîqu'n-naru'l-xeḍa summe tencelî*

*Li cennet reḥîqa weşlê Ţahir veẖwor yek cam*
*Emanun we teslîmun lî racin we mûmilî* (Ertekin, 2024, r. 468-469).

Şûşî helbesteke dî di sala 1960an dema li nexweşxaneya Twîsê razayî bû nivîsandîye. Di eslê xwe da ev helbesteke serbixwe nîne Şûşî wek parçeyeke *Gulzarê* nivîsandîye û xwestîye ku bêxe berahîka behsa zewaca îmam Elî û Fatîmeya kiça Pêxemberî. Lê paşê Şûşî gotîye "*Ez derbarê xistina nav Gulzarê ya vê helbestê dudil im hetta pêtir we difikirim ku neêxim nav çêtir e. Înşellah di rojên bê da ez dê vê helbestê bi awayekê taze binivîsim."* (Şûşî, 2021, r. 125-130). Helbest bi bi heman qalibê erûzê ya *Gulzarê* ve hatiye nivîsîn û di çend cihan da jî behsa *Gulzarê* jî dike.

Ev menzûme ji 106 beytan pêk tê û tê da behsa rojên xwe yên di nexweşxaneyê da borandîn, nesaxîya xwe, tedawî ya xwe, dermanên xwe, rewşa nexweşxaneyê, rewşa nexweşan dike (Şûşî, 2021, r. 125-138). Di dawîyê da vê menzûmê di nav destxeta *Gulzarê* da cih negirtîye. Bi awayekê muswedde li def Hemzeyê Şûşî hebûye û wî jî di dawîya pirtûka bîranînên Şûşî da bi tîpên erebî neşr kirîye û çend şîroveyên erebî li bin nivîsandîne. Her çend di nav destxetê da cih negire jî ji ber ku Şûşî pêşîyê ew wek parçeyek ji *Gulzarê* nivîsandîye me ew latînîze kirîye. Helbesta Şûşî ya derbarê nexweşxanê û nesaxîya wî bi vî şiklî ye:

*Bîsmîllahîrreḥmanîrreḥîm*

*Eyûb jî, dema gazî Xwedayê xwe kir; (Xwedêyo!) Derdekî giran bi min girtiye û tu dilovantirînê dilovanan* (Sûreya Enbîya, ayet: 83)

*Ya Reb tu Xudayî bê hevalî*
*Bê hed mezinî tu Zulcelalî*

*Saxî nemirî tu ber qerarî*
*Malik tu yî serbixo bi karî*

*Zatê te zîdd û nîdd û çûne*
*Karê te ji emrê kun yekûne*

*Pakî ji cîhatî bê mekanî*
*Sultan û xudanê du cîhanî*

*Her hey ji ezel ebed dimînî*
*Xaliq tu Xudayê alemîn î*

*Karê te dirist û hîkmeta te*
*Îlmê te mûhît û qudreta te*

*Zana yî bi her nîhan û razan*
*Agayî bi dadê dadexaran*

*Karêt te hemû di espehîn e*

*Şolet te belê di kes nedîne*

*Şeinêt te tijî ji hîkmet in ew*
*Bo ehlê dilan bi îbret in ew*

*Kes nîne bibet eger bidey tu*
*Kes nîne bidet eger bibey tu*

*Ew dê bî ewa tu hez dikey bes*
*Karê te niye ku red biket kes*

*Ew zikrê te ye sefayê canan*
*Wey navê te ye şîfayê canan*

*Ya Reb me nekey şeqî û gumreh*
*Xafil me nekey ji zikrê Ellah*

*Naşûkrî nebî eger bi nale*
*Bêjim bi qelem ve erzûhale*

*Ezman û dil û qelem bi yekser*
*Erzê te bikem meram û mehder*

*Teirîxê nesaxîya xû Şûşî*
*Herfek ji Rîyadê Nûr bikêşî*

*Belkî ji bira û xwînewaran*
*Ez bême xeyalê car bi caran*

*Ew bo me biken duan bi rehmet*
*Rehmet li heman bî ta qîyamet*

*Ew bo me biken dua şîfayê*
*Gel ecr û seadet û rizayê*

*Ya Reb te ezê feqîr û jar im*
*Pirr swîç û xeta û şermezar im*

*Gazî te dikim bi zarê Eyyûb*
*Ew pakepeyemberê te mehbûb*

*Serdarê me van nexûş û jaran*
*Wî bo me bikey ji hîvîkaran*

*Qurtar me bikey ji vê belayê*
*Aza me bikey ji her xetayê*

*Rehmet te pire kerem te zor e*
*Bo xatirê wî ji min bibore*

**Mêjûya Nesaxîyê**
*Ya Reb tu dizanî çen li mêje*
*Ev êşe li min te kir dirêje*

*Şêş sale Xudê ve derde tale*
*Naxûş kirîye li Şûşî hale*

*Naşûkrî nebî ji rengê tîzkar*
*Ev behse di nêv Rîyad û Gulzar*

**Sala 1954ê**
*Heftê û hizar û sê û sêsed*
*Bo hîcretê serwerê me Ehmed*

*Ev derde te daye min bi îhsan*
*Ya reb tu bigêrî xêr û xufran*

*Ey bê şebehî di qudreta xû*

*Danîn te sebeb ji îzzeta xû*

*Esbab di kerr û di kor û lal in*
*Bêy emrê te ew emel betal in*

*Ew cumle bi emrê tu bi kar in*
*Nîşanê kemalê kirdigar in*

*Derman bi te ye dibîte derman*
*Bê fayde ye ta nekey tu ferman*

*Her çî ji me hatî pare mecbûr*
*Min da bi heqê dewa û doktûr*

*Nêzîkî du sal me kir tedawî*
*Lê fayde nebû me dest bû xawî*

**Sala 1956ê**
*Yaran ji me ra digot ji cane*
*Tu çak e biçî bi xestexane*

*Heftê û hizar û sêzde û pênc*
*Naçar te kirim ji derdê pirr renc*

*Daxilbûme xestexaneyê Mûsil*
*Paş çen mehekan te kirme xûş dil*

*Qurtar te kirim ji wê belayê*
*Pirr ber bi şîfa û hêz û şayê*

*Çen xûş e Xudê xûşîy û nîmet*
*Paş renc û nebûn û derd û nîqmet*

*Ew qedrê ji afîyet dizanî*

*Ê dîtî mûsîbetek bi canî*

**Sala 1957ê**

*Heftê û hizar û sêzde û şeş*
*Bû ez bi giyanê xûş û dilgeş*

*Sername ji bo Rîyadê Nûre*
*Lew wext e me danî pirr sirûre*

*Salek nediçû ji meşyeta te*
*Dubare li min ve derde hate*

**Sala 1959ê**

*Heftê û hizar û sêzde û heşt*
*Şe'ban ku dema bi axirî geşt*

*Sê heftê diçûn ser buharê*
*Ev car te birim pitir bu xarê*

*Karê te îlahî çen cuwan e*
*Carek dî te birim xestexane*

*Yek sal û sê meh temame naşad*
*Keftîme di xestexaneyê Bexdad*

*Dûr im li bira û day û baban*
*Ewlad û heval û xûş xîtaban*

**Kurtîyek li Ser Rewşa Xesta Twîse**

*Ew xeste li nik Twîse nave*
*Xûş cê li kinar cu av bi nave*

*Xerbê wê Diyal e nave Rûbar*
*Dîcle dikevîte qîbleka xwar*

*Xestek mezin e gelek berîn e*
*Naxûşî nebî cihek şirîn e*

*Her layî firîz çemen di pan in*
*Pirr dar û gulêt gelek ciwan in*

*Geh ser û sewber û qelentoz*
*Darxurme di taze û bejinqoz*

*Geh as di ciwan û pirteqal in*
*Darêt di gulan ji dil delal in*

*Odêt wê di mezin û di qenc in*
*Bijlî ji xusûsî bîst û pênc in*

*Nêzîkî hizar li nave nasax*
*Zengîn û ciwan û pak û perlax*

**Xelkê Xestê Nûke**
*Ya Reb tu dizanî çî li dil min*
*Zêdey ji xeman nexûş li mil min*

*Keftîme di nîvê qewmekê bed*
*Bê dîn û derdeserî çi bê hed*

*Nadan û ker û zimandirêjan*
*Bêterbîyetan û hezrebêjan*

*Exlaqê di wan di pîs û nakam*
*Bes ew bi devî diken xû îslam*

*Bême'rîfet in di bêzemîr in*
*Bê ferqe ye ger ciwan û pîr in*

*Êkek ji sedan eger bibînî*
*Pîçek bi xuliq ciwan û dînî*

*Şek nîne belê çi qewm û millet*
*Dûr keftî ji dînê heq bi xeflet*

*Derkeftî ji rahê rastê Quran*
*Tabi' bi hewa û nefs û şeytan*

*Pişt daye şerî'etê Xudayî*
*Xafil ji kelamê Mustefayî*

*Nadan û neker bi sunneta wî*
*Bê behreyê pakesîreta wî*

*Helbet digerêt wekî dibînî*
*Lew pirr ji dilî esef dimînî*

*Sed heyf û esef bu dînê îslam*
*Ew dînê xeqê Xudayê ellam*

*Ew dînê we taze û munewwer*
*Ew şer'ê we adil û mutehher*

*Ew hukm û nîzam û xulqê taze*
*Ew nav û nîşan û 'îzz û naze*

*Ew qewmê we mezin û we rengîn*
*Ew hinde bi hêz û şan û sengîn*

*Ew hinde bi qîmet û şerefnak*
*Evroke wesa dibînî napak*

*Ya Reb tu bi cahê yarê muxtar*
*İslamê ji xû ve bikey hişyar*

*Taze vegêrîn bo dînê îslam*
*Carek dî ezîz bibin nîkûnam*

*Wan hukm û emel bi şer' û sunnet*
*Hem jînê cîhan û rahê cennet*

*Wek tacê serê Kurey Zemînê*
*Hel Endelûsê heta bi Çînê*

**Hejmara Dermanan**
*Hel ewwelî ta digehte ev dem*
*Dermanê di min çi zor e ger kem*

*Borîne ji bîst û pênc hizarî*
*Enwa'ê hebik neçar me xwarî*

*Eşkalê şirenqe nêv giyanim*
*Sih zêde ji hefsedan dizanim*

*Lewra çi dikem tedawî her car*
*Mîn cumle nivîsîne bu tîzkar*

*Dermanê di ron di çen ezab e*
*Ew hinde me xwarî bê hesab e*

*Ya Reb tu dizanî çav li rê me*
*Çavnêrê şîfa û rehmetê me*

*Rizgar me bike ji êş û nalan*
*Ew dadiresmê me xestehalan*

*Nê emrê te ye Xudayê mazin*
*Dad û teleban ji min bixwazin*

*Ya Reb tu bi navê xûy şirîn key*
*Paşî bi Resûlê çêtirîn key*

*Bo xatirê xirr sehab û alan*
*Sahibşerefan xudankemalan*

*Xasma bi sehabeêt di bedrê*
*Bo xatirê şevberat û qedrê*

*Bo xatirê cumle enbîyayan*
*Bo qewmê bijare ewlîyayan*

*Lutfa tu kerem bikey rizayê*
*Rizgar me bikey ji vê belayê*

*Xûş key tu li min gîyan û canî*
*Gel xirr me biraderêt dizanî*

*Bê bar me nekey ji xêr û ecrê*
*Bo xatirê pake ehlê bedrê*

*Pirr sûç û xeta me pirr gunah im*
*Şermunde ji tu mê rûsiyah im*

*Bikşîn qelemê 'efû bi defter*
*Bo xatirê çêtirîn peyember*

*Hişyar me bikey xurûrê*
*Dil zînde bikey bi feyz û nûrê*

*Behrek bide min ji camê qudsê*

*Bêhnek ji ‘ebîrê baxê unsê*

*Memnûn bi derê etayê xû ke*
*Memnûn bi cihê lîqayê xû ke*

*Dilxûş ke bi cennet û rizayê*
*Pirr bar ke bi dîtin û lîqayê*

*Bo sebr û dil û sukûnê canî*
*Behsek me ji bo Rîyadî danî*

*Pêxemberê mey xudanê lewlak*
*Key dayewşî Fatîmey şerefnak*

*Ev behsê şirîn me kir nîşane*
*Teirîxê ku ez li xestexane*

*Dil şermê diket Xudê ji tu ye*
*Ev çende me got ji halê xû ye*

*Min gotîye bes bo yad û tîzkar*
*Bo behsê niho me gotî pêş bar*

*Ger yar bî Xudê û ez bimînim*
*Dê riste Rîyazê Nûr vehwînim*

*Ellah ji me ra bibî mededkar*
*Da cumle nezim bikem guherdar*

*Ya Reb bi Elîy û Fatîmayê*
*Xufranê bidey digel şîfayê*

#### 1.5.1.6. El- Şerhe-l Menzum ʿElî er- Cewze-l Şêx Meʿrûf el- Nodehî el-Barzencî

Berhemeke menzûm e. Bi zimanê erebî hatiye nivîsîn. Şûşî di vê berhemê da menzûmeya Şêx Meʿrûfê Nodehî (175 beyt) ya ku bi zimanê erebî li ser ilmê eruzê nivîsîye dîsa bi zimanê erebî û bi awayekê menzûm şerh kirîye. Armanca vê berhemê ew e ku feqe bi awayekê hêsan bişên qalibên erûzê jiberbikin. Şûşî di destpêka berhemê da behsa pênaseya erûzê û xalên giring ên ku divê bên dubarekirin, di beşa duyem da behsa beşên erûzê, di beşa sêyem da jî behsa kêmasîyên erûzê kirîne û xatîmeyek li berhemê zêdekirîye (Şûşî, 2021, r. 67). Ev berhem ji 535 beytan pêk hatiye û hêj çap nehatiye çapkirin (Şûşî, 2023, 74).

#### 1.5.1.7. Fen el- Serwa

Mijara vê berhemê hunera serwayê ye, bi zimanê erebî, bi awayekê menzûm hatiye nivîsîn. Ji 98 beytan pêk hatiye û hêj çap nebûye (Şûşî, 2023: 74).

### 1.5.2. Berhemen Pexşanî

Di bin vî sernavî da dê behsa sê berhemên Şûşî yên pexşan hatiye kirin. Berhemên Şûşî yên pexşan wiha ne:

#### 1.5.2.1. Behdînan fî Muzekkerat eş-Şêx Tahir eş-Şûşî

Ev pirtûk jîyannameya Şêx Tahirê Şûşî ye. Şûşî di vê berhemê da bi awayekê kurt behsa jîyana xwe û serborên xwe kirîne. Şûşî di rûpela pêşîn a pirtûkê da dibêje ev berhem kurtedîroka bûyer û wefata kesayetên mezin in. Çendek ji van bûyeran min ji bapîrê xwe Şêx Îslam neqilkirîne yên mayîn jî min nivîsandîne. Şûşî dibêje min ev pirtûke ji bo ku bo nifşên piştî me tên bibe bîranîn û ji wê şîret werbigirin dinivîsim. (Şûşî, 2021, r. 10). Berhem bi zimanê erebî hatiye nivîsîn, ji 188 rûpelan pêk tê û di sala 2021an ji aliyê Hemzeyê Şûşî ve li Tehranê, di çapxaneya Çengel da hatiye çap kirin. Ev berhem ji bo jîyan Şêx Tahirê Şûşî çavkanîyeke giring a lêkolîna me ye.

#### 1.5.2.2. Feraîd el-Mînhac

Nameyek e li ser ilmê mîratgerîya şiʿrê û di sala 1940an da hatiye nivîsîn. Ev berhem bi xetekê ciwan û bi endazyareka taybet hatiye nivîsîn. Her rûpelekê vê berhemê bi şêwazekê taybet hatiye xemilandin (Şûşî, 2023, r. 74).

#### 1.5.2.3. El-Muntexeb fî Zîkrî Mîlad Muhemmed Fexruʿl – ʿEcem wel-ʿEreb

Ev berhem mewlûdnameyka pexşan e û bi zimanê erebî hatiye nivîsîn. Berhem bi xetekê ciwan ve hatiye nivîsîn. Ji 40 rûpelan pêk tê û hêj nehatiye çap kirin (Şûşî, 2023, r. 74).

### 1.5.3. Berhemên Înstînsax, Perawêz û Şerh

#### 1.5.3.1. Nivîsîn û Binecihkirina Dîwana Mela Ehmedê Cizîrî

Şûş du caran dîwana Melayê Cizîrî bi xetê xwe istînsax û teḥqîq kirîye. Yek ji van nusxeyan di rêya Qahîreyê da berze bûye, ya dî jî di şewata çapgeha “Kurdistan ê” ya Gîwê Mukrîyanî da sotîye. Lêbelê Mela Tahayê Kovilî li ber yekê ji van nusxeyek ji bo xwe istînsax kirîye û ev nusxe di pirtûkxaneya taybeta Tehsîn Îbrahîm Doskî da tê parastin (Şûşî, 2023, r. 74).

#### 1.5.3.2. Nivîsîn û Binecihkirina Tefsîra Îşarat el-Îʿcaz fî Mîzan el-Îcaz ya Mela Seîdê Nûrsî

Şûşî di vê berhema xwe da berhema Mela Seîdê Nûrsî ya bi navê Îşaratu’l-Îʿcaz fî Mezannîʿl-Îcazê bi zimanê erebî istînsax û teḥqîq kirîye. Ji 506 rûpelan pêk tê. Îhsan Qasim Salihî ev xebata Şûşî li ser navê xwe çap kirîye. Li gorî Hemzeyê Şûşî gelek cudahî di navbera pirtûka ku Îhsan Qasim çap kirî û ya destxeta Şêx Tahirî da hene (Şûşî, 2023: 74).

#### 1.5.3.3. Mîn Hîkemîyat en-Nûrsî

Ev berheme ji metnên giring ên ku ji berhemên Mela Seîdê Nûrsî hatine hilbijartin pêk tê. Bi zimanê erebî hatiye nivîsîn û hêj çap nebûye.

#### 1.5.3.4. Istînsaxên Wî

Şûşî hem ji bo xwe hem jî ji bo hevalên xwe gelek berhem, name bi xetê xwe istînsax kirine. Nêzîkê 150 xutbeyên roja eynî nivîsandîne (Şûşî, 2023: 75).

#### 1.5.3.5. Resaîlu’n-Nûr

Şûşî berhemên Mela Seîdê Nûrsî yên bi navê “Resaîlu!n-Nûr”ê bi xetê xwe wekî du berg istînsax kirine. Navê bergê yekem “Zirat” û bergê duyem jî “Îsa Musa” ye (Şûşî, 2023: 75).

#### 1.5.3.6. Perawêzên li ser Hin Kitêban

Şûşî li ser "*Şerhu Şafîye*" ya Îbn Hacib, "*Kemaleddîn*[1]" a Mehmedê Kurê Mehemedê Kurê Meîn el Dînê Fesewî, "*El Wadiʿul Îstîare*[2]" ya ʿIsameddîn Îbrahîmê Kurê Mehemedê Esfiraînî, "*El-Camîu'l-Sexîr*" ya Îmam Suyutî haşîye nivîsandîne (Şûşî, 2023: 75).

### 1.6. Mirina Wî

Şûşî di dawîya umrê xwe da tûşî nexweşîyeke sîngî dibe û di sala 1956an da ji ber vê nexweşîya sîngî diçe Mîsilê û bi heyvan di nexweşxaneyê da dimîne. Ev nexweşîya Şûşî wî gelek aciz dike û nahêle berhemên xwe binivîse. Şûşî gelek beyt li ser nexweşîya xwe û halê xwe yê xirab nivîsandîne. Wekî mînak:

*Her ewwelî ta digehte ve dem*
*Dermanê di min çi zore ger kem*

*Bûrine ji bîst û pênc hizarî*
*Enwaʿê xebik neçar me xwarî*

*Eşkalê şirenqe nîv gîyanim*
*Sih zêde ji hefsedan dizanim*

*Lewra çi dikem te dawî her car*
*Min cumle nivîsîne bi tîzkar* (Şûşî, 2021: 132)

Bi vê nexweşîya giran Şûşî hêj di 44 salîya xwe di 23/12/1961an da emrê xwedê dike. Derbarê sala mirina Şûşî da tevlîhevîyek heye. Li gorî hin lêkolînan (Doskî, 2010; Şûşî, 2012; Salih, 2021; Hesen, 2022) Şûşî di sala 1962an û li gorî hin lêkolînan (Adak, 2020, r. 1514; Şûşî, 2023, r. 77) jî di sala 1961an da wefat kirîye. Hesen di teza xwe masterê da kaxeza wefata Şûşî wekî belge nîşan dide ku tê da sala wefata Şûşî wekî 1962 nivîsandîye dibêje sala wefata Şûşî 1961 nîne 1962 ye (Hesen, 2022, r. 53). Kurê Şêx Tahirê Şûşî çend gotar li ser babê xwe û berhemên wî

---

[1] Di sala1941an da li gundê Başkalê hatiye nivîsîn.
[2] Di sala1941an da li gundê Başkalê hatiye nivîsîn

nivîsandîne. Hemzeyê Şûşî jî di *Gulzar*a ku di sala 2012an da hatiye çap kirin dîroka wefata babê xwe wekî 12.12.1962 nîşan dide. Lê dîsa Şûşî di berhema babê xwe ya ku di sala 2021ê da ji alîyê wî ve hatiye çap kirin[1] û di gotara xwe ya 2023an da nivîsî[2] dibêje ku Şêx Tahir 15 Recep 1381 hîcrî anku 23.12.1961an mîladî da wefat kirîye (Şûşî, 2023, r. 77). Şûşî dibêje dîroka ku li ser kaxeza wefata babê min nivîsî durist nîne ji ber ku wî demî ewqas pêşketin nebû kesekî ji wan ra digot û wan jî dinivîsand. Dibêje evro bi awayekê dîjîtal û rasttir salên hîcrî li yên mîladî tên veguherîn (Şûşî, 2025). Qebrê Şûşî niha li gundê Şûşê li goristana Şêx Şemseddînê Şûşî ye.

[1] *Behdînan fî Mezkîrat el Şêx Tahir el Şûşî*
[2] Zana û Nivîser û Hozanvan û Xetxoşê Kurd Şêx Tahirê Şûşî

# BEŞA DUYEM: ANALÎZA GULZARÊ

Di vê beşê da analîza metna *Gulzarê* cih digire. Me di vê beşê da pêşîyê *Gulzar* daye nasîn paşê jî ji aliyê taybetmendîyên ruxsarî, zimanî, vegotinî, hunerên edebî û naverokî ve bi hûrgulî analîz kirîye.

## 2.1. Danasîna *Gulzara* Şêx Tahirê Şûşî

Di vê beşê da bi giştî *Gulzar* dê bête nasandin. Li bin sernavên destxeta resen, navê berhemê, cureyê berhemê, sedema nivîsandinê, dîroka nivîsandînê û hejmara beytan da derbarê *Gulzarê* da agahîyên bingehîn dê cih bigirin.

### 2.1.1. Destxeta Resen

Destxeta *Gulzarê* tenê nusxeyek e û ew nusxe jî li def Hemzeyê Şûşîyê kurê Şêx Tahir tê parastin. Dirêjahîya cîldan: 22 cm, firehîya wan: 17 cm ye. Gava ku wekî tevahî em binêrin *Gulzar* bi rûpelên destpêkê ve 1043 rûpel e.

*Gulzar*a destxet wekî defterên serbixwe ji sê defteran pêk tê anku sê berg e.[1] Lê gorî hejmar dayînê em dikarîn wekî du berg bihesibînîn. Ji ber ku di serê destxetê da bi hejmara 1 destpêkirîye heta 595 ê hejmar li ser rûpelan nivîsîne, paşê careka dî bi hejmara 1 destpêkirîye û heta 488an dîsa hejmar li ser rûpelan nivîsîne. Wekî encam ji alîyê hejmara rûpelan ve cîldê yekem navbera rûpelên 1-595 e ku tê da beşên Muqeddîme, Mêrga Êkê û Mêrga Duyem cih digirin û cîlda dûyem jî navbera rûpelên 1-488 e ku tê da Mêrga Sêyê û Mêrga Pêncem cih digire.[2] Ji bo vê lêkolînê em dê kategorîya li gorî hejmara rûpelan hatiye çêkirîn bikarînîn.

### 2.1.2. Navê Berhemê

Navê *Gulzarê* yê resen bi erebî "*Rîyaḍu'n-Nûr*" e. Li ser bergê *Gulzarê* navê wê yê erebî yê dîrej wiha hatiye nivîsîn: "*Rîyaḍu'n-Nûr el-Menzûme el-Kurdîyye fî Sîretî Seyyîdîna Muḥemmedîn we Ḥeyatîhî eş-Şerîfe ez-Zekîyye*" (Bostana Nûrê: Menzûmeya Kurdî ya li ser Sîyer û Jiyana Pîroz û Pak a Seyîdê Me Muhemmed.). Şûşî di biranîn xwe da tîne ziman ku wî di serê remezanê da dest bi nivîsandina vê berhemê kirîye û navê wê kirîye *Rîyadu'n-Nûr* (Şûşî, 2021, r. 99). Di *Gulzarê* da herî zêde anku li heşt cihan navê berhemê wekî "*Rîyaḍê Nûr*" derbas dibe. Wekî mînak:

---

[1] Pêvek 3
[2] Di vê cîldê da Mêrga Çarê û Xatîme jî heye lê Şûşî negiştîye wan beşan binivîse.

*Ger yar bî Xudê û ez bimînim*
*Dê rişte* ***Rîyaḍê Nûr*** *vehwînim* (*Gulzar*, b: 475)
...

*Çengek me ḥubir di nav qelem kir*
*Şîrîn me* ***Rîyaḍê Nûr*** *reqem kir* (*Gulzar*, b: 505)

Şûşî bi kurdî jî navên "Gulzar û Baxê Nûr" li berhema xwe kirîne. Ev navên berhemê di *Gulzarê* da bi vî şiklî derbas dibin.

*Wer taze biçîne nîvê* ***Gulzar***
*Beḥs̱ê vî resûlê pakê muxtar (Gulzar, b: 904)*
...

*Piṛṛ ẕewq û ṣefa ye piṛṛ sirûr e*
***Gulzar*** *e belê Rîyaḍê Nûr e* (*Gulzar*, b: 907)
...

*Fikrek mi heye eger çî dûr e*
*Emma tu dizanî* ***baẋê nûr*** *e* (*Gulzar*, b: 365)

### 2.1.3. Cureya Berhemê

Hin mesnewî bi mebesta fêrkirina tarîxê tên nivîsîn û ger ew tarîx jîyana Pêxemberî be ji van cure mesnewîyan ra mesnewîyên sîyerê yan jî sîyername tê gotin (Adak, 2019, r. 342). Ji ber ku têgehên sîyer an jî sîret ji bo pênasekirina jiyana Pêxemberî tên bikaranîn. *Gulzar* bi vî awayî mînakeke gelekî baş a sîyernameyê ye di edebiyata kurdî ya klasîk da. *Gulzar* bi hemû awayan xwe nîşan dide ku ew sîyername ye. Navê berhemê yê resen bi erebî ye lê bi kurdî tê wateya "*Bostana Nûrê: Menzûmeya Kurdî ya li ser Siyer û Jiyana Pîroz û Pak a Seyîdê Me Mihemed"*. Ji vî navê berhemê bi xwe dîyar e ku ew sîyereke menzûm e û behsa jîyana Pêxemberî dike.

Dîsa Şûşî di nav *Gulzarê* da têgeha "sîretê" bi kar tîne û dîyar dike ku *Gulzar* sîret e û behsa jîyana Pêxemberî dike. Wekî mînak di van beytan da tê dîyar kirin ku *Gulzar* behsa jîyana Pêxemberî dike û vê yekê jî wekî sîret pênase dike:

*Lew lazim e tu bi nasî taze*
*Peyẋemberê piṛṛ ji ʿîzz û naze*

*Jîn û es̱era resûlê lewlak*

*Lazim tu bizanî taze ṣerpak*

*Exlaqê di wî û ṣûreta wî*
*Karê wî û* ***pakesîreta*** *wî* (*Gulzar*, b: 892-894)

*Ev rêke ji ẋarê ta Medîne*
*Lê Îbnû Hîşam dibêt şirîne*

*Çen carê li çûl û çen di rêyan*
*Navêt di nuwal û gund û cêyan*

*Ger dê te merame çak bizanî*
*Seyrê ke wê* ***sîretê*** *ji canî* (*Gulzar*, b: 5834-5836)

Her wesa ji sernavên mijaran û naveroka wan dîyar e ku *Gulzar* sîyername ye. Wekî mînak:

*Fî Ḥewadîsîs-Senetîs̱- S̱anîyetî Mînel Hîcretî (Bûyerên Sala Duyê Koçî)*

*Ev sale ji hîcreta wî du ye*
*Pîrûz bî li wî ku bûyenû ye*

*Peyẋemberê piṛṛ kemal û îqbal*
*Ḥetta ku ji hîcretê çu yek sal*

*Wî danî ʿeceb binaẋe bû dîn*
*Emma bi kemalê ray û zanîn*

*Çendek ji muhaciran û enṣar*
*Wî kirne bira bi canfîdakar*

*Karek bû kirî ji kanê ḥîkmet*
*Nîşanê siyaset û şehamet* ...(*Gulzar*, b:6485-6489)

Di van beytan da behsa bûyerên sala dûyê koçî tê kirin. Dîsa ev sernavên jêrîn jî behsa xezweyên Pêxemberî dike û ev yek jî delîl e ku *Gulzar* sîyername ye.

*1. Ẋezwetu Buwaṭîn (Ẋezwa Buwaṭê)*

*2. Ẋezwetu ʿUşeyretî (Ẋezwa ʿUşeyre)*

*3. Ẋezwetu Bedrîn eṣ- Ṣuẋra (Ẋezwa Bedra Biçuk)*

*4. Serîyyetu ʿEbdîllahîbnî Ceḥşîn (Serîya ʿEbdullahê Kurê Ceḥşî)*

*5-6. Ferḍuṣ Ṣîyamî we Ṣerfûl Qîbletî Îlel Keʿbetî (Ferzbûna Rojiyê û Wergêrana Qîblê bo Keʿbê*)

**2.1.4. Sedema Nivîsandina Berhemê**

Şûşî di *Gulzar*e da bi du sernavan behsa sedema nivîsandina *Gulzarê* dike. Di sernavê yekem da Şûşî behsa sedemeke giştî ya nivîsandina berhema xwe dike ku hemû misilmanan eleqedar dike. Di sernavê duyem da jî behsa sedemeke taybet anku sedema bi kurdî nivîsandina berhemê dike. Ji ber vê yekê em jî dê li gorî rêbaza wî biçîn û sedema nivîsandina berhemê di bin du Sernavan da aşkere bikin.

**2.1.5. Sedema Giştî ya Nivîsandina Berhemê**

Şûşî ji bilî helbestvanîya xwe kesekê alim û mela bû. Şûşî di derbarê dînê xwe û bawerîya xwe kesekê gelekî dilsoz bû, gelek ji heş rêberê bawerîya xwe Muhemmedî (s.x.l) dikir. Li gorî Şûşî her misilmanek divê teqez Pêxemberê xwe baş binase û li dûv wî biçe. Ji ber vê yekê Şûşî dest bi nivîsandina *Gulzarê* dike. Şûşî di *Gulzarê* da di navbera beytên 377-416an da behsa sedema nivîsandina giştî dike û dibêje: Lazim e her misilmanek tarîxa Pêxemberê xwe, sifetên wî, exlaqê wî, şexsê wî, karên wî, pexemberîya wî, pêvajoya belavbûna îslamê, êş û nexweşîyên ku Pêxemberî û hevalên wî dîtîn, cehd û têkoşîna wan û taetê wan baş bizane. Vê yekê di van beytên jêrîn da wiha tîne ziman:

*Lazim tu bizanî ey birader*
*Tarîxî ḥeyatê yarê serwer*

*Peyẋember û daʿîyê vî dînî*
*Hindek ji ḥeyatê wî vexwînî*

*Ewṣafê di wî ji pê ḥeta ser*
*Exlaqê di wî heman seraser*

*Şexṣê wî bi cumleyê ṣîfatan*

*Karêt wî ʿecîbe muʿcîzatan*

*Ḥalê wî ji bûnê ta wefatê*
*Jîna wî ḥeta di vê ḥeyatê*

*Ew ku bû ḥeta biçûk û mindal*
*Karê wî çi bû ḥeta ku çil sal*

*Roja ku Xudayî kir peyember*
*Ser dînî ewî çi hate ser ser*

*Ḥalê wî çibû digel hevalan*
*Jîna wî li Mekke s̱êzde salan*

*Şeʾnê wî çi bû li dest neyaran*
*Êk êk tu bibîne wan nekaran*

*Çen mudde li destê wan diêşa*
*Çen ṣebr û bêhn ewî dikêşa*

*Ew cewr û cefa û pîsekarî*
*Ew ḍerb û civîn û qehr û larî*

*Eḥwalê di wan heval û hemser*
*Sê car ku li Mekkeyê kirin der*

*Xaṣma li ewan feqîr û jaran*
*Ḍerba ku li wan dikir neyaran...* (*Gulzar*, b: 377-389).

Şûşî di *Gulzarê* da dibêje xwînerên xwe ger hûn jîyana Pêxemberî baş bizanin wê gavê hûn dê qedr û qîmetê Pêxemberê xwe baş bizanin, jiyana Pêxemberî tijî îbret û delîl in, bi xêra wan hûn dişên bo xwe îbret û dersan jê wergirin, bi vî şiklî hûn dişên hişyar bin û bi rêberîya Pêxemberî xwe bigehînin biheşt ê. Vê yêkê Şûşî di *Gulzarê* da wiha tîne ziman:

*Seyrêke temamî sunneta wî*

*Ḥetta tu bizanî qîmeta wî*

*Ḥetta tu bizanî ey birader*
*Qedrê vî Muḥemmedê peyember*

*Ser ta bi qedem wî ʿumr û jîne*
*Xir ders û delîlê jîn û dîn e*

*Beḥsê wî divêt cewan bixwînî*
*Belkî ji xû ʿîbretek bibînî*

*Hişyarê bibîn li xew bê mestî*
*Em taze li dû biçîn diristî*

*Ellah nê dibê peyemberê min*
*Xûş ṛehber e ew ji bû derê min*

*Her kes bigirît rîya wî taze*
*Dê bidî biḥeştê serfiraze* (*Gulzar*, b: 400-406).

**2.1.6. Sedema bi Kurdî Nivîsandina Berhemê**

Şêx Tahirê Şûşî kesayetekê ayînperwer bû lê di heman demê da jî kesayetekê kurdperwer bû. Şûşî gelek heş ji milletê xwe yê kurd dikir ji ber vê yekê hindî ji destê wî dihat mafên kurdan li hemberî zordaran diparast. Şûşî nedixwest ku kurd bi çi awayan ji milletên dî paş û kêm bimînin (Şûşî, 2012, r. 21). Wek sedema bi kurdî nivîsandina *Gulzarê* jî Şûşî vê yekê nîşan dide. Ew vê yekê di van beytên jêrîn da bi aşkere tîne zîman:

*Beḥsê wî diken bi her zubanan*
*Medḥa wî diken li her mekanan*

*Emma me ḥeta nihû nedîne*
*Jîna wî bi kuṛdîya şirîne*

*Ey dil kesera te ya li mêje*

*Wer wekî te divê bi kuṛdî bêje* (*Gulzar*, b: 421-423).

Şûşî di van beytan da dibêje bi hemî zimanan berhem li ser jîyana Pêxemberî hatîne nivîsîn û bi hemî zimanan medhên Pêxemberî tên kirin. Lazim e kurd jî ji vê yekê bê par nemînin.

### 2.1.7. Dîroka Nivîsandinê

Şûşî di sala 1957an da dest bi nivîsandina destxetê kirîye û heta sala 1961an da ku wefat kirîye nivîsa xwe domandîye (Şûşi, 2023: 73). Şûşî dîroka destpêkirina berhema xwe di *Gulzarê* da di bin Sernavê "*Tarix-ul Îbtîdaî bî Neẓmîl Kîtabî we Mîzanû Neẓmîhî* (Dîroka Destpêkirina Nezma vê Kitêbê û Kêşana Nezma Wê)" bi aşkere wiha tînê ziman:

*Gava me serê kîtabê danî*
*Mahê remeḍan bû xûş li canî*

*Ḥeftê û şeş û hizar û sêṣed*
*Bu hîcretê yarê mey Muḥemmed* (*Gulzar*, b: 476-477)

Şûşî di van beytan da bi aşkere tîne ziman ku di sala 1376 hîcrî û di meha remezanê ku ew jî li gorî mîladî dibe 1957 meha Nîsanê dest bi nivîsandina berhemê kirîye. Şûşî heta sala wefat kirî 1961ê nivîsandina berhemê dewam kirîye û negiştîye li gorî plana ku danay bo berhema xwe bi temamî binivîse.

### 2.1.8. Hejmara Beytan

Di derbarê hejmara beytên *Gulzarê* da şêlîtîyek heye. Di lêkolînên li ser Şûşî û berhemên wî hatîne kirin da hejmarên cuda ji bo *Gulzarê* hatîne gotin. Hejmara beytên *Gulzarê* li gorî çend lêkolînên wekî Doskî, (1993, 2008, 2010): 13 hizar, li gorî Şûşî, (2012 û 2023): Pitir ji 13 hizaran, li gorî Adak, (2020): nêzîkê 14 hizar, li gorî Salih, (2021): pitir Pitir ji 13 hizaran, li gorî Ertekin, (2022): nêzîkê 14 hizar û li gorî Hesen, (2022): Pitir ji 13 hizaran e. Piranîya kesên ku hejmara beytan dibêjin wekî çavkanî Tehsîn Îbrahîm Doskî û Hemzeyê Şûşî nişan didin.

Ji ber ku *Gulzar* mijara teza me ye û em dê beytên wê ji bo analîza metnê bi kar bînîn, me li serê her beytekê hejmarek dayê. Di encama vê hejmar dayînê me dît ku hejmara beytên *Gulzarê* ewqas nînin ku di lêkolînên berê da hatîne gotin. Hejmara

beytên *Gulzarê* bi temamî 10154 beyt in. Ji alîyê Hemzeyê Şûşî ve pirtûkên Şêx Tahirê Şûşî "*Pend û Şîret* (1997)", "*Gulzar* (2012)" û "*Îsra û Mîʿrac û Muʿcîzatên Pêxemberî* (2022)" bi awayekê ser bi xwe yên hatîne çap kirin. *Pend û Şîret* her çend ji alîyê ruxsarî ve bişibe *Gulzarê* jî aliyê naverokê ve ji *Gulzarê* vediqete û di nav bergên *Gulzarê* da cih nagire (Şûşî, 2012, 36). Ji ber vê yekê hejmara beytên wê di nav hejmara destxetê da nehatîne hesabkirin. Di *Gulzar*a 2012 da ji alîyê Hemze Şûşî ve hatiye çap kirin da mijara *Îsra û Mîʿracê* heye lê mijara *Muʿcîzatên Pêxemberî*" nîne. Di vê çapê da hejmara beytên *Gulzarê* 9300 in. Dîsa çend beytên ku di *Gulzar*a destxet da hene di *Gulzar*a 2012 da nînin. Dibe ku ew beyt neketibine ber çavê Hemzeyê Şûşî. Wekî mînak ev beytên jêrîn ku di nav destxetê da hene di nav *Gulzar* 2012ê da nînin:

*Ser qewmê xû hûn me xûş emîn in*
*Ser ʿehdê xû ta ku hûn bimînin*

*Vî emrî ji min biken gudarî*
*ʿÎsa bi ş îfet me hûn ḥewarî* (*Gulzar*, b: 5464-5465)

*Ev qismet e ger bikey tu dîqqet*
*Sengîn e bi fennê ṭibb û ḥîkmet* (*Gulzar*, b: 8409)

Di "*Îsra û Mîʿrac û Muʿcîzatên Pêxemberî*" ku di sala 2022 ji alîyê Hemzeyê Şûşî ve hatiye çap kirin da Şûşî mîjaren "*Îsra û Mîʿrac"* ku di *Gulzar* (2012) jî hey û mijara "*Muʿcîzatên Pêxemberî"* ku di *Gulzar* (2012) cih nedayê kom kirîne û wekî berhemeke serbixwe çap kirîne. Di vê berhemê da hejmara beytan 1260 in ku ji van 732 yên beşa *Muʿcîzatên Pêxemberî* ne 528 beyt jî yên mijara *Îsra û Mîʿracê* ne. Anku wekî encam di *Gulzara* destxet da tenê beytên berhema *Pend û Şîret* nînin ji ber vê yekê ew berhem me ji derveyê lêkolîna xwe hêlaye. Lê di *Gulzar*a destxet da hemû beytên ku bi navê "*Îsra û Mîʿrac* û *Muʿcîzatên Pêxemberî" wekî* berhemeke serbixwe hatiye çapkirin bi temamî hene. Ji ber vê yekê bi xwe ev berhem di nav destxetê da ya û di nav lêkolîna me da cih digire. Hejmarên beytên *Gulzarê* di tabloya jêrîn da bi li gorî mêrgên wê bi awayekê hûrgulî hatîne dayîn.

**Tablo 2. 1:** Hejmara Beytên Gulzarê

| Beşa Sereke | Binbeş | Hejmara Beytan | Şîrove |
|---|---|---|---|
| **Bergê Yekem** | Muqeddîme | 908 | Bi temamî hatiye nivîsîn |
| | Mêrga Êkê | 1719 | Bi temamî hatiye nivîsîn |
| | Mêrga Duyê | 3009 | Bi temamî hatiye nivîsîn |
| **Giştî** | | 5636 | - |
| **Bergê Duyem** | Mêrga Sêyê | 2300 | %50 kêm e |
| | Mêrga Çarê | - | Qet nehatiye nivîsîn |
| | Mêrga Pêncê | 2218 | %20-25 kêm e. |
| | Xatîme | - | Qet nehatiye nivîsîn |
| **Giştî** | | 4518 | - |
| **Tevahîya Giştî** | | 10154 | - |

**Tablo 2. 2:** Ji Alîyê Hejmara Beytan ve Berawirda Gulzarê Li gel Çend Mesnewiyên Kurdî

| Jmr | Mesnewî | Nivîskar | Zarave | Hej. Beytan |
|---|---|---|---|---|
| 1 | Mem û Zîn | Xanî | Kurmancî | 2.656 |
| 2 | Yûsif û Zuleyxa | Selîmî | Kurmancî | 2.325 |
| 3 | Seyfilmilûk | Sîyahpoş | Kurmancî | 2.883 |
| 4 | Rewdu'n-Ne‘îm | Rûhî | Kurmancî | 4.531 |
| 5 | el-Hemaîl fi’ş-Şemaîl | Godişkî | Kurmancî | 5.569 |
| 6 | el-Cewahîru’r-Reşadîye | Godişkî | Kurmancî | 5.204 |
| 7 | Mewlûda Sîyer a Xerxurî | Xerxurî | Kurmancî | 910 |
| 8 | Jêgirtiyên bi Zefer, ji Xebata Pêxember | Mela Mehmûd | Kurmancî | 540 |
| 9 | Misk û Enber: Nezma Heyata Hezretî Pêxember (s.x.l) | Şemrexî | Kurmancî | 1700 |
| 10 | Îran û Tûran | Gelêrî | Goranî | 7000 |
| 11 | Xusrew û Şêrîn | Qubadî | Goranî | 5526 |
| 12 | *Gulzar* | Şûşî | Kurmancî | 10154 |

Di vê tabloya jorîn da çend mesnewîyên kurdî yên ku hejmara beytên wan gelek in cih digirin. Di tabloyê da jî tê dîtin ku *Gulzar* di nav mesnewîyên kurdî da mesnewîya herî mezin e. Divê neyê jibîrkirin ku Şûşî *Gulzar* bi temamî nenivîsandîye. Wî “Mêrga Çarê” û “Xatîmê” qet nenivîsandîye û herî kêm %50 ya Mêrga Sêyê û

%20-25ê Mêrga Pêncê jî nenivîsandîye. Anku ger ku şîyaba ev berhem bi temamî nivîsandiba wê gavê da hejmara beytên wê nêzîkê 17 hizaran bûya. Ji xwe me beyten *Pend û Şîretê* ku Şûşî ew jî wek parçeyeke *Gulzar*ê nivîsandîye di nav van beytan da hesap nekirîne. Ger em wê jî ku ji nêzîkê 1000 beytan pêk tê hesab bikin wê gavê hejmara beytên *Gulzar*ê dê bigeştina nêzîkê 18 hizaran.

### 2.2. Taybetiyên Ruxsarî

Di vê beşê da em dê li ser alîyê Ruxsarî yê *Gulzar*ê bisekinîn.

#### 2.2.1. Teşeyê Nezmê

Mesnewî peyveke zimanê erebî ye ji peyva "mesna" ku tê wateya cot cote tê. Bingeha vê peyvê her çend bi erebî be jî wekî têgehek edebî mesnewî aîdê edebiyata farisî ye. Di edebiyata farisî da ji bo helbestên ku serwaya beytên wan cot in mesnewî hatiye gotin. Mesnewî teşeyekê nezmê ye ku ji beytan pêk tê û misrayên her beytekê jî di nav xwe da di hemserwa ne û heman beytên wê bi heman qalibê erûzê ve tên nivîsîn (Çiçekler, 2004, r. 320). Mesnewî di nav xwe da wekî mesnewîyên serbixwe û mesnewîyên wekî helbestên dîwanan dibin du beş (Adak, 2019, r. 245-246). Ji bo vegotin û bûyerên dîroj mesnewîyên serbixwe gelen guncaw in. Ji ber ku di van mesnewîyan da her beyt tenê di nav xwe da hemserwa ne û hejmareka ku wan sînordar dike nîne ev jî derfetê dide helbestvanî ku bûyer û çîrokên dirêj bişêt vehînît.

*Gulzar* li gorî teşeyê nezmê dikeve nav kategorîya mesnewîyên serbixwe. Ji ber ku hemû beytên *Gulzarê* li gorî heman qalibê erûzê ""*Feʿlun feʿelun feʿel feʿûlun"* hatîne nivîsîn û di *Gulzarê* da her beytek di nav xwe da hemserwa ne. Wekî mînak:

*Ellah ku çi navekê şirîn e* a
*Gûtna wî ḥeyatê can û jîn e* a

*Ey navê te ye Reḥîm û Reḥman* b
*Wey ẕikrê te ye şîfa û derman*b

*Her ḥemd û s̱ena û şukr û minnet* c
*Her bû te Xudê xudanê reḥmet* c

*Bawer me heye ku tu Xuda yî* d
*Her tu mezin î xudan beqa yî* d

*Tenha yî tu bê heval î û bê hemṣer* e
*Ne yê pêtivîyê wezîr û yawer* e (*Gulzar*, b: 1-5)

### 2.2.2. Kêşa Erûzê

Erûz peyveke erebî ye û wateya wê ya ferhengî “alî, rê, hêştira serkêş, stûna nîveka konî, bajarê Mekke, derketina hol û û tiştê ku dibe pîvan û mînak “(Çetin, 1991, r. 424).” Wekî têgeheke edebî, eruz, sîstemeke weznê ye ku di helbestê da li ser rêzkirina ahengdar a tîpên dirêj û kurt hatiye damezrandin (Adak, 2014, r. 366). Di edebiyatên klasîk ên ereb, faris, tirk û kurdan da berhemên menzûm li gorî kêşa erûzê yên hatîne nivîsîn. Wekî berhemeke menzûm a edebiyata klasîk a kurdî *Gulzar* jî bi kêşa erûzê hatiye nivîsîn. Şûşî bi xwe di van beyê jêrîn ên *Gulzarê* da wiha behsa wezna berhema xwe dike:

*Wezna wê bi lezzet û şirîn e*
*Nêv ʿîlmê ʿerûzê nav çu nîne*

*Lewṛa bi xusûsê her zubanek*
*Her şiʿrekê bu heyîn nîşanek*

*Ey dûsto eger te arezû ye*
*Neẓma vê şirîn kitêbê ku ye*

*Weznek ji wê ra me got bi dilxwaz*
*Hem rêk û rewan e neẓm û awaz*

*Feʿlun feʿelun feʿel feʿûl un*
*Ev çware Rîyaḍê Nûr uṣûl in* (*Gulzar*, b: 478-482)

Şûşî di van beytan da dibêje ku *Gulzar* bi qalibê “*Feʿlun feʿelun feʿel feʿûl un”* hatiye nivîsîn. Şûşî di van beytan da dibêje ku ew qalibê ku wî bikarînay di nav ilmê erûzê da nînê. Adak di gotara xwe ya li ser *Gulzarê* tîne ziman ku qesta Şûşî ji vê gotinê ne ew e ku dixwaze bibêje di nav edebiyata farisan û ya kurdan da jî ev qalib

qet nehatiye bikaranîn qesta wî ew e ku dibêje ev qalib di nav erûza ereban da qet nehatiye bikaranîn. Dîsa Adak di vê gotara xwe da dîyar dike ku berhema *Mem û Zînê* li ber destê Şûşî hebû û Şûşî qalibê xwe li gorî qalibê Mem û Zînê "mefʿûlu mefaʿilun feʿûlun" dana ye (Adak, 2020, r. 1519). Gava mirov li her qalibên Xanî û Şûşî dinêrît li gorî dirêjî û kurtîya wekî hev in.

*Feʿlun / feʿelun / feʿel / feʿûl un* (*Gulzar*, Şûşî)

(- - / + + - / + - / + - -)

*Mefʿûlu mefaʿilun feʿûlun* (Mem û Zîn, Xanî)

(- - + / + - + - / + - -)

Her du qalib jî li gorî dirêjî û kurtîya heceyan wekî hev in. Her du qalib jî ji deh heceyan pêk tên. Cudahîya van qaliban jî hejmara tefʿîleyan e. Qaliba Şûşî ji çar tefʿîleyan pêk tê, ya Xanî ji sê tefʿîleyan pêk tê. Wekî mînak:

*Adem bi xwe yek ji her duwan e*

*(- - + / + - + - / + - - )*

*Yek herf e ji emrê kun fekan e* (Mem û Zîn, b: 9)

*(- - + / + - <u>+</u> - / + - - )*

...

Feyḍ û kerem û selam di bê ḥed

(- - / + + - / + - / + - - )

Ya Reb tu biṛêje ser Muḥemmed (*Gulzar*, b: 15)

(- - / + + - / + - / + - - )

Di van mînakan da tê dîtin ku her du berhem jî bi deh heceyan hatîne nivîsîn û kurt û dirêjîya heceyan wekî hev e. Cudahîya di navbera qaliba *Mem û Zîn* û *Gulzarê* hejmar û navê tefʿîleyan e. Şûşî di *Gulzar*ê da bi giştî qalîba erûzê bi awayekê serkeftî bikaranîye lê li hin deran kêmasî û qusûr jî hene.

#### 2.2.2.1. Zîhaf

Di erûzê da ger ku heceyeke dirêj ji bo ku li weznê bê, kurt bê xwendin wê gavê zîhaf pêk tê. Zîhaf ji bo helbestvanî wekî qusûr tê qebûlkirin (Adak, 2014, r. 382). Wekî mînak di van beytên jêrîn ên *Gulzarê* da zîhaf heye.

*Ellah ku çi navekê şirîn e*

*Gûtna w**î** ḥeyatê can **û** jîn e* (*Gulzar*, b: 1)

Di misraya duyem da dengên dîrêj ên "***î***" û "***û***" ji bo ku li weznê bihên kurt têne xwendin.

*Ew gaz**î** diket bi dengekê hêl*

*Ey qewm**ê** Qureyş**î** pîr **û** cahêl* (*Gulzar,* b: 2837)

Dengen dirêj ên "***î, ê, û***" ji bo ku li weznê bihên kurt têne xwendin.

#### 2.2.2.2. Îmale

Di erûzê da ger ku heceyeke kurt ji bo ku li weznê bê, dirêj bê xwendin wê gavê îmale pêk tê (Saraç, 2019, r. 524). Îmale ji bo helbestvanî qusûreke ji zîhafê kêmtir tê qebûlkirin. (Adak, 2014: r.382). Wekî mînak di van beytên jêrîn ên *Gulzarê* da îmale heye.

*Her w**e** bi Muḥemmedî me bawer*

*ʿEbdê te ye qaṣi**d** û peyember* (*Gulzar,* b: 9)

Di misraya yekem da dengê "***e***" ya kurt ji bo ku li weznê were dirêj tê xwendin. Bi vî şiklî îmaleya çêdibe.

*Zemʿ**e** ku li mêje wî heval bû*

*Bab Eswed e lê çi şîr ḥelal bû* (*Gulzar,* b: 4144)

Di misraya yekem da dengê "***e***" ya kurt ji bo ku li weznê were dirêj tê xwendin. Bi vî şiklî îmaleya çêdibe.

#### 2.2.2.3. Wesl

Ger ku peyvek bi tîpeka dengdar biqede û peyva li dûv wê tê bi tîpeka dengdêr dest pê bike wê gavê tîpa dengar a peyva pêşîyê bi tîpa dengdêr a dûv wê ra tê bi hev ra tên xwendin. Ji bo erûzê wekî qusûr nayê dîtin (Saraç, 2019, r.521). Ji vê rewşê ra wesl tê gotin. Di *Gulzarê* da gelek mînak ji bo vê rewşê hene. Wekî mînak:

*Her çî tu bide**y_û** yan nedey tu*

*Her çî tu bibe**y_û** ger nebey tu* (*Gulzar,* b: 94)

*Haşa te hebin şeṛî**k_û** eşbah*
*Yan eh**l_û** weled te haşalîllah* (*Gulzar,* b: 101)

Şûşî di gelek beytan da ji bo weslê çêbike peyva “**y**” bikarînaye. Wekî mînak:

*Rumbazî**y_û** quşme û suwarî*
*Segvanî**y_û** karê nêzekarî (Gulzar, b: 603)*

*Dabêjîte katibê xû paşî*
*Binvîse bi tazehî**y_û** başî* (*Gulzar,* b: 625)

**2.2.2.5. Şedde**

Hin caran ji bo ku wezin durist bibe dengek tê dubarekirin anku bi şedde tê nivîsîn. Ev rewş mahareta helbestvanî nîşan dide (Saraç, 2019, r. 534). Di *Gulzarê* da çend mînaken şeddeyê wiha ne:

*Qîṣṣa xû hemû digût serûber*
*Bû wê ḥerema zuban çu şe**kk**er* (*Gulzar,* b: 2674)

*Zanayî bi fe**nn**ê ḥukm û dewlet*
*Wer seyrê bike ji dil şeṛîʿet* (*Gulzar,* b: 709)

**2.2.2.6. Qesr**

Helbestvan hin caran ji bo ku li weznê bê herfeke peyvê nanivîsîn ji vê rewşê ra qesr tê gotin (Saraç, 2019, r. 534). Şûşî jî ji bo ku li weznê were li gelek cihan bi taybet jî di navan da qesr bi kar înaye. Wekî mînak:

***Bûbekrî** ku hêj xeber nezanî*
*Yek duşminê dîn bû gût nîhanî* (*Gulzar,* b: 4363)

***Bûcehlê** kuṛê Hîşamê bedkar*
*Derḥeq bi nebî şibî şeyê har* (*Gulzar,* b: 2879)

Şûşî di van her du beytan da ji bo li weznê were herfa ewil ya navî “**E**” nenivîsî ye û bi vî şiklî li weznê hatîye.

### 2.2.3. Serwa

Di helbestê da, serwa û paşserwa du hêmanên bingehîn in ku aheng, rîtm û wateyê didin berheman. Serwa di dawîya misrayan da dubarekirina dengan e. Ev peyvên ku tê da deng têne dubarekirin divê yan bi xwe cuda bin yan jî wateya wan cuda bin (Saraç, 2019, r. 573). Bi serwayê helbest ahengdar dibe û xwendina helbestê hêsan dibe. Çend cureyên serwayê hene.

#### 2.2.3.1. Serwaya Bêpaşserwa

Di vî cureyê serwayê da serwa di dawîya misrayan da cih digire û piştî serwayê paşserwa nîne. Wekî mînak:

*Ew ṣaẋ e ne wek lîbase belk**î***
*Wek pîstê fireh dibît li xan**î*** (*Gulzar*, b: 712)

*Ew ʿîlmê bi nav ʿîlac û derm**an***
*Fennê bi wî çêdibît wîcd**an*** (*Gulzar*, b: 719)

Di van her du mînak da paşserwa nîne û serwa di dawîya misrayan da ye. Di beyta yekem da serwa “î” di ya duyem da jî “an” ne.

#### 2.2.3.2. Serwaya Bipaşserwa

Di vî cureyê serwayê da di dawîya misrayan da paşserwa û berî wê jî serwa heye (Adak, 2014, r. 396. Wekî mînak:

*Ewwel me bûy xû îbtîd**a** ye*
*Axir me li ser wî întîh**a** ye* (*Gulzar*, b: 31)

*Ev dîne belê del**îl**ê wan e*
*Ev şeṛʿe tinê kef**îl**ê wan e* (*Gulzar*, b: 716)

Di beyta yekem da “ye” paşserwa ye û di dawîya misrayê de ye û “a” serwa ye û berî paşserwayê tê. Di beyta duyem da jî “ê wan e” paşserwa ye û di dawîya misrayê da ye û “îl” jî serwa ye û berî paşserwayê tê.

#### 2.2.3.3. Serwaya Mucerred

Ger serwa tenê bi herfa rewîyê hatibe kirin anku herfa dawîya misrayê bê hereke be ji wê serwayê ra dibêjin serwaya mucerred (Saraç, 2021, r. 588). Wekî mînak:

*Xir muyê leşê wî bûne nişte**r***
*Ber tirsê ḥebîbê şahê ekbe**r*** (*Gulzar*, b: 5790)

*Işkeft û kun û kujî û bin be**r***
*Êk êke di seh kirin serûbe**r*** (*Gulzar*, b: 5769)

Di van her du beytan da jî serwa bi herfa rewîyê (r) hatiye kirin ji ber vê yekê di van beytan da serwaya mucerred heye.

#### 2.2.3.4. Serwaya Murekkeb

Sê cureyên serwaya murekkeb hene:

##### 2.2.3.4.1. Serwaya Murdef

Ew cure serwa ye ku di nav xwe da herfa rîdfê (herfa bê hereke ya berî herfa rewîyê) anku "elîf, waw û yê" dihewîne. Ger yek ji van herfan bê hereke berî herfa rewî bihê wê gavê serwaya murdef çêdibe (Saraç, 2021,r. 588). Wekî mînak:

*Ew nuke bihên bû dergehê ẋ**a**r*

*Em dê çi bikeyn ji destê bedk**a**r* (*Gulzar*, b: 5793)

*Çen quṭbê mezin xû Ẋewsê Beẋd**a**d*

*Rabûne ji neslê wan eṣilz**a**d* (*Gulzar*, b: 7290)

Di van her du beytan da berîya herfa rewî (r, d) herfa rîdfê (a) hatiye ji ber vê yekê di van beytan da serwaya murdef heye.

##### 2.2.3.4.2. Serwaya Muqeyyed

Di vî cureyê serwayê da berîya herfa rewîyê herfeke bê hereke dubare dike. Wekî mînak "... me**s**t / ... ele**s**t" (Saraç, 2021, r. 588). Di *Gulzar*ê da mînakên vê serwayê bi vî rengî ne:

*Simbêl di piṛṛ û cewan û şeb re**n**g*
*Ey devmezinê şirîn û xûş de**n**g* (*Gulzar*, b: 7988)

*Wî şîr diweşand û her qebû xwa***st**

*Wî gûtî peyember im belê ṛa***st** (*Gulzar*, b: 8335)

Di van her du beytan da berîya herfên rewîyê (g, t) herfên bê hereke (n, s) hatîne ji ber vê yekê di van beytan da serwaya muqeyyed heye.

#### 2.2.3.4.3. Serwaya Muesses

Ger ku berî herfa rewîyê herfekeke bi hereke û berîya wê jî "elîf"ek hebe wê gavê serwaya muesses çêdibe. Wekî "ker**ame**t û işa**re**t". (Saraç, 2021, r. 589).

*Peyẋemberî bû dikir îş***are***t*

*Tu kirbe nihû ji ev bîş***are***t* (*Gulzar*, b: 7597)

*ʿAlem ji gef û zuban sel***ame***t*

*Serbest û seʿîd bibît qiy***ame***t* (*Gulzar,* b: 115)

Di van her du mînakan da berî herfa rewîyê (t), herfeke bi hereke (re, me) hatiye û berî herfa bi hereke jî elif (a) hatiye bi vî awayî di van beytan da serwaya muesse pêk hatîye.

### 2.2.3.5. Serwa li Gorî Dengan

Li gorî dengan serwa dibe sê cure.

#### 2.2.3.5.1. Serwaya Lawaz

Ger serwa tenê bi dengekî hatibe çêkirin ew dibe serwaya lawaz (Dilçin, 2013, r. 86). Wekî mînak di vê beyta jêrîn da serwa tenê bi dengê "a"yê hatiye çêkirin anku di vê beytê da serwaya lawaz heye.

*Ewwel me bûy xû îbtîd***a** *ye*

*Axir me li ser wî întîh***a** *ye* (*Gulzar*, b: 31)

#### 2.2.3.5.2. Serwaya Asayî

Ger serwa bi du dengan hatibe çêkirin ew dibe serwaya asayî (Dilçin, 2013, r. 87). Wekî mînak di vê beyta jêrîn da serwa bi du dengan "as" hatiye çêkirin anku di vê beytê da serwaya asayî heye.

*Rabûye ẋulam bi navê ʿEdd***as**

*Ew merdê ẋerîb û hem ẋerîbn***as** (*Gulzar*, b: 5098)

#### 2.2.3.5.3. Serwaya Zêdebar

Ger serwa bi du dengan zêdetir hatibe çêkirin ew dibe serwaya zêdabar (Dilçin, 2013, r. 89). Wekî mînak di vê heyta jêrîn da serwa ji sê dengan "wet" pêk hatiye û serwaya zêdebar çêbûye.

*Ney ṭaqet e ney çi ḥewl û quw***wet**

*Îlla bi te ey xudanê seṭ***wet** (*Gulzar,* b: 5080)

*Gulzar* ji alîyê serwayê û cureyên wê ve gelekî dewlemend e. Di *Gulzarê* da her cureyê serwayê heye lê di du cihan da di navbera misrayan da serwa çênebûye. Wekî mînak di van her du beytên jêrîn da serwa nîne.

*Peyẋember e ev ji bu we taz***e**
*ʿUtbeî gu: Belê bi serfiraḍ***î** (*Gulzar,* b: 5135)

*Dê ku bikujî me dûst û yara***n**
*Ḥef ṣed kesî xir ji wan bijar***e** (*Gulzar,* b: 7118)

### 2.2.4. Paşserwa

Paşserwa di helbestê da di dawiya rêzan da dubarebûna yek an zêdetir peyv an paşgiran e, lê şert ew e ku hem wateya wan yek be hem jî erka wan yek be. Paşserwa her tim piştî serwayê tê û serwayê hê bêtir xurt dike û ahengek taybet dide helbestê. Bi gotineke din, heke serwa melodiyê bide, paşserwa rîtmê sabît dike (Saraç, 2019, r. 576). Li gorî tiştên ku tên dubarekirin sê cureyên paşserwayê hene (Adak, 2014, r. 399):

#### 2.2.4.1. Paşserwaya Qertaf

Di vî cureyê paşserwayê da qertaf di dawîya misrayan da tên dubarekirin (Adak, 2014, r. 399). Wekî mînak di van beytên jêrîn da qertafên "-e û –im" redîf in.

*Bawer çî neket ji xû xisar* ***e***
*Ew ḥeşrê ẕelîl û şeṛmezar* ***e*** (*Gulzar,* b: 5132)

*Nazanî ji tu çi daẋidar* ***im***

*Dê tu bikujim li ser sûwar* ***im*** (*Gulzar,* b: 7554)

#### 2.2.4.2. Paşserwaya Qertaf û Bêje

Di vî cureyê paşserwayê da di dawîya misrayan da qertaf û bêje yan kombêje bi hev ra tên dubarekirin (Adak, 2014, r.399). Wekî mînak di van beytên jêrîn da paşserwa di halê qertaf û bêje "-î tu, -a Xudayî" û qertaf û kombêje "-e ya Reb" da ne.

*Bê sir nîye lê ku xatem**î tu***
*Seydayê cemîʿî ʿalem**î tu*** (*Gulzar*, b: 143)

*Ey nûrê hîdayet**a Xudayî***
*Menzûrê ʿînayet**a Xudayî*** (*Gulzar*, b: 121)

*Navê te gelek şirîn **e ya reb***
*Luṯfa te gelek berîn **e ya reb*** (*Gulzar*, b: 28)

#### 2.2.4.2. Paşserwaya Bêje û Kombêje

Di vî cureyê paşserwayê da qertaf nîne wekî paşserwa bêje yan kombêjeyek heye (Adak, 2014, r. 400). Wekî mînak di van beytên jêrîn da paşserwa di halê bêje "bûy" û kombêje "ji bû min, dibin bi wî dil" da ne.

*Kenzek tu hebûy ezel nîhan **bûy***
*Bê ʿarif û ʿebdê îns û can **bûy*** (*Gulzar*, b: 102)

*Dînê xû te kir beyan **ji bû wan***
*Şeṛʿê xû te kir ʿeyan **ji bû wan*** (*Gulzar*, b: 108)

*Navê te ye ron **dibin bi wî dil***
*Ẕikrê te ye hûn **dibin bi wî dil*** (*Gulzar*, b: 23)

### 2.2.5. Tertîb/Plansazî

Mesnewî ji ber ku gelekî dirêj in li gorî plansazîyekê têne nivîsîn. Mesnewî ji sê beşên sereke pêk tên ku ew jî beşa dîbaceyê (destpêk), beşa sereke û beşa xatîmê (encam) ye (Adak, 2019, r. 268). Wekî mesnewîyeke serbixwe di *Gulzarê* da plansazîyeke gelekî baş heye. Şûşî di rûpelekê serê destxeta xwe da plansazîya *Gulzarê* nivîsandîye. Li gorî plana Şûşî *Gulzar* ji muqeddîmeyekê (destpêk), pênc beşên sereke

(Rewde, Mêrg) û xatîmeyekê (encam) pêk tê. Plana Şûşî ya di serê destxetê da dîyar kirî bi vî şiklî ye:

**Tablo 2. 3:** Plansazîya Şûşî ya Gulzarê

| | | |
|---|---|---|
| **Beşa Dîbace** | Muqeddîme | Destpêkirina kitêbê, medhê Xwedê û Pêxember, mebesta nivîsîna kitêbê, nimûneyên bedewîya Quranê û taybetmendîyên dînê Îslamê. |
| **Beşa Sereke** | Rewdeya Yekem | Ji wîladeta Pêxember heta bi Pêxembertîya |
| | Rewdeya Duyem | Ji Pêxembertîya wî heta bi hicreta wî. |
| | Rewdeya Sêyem | Ji hicreta wî heta bi fetha Mekkehê. |
| | Rewdeya Çarem | Ji fetha Mekkehê heta bi hecca Wedaʿê. |
| | Rewdeya Pêncem: | Şekl û sûretê wî; exlaq û rabûn û rûniştina wî; taybetmendî û fezîlet kemalatên wî, şemaila wî, mucîzeyên wî, ehlê beyt û derdora wî, wefata wî û tayînkirina xelîfeyê xwe |
| **Beşa Xatîme (Encam)** | Xatîme | Sîyera her çar xelîfeyên raşid ên ku piştî Pêxember rêvebirî kirine û dînê Îslamê belav kirine. |

### 2.2.5.1. Beşa Dîbaceyê

Dîbace, di mesnewîyan da navê beşa muqeddîmê ye û di vê bêşê da sedema nivîsandina berhemê, felsefeya hunermendî û carna jî agahiyên derbarê jiyana wî di vê beşa destpêkê da cih digirin (Üzgör, 1994, r. 277). Di dibacêyan da bi giştî mijarên bîsmîllah, tewhîd, tehmîd, mûnacat, neʿt, medhîye û sebebê teʾlîfê hene. Di hin dîbaceyan da mijarên mîrac, şefaʿet û methên çar xelîfeyan jî li dîbaceyan hatîne zêdekirin. Hin caran jî mesnewînûs li gorî standartê neçûne û li gorî xwe hin mijar li dîbacê kêm yan jî zêdekirîne (Adak, 2020, r. 1520). Di edebiyata kurdî da yek ji wan kesên dîbaceyeke gelekî berfireh nivîsandî û hin mîjarên nû li dîbaceyê zêdekirî jî Şêx Tahirê Şûşî ye. Şûşî dîbaceya *Gulzarê* bi 908 beytan ve nivîsandîye. Şûşî dîbaceya xwe di bin 9 sernavan da nivîsandîye û ji bo her sernavekê jî hejmarek daye. Li gorî sernavan dîbaceya *Gulzarê* bi vî şiklî ye:

#### 2.2.5.1.1. Bîsmîllah

Bîsmîllah di *Gulzarê* da bi du awaya derdikeve pêş. Ya yekem nivîsîna orijînala bîsmîllahê ya bi erebî ye. Şûşî di rûpelên pêşîyê yên şîroveyan da di rûpelê yekem da

bi xettatî[1] û di rûpelên dî da jî bi awayê standart bîsmîllah nivîsandîye. Ji bilî van her duyan di beşên muqeddîme, mêrga yekê, mêrga duyê, mêrga sêyê û mêrga pêncê da jî bi erebî di serê rûpelî da bîsmîllah nivîsandîye. Di beşa muqeddîmeya *Gulzarê* da jî wekî beşek serbixwe ya dîbaceyê beşa Bîsmîllah heye û Şûşî sernavê wê wiha nivîsandîye: “El Îbtîdahû bî Îsmî Rabbîl Eʿla El-Fettaḥ (Destpêk bi Navê Rabbê Min ê Bilind ê Fettaḥ).” Ev beş ji 72 beytan pêk tê lê ji serî heta dawîyê behsa bîsmîllahê nake.

Şûşî destpêka xwe bi navê Xwedê yê "Fettah" dike, ku tê wateya "vekêr" an "keremkar". Ew di vê beşê da li ser giringiya navê Xwedê û bandora wî ya olî disekine. Li gor wî, navê Xwedê ne tenê şîfa û derman e, ew herweha mifteha seadetê, ronahiya dilan û rêberê mirovan e. Şûşî diyar dike ku kesên ku Xwedê nas dikin û ji dil taetî bo wî dikin, ew xwedî kemal in. Şûşî di vê beşê da li ser Pêxemberê îslamê jî disekine û wî wekî "serdarê hemû Pêxemberan", "ronahiya rehmetê" û "sedema afirandina alemê" pênase dike. Di vê çarçoveyê da, Pêxamber wekî rêber û mûrşîdê mirovan tê dîtin ku bûye sebeba hîdayetê. Herweha, sinneta wî jî wekî delîl û rêber tê pejirandin. Şûşî di vê beşê da li ser sehabîyên Pêxemberî jî disekine. Ew wan wekî "xudanê dîrayet û dînan", "xwedî kemal" û "şehîdên canfîda" yên ku bûne sedema seadet û hîdayetê pênase dike. Di dawîya beşê da Şûşî şîretan li xwe û xwînerên xwe dike. Ew ji wan daxwaz dike ku tewbe bikin, ji gunahan dûr bisekinin û bikevin rêya Xwedê da ku xilas bibin.

Ev beş wekî dîbaceya dîbacê ye. Şûşî di vê beşê da pêşîyê bi bîsmîllahê dest pê dike (*Gulzar*, beyt: 1-2):

*Ellah ku çi navekê şirîn e*
*Gûtna wî ḥeyatê can û jîn e*

*Ey navê te ye Reḥîm û Reḥman*
*Wey ẕikrê te ye şîfa û derman*

Piştî van her du beytan Şûşî derbasi tehmîdê dibe (*Gulzar,* b: 3):

*Her ḥemd û s̱ena û şukr û minnet*

[1] Binêre pêvek 5

*Her bû te Xudê xudanê reḥmet*

Ji tehmîdê derbasî tewhîdê dibe (*Gulzar*, b: 4-8):

*Bawer me heye ku tu Xuda yî*
*Her tu mezin î xudan beqa yî*

*Tenha yî tu bê heval î û bê hemṣer*
*Ne yê pêtivîyê wezîr û yawer...*

Ji tewhîdê derbasî neʿtê dibe (*Gulzar*, b: 9-21):

*Her we bi Muḥemmedî me bawer*
*ʿEbdê te ye qaṣid û peyember*

*Serdarê hemû peyemberan ew*
*Serdefterê cumle serweran ew*

*Ew rohnîyê afitabê reḥmet*
*Ew durrê giran buhayê xilqet...*

Ji neʿtê dîsa derbasî bîsmîllahê dibe (*Gulzar*, b: 22-30):

*Navê te Xudê çi tazenav e*
*Pîrûz e çi şûleka li nav e*

*Navê te ye ron dibin bi wî dil*
*Ẕikrê te ye hûn dibin bi wî dil...*

Ji bîsmîllahê derbasî behsa xwe dibe (*Gulzar*, b: 32-35):

*Ṭahirê te feqîr û jar e ya reb*
*Reḥma te wî pişk û bar e ya reb*

*Şermende ji tu ye piṛṛ gunah e*
*Feḍla te umêd e hem penah e*

Ji behsa xwe derbasî munacatê dibe (*Gulzar* b: 36-38):

*Mewlayê me yî tu dilnewaz î*
*Rebbê me tu yî tu karîsaz î*

*Ya Reb tu bi navê xû yê eʿzem*

*Ẋafil me ji xû nekey tu her dem*

Ji munacatê dîsa derbasî bîsmîllahê dibe (*Gulzar*: b: 39-42):

*Navê te Xudê ku çendê xûş e*
*Miftaḥê seʿadet û xirûş e*

*Navê te ye cewhera zubanan*
*Zikrê te ye nûrê qelb û canan*

Ji bîsmîllahyê derbasî şîretan dibe (*Gulzar*, b: 43-59):

*Zengîn e ewê ji dil tu nasî*
*Serşîn e kesê li nik te ʿaṣî...( 43)*

*Nefiroşe bi vê cîhanê yekser*
*Ṭahir tu riḍayê şahê ekber...(*50)

Ji şîretan derbasî behsa xwe dibe (*Gulzar* b: 60-72):

*Ṭahir were tuş wekî hevalan*
*Waz bîne li pûçîy û xeyalan*

*Qeṣdê bike baregahê Barî*
*Ta key neker û ne huşiyarî...*

Wekî encam di vê beşê da yek mijar tenê nîne. Mijarên bîsmîllah, tehmîd, tewhid, neʿt, munacat, şîret û behsa xwe di bin sernavê mijara bîsmîllahê da kombûne.

#### 2.2.5.1.2. Sena

Di vê beşa dîbaceyê da nivîskar hemd û methên Xwedê dike (Adak, 2019, r. 277). Di dîbaceya *Gulzarê* da wekî beşeke serbixwe ev mijar heye. Di bin sernavê " "Es-Sena ʿElellah (Pesin Bo Xwedê)" da di navbera beyten 73-119an da ev mijar heye. Di van beytan da, Şûşî di destpêkê da li ser sîfetên mutleq ên Xwedê disekine, Wî wekî "Ẕulcelal û Qadir" (Xwediyê mezinahî û hêzdariyê) û "ṣaniʿê piṛṛ kemal û ḥîkmet" dide nasîn. Ew tekez dike ku Xwedê ezelî û ebedî ye, bê destpêk û bê dawî ye û zanîna wî her tişt dorpêç kiriye. Qudreta wî ya bêhempa bi fermana "kun feyekun" tê nîşandan. Di warê hebûnî da, Şûşî diyar dike ku Xwedê bêalî û bêhevser e, ji her kêmasî û eyban dûr e û "ji her mekanî der e, lê li her mekanî ye. Têkiliya wî ya bi mexlûqan ra li ser bingeha dûalîteya rehm û qehrê ye: rehmeta wî ya berfireh (ku biheşt

tenê qetreyek jê ye) dilê bawermendan bi hêvî (reca) dagirtî dike, lê qehra wî ya tund da sedema tirsê (xewf) ye. Di dawîya vê beşê da Şûşî digel gunehên xwe yên pir, hêviya xwe bi rehmeta Xwedê ya bêdawî û şefaeta Muhemmed Pêxemberî (s.x.l.) ve girêdide.

Şûşî paşê derbasî mijara nîzama alema afirandî dibe, nîşan dide ku Xwedê hemû cin, mirov û melek bi pergaleke berfireh afirandîne. Ev nîzam, li ser bingeha xalên dûalîteyê (berevajîbûnê) hatiye avakirin, wekî cûdahiyên di navbera mirovên bi hezar eşîret, reng û ziman da û her weha berevajîyên gerdûnî (roj/şev, nûr/ẓelam) û yên exlaqî (xêr/şer, kufr/îman). Armanca vê nîzamê ya bi dûalîteyan tije, li gorî Şûşî, ew e ku mirov bi riya wan bigihîje me'rîfetê (naskirina Xwedê yê rastîn). Mirov wekî mexlûqê bijarte yê ku tacê keremê li ser serê wî hatiye danîn tê dîtin û bi şandina Pêxemberan ra Xwedê azadiya îradeya azad (bijartina di navbera îman û kufrê da) daye wî. Di dawiyê da ev beyt tekez dikin ku edalet û hukmê mutleq tenê yên Xwedê ne û kesên ku Xwedê nas nekin dê hîlak bibin. Ew daxwaz dike ku ew di rêya Xwedê da bimire û bi rehmeta Îlahî ya ku ji hemû gunehan mezintir e were efûkirin. Çend mînak ji vê beşê wiha ne:

*Ey ṣaniʿê Ẕulcelal û Qadir*
*Ẕatê te ne ewwel û ne axir*

*Îlmê te muḥîṭ û qudreta te*
*Ḥukmê te dirist û ḥîkmeta te*

*Ey çen mezinî çi ʿalî şanî*
*Nîşan te ew e ku bê nîşanî*

*Emrê tu bibêjî "kun fekan e"*
*Şeʾnê te Xudê çi taze şan e*

*Nînin te mekan li her mekan î*
*Rebbê me tu yî me tu xudan î*

*Baqî tu yî her tu ber qerar î*
*Her tu meded î tu harîkar î*

*Ey wahidê bê heval û hemser*
*Meʿbûdê hemû enamî yekser*

*Dûrî tu li ʿeyb û kêm û kasî*
*Ney xwuzme li wê ku tu nenasî...* (*Gulzar,* b: 73-80)

**2.2.5.1.3. Neʿt**

Ji bo helbestên ku behsa Pêxemberî dikin û methên wî dikin neʿt tê gotin (Çiçekler, 2006, r. 435). Neʿt beşeke sereke ya dîbaceyan e. Di *Gulzarê* da jî ev beşa dîbaceyê bi navê *"Fî Medḥîl Resûl (Di Pesnêt Peyẋemberî)"* cih digire. Di navbera beytên 120-201ê da ev mijar heye. Di vê beşê da, Şûşî pesnê Muhemmed Pêxemberî (s.x.l) dide û wî wekî "fexrê cîhan" û "tacê serê cemîʿê ʿalem" destnîşan dike. Ew, Muhemmed Pêxemberî wekî "nûrê hîdayeta Xudayî", "serwerê cumle murselînan" û "murşîdê cumleyê cîhanî" bi nav dike. Dîsa ew li ser rola Muhemmed Pêxemberî ya di roja qiyametê da disekine û pesnê wî dide: Ew Pêxemberî wekî "şefîʿê rojê meḥşer" û "saqî avê hewḍê kewser" û xwediyê meqamê meḥmûd û sîfeta bilind a "lewlak" pênase dike. Şûşî, bi metaforên wekî "sorgulê baẋê feyḍ û unsê, miftaḥê xizîneya kemalê" û "bilbilê murẋizarê Qudsê" wî pênase dike. Ew tekez dike ku Xwedê, Quran ji wî ra şandiye û ew kiriye sedem ku ummeta wî ji tarîtiyê ber bi nûrê ve biçin. Li gorî vê beşê Muhemmed Pêxember, ji destpêkê heta dawiyê, hem rehber hem jî şefîʿê ummetê ye.

Şûşî paşê derbasî mijara xebat û zehmetîyên ku Muhemmed Pêxemberî (s.x.l) yên ku di rêya dînî da kêşan dibe. Ew behsa cewr û cefa, ẓilm û êşên ku wî ji destê neyaran dîtin dike û dibêje Muhemmed Pêxember bi sebr û tehemulê li hember nebaşî û tiṛaneyên wan rawestiyaye. Her çend ku Pêxember bi sedan mucîze û delîlan ve jî hat, neyarên wî kor û kerr bûn û ew carinan wekî sahir, carinan wekî şaʿir bi nav dikirin. Tevî vê derdeserî û ḍerbederî, Muhemmed Pêxember bi xulqê xwe yê şirîn û edebê xwe ya bilind, dîn li seranserê cîhanê belav kir. Şûşî destnîşan dike ku rêya Pêxemberan zehmet e û yê ku li dinyayê zehmetê nekêşîne, neşêt xwe bigehîne cennetê. Di dawiya vê beşê da, Şûşî dibêje yê ku bibe peyrewê Muhemmed Pêxemberî (s.x.l) û rêya wî bigire dê serbilind û azad bibe, lê yê ku ji rêya wî derkeve dê bibe peyrewê şeytanî. Şûşî vê beşê bi duayekê bi dawî tîne, daxwaza efûkirina xwe dike û

hêviya xwe bi rehmeta Xwedê ya bê hejmar û bi xaṭira Muḥemmed Pêxemberî (s.x.l) ve girêdide. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Ey fexrê cîhan û wildê Adem*
*Ey tacê serê cemîʿê ʿalem*

*Ey nûrê hîdayeta Xudayî*
*Menzûrê ʿînayeta Xudayî*

*Navê te Xudê bilindê anî*
*Xulqê te gelek mezin wî zanî*

*Ey serwerê cumle murselînan*
*Wey pêşeṛoyê me muʾmînînan*

*Mînẓarê tereqqî û ʿîbadet*
*Serdarê hemû xudan seʿadet*

*Ey her tu şefîʿê rojê meḥşer*
*Her tu vedikey derî ji mehder*

*Ṣaḥib ʿelem û meqamê meḥmûd*
*Bes date Xudayî hewḍî mewrûd*[1]

*Ey saqî avê hewḍê kewser*
*Hîvî me nekey ji bîr di meḥşer*

*Ṣaḥib kerem î meqamê "lewlak"*
*Durra ṣedefa sucûdê emlak*

*Ey sorgulê baẋê feyḍ û uns î*
*Wey bilbilê murẋizarê*[2]*Qudsî...* (*Gulzar*, b: 120-129)

#### 2.2.5.1.4. Al û Eshab

Di dîbaceya *Gulzarê* da di navbera beytên 202-262an da behsê al û eshabê Pêxemberî tê kirin. Di vê beşê da methên malbata Pêxemberî û sehabeyê wî tên kirin. Di vê beşê da, Şûşî di destpêkê da pesnê Xwedê dide, diyar dike ku Xwedê, rehm û îḥsanê dide wan kesên ku ji dil guhdarîya wî dikin. Şûşî di vê beşê da methên "alê Resûl" (malbata Pêxemberî) û sehabîyên wî dike. Ew, "alê Resûl" wekî xwedanên qedr, şeṛef, ecr û xweştivîyên Xwedê destnîşan dike. Sehabî, wekî kesên şirîn xîsal, xudan kemal û stêrk têne binavkirin. Şûşî wan wekî kesên ku li hember kafiran germ û li hember misilmanan bi rehm û nerm, di şevê da bi zîkr û Quran û di rojê da jî şîrweşîn dide nasîn. Şûşî tîne ziman ku sehabî bi sexîtîya xwe navdar bûne û Pêxemberî ew wekî stêrkên rêya hîdayetê bi nav kirîne.

Şûşî paşê tekez dike ku sehabî ji aliyê Xwedê ve hatine bijartin û hedîsa Pêxemberî (s.x.l) ya ku dibêje "Qernê min e çêtirînê qernane" qedrê wan zêdetir dike. Ew di nav ewlîyayan da serok in û divê qet ʿîtab (şermezarî) li wan neyê kirin. Şûşî behsa zehmetî û fidarîya wan dike, diyar dike ku wan mal, ser û canê xwe di rêya Xwedê da dane. Herwiha, ew tîne ziman ku berî hatina Muhemmed Pêxemberî, ew butperist bûn û di rêya şaş da bûn lê piştî ku ew bûne heval û hemserên Pêxemberî, exlaq û sîretên wan bi temamî bedel bûn. Wan bi vê hêz û nîzamê, li dijî Rom û Kîsrayê ceng kirin û dîn di sih salan da li seranserê cîhanê belav kirin. Di encama vê beşê da, Şûşî daxwaza behiştê û rîdwanê ji Xwedê ra dike, bi taybetî ji bo çar xulefeyên bijarte û ji bo hemû misilmanan. Çend mînak ji beşê wiha ne:

*Nê "alê resûl" gelek bi qedr in*
*Ṣaḥib şeṛef in xudanê ecr in*

*Ew zêde bi qîmet û bi seng in*
*Lew ew du cîhan bi nav û deng in*

*ʿAlî neseb in xudan şehamet*
*Meḥûbê Xudê ne piṛṛ keramet*

*"Eṣḥabê Resûl" şirîn xîṣal in*
*Ṣaḥib huner in xudan kemal in*

*Çen behrewer in çiqe cewan in*
*Ellah çi qeder di ʿalî şan in*

*Peyẋember e roj ewan sitêr bûn*
*Her ber wî bû ew ku bû te şêr bûn*

*Wan pişt bi te û ʿemel bi wî bû*
*Lew ew bi te û ewan qewî bû*

*Ṣaḥib ʿemel in xudan dîyanet*
*Kardîde*[1] *ne xiṟṟ di piṟṟ şecaʿet*[2]... (*Gulzar*, b: 209-216)

#### 2.2.5.1.5. Çar Xelîfe

Di dîbaceya *Gulzarê* da ji bo her xelîfeyekî sernavekê serbixwe hatiye danan. Di naverbera beytên 263-363an bi rêzê ve behsa xelîfe Ebûbekir, Umer, Osman û Elî tê kirin. Şûşî di bin van sernavan da behsa fazîletên wan dike û bo wan duayan dike. Ji her sernavekî çend mînak:

***Ebûbekrê Siddîq***

Şûşî di vê beşê da bi awayekê berfireh û bi estetîkî methên Ebûbekrê Sîddîqî dike. Ew wî wekî xelîfeyê yekem, herî başê hevalan, kesekê bi nûr, rastgo, aqilmend, bi tedbîr û xwedî kerem dide nasîn. Şûşî taybetiya Ebûbekrî ya sereke, eleqeya wî ya ji dil û can a bo Pêxemberî nîşan dide. Ev eleqe bi taybetî di bûyera hîcretê da xwe nîşan dide ku Ebûbekrî di vê revingîyê da gelek zehmetî li gel Pêxemberî kêşandin. Herweha, di vê beşê da ew wekî wezîrekî jîr û dilsoz tê teswîrkirin ku hemû mal û milkê xwe ji bo parastina misilmanan û azadkirina koleyan xerc kiriye. Piştî mirina Pêxemberî, gava bûye xelîfe gelek şer li gel eşîrên ku ji dînê îslamê derketîn kirîye û ew kontrol kirîne. Şûşî di vê beşê da wekî xizmeta Ebûbekrî ya herî giring a li dîroka îslamê, bi awayekê fermî komkirina ayetên Quranê nîşan dide. Bi vê xizmetê, ew bûye pêşengê parastina vê pirtûka pîroz. Şûşî bi kurtasî, Ebûbekrî wekî kesayetiyek bingehîn û bêhempa di dîroka îslamê da dibîne ku ne tenê bi dilsoziya xwe ya mezin,

[1] Şolzan
[2] Mêrxas, egît, pelewan

lê di heman demê da bi hişmendî û biryardariya xwe ya siyasî jî derketiye pêş. Çend mînakên beytan ji vê beşê wiha ne:

*Ṣiddîqê mezin xelîfê ewwel*
*Bê şek li hemû ṣeḥabe efḍel*

*Ew piṛṛ kerem e xudan meqam e*
*Çen mihterem e çi nîkûnam e*

*ʿAlî şeṛef e şeṛîfê zat e*
*Pakij neseb e şirîn ṣîfat e*

*Ew hel ji dilî ḥeta bi hestî*
*Piṛṛ nûr û hîdayet û diristî...*(*Gulzar*, b: 263-266)

***Umerê Farûq***

Şûşî di vê beşê da bi awayekê berfireh methên xelîfeyê duyem Umerê Faruq dike. Ew, bi sifetên "xelîfeyê bêhempa", "ustazê kemal û hukimranî", "xwediyê şehamet, edalet, kerem û sebr" behsa wî dike. Şûşî bi taybetî li ser şervanîya wî ya dijwar û siyasetmedarîya wî ya jîr disekine ku ew hem di meydanên şerî da biserkeftî bûye hem jî ji bo miletê xwe rêberekê adil û hişyar bûye. Ew di vê beşê da bi taybetî li ser rola Umer a belavkirina dînî disekine û wî wekî “Mensûrê Xwedê, yar û wezîrê Pêxemberî” bi nav dike. Şûşî di vê beşê da şervanîya wî ya bihêz û xelîfetîya wî ya bi edalet dertêxîne pêş.. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Bê mîs̱al e ʿUmer xelîfê s̱anî*
*Ustaẕê kemal û ḥukimranî*

*Ṣaḥib huner û xudan şehamet*
*Zêdey bi ʿedalet û keramet*

*Lê piṛṛ kerem û kemal û qedr e*
*Ehlê ʿemel û ṣefa û ṣebr e*

*ʿAlî şeṛef e bilindê şan e*
*Maqûl e gelek xudan nîşan e...* (*Gulzar*, b: 290-293)

***Usmanê Zînnûreyn***

Şûşî di vê beşê da methên xelîfeyê sêyem Usmanî dike. Ew wî wekî "xudanê fezilêtê, babê keremê, mêrê bi edalet, xwedîyê du nûr, sebr, dîyanet, zavayê Pêxemberî, şermok, dilovan û hevalekê nêzîk ê Pêxemberî" pênase dike. Şûşî, dîyar dike ku wî carekê bo Hebeşîstanê, careka dî jî bo Medîneyê koç kirîye. Ew di vê beşê da bala xwendevanan dikêşîne ser xizmeta wî ya Quranê û dibêje wî bi awayekê fermî Qurane kom kirîye û weşandîye. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*ʿUs̱manê mezin xudanê feḍlê*
*Babê keremê birayê ʿedlê*

*ʿAlî şeṛef e bilind meqam e*
*Merdê kerem e çi nîkûnam e*

*Ṣaḥib huner e huner diyar e*
*Zavayê Resûl e hem xû yar e*

*Ew êk e belê ji sabiqînan*
*Meşhûre di nav mihacirînan...* (*Gulzar*, b: 319-322)

***Elîyê Murteza***

Şûşî di vê beşê da behsa xelîfeyê çarem Îmam Elî dike û gelek pesnê wî dide. Ew wî wek "xwediyê kemalê, xwedanê şecaatê, deryayê zanistê û şêrê Xwedê" pênase dike. Ew taybetmendîyên sereke yên Xelîfe Elî wekî "zîrekî", "wêrekî" û "abîdî" diyar dike. Şûşî li ser lehengî û wêrekîyâ wî ya şerên Bedr, Uhud û Xeyberê disekine. Ew di vê beşê da bala xwendevanan dikêşîne ser têkiliya wî ya taybet a bi malbata Pêxemberî ra ku ew wekî hevling, zava û hevalê nêzîk ê Pêxemberî tê binavkirin. Her weha, ew wekî bavê Hesen û Huseyn ên ku di dîroka îslamê da cihekî girîng digirin, tê nasandin û methên wî tên kirin. Di vê beşê da, Şûşî du aliyên sereke yên şexsiyeta Elî yên ku di dîroka îslamê da cihê wî yê taybet diyar dikin, pêşkêş dike ku ew jî şervanîya wî ya dijwar a li qadên şerî û zanayetîya wî ya ulumên îslamî ye. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Piṛṛ feḍl e ʿElî xudan kemal e*
*ʿAlî şeṛef e mezin xîṣal e*

*Ṣaḥib huner e xudan şecaʿet*
*Meşhûr e bi zêde werʿi û taʿet*

*Deryayê ʿilûm e ʿalî şan e*
*Mêrçak e wekî feṣîḥ zuban e*

*Serdarê cewan û şêremêran*
*Meşhûr e ʿElî ji nêremêran...* (*Gulzar*, b: 330-333)

**2.2.5.1.6. Armanc**

Şûşî di dîbaceyê da di bin sernavê "Îfadet-ul Meramî (Şîrovekirina Armancê)" da behsê armanca nivîsandina *Gulzarê* ya giştî dike. Şûşî dîyar dike ku ji mêje ve fikra wî ya nivîsandina "Baxê Nûr" anku *Gulzar*ê hebûye. Ew dibêje ez dizanim ku ev şolekê gelekî zehmet e û ji bo vî karî sexbêrî, dilê xweş, keyf, fereh û çelengî lazim e. Dibêje armanca min ew e ku ez serhatîya "Resûlê muxtar" binivîsim. Di dawîya beşê da bangî xwendevanan dike û dibêje ger tu bihêy vê berhemê bixwînî dê zewq û sefaya dil bibînî ji ber ku ev berhem behsa jîyana Pêxemberî dike. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Ya Reb tu ʿElîmî tu dizanî*
*Mêje keserek ku min di canî*

*Fikrek mi heye eger çî dûr e*
*Emma tu dizanî baẋê nûr e*

*Ew gerçî bi talî ye û bi zeḥmet*
*Miḥtac e bi hîmmet û feraẋet*

*Seẋbêrî divêtin û dilê xûş*
*Keyf û fereḥ û çelengî û huş...* (*Gulzar*, b: 364-367)

Ev beş di navbera beytên 364-523an da cih digire û ji pênc binbeşên serbixwe yên bi navê "*Giringîya Vehandina Kîtabê*, *Sedema Nivîsandina bi Kurdî*, *Çend Çavkanîyên Kîtabê*, *Kêşa Nezma Kîtabê û Dîroka Destpêkirina Nivîsandina Wê* û *Lêborîn ji Xwendekaran* pêk tê. Ji her binbeşekê çend mînak:

***Giringîya Vehandina Kîtabê***

Di vê beşa da, Şûşî girîngiya hînkirin û xwendina jiyana Muhemmedî (s.x.l.) û çar xelîfeyên wî bi aşkere û bi awayekê sîstematîk diyar dike. Ew diyar dike ku nasîna tarîxa jiyana Pêxemberî, jidayikbûna wî heta mirina wî, wekî delîl û rêberekê jiyanê ye. Ji ber vê yekê hemû misilman divê ji zaroktiya wî heta wefata wî hemû hûrgulîyên jîyana wî bixwîne û bizane.

Di vê beşê da bi awayekê aşkere tê gotin ku armanca vehandina vê berhemê danasîna jîyana Pêxemberî ye da ku xwendevan bo xwe îbret û şîretan jê werbigirin. Şûşî bawer dike ku ev nasîn dê bibe wesîla ji xewê hişyarbûn û dîtina rêya rast a Xwedê. Her weha ew di dawîya vê beşê da behsa çar xelîfeyan jî dike û her yek bi taybetmendiyên wan ên taybet diyar dike. Ew Ebûbekrî wekî xelîfeyê pêşîn û kesê herî baş, Umerî wekî rêberekê bi edil, Usmanî wekî xwediyê kerem û Elî jî wekî zana û şêrê Xwedê pênase dike. Ew diyar dike ku nasîna jiyana wan jî ji bo fêmkirina belavbûna dînê Îslamê pêwîst e. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Lazim tu bizanî ey birader*
*Tarîxî ḥeyatê yarê serwer*

*Peyẋember û daʿîyê vî dînî*
*Hindek ji ḥeyatê wî vexwînî*

*Ewṣafê di wî ji pê ḥeta ser*
*Exlaqê di wî heman seraser...* (*Gulzar,* b: 377-379)

***Sedema Nivîsandina bi Kurdî***

Şûşî di vê beşê da dîyar dike ku bi hemû zimanan berhemên ku behsa jîyana Pêxemberî dikin hene lê bi kurdî heta niha wî pirtûkeke wiha nedîtîye. Ji ber vê kêmasîyê wî xwestîye *Gulzarê* binivîse. Ew di vê beşê da jîyana Pêxemberî wekî “dilveker û xemrevîn” pênase dike û duayan bo xwe ji Xwedê dixwaze ku bişêt vê berhemê binivîse. Dîsa di vê beşê da Şûşî nesaxîya xwe, êş û elemên xwe tîne ziman û ji bêrewacbûna ilmî ya dewra xwe gazindeyan dike. Di dawîya beşê da dîsa duayan bo xwe ji Xwedê dike ku bişêt berhema xwe binivîse. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Beḥs̱ê wî diken bi her zubanan*

*Medḥa wî diken li her mekanan*

*Emma me ḥeta nihû nedîne*
*Jîna wî bi kuṛdîya şirîne*

*Ey dil kesera te ya li mêje*
*Wer wekî te divê bi kuṛdî bêje...* (*Gulzar,* b: 421-423)

***Çend Çavkanîyên Kîtabê***

Di vê beşê da, Şûşî behsa çend çavkaniyên ku wî ji bo nivîsanda *Gulzar* bikar anîne dike. Di vê beşê da wekî çavkanî tenê navê "Beydawî, Kamil, Buxarî" derbas dibe lê dibêje me ji deh-pazde kîtaban sûd wergirtîye. Her weha Şûşî di vê beşê da dibêje ku ev berhem bi kurdîya behdînî nivîsandîye û dîsa ji Xwedê duayan dixwaze ku ew di xeyala xwe da anku nivîsandina *Gulzar*ê da serbikeve. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Seyrêke hinek ḥedîs tefsîr*
*Tarîxê dirist bi rêz û teqdîr*

*Beyḍawî û Kamil û Buxarî*
*Reḥmet li xudanê wan bibarî*

*Deh pazde kîtab wekî me lazim*
*Her dem mededê ji wan dixwazim...* (*Gulzar*, b: 465-467)

***Dîroka Destpêkirina Nivîsandina Wê û Kêşa Nezma Kîtabê***

Şûşî di vê beşê da behsa dîroka nivîsandina *Gulzar*ê û weznê wê yê erûzê dike. Dibêje ku wî di sala 1376 hîcrî (1957 m.) da li meha remezanê dest bi nivîsandina *Gulzar*ê kirîye. Her weha ew dibêje ku *Gulzar* bi weznê "*Feʿlun feʿelun feʿel feʿul in*" hatiye nivîsîn û ev wezne di nav ilmê erûzê da nîne. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Gava me serê kîtabê danî*
*Mahê remeḍan bû xûş li canî*

*Ḥeftê û şeş û hizar û sêṣed*
*Bû hîcretê yarê mey Muḥemmed...* (*Gulzar,* b:476-477)

*Feʿlun feʿelun feʿel feʿûl un*
*Ev çware Rîyaḍê Nûr uṣûl in* (*Gulzar*, b: 482)

***Lêborîn ji Xwendekaran***

Şûşî di serê beşê da selaman li xwendevanên *Gulzar*ê dike û paşê derbasî mijara nivîsandina berhemê dibe. Dibêje di vê berhemê da her agahîyek me ji çavkanîyekê wergirtîye û dibeje ger kêmasîyek hebe ew ji min e û her tiştê rast jî yê wan e. Dîsa di vê beşê da jî Şûşî nivînsandina *Gulzar*ê wekî merama xwe ya kevin nîşan dide û ji bo nivîsandina wê duayan ji Xwedê dixwaze. Her weha ew di vê beşê da şîretan li xwînerên xwe dike û ji wan dixwaze ku ew wî ji bîr nekin hin caran bînin bîra xwe û bo wî dua bikin. Şûşî di dawîya vê beşê da dibêje ez vê berhemê dinivîsim da ku qedrê Pêxemberî bihê zanîn. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Ey naẓirê vê rîsaleya nû*
*Ṣed carê selam dikem li ser tu*

*Min hîvî ye tu bi luṭf û xûşî*
*Da seyrê bikey Rîyaḍê Şûşî*

*Ez her çî bibêm li her meʿanî*
*Bê şik me li meṣderek deranî* (*Gulzar*, b: 483-485)

**2.2.5.1.7. Qurana Mecîd**

Di dîbaceyên standart da ev mijar nîne lê Şûşî ji standartên dîbaceyê derketîye û mijareka nû xistîye nav dîbaceyê da (Adak, 2020, r. 1521). Qurʾana Mecîd beşa sereke ye û ji şeş binbeşên bi navê "*Mezinatiya Quranê, Welatê Quranê, Quran û Zanîn, Quran û Sedemên Bilindîyê, Serûjêrkirina Quranê* û *Nuqitkirina Quranê*" pêk tê. Ev beş di navbera beytên 524-681an da cih digire.

Şûşî di serê beşê da behsa rewşa dinyayê ya berî virêkirina wehyê dike. Ew rewşa dinyayê ya berî wehyê wekî delalet, îsyan, fesadî, talan, şer û şor, xwînrêtin, butperistî dibîne. Ew dibêje ji ber vê rewşa xirab a dinyayê Xwedê dilê xwe hêla bi ebdên xwe ve û bo wan wekî rêberê xilaskirinê ji vê rewşa xirab Qurana pîroz virêkir. Şûşî piştî Quranê behsa Pêxemberî dike û dibêje ew resûlê dawî ne û Quran jî kîtaba dawî ne ku Xwedê bo wî virêkirî. Şûşî Quranê wekî tacê serê kurey zemînê pênase

dike. Ew li ser giringiya Quranê wekî "tacê serê vê kurey zemînî" disekine û wê wekî "çirayê alem" (ronahiya cîhanê) û "ustazê alem" (mamosteya cîhanê) dibîne. Her weha, ew dîyar dike ku Quran ji bo hemû ziman, milet û çandan hatiye virêkirin û di hemû deman da aktuel û guncan e. Her çiqas dem bi pîrî ve here jî, dê xweza û bandora wê her daîm dê dom bike. Wekî mînak çend beyt ji bêşê wiha ne:

*Qurʾan e eger tu hûr dibînî*
*Tacê serê vê kuṛey zemînî*

*Qurʾan e belê çirayê ʿalem*
*Ustaẕ e û rehnimayê ʿalem*

*Barî ku hinarî taze Qurʾan*
*Nek bû ṭebeqek li newʿê însan..* (*Gulzar*, b: 535-537)

***Mezinatiya Quranê***

Ev beş, binbeşa “Quranu-l Mecîd” e û di navbera beytên 524-539an da cih digire. Di vê beşê da, Şûşî li ser mezinahiya Quranê ya bêhempa disekine û bi hurmet methên wê dike. Ew Quranê wekî "nîzam û dûstûr" a (pergal û destûr) Xwedê dibîne. Şûşî taybetmendiyên sereke yên Quranê wiha dîyar dike:

- Mîzana edalet û kemalê
- Kîtabeke bê mîsal û kerîm
- Zimanekî fesîh û bê kêmasî
- Tijî ilim û ʿîrfan
- Delîl û rêberekî guncan ji bo hemû beşên jiyanê

Ew diyar dike ku Quran hem rêberekî dînî ye û hem jî çavkaniyeke zanistî ye, ku hemî zanistên îslamî jê derdikevin. Her weha, ew zimanê erebî yê Quranê jî weke zimanekî "şîrîn, fesîh û serdarê hemû zimanên cîhanê" pênase dike û methên wê dike. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Qurʾan e Xudê nîẓam û dûstûr*
*Bû jînê beşeṛ bi kam û mesrûr*

*Qanunê Xuda ye bû hîdayet*
*Menşûrê wî ye ji bû seʿadet*

*Mîzanê ʿedalet û kemal e*
*Mîqiyasê sîyadet û celal e...* (*Gulzar*, b: 540-542)

***Welatê Quranê***

Di vê beşê da, Şûşî li ser bandora dîrokî û civakî ya Quranê disekine û wê bi awayekê balkêş û kûr vedibêje. Ew Quranê wekî "destûra hemû cîhanê" dibîne ku ji herêma Hîcazê derketiye û bûye sebebê guherandina nexşeya cîhanê. Şûşî di vê beşê da Quranê wekî mucîzeyeke mezin û bi hîkmet dibîne. Ew di vê beşê da dîyar dike ku Quran bûye sedema avakirina nîzameke nû li ser dinyayê, rûxandina sînorên heyî û hilweşandina hukimdariyên kevnar, damezrandina bingehên nû yên dîn û dewletê û belavkirina îslamê ji Endulusê heta Çînê, ji Qefqasyayê heta Zencebarê. Şûşî herêma ku ehlê îslam lê bi serbestî lê dijîn, wekî "welatê Quranê" dibîne. Di dawiyê da, ew ji Xwedê dixwaze ku bi hêza Quranê, ehlê îman bibe serkêş û serfiraz. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Qurʾan e eger te hûr e menẓer*
*Disturê hemû cîhanê yekser*

*Ew hat ji Ḥîcazê wê ʿecel kir*
*Wê çust û durust zemîn bedel kir*

*Ya Reb ve çi qudretek ʿecîb e*
*Ellah ve çi ḥîkmetek ẋerîb e...* (*Gulzar,* b: 568-570)

***Qurʾan û Zanîn***

Di vê beşê da Şûşî têkiliya di navbera Quranê û zanistên dî da vedibêje û girîngiya pêşxistina zanistî ji bo ummeta îslamî diyar dike. Ew Quranê wekî çavkaniyeke bingehîn a ku mirovî teşwîq dike ku li ser zanist û hunerên cîhanê bixebite, dibîne. Şûşî, bi awayekê xurt diyar dike ku: Quran nîşanên jiyanê û delîlên afirandina cîhanê diyar dike. Xwedê cîhan wekî "darê esbab" (dara sebeban) afirandiye, ji ber vê yekê pêwîst e ku mirov ji sebaban bi kar bîne. Ji bo misilmanan tenê bi dînî ve mijûlbûn têra nake, pêwîst e ku ew her cure zanist, huner û zimanên dî jî hîn bibin. Bi pêşxistina zanistî û aborî, misilman dê bişên bi awayekê serbest, bi îzzet û dewlemend bijîn. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Qurʾan e ku rişt diket dema dem*
*Însanî li ser funûnê ʿalem*

*Nîşame didet delaîlê jîn*
*Jêrî ʿelemê mubarekê dîn*

*Nîşame didet li vê wicûdê*
*Esbabê tereqîy û suʿûdê...*(*Gulzar,* b: 578-580)

***Qurʾan û Sedemên Pêşketinê***

Di vê beşê da, Şûşî behsa têkiliya di navbera Quranê û pêşketina civakî, aborî û çekesaziyê dike. Ew bi awayekê xurt diyar dike ku pêşketin û xweparastina fizîkî ji bo parastina misilmanan wekî ferzeke dînî ye. Ew di vê beşê da li ser van xalan disekine:

- Giringîya ku Quran dide xebatê
- Pêdiviya hişyariya leşkerî û çekesaziyê
- Girîngiya fêrkirina teknolojiya nûjen wek tayare, bombe, peraşût, dûrbîn, tank û radaran
- Pêdivîya misilmanan bi artêşeke xwedî çek û quwwet

Di dawiyê da, ew ji Xwedê dixwaze ku ummeta Îslamê bi hev re yekdil bijîn û di bin sîwana Quranê da bi serfirazî jiyana xwe bidomînin. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Meʿlûm e li nik heman dîyar e*
*Asasê ḥeyatê seʿiy û kar e*

*Nagehte murad û nav û nîşan*
*Her çî neker û nezan bi pîşan*

*Her qewmê ji xû ve bûye hişyar*
*Karek ji xû ra kirî şirînkar...* (*Gulzar,* b: 592-594)

***Serûjêrkirina Quranê***

Di vê beşê da Şûşî behsa dîroka berhevkirina Quranê, nivîsandina wê û xwendina wê dike. Ew bi dîrokî rave dike ka Quran çawa hatiye berhevkirin û ji bo

parastina rastiya wê gavên çawa hatine avêtin. Şûşî di vê beşê da dîyar dike ku Quran hêj di dema Pêxemberî da ji alîyê katiban ve dihate nivîsîn û di nivîsîna wî demî da herf bê nuqte dihatin nivîsîn. Dîsa Şûşî di vê beşê da dîyar dike ku Xelîfe Osman Quran bi awayeke fermî da berhevkirin û zêdekirin ku ew yek jî ji alîyê Quranê ve bû sedema yekitîya misilmanan. Di vê beşê da behsa pêvajoya nuqitkirina Quranê jî tê kirin. Şûşî dibêje ji ber ku hêdî îslam gelek berbekav bûye û gelek netewên dî jî bûne misilman tirsa xelet xwendina Quranê derketîye hole. Ji ber vê tirsê zanyarên wek Elî bin Ebdilmelîk û Ziyad bin Sûmeyye sîstema nuqte û îrabê çêkirin û ev sîstem ji bo rast xwendina Quranê bo misilmanan bû harîkar. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Qurʾan ku Xudê hinar li bû me*
*Peyẋemberî kir diyar ji bû me*

*Her ayeteka dihate xwarê*
*Wî taze bû wan digûtî carê*

*Dabêjîte katibê xû paşî*
*Binvîse bi tazehîy û başî...* (*Gulzar,* b: 623-625)

***Nuqitkirina Quranê***

Şûşî di vê beşê da bi şêweyekî zanistî û dîrokî behsa pêvajoya nuqtekirina Quranê dike. Di dema Xelîfe Ebdulmelîkî da, walîyê bi hêz Heccac fermanê dide her du zanyarên bi nav û deng, Neṣrê kurê ʿAsim û Yehyayê Îbnû Yeʿmur, da ku tîpên erebî yên Qur'anê bi nuqteyan cih bikin. Armanca bingehîn ji vî karî ew bû ku xwendina Quranê xelet nebe û li gel tîpên dişibin hev ferq were danîn. Piştî erêkirina Ebdulmelîkî, ev şêwaza nû ya nivîsandinê bi fermî li seranserê civaka misilman hate ferzkirin da ku xwendina Qur'anê rast û durist bibe. Şûşî piştî vegotina vê pêvajoya şîretan li xwînerên xwe dike û dibêje ger tu bixwazî navê te li dinyayê bimîne û nifşên piştî te jî bo te duayan bikin, ji dil şolekê wisa bike ku di xêra ummetê, dînê te û dewleta te be. Ew vê beşê bi duayekê xilas dike. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Wan nuqte ji rengê ḥerfê danan*
*Da feriq bibît li karê pêş wan*

*Bûlesewedê wan mela û ustad*
*Îʿrab wî dema kiribû îcad*

*Wî ḥerf bi ṛeş bi ṣurê îʿrab*
*Danabû ewî bi rêz û adab...* (*Gulzar*, b: 659-661)

**2.2.5.1.8. Dînê Xwedê Îslam**

Ev mijar jî di nav mijarên standart ên dîbaceyan da nîne û Şûşî ev mijar li dîbaceya xwe zêde kirîye. Ev beş di navbera beytên 682-876an da cih digire û ji şeş binbeşên bi navê "*Mezinahîya Şeṛîʿeta Îslamî, Nimûnek ji Zanistên Şeṛʿî, Nêrînek li ser Ḥeramîya Rîbayê û Meşrûîyeta Zekatê, Misilmanetî Di Çerxên ʿEwil da*, *Rewşa Misilmanetiya Evro* û *Sinneta Misilmanan li Hemberî Dînê Wa yê Mûbîn* pêk tê.

Di vê beşê da, îslam wekî dînê rastîn û dawîn ê Xwedê tê destnîşankirin. Di destpêkê da, şikur ji bo Xwedê tê kirin ku Wî Pêxemberê bi rûmet û Kitêba Temam (Quran) şandîye û rêya bexteweriyê (seʿadet) nîşanî mirovan daye. Şûşî îslamê wekî destûra Xwedê (nîẓam û distur) û tekane dînê rastîn dibîne û dibêje ku ji bilî îslamê hemî dînên dî betal in. Ew di vê beşê da wekî nûr û delîlê îmanê behsa Muhemmed Pêxemberî dike. Her weha di vê beşê da tê diyarkirin ku îslam li ser bingeha edalet û kemalê hatiye avakirin, ji bo hemî mirovahiyê qanûneke giştî ye û bingeha jiyaneke pak û desthilatdarîyeke serkeftî ye. Di dawîya beşê da Şûşî dibêje kesê ku ji dil vî dînî bo xwe bigire ew dê li her du cîhanan bextewer be û yên xwe jê dûrtêxin jî dê li her du cihanan dê xisaretê bibînin. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha :

*Îslama Xudê nîẓam û distûr*
*Qurʾana Xudê beyan û menşûr*

*Peyẋemberê wî wekîlê dîn e*
*Hem qaṣid û ṣadiq û emîn e*

*Nê dînê Xudê ye dînê îslam*
*Ẋeyrî wî hemû beṭal û bê ṭam* (*Gulzar*, b: 686-688)

***Mezinahîya Şeṛîʿeta Îslamî***

Di vê beşê da, Şûşî behsa mezinahî û gerdûnîbûna şerîeta îslamê dike û bangî xwînerên xwe dike ku ger ew bixwazin bi karê dewletî û zanistên rêveberiyê (fennê

ḥukm û dewlet) eleqedar bibin, divê bi dil şerîetê baş vekolin û hîn bibin. Ew Şerîetê wekî dergehê bexteweriya her du malan (dunya û axret) pênase dike ku Xwedê ew wekî kakilek ji zanîna xwe hilbijartiye. Şûşî dibêje ku şerîet ne wekî kincên teng, lê wekî çermê fireh û gerdûnî ye û ew li ser delîlên aqilî hatiye damezirandin. Ew tekez dike ku şerîet ji bo hemû zanistên bingehîn hatiye çêkirin û her çend mirovahî pêşve diçe (tereqqî) şerîet jî her tim bi wan re hevrêz dimîne. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha:

*Wer seyrê bike eger tu dahî*
*Agahî bi karê mulk û şahî*

*Zanayî bi fennê ḥukm û dewlet*
*Wer seyrê bike ji dil şeṛîʿet*

*Ev şeṛʿe bira wekî dizanî*
*Dergahê seʿadeta du xanî...* (*Gulzar*, b: 708-710)

***Nimûnek ji Zanistên Şerʿî***

Di vê beşê da, Şûşî balê dikêşîne ser firehî û kûrahiya zanistên ku di nav şerîeta îslamê da cih digirin û gazî xwînerên xwe dike ku ji bo nimûneyê li van zanistan binêre. Şûşî destnîşan dike ku şerîet zanistên wekî zanista giyanî (ku giyan paqij dike û dilan terbîye dike), zanista siyaseta cîhanê û rêkxistina malan û zanista hiqûqî (huqûqê xaṣ û ʿamê) û karên dewletê dihewîne. Ew tekez dike ku şerîet ne tenê îbadet in, lê di heman demê da ew hemî zanistên girîng ên ji bo jiyan, siyaset û rêveberiyê jî di nav xwe da dihewîne. Di encamê da, Şûşî dibêje ku her çend sed zanistên cûrbecûr hebin jî, ew hemû di nava şerîetê da hatine cema kirin û ji ber vê yekê jî şerîeta îslamê gerdûnî ye. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Ḥezkey tu were ji bû nimûne*
*Çendik ji ʿilûmê dîn bixwune*

*Wek fennê ku can diket muhezzeb*
*Wek ʿîlmê dilan diket mueddeb*

*Ew ʿîlmê bi nav ʿîlac û derman*

*Fennê bi wî çêdibît wîcdan...* (*Gulzar*, b: 717-719)

***Nêrînek li ser Ḥeramîya Rîbayê û Meşrûîyeta Zekatê***

Di vê beşê da, Şûşî li ser du mijarên giring ên şerîetê anku zekat û rîbayê (faîz) radiweste û ew van her du mijaran wekî sedemên esasî yên ku li cîhanê da dibin sedema tevlihevî, pevçûn û şeran, destnîşan dike. Ew radigehîne ku ger mirov van her du hukmên dînî (zekat û rîba) bi cih bîne, dê dîtina nepenî (sirr) û feydeyên (meṣleḥet) wan ên civakî fêm bike. Ew dibêje ger ku mirov li dîroka cîhanê binêre, dê bibîne ku serê şer, parçebûn (şîqaqê) û dubendîyê(nîfaqê) di civakê da du felsefeyên nebaş in. Yekemîn felsefe ew e ku kes dibêje: "Ger ez têr û dewlemend bim, kesên birçî û tirsandî (li birs û tirsan) bo min xem nîn in." Felsefeya duyemîn jî ew e ku: "Tu biweste da ku ez bixwum û bijîm." Şûşî van her du fikran wekî serokên fitneyê (serûkê fitnan) û sedema rewşa perîşan a mirovahîyê dibîne. Ew tekez dike ku ji bilî şerîet û Quranê, ji bo vê nexweşîyê ti dermanek dî nîne.

Şûşî diyar dike ku dermanê vê nexweşîya civakî tenê şerîeta îslamê ye. Şerîet ferman dike ku mirov ji karên heram ên wekî rîbayê dûr bikevin û ruknê zekatê ji dil û can bi cih bînin. Ew dîsa dîyar dike ku bi xêra zekatê di nav ummetê da dê xweşî, hezkirin (evîn) û ulfet peyda bibe û misilman dê bi serbilindî bijîn. Ew di cîhanê da hebûna dewlemend û feqîr, mezin û gedayan wekî hîkmetên Xwedê destnîşan dike û dibêje lazim e dewlemend li hemberî feqîran bexîlî û zilmê nekin. Şûşî dîsa dîyar dike ku dema zekat di nav misilmanan da kêm dibe û rîba zêde dibe, dilên dewlemendan hişk û tije kîn dibin û feqîr jî bi dilreşî li hember maldarên xwe disekinin. Ew dîsa dubare dike ku dermanê vê nexweşiyê peydabûna zekatê û dûrketina ji rîbayê ye. Di dawiyê da, ew dibêje ger ku misilman ji dîn û şerîeta xwe dûr bikevin, dê her tim di nava derd û perîşaniyê da bimînin ji ber ku dînê wan kilîla kerametê û kefîlê bexteweriyê (seʿadet) ye. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Luṭfa tu were bibîn bi dîqqet*
*Yek du ji mesailêt şeṛîʿet*

*Ewwel tu were zekat neẓer ke*
*Paşî bi rexê rîba guzer ke*

*Sirrek çi mezin Xudê di wan da*

*Çen xêr û çi meşleḥet bi wan da...* (*Gulzar,* b: 724-726)

***Misilmanetî Di Çerxên ʿEwil da***

Di vê beşê da Şûşî li ser rewşa misilmanên ewil disekine û wan wekî mînakên baş nîşa xwînerên xwe dide. Ew dibêje misilmanên ewil emel bi Quranê dikir ji ber vê yekê jî bibûne xûdanê milk û hukimranîyê. Şûşî, van misilmanan bi têgehên "xwedî dîyanet, hêz, edalet, yekbûn, yekgirtin, ilm û huner" pênase dike. Dibêje ji ber van taybetmendîyên baş ew di dewra xwe da bi serbilindî û serbestî dijîn û ji ber ku xwedî hêz û quwwet jî bûn şîyabûn li dinyayê edaletê belav bikin. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Her wekî li me pêş weke dizanî*
*Îslam bi kemalê ḥukimranî*

*Çendî ku ʿemel ewan bi Qurʾan*
*Ew bûne xudanê mulk û sulṭan*

*Ew çen bi dîyanetê diyar bûn*
*Ṣed hinde bi quwwet û bi kar bûn...* (*Gulzar*, b: 785-787)

***Rewşa Misilmanetiya Evro***

Şûşî, di vê beşê da, rexneyeke tûj li ser rewşa civakên misilmanên evro dike. Ew, beramberî rûmet û serkeftina dema ewil a îslamê, rewşa îro ya misilmanan gelekî xirab dibîne û vê rewşa wan bi têgehên "bê rewac û bê nam" pênase dike. Ew sedema vê lawaziya misilmanên evro bi perçebûn, nehezkirin û netifaqbûna wan ve girêdide. Şûşî, dûrketina misilmanan a ji edalet, şerîet û yekîtiya berê wekî sedema vê rewşa wan (zeîf, ser şor) nîşan dide. Şûşî di vê beşê da ji bilî kêmasiyên siyasî û civakî, balê dikêşîne ser xerabûna exlaqî û fedakirina nirxên dînî ji bo berjewendiyên dinyewî. Ew di nav misilmanan da belavbûna qumar, sînema, muzîk, fucûr (pîsekarî) û bêşermiya jinan rexne dike û van tevgeran wekî neyartiya dînî dest nîşan dike. Şûşî li ser belavbûna bêbextî, îftira, dizî, ruşwet, hîlekarî û kêmasiya pîvanan disekine û sedema wan dûrketina misilmanan ji şerîeta îslamê nîşan dide. Ew xemgîn e ku di roja wî da zanist bê qedr bûye û namûsê giringîya xwe winda kirîye. Di dawîya beşê da Şûşî diyar dike ku heta misilman ji dil li gorî şerîeta Xwedê neçin, nefsa xwe û şehweta xwe kontrol nekin Xwedê jî alîkaraya wan nake. Wekî mînak çend beyt ji beşê wiha ne:

*Ṣed ḥeyf û mixabinî bû îslam*
*Evroke we bê rewac û bê nam*

*Gava ku hebûn hemû li gel êk*
*Wan şûl bi dilî hemû dibûn rêk*

*Evroke hituve lêk cuda yîn*
*Lêk dî neḥez în û labela yîn...* (*Gulzar*, b: 798-800)

***Sinneta Misilmanan li Hemberî Dînê Wa yê Mûbîn***

Şûşî, di vê beşê da li ser helwesta misilmanan a niha ya li hemberî dînê wan ê pîroz disekine û bi hêviyeke mezin banga vejînê dike. Ew di destpêka beşê da behsa qedr û qîmetê dînê îslamê dike û dibêje Qur'an wekî bingeha vî dînî, heta ku cîhan hebe dê rast û durist bimîne. Şûşî piştî vê destpêkê behsa rewşa xirab a misilmanan dike û wan rexne dike. Dibêje mixabin misilman ji Quranê û dînê xwe dûr ketîne û ketîne rêya neyarên xwe. Ji ber vê yekê jî ji kemalê dûr ketîne û ketîne nav zilletê. Piştî dîyarkirina û rexneya rewşa xirab a misilmanan Şûşî gazî misilmanan dike ku hemû misilman li gel Xwedê bi dilsoz bin û ji bo rizgarî û bilindkirina dînê Xwedê dest bi xebatê bikin. Ew bi bîr tîne ku dema misilman bi dîn û îman bûn, wan "mûlk û sultan" bi dest xistibûn, di jiyaneke xweş û bextewar da bûn. Şûşî di dawîya beşê da duayê dike ku Xwedê bi qedrê navê xwe yê herî mezin û qedrê Pêxemberê Ekrem û Qurana pîroz, hêz û tifaqê bide misilmanan û wan li ser kafiran muzeffer bike. Ew di heman demê da daxwaz dike ku Quran bibe hukimran û şerîet bibe destûr ji bo jiyana wan. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Ev dîne şeṛîʿetê Xuda ye*
*Lew hinde bi qîmet û buha ye*

*Qurʾan e belê mîdadê dînî*
*Ta maye cîhan durust dimînî*

*Îslamê eger çî car bi caran*
*Guh daye desîseya neyaran...* (*Gulzar*, b: 843-845)

#### 2.2.5.1.9. Pêşgotina Mêrga Êkê

Yek ji mijarên dî yên ku Şûşî li dîbaceyê zêdekirî ev e. Şûşî di vê mijarê da behs dike ka dê di mêrga yekê da behsa çi bike. Şûşî ji bo mêrga duyê û sêyê jî di dawîya mêrga yekê û dûyê da bi heman awayî pêşgotinek nivîsandîye. Di navbera beytên 877-908an da behsa vê mijarê tê kirin. Şûşî, pêşî destnîşan dike ku Quran, şerîet û dîn, hemû bi rêya "Resûlê şirîn" gehîştine mirovan û ew Pêxember bûye sedema hîdayet û bextewariya wan. Ew paşî derbasî duayan dibe û ji Xwedê daxwaz dike ku li ser Pêxemberî, malbat, heval û hemû sehabîyên wî, nemaze li ser çar xelîfeyên wî, dilovanî û bereketê bibarîne. Şûşî di vê beşê da behsa xwe dike xwe wekî jar pênase dike û ji Xwedê daxwaz dike ku alîkarîya wî bike.

Şûşî di beşa navendî ya pêşgotinê da li ser ferziyeta hezkirin û naskirina Pêxemberî disekine. Ew dibêje Pêxember "şefîʿê meḥşer" û "ruḥ û canê" misilmanan e ji ber vê yekê divê misilman ji her tiştî – ji zarok, can, jiyan, mal û malbatê – zêdetir ji wî hez bikin. Şûşî dibêje îmana kesê ku ji her tiştî zêdetir ji Pêxemberî hez neke bêserûber û lawaz e. Lewma, Şûşî daxwaz dike ku xwîner bi temamî jiyan, bandor, exlaq, sîret û kiryarên Pêxemberî bizanin û ji wê ders û nesîhetan hilgirin.

Şûşî di dawîya pêşgotinê da ji Xwedê daxwaz dike ku di nivîsandina *Gulzarê* da harîkrîya wî bike da ku ew bişêt bi awayeke herî baş çîroka jîyana Pêxemberî vebêje. Di dawîya vê beşê da Şûşî berhema xwe wekî *Gulzar* û *Rîyaḍê Nûr* bi nav dike û wê wekî baxekê gelek şirîn, dilveker, xemrevîn û tijî sewq û sefa pênase dike. Wekî mînak çend beyt ji vê beşê wiha ne:

*Behrek ji ʿînayetê kerem ket*
*Nûrek di serû serê qelem ket*

*Ez dê ji nebî cewan xeber dem*
*Şîrîn qise û rewan xeber dem*

*Dê puşt bi Xudê cewan bibêjim*
*Her wekî te merame dadirêjim* (*Gulzar*, b: 899-901)

**Tablo 2. 4:** Berawirda Dîbaceya Gulzarê li gel Çend Mesnewîyên Kurmancî

| | **Dîbaceya Yusif û Zuleyxayê**[1] | **Dîbaceya Mem û Zînê**[2] | **Dîbaceya Rewdu'n-Ne'îmê**[3] | **Dîbaceya El-Cewahîrê**[4] | **Dîbaceya *Gulzar*ê** |
|---|---|---|---|---|---|
| 1 | - | - | Bîsmîllah | Bîsmîllah | Bîsmîllah |
| 2 | Tewhîd | Tewhîd | Tewhîd | - | - |
| 3 | - | - | Tehmîd | - | - |
| 4 | - | - | - | - | Sena |
| 5 | Munacat | Munacat | - | - | - |
| 6 | Ne'‘t | Ne‘t | Ne‘t | - | Ne‘t |
| 7 | - | Mi‘rac / Şefa‘et | - | - | - |
| 8 | - | - | - | - | Al û Eshab |
| 9 | - | - | - | - | Çar Xelîfe<br>- Ebûbekrê Siddîq<br>- Umerê Farûq<br>- Usmanê Zînnûreyn<br>- Elîyê Murteza |
| 10 | Medhîye | Medhîye | - | - | - |
| 11 | Sebebê Te'lîfê | Sebebê Te'lîfê | Sebebê Te'lîfê | Sebebê Te'lîfê | Armanc<br>- Giringîya Vehandina Kîtabê<br>- Sedema Nivîsandina bi Kurdî<br>- Çend Çavkanîyên Kîtabê<br>- Dîroka Destpêkirina Nivîsandina Wê û Kêşa Nezma Kîtabê<br>- Lêborîn ji Xwendekaran |
| 12 | - | - | - | - | Qur᾽ana Mecîd<br>- Mezinatiya Quranê<br>- Welatê Quranê<br>- Quran û Zanîn<br>- Quran û Sedemên Pêşketinê<br>- Serûjêrkirina Quranê<br>- Nuqitkirina Quranê |
| 13 | - | - | - | - | Dînê Xwedê Îslam<br>- Mezinahîya Şeṛî῾eta Îslamî<br>- Nimûnek ji Zanistên Şer῾î |

[1] Tek, 2019, r. 159-176
[2] Adak, 2019, r. 270
[3] Şemrexî, 2013, 15-54
[4] Titiz, 2020, r. 69

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | - Nêrînek li ser Ḥeramîya Rîbayê û Meşrûîyeta Zekatê<br>- Misilmanetî Di Çerxên ʿEwil da<br>- Rewşa Misilmanetiya Evro<br>- Sinneta Misilmanan li Hemberî Dînê Wa yê Mûbîn |
| 14 | - | Saqîname | Saqîname û Muxennînam e | - | - |
| 15 | - | - | - | - | Pêşgotina Mêrga Êkê |
| **Teva hî** | 5 | 7 | 6 | 2 | 9 |

Di tabloya jorîn da berawirda dîbaceya *Gulzar*ê li gel çend mesnewîyên kurmancî hatiye kirin. Di vê berawirdê da çend encam derdikevin pêş.

- Wekî Adak dîyar dike tradîsyana beşên dîbaceyê yên mesnewîyên kurmancî cara ewil ji alîyê Ehmedê Xanî ve hatîne bikaranîn û ji ber ku ev berhem li ber destê Şûşî hebûye dikare bê gotin ku Şûşî di beşa dîbaceyê da li bin banora Xanî da maye û rêya wî şopandîye (Adak, 2020, r. 1523). Wekî di tabloyê da jî tê dîtin di dîbaceya *Mem û Zînê* da 7 beş û 8 mijar, di ya *Yusif û Zuleyxayê* da 5 beş, di ya *Rewdu'n-Ne'îmê* da 6 beş û 7 mijar, di ya *El-Cewahîrê* da 2 cih digirin. Li hemberî van mesnewîyan di dîbaceya *Gulzarê* da 9 beş û 21 binbeş bi tevahî 30 beş hene.
- Beşa "bîsmîllahê" di *Rewdu'n-Ne'îm*, *El-Cewahîrê* û *Gulzarê* da derbas dibe lê di *Mem û Zîn* û *Yusif û Zuleyxayê* da derbas nabe. Tewhîd di *Yusif û Zuleyxa*, *Mem û Zîn* û *Redu'n-Ne'îmê* da heye lê di *El-Cewahîr* û *Gulzarê* da nîne. Di dîbaceya *Gulzarê* da her çend wekî beşeke serbixwe nebe jî di bin serenavê bîsmîllahê da mijara tewhîdê derbas dibe. Tehmîd, wekî beşeke serbixwe tene di *Rewdu'n-Ne'îmê* da derbas dibe di *Gulzarê* da beranberî vê beşê beşa "senayê" heye û di beşa "bîsmîllahê" da jî Şûşî cih daye mijara tehmîdê. Munacat, wekî beşeke serbixwe tenê di *Yusif û Zuleyxa* û *Mem û Zînê* da heye lê di mesnewîyên dî dan nînin lê ev mijar jî di *Gulzarê* da di bin sernavê bîsmîllahê da heye. Ne't ji bilî *El-Cewahîr*ê di her çar mesnewîyên dî da hene. Mi'rac/şefa'et, tenê di dîbaceya *Mem û*

*Zînê* da heye. Medhîye di Yusif û Zuleyxa û Mem û Zînê da heye di yên dî da nîne. Di her pênc mesnewîyan da jî beşa “Sebebê Te’lîfê” heye. Saqîname, di *Mem û Zîn* û *Rewdu’n-Ne‘îmê* da heye di dîbaceyên her sê mesnewîyên dî da nîne. Muxennîname, tenê di *Rewdu’n-Ne‘îmê* da heye.

- Dîbaceya *Gulzarê* li gorî dîbaceyên dî yên mesnewîyên kurdî gelekî dewlemend e û gelek mijarên ku di dîbaceyên wan mesnewîyên da nînin di *Gulzarê* da cih digirin. Di dîbaceya *Gulzarê* da gelek mijarên bi zanista Quranê û hizar dînî ra têkildar di *Gulzarê* da hene ku wekî Adak jî dîyar dike ev mijar di dîbaceyên mesnewîyên kurdî da yekem car ji alîyê Şûşî ve hatiye bikaranîn (Adak, 2020, r. 1523). Mijarên nû ku Şûşî li dîbaceya *Gulzar*ê da cih dayê ev in: armanc (giringîya vehandina kîtabê, çend çavkanîyên kîtabê, dîroka destpêkirina nivîsandina wê û kêşa nezma kîtabê, lêborîn ji xwendekaran), Qurʾana mecîd (mezinatiya Quranê, welatê Quranê, Quran û zanîn, Quran û sedemên pêşketinê, serûjêrkirina Quranê, nuqitkirina Quranê), dînê Xwedê îslam (mezinahîya şeṛîʿeta îslamî, nimûnek ji zanistên şerʿî, nêrînek li ser ḥeramîya rîbayê û meşrûîyeta zekatê, misilmanetî di çerxên ʿewil da, rewşa misilmanetiya evro, sinneta misilmanan li hemberî dînê wa yê mûbîn) û pêşgotina mêrga êkê.

### 2.2.5.2. Beşa Sereke

Beşa sereke beşa herî berfireh a mesnewîyan e. Di vê beşê da bi hûrgulî li ser mijarê tê sekinîn. Di mesnewîyan da ev beş di navbera beşên dîbace û xatîmeyê da cih digire (Adak, 2020, r. 1524). Di *Gulzarê* da beşa sereke di navbera beytên 909-10154an da cih digire û bi temamî ji 9246 beytan pêk tê. Li gorî plana Şûşî ev beş ji pênc rewdeyan pêk tê.

**Tablo 2. 5:** Dabeşbûna Beşa Sereke ya Gulzarê

| Rewde (Mêrg) | Cihê Beytan | Hejmara Beytan | Hejmara Binbeşan | Mijaren Tê da |
|---|---|---|---|---|
| Rewdeya Yekê | 909-2627 | 1719 | 5 | Serdem û binemala Pêxemberî, jidayîkbûna wî û îrhasatên wî, şîrdan û xudankirina wî, gencînîya wî, rewşa serdema wî ya berî Pêxemberîyê, pêşgotinek bo rewdeya duyê. |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Rewdeya Duyê | 2628- 5636 | 3009 | 9 | Hatina wehyê bo Pêxemberî, ezabdana sehabîyên feqîr û belengaz, helwesta mûşrîkan li hemberî Pêxemberî, koçên Hebeşistanê, misilmanbûna mamê Hemze û Umerî, peymana qureyşîyan a ku dan û standinê li gel misilmanan qedexe dike, îsra û mîrac, zewaca Pêxemberî li gel Sewde û Aîşayê, peymanên eqebê. |
| Rewdeya sêyê | 5637-7936 | 2300 | 5 | Koça Pêxemberî bo Medîneyê, bûyerên sala êkê koçî, bûyerên sala duyê koçî, bûyerên sala sêyê koçî |
| Rewdeya Çarê | - | - | - | Ev beş qet nehatiye nivîsîn. |
| Rewdeya Pêncê | 7937-10154 | 2218 | 8 | Şekl û şemala Pêxemberî, exlaqê Pêxemberî, jiyana wî ya rojane, tiştên ku jê hezkirî û jê heznekirî, cilkên wî, dewar û çekên wî, xeslet û qencîyên wî, xanim û zarokên wî, mirovên wî, nivîser, hozan û xutbexwînên wî, muʿcîzatên wî |

Şûşî rewdeya yekê û duyê bi temamî nivîsandîye lê di rewdeyên dî da kêmasî hene. Rewdeya çarê qet nenivîse û di rewdeyên sê û pêncê da jî çend kêmasî hene. Şûşî di plana[1] xwe da dîyar kirîye ku rewdeya sêyê ji hîcretê heta fetha Mekkeyê pêk tê. Şûşî di vê rewdeyê da bi pênc binbeşan (kulîlk) behsa koça Pêxemberî bo Medîneyê, bûyerên sala êkê koçî, bûyerên sala duyê koçî û bûyerên sala sêyê koçî kirîye û dewama wê nenivîsandîye. Lê fetha Mekkeyê di sala heştê hicretê da çêbûye ev jî tê wê wateyê ku Şûşî herî kêm dê bi pênc binbeşên (kulîlk) dî dê behsa bûyerên sala çarê koçî – bûyerên sala heştê koçî bikira. Di hale hazir da Şûşî pênc binbeş nivîsandîne ger umrê wî têra bikira ew dê herî kêm pênc binbeşên dî jî nivîsandiba. Anku herî kêm sedî pêncî ya vê rewdeyê ya kêm e hetta Adak (2020) dîyar dike ku tenê sedî çilê vê beşê hatiye nivîsîn (Adak, 2020, r. 1516). Şûşî di rewdeya pêncê da bi heşt kulîlkan behsa şekl û şemala Pêxemberî, exlaqê wî, jiyana wî ya rojane, tiştên ku jê hezkirî û jê heznekirî, cilkên wî, dewar û çekên wî, xeslet û qencîyên wî, xanim

[1] bnr. pêvek 4

û zarokên wî, mirovên wî, nivîser, hozan û xutbexwînên wî û mucîzatên wî kirîye. Şûşî di plana *Gulzarê* [1] da dîyar kirîye ku ew dê di rewdeya pêncê da behsa mijarên "*ehlê beyt û derdora wî, wefata wî û tayînkirina xelîfeyên xwe*" jî bike lê we dîyar e ku negihiştiye van her sê mijaran binivîse. Anku Şûşî negehiştîye herî kêm sê kulîlkên rewdeya pêncê (sedî bist-bîst û pênc) binivîse. Wekî encam em dişên bibêjîn ku di beşa sereke ya *Gulzarê* da rewdeya yekê û duyê bi temamî, ya sêyê hêrî zêde ji sedî pêncî, rewdeya pêncê teqrîbî ji sedî heftê û pênc hatiye nivîsîn û rewdeya çarê qet nehatiye nivîsîn.

#### 2.2.5.3. Beşa Xatîmeyê

Xatîmeya mesnewîyan beşa dawî ya berhemê ye, ku tê da helbestvan bi piranî pesnê Xwedê û sultanî dide, bi berhema xwe şanazî dike, navên mesnewînûsên navdar tîne ziman û ji xwendevanan daxwaza dua dike (Adak, 2019, r. 315). Ev beş di plana *Gulzar*ê[2] da heye û Şûşî dîyar dike ku di vê beşê da dê behsa çar xelîfeya Ebûbekir, Umer, Osman û Elî bike. Lê umrê wî têra nekir ku bikare beşa encamê binivîse.

### 2.2.6. Sernav

Berhemên mesnewî bi gelemperî dirêj in û bi piranî li ser çîrokan ava dibin. Ji bo ku mijar tevlîhev nebe û baş were fêm kirin helbestvan mijaran bi beş û binbeşan dabeş dike û ji bo her beşekê jî sernavekî bikartîne. Di mesnewîyan da zimanê mesnewîyê û zimanê sernavan hin caran cuda ne. Di mesnewîyên kurmancî yên lîrîk-evînî yên wekî mînak *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî û *Yusif û Zuleyxaya* Selîmê Hîzanî da sernav bi giştî bi kurmancî, di yên dînî-lîrk da yên wekî *Mewlûdnameya* Melayê Bateyî û Rewdu'n-Ne'îm a Rûhî bi Farisî û yên dînî-dîkaktîk ên wekî *Nehcu'l-,Enama* Mela Xelîlê Sêrtî û E*qîdenameya* Mela Ehmedê Heyderî da bi erebî hatine nivîsîn (Adak, 2020, r. 1526). Wekî mesnewîyeke dînî-dîdaktîk di *Gulzarê* da jî sernav hemû bi erebî hatîne nivîsîn.

#### 2.2.6.1. Sernavên Beşa Muqeddîmeyê

Di beşa muqeddîmeya *Gulzarê* da 12 sernavên sereke û 18 sernavên jêrîn bi tevahî 30 sernav hene. Sernavên vê beşê wiha ne:

---

[1] bnr. pêvek 4
[2] B.n.r. pêvek 4

**Tablo 2. 6:** Sernavên Beşa Muqeddîmeyê

| SERNAVÊ RESEN | KURMANCÎYA SERNAVAN |
|---|---|
| EL-MUQEDDÎME | DESTPÊK |
| 1. EL ÎBTÎDAHÛ BÎ ÎSMÎ RABBÎL EʿLA EL-FETTAḤ | 1. DESTPÊK BI NAVÊ RABBÊ MIN Ê BILIND Ê FETTAḤ |
| 2. ES-SENA ʿELELLAH | 2. PESIN BO XWEDÊ |
| 3. FÎ MEDḤÎL RESÛL | 3. DI PESNÊT PÊXEMBERÎ |
| 4. ṢENA-ÛL ALÎ WEL EṢḤABÎ | 4. MEDḤÊN XIZM Û HEVALAN |
| 5. EBÛBEKRÎ ṢIDDÎQ | 5. EBÛBEKRÊ SIDÎQ |
| 6. ʿUMERU'L-FARÛQ | 6. ʿUMERÊ FARÛQ |
| 7. ʿUṢMANU ẒUNNÛREYN | 7. ʿUṢMANÊ XWEDÎ DU NÛR |
| 8. ʿELÎYYÛ'L-MURTEẒA | 8. ʿELÎYÊ MURTEẒA |
| 9. ÎFADETU'L-MERAMÎ | 9. GOTINA ARMANCÊ |
| Ehemmîyetu Neẓmî'l-Kîtab | Giringiya Vehandina Kîtabê |
| Sebebû Neẓmî'l-Kîtabî bîl Lûxetî'l-Kurdiyye | Sedema Vehandina Kîtabê bi Zimanê Kurdî |
| Beʿdu Meṣadîrî'l-Kîtab | Çend Jêderên Kitêbê |
| Tarixu'l-Îbtîdaî bî Neẓmî'l-Kîtabî we Mîzanu Neẓmîhî | Dîroka Destpêkirina Nezma vê Kitêbê û Kêşana Nezma Wê |
| El Îʿtîzazu îlel Quraî'l-Exyar | Lêborîn ji Xwendevanên Hêja |
| 10. EL QURʾANU'l- MECÎD | 10. QURANA BILIND Û PÎROZ |
| ʿEẓametu'l- Qurʾan | Mezinatiya Quranê |
| Weṭenu'l- Qurʾan | Welatê Quranê |
| El Qurʾanu wel Funûn | Quran û Zanîn |
| El-Qurʾanu we Esbabu't Tereqqî | Quran û Sedemên Pêşketinê |
| ʿÎrab-el Qurʾan | Serûjêrkirina Quranê |
| Îʿcamu'l-Qurʾan | Nuqitkirina Quranê |
| 11. DÎNULLAHÎ'L- ÎSLAM | 11. DÎNÊ XWEDÊ ÎSLAM |
| ʿEẓametu Şerîʿetîl Îslamîyyetî | Mezinahîya Şerîeta Îslamî |
| Numuẓecun mîn Ulumî'l- Şerîʿetî | Nimûnek ji Zanistên Şerʿî |
| Neẓaru îla Meşrûʿîyyetî Zekatî we Ḥûrmetî Rîba | Nêrînek li ser Heramîya Rîbayê û Meşrûîyeta Zekatê |
| El-Îslamû fîl Qurûnî'l-Ûla | Musilmanetî di Çerxên ʿEwil da |
| Ḥalu'l-Îslamî'l-Yewmî | Rewşa Musilmanetîya Evro |

| | |
|---|---|
| Sunnetu'l-Muslîmîne meʿe Dînîhîmî'l-Mubîn | Sinneta Musilmanan li Hemberî Dînê Wa yê Mûbîn |
| Temhîdu'l-Rewḍetî'l-Ûla | Pêşgotına Mêrga Êkê |

### 2.2.6.2. Sernavên Rewdeya Yekem

Di vê beşê da 5 sernavên sereke, 59 sernavên jêrîn bi tevahî 64 sernav hene. Sernavên vê beşê bi vî rengî ne:

**Tablo 2. 7:** Sernavên Rewdeya Yekem

| SERNAVÊN REWDEYA YEKEM | KURMANCÎYA SERNAVAN |
|---|---|
| ER-RAWDETU'L-ULA | MÊRGA ÊKÊ |
| 1. CÎLUHU WE NESEBÛHU | 1. SERDEM Û BINEMALA WÎ |
| Feḍlu Ceylîhî ʿEla Lîsanîhî | Bi Zimanê Wî Qedrê Neseba Wî |
| Sirrû Sîlsîletî Nesebîhî îla ʿEdnan | Sirra Zincîra Babikên Wî Heta ʿEdnanî |
| A/أ Cedduhu Şeybe ʿEbdulmuṭṭelib Bîn Haşim | Bapîrê Wî Şeybe ʿEbdulmuṭṭelib Kuṛê Haşimî |
| Ḥefru Ceddîhî Zemzeme | Kolîna Bapîrê Wî ya Zemzemê |
| Nîzaʿu Qureyşîn Ceddehû fî Bîrî Zemzem | Nîqaşa Qureyşîyan li gel Bapîrê Wî li Ser Bîra Zemzemê |
| Ebuhu ʿEbdullah ez- Zebîḥ | Babê Wî Ebdullahê Qurban |
| B/ب El Haşim Bîn ʿEbdilmenaf | Haşim Kurê Ebdulmenafî |
| C/ج ʿEbdulmenaf Bîn Quṣey | Ebdulmenaf Kurê Qusey |
| D/د Quṣey Bîn Kîlab | Quṣey Kuṛê Kîlabî |
| T(ت) el-Kîlab Bîn Murre Bîn Keʿb Bîn Luey | Kîlabê Kuṛê Murrey Kuṛê Keʿbî Kuṛê Luey |
| W(و) Luey Bîn Ẋalib Bîn Fîhr Bîn Malik | Luey Kuṛê Ẋalibî Kuṛê Fîhrî Kuṛê Malikî |
| (Z/ز) Malik Bîn Neḍr Bîn Kînane Bîn Xuzeyme | Malik Kuṛê Neḍrî Kuṛê Kînaney Kuṛê Xuzeymey |
| Ḥ (ح). Xuzeyme Bîn Muḍrîke Bîn Ilyas Bîn Muḍer Bîn Nizar | Xuzeyme Kuṛê Muḍrîkey Kuṛê Ilyasî Kuṛê Muḍerî Kuṛê Nizarî |
| Ṭ.(ط) Nizar Bîn Meʿd | Nizarê Kuṛê Meʿdî |
| Y(ى) Meʿd Bîn ʿEdnan | Meʿdê Kuṛê ʿEdnanî |
| 2. MÎLADUHU WE ÎRHASATUHU | 2. JIDAYÎKBÛNA WÎ Û NÎŞANÊN WÎ YÊN PÊŞÎ |
| Zewacu Ebîhî ʿEbdîllahî | Zewaca Babê Wî Ebdullahî |
| Qiṣṣetu Eṣhabîl Fîl | Çîroka Xudanên Fîlan |

| | |
|---|---|
| Wefatu Ebîhî Ebdîllah Bîn Ebdîlmuṭṭalîb | Mirina Babê Wî Ebdullahê Kurê Ebdulmutelîbî |
| Exbaru'l-Kehenetu ʿen Mecîʿih ʿEleyhî's-Selam | Xeberên Xêvzanka di Derbarê Hatina Pêxemberî Silav li Ser Bin |
| Mîladuhu ʿEleyhî's-Selam | Jidayîkbûna Wî Silav li Ser Bin |
| Numuẕecun Mîn Îrhaṣatîhî Bîmîladîhî | Nimûneyek ji Îrsahên Wî yên Jidayîkbûna Wî |
| Înşîqaqû Eywanî Kîsra | Tîkbûna Eywana Kîsray |
| Înṭîfau Narî Faris | Vemirîna Agirê Fursê |
| Nûḍûbû Buḥeyretî Sawetî | Hişkbûna Gola Saweyê |
| 3. REḌAʿUHU WE TERBÎYETUHU | 3. ŞÎRDAN Û XUDANKIRINA WÎ |
| Muraḍîʿuhu ʿEleyhî's-Selam | Şîrderên Wî Silav lê Bin |
| Îrḍaʿu Ḥelîme Bîntî Ebî Ẕûeyb es- Seʿdîyye | Şîrdana Ḥelîma Kiça Zûeybê Seʿdî |
| Reddûhû Îla Ûmmîhî Beʿde Seneteynî | Vegerandina Wî bo Dayika Wî ya Piştî Du Salan |
| Îstîrcauʿhû Helîmete Merreten Sanîyeten | Carê Duyê Vegerandina Wî bo Helîmayê |
| El-Qiṣṣetuş Şaqîş Ṣadrîhîş Şerîf | Çîroka Vekirina Sîngê Pîroz |
| Ḥeyatuhu Mînel Erbeʿ îlel Erbeʿîn Fî Kefaletî Ceddîhî ʿEbdulmuṭṭelib | Jîna Wî Ji Çar Saliyê Heta Çilê li Bin Çavdêriya Bapîrê Wî ʿEbdulmuttelibî |
| Wefatu ummîhî fî's-Senetî Sadîsetî mîn ʿUmrîhî | Mirina Dayika Wî di Şeş Salîya Wî da |
| Wefatu Ceddîhî | Mirina Bapîrê Wî |
| Fî Ḥîmayetî ʿEmmîhî Ebî Ṭalîb | Li Jêr Çavdêriya Mamê Xwe Ebû Ṭalibî |
| Ewwelu Esfarîhî Îla eş-Şam Meʿe ʿEmmîhî Ebî Ṭalîb fî Senetî es- S̱anîyetî ʿEşere mîn ʿUmrîhî ʿEleyhî's-Selam | Yekem Sefera Wî bo Şamê digel Mamê Wî Ebû Ṭalibî di Duwazde Salîya Wî da |
| El-Îstîsqaîhî ʿEleyhî's-Selam Eyyamîn Ebî Ṭalîb | Baran Xwastin bi Wî (s.l.w.) di Dema Mamê Wî Ebuṭalibî da |
| 4. EZ-ZEHRETU RABÎʿETU | 4. KULÎLKA ÇARÊ |
| ḤEYATUHU FÎ ŞERḤÎ ŞEBABÎHÎ ʿELEYHÎ'S-SELAM | JÎNA WÎ DI GENCÎYA WÎ (S.L.W) DA |
| Îla Suqey ʿUkaz we ẕîl Ḥîcaz Meʿe ʿUmmîhî Ebî Ṭalîb | Ber bi Suka ʿUkaz û Ḥîcazê digel Mamê Xwe |
| Qitalu Fî Ḥerbî el-Fîcarî we ʿUmrîhî (15) ʿAmen | Di Pazdesalîya Xwe da Beşdarbûna Wî ya Cenga Fîcarê |

| | |
|---|---|
| Menşeu Ḥerbî Fîcar | Sedema Cenga Fîcarê |
| ʿEqduhu fî Ḥîlfîl Fuḍûl | Peymana Wî Ya Ḥilful Fudûlê |
| Seferuhu îla eş-Şamî fî Tîcaretîn lî Xedîcetî we ʿUmrîhî (25) ʿAmen. | Sefera Wî bo Şamê digel Karwanê Xedîcayê di 25 Salîya Xwe da |
| Zewacuhu mîn Xedîce bîntî Xuweylîd we ʿUmruhu (25) ʿAmen | Di 25 Salîya Wî da Zewaca Wî li gel Xedîca Kiça Xuweylidî |
| Îla Beytî Xedîcetî | Bo Mala Xedîcayê |
| Ewladuhu mîn Xedîcetîl Kubra | Zarokên Wî yên ji Xedîcaya Hêja |
| Terbîyyetuhu îbn ʿEmmîhî ʿElîyye îbn Ebî Ṭalîbîn. | Perwerdakirina Pisamê Wî ʿElîyê Kurê Ebû Ṭalibî |
| ʿEmeluhu Eleyhî-s Selam Meʿe Qureyşîn fî Bînaîl Keʿbetî we Teʾrîxû Benaîha | Digel Qureyşan di Avakirina Keʿbê da Karê Wî (s.l.w) |
| Fîtnetun Yutfîuha en-Nebîyyu ʿEleyhî's-Selam | Vemirandina Arîşekê ji Alîyê Pêxemberî (s.l.w) |
| Keyfîyyetu Bînaîhîm el-Keʿbete | Awayê Avakirina Keʿbê ji Alîyê Wan ve |
| Tarîxu Bînaîl Keʿbete | Dîroka Avakirina Keʿbê |
| a/أ Bînau Îbrahîm ʿEleyhî’s-Selam | Avakirina Îbrahîmî (s.l.w.) |
| b/ب Bînau ʿEbdîllah bîn ez-Zubeyr | Avakirina ʿEbdullahê Kuṛê Zubeyrî |
| c/ج Benau el-Ḥeccacu eṣ-Ṣeqafî | Avakirina Ḥeccacê Seqefî |
| d/د Benau es-Sultan Murad er-Rabiʿ | Avakirina Sulṭan Muradê Çarê |
| 5. EZ-ZEHRETUL XAMÎSETU | 5. KULÎLKA PÊNCÊ |
| ḤALU QEWMÎ YEWMEÎZÎN WE ḤALU EL-ʿALEMÎ EL-MUCAWÎRÎ WE TEXUṢṢUHU BÎXARÎ ḤÎRAÎ | REWŞA MILLETÊ WÎ Û REWŞA CÎHANA DEWR Û BER Û MANA WÎ DI ŞIKEFTA ḤÎRAYÊ DA |
| a/أ Ḥalu Qewmî Yewmeîzîn | a/أ Rewşa Milletê Wî |
| b/ب Ḥalu el-Alemî'l-Yemeîzîn | b/ب Rewşa Cîhanê Wê Serdemê |
| Tehennuṣuhu Bîxarî Ḥîraî Bîcelebî Nûr | Vemana Wî di Şikefta Hîrayê li Çiyayê Nûr |
| TEMHÎDU RAWḌATU'S-ṢANÎYETÎ | PÊŞGOTINA MÊRGA DUYÊ |

### 2.2.6.3. Sernavên Rewdeya Duyem

Di vê beşê da 10 sernavên sereke û 107 sernavên jêrîn bi tevahî 117 sernav hene. Sernavên “Rewdeya Duyem” wiha ne:

**Tablo 2. 8:** Sernavên Rewdeya Duyem

| **SERNAVÊN REWDEYA DUYEM** | **KURMANCÎYA SERNAVAN** |
|---|---|
| ER-RAWḌETÛ'S- SANÎYETÎ | MÊRGA DUYÊ |

| | |
|---|---|
| Mîn Buʿs̱etîhî Îla Hîcretîhî ʿEleyhî's-Selam | Ji Dema Bûyî Peẋember Heta Mişextbûna Wî |
| EZ-ZEHRATU'L-ÛLA | KULÎLKA ÊKÊ |
| Fî Matlaʿîr Rîsaletîhî | Di Despêka Pêxemberîya Wî da |
| Ewwelu Şeyʾîn Furîde ʿEleyhî's-Selam | Yekem Kar Ferz Bûy Li Ser Wî (s.l.w.) |
| Ewwelu Men Amene Bîhî ʿEleyhî's-Selam | Yekem Kesa Bawerî bi Wî (s.l.w.) Înay |
| El-Muʾmînûn-es Sabîqûne | Bawermendên Pêşiyê |
| Qureyşûn wel Muslîmûne | Qureyş û Musilman |
| Emrullahî bîîzharîd Deʿwetî Fîl ʿAmîr Rabîʿî Mînel Buʿs̱etî | Fermana Xwedê ya Aşkerekirina Deʿwê di Sala Çarê Pêxemberîyê da |
| Îcmaʿû Qureyşîn ʿEla Muʿadatîhî | Tifaqa Qureyşîyan Bo Dijayetiya Wî |
| EZ-ZEHRATU'S̱- S̱ANÎYETÛ | KULÎLKA DUYÊ |
| Fî Teʿzîbîl Mustaḍʿefîne Wel Welmustaḍʿefat | Ṛencdana Belengazan |
| 1. Bîlalu Ḥebeşîyyî | 1. Bîlalê Ḥebeşî |
| 2 - 3 - 4. ʿEmmarun we Walîdahû | 2 - 3 - 4. ʿEmmar û Deybabên Wî |
| 5. Xebbab-ubnu el-Erettî | 5. Xebbabê Kuṛê Erettî |
| 6. Ṣuheyb-ubnu Sînan-ur Rûmîyyî | 6. Ṣuheybê Kuṛê Sînanê Romî |
| 7. ʿAmîr-ubnu Fuheyretî | 7. ʿAmîrê Kurê Fuheyrey |
| 8. Ebû Fukeyhetî | 8. Babê Fukeyhey |
| 9. Lebînetu | 9. Lebîne |
| 10. Zînnîretu | 10. Zînnîre |
| 11 - 12. En-Nehdîyyetu we Ummu ʿUbeysîn | 11 - 12. Nehdîya û Deyka ʿUbeysî |
| EZ-ZEHRATU'S̱- S̱ALÎS̱ETÛ | KULÎLKA SÊYÊ |
| Fî Zîkrî el-Mustehzîîne we Men Kane Eşedde Ezen Lînnebîyyî S.ʿA.W. | Tiṛaneker û Xirabkarên Derḥeqê Peyẋemberî (s.l.w.) |
| 1-2. ʿEmmuhu Ebu Lehebîn Wemraetuhu Ummu Cemîlîn | 1-2. Mamê Wî Ebûleheb û Jinka Wî Ummû Cemîl |
| 3. Ebu Cehlîbnî Hîşamîl Mexzûmî | 3. Ebûcehlê Kurê Hîşamê Mexzûmî |
| 4. Eswedubnu ʿEbdî Yeẋûs | 4. Eswedê Kuṛê ʿEbdî Yexûsî |
| 5. El-Ḥers-ubnu Qeysî es-Sehmîyyî | 5. Ḥarisê Kurê Qeysê Sehmî |
| 6. El-Welîd-ubnu'l-Muẋîretî | 6. Welîdê Kurê Muẋîrey |
| 7-8. Umeyyetu we Ubeyy-ubna Xelefîn | 7-8. Umeyye û Ubey Kurêt Xelefî |
| 9. Ebul Qeys-îbnîl Fakîh | 9. Babê Qeysî Kurê Fakihî |

| | |
|---|---|
| 10. El-ʿAs-ubnu Waîlîn Walîdu ʿEmr-ubnu'l--ʿAsî | 10. ʿAsê Kurê Waîlî Babê ʿEmrê Kurê ʿAṣî |
| 11. Nedr-ubnu'l- Ḥers-îbnî ʿElqemetî | 11. Neḍrê Kurê Ḥerisê Kurê ʿElqemey |
| 12 - 13. Nubeyhun we Munebbîhun Îbna el-Ḥeccacî | 12 - 13. Nubeyih û Munebbih Kurêt Ḥecacî |
| 14. ʿUqbetubnu Ebî Muʿeyṭî | 14. ʿUqbe Kurê Babê Muʿeyṭî |
| 15. Zuheyrubnu Ebî Umeyyetî | 15. Zuheyr Kurê Babê Umeyyey |
| 16. El-Eswed-ubnu'l- Muṭṭelîbî | 16. Eswed Kurê Muttelibî |
| 17. Muṭʿîm-ubnu ʿEdîyyu | 17. Muṭʿîm Kurê ʿEdîy |
| 18. Malîk-ubnu'l-Ṭulaṭîletî | 18. Malikê Kurê Ṭulaṭîlihî |
| 19. Rîkanet-ubnu ʿEbdîyezîd | 19. Rîkane Kuṛê ʿEbdîyezîdî |
| EZ-ZEHRATU'R-RABÎʿETÛ | KULÎLKA ÇARÊ |
| Fî Hîcratîl Esḥabîl Îlel Ḥebeşetî el-Hîcretu'l-Ûla Fîs-Senetîl Xamîsetî Minel Buʿs̱etî | Her Du Koçên Sehabîyan bo Ḥebeşê Koça Êkê di Sala Pêncê ji Pêxemberîyê |
| El-Hîcretus̱ S̱anîyetî îlel Ḥebeşetî | Koça Duyê Bo Ḥebeşê |
| Sefaretu Qureyşîn Îlen Neccaşîyyî fî Reddîl Muhacîrîn | Qasidê Qureyşîyan bo Necaşî ji bo Vegerandina Koçberan |
| Sefîra Qureyşîn îlen Neccaşîyyî | Her Du Qaṣidên Qureyşîyan bo Necaşî |
| Hîcretû Ebî Bekrî eṣ-Ṣiddîq | Koça Ebû Bekrê Ṣiddîq |
| EZ-ZEHRATU'L-XAMÎSETU | KULÎLKA PÊNCÊ |
| Fî Îslamî Ḥemzetu ʿEmmîn Nebîyyî We ʿUmer-îbnîl Xettabu We Muʿcîzetu Înşîqaqîl Qemerî | Musilmanbûna Ḥemzey Mamê Peyẋemberî û ʿUmerê Kuṛê Xeṭṭabî û Seyra Şeqbûna Heyvê |
| 1. Îslamu Ḥemzete | 1. Musilmanbûna Ḥemzey |
| Axîru Muḥaweletî Qureyşîn Meʿen Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam Fîl Keffî ʿen Deʿwetîhî | Dumahîk Bizava Qureyşîyan digel Pêxemberî (s.l.w.) bo Hêlana Deʿwê |
| 2. Îslamu ʿUmer-ubnu'l- Xeṭṭabî | 2. Musilmanbûna ʿUmerê Kurê Xeṭṭabî |
| 3. Muʿcîzetû Înşîqaqîl Qemerî | 3. Mucîzeya Kerbûna Heyvê |
| Sualun we Cewabûn | Pirs û Bersiv |
| EZ-ZEHRATU'S-SADÎSETÛ | KULÎLKA ŞEŞÊ |
| Fî Emrîş Ṣeḥîfetî we Neqḍîha we Ẋeyru Ẕalîke îla Mewtî ʿEmmîhî we Zewcîhî Eleyhîs Selam | Beḥs̱ê Peymana Qureyşan û Têkdana Wê û Beḥs̱î Mirina Mam û Jinka Wî Silav lê Bin |

| | |
|---|---|
| 1. Emruş Şeḥîfetîl Meşʾunetî ʿAmu (7) Mînel Buʿs̱etî | 1. Beḥsê Peymana Kirêt a Qureyşîyan Sala 7ê Pêxemberîyê |
| 2. Muʿadatu Qureyşîn Bîddîʿayetî | 2. Dijminîya Qureyşîyan bi Propagandayê |
| El-Welîd-ubnu'l-- Muẋiretî | Welîdê Kurê Muẋîrey |
| Dîʿayetu Neḍr Îbnî-l Harîs | Propagandaya Neḍrê Kurê Harsî |
| Cebr-un Neṣranî | Cebrê Neṣranî |
| Et-Tufeyl-ubnu ʿEmrî ed-Dewsîyyu | Ṭufeylê Kurê ʿEmrê Dewsî |
| 3. Keyfîyyetu Naqdîṣ Şeḥîfetî ʿAmu (10) Mînel Buʿs̱etî | 3. Awayê Têkdana Wî Rûpelî li Sala Dehê Pêxemberîyê |
| 4. Wefatu Zewcîhîṣ Ṣîddîqetî We ʿEmmîhîl Bar | 4. Mirina Kabaniya Wî Xedîcayê û Mamê Wî yê Çak |
| a. Xedîcetu Bîntî Xuweylîdî ʿAmun (10) Mînel Buʿs̱etî | a. Xedîca Kiça Xuwelîdî Sala Dehê Pêxemberîyê |
| b. Wefatu ʿEmmîhî Ebî Ṭalîbîn | b. Mirina Mamê Wî Ebû Ṭalibî |
| EZ-ZEHRETU'S-SABÎʿETÛ | KULÎLKA HEFTÊ |
| Fîl Îsraî wel Mîʿracî Beʿdel Beʿs̱î bî Xemsî Sînîn | Îsra û Mîʿrac Piştî Pêxemberîyê bi Pênc Salan |
| 1. Nebzetû ʿEn Keyfîyetîl Mîrʿacî bî Rîwayetîl Buxarî bî Zîyadatîn Yesîretîn Mîner Rîwayatî | 1. Kurteyek li Ser Çawaniya Mîʿracê ji Zarê Buxarî digel Çen Rîwayetên Zêde |
| 2. Eyḍan Rîwayetul Buxarî | 2. Dîsa Rîwayeta Buxarî |
| 3. Rîwayetul Beyheqîyyî | 3. Rîwayeta Beyheqî |
| 4. Eyḍan Rîwayetul Beyheqîyyî | 4. Dîsa Rîwayeta Beyheqî |
| 5. Rîwayetut Ṭeberanîyyî wel Bezzarî | 5. Rîwayeta Ṭeberanî û Bezzarî |
| 6. Rîwayetul Beyheqîyyî Eyḍan | 6. Rîwayeta Beyheqî Dîsa |
| 7. Rîwayetul Beyheqîyyî Eyḍan | 7. Rîwayeta Beyheqî |
| 8. Rîwayetut Ṭeberanîyyî | 8. Rîwayeta Ṭeberanî |
| 9. Rîwayetun ʿEn Enes-îbnî Malîkîn | 9. Rîwayetek ji Enesê Kurê Malikî |
| 10. Rîwayetul Beyheqîyyî | 10. Rîwayeta Beyheqî |
| 11. Rîwayetu Îbnî Macehe | 11. Rîwayeta Îbnû Mace |
| 12. Rîwayetut Tîrmîẕîyyî | 12. Rîwayeta Tirmiẕî |
| 13. Rîwayetûn ʿEn Ehlîl Ḥedîs̱î | 13. Rîwayetek ji Ehlê Ḥedîs̱ê |
| 14-15. Rîwayetanî ʿEn Îbnî ʿEbbasîn | 14-15. Du Rîwayet ji Kurê ʿEbbasî |
| A (ا) Qîble | A (ا) Qîble |

| | |
|---|---|
| DIST BIKARIYA NIVÊJÊ Û NIHÊNIYÊT WÊ | Dest Bikariya Nivêjê û Nihêniyêt Wê |
| Nihêniya Nivêja Cumʿê û Cemaʿetê | Nihêniya Nivêja Cumʿê û Cemaʿetê |
| Ḥukmê Nivêjnekerî | Ḥukmê Nivêjnekerî |
| EZZEHRETUŞ ŞAMÎNETU | KULÎLKA HEŞTÊ |
| Fî Ẕîkrî Nîkahî Sewdete We ʿAîşete We ʿErḍî Nefsîhî ʿEla Qebaîlîl ʿErabî | Beḥs̱ê Înana Sewde û Aîşayê û Gehandina Deʿwa Xwe bo Hozên ʿEreban |
| 1. Nîkahû Sewdete Bîntî Zemʿetî | 1. Zewaca Wî li gel Sewdeyê |
| 2. Zewacû ʿAîşetu Bîntî Ebî Bekr | 2. Zewaca Wî li gel Aîşayê |
| 3. ʿErḍu Nefsîhî ʿElel ʿErabî | 3. Gehandina Deʿwa Xwe bo Hozên ʿEreban |
| Xurucîhî Îleṭ Ṭaîfî | Çûna Wî bo Ṭaîfê |
| Îla Beʿḍî Qebaîlîl ʿErabî | Ber bi Çend Hozên ʿEreban |
| EZ-ZEHRETU'T-TASÎʿETU | KULÎLKA NEHÊ |
| Fî Ewwelî ʿErḍî Nefsîhî ʿEleyhî's-Selam ʿEla Enṣarî We Beyʿetî ʿEqebetî | Yekem Xwepênaskirina bo Enṣarîya û Her Du Peymanên ʿEqebê |
| 1. Suweyd-ubnuṣ Ṣamîtî'l-Ewsî | 1. Sûweydê Kurê Ṣamitê Ewsî |
| 2. Ebul Heyser Enes-îbnî Rafîʿîn el-Ewsî | 2. Babê Heyserî Enes Kurê Rafîʿê Ewsî |
| 3. Îmanû Cemaʿetîn Mînel Enṣarî ʿAme (11) Mînel Buʿs̱etî | 3. Bawerîînana Komeka Enṣarîya Sala Yazdê ji Pêxemberîyê |
| 4. Beyʿetul ʿEqebetîl Ûla Senete (12) minel Buʿs̱etê | 4. Beyʿeṭa ʿEqeba Êkê Sala Duwazdê ji Pêxemberîyê |
| 5. Îslamu Seʿd-îbnî Muʿazîn we Useyd-îbnî Ḥuḍeyrî Seyyîdey Benîl Eşhelî | 5. Musilmanbûna Seʿdê Kurê Meʿazî û Useydê Kurê Ḥuḍeyrî Mezinên Benî Eşhela |
| 6. Beyʿetul ʿEqebetîs̱ S̱anîyetî Fîssenetî 13 Mînel Nubuwwetî | 6. Beyʿeta ʿEqebeya Duyê li Sala S̱êzdeyê Pêxemberîyê |
| Ewwelu Men Yetekelleme Huwel ʿEbbasu ʿEmmun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam | Yekemîn Axiftinker ʿEbbas Mamê Pêxemberî (s.l.w.) |
| Cewabul Enṣarî | Bersiva Enṣaran |
| Kelamun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam | Axiftina Pêxemberî Silav lê Bin |
| Ewwelu Men Yeteqeddeme lîl Beyʿetî | Yekem Kesê bo Beyʿetê Diaxivît |
| Kelamu Ebîl Heys̱em-îbnît Teyyîhan | Axiftina Babê Heys̱emê Kurê Teyîhanî |
| Cewabun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam | Bersiva Peyẋemberî Silav lê Bin |
| Kelamul ʿEbbas-îbnî ʿUbadetî | Axiftina ʿEbbasê Kurê ʿUbadey |

| | |
|---|---|
| Cewabul Enṣarî we Tetabîʿuhum ʿElel Beyʿetî | Bersiva Enṣaran û Beyʿeta Wan |
| Neqbaul Enṣarî | Rêberên Enṣarîyan |
| ʿÎlmu Qureyşîn Bîşeyʾîn Mînel Beyʿetî | Pêhesyana Qureyşîyan bi Beyʿetê |
| Hîcretul Eṣḥabî Îlel Medînetî | Koça Sehabîyan bo Bajarê Medîneyê |
| 7. Muameretu Qureyşîn ʿEla Qetlîn Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam | 7. Pîlana Qureyşîyan bo Kuştina Pêẋemberî Silav lê Bin |
| Reʾyu Ebîl Buxturî | Nêrîna Buxturî |
| Reʾyu Hîşamîn | Nêrina Hîşamî |
| Reʾyu Ebî Cehlîn | Nêrîna Ebû Cehlî |
| Îcmaʿuhum ʿEla Reʾyî Ebî Cehlîn | Razîbûna Wan li Ser Nêrîna Ebû Cehlî |
| Îxbarullahî Teʿala Nebîyehî bîhazîhîl Muameretîd Denîyyetî | Agehdarkirina Peyẋemberî ji Alîyê Xwedê Derbarê vê Pîlana Pîs |
| Xîtamur Rawḍatîs̱-S̱anîyetî | Dumahîka Mêrga Duyê |

### 2.2.6.4. Sernavên Rewdeya Sêyem

Di vê beşê da 6 sernavên sereke û 97 sernavên jêrîn bi tevahî 103 sernav hene. Sernavên vê beşê wiha ne:

**Tablo 2. 9:** Sernavên Rewdeya Sêyem

| SERNAVÊN REWDEYA SÊYEM | KURMANCÎYA SERNAVAN |
|---|---|
| ER-RAWḌATUS̱ S̱ALÎSETU | MÊRGA SÊYÊ |
| EZ-ZEHRETUL ÛLA | KULÎLKA ÊKÊ |
| Fî Hîcretîhî | Koça Wî |
| 1. Sebebu Hîcretîn Nebîyyî | 1. Sedema Koça Wî Silav lê Bin |
| 2. Keyfîyyetu Seferîl Hîcretîl Meymunetî | 2. Awayê Koça Wî |
| Fî Leyletîl Hîcretî | Şeva Derketinê |
| Teftîşû Qureyşîn we Xeybetuhum | Lêgeryana Qureyşîyan û Şermezarîya Wan |
| Nesîcul Enkebûtî We îwaîl Hemmameteynî we Tedellîyîş Şeceretî | Tevinbîrk û Her Du Hêlîn û Şorbûna Darê |
| Keyfe Kane Halen Nebîyyî Esnae Teftîşûl Xarî | Rewşa Pêxemberî di Şikeftê da Dema Lêgeryana Qureyşîyan |
| Fî Leyalîl Ẋarî | Şevên Şikeftê |
| 3. Muẋaderetuhul Ẋarî Îla Medînetîl Ensarî | 3. Derketina Wî ji Şekiftê bo Bajêrê Enşaran |

| | |
|---|---|
| Suraqetubnu Malîkîl Mudlîcîyyî Fî Ṭelebîhîm Suraqe | Kurê Malikî li Dûv Wan da ye |
| Lîqauhum ez-Zubeyre Fî Rekbîn Mînel Muslîmîn | Dîdara Wan Digel Zubeyrî di Nav Komeka Musilmanan |
| 4. Îla Beytî ʿAtîketî Ummu Meʿbedîn el-Xuzaʿîyyetî | 4. Ber bi Mala ʿAtîka Xuzaʿî |
| Îla Qebîletî Benî Sehm | Ber bi Hoza Benî Sehim |
| 5. Întîẓarû Ehlîl Medînetî we Îstîqbalûhum | 5. Jivana Xelkê Medînê û Pêşwaziya Wan |
| Nuzûlun Nebîyyî bî-Qubaî fî Benî ʿEmr-îbnî ʿEwfîn | Gehiştina Peyẋemberî li Qubayê di Nav Benî ʿEmr b. ʿEwf |
| Meqdemu ʿElîyyîn | Hatina ʿElî |
| Ewwelu Mescîdîn Ussîse ʿElet Teqwa | Yekem Mizgefta ku li ser Bingeha Teqwayê Hatiye Avakirin |
| 6. Duxûlun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam el-Medînetel Munewwerete | 6. Gehiştina Pêxemberî Silav lê Bin ya Bajêrê Medînê |
| Îla Beytî Ebî Eyyube Xalîdîbnî Zeydîn el-Ensarî | Bo Mala Babê Eyyubê Enṣarî |
| Îslamû Ebdîllah-îbnî Selam | Musilmanbûna ʿEbdullahê Kurê Selamî |
| EZ-ZEHRETUS SANÎYETU | KULÎLKA DUYÊ |
| Fî Zîkrî Makane Mînel Umûrî Ewwele Senetîn Mînel Hîcrîyyetî | Ew Bûyerên di Sala Êkê Koçî da Qewimîn |
| 1. Bînau Mescîdî Quba | 1. Avakirina Mizgefta Qubayê |
| 2. Bînau Mescîdî-hîş Şerîfî | 2. Avakirina Mizgefta Pêẋemberî |
| 3. Bînau Buyutîhî ʿEleyhî's-Selam | 3. Avakirina Xanîyên Wî Silav lê Bin |
| 4. Ferîḍatû Selatîl Cenazetî | 4. Ferzbûna Nivêja Mirî |
| 5. Meşrûʿîyetu el-Cemaʿetî wel Azanî wel Îqametî we Zîyadetu Rekʿeteynî ʿEla Selatîl ʿEsrî | 5. Binechkirina Nivêja Cemaʿetê û Bangî û Qametê û Zêdekirina Du Rekʿeṭa ser Nivêja Êvarê |
| Sîrrul Azanî wel Cemaʿetî | Nihêniya Bang û Cemaʿetê |
| 6. Îslamu Selman-el Farîsîyyî | 6. Musilmanbûna Selmanê Farisî |
| 7. El-Muaxatû Beynel Muhacîrîne wel Enṣarî | 7. Birayîniya Navbera Muhacir û Enṣaran |
| Feḍlû Ensarî we Mezayahum | Senga Enṣariya û Çakîya Wan |
| Husnu Senîʿîhîm Meʿel Muhacîrîne | Çakiya Wan Gel Muhaciran |
| Ewwelu Mewludîl Muhacîrîne | Jidayîkbûna Yekemîn Zarokê Muhaciran |

| | |
|---|---|
| 8. Bînaun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selamî Bîʿaîşete Bîntî Ebî Bekrîn | 8. Veguhaztina Aîşaya Kiça Ebû Bekirî bo Pêẋemberî Silav lê Bin |
| Mîn Huneynîn el-Muhacîrîne İla Mekketel Mukerremetî | Ẋerîbiya Muhaciran bo Mekkeya Pîroz |
| 9. Ewwelu Lîwaîn ʿEqedehu ʿEleyhî's-Selamî Lîʿemmîhî Ḥemzetî | 9. Alaya Yekemîn a ku Pêẋemberî Silav Ser Bin bo Mamê Xwe Ḥemzeyî Girêday |
| Serîyyetu Ḥemzetîbnîl Muttelîbî | Serîya Ḥemzey |
| 10. Serîyyetu ʿUbeydet-ubnu'l- Ḥarîs̱î | 10. Serîya ʿUbeydê Kurê Ḥarîs̱î |
| 11. Serîyyetu Seʿd-îbnî Ebî Weqqaṣîn | 11. Serîya Seʿdê Kurê Babê Weqqaṣ |
| 12. Ẋezwetu Weddanî Wehuwe Ewwelu Mexazîhî Sellellahu ʿEleyhî We Sellem | 12. Yekemîn Ẋezwa Peyẋemberî Silav lê Bin Ẋezwa Weddan |
| 13. Wefatû Hazîhîs Senetî | 13. Mirinên vê Salê |
| EZZEHRETU'S̱-S̱ALÎSETU | KULÎLKA SÊYÊ |
| Fî Ḥewadîsîs-Senetîs̱- S̱anîyetî Mînel Hîcretî | Bûyerên Sala Duyê Koçî |
| 1. Ẋezwetu Buwaṭîn | 1. Ẋezwa Buwaṭê |
| 2. Ẋezwetu ʿUşeyretî | 2. Ẋezwa ʿUşeyre |
| 3. Ẋezwetu Bedrîn eṣ- Ṣuẋra | 3. Ẋezwa Bedra Biçuk |
| 4. Serîyyetu ʿEbdîllahîbnî Ceḥşîn | 4. Serîya ʿEbdullahê Kurê Ceḥşî |
| 5-6. Ferḍuṣ Ṣîyamî we Ṣerfûl Qîbletî Îlel Keʿbetî | 5-6. Ferzbûna Rojiyê û Wergêrana Qîblê bo Keʿbê |
| 7. Ẋezwetû Bedrîn el-Kubra | 7. Ẋezwa Bedra Mezin |
| Tecehhuzu Qureyşîn Lîl-Mesîrî | Xweamadekirina Qureyşîyan bo Cengê |
| Xurûcun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam Îla Bedrîn | Derketina Peyẋemberî Silav lê Bin bo Bedrê |
| Îstîşaretuhu ʿElehîs Selamî Bîeṣḥabîhîl Kîramî | Şêwra Pêẋemberî Silav lê Bin li gel Hevalên Hêja |
| ʿÎru Qureyşîn we Nefîruhum | Karwanê Qureyşîyan û Derketina Wan |
| Teheyyîetu en-Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam lî Meʿreketîl Qîtalî | Xweberhevkirina Pêẋemberî Silav lê Bin bo Cengê |
| Emru Qureyşîn Beʿde Nuzulîhîm bîl ʿUdwetîl Quswa | Karê Qureyşîyan Paşdabezîna Wan li ʿUdwa Nêzîk |
| En-Nuzulu Îlel Meydanî wellahul Musteʿanî | Dabezîna Musilmana bo Meydanê bi Harîkarîya Xwedê |
| Îltîqaʾul Cemʿeynî | Vêkketina Her Du Layan |

| | |
|---|---|
| El-Hucûmu | Hêriş û Despêka Şeṟî |
| Beʿdel Hezîmetî | Piştî Şikestinê |
| Însîrafuhu ʿEleyhî's-Selamî Îlel Medînetî | Vegeryana Wî Silav lê Bin bo Medînê |
| Neʿyu Qureyşîn Bîmeîsatî Bedrîn | Şîna Qureyşîyanan bi Şikesta Bedrê |
| 8. Meşruʿîyyetu Selatul ʿÎydîl Fîtrî | 8. Binecihbûna Nivêja Cejnê û Remezanê û Zekata Fitrê |
| 9. Ferḍîyyetu Zekatîl Malî | 9. Ferzbûna Zekata Malî |
| 10. Ẋezwetû Benî Qeynuqaʿîn | 10. Ẋezwa Benî Qeynuqaʿê |
| 11. Serîyyetû ʿUmeyrîbnî ʿEdîyyîn | 11. Seriya ʿUmeyrê Kurê ʿEdî |
| 12. Ẋezwetul Kudrî | 12. Ẋezwa Kudrê |
| 13. Serîyyetû Ẋalîbîbnî ʿEbdîllahî el- Leyṡî | 13. Seriya Ẋalibê Kurê ʿEbdullahê Leyṡî |
| 14. Serîyyetu Salîm-îbnî ʿUmeyrîn | 14. Seriya Salîmê Kurê ʿUmeyrî |
| 15. Ẋezwetu Sewîqîn | 15. Ẋezwa Sewîqê |
| 16. Meşruʿîyyetu ʿÎydîn Nehrî wel Uḍhîyyetî | 16. Binecihbûna Cejna Qurbanê |
| 17. Tezwîcuhu ʿEleyhî's-Selamî Faṭîmetez Zehraî mîn Seyyîdîna ʿElîyyîn K.W. | 17. Zewaca Faṭîmayê bi ʿElî Raḍîbîna Xwedê li Ser Bît |
| Ewladu Faṭîmatîz Zehraî mîn Seyyîdîna ʿElîyyîbnî Ebî Ṭalîbîn | Zarokên Faṭîmayê ji ʿElîyê Kurê Ebû Ṭalibî |
| 18. Wefeyatul Hazel ʿAmî | 18. Mirinên vê Salê |
| EZ-ZEHRETU'R-RABÎʿETÛ | KULÎLKA ÇARÊ |
| Fî Ḥewadîsîṡ Senetîṡ Ṡalîṡetî | Bûyerên Sala Sêyê Koçî |
| A/أ Serîyyetu Muḥemmed-îbnî Meslemetî | A/أ Seriya Mihemedê Kurê Meslemey |
| B/ب Ẋezwetu Ẋeṭefan | B/ب Ẋezwa Ẋeṭefanê |
| C/ج Ẋezwetu Buḥranî | C/ج Ẋezwa Buḥranê |
| D/د Serîyyetu Zeydîbnî Ḥariṡetî | D/د Serîya Zeydê Kurê Ḥariṡey |
| E/ه Serîyyetu ʿEbdîllahîbnî ʿEtîk | E/ه Serîya ʿEbdullahê Kurê ʿEtîkî bo Kuştina Babê |
| F/و Ẋezwetu Uḥudîn | F/و Ẋezwa Uḥudê |
| Mesîru Qureyşîn Îla Uḥudîn | Çûna Qureyşîyan Bo Uḥudê |
| Îstîşaretûn Nebîyyî ʿEleyhî's-Selamî bî Esḥabîhîl Kîramî | Şêwra Pêẋemberî Silav lê Bin li gel Hevalên Xwe |
| Xurûcuhu ʿEleyhî's-Selamî Îla Uḥudîn | Derkeftina Peyẋemberî Silav lê Bin bo Uḥudê |
| Teheyyuul Ceyşeynî | Xweamadekirina Her Du Leşkeran |

| | |
|---|---|
| En-Nuzûku îlel Meʿreketî | Dabezîn bo Meydana Cengê |
| ʿÎsyanu Emrîn Nebîyyî ʿEleyhî's-Selamî | Neguhdana Fermana Pêẋemberî Silav lê Bin |
| Cerhun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam | Birîndarbûna Pêẋemberî Silav lê Bin |
| Qetlu Ḥemzetebnî ʿEbdîl Muṭṭelîbî | Kuştina Ḥemzey Kurê ʿEbdulmuṭṭelibî |
| Mîmma Kane Xîlalel Qetlî | Tiştên ku di Dema Cengê da Qewimîn |
| Beʿde Xumudîl Qîtalî | Piştî ku Şeṛ Verevî |
| ʿEwdu Resûlîllahî Îlel Medînetî | Zivirîna Pêxemberî bo Bajarê Medîneyê |
| G/ز Ẋezwetu Ḥemraul Esedî | G/ز Ẋezwa Hemraê Eṣed |
| H/ح Serîyyetu Ebî Selemete ʿEbdîllahîbnî ʿEbdîl Esedî | H/ح Serîya Babê Selemey ʿEbdullahê Kurê ʿEbduleṣedî |
| Î/ی Tezewwecuhu ʿEleyhî's-Selamî Ḥefsete bînte ʿUmer we Tezwîcuhu Umme Kulṯumîn Mîn ʿUṯmanîn | Î/ی Zewaca Wî Silav lê Bin bi Hefsa Kiça ʿUmerî û Daneşûya Kiça Xwe Ummû Kulṯûmê bi ʿUṯmanî ra |
| J/ك Wîladetul Hesen-îbnî ʿElîyyîn R.ʿE. | J/ك Jidayîknûna Hesenê Kuṛê ʿElî Xwidê jê Razî Bît |
| K/ل Teḥrîmul Xemrî Nîhaîyyen | K/ل Ḥeramkirina Meyê bi Êkcarî |
| L/م Meḍarul Xemrî we Exûha Qîmar | L/م Ziyanên Mey û Qimarê |
| M/ن Ḥukmu Şarîbîl Xemrî | M/ن Sizayê Ereqvexwerî |
| EZ-ZEHRETUL XAMÎSETU | KULÎLKA PÊNCÊ |
| Fî Hewadîṯîs Senetîr Rabîʿetî Mînel Hîcretî | Bûyerên Sala Çarê Koçî |

### 2.2.6.5. Sernavên Rewdeya Pêncem

Di vê beşê da 9 sernavên sereke û 76 sernavên jêrîn bi tevahî 85 sernav hene. Sernavên vê beşê wiha ne:

**Tablo 2. 10:** Sernavên Rewdeya Pêncem

| SERNAVÊN REWDEYA PÊNCEM | KURMANCÎYA SERNAVAN |
|---|---|
| ER-REWḌETU'L- XAMÎSETU | MÊRGA PÊNCÊ |
| EZ-ZEHRETU'L-ÛLA | KULÎLKA ÊKÊ |
| Fî Beyanî Xelqîhî We Ṣûretîhî ʿEleyhî's-Selam | Derbarê Şirovekirina Xwerûya Wî û Sûratê Wî Silav lê Bin |
| EZ-ZEHRETU'Ṣ-ṮANÎYETU | KULÎLKA DUYÊ |
| Fî Xuluqîhî we Sîretîhî | Derbarê Rewşit û Jiyana Wî |
| Serdu Şeyîn Mîn Şîyemîhîş Şerîfetî | Çendek ji Rewşitên Wî |

| | |
|---|---|
| Haluhu Fî Ehlîhî ʿEleyhî's-Selam | Rewşa Wî di Mala Wî da Silav lê Bin |
| ʿEqluhu we ʿEmeluhu ʿEleyhî's-Selam | ʿAqil û Pêzanîna Wî Silav lê Bin |
| Ṣebruhu we Hîlmuhu ʿEleyhî's-Selam | Dilfirehî û Nermîya Wî Silav lê Bin |
| Sexauhu We ʿEṭauhu | Dan û Merdîya Wî |
| Quwwetuhu we Şecaʿetuhu | Şiyan û Çelegîya Wî |
| Zuhduhu we ʿÎşetuhu | Zuhd û Jiyana Wî |
| Zîkru Ma Sebete Ennehu Eleyhîs Selamî Ekelehu | Ew Tiştê Binecihbûy ku Pêxemberî Xwarî |
| Muştehîyatuhu Eleyhîs Selam Mîn Leẕaîẕîd Dunya | Ew Tiştên ku Pêxemberî Hejêkirî ji Xûşîyên Dunyayê |
| ʿÎbadetuhu we Mucahedetuhu | Peristin û Xwemandîkirina Wî |
| Mîzaḥuhu we Ḍeḥîkuhu | Tirane û Keniya Wî |
| Teṭeyyubuhu we Teḥsînu Heyʾetîhî Eleyhîs Selam | Bêhnxweşî û Cewankariya Wî Silav lê Bin |
| Beqîyyetun Mîn Xuluqîhî we Adabîhî ʿEleyhî's-Selam | Çendek ji Rewşit û Cankarên Wî Silav lê Bin |
| EZZEHRETU'Ṣ-ṢALÎSETU | KULÎLKA SÊYÊ |
| Fî Zîkrîl Bîʾsetî we Emtîʿetîhî we Dewabbîhî we Eslîhetîhî | Beḥṣê Cilk û Tişt û Dewar û Çekên Wî |
| EZ-ZEHRETU'R-RABÎʿETÛ | KULÎLKA ÇARÊ |
| Fî Ẕîkrî Şeyîn Mîn Fedaîlîhî we Xesaîsîhî | Çendek Ji Xaslet û Qencîyên Wî |
| 1. Feḍaîluhu ʿEleyhî's-Selam | 1. Fazîletên Wî Silav lê Bin |
| 2. Xesaîsuhu ʿEleyhî's-Selam | 2. Taybetmendîyên Wî Silav lê Bin |
| a. el-Wacîbatu | a. Karên Fer |
| b. el-Muḥerrematu wel Mekruhatu | b. Tiştê Ḥeram û Mekruh |
| c. el-Mubaḥatu | c. Tiştê Durist |
| d. Ṭeharetu Feḍelatîhî | d. Pakijiya Bermayê Wî |
| EZ-ZEHRETUL XAMÎSETU | KULÎLKA PÊNCÊ |
| Fî Beyanî Ezwacîhî we Ewladîhî ʿEleyhî's-Selamî | Babetê Xêzan û Zarokên Wî Silav lê Bin |
| a. Ezwacuhuṭ Ṭahîratî | a. Xêzanên Wî |
| 1. Xedîcetu Bîntu Xuweylidî | 1. Xedîca Kiça Xuweylidî |
| 2. Sewdetu Bîntu Zemʿetî | 2. Sewda Kiça Zemʿey |
| 3. ʿAîşetu Bîntu Ebî Bekrîn | 3. ʿAîşa Kiça Ebû Bekirî |
| 4. Ḥefsetu Bîntu ʿUmer | 4. Ḥefşa Kiça ʿUmerî |

| | |
|---|---|
| 5. Ummu Seleme Hîndubnetuhu Ebî Umeyyetî | 5. Ummû Seleme, Kiça Ebî Umeyye, Hînd |
| 6. Zeynebun Bîntu Xuzeymetî el-Hîlalîyyetî | 6. Zeyneba Kiça Xuzeymey |
| 7. Cuweyrîyetu Bîntû Ḥaris̱î | 7. Cuweyrîya Kiça Ḥaris̱î |
| 8. Ummu Ḥebîbetî Remletu Bîntu Ebî Sufyanî | 8. Ummû Ḥebîbe Remla Kiça Babê Sufyanî |
| 9. Zeynebu Bîntu Ceḥşî | 9. Zeyneba Kiça Ceḥşî |
| 10. Ṣefîyetu Bîntu Ḥuyey el-Xeyberî | 10. Ṣefiya Kiça Ḥuweyyê Xeyberî |
| 11. Meymûnetu Bîntu el-Harîs̱î | 11. Meymûna Kiça Haris̱î |
| 12-15. ʿAliyetun Bîntu Ẓebyanî we Esmau Bîntul Nuʿmanî we Ẋezîyetu Bîntu Cabîrî we Şenbau Bîntu ʿEmrîn | 12-15. ʿAliya Kiça Ẓebiyanî û Esma Kiça Nuʿmanî û Ẋezîya Kiça Cabirî û Şenba Kiça ʿEmrî |
| b. Serarîhî ʿEleyhî's-Selam | b. Carîyên Wî Silav lê Bin |
| 1. Marîyetu Bîntu Şemʿûnî el-Qibṭî | 1. Mariya Kiça Şimʿûnî Ya Qibṭî |
| 2. Reyḥanetu Qureẓîyetî | 2. Reyḥana Qureẓî |
| 3 - 4. Îḥdahuma Hedîyetun wel Uxra Ṣebaha Fî Sebyî | 3 - 4. Êk Dîyarî, Ya dî Bara Cengê |
| c. Ewladuhu ʿEleyhî's-Selam | c. Zarokên Wî Silav lê Bin |
| Ewladuhuẕ Ẕukurî | Zarokên Nêr |
| Benatuhul Fuḍleyatî | Kiçên Wî yên Pirr Seng |
| 1. Zeynebul Kubra | 1. Zeyneba Hêja |
| 2 - 3. (Ruqeyyetu we Ummu Kuls̱ûmîn | 2 - 3. Ruqeyya û Ummû Kuls̱ûm |
| 4. Faṭîmetuz Zehraî | 4. Faṭîma Zehra |
| EZ-ZEHRETU'S-SADÎSETÎ | KULÎLKA ŞEŞÊ |
| Fî Eʿmamîhî we ʿEmmatîhî we Îxwetîhî we Exewatîhîr Rîdaîyyetî | Mam û Met û Xwîşk û Birayên Wî yên Şîrî |
| 1. Eʿmamîhî | 1. Mamên Wî |
| a/أ ʿEmmuhu Ḥemzete | a/أ Mamê Wî Ḥemze |
| b/ب ʿEmmuhu ʿEbbasu | b/ب Mamê Wî ʿEbbas |
| 2. ʿEmmatuhu ʿEleyhî's-Selam | 2. Metêt Wî Silav lê Bin |
| 3. Îxwetuhu we Exewatuhur Reḍaîyyetî we Muraḍîʿuhu | 3. Xwîşk û Birayên Wî yên Şîrî û Dayînên Wî |
| EZ-ZEHRETU'S-SABÎʿETU | KULÎLKA ḤEFTÊ |

| | |
|---|---|
| Fî Kuttabîhî we Muez̠z̠înîhî we Şuʿeraîhî we Xeṭîbîhî we Huddatîhî we Xedemîhî we Ḥeresîhî we Mewalîhî we Îmaîhî | Nivîser û Bangder û Hozanvan û Xuṭbexwîn û Beṛevan û Zêrevan û Sepan Kole û Carîyên Wî |
| 1. KuttabuhuʿEleyhî's-Selam | 1. Nivîserên Wî Silav lê Bin |
| 2. Muez̠z̠înuhu ʿEleyhî's-Selam | 2. Bangderên Wî Silav lê Bin |
| 3. Şuʿerauhu we Xeṭîbuhu ʿEleyhî's-Selam | 3. Hozanvan û Xuṭbexwînên Wî |
| 4. Xedemuhu we Ḥeresuhu ʿEleyhî's-Selam | 4. Sepan û Zêrevanêt Wî |
| 5. Mewalîhî we Îmauhu | 5. Koleyêt Wî |
| 6. Men Yeḍrîbul Eʿnaq Beyne Yedeyhî | 6. Ewên Sizavan û Serbir |
| EZZEHRETU'S̠-S̠AMÎNETU | KULÎLKA HEŞTÊ |
| Fî Beyanî Muʿcîzatîhî we delaîlî Nubuwwetîhî ʿEleyhîṣ Ṣelatu Wes Selam | Ronkirina Muʿcîze û Nîşanêt Peyemberatiya Wî Silav lê Bin |
| El-Muqeddîmetu | Berahîk |
| a/ا Numûzecun mîn Muʿcîz̠atîhî es-Semawîyyetî | a/ا Nimûnek ji Muʿcîz̠atên Esmanî |
| 1. Kewnuhu Ummîyyen | 1. Nexwendewariya Wî |
| 2. el-Qurʾanul Muʿcîz̠ul Beyanî | 2. Qurʾana Piṛṛ Hiner û Aşkera |
| 3. Înşîqaqul Qemerî | 3. Kerbûna Heyvê |
| 4. Redduş Şemsî ʿEleyhî's-Selamî we Ḥebsuha Mînel Xurûb | 4. Vegeryana Rojê bo Pêxemberî û Gîrobûna Wê ya Avabûnê |
| b/ب Tesbîḥut Teʿamî wel Ḥesa Fî Keffîş Şerîfî | b/ب Tesbîḥatî Zadî û Berka di Destê Pak da |
| c/ج Teslîmul Ḥecerî ʿEleyhî's-Selamî we Ṭaʿetul Cemadatî Lehu | c/ج Silavkirina Bera û Ṭaʿetê Bêruḥa Ser Wî Silav lê Bin |
| d/د Kelamuş Şecerî Lehu we Selamuha ʿEleyhî we îṭaʿetuha Lehu | d/د Axiftin û Silav û Guhdana Dara bo Wî Silav lê Bin |
| e/ه Ḥuneynul Cîzʿî Şewqen Îleyhî ʿEleyhî's-Selamî | e/ه Nalîna Qurmê Darê bo Peyemberî Silav lê Bin |
| f/و Qelbul Eʿyanî Lehu ʿEleyhî's-Selam | f/و Guherîna Tişta bo Wî Silav lê Bin |
| g/ز Kelamul Ḥeyewanatî we Taʿetuha Lehu ʿEleyhî's-Selam | g/ز Axiftina Giyanewera û Guhdariya Wan bo Wî Silav lê Bin |
| h/ح Nebʿul Maî Tuhurî Beyne Esabîʿîhîş Şerîfetî | h/ح Zêyîna Ava Bijûn di Nav Tiblêt Wî yêt Pakij da |
| i/ط Tefcîrul Maî Bîbereketîhî Wenbîasîhî bî Messîhî we deʿwetîhî | i/ط Zêyîna Avê bi Bereketa Wî û Zêdebûna Wê bi Destkirin û Daxwaza Wî |

| | |
|---|---|
| j/ی Tekṣ̱îrut Teʿamîl Qelîl Bîbereketîhî | j/ی Zedebûna Xwarineka Kêm bi Bereketa Wî |

Hejmara Sernavên sereke û sernavên jêrîn di *Gulzarê* da bi vî awayî ne:

**Tablo 2. 11:** Di Gulzarê da Hejmara Sernavan

| Beşên *Gulzarê* yên Sereke | Hejmara Sernaven Sereke | Hejmara Sernavên Jêrîn | Tevahîya Sernavan |
|---|---|---|---|
| Muqeddîme | 12 | 18 | 30 |
| Rewdeya Yekem | 6 | 57 | 63 |
| Rewdeya Duyem | 10 | 107 | 117 |
| Rewdeya Sêyem | 6 | 97 | 103 |
| Rewdeya Pêncem | 9 | 76 | 85 |
| **Tevahî** | **43** | **355** | **398** |

Wekî berî niha jî me behsa wê kirî li gorî agahîyên berdest bi 10154 beytên xwe ve *Gulzar* mesnewîya herî mezin a kurdî ye. Ji ber vê yekê jî tiştekê normal e ku ji alîyê hejmara sernavan ve jî mesnewîya herî dewlemend e. Ji alîyê hejmara sernav ve gava em li çend mesnewîyên kurdî binêrîn rewşeke wiha heye: *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ji 60 sernavan, *Yusif û Zuleyxaya* Selîmê Hîzanî ji 45 sernavan, *El-Cewahîra* Mela Nurullahê Godişkî ji 174 sernavan, *Rewdu'n-Ne'îma* Şêx Ebdurrehmanê Eqtepî ji 35 sernavan, *El-Hemaîl fî'ş-Şemaîla* Mela Nurullahê Godişkî ji 46 sernavan, *Jêgirtiyên bi Zeferi ji Xebata Pêxembera* Mela Mahmud Mustafa Yusuf ji 49 sernavan, *Jiyannameyî Pêxemberî Pêşewa be Honraweya* Ferhat Cewher Biradostî ji 57 sernavan û *Sîyerê Nebî bi Zimanê Dimilîya* Mela Cimayo Babij ji 21 sernavan pêk tê. *Gulzara* Şûşî ji 43 sernavên sereke û 355 sernavên jêrîn bi tevahî ji 398 sernavan pêk tê û bi vî şiklî di nav sîyernameyên kurdî da mesnewîya herî dewlemend e.

### 2.3. Taybetmendîyên Ziman û Vegotinê

Di bin sernavê "Taybetmendîyên Ziman û Vegotinê" da, em dê li ser taybetmendiyên zimanî yên berhema *Gulzar* û teknîkên vegotinê yên ku nivîskar bi kar anîne bisekinin. Pêşî, em dê taybetmendîyên devoka behdînî, hêmanên erebî, farisî û tirkî yên di nav berhemê da cih girtine nîqaş bikin. Paşê, em ê rêbaz û şêweyên

vegotinê yên wekî çîrokbêjî, teswîrî, epîk û lîrîk analîz bikin, da ku çand û hunera vê berhemê bi awayekê kûrtir were fêhm kirin.

### 2.3.1. Taybetmendîyên Zimanî

Şûşî ji bilî kurdî, zimanên erebî, farisî û tirkî jî dizanî. Ji ber hostayîya Şûşî ya van zimanan di *Gulzarê* da gelek peyvên bîyanî bi taybet ên erebî û farisî derbas dibin. Lê li gel vê yekê jî zimanê *Gulzarê* zimanekê hêsan û herikbar e. Yek ji sedemên ji aliyê famkirinê hêsanbûna *Gulzarê* jî ew e ku *Gulzar* berhemeke sedsala 20an e anku berhemeke kevin nîne ji ber vê yekê jî berhem bi peyvên ku îro jî tên bikaranîn hatiye nivîsîn. Sedema dawîyê yê hêsabûna zimanê *Gulzar*ê jî ew e ku *Gulzar* bi awayê mesnewîyê ve hatiye nivîsîn û zimanê mesnewîya li gorî formên dî yê edebiyata klasîk hêsantir e. Taybetmendîyên zimanî yên *Gulzarê* em dişên di bin çar Sernavan da kom bikin.

#### 2.3.1.1. Hêmanên Devoka Behdînî

Şûşî berhema xwe *Gulzar* bi zimanê kurdî nivîsandîye. Şûşî di vê beytê da zimanê berhema xwe aşkere dike û wiha dibêje:

*Ger yar bî xudê bi keyf û xûşî*
*Şîrîn dê bi kuṛdî bêjî Şûşî* (*Gulzar*, b: 908)

Dîsa Şûşî di beyta jêrîn da dîyar dike ku wî *Gulzar* bi devoka behdînî ya lehçeya kurmancî ya kurdî nivîsandîye. Şûşî di vê beyta jêrîn da vê yekê bi aşkere tîne ziman û wiha dibêje:

*Her çî ku ewan cewan nivîsî*
*Wer bû me neẓim bikey bi lwîsî*

*Behdînî bi lehce û bi kuṛdî*
*Çî ṣafebêhn î bihêle durdî* (*Gulzar*, b: 468-469)

Behdînî yek ji devokên kurmancîyê ye ku bi giştî di Kurdistana Êraqê li Duhok, Zaxo, Akre, Amedî û di Tirkîyê da jî li Colemêrgê tê axiftin. Çend taybetmedîyên vê devokê hene ku wê ji devokên dî yê kurmancîyê cuda dike.

Taybetmendîyeke vê devokê ew e ku di peyvên hemwate da peyvên ji devokên dî cuda têne bikaranîn. Wekî mînak ji bilî devoka behdînîyê ji bo kevirî (*stone*) peyva *kevir* tê bikarînan lê di behdînîyê da peyva “*ber*” tê bikarînan. Dîsa di devokên dî yên

kurmacîyê da ji bo organa pozê "*nose*" peyvên *poz* û *bêvil* tê bikarînan lê di behdînîyê da peyva *difin* tê bikarînan. Her wiha di gelemperîya devokên dî yê kurmancîyê da ji bo peyva zarokê "*child*" *zarok* tê bikarînan lê di behdînîyê da peyva *biçûk* tê bikarînan (Öpengin, 2014: 183). Di *Gulzarê* da jî ev taybetmendîyên devoka behdînî gelek ber bi çav in. Wekî mînak:

*Her carê* ***biçûk*** *bibît bi naçar / ...* (*Gulzar*, b: 980)

*... / Gel kîn û gef û* ***difin****bilindî* (*Gulzar*, b: 1370)

*Ḥetta tu* ***dişêy*** *tu xirke malî / ...* (*Gulzar*, b: 1105)

*Cibrîl wî demî ku lê bû* ***berze*** */...* (*Gulzar*, b: 2668)

*... /* ***Pirça*** *bi serî siyah û şûr e* (*Gulzar*, b: 4420)

*... / Lew wî dihusîn li wê* ***didane*** (*Gulzar*, b: 1418)

*Ew gerçî* ***duhî*** *ne xundewar bûn* / ... (*Gulzar*, b: 247)

*Xizman tu dibînî rût û* ***birsî*** / ... (*Gulzar*, b: 4146)

*Emma dilê* ***hingû*** *naşikînim* (*Gulzar*, b: 1792)

Di van beytan da li şûna peyvên devokên dî yên kurmancîyê "*zarok, poz, karîn, winda, por, diran, duh, birçî, hûn, hewe*" peyvên devoka behdînîyê "*biçûk, difin, şîyan, berze, pirç, didan, duhî, birsî û hingû*" hatîne bikaranîn.

Di devoka behdînan da di gelek peyvan da li şûna dengê "o" dengê "û" tê bikaranîn. Wekî mînak:

*Qurʾan wî cemʿi dikir ji ewwel*
*Ev behre ji* ***bû*** *wî bû mukemmel* (*Gulzar*, b: 288)

*Wan xûşk û bira ku dil* ***dişûtin***
*Têr maçî diken ji can ve gûtin* (*Gulzar*, b: 1798)

Di van beytan da ev taybetîya devoka behdînî gelekî ber bi çav e. Wekî mînak di devokên dî yên kurmancîyê da peyvên "*fermo, gotin, bo* û *sotin*" bi dengê "o" yê ve tên bilêvkirin lê di behdînîyê da bi dengê "û" ve tên bilêvkirin.

Taybetmendiyeke dî ya devoka behdînîyê jî ew e ku koma dengdêrên (fonemên) /xw/ ya zimanê kurmanciya standard di behdînîyê da bi gelemperî hêsan

dibe û vediguhere dengdêra /x/yê (Öpengin, 2014: 188). Ev cûdahî wekî guherînek fonolojîk (dengnasî) di navbera her du devokan da tê dîtin û yek ji nîşaneyên esasî ye ku behdînîyê ji devokên dî yên kurmancîyê cuda dike. Di *Gulzarê* da ji bo vê taybetîya behdînîyê jî gelek mînak hene.

*Efleḥ **xû** digel hemû ʿezabe*
*Zu da ve leʿînî **xûş** cewabe* (*Gulzar*, b: 3110)

*Qudret wî piṛṛ e ʿeceb şiûn e*
*Însanî didet li parçe **xûne*** (*Gulzar*, b: 2664)

*Paşî qederek diket wefatê*
*Ser dînê **Xudê** digel necatê* (*Gulzar*, b: 2693).

Di van mînakan da gruba dengdêrên “xw” di devoka behdînî da guherîye û bûye “x”. Di *Gulzarê* da ev guherîne bi gelemperî gava ku piştî “xw” yê dengên “u, û” tê çêdibe. Ger ku piştî “xw” yê dengên “a” û “î” bihê wê gavê “xw” wekî xwe dimîne û naguhere. Wekî mînak:

*Gava ku weḥî bû hate **xware***
*Da ew bi Xudê biket qerare* (*Gulzar*, b: 2718)

*Hin av wî **vexwar** ḥeta ku bel bû*
*Tayê digirît û ḥal ecel bû (Gulzar, b:* 3255)

*Navê te kesê ji dil **bixwînît***
*Dê her du cîhanê xêr bibînît* (*Gulzar*, b: 29)

*Gû: Kanê ṣeḥîfe bû me bîne*
***Xwîşkê** gû: Dikey tu naşirîne* (*Gulzar*, b: 3839)

Di van mînakan da ji ber ku di peyvên “*xware, vexwar, bixwînît, xwîşkê*” da piştî “xw” yê “a” û “î” hatiye gruba dengdêra “xw” wekî xwe maye.

Di hemû devokên kurmancîyê da cînav bi heman awayî hatîne parastin lê di devoka behdînîyê da *hun/hewe* ya standart diguhere û dibe *hing/hingo* (Öpengin, 2014: 193). Di *Gulzarê* da jî ev taybetîya behdînîyê heye lê di heman demê da di *Gulzarê* da cinavên hûn/hewe jî hatîne bikaranîn. Wekî mînak:

*Dê bên **hewe** ew ki ye ji **hingû***
*Rabûye ji nû bi dînekê nû?* (*Gulzar*, b: 3264)

*Wî qîṣṣe dema bû gût temame*
*Gû **hûn** çi dibên ji bû zelame* (*Gulzar*, b: 1276)

Di van beytan da bi aşkere tê dîtin ku Şûşî di berhema xwe da hem cînavên standart *hûn/hewe* hem jî cînava devoka behdînîyê *hingû* bi hev ra bikaranîne.

Ji bilî devoka behdînîyê di devokên dî yên kurmancîyê da ji bo hemû cînavên pirjimar qertafa "in" tê bikaranîn lê di devoka behdînîyê da qertafa "în" tê bikaranîn. Wekî mînak:

*Hişyarê bibîn li xew bê mestî*
***Em** taze li dû **biçîn** diristî* (*Gulzar*, b: 404)

*Ger **em** dê **bibîn** xudan ẓefer ew*
*Wer em bişikên û derdeser ew* (*Gulzar*, b: 7493)

Di van beytan da ji ber ku cînava "em" hatiye bikaranîn qertafa lêkerê bûye "în".

Taybetmendîyeke dî ya devoka behdînîyê jî ew e ku ji bo pirjimar kirinê li şûna qertafa "en" qertafa "êd" an "êt" tê bikaranîn. Di *Gulzarê* da jî ji pijimar kirinê qertafa "êd" hatiye bikaranîn. Wekî mînak:

***Ewladêd** nêr hebûn çuwarde*
*Gel hevde kiçan di eṣilzade* (*Gulzar*, b: 344)

*Çen serwer û mêrserêt hunerdar*
*Çen hakim û **beglerêt** şirînkar* (*Gulzar*, b: 7288)

Di van beytan da ji bo pirjimarîyê qertafa "êd, êt" hatiye bikaranîn.

### 2.3.1.2. Hêmanên Erebî

Di *Gulzarê* da piştî kurmancîyê zimanê ku herî li pêş erebî ye. Ev jî tiştek siruştî ye ji ber ku Şûşî di zimanê erebî da gelekî şareza ye û piranîya berhemên xwe jî bi erebî nîvîsandîne. Digel vê yekê zimanê hemû zanistên îslamî yên wekî Qurʾan, tefsîr, hedîs, fiqih, sîyer û hwd. erebî ye. Ji ber vê yekê kesekê ku bixwaze di van qadan da berhemekê binivîse pêwîst e ku termînolojîya wan ku ew jî bi erebîye bikarbîne. Di

encamê da gava ku berhemek di van qadan da hate nivîsîn ger bi erebî neyê nivîsîn jî gelek hêmanên erebî digire nav xwe. *Gulzar* jî berhemeke sîyerê ye ku dikeve nav qadên zanista Îslamî ji ber vê yekê gelek hêmanên erebî di nav *Gulzarê* da hene. Ji ber ku erebî hem zimanê Quranê hem jî zimanê biheştîyan e Şûşî giringîyeke taybet dide erebî yê û vê yekê di van beytan da wiha tîne ziman:

*Qurʾan ʿerebî û xûş zuban e*
*Ezmanê biḥeştîyan bizane* (*Gulzar*, b: 953)

*Ezmanê ʿereb ku xûş zuban e*
*Serdarê zubanê xir cîhan e* (*Gulzar*, b: 562)

*Gulzarê* da zimanê erebî bi çend awaya hatiye bikaranîn. Di *Gulzarê* da navê berhemê bi erebî hatiye nivîsîn. Di serê destxeta *Gulzarê* da navê berhemê bi erebî wekî "*Rîyadu'n-Nûr*" hatiye nivîsîn. Di nav beytan da jî navê berhemê yê erebî *Rîyadu'n-Nûr* derbas dibe. Wekî mînak:

*ʿEwnê tu bidey digel sirûre*
*Da taze bibêm* ***Rîyaḍê Nûre*** (*Gulzar*, b: 5634)

Di vê beytê da navê berhemê bi erebî wekî *Rîyaḍê Nûr* derbas dibe.

Di *Gulzarê* da hemû sernav bi erebî hatîne nivîsîn. Wekî mînak di bin sernava yekem a beşa Muqeddîmeyê wiha hatiye nivîsandin:

"1. *El Îbtîdahû bî Îsmî Rabbîl Eʿla el-Fettaḥ*"

Di *Gulzarê* da di serê destxetê da çend rûpel hene ku behsa xîtaba Telebeyên Nûrê, çavkanîyên wê, plansazîya wê û îşaretên wê dike bi erebî hatîne nivîsîn. Dîsa di *Gulzarê* da Şûşî jêrenotên xwe jî bi erebî nivîsandîne.

Şûşî di serê her mêrgeka (rewde) *Gulzarê* da ayetek yan jî çend ayet bi erebî nivîsandîne. Wekî mînak Şûşî berîya ku derbasî beşa Muqeddîmeyê bibe ev ayet bi erebî nivîsandîye:

"*Rabbîşreḥ lî ṣadrî. We yessîr lî emrî. Weḥlul ʿukdeten mîn lîsanî. Yefqeḥû qewlî*"

Di *Gulzarê* da Şûşî rêzikeka misrayekê bi temamî erebî nivîsandîye. Ji bilî wê Şûşî di nav beytan da gelek peyv û terkîbên erebî jî bikaranîne. Wekî mînak:

*Fermûdeyê Îbnû Murdeweyhî*

*Ey -* ***reḥmetu rabbena ʿeleyhî*** (*Gulzar*, b: 5711)

*Ey navê te ye* ***reḥîm*** *û* ***reḥman***
*Wey* ***ẕikr****ê te ye* ***şîfa*** *û derman* (*Gulzar*, b: 2)

*Her* ***ḥemd*** *û* ***s̱ena*** *û* ***şukr*** *û* ***minnet***
*Her bû te Xudê xudanê* ***reḥmet*** (*Gulzar*, b: 3)

***Haḏir*** *tu li ser dilan* ***reqîb*** *î*
***Şahid*** *tu li* ***kullî*** *kesî* ***qerîb î*** (*Gulzar*, b: 6)

***Feyḍ û kerem û selam*** *di bê ḥed*
*Ya* ***Reb*** *tu biṛêje ser Muḥemmed* (*Gulzar*, b: 15)

*Carek ku diçît* ***xelîfê s̱anî***
*Bû layê peyemberî di xanî* (*Gulzar*, b: 8368)

***Ṣiddîq****ê mezin* ***xelîfê ewwel***
*Bê şek li hemû* ***ṣeḥabe efḍel*** (*Gulzar*, b: 263)

***Esbab*** *me hebin dirist û taze*
*Da bêt bi serêkve ev nîyaze* (*Gulzar*, b: 368)

Di van beytan da peyvên "*reḥîm, reḥman, ẕikr, şîfa, ḥemd, s̱ena, şukr, minnet, reḥmet, haḏir, reqîb, şahid, feyḍ, kerem, selam, Reb, xelîfê s̱anî, siddîq, xelîfê ewwel, ṣeḥabe efḍel, eshab"* bi erebî ne. Bi vî şiklî gelek peyvên zimanê erebî di nav *Gulzarê* da derbas dibin.

### 2.3.1.3. Hêmanên Farisî

Kurdî û farisî du zimanên ji heman malbatê (Hînd-Ewropî) ne (Şeyholislamî, 2020, r. 86). Ji ber vê yekê di dirêjahîya dîrokê da ji alîyê ferheng, rêziman û bilêvkirinê gelek bandor li êk û du kirîne. Di navbera her du zimanan da gelek peyvên hevpar ên wekî "gul, roj, av, birinc, şev, dest, mar û hwd. hene. Şûşî di zimanê farisî jî da gelekî şareza bûye hetta helbesteke farisî jî ji bo seydayê xwe nivîsandîye. Beyteka vê helbesta wî wiha ye:

*“Hirof çend ez gelkî zebanem*

*Bi nezdê şêx û ustadem resanim*”(Hemze Şoşî; 2017:37).

**Wate:** Çend peyveke xweş ku bê ser zimanê min ez dê gehînime şêx û ûstadê xwe.

Di *Gulzarê* da jî gelek hêmanên farisîyê hene. Wekî mînak di farîsî da “Ebû” ya erebî wekî “Bû” tê bikaranîn. Anku peyva “Ebûbekir” a erebî di farisî da wekî “Bûbekir” tê bikaranîn. Ev taybetîya zimanê farisî di *Gulzarê* da gelekî ber bi çav e. Şûşî ji bo ku wezna beytê xelet nebe gelekî caran ev taybetmendî bikarînaye. Wekî mînak:

***Bûbekrê** mezin çi xûş wezîr e*

*Hem yarê nebî û hem xezîr e* (*Gulzar,* b: 274)

*Yek Ḥemze ye serwerê şehîdan*

*Yek **Bûlehebê** ji wan pelîdan* (*Gulzar,* b: 1111)

***Bûcehlê** kuṛê Hîşamê bedkar*

*Derḥeq bi nebî şibî şeyê har* (*Gulzar,* b: 2879)

Di van beytan da peyvên “*Ebû Bekir*, *Ebû Leheb* û *Ebû Cehil*” wekî *Bûbekr, Bûleheb* û *Bûcehl* hatîne nivîsîn. Dîsa Şûşî di hin beytan da dîyar dike ku ew hin peyvên farisî ji bo ku xeml û xweşikîyê bikartînît. Vê yekê di van beytan da wiha tîne ziman:

*Hûn cumle werin bû malê Cabir*

***Sûrek** ji me ra wî kirye faxir*”

***Sûr farisî ye gû bû leṭafet***

*Yeʿnî: Ji me ra wî kir ḍiyafet* (*Gulzar,* b: 10142-10143)

Ji bilî van awayên jorîn ên bikaranîna farisîyê di *Gulzarê* da awayê herî berbelav bikaranîna peyvên farîsî ye. Şûşî di *Gulzarê* da gelek peyvên farisî bikartîne. Wekî mînak:

*Ṣaḥib meded î tu **dilnewaz** î*

*Tu **dadires** î tu **karisazî*** (*Gulzar,* b: 429)

*Beḥs̱ê wî diken bi her **zubanan***

*Medḥa wî diken li her mekanan* (*Gulzar,* b: 421)

Di van beytan da peyvên "*dilnewaz, dadires, karîsaz* û *zuban*" peyvên farisî ne ku di *Gulzarê* da hatîne bikaranîn. Helbet ji bilî van peyvan gelek peyven dî yên farisî jî di *Gulzarê* da derbas dibin.

### 2.3.1.4. Hêmanên Tirkî

Tirkan û kurdan cîranetîyeke coxrafî ya dîrokî heye. Ji ber ku demekê gelekî dirêje kurd û tirk di nav hev da dijîn yan cîran in. Ji ber vê yekê gelek têkilî û dan û standin di navbera wan da çêbûye. Ev jî bûye sedem ku ev her du ziman bandorê li hev bikin. Bandora tirkî herî zêde li kurdîya kurdên Tirkîyê çêbûye ji ber ku di nav heman dewletê da û bi awayekê têkel dijîn. Şûşî li Kurdistana Iraqê jîyaye û hînî zimanê tirkî bûye (Şûşî, 2012: 39). Lê tesîra tirkî ya li ser kurdîya wî ewqas zêde çênebûye. Her çend hêmanên tirkî hindî yên erebî û farisî di nav *Gulzarê* da nebin jî çend mînak hene.

Hêmanên tirkî di *Gulzarê* da bi du awaya derdikeve pêş. Ya yekê di *Gulzarê* da çend qertafên aîdê zimanê tirkî hatîne bikaranîn. Wekî mînak.

*Eṣlê wî ji şehrê Rame Hurmiz*
*Babê wî ji farisanê* ***dînsiz*** (*Gulzar,* b: 6214)

***Exlaqsiz*** *û bê kemal û bê bar*
*Ew hinde di têz û tund û duşwar* (*Gulzar,* b: 8171)

Di van her du beytan da her çend peyvên *dîn* û *exlaq* bi erebî bin jî qertafa "*siz*" (bi tirkî "sız") a ku li van peyvan hatiye zêdekirin bandora tirkî ye. Ji ber ku di tirkî da ev qertaf ji bo xwedî nebûna tiştekî tê bikaranîn.

***Gerdenlixeka*** *Xedîce dayê*
*Gel wan dihinêrî bu fîdayê* (*Gulzar,* b: 7031)

*Çen serwer û mêrserêt hunerdar*
*Çen hakim û* ***begler****êt şirînkar* (*Gulzar*, b: 7288)

Dîsa di van beytan da jî di beyta yekem da qertafa "lix (lik) û di beyta duyem da jî qertafa "ler" a tirkî hatiye bikaranîn. Awayê duyem ê hêmanên tirkî di *Gulzarê* da wekî bikaranîna çend peyvên tirkî xwe nişan dide. Wekî mînak:

*Peyxemberî gût û ew girnicî*
*"Ew bûn ji qureyşîyan* ***birincî***" (*Gulzar*, b: 6994)

*Ew êdî çu ta gehî hevalan*
***Qurtarbûne*** *ew bi her çî ḥalan* (*Gulzar,* b: 7430)

*Ta* ***dunê*** *çewa nezan bi exbar*
*Evruke çewa bu gencê esrar* (*Gulzar,* b: 9485)

*Hin* ***ariş û wêrişî*** *diken hin*
*Xutban û qesîdeyan dixwunin* (2593)

Şûşî di van beytan da çend peyvên ku bi tirkî ne bikaranîne. Di van beytan da peyvên "birincî (bi tirkî birinci), qurtarbûn (kurtulmak), dun (dün) û ariş û wêriş (alışveriş)" peyvên tirkîne (https://sozluk.gov.tr/).

#### 2.3.1.5. Hêmanên Zimanên Ewropî

Hêmanên zimanên Ewropî wekî bikaranîna çend peyvên zimanên Ewropî xwe nîşa dide. Di *Gulzarê* da her çend kêm jî bin çend peyvên zimanên Ewropî derbas dibin. Bi taybet gava Şûşî behsa alavên şerî yên serdema xwe dike van peyvan bikartîne. Wekî mînak:

*Ṭeyyare û bûmbe û peṛaşût*
*Pêdivî ne me wekî ẕexîre û qût* (*Gulzar*, b: 605)
Di vê beytê da *"bûmbe"* peyveke îtalkî û peyva *"peṛaşût"* jî frensî ye.

*Reşşaş û tivenk û ṭop û dûrbîn*
*Nê cumle fer in çu gaz û benzîn* (*Gulzar*, b: 606)
Di vê beytê da *gaz* peyveke hollandî û *benzîn* jî frensî ye.

*Rummane û şîr û rumḥ û sîkar*
*Laslikî û berq û tank û radar* (*Gulzar*, b: 607)
Di vê beytê da *"tank"* û *"radar"* peyvên ingilîzî ne.

Wekî tê dîtîn di *Gulzar*ê da hêmanên devoka behdînî, erebî, farisî, tirkî û ewropî tên dîtîn. Ji bo ku rêjeyên van zimanan texmînî derkeve holê ji 10154 beytên *Gulzarê* me ji beşa muqeddîmê, mêrga êkê, duyê, sêyê û pêncê 1012 beyt wek nimûne jêgirtin û analîz kirin. Li gorî analîzê *Gulzar* bi texmînî % 73ê ji hêmanên kurdî (behdînî, kurmancî, soranî), % 19,5 ji hêmanên erebî (bi taybet hêmanên dînî), % 5,3

ji hêmanên farisî (hêmanên edebî), % 2 ji hêmanên tirkî û % 0.2 jî ji hêmanên ewropî pêk tê. We dîyare ku em li tevahîya *Gulzarê* jî binêrîn kêm zêde dê rêjeyên bi vî awayî derkefin holê.

#### 2.3.1.6. Peyvên Resen ên Kurdî

Di *Gulzarê* da gelek peyvên erebî û farisî hatîne bikaranîn. Her çend gelek kêm jî be çend peyvên tirkî jî hene. Sedema vê yekê di serî da ji naveroka wê ya olî û bandora kevneşopiya wêjeyî ya erebî û farisî tê. Her wiha, zanîna kûr a nivîskar Şêx Tahirê Şûşî ya her du zimanan jî, rasterast bandor li ser vê yekê kirîye. Lê belê, li gel van peyvan, Şêx Tahirê Şûşî di *Gulzarê* da ji gelek peyvên kurdî yên resen jî bi awayekê hostayî sûd wergirtiye. Çend peyvên resen ên ku di *Gulzarê* da hatîne bikarînan wiha ne:

**ageron:** cureyek hingivîn e

**batî:** şûna, pêş (şûna min tu here)

**baxûyî:** xwedê

**behrik:** gol

**berûk:** berser

**bêyum:** bêoxir, bêqidoş

**bijwîn:** paqij, temîz

**bizinmij:** cureyekê kimkiman e (ajal)

**bizinmijk:** margîsk (ajal

**cisr:** pir, derbasgeh

**cuxîn:** cihê bêdera genimî

**çavnêr:** çavdêr, temaşevan, yê ku li tiştekî dinêre

**çeqîn:** çikilîn, rawestan

**çilave guşt:** şorba goştî

**çiku: ji ber ku**

**çîn çîn**: kom kom, ref ref

**dabestî:** karik, gîsk

**dapîruk:** tevinbîrk

**dawer:** sembol, nîşan

**dayîn:** dayîka şîrî

**deskêş:** alîkar, rêber, piştgir

**dikak**: zad, dexil

**dilêr:** destvekirî, wêrek

**dilmurde:** dilmirî

**dilnewazî:** dilxweşî, dilşadî

**dilpezîr:** dilkêş

**dilveker:** tiştê dil pê şa dibe

**dilzînde:** kesê ku dilê wî zindî ye û tijî coş e.

**duhmen:** pişt ve

ʿ**ebdereş:** koleyên reş

**emirber:** emirqûl

ʿ**eqilker:** aqilmend, jêhatî,

**gend:** qirej, pîsatî

**ger:** dor, sira

**gêzirandin:** xapandin

**guhersenc:** ê ku rewşê diguherînîn

**gûyînde:** xîtabxweş

**havrî:** berê xwe dan bi hemû bedenê xwe

**helistin**: rabûn, şînbûn

**hemser:** hevjîn, jin

**hemwar:** lihevkirî, ahengdar

**hevêz:** hewşî

**hezreguyî:** hiş, aqil

**hijmet:** tirsa pirr, sehm

**hingû:** hûn

**hituve:** hosa, wiha

**ḥûrk:** zik

**jivan:** hevdîtina plankirî, randevu

**kakila can:** wateya cewhera ruh, beşa herî giring û esilî ya jiyanê/ruhanî

**karedan:** kesê karî didet (xwedê)

**karîsaz:** jêhatî, bikêrhatî

**kavledinê:** dinyaya kevin

**kejave:** darbest

**kepir:** sîwana dar û belgan

**kewte:** kerîyê pez

**kiryarî:** tîcaret

**kişpil:** pişkil

**klavzirî:** kulafê asin

**kulî:** cureyekê kuskan e (ajal)

**kulkedar:** senemperist

**kunik:** tûrikên avê

**kuştar:** komelkujî, qetlîam

**lak:** xwarina kûçikan

**lalî:** def, nik

**libin:** tuxleyên ji herrîyê hatine çêkirin,

**mambizek:** xezal

**mereqe:** afik cureyek xwarina bi av

**mexel:** cihê rawestîna pezî.

**milkeç:** teslîm, radest

**mirk:** kurmik

**mûxul:** moxil, cureyeke bêjingan

**nayab:** bijare,  gelek baş

**nehat:** cihê an tiştekê ku zivirîn nîne

**neyî:** feqîr

**nêz:** rim

**nîkunam**: navşirîn

**nikûnser:** serşor, serbijêr bûn

**nixir:** cureyekê teyran e.

**pa:** ma, ca, be

**pa:** nexwe, îcar

**perhêz:** xwe spartin

**perkê guhî:** goştê nermê binê guhî

**pişîdirêj:** bêhnfireh

**qebû xwastin:** gazîya meydanê

**qinare kirin:** sêdaredan, hilawîstin

**qurbiser:** şermezar, teqîn li serî

**qurmek:** firek

**rotî:** feqîrî

**sekvan:** nîşangir, nêçiran

**serkêl:** serfiraz, serbilind

**serrişte:** serê benikî

**serşêt:** tiredîn, aqilkêm

**serşîn:** kesê xwedî wechekê tarî, sifetekê kirêtîyê ye

**sexî:** destxweş, xizmetxweş

**sûrax:** cihê birînê (soranî)

**şaper:** çeng, çeq

**şehînşîn:** cîhê serdestî an jî navenda fermandarîyê

**şimşêr:** şîrê şerî (soranî)

**şivik:** şivtan, darikê ter û dirêj

**tanîn:** karîn, şîyan

**tehre:** kelegerma havînê

**teres:** bêaqil, ehmeq, gêj

**ṭexer:** teqez

**tupîn:** sikitîn, mirin

ʿ**uşirçî:** kesê ku baca dehan (ûşir) kom dike

**vepeşîn:** belav kirin, dabeş kirin

**xanuxûy:** xwedîya malê

**xav:** saf, xam

**xudegîr:** girtina xwedê, nifînek e

**xun vekirin:** tol hildan

**zêrevanî:** nobedarî, çavdêrî

**zikvîyanî:** çilî, zêde ketîyê zikê xwe

**zişt:** kirêt, ne delal

### 2.3.2. Rêbaz û Teşeyên Vegotinê

Ji bo ku şêwaz û kûrahiya berhemeke edebî bi awayekê berfireh bê fêmkirin, pêwîst e ku mirov li ser rêbaz û teknîkên vegotinê yên ku tê da hatine bikaranîn bi hûrgulî bisekine. Bi vê armancê di vê beşê da, em dê li ser Cihê Vegoter, Cureyên Vegotinê li Gorî Vegoter û Kesan, Rêya Vegotinê ya Pirrjimar û Teşeyên Vegotinê bi hûrgilî bisekinîn.

#### 2.3.2.1. Cihê Vegoter[1]

Li gorî teorîya vegotinê vegoter dikare "homodîyetîk" (beşdarê çîrokan) an "heterodîyetîk" (derveyî çîrokan) be (Genette, 1980: 245). Di *Gulzarê* da di hin cihan da vegoter beşadarê çîrokê (homodîyetîk) ye. Wekî mînak:

*Bawer* **me** *heye ku tu Xuda yî*

*Her tu mezin î xudan beqa yî* (*Gulzar,* b: 4)

...

*Mewlayê* **me** *yî tu dilnewaz î*

*Rebbê* **me** *tu yî tu karîsaz î* (*Gulzar,* b: 36)

Di van her du beytan da bi vegoter bi forma kolektîf a "me" çîrokê vedibêje anku ji ber vê yekê vegoter di van beytan da beşadarê çîrokê ye.

Di *Gulzarê* da vegoter hin caran jî xwe ji derveyî çîrokê dihêle anku heterodîyotîk e. Wekî mînak:

*Ew Bûlehebê wî bab e Şeybe*

*Caryek wî hebû bi nav Ṣuweybe* (*Gulzar,* b: 1631)

...

*Mazin bû Ṣuweybe nik peyember*

*Hem nik ḥerema Xedîce dilber* (*Gulzar,* b: 1636)

Di van beytan da vegoter tenê çîrokê vedibêje û beşdarê çîrokê nîne anku heterodîyotîk e.

#### 2.3.2.2. Cureyên Vegotinê li Gorî Vegoter û Kesan

Sê cureyên vegotina li gorî kesan hene. Ew jî vegotina li gorî devê kesê yekem (yekjimar, pirjimar) "ez, min, em, me", vegotina li gorî kesê duyem (yekjimari pirjimar) "tu, te, hûn, we" û vegotîna li gorî kesê sêyem "ew, wî" e (Bakır, 2015: 35). Di *Gulzarê* da mînakên her sê cureyan jî hene.

---

[1] Ev peyv di berhema Ayhan Yıldız "Hunera Vegotina Bedew a Devkî û Nivîskî" da ji bo kesê ku çîrokê dibêje tê bikaranîn. Me jî bi hema awayî bikaranîye.

#### 2.3.2.2.1. Vegotina li Gorî Devê Kesê Yekem

Di vegotina li gorî devê kesê yekem da nivîskar bûyereke ku bi serê wî da hatiye an jî ew tê da ye vedibêje. Nivîskar hevokên xwe bi cînavkên “ez, em” saz dike (Yıldız, 2017: 74). Ev cureyê vegotinê wekî mînak di *Gulzarê* da wiha dibore:

*Min fikr e bira ku* ***ez*** *bibêj****im***
*Daẋa li dilê xû* ***ez*** *bi rêj****im*** (*Gulzar,* b: 418)

***Ez*** *neẓim bik****em*** *cewan û ṣaẋlem*
*Tarîxê ḥeyatê şahê ʿalem* (*Gulzar,* b: 419)

Di van her du beytan da bi bikaranîna cînavka “ez” vegotina li gorî devê kesê yekem hatiye bikaranîn.

#### 2.3.2.2.2. Vegotina li Gorî Devê Kesê Duyem

Di teorîyên vegotina romanê da her çend bara pêtir behsa vegotina li gorî devê kesê yekem û sêyem bê kirin jî hin çavkanî behsa vegotina li gorî devê kesê duyem kêm jî dikin (Demiryürek, 2013, r. 119). Di vî şêweyê vegotinê da bi cînavên “tu, te an hûn, we” xitabî kesekî/ê dike (Abrams, 1999, r. 234). Di *Gulzarê* da ev şêweyê vegotinê di cihekî da wekî mînak wiha derbas dibe:

*Tenha yî* ***tu*** *bê heval î û bê hemṯer*
*Ne yê pêtivîyê wezîr û yawer*

*Haḏir* ***tu*** *li ser dilan reqîb î*
*Şahid* ***tu*** *li kullî kesî qerîb î*

*Zana bi xefî yî û aşikar î*
***Tu*** *çen bizirî du hin diyar î*

*Ageh bi şehadetê û ẋeybê*
*Dûr î* ***tu*** *li her nerêz û ʿeybê* (*Gulzar,* b: 5-8)

Di van her du beytan da bi bikaranîna cînavka “tu” vegotina li gorî devê kesê duyem hatiye bikaranîn.

#### 2.3.2.2.3.Vegotina li Gorî Devê Kesê Sêyem

Di vegotina li gorî devê kesê sêyem da vegoter ji derveyê çîrokê ye. Ji ber vê yekê vegoter hevokên xwe bi cînavka kesê sêyem “ew, wî” saz dike (Yıldız, 2017, r. 74). Di *Gulzarê* da ev cureyê vegotinê jî gelekî berbelav e. Wekî mînak:

*Serdarê hemû peyemberan* ***ew***
*Serdefterê cumle serweran* ***ew***

***Ew*** *rohnîyê afitabê reḥmet*
***Ew*** *durrê giran buhayê xilqet*

*Bînahîyê çavê cumle ʿalem*
*Tacê serê xir kuṛêt di Adem*

***Ew*** *meẓherê xûş xîṭabê “lewlak”*
*Sîrr û sebebê sucûdê emlak* (*Gulzar,* b: 10-13)

Di van beytan da vegoter bi cînavka “ew” vegotina devê kesê sêyem bikartîne. Vegoterê kesê sêyem, li gorî perspektîfa xwe di berheman da bi du awayan xuya dibe.

**Vegoterê/a Îlahî:** Di vî cureyê vegotinê da vegoter xwediyê agahiyeke bêsînor e. Vegoter di derbarê cîhana hundirîn a karakteran û pêşî û paşîya bûyeran da her tiştî dizane (Tekin, 2022, r. 54). Di *Gulzarê* da ev şêwazê vegotinê wekî mînak wiha derbas dibe:

“*Serdarê hemû peyemberan ew*
*Serdefterê cumle serweran ew*” (*Gulzar,* b: 10)

“*Ew meẓherê xûş xîṭabê lewlak*
*Sîrr û sebebê sucûdê emlak*” (*Gulzar,* b: 13)

Di van mînakan da, vegoter ji bûyeran derve ye û bi agahiyeke mutleq diaxive; rola gerdûnî ya Muhemmed (s.x.l) û cihê wî di nava hebûnê da diyar dike. Ev mînak nîşan didin ku vegoter ne tenê çîrokbêj e, lê di heman demê da di pozîsyoneka wisa da ye ku hemû tiştan dizane (îlahî).

**Vegoterê/a Çavdêr:** Di vî cureyê vegotinê da çavdêr bûyeran wekî çavdêrekî ji derve vedibêje. Ev cure vegêr bi gelemperî bi bêalîbûn û agahiya sînordar tê nasîn (Tekin, 2022, r. 56). Di *Gulzarê* da ev şêwazê vegotinê wekî mînak wiha derbas dibe:

"*ʿUmrê wî gehîbû pazde salan*
*Ew pêşeṛe wê xudan kemalan*" (*Gulzar*, b: 2150)

"*Qewmî bû şeṛek bi pîsekarê*
*Navê wî dibên şeṛê fîcarê*" (*Gulzar*, b: 2151)

"*Berraḍê kînanî bû serê kar*
*Çar sal bûye şeṛ bi her çî kuştar*" (*Gulzar*, b: 2152)

Vegoter di van beytan da temenê Pêxemberî, rewşa derdorê û nakokiyên civakî rasterast vedibêje. Bêyî ku hestên xwe dîyar bike bûyeran di çarçoveya dîrokî da pêşkêş dike.

### 2.3.2.3 Rêya Vegotinê ya Pirrjimar

Di vî cureyê vegotinê da, gelek vegoter di heman demê da hene. Vegoter di cihekî da bi vegoterê kesê yekem, di cihekî da bi yê duyem û di ciheke dî da jî bi yê sêyem çîrokê vedibêje (Çetişli, 2004, r. 88). Ev şêwaza vegotinê taybetmendiya herî serdest a *Gulzarê* ye. Wekî mînak Şûşî di beyta yekem da bi vegotina kesê seyem "*Ellah ku çi navekê şirîn e / Gûtna wî ḥeyatê can û jîn e*" (b: 1) dest bi *Gulzarê* dike lê di beyta duyem da "*Ey navê te ye Reḥîm û Reḥman / Wey ẕikrê te ye şîfa û derman*" (b: 2) derbasî vegotina devê kesê duyem dibe, di beyta çarem da "*Bawer me heye ku tu Xuda yî / Her tu mezin î xudan beqa yî*" (b: 4) derbasî vegotina devê kesê yekem dibe û di beyta pêncem da "*Tenha yî tu bê heval î û bê hemṣer / Ne yê pêtivîyê wezîr û yawer*" (b: 5) disa derbasî vegotina devê kesê duyem dibe. Disa di beyta 22 "*Navê te Xudê çi tazenav e / Pîrûz e çi şûleka li nav e* heta beyta 30ê bi vegotina kesê duyem vedibêje. Di beyta 31ê "*Ewwel me bûy xû îbtîda ye / Axir me li ser wî întîha ye*" derbasî vegotina kesê yekemê pirjimar û kesê sêyem dibe. Di beyta 34ê "*Nîn in te beṛevan bijil peyember / Xûşevê te û şefîʿê meḥşer*" dîsa derbasî vegotina kesê duyem dibe. Di *Gulzar*ê da bi vî şiklî gelek mînak hene.

#### 2.3.2.4. Teşeyên Vegotinê

Di *Gulzarê* da, nivîskar ji bo ragehandina naveroka xwe ya dewlemend û gehandina peyamên dînî-exlaqî, cûrbecûr teşeyên vegotinê bi awayekê hostayî bi kar aniye. Di vê beşê da em dê li ser teşeyên sereke yên vegotinê yên wekî Vegotina Raveker, Vegotina Çîrokbêjî, Vegotina Teswîrî, Vegotina Nîqaşger, Vegotina Lîrîk, Vegotina Hîndekar / Dîdaktîk û Vegotina Epîk ku di *Gulzar*e da hene bisekinîn.

##### 2.3.2.4.1. Vegotina Raveker

Di vî teşeyê vegotinê da armanca nivîskarî dayîna agahîyan, ravekirina têgînan û zelalkirina mijaran e (Özdemir - Binyazar, 2018, r. 68). Di *Gulzarê* da, vegotina raveker di beşa "El-Muqeddîme" û gelek sernavên dî da tê dîtin. Wekî mînak di bin sernavê "El Qurʾan-ul Mecîd (Qurʾana Bilind û Pîroz)" de, giringî, naverok û cihê Quranê di Îslamê da bi awayekê berfireh hatiye ravekirin.

*Qurʾan e eger tu hûr dibînî*
*Tacê serê vê kuṛey zemînî*

*Qurʾan e belê çirayê ʿalem*
*Ustaẕ e û rehnimayê ʿalem*

*Barî ku hinarî taze Qurʾan*
*Nek bû ṭebeqek li newʿê însan*

*Belkî bû hemû ziman û mîllet*
*Bû cumle beşeṛ ḥeta qiyamet* (*Gulzar*, b: 535-538)

##### 2.3.2.4.2. Vegotina Çîrokbêjî

Ev cure ji bo vegotina bûyer, çîrok û serpêhatiyan tê bikaranîn. Armanca nivîskarî ew e ku xwendevanan derbarê bûyerê agahdar bike (Yıldız, 2017, r. 66). Ji ber ku berhem li ser jiyana Pêxemberî ye, ev şêwaz di *Gulzarê* da gelek berbelav e. Wekî mînak di bin Sernavê “Qiṣṣetu Eṣhabîl Fîl (Çîroka Xudanên Fîla)” da bûyera Fîl bi awayê çîrokbêjî wiha tê gotin.

*ʿUmrê wî gehişte salê ḥeftê*
*Ew piṛṛ şeṛefê wekîlê beytê*

*Ew Ebreheyê bi kerb û pîlan*
*Hatin Mekehê suwarê fîlan*

*Ew Keʿbe ku qîblegahê ummet*
*Ew hat û xirab biket bi quwwet* (*Gulzar,* b: 1357-1359)

#### 2.3.2.4.3. Vegotina Teswîrî

Di vî teşeyê vegotinê da nivîskar bi rêya peyvan cih, tişt yan jî bûyerekê di zêhna xwendevanên xwe da zindî dike, wêneyekê zindî tîne ber çavên wî (Tekin, 2022, r. 210). Di *Gulzarê* da vegotina teswîrî jî gelek caran hatiye bikaranîn. Wekî mînak di bin sernavê "Ẋezwetû Bedrîn el-Kubra (Ẋezwa Bedra Mezin)" da, meydana Şerê Bedrê, rewşa leşkeran û atmosfera şerî hatiye teswîrkirin:

*Êdî bû hicum li her kinare*
*Bû yek dî diçûn di daẋedare*

*Şîran şeqe şeq diçît bi denge*
*Lê rim bi meṭalî ringe ring e*

*Çendan tu dibînî serfirandî*
*Du hinde dibînî zikdirandî* (*Gulzar,* b: 6829-6831)

#### 2.3.2.4.4. Vegotina Nîqaşker

Ev teşeyê vegotinê ji bo parastina fikrekê an jî tezekê, pûçkirina nêrînên dijber an jî piştgiriya baweriyekî tê bikaranîn (Özdemir, 1994, r. 34). Di *Gulzarê* da di bin sernavê "*Neẓaru îla Meşrûʿîyyetî Zekatî we [Ḥûrmetî] Rîba* (Nêrînek li ser Ḥeramîya Rîbayê û Meşrûîyeta Zekatê)" da, li ser heramiya faîzê û meşrûîyeta zekatê nêrînên dînî yên cuda hatine nîqaşkirin. Wekî mînak:

*Ewwel tu were zekat neẓer ke*
*Paşî bi rexê rîba guzer ke*

*Sirrek çi mezin Xudê di wan da*
*Çen xêr û çi meṣleḥet bi wan da*

*Ferḍa ku zekat rîba ḥeram î*
*ʿAlem şewişî ji wan temamî*

*Ger seyrê cîhan bikey peyapey*
*Tarîxê di ʿalemê tu seḥ key*

*Dê bînî serê şeṛ û şîqaqê*
*Vî muctemeʿî û vê nîfaqê*

*Ev xelke li her cihek lewanê*
*Keftîne ẋemê û êş û janê*

*Ev hinde mûşewweş in ne hemwar*
*Nê du qise ne tinê sebeb kar*

*1-Ewwel eve ye wekî dibêjît*
*Ew yê ku li xelkî can dimêjît...* (*Gulzar*, b: 725-732).

**2.3.2.4.5. Vegotina Lîrîk**

Taybetmendiyên sereke yên helbesta lîrîk, gotineka herikbar, ahengdar û îfadeyeke nerm in. Di vê cure helbestê de, ku mijarên ferdî û hestên şexsî bi awayekê kûr cih digirin, nexme, dilpakî û coş ruhê lîrîzmê pêk tînin. Giring e ku helbestvan hestên xwe yên coşdar bi zimanekî sade, kurt û ji dil ragihîne; bi vî awayî, helbestên lîrîk bi xwînerên xwe re têkiliyeke hestyarî ya kûr ava dikin (Çetin, 2019: 218). Wekî mînak di van beytan da vegotina lîrîk heye:

*Ey navê te ye Reḥîm û Reḥman*
*Wey ẕikrê te ye şîfa û derman* (*Gulzar*, b: 2)

*Ey yar tu eger bihêy bixwî*nî
*Dê ẕewq û ṣefa di dil bibînî* (*Gulzar*, b: 374)

*Lew beḥṣ̱ê peyemberê zemanî*
*Ronayê dil û ṣefayê canî* (*Gulzar*, b: 375)

*Tuy şuʿleyê afitabê reḥmet*

*Tuy durrê giran buhayê ḥîkmet* (*Gulzar*, b: 7955)

#### 2.3.2.4.6. Vegotina Hindekar / Didaqtîk

Vegotina hîndekar, cureyekê vegotinê ye ku armanca wê şêweyekê hîndekarî agahiyê bide, peyameka exlaqî an dînî bigehîne xwendevanan. Di vî cureyî da nivîskar, dixwaze ku rastî, şaşî, qencî û xerabiyê hînî xwendevanan bike (Özdemir, 1994, r. 99). Di *Gulzarê* da ev teşêyê vegotinê gelekî berbelav e. Wekî mînak di van beytan da vegotina hîndekar hatiye bikaranîn:

*Her kes ji xû ra neket çi karan*
*Nagehte murad û pişk û baran*

*Nê şeṛm e ji wan cewane mêran*
*Wan çav hebitin li nanê xêran*

*Daran tu bi pişta xû bikêşî*
*Nek tu bi sualê dil biêşî*

*Ḥemmalî bikey ne wekî bixwazî*
*Xaṣma tu eger şeṛefnewazî*

*Ger dê te divê bijî bi serbest*
*Tu helke li şûlî bask û dest...* (*Gulzar*, b: 1492-1496)

#### 2.3.2.4.7. Vegotina Epîk

Vegotina epîk, cureyekê vegotinê ye ku bi zimanekî bilind û bi coş, bûyerên mezin û şerên lehengî yên qehremanan vedibêje (Aytaş, 2006, r. 6). Armanca wê ew e ku kiryarên awarte yên lehengan ronî bike û xwendevanan bixe nav atmosfereke dîrokî. Pir caran, hêzên serxwezayî jî di nava van çîrokan da cih digirin. Di *Gulzarê* da ev teşeyê vegotinê di behsa şeran da tê dîtin. Wekî mînak:

*Ḥîna digehişte êk du leşker*
*Ew roj wî li duşminêt xû ṛeşkir*

*Çengek wî hilanî piṛṛ ji xîze*
*Havêtîye qewmê natemîze*

*Ev xîze bi qudreta Xudayî*
*Her êkî hinek di çav gehayî*

*Her êk bû bi çavê xû perêşan*
*Lew cumle revîn bi ah û êşan*

*Bedrî li du wan bi rumḥ û şimşîr*
*Hindan dikujin hinan jî êxsîr*... (*Gulzar,* b: 9723-9727)

Di van beytan da Şûşî bi awayekê epîk behsa şerê Bedrê dike.

### 2.4. Hunerên Edebî di *Gulzarê* da

Gulzar ji alîyê hunerên edebî ve berhemeke dewlemend e. Di vê beşê da hunerên edebî yên ku di Gulzarê da derbas dibin hatine tespîtkirin.

#### 2.4.1. Teşbîh (Şibandin)

Teşbîh, peyveke erebî ye û di ferhengê da tê wateya şibandinê (Durmuş, 2011: 553). Hem di axaftina rojane û hem jî di nivîsê da ev huner pir tê bikaranîn. Di edebiyatê da jî hunereke herî giring a ronbêjîyê (beyan) ye. Teşbîh ji çar hêmayan pêk tê; mûşebbeh (şibande) anku ya tête şibandin, muşebbehûn bîh (lêşibande) ya ku lê tête şibandin, aliyê şibandinê û daçeka şibandinê (Hacımüftüoğlu, 1992: 22). Di hemû şibandinan da şert nîne ku her çar hêma hebin. Dibe ku di şibandinekê da ev her çar hêma pêkve hebin, di hin şibandinan da jî dibe ku ji van hêmayan hin cih negirin. Di *Gulzarê* da hunera şibandinê gelek hatiye bikaranîn. Çend mînakên hunera şibandinê di *Gulzarê* da em dişên wiha rêz bikin:

*Peyẋember e roj ewan sitêr bûn*
*Her ber wî bû ew ku bû te şêr bûn* (*Gulzar*, b: 214)

Di vê beytê da sê teşbîh hene. Di misra ewil ya beytê da Pêxember şibandiye roj ê (tav) û hevalên wî şibandîne sitêrkan. Dîsa di misra duyem a beytê da jî hevalên Pêxemberî şibandîne şêran.

*Ḥûrî ṣîfet e melek surûşt e*
*Ser rişteyê luilûêt biheşt e* (*Gulzar*, b: 9273)

Di vê beytê da jî behsa kiça Pêxemberî Fatîmayê dike. Di vê beytê da Fatîma şibandîye hûrî, melek û luilûêt biheştê.

*Royê wî çu meh bejin çu ʿerʿer*

*Neybun wî li heyv û rojê sêber* (*Gulzar*, b: 8556)

Di vê beytê da rûyê Pêxemberî şibandîye heyvê û bejna wî jî şibandîye ʿer ʿer ê.

*Bînahîyê çavê cumle ʿalem*

*Tacê serê xir kuṛêt di Adem* (*Gulzar*, b: 12)

Di vê beytê da Şûşî, Pêxember şibandîye bînahîya (dîtina) çavê hemî alemê. Dîsa di vê beytê da taca serê hemî kûrêt Ademî.

### 2.4.2. Mecaz

Peyva "mecaz" erebî ye û ji peyva "cewz (cewaz)" a ku dihête wateya "bi rêveçûnê ji cihêkî borîn, rê çûn" tê û di wateya "lefza ku jiderveyî wateya xwe ya rasteqîn da tê bikaranîn" da ye (Durmuş, 2003: 217). Anku di mecazê da tişta herî giring ew e ku peyva dihête bikaranîn di wateya ya xwe ya eslî da nîne. Di mecazê da astengek heye (qerîneya maniʿyê) ku nahêle ku peyv bi wateya xwe ya eslî were famkirin (Saraç, 2019: 113). Mecaz, şêwazekî dî yê şîrovekirin û ravekirina hestên helbestvanan e.

*Feyḍ û kerem û selam di bê ḥed*

*Ya Reb tu biṛêje ser Muḥemmed* (*Gulzar*, b: 15)

Di vê beytê da Şûşî ji Xwedê dixwaze ku bê hed feyz û kerem û selamê birêje ser Pêxemberê xwe. Lê feyz, kerem û selam ne tiştekê wekî av û baranê yê fîzîkî ne (qerîneya maniʿyê) ku birije. Ji ber vê yekê peyva "birêje" wekî mecaz hatiye bikaranîn.

*Xûzya li kesê Xudê ḥebandî*

*Nefsa xû li vê dinê revandî* (*Gulzar*, b: 51)

Di vê beytê da Şûşî di misra duyem a beytê da ji bo ku bixwaze bibêjît xwezîya wî kesî yê ku li gorî xwastekên nefsa xwe neçît û xwe ji tiştên dûnyewî dûrbêxît, peyva "revandin"ê bikartînît. Lê nefs ne tiştekê wisa ye ku mirov bişêt birevînît (qerîneya maniʿyê). Ji ber vê yekê peyva "revandî" wekî mecaz hatiye bikaranîn.

### 2.4.3. Mecaza Mursel

Mecaza mursel ew e ku bêjeyek bêyî mebesta şibandinê di wateyeke dî da tê bikaranîn û nîşaneyek jî heye ku nîşandide ku bêje di wateya rasteqîn da nehatiye

bikaranîn (Kaptan, 1999: 169). Anku ji bo mecaza murselê sê şertên bingehîn hene (Şenödeyici, 2005, r. 123-124).

- Divê bêje jiderveyî wateya xwe ya rasteqîn da hatibe bikaranîn.
- Divê di navbera wateya nû û wateya rasteqîn da şibandin nebît.
- Divê nîşanek hebît û bibîte asteng ku bêje di wateya rasteqîn da bê famkirin.

*Navê te ye ron dibin bi wî dil*
*Ẕikrê te ye hun dibin bi wî dil*

Di vê beytê da Şûşî peyva "dil" bikaranîye lê qesta wî ne wekû organ dil e, navê organekî daye lê qesta wî mirov bi xwe ye.

*Bê fayde ʿumir te geşte êvar*
*Karek te nekir bu rojê dujwar* (*Gulzar,* b: 63)

Di vê beytê da peyva "êvar" hatiye bikaranîn lê qesta Şûşî ji vê peyvê ne wekû demekê rojê êvar e, qesta wî dawîya umrî ye anku nezîkbûna mirinê ye.

*Qeṣda te tinê riḍa wî bîtin*
*Dunya çû nîye bilan biçîtin* (*Gulzar,* b: 67)

Di vê beytê da peyva "dunya" hatiye bikaranîn lê qesta Şûşî ji vê peyvê ne wekû gerestêrkekê dinya ye. Qesta wî ji peyva "dunya"yê jîyana dinyayê û mal û milke dinyayê ye.

### 2.4.4. Îstîare

Îstîare, di ferhengê da tê wateya "deyn xwastin, deyn hilgirtin" ê. Li gorî pisporên belexetê îstiare, ew e ku bêje an ravekek, ji bo ku li şibandinekê mûbalexe û hêza şîroveyê zêde bibe, bi pêwendiya şibînê jiderveyî wateya wê ya rasteqîn da bihête bikaranîn (Pala û Durmuş, 2001: 315). Anku di îstiareyê da divê bêje ji bilî wateya xwe ya rasteqîn di wateyeke nû da hatibe bikaranîn, di navbera wateya rasteqîn û wateya nû ya bêjeyê da pêwendiya şibîne hebe û astengek hebe ku bêje di wateya rasteqîb da bê fêmkirin (Gerdî, 1972: r. 69). Îstîare, ji aliyekî şibandinê, ji aliyê dî jî mecazê di nav xwe da dihewîne. Ji ber vê yekê li gorî hin alimên belexetê di nav şibandinê da li gorî hin alimên dî yên belexetê da jî di nav mecazê da hatiye qebûlkirin. Tişta ku îstîareyê ji şibandinê cuda dike ew e ku di şibandinê da hem şibande (mûşebbeh) hem jî lêşibande (muşebbehûn bîh) ya heye lê di îstîareyê da yek ji van

tenê heye, yan şibande heye, yan jî lêşibande. Tişta ku îstîareyê ji mecazê jî cuda dike ew e ku di mecazê da mebesta şibandinê nîne lê di îstîareyê da şibandin heye.

*Her rojê di man û çav li rah e*

*Dê kengî helêt ji wan ve mahe* (*Gulzar*, b: 5983)

Di vê beytê da Şûşî Pêxember şibandîye “mahê” anku heyvê lê ew bi xwe negotîye, tenê lêşibande (muşebbehûn bîh) heye. Ji ber vê yekê di vê beytê da îstîareya aşkere heye.

*Bê fayde ʿumir te geşte êvar*

*Karek te nekir bu rojê dujwar* (*Gulzar*, b: 63)

Di vê beytê da axret şibandîye roja dijwar lê axret bi xwe nehatiye gotin. Ji ber vê yekê di vê beytê da îstîareya aşkere heye.

*Ya Reb tu birêjî ser wî reḥmet*

*Ṣed naz û neʿîm di baẋê cennet* (*Gulzar*, b: 880)

Di vê beytê da “rehmet” bi rêya peyva “birêjî”li avê hatiye şibandin lê av bi xwe nehatiye gotin. Ji ber ku di vê beytê da şibande (mûşebbeh) heye û lêşibande (muşebbehûn bîh) nîne di vê beytê da îstîareya veşartî heye.

*ʿErḍ û felek û semak bi carek*

*Hemyan ji wî ra digût mubarek* (*Gulzar*, b: 1549)

Di vê beytê da “erd û semaû felek” bi rêya peyva “digût”li mirovan hatiye şibandin lê mirov bi xwe nehatiye gotin. Ji ber ku di vê beytê da şibande (mûşebbeh) heye û lêşibande (muşebbehûn bîh) nîne di vê beytê da îstîareya veşartî heye.

### 2.4.5. Kînaye

Kînaye di ferhengê da tê wateya “nixaftina tiştekî bi tiştekî din”. Wekî hunerek edebî jî tê wateya “vegotina nixaftî”. Li gorî alimên beyanê kînaye ew e ku bêje an ravekek li gel wateya rasteqîn di wateyeke d da jî tê bikaranîn û mebest jî ne wateya rasteqîn e, mebest wateya nû ye (Durmuş, 2002: 34). Lê dîsa jî çi asteng li ber têgehiştina wateya rasteqîn jî nîne (Hacımüftüoğlu, 1992: 22). Ji ber vê yekê dibe ku kesek bêjeyê di wateya rasteqîn da jî qebûl bike. Di kînayeyê da ji bo wateya esil an wateya rasteqîn a bêje an ravekê “meknî bîh” tê gotin. Ji bo wateya nixaftî an wateya ku tê nîşandan jî “meknî anh” tê gotin (Tuna, 2018: 27). Kînaye ji bilî edebiyatê di gotinên pêşiyan da jî gelek caran derdikeve pêş. Ev hunere bi bikaranîna gotinên pêşiyan di nav helbestan da, hem qalib an dirûvê wan diparêze, hem jî di helbestê da

aheng û hêzdariyekê dirust dike û bi awayî wan hem ji navçûn û windabûnê rizgar dike, hem jî bi heman qalib û dirûvê wan ji serdemekê bo serdemek dî wediguhêze (M.Salih, 2016: 128-129).

*Babet niye her kesî gula geş*
*Kerṭebʿî nevêt ji ẋeyrî kerbeş* (*Gulzar*, b: 6126)

Di vê beytê da di misra duyem da gotineka pêşîyan "Kerṭebʿî nevêt ji ẋeyrî kerbeş" hatiye bikaranîn. Meknî bîh: Ker gelek ji heş ji gîyayê kerbeşê dike û ji bilî wî hej gîyayên dî yên xweş nake. Meknî anh: Kesên ku xwedî tebîʿetê keran bin bes heş xirabî û nexweşîyan dikin heş tiştê xweş û baş nakin.

*Serşor û xisaret û gunehkar*
*Barê gunehan giran e êkcar* (*Gulzar*, b: 45)

Divê beytê da di peyva "serşor" da kînaye heye. Meknî bîh: serê xwe çemandin, şor kirin. Meknî anh: şerim kirin, şermizarbûn.

*Carek dî ku ez te hu bibînim*
*Çavan li serê te derdiînim* (*Gulzar*, b: 3191)

Di vê beytê da di misra duyem da biwêjek "*Çavan li serê te derdiînim*" hatiye bikaranîn. Meknî bîh: Dê çavên te ji serê te derêxim û dê te kor kim. Meknî anh: Dê te gelek bikutim û te înim halekê wesa ku tu neşêy çavên xwe vekî.

### 2.4.6. Tecrîd

Tecrîd di ferhengê da tê wateya "cilê tiştekî jêkirin an jî qalikê wê derxistin" (Özfırat, 2016: 646)**.** Wekî huner tecrîd ewe ku helbestvan di nav helbesta xwe da gazî xwe dike lê mirov dibêje gazî kesekê dî dike (Tok, 2011: 44). Şûşî di *Gulzarê* da ev hûner gelek caran bikaranîye. Di van mînakên jêrî da Şûşî gazî xwe dike.

*Ey dil were ger tu huşiyarî*
*Tê fikre cewan di kûlkedarî*

*Ey Ṭahirê qurbiser ji bû xû*
*Ta kengî hebê xeber ji bû xû*

*Nê bûyî ḍeʿîf û pîr û jar e*
*Hêşta te nekirye kar û bare*

*ʿUmrê çil û pênc te çu bi talan*
*Karê te he wekî ʿemel beṭalan* (*Gulzar*, b: 9843-9847)
Di van beytan da gazîkirinên “Ey dil” û “Ey Tahir” dibin hunera tecrîdê.

### 2.4.7. Întak / Teşxîs

Întaq û teşxîs, di wêjeyê da du hunerên edebî yên giring in û bi gelemperî bi hev re têne bikaranîn. Întaq, dayîna taybetmendiya axaftina mirovî ji tiştên bêcan, riwek an jî ajalan re ye. Teşxîs jî, dayîna taybetmendî û hestên mirovî ji heyînên ku ne mirov in. Ev her du huner jî di *Gulzarê* da gelek caran bi taybet jî di beşa mucîzeyên Pêxemberi da hatîne bikaranîn. Di van mînakên jêrîn da ev huner hatiye bikaranîn:

*Gurgî gûtî: Ez dibêm ʿecebter*
*Ev şahê Medîne pak peyember*

*Gazî diketin bi dînê barî*
*Ta kengî dibin bi can di ṭarî* (*Gulzar*, b: 9878-9879)
Di van beytan da Gurgek diaxivît ev jî dibe hunera întakê di heman demê da jî hunera teşxîsê.

*Ellah ku we da cewabê cennet*
*Cennet gû: Hizar ji bu te minnet* (*Gulzar*, b: 4634)
Di vê beytan da Cennet diaxivît ev jî dibe hunera întakê di heman demê da jî hunera teşxîsê.

*Bu mînberê çu resulê ʿalî*
*Wê gavê sitûn ji bu wî nalî* (*Gulzar*, b: 9827)
Di vê beytê da mînber ku heyîneka bêcan e wekî mirovan dinale ev jî dibe hunera teşxîsê.

### 2.4.8. Îqtîbas

Di ferhengê da "îqtibas" tê wateya "*ji agir pêt girtin*"; lê di wateya mecazî da, ew ji bo "*hewldana bidestxistina zanînê an jî ji zanîna kesekî sûd wergirtinê*" tê bikaranîn. Ji ber ku ew zindîbûn û germatiyê dide vegotinê, gotinê xurt dike û dixemilîne, îqtibasên ji Qurʾan an hedîsan têne kirin wekî hunereke edebî hatine pejirandin (Durmuş, 2000, 52). Di *Gulzarê* da ev hunere gelek caran hatiye bikaranîn. Di van mînakê jêrîn da hunera îqtîbasê heye.

*Hatin bi ẋeḍeb ewan nezanî*

*Ẋafil ji qeḍayê kûn fekan î* (*Gulzar*, b: 1453)

Di vê beytê da jorî da “kun fekan” parçeyeke ayetekê ye tê wateya “me go çêbibe û ew jî çêdibe ku di Quranê da di gelek cihan da derbas dibe.

*Berdave resûlê cînn û însan*

*Îḥsan e tinê cezayê îḥsan* (*Gulzar*, b: 3370)(Rehman, 60)

Di vê beytê da jî “*Îḥsan e tinê cezayê îḥsan*” ayeta 60ê ya sûreta Rehmanê hatiye bikaranîn.

*Ma beynê zelam û şîrk û kufr e*

*Nê terkê nivêj e” hûr bifikre* (*Gulzar*, b: 4974)

Di vê beytê da jî hedîsek hatiye bikaranîn

*Kes ser kesê qeṭ neken çi fexre*

*Bê kîbr û ẋurûr û ẋedr û qehre (Gulzar, b:* 8675)

Di vê beytê da jî hedîsek hatiye bikaranîn. Ji bilî van mînakan gelek mînakên dî yên îqtîbasê di *Gulzarê* da hene anku *Gulzar*, ji aliyê hunera îqtîbasê ve gelekî dewlemend e. Di beşa “Taybetmendîyen Naverokî” da bi hûrgulî behsa ayet û hedîsên di *Gulzar*ê da derbas dibin hatiye kirin û ew hemû dibin mînakên hunera îqtîbasê.

### 2.4.9. Tezat

Peyva tezatê bi eslê xwe peyveke erebî ye û tê wateya dijberî an jî nakokîyê. Di wêjeyê da, tezat hunera berhevkirina du tiştên ku li hev nakin, du ramanên dijber, an jî du hestên cuda di heman demê û di heman hevokê da ye (Durmuş, 2012, 60). Armanc ew e ku gotin geştir bibe û kûrahiya wateyê zêdetir bibe. Mînak, dema em "roj û şev" an "şîn û şahî" bi hev re bi kar tînin, em tezatê bi kar tînin. Di *Gulzarê* da ev hunere gelek caran hatiye bikaranîn. Wekî mînak di van beytan da hunera tezatê hatiye bikaranîn.

*Zana bi xefî yî û aşikar î*

*Tu çen bizirî du hin diyar î* (*Gulzar*, b: 7)

xefî – aşîkar û bizir – diyar dijberê hev in.

*Xêr û şeṛ û pîsî î û cewanî*

*Ev xûş û nexûşî û giranî* (*Gulzar*, b: 91)

xêr – şer, pîsî – cewanî, xûş – nexûş dijberê hev in.

*Ev jîn û mirin şebab û pîrî*
*Ev her du cîhan bi kwîr û dwîrî* (*Gulzar*, b: 93)
jîn – mirin, şebab – pîr dijberê hev in.

### 2.4.10. Telmîh

Di edebiyatê da, ev huner ew e ku mirov di nava vegotinê da, bêyî ku rasterast behsî bike, îşaretê bi çîrokekê, bûyereka kevnar, çîrokek an efsaneyeke navdar, kesayetiyek naskirî, baweriyên curbicur, ayetan, hedîsên şerîf an jî biwêjeka berbelav bike (Uzun, 2011, r. 408). Yek ji hunerên ku herî zêde di *Gulzarê* da derbas dibe telmîh e. Şûşî di *Gulzarê* da li gelek cihan ev huner bikarînaye ji ber ku hejmara vê hunerê di *Gulzarê* da gelek zêde ye û dê gelek cihî bigire me tenê cih daye çend mînakan. Wekî mînak di van beytên jêrîn da hunera telmîhê heye.

*Adem te birî bû jûr meqame*
*Esmaʿ te nîşa wî dan temame* (*Gulzar*, b: 9442)

Telmîha bûyera afirandina Ademî nîşandana navê her tiştî bo wî

*Ṭufan te dida bû xaṭirê Nuḥ*
*Pê xendiqî kafiṛê siyehrûḥ* (*Gulzar*, b: 9448)

Telmîha bûyera tufana Nuh Pêxemberî

*Çen tiştê mezin te dan Suleyman*
*Ber emrê wî kir te ba bi ferman* (*Gulzar*, b: 9455)

Telmîha qisseya mûcîzeye Suleyman Pêxemberî ku ba li ber emrê wî bû.

*Asin te nerim dikir bû Dawud*
*Kuştî te bi bayî ʿAd ji bû Ḥûd* (*Gulzar*, b: 9454)

Telmîha bûyera hesinkarîya Dawûd Pêxemberî helakbûna qewmê Ad bi bayî.

*Agir te di kirye xûş û ṣar e*
*Ser xaṭirê Îbrahîmê yar e* (*Gulzar*, b: 9450)

Telmîha bûyera avêtina Îbrahîm Pêxemberî bo nav agirî û nesotina wî.

*Yunis te xilaṣ dikir ji masî*
*Yeʿqûbî bînahî lew kirasî* (*Gulzar*, b: 9456)

Telmîha xilasbûna Yunis Pêxemberî ji zikê masîyê û saxbûna çavên Yakûp Pêxemberî bi kirasê Yusif Pêxemberî.

*Yusif te dikir ji zelle qurtar*
*Burhan te nîşa wî da bû hişyar* (*Gulzar*, b: 9457)

Telmîha bûyera Yusif Pêxember û Zuleyxayê.

*Eyûb te ji paşî çendî salan*
*Gel çendî bela û êş û nalan* (*Gulzar*, b: 9458)

Telmîha êşa giran a Eyûb Pêxemberî.

*Westandî bû Yuşeʿî te xurşîd*
*Idrîs te bire meqamê temcîd* (*Gulzar*, b: 9460)

Telmîha mûcîzeya sekinandina rojê ya Yuşe'i Pêxemberî.

*ʿÎsayî te danê çen ʿecebkar*
*Ṣaẋ kireve bi tu mirî wî çen car* (*Gulzar*, b: 9461)

Telmîha mûcîzeya saxkirina mirîyan ya Îsa Pêxemberî.

*Meʿlûm wekî rojê ron diyar e*
*Ummî bu yeqîn ne xwûndewar e* (*Gulzar*, b: 9471)

*Wan dîtî heman bi çavê ser ew*
*Ew mahe temame bûyî du ker ew* (*Gulzar*, b: 9614)

*Ragirtibû roj di asemane*
*Ḥetta ku dihatve karewane* (*Gulzar*, b: 9650)

Di van her sê beytan da telmîha mûcîzeyên nexwendebûn, kerkirina heyvê û sekinandina rojê li esmana ya Muhemmed Pêxemberî heye.

*Sulṭanê mezin Muradê çarê*
*Ṣed feyḍ û kerem bû bêne xarê*

*Wî çêkireve cewan û muḥkem*
*Wek pêşî wî Keʿbeya muʿeẓẓem* (*Gulzar*, b: 2481-2482)

Telmîha bûyera restorasyona Keʿbeyê ji alîyê sultanê dewleta Osmanî Muradê Çarê.

*Westa bû li sîngê wan tebayî*
*Wek Rosteman bi canfîdayî* (*Gulzar*, b: 2947)

Telmîha lehengîya Rostemî.

*Ewṣafê di wî netên jimarê*
*Ew yarê Muḥemmedî di ẋarê (Gulzar, b: 271)*

Telmîha rêhevaltîya Ebûbekir û Pêxemberî ya şikeftê di dema koça Medîneyê da.

*Ya Reb tu min û xulamê Qur'an*
*Seydayê mezin melayê kurdan* (*Gulzar*, b: 612

Telmîha Seîdê Nûrsî.

*Ew meẓherê xûş xîṭabê "lewlak"*
*Sîrr û sebebê sucûdê emlak* (*Gulzar*, b: 13)

Telmîha hedîsa "lewlak" ê ku di vê hedîsê da Xwedê gotîye Pêxemberê xwe heke tu nebay min çi kes nediafirand.

*Her yek ku dibêjî: Nefsî nefsî*
*Ew dê çîte baregahê qudsî* (*Gulzar*, b: 8791)

Telmîh şefaeta Pêxemberî.

*Her kes xu bi karê xu rehîne*
*Hakim tu yî lê çi zulim nîne* (*Gulzar*, b: 111)

Bi rêya misra yekem a beytê "Her kes xu bi karê xu rehîne" telmîha ayeta 38 a sureya Mûderrîsê tê kirin.

### 2.4.11. Nîda

Nîda peyveke erebî ye û tê wateya qêrîkirin, bangkirin û gazîkirinê. Hin carên ku helbestkar gelek hestîyar bû û kelecana wî gelekî zêde bû ev huner derdikeve. Bi baneşanên "ey, ya, hey, wey û hwd." ev huner çêdibe (Ilı, 2019, 49). Şûşî di *Gulzarê* da gelekî zêde ev huner bikarînaye. Ji *Gulzarê* çend mînakên hunera nîdayê em dişên wiha rêz bikin:

*Ey fexrê cîhan û wildê Adem*
*Ey tacê serê cemîʿê ʿalem* (*Gulzar*, b: 120)
...
*Hingû bes e xû çi kes nemaye*
*Gûtin: Belê ey me xir fîda ye* (*Gulzar*, b: 10033)
...
*Ey navê te ye reḥîm û reḥman*
*Wey zikrê te ye şîfa û derman* (*Gulzar*, b: 2)

### 2.4.12. Rucû

Rucû, di wateya xwe ya ferhengî da, tê wateya vegeriyanê. Di wêjeyê da, ev huner ew e ku helbestvan an nivîskar ji gotineke xwe vedigere. Ev veger dibe ku vegerîna gotina berê be an jî betalkirina gotina berê û berêxwedana ramaneka nû jî be. Dema ku bi cih be, rucû hestên helbestvan xweştir nîşan dide û fikra sereke xurtir dike (Saraç, 2019, r. 193). Ev huner, hişê xwendevan jî hişyar dike û bandoreke xurt dide helbestê, ku ev yek di gelek berhemên wêjeyî da, bi zelalî tê dîtin. Di *Gulzarê* da mînakeke vê hunerê em dişên wiha bidin:

*Ellah ku çi navekê şirîn e*
*Gûtna wî ḥeyatê can û jîn e*

*Ey navê te ye reḥîm û reḥman*
*Wey ẕikrê te ye şîfa û derman* (*Gulzar*, b: 1-2)
...
*Her we bi Muḥemmedî me bawer*
*ʿEbdê te ye qaṣid û peyember*

*Serdarê hemû peyemberan ew*
*Serdefterê cumle serweran ew* (*Gulzar,* b: 9-8)
...
*Navê te Xudê çi tazenav e*
*Pîrûz e çi şûleka li nav e*

*Navê te ye ron dibin bi wî dil*
*Ẕikrê te ye hûn dibin bi wî dil* (*Gulzar,* b: 22-23)

Di beytên 1-8an da bi pesna Xwedê dest pê dike û metha wî û navên wî tên kirin. Şûşî di beytên 9-15an da ji pesna Xwedê derbasî Pêxemberî dibe û pesna Pêxemberî dide. Di beytên 36-38an careka di vedigere ser pesna Xwedê. Bi vî awayî hunera rucûyê hatiye bikaranîn.

### 2.4.13. Leff û Neşr

Leff û Neşr, di zanista bedîʿê da, yek ji wan huneran e ku bi rêkûpêkkirina hêmanên hevokê ve têkildar e û bedewiyê li wateyê zêde dike. Ev huner ji peyvên "leff", ku di ferhengê da tê wateya "civandin, pêçandin, tewandin" û "neşr", ku tê

wateya "belavkirin, raxistin", pêk tê. Bi kurtasî, di vê hunerê da, pêşî çend tişt bi hev re tên civandin (leff), paşê jî tiştên ku bi wan re eleqedar in, lê bi misrayeke cuda tên belavkirin (neşr) (Durmuş – Saraç, 2003, r. 122). Ev rêbaz, ji bo ku peyam zelaltir bibe û bandoreke estetîk li ser xwîner çêbike, tê bikaranîn. Di *Gulzarê* da çend mînakên vê hunera em dişên wiha rêz bikin:

*.Nisbet nîye şîr û hingivînî*
*Bew rengê sipî û bew şirînî* (*Gulzar*, b: 4727)

Di vê beytê da, pêşî "şîr" û "hingivîn" hatine rêzkirin (leff). Paşê, bi rêzê ve taybetmendiyên wan ên sereke hatine destnîşankirin: "şîr" bi "rengê sipî" ra û "hingivîn" jî bi "şirînî" ra hatine girêdan (neşr).

*Ev sal û zeman û ev şev û roj*
*Ev nûr û ẓelam û cennet û doj* (*Gulzar*, b: 90)

Di vê beytê da jî, di misraya yekem da çar tişt hatine rêzkirin: "sal", "zeman", "şev" û "roj" (leff). Di misraya duyem da jî çar têgînên pêwendîdar hatine belavkirin: "şev" bi "ẓelam" (tarîtî) ra, "roj" bi "nûr" (ronahî) ra û "sal û zeman" jî bi "cennet û doj" (bihuşt û dojeh) re hatine girêdan. (neşr)

**2.4.14. Tenasûb**

Tenasûb di wêjeyê da hunereke bedewiyê ye ku tê da peyvên bi hev re têkildar û hevaheng, di nav beyt an jî nivîsekê da, bi zanebûn tên cem hev. Armanca vê hunerê ew e ku di navbera peyvan da ahengeka wateyî çêbike, da ku peyam hêj bihêztir û xweştir bigihîje xwendevanan. Peyvên ku tên hilbijartin divê ne dijber bin, belkî hev temam bikin û heman mijar an hestê bînin bîra mirovî. Mînakên hunera leff û neşr ê di heman demê da dibin mînakên tenasûbê jî (Saraç, 2019, r. 163). Bi vî awayî, tenasûb, kûrahiyê li wateyê zêde dike û bandora estetîkî ya nivîsê zêde dike. Di *Gulzarê* da gelek mînakên vê hunerê hene. Çend mînakan em dişên wiha rêz bikin:

*Ey destegulê ḥedîqeyê raz*
*Wey bilbilê baẋê ʿizzet û naz* (*Gulzar*, b: 7957)

Di vê beytê da, peyvên wekî "destegul" (guldest), "ḥedîqe" (baxçe), "bilbil" û "baẋ" (baxçe) bi hev re têkildar in.

*Dê ron biketin cîhanê ṭarî*
*Qurtar diketin ji pûçekarî* (*Gulzar*, b: 1558)

Di vê beytê da, peyvên wekî "ron" (ronahî) û "ṭarî" bi hev re têkildar in, ji ber ku ew du rewşên dijber ên cîhanê ne. "Qurtar" (rizgarkirin) û "pûçekarî" (pûçî) jî bi hevra têkildar in, ji ber ku rizgarkirin ji rewşek nebaş an pûç e.

*Ey lêv tenikê didan biçik fir*

*Rewneq wekî ṭerg û luʾlû û dur* (*Gulzar*, b: 7993)

Di vê beytê da, peyvên wekî "lêv" û "didan" bi peyvên "rewneq" (ronahî), "ṭerg" (sedef), " *luʾlû*" (morî) û "dur" ra di nav têkiliyeke ahengdar da ne. Lêv û didan endamên bedewiyê ne û sedef, morî û dur jî tiştên bi qîmet û geş in ku bedewî û ronahiyê îfade dikin.

### 2.4.15. Husnê Teʿlîl

Husnê teʿlîl ew huner e ku sedema bûyer yan jî rewşekê ji bo ku xweşikîyeke gotinê ava bike bi sedemeke xeyrî sedema ʿeslî ve girêdane. Di vê hunerê da li şûna sedema eqlî û zanyarî sedemeke xeyalî ya helbestvanî heye (Saraç, 2019, r. 239). Di *Gulzarê* da Şûşî ev hunere jî bikarînaye. Wekî mînak:

*Ev kevnedinê ji nû bû ava*

*Gava ve biçûke dît bi çava* (*Gulzar*, b: 1550)

Di vê beytê da sedema ji nûve avabûna dinyayê wekî jidayîkbûna Pêxemberî (s.x.l) hatiye nîşandan.

*ʿAlî neseb î mezin ṣifat î*

*Dunya vejî lew dema tu hatî* (*Gulzar*, b: 132).

Dîsa di vê beytê da sedema vejîna, zindîbûna dinyayê wekî hatina Pêxemberî (s.x.l) hatiye nîşandan.

### 2.4.16. Mubalexe

Hunera mubalexeyê, ji bo zêdekirina bandora bûyerek, rewşek an taybetmendiyekê, nîşandana wê ji ya heyî pir mezintir an pir piçûktir e (Tok, 2011: 189). Ev hunera axaftinê, ku wekî mezin kirin jî tê zanîn, di nivîsên wêjeyî û di zimanê rojane da ji bo xurtkirina îfadeyê, balkêştirkirina vegotinan an jî ji bo afirandina bandoreke henekî tê bikar anîn. Di *Gulzarê* da hunera mubalexeyê wekî mînak wiha hatiye bikaranîn:

*Ew newʿe xewariqêt diyare*

*Geştîne jimarê yek hizar e* (*Gulzar*, b: 9467)

Di vê beytê da Şûşî ji bo ku pirrbûna mucîzeyên Pêxemberî nîşan bide dibêje Pêxemberî ewqas zêde mucîze hene ku hejmara wan gehiştiye hizaran.

*Seyrê ke ji ʿilmê ew çewa ne*

*Navê wî tijî kuṛey cîhane* (*Gulzar*, b: 9484)

Di vê beytê da Şûşî ji bo ku mezinîya ilmê Pêxemberî nîşan bide dibêje ilmê wî ewqas zêdeye ku navê li hemî cîhanê belav bûye û li her derê cîhanê tê nasîn.

*Çil sal bû çewa dibêjî lal e*

*Evroke ji nutqê bê mîs̱al e* (*Gulzar*, b: 9486)

Di vê beytê da Şûşî ji bo ku nîşan bide ku Pêxemberî berîya Pêxemberîya xwe çi xwendin nekiribû dibêje di 40 salên berîya Pêxemberîyê ew wisa bû ku mirov dibêje ew yê lal e û çi gotin ji devê wî derneketîne.

### 2.4.17. Tecahula ʿArif

Tecahula arif, hunerek e ku tê da rastiyek tê zanîn, lê mirov xwe ser ve dibe anku xwe wekî nizane nîşan dide da ku vegotinê xurtir bike. Armanc, ne nezanî ye, lê zêdekirina bandor û kûrahiyê ye (Saraç, 2019: 235). Helbestvan, tiştekê ku dizane, wekî ku nizane tevdigere da ku balê bikêşîne û ramanê bi bandortir bike.

*Nuke bi cebir dibîne ʿesker*

*Ma qeṭ di cîhan dibîne mîrser* (*Gulzar*, b: 831)

Di vê beytê da Şûşî her çend dizane jî ku ger milletek dildarê dewleta xwe nebe û bi zorê biçe eskerîyê em nikarin bibin hukimran jî xwe we dide nîşan ku ew nizane.

*Ey serwerê ʿalem û serê tac*

*Bû kê dî bijil te bûye mîʿrac* (*Gulzar*, b: 172)

Di vê beytê da jî Şûş her çend dizane ku tene Pêxember çûye miracê jî xwe we nîşan dide ku ew nizane.

### 2.4.18. Îstîfham

Îstîfham, di wêjeyê da hunerek e ku tê da bi pirsan, lê ne ji bo bersivê, lê ji bo xurtkirina gotinê û vegotina hestekê tê bikar anîn. Ev pirsên ku bersiva wan tê zanîn an jî ne hewceyê bersivê ne, ji bo afirandina bandorek dramatîk an jî ramanê têne pirsîn (Saraç, 2019: 235). Armanc ew e ku xwendevan bifikire û bi vegotinê re eleqedar bibe. Di van beytên jêrîn da Şûşî hunera îstîfhamê bikaranîye.

*Ger ew dişiyan bi tazerenge*

*Ma wan ku dikir cîdal û cenge* (*Gulzar*, b: 9538)

*Ma kes dibitin şiyuʿî gava*
*Îslam bi zekat bibîtve ava* (*Gulzar*, b: 774)

### 2.4.19. Tarîx

Hunera tarixê danînê di wêjeyê da, hunerek e ku tê da dîroka bûyerekê bi rêya nirxên hejmarî yên tîpan (hesaba ebcedê) di nava helbestê da tê veşartin. Helbestvan, bi bijartina peyvan, berhevoka nirxên ebcedî yên tîpan dike ku bi sala bûyerê re wekhev be (Saraç, 2019: 309). Ev huner zîrekî dixwaze û wekî şîfreyeke helbestî tê zanîn. Di hin deran jî helbestvan bi aşkera dîroka bûyerekê dinivîse ji vî cureyî Tarîxên Aşkere tê gotin (Ilı, 2019: 74). Di *Gulzarê* da mînakên tarîxên aşkere hene. Wekî mînak:

*Hîcret digehişte sal çil û çar*
*Canê xû siparte şahê ẋeffar* (*Gulzar*, b: 9117)

Di vê beytê da behsa mirina xanima Pêxemberî Remla kiça Ebû Sûfyan tê kirin. Dibêje wê di 44ê Hîcrî da wefat kirîye.

*Umrê wê gehişte şêst û şeş sal*
*Bu pêncî û heştê hîcreta ʿal* (*Gulzar*, b: 5015)

Di vê beytê da behsa sala wefata xanima Pêxemberî Aîşayê dike. Dibêjê wê di 66 salîya xwe da di sala 58ê Hîcrî da wefat kirîye.

### 2.4.20. Îrsala Mesel

Îrsala mesel an îrada mesel, di wêjeyê da hunerek e ku tê da ji bo xurtkirina ramanekê an îspatkirina, gotineka gelêrî, biwêj an jî metelokek tê zanîn, di nava nivîsê da tê bikaranîn (Saraç, 2019: 285). Ev huner, gotinê bibandortir, pêbawertir û kûrtir dike. Gotina bikaranînî, ramanê zelaltir dike û dihêle ku di hişê xwendevan da cih bigire. Di *Gulzarê* da ev hunere di gelek cihan da hatiye bikaranîn. Çend mînakên vê hunêrê di *Gulzarê* da em dişên wiha rêz bikin:

*Dûstê xu bira bizane hîngî*
*Gava tu ketî deravê ṭengî* (*Gulzar*, b: 1060)

Di vê beytê da rasterast gotineka pêşîyan hatîya bikaranîn.

*Dara tu ji nû bi dest biçînî*

*Dêşêy bi tinê ji bin derînî* (*Gulzar*, b: 3541)
Di vê beytê da rasterast gotineka pêşîyan hatiye bikaranîn.

*Babet niye her kesî gula geş*
*Kerṭebʿî nevêt ji ẋeyrî kerbeş* (*Gulzar*, b: 6126)
Dîsa di vê beytê da jî gotineka peşîyan rasterast hatiye bikaranîn.

### 2.4.21. Sîhra Helal

Di vê hunerê da peyvek yan komepeyvek di dawîya misraya yekem a beytê da tê bikaranîn û ew hem gotinên berî xwe hem jî yên misraya duyem watedar dikin (Saraç, 2019: 307). Di *Gulzarê* da çend mînakên vê hunerê em dişên wiha rêz bikin:

*Bê mîs̱al e ʿUmer xelîfê s̱anî*
*Ustaẕê kemal û ḥukimranî* (*Gulzar*, b: 290)

*Ew dînê li ser bû Îbnû Meryem*
*Nik wan nebû bijlî nav di ew dem* (*Gulzar*, b: 2529)

*Ew dînê li nik Xudê ke îslam*
*Têk da bû ewan qeşan bi nakam* (*Gulzar*, b: 2530).
Di beyta yekem da "*ʿUmer xelîfê s̱anî*" hem wateya misraya temam dike hem jî misraya duyem watedar dike. Di beyta duyem da "*Îbnû Meryem*" hem wateya misraya temam dike hem jî misraya duyem watedar dike. Di beyta sêyem da jî "*îslam*" hem wateya misraya temam dike hem jî misraya duyem watedar dike.

### 2.4.22. Tekrîr

Di vê hunerê da ji bo ku bandora peyvê an gotinê bihêztir bibe peyv an jî gotin tê dubarekirin. Di vê hunerê da armanc, ne tenê dubarekirina sade armanca sereke ew e ku bi vê dubarekirinê vegotin bi bandortir û kûrtir bibe. Di *Gulzarê* da ev huner gelek tê dîtin. Çend mînakan ji *Gulzarê* bo vê hunerê em dişên wiha rêz bikin:

*Her ḥemd û s̱ena û şukr û minnet*
*Her bû te Xudê xudanê reḥmet* (*Gulzar*, b: 3)
Di vê beytê da peyva "*her"* tê dubarekirin û bi vî awayî bandora vegotinê zêdetir dibe.

*Ev ʿerḍe û aseman seraser*

*Ev ḥîkmet û ev wicude yekser* (*Gulzar*, b: 2494)

Di vê beytê da peyva "*Ev"* tê dubarekirin û bi vî awayî bandora vegotinê zêdetir dibe.

*Geh karê ewan revan û talan*

*Geh cengê giran di çendî salan* (*Gulzar,* b: 2510)

Di vê beytê da peyva "*geh"* tê dubarekirin û bi vî awayî bandora vegotinê zêdetir dibe.

### 2.4.23. Asonans

Asonans, di wêjeyê da hunereke edebî ye ku bi dubarekirina dengên dengdêran çê dibe. Ev dubarekirina dengan, ahengeka navxweyî û muzîkalîteyekê dide hevok an rêzan. Armanca wê ew e ku vegotinê dewlemend bike, balê bikêşîne ser hin peyvan û bandorek estetîkî li ser xwîner çêbike. Di *Gulzarê* da çend mînakên vê hunerê em dişên wiha rêz bikin:

*Ell**a**h ku çi n**a**vekê şirîn e*
*Gûtn**a** wî ḥay**a**tê c**a**n û jîn e* (*Gulzar*, b: 1).
Di vê beytê da bi dubarekina dengê "a"yê asonans hatiye çêkirin.

*Haḏir tu li ser dilan req**î**b **î***
*Şahid tu li kull**î** kes**î** qer**î**b **î*** (*Gulzar*, b: 6)
Di vê beytê da bi dubarekina dengê "î"yê asonans hatiye çêkirin.

*Y**e**k fiṭr**e** h**e**bû ji c**e**h m**e** kir ar*
*Dab**e**stiyeke q**e**l**e**w jî b**e**zdar* (*Gulzar*, b: 10136)
Di vê beytê da bi dubarekina dengê "e"yê asonans hatiye çêkirin.

### 2.4.24. Alîterasyon

Aliterasyon, di wêjeyê da hunereke edebî ye ku bi dubarekirina dengên bêdeng (konsonant) tê çêkirin. Ev dubarekirina bêdengan, vegotinê zindî dike, ahengeka taybet dide hevokan û helbestan (Tok, 2011: 35). Armanca wê ew e ku balê bikêşîne ser peyvên hilbijartî, bîranîna wan hêsan bike û bandorek muzîkal li ser xwîner çêbike.

*Ḥe**tt**a ku biçî**t** hizar hizaran*
*Van nîʿme**t** û lu**ṯ**f û **t**azekaran* (*Gulzar,* b: 2498)
Di vê beytê da bi dubarekina dengê "t"yê asonans hatiye çêkirin.

***B**arî **b**û **b**eşeṛ kirîn **b**i carek*
*Ḥetta ku **b**eşeṛ **b**ijît mu**b**arek* (*Gulzar,* b: 2499)
Di vê beytê da bi dubarekina dengê “b”yê asonans hatiye çêkirin.

*Se**r**şo**r** û xisa**r**et û gunehka**r***
*Ba**r**ê gunehan gi**r**an e êkca**r*** (*Gulzar*, b: 45)
Di vê beytê da bi dubarekina dengê “r”yê asonans hatiye çêkirin.

### 2.4.25. Tersîʿ

Tersîʿ wekî têgeha ʿilmê bedîʿê tê wateya “bi mercan û zêrên biqîmet xemilandina her du alîyên gerdanî ye”. Di wêjeyê da ew huner e ku bi rêkûpêkkirina hevok an beşên wan ên hevseng û paralel pêk tê (Durmuş, 2011. 110). Di vê hunerê da, peyvên di nava rêz an hevokê da, li gorî hejmara tîpan, giraniyê, an jî serwayê li hev tên û ahengeka taybet diafirînin. Ev hevsengiya dengî û avahîsazî, tesîreka estetîk a xurt dide nivîsê û wateyê zêdetir dewlemend dike. Çend mînakên vê hunerê di *Gulzarê* da em dişên wiha bidin.

*Navê te ye ron dibin bi wî dil*
*Ẕikrê te ye hûn dibin bi wî dil* (*Gulzar,* b: 23)

*Kes nîne bibet eger bidey tu*
*Kes nîne bidet eger bibey tu* (*Gulzar,* b: 100)

*Dûr in ji rîya seʿadetê ew*
*Kûṛ in ji rîya hîdayetê ew* (*Gulzar,* b: 2506)
Di van her sê beytan da jî ji alîyê hejmara tîpan eynî ne û ji bilî serwayên dawîya misrayan serwayên nîveka misrayan da jî hene. Bi vî şiklî di navbera misrayên yekem û duyem hevsengîyeke baş heye ku ev jî dibe hunera tersîʿê.

### 2.4.26. Teşrîʿ (Zul Kafiyeteyn)

Teşrîʿ, di wêjeyê da hunereke bedîʿê ye ku tê da, li gel sîstema wezn û serwaya sereke ya helbestê, di nava beytan da du an zêdetir rêzikên serwayê tên avakirin. Ev yek tê wateya ku di beytekê da çend serwa li gor wezneka cuda li hev tên û ahengek zêde didin nivîsê. Ji bo vê hunerê ji *Gulzarê* em dişên van mînakan bidin:

*Her çî tu bidey û yan nedey tu*
*Her çî tu bibey û ger nebey tu* (*Gulzar,* b: 94)

Di vê beytê da, her misrayek du serwayên cuda dihewîne (mînak, "bidey-nedey" û "bibey-nebey").

*Ew carê diken xuday xû ʿÎsa*
*Gel hindê diken fîday xû ʿÎsa* (*Gulzar*, b: 2538)

Di vê beytê da, her misrayek du serwayên cuda dihewîne (mînak, "diken-diken" û "ʿÎsa-ʿÎsa".

*Carek dî diken kuṛê Xudê ew*
*Carek dî diken wî êk ji sê ew* (*Gulzar,* b: 2539)

Di vê beytê da, her misrayek du serwayên cuda dihewîne (mînak, "diken-diken" û "ew-ew".

### 2.4.27. Teʿrîz

Teʿrîz, di wêjeyê da hunereke edebî ye ku tê de, mirov behsa mijarekê bi awayekê nerasterast, bêyî ku navê wê aşkere bike, dike. Ev huner bi armanca rexneyek nerm, tinazî, an jî peyameke veşartî tê bikaranîn û ji xwîner an guhdar re tê hiştin ku wateya wê ya veşartî fêm bike (Durmuş, 2002: 35). Bi vî awayî, vegotin kûrtir dibe û li ser bîra xwîner bandorek mayînde dihêle. Di *Gulzarê* da ev huner wekî mînak bi vî awayî hatiye bikaranîn:

*Romî di ʿeqîdeyê di hu bûn*
*Emma bi ʿemel nepirse ku bûn* (*Gulzar,* b: 2544)

Di vê beytê da Şûşî di misraya yekem da behsa bawerî ya feleyan ya xirab dike lê di ya duyem da wan rexne dike û dibêje emelên wan hêj ji bawerîya wan xirabtir e.

*Ev cewherê kes nedîtî însan*
*Nêzîk bû biçîte rêzê ḥeywan* (*Gulzar,* b: 2501)

Di vê beytê da Şûşî di misraya yekem da methên însanî dike lê di misraya duyem da bi awayekê veşartî rexneyê li însanî dike.

*Axa ne beg in çi mîr û xan in*
*Ew ser serê wan ẋedir giran in* (*Gulzar,* b: 4181)

Şûşî di vê beytê da behsa çend şexsîyetên ji kurda dike û wan wekî axa, beg, mîr û xan pênase dike lê di misraya duyem da ji ber zordarîya wan bi awayekê veşartî wan rexne dike.

### 2.4.28. Cînas

Wateya ferhengî ya cînasê hevşibîna du yan zêdetir tiştan e. Wekî hunera edebî li ser bikaranîna peyv an hevokên ku di dengî da dişibin hev lê di wateyê da cuda ne, tê avakirin. Armanca cînasê, afirandina lîstikeka peyvan e ku dikare bandoreke henekî, îronîk, an jî kûrahiyeke wateyî çêbike. Ew dikare bibe cînasa temam (gava peyv bi tevahî yek bin lê maneyên wan cuda bin) an jî cînasa ne-temam (gava peyv di dengekî da nêzîkî hev bin lê cuda bin) (Saraç, 2019: 251-253). Di *Gulzarê* çend mînakên vê hunerê em dişên wiha rêz bikin:

*Zu be tu herev lîqayê Barî*

*Da bu te sivik biket vî barî* (*Gulzar,* b: 4475)

Di vê beytê da jî cinasa basît hatiye bikaranîn lewra di navbera her du bêjeyan (Barî- barî) da ji aliyê şiklî ve wekheviyek tam heye. Lê wateya her du bejeyan jî ji aliyê wateyê ve cuda ye. Di misraya yekem da “Barî” yek ji navên Xwedê ye di misraya duyem da barî lêkera “barîn” ê ye.

*Her dem li ruḥa wî têr bibarî*

*Luṭf û kerem û selam ji Barî* (*Gulzar,* b: 4309)

Di vê beytê da cînasa ne tam hatiye bikaranîn ji ber ku di navbera her du bêjeyan (bibarî-Barî) da ji aliyê şiklî ve nêzîkîyek heye lê hejmara herfên wan cuda ne. Di misraya yekem da *bibarî* lêkera “barîn” ê ye lê di misraya duyem da “Barî” yek ji navên Xwedê ye.

*Ew yê xeliqandî mêş û pêşik*

*Dê fîlî bişêt bigêrî bê şek* (*Gulzar,* b: 4337)

Di vê beytê da cînasa ne tam hatiye bikaranîn ji ber ku peyvên "pêşik" û "şek" her çend di dengekî da dişibin hev jî, ew di nivîsandinê da cuda ne û wateyên wan jî bi tevahî cuda ne.

### 2.4.29. Îştîqaq

Îştîqaq hunereke edebî ye ku tê da peyvên ji heman reh (kok) an malbata peyvan, lê bi wateyên cuda, di heman hevok an beytê da tên bikaranîn. Armanca vê hunerê ew e ku girêdaneka wateyî di navbera wan peyvan da bê nîşandan û bandoreke estetîkî çêbibe (Tok, 2011: 136). Di *Gulzarê* da çend mînakên vê hunerê em dişên wiha rêz bikin:

*Eṣḥabê Resûl şirîn xîṣal in*
*Ṣaḥib huner in xudan kemal in* (*Gulzar*, b: 212)

Di vê beytê da peyvên "*Ṣaḥib*" û "*Eṣḥab*" ji heman reha erebî ya (ص ح ب - ṣ-ḥ-b) tên ku wateya vê rehê hevaltî û xwedî bûn e.

*Ey nûr û çirayekê mûnîr î*
*Mizgîn derê ʿalem û neẓîr î* (*Gulzar*, b: 133)

Diş vê beytê da peyvên "*nûr*" û "*mûnîr*" ji hema reha erebî ya (ن و ر - n-w-r) tên ku wateya vê rehê ronahî, ronahîkirin e.

### 2.4.30. Muwazene

Muwazene hunereke edebî ye ku tê da du an jî zêdetir hevok an jî beşên hevokan ji hêla dirêjahî, hejmara peyvan, ritm, an jî avahiya rêzimanî ve bi hevsengî têne sazkirin (Saraç, 2019: 264). Armanca wê ew e ku di nivîsê da aheng, hevsengî û bandoreke estetîkî çêbibe. Di van beytên *Gulzarê* da ev huner hatiye bikaranîn:

*Navê te gelek şirîn e ya Reb*
*Luṭfa te gelek berîn e ya Reb* (*Gulzar*, b: 28)

Di van her du misrayan da, avahîya hevokê ("...te gelek...e ya reb") û ritm bi awayekê tam paralel in, hevsengiyekê çêdikin

*Mewlayê me yî tu dilnewaz î*
*Rebbê me tu yî tu karîsaz î* (*Gulzar*, b: 36)

Di van her du misrayan da, avahîya hevokê ("...me yî tu.. û ...î") û ritm bi awayekê tam paralel in, hevsengiyekê çêdikin

### 2.4.31. Redulʿecuz ʿElessedr

Ev huner, di helbest an pexşanê da, hunereke zimanî ye ku tê da peyvek li dawiya hevokê û heman peyv an peyveke ji heman kokê, di destpêka wê hevokê da tê dubarekirin (Durmuş, 2007: 521). Armanca vê hunerê ya sereke ew e ku gotinê xweşiktir bike û peyamê xurttir bike. Di *Gulzarê* da çend mînakên vê hunerê em dişên wiha bidin:

*Navê te ye ron dibin bi wî dil"*
*"Ẕikrê te ye hûn dibin bi wî dil* (*Gulzar*, b: 23)

Di vê beytê da peyva "dil" di dawîya beytê da tê bikaranîn lê di heman demê da ev peyv berîya wê di misraya yekem da jî hatiye bikarînan.

*Navê te gelek şirîn e ya Reb*

*Luţfa te gelek berîn e ya Reb* (*Gulzar*, b: 28)

Di vê beytê da peyva “Reb” di dawîya beytê da tê bikaranîn lê di heman demê da ev peyv berîya wê di misraya yekem da jî hatiye bikarînan.

### 2.4.32. Îade

Di vê hunerê da peyva dawîya beytekê dibe peyva yekem a beyta piştî xwe (Saraç, 2019: 269. Di *Gulzarê* da mînakeke vê hunerê em dişên wiha bidin:

*Serdarê hemû peyemberan ew*

*Serdefterê cumle serweran* ***ew"***

***Ew*** *rohnîyê afitabê reḥmet*

*Ew durrê giran buhayê xilqet* (*Gulzar*, b: 10-11)

Dawîya beyta 10ê bi peyva “ew” xilas dibe û destpêka beyta 11ê jî bi “ew”ê dest pê dike.

### 2.5. Şewaza Zanistî di *Gulzarê* da

Taybetmendîyeke herî giring a *Gulzarê* şêwaza wê ya zanistî ye. Her çend ku *Gulzar* berhemeke edebî be jî Şûşî ew bi şêwaza zanistî nivîsandîye. Berî ku dest bi vekotina bûyerê bike pêşgotinek bo berhema xwe nivîsandîye, plana nivîsandina berhema xwe dîyar kirîye, wateya îşaret û herekeyên ku bi berhema xwe da bi kar înane dîyar kirîne û beşeke taybet ji bo çavkanîyên berhema xwe veqetandîye û tê da behsa çavkanîyên xwe yên sereke û alîkar kirînê. Di vê beşê da, çavkaniyên ku Şêx Tahirê Şûşî di nivîsandina sîyernameya xwe ya menzum, *Gulzarê* da, sûd jê wergirtiye, li gorî qadên pisporiya zanistên îslamî û kartêkîya berhemên wan di wêjeya sîyerê da, bi awayekê tematik hatine komkirin û lêkolînkirin. Ev tasnîf, bikaranîna berfireh a çavkaniyan a Şûşî û cihê wî di kevneşopiya nivîsandina sîyerê da bi awayekê sîstematîktir nîşan dide

### 2.5.1. Qurana Kerîm

Qurana Pîroz, ji bo famkirina jiyan û kiryarên Pêxemberî (s.x.l.), çavkaniya bingehîn e. Ji ber ku gelek ayetên wê bi bûyer û rewşên dîrokî re têkildar hatine daxistin, ew herika bûyerên sîyerê û sedemên wan bi zelalî destnîşan dike. Bi vî awayî, Qur᾿an hem şêwaza jiyana Pêxemberî û hem jî nirxên exlaqî û hînkirinên wî pêşkêş

dike. Şûşî jî di *Gulzarê* da, Qurana Pîroz wekî çavkaniyeke bingehîn bi kar aniye. Di *Gulzarê* da, referansên ji ayetên Quranê bi awayên cûrbecûr hatine dayîn. Awayên bikaranîna ayetan di *Gulzarê* da em dişên wiha dabeş bikin:

**Rasterast Îqtîbaskirin:** Şûşî, di berhema xwe da hin ayet rasterast bikaranîne. Wekî mînak, ayeta 90 a sûreya Nehlê, ayeta 13 a sûreya Fussîletê û ayetên 23-24 ên sûreya Beqereyê, rasterast di "*Gulzar*"ê da derbas dibin. Wekî mînak di van beytên jêrîn da ayetek (Nehl, 90) rasterast derbas dibe.

*"Ellah e emir diket bi îḥsan*
*Çakî û ʿedaletê bi însan*

*Gel xizm û kesan gelek bi çakî*
*Parêzê ji feḥşî û nepakî*

*Her karê ḥeram û ẋedr û har e*
*Ev renge Xudê neşîḥekar e"* (*Gulzar,* b: 9571-9573)

**Telmîh û Îqtîbasên Edebî:** Şûşî, bi bikaranîna hunerên edebî yên wekî telmîh û îqtîbas, îşaret bi hin ayetan kiriye. Ev nêzîkatî, ji bo dewlemendkirina wateya ayetan û zêdekirina kûrahiya metnê hatiye sepandin. Wekî mînak di beyta jêrîn da bi peyvên "*nefsî nefsî*" ve hunera telmîhê tê bikaranîn. Şûşî bi van peyvan ve îşareta roja qîyametê dike ku dê wê rojê her kesek bikevîte derdê xwe û haya wan ji kesekê dî namîne.

*Her yek ku dibêjî: Nefsî nefsî*
*Ew dê çîte baregahê qudsî* (*Gulzar,* b: 8791)

**Sernavên Beşan:** Şûşî, serê her beşekê (mêrg, rewde) bi hin ayetên Quranê xemilandiye. Ev ayet, naveroka beşa têkildar nîşan didin û xwendevanan ji bo mijarê amade dikin. Ev ayet tenê bi erebî hatîne nivîsîn. Wekî mînaka jêrîn da Şûşî bi ayeta 4 a sureya Qelemê "*Û bi rastî jî, tu (Muhemmed) li ser exlaqekî mezin î."* dest bi Mêrga Pêncê dike û di vê mêrgê da behsa exlaqê Pêxemberî dike.

*"We înneke leʿela xuluqîn ʿezîm" (Qelem, 4)* Destpêka Mêrga Pêncê

**Bîsmîllah:** Hemû beşên *Gulzarê* (Muqeddîme, Merga 1, 2, 3 û 5) bi "*Bîsmîllahîrreḥmanîrreḥîm*"ê dest pê dikin. Ev yek, wekî ku di kevneşopiya Îslamî da

asayî ye, prensîba destpêkirina her karekî baş bi navê Xwedê destnîşan dike. Wekî mînaka jêrîn 5 bîsmîllah di *Gulzarê* da derbas dibin.

*"Bîsmîllahîrreḥmanîrreḥîm" (Mêrga Pêncê)*

Ev helwesta Şûşî, diyar dike ku "*Gulzar*" ne tenê vegotineka dîrokî ye, lê di heman demê da berhemeke dînî ye ku di bin ronahiya Quranê da hatiye nivîsîn. Bikaranîna ayetên Quranê, hem bedewiyeke edebî li berhemê zêde kiriye, hem jî teqezî li ser wê yekê kiriye ku naveroka wê bi prensîbên bingehîn ên Quranê ra hevaheng e.

**2.5.2. Hedîs**

Nivîskarên di vê beşê da stûnên bingehîn ên zanista hedîsê ne û di berhemên xwe da bi hûrgulî gotin, kirin û erêkirinên Pêxemberî (s.x.l.) berhev kirine. Ev nivîskar û berhemên wan, ji bo vegotinên sîyerê, zemînekê rîwayetê yê saxlem pêşkêş dikin. Di van berheman da hûrgiliyên bûyeran, sepanên Pêxemberî û helwestên sehebîyan têne vegotin. Şûşî ji bo nivîsandina *Gulzarê* herî zêde ji van 17 muheddîsan sûd wergirtîye. Di vê beşê da muheddîsên çavkanîyên *Gulzarê* li gorî rêza kronolojîk hatine rêz kirin.

**2.5.2.1. Îbnû Wehb (Ebdullah b. Muslîm, w. 197/812)**

Îbnû Wehb yek ji çavkanîyên *Gulzarê* yê herî kevn e. Îbnû Wehb li Misrê hatiye dinyayê. *El-Camiʿ fîl-Hedîs*, yek ji pêşengên berhevokên hedîsan ên serdema destpêkê ye. Beşa *Kîtabûl-Mexazî* rîwayetên sîyerê yên berî Îbnû Îshaq dihewîne. Wekî xwendekarê Malik b. Enes, ekola Medîneyê temsîl dike (Köse, 1999, r. 441-442). Şûşî di beşa mucîzeyên Pêxemberî da ji rîwayeteka wî sûd werdigire. Di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Hem Îbnû Weheb diket rîwayet*
*Vê muʿcîzeyê bi piṛṛ dîrayet* (*Gulzar*, b: 9913)

**2.5.2.2. Seʿîd b. Menṣur (w. 227/842)**

Seʿîd b. Mensur yek ji çavkanîyên *Gulzarê* yê pêşîn e. Seʿîd b. Mensur li Xorasanê hatiye dinyayê. Berhema wî ya windabûyî ya bi navê "Sûnen", yekem xebata sîstematîzekirina rîwayetên Ebû Hureyre ye. Ji perçeyên ku gihîştine roja me, rîwayeta "Xezwetul Ḥudeybiyê", zimanê resen ê bendên peymanê diparêze. Yek ji çavkaniyên rasterast ên Buxarî ye (Efendioğlu, 2008, r. 562). Şûşî di beşa mucîzeyên Pêxemberî da ji rîwayeteka wî sûd werdigire. Di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Hem bu me dibêt Seʿîdê Menṣur*
*Fermanê Ebû Hureyre piṛṛ nûr* (*Gulzar*, b: 9905)

#### 2.5.2.3. Ehmed b. Henbel (w. 241/855)

Ehmed b. Henbel li Bexdayê hatiye dinyayê, damezrênerê mezheba Henbelî ye. Berhema wî ya bi navê *el-Mûsned*, bi 28.000 hedîsan yek ji berhevokên hedîsan ên herî mezin e. Rîwayeta bi jimareya 1308 ya derbarê rola Îmam Elî di fetihkirina Xeyberê da, dînamîk û taktîkên şeran bi hûrgilî vedibêje. Beşa berhemê *Fedaîlus Sahabe*, di warê biyografiyên sehebîyan da dewlemend e (Kandemir, 1989, r. 82-85). Henbel yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye û Şûşî di beşa mucîzeyên Pêxemberî da ji rîwayeteka wî sûd werdigire. Di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Eḥmed kuṛê Ḥenbel û Nesaî*
*Her du ji Enes dibên tebayî* (*Gulzar*, b: 9956)

#### 2.5.2.4. Darimî (Ebdullah b. Ebdurrehman, w. 255/869)

Darimî, li Semerqendê hatiye dinyayê. *Sûnenûd Darimî*, yek ji berhevokên hedîsan ên serdema destpêkê yên herî kurt e. Beşa *Kîtabûs Siyer* 412 rîwayetên derbarê sîstema civakî ya dema Medîneyê dihewîne. Bi zincîreyên xwe yên îsnadê yên kurt û nebûna rîwayetên qels, balê dikêşîne (Aydınlı, 1993, r. 494-495). Darimî yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ê pêşînê û Şûşî di beşa mucîzeyên Pêxemberî da ji rîwayeteka wî sûd werdigire. Di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Hem hatî ji Daremî xudênas*
*Yê gûtî cenabê Îbnû ʿEbbas* (*Gulzar*, b: 10064)

#### 2.5.2.5. Îmam Buxarî (Muhemmed b. Îsmaîl, w. 256/870)

Îmam Buxarî, li bajarê Buxaraya Xorasanê hatiye dinyayê. Bi metodolojiya xwe ya hûrbîn di zanista hedîsê da tê naskirin. Berhema wî ya bi navê *el-Camîus Sehîh* (Sehîha Buxarî), bi 7.275 hedîsan, yek ji berhevokên hedîsan ên herî pêbawer ên Îslamê ye. Beşa *Kîtabul Mexazî*, stratejiyên leşkerî yên şerên Bedr û Uhudê, eslê fikra kolandina xendekê û biryarên şer ên Pêxember (s.x.l) bi awayekê sîstematîk dinivîse. Ev berhem, di nivîsandina sîyerê da çavkaniyeke bingehîn e ku çarçoveyeke kronolojîk pêşkêş dike (el-Aʿzamî, 1992, r. 368-372). Sehîha Buxarî, ji nav berhemên hedîsan da çavkanîya herî giring a *Gulzarê* ye. Di *Gulzarê* da 26 cihan da rîwayetên wî derbas dibin. Wekî mînak:

*Her wekî ji me ra dibêt Buxarî*

*Reḥmet li me û li wan bibarî* (*Gulzar*, b: 2419)

#### 2.5.2.6. Îmam Muslîm (Muslîm b. Heccac, w. 261/875)

Muslîm, li Nîşabûrê hatiye dinyayê. *el-Camîus Sehîh* (Sehîha Muslim), bi 3.033 hedîsan, wekî yek ji "Sehîheyn"an tê qebûlkirin. Beşên *Kîtabûl Cîhad* û *Kîtabûl Îmare*, metnên resen ên Peymana Hudeybiyê, prensîbên exlaqê şer û protokolên belavkirina xenîmetan dihewîne. Bi taybetî beşa *Fedaîlun Nebî*, ji bo portreya karaktera Pêxemberî giring e (Kandemir, 2006, 93-94). Muslîm jî li gel Buxarî yek ji çavkanîyên giring ên *Gulzarê* ye û di *Gulzarê* da 15 caran derbas dibe. Wekî mînak:

*Muslîm ji nebî we daye ferman*

*Ey em hemû dem fîda û qurban* (*Gulzar*, b: 4946)

#### 2.5.2.7. Ebû Dawûd es-Sîcîstanî (w. 275/889)

Ebû Dawûd, yek ji zanyarên hedîsê yên herî pêşîn di cîhana Îslamê da ye. Nivîskarê *es-Sûnen* e, ku yek ji Kutubî Sîtte (Şeş Berhemên Hedîsê yên Pêşeng) ye. Ew ji bo berhevkirina hedîsan li gelek bajaran gerîyaye û li ser hedîsan û baweriya rawiyan bi hûrgilî lêkolîn kiriye. Ji 500.000 hedîsên berhevkirî, wî 4.800 hedîs ji bo *es-Sûnen* a xwe hilbijartiye. (Kandemir, 1994, r. 119-121). Şûşî di *Gulzarê* da li 2 cihan li ser mijarên “Xwarinên Pêxemberî” û “Mucîzeyên Pêxemberî” ji rîwayetên Ebû Dawûdî sûd wergirtîye. Wekî mînak Ebû Dawûd di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Wê hat ji Budawidî ji exbar*

*Pîvazê kelî dixwar wî car car* (*Gulzar*, b: 8857)

#### 2.5.2.8. Îbn Mace (Ebû Ebdillah Muhemmed b. Yezîd Mace el-Qazwînî, w. 273/887)

Îbn Mace, muhaddisekî hedîs hafiz ê navdar e ku di sedsala 9ʿan da li Qazwînê hatiye dinyayê. Wî ji gelek zanyarên hedîsê yên li navendên îlmê yên wekî Kûfe, Besra, Bexda, Dîmeşq û Misrê ders girtiye. Berhema wî ya herî giring "*es-Sûnen* e ku wekî pirtûka şeşemîn a Kutub-i Sitteyê tê qebûlkirin û 4341 hedîsan dihewîne. Digel vê, Îbn Mace xwediyê berhemên dîrokî yên wekî *Tarîxul Xulefa* û *Tefsîr* jî ye. (Kandemir, 1999, r. 161-162). Îbnû Mace yek ji çavkanîyên *Gulzarê* yê bûyera mîracê ye. Di *Gulzarê* da di cihekî da wiha derbas dibe:

*Hem gûtîye Îbnû Maceyê pak*

*Yê gûtî Enes ji yarê lewlak* (*Gulzar*, b: 4753)

#### 2.5.2.9. Tirmizî (Ebû Îsa, w. 279/892)

Tirmizî, li Ozbekistana îroyîn hatiye dinyayê. *Sûnenut Tirmizî*, bi 3.956 hedîsan di nav çar sûnenên mezin da cih digire. Beşa *Kîtabuş-Şemaîl* ya berhemê, taybetmendiyên fîzîkî yên Pêxemberî (s.x.l) şêwaza cil û bergên wî û tevgerên wî yên rojane bi hûrgilî şirove dike. Rîwayetên ku wekî *Xerîbul Hedîs* hatine nîşankirin, aliyên psîkolojîk ên bûyerên kêm naskirî, wekî dorpêçkirina Taîfê, vedibêjin (Kandemir, 2012, r. 202-204). Şûşî di *Gulzarê* da li 3 cihan li ser mijarên mîrac û mucîzeyên Pêxemberî ji rîwayetên Tirmizî sûd wergirtîye. Wekî mînak Tirmizî di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Hem gûtîye Tirmizî ji exbar*
*Ev gûte ji zar xelîfeyê çar* (*Gulzar*, b: 9678)

#### 2.5.2.10. Bezzar (Ebûbekir Ehmed b. Emr el-Bezzar, m. 292/905)

Bezzar, zanyarekî hedîsê yê giring ê Besrayî ye. Bezzar tevahiya jiyana xwe ji zanista hedîsê re terxan kiriye û ji bo belavkirina wan li navendên giring ên wê demê geriyaye. Berhema wî ya herî giring *el-Mûsned*, di vegotinên sîyerê da çavkaniyeke giring e û bi taybetî jî bi cîh girtina hedîsên ku di Kutub-i Sitteyê da tune ne, balê dikêşîne. Her çend rexnegirên hedîsê wî wekî pêbawer qebûl dikin jî, tê gotin ku ji ber ku bi bîra xwe rîwayet kiriye, carinan şaşî jî kiriye (Kandemir, 1992, r. 113). Şûşî di *Gulzarê* da li 2 cihan li ser mijarên mîrac û mucîzeyên Pêxemberî ji rîwayetên Bezzarî sûd wergirtîye. Wekî mînak Bezzar di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Şêxê Ṭeberanî şîhî Bezzar*
*Gûtin ji Ebû Hureyreyê yar* (*Gulzar*, b: 4542)

#### 2.5.2.11. Nesaî (Ebû Ebdurrehman, w. 303/915)

Nesaî, li Xorasanê hatiye dinyayê. *Sûnenun Nesaî*, bi 5.270 hedîsan wekî sûnenên pêbawer tê qebûlkirin. Rîwayeta *Xezwetû Benîl-Musteliq* di beşa *Kîtabul Cîhad* da, rêxistina lojîstîkî ya serîyeyan dinivîse. *Bûyera Cîrane* jî mekanîzmaya edaletê di belavkirina xenîmetan da mînakan dide (Kandemir, 2006, r. 563-564). Nesaî, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye û Şûşî di beşa mucîzeyên Pêxemberî da ji rîwayeteka wî sûd werdigire. Di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Eḥmed kuṛê Ḥenbel û Nesaî*

*Her du ji Enes dibên tebayî* (*Gulzar,* b: 9956)

**2.5.2.12. Teberanî (Sûleyman b. Ehmed, w. 360/971)**

Teberanî li bajarê Teberiyya Îranê hatiye dinyayê. *el-Muʿcemul Kebîr,* bi 60.000 hedîsan berhevoka hedîsan a herî mezin e û zincîreyên îsnadê yên kêm dihewîne (Görmez, 2010, r. 310-312). Teberanî yek ji çavkanîyên giring ê *Gulzarê* ye. Şûşî bi gelemperî di mijarên mucîze û mîracê ji wî sûd wergirtîye. Di *Gulzarê* da 6 caran navê wî derbas dibe. Wekî mînak:

*Şeyxê Ṭeberanî cayê bawer*
*Neqlê diketin ji zar Ebû Zer* (*Gulzar,* b: 9656)

**2.5.2.13. Ebul Hesen bîn Xalîb (Ebul Hesen Tahir b. Ebdulmûnîm b. Ubeydullah b. Xalîb el-Helebî el-Misrî, w. 1009)**

Ebul Hesen, di sala 950an da li Helebê hatiye dinyayê, li Misrê jiyaye û alimekî giring ê qiraet û hedîsê ye. Berhema wî ya bi navê *et-Tezkîre fîl-Qiraetîs-Seman* ku di zanista qiraetê da wekî otorîte tê qebûlkirin, ji bo alimên piştî xwe bûye çavkaniyeke bingehîn (Altıkulaç, 1999, r. 499-500). Ebul Hesen, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* yê mijara mucîzeyên Pêxemberî ye û di cihekî da navê wî wiha derbas dibe:

*Enware dibêjî piṛṛ meṭalib*
*Gût Bûlhesenê wî bab e Ẋalib* (*Gulzar,* b: 4782)

*Fermûdeyê Îbnû Murdeweyhî*
*Ey - reḥmetu rabbena ʿeleyhî* (*Gulzar,* b: 5711)

**2.5.2.14. Hakim en-Nîşaburî (Muhemmed b. Ebdullah, w. 405/1014)**

Li Nîşabûrê hatiye dinyayê. *el-Mûstedrek ʿeles Sehîheyn*, 8.845 rîwayetên ku Buxarî û Muslim kêm hiştine, temam dike (Kandemir, 1997, r. 190-191). Hakim, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye ku di mijarên exlaqê Pêxemberî û mucîzeyên jî ji wî sûd hatiye wergirtin. Navê wî 2 caran di *Gulzarê* da derbas dibe. Wekî mînak:

*Hakim ji rîwayetek dibêjî*
*Ya Reb tu reḥim bi ser birêjî* (*Gulzar,* b: 8225)

**2.5.2.15. Îbnû Murdeweyh (Îbnû Merdûye) (w. 1020)**

Îbnû Murdeweyh hedîs hafiz, mufesîr û dîroknasê navdar ê Îsfehanî ye. Li navendên wekî Bexda, Besra û Xorasanê zanist wergirtiye û bi zêhna xwe ya bihêz

hedîs bi senedên wan ve vegotine. Berhema wî ya herî giring *Kîtabut Tefsîr*, di nav çavkaniyên sîyerê da jî xwedî nirx e ji ber ku çîrokên Pêxemberan bi hedîsan tefsîr kiriye. Di heman demê da berhemên dîrokî û cografîk ên wekî *Tarîxu Îşfehan* û *Mucemul Bûldan* jî nivîsandiye (Şenel, 1999, r. 184-185). Îbnû Murdeweyh, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* yê mijara hîcretê ye û di cihekî da navê wî wiha derbas dibe:

#### 2.5.2.16. Şêxê Newewî (Îmam Newewî) (Ebû Zekeriyya Yahya b. Şeref, w. 1277)

Şêxê Newewî, di sala 1234an da li Sûriyeyê hatiye dinyayê û alimekê hedîs û fiqihê yê giring e ku xwe bi tevahî terxanî zanistê kiriye. Di dirêjahiya jiyana xwe da gelek berhemên hêja yên derbarê zanistên Îslamî da nivîsandîne. Di warê hedîsan da xebatên wî yên sereke *Rîyadus-Salihîn* û *el-Mînhac fî Şerhî Sehîhî Muslîm* in. Di fiqhê da jî bi berhemên xwe yên wekî *Rawdetut-Talibîn* bingeha mezheba Şafiî ava kiriye. Bi taybetî xebata wî ya bi navê *es-Sîretun Nebewîyye* ji bo zanista sîyerê çavkaniyeke hêja tê qebûlkirin (Kandemir, 2007, r. 45-47). Newewî, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye û Şûşî di mijara mîracê da sûd ji wî wergirtîye. Navê wî di *Gulzarê* da li cihekî wiha derbas dibe:

*Şêxê Newewî ku ez fîda me*
*Ev qewle dibêt bi min temam e* (*Gulzar*, b: 4371)

#### 2.5.2.17. Celaleddîn es-Suyûtî (w. 911/1505)

Suyûtî zanyarekê Îslamî yê piralî ye ku li ser eqaîd, kelam, tefsîr, hedîs û ziman berhem nivîsandîne. Yek ji xebatên wî yên giring di zanista hedîsê da *Camius-Saxîr* e, ku ji 10.000 hedîsan pêk tê. Ev berhem bi gelemperî li ser rîwayetên derbarê îman, exlaq û fezîletan da ye, Suyûtî ji hêla gelek zanyaran piştî xwe wekî çavkanî hatiye bikaranîn û li ser berhema wî şerhên cûrbecûr hatine nivîsandin (Özkan, 2010, r. 202-204). Her çend navê wî di nav beytan da derbas nebe jî ji bo Şûşî çavkanîyeke giring e. Şûşî di rûpeleka pêşîn a destxeta xwe da behsa çavkanîyên *Gulzarê* dike û di vê derê da dîyar dike ku wî ji Suyûtî jî sûd wergirtîye (Şûşî, Destxet)

### 2.5.3. Sîyer û Dîrok

Ev kom, nimûneyên sîstematîk ên yekem ên zanista sîyerê û berhemên berfireh ên ku dîroka Îslamê vedihewînin, temsîl dikin. Ji bo berhema Şûşî, çarçoveya kronolojîk û rêzika bûyeran bi gelemperî ji van çavkaniyan sûd wergirtiye.

#### 2.5.3.1. Îbnû Îshaq (Muhemmed b. Îshaq, w. 151/768)

Îbnû Îshaq, li Medîneyê hatiye dinyayê. *Sîretû Îbnî Îshaq*, yekem nimûneya nivîsandina sîyerê ya sîstematîk e. Berhem, kronolojiya Heca Xatirxwestinê û rêzika leşkerî ya Şerê Bedrê bi awayekê hevgirtî vedibêje. Nusxeya resen a 20-cildî heta roja me nehatiye; bi rêya berhema Îbn Hîşam a bi navê *es-Sîretun Nebewîyye* hatiye parastin (Fayda, 1999, r. 93-95). Îbnû Îsḥaq yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye û di cihekî da di mijara mucîzêyên Pêxemberî da wiha derbas dibe:

*Enware dibêt ji Îbnû Îsḥaq*
*Nêv cengê Bedir bi canê muştaq* (*Gulzar*, b: 9853)

#### 2.5.3.2. Îbnû Hîşam (Ebû Muhemmed Cemaluddîn Ebdulmelîk b. Hişam, w. 218/833)

Îbnû Hîşam, li Besrayê hatiye dinyayê û li Misrê jiyaye. Wekî dîroknas, zimannas û alimê ensabê (zanista neslê) yê navdar e. Yek ji berhemên wî ya herî giring *es-Sîretun Nebewiyye* ye. Di berhema xwe da, wî mijarên ku di Quranê da cîh nagirin an jî rasterast bi Pêxember re eleqedar nînin derxistîne û metna xwe bi lêzêdekirinên rêzimanî û ensabê dewlemend kiriye. Îbnû Hişam, wekî navê herî giring ê ku sîyera Îbnû Îshaq gihandiye roja me, tê qebûlkirin û xebata wî di çavkaniyan da wekî yek ji pirtûkên sîyerê yên herî saxlem û baş tên hesibandin (Fayda, 1999, r. 71-72). Îbnû Hîşam, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye û di cihekî da di mijara koça Pêxemberî bo Medîneyê da wiha derbas dibe:

*Ev rêke ji ẋarê ta Medîne*
*Lê Îbnû Hîşam dibêt şirîne* (*Gulzar*, b: 5834)

#### 2.5.3.3. Îbnul Esîr (Îzzedîn, w. 630/1233)

Li Cizîrê hatiye dinyayê. *el-Kamîl fît-Tarîx*, pirtûka dîrokê ya ansîklopedîk e ku serdema piştî Teberî temam dike. Ev berhem bûyerên sîyerê di çarçoveya sosyopolîtîk da şirove dike (Özaydın, 2000, r. 26-27). Di *Gulzarê* da rasterast navê Îbnûl Esîr derbas nabe lê navê berhema wî di beşa mucîzeyên Pêxemberî da wiha derbas dibe:

*Kamil we dibê ve xew peyember*
*Ew bû sefera fetih bû Xeyber* (*Gulzar*, b: 10114)

#### 2.5.3.4. Muhemmed Huseyn Heykel (1888-1956)

Muhemmed Huseyn rojnamevan, siyasetmedar û ramangêrekî Misrî ye. Xebata wî ya herî balkêş, *Heyatu Muhemmed* (1935), berhemeke siyerê ye, ku li Rojhilat û Rojava gelek deng vedaye. Di vê pirtûkê da, wî jiyana Pêxemberî bi metodên zanistî yên nûjen şîrove kiriye û parastina fikra lihevhatina aqil û dîn kiriye, bi vî awayî beşdariyên giring di nîqaşên entelektuelî yên cîhana Îslamê ya dema xwe da kiriye (Görgün, 1998, r. 286-290). Navê wî di nav beytan da derbas nabe lê di serê destxetê da di lîsteya çavkanîyan da navê wî derbas dibe.

### 2.5.4. Şemaîl û Delaîlu'n-Nubuwwe

Ev kom, nivîskarên ku şemaîla Pêxemberî, taybetmendiyên wî yên exlaqî, mucîzeyên wî û têkiliya di navbera ayetên Quranê û bûyerên sîyerê da lêkolîn kirine, dihewîne. Şûşî di *Gulzarê* da gelek sûd ji van çavkanîyan wergirtîye. Berhemên vê komê em dişên wiha dabeş bikin.

#### 2.5.4.1. Îbnû Şahîn (Omer b. Ehmed, w. 995)

Îbnû Şahîn li Bexdayê hatiye dinyayê. *Fedaîlun Nebî*, yek ji metnên damezirîner ên wêjeya pesnê Pêxember e. Beşa Sifatû *Xuluqîhî*, taybetmendiyên exlaqî (nefsbiçûkî, bexşandin) sîstematîze dike. Di vê beşê da bi 203 rîwayetan kevneşopiya şemaîlê berhev dike (Koçkuzu, 1999, r. 367-369). Îbnû Şahîn, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye û di *Gulzarê* da li 2 cihan li ser mijara mucîzeyên Pêxemberî Şûşî ji wî sûd wergirtîye. Wekî mînak:

*Hem bû me dibêjî Îbnû Şahîn*
*Vê muʿcîzeyê ji serwerê dîn* (*Gulzar*, b: 9982)

#### 2.5.4.2. Beyheqî (Ehmed b. Huseyîn, w. 1066)

Beyheqî, li Xorasanê hatiye dinyayê. *Delaîlun Nubuwwe*, ji bo mucîzeyên mîrac û kerbûna heyvê çavkaniyeke bingehîn e. *Sûnenul Kubra* ya wî, bi şiroveyên *Beyʿetur-Ridwan* (beyʿeta di bin darê da) aliyê hiqûqî yê sîyerê vedibêje (Kandemir, 1992, r. 58-61). Beyḥeqî yek ji çavkanîyên herî giring ê *Gulzarê* ye ku Şûşî wekî çavkanî gelek sûd ji wî wergirtîye û navê wî di *Gulzarê* da 11 caran derbas dibe. Wekî mînak:

*Zanî me ji Beyḥeqîyê enwer*
*Ḥîna diçû aseman peyember* (*Gulzar*, b: 4519)

#### 2.5.4.3. Bexewî (Huseyîn b. Mesud, w. 1122)

Bexewî, muhedîs û mufesîrekê Xorasanî ye ku bi navê *Muhyîsûnne* tê naskirin. Berhema wî ya herî giring *Şerhus Sûnne*, beşa *Kîtabul Mexazî* rîwayetên sîyerê yên berî Îbnû Îshaq berhev dike; herwiha berhema wî ya bi navê *el-Enwar fî Şemaîlîn-Nebîyyîl-Muxtar* jî ji bo wêjeya sîyerê çavkanîtiyê dike (Güngör, 1992, r. 340-341). Bexewî, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye û Şûşî di mijara mucîzeyên Pêxemberî ji wî sûd wergirtîye. Di *Gulzarê* da 2 caran navê wî derbas dibe. Wekî mînak:

*Şêxê Bex̊ewî ji zar şeḥabî*
*Yeʿla kuṛê Murre pak cenabî* (*Gulzar*, b: 9801)

#### 2.5.4.4. Îbnû Sebʿi (w. 520/1126)

Îbnû Sebi’ (Ebu’r Rabî’ Suleyman îbnû Sebi’ w. 520/1126) yek ji alimên Fasê ye û wek şêx, faqih, xetîb, muhedîs, hafiz, edîb tê nasîn. Di derbarê dîrok û sîyerê da xwedî agahîyên kûr e. Berhema wî Şîfau's- Sudûr ji 15 cîldan pêk tê (www.habous.gov.ma, 14.08.2025). Ji bo ilmên hedîs û sîyerê çavkanîyeke giring e. Îbnû Sebʿi, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye û Şûşî di mijara mîracê da sûd jê wergirtîye. Navê di *Gulzarê* da li cihekî wiha derbas dibe:

*Zar Îbnû Sebʿi di nêv wê name*
*Meşhur e Şîfa Ṣudûr temame* (*Gulzar*, b: 4783)

#### 2.5.4.5. Qadî Îyaz (Îyaz b. Musa, w. 1149)

Qadî, li Endulusê hatiye dinyayê. *eş-Şîfa bi-Tarîfi Huqûqîl-Mustafa*, berhema bingehîn e ku rewşa hiqûqî ya Pêxemberî pênase dike (Kandemir, 2001, r. 116-118). Qaḍî, yek ji çavkanîyên giring ê *Gulzarê* ye û di *Gulzarê* da 7 caran navê wî derbas dibe. Wekî mînak:

*Hem Qaḍî dibêt di nêv Şîfayê*
*Ya Reb bi min û bi wî riḍayê* (*Gulzar*, b: 9996)

#### 2.5.4.6. Yûsuf en-Nebhanî (1849-1932)

Nebhanî, li gundê Îcrîm a Filistînê hatiye dinyayê. Berhema wî ya bi navê *el-Enwarul Muhemmedîyye mîn Mewlîdîhî îla Meadîhî*, kurtkirina *el-Mewahîbul Ledûnniyye* ya Îmam Qastalanî ye. Beşa *Muʿcîzatul Qurʾan*, mucîzeyên zanistî yên Quranê ronî dike (Özervarlı, 2006, r. 471-472). Nebhanî, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ya mijara mucîzeyên Pêxemberî ye û di cihekî da navê wî wiha derbas dibe:

*Nebhanî dibê di taze Enwar*
*Ṭebʿa ji xudan ḥedîs̱ û exbar* (*Gulzar*, b: 10001)

### 2.5.5. Tefsîr û Zanistên Quranê

Tefsîr çavkanîyên giring ên *Gulzarê* ne. Şoşî di rûpela çavkanîyan a pêşîya beytan da dîyar dike ku wî ji du tefsîran (Tefsîra Beydawî û Îşaratu'l-Îʿcaz) sûd wergirtîye. Helbet ji bilî van navên ku Şûşî behsa wan kirîye di nav beytên *Gulzarê* da jî navên çend kesayetan jî diborin ku ew jî xwedî tefsîrên navdar in. Şoşî, ji bilî tefsîran di *Gulzarê* da çavkanîyên ku dikevin qada Zanistên Quranê (Ulumî'l-Quran) jî bikaranîne. Çavkanîyên vê beşê em dişên wiha rêz bikin:

#### 2.5.5. 1. Fexreddîn er-Razî (Muhemmed b. Omer, w. 1209)

Razî, li bajarê Rey yê Îranê hatiye dinyayê. *Mefatîhul Xeyb*, a wî wekî şahesera tefsîra kelamî tê dîtin. Di tefsîra ayeta 17 a sûreya Enfalê da, îfadeya "Dema te avêt, te neavêt..." bi destwerdana îlahî ya di Şerê Bedrê da girê dide. Razî di tefsîra xwe da metodolojiya sedemên daketinê (esbabun nûzûl) sazkiriye (Yavuz, 1995, 89-92). Razî, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye, Şûşî di mijara mucîzeyên Pêxemberî ji wî sûd wergirtîye. Di *Gulzarê* da li cihekî da wiha derbas dibe:

*Hem neqlê diket xudanê Enwar*
*Zar Fexr û Îmamê Razî guftar* (*Gulzar*, b: 9707)

#### 2.5.5.2. Beydawî (Ebdullah b. Omer, w. 1286)

Beydawî, li Tebrizê hatiye dinyayê. Tefsîra wî ya kurt û felsefî ya bi navê *Enwarut Tenzîl we Esrarut Tewîl*, 600 salan wekî pirtûka dersê di medreseyên Osmanî da hatiye xwendin. Di tefsîra ayeta 123 a sûreya Alî Îmranê da, alîkariya melaîketan di Bedrê da bi şiroveyeke sosyolojîk rave dike (Yavuz, 1992, r. 100-103). Beydawî, yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye û Şûşî di mijarên heremkirina ereqê û mucîzeyên Pêxemberî ji wî sûd wergirtîye. Di *Gulzarê* da 3 caran derbas dibe. Wekî mînak:

*Her wekî ji me ra dibêjî tefsîr*
*Beyḍawî diket beyan û teqrîr* (*Gulzar*, b: 7874)

#### 2.5.5.3. Seîdê Nûrsî (w. 1960)

Seîdê Nûrsî zanyarekî Îslamî û ramangêrekî kurd bû ku li gundê Nûrs a Bidlîsê ji dayik bûye. Wî jiyana xwe ji bo xizmeta zanist û îmanê terxan kiriye, çareseriyên

Quran-navendî ji pirsgirêkên serdema nû re pêşkêş kiriye û berhema xwe ya *Kullîyata Rîsaleya Nûr* nivîsandiye, ku li gelek zimanan hatiye wergerandin. Di nav vê kulliyatê da, bi taybetî *Îşaratul Îʿcaz* ku di dema Şerê Cîhanê yê Yekem da hatiye nivîsandin û bi mûcîzeyên wêjeyî yên Quranê ra mijûl dibe, cihekî giring digire (Açıkgenç, 2018, r. 565-572). Navê Nûrsî di nav beytên *Gulzarê* da bi armanca ku methên wî bike yan duayan bo bike derbas dibe. Şûşî di nav rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da dîyar dike ku Nûrsî yek ji çavkanîyên wî ye.

#### 2.5.5.4. Muhemmed Ebdûlezîm Zurqanî (w. 1948)

Muhemmed Ebdulezîm ez-Zurqanî zanyarekê hedîs û zanistên Quranê yê Misrî yê serdema nûjen e. Berhema wî ya herî naskirî *Menahîlul Îrfan fî Ulûmîl-Qurʾan* e. Ev berhem bi nêrîna xwe ya nûjen ji zanistên Quranê re û hewldanên xwe yên ji bo rakirina gumanên li ser Quranê tê naskirin (Mertoğlu, 2013, r. 579-580). Yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye. Navê wî di nav beytan da derbas nabe lê di rûpelê çavkanîyên *Gulzarê* da Şûşî dîyar dike ku ji wî sûd wergirtîye.

#### 2.5.5.5. Muhemmed Tahîrê Kurdî (1903-1980)

Muhemmed Tahîrê Kurdî xetat, dîroknas û edîbekî navdar ê Erebistana Siûdî bû. Perwerdehiya xwe li Mekke û Qahîreyê qedandiye û yekemîn kes bûye ku li Erebistana Siûdî dersên xetê yên fermî daye (Özel, 2019, r. 110-112). Her çend ku hevdîtina wî li gel Şûşî çênebe jî bi rêya nameyan têkilîyan wan çêbûye û bi awayê xîyabî îcazeta xetê daye Şûşî. Şûşî di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da wekî çavkanî behsa sê berhemên wî (Tarîxu’l-Quran we Xeraîbî Resmîhî, Tarîxu’l-Xettî’l-Erebî we Adabûh û Meqamu Îbrahîm) dike.

### 2.5.6. Kelam û Eqaîd

Sê berhemên ku Şoşî di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da behsa wan kirî dikevin kategorîya berhemên kelam û eqaîdê. Du ji van berheman yên Îbnû Hecer El-Heytemî (w. 974/1567) û yek jî ya Muhemed Reşîd Riza (w. 1935) e. Çavkanîyên vê beşê em dişên wiha rêz bikin:

#### 2.5.6.1. Îbnû Hecer El-Heytemî (w. 974/1567)

Faqîhekî Şafiî, muhaddis û edîbekî navdar e. Ibnû Hecer el-Heytemî li Misrê ji dayik bûye û piraniya jiyana xwe li Mekkeyê derbas kiriye. Wî berhemên hêja di warê sîyerê da nivîsandîne (Kallek, 1999, r. 531-534). Yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ye ku

navê wî di nav beytan da derbas nabe lê di rûpela çavkanîyan da navê du berhemên wî (*Es Sewaîq* û "*Tethîru'l-Cenan wel Lîsan) derbas dibe.* Ji van berheman *Es Sewaîq* li ser meşrûîyeta çar xelîfeyan û nêrîna şîayê ya xelet, *Tethîru'l-Cenan wel Lîsan* jî li ser dijminîya Muawîye û tehlîkeya wê disekine.

#### 2.5.6.2. Muhemmed Reşîd Riza (1865-1935)

Reşîd Riza yek ji kesayetiyên sereke yên ramana reformîst di cîhana Îslamê da bû. Bi bandora Cemaledînê Efganî û bi taybetî Muhemmed Ebduh, wî kovara *el-Menar* damezrand da ku ramanên xwe belav bike. Armanca wî têgehiştineka rast a dînî û pêşkêşkirina çareseriyên îslamî ji pirsgirêkên serdema nû ra bû. Di nav berhemên wî da, lêkolînên giring ên siyerê hene, wekî *Wehyu'l-Muhemmedî*, ku li ser mijarên îspata nubûwetê, îcaza Qurana Kerîm, çawanîya wehyê û armanca hinartina wê hatiye nivîsîn (Özervarlı, 2008, r. 14-18). Navê wî di nav beytan da derbas nabe lê di serê destxetê da di lîsteya çavkanîyan da navê wî derbas dibe.

### 2.5.7. Fiqih

Şoşî, di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da dîyar dike ku berhemên fiqha Şafi'î yek ji çavkanîyên *Gulzarê* ne lê navê çi berhemên fiqhê yan nivîskarên wan negotîye. Şoşî di rûpela çavkanîyan da yek ji çavkanîyên *Gulzarê* jî wek pirtûkên Fiqha Şafi'î'nîşan dide lê navê çi pirtûkan nabeje û di nav beytan da navê wan derbas nabe[1]. Di *Gulzarê* da çend mîjarên fiqhî yên wekî nivêj û hukmê nivêjnekerî (*Gulzar*, b: 4926-4980), cezayê meyvexwerî (*Gulzar*, b: 7931-7936) zekat û rîba (724-784) derbas dibin ku dîyare Şoşî di van mijaran da ji berhemên fiqha Şafîî sûd wergirtîye.

Hemû çavkanîyên *Gulzarê* li gorî rêza kronolojîk di tabloyê da em dişên wiha nîşan bidin:

**Tablo 2. 12:** Li gorî rêza kronolojîk çavkanîyên Gulzarê.

| Rêz | Nivîskar | Berhêmên ku Navê Wan | Hejmara Derbasbûnê | Cihê Derbasbûnê |
|---|---|---|---|---|

[1] Her çend navê çi ji van berheman negotibe jî gava em li pirtûkxaneya Şoşî dinêrîn em dibînîn ku gelek pirtûkên fiqha Şafi'î li ber destê wî hebûne. Li gorî gotina Hemzeyê Şoşî babê wî herî zêde ji van berhemên fiqhê sûd wergirtîye:
1. Tuhfetu'l-Muhtac Şerhu'l-Mînhac a Îbnû Hecer el- Heytemî
2. Î'anetut Talibîn a Ebûbekir Osman b. Muhemmed
3. Kîtabu'l-Fiqih 'ela Mezabehu'l-Erbe'e ya Ebdurrehman el- Cezerî
4. El- Muhezzeb a Ebû Îshak eş- Şîrazî
5. Muxnîl Muhtac a Xetîb eş- Şîrbînî

| | | **di *Gulzarê* da Derbas Dibin** | | |
|---|---|---|---|---|
| 1 | Qurana Pîroz | | 109 | Di nav beytên *Gulzarê* da 109 caran derbas dibe. Wekî mînak, b: 54, 134, 199, 217, 254 û hwd. |
| 2 | Îbnû Îshaq (151/768) | - | 1 | b: 9853 |
| 3 | Îbnû Wehb (197/813) | - | 1 | b: 9913 |
| 4 | Îbnû Hîşam (218/833) | - | 1 | b: 5834 |
| 5 | Seʿîd b. Menṣur (227/842) | - | 1 | b: 9905 |
| 6 | Ehmed b. Henbel (241/855) | - | 1 | b: 9956 |
| 7 | Darimî (255/869) | - | 1 | b: 10064 |
| 8 | Îmam Buxarî (256/870) | el-Camîus Sehîh (Sehîha Buxarî) | 25 | b: 466, 2419, 2472, 3204, 3660, 3927, 4372, 4958, 5666, 5724, 6315, 6361, 8049, 8215, 8261, 9629, 9653, 9694, 9728, 9816, 10018, 10042, 10080, 10087, 10132 |
| 9 | Îmam Muslîm (261/875) | - | 15 | b: 3927, 4946, 4958, 8049, 9629, 9675, 9716, 9808, 10018, 10042, 10051, 10069, 10087, 10107, 10132 |
| 10 | Îbnu Mace (273/887) | - | 1 | b: 4753 |
| 11 | Ebû Dawûd es-Sîcîstanî (275/889) | - | 2 | b: 8857, 9667 |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 12 | Tirmizî (279/892) | - | 3 | b: 4762, 9678, 9793 |
| 13 | Bezzar (292/905) | - | 2 | b: 4542, 9681 |
| 14 | Nesaî (303/915) | - | 1 | b: 9956 |
| 15 | Teberanî (360/971) | - | 5 | b: 927, 4542, 4702, 9631, 9656 |
| 16 | Îbnû Şahîn (385/996) | - | 2 | b: 9982, 10026 |
| 17 | Ebul Hesen bîn Xalîb (399/1009) | - | 1 | b: 4782 |
| 18 | Hakîm en-Nîsaburî (405/1014) | - | 2 | b: 8225, 9766 |
| 19 | Îbnû Murdeweyh (410/1020) | - | 1 | b: 5711 |
| 20 | Beyheqî (458/1066) | - | 8 | b: 4519, 4527, 4654, 4693, 4734, 5602, 9684, 10035 |
| 21 | Bexewî (516/1122) | - | 2 | b: 9801, 9974 |
| 22 | Îbn Sebi‘ (520/1126) | Şîfau's Sudûr fî E'lam Nubuwwetî'r Resûl we Hesaîsîh | 1 | b: 4783 |
| 23 | Qadî Îyaz (544/1149) | eş-Şîfa bi-Tarîfi Huqûqîl-Mustafa | 7 | b: 9663, 9700, 9780, 9818, 9886, 9922, 9996 |
| 24 | Fexreddîn er-Razî (606/1210) | - | 1 | b: 9707 |
| 25 | Îbnul Esîr (630/1233) | el-Kamîl fît-Tarîx | 1 | b: 10114 |
| 26 | Şêxê Newewî (676/1277) | - | 1 | b: 4371 |
| 27 | Beydawî (685/1286) | Tefsîra Beydawî | 3 | b: 466, 7874, 9716 |
| 28 | Celaleddîn es-Suyûtî (911/1505) | Camius-Sexîr | 1 | Di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da derbas dibe. |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 29 | Îbnû Hecer El-Heytemî (974/1567) | Es Sewaîq,<br>Tethîrul Cenan wel Lîsan | 1 | Di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da derbas dibe. |
| 30 | Muhemmed Reşîd Riza (1935) | - Tefsîrul Menar,<br>- El- Wehyul Muhemmedî | 1 | Di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da derbas dibe. |
| 31 | Yûsuf en-Nebhanî (1932) | el-Enwarul Muhemmedîyye mîn Mewlîdîhî îla Meadîhî | 6 | b: 4782, 5744, 9707, 9853, 9861, 10001 |
| 32 | Muhemmed Ebdûlezîm Zurqanî (1948) | Menahîlul Îrfan fî Ulûmîl-Qurʾan | 1 | Di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da derbas dibe. |
| 33 | Muhemmed Huseyn Heykel (1956) | Heyatu Muhemmed | 1 | Di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da derbas dibe. |
| 34 | Seîdê Nûrsî (1960) | Îşaratul Îʿcaz | 3 | b: 612, 613, 3935 (Navê berhemê tenê di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da derbas dibe. |
| 35 | Muhemmed Tahîrê Kurdî (1980) | Tarîxul Xettîl Erebî,<br>Tarîxul Quran,<br>Meqamu Îbrahîm | 1 | Di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da derbas dibe. |
| 36 | Navê Nivîskaran Derbas Nabe | Berhemên Fiqha Şafiî yên Cûda | 1 | Di rûpela çavkanîyên *Gulzarê* da derbas dibe. |

Di *Gulzarê* da bi tevahî navê 18 berheman derbas dibe û Şoşî 6 ji wan (Qurana Pîroz, Tefsîra Beydawî, Sehîha Buxarî, El-Kamîl (Îbnu'l-Esîr), El-Enwar (Nebhanî) û Heyatu Muhemmed (Heykel)) wekî çavkanîyên sereke nîşan dide. 12 berhemên mayî Şîfau's Sudûr (Îbn Sebi'), Eş-Şîfa (Îyaz), Camîu's Sexîr (Suyûtî), Fiqihên Şafi'î, Îşaretu'l Îcaz (Seîdê Nûrsî), Menahîlu'l Îrfan fî Ulûmîl-Quran (Zurqanî), es-Sewaîq, Tethîru'l-Cenan wel Lîsan (Heytemî), el-Wehyu'l-Muhemmedî (Reşîd Riza), Meqamu Îbrahîm, Tarîxu'l-Quran we Xeraîbî Resmîhî û Tarîxu'l-Xettî'l-Erebî we Adabûh (Kurdî) jî ew berhem in ku navê wan di *Gulzarê* da wekî çavkanîyên alîkar derbas dibin.

Di *Gulzarê* da wekî çavkanîyên kesayet navê Îbnû Îshaq, Îbnû Wehb, Îbnû Hîşam, Seîd b. Mensur, Ehmed b. Henbel, Darimî, Muslîm, ÎbnûMace, Ebû Dawûd, Tirmizî, Bezzar, Nesaî, Teberanî, Îbnû Şahîn, Ebu'l-Hesen, Hakîm, Îbnû Murdeweyh, Beyheqî, Bexewî, Razî û Şêxê Newewî derbas dibe lê navê çi berhemên wan derbas nabe. Van aliman gelek berhem hene û dikarin di nav çend kategorîyan bên cihkirin. Li gorî berhemên wan ên sereke yên bi sîyerê ra têkildar em dişên van kesayetan wek alimên hedîs, tefsîr û zanistên Quranê, sîyer, dîrok, şemaîl, delaîlu'n-nubuwwe, fiqih, kelam, exlaq û hwd. dabeş bikin. Lê ji ber ku Şoşî navê çi berhemên wan negotîye û tenê ji rîwayetên wan sûd wergirtîye em dikarîn van kesayetan wek muhedîs qebûl bikin. Bi vî awayî Şoşî ji bilî 18 berhemên ku navê wan dîyarkirî ji rîwayetên 21 kesan jî sûd wergirtîye.

### 2.6. Taybetmendîyên Naverokî

Di vê beşê da Gulzar ji aliyê naverokê ve bi hûrgulî hatiye analîzkirin. Gulzar ji aliyê taybetmendîyên naverokê ve wiha ye:

#### 2.6.1. Ayetên Quranê

Gelek ayetên Quranê behsa Pêxemberî û bûyerên di dewra wî da qewimîn dikin. Ji ber vê yekê çavkanîyeke herî sereka ya sîyerê Qurana Pîroz e. Kesên ku sîyeran dinivîsin teqez divê pêşîyê li Qurana pîroz binêrin ji ber ku agahîyên herî rast û bêgûman di wê da hene.

Wek nivîskarekê sîyerê Şûşî ji bo *Gulzarê* ji gelek çavkanîyan sûd wergirtîye. Yek ji çavkanîyên *Gulzarê* yên herî sereke jî Qurana piroz e. Şûşî di *Gulzarê* da bi rêya hin hunerên edebî yên wekî telmîh û îqtîbasê îşareta gelek ayetan kirîye. Di beşa hunerên edebî da behsa hin ji van hatiye kirin. Di vê beşê da wekî tablo behsa ayetên ne ku bi rêya îşaretê yên ku rasterast diborin hatiye kirin. Ji bo metnên ayetan ji "Meala Qur'ana Pîroz a Kurdî" a Karûbarên Dîyanetê (Gûndûz-Seyhan: 2015) sûd hatiye wergirtin.

**Tablo 2. 13:** Tekilîya Beytan Li Gel Ayetên Quranê

| Suret û Ayet | Metna Ayetê | Mînak ji *Gulzarê* | *Gulzar* - Beyt |
|---|---|---|---|
| Nehl - 90 | Bêguman Xwedê, bi dadiyê, qencîkariyê û xêrpêkirina li eqrebeyan ferman dike... | *Gel xizm û kesan gelek bi çakî / Parêzê ji fehşî û nepakî* | 9571-9573 |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Fussîlet - 13 | Ez we bi yek helakê hişyar dikim, mîna wê helaka ku bi serê qewmê Ad û Semûd da hatî. | *Ku ʿAd û Şemûd birin fenayê" / ʿÎbret bigirin ji hûş û rayê* | 9562-9563 |
| Beqere – 23-24 | (Gelî mirovan!) Eger ku hûn derbarî ya ku me ji bo evdê xwe şandiye gumandar bin, vêca eger bera hûn rast dibêjin: de hûn jî sûreyekî mîna wê bînin... | *Ger hun hemîyan di xu dibînin / Yek şûretê wekî wê bu me bînin* | 9504-9510 |
| ʿEnkebût - 45 | Bêguman nimêj mirov ji neqencî û bêtoretiyan dûr digire... | *Dê wî dete paş nivêj li munker / Fehşî û gunah û pîsî yekser* | 4915 |
| Beqere – 217 | Di bara şerê di Şehrul-Heramê de ji te dipirsin. Bibêje: Şerê di wê mehê de gunehekî mezin e... | *Şer ku ye di nêv meha ḥeram e / Tu bêje gunah e zur zelam e* | 6599-6602 |
| Enfal - 7 | (Gelî hevalên Pêxember!) Di bîr bînin dema ku Xwedê, ji du tiştan peymana yekê ji wan dabû we... | *Dê yek ji du ṭaîfêt di Mekke / Bu hingu dibîte bar ne şekk e* | 6637-6639 |
| Enfal - 9 | ...Xwedê bersiva we da (û got:) Ez ê hezar melayîketî li pey hev li hawara we bişînim. | *Ayet ji me ra dihate xware / Ha bu we melek hizar suware* | 6820 |
| Ehzab - 43 | Xwedê ye, yê ku rehma xwe li we dike û firîşteyên Wî jî (lêborîna we dixwazin) da ku we ji tarîtiyan derxe ber ronahiyê. Xwedê digel bawermendan pir dilovîn e. | *Gel hingu reḥim diket bi îʿzaz / Ba cumle melek ji wî bi daxwaz* | 4824-4826 |
| Meryem - 27-32 | ...Meryemê zarok destnîşan kir (ku ji wî bipirsin). Gotin: Em ê bi zarokekî dergûşê re çawa bipeyivin?... | *Gûtin: ku li gel dikeyn kelame / ʿÎsa bi ziman dihêt temame* | 3615-3621 |
| Şuʿera - 214 | (Berî her kesî) xwedî û lêzimên xwe yên nêzîk hişyar bike. | *Ey Qaṣidê min ji bu te ferman / Înzarê bide ʿeşîr û xizman* | 2814 |
| Furqan - 43 | (Ya Muhemmed!) Erê ma te ew kesê ku hewesa xwe ji xwe re kiriye îlah nedîtiye... | *Mexirurê cîhan xudan hewa ye / Ê kirye hewayê xu xudaye* | 3253 |
| Tebbet – 1-5 | ...Serwet û qazanca ku kirî tu feyde nedayê. Ew ê bikeve agirekî bipêt... | *Dê biçye cehennemê muebbed / Têr ṭamke cezayê karê xûy bed* | 2855-2857 |
| Casiye - 13 | Xwedê ji kerema xwe çi li erd û li asîmanan hene tev ji bo we bindest kirine... | *Çen carê dibêt xudayê ekber / Ger ʿerḍ û sema me kir musexxer* | 582 |
| Fîl – 1-5 | Ka ji min re bêje: Ma tu dizanî Xwedayê te çi bi serê Eshabul-Fîl anî?... | *Nabînî çi lê kirin xudan fîl / Leşker wî hinarte wan ebabîl* | 1447-1452 |

Şûşî di *Gulzarê* da wekî di tabloyê da jî dîyar e ji 12 sûreyan 27 ayet rasterast bikaranîne. Ji van 12 sûreyan Tebbet û Fîl bi temamî derbas dibin ji yên dî ji Nehl, Fussîlet, Enkebût, Ehzab, Şuʿera, Furqan û Casiyeyê: 1, ji Enfalê: 2, ji Beqereyê: 3 ayet derbas dibin.

Şûşî ji bilî beytan jî di *Gulzarê* da cih daye çend ayetan. Şûşî di serê her beşekê da cih daye ayetan anku her beşeke *Gulzarê* bi ayetekê dest pê dike. Ayetên serê beşan bi erebî hatîne nivîsîn, kurmancîya wan nehatiye nivîsîn.

Hemû beşên *Gulzarê* bi "Bîsmîllahîrreḥmanîrreḥîm"ê destpêdikin. Ev jî tiştekê gelekî normal e ji ber ku di îslamê da serê her tiştê baş bîsmîllah e. Di Quranê da yek

tênê hemû sûre bi bîsmîllah ê destpêdikin. Dîsa Pêxember di gelek hedîsên xwe da behsa giringîya bîsmîllahê dike û ji misilmanan dixwaze ku bi bîsmîllahê dest bi hemû karên xwe bikin (Suyûtî, El Camiuʿs Saxîr, no: 6284). Şûşî jî wekî kesayetekê misilman bi bîsmîllahê dest bi beşên berhema xwe kirîye. Ji bilî bîsmîllahê di serê beşan da hin ayet cih digirin.

Şûşî di serê beşa ewil "Muqeddîmê" da piştî bîsmîllahê ayetên 25-28 ên sûreya Tahayê nivîsandîne. Di van ayetan da wiha dibêje: "*(Mûsa) Got: Xwedayê min! Sînga min fireh bike. Karê min ji bo min hêsan bike. Girêka zimanê min veke. Da ku gotina min fêm bikin."*. Şûşî bi van duayan daxwaz dike ku Xwedê karê wî yê zehmet (nivîsandina *Gulzar*ê) bo wî hêsan bike û xwîner ji jîyana Pêxemberî baş hîn bibin û fêm bikin.

Di beşa duyem anku "Mêrga Êkê"da piştî bîsmîllahê ayetên 6-11 yên sûreya Duhayê hatîne nivîsîn. Di van ayetan da Xwedê wiha gazî Pêxemberi dike: "*Ma tu ne sêwî bûy vêca Xwedê tu vehewandî? Ma tu neheyirî bûy êdî Xwedê tu rasterê kirî? Ma tu ne xizan bûy Xwedê tu dewlemend kirî? Vêca herçî ku yê sêwî ye, tu wî neêşîne û riswa meke. Herçî yê parsek e jî tu wî neqewirîne. Tu her behsa qencî û kerema Xwedayê xwe bike û pê biaxive*". Şûşî bi van ayetan bala xwîneran dikêşe ser jîyana Pêxemberî dike û dest bi vegotina jîyana Pêxemberî dike.

Di beşa sêyem anku "Mêrga Duyê" da piştî bîsmîllahê ayeta 107 a sûreya Enbîyayê hatiye nivîsîn. Di vê ayetê da wiha tê gotin: *"(Hey Muhemmed!) Me tu şandî bes da ku tu ji heyînan re bibî rehmet.*". Şûşî bi vê ayetê dest bi vegotina pêvajoya wehî hatin û Pêxemberîya Muhemmed dike.

Di beşa çarem anku "Mêrga Sêyê" da piştî bîsmîllahê ayeta 28 a sûreya Fetîhê hatiye nivîsîn. Di vê ayetê da wiha tê gotin: "*Ew e, yê ku Pêxemberê xwe bi hîdayet û dînê heq şandiye, da ku dînê wî bi ser hemû dînan bixe. Li ser vê yekê Xweda bi şahidî bes e.*". Şûşî bi vê ayetê dest bi pêvajoya koça Pêxemberîya ya bo Medîneyê dike.

Beşa pêncem anku "Merga Çarê" ji ber nexweşî û wefata Şûşî nehatiye nivîsîn. Di beşa şeşem anku "Mêrga Pêncê" da piştî bîsmîllahê ayeta 4 ê hatiye nivîsîn. Di vê ayetê da wiha tê gotin: "*Birastî tu li ser rewiştekî (exlaqekî) mezin î.*". Şûşî bi vê ayetê balê dikêşe ser exlaqê Pêxemberî yê xweş û dest bi vegotina exlaqê Pêxemberî dike.

### 2.6.2. Hedîs

Hedîs, ji bo nivîsandina sîyerê çavkanîyeke gelekî giring e. Şûşî di nivîsandina "*Gulzar*"ê da herî zêde ji hedîsan îstîfade kirîye. Em dişêyn bêjîn ku berhem ji serî heta dawîyê ji hedîsan pêk tê. Şûşî di *Gulzarê* da cih daye hemû cure rîwayetan. Di *Gulzarê* da hem rîwayetên sehîh hem jî yên zeîf cih digirin. Ji ber vê yekê hejmara hedîsan di *Gulzarê* da gelek in. Me ji bo vê beşê tabloyek amade kiriye. Di vê tabloyê da ji ber ku hejmara wan gelek in helbet hemû hedîs cih nagirin tenê wekî mînak 30 hedîs cih digirin. Di tabloyê da çendek ji metna orjînal a hedîsê, çavkanîya wê, mînak ji *Gulzarê* û beytên ku tê da diborin cih digirin. Bi vî awayî xwînerên tezê dikarin orjînala hedîsê û vegotina wê ya *Gulzarê* berawird bikin û dikarin xwe bigehînin çavkanîya hedîsê û beytên *Gulzarê* ku hedîs tê da hatiye vegotin.

**Tablo 2. 14:** Têkilîya Beytan li gel Hedîsan

| Metna Hedîsê | Çavkanîya Hedîsê | Mînak ji *Gulzar*ê | Beytên *Gulzar*ê |
|---|---|---|---|
| "Bi rastî, di navbera mirov û şirk û kufrê da, terka nivêjê heye. | Mûslim, Îman 134 | *Ma beynê zelam û şîrk û kufr e / Nê terkê nivêj e" hûr bifikre* | 4974 |
| Ger biba ez da emrê jînê kema ku bo mêrê xwe biçîte secdê. | Ebû Davûd, Nîkah, 40 | *Ger emrî bikem kesek ji bû kes / Bû secde dibû bi mêr û jin bes* | 9790-9792 |
| Xwedê kesek ji Xedîceyê bi xêrtir nedaye min... | Ahmed b. Hanbel, Mûsned, VI, 118 | *Wî gûtî: "Nexêr bi ew xudayî / Çêtir ji wê qeṭ bi min nedayî* | 8941-8944 |
| Rebbê me ez bo hemî kurên Ademî virêkirim... | Mûslîm, Mesacîd: 5 | *Rebbê me kirim resûlê xatem / Bû cumle beşeṛ ji neslê Adem* | 8800-8812 |
| Qet xwe li ser êk mezin nekin. | Mûslîm, Cennet: 64 | *Kes ser kesê qeṭ neken çi fexre / Bê kîbr û ẋurur û ẋedr û qehre* | 8674-8676 |
| Ji nav mirovan yê herî xirab ew e ku mirov xwe jê diden paş... | Muvattaʿ, Hûsnul hulk, 1 | *Ew merde xirabtirîn di meḥşer / Pêş destê cenabê şahê ekber* | 8654-8655 |
| Netirse! Ez qiralekê bi qehr û kîn im... | Îbn-î Mace, Etʿîme, 30 | *Peyẋemberî gû: "Çi tirsê nîne / Ez ney melîk im bi qehr û kîne* | 8670-8671 |
| Bizewicin, wekî rebenêt fela nekin...[1] | Ebû Davud, "Nîkah", 4 | *Emrê me dikir: "Ku jin bihînin / Nek wekî rebenêt felan bimînin* | 8616-8618 |

[1] Ceyhan, 2022

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ey Xwedayê min tu yê pakî û herdem ez hemda te dikim... | Ebu Davud, Edeb 32 | *Dabêjî: "Xudayê min tu pakî / Ḥemda te dikim dewam bi pakî"* | 8587-8588 |
| Wê Xwedê wî kesê ku bo xwe dua diket efû diket... | Îbnî Mace, 1388 | *Ev şev çi kesê biket recaye / Barî dê ʿefû biket xeṭaye* | 8487-8492 |
| Ey Resûl tu boçî rojên duşem û pênşem rojîyan digirî?... | Tîrmîzî, Savm: 44 | *Gûtin wî: Eya resûlê ekrem / Bû her digirî duşemb û pênşem?* | 8475-8477 |
| Zekat bo min û malbata min helal nîne. | Mûslîm, Zekat: 168 | *Ev malê zekat qirêjê mal e / Ney bû min û alê min ḥelal e* | 8421 |
| Hinavên xwe bo xwarin, hewa û avê bike sê pişk. | Tîrmîzî, Zûhd 47 | *Werne bike sê pişik hinavan / Bû xwarin û bû pişî û avan* | 8407-8408 |
| Ma te nevêt ey Omer dinya bo wan axret bo me bît?. | Ahmed, II, 298 | *Wî gû: "Te nevêt ji bû me cennet / Bû wan tinê ev cîhan bi zeḥmet* | 8377-8378 |
| Ger te bivêtin Xwedê wan çîyayên he bo te dê bikete zêr... | Mûslim, Zûhd: 27 | *Barî bû hinar: Te ger divêtin / Beṭḥa dê ji bû te zêr bibîtin* | 8354-8356 |
| Misilman ji kunekê du caran nahête gez kirin. | Buharî, Edeb, 83 | *Nahête gezîn kesê misilman / Du car ji kunek" ji huşê îman* | 7799 |
| Mirov gava zîna dike, di wê çaxê da bi îmanê xwe zîna nake | Bûharî, Esrîbe, 1 | *Kes nake zînayê çî misilman / Wê gavê meger nemaye îman* | 7914-7915 |
| Derbarê meyê leʿnet li deh kesan hatiye kirin... | Ebu Davud: 3674 | *Leʿnet dike ṛehberê ename / Ser deh kesî ser meya ḥerame* | 7918-7922 |
| Nivêja ku bi cemaʿet bihête kirin 27 caran ji ya bi tenê tê kirin bi xêrtire. | Bûharî, Ezan 30 | *Xêra wî bi bîst û ḥeft û hêje / Gel yê bi tinê diket nivêje* | 6210-6211 |
| Vîyana Ensaran ji îmanê ye... | Buharî, Menakıbul ensar: 4 | *Nîşan e ji bu yeqîn û bawer / Nevyanê ewan nîfaq e" yekser* | 6280-6282 |
| Bo min emir hatiye ku ez li gel ʿalemê şerî bikim heta ku dînê Xwedê îqrar dikin... | Bûharî, Îman: 17 | *Emrê me diket Xudê bi kujtar / Gel ʿalemê ta bi dînî îqrar* | 4958-4959 |
| Nivêj sitûna dînî ye. Kî nivêjê biterikîne we ye ku wî dînê xwe jibinbirîye. | Aclunî, Keşful Hafa, II/31 | *Fermanê peyemberê nîkûnam / "Istun e nivêj bû dînê îslam* | 4918-4920 |
| Hînê ku mirov herî nêzîkê Xwedê secde ye. | Mûslîm, Salat 215 | *Ḥîna di sucûdê rû li ser xak / Nêzîktir e ew ji Xaliqê pak* | 4904 |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ji bo xêran deh qat bo qerdanê hejde qat xêr hene. | Camîûssaxîr 3:518, | *Meʿlûm bî gûtî ji bû te mujde / Xêr yek bi deh e û qer bi hejd e* | 4756 |
| Emmar dê bi destê qewmekê baxî bê kuştin... | Bûharî, "Ṣalat": 63 | *Qewmek dikûjin ewî di baẋî" / Ew qewme bû şamîyêt di ṭaẋî* | 3039-3040 |
| Ger qewmê te nû nebiba misilman min da Keʿbe xirab kiriba û ji nûve çêkiriba... | Bûharî, Kîtabul Hacc: 1586 | *Qewmê te neban di nû xudênas / Min keʿbe xirab dikir ji asas* | 2421-2424 |
| Jin, dafên şeytan in. | Keşful hafa: 2802 | *Peyẋemberî ma nedaye ferman / Jin dav û ṭelê ne ew bu şeyṭan* | 822 |
| Xwedê, di serê her sed salekê da bo ûmmetê mûceddîdekî virêdike. | Ebu Davud, Melahîm, 1 | *Êkek ku ji dîn dibît xudane / Vî dînî diket bi ʿîzz û şane* | 871-872 |
| Bi vî awayî ez bûm bijareyê bijareyan. | Mecmauʿz-zevaid, 8/215 | *Barî bi me dave pişk û bare / Ez bûme bijare ser bijare* | 928-932 |
| Vîyana ereban delîlê îmanê ye, nevîyana wan jî delîlê nîfaqê ye. | Taberanî, el-Muʿcemul Kebîr | *Ḥubba ʿereban delîlê îman / Nevyanê ewan nîfaq e nîşan* | 951-953 |
| Gava ku dayîka min bo hemle bû. Dît ku nûrek jî wê derket û li Şamê xuya bû...[1] | İbn Hişam, I, 135 | *Wê dî bi du çav ji wêve rabû / Nûrek we ji bû wî Şam xûya bu* | 1555-1556 |

### 2.6.3. Navên Xwedê

"Esmayê Hûsna" (el-esmaul hûsna), ji peyva "esma" (nav) û "hûsna" (xweşik, herî bedew) pêk tê. Her çend di derbarê hejmara navên Xwedê da nîqaş hebin jî, bi gelemperî 99 nav têne pejirandin (Topaloğlu, 1995: 404). Ev navên Xwedê bi taybet di nav berhemên edebî yên îslamî da gelek tên bikaranîn. Wekî berhemeke edebî ya îslamî di *Gulzarê* da jî navên Xwedê gelek derbas dibin. Di *Gulzarê* da ji 99 navên Xwedê yên ku bi gelemperî tên pejirandin 33 navên Xwedê derbas dibin. Navên Xwedê di nav *Gulzarê* da wiha derbas dibin:

***Ellah*** *ku çi navekê şirîn e*
*Gûtna wî ḥeyatê can û jîn e* (*Gulzar*, b: 1)

*Her ḥemd û s̱ena û şukr û minnet*

[1] Özkan, 2016

*Her bû te **Xudê** xudanê reḥmet* (*Gulzar,* b: 3)

*Bawer me heye ku tu **Xuda** yî*
*Her tu mezin î xudan beqa yî* (b.4)

*Ser dînê te ew çi canfîda ne*
*Ya **Reb** tu bidey cezayê wane* (*Gulzar,* b: 19)

*Qeṣdê bike baregahê **Barî***
*Ta key neker û ne huşiyarî* (*Gulzar,* b: 61)

***Xaliq** derekî eger bi ḥîkmet*
*Bigirît vedket dîger bi reḥmet* (*Gulzar,* b: 2004)

*Belkî li te xûş bî şahê **Reḥman***
*Dilxûş te biket ebed bi rîḍwan* (*Gulzar,* b: 68)

*Wî jî dikirît wekî Bîlalî*
*Aza diketin bû **Ẕulcelalî*** (*Gulzar,* b: 3089)

*Ta ew du cîhan bibin şirînkar*
*Têkda bigehin riḍayê **Ẋeffar*** (*Gulzar*, b: 2572)

*Her karê te hey ji wî dixwazî*
*Ey her tu **Reḥîm** û karisazî* (*Gulzar*, b: 4894)

*Ḥîna bû emir dihat ji **Cebbar***
*Tu rabe ji bû Xudê bi înzar* (*Gulzar*, b: 2734)

*Wî rokire layê asemanî*
*Ya Reb tu ʿ**Elîm** î tu dizanî* (*Gulzar*, b: 9637)

*Ya **Reb** tu **Ḥekîm** û piṛṛ kemal î*
***Qadir** he tu yî tu **Ẕulcelal î*** **(*Gulzar,* b:** 5245)

*Hindek wî xirab dikir ji dîwar*
*Guhdayê heman ji karê **Qehhar*** (*Gulzar*, b: 2330)

*Ger ez nemirim bi iznê **Settar***
*Jê defʿe dikem neyar û bedkar* (b.4249)

*Ey ḥeft felek te bûne pabûs*
*Ey sîdre te deʿwegahê **Quddûs*** (*Gulzar*, b: 173)

***Baqî** tu yî her tu ber qerar î*
*Her tu meded î tu harîkar î* (*Gulzar*, b: 78)

*Wî gût bi duʿa ji ẕatê Barî*
*Ya Reb tu **Xebîr** û agedar î* (*Gulzar*, b: 6426)

*Ev ḥal e peyemberan qedîme*
*Ew şeʿnê xudayê mey **Ḥekîm e*** (*Gulzar*, b: 5654)

*Ya Reb me tu **Hadî** û delîl î*
*Ya Reb me tu yî me tu **Wekîl** î* (*Gulzar*, b: 428)

*Her çen ku cuwan e şukrê esbab*
*Ṣed hinde dikey bû rebbê* **Tewwab** (*Gulzar*, b: 1914)

*Ew şîrkê neket ku bê şeṛîk im*
*Bû her du cîhan he ez **Melîk** im* (*Gulzar*, b: 4625)

*Her çen ku tinê Xudê **Ḥesîb** e*
*Emma di fer in ve newʿe lêbe* (*Gulzar*, b: 5735)

*"Rebbê me bilindtir û **Celîl** e"*
*Xûş **Naṣir** e ew me xûş **Wekîl** e* (*Gulzar*, b: 7694)

*Her çendî Xudê mezin **Kerîm** e*
*Dana wî di nêv şevan ʿeẓîme* (*Gulzar*, b: 8496)

*Haḏir tu li ser dilan **Reqîb** î*
*Şahid tu li kullî kesî **Qerîb** î* (*Gulzar*, b: 6)

*Fermuyî cenabê Îbnû Mesʿûd*
*Ez sundê dixwum bi **Ḥeyyê** mewcûd* (*Gulzar*, b: 3218)

*Ev dengî cehennema şedîd e*
*Daxwaz wê ji xaliqê **Mecîd e*** (*Gulzar*, b: 4638)

*Wî gûtî "Peyẋember û nezîr im*
*Peyẋemberê xaliqê **Qedîr** im"* (*Gulzar*, b: 2844)

*Karê te ʿecîb û hur e ya Reb*
*Navek te tinê **Ṣebûr** e ya Reb* (*Gulzar*, b: 5248)

*Ya Reb me tu **Hadî** û delîl î*
*Ya Reb me tu yî me tu wekîl î* (*Gulzar*, b: 428)

*Ey **Wahidê** bê heval û hemser*
*Meʿbûdê hemû enamî yekser* (*Gulzar*, b: 79)

Di *Gulzarê* da herî zêde (590 caran) navê "Xudê/a" derbas dibe. Çend sedemên pirr bikaranîna vî navî dişên wiha rêz bikin:

- "Xudê" di zimanê kurdî da navê herî giştî û bingehîn ê Xwedê ye. Wekî "Ellah" di erebî da, ev nav di tevahiya *Gulzarê* da wekî yekîtî û nasnameya Xwedê tê bikaranîn.
- "Xudê" di zimanê kurdî da peyveke kurt û bikêrhatî ye, ji ber vê yekê di helbest û dua da rîtm û ahengê hêsantir dike. Di heman demê da, "Xuda" jî di kurdî da forma kevnare û helbestî ye, ji ber vê yekê di edebiyata dînî da zêdetir tê bikaranîn.
- Di çanda kurdî de, "Xudê" ji zarokatiyê ve di devokê da heye û wekî peyveke "malê" tê dîtin. Ji ber vê yekê, di *Gulzarê* da, ev nav herî zêde tê bikaranîn.

Di *Gulzarê* da piştî “Xudê/a” navê Xwedêyê ku herî zêde derbas dibe “Rebb” e. Di *Gulzarê* da ev navê Xwedê di 163 cihan da rasterast derbas dibe. Çend sedemên ewqas zêde derbasbûna vî navî di *Gulzarê* da em dişên wiha şîrove bikin:

- Navê “Reb” di helbestên dua, munacat û tefekkûrê da formeke îdeal a bangkirinê ye; ji ber vê yekê, li şûna “Ellah”, bikarînana “Reb” jidilî û dilsoziyê îfade dike.
- Peyva “Reb” ji ber ku di avahiya heceyê da kurt e û bi weznê ra lihevhatî ye, di helbesta klasîk a kurdî da pir tê bikaranîn. Di berhemên sîyernameyên wekî *Gulzarê* da beşên dua, hîvî, nîda û medhê pir in. Di van cureyan da navê “Reb” di çarçoveya bangkirinê da roleka weznî ya fonksiyonel digire.
- Ji ber ku “*Gulzar*” sîyernameyek e, di dema behskirina jiyana Pêxemberî da Şûşî gelek caran dua bo Pêxemberî dike. Piraniya van duayan bi “Ya Reb...” dest pê dikin. Ji ber vê yekê, pirbûna bikarînana navê “Reb” ji hêla lihevhatina bi cureya metnê ve jî gelek xwezayî ye.

Di *Gulzarê* da piştî navê “Xudê û Reb” navê herî zêde derbas dibe “Barî” ye. Di *Gulzarê* da 148 caran derbas dibe. Navê "Barî" yek ji navên Xwedê ye ku di nav Esmayê Hûsnayê da cih digire. Koka vê peyvê "berˀ", "bûrˀ" an jî "berûˀ" e û di zimanê erebî da tê wateyên “afirandin, bêqisûr û paqijbûn, dûrbûna ji hemî nexweşî, qisûr û eyban (Topaloğlu, 1992: 73). Çend sedemên evqas zêde bikaranîna navê “Barî” di *Gulzarê* da dikarîn wiha rêz bikin.

- Şûşî di qelemperîya *Gulzarê* da behsa afirandina Xwedê ya bê hempa dike û metha afirandina wî dike. Dibe ku Şûşî dixwaze bala xwîneran bikêşe ser afirandina Xwedê yê bêqisûr.

- *Gulzar* ji serî heta dumahîyê behsa jîyana Pêxemberî dike. Gava Şûşî behsa Pêxemberî dike bi mest û heyran dimîne. Dibe ku Şûşî dixwaze bala xwîneran bikêşe ser afirandina Pêxemberî ya bêqisûr. Dixwaze li ser Pêxemberî nîşan xwîneran bide ka afirandina Xwedê çiqas ya hêja û bêqisûr e.
- "Barî" navêkî kurt û bi awayekê muzikal e, çêtir û hêsantir li veznên ʿerûzên tê.

Di tabloya jêrîn da navên Xwedê yên ku di *Gulzarê* da derbas dibin wekî tablo hatiye amadekirin. Di tabloyê da navê Xwedê hejmara derbasbûna wî di *Gulzarê* da û bi kurtî wateya navî cih digire.

**Tablo 2. 15:** Navên Xwedê di Gulzarê da

| Navê Xwedê | Hejmara Derbasbûnê | Wateya Navê Xwedê |
|---|---|---|
| **Xudê / Xuda** | 590 (Xudê: 393, Xuda: 197) | Xwedayê yekta, îlah |
| **Reb** | 163 | Xudan, Perwerdekar, efendî |
| **Barî** | 148 | Afirîner, xuliqker |
| **Xaliq** | 33 | Afirîner |
| **Reḥman** | 31 | Dilovanê herî merhametdar |
| **Ellah** | 26 | Navê taybet ê Xwedê yê misilmanan |
| **Ẕulcelal**[1] | 24 | Xwediyê azamet, haşmet û qudretê |
| **Ẋeffar** | 18 | Bibexşînerê gunehan |
| **Cebbar** | 7 | Hêzdar, Temîrker |
| **ʿElîm** | 6 | Zanyarê her tiştî |
| **Qadir/Qedîr** | 6 | Bi quwet, ê ku her daxwaza xwe dikare bîne cih. |
| **Reḥîm** | 5 | Mihrîban, dilovan |
| **Qehhar** | 5 | Zelîlker, li her tiştê ku dixwaze dikare bike |
| **Settar** | 4 | Yê ku guneh, kêmasî û eybên bendeyên xwe vedişêre, diparêze |

[1] Di 19 cihan da wek Zulcelal di 5 cihan da jî wekî Celal derbas dibe

| Navê Xwedê | Hejmara Derbasbûnê | Wateya Navê Xwedê |
|---|---|---|
| **Quddûs** | 3 | Pîroz, Pak û pakij, ji her kêmasîyan dûr |
| **Baqî** | 3 | Dawîya hebûna wî nîne |
| **Xebîr** | 2 | Agehdar, haydar |
| **Ḥekîm** | 2 | Her karê wî bi hîkmet û wate |
| **Wekîl** | 2 | Piştevan, kefîl |
| **Tewwab** | 2 | Qebûlkerê guneh û poşemanîyan |
| **Naṣir** | 2 | Alîkar, Yê ku alîkariyê dike |
| **Ḥeyy** | 2 | Jîndar, sax, zînde |
| **Melîk** | 1 | Key, hukimdarê mutleq |
| **Ḥesîb** | 1 | Hesabker |
| **Celîl** | 1 | Mezin, zor birêz |
| **Kerîm** | 1 | Xwedî lutf û kerema gelek zêde |
| **Reqîb** | 1 | Çavdêr, nêrevan, bîner û amade |
| **Mecîd** | 1 | Qedr û şanê wî mezin e, Rûmetdar |
| **Ṣebûr** | 1 | Bênfireh, bisebir |
| **Hadî** | 1 | Rêber, ew e hîdayetê dide |
| **Qerîb** | 1 | Yê gelekî nêzîkê ʿebdê xwe |
| **Fettaḥ** | 1 | Yê ku vedike, pirsgirêkan çareser dike |
| **Waḥid** | 1 | Yekta, tek, bê şirîk |

### 2.6.4. Melek

Di *Gulzarê* da peyva melek 30 caran derbas dibe. Lê rasterast tenê navê du melekan derbas dibe. Navê Cibrîl 49 caran û yê Mîkal jî 2 caran derbas dibe. Ji bilî van navê ʿEzraîl jî wekî “Melekê wekîlê canî” derbas dibe.

...

*Tim girtî rikêb emînê **Cibrîl***

***Mîkalî*** *celew digirt bi tebcîl* (*Gulzar*, b: 4350)

...

*Peyẋemberî da di asemanî*
*Mazin* ***melekê wekîlê canî*** (*Gulzar*, b: 4772)

Ji bilî van navên melekên dî di *Gulzarê* da derbas nabin.

### 2.6.5. Pêxember

Di Qurana pîroz da navê bîst û pênc Pêxemberan derbas dibe. Di *Gulzarê* da ji van bîst û pêncan navê 18 Pêxemberan derbas dibe yê 6 Pêxemberan jî (Lut, Şuʿeyb, Zulkifl, Îlyas, Elyesa, Zekerîya) derbas nabe. Wekî mînak navên van Pêxemberan di *Gulzarê* da wiha derbas dibin:

***Adem*** *ku dikir beyan bû wan ew*
*Subhan ji te gûtî wan heman ew* (*Gulzar*, b: 9445)

*Ṭufan te dida bû xaṭirê* ***Nuḥ***
*Pê xendiqî kafiṛê siyehrûḥ* (*Gulzar*, b: 9448)

*Çen tiştê mezin te dan* ***Suleyman***
*Ber emrê wî kir te ba bi ferman* (*Gulzar*, b: 9455)

*Asin te nerim dikir bû* ***Dawud***
*Kuştî te bi bayî ʿAd ji bû* ***Ḥûd*** (*Gulzar*, b: 9454)

*Namus e ew e ku hat bû* ***Musa***
*Nê her tu yî mijdedayê* ***ʿÎsa*** (*Gulzar*, b: 2687)

*Yek hezretê* ***Îbrahîm*** *Xelîl e*
*Yê dîke kuṛê wî* ***Îsmaʿîl*** *e* (*Gulzar*, b: 2400)

***Yunis*** *te xilaṣ dikir ji masî*
***Yeʿqûbî*** *bînahî lew kirasî* (*Gulzar*, b: 9456)

***Yusif*** *te dikir ji zelle qurtar*
*Burhan te nîşa wî da bû hişyar* (*Gulzar*, b: 9457)

***Eyûb*** *te ji paşî çendî salan*
*Gel çendî bela û êş û nalan* (*Gulzar*, b: 9458)

*"Ta derge vekirbû dergevanî*
***Idrîs*** *me didî di wî mekanî"* (*Gulzar*, b: 4429)

*"Ey bêt û bi xêr birayê* ***Ṣaliḥ***
*"Peyẋemberekê emîn û nasiḥ* (*Gulzar*, b: 4418)

*"**Harûn** me didî di vî asemanî*
*Ba reddê selam û dil ṣefayî* (*Gulzar,* b: 4433)

*"Dîtin me du kes li wêrê dîsa*
***Yeḥyayê** nebî ewê dî ʿÎsa*" (*Gulzar,* b: 4415)

Li gel vê yekê navê 3 Pêxemberên (Xiḍir[1], Berxîya[2], Yuşeʿi[3]) ku di Quranê da derbas nabin di *Gulzarê* da derbas dibin. Di *Gulzarê* da navên van her sê Pêxemberan wiha derbas dibe:

*Meşhûr e **Xiḍir** ku Ermîya ye*
*Ta nûke xudan heyat û maye* (*Gulzar,* b: 1305)

*Her wekî wî bû **Berxîya** peyember*
*Hun her du herin bû Mekke yekser* (*Gulzar*, b: 1306)
...
*Westandî bû **Yuşeʿî** te xurşîd*
*Idrîs te bire meqamê temcîd* (*Gulzar,* b: 9460)

Di *Gulzarê* da navê Pêxemberê ku herî zêde derbas dibe Muhemmed e. Ji xwe *Gulzar* jî behsa jîyana wî dike. Di *Gulzarê* da 138 caran navê Muhemmed dibore. Ji bilî navê Muhemmed, 22 caran wekî Ehmed û 5 caran jî wekî Babê Qasim derbas dibe. Ji bilî van navan bi qesta Muhemmed, 209 caran navê Nebî û 377 caran navê Resûl derbas dibe. Wekî mînak di van beytên jêrîn da navê Pêxemberî wekî Muhemmed, Ehmed, Babê Qasim û Resûl derbas dibe:

*Her we bi **Muḥemmedî** me bawer*
*ʿEbdê te ye qaṣid û peyember* (*Gulzar,* b: 9)
...
*Xaliq bi beşeṛ dikir ʿînayet*
***Eḥmed** wî hinart bi şeṛʿ û ayet* (*Gulzar,* b: 529)
...
*Zêde li evan jî neslê haşim*
*Axir li evan jî **Babê Qasim*** (*Gulzar*, b: 931)
...
*Ew lêve nebû ḥeta xeber dan*

---

[1]Di nav alimên îslamê da derbarê Xidir da îxtîlaf heye. Li gorî hin aliman wek Pêxember, welî an jî melek hatiye dîtin (Çelebî, 1998: 406-409). Şûşîdi Gulzarê da Xidir wek Pêxember nîşan dide û dîyar dike ku Xidir û Ermîya heman kes in (1305). Navê Xidir carekê yê Ermîya 2 caran derbas dibe.

[2] Berxîya di hin tefsîr û çavkanîyên îslamê da wek pisxalet û wezîrê Suleyman Pêxember derbas dibe. Li gorî van çavkanîyan ew kesekî xwedî keramet bû (Harman, 1991: 455) Şûşîdi berhema xwe da Berxîya wek pêxemer nîşan dide (b.1306).

[3] Li gorî Tewratê harîkarê Musa Pêxember bû û piştî wî bibû Pêxemberê qewmê wî. Ev nave di Qur'anê da derbas nabe lê li gorî aliman çend îşaret hene ku behsa wî dikin (Harman, 2013: 43-45). Şûşîdi Gulzarê da wek Pêxember behsa wî dike (b. 9460).

*Çî hatiye ser **Resûlê** ʿerdan* (*Gulzar*, b: 1889)

**Tablo 2. 16:** Pêxemberên Ku Navên Wan di Gulzarê da Derbas Dibin

| Navê Pêxember | Hejmara Derbasbûnê (*Gulzar*) | Di Quranê derbas dibe? | Nîşe |
|---|---|---|---|
| Muḥemmed | 138 | Derbas Dibe | Eḥmed: 22, Babê Qasim: 5, Nebî: 209, Resul: 377 |
| Adem | 15 | Derbas Dibe | |
| Îsa | 13 | Derbas Dibe | Mesîh: 4 |
| Mûsa | 13 | Derbas Dibe | |
| Îbrahîm | 5 | Derbas Dibe | |
| Ḥûd | 4 | Derbas Dibe | |
| Yûnis | 3 | Derbas Dibe | |
| Idrîs | 2 | Derbas Dibe | |
| Saliḥ | 2 | Derbas Dibe | |
| Îsmaîl | 2 | Derbas Dibe | |
| Yûsif | 2 | Derbas Dibe | |
| Harûn | 2 | Derbas Dibe | |
| Yeḥya | 1 | Derbas Dibe | |
| Nûḥ | 1 | Derbas Dibe | |
| Eyûb | 1 | Derbas Dibe | |
| Dawûd | 1 | Derbas Dibe | |
| Suleyman | 1 | Derbas Dibe | |
| Xidir | 1 | Derbas Nabe | Ermîya: 2 (Li gorî Şêx Tahir, Xidir û Ermîya heman kes in) |
| Berxîya | 1 | Derbas Nabe | |
| Yûşeʿi | 1 | Derbas Nabe | |
| Yaqûb | 1 | Derbas Dibe | |

### 2.6.6. Dîn û Kitêbên Pîroz

Di *Gulzarê* da herî zêde navê dînê îslamê derbas dibe. Di 147 caran wekî îslam û di 60 cihan da jî wekî misilman bi giştî 207 caran derbas dibe. Ev jî tiştekê asayî ye ji ber ku berhem berhemeke îslamî ye.

...

*Ḥemze ku bi xêr dibîte **Îslam***

***Îslam** dibitin ji nû xudan nam* (*Gulzar*, b: 3745)

...

*Ḥîna ku belav bu dînê **îslam***

*Nêv ehlê Medîneya nîkûnam* (*Gulzar*, b: 5359)

...

Piştî îslamîyetê navê dînên ku herî zêde derbas dibe cihûtî ye. Di *Gulzarê* da 50 caran cihûtî wekî Cwî/Cû derbas dibe. Sedema vê yekê jî ewe ku li Medîneyê cihû hebûn û têkilîyên Pêxemberî herî zêde li gel cihûyan hebûn.

*Çen carê* ***cwîyan*** *digûte wane*

*Ha weqtê peyẋemberê zeman e* (*Gulzar*, b: 5230)

...

*Wan hîvî hebun bi her çî ḥale*

*Bu dînê* ***cwîyan*** *biden wî pale* (*Gulzar*, b: 6505)

Piştî cihûtîyê senemperistî 21 caran wekî butperistî/senemperistî derbas dibe. Ev jî tiştekê asayî ye ji ber ku gava ku wehî bo Pêxemberî hatî qewmê wî ji xwe senemperist bûn û di *Gulzarê* da behsa têkilîyên wan tê kirin.

*Nêzîke xirab biket bi çustî*

*Mala ṣenem û* ***ṣenemperistî*** (*Gulzar*, b: 1533)

Xiristiyanî di *Gulzarê* da bi awayê mesîhî/fela/fila/xaçperistî 13 caran derbas dibe. Sedema kêm derbasbûna xiristiyanîyê li hemberî cihûtîyê ew e ku xiristîyan li hemberî cihûyan hejmara wan kêm bûn û hindî cihûyan têkilîyên wan li gel Pêxemberî çênebûne.

*Yê dî yê* ***filan*** *bu* ***xaçperistan***

*Ew her du di xwar û naduristan* (*Gulzar*, b: 4662)

Zerdeştî bi awayê agirpersî/mecûsî 6 caran di *Gulzarê* da derbas dibe. Sedema derbasbûna vî dînî di *Gulzarê* da ew e ku Zerdeştî dînê kurdan ê kevin e. Cihên ku navê agirpersî/mecûsî derbas dibe jî Şûşî hemda Xwedê dike ku bûye misilman û ji wî dinî dûrketîye.

*Ber wan neba em nihû* ***belûsî***

***Agirpersî*** *û di pîs* ***mecûsî*** (*Gulzar*, b: 948)

Hindûîzm jî di *Gulzarê* da tenê carekê bi awayê çêl û gaperist derbas dibe. Sedema vê jî ew e ku di dewra Pêxemberî da têkilîyên hindûîzmê li gel îslamîyetê çênebûne, ji yek dûrbûne.

*Hindan digu çêl û* ***gaperist in***

*Hin ʿabidê roj di nadirist in* (*Gulzar*, b: 2559)

Di *Gulzarê* da navê çar kîtêbên pîroz derbas dibin. Navê Încîlê 10 caran (9 caran wekî Încîl di cihekî jî da jî wekî Kelamê Îsa), yê Tewrat û Zebûran jî 2 caran derbas dibin.

***Qurʾan*** *wî kirî delîl û ṛehber*

*Serdarê rusûl şefîʿê meḥşer (Gulzar, b:* 54)
...
***Încîl** e eger **Zebûr** û **Tewrat***
*Mensûẋ diketin bi neṣṣê ayat* (*Gulzar*, b: 1535)

Di *Gulzarê* da herî zêde (126 caran) navê Quranê derbas dibe. Ji bilî Quranê çend navên dî yên Quranê yên wekî kîtab, kelam, zîkr, wehî, nûr û hwd. hene (Birışık, 2002). Di *Gulzarê* da navê Quranê 16 caran wekî kelam, 15 caran wekî wehî, 7 caran wekî kitêb/kîtab û carekê jî wekî tenzîl derbas dibe.

*Tiştek tu eger dizanî Qurʾan*
*Zeḥmet nebî tu bixwîne der an* (*Gulzar*, b: 3595)

*Gu "ʿUtbe eger tu huşiyarî*
*Tu guhde hinek kelamê Barî"* (*Gulzar,* b: 3784)

### 2.6.7. Mucîzeyên Pêxemberan

Mucîze ew nîşan in ku Pêxember nîşanî mirovan didin da ku yên bawerîya wan bi Xwedê û Pêxember nîne bawer bikin û yên ku ji xwe bawermend in jî bawerîya wan xurttir bikin. Şûşî di *Gulzarê* da beşeke taybet ji bo mucîzeyên Pêxemberan bi taybet jî bo mucîzeyên Muhemmed (s.x.l) veqetandîye. Ev beş ji deh binbeşan û ji 732 beytan pêk tê. Dabeşbûna vê beşê bi vî şiklîye:

#### 2.6.7.1. Mucîzêyên Pêxemberên Berê (Berahîk)

Şûşî di *Gulzarê* da ev beş wekî "Berahîk" binavkirîye. Di vê beşa berahîkê da behsa mucîzeyên 14 Pêxemberên berî Muhemmedî (s.x.l) tê kirin. Ev beş ji 46 beytan pêk tê û wekî destpêka mijara "Mucîzeyên Pêxemberî" ye. Mucîzeyên Pêxemberên berê ku di vê beşê da derbas dibin bi vî şiklî ne:

**Adem Pêxember:** Secdekirina melekan bo wî (*Gulzar*, b: 9442-9447)

*Adem te birî bû jûr meqame*
*Esmaʿ te nîşa wî dan temame*
*...*
*Her we ku te dayê feḍl û cah e*
*Bû cumle melek bi secdegah e*

**Nuh Pêxember:** Bi tufanê qirkirina qewmê wî û çêkirina keştîyê (9448-9449)

*Ṭufan te dida bû xaṭirê Nuḥ*
*Pê xendiqî kafiṛê siyehrûḥ*
...
*Çêkir wî gemî bi xir xebatê*
*Çî gel wî hemû diçûn necatê*

**Îbrahîm Pêxember:** sarbûna agirî bo wî û hinartina qurbanekê bo wî wekî fîdyeya Îsmaîl Pêxemberî (*Gulzar*, b: 9450-9451)

*Agir te di kirye xûş û ṣar e*
*Ser xaṭirê Îbrahîmê yar e*

*Feḍla te piṛṛ e bi kuṛ Xelîlî*
*Ew fîdye te dabû Îsmeʿîlî*

**Mûsa Pêxember:** Şeqbûna behrê û derbûna diwazde kanîyan ji berî bi asayê wî (*Gulzar*, b: 9452-9453)

*Musa bi ʿeṣa û destê nûrîn*
*Derya te bû kir bi rahê bûrîn*

*Ḍerbek bi ʿeṣa dema wî danî*
*Derbûn ji berî duwazde kanî*

**Dawud Pêxember:** Nerimbûna asinî ji bo wî (*Gulzar*, b: 9454)

*Asin te nerim dikir bû Dawud*
*Kuştî te bi bayî ʿAd ji bû Ḥûd*

**Hûd Pêxember:** Qirkirina qewmê wî Ad bi bayî (*Gulzar*, b: 9454)

*Asin te nerim dikir bû Dawud*
*Kuştî te bi bayî ʿAd ji bû Ḥûd*

**Suleyman Pêxember:** Beremirbûna bayî bo wî (*Gulzar*, b: 9455)

*Çen tiştê mezin te dan Suleyman*
*Ber emrê wî kir te ba bi ferman*

**Yunis Pêxember:** Xilasbûn ji zikê masîyê (*Gulzar*, b: 9456)

*Yunis te xilaṣ dikir ji masî*
*Yeʿqûbî bînahî lew kirasî*

**Yakub Pêxember:** çavebûna wî bi kirasî (*Gulzar*, b: 9456)

*Yunis te xilaṣ dikir ji masî*

*Ye'qûbî bînahî lew kirasî*

**Yusif Pêxember:** Xilasbûna ji zelleyê (ji entrîkayên Zuleyxayê) (*Gulzar*, b: 9457)

*Yusif te dikir ji zelle qurtar*

*Burhan te nîşa wî da bû hişyar*

**Eyûb Pêxember:** Çêbûna êş û kulên wî, saxbûna wî ji nexweşîya giran (*Gulzar*, b: 9458-9459)

*Eyûb te ji paşî çendî salan*

*Gel çendî bela û êş û nalan*

*Ew çêbîyeve bi aveka ṣar*

*Ṣaẋbuve giyanê wî wekî car*

**Yuşe'i Pêxember:** Sekinandina rojê ji bo wî (xurşîd) (*Gulzar*, b: 9460)

*Westandî bû Yuşe'î te xurşîd*

*Idrîs te bire meqamê temcîd*

**Idrîs Pêxember:** Birina wî bo meqamê temcîdê anku meqamê bilind (*Gulzar*, b: 9460)

*Westandî bû Yuşe'î te xurşîd*

*Idrîs te bire meqamê temcîd*

**Îsa Pêxember:** Saxkirina mirîyan (*Gulzar*, b: 9461-9462)

*'Îsayî te danê çen 'ecebkar*

*Ṣaẋ kireve bi tu mirî wî çen car*

*Ser gûr û bereṣ wî dest di malî*

*Çêbûne bi iẕnê ẕulcelalî*

### 2.6.7.2. Mucîzêyên Muḥemmedî (s.x.l)

Şûşî di *Gulzarê* da cihekê gelekî berfireh daye mucîzeyên Muhemmedî (s.x.l). Di *Gulzarê* da di bin sernavên *Mu'cîzatên Esmanî* (184), *Tesbîhata Zadî, Ber û Tirî û Axaftina Zadî li gel Pêxemberî* (22 beyt), *Silavkirina Bera û Taeta Bêruha Bo Pexemberî* (79 beyt), *Axiftina Dara li gel Pexemberî û Guhdarbûna Wan bo Pêxemberî* (62 beyt), *Nalîna Qurmê Darê bo Peyemberî Silav lê Bin* (37 beyt), *Guherîna Tişta Bo*

*Wî Silav lê Bin* (17 beyt), *Axiftina Giyanewera û Guhdariya Wan Bu Wî Silav lê Bin* (141 beyt), *Zayîna Ava Bijûn di Naf Tiblêt Wî yêt Pakij da* (58 beyt) û *Zayîna Avê Bi Bereketa Wî û Zêdebûna Wê Bi Deskirin û Daxwaza Wî* (86 beyt)**,** bi 686 beytan behsa 52 mucîzeyên Pêxemberî tê kirin. Ji beşa mu'cîzeyên Muhemmed Pêxemberî (s.x.l) çend mînak:

*Meʿlûm wekî rojê ron diyar e*
***Ummî bu** yeqîn ne xwûndewar e*

*Ney xwûndî elîf ne sîn û şîn e*
*Ney zanî ḥerif ji şeṛʿ û dîn e* (*Gulzar*, b: 9470-9471)
...
*Êkê dî peyemberê me nîşan*
***Qurʾan** e ewa ʿeẓîm û piṛṛ şan* (*Gulzar*, b: 9492)

...
*Wan dîtî heman bi çavê ser ew*
***Ew mahe temame bûyî du ker ew*** (*Gulzar*, b: 9614)
...
*Carek dî li cê xu ew helate*
*Ronbûve dubare xir welate* (*Gulzar*, b: 9641)
...
*Ragirtibû roj di asemane*
*Ḥetta ku dihatve karewane* (*Gulzar*, b: 9650)
...
*Zadek me dikir bi nuşê cane*
*Wî zadî zikir dikir ʿeyane* (*Gulzar*, b: 9655)
**...**
*Her dar û beran digût ji her gah*
*Ey ser te selam resûlê Ellah* (*Gulzar*, b: 9680)
**...**
*Dîwar û der û berêt derazîn*
*Sê car hemîyan digûtî amîn* (*Gulzar*, b: 9693)

*Carek bu li ser Ṣebîr çiyayî*
*Wî gûte peyemberê Xudayî*

*Ser min tu here me tirse piṛṛ can*
*Ser min bikujin te qewmê nadan* (*Gulzar*, b: 9702-9703)
...
*Çendek di nivist resûlê muxtar*
*Min dîtî dihat ji wêve yek dar*

*Şaper wê ji xû hemî kirin şûr*
*Ser pakeleşê resûlê piṛṛ nûr* (*Gulzar*, b: 9803-9804)
...
*Bû mînberê çû resûlê ʿalî*
*Wê gavê sitûn ji bû wî nalî*

*Ew nalî wekî biçûkê ẋemnak*
*Ta piṛṛ bû ji dengî mizgeta pak*

*Nalên wê belê ji şewqê ḥeq bû*
*Lew ew ji ẋeman ji xû ve şeq bû* (*Gulzar*, b: 9827-9829)
...
*Ew ʿEbdê Xudê ku Ceḥiş bab e*
*Wî şîr diweşandî bê ḥîsabe*

*Şîrê wî şikest di nîvî cenge*
*Çû lalî peyemberê bi senge*

*Yek ṭayê qesib wî daye destî*
*Gava wî hejand bu şîr durustî* (*Gulzar*, b: 9862-9864)

Di *Gulzarê* da mucîzeyên dotina bizineka bêşîr, saxkirina çavê neʿman kurê Qetade û nebûna siha wî di nav beşa "Mucîzeyên Pêxemberan" da cih nagirin lê di cihên cuda da behsa wan tê kirin. Wekî mînak:

*Gû: Min bi fîda bi bab û daye*
*Çen mêje çu şîr di wê nema ye* (*Gulzar*, b: 5918)

...

*Wan taze vexwar û wî dubare*
*Wî piṛṛ kireve bi lêv tirare* (*Gulzar*, b: 5922)

*Wê gavê dihate nik peyember*
*Çavê wî li cê xû hatibû der*

*Wî birve cihê xû dest bi malî*
*Çêbûve bi emrê Ẕulcelalî* (*Gulzar*, b: 7631-7632)

...

*Sêber wî nebû di heyv û ṭavan*
*Ẋafil ji xudê nebû çi gavan* (*Gulzar*, b: 8598)

### 2.6.8. Taybetmendîyên Pêxemberî (Şemaîl û Hîlye)

Hîlye di ferhengê da tê wateyên "xeml, zînet û gerdenî" wekî mecaz jî tê wateyên "afirinî, sûret û wesfên xweş" (Uzun, 2020, r. 44). Di edebitayê da ji wan berhemên ku taybetmendîyên fîzîkî yên Pêxemberî têne vegotin hîlye tê gotin. Şemaîl pirjimara "şîmal"ê ye ku şîmal jî di ferhengê tê wateya "xislet, tibʿet, exlaq û alîyê çêp". Şemaîl wekî têgeh tê wateya "alîyê Pêxemberî yê beşerî, şekl û şemal, jîyana taybet û exlaq (Kandemir, 2010, r. 497). Gava mirov li wateya hîlye û şemaîlê dinêre mirov dişêt bibêjît ku hîlye parçeyek e ji şemaîlê. Ji ber vê yekê em dê li vê beşê peyva şemaîlê bikarbînîn. Di vê beşê da em dê li ser şemaîla di *Gulzarê* da derbas dibît bisekinîn.

Şûşî di *Gulzarê* da beşeke taybet ji bo şemaîla Pêxemberî veqetandîye û bi hûrgulî behsa şemaîla Pêxemberî kirîye. Şûşî di *Gulzarê* da di "Mêrga Pêncem (rewdeya pêncem)" da cih daye şemaîlê. Ev beş ji heşt kulîlkan pêk tê û Şûşî di kulîlkên yeke heta çarê (1-4) behsa şemaîla Pêxemberî dike. Şûşî bi qelemperî 966 beyt ji bo şemaîla Pêxemberî terxan kirîye.

Şûşî, di kulîlka yekê ya bi 101 beytan behsa taybetmendîyên bedenî yên Pêxemberî dike. Şûşî di vê beşê da behsa bejn û bala wî, dest û pîyên wî, çavên wî, difna wî, simbêlên wî, pora wî, enîya wî, sîngê wî, milên wî, birêveçûna wî û hwd. dike. Wekî mînak em dişên çend mînakan bidin:

*Bejna te dibêm nihalê ʿerʿer*

*Şîrîn û cewan ji payî ta ser* (*Gulzar,* b: 7970)

...

*Dêmê te texre çû bedre nûrîn*

*Rengê te sipî û ṣur e şîrîn* (*Gulzar*, b: 7975)

...

*Çavêt te di ṛeş gelek cewan in*

*Ebru di zirav û ṛeş kivan in* (*Gulzar,* b: 7980)

...

*Ma wekî te şirîn û taze kê dî*

*Ḥîna tu diçuyî bi hêdî hêdî* (*Gulzar,* b: 8019)

Kulîlka duyê li gorî kulîlkên dî yên behsa şemaîla Pêxemberî dikin ya herî mezin e. Şûşî di vê kulîlkê da bi 628 beytan behsa exlaqê xweş ê Pêxemberî, rewşa wî ya malê, aqil û pêzanîna wî, dilnermî û dilfirehî ya wî, merdîya wî, şîyan û çelengîyên wî, zûhda wî, tiştên ku Pêxemberî jê hezkirî û xwarî, îbadetê wî, tirane û kenîyê wî û bêhnxweşîya wî dike. Wekî mînak em dişên çend mînakan bidin:

*Xûşṭebʿî û nermî û sexawet*

*Maqûlî û xîret û şecaʿet* (*Gulzar,* b: 8068)

...

*Xûşṭebʿ û xeberxûş û şirînkar*

*Cilkê xû bi xû pinî dikir car* (*Gulzar*, b: 8134)

...

*ʿEqlê wî selîm û piṛṛ kemal e*

*ʿIlmê wî ji weḥy e bê mîs̱al e* (*Gulzar,* b: 8168)

...

*Wî xwarîye guşt û qesb û nane*

*Ḥelwa ku ji qesb û şîr beyane* (*Gulzar,* b: 8431)

...

*Larî dikirin wî car bi caran*

*Bu keyf û dilê heval û yaran* (*Gulzar*, b: 8500)

Di kulîlka sêyê da Şûşî bi 94 beytan behsa cilkên wî, tişt û nivînên wî, dewar û pezên wî û çekên wî kirîye. Wekî mînak em dişên çend beytan bidin:

*Raêx wî hebû zivir çu ber ew*

*Êka dî ji parçe kevlemer ew* (*Gulzar*, b: 8727)

...

*Hespêt wî bi ewwel û bi axir*

*Bîst in hemû eşlî û di faxir* (*Gulzar,* b: 8754)

...

*Neh şîr wî hebûn di piṛṛ buha ne*

*Her êke bi navekî beyan e* (*Gulzar,* b: 8762)

Şûşî di kulîlka çarê da bi 143 beytan behsa fazîletên Pêxemberî, karên fer ên wî, tiştên ku bo wî heram û mekrûh, tiştên bo wî durist û serbest û pakijiya bermayên wî dike. Wekî minak em dişên çend beytan bidin:

*Qedrê wî li nik Xudê giran e*

*Ew serwerê cumle enbiyan e* (*Gulzar,* b: 8785)

...

*Caîz nebû ew bibêjî şiʿiran*

*Yan werbigirît zekat û xêran* (*Gulzar,* b: 8842)

...

*Caîz bû ji bû pitir li çar jin*

*Jin gel met û xaletê li nik bin* (*Gulzar,* b: 8865)

...

*Pakij bû leş û giyanê şîrîn*

*Her tiştê li gel wî pak û xavîn* (*Gulzar,* b: 8886)

Şûşî, her çend beşeke taybet bo şemaîla Pexemberî veqetandibe jî ji bilî vê beşa taybet jî li gelek cihan behsa şemaîla Pêxemberî kirîye. Wekî mînak di ev beyta jêrîn ne di nav "Mêrga Pêncan" da ye lê behsa taybetmendîyên bedenî yên Pêxemberî dike:

*Gerden spî û dirêj û taze*

*Sîngê wî çi pan e gencê raz e* (*Gulzar,* b: 5936)

**2.6.9. Gotinên Pêşîyan û Biwêj**

Gotinên pêşîyan û bîwêj di nav çanda kurdan da xwedî cihekê taybet in. Gotinên pêşîyan, ew gotinên bab û kala ne ku encama ceribandinên dirêj û tecrûbeyên berfireh derketîne holê (Aksoy, 1988, r. 37). Ev gotin gotinên qalibgirtî ne û nifş bi nifş heta roja me hatîne neqkilkirin (Yıldırım, 2012, r. 389). Xwedîyê van gotinan dîyar nînin, gotinên bi hîkmet in û gelek pend û şîretan di nav xwe da dihewînin (Elçin, 1992, r. 348). Ev gotine bi gelemperî kurt in ji yek yan du hevokan pêk tên. Gotinên

pêşiyan, bi vegotinên xwe yên xwerû û dîdaktîk, ravekirina ramanên gel ên hevpar in (Öztürk, 2015, r. 322). Hin ji van gotinan mînak in, hin pend û şîret in, hin jî serhatîyên sosret û balkêş ên hizar sala ne (Öncü, 2009, r. 7). Ev gotin bi pîranî bi armanca pend û şîretan wekî amûrek di nav jîyana rojane da têne bikaranîn. Helbet ne tenê di nav jîyana rojane da di nav edebiyata gelêrî, modern û klasîk da jî gelek caran ji van gotinan sûd tê wergirtin.

Wek berhemeke tradîsyona edebiyata klasîk, *Gulzar* jî di nav xwe da gelek gotinên pêşîyan dihewîne. Şûşî bi armanca ku nesîhetan li xwînerên xwe bike û xwîner jî dersekê bo xwe jê wergirin di *Gulzar*e da cih daye gotinên pêşîyan. Gotinên pêşîyan ên ku di *Gulzarê* da derbas dibin eve ne:

**Tablo 2. 17:** Gotinên Pêşiyan di Gulzarê da

| Hejmara Beytê | Gotina Pêşîya | Şirove |
|---|---|---|
| 1060 | *Dûstê xû bira bizane hîngî / Gava tu ketî deravê ṭengî* | Dostê heqîqî di rojên teng da aşkere dibin. |
| 1061 | *Meʿlûm e xudanê cah û malî / Dûstê wî bi naz û gef dinalî* | Dostên kesên zengîn di dilê xwe da ya di piş dostên xwe da gefan li wan dike. Çavê wan bi dostê wan narabe. |
| 1073 | *Her kes ku ḥesed di can û dil bît / Daîm dê ser û dilê wî kul bît* | Kesê ku hesed di dilê wî da hebe ew kes her dem dê xemgîn be, bi kul û keser be. |
| 2004 | *Xaliq derekî eger bi ḥîkmet / Bigirît vedket dîger bi reḥmet* | Ger ku xwedê tiştekê ku em dixwazîn nede me, ew ji ber wê ye ku tiştekê hêj baştir bide. |
| 2351 | *Lewṛa çî neket guhdarê meznan / "Dê pêve bihên wî şaxê biznan* | Kesê ku guhê xwe nede mezinan ew dê gelek poşeman bibe. |
| 2940 | *Mezinan gûtîye: Ku yarê parî / Naket ji te ra çi harîkarî* | Kesê ku ji ber berjewendîya xwe dostanîya yekî bike di dema tengavîyan da harîkayê nade dostê xwe. |
| 3138 | *Nabînî kitik dibîte naçar / Gel şêrî diket bi pence kujtar* | Gava ku çi çare neman ji bo mirovî, mirov dişêt her tiştî biket. |
| 3048 | *Berṭengî eger çî zûr di tal in / Emma nê di kuṛt û ser zewal in* | Bertengî gelek nexweş in lê hemî berteng î kurt in û dawîyeke wan heye. |
| 3539 | *Meznan gûtîye: Heyîn gelek şûl / Ewwel dimeşin bi yek qise û pûl* | Gelek şol hene gava ku di dema ewil da mirov li ser bisekine tene bi yek gotin an parekî kêm hel dibin. |
| 3540 | *Ger tu qederek vehêlî ew kar / Nabî bi du ṣed reca û dînar* | Gava ku şolek di dema wî da neyê hel kirin di dawîyê |

| | | |
|---|---|---|
| | | da bi gelek pare û rîcayan jî nayê hel kirin. |
| 3541 | *Dara tu ji nû bi dest biçînî / Dêşêy bi tinê ji bin derînî* | Ji bo ku tiştek an karek saxlem be divê dem ser da biçe ji ber ku tişt an karên nû zeîf in û dikare zû xira bibin. |
| 3542 | *Ger ew qederek bihête hêlan / Der nayê li cê xu ew bi fîlan* | Şolê ku di wextê xwe da neyê kirin paşê kirina wî şolî gelek bi zehmet dikeve. |
| 3543 | *Bertîl ku dibên çi xûş delîl e / Ṣed karê mezin diket ẕelîl e* | Bertîl anku rişwet her çend ku gelek şol pê sanahî bên kirin jî gelek şolan diherimîne. |
| 3544 | *Her kes tu dibînî tund û germ e / Bertîlê bidê digêrî nerme* | Kesê kute dît şolê te naket tu rişwetê bideyê dê nerim bît û şolê te hel ket. |
| 3724 | *Peyẋemberî hîç cewab negûte / Lew ehmeqî bes cewab sukût e* | Divê mirov li gel kesên ehmeq nekeve nîqaşê ya baş ew e ku mirov li gel wan neaxive. |
| 5204 | *Evro bu we ferset im bi dilxwaz / Furṣet ku dihêt li ser neden baz* | Gava ku firset ketê destê mirov divê mirov wê firsetê baş bikarbîne. |
| 6126 | *Babet niye her kesî gula geş / Kerṭebʿî nevêt ji ẋeyrî kerbeş* | Ne lazim e ku her kes ji tiştên baş û xweş hez bike. Kesên nebaş û xirab heş tiştên xirab û nexweş dikin. |
| 6127 | *Her kes ne dinasî durr û cewher / Lew zêrî nenasî bijlî zerger* | Her kes ji her tiştî fêm nake û qedrê wê nizane ji bilî pisporên wê. |
| 9531 | *Her çendî zelam xudan kemal e / Ser karê xû nik xû bê mîs̱al e* | Zelam ser xwe da kesî nabînin. |

Biwêj komeka peyvan e ku herî kêm ji peyvan pêk tên û bi piranî bi wateya mecazî tên bikaranîn (Bingöl, 2014, r. 6). Çend taybetmendîyên biwêjan hene. Ev gotin anonîm in kesê ku ewil ev gotin bikarînay dîyar nîne. Hindek biwêj xwedî serwa ne. Hindek biwêj li ser çîrok an bûyerekê hatîne gotin. Hindek biwêj çîrok, orf, adet û bawerîya gelekî tînîn ziman (Aksoy, 1998, r. 501). Di *Gulzarê* da jî çendek biwêj hatîne bikaranîn. Çend biwêjên ku di *Gulzarê* da derbas dibin bi vî awayî ne:

**Tablo 2. 18:** Biwêjên di Gulzarê da

| **Hejmara Beytê** | **Biwêj** | **Şirove** |
|---|---|---|
| 1418 | Lew wî *dihûsîn li wê didane* | Didan hesûn: Derbarê tiştek an rewşekê da xwedîbûna hêrseka mezin û di encama wê da jî geflêkirin |
| 1757 | Ṣed car ji me *gerdena te aza* | Gerden Azakirin: Lêborîn, efû kirin |

| | | |
|---|---|---|
| 3191 | *Çavan li serê te derdiînim* | Çav li serî derêxistin: Qutana (lêdan) bi şîddet. |
| 3328 | Ro bi ro bi nebî *zuban dirêj bun* | Ziman dirêj: Gotinên nexweş û bê hed |
| 5044 | Êkê dî dibêt *zuban şikestî* | Ziman Şikestî: Di wateya nifînê da lalbûn. |
| 7179 | Yek jin bu çi *guhdirêj û ezman* | Guhdirêj: Yên ku guhdarîya hemî gotgotan dikin. |
| 8648 | Lew her çî kesê *rwî tirş û tal e* | Rû tirş û tal: Mirût nexweş, madekirî |
| 8653 | Gû: "Kengî te dî me ez *zubantal"/ Gûtinreq û deqşikêne* bedḥal | Zimantal: Gotinên nexweş ku deqên miron pê dişkên<br>Gotinreq: Gotinên hişk, gotinên ne nerm û nazik<br>Deqşikên: Kesê xwedîyê axiftinên nexweş ku zewqê mirovan xirab dike. |
| 7503 | Em gel we dibîne *dest li gerden* | Dest li gerden: li hemberî yek dijminbûn. |
| 3917 | Ew *ṭarîdila* û kuṛ du çave | Tarîdil: Ew kesên ku tenê xirabî û tiştên nebaş difikirin, kîndar. |
| 3279 | Lazim *jê diket cîhanê ṭarî* | Cîhan lê tarîkirin: Kuştin, xistina rewşeke gelekî xirab. |
| 2889 | *Dilreş* diketin kûṛî ji babî | Dilreş: Li hemberî kes yan tiştekî nemana vîyanê, xêrnexwazî. |
| 2508 | Têk da hemu dilreş in di *dilreq* | Dilreq: Kesên li hemberî kes yan tiştekî gelekî bêrehm û merhemet. |
| 5713 | Ḥîna ku qureyşîyêt X*udê gîr* | Xude gîr: Girtina Xwedê bi wateya neyînî |
| 43 | *Serşîn* e kesê li nik te ʿaṣî | Serşîn: Yê ku wechê wî tarî |
| 577 | *Serkêle* bikey tu ehlê îman | Serkêl: Serbilind, serferaz |
| 2342 | Nêzîk bû li wan bibît *şeṛê ṛeş* | Şeṛê ṛeş: Şerê şermezarîyê, şerê dijwar |
| 9845 | Ey Ṭahirê *qurbiser* ji bû xû | Qurbiser: Şermezar |

**2.6.10. ʿEdet, orf û Çand**

Di vê beşê da em li ser ʿedetên jidayîkbûn û zewacê yên ʿerebên dewra Pêxemberî û çanda wan a helbestê û cejnên wan sekinîne.

**2.6.10.1. ʿEdetên Jidayikbûnê**

Di *Gulzarê* da çend ʿedetên jidayîkbûnê ên civaka ʿereban derbas dibin. Hin ji wan, ʿedetên xirab ên berîya hatina îslamê bûn û bi hatina îslamê ji holê rabûne hin ji wan jî ʿedetên baş bûn ji ber vê yekê jî piştî hatina îslamê jî berdewam bûne. ʿEdetekê

xirabê ʿereban ê berîya îslamê hey û bi îslamê ji holê rabûy ew bû ku dema zarokê ewil ê wan keçik ba ew ji bo wan şermeke mezin bû. Ji ber vê yekê hin ji wan ew keçik bi saxî dixistin nava qebran û bi vî şiklî ew dikuştin. Di Gulzarê da ev mijar wiha derbas dibe:

*Ew hinde di dilreq in di baẋî*
*Wan kiç di qebir dinan bi ṣaẋî.* (*Gulzar*, b: 2511)

Yek ji van ʿedetên baş ê berîya îslamê hey û di îslamê da jî dewam dike ew e ku ji bo jidayîkbûna zarokekî vekuştina heywanekî û dayîna zîyafetekê ye. Ev ʿedet berîya îslamê jî hebûn û di îslamê da jî dewam dikin. Di *Gulzarê* da ev ʿedet wiha derbas dibin:

*Ḥetta ku li ser diburî ḥeftî*
*Yek ḥêştirê çak buy vekujtî*

*Ḥaḍir diketin ʿecîb zîyafet*
*Bu qewm û biraderan bi deʿewet* (*Gulzar*, b: 1571-1572)

ʿEdetekê dî yê jidayîkbûnê yê ku di *Gulzarê* da derbas dibe jî sinet e. Di *Gulzarê* da dema behsa jidayîkûna Pêxemberî dike dibêje ku dema ew xwidêday ew yê sinetkirî û hazir bû. Ev ʿedet di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Ew dabu xudê li eṣlê fiṭret*
*Sunnet kirî û bi taze ṣûret* (*Gulzar*, b: 1553)

ʿEdetên dî ên jidayîkbûnê ku di *Gulzarê* da derbas dibin ew ku dema zarokek jidayîkbû mezinê malbatê navekî didane ser zarokî. Bi gelemperî ʿereban navên bab û bapîrên xwe didanan ser zarokên xwe. Di *Gulzarê* da behsa bapîrê Pêxemberî Şeybe dike dema navî li Pêxemberî dike. Di *Gulzarê* da ev ʿedet wiha derbas dibe:

*Şeybey ku didît ve taze mindal*
*Wî rakir û bir bu Keʿbe derḥal*

*Navê dikir diyare dergav*
*Nevyê me Muḥemmed e şirînnav* (*Gulzar*, b: 1564-1565)

ʿEdetekê dî yê ʿereban bi taybet yên ku dewlemend ew bû ku gava ku zarokekê wan ji dayîk dibû bo zarokên xwe dayîn digirtin û zarokên xwe du salan didan wan dayîyan û wan dayînan jî şîr dida wan zarokan û ew xwidan dikirin. Gava ku Pêxember jî xwidê day ew da dayîna wî Helîmeya heta çend salan li def dayîna xwe ma. Di *Gulzarê* da ev behse wekî mînak wiha derbas dibe:

*Meʿlûm e qureyşîyan bu ʿadet*

*Xaşma xu ewêt xudanê serwet*

*Wergirtî ewê li Amînayê*

*Ew menbeʿê behcet û buhayê* (*Gulzar*, b: 1648-1673)

**2.6.10.2. Zewac**

Di nav ʿereban da zewac tiştekê giring e. Gava ku em li *Gulzarê* dinêrîn çend taybetmendîyên zewacê derdikevin pêş. Li gorî *Gulzarê* taybetmendîyên zewacên ʿereban bi vî awayî ne:

- Dema ku kurikek balix bû hate wextê zewacê bab yan papîrê wî bo wî li ber jinekê digerin. Anku biryara zewaca mezin didin û kurik jî qebûl dikin (*Gulzar*, b: 1330).

*Hizrêt xû kirin digûtî lazim*

*Ez bû jineka cewan bixwazim*

- Rê û rêbazên jin xwastinê hene (*Gulzar*, b: 1338).

*Daxwazî kirin bi resm û ayîn*

*Lê mare kirin miwafiqî dîn*

- Day û bab yan çend mezin diçin û jinê ji malbata wê dixwazin (*Gulzar*, b: 2237).

*Wê cumle hebûn bi rêz û rengîn*

*Lew çen mezinan wê bûne xwazgîn*

- Ji bo jin xwastinê mehir tiştekê giring e. Mêr ji bo jinê mehrê dide (*Gulzar*, b: 2267).

*Bîst ḥêştirê çak kirin diyare*

*Bû marehîya wê xir bijare*

- Di dawetan da ji aliyê kesayetekê zana ve xutbek tê xwandin (*Gulzar*, b: 9106).

*Xutbek wî vexwundî piṛṛ ji cewher*

*Xir medḥ û s̱enayê şahê ekber*

- Di dawetan da zîyafeteka bi navê “welîme” tê dan (*Gulzar*, b: 9113).

*Adabê peyemberan qedîm e*

*Zadek dê bixwun bi nav welîm e*

- Zelam (Pêxember) dikarin bi gelek jinan ra bizewicin (*Gulzar,* b: 8919).

*Cumley ḥeremêt ḥebîbê enwer*

*Ew pazde ne piṛṛ ji feḍl û cewher*

- Keçik dikare di umrekê gelek biçûk da bên zewicandin (*Gulzar,* b: 5005, 5009).

*Peyẋemberî marekir di Mekke*

*Şeş salî bû wî demî ne şekk e*

*...*

*Neh salî bû hêj ne ḥînê bûkan*

*Hêj larî dikir digel biçukan*

- Zelam dişên bi teleq jinên xwe berdin (*Gulzar,* b: 9183).

*Peyẋemberî hem ṭelaqe daye*

*Ew rosîyeha ne ʿeql û raye*

- Hindek jinên dewlemend berevajî gelemperîya jinan dikarin bi xwe biryara zewacê bidin û daxwaza zewacê bo zelamekî bikin (*Gulzar,* b: 8956).

*Ger ray li min e me arezû ye*

*Raḍî me bi wî bi yar û şûye*

- Xasletên jinên ku bo zewacê tên xwastin, esl – neseb, eql, edeb, bejinbilindî, delalî û dewlemendî ye (*Gulzar,* b: 1331-1332).

*Emma li Qureyşîyan bî bê çûn*

*Nazik beden û şirîn û xatûn*

*Eṣl û neseb û xuliq pesindî*

*ʿEql û edeb û bejin bilindî*

#### 2.6.10.3. Helbest

Di nav ʿerebên dema Pêxemberî da edebiyata devkî bi taybet jî helbest gelek ya pêşketî bû. Di nav ʿereban da gelek şaʿirên meşhûr hebûn û wan gelek qedr û qîmetê wan digirt (*Gulzar,* b: 9497, 9505). Di civînên xwe da, cejnên xwe da, keyfxweşîyên xwe da, şerên xwe û xemên xwe da ʿereban şiʿir digotin (*Gulzar,* b: 9480). Gava ku Pêxemberî, Pêxemberîya xwe îlankirî ʿerebên mûşrîk bi şiʿir û şaʿirên xwe êrişî wî kirin. Erebên mûşrîk bi şaʿirên xwe yên bi hêz tirane bi Pêxemberî kirin (Yalar, 2009, r. 63). ʿErebên mûşrîk ji Pêxemberî ra gotin ew gotinên tu dibêjî gotinên şaʿira ne, li

ser vê yekê Pêxember jî dibêje madem wesa ye werin hûn hemî kom bibin û sûreta wekî ya Quranê binivîsin (Beqere 23, Yunis 38). Di *Gulzarê* da ev babet wekî mînak wiha derbas dibe:

*Bê şek qureşî di wî zemanî*
*Meşhûr bûne piṛṛ feṣîḥzubanî* (*Gulzar*, b: 9493)

*Ustaẕê kelamê şiʿir û menşûr*
*Çen şaʿir û çen feṣîḥ di meşhûr* (*Gulzar*, b: 9497)

*Ger ew hemû roj diçûne nadî*
*Wan şiʿir digûn bi keyf û şadî* (*Gulzar*, b: 9480)

#### 2.6.10.4. Cejn

Di derbarê cejnên ʿerebên dewra berî îslamê da agahî kêm in. Li herêma Hîcazê cejna herî mezin di meha Zîlkadê da bû. Di vê mehê da ji derdoran gelek kes dihatin Mekkeyê, sûk û bazarên Ûkaz û Zûlmecaz dihatin çêkirin (Azizova, 2012, r. 61 – b: 2140). Li Medîneyê jî du cejin hebûn yek ji wan Newrûz ya dî jî Mîhrecan bû (*Gulzar*, b: 7171-7172). Bi hatina îslamê du cejnên taybet bo misilmanan hatin damezirandin ku yek ji van cejna Remezanê ya dî jî cejna Qurbanê ye. Di *Gulzarê* da ev babet wekî mînak wiha derbas dibin:

*Da xirbineve bu çen niyazan*
*Nêv sûqê ʿukaz û zîlmecazan* (*Gulzar*, b: 2140)

*Her salê hebûn du ʿeyd ewane*
*Newrûz e ewa dî mîhrecan e* (*Gulzar*, b: 7172)

*Çêtir ji ewan du rojê taban*

*ʿEydê remeḍan û ʿeydê qurban* (*Gulzar*, b: 7174)

### 2.6.11. Kesayetên Giring

*Gulzar* ji ber ku behsa jîyana Pêxemberî dike navê gelek kesan tê da dibore. Di vê beşê da tenê navên hin qiral, fermandar û alimên ku di *Gulzarê* da derbas dibin cih digirin. Di *Gulzarê* da navê pênc qiralan, pênc aliman û fermandarekê lehengî derbas dibe. Navên wan bi vî awayî ne:

#### 2.6.11.1. Rostem

Rostem, lehengekê edebiyata pehlewî ye û tê wateya “qelew” û “hêzdar” (Yıldırım, 2008, r. 294). Di edebiyata kurdî da bi qelemperî wekî sembola lehengî, mêrxasî, wêrekî û hêzê tê bikaranîn. Di *Gulzarê* da jî Rostem bi heman armancê hatiye bikaranîn.

*Westa bû li sîngê wan tebayî*
*Wek Rosteman bi canfîdayî* (*Gulzar*, b: 2947)

*Meḥbûbê Xudê resûlê mey pak*
*Ew rostem û zurê dest û mêrçak* (*Gulzar*, b: 8318)

#### 2.6.11.2. Muqewqes

Waliyê Qibtî yê Misrê bû ku di serdema Pêxemberî da jiyaye. Pêxemberî bo peymanek şandibû lê wî peymana Pêxemberî qebûl nekiribû lê rêz bo Pêxemberî girtibû, carîyek (Marya) û çend dîyarî bo Pêxemberî şandibûn. Di *Gulzarê* da jî bi awayekê erênî behsa wî tê kirin.

*Yek Mariye ye ji dil fehîm e*
*Deyka weledê wî Îbrehîm e*

*Gel çen ji giranbuha dîyarî*
*Bû taze Muqewqesî hinarî* (*Gulzar*, b: 9189-9190)

#### 2.6.11.3. Kîsra

Şahê mezin ê Împeratoriya Sasaniyan bû. Di dîrokê da wekî hêzeka dijberê îslamê tê naskirin. Di *Gulzarê* da wekî serokê hemî farisan û xwedî hêzeka mezin behsa wî tê kirin. Dîsa di *Gulzarê* da behsa mizgînîya hilweşîna wî tê kirin.

*Yek rom e qeralê wan bû qeyṣer*
*Kîsra bû serukê fursê yekser* (*Gulzar*, b: 2527)

...

*Ev weʿde çiku ji layê ḥeq bû*
*Kîsrayê me payê textî leq bû* (*Gulzar*, b: 9752)

#### 2.6.11.4. Qeyser

Împaratorê Bizansê bû û di serdema pêşketina îslamê da dijberekê mezin bû. Di *Gulzarê* da wekî hêzeka mezin a ku dê bikeve bin hikumdarîya misilmanan tê nîşandan.

*Wan fikre ji xu dibin muẓeffer*
*Ser dewletê furs û mulkê qeyser* (*Gulzar,* b: 3376)
...
*Dê bû we bibin ʿereb emirber*
*Dê gehne we gencê furs û qeyser"* (*Gulzar,* b: 6984)

#### 2.6.11.5. Necaşî

Di serdema Pêxemberî da qiralê Hebeşistanê bû. Di *Gulzarê* da bi awayekê gelekê êrênî behsa Necaşî tê kirin. Di *Gulzarê* da dibêje Necaşî kesekê bi ʿedalet bû û zilm li kesî nedikir. Gava ku îşkenceyên mûşrîkên Mekkeyê li hemberî misilmanan gelek zêdebûy Pêxemberî ferman kir kesê ku bixwazît bila biçîte Hebeşistanê. Pêxember dibêje qiralê wêrê Necaşî kesekê bi edalet e û kesê xwe avêtîye bextê wî çi caran mexdûr nabe (*Gulzar,* b: 3430- 3433).

*Neccaşî ye mazinê ʿedil zûr*
*Kes nik wî ne dê bî jar û mexdûr* (*Gulzar,* b: 3432)
...
*Neccaşî çi qed ji bû me baş e*
*Çakiya wî Xudê nekey belaşe* (*Gulzar,* b: 3645)
...
*Neccaşî ji min selam bixwîne*
*Îslam bibû ew ji dil yeqîn e* (*Gulzar,* b: 9100)

#### 2.6.11.6. Muradê Çarê

Muradê Çarê (1623-1640), yek ji padîşahên Osmanî bû ku xizmetên giring ji bo Heremeynê (Mekke û Medîne) kiribûn. Wekî mînak wî walîyê Misrê ji bo temîra Qe'bê peywirdar kiribû (Kurşun, 2017, r. 299). Şûşî jî di *Gulzarê* da bi erênî behsa Muradê Çarê dike û ji ber xizmetên wî ji Xwedê dixwaze ku rehmê li wî bike.

*Lew emir dikir cenabê sulṭan*
*Meşhûr e Murad ji alê ʿUs̱man*

*Sulṭanê mezin Muradê çarê*
*Ṣed feyḍ û kerem bû bêne xarê*

*Wî çêkireve cewan û muḥkem*
*Wek pêşî wî Keʿbeya muʿeẓẓem* (*Gulzar*, b: 2480-2482)

**2.6.11.7. Şêx Ebdulqadirê Geylanî (jdb. 1077 - m. 1166)**

Ew yek ji kesayetên giring ên tesewufa îslamê ye û damezrînerê terîqeta Qadirîyan e (Kara, 1994, r. 69). Ji alîyê gelek kesan ve Şêx Qadir wekî kurd tê dîtin û qadirîtî jî wekî yekem terîqet e ku di nav kurdan da hatiye avakirin tê pêjirandin (Tenik, 2015, r. 55). Ji ber ku piranîya helbestvanên edebiyata kurdî ya klasîk kesên mutesewif in wekî şêxê terîqeta qadirîyê bandora Şêx Ebdulqadirî gelek li ser wan çêdibe. Di *Gulzarê* da jî em dibînîn ku navê Şêx Ebdulqadirî derbas dibe. Şûşî di *Gulzarê* da wî wekî qutbê mezin û şêxê Bexdad wiha bi nav dike:

*Çen quṭbê mezin xû Ẋewsê Beẋdad*
*Rabûne ji neslê wan eṣilzad* (*Gulzar*, b: 7290)

**2.6.11.8. Ehmedê Rifayî (1118-1182)**

Rifayî damezrînerê tekyaya Rifaiyê ye û yek ji kesayetên giring ên sofîtiya îslamê ye ku wekî "Çar qutbên mezin" ji tê nasîn. Bi menqibeya maçkirina destê Pêxemberî li Medînê navdar e. Tirbeya wî li Iraqê wekî ziyaretgeheke pîroz tê ziyaretkirin (Tahralı, 1989, r. 127-130). Di *Gulzarê* da navê wî wiha derbas dibe:

*Ruffaʿî bi nûr e şêxê Eḥmed*
*Eḥmed Bedewî bi cahê bê ḥed* (*Gulzar*, b: 7291)

**2.6.11.9. Eḥmed Bedewî (1200-1276)**

Yek ji kesayetên giring ên sofîtiya îslamê ye û damezrînerê tekyaya Bedewiyan e. Li bajarê Fesê yê Fasê ji dayîk bûye û hêj di ciwaniya xwe da xwendina zanistên dînî qedandiye. Bi riyazetên dirêj û nerîtî (bi taybetî "sûtûh" - li ser banî li rojê mêze kirin) û terbiyeta murîdan bi nêrînê (nazar) navdar bûye. Gelê Misrê ew wekî welî û şoreşgerê dijî xaçperestan nas kiriye (Kara, 1989, r. 47-48). Di *Gulzarê* da navê wî wiha derbas dibe:

*Ruffaʿî bi nûr e şêxê Eḥmed*

*Eḥmed Bedewî bi cahê bê ḥed* (*Gulzar*, b: 7291)

**2.6.11.10. Îbrahîm ed-Dûsûkî (1235-1277)**

Sofîyekê navdar ê Misrê ye û damezrînerê tekyaya Dûsûkîyê ye. Wekî yek ji "çar qutbên mezin" (bi reya Ebdulqadirê Geylanî, Ehmedê Rifayî û Ehmedê Bedewî) tê nasîn. Bi riyazetên dirêj û kerametên xwe navdar bûye. Îro tirbeya wî li bajarê Dûsûkê ya Misrê wekî ziyaretgeheke pîroz tê ziyaretkirin (Demirci, 1994, r. 212-213). Di *Gulzarê* da navê wî wiha derbas dibe.

*Seyrê ke Dusûqî Îbrehîme*
*Çen ʿalim û qutbekê ʿeẓîm e* (*Gulzar*, b: 7292)

**2.6.11.11. Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî**

Seîdê Nûrsî (1878-1960) yek ji ʿalimên kurdên dawiya dewleta Osmanîyan e. Nûrsî, li gundê Nûrsa Bedlîsê ji dayik bûye û bi navê "Bedîuzzeman" navdar bûye (Açıkgenç, 2018, r. 565). Her çend beşeke mezin a jiyana xwe li sirgûnê derbas kiribe jî, bi ramanên xwe bandorek mezin li ser gelê xwe kiriye.

Berhema sereke ya Seîdê Nûrsî, *Kulliyata Rîsaleya Nûr* e Nûrsî di vê kullîyatê da meseleyên îmanê bi awayekê aqilane şirove dike (Gürbüz, 2021, r. 101). Şûşî jî hevdemekê Seîdê Nûrsî ye û gelek di bin bandora wî da ma ye. Şûşî û Nûrsî her çend rû bi rû yek dî nedîtibe jî name ji yek û din ra şandîne. Şûşî xwe wekî talebeyekê Nûrsî dihesibîne. Şûşî, Kullîyata Rîsaleyên Nûrsî bi xetê xwe istînsax kirîye, ji metnên giring ên Nûrsî berhemeke bi navê "*Mîn Hîkemîyat en-Nûrsî*" bi erebî nivîsandîye lê hêj çap nebûye. Dîsa Şûşî, berhema Nûrsî ya bi navê "*Îşarat el-Îʿcaz fî Mîzan el-Îcaz*" bi erebî istînsax û tehqîq kirîye (Şûşî, 2023, r. 74). Şûşî di *Gulzarê* da jî behsa Nûrsî dike, bo wî û talebeyên wî dua dike û wî wekî melayê kurdan, melayê meşhûr, Seîdê meşhûr, Seîdê Wanî, ûstad û bedîʿuzzeman bi nav dike. Behsa Nûrsî di *Gulzarê* da wekî mînak wiha derbas dibe.

*Ya Reb tu min û x̊ulamê Qurʾan*
*Seydayê mezin melayê kuṛdan*

*Seydayê heman Seʿîdê meşhûr*
*Ustaẕê me cumle Ṭalibê Nûr* (*Gulzar*, b: 612-613)
...
*Wek bu me dibêt Melayê Meşhûr*

*Seydayê me cumle ṭalibêt nûr*

*Ustaẕê mezin Seʿîdê Wanî*
*Meşhûr e bedîʿê vî zemanî* (*Gulzar,* b: 3934-3935)

**2.6.12. Netew û Ziman**

Di *Gulzarê* da navê pênc netewan û sê zimanan derbas dibin. Ji ber ku Pêxember bi xwe ʿereb e û berhem li ser jîyana wî ye herî zêde navê ʿereban û zimanê wan erebî derbas dibe. Şûşî di *Gulzarê* da di "Mêrga Yekem" a *Gulzarê* da gelek methên ʿereban dike. Di vê beşê da du hedîsên Teberanî neqil dike. Ji van hedîsan ya ewil da Pêxember dibêje: "Xwedê ji nav hemû mexlûqan da însan jê girt, ji nav însanan da jî qewmê ereban, ji nav ereban qureyşî, ji nav wan haşimî, ji nav haşimîyan da jî ez jê girtim." Şêx Tahir pişta xwe dide vê hedîsê û gelek methên ereban dike. ʿEreban Ji hemû cîhanê çêtir dibîne û wan xwedî îzz û naz, serfiraz, sahibhuner, cewanemêr, kardîde, sahibkerem, serkêl, zîrek, sexî, xwedî ewlîya, murşîd û alim dibîne. Ji ber ku Pêxember ʿereb e ʿereban sebeba hîdayeta misilmanan dibîne û dibêje divê misilman minneta ʿereban qebûl bikin û spasîya wan bikin. Wekî mînak di van beytan da wiha dibêje:

*Qewmê ʿerebî bi ʿîzz û naz in*
*Ḥetta bi ebed di serfiraz in* (*Gulzar,* b: 934)
...
*Ṣaḥibkerem in di çav vebîne*
*Serkêl û di zîrek û sexî ne* (*Gulzar,* b: 936)
...
*Nêv her milletek çu meh diyar in*
*Bu dîn û cîhan di bexteyar in* (*Gulzar,* b: 943)

Şûşî viyana ʿereban ji bo misilmanan gelekî fer dibîne. Li ser vî babetî di hedîsa duyem da Pêxember dibêje ji ber ku ez ʿereb im, zimanê Quranê û yê biheştîyan ʿerebî ye dive hûn heş ʿereba bikin, vîyana ereban delîlê îmanê ye. Wekî mînak di van beytan da wiha dibêje:

*"Ḥubba ʿereban delîlê îman*
*Nevyanê ewan nîfaq e nîşan*

*Lazim we ʿereb bivên ji dil can*

*Lew ez ʿereb im ji neslê ʿednan* (*Gulzar*, b: 951-952)

Di *Gulzarê* da gelek cihan da ʿecem hatiye bikaranîn. ʿEcem di *Gulzarê* da ne di wateya netew an zimanekî di wateya netew û zimanên ji xeynî ʿereb û ʿerebî hatiye bikaranîn. Wekî mînak di *Gulzarê* da ʿecem wiha hatiye bikaranîn:

*Fexrê ʿecem û hemu ʿereb tuy*

*Ey kan û xizîneya edeb tuy* (*Gulzar*, b: 140)

...

*"Ḥukmî li ʿereb diken bi ʿîzzet*

*Dê bu we ʿecem bibin reʿîyet"* (*Gulzar*, b: 4233)

Di *Gulzarê* da netewa dî ya navê wê derbas dibe rom e. Di *Gulzarê* da rom wekî hêzeka mezin a serdema Pêxemberî ya dijmin hatiye dîtin. Wekî mînak di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Meşhûr wî demî hebûn du dewlet*

*Her du çi bi şewket û bi ṣewlet*

*Yek rom e qeralê wan bû Qeyṣer*

*Kîsra bû serûkê fursê yekser* (*Gulzar*, b: 2526- 2527)

...

*Gava ku diçûn qîtalê romê*

*Lerzî digehişt qeralê romê* (*Gulzar*, b: 251)

Di *Gulzarê* da neteweka dî ya navê gelek caran derbas dibe jî faris in (furs). Di *Gulzarê* da faris li gel romê hêzeka mezina serdema Pêxemberî tên nîşandan. Di *Gulzarê* hem wekî netewek navê farisan derbas dibe hem jî navê zimanê wan farisî jî derbas dibe. Wekî mînak faris û farisî di *Gulzarê* da wiha derbas dibin:

*Yek rom e qeralê wan bû Qeyṣer*

*Kîsra bû serûkê fursê yekser* (*Gulzar*, b: 2527)

...

*Sûr farisî ye gû bû leṭafet*

*Yeʿnî: Ji me ra wî kir ḍiyafet* (*Gulzar*, b: 10143)

Di *Gulzarê* da navê tirk tenê carekê derbas dibe. Di roja şerê Uhûdê da Pêxemberî çeqekê xurmê dabû Ebdullah bîn Cehş û ew bibû şîrekê gelekî tîj. Şûşî gava

behsa vî şîrî dike dibeje ew şîr ji alîyê fermanderekê tirk ve ji warisên Ebdullah bîn Cehş hatiye kirîn.

*Yek turkî emîrekê şeṛefdar*
*Qîmet wî demî du ṣed ji dînar* (*Gulzar,* b: 9869)

Navê netew û zimanekê dî yê di *Gulzarê* derbas dibe jî kurd û kurdî ye. Ji ber ku nivîskarê *Gulzarê* Şûşî kurd e û berhema xwe jî bi kurdî/kurmancî nivîsandîye di *Gulzarê* da navê kurd û kurdî derbas dibe. Di *Gulzarê* da wekî netew du caran navê "kurd" wekî ziman jî çar caran navê "kurdî" derbas dibe. Di cihekî da jî wekî lehçeyeke kurdî wekî "behdînî" derbas dibe. Şûşî kurdî wekî zimanekê gelekî şirîn pênase dike. Wekî mînak di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Emma me ḥeta nihû nedîne*
*Jîna wî bi kuṛdîya şirîne* (*Gulzar,* b: 422)
...
*Behdînî bi lehce û bi kuṛdî*
*Çî ṣafebêhn î bihêle durdî* (*Gulzar,* b: 469)
...
*Ṣed ḥeyf û esef di nav me kuṛdan*
*Millet bûye jar û ser bi derdan* (*Gulzar,* b: 4180)

### 2.6.13. Xwarin û Vexwarinan

Di *Gulzarê* da navê çend xwarinên Nîvgirava Erebistanê yên serdema Pêxember lê jîyayî derbas dibin. Di *Gulzarê* da navê xwarinên wekî goşt, qesb, nan, helwa, (*Gulzar,* b: 8431), xebîse (*Gulzar,* b: 8432), nanê genimî, nanê cehî, keşk, goştê hêştiran, goştê mihan û goştê mirîşkan (*Gulzar,* b: 8433), penîr, goştê kerê kuvî, nîvişk, tirî, (*Gulzar,* b: 8434), gundor, herbize, xiyar kundik, zeyt, sêk (sirke) (*Gulzar,* b: 8436), silk, pîvaz (*Gulzar,* b: 8435), cerg, şeker (*Gulzar,* b: 8440), gulçêçik, kulî, bizinmij (*Gulzar,* b: 8443), sîr, kurad (*Gulzar,* b: 8444), hingivîn (*Gulzar,* b: 8445), ecwe (*Gulzar,* b: 8451), nebîẕ (*Gulzar,* b: 8452) û rûnê meşkê (*Gulzar,* b: 9158) derbas dibin. Ji bilî van jî navê vexwarinên wekî şîr (b: 8431), av (b: 8434) û xoşavê (b: 8445) di *Gulzarê* da derbas dibin. Wekî mînak di *Gulzarê* da navê xwarin û vexwarinan wiha derbas dibin:

*Wî xwarîye guşt û qesb û nane*
*Ḥelwa ku ji qesb û şîr beyane*

*Yê xwarî xebîşeya şirîne*
*Ew: Are û ron û hingivîn e* (*Gulzar*, b: 8431-8432)
...
*Guştê kerê kuvî û penîre*
*Nîvişk û tirî û av û şîre* (*Gulzar*, b: 8434)

**2.6.14. Fêqî – Nebat**

Cihê ku jîyana Pêxemberî lê derbas bûyî Nîvgirava Erebistanê ye. Bi gelemperî ev herêmeka ziha ye, avhewayê vê herêmê çol e. Ji ber vê yekê li herêma ku Pêxemberî jîyana xwe lê borandî ji alîyê nebat û fêqîyan ve herêmeka feqîr e. Dîsa herêma ku nivîskarê "*Gulzar*ê" Şûşî jî lê jîyay her çend ji alîyê nebat û fêqîyan ve li gorî Nîvgirava Erebistanê dewlementir be jî bi xwe herêmeka gelek dewlemend nîne. Ji ber vê yekê di berhema "*Gulzarê* da navê gelek nebat û fêqîyan derbas nabe. Ji ber ku avhewaya herêma Pêxemberî jîyana xwe lê borandî çol bû li herêmê herî zêde xurme/qesb çêdibûn ji ber vê yekê di *Gulzarê* da fêqîyên ku navê wan herî zêde derbas dibe "xurme û qesb" e. Di *Gulzarê* da navê wan 19 caran derbas dibe. Ji bilî xurme/qesb navên tirî, xîyar (b: 8432), silk, pîvaz (b: 8435), kundik, zeyt (b: 8436), sîr, kurad (b: 8444), gul, sunbûl, semen, rihan, sorgul (b: 459) û kulîlkan derbas dibe. Ji xwe navên "gul, sunbûl, semen, rihan, sorgul û kulîlkan ne tenê da di *Gulzarê* da wekî kevneşopîyekê di helbesta klasîk a ereb, faris, tirk û kurdan da gelek carab tên bikaranîn. Navê van fêqî û nebatan di *Gulzarê* da wekî mînak wiha derbas dibe:

*Baqek ji gul û ḥelal û sunbûl*
*Destek semen û rihan û ṣorgul* (*Gulzar*, b: 459)
...
*Ewwel digehîn cihek gulistan*
*Piṛṛ xurme û qesb û baẋ û bîstan* (*Gulzar*, b: 4520)

**2.6.15. Av**

Di *Gulzarê* da navê gelek avan derbas nabe ji ber ku herêma behsa wê tê kirin herêmeka ziha ye û ji alîyê avan ve herêmeka feqîr e. Di *Gulzarê* da herî zêde navê ava zemzemê derbas dibe. Zemzem aveka xwedî dîrokeka dûr û dirêj e ku ji bîreka nêzîkê Keʿbê derdikeve û di nav misilmana da wekî aveka pîroz tê dîtin (Küçükaşçı,

2013, r. 242). Di *Gulzarê* da behsa kolîn û derxistina bîra zemzemê, pîrozîya wê û ji bo xelkê herêmê û hecîyan giringîya wê tê kirin.

*Her Şeybe bû ku deranî zemzem*
*Ḥuccac wî kirin li avê bê ẋem* (*Gulzar,* b: 1011)

Aveka dî ya ku navê wê di *Gulzarê* da derbas dibe Gola Sawe ye. Di *Gulzarê* da wekî mucîzeyeke ji dayîkbuna Pêxemberî behsa wê hatiye kirin. Gava ku Pêxember ji dayîkbûy ev gole hişk bibû. Di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Çik bûye beḥrikê Sawe gava*

*Dunya bi Muḥemmedî bû ava* (*Gulzar,* b: 1617)

Di *Gulzarê* da behsa behrekê tenê derbas dibe ku ew jî Behra Sor e. Behra Sor dikeve navbera Nîvgirava Erebistanê û rojhilata parzemîna Efrîqayê. Di *Gulzarê* dema ku behsa Serîya Hemzeyî tê kirin ku Pêxemberî şandibû ser karwanekê mûşrîkan navê vê Behra Sor derbas dibe.

*Wan dîn li kinarê behrê ṣûre*
*Sê ṣed wî digel ji dîn di kûṛe* (*Gulzar,* b: 6450)

Di *Gulzarê* da navê du rûbaran Firat û Nîlê derbas dibe. Ev her du rûbar, rûbarên herî mezin ên derdora Nîvgirava Erebistanê ne. Firat kanîya xwe ji Tirkîyê digire ji Surîyê û Iraqê derbas dibe û diherîka nav kendava Besrayê. Nîl yek ji rûbarên herî dirêj ên dinyayê ye. Nîl kanîya xwe ji rojhilata nava Efrîqayê digire, ber bi bakur ve di nav gelek dewletan da derbas dibe û herî dawî di nav Misrê da derbas dibe û diherike nav Behra Spî. Di *Gulzarê* da dema ku Pêxember diçe mîracê behsa Firat û Nîlê derbas dibe. Pêxember di biheştê da çar rûbaran dibîne du ji van rûbaran Firat û Nîl in.

Di *Gulzarê* da li gel Firat û Nîlê behsa du avên biheştê jî derbas dibin ku ew jî Kewser û Selsebîl in. Kewser ew av û rûbar e ku Xwedê daye Muhemmed (s.x.l) (Sureya Kewser, 1). Selsebîl jî aveka xweş a bi tam e ku di biheştê da Xwedê dê bidete ʿebdên xwe yên qenc û sexî (Sureya Însan, 18). Di *Gulzarê* da behsa van avan wiha derbas dibe:

*“Ev kewser e gu ve selsebîl e*
*Ew êt di diyar furat û nîl e”* (*Gulzar,* b: 4460)

### 2.6.16. Ajal

Ji ber taybetmendîyên coxrafî, Nîvgirava Erebistanê ji alîyê çeşîtdarîya ajalan ve herêmeka feqîr e. Ji ber vê yekê di *Gulzarê* da jî navê gelek ajalan derbas nabe. Di *Gulzarê* da navê hêştir (*Gulzar*, b: 1091), mer-dewar (*Gulzar*, b: 1386), pez (*Gulzar*, b: 1695), berx (*Gulzar*, b: 1810), kêz (*Gulzar*, b: 3108), mêş – pêşî (*Gulzar*, b: 4337), ker (*Gulzar*, b: 4389), baz (*Gulzar*, b: 6966), hêstir(*Gulzar*, b: 8332), mirîşk (*Gulzar*, b: 8433), kerê kûvî (*Gulzar*, b: 8434), Nix̊ir (*Gulzar*, b: 8657), hesp (*Gulzar*, b: 8754), bizin (*Gulzar*, b: 8759), dîkil (*Gulzar*, b: 8761), çêl û ga (*Gulzar*, b: 8761), masî (*Gulzar*, b: 9456), bizinmijk (margîsk) (*Gulzar*, b: 9924), gurg (*Gulzar*, b: 9915), xezal (mambiz) (*Gulzar*, b: 9942), kotir (*Gulzar*, b: 10003), kulî (*Gulzar*, b: 8343) û dapîrokan (tevinbîrk) (*Gulzar*, b: 10004) derbas dibe ku ev ajalên herêmê ne û di *Gulzarê* da bi gelemperî bi armanca rasteqîn hatîne bikaranîn. Ji bilî van ajalan navê hin ajalên dî jî derbas dibe û ew bi gelemperî ne bi armanca rasteqîn bi armanca şibandinê hatîne bikaranîn. Di *Gulzarê* da navê fîl û kerkedanan wekî temsîla hêz û quwetê, navê şêr û pilingan wekî temsîla wêrekî û quwetê, navê Tutî û bilbilan jî bi armanca şibandina Pêxemberî hatîne bikaranîn. Wekî mînak di vê beytê da tûtî bi armanca şibandina Pêxemberî hatiye bikaranîn:

*Ey serwê bilindê bax̊ê unsê*
*Wey ṭûṭîyê murxûzarê qudsê* (*Gulzar*, b: 7953)

### 2.6.17. Çîya

Di *Gulzarê* da navên çîyayên Sewr, Qeten, Sebir, Hîra (Nûr) û Uhûdê derbas dibe ku ev çîyayên herêma Erebistanê ne. Çiyayê Sewrê, li başûrê bajarê Mekkê ya Erebistana Siûdî da cih digire û wekî çiyayekî pîroz tê dîtin. Pêxember û Ebubekrî di dema hîcretê da sê rojan di şikefteka vî çîyayî da xwe veşartibûn.

*Êkcar bi dizî li Mekke çun der*
*Bu layê çiyayê S̱ewrê enwer* (*Gulzar*, b: 5727)

Qeten, di *Gulzarê* da wekî navê çîyayekê herêma Qayîda derbas dibe.

*Ew çûye çiyay Qeṭen bi nav e*
*Wan kes nedî xir bûyîn belave* (*Gulzar*, b: 7818)

Di *Gulzarê* da navê çîyayekê derdore Mekkê bi navê Sebir derbas dibe. Dema ku Pêxember koç dikir çûbû ser vî çîyayî. Ev çîyaye bi ezman ketibû û gotibû

Pêxemberî ji ser min were xwarê ez ditirsim dujmin bihên li ser min te bikujin û Xwedê jî ezabê bide min (*Gulzar*, b: 9700-9704).

*Carek bû li ser Ṣebîr çiyayî*
*Wî gûte peyemberê Xudayî*

*Ser min tu here me tirse piṛṛ can*
*Ser min bikûjin te qewmê nadan* (*Gulzar*, b: 9702-9703)

Di *Gulzarê* da navê Çîyayê Hîrayê (Nûr) jî derbas dibe. Ev çîya ji bo misilmanan cihekî gelekî pîroz e ji ber ku ewil wehî bo Pêxemberî li ser vî çîyayî hatibû. Di *Gulzarê* da behsa vî çîyayî wekî mînak wiha derbas dibe.

*Îşkeftê Ḥîra çi tazeẋar e*
*Ta nûke mubarek û diyar e* (*Gulzar*, b: 2615)
...
*Gazî kire wî Ḥîra çiyayî*
*Bû ser me were bi xêr û şayî* (*Gulzar*, b: 9705)

Çîyayekî dî yê giring ku navê wî di *Gulzarê* da derbas dibe jî Çîyayê Uhudê ye. Ev çîya dikeve bakûrê bajarê Mekkê û bi şerê Uhudê navdar bûye. Uhud ew çîya ye ku Pêxemberî tîravêjên xwe lê cih kirîn û gotîye wan divê bi çi şiklan hûn vê derê berneden. Di *Gulzar* ê da Uhud wekî mînak wiha derbas dibe:

*Çû geşte Uḥûd bi keyfeşayî*
*Wî ûrdî didanî bin çiyayî* (*Gulzar*, b: 7488)

### 2.6.18. Cih û War

Di *Gulzarê* da navê gelek cih û waran derbas dibin. Di vê beşê da ew navên cih û waran ku di *Gulzarê* da derbas dibin wekî tablo hatine amadekirin. Di tabloyê da navê cih û waran wekî dewlet, herêm, cihê dîrokî û bajar hatîne dîyar kirin. Dîsa di tabloyê da welatê îro yê cih û waran, hejmara beyta *Gulzarê* ku navê wan tê da dibore û derbare cih û waran da kurteşîroveyek cih digire.

**Tablo 2. 19:** Cografîk a Navên Cih û Waran

| Navê Cihî | Cure | Welatê Îro | Hejmarê Beyta *Gulzar*ê | Kurteşirove |
|---|---|---|---|---|

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **Çîn** | Dewlet | Çîn | 166 | Li rohelata Asyayê ye û di *Gulzarê* da wekî sembola dûratîya hatiye bikaranîn. |
| **Ḥebeş** | Herêm/Dewlet | Etiyopya/Eritre | 324 | Herêma pêşîn e ku misilman koç kirîyê. (Habeşistan). |
| **Endelus** | Herêm/Dewlet | Spanya/Portekîz | 574 | Herêmeka Nîvgirava Îberê ye ku di navbera salên 711-1492 da li bin hukimranîya misilmanan da bû. |
| **Urdûn** | Dewlet | Urdun | 1143 | Urdun, dewleteke li Rojhilata Navîn e ku bi dîrokê xwe ya kevn û çanda dewlemend tê nasîn. |
| **Yemen** | Dewlet | Yemen | 1313 | Yemen, dewleteke li başûrê Nîvgirava Erebistanê ye ku bi dîroka xwe ya kevn û sirûşta balkêş tê nasîn |
| **ʿIrak** | Dewlet | Iraq | 2550 | Di serdema Ebasîyan da Bexda, paytexta medeniyeta îslamê bû. |
| **Mekke** | Bajar | Erebistana Siûdî | 272 | Bajarekê pîroz ê îslamê ye û Keʿbe tê da ye. |
| **Medîne** | Bajar | Erebistana Siûdî | 276 | Tirba Pêxemberê (s.x.l.) û Mescîdê Nebevî lê ye. |
| **Ḥîcaz** | Herêm | Erebistana Siûdî | 569 | Herêma dîrokî ya Nîvgirava Erebistanê ye ku Mekke û Medîneyê digire nav xwe. |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **Qefqas** | Herêm | Azerbeycan/Gurcistan | 575 | Çiyayên Qefqasê û rêgehên stratejîk ên fethên îslamê. |
| **Zencebar** | Herêm/Bajar | Tanzanya | 575 | Li Afrîkaya Rojhilat navenda bazirganiya biharat û çanda îslamê. |
| **Besra (Besra)** | Bajar | Iraq | 641 | Di serdema pêşîn a îslamê da bajarê giring ê lîman û zanistê. |
| **Ẋezze (Gazze)** | Bajar/Herêm | Filistîn | 985 | Li axa Filistînê bajarê stratejîk ê lîmanê. |
| **Xeyber** | Herêm/Bajar | Erebistana Siûdî | 1087 | Di dema Pêxember (s.x.l.) da hatiye fetihkirin (cihê kelehên Cihûyan). |
| **Necef** | Bajar | Iraq | 1311 | Tirba Hz. Elî (r.a.) û bajarê pîroz ê Şiîyan. |
| **Ḥîre** | Bajarê Dîrokî | Iraq (Kufe nêzîk) | 1362 | Paytexta Keyaniya Lahmî û navenda helbesta erebî. |
| **Ṣenʿa (Sanʿa)** | Bajar | Yemen | 1366 | Paytexta Yemenê û bajarê kevnare yê UNESCOyê. |
| **Pake Selman** | Bajar/Tirbe | Iraq | 1606 | Tirba Selmanê Farisî û bermahiyên qesra Sasaniyan. |
| **Sawe (Saveh)** | Bajar | Îran | 1617 | Di serdema Selçûqî da navenda bazirganî û zanistê. |
| **Hemedan** | Bajar | Îran | 1619 | Xaçerêya şaristaniyan, bajarê kevn ê Ekbatan. |
| **Rey** | Bajar | Îran (Tahran) | 1619 | Navenda xebatên zanistî yên berî û piştî Îslamê. |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **Ebwa** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 1970 | Herêma ku Pêxember (s.x.l.) serîya ewil şandî. |
| **Busra** | Bajar | Sûrî | 2036 | Di dema Romê û îslamê da navenda bazirganiyê ya Şamê. |
| **Medyen** | Herêmê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 2074 | Cihê ku gelê Şuêyb Pêxemberî (s.x.l) lê dijî. |
| **Cudde (Cidde)** | Bajar | Erebistana Siûdî | 2335 | Li rex Deryaya Sor bajarê lîmanê yê heciyan. |
| **Quba** | Bajar | Erebistana Siûdî | 2315 | Cihê ku Mescîda Kuba (yekem mizgefta îslamê) hatiye avakirin. |
| **Ḥerre** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 2428 | Yek ji qadên şer ên dîrokî. |
| **Wan** | Bajar | Tirkiye | 3935 | Li kêşê Gola Wanê bermahiyên Urartû û Osmaniyan. |
| **Niṣêbîn** | Bajar | Tirkiye (Mêrdîn) | 5123 | Navenda çanda Suryanî û Dibistana Nusaybînê. |
| **Kînane** | Herêm | Erebistana Siûdî | 5609 | Di serdema Cahiliyetê da eşîrên ereb lê dijîn. |
| **Ẕîbab** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 7123 | Li serdemê berî îslamê cihê giring. |
| **Eẕrîʿat** | Bajar | Sûrî (Dera) | 7124 | Di dema Romê û Îslamê da li ser rêyên bazirganiyê bajarê stratejîk. |
| **Uḥud** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 7612 | Çiyayê Uhud û derdorê Şerê Uhud |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **Rame Hurmiz** | Bajar | Îran | 6214 | Di serdema Sasaniyan da bajarê giring. |
| **Wadî Qura** | Herêm | Erebistana Siûdî | 6226 | Newala dîrokî û rêya bazirganiyê nêzîkê Medîne. |
| **Cuḥfe** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 6429 | Li ser rêya hacê rawestgeheka giring. |
| **Weddan** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 6475 | Di serdemê berî îslamê da cihê kervanan. |
| **Fedik** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 6502 | Nêzîkê Medîne, herêma çandiniyê. |
| **Buwaṭ** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 6519 | Yek ji serîyeyên Pêxemberî (s.x.l.) li vê derê pêk hat. |
| **Yenbûʿ** | Bajar | Erebistana Siûdî | 6520 | Bajarê lîmanê li rex Deryaya Sor. |
| **Ẋeṭefan** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 7139 | Ji bo Şerê Bedir amadehiya şer li vê herêmê hat kirin. |
| **Erîḍ** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 7153 | Bîr û cihê niştecih ê dîrokî. |
| **Necd** | Herêm | Erebistana Siûdî | 7391 | Navenda Nîvgirava Erebistanê, di dîroka îslamê da cihekî giring. |
| **Ṣerf** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 7565 | Li navbera Mekke û Medînê rawestgehek rê. |
| **Yemame** | Herêm/Bajar | Erebistana Siûdî | 7623 | Di serdema pêşîn a îslamê da şerên giring lê qewimîn. |
| **Hemrayê Eṣed** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 7782 | Newalek nêzîkê Medînê. |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **Ḥemat** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 7813 | Di dema Pêxember (s.x.l.) da derbendeke giring. |
| **Serîf** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 9168 | Derbendek e li ser rêya hecê. |
| **ʿEqenqel** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 9717 | Bîrek dîrokî an jî cihê niştecih. |
| **Qudeydê** | Cihê Dîrokî | Erebistana Siûdî | 5908 | Lîmaneke kevnare li kêşê Deryaya Sor. |

Piraniya navên cografîk li Erebistana Siûdî, Iraq, Îran, Yemen û Sûriyê ne. Nîvgirava Erebistanê bi bêhtirîn 30 navan derketiye pêş, ji ber ku pêkhatina îslamê û bûyerên sereke li wir qewimîne. Di *Gulzarê* navê 2 bajarên kurdan Nisêbîn û Wan derbas dibin. Şûşî dema behsa hin cinan dike ku guhdarîya Pêxemberî dikin navê Nisêbînê derbas dibe. Şûşî di *Gulzarê* da dema behsa Seîdê Nûrsî dike navê bajarê Wanê derbas dibe. Navê Nisêbîn û Wanê di *Gulzarê* da wiha derbas dibe:

*Ḥeft kes ji ecinne êt Niṣêbîn*
*Guhdarî kirin peyemberê dîn* (*Gulzar*, b: 5123)

*Ustaẕê mezin Seʿîdê Wanî*
*Meşhûr e bedîʿê vî zemanî* (*Gulzar*, b: 3935)

**2.6.19. Dua**

Di *Gulzarê* da gelek zêde dua derbas dibin. Şûşî di *Gulzarê* da bo her kesekê/a xemxarê dînê îslamê û ehlê qencîyê dua kirîne. Di *Gulzarê* da Şûşî dua herî zêde bo Muhemmed (s.x.l) kirîne. Çend mînakên van duayan bo Pêxemberî hatîne kirin wiha ne:

*Feyḍ û kerem û selam di bê ḥed*
*Ya Reb tu biṛêje ser Muḥemmed* (*Gulzar,* b: 15)
...
*Ya Reb tu birêjî ser wî reḥmet*
*Ṣed naz û neʿîm di baẋê cennet* (*Gulzar*, b: 880)
...
*Ṣaḥib şeṛef û lîwayê meʿqûd*
*Ya Reb bideyê meqamê meḥmûd* (*Gulzar*, b: 882)

Şûşî ji bilî Muhemmed (s.x.l) bo xanimên wî, ewladên wî, sehabîyên wî, alimên îslamê, misilmanan, rawîyên hedîsan, kesayetên dîrokî yên ku harîkarî daye dînê îslamê û hwd. dua kirîne. Çend mînakên van duayan wiha ne:

***Îslamê** bikey heman tu yek dil*
*Dilxûşî bijîn bi dînê kamil* (*Gulzar*, b: 619)
...
*Ya Reb tu bidey ewan bi îḥsan*
*Ṣed baẋê biḥeşt û ḥûr û wîldan* (sehabe) (*Gulzar,* b: 257)
...
*Ṣed feyḍ û kerem ji ẕatê Barî*
*Ser ruḥê Xedîce her bibarî* (*Gulzar,* b: 8991)
...
*Hem Beyḥeqî ye diket rîwayet*
*Ya Reb tu bûy bikey ʿînayet (rawî)* (*Gulzar*, b: 4654)
...
*Ya Reb tu min û ẋulamê Qurʾan*
*Seydayê mezin melayê kuṛdan*

*Hemyan me bikey fîdayê tenzîl*
*Aza me bikey bi sayê tenzîl (Seîdê Nûrsî)* (*Gulzar*, b: 612-614)

Şûşî dema ku ev berheme dinivîsand tujî nexweşîyeke giran bibû û gelek caran di nexweşxaneyan da bû. Şûşî hem ji bo vê nexweşîya xwe hem jî bo dinya û axreta xwe di *Gulzarê* da gelek dua bo xwe kirîne. Çend mînakên duayên ku Şûşî bo xwe kirîne wiha ne:

*Ya Reb bi peyemberê zeman key*
*Paşî tu bi cahê van heman key*

*Ṭahir tu bikey hevalê wan e*
*Ṣaẋ key tu ji min giyan û cane*

*Dûr bêxî ji şeṛrê nefs û bedkar*
*Qurtar ke ji vî zemanê duşwar* (*Gulzar*, b: 7294-7296)

### 2.6.20. Nifîn

Nifîn berevajîya duayê ye. Di duayê da mirov başî û qencîyê di nifînê da mirov xirabîyê ji bo kesekî/kesekê dixwaze. Di *Gulzarê* da wekî duayan nifîn jî derbas dibin. Çend nifînên ku di *Gulzarê* da derbas dibin em dişên wekî nifînên Pêxemberî li mûşrîkan kirîn û yên Şûşî li mûşrîkan kirîn bikin du cur. Çend ji mûşrîkên wekî Eswed, Utbe û Şeybe hebûn ku wan Pêxember gelek aciz dikir, gelek bêhna wî teng dikir ji ber vê yêkê Pêxemberî jî nifîn li wan dikir. Çend mînakên nifînên Pêxemberî em dişên wiha rêz bikin:

*Ya Reb tu bibey jê nûrê du çav* (*Gulzar,* b: 3379)

*Cergî bişûjî ji vî le῾înî* (*Gulzar,* b: 3380)

*Mergî ji kuṛê xû ew bibînî* (*Gulzar,* b: 3380)

*Ya Reb bigirî tu ῾Emrê bednam / Bûcehlê kuṛê Hîşamê nakam*” (*Gulzar,* b: 3214)

*Hem bigre ῾Umare kuṛ Welîd e / Gel ῾Utbe peder Welîd pelîd e"* (*Gulzar,* b: 3217)

Şûşî jî di *Gulzarê* da nifînan li çend kesên wekî Ebû Leheb, Eswedê Kurê Ebdî Yexusî û şivanê ku di dema koçê da gotîyê mûşrîkan li şikeftê binêrin, dike. Çend nifînên Şûşî em dişên wiha rêz bikin:

*Bişkên ku ji wî dev û didane (Gulzar*, b: *3233)*

*Ew Bûlehebe dihate sûke / Bişkên ku ji wî du kab û çûke* (*Gulzar*, b: 3990)

*Hin guh didene ewî şivanî / Ezman wî şikestî gel didanî* (*Gulzar,* b: 5772)

*Ey cerg û hinav jê bêne xwarê / Ger ew bigehin bû derkê ẋarê* (*Gulzar*, b: 5774)

### 2.6.21. Dijûn û Tajang

Dijûn (xeber) ew gotinên kirêt in ku di demên mirov ji kes yan tiştekî gelekî aciz dibî, bêhnteng dibî ji devê mîrovî derdikevin û muxatabê xwe rencîde û dilşikestî dike. Di *Gulzarê* da Şûşî li çend cihan dijûnan dide hin mûşrîkên ku kerbên wî gelek jê vedibin. Çend mînakên dijûnên ku di *Gulzarê* da derbas dibin em dişên wiha rêz bikin:

*Ew ṭûpî* li wê ji xêrê bê bar (*Gulzar,* b: 9098)

Berdanê biçuk û *kerzelaman* (*Gulzar,* b: 5057)

*Nakesbeçeyan* û *nanḥeraman* (*Gulzar*, b: 5057)

*Nakesbeçeyan* û *pîsekaran* (*Gulzar*, b: 2127)

Çav lê bu ewan ku wan *nefaman* (*Gulzar*, b: 5066)

Eswed xu me pê çi newʿe kes bu / Kuṛxalê nebî bu lê *teres* bu (*Gulzar*, b: 3232).

Ew kafiṛê piṛṛ cefa û *ebter* (*Gulzar*, b: 3378)

Nadan û *sefi* ye û *bê edeb* bu (*Gulzar*, b: 3398).

Bûcehlê *leʿîn hevalê iblîs* (*Gulzar*, b: 3200)

**2.6.22. Gazinde û Rexne**

Rexne û gazinde du têgehên sereke ne ku bi awayekî, çandî, edebî û civakî ve tê dîtin. Rexne bi giştî nirxandineka dualî ye. Di rexneyê da hem alîyên erênî hem jî alîyên neyînî tên nirxandin lê di gazindê da tenê alîyê neyînî heye. Gava em li *Gulzarê* dinêrîn Şûşî derbarê gelek meseleyan da gazindeyên xwe tîne ziman. Gazindeyên Şûşî yên di *Gulzarê* da derbas dibin em dişên wiha rêz bikin:

**2.6.22.1. Rewşa Civaka ʿEreban Berî Îslamê**

Şûşî di *Gulzarê* da bi awayê neyînî behsa rewşa ʿerebên berî îslamê dike. Dibêje ew di karên xwe da durist nebûn. Gelemperîya wan nexwanda, nezan û xirab bûn. Ji rêya heq dûr bûn, derbarê dîn û heqîqetê cahêl bûn. Kesên mezin gelek bi hêz bûn û zulim li feqîran dikirin. Di nav xwe da gelek şerên dijwar, revan û talan dikirin. Dizî, hîzî, kufir, delalet, hesûdî, serxweşî, yarî, direw, wehşîyet, fesad û xîyanet di nav wan da gelek berbelav bûn. Gava ku zarokê wan yê ewil keç ba wê gavê wan ew bi saxî dikirin qebrî da û bi vî şiklî ew dikuştin. ʿEreb hemî yek nebûn û yek nedigirtin, her qewm û ʿeşîretek wan serbixwe bû. Ji ber vê rewşê wan serokekê giştî nebû û gelek bi hêz û nav nebûn (*Gulzar*, b: 2503-2519).

*ʿAlem wî demî nexûşeḥal bû*
*Ewḥalê ji wan çi tirş û tal bû* (*Gulzar*, b: 2502)
...
*Ummî ne hemu ne xwundewar in*
*Nazan û bed in ne huşîyar in* (*Gulzar*, b: 2505)
...
*Kufrî û delal û butperistî*

*Ḥîzî û dizî û nadurustî* (*Gulzar*, b: 2513)

Berî Peyxemberî di Serdema Cahilîyeyê da, kahîn (remilvan) di civaka ereban da hem di warê dînî hem jî sosyal da kesayetiyên bi bandor bûn. Di vê serdemê da kahinî, bi taybetî bi têkiliya cinan re girêdayî bû û baweriya wan ew bû ku ew ji xeybê agahîyan didin. Ji bo meseleyên giring ên civakê ʿereb diçûn û bi wan ra dişêwirîn. Kahînan di nav gel da otorîteyeke mezin a manewî hebû; berî ku qerarê şerê bidin, şirîkatiyên bazirganiyê ava bikin an jî rêwîtiyeke giring bidin, pirsa kahînan dikir (*Gulzar*, b: 1087-1090).

*Bû vê ṭelebê ewan sefer kir*

*Bû layê wî kahinî guzer kir* (*Gulzar*, b: 1039)

...

*Meşhûr e jinek li layê Xeyber*

*Pisyarekê pê bikey bi bawer* (*Gulzar*, b: 1087)

Di serdema Cahiliyetê da, rewşa jinên ereban bi giştî pir xirab bû. Keçikên zarok wekî eybekê dihatin dîtin û hin caran bi zindî ve dihatin veşartin. Jin ji mîratê bêpare diman û wekî milkê mêran dihatin dîtin. Lê belê, jinên ji malbatên zengîn û navdar, di rewşeke cuda da dijîn. Mînak, Hatîce bint Xuweylîd dikaribû mal û milkên xwe birêve bibe û bazirganiyê bike (*Gulzar*, b: 2234-2248).

*Nazdar e Xedîce xan bi ʿeyşî*

*Babê wê Xuweylidê qureyşî*

*Ew çakejina cewan û şîrîn*

*Ew tazedila bi ʿeql û zengîn* (*Gulzar*, b: 2234-2235)

Di demên şerî da, gelek jin jî li gel zelaman ji bo ku hin pêdivîyên wekî xwarin û vexwarin, dermankirina birindîran diçûne şerî. Hin jinên şaîr wekî Hansa bînt Emr, bi helbestên xwe yên hêzdar mêr teşwîq dikirin, li hemberî dijminî tîj dikirin û bi awayekê psîkolojîk tesîr li şerî dikirin.

*Bazarê kejaveyan li cûş e*

*Jin lawje dibên bi dengê xûşe* (*Gulzar*, b: 7499)

...

*Ey law ciḥêl û kal û pîran*

*Şeq şeq we bihêt ji ḍerbê şîran*

*Ev renge ewan dikir heware*

*Muşrik dikirin çu gurgê hare* (*Gulzar*, b: 7505-7506)

**2.6.22.2. Rewşa Misilmanan**

Şûşî di *Gulzarê* da behsa rewşa xirab a misilmanên dewra xwe dike. Şûşî dibêje di dema Pêxemberî da misilman hemî yek bûn û hemî bo dîne xwe canfîda bûn lê evro misilman bûne parçe parçe ji ber vê yekê li misilman li hemberî dujminên xwe gelekî zeîf û acîz in. Dibêje ji bo ku em ji vê rewşa xirab xilas bibîn dive em hemî misilman wekî berên dîwarekî êk û du bigirin.

*Ew çen di emir berê Xuda bûn*
*Bu serwerê dîn çi canfîda bûn* (*Gulzar*, b: 7718)
...
*Nê şeṛm e bû ummeta Muḥemmed*
*Ev tefrîqe û şîqaqe bê ḥed*

*Îslam nê hemû yek in bi Qurʾan*
*Ew cumle wekî bira û yek can* (*Gulzar*, b: 7724-7725)

Rewşeke dî ya xirab a misilmanên evro ku Şûşî di *Gulzarê* da balê dikêşe ser jî bi aşkere vexwarin, kirîn û firotina ereqê ye. Şûşî dibêje evro li van bajarên misilmanan hêdî bê perde û şerm li her derî ereq tê kirîn, firotin û vexwarin. Ev rewşe jî ji bo misilmanan gelekî şerm e. Çareseriya vê meseleyê jî tetbîqkirina hukmên şerîʿeta îslamê ye.

*Dê bînî di van cewane şaran*
*Şûşêt ʿereqê dibê jimaran*

*Bê perde di van dukan û sûkan*
*Ney tirsê Xudaye ney serûkan* (*Gulzar*, b: 7924-7925)
...
*Ew ḥeddê ku şeṛʿî kirye ferman*
*Vî derdî bijil wî nîne derman* (*Gulzar*, b: 7930)

Mijareka dî ya ku Şûşî di *Gulzarê* da gazinde jê dike bêqedirbûna ʿilmî ye. Şûşî dibeje hêdî kesek giringîyê nadete ʿilmî, hêdî di nav civakê da çi rewaca ʿilmî nemaye. Di nav vî qewmê xirab da ilmên Quranê û dînê îslamê bêqedir bûne hêdî kes qedrê waiz û xetîban nagire. Wekî mînak di *Gulzarê* da ev mijar wiha derbas dibe:

*Ney xaṣme li vî zemanê bedreng*

*ʿÎlmê me çi bê rewac û bê seng*

*Qurʾan û ʿilûm û dînê îslam*
*Bê qedr e li nik vî qewmê bednam* (*Gulzar,* b: 436-437)

Dîsa Şûşî di *Gulzarê* da balê dikêşe ser mizgeft, medrese û melayan û dibêje di nav civaka evro da qedr û qîmetê van gelekî kêm bûye. Berê qedrê melayan di nav civakê da hebû, ew yek ji rêberên civakê bûn û her kesî pirsên xwe ji wan dikirin lê evro hêdî gelekî kêm kes diçin mizgeftan û guhê xwe didin melayan.

*Ger medrese ye çi xaneqah e*
*Ger mizgetê pak û secdegah e*

*Eẋleb tu dibînî ew di çûl in*
*Bê reẋbet û qîmet û melûl in*

*Ney maye melan çi nav û nîşan*
*Ekṯer di muşewweş û perîşan* (*Gulzar,* b: 441-443)

### 2.6.22.3. Rewşa Kurdan

Şûşî, ji bo rewşa kurdan mînaka dirandina sehîfeya boykotê ya li ser misilmanan ji aliyê pênc mûşrîkên canfîda û lihevkirî dide. Dibeje her çend ew kêm kes jî bûn lê canfîda bûn, bi bawer bûn û li pişta êk bûn, şîyan wê sehîfeya boykotê bi dirînin. Şûşî dibêje sed heyf ku îro rewşa kurdan xirab e. Kurd jar in û serê wan di derdan da ye. Axa û begên wan li ser wan zilimker in. Lê her çend ku hejmara wan kêm jî be sed xurt di xizmeta wan da ne. Ger pênc ji van xurtan xwe bidin êk û canfîda bin dê selteneta wan axa û began hilweşînin û ji vê rewşa xirab xilas bibin.

*Pênc kes nê eger ji dil bibin êk*
*Ṣed naḥeqîyan dişên biden têk*

*Ṣed ḥeyf û esef di nav me kuṛdan*
*Millet bûye jar û ser bi derdan* (*Gulzar,* b: 4179-4180)

### 2.6.22.4. Rewşa Şûşî ya Xirab

Şûşî, jîyaneke gelekî xweş neborandîye. Di jîyana xwe da gelek nexweşî, zehmetî, êş û elem dîtîne. Hêj di umrekê biçûk da nexweşîyeke giran lê peydabûye ji

ber vê yekê dawîya umrê xwe di nexweşxaneyan da borandîye. Hêj di 44 salîya xwe da ji ber vê nexweşîya giran emrê Xwedê kirîye. Ji ber vê yekê jî mêrga çarê ya *Gulzarê* nehatiye nivîsîn. Di *Gulzarê* da li hin cihan Şûşî derbarê nexweşîya xwe û jîyana xwe ya dijwar gazinda dike. Wekî mînak di van beytên jêrîn da Şûşî gazinda ji nexweşîya xwe, xemên xwe, tevgerên xirab ên dijminên xwe dike.

*Çen sale dizanî ez neşaẋ im*
*Zêdey ku ji ẓaliman bi daẋ im*

*Gel hinde ẋem û nexûşekaran*
*Dîtin me ji wan xebîṯ neyaran*

*Dîtin me ji wan gelek nexûşî*
*Lew ṭeng e dil û ḥezîn e Şûşî* (*Gulzar*, b: 432-434)

### 2.6.22.5. Şert û Mercên Dijwar ên Zewacê

Şûşî di *Gulzarê* da gava behsa daneşûya Fatîma kiça Pêxemberî ya gelekî sade û bê mesref dike, navberê dide meselê û behsa şertê û mercên dijwar ên zewacê yên serdema xwe dike. Şûşî di vî babetî da balê dikşîne ser şert û mercên zewaca roja xwe û rexneyên tûj li civaka xwe dike. Şûşî dibêje civak ji dînî dûrketîye êdî guhê wan li gotinên dînî nîne. Edî her kes bûye xudperis, rîyalî û xurur gelekî berbelav bûye. Dema ku zelamekî xwast ku biçe bo xwe jinekê bixwaze malbata bûkê berî ku pirsa exlaqê wî, eslê wî, dîyaneta wî û kemala wî bike pirsa mal û halê wî dike. Ger ku kesê diçît jinê dixwazît kesekî dewlemend bît êdî ne mûşkile ye ku kesekê ji dînî dûr bît yan kesekî xirab bît. Malbata bûkê dema kesek hat û kiça wan xwast, gelek next û xelatan ji zavayê xwe dixwazin û ew bi gelekîya next û xelatan gelekî şad dibin. Li gorî wan ger ku malekê mezin bo kiça wan neyê wê gavê qedr û bextê kiça wan namîne. Gelek kes kiçên xwe wekî amûrekê danûstandinê dibîne çiqas bi giranî ji destê xwe derbêxe ewqas zêde keyfa wan xweş dibe. Ew qet hizra zavayên xwe nakin, qet bo xwe wan ne xem e ku ew zava ji bo ku daxwazên wan bicihbînî dikeve bin qerên mezin. Piştî van rexneyan Şûşî dibêje divê em çav li Pêxemberî bikin û bo zewacê divê em zewaca Fatîmeya kiça Pêxemberî bo xwe bikin mînak (b: 7231-7251. Di *Gulzarê* da wekî mînak wiha behsa vê meselê tê kirin:

*Kiç nadene şû ḥeta neket mêr*

*Bû cilk û çekan ḥeta dibin têr* (*Gulzar,* b: 7234)

...

*Nik wan we ye wan ne qedr û bext e*

*Ger wernegirin xelat û nexte* (*Gulzar,* b: 7239)

...

*Jinxwazê neyî bilan welî bî*

*Xû neslê îmamê mey ʿElî bî* (*Gulzar,* b: 7249)

### 2.6.23. Şîret

Şîret alavek e ku armanca wê rastkirina çewtîyan û ji holê rakirina nebaşîyan e. Wekî gelek qadên jîyanê edebiyat jî qadek e, ku şîret tê da rolekê giring dilîze. Di vê qadê da cureyeke taybet a edebî bi navê pendname (şîretname) pêşketiye, ku armanca sereke ya wan dayîna şîretan e (Duran, 2021, r. 103). Şûşî, alimekê hişyar û xemxwar e. Şûşî civaka ku tê da dijî baş çavdêr dike, xeletî û kêmasîyên civaka xwe tespît dike û dixwaze wan sererast bike. Ji ber vê yekê berhemeke serbixwe ya bi navê "Pend û Şîret" nivîsandîye. Ji bilî wê berhema serbixwe, Şûşî di *Gulzarê* da jî cihekê berfireh daye şîretan. Şûşî di *Gulzarê* da derbarê mijarên wekî giringîya xwandin û hişyarbûn, ziyanên ereq û qumarê, xirabîya malê dinyayê, giringiya jinînanê, di jîyanê da rola jinê, amadebûn bo şerê li hemberî dijminan, dilpakî, ʿîbret, hecemat û xewa nîvro cihekê berfireh daye şîretan. Wekî mînak di van beytan da Şûşî şîretan li xwînerên xwe dike:

*Karek tu bike ḥelal û taze*

*Dê bî du cîhan tu serfiraze* (*Gulzar,* b: 1497)

...

*Her kes ji te ra bibêjî pende*

*Guhdarî bikey eger pesinde* (*Gulzar,* b: 5957)

...

*Nê malê dinê bela ye ex̆leb*

*Ney xûzme kesê bi têrî meṭleb* (*Gulzar,* b: 8357)

...

*Nê rahê ḥeyatê jinînan e*

*Asasê jiyanê xir cîhane* (*Gulzar,* b: 8622)

Çend şîretên dî ên Şûşî yên ku di *Gulzarê* da derbas dibin em dişên wiha rêz bikin:

- Bi ʿilmî jî sabît e ku xewa nîvro bo giyanê mirovî baş e

*Meşhûr e bi ʿʿilmî tenduristî*

*Xew lew demî bû giyan û hestî* (*Gulzar*, b: 5888).

- Divê jin kabanîya mal xwe bît û zarokên xwe ser exlaqeqê baş mezin biket.

*Ma bes niye jinkê ev weẓîfe*

*Neyxaṣme eger bi dîn neẓîf e*

*Mazin diketin kuṛ û kiçan ew*

*Ba xulqê şirîn çi ruḥ û can ew* (*Gulzar*, b: 8631-8632)

- Ji leşê xwe xwînberdan (hecemat) sineta Pêxemberî ye û ji bo gelek nexweşîyan derman e (*Gulzar*, b: 8641-8642).

*Lewṛa wî ji bû me daye ferman*

*Derman e ve renge xwûn bi berdan* (*Gulzar*, b: 8642)

- 17, 19 yan 21 ê mehê xwînberdanê bike. Roja şêşembîyê xwînberdanê neke (*Gulzar*, b: 8643-8644).

*Yan hevde ji mahê yanê nûzde*

*Yan bîst û yekê wekî wî berde*

*Sêşembîyê bernedey bi qestî*

*Yek leḥze di wê ye xwun newestî*

- Misilman ji kunekê du car nahê gezkirin ji ber vê yekê kesekê hişyar be (*Gulzar*, b: 7799).

*Nahête gezîn kesê misilman*

*Du car ji kunek" ji huşê îman*

- Çi rewşa wî xanîyê kabanî tê da nebe nîne (*Gulzar*, b: 4983).

*Bê rewş e eger ji min dizanî*

*Kabanî eger nebît di xanî*

- Jinînan asasê xir cîhanê ye (*Gulzar*, b: 8622).

*Nê rahê ḥeyatê jinînan e*

*Asasê jiyanê xir cîhane*

- Jin ji bo kesê dîndar gelek xweş yar e (*Gulzar*, b: 8626).

*Xûş behre ye bû mirûvê dîndar*

*Bû dîn û cîhan muʿîn û xûş yar*

- Jin bingeh e, kanî ye. Ger jin nebin wê gavê Pêxember, alim, arif û mêr jî nabin ji ber ku ew hemî ji jinan dibin (*Gulzar,* b: 8627).

*Jin ta ku nebin çewa dibin mêr*

*Mêrê ku di nêv ẋezayê wekî şêr*

- Ger tu bixwazî bo xwe jinekê bînî hişyar bî tenê li lawînîyê nenêre, kemalê paş guhê xwe ve neavêje (*Gulzar*, b: 1352).

*Hişyar bî neẓer nekey li malî*

*Yan lawînîya bi bê kemalî*

- Gava tu jinekê dixwazî li eql, neseb, heseb, dîn, şeref û edeba wê binêre (*Gulzar*, b: 1353).

*ʿEql û neseb û ḥeseb bixwaze*

*Dîn û şeṛef û edeb bixwaze*

- Dilpak be, dilpîs û dilreş nebe (*Gulzar,* b: 5953).

*Dilpakî ye dergehê kemalê*

*Dilpîsî esas e bû zewalê*

- Aqil divê mirovî ber bi qencîya ve bibe (*Gulzar,* b: 5954).

*Ev ʿeqlê Xudê ku daye însan*

*Ḥeyf e ku nebît delîlê îḥsan*

- Divê tu heqê hemî organên xwe bideyê wan zayî nekey (*Gulzar,* b: 5955).

*Ger çav û guh in eger zuban e*

*Nêv cê xû ṣerif nekey ziyane*

- Gava kesekî pendek li te kir guhê xwe bidê (*Gulzar*, b: 5957).

*Her kes ji te ra bibêjî pende*

*Guhdarî bikey eger pesinde*

- Zelamek çend yê xirab û nezan jî be bi ezmanê şirîn dê çêbibe (*Gulzar*, b: 8124).

*Her çendî zelam bed û nezan e*

*Dê çêbît eger şirînzuban e*

- Ezmanşirînî û rûyê xweş dergehê emînî û evînê ye (*Gulzar*, b: 8125).

*Nê royê xûş û zubanşirînî*

*Ew dergê emînî û evînî*

- Di hin rewşan da hîle fer in (*Gulzar,* b: 5735).

*Her çen ku tinê Xudê ḥesîb e*

*Emma di fer in ve newʿe lêbe*

- Merdê ku şareza nebe şolên wî bi asanî nameşin (*Gulzar*, b: 5736).

*Lew merdê neşareza û nadan*

*Şulêt wî neçêdibin bi asan*

- Gava ku birayê te yê misilman kete deravekê tengîyê bi mal û parê xwe ve destê wî bigire (*Gulzar*, b: 4760).

*Xêrek mezin e birayê dînî*

*Wî dest bigirî bi can evînî*

- Tengavî, xurûr û îsyana mirovî dişkêne (*Gulzar*, b: 2090-91).

*Ṭengavî ḥeta nebînî însan*

*Nêzîke biket ẋurûr û ʿîşyan*

*Her merdê dibînî hêc û har e*

*Wê rojê dibînî kulewar e*

- Ji nefsa têr bitirse ji ya birsî netirse (*Gulzar*, b: 2092).

*Nefsa xû eger te dîtî birsî*

*Mizgîn li te hîç li wê netirsî*

- Nefsa xwe bindest bike nehêle rizgar bibe (*Gulzar*, b: 2094).

*Vê nefsê ḥeta nekey tu jêrdest*

*Bê fayde nekey bilindîyê qest*

- Kesê bê şol bît ew çi caran nagehîte murada xwe (*Gulzar*, b: 1492).

*Her kes ji xû ra neket çi karan*

*Nagehte murad û pişk û baran*

- Bo cewanemêran şerm e ku çavê wan li nanê xêre be (*Gulzar*, b: 1493).

*Nê şeṛm e ji wan cewane mêran*

*Wan çav hebitin li nanê xêran*

- Ger ku şerefa te bo te giring be, wê gavê here hemalîyê bike neku tu ber suala kesekî dilê te biêşe (*Gulzar*, b: 1495).

*Ḥemmalî bikey ne wekî bixwazî*

*Xaṣma tu eger şeṛefnewazî*

- Ji bo ku tu bibî xwedî jîyaneke serfiraz û serbest divê te şolek hebît û tu şol bikey (*Gulzar*, b: 1496).

*Ger dê te divê bijî bi serbest*

*Tu helke li şulî bask û dest*

- Kiryarî û tovçînîyê bike (*Gulzar*, b: 1498).

*Kiryarî bikey gelek pesinde*

*Tûwçînî bikey du hin bilinde*

- Bibe xwedî sinʿetek (*Gulzar*, b: 1499).

*Ṣinʿet ji xû ra bikey cewan e*

*Hem dîn û ʿîbadet û jiyan e*

- Hindî ku ne di îsyana Xwedê da bin ferz e guhdarîya mîr û sultanên xwe bike, çi caran tiştên xirab li gel wan neke (*Gulzar*, b: 1437).

*Her hinde dikey îṭaʿeya mîr*

*Ḥetta ku mezin nebît Xudêgîr*

- Ev dinya ni cihekê bêdawî ye ji ber vê yekê her dem taeta Xwedê bike (*Gulzar*, b: 1440).

*Ev kevnecîhane bê beqa ye*

*Hişyar bî ji ṭaʿetê xudaye*

- Li heqqê feqîr û jaran hişyar be wan jibîrneke (*Gulzar*, b: 1428).

*Guhdar be Xudê te agedar e*

*Ser ḥeqqê feqîr û jarî yar e*

- Nivîs û qelem ji bo me gelekî pêtivîne girinîyê bidê (*Gulzar*, b: 7075).

*Nê xeṭṭ û qelem me pêtivî ne*

*Bû jînê cîhan û neşrê dîne*

- Hem ji bo şol dinyayê yên wekî tarîx û hesaba hem jî bo axretê şolên dînî yên wekî nivîsandina Qurʾan û hedîsan qelem gelekî giring e (*Gulzar*, b: 7078).

*Qurʾan û ḥedîs̱ û şeṛʿ û eḥkam*

*Tarîx û ḥisab û karê îslam*

- Nivîs û ziman ji bo hukimranî û dewletên vî demî gelekî pêtivî ne. Ji ber vê yekê xwe fêrî nivîs û zimanê gelek dewletan bike (*Gulzar*, b: 7080- 7081).

*Xeṭṭ pêtivî ye di vî zemanî*

*Bû dewlet û dîn û ḥukimranî*

*Ney bes bi tinê me xeṭṭê îslam*

*Belkî xeṭṭê cumle dewletan ʿam*

- Ereq û qumar gelek xirab û bi zerer in xwe jê dûrbêxe (*Gulzar*, b: 7902).

*Ger pîsemey e eger qimar e*

*Wan şeṛr û ḍerer bi çav diyar e*

- Ger kesek fêrî ereq û qumarê bû êdî çi xêr ji wî kesî nahê (*Gulzar*, b: 7903).

*Her kes bi yekê ji wan bibît fêr*

*Êdî tu xeyal nekey ji wî xêr*

- Ereq û qumar mala mirovî xirab diketin, hişên mirovî ji serê mirovî dibetin, taetê Xwedê li ber mirovî sar diketin, hem exlaq hem jî tenduristîya giyanê mirovî xirab diketin, mirovî feqîr û bê mal diketin ji ber vê yekê xwe jê dûr bike (*Gulzar*, b: 7904-7911).

*ʿEqlî dibetin ji kelle mêran*

*Malan diketin xirab û wêran*

...

*Hindan ji keser ji malê çûyî*

*Bedkarî hinan û ḥezreguyî*

- Malê dinyayê bi qelemperî bela ye bo mirovî. Mirovî difinbilind, serxweş, methoyî dike, ji rêya xwedê xafil dike û şohretperest dike (*Gulzar*, b: 8357-8361).

*Nê malê dinê bela ye eẋleb*

*Ney xûzme kesê bi têrî meṭleb*

...

*Şuhretperisî û zikviyanî*

*Ney karê miruvê nûr di canî*

- Kesê ku dinya li ber dilê wî gelek şirîn be dînê wî dê zererê bibîne (*Gulzar*, b: 8362).

*Dunya çi kesê bivêt şirîne*

*Dînê wî ḍerer dihêt yeqîne*

- Kesê ku merama wî razîbûna Xwedê û biheşte divê ev rêya Pêxemberî bişopîne (*Gulzar*, b: 183-184).

*Herkes ku riḍa Xudê meram e*

*Ev kavledinê li wî ḥeram e*

*Her çî ku divêt neʿîmê cennet*

*Dê bigrî rîya resûlê ummet*

- Ey bira ji bo ku tu qedrê Pêxemberê xwe baş bizanî û dersan bo xwe ji jiyana wî wergirî divê tu jîn û heyata wî can bixwînî (*Gulzar*, b: 401-403).

*Ḥetta tu bizanî ey birader*

*Qedrê vî Muḥemmedê peyember*

*...*

*Beḥṣê wî divêt cewan bixwînî*

*Belkî ji xû ʿîbretek bibînî*

- ʿEyb û kêmasîyên mirovan aşkere neke biveşêre (*Gulzar*, b: 496).

*Rengîn e li nik me ʿeybepuşî*

*Ne şirîn e çi kîbr û ḥeqfiruşî*

- Xwe ji kîbr, xurur û deqşikênîyê dûr bêxe (*Gulzar,* b: 497-499).

*Hişyar bî bira nekey ẋurûrê*

*Înṣaf e derê kemal û nûrê*

*...*

*Nek carê bikey tu deqşikênî*

*Bê şek dê nedametê bibînî*

- Ey kesên ehlê ʿilmî gelek bi sebir bin, nerim bin, dilnizim bin (*Gulzar,* b: 500-501).

*Xaṣma tu bira ji ehlê ʿîlmî*

*Lazim tu gelek bi ṣebr û ḥîlmî*

*Karê te tewaḍuʿ û weqar e*

*Navê te bi çakî payedar e*

- Her çi ilm, sinʿet û karên baş hebib xwe fêr bikin (*Gulzar*, b: 586).

*Bê bar xû nekeyn ji her çî baş e*

*Ger ʿîlm e çi ṣinʿet û meʿaş e*

- Xwe ji rîbayê dûr bêxin (*Gulzar,* b: 741).

*Ew karê ḥeram wekî rîba ye*

*Nêzîk wê nebin biken tebaye*

- Zekatê ji malê xwe bide, ew zekat te ji bela û mûsîbetan biparêzît (*Gulzar*, b: 742).

*Ew ruknê zekat Xudê ku danî*

*Em taze bideyn ji ruḥ û canî*

- Bo xwe bi awayekê ciwan û helal malî xir bike, nebe êxsîrê malê xwe bi wî malê xwe xêran bike da biçîye biheştê (*Gulzar,* b: 1100-1108).

*Ger bêt û bela biçît bi malî*

*Memnun bî ne wekî ji bû bi nalî*

...

*Dunya çu niye ku bê dewam e*

*Karek bike bû biḥeşt meqam e*

- Li hemberî dijminên dînî her dem bo şerî yên amade bin, hûn çend bişên ji bo xwe çek û quwwetan amade bikin (*Gulzar*, b: 598-599).

*Hişyarî xû bin li duşminê dîn*

*Ḥaḍir xû biken bû cengê her ḥîn*

*Hun kesib biken sîlaḥ û quwwet*

*Çendî ku ji we şiyan û ṭaqet*

- Ceyşeka xwedî çek û taʿetker bo xwe çêkin. (*Gulzar*, b: 601).

*Ceyşek we divêt cewan û mêrîn*

*Emma bi çek û ʿîbadet û dîn*

- Ser dîn û wetenê xwe canfîda bin (*Gulzar*, b: 602).

*Ser dîn û weṭen di canfîda bin*

*Ta çendî bijîn ʿezîz û şa bin*

- Bo şerekê li hemberî dijminê xwe hemû amûrên şerî yên dewra xwe bidestbêxin da ku hûn bişên şerê dijminê xwe bikin(*Gulzar*, b: 603-610).

*Rumbazîy û quşme û suwarî*

*Segvanîy û karê nêzekarî*

*Fêrbûnî evî sîlaḥê taze*

*Nê ferḍ e li ser me wekî nemaz e*

*Ṭeyyare û bûmbe û peṛaşut*

*Pêdivî ne me wekî ẕexîre û qût*

*Reşşaş û tivenk û ṭop û dûrbîn*

*Nê cumle fer in çu gaz û benzîn*

*Rummane û şîr û rumḥ û sîkar*

*Laslikî û berq û tank û radar*

*Seyyare eger qîṭar û papor*
*Ta her çî bi kar e bû şeṛ û şor*

*Cumle me divên evî zemanî*
*Bêy wan nê meḥale zindiganî*

*Ceyşek bi çek û quwwet û nav*
*Îslamê divê hebî di her gav*

# BEŞA SÊYEM TRANSKIRPTSIYONA GULZARÊ

## 3.1. Rêbaza Transkriptsiyona Gulzarê

Destxet bir herfên erebî – kurdî ve hatiye nivîsîn. Transkrîpsiyona herfan li gorî alfabeya transkrîpsiyonê ya standart hatiye kirin. Di tabloya jêrîn da ka li hemberî kîj herfên erebî – kurdî, kîjan herfên latînî – kurdî hatîne bikaranîn tê nîşandan.

**Tablo 3. 1**: Latînîza Tîpên Erebî

| Transkrîpsiyona herfên ku di alfabeya erebî da hey û di alfabeya kurdî ya latînî da jî tên bikaranîn | | Transkrîpsiyona herfên ku di alfabeya erebî da hey lê di alfabeya kurdî ya latînî da nayên bikaranîn | | Transkrîpsiyona herfên ku di alfabeya erebî ney lê di alfabeya kurdî ya latînî da tên bikaranîn | |
|---|---|---|---|---|---|
| ا | Aa, Ee | ث | S̱s̱ | چ | Çç |
| ب | Bb | ح | Ḥ ḥ | ژ | Jj |
| ت | Tt | خ | Xx | ڤ | Vv |
| ج | Cc | ذ | Ẕ ẕ | وُ | Ûû |
| خ | Xx | ص | Ṣ ṣ | ۆ | Oo |
| د | Dd | ض | Ḍ ḍ | ێ | Êê |
| ر | Rr | ط | Ṭ ṭ | | |
| ز | Zz | ظ | Ẓ ẓ | | |
| س | Ss | ع | ʿ | | |
| ش | Şş | غ | Ẋ ẋ | | |
| ف | Ff | ڕ | ṛ | | |
| ق | Qq | ء ؤ ئ | ʾ | | |
| ک ك | Kk | | | | |
| ل | Ll | | | | |
| م | Mm | | | | |
| ن | Nn | | | | |
| ه | Hh | | | | |
| و | Ww | | | | |
| ی | Yy, Îî | | | | |

Heta niha di gelek lêkolînên kurdî yên transkrîpsiyonê da ji bo herfa “غ” wekî lêkolînên tirkî herfa “ġ” hatiye bikaranîn. Lê me di vê lêkolîna xwe da ji ber ku çêtir li kurdî tê ji bo herfa

“غ” , herfa “ẍ” bikarînaye. Berîya me Gîw Mukriyanî[1], Hemin Omar Ahmad[2], Zahir Ertekin[3] Semih Gezer[4] , Hacı Yılmaz[5] jî bi vî avayî bikarînaye.

Şex Tahir ji bo rastxwendina metnê, wezn û qafîyeyê di metnê da çend îşaretên taybet bikaranîne û cihê ev îşaret heyî divê çawa bêne xwendin dîyar kirine. Me jî di transkrîpsiyona metnê da hişyarî li van xala kir.

Di metnê “ِ” wek “i”, “ٖ” wekî “e”, “ُ” wekî “u”, “ى” hatibe wek “î”, " وٚ " weki “o”, “وُ” jî wekî “û” hatine nivîsîn. Di hin peyvan ji bo wezn a beytê bêyî ku kesre “ِ” hebe jî herfa “i” hatiye bikaranîn. Wek mînak di beyta jêrîn da di peyva “aşkar” da kesre tune lê ji bo wezn a metnê peyv wekî “aşikar” hatiye xwendin û nivîsandin.

“Zana bi xefîy yî û aş**i**kar î

Tu çen bizirî tu hin diyar î” (b7)

Di metnê da herfên ku şedde “ّ” li ser in wek du herf hatine nivîsîn. Wek mînak di beyta jêrîn da ji ber ku li ser herfa نّ’yê hereka şeddeyê heye wek du “n” hatiye nivîsîn.

“Her ḥemd û s̱ena û şukr û mi**nn**et

Her bu te xudê xudanê reḥmet” (b3)

Di destpêka destxetê da sê rûpel hene ku Şûşî xettatîya xwe nîşan daye. Bi xetekê xweş di rûpela yekem da bi erebî bîsmîllah nivîsandîye. Di rûpelê duyem da navê Gulzarê yê erebî, navê Pêxemberî û çend ayet nivîsandîne. Di rûpelê sêyem da jî dîsa navê berhemê bi xettatî nexşandîye. Ev her sê rûpel wek pêvek hatîne dayîn. Dîsa Şûşî rûpelên 4-9an jî bi erebî nivîsandine. Di van rûpelan da Şûşî pirtûka xwe dîyarî telebeyên Nûrê dike, çend çavkanîyên sereke yên pirtûka xwe, plana pirtûka xwe, hereke û îşaretên pirtûka xwe dîyar dike. Ev rûpel di pêvekê da hene lê di nav metnê transkrîpsîyonê me cih nedayê.

Di nav gulzarê da di serê beşan da bi erebî ayet hatîne nivîsin me orjînala ayetê bi herfên transkrîpsiyonê nivîsandîne û wateya wan a kurmancî jî di nav kevanekê da nivîsîye.

Hemû serenavên Gulzarê û jêrenotên wê bi erebî hatîne nivîsîn. Me jî bi herfên transkrîpsîyonê resen a serenavan nivîsandîye û kurmancîya we jî di nav kevanekê da nivîsandîye. Jêrenotên Şûşî me wergerandîne kurmancî û tenê kurmancîya wan nivîsandîye.

---

[1] Mukriyanî, G.”Elfûbêy Kurdî”,Çapxaney Kurdistan, Hewlêr, 1960
Ahmad, H. O. “Mentîqut – Teyr”, weşanxana zankoya Soran, 2018[2]
[3] Ertekin, M.Z. û Ahmad, H. O, “Dîwana Mehwî” Weşanên Lîs, 2018
[4]Gezer, S. “Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kenduleyî (Metn û Lêkolîn)” Teza Doktorayê, Zanîngeha Bîngolê, 2023
[5]Yılmaz, H. “Dîwana Laxer Mela Umerê Aşiq (Metin û Lêkolîn)” Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Artukluyê, 2019

## 3.2. Metna Gulzarê ya Transkirîbekirî

**BÎSMÎLLAHÎRREḤMANÎRREḤÎM**
Rabbîşraḥ lî ṣadrî. We yessîr lî emrî. Waḥlul ʿuqdeten mîn lîsânî. Yefqaḥû qawlî. (*(Mûsa) Got: Xwedayê min! Sînga min fireh bike. Karê min ji bo min hêsan bike. Girêka zimanê min veke. Da ku gotina min fêm bikin.(20-Sureyê Ta-ha (25-28)*)

**EL-MUQEDDÎME (DESTPÊK)**
We fîha ezhar (Pêşekî û Çend Kulîlk)

**1. EL ÎBTÎDAHÛ BÎ ÎSMÎ RABBÎL EʿLA EL-FETTAḤ (DESTPÊK BI NAVÊ RABBÊ MIN Ê BILIND Ê FETTAḤ)**

1. Ellah ku çi navekê şirîn e
Gûtna wî ḥeyatê can û jîn e

2. Ey navê te ye Reḥîm û Reḥman
Wey ẕikrê te ye şîfa û derman

3. Her ḥemd û ṯena û şukr û minnet
Her bû te Xudê xudanê reḥmet

4. Bawer me heye ku tu Xuda yî
Her tu mezin î xudan beqa yî

5. Tenha yî tu bê heval î û bê hemṯer
Ne yê pêtivîyê wezîr û yawer

6. Haḏir tu li ser dilan reqîb î
Ṣahid tu li kullî kesî qerîb î

7. Zana bi xefî yî û aşikar î
Tu çen bizirî du hin diyar î

8. Ageh bi şehadetê û ẋeybê
Dûr î tu li her nerêz û ʿeybê

9. Her we bi Muḥemmedî me bawer
ʿEbdê te ye qaṣid û peyember

10. Serdarê hemû peyemberan ew
Serdefterê cumle serweran ew

11. Ew rohnîyê afitabê reḥmet
Ew durrê giran buhayê xilqet

12. Bînahîyê çavê cumle ʿalem
Tacê serê xir kuṛêt di Adem

13. Ew meẕherê xûş xîṭabê “lewlak”
Sîrr û sebebê sucûdê emlak

14. Xûşevyê te ye qedir giran e
Axir te peyemberêt cîhan e

15. Feyḍ û kerem û selam di bê ḥed
Ya Reb tu biṛêje ser Muḥemmed

16. Hem ser hemû çak û pake alan
Gel cumleyê wan mezin hevalan

17. Ṣaḥib hunerêt di piṛṛ dîrayet
ʿ Alî ṣîfetêt xudan dîyanet

18. Piṛṛ behrewer in xudan kemal in
Xîlqet beşeṛ in melek xîṣal in

19. Ser dînê te ew çi canfîda ne
Ya Reb tu bidey cezayê wane

20. Ew ḥamilê dîn in û şeṛîʿet
Ew murşîdê dîn in û ṭerîqet

21. Ew bûne serê seʿadeta me
Ew bûn sebebê hîdayeta me

***

22. Navê te Xudê çi tazenav e
Pîrûz e çi şûleka li nav e

23. Navê te ye ron dibin bi wî dil
Ẕikrê te ye hûn dibin bi wî dil

24. Bû nûrê hîdayetê delîl e
Bû jîn û seʿadetê kelîl e

25. Miftaḥ e ji bû xizîneya nûr
Mîʿrac e bû cennet û serê jûr

26. Navê te ye nûrê dûrebînan
Ẕikrê te ye ṣebrê her ḥezînan

27. Dermanê cemîʿê êş û nalan
Xermanê me van feqîreḥalan

28. Navê te gelek şirîn e ya reb
Luṭfa te gelek berîn e ya reb

29. Navê te kesê ji dil bixwînît

Dê her du cîhanê xêr bibînît

30. Her kes weku berbela û gumrah
Îmdad wî bese bibêjî Ellah

31. Ewwel me bûy xû îbtîda ye
Axir me li ser wî întîha ye

32. Ṭahirê te feqîr û jar e ya Reb
Reḥma te wî pişk û bar e ya Reb

33. Şermende ji tu ye piṛṛ gunah e
Feḍla te ûmêd e hem penah e

34. Nîn in te beṛevan bijil peyember
Xûşevê te û şefîʿê meḥşer

35. Ger dê tu ʿefû bikey vî jarî
Dê dey me bi xaṭira wî yarî

36. Mewlayê me yî tu dilnewaz î
Rebbê me tu yî tu karîsaz î

37. Ya Reb tu bi navê xû yê eʿzem
Ẋafil me ji xû nekey tu her dem

38. Gel dûstê di xû bikey me hemṛah
Ẋafil me nekey ji ẕikrê Ellah
***

39. Navê te Xudê ku çendê xûş e
Miftaḥê seʿadet û xirûş e

40. Navê te ye cewhera zubanan
Zikrê te ye nûrê qelb û canan

41. ʿArif bi te ṛa xudan kemal in
ʿAşiq xû ji bû te her dinalin

42. Zahid bi te ew di piṛṛ qerar in
ʿAbid bi tinê di hoşiyar in

43. Zengîn e ewê ji dil tu nasî
Serşîn e kesê li nik te ʿaṣî

44. Dûstê te belê ebed seʿîd e
ʿAṣî ji te bê kes û pelîd [1]e

45. Serşor û xisaret û gunehkar
Barê gunehan giran e êkcar

46. Nefʿê[2] wî nîye ne mal û ewlad
Rûyreş ji Xudê ẕelîl û naşad

47. ʿUmrê xû bi ẋefletê wî bûrand
Cennet bi şefaḥeta xû dorand

48. Dunya xû eger çî zûr şirîn e
Emma bi neẕer wî her çu nîne

49. Ney warê şefa û keyf û xûşî
Ney darê beqa[3] û ʿeyşenûşî[4]

50. Nefiroşe bi vê cîhanê yekser
Ṭahir tu riḍayê şahê ekber
***

51. Xûzya li kesê Xudê ḥebandî
Nefsa xû li vê dinê revandî

52. Xû nasîy û tu bi ṛastî zanî
Paṛastî xû wî li vî zemanî

53. Ḥubba te kirî refîq ji bû xu
Şeṛʿê te kirî ṭerîq ji bû xu

54. Qurʾan wî kirî delîl û ṛehber
Serdarê rusûl şefîʿê meḥşer

55. Wî qewl û ʿemel bi sunneta wî
Mizgînî ji wî bû ummeta wî

56. Xuyziya li kesê Xudê ʿefuket
Dilxûş bi lîqayê ẕatê xû ket

57. Rizgar biketin li vê belayê
Piṛṛ behre biket bi wê lîqayê

58. Ew dê bigehîte rewḥ û reyḥan
Dilxûş dibitin bi ḥûr û wîldan

59. Navê wî kesê gelek bibêjî
Dê reḥm û kerem bi ser birêjî
***

60. Ṭahir were tuş wekî hevalan
Waz bîne li pûçîy û xeyalan

61. Qeşdê bike baregahê Barî
Ta key neker û ne huşiyarî

---

[1] Pîs,gemarî, heram
[2] Kar, fayde
[3] Biheşt
[4] Jiyaneke xweş û bi kêf, jiyana bextewar.

62. Hilbigre rîya xudan kemalan
Ṣaḥib huneran şirîn xîṣalan

63. Bê fayde ʿumir te geşte êvar
Karek te nekir bû rojê dujwar

64. Karek bike tu vî ʿumrê mayî
Waz bîne li karê pîs rîyayî

65. Mala xû bigêre xilwexane[1]
Aloze gelek nê ev zemane

66. Tewbe bike zû li xir gunahan
Piṛṛ feḍl e Xudê bû dadexwahan

67. Qeṣda te tinê riḍa wî bîtin
Dunya çû nîye bilan biçîtin

68. Belkî li te xûş bî şahê Reḥman
Dilxûş te biket ebed bi rîḍwan

69. Qurtar te biket li vê belayê
Pirr bar te biket bi wê lîqayê[2]

70. Gel xizm û kes û bira û daybab
Seyda û heval û cumle eḥbab

71. Vêkra ku hemî bi reḥmeta wî
Em cumle bi çîne cenneta wî

72. Ya Reb me tinê tu piştevanî
Ḥîfza me bikey di vî zemanî

**2. ES-SENA ʿELELLAH (PESIN BO XWEDÊ)**

73. Ey ṣaniʿê Ẕulcelal û Qadir
Ẕatê te ne ewwel û ne axir

74. ʿÎlmê te muḥîṭ û qudreta te
Ḥukmê te dirist û ḥîkmeta te

75. Ey çen mezinî çi ʿalî şanî
Nîşan te ew e ku bê nîşanî

76. Emrê tu bibêjî “kun fekan e”
Şeʾnê te Xudê çi taze şan e

77. Nînin te mekan li her mekan î
Rebbê me tu yî me tu xudan î

78. Baqî tu yî her tu ber qerar î
Her tu meded î tu harîkar î

79. Ey wahidê bê heval û hemser
Meʿbûdê hemû enamî yekser

80. Dûrî tu li ʿeyb û kêm û kasî
Ney xwuzme li wê ku tu nenasî

81. Şukra te ye rewneqa zubanan
Ẕikrê te ye nûrê qelb û canan

82. Reḥma te Xudê gelek berîne[3]
Feḍla te qewî ji dil şirîne

83. Heşt baẋê biḥeşt bi ḥûr û wîldan
Yek qeṭren e ew ji beḥrê îḥsan

84. Qehra te qewî şedîd û tal e
Lew piṛṛ gunehan me nale nal e

85. Her çen me xeṭa û piṛṛ quṣûr e
Hîvî me bi reḥmeta te zûr e

86. Şermende ye piṛṛ gunahê Şûşî
Settar î Xudê tu lê bipûşî[4]

***

87. Ey Xaliqê piṛṛ celal û qudret
Wey ṣaniʿê piṛṛ kemal û ḥîkmet

88. Cînn û beşeṛ û melek temamî
Xir dane te taze piṛṛ nîẓamî

89. Eṣnafê beşeṛ hizar ʿeşîret
Ṣed reng û zuban û ṣed ṭebîʿeṭ

90. Ev sal û zeman û ev şev û roj
Ev nûr û ẓelam û cennet û doj

91. Xêr û şeṛ û pîsî î û cewanî
Ev xûş û nexûşî û giranî

92. Ev çak û xirab kufr û ʿîṣyan
Ev ʿedl û ḥeqî û fîsq û ṭuxyan

93. Ev jîn û mirin şebab[5] û pîrî
Ev her du cîhan bi kwîr û dwîrî

[1] Xelwetxane, silûsgeh
[2] Hevdîtin, seredan
[3] Berfireh, bêsînor
[4] Veşartin, nixaftin
[5] Xort, genc

94. Her çî tu bidey û yan nedey tu
Her çî tu bibey û ger nebey tu

95. Hindan di ẋenî hinan feqîr key
Hindan nefer û hinan emîr key

96. Her çî ku seʿîd e yan şeqî ew
Piṛṛ sûç û xeṭa ye yan teqî ew

97. Heç yê tu ʿezîz bikey ʿezîz e
Ew yê tu temîz bikey temîz e

98. Herkes ku tu hez bikey celîl e
Herçî ku te ḥezkirî ẕelîl e

99. Ew dê bî ewa te ḥezkirî bes
Ḥukmê te nîye ku red biket kes

100. Kes nîne bibet eger bidey tu
Kes nîne bidet eger bibey tu

101. Haşa te hebin şeṛîk û eşbah[1]
Yan ehl û weled te haşalîllah

102. Kenzek[2] tu hebûy ezel nîhan[3] bûy
Bê ʿarif û ʿebdê îns û can bûy

103. Ev xelqe te da bi rêz û rengîn
Da ku tu bi ṛastî bêye nasîn

104. Her êk xû bi şolekê muweẕẕef[4]
Hindek te kirin li wan mukellef

105. Çêtir te li wan heman beşeṛ kir
Tacê kerema xû lê bi ser kir

106. Qaṣid te fiṛêkirin peyapey
Her êk bi nîẕameka tu ḥezkey

107. Adem li serî ḥeta ku xatem
Ron kir te bi wan cemîʿî ʿalem

108. Dînê xû te kir beyan ji bû wan
Şeṛʿê xû te kir ʿeyan ji bû wan

109. Ḥukmê xû wesa te kir bi dîdar
Însan te kirî bi şulê muxtar

110. Her kes ku divê wî nûr û îman
Her kes ku divê wî kufr û ʿiṣyan

111. Her kes xû bi karê xû rehîne
Hakim tu yî lê çi zulim nîne

112. Her çî ku tu nasî çak û pak e
Her çî tu nenasî ew hîlak e
***

113. Xûzmey li kesê ku tu vîyayî
Nefsa xû vegirt li dest hewayî

114. Tirsa wî dewam li heybeta te
Çavê wî dewam li reḥmeta te

115. ʿAlem ji gef û zuban selamet
Serbest û seʿîd bibît qiyamet

116. Ya Reb me bikey ji wan seʿîdan
Têkel me bikey di nav şehîdan

117. Ṭahir dê mirît û dê fena bît
Ya Reb di rîya te da bila bît

118. Ya Reb xû tu yî Reḥîm û Reḥman
Reḥma te tinê divêt me derman

119. Her çendî ku piṛṛ gunah e bê ḥed
Emma bide xaṭira Muḥemmed

**3. FÎ MEDḤÎL RESÛL (DI PESNÊT PÊXEMBERÎ)**

120. Ey fexrê cîhan û wildê Adem
Ey tacê serê cemîʿê ʿalem

121. Ey nûrê hîdayeta Xudayî
Menzûrê ʿînayeta Xudayî

122. Navê te Xudê bilindê anî
Xulqê te gelek mezin wî zanî

123. Ey serwerê cumle murselînan
Wey pêşeṛoyê me muʾmînînan

124. Mînẕarê tereqqî û ʿîbadet[5]
Serdarê hemû xudan seʿadet

[1] Tiştên wek hev
[2] Xezîne, gencîne
[3] Veşarî
[4] Erkedar, peywirdar
[5] Dûrbîna pêşveçûnê

125. Ey her tu şefîʿê rojê meḥşer
Her tu vedikey derî ji mehder

126. Ṣaḥib ʿelem û meqamê meḥmûd
Bes date Xudayî hewḍî mewrûd[1]

127. Ey saqî avê hewḍê kewser
Hîvî me nekey ji bîr di meḥşer

128. Ṣaḥib kerem î meqamê “lewlak”
Durra ṣedefa sucûdê emlak

129. Ey sorgulê baẋê feyḍ û uns î
Wey bilbilê murẋizarê[2] Quds î

130. Miftaḥê xizîneya kemal î
Dellalê ṭerîqeya cemal î

131. Peyẋemberê axirê zeman î
Tu murşîdê cumleyê cîhanî

132. ʿAlî neseb î mezin ṣîfat î
Dunya vejî lew dema tu hatî

133. Ey nûr û çirayekê munîr î
Mizgîn derê ʿalem û neẓîr î

134. Qurʾan ji te ra Xudê hinarî
Bû ummeteka ku wî bijarî

135. Ṣed şukir tu yî me yar û yawer
Peyẋember î tu me tu yî ṛehber

136. Anîn te ji ṭarîyê bû nûrê
Dilxûş te kirîn bi vê sirûrê

137. Ewwel me tu yî delîl û ṛehber
Axir me tu yî şefîʿê meḥşer

138. Ṭahir te yek e ji cumle yaran
Qurbanî te ye hero du caran

139. Ey ṛehberê xûşî û seʿadet
Peyẋember û qaṣidê hîdayet

140. Fexrê ʿecem û hemû ʿereb tuy
Ey kan û xizîneya edeb tuy

141. Ellah ku tu day bi taze ṣûret
Ṛazandî belê bi pake sîret

142. El Ḥeq mezin î kemalê darî
Ṣaḥib huner î eṯer diyar î

143. Bê sir nîye lê ku xatemî tu
Seydayê cemîʿî ʿalemî tu

144. Ey çen mezin î du hin şirîn î
Serbarê dil î tu nazenîn î

145. Tuy şuʿleê afitabê[3] reḥmet
Tuy durrê giranbuhayê ḥîkmet

146. Ey meẓherê reḥmeta Xuday î
Wey her ji bû reḥmetê tu day î

147. Ey ku çi qeder te talî kêşan
Çen cewr û cefa çi ṛenc û êşan

148. Dîtin te li destê wan neyaran
Nek carekê bel hizarê caran

149. Tu ṣebr û teḥemmul û cewanî
Wan zilm û nebaşîy û neṣanî

150. Tu daʿî û hadîyê seʿadet
Wan butperisî rîya şeqawet[4]

151. Çendî te ḥeqî dikir beyane
Wan her bi te ṛa dikir tiṛane

152. Ṣed muʿcîze û hizar ji ayet
Bê ḥed ji delaîl û îşaret

153. Yek yek te kirin beyan ji bû wan
Bes da ku biken qebûlê îman

154. Kerr bûn li ḥeqî li nûrê kûr bûn
Lal bûn li rîya vî dînî dûr bûn

155. Gavê tu ewan dikirye saḥir
Gavê tu dikirye dîn û şaʿir

156. Dem dem dikirin tifaq li ser te
Geh geh bi şeṛ û şîqaq li ser te

157. Her çen te dikir li wan neṣîḥet

[1] Birka ku Pêxember roja qîyametê li hivya ummeta xwe dimîne.
[2] Çûçika di zare
[3] Tav, roj
[4] Rêbirî, eşqîyayî

Wan her bi te ṛa dikir feḍîhet

158. Ṣed ẓilm û ezîyet û nekamî
Ṣed qehr û nerêzî û nefamî

159. Çen sal tu ji wan ve derdeser bûy
Axir tu li Mekke ḍerbeder bûy

160. Tu mayî di ḥalê tirş û tale
Hel bîʿisetê ta bû s̱êzde sale

161. Wan çendî ji dil cefa didate
Hindê dî te kir bû dîn xebate

162. Bew ṣebr û teḥemmul û cewanî
Bew xûş xeber û siḥir beyanî

163. Bew xulqê şirîn û tazekar î
Ḥetta te birin bû rahê Barî

164. Înane derê ji kufr û ʿîṣyan
Dil zînde kirin bi dîn û îman

165. Alayê bilindê dîn û dewlet
Hilgirtî ewan bi naz û ʿîzzet

166. Sîh sal pê neçûn ḥeta ku ew dîn
Pan kir li cîhan ḥeta derê Çîn

167. Ey xûşevîyê Xudayê ekber
Peyẋemberê xir cîhanê yekser

168. Şanê te çi taze û pesind e
Qedrê te li nik wî zûr bilinde

169. Barî, tu ji ʿalemê bijarî
Da bibye delîlê dînê Barî

170. Bê mîs̱l î belê ji ʿalemê tu
Bê sir nîye lê ku xatemî tu

171. Mewlay bi te dan ji kanê reḥmet
Ṣed muʿcîze û hizar keramet

172. Ey serwerê ʿalem û serê tac
Bû kê dî bijil te bûye mîʿrac

173. Ey ḥeft felek te bûne pabûs[1]
Ey sîdre te deʿwegahê Quddûs

174. Deʿwayê peyẋemberî te ḥeq bû
Lew meh bi îşareta te şeq bû

175. Ey dar û beran selam li gel te
Ey caneweran kelam li gel te

176. Xaliq bi te dan hizar ʿelamet
Nîşanê nibûwwet û keramet

177. Meʿlûm e cenabê pakê Barî
Şanê xû qedîm we kirye carî

178. Peyẋemberî zûr di ber bela ne
Hem warisê wan ku em mela ne

179. Mewlay ji ezel hu kirye sunnet
Xûşî te nîye nexuy tu zeḥmet

180. Ḥetta tu nebî ʿezab û ṛencê
Zeḥmet tu bigehye mal û gencê

181. Ḥetta di cîhan nekêşî zeḥmet
Zeḥmet tu biçî bû nîvê cennet

182. Behrek mezine peyẋemberî lew
Lazim bû dikêşî zeḥmetê ew

183. Herkes ku riḍa Xudê meram e
Ev kavledinê li wî ḥeram e

184. Her çî ku divêt neʿîmê cennet
Dê bigrî rîya resûlê ummet

185. Ṭahir were tu ḥeta ku zû ye
Karek bike ta ʿumir neçûye

186. Hilbigre rîya resûlê serwer
Belkî te jibîrneket di meḥṣer

187. Ey fatihê dergehê biḥeştê
Qurtar e kesê reca te geştê

188. Her çî ji xû bûye peyrewê te
Hişyar û gudar û rehrewê[2] te

189. Destê wî bi sinneta te tund e
Qelbê wî bi ulfeta[3] te bend e

190. Serbest û ʿezîz û serfiraz e
Dilxûş e ebed bi ʿîzz û naz e

---

[1] Pê maçîkirin
[2] Şagirt,mirît
[3] dostanî

191. Her çî ku li mezhebê te der çû
Şeyṭanî li ser bir û li ser çû

192. Mexrûre bûyî bi nefs û şehwet
Melbûke bûyî bi mal û dewlet

193. Dunyayê denî qewî ḥebandî
Ageh ji qîyametê birandî

194. Ḥeywan e bila xudan nîşan ew
Wêran e welew ku avedan ew

195. Miskîn e keçî dîyare zengîn
Serşîn e bila cewan û rengîn

196. Ya Reb tu bi ḥeqqê navê xû key
Gel dûst û bira tu min ʿefûkey

197. Qehra te eger çî zûr e duşwar
Reḥma te belê neḥedd û ejmar

198. Karê me quṣûr û her xeṭa ye
Şeʾnê te Xudê ʿefû ʿeṭa ye

199. Hîvya me tu yî wesîlet Qurʾan
Şermende nekey me rojê mîzan

200. Ṣûşî te eger çî şeṛmizar e
Nê xûşevîyê te hîvîkar e

201. Ger dê tu ʿefû bikey muebbed
Dê dey me bi xaṭira Muḥemmed

## 4. ṢENA-ÛL ALÎ WEL EṢḤABÎ (MEDḤÊN XIZM Û HEVALAN)

202. Ey Ṣaḥibê feḍl û dan û reḥmet
Her bû te ṣena û şukr û minnet

203. Îḥsan tu dikey cezayê îḥsan
Rîḍwan tu didey cezayê îman

204. Her çî ji te ra ji dil gudar e
Ser emrê te ew bi kar û bar e

205. Miḥḍa ji te ra wî kirye karek
Karê wî ji bû dikey mubarek

206. Ṛenc û teʿeb û ʿezab û zeḥmet
Ger bû te ne tu digêrî reḥmet

207. Her kes ji te ra muṭêʿe kar bî
Bê şek ji wî ra dê harîkar bî

208. Her çî ji te ra bi emr û ferman
Bê ḥed dideyê tu feḍl û îḥsan

209. Nê “alê resûl” gelek bi qedr in
Ṣaḥib şeṛef in xudanê ecr in

210. Ew zêde bi qîmet û bi seng in
Lew ew du cîhan bi nav û deng in

211. ʿAlî neseb in xudan şehamet
Meḥûbê Xudê ne piṛṛ keramet

212. “Eṣḥabê Resûl” şirîn xîṣal in
Ṣaḥib huner in xudan kemal in

213. Çen behrewer in çiqe cewan in
Ellah çi qeder di ʿalî şan in

214. Peyẋember e roj ewan sitêr bûn
Her ber wî bû ew ku bû te şêr bûn

215. Wan pişt bi te û ʿemel bi wî bû
Lew ew bi te û ewan qewî bû

216. Ṣaḥib ʿemel in xudan dîyanet
Kardîde[1] ne xiṛṛ di piṛṛ şecaʿet[2]

217. Ew bûn bi şevê bi zîkr û Qurʾan
Rojê bûne şîrweşîn li meydan

218. Ew cumle mubarek û teqî ne
Zêde bi dîyanet û neqî ne

219. Ṣaḥib kerem in emîn û ṣadiq
Qabil bû hemû ṣena û laîq

220. Çen carê Xudê bi neṣṣê tenzîl
Nîşame didet ewan bi tebcîl

221. Ew serserê kafiran di germ in
Bû xuxuyê zûr bi reḥm û nerm in

222. Der zîkr û sucûd ewan diyar in
Ṭalib kerem in ji kirdigarin

223. Gel wê şeṛefa Xudayî dayê
Wan zêde hebû dilê sexayê

[1] Şolzan

[2] Mêrxas, egît, pelewan

224. Teqdîm dikirin li ser xû eẋyar
Çendan ku hebûn feqîr û bêbar

225. Fermuye belê resûlê xêran
Eṣḥabê min in wekî sitêran

226. Her kes bi heçî ji wan bî peyrew
Bê şubhe li ser hîdayetê ew

227. Eṣḥabê min in cenabê Barî
Ser cîn in û beşeṛ ewî bijarî

228. Bes nîne Nebî we daye ferman
Qernê min e çêtirînê qernan

229. Bijlî rusulan û enbîyayan
Ew bûne serûkê ewlîyayan

230. Zînḥar çu neken li wan ʿîtabê
Nabît ku bi wan biden ʿezabê

231. Her çî ku bivên divên li ber min
Her kes ku nevên nevên li ser min

***

232. Heçyê ku li wan biket nexûşî
Bê şek li me ye me pê diêşî

233. Ya Reb tu dizanî wan çi zeḥmet
Kêşaye çi kêşmekêş û ezyet

234. Çen cewr cefa birin li ber te
Çen bigr û bikêş kirin li ser te

235. Ṣed qehr û bela hizar şeṛ û şûr
Ṣed talî û ẋurbet û rihê dûr

236. Wan her ji te ra di bexşî erzan
Mal û ser û ewlad û rûḥ can

237. Wan her çî dikir dikir ji bû te
Ew her çî dimir dimir ji bû te

238. Lew ew du cîhan di serfiraz in
Ew nik te gelek bi ʿîzz û naz in

239. Ew gerçî ḥeta nebûn misilman
Wan qeṭ çu nebûn ne nav û nîşan

240. Ney xeṭ û qelem ne wan riyaset
Ney fennê heḍaret û siyaset

241. Efkarê di wan bi butperistî
Exlaqê di wan di naduristî

242. Nageh wekî hat resûlê enwer
Ew bûne ji wî heval û hemser

243. Exlaqê di wan hemû bedel bûn
Safîdil û ispehî ʿemel bûn

244. Ḥîna ku ewan gehan bi dînî
Ew bûne ewêt ku tu dibînî

245. Nageh tu dibînî bûne îslam
Ew bûne xudan rîyaset û nam

246. Ew gerçî ḥeta duhî di weḥşî
Evroke bûyîn emîrê ceyşî

247. Ew gerçî duhî ne xundewar bûn
Nageh bi ʿilûm û fen diyar bûn

248. Ew bûne serê seʿadeta me
Ew bûn sebebê hîdayeta me

249. Ḥîna ku diçûn ji bû ẋezayê
Wan piṛṛ dibû dil ji şewq û şayê

250. Her qewmê ji bû diçûn bi cenge
Ev ʿerḍe li wan di bûye ṭenge

251. Gava ku diçûn qîtalê Romê
Lerzî digehişt qeralê Romê

252. Fewcek ku diçû şeṛî li wan bes
Nê ta digehişte can Muqewqes

253. Kîsra wekî bû diçûn bi hîmmet
Bê şubhe li wî dibû qiyamet

254. Wan destê bi şîr û dev bi Qurʾan
Çavek ji ʿedil ewê dî îḥsan

255. Alayê bilindê dîn û dewlet
Hilgirtî ewan bi naz û îzzet

256. Sih sal pê neçûn ḥeta ku ew dîn
Pan kir li cîhan bi îzz û temkîn

257. Ya Reb tu bidey ewan bi îḥsan
Ṣed baẋê biḥeşt û ḥûr û wîldan

258. Her wek tu dizanî behrewer key
Ḥetta bi ebed di xêrê wer key

259. Ṣed feyḍ û selam û luṭf û xûşî
Ṣed naz û neʿîm û ʿeyşê noşî

260. Ya Reb tu birêjî ser dilê wan
Dilxûş tu bikey bi cah û rîḍwan

261. Xaşma li ewan li wan bijaran
Zêdey hemîyan li çar ji yaran

262. Ya Reb min û yar û dayûbaban
Hemyan bide xaṭira ṣeḥaban

## 5. EBÛBEKRÎ ṢIDDÎQ (EBÛBEKRÊ SIDÎQ)

263. Ṣiddîqê mezin xelîfê ewwel
Bê şek li hemû ṣeḥabe efḍel

264. Ew piṛṛ kerem e xudan meqam e
Çen mihterem e çi nîkûnam e

265. ʿAlî şeṛef e şeṛîfê zat e
Pakij neseb e şirîn ṣîfat e

266. Ew hel ji dilî ḥeta bi hestî
Piṛṛ nûr û hîdayet û diristî

267. Ṣaḥib huner e bi ʿeql û ra ye
Tedbîrêker e xudan deha ye

268. Meḥbûbê Xudê bilinde şan e
Ṣîrîn xeber e şekirdihan e

269. Fama û zekî xudan dîrayet
Zana bi îdare û siyaset

270. Kardîde û rostem û dilawer
Çen şeṛ wî kirin li gel Peyember

271. Ewṣafê di wî netên jimarê
Ew yarê Muḥemmedî di ẋarê

272. Roja ku Nebî ji Mekke hîcret
Kir ew bû hevalê wî bi xidmet

273. Hem ḥariṣ û mûnisê[1] ṭerîq e
Hem xadim û yawer û refîq e

274. Bûbekrê mezin çi xûş wezîr e
Hem yarê Nebî û hem xezîr e

275. Ḥaḍir bû di emrê wî mubarek
Gel mal û ser û weled bi carek

276. Lewṛa ku dibêt şehê Medîne
Çêtir me li wî ṣeḥabe nîne

277. Peyẋemberî daye wî bîşaret
Bûbekrê me dê biçîte cennet

278. Ehlê kerem û xudan sexa bû
Maqûl û mezin ḥeta ku ma bû

279. Dilnazik û ʿabid û ḥezîn bû
Ew piṛṛ bi qîraet û girîn bû

280. Çen kes vekirîne wî mewalî
Ḥîna wî didîn bi êş û talî

281. Wî ew dikirîn bi malekê zûr
Yek wan Ḥebeşî Bîlalê meşḥûr

282. Aza dikirin li rahê Barî
Reḥmet hemû dem li wî bibarî

283. Axir ku neṣaẋ bû yarê serwer
Ew bûye îmam li cê Peyember

284. Çêtir hemîyan ʿereb dinasîn
Kî pakedil in wekî di qasîn

285. Paşî ku wefa dibû Muḥemmed
Çen qewmê ʿereb dibûne murted

286. Leşker wî hinarte wan bi kujtar
Ḥetta ku bi dîn kirinve îqrar

287. Lew ḥerbê gelek ji qarî Qurʾan
Ḥîna ku şehîd dibûne bê can

288. Qurʾan wî cemʿi dikir ji ewwel
Ev behre ji bû wî bû mukemmel

289. Feḍla wî ne tête hîç ḥîsaban
Ya Reb bideyê hizar s̱ewaban

## 6. ʿUMERU'L-FARÛQ (ʿUMERÊ FARÛQ)

290. Bê mîs̱al e ʿUmer xelîfê s̱anî
Ustaẕê kemal û ḥukimranî

291. Ṣaḥib huner û xudan şehamet
Zêdey bi ʿedalet û keramet

292. Lê piṛṛ kerem û kemal û qedr e

[1] hînbûy

Ehlê ʿemel û ṣefa û ṣebr e

293. ʿAlî şeṛef e bilindê şan e
Maqûl e gelek xudan nîşan e

294. Menṣûrê Xudê û bextiyare
Ṣaḥib eṯer e eṯer diyar e

295. Êke ji dehêt xudanê mizgîn
Ew dê biçine biḥeştê rengîn

296. Ḥetta ku nebû li ehlê îman
Îman nekirin li Mekke îʿlan

297. Çen carê ʿUmer wekî vîyayî
Ayet difiṛêkirin Xudayî

298. Zur nerm e bû yar û dîndaran
Çen tal û şedîd eṯer neyaran

299. Dahî û zekî xudan dîrayet
Zana bi siyasetê bû ẋayet

300. Kardîde û rostem û suwar bû
Lew zêde li nav şeṛan diyar bû

301. Gava ku suwar dibû li meydan
Duşmin xû ji hijmeta wî nedman

302. Ḥîna wî bi destî şîr dikêşa
Cerg û dilê kafiran diêşa

303. Weqtê wekî rim ewî di destî
Ṣed hestî ji duşminan şikestî

304. Çendan tu dibînî zik dirandî
Du hinde dibînî ser firandî

305. Ew zêde bi kar û canfîda bû
Her çî wî dikir ji bû Xuda bû

306. Dem ʿabid e ew demê emîr e
Geh cundî ye geh cîhangîr e

307. Roja ku ʿUmer dibû xelîfe
Pîrûz bî li wî ku ew weẓîfe

308. Wî çust û dirist bi can û hîmmet
Hilgirtî girane barê ummet

309. Roja kemera xîlafetê best
Pişta hemû duşminan xû işkest

310. Rebbê wî ku ew ʿezîz xurt kir
Destê hemû kafiran wî kuṛt kir

311. Pan kir li zemîn ʿedalet û dîn
Serbestî dijîn ḥeta ku ew jîn

312. Bêçare li nik wî zûr qewî bû
Bê ʿeyşî ẋema meʿaşê wî bû

313. Bê şeṛʿî dema ewî didîtin
Hoşa wî li hijmetan diçîtin

314. Wî zêde li werʿi û zêde xeşyet
Hişyarî dikir bi xû li reʿiyet

315. Karê wî ji ser ḥeta dumayî
Ḥerfek ji ʿedaleta Xudayî

316. Hem yare Nebî û hem wezîr e
Ẋemxwar e Nebî û xûş xezîr e

317. Karê wî kirî ji bû me îslam
Ya Reb bideyê xelat û înʿam

318. Ya Reb ʿUmerî tu behrewer key
Tacê kerema xû wî bi ser key

**7. ʿUṮMANU ẒUNNÛREYN (ʿUṮMANÊ XWEDÎ DU NÛR)**

319. ʿUṯmanê mezin xudanê feḍlê
Babê keremê birayê ʿedlê

320. ʿAlî şeṛef e bilind meqam e
Merdê kerem e çi nîkûnam e

321. Ṣaḥib huner e huner diyar e
Zavayê Resûl e hem xû yar e

322. Ew êk e belê ji sabiqînan
Meşhûre di nav mihacirînan

323. Piṛṛ qedr e belê xudan du nûr e
Qedrê wî li nik Nebî çi zûr e

324. Du carê diçû Ḥebeş zemîne
Carek jî bi hîcreta Medîne

325. Mizgîn bi wî da resûlê ummet
ʿUṯmanê me dê biçîte cennet

326. Piṛṛ feḍl e gelek îmamê ʿUṯman
Wî cemʿe kirî dubare Qurʾan

327. Piṛṛ ṣebr û teḥemmul û dîrayet

Ew zêde bi xeşyet û dîyanet

328. Mêrçak û dilawer û cewan bû
Ba şeṛm û ḥeya gelek ʿeyan bû

329. Ṣed feyḍ û hizar neʿîm û îḥsan
Ya Reb tu bidey îmamê ʿUs̱man

**8. ʿELÎYYÛ'L-MURTEẒA (ʿELÎYÊ MURTEẒA)**

330. Piṛṛ feḍl e ʿElî xudan kemal e
ʿAlî şeṛef e mezin xîṣal e

331. Ṣaḥib huner e xudan şecaʿet
Meşhûr e bi zêde werʿi û taʿet

332. Deryayê ʿilûm e ʿalî şan e
Mêrçak e wekî feṣîḥ zuban e

333. Serdarê cewan û şêremêran
Meşhûr e ʿElî ji nêremêran

334. Ew şêrê Xudê dema li meydan
Meydan dibû li kafiran bi zîndan

335. Çen şeṛ bû li gel resûlê serwer
Bedr û Uḥud û Ḥuneyn û Xeyber

336. Kardîde û zîrek û emîn bû
Wî qewl û ʿemel gelek şirîn bû

337. ʿAbid bû serûkê ewlîyayan
Zahid bû emîrê eṣfîyayan

338. Nîvmêr e ʿumir wî ḥeft sal e
Ew bûye bi dîn xudan kemal e

339. Ustaẕ e ʿElî ûʿalî şan e
Ṣaḥib huner e xudan nîşan e

340. Babê Hesen û Huseyn û Muhsin
Her rojê fîdayê wan dibim min

341. Hem yar û beray resûlê enwer
Zava ye û xûş heval û yawer

342. Ṣaḥib kerem e kemalidar e
Ewṣaf̣ê di wî ne tên jimare

343. Bû her sê xelîfeyan wezîr bû
Hem qaḍî û yawer û muşîr bû

344. Ewladêd nêr hebûn çuwarde
Gel hevde kiçan di eṣilzade

345. Bes pênc li kuṛan xudanê nesl in
Ṣaḥib şeṛef in bi feḍl û eṣl in

346. Her du Hesenêt bi nav û nîşan
Neviyêt peyemberê xudan şan

347. Ew zêde li nik resûlê muxtar
Piṛṛ qedr in û xûşevî û dildar

348. Qurbanî ewan û ceddê wan im
Gel Faṭîmeya şirîn û xanim

349. Yê sê ye Muḥemmedê ku meşhûr
Xwarzayê Benî Henîfe ew nûr

350. ʿEbbas û ʿUmer ewîş li wan in
Ewladê di wan tijî cîhan in

351. Her du Hesenan heye li ser wan
Qedr û şeṛef û meqam û nîşan

352. Ewladêd wan wekî dîyar in
Ṣaḥib es̱er in bi kar û bar in

353. Bê ḥed ʿulema di piṛṛ dîrayet
Bê ḥed ṣuleha xudan wîlayet

354. Rabûne ji wan di her zemanan
Bûn nûrê cîhan di her mekanan

355. Her kes ku ewan zurîyeta pak
Maqûl biket û bivên li dil çak

356. Miḥḍa ku ji ber resûlê ummet
Mezin biketin bi qedr û ḥurmet

357. Ser xatrê ewî û Faṭîmayê
Rizgar dibitin ji her belayê

358. Meḥbûb dibitin li nik Peyember
Qurtar dibitin di rojê meḥşer

359. Ya Reb tu dizanî min divên zûr
Ewladê Nebî resûlê piṛṛ nûr

360. Ew nik me gelek xudanê xaṭir
Bû xaṭirê wan ʿefûke Ṭahir

361. Ṣûşî ku ʿElî ẋulamê derge
Ser xatrê ʿElî di xêrê wer ke

362. Babê Hesen û Huseynê serwer

Ew şêrê Xudê îmamê ḥeyder

363. Wan ez ji xedem ḍeʿîf û peyrem
Tu bû bikey bi deste gêrem

## 9. ÎFADETU’L-MERAMÎ (GOTINA ARMANCÊ)

364. Ya Reb tu ʿElîmî tu dizanî
Mêje keserek ku min di canî

365. Fikrek mi heye eger çî dûr e
Emma tu dizanî baẋê nûr e

366. Ew gerçî bi talî ye û bi zeḥmet
Miḥtac e bi hîmmet û feraẋet

367. Seẋbêrî divêtin û dilê xûş
Keyf û fereḥ û çelengî û huş

368. Esbab me hebin dirist û taze
Da bêt bi serêkve ev nîyaze

369. Her çen vî demî me ew di kêm in
Emma ji te her meded divê min

370. Gerçî me li nik xeyalê dûr e
Lakin çemen û Rîyaḍê Nûr e

371. Serhatîyê wî Resûlê muxtar
Hem nûr û çira ye hem xû gulzar

372. Zur taze ye ew gelek leṭîf e
Xûş name ye lê ji dil neẓîf e

373. Ev mêrg e lewa hû ẋemrevîn e
Serhatîyê wî resûlê dîn e

374. Ey yar tu eger bihêy bixwînî
Dê ẕewq û ṣefa di dil bibînî

375. Lew beḥṡê peyemberê zemanî
Ronayê dil û ṣefayê canî

376. Şîrîn e rîyaḍ bilan dirêj e
Car care ji can û dil bibêje

### Ehemmîyetu Neẓmî’l-Kîtab (Giringiya Vehandina Kîtabê)

377. Lazim tu bizanî ey birader
Tarîxî ḥeyatê yarê serwer

378. Peyẋember û daʿîyê vî dînî
Hindek ji ḥeyatê wî vexwînî

379. Ewṣafê di wî ji pê ḥeta ser
Exlaqê di wî heman seraser

380. Şexṣê wî bi cumleyê ṣîfatan
Karêt wî ʿecîbe muʿcîzatan

381. Ḥalê wî ji bûnê ta wefatê
Jîna wî ḥeta di vê ḥeyatê

382. Ew ku bû ḥeta biçûk û mindal
Karê wî çi bû ḥeta ku çil sal

383. Roja ku Xudayî kir peyember
Ser dînî ewî çi hate ser ser

384. Ḥalê wî çibû digel hevalan
Jîna wî li Mekke ṡêzde salan

385. Şeʾnê wî çi bû li dest neyaran
Êk êk tu bibîne wan nekaran

386. Çen mudde li destê wan diêşa
Çen ṣebr û bêhn ewî dikêşa

387. Ew cewr û cefa û pîsekarî
Ew ḍerb û civîn û qehr û larî

388. Eḥwalê di wan heval û hemser
Sê car ku li Mekkeyê kirin der

389. Xaṣma li ewan feqîr û jaran
Ḍerba ku li wan dikir neyaran

390. Emṡalê di Yasîr û Bîlalî
Çen dîne ji wan cefa û talî

391. Ew paşî li Mekke ku bû qurtar
Ḥalê wî çi bû dema di nêv xar

392. Damezrî dema li nêv Medîne
Seyrêke tu karê wî bibîne

393. Karê wî bibîn li wê di deh sal
Dunya ku li kafiran dikir tal

394. Çen şeṛ wî kirin bi canfîdayî
Ser dîn û şeṛîʿetê Xudayî

395. Ev dîne ewî xudan ẋeleb kir
Ku panî cezîreyê ʿereb kir

396. Ḥalê wî çi bû ji dunyedarî

Karê wî çi bû di ḥukimranî

397. Şeʾnê wî çi bû ku destê kuṛt e
Karê wî çewa ne ew ku xurt e

398. Karê çi bû digel hevalan
Ḥalê wî di nêv ʿeyal û malan

399. Zuhda wî bibîn û taʿetê wî
Cehda wî binêr ʿîbadetê wî

400. Seyrêke temamî sunneta wî
Ḥetta tu bizanî qîmeta wî

401. Ḥetta tu bizanî ey birader
Qedrê vî Muḥemmedê peyember

402. Ser ta bi qedem wî ʿumr û jîne
Xir ders û delîlê jîn û dîn e

403. Beḥs̱ê wî divêt cewan bixwînî
Belkî ji xû ʿîbretek bibînî

404. Hişyarê bibîn li xew bê mestî
Em taze li dû biçîn diristî

405. Ellah nê dibê peyemberê min
Xûş ṛehber e ew ji bû derê min

406. Her kes bigirît rîya wî taze
Dê bidî biḥeştê serfiraze

407. Hem lazim e ger bi hûş û can în
Tarîxê xelîfeyan bizanîn

408. Hindek ji ḥeyatê çwar xelîfan
Ṣaḥib huneran ji dil şeṛîfan

409. Bûbekirê mezin xelîfê ewwel
Çêtir ji ṣeḥabeyan û efḍel

410. Şehbazê ʿUmer xelîfê s̱anî
Ustaẕê kemal û ḥukimranî

411. Ṣaḥib keremê îmamê ʿUs̱man
Zavayê ducar resûlê muxtar

412. Ew şêrê Xudê ʿElîyê Ḥeyder
Deryayê ʿilim û kanê gewher

413. Ew paşî resûlê pakesunnet
Êk êke bûyîn çirayê ummet

414. Her êkî çi kir bi ḥukimdarî
Xidmet ku dikir bû dînê Barî

415. Ev dîne çewa xudanê nav kir
Ta şeṛq û ẋerb ewan belav kir

416. El qisse eger Xudê me yare
Dê bînî hizar qisan bijare

**Sebebû Neẕmî'l-Kîtabî bîl Lûxetî'l-Kurdiyye (Sedema Vehandina Kîtabê bi Zimanê Kurdî)**

417. Mewzûn tu dibînî zûr ji name
Çîrok û ʿilûm û şahiname

418. Min fikr e bira ku ez bibêjim
Daẋa li dilê xû ez bi rêjim

419. Ez neẕim bikem cewan û ṣaẋlem
Tarîxê ḥeyatê şahê ʿalem

420. Jîn û es̱era wî dê vexwînim
Dê taze bi şiʿr û çak vehînim

421. Beḥs̱ê wî diken bi her zubanan
Medḥa wî diken li her mekanan

422. Emma me ḥeta nihû nedîne
Jîna wî bi kuṛdîya şirîne

423. Ey dil kesera te ya li mêje
Wer wek te divê bi kuṛdî bêje

424. Mewzûnê kelam gelek şirîn e
Hem dilveker e û ẋemrevîn e

425. Zêde ku cewan û rêk û çak bî
Xaṣma es̱era resûlê pak bî

426. Ya Reb tu bidey ji kenzê îḥsan
Ronahî bi dil beyanê ezman

427. Ezmanî ji min bikey guher senc
Da bînime derê li dil hizar genc

428. Ya Reb me tu hadî û delîl î
Ya Reb me tu yî me tu wekîl î

429. Ṣaḥib meded î tu dilnewaz î
Tu dadires î tu karisazî

430. Min neqdê beyan eger quṣûr e
Emma me emel bi tu çi zûr e

431. Xaşma tu dizanî ḥalê bende
Êş û elema dilê me çend e

432. Çen sale dizanî ez neṣaẋ im
Zêdey ku ji ẓaliman bi daẋ im

433. Gel hinde ẋem û nexuşekaran
Dîtin me ji wan xebîs̱ neyaran

434. Dîtin me ji wan gelek nexûşî
Lew ṭeng e dil û ḥezîn e Ṣûşî

435. Ney xaşme li vî zemanê bedreng
ʿÎlmê me çi bê rewac û bê seng

436. Qurʾan û ʿilûm û dînê îslam
Bê qedr e li nik vî qewmê bednam

437. Ev şeṛʿ û ʿilûmê çak û taze
Bê qedr û rewac û ʿîzz û naze

438. Ew ḥamilê şeṛʿ û dînê Qurʾan
Nik xelkî nehîn evîne alan

439. Ger waʿiz e ger xeṭîbê dîn e
Evro çi qedir di qewmî nîne

440. Ger medrese ye çi xaneqah e
Ger mizgetê pak û secdegah e

441. Eẋleb tu dibînî ew di çûl in
Bê reẋbet û qîmet û melûl in

442. Ney maye melan çi nav û nîşan
Eks̱er di muşewweş û perîşan

443. Ney naze ne fexr û mal û ḥal e
Ney kes ji metaʿê wan sual e

444. Ney qedrê heca di nêv ʿeşîran
Ney ḥurmet e nik reys û mîran

445. Ney pirs e hikumetê ji wan e
Ney yarî ye milletê nezan e

446. Ṣed ḥeyf e bû ʿîlmê dînê îslam
Ev renge çi bê rewac û bê nam

447. Meʿlûm e li nik heman diyar e
Ger qedir nema çi ʿîlm û kare

448. Ṣolker dê li ser bibîte sust e
Elbet dibê kêm û nadurist e

449. Min hîvî ye lew ji tazeyaran
Ew lewmê ji min neken çu caran

450. Nê ḥal eve ye wekî dîyare
Lew dil me li ser kitêbê ṣar e

451. Emma me ji zêde şewqê canî
Ev çend e me got bi ser zubanî

452. Gel hinde ẋem û nexûş û bedkar
Ev çend e me got li gel dilê ṣar

453. Ya Reb tu bidey me keyf û şaye
Rizgar me bikey ji her belaye

454. Da ez li dilî çi sur derînim
Da ez bi zuban çi dur vehwînim

455. Ey dil were tu wekî şevê dî
Bû seyrê çemen bi hêdî hêdî

456. Çîmen çi bi lez̲z̲et û şirîn in
Çîmen ku qewî di ẋemrevîn in

457. Çîmen di cewan û piṛṛ ṣefa ne
Seyrangehê ṣinʿetê Xuda ne

458. Ew baẋê duhî te dîtî şîrîn
Gavek bi temaşe lê bi seyrîn

459. Baqek ji gul û ḥelal û sunbul
Destek semen û rihan û ṣorgul

460. Bibijêre li mêrg û baẋ û bustan
Pêşkêş bike bû heval û dûstan

461. Ew baẋe keçî berîne ẋayet
Bû xû biçine qeder te ṭaqet

462. Ew baẋe çî ye hu piṛṛ xirûş e
Ev hinde ku dilguşad û xûş e

463. Tarîxê resûlê xiṛṛ cîhan e
Ronayê dil û jiyanê can e

**Beʿdu Meşadîrî'l-Kîtab (Çend Jêderên Kitêbê)**

464. Ṭahir were tu bi keyf û xûşî
Gel z̲ewq û ṣefa û seʿy û kûşî

465. Seyrêke hinek ḥedîs tefsîr
Tarîxê dirist bi rêz û teqdîr

466. Beyḍawî û Kamil û Buxarî
Reḥmet li xudanê wan bibarî

467. Deh pazde kîtab wekî me lazim
Her dem percedê ji wan dixwazim

468. Her çî ku ewan cewan nivîsî
Wer bû me neẓim bikey bi lwîsî

469. Behdînî bi lehce û bi kuṛdî
Çî ṣafebêhn î bihêle durdî[1]

470. Ya Reb tu bidey me xûş zubanî
Ronayê dil û ṣefayê canî

471. Nazik bi dilê me key sekîne
Piṛṛ sîng û dilê me key yeqîne

472. Ya Reb tu bidey me ʿewn[2] û tewfîq[3]
Nîşa me bidey s̱ewab û teḥqîq[4]

473. Min fikr û xeyal gelek belav in
Dil besteyê ṣed nekam û dav in

474. Harî me bikey digel s̱ewabê
Ḥetta ku temam bikem kîtabê

475. Ger yar bî Xudê û ez bimînim
Dê rişte Rîyaḍê Nûr vehwînim

**Tarixu'l-Îbtîdaî bî Neẓmî'l-Kîtabî we Mîzanu Neẓmîhî (Dîroka Destpêkirina Nezma vê Kitêbê û Kêşana Nezma Wê)**

476. Gava me serê kîtabê danî
Mahê remeḍan bû xûş li canî

477. Ḥeftê û şeş û hizar û sêṣed
Bû hîcretê yarê mey Muḥemmed

478. Wezna wê bi lez̠z̠et û şirîn e
Nêv ʿîlmê ʿerûzê nav çu nîne

479. Lewṛa bi xusûsê her zubanek
Her şiʿrekê bû heyîn nîşanek

480. Ey dûsto eger te arezû ye
Neẓma vê şirîn kitêbê ku ye

481. Weznek ji wê ra me got bi dilxwaz
Hem rêk û rewan e neẓm û awaz

482. Feʿlun feʿelun feʿel feʿul in
Ev çware Rîyaḍê Nûr uṣûl in

**El Îʿtîzazu îlel Quraî'l-Exyar (Lêborîn ji Xwendevanên Hêja)**

483. Ey naẓirê vê rîsaleya nû
Ṣed carê selam dikem li ser tu

484. Min hîvî ye tu bi luṭf û xûşî
Da seyrê bikey Rîyaḍê Şûşî

485. Ez her çî bibêm li her meʿanî
Bê şik me li meṣderek deranî

486. Her çî ku te dî durist li wan e
Wer xwarê te dî ji min bizane

487. Meʿna çû leş e lefiẓ lîbas e
Tu ji ẋeyrî lîbas ji min nenase

488. Ev berge eger te dît nehatî
Ez taze xû fêr dikem xeyatî

489. Meʿlûm e divêt bi qed meʿanî
Gûtin bi çeq in ji dil cewanî

490. Emma me ji vê ziyade nîne
Luṭfa ji me ra ʿefû vexwîne

491. Ev kare me zêde ye li ṭewqê
Emma çi bikem li zêde şewqê

492. Çen mêje ye min meram û marem
Neẓma es̱era resûlê ʿalem

493. Ger ṛastê te dî tu çak vexwîne
Wer xwarê te dî tu ʿuzrê bîne

494. Ger dê te divê riḍayê Barî
Zînhar venekey zuban bi xwarî

495. Çen taze ye nermî û diristî
Nej reng e ẋurûr û xudperistî

496. Rengîn e li nik me ʿeybepûşî
Ne şirîn e çi kîbr û ḥeqfirûşî

497. Hişyar bî bira nekey ẋurûrê
Înṣaf e derê kemal û nûrê

---

[1] Wekî dur
[2] harîkarî
[3] bextîyar
[4] Ezmûn, îmtîhan

498. Zînhar tu çi ca nekey tekebbûr
Axir dê ji wê bikey teḥessûr

499. Nek carê bikey tu deqşikênî
Bê şek dê nedametê bibînî

500. Xaşma tu bira ji ehlê ʿîlmî
Lazim tu gelek bi ṣebr û ḥîlmî

501. Karê te tewaḍuʿ û weqar e
Navê te bi çakî payedar e

502. Nê ʿaqîbeta me dê bî xake
Her nûke bibîne xak we çake

503. Min hîvî ye ey bira û yaran
Hun bîrveneken me car bi caran

504. Ez mayê tinê sikût di qebrî
Paşmayê me ye ve çengê ḥubrî

505. Çengek me ḥubir di nav qelem kir
Şîrîn me Rîyaḍê Nûr reqem kir

506. Min hîvî ji we û Rîyaḍê Nûrê
Car car bi duʿa me bînine bîrê

507. Belkî bi sebeb duʿayê çakan
Ḥeşra me biket Xudê li pakan

508. Napak û gelekî gunahkar im
Roreş ji Xudê û şeṛmizar im

509. Ya Reb tu dizanî yarê serwer
Her ew me şefîʿ e rojê meḥşer

510. Rebbî çi ḥerf di vê kitêbê
Bû min bike deftera ḥisêbê

511. Yekser bike şafiʿ û recadar
Bû ʿebdê xû Ṭahirê gunehkar

512. Hêşta me negot ji vî peyember
Ez çake hinek bibêm serûber

513. Paşmayê evî çirayê ʿalem
Hem ṛehber û rehnemayê ʿalem

514. Yek du jê beyan bikem nimûne
Ey dûst tu were bi dil bixûne

515. Qurʾan ku Xudê ji bû hinarî
Ku bûye çirayê kufr û ṭarî

516. Ew dînê Xudê ku dînê îslam
Ev çen beşeṛe kirin xudan nam

517. Pîçek jê bibêm ḥeta bizanî
Qedrê vî peyemberê zemanî

518. Ḥetta tu bizanî ew çi reng e
Ew çendî bi qîmet û bi seng e

519. Ḥetta tu bibînî dînê îslam
Çen taze ye ew di ḥukm û eḥkam

520. Çen pakij e ew çi qed bilind e
Çen ṛast û dirist e çen pesind e

521. Her ew beşeṛê ḥeta ku maye
Qanûn û şeṛîʿetê Xuda ye

522. Her qewmê ʿemel bi şeṛʿ û Qurʾan
Serbestî dijîn bi xûşîya can

523. Her çî li rîya vî dînî çu der
Dê her du cîhan bibît nixwun ser

**10. EL QURʾANU'l- MECÎD (QURANA BILIND Û PÎROZ)**

524. Roja ku Xudê îrade ṣadir[1]
Bû da bidetin resûlê axir

525. Dunya bû tejî ḍelal û ṭuxyan
Ev ʿerḍe pirî fesad û ʿîṣyan

526. Layek şeṛ û şor û xwûn rijandin
Talan û sitandin û revandin

527. Layê bi fucûr û fîsq û mestî
Layê bi ḍelal û butperistî

528. Însan ketibû binê nuwalê
Bê bar ji seʿadet û kemalê

529. Xaliq bi beşeṛ dikir ʿînayet
Eḥmed wî hinart bi şeṛʿ û ayet

530. Wî daye bi wî çi taze menşûr
Ew ta bi ebed diyar û meşhûr

[1] Aşkera bûn.

531. Wî bû wî hinart ji xû ve ferman
Da guh bigirin ji bû xû însan

532. Bû cumle beşeṛ wî kirye ustad
Da bênte derê li kufr û îlḥad

533. Nê ew xû resûlê axirîn e
Hem xatemê enbîya û dîn e

534. Elbet dibitin kîtabê axir
Xatem bû hemû kîtab û nadir

535. Qurʾan e eger tu hûr dibînî
Tacê serê vê kuṛey zemînî

536. Qurʾan e belê çirayê ʿalem
Ustaẕ e û rehnimayê ʿalem

537. Barî ku hinarî taze Qurʾan
Nek bû ṭebeqek li newʿê însan

538. Belkî bû hemû ziman û mîllet
Bû cumle beşeṛ ḥeta qiyamet

539. Çendî ku zeman bibîte pîre
Ew her hu ciḥêl û dilpezîr[1] e

**ʿEẓametu'l- Qurʾan (Mezinatiya Quranê)**

540. Qurʾan e Xudê nîẓam û dûstûr
Bû jînê beşeṛ bi kam û mesrûr

541. Qanunê Xuda ye bû hîdayet
Menşûrê wî ye ji bû seʿadet

542. Mîzanê ʿedalet û kemal e
Mîqiyasê sîyadet û celal e

543. Şamil bi hemû beyan û teşrîʿ
Camiʿ bi hemû cemal û terfîʿ

544. Peyẋemberî zûr bûyîn ʿelamet
Nîşanê nubûwet û rîsalet

545. Qurʾan wî bes e delîl di destî
Nîşanê nubûwetê diristî

546. Ew muʿcîzeka gelek ʿeẓîm e
Bê mîs̱l e kîtabeka kerîm e

547. Axir û ṛast e zuban feṣîḥ e
Bê ʿeyb û qusûr e zûr ṣeḥîḥ e

548. Îʿcaz û belaẋet û berînî
Îcaz û nezaket û şirînî

549. Îʿcab û leṭafet û cewanî
Şîrînxeberî siḥirbeyanî

550. Ger ḥukm û nîẓam e wer şeṛîʿet
Ger rahê sulûk e wer ṭerîqet

551. Ger dîn te divêt û karisazî
Dunya te divêt bi serfirazî

552. Qurʾanê bike delîl û ṛehber
Xûş murşîd e ger te ṣaf e bawer

553. Qurʾan e tijî ʿulûm û ʿîrfan
Qurʾan e pirî ji nûr û îman

554. Darêtîye ew bi sikkeyê ẋeyb
Rengîn e bi neqşê taze lareyb

555. Ew merceʿê jorî ye ji dînî
Ev dîne ebed bi wê dimînî

556. Her çî ḥîkem û kemal û eḥkam
Her çî qîṣeṣ û ʿilûmê îslam

557. Çendî ji ʿîbadet û ʿeqîdet
Exlaqê di taze û ḥemîdet

558. Ger xêr û şeṛ û dirist û xwarî
Wer çak û xirab û nûr û ṭarî

559. Her çî ku ḥeram e wer ḥelal e
Ger rahê nuzûl e ger kemal e

560. Ew cumle Xudê bi neṣṣê tenzîl
Xir bû me beyan kirin bi tefṣîl

561. Ezmanê ʿereb ḥeta ku maye
Ser xatrê ewî giranbuha ye

562. Ezmanê ʿereb ku xûş zuban e
Serdarê zubanê xir cîhan e

563. Ew zêde ku camiʿ û berîn e
Piṛṛ qaʿîde ye gelek şirîn e

[1]Anku dilan bal xwe ve dikêşe

564. Ev hinde bi lez̲z̲et û bi ṭam e
Ev çende bi şuhret û bi nam e

565. Ezmanê ʿereb bi vê feṣahet
Ger ṣerf û neḥw û ne ger belaẋet

566. Gel çendî ʿilûmê bûyne tedwîn
Qurʾan e ji wan dibêjî teḥsîn

567. ʿEksê didetê cemalê Qurʾan
Şewqê didetê şemalê Qurʾan

**Weṭenu'l- Qurʾan (Welatê Quranê)**

568. Qurʾan e eger te hûr e menẓer[1]
Disturê hemû cîhanê yekser

569. Ew hat ji Ḥîcazê wê ʿecel kir
Wê çust û durust zemîn bedel kir

570. Ya Reb ve çi qudretek ʿecîb e
Ellah ve çi ḥîkmetek ẋerîb e

571. Êxiste kuṛeyî zemîn nîẓamek
Neyhêjtîbû kes nîşan û namek

572. Têkdan wê tixûbê her memalik
Wê ʿezil kirin mulûk û malik

573. Dana bi nîẓamê ʿîlm û ḥîkmet
Wê taze esasê dîn û dewlet

574. Wê taze xerîte da zemînê
Hel Endelusê ḥeta ku Çînê

575. Qefqasê ḥeta bi Zencebarê
Îslam li vî cê biken qerarê

576. Ev xûş weṭen e bû ehlê îslam
Serbestî bijîn bi naz û îkram

577. Ya Reb tu bi ḥeqqê şanê Qurʾan
Serkêle bikey tu ehlê îman

**El Qurʾanu wel Funûn (Quran û Zanîn)**

578. Qurʾan e ku rişt diket dema dem
Însanî li ser funûnê ʿalem

579. Nîşame didet delaîlê jîn
Jêrî ʿelemê mubarekê dîn

580. Nîşame didet li vê wicûdê
Esbabê tereqîy û suʿûdê

581. Madem ku cîhan e darê esbab
Pêdvîye ji bû me karê esbab

582. Çen carê dibêt Xudayê ekber
Ger ʿerḍ û sema me kir musexxer

583. Bû hingo me dane ew tebayî
Ba her çî li nav ewan me dayî

584. Madem we ye ey cemîʿê Îslam
Ḥeyf e ku bibîn ḍeʿîf û bê nam

585. Baş nîne xû dûr bikeyn li wêrê
Her çî ku Xudayî day li xêrê

586. Bê bar xû nekeyn ji her çî baş e
Ger ʿîlm e çi ṣinʿet û meʿaş e

587. Nê ferḍ e li me ku em musilman
Her ṣinʿet û ʿîlmekî û ezman

588. Her şulek û fenneka bi kar e
Em kesbe bikeyn bi mal û pare

589. Ta ṭulê zeman bijîn bi serbest
Da kuṛte bikeyn li duşminan dest

590. Serkêlê bijîn bi naz û ʿîzzet
Hem dîn e û xûş ḥeyat û dewlet

591. Nê ta ku nebeyn ʿezab û ṛencê
Ma qeṭ digehîn kemal û gencê

**El-Qurʾanu we Esbabu't Tereqqî (Quran û Sedemên Pêşketinê)**

592. Meʿlûm e li nik heman dîyar e
Asasê ḥeyatê seʿiy û kar e

593. Nagehte murad û nav û nîşan
Her çî neker û nezan bi pîşan

594. Her qewmê ji xû ve bûye hişyar
Karek ji xû ra kirî şirînkar

595. Serbestî jîye bi naz û taze

[1] Nêrîn,

Dunya wî dirist û serfiraz e

596. Meʿlûm e li nik heman yeqîn e
Quwwet sebebê necat û jîn e

597. Qurʾan e diket me emr û ferman
Bû cumle me ehlê dîn û îman

598. Hişyarî xû bin li duşminê dîn
Ḥaḍir xû biken bû cengê her ḥîn

599. Hun kesib biken sîlaḥ û quwwet
Çendî ku ji we şiyan û ṭaqet

600. Esbabê şeṛî çi yê bikare
Ger engo biken eger bi pare

601. Ceyşek we divêt cewan û mêrîn
Emma bi çek û ʿîbadet û dîn

602. Ser dîn û weṭen di canfîda bin
Ta çendî bijîn ʿezîz û şa bin

603. Rumbazîy û quşme û suwarî
Segvanîy û karê nêzekarî

604. Fêrbûnî evî sîlaḥê taze
Nê ferḍ e li ser me wek nemaz e

605. Ṭeyyare û bûmbe û peṛaşut
Pêdivî ne me wek ẕexîre û qût

606. Reşşaş û tivenk û ṭop û dûrbîn
Nê cumle fer in çu gaz û benzîn

607. Rummane û şîr û rumḥ û sîkar
Laslikî û berq û tank û radar

608. Seyyare eger qîṭar û papor
Ta her çî bi kar e bû şeṛ û şor

609. Cumle me divên evî zemanî
Bêy wan nê meḥale zindiganî

610. Ceyşek bi çek û quwwet û nav
Îslamê divê hebî di her gav

611. Serşor û ẕelîl û nale nal e
Her çî ne çek û sîlaḥ û mal e

612. Ya Reb tu min û ẋulamê Qurʾan
Seydayê mezin melayê kuṛdan

613. Seydayê heman Seʿîdê meşhûr
Ustaẕê me cumle Ṭalibê Nûr

614. Hemyan me bikey fîdayê tenzîl
Aza me bikey bi sayê tenzîl

615. Çil salî me ew pitir li heştê
Ya Reb me heman bibey biḥeştê

616. Vêkra tu min û ewan ʿefû key
Dilxûş bi lîqayê ẕatê xû key

617. Hîvî me li te Xudayê ʿalem
Îslamê bikey çirayê ʿalem

618. Ya Reb tu bidey me huşiyarî
Îxlas û tifaq û harîkarî

619. Îslamê bikey heman tu yek dil
Dilxûşî bijîn bi dînê kamil

620. Her wek li me pêş bi naz û şanî
Xûşîy û jiyan û ḥukimranî

621. Ya Reb tu bikey bibînî Ṭahir
Îslam bîye êk bi can û xaṭir

622. Jêrî ʿelemê bilindê Qurʾan
Hem dîn e û hem jiyan û îman

**ʿÎrab-el Qurʾan[1] (Serûjêrkirina Quranê)**

623. Qurʾan ku Xudê hinar li bû me
Peyẋemberî kir diyar ji bû me

624. Her ayeteka dihate xwarê
Wî taze bû wan digûtî carê

625. Dabêjîte katibê xû paşî
Binvîse bi tazehîy û başî

626. Ew da nivîsin li her çî îmkan
Kevlok û ber û şikilk û belgan

[1] Beşên "Serûjêrkirina Qurʾanê" û "Nuqutkirina Qurʾanê" di nav destxetê da bi xwe nîne. Li gorî agahîyên kuṛê Şêx Tahir, Hemzeyê Şuşî ev her du beşe li ser çend rûpelên cuda yên hatîne nivîsîn û Şêx Tahirî yê dîyarkirî ka dê li kîj dera destxetê hête cih kirin.

627. Meʿlûm e ku xet li wî zemanî
Bijlî xetê kûfî wan nezanî

628. Bê nuqte û bê serûber û jêr
Hebûn bi xet û vexwîndinê fêr

629. Wan ferq dikir bi cê û şwînan
Beynê ber û jêr û sîn û şînan

630. Ḥetta çil û hinde sale bûran
Paş mushefê wî îmamê ʿUs̱man

***

631. Axir perebûn li ʿerḍê îslam
Têkel ʿereb û ʿecem bûyîn ʿam

632. Ezmanê ʿereb xusûsî Qurʾan
Tirsan bigehîtê ʿeyb û nuqṣan

633. Fikrîne gelek li ehlê rayê
Em çarekê lê bikeyn berayê

634. Hêşta ku sere ḍerer divêtin
Zu derg e li wê ku bête girtin

635. Ṣed kar hene eger jinû ve
Tedbîrê ji wan dibît ji xû ve

636. Çen rojê eger bikey tu texîr
Êdî li te dûr dibît tedbîr

637. Ta bû te heye mecal û furṣet
Texîrê neke da nexwuy nedamet

***

638. Bûlesudê tabiʿîy û fasil
Hem ʿalim û mutteqîy û kamil

639. Çendek ji qewaʿidêt di neḥwî
Bû manê zuban dirist kirin wî

640. ʿEbdilmelîkê wî bab e Merwan
Pismamê ewî îmamê ʿUs̱man

641. Yek walî ewî hebû li Besra
Bû kar û umûr û ḥukm û îcra

642. Meşhûr e Ziyad kuṛê Sumeyye
Çen car wî bi dîqqet û rewîye

643. Wî gûte wî ʿalimê xudan şan
Lazim serûber bikey tu Qurʾan

644. Îqnaʿi nebû mela ji ewwel
Ḥetta ku bi ḥîlekê bû dest ḥel

645. Dana di rîya wî da zelamek
Qurʾanê bixwînîtin temamek

646. Qurʾanê xelet biket bi qestî
Belkî ku mela ji dil helistî

647. Gava ku bihîst we renge Qurʾan
Çu gûte Ziyad xudanê ferman

648. Katib me divê yekek bi dîqqet
Zana bi vexwundin û kîtabet

649. Wî sîh ji wî ra ji dil hinarî
Wî yek ji xû ra li wan bijarî

650. Qurʾan li serî ḥeta dumayê
Îʿrabê kirin bi fehm û rayê

651. Wan nuqte kirin ji xû ve nîşan
Ḥubrek ne ji rengê ḥubrê Qurʾan

652. Karek bû ewan kirî cewanî
Ew ma bi dirêjîya zemanî

653. Ev kare ewan ku kir bi îḥsan
Da ṛast û durist vexwînî Qurʾan

654. Ya Reb tu min û ewan ʿefû key
Bû xatrê evî kelamê xû key

**Îʿcamu'l-Qurʾan (Nuqitkirina Quranê)**

655. ʿEbdulmelîkî hebû ye walî
Ḥeccacê bi heybet û bi talî

656. Wî gûte du kes ji ʿalimê weqt
Hem ehlê selaḥ û başîy û bext

657. Neṣrê kuṛê ʿAsimê xeberdur
Yeḥyayê di bêjnê Îbnû Yeʿmur

658. Ew her du bi tazehî û çustî[1]
Wan ḥerf nuqte kirin duristî

659. Wan nuqte ji rengê ḥerfê danan
Da feriq bibît li karê pêş wan

660. Bûlesewedê wan mela û ustad

[1] Bi zîrekî, bi lez û bez.

Îʿrab wî dema kiribû îcad

661. Wî ḥerf bi ṛeş bi ṣurê îʿrab
Danabû ewî bi rêz û adab

662. Van ḥerf bi nuqte ve ku ṛeş kir
Îʿrab bi rengê ṣurî geş kir

663. Ḥeccacî li paş emir beder kir
Xurtî ku li reʿiyetê xeber kir

664. Her kes binivîsîtin wekî nu
Ew nuqte biken kîtabeta xu

665. Ḥeccacî bese mesel li şîddet
Hem xurtî û dilreqî li millet

666. ʿEbdulmelîkî dema ku zanî
Ev kare bi başî û cewanî

667. Wî zûr bi dilîbû dabû ferman
Ev emre me dabû xir musilman

668. Her kes binivîsîtin li nû paş
Ḥerfan bi temamî nuqteken baş

669. Çen taze ye karê Neṣr û Yeḥyay
Ev xette wesa dibît ḥeta may

670. Ev kare ewan kirî bi îḥsan
Da ṛast û durist vexwunî Qurʾan

671. Ew çûn û li wan bû paşvemayî
Ev xêre ḥeta cîhan dumayî

672. Ger dê te divê ebed bimînî
Navê te xelik bi taze bînî

673. Xellaq û xelik te baş bibînin
Her dem ji te ra duʿan bixwînin

674. Karek tu bike ji dil bû ummet
Bû xêr û jiyanê dîn û dewlet

675. Bû dîn û weṭen bikey tu karek
Ellah ji te ra diket mubarek

676. Karek te heye hituve[1] taze
Tu biste ji wî kerem bixwaze

677. Her kes ʿemelek kirî ji xû çak
Ew ṣaẋ e welew biçîte nêv xak

678. ʿUmrê me bira bi pûçî bûrî
Karek me nekir bû layê jûrî

679. Karek me nekir bi kar bibîtin
Ew bû me bi harîkar bibîtin

680. ʿUmrê me nihu gehişte çil sal
Karek me nekir cewan ji ʿemal

681. Ya Reb me nîye di ḥeşr û mîzan
Ẋeyrî te û hîvîya me Qurʾan

### 11. DÎNULLAHÎ’L- ÎSLAM (DÎNÊ XWEDÊ ÎSLAM)

682. Ṣed şukir ji bû Xudayê ekber
Her medḥ û ṯena ji bû wî yekser

683. Bê ḥed bi me dan wî naz û nîʿmet
Anîne bi ser rîya seʿadet

684. Peyẋemberekê kerîm û mursel
Ba wî ve kîtabeka mukemmel

685. Qurʾan wî ji bû hinart û sunnet
Ew bû me bû rehnumayê[2] cennet

686. Îslama Xudê nîẓam û distur
Qurʾana Xudê beyan û menşur

687. Peyẋemberê wî wekîlê dîn e
Hem qaṣid û ṣadiq û emîn e

688. Nê dînê Xudê ye dînê îslam
Ẋeyrî wî hemû beṭal û bê ṭam

689. Ey serwerê cumle wuldê adem
Wey nûr û çirayê cumle ʿalem

690. Ey kan û xizîneya edeb tuy
Fexrê ʿecem û hemû ʿereb tuy

691. Tu qaṣidê cumle îns û can î
Peyẋemberê axirê zeman î

692. Gava ku geha kemalê însan
Ellah tu kirî resûl ji bû wan

693. Ḥîna ku cîhan tejî ji ẓilmet

[1] Hosa, wiha

[2] Rêber

Barî tu kirî çirayê ummet

694. Dunya ku tijî ji kufr û ṭuxyan
Xaliq tu kirî delîlê îman

695. Her kes bigirî ji dil vî dînî
Bê şek du cîhan dê xêr bibînî

696. Her çî bigirî rîya şeṛîʿet
Meʿlûm digehît serê ḥeqîqet

697. Vî dînî eger tu hur dibînî
Xûşî û sirûr û nûr dibînî

698. Ava ye li ser esasê ʿedlê
Ala ye ji bû kemal û feḍlê

699. Destek wê ḥeq e û yek ḥeqîqet
Çavek wê ʿîlim û yek şeṛîʿet

700. Ev dînê Xudê ʿeceb nîẓam e
Bû cumle kuṛey zemîn temam e

701. Qanûn e ji bû beşeṛ bi carek
Da ew du cîhan bibin mubarek

702. Ev dîn û şeṛîʿetê te zanî
Asasê jiyan û ḥukimranî

703. Pakî û bilindi yî ʿeqîdet
Exlaqê di taze û ḥemîdet

704. Te hîzbî dil û ṣefayê can î
Te ne perwerî û şirîn jiyan î

705. Dunya te divêt bi naz û ʿîzzet
ʿUmrek ebedî di baẋê cennet

706. Ev dîne ji bû heman kefîl e
Baş bigre ji xû ku xûş delîl e

707. Her kes negirî rîya vî dînî
Bê şek du cîhan xisar dimînî

**ʿEẓametu Şerîʿetîl Îslamîyyetî**
**(Mezinahîya Şerîeta Îslamî)**

708. Wer seyrê bike eger tu dahî
Agahî bi karê mulk û şahî

709. Zanayî bi fennê ḥukm û dewlet
Wer seyrê bike ji dil şeṛîʿet

710. Ev şeṛʿe bira wekî dizanî
Dergahê seʿadeta du xanî

711. Ew kakilek e Xudê bijarî
Wî bû me ji ʿîlmê xû bijarî

712. Ew ṣaẋ e ne wek lîbase belkî
Wek pîstê fireh dibît li xanî

713. Çendî ku beşeṛ biket tereqqî[1]
Gel wan dê biçîte rê bi ḥeqqî

714. Ava ye li ser delîlê ʿeqlî
Çêkirye li xir ʿilûmê eslî

715. Her ʿîlmek û fennekê bi kar e
Bû jîn û siyaset û îdare

716. Ev dîne belê delîlê wan e
Ev şeṛʿe tinê kefîlê wan e

**Numuẓecun mîn Ulumî'l- Şerîʿetî**
**(Nimûnek ji Zanistên Şerʿî)**

717. Ḥezkey tu were ji bû nimûne
Çendik ji ʿilûmê dîn bixwune

718. Wek fennê ku can diket muhezzeb[2]
Wek ʿîlmê dilan diket mueddeb

719. Ew ʿîlmê bi nav ʿîlac û derman
Fennê bi wî çêdibît wîcdan

720. ʿÎlmê bi wî rêk dibîte xane
Fennê ku siyaseta cîhane

721. Ew ʿîlmê muʿamelan temamî
Ew fennê huqûqê xaṣ û ʿamê

722. Ew ʿîlmê umûr û karê dewlet
Adabê dîfaʿ û mulk û quwwet

723. Her hotuve ṣed ʿîlim bizane
Ew xir di şeṛîʿetî cema ne

[1] pêşveçûn
[2] Selihandin,islah kirin

**Neẕaru îla Meşrûʿîyyetî Zekatî we Ḥûrmetî Rîba (Nêrînek li ser Heramîya Rîbayê û Meşrûîyeta Zekatê)**

724. Luṭfa tu were bibîn bi dîqqet
Yek du ji mesailêt şeṛîʿet

725. Ewwel tu were zekat neẕer ke
Paşî bi rexê rîba guzer ke[1]

726. Sirrek çi mezin Xudê di wan da
Çen xêr û çi meṣleḥet bi wan da

727. Ferḍa ku zekat rîba ḥeram î
ʿAlem şewişî ji wan temamî

728. Ger seyrê cîhan bikey peyapey
Tarîxê di ʿalemê tu seḥ key

729. Dê bînî serê şeṛ û şîqaqê[2]
Vî mucthemeʿî û vê nîfaqê

730. Ev xelke li her cihek lewanê
Keftîne ẋemê û êş û janê

731. Ev hinde mûşewweş[3] in ne hemwar[4]
Nê du qise ne tinê sebeb kar

732. 1-Ewwel eve ye wekî dibêjît
Ew yê ku li xelkî can dimêjît

733. Ger bêt û bijîm û têr bibim ez
Ṣaḥib meziniî û xêr bibim ez

734. Min bak[5] nîye ẋeyrî min li birsan
Bimrin û biçin li birs û tirsan

735. Nê ev qise ger me guh bidêrîn
Zur pîs û birsî ye û ne şîrîn

736. 2-Ya dî tu bike ḥetta bixwum ez
Tu mandî bibe ḥetta bijîm ez

737. Herwe ve qiseş gelek kirêt e
Naxûş û ṛeş e û kes nevêt e

738. Ev du qisene serûkê fitnan
Evro şilqandî newiʿê însan

739. ʿAlem şewişand ji dil peyapey
Ḥetta ku birin serê firakey

740. Vî derdî ji bû çu nîne derman
Bijlî vî şeṛîʿetî û Qurʾan

741. Ew karê ḥeram wekî rîba ye
Nêzîk wê nebin biken tebaye

742. Ew ruknê zekat Xudê ku danî
Em taze bideyn ji ruḥ û canî

743. Peyda dibitin li nêv me ummet
Xûşî û evîn û ṣebr û ulfet

744. Vêkra dê bijîn bi serfirazî
Gel keyf û ṣefa û dilnewazî

745. Xalî nîye lê ji sîrr û ḥîkmet
Fer kirye Xudê zekat li ummet

746. Teslîm kirîye bi wan ê zengîn
Sal sale besê feqîr û miskîn

***

747. Ev karê Xudê gelek cewan e
Hindek di mezin û hin geda ne

748. Hindek di feqîr û hin di zengîn
Hindek di siyah û hin di rengîn

749. Beʿḍek di nezan û hin di zana
Çendek di ḍeʿîf û çen tewana

750. Xalî nîye lê li nefʿ û ḥîkmet
Bê sir nîye ew ji xêr û reḥmet

751. Ev renge divêt belê cîhanê
Ev weḍʿe divêt evê jiyanê

752. Emma nîye karê ʿeql û murwet
Însan ku li yêk biken meḍerret

753. Zengîn bi geda biket bexîlî
Mazin bi feqîr û jar ẕelîlî

754. Xurtî biketin li wan û ẋedrê
Batî keremê û reḥm û qedrê

755. Hişyar bî eger tu nûke têrî

---

[1] Derbas be
[2] Nakokî, îxtîlaf
[3] Tevlîhev
[4] Lihevkirî, ahengdar
[5] Tırs

Ya evro bi çen kesan diwêrî

756. Şeʾnê te ye ey birayê însan
Xaşma tu erê birayê îman

757. Çakî û şirînî û cewanî
Başî û emînî û vîyanî

758. Xuşṭebʿî û xuşzuban û yarî
Dan û kerem e û harîkarî

759. Roja ku zekat li nav me îslam
Kêm bûye rîba çi zûr bû bêqam

760. Em xir şulûqîn ji dil perîşan
Xuşê kete ḥalê ruḥê kêşan

761. Seyrêke ewanê têr û zengîn
Dilreq ku bûyîn bi can tijî kîn

762. Nabînî ji wan ji ẋeyrî tundî
Suxre w ẋeḍeb û difinbilindî

763. Batî mededê û harîkarî
Batî keremê bû layê Barî

764. Wer pêş ṭebeqa feqîr û jaran
Dilreş ku bûyîn li malidaran

765. Ew batî viyan û qedrê şîrîn
Ẋeybetker in û civîn û nifrîn

766. Cumle neḥez in li yêk û dilreş
Lew hu ne tifaq in û muşewweş

767. Vî derdî ji bû çu nîne derman
Madem ku zekat neden misilman

768. Ḥetta ku zekat hituve kêm bî
ʿAlem dê hemû bi derd û ẋem bî

769. Bû vê mereḍê şîfa çu nayê
Madem ku gelek diken rîbayê

770. Madem ku rîba li nav me zûr e
Xûşî û necat bizane dûr e

771. Peyẋemberî nê we daye ferman
Xaliq ji kemalê luṭf û îḥsan

772. Danaye ji bû feqîrê ḥalan
Malek wî li nik xudanê malan

773. Bû wan vebirî bi ʿîlm û ḥîkmet
Malek ku ji ḥalê wan kîfayet

774. Ma kes dibitin şiyuʿî gava
Îslam bi zekat bibîtve ava

775. Ev qerqeşe û nexûş jiyanî
Baʿis neyê ye eger bizanî

776. Bêḥalî ye hindekan û rûtî
Gel ẋefletê dil ji wane ṣutî

777. Meznan xû ṭexer ẋurûr û ṭuxyan
Bê dînî û ẓilm û ẋedr û ʿîṣyan

778. Lew hinde di nav xû bê tifaq în
Em hinde xudan şeṛ û şîqaq în

779. Nê şeṛm e ji bû me xir misilman
Nik xû ve em în xudanê Qurʾan

780. Em hinde ji dînê xû di dûr în
Ev çende ji şeṛʿê ḥeq nifur în

781. Ḥeyf e ji me ger me huşiyar în
Ev renge ne rêk û pêk diyar în

782. Nê dînê Xudê ye dînê îslam
Ma her ew e ruḥ û jînê îslam

783. Dînê me kilîl e bû keramet
Şeṛʿê me kefîl e bû seʿadet

784. Her kes negirît rîya vî dînî
Ta maye bi derdeḥal dimînî

**El-Îslamû fîl Qurûnî'l-Ûla**
**(Misilmanetî di Çerxên ʿEwil da)**

785. Her wek li me pêş weke dizanî
Îslam bi kemalê ḥukimranî

786. Çendî ku ʿemel ewan bi Qurʾan
Ew bûne xudanê mulk û sulṭan

787. Ew çen bi dîyanetê diyar bûn
Ṣed hinde bi quwwet û bi kar bûn

788. Sulṭanî dikir li vê zemînê
Serbestî digel xûşî û jînê

789. Hindî ku ewan dikir ʿedalet
Wan zêde dibû supah û dewlet

790. Bê ferq û cudayî bûn di taze

Yek parçe hemû di serfiraze

791. Navê hemîyan şirîn e îslam
Yek ḥizb e çi ḥizbê rebbê ʿellam

792. Gel çendî ziban[1] û millet û cîl
Ew bûne bira bi emrê tenzîl

793. Lew ew du cîhan di kameran[2] bûn
Ṣaḥib huner û xudan nîşan bûn

794. ʿIlm û huner û bilindî û bext
Tac û sipeh û siyaset û text

795. Înṣaf û ʿedalet û emînî
Wan cumle hebûn bi navê dînî

796. Ev dîn û şeṛîʿetê Xuda ye
Bû cumle cîhan ḥeta ku maye

797. Pêşî me ye em ji dil helistîn
Rebbê xû bi dînê ḥeq peristîn

**Ḥalu'l-Îslamî'l-Yewmî (Rewşa Musilmanetîya Evro)**

798. Ṣed ḥeyf û mixabinî bû îslam
Evroke we bê rewac û bê nam

799. Gava ku hebûn hemû li gel êk
Wan şûl bi dilî hemû dibûn rêk

800. Evroke hituve lêk cuda yîn
Lêk dî neḥez în û labela yîn

801. Bê nav û nîşan û bê delîl în
Pêş kafir û duşminan ẕelîl în

802. Roja me bûyîn yek û bi quwwet
Duşmin me li pêş bi derd û zîllet

803. Evro netifaq û labela yîn
Lew hinde di jar û berbela yîn

804. Ḥîna dixurîn penah bibarî
Ew yarê me bû bi harîkarî

805. Evro dixwurîn bi navê duşmin
Lew hinde şirîn di çavê duşmin

806. Ḥetta me dikir emir bi çakî
Wek nehyê li pîsî û nepakî

807. Bê ferq û cudayî bûyîn li her kar
Êk dî me digirt şebîhî dîwar

808. Em pêkve hemû bi harîkarî
Xaṣma li deravê ṭeng û ṭarî

809. Bû layê Xudê bi canfîdayî
Vêkra me dijîn bi xêr û şayî

810. Ḥukmê me hebû li xir zemînê
Hel Endelusê ḥeta ku Çînê

811. Serbestî dijîn bi naz û ʿîzzet
Hem dîn e û hem cîhan û dewlet

812. Evro me bibîne em çewa nîn
Dûr negre xirabtirî cîhan în

813. Bê şeṛʿî gelek bi çav dibînî
Nabînî kesê xû têbgehînî

814. Hindan şeṛ û şur û natifaq e
Hindan bi xiyanet û nîfaq e

815. Layek bi ẋurûr û dunyedarî
Layek bi fucûr û pîsekarî

816. Wer seyrê miqam û besteguyan
Melhay û mey û teyatrûyan

817. Weḍʿek tu dibînî zûr bed û ṛeş
Îslamê dibînî zûr muşewweş

818. Ger beste ne ger miqam û ḥeyran
Zurna ne ji bû leʿînê şeyṭan

819. Seyrêke qumar û sînemayê
Wer ṛeşbelekî bibîn li şayê

820. El mûde bi nûr e jin hizaran
Bê perd û bê şeṛim li şaran

821. Belkî jin û mêr bi hev li pêş çav
Dans û meleyî diken di nav av

822. Peyẋemberî ma nedaye ferman
Jin dav û ṭelê ne ew bû şeyṭan

823. Nê ḥeyf e ji bû me em di hu bîn

[1] ziman

[2] Bextîyar,şa

Ev renge neyarê dînê xû bîn

824. Bêbextî û îftîra û ẋeybet
Ẓilm û dizî û revan û rîşwet

825. Feḥşî û diru û ḥîlebazî
Kêmasîyê ximse û terazî

826. Ḥetta me ʿemel bi şeṛʿ û dîn bûn
Em tacê serê kuṛey zemîn bûn

827. Nê ḥukm û edeb hemû me gorîn
Em lew di ḍeʿîf û ser di şor în

828. Wan çendî seʿî dikir bû dînî
Wan dîn û cîhan hebûn yeqînî

829. Evro şeṛefê û dîn û îman
Bû kavledinê diken bi qurban

830. Ḥetta me çek û silah bû ẋîret
Bû ẋîretê dîn di taze sîret

831. Nuke bi cebir dibîne ʿesker
Ma qeṭ di cîhan dibîne mîrser

832. Ḥetta tu ji dil nekey ẋezayê
Îmdad ji Xudê ji bû te nayê

833. Ṣed ah û esef bû ehlê îman
Dûr keftine ew ji rahê Qurʾan

834. Ew dînê hituve pak û şîrîn
Lê bûne neyar û duşminê dîn

835. Adab û şeṛîʿetê Xudayî
Pîçek bi Xudê li nav me mayî

836. Ew ʿîlmê weku esase bû dîn
Bê qedr e esef li nav me ev ḥîn

837. Ev dînê mubîn dibînî ev gav
Bê nafik û bê rewac e bes nav

838. Melbukê bûyîn bi mal û dewlet
Meftunê bûyîn bi nefs û şehwet

839. Namusê ḥeta dibînî çen car
Dê ken bi fîdayê êk du dînar

840. Bes pare bidet bila nê şeyṭan
Dîn û weṭenî diken bi qurban

841. Ev kare ne karê ʿeql û jîn e
Ev ḥale nê layiqê me nîne

842. Nik xû ve em în bijare ummet
Em çake bibîn ʿemel bi sunnet

**Sunnetu'l-Muslîmîne meʿe Dînîhîmî'l-Mubîn (Sinneta Musilmanan li Hemberî Dînê Wa yê Mûbîn)**

843. Ev dîne şeṛîʿetê Xuda ye
Lew hinde bi qîmet û buha ye

844. Qurʾan e belê mîdadê dînî
Ta maye cîhan durust dimînî

845. Îslamê eger çî car bi caran
Guh daye desîseya neyaran

846. Guh daye neyarê dîn û îman
Ẋafil bûye ew ji rahê Qurʾan

847. Pîç pîçe ji dînî dûr dimînin
Ḥetta ji kemalê kur dimînin

848. Bê bar li xûşî û dunyedarî
Zêdey ku ṣube ʿezabê Barî

849. Axir dê biken ji dilve bawer
Bêdînî ye ew kirîne bê ser

850. Nageh dê ji can û dil helistin
Peyman dê li gel Xudê bibestin

851. Her êk ji xû ra diket xebatê
Ta dînê Xudê biden necatê

852. Ḥetta ku hemû bi dîn û îman
Ew dîn e xudanê mulk û sulṭan

853. Hem jîn e xûşî û dîn û dewlet
Dunya ye digel riḍa û cennet

854. Hîvî me heye ji luṭfê Barî
Ew zûr bidetin me huşiyarî

855. Hişyar me biket li derdê ẋeflet
Qurtar me biket li davê ẕillet

856. Ûmêd e hemû ji dil helistîn
Ellah ji dil û yeqîn peristîn

857. Vî dînî ʿezîz bikeyn wekî car
Da em di cîhan bibîne serdar

858. Em taze bideyn bû dînê Qurʾan
Mal û ser û canê xû bi erzan

859. Serkêl dê bijîn bi dilşirînî
Jêrî ʿelemê bulendê dînî

***

860. Ya Reb tu bi qedrê navê eʿ ẕem
Ya Reb tu bi vî resûlê ekrem

861. Ya Reb te bi cahê pakê Qurʾan
Mewla ku tu yî Reḥîm û Reḥman

862. Nik xû ve bidey me hewl û quwwet
Îslamê hemî bigêrî dewlet

863. Îslamê bikey qewî û tunde
Dînê xû bikey tu serbilinde

864. Em evro li xir cîhan cegerxwûn
Bes nîne çûwar ṣedîn ji melyûn

865. Serpişke cihê me s̠er zemînê
Hel Endelusê ḥeta ku Çînê

866. Ya Reb tu bikey bibînî Ṭahir
Ser kafirî em di nêr û ẓahir

867. Ev dîne bibît xudanê ʿizzet
Gel ʿedil û tifaq û şan û quwwet

868. Vî dînî bi ʿîzz û şan bibînim
Qurʾanê bi ḥukimran bibînim

869. Şeṛʿê te tinê me bibte distur
Hem dîn û jiyan e nûr li ser nûr

870. Qurʾan me bibît xudanê sulṭan
Ṣed kes wekî min fîda û qurban

871. Fermuye peyẋemberê ṣîfet ʿal
"Ellah dihinêrî her di ṣed sal

872. Êkek ku ji dîn dibît xudane
Vî dînî diket bi ʿîzz û şane"

873. Vê gavê dizanî ey Xuda ye
Dînê me ne qîmet û buha ye

874. Mehdî ku dihêt li ḥînê deccal
Deccal me li nav hizar hemû sal

875. Ya Reb tu tinê xudanê dînî
Çêtir ji hemû kesan dibînî

876. Luṭfêt te gelek piṛṛ in nîhanî
Êdî tu dikey wekî dizanî

**TEMHÎDU'L-REWḌETÎ'L-ÛLA**
**(PÊŞGOTINA MÊRGA ÊKÊ)**

877. Qurʾan e eger şeṛîʿet û dîn
Yekser bû me gût resûlê şîrîn

878. Ew bûye serê hîdayeta me
Ew bû sebebê seʿadeta me

879. Înayne derê li kufr û ṭarî
Em fêrkirîn bi dînê Barî

880. Ya Reb tu birêjî ser wî reḥmet
Ṣed naz û neʿîm di baẋê cennet

881. Her wek tu dizanî behrewer key
Wî taze di naz û şayê werkey

882. Ṣaḥib şeṛef û lîwayê meʿqûd[1]
Ya Reb bideyê meqamê meḥmûd

883. Ya Reb bideyê digel wesîle
Her xûşî û nîʿmet û feḍîle

884. Ser ehl û ʿeyal û pakealan
Ser cumle ṣeḥabe û hevalan

885. Xaşma ji muhaciran û enṣar
Zêde li çuwar xelîfe û yar

886. Ṭahir te feqîr û jar e ya reb
Xûşevyê te hîvîkar e ya reb

887. Ev ẕatê xudan kemal û serwer
Meḥbûbê Xudê şefîʿê meḥşer

888. Ew pêşeṛoyê me muʾmînan e
Xûşevyê me ye û ruḥ û can e

889. Nê ferḍ e me ew cewan bivêtin
Çêtir li biçuk û can bivêtin

890. Çêtir li jiyan û ʿeyş û ḥalan
Çêtir li ser û ʿeyal û malan

---

[1] Teqez, eqd

891. Her kes ku wesa nevêt peyember
Îman wî ḍeʿîf û bê serubêr

892. Lew lazim e tu bi nasî taze
Peyẋemberê piṛṛ ji ʿîzz û naze

893. Jîn û eṯera resûlê lewlak
Lazim tu bizanî taze ṯerpak

894. Exlaqê di wî û ṣûreta wî
Karê wî û pakesîreta wî

895. Hel bûnê ḥeta wefatê yekser
Wer taze bizane ey birader

896. Ḥalê wî ji ser ḥeta duwayî
Xir ders û neṣîḥet in tebayî

897. Ellah ji me ra ku harîkarî
Bû Ṭahirî destegîr û yar bî

898. Nûrîn biketin me qelb û canî
Berdet bi belaẋetê zimanî

899. Behrek ji ʿînayetê kerem ket
Nûrek di serû serê qelem ket

900. Ez dê ji Nebî cewan xeber dem
Şîrîn qise û rewan xeber dem

901. Dê puşt bi Xudê cewan bibêjim
Her wek te merame dadirêjim

902. Ev çend e me got şirîn û taze
Hêj em negehîne ṯer niyaze

903. Sername bila ve çende bes bî
Bû meqṣedê da tu piṛṛ hewes bî

904. Wer taze biçîne nîvê gulzar
Beḥṯê vî resûlê pakê muxtar

905. Baẋek me heye gelek şirîn e
Çen dilveker e çi ẋemrevîn e

906. Ey dûst û biraderêt di taze
Wer seyrê biken ku gencê raze

907. Piṛṛ ẕewq û ṣefa ye piṛṛ sirûr e
Gulzar e belê Rîyaḍê Nûr e

908. Ger yar bî Xudê bi keyf û xûşî
Şîrîn dê bi kuṛdî bêjî Şûşî

**BÎSMÎLLAHÎRREḤMANÎRREḤÎM**

"Elem yecîdîke yetîmen feawa wewecedeke ḍallen feheda wewecedeke aîlen feeẋna feemmel yetîme fela teqher weemmes saîle fela tenher weemma bînîʿmetî rebbîke feḥeddîs̱ (*Ma tu ne sêwî bûy vêca Xwedê tu vehewandî? Ma tu neheyirî bûy êdî Xwedê tu rasterê kirî? Ma tu ne xizan bûy Xwedê tu dewlemend kirî? Vêca herçî ku yê sêwî ye, tu wî neêşîne û riswa meke. Herçî yê parsek e jî tu wî neqewirîne. Tu her behsa qencî û kerema Xwedayê xwe bike û pê biaxive (93 –Sûreyê Duha (6-11)*)

**ER-RAWDETU'l-ULA (MÊRGA ÊKÊ)**

Min Mîladîhî Îla Buʿs̱etîhî ʿEleyhîs Selatû Wesselam we ʿEla Alîhî We ʿÎtretîhî. (Ji Dayîkbûna Wî Heta Bûye Peyẋember Silav Li Ser Wî û Malbat Wî Bin)

We Fîha ʿÎddetû Ezharûn (Di vê mêrgê da gelek çîçek hene)

**1. CÎLUHU WE NESEBÛHU (SERDEM Û BINEMALA WÎ)**

909. Ey ḥemd û s̱ena bû ẕatê Barî
Anîn bi hîdayetê ji ṭarî

910. Wî bû me fiṛêkirî peyember
Serdarê peyemberan û serwer

911. Qurʾan wî ji bû me kir beyane
Ser zarê resûlê îns û cane

912. Xûşevyê Xudê çirayê ʿalem
Ew ṛehber û rehnumayê ʿalem

913. Ṣed feyḍ û selam li wî bibarin
Gel her çî ewî heval û yar in

914. Xaṣma li ṣeḥabeyan bijaran
Zêdey ji heman li çwareyaran

915. Gel cumleyê tabiʿîn û peyrew
Ta her kî li rahê wan biçît ew

916. Ta cumleyê ʿalimêt di ʿamil
Taʿabd û murşîdêt di kamil

917. Ta her çî diket li xêr û xidmet
Bû jîn û rewacê dîn û ummet

918. Ev rewḍe yek e li vê kîtabê
Yarê me Xudê bî bû ṣewabê

919. Dê beḥs̱ bikem ji bûnê serwer
Ḥetta li çîlê dibît peyember

**Feḍlu Ceylîhî ʿEla Lîsanîhî (Bi Zimanê Wî Qedrê Neseba Wî)**

920. Ya Reb tu tinê bi xû dizanî
Karê xû di ʿerḍ û asemanî

921. Şeʾnê te çi taze û pesind e
Karê te bi ḥîkmet û bilind e

922. Ey her tu dizanî şahê ekber
Kê dê tu li kê bikey peyember

923. Roja ku Xudê îrade ṣadir
Bû da bidetin resûlê axir

924. Wî da ʿereban ve cah û qedre
Da haşimîyan ve zêde fexre

925. Qewmê ʿereban ku xir dizanin
Çêtir li hemû cîhan ewan in

926. Belkî ku te zanî ey birader
Fermuye Nebî bi zarê şeker

927. Ṣêxê Ṭeberanî piṛṛ dîrayet
Ew bû me ji wî diket rîwayet

928. "Ev xelqe dema ku dabû Barî
Însan wî li xelqê xû bijarî

929. Dîsan li hemû beşeṛ deranî
Qewmê ʿerebî bi ʿîzz û şanî

930. Ev behre dema bi wan wî bexşî
Piṛṛ qedir kirin li wan Qureyşî

931. Zêde li evan jî neslê haşim
Axir li evan jî Babê Qasim

932. Barî bi me dave pişk û bare
Ez bûme bijare ser bijare"

933. Barî xû dizanî karê ḥîkmet
Ka ew bi çi kes didet nubuwwet

934. Qewmê ʿerebî bi ʿîzz û naz in
Ḥetta bi ebed di serfiraz in

935. Ṣaḥibhuner in cewanemêr in
Kardîde ne ew bi ḥerbê fêr in

936. Ṣaḥibkerem in di çav vebîne

Serkêl û di zîrek û sexî ne

937. Meʿlûm e sexa bi navê wan e
Meşhûr e zeka bi navê wan e

938. Bê ḥed ʿulema di pak û faḍil
Çen murşîd û ewlîya di kamil

939. Çen merdê siyaset û cihangîr
Çen ehlê ziman û ray û tedbîr

940. Rabûne ji wan di her zemanan
Bû dîn û weṭen di her mekanan

941. Ḥezkey were seyîydan bibîne
Tarîxê ḥeyatê wan vexwîne

942. Çen piṛṛ şeṛef in bi rêz û rengîn
Ṣaḥib huner in pesind û sengîn

943. Nêv her milletek çu meh diyar in
Bû dîn û cîhan di bexteyar in

944. Seyrê bike neslê wan şeḥaban
Nêv şeṛq û ẋerb çu mahê taban

945. Ṣaḥib huner in eṯer diyar in
Şêrzade ne ew di şehreyar in

946. Minnet ʿereban li ser me zûr e
Şukra ʿereban ji bû me nûr e

947. Ew bûn sebebê hîdayeta me
Ew bûne serê seʿadeta me

948. Ber wan neba em nihû belûsî
Agirpersî û di pîs mecûsî

949. Ḥubba ʿereban ji ber peyẋember
Naçar û fer e li ser me yekser

950. Belkî ji Nebî te kir gudarî
Fermu ye belê bi emrê Barî

951. “Ḥubba ʿereban delîlê îman
Nevyanê ewan nîfaq e nîşan

952. Lazim we ʿereb bivên ji dil can
Lew ez ʿereb im ji neslê ʿednan

953. Qurʾan ʿerebî û xûş zuban e
Ezmanê biḥeştîyan bizane”

954. Ṭahir ewê kemtirîn e xadim
Ḥubba ʿereban wî zûr e lazim

### Sirrû Sîlsîletî Nesebîhî îla ʿEdnan
### (Sirra Zincîra Babikên Wî Heta ʿEdnanî)

955. Serdarê peyemberan Muḥemmed
Hem serwerê mîrseran Muḥemmed

956. Bê mîṣl e belê li cumle însan
Bû fikir û deha û ʿîlm û ʿîrfan

957. Pakij neseb e resûlê ʿalem
Hel babî ḥeta biçîte Adem

958. Zincîrê neseb ku pak e çendan
Meʿlûm e ḥeta digehte ʿEdnan

959. Ez navê di wan dibêm li du êk
Ḥetta digehîte wî gelek rêk

960. Babê wî diyar e ʿEbdê Ellah
Bapîre wî Şeybe ê xudan cah

961. Ger Haşim e nav ʿEmir şehîd e
Ger ʿEbdîmenaf bû ew Muxîr e

962. Hem Zeyd e Quṣey Kîlab û Murre
Keʿb û Luwe ye çu dane durre

963. Ẋalib mezinek bû bab wî Fîhre
Malik çi kerîm bû bab wî Neḍr e

964. Her Neḍr e Qureyşî bûye meşhûr
Nesla wî ne ev qebîleyêt zûr

965. Babê wî Kînan e ta Xuzeyme
Ta Muḍrîke ê şirîn di şîme

966. Îlyas û Muḍer Nizar di piṛṛ şan
Ḥetta digehî Meʿedd û ʿEdnan

967. Ev sîlsîle wek dikir bi ejmar
Pêhel wî negût resûlê muxtar

968. ʿEdnanî ḥeta ku Îsmaʿîle
Meʿlûm nîye cumle qal û qîle

969. Yek yek te eger divêt bizanî
Ecdadê resûlê vî zemanî

970. Wer guhde birayê xû yê Şûşî
Dê bû te bibêt bi ẕewq û xûşî

### A/أ Cedduhu Şeybe ʿEbdulmuṭṭelib Bîn Haşim (Bapîrê Wî Şeybe ʿEbdulmuṭṭelib Kuṛê Haşimî)

971. Ev sîlsîle her wekî me zanî
Mazin bûne xir bi ḥukimranî

972. Ew cumle bi nav û şehreyar bûn
Nav quṭrê ḥîcazê zûr diyar bûn

973. Şeybe ku peyẋemberî bû bapîr
Ṣaḥib hunerê bi ʿeql û tedbîr

974. Babê wî ku Haşimê şirîn nam
Bû kesbê diçû tîcareta Şam

975. Ladabu[1] Medîneya di piṛṛ baẋ
Nik ʿEmr ê kuṛê Lebîdî qûnax

976. Ew Xezrecîyê ji neslê Neccar
Qedrê wî gelek digirt hemû car

977. Selma wî kiçek hebû şirîn qed
Piṛṛ ʿeql û kemal û law bû bê ḥed

978. Haşim ku didît bi lence û naz
Wî taze ji babî kirbû daxwaz

979. Babî gû didem bidey qerarek
Ger raḍî bibî tu lê mubarek

980. Her carê biçûk bibît bi naçar
Lazim tu bihînî nêv me ey yar

981. Raḍîbû bi şeṛṭê hu girane
Lew ṣuṭibû dil ji newcewane

982. Mare diket û diçîte Şamê
Geryave Medîne bû meramê

983. Wî paşî li gel xû bir bû malê
Nik malê Xudê di wê nuwalê

984. Ḥîna ku bi ḥemle bû girane
Înave Medîne nêv birane

985. Her vê seferê diçîte Şame
ʿUmrê wî li Ẋezze bû temame

986. Selmayê kuṛek dibît bi şane
Wan zanî xeber ku bab nemaye

987. Peyda bû ewî sipî bû nav çav
Lew Şeybe kirin yetîmê xû nav

988. Ew mave di kuşê day û xalan
Ta geşte ʿumir wî ḥeft salan

989. Êkek ji Qureyşîyan ji xizman
Ev ṭîfle didît bi ʿeql û ezman

990. Larî dikirin digel hevalan
Tîrbazî dikir li durê malan

991. Her carê wî tîr dida li nîşan
Da xû pesinît bi ʿîzzet û şan

992. Dabêjî ez im çi tîrê endaz
Babê min e Haşimê çu şehbaz

993. Jê pirsî dema ku dî zelamî
Eṣlê xû digût ji bû temamî

994. Geryave dema zelam ji bû mal
Bû Muṭṭelibî digût wî ev ḥal

995. Mamê dema bihîstî mizgîn
Her ewro diçît Medîne rengîn

996. Şeybey xû ṭeleb diket li dayê
Selmayê bi dilxûşî didayê

997. Ḥîna ku gehişte Mekke war e
Ev ṭîfle li paşî wî suwar e

998. Xelkî digû Muṭṭelib bi pisyar
Ew ṭîfle çî ye li paş te dildar

999. Ew ʿebdê min e digût me anî
Ḥetta dibire derukê xanî

1000. Bergek dikirît ji bû wî rengîn
Gel xû dibetin bû nedwe sengîn

1001. Ew taze xeber dibêjî lazim
Ev ṭîfle kuṛê birayê Haşim

1002. Ta nuke li Yesrîbê bû taze
Nik xalê di xû bi serfiraze

1003. Navê li wî Şeybe çen şirîn e
Meḥbûb e li nik me nazenîn e

[1] Terk kirin

1004. Wî kirbû li pêşî ʿebdê xû lew
Meşhûr bû bi ʿEbdê Muṭṭelib ew

1005. Ḥîna ku mezin bû ev cewane
Wî danî li cayê bab bi şane

1006. Milkê wî hemû didaye destî
Bû qedrê wî hîç nekir çu sistî

1007. Paş Muṭṭelibî ku mamê wî bû
Rewşa Mekehê bi navê wî bû

1008. Meznê Mekehê bi ʿîzz û şan bû
Piṛṛ cah û kemal û nan û dan bû

1009. Zadê hecîyan û koçk û dîwan
Gel avê şirîn bû yar û mêvan

1010. ʿAyd bi wî bûn bi serbilindî
Gel nav û nîşan û gel pesindî

***Ḥefru Ceddîhî Zemzeme (Kolîna Bapîrê Wî ya Zemzemê)***

1011. Her Şeybe bû ku deranî zemzem
Ḥuccac wî kirin li avê bê ẋem

1012. Wan Curhumîyan veşarbû ew bîr
Gel cute ẋezalê zêr û çen şîr

1013. Gel çen zirîyan[1] hemû bijare
Xaliq ji wî ra kirin diyare

1014. Rojek xû nivistîbû di ḥîcrê
Xewnek wî didît şebîhî fecrê

1015. Êkek digûtê tu ey heliste
Ṭeybe tu bikule çak bi deste

1016. Gû Ṭeybe çî ye li kî meqam e
Hişyar bû bizir bû ew zelame

1017. Ew çûbû ṣubeş li wê nivistî
Dûstê xû didîve hem diristî

1018. Gû rabe bû xû bikule Berre
Hem bû wî temam negût ve kerre

1019. Dûṣbe diçitin li cê xû wek car
Razibûye çehvinêrî ew yar

1020. Hem hat û digûtê ey birader
Meḍnûne bikule ey dilawer

1021. Dîsan bû negût û lê nîhan bû
Wî ev kesere tijî ji can bû

1022. Hem çu li cê xû rojê çare
Ya Reb ve çi xewn e ev çi kar e

1023. Hem dî di xewê wî ew zelame
Şîrînxeber û şekerkelam e

1024. Gû rabe bikule bîrê zemzem
Mîrateyê bab e pîrê eʿizem

1025. Ava wê çi ca nedêbî hişke
Xaṣî te tinê ve bar û pişke

1026. Mabeynê îsaf û naîley çak
Tu heste bikule ey şeṛefnak

1027. Nêzîk kunemêrîyê yeqînî
Wê bîre mubarekê dibînî

1028. Piṛṛ keyf û sema li xew bû hişyar
Ew rabû bi lez bi hîmmet û kar

1029. Ḥariṯ wî hebû ye kuṛ bi nave
Wî anî li gel xû hem di gave

1030. Dest dane kûling û ṭevr û bêran
Wan kulî wekî cewane mêran

1031. Wan kulî ji dil bi kar û bare
Ḥetta derê bîrê bû diyare

1032. Dergavê digût bi hêl wî tekbîr
Wan zanî ku wî deranî ew bîr

***Nîzaʿu Qureyşîn Ceddehû fî Bîrî Zemzem (Nîqaşa Qureyşîyan li gel Bapîrê Wî li Ser Bîra Zemzemê)***

1033. Hatin bi nîzaʿ Qureyşî gava
Ev bîre bi pakeav bû ava

1034. Gûtin wî emîş xudanê bar în
Derḥeq bi vê avê ḥîṣṣedar în

1035. Wî gûtî nexêr ve tazebehre

[1] zirx

Her bû min e bes ve nav û fexre

1036. Nakem ji we ra ebed tenazul
Ḥetta li me muṭmeîn nebî dil

1037. Wan gûtine wî li layê Şamê
Şexşek heye bû me vê meramê

1038. Her çî ku ewî ji bû me danî
Pê raḍîne em bi qelb û canî

1039. Bû vê ṭelebê ewan sefer kir
Bû layê wî kahinî guzer kir

1040. Şeybe ku dibît resûlî bapîr
Ṣaḥib keremê bi ʿeql û tedbîr

1041. Wî gel xû birin hinek ji mazin
Ew yêt bi ʿeşîr û cah di nazin

1042. Hem hatine çen kesek bijare
Ew yêt ku bûyîn ji wî neyare

1043. Ew rêke gelek dirêj e piṛṛ tav
Axir li rîyê neman ji wan av

1044. Xizmêt wî ewêt li gel cîdale
Av mabû ewan hinek li bale

1045. Şeybe ku bi murûwetê dinazît
Bû seddê remeq ji wan dixwazît

1046. Ew menʿe dibin li danê avê
Wey bû wî dilê di wê deravê

1047. Axir hemû ladibin perîşan
Nêzîk bûne xir ji ruḥê kêşan

1048. Bapîrê Nebî ku mir bû avê
Ellah bû kerem dikir di gavê

1049. Derḥal li binê piyê dewarî
Av der dibitin bi emrê Barî

1050. Avek çi sipî û ṣar û şîrîn
Tekbîr digûtin heman bû şayîn

1051. Wan têr ku vexwar bi keyf û şayê
Aman bû xû pirkirin dumayê

1052. Xeṣmêt wî dema we dîn bi çavan
Pîçek şefeqet gehî hinavan

1053. Hatin hemîyan şirîn edeb kir
Wan taze li Şeybe av ṭeleb kir

1054. Şeybey gûtî her kesê divêtin
Vê avê vexwut bila bihêtin

1055. Hindan gûtî wan ku av nedame
Ew nabî biken ji avê ṭame

1056. Şeybey gûtî wan ne reḥm û wîcdan
Ger em we bikeyn emîş wekî wan

1057. Zur kêm e kesê ji dil wesa bî
Çakî biketin li cê xirabî

1058. Hemyan gûtî lê mezanî ev dem
Her laîqî tu ye bîrê zemzem

1059. Geryaneve xir bû layê malê
Ser vî xeberî û vê xeyalê

1060. Dûstê xû bira bizane hîngî
Gava tu ketî deravê ṭengî

1061. Meʿlûm e xudanê cah û malî
Dûstê wî bi naz û gef dinalî

1062. Yarê te ye yarê ṛenc û tirsê
Dûstê te ye dûstê kulb û birsê

1063. Mizgînî eger te yar we bîtin
Ger dê we nebît bila nebîtin

1064. Zemzem wî dikulî lê bi çustî
Ḥetta ku gehişt binî diristî

1065. Cutek ji ẋezalê zêr û çen şîr
Gel çen zirîyan wî dîn di ew bîr

1066. Behrek mezin e ve ave çen zûr
Hem geşte xezîne nûr li ser nur

1067. Rabûn bi nîzaʿ Qureyşî dîsan
Wan bê xeber û ḥesûd û pîsan

1068. Wan gûtî emîş xudanê bar în
Gel te di vî malî ḥîṣṣedar în

1069. Wî gûtî çira çi dil biêşîn
Dê qurʿe li nik hubel bikêşîn

1070. Pişkek du ẋezal û êk zirî w şîr
Beyt û ez û hûn heçî bû teqdîr

1071. Wan qurʿe dikir li karê ẋeybê

Derkeftî bi navê wî û keʿbê

1072. Bû Keʿbe ẋezal û bû wî mayî
Bû wan bû xisaretî dumayî

1073. Her kes ku ḥesed di can û dil bît
Daîm dê ser û dilê wî kul bît

1074. Zur ʿadil e ew eger bizanî
Ewwel dikujît li xû xudanî

1075. Hişyarbî bira nebî ḥesedkar
Ḥetta du cîhan nebî tu bê bar

1076. Zanî ku ḥesûdê dil di ṭarî
Naraḍî ye ew li karê Barî

***Ebuhu ʿEbdullah ez- Zebîḥ (Babê Wî Ebdullahê Qurban)***

1077. Şeybey ku didît li dest Qureyşan
Piṛṛ kêşî û bê dilî û êşan

1078. Wî nezir dikir li ser xû lazim
Gava ku bi dest me hat niyazim

1079. Deh kuṛ ji me ra hebin bi peyman
Ez dê vekujim yekî bi qurban

1080. Her wekî gûtî Xudê ku dayê
Nezra wî bibîr bû yarê rayê

1081. Çu nik hubelî bi qurʿe kêşan
Ka dê kî li wan bibîte bê can

1082. Derkeftî bi navê Babê Eḥmed
Kiçkuk û ter xûşevî bû ḥed

1083. Derḥal wî bire qeṣebaxane
Da ser bibirît ji ṭîbê cane

1084. Ewlad û hemû Qureyşîyan têk
Gûtin venekuj ḥeta hebît rêk

1085. Ev şule eger bi mal bibîtin
Raḍîne bila me mal biçîtin

1086. Ger tu vekujî vî lawê piṛṛ nur
Ev kare li paş te dê bî distur

1087. Meşhûr e jinek li layê Xeyber
Pisyarekê pê bikey bi bawer

1088. Dijwar e li nik heman ve kare
Belkî ji te ra bibêjî çare

1089. Ew çu bi wê kir bû tazepisyar
Ew pîrejina bi fam û hişyar

1090. Wî qîṣṣe dikir ji bû beyane
Guhdarî dikir jinê ji cane

1091. Wê gû çîye nik we xunê mêran
Gû deh şutur in geda û têran

1092. Wê gû here mal û qurʿe danî
Ser deh şuturan û newcewanî

1093. Ger dernekevît bi navê ḥêştir
Carek dî bikey dehêt dî zêtir

1094. Deh deh tu wesan dikey ʿelawe
Ḥetta ku necat bibît ve lawe

1095. Qurʿe çi dema bi navê wan hat
Rîḍwan li xudanê mulk û can hat

1096. Wî qurʿe dema dikir bi ferman
Ser ṣed şuturan temam bû qurban

1097. Sê car li du êk bi navê wan hat
Bawer wî dikir fîdayê can hat

1098. Ṣed ḥêştirê çak birin di anê
Vêkra bû derê qeṣabexanê

1099. Wî taze bi destê xû vekujtin
Bû her kesekî li wê vehijtin

1100. Ger bêt û bela biçît bi malî
Memnun bî ne wek ji bû bi nalî

1101. Çen xûş e ji dil şirîn û erzan
Ev male bibît fîdayê însan

1102. Ev malê dinê ku çen şirîn e
Emma ji ḥeyatê can çu nîne

1103. Ev male eger çî bê buha ye
Emma gele car ji canfîda ye

1104. Ṣed şûl nê dibin bi mal û zêran
Nabin bi duṣed cewanemêran

1105. Ḥetta tu dişêy tu xirke malî
Emma bi cewanî û ḥelalî

1106. Fama yî eger tu huşiyarî

Pê raḍî dikey tu xelq û Barî

1107. Hişyar bî nebî esîrê malî
Ta her du cîhan nebey bi talî

1108. Dunya çu niye ku bê dewam e
Karek bike bû biḥeşt meqam e

1109. Ewladê di wî çuwarde kuṛ bûn
Ew cumle ji şewketê di piṛṛ bûn

1110. Ḥaris̱ li heman mezintirîn e
ʿEbbas e kiçiktir û şirîn e

1111. Yek Ḥemze ye serwerê şehîdan
Yek Bûlehebê ji wan pelîdan[1]

1112. Ẋeydaq û Qus̱em digel Muqewwem
Yek ew Ebuṭalibê mukerrem

1113. Yek ʿEbdîmenaf e yek Zubeyr e
Yek ew Ḥecelê bi nav Muẋîre

1114. Du yêt dî Ḍîrar û ʿEbdîkeʿb e
Yek babê resûlê cumle şeʿbe

1115. Navdêr e bi navê ʿEbdê Ellah
Ew bû li heman pitir xudan cah

1116. Ta mabû reîsê çak û hişyar
Wî menʿe dikir ji ẓilm û bedkar

1117. ʿ Emrê wî dewam bi ʿedl û çakî
Exlaqê di ispehî û pakî

1118. ʿUmrê wî gehişte bîst û ṣed sal
Şeybey ku ecel ji wî dibû ḥal

**B/ب El Haşim Bîn ʿEbdilmenaf (Haşim Kurê Ebdulmenafî)**

1119. Haşim bi ʿEmir ku namedar e
Wî ʿEbdîmenaf e bab dîyar e

1120. Mazintirî xir bira û efḍel
Yek Muṭṭelib e yekê dî Newfel

1121. Yek ʿEbdîşems bi nav û nîşan
Haşim li heman pitir xudan şan

1122. Piṛṛ dan û sexa ye xûş reîs e
Bû ʿalemê çêdikir herîse

1123. Zadê hecîyan şeṛab û av e
ʿAîd bi wî bûn bi qedr û nav e

***

1124. Kuṛê ʿEbdîşems Umeyye meşhûr
Ev ḥale wî xûş nebû di dil kur

1125. Rabûye li ziḍḍê mamê Haşim
Deʿway mezinî dikir ne lazim

1126. Çendî xebitî bi seʿy û kare
Wî karî ji bû negirt qerare

1127. Çen pîse ḥesed çi qed giran e
Hem jehrê dil e û jengê can e

1128. Hindek ji Qureyşîyan di fessad
Hindê dî gerim kirîne hussad

1129. Carê bi ḥuḍur û car nîhane
Ser hindê bi wî dikir tiṛane

1130. Girtî ẋeḍebê Umeyyeyê har
Gel Haşimî kir cîdal û bedkar

1131. Mamê wî ye hem sipî ridîn e
Cirre û qireqir ne rengê wî ne

1132. Axir gûte Haşimê nîkunam[2]
Yan ez dê li Mekke bim û yan mam

1133. Çendî bi reca û dalevaye
Ber suzê ḥesed nebû tenaye

1134. Gû rabe me dê biçîne ʿUsfan
Meşhûr heye kahinek bi ʿirfan

1135. Her çî li me ew bigêrî bê bar
Pêncî şuturan didet bi hejmar

1136. Deh sal dê ji Mekke bît mişexte
Raḍîbûne bew qerar û bexte

1137. Rabûne cemaʿetek serûber
Bû layê wî kahinê ḥukimker

1138. Wan qîṣṣe dema bû kir beyane
Haşim gû xudanê ʿîzz û şane

[1] Pîs, gemarî

[2] Navxweş, navşirîn

1139. Geryaneve s̱er qerarê taze
Haşim bi niyazê serfiraz e

1140. Dergavê Umeyye dan bi qencî
Yekser şuturêt bijare pêncî

1141. Haşim hemû ser birîn di gave
Ser qewmî hemû kirin belave

1142. Bar kirbû Umeyyeyê xû derḥal
Ew çu bû ʿEmûrîyê di deh sal

1143. Xûş gundek e ew li layê Şame
Evroke di Urdunê meqam e

1144. Ewwel eve bû nexûşî qewmay
Mabeynê di Haşim û birazay

1145. Haşim dimirît li Ẋezzeya Şam
ʿUmrê wî gehişte bîst û pênc ʿam

1146. Rûniştî li cê wî serfiraze
Ew Muṭṭelibê birayê taze

1147. Gerçî ku kuṛê wî Şeybe kuke
Emma wî demî nê ew biçuk e

**C/ج ʿEbdulmenaf Bîn Quṣey (Ebdulmenaf Kurê Qusey)**

1148. Êkek ji Qureyşîyan şehîr e
Ew ʿEbdîmenafê nav Muẋîre

1149. Piṛṛ qedr û kemal û mal û cah e
Piṛṛ husn û cemal şebîhê mah e

1150. Çwar kuṛ wî hebûn di piṛṛ kemal bûn
Ṣaḥib huner û şirîn xîṣal bûn

1151. Mazintirî wan heman bû Haşim
Bapîrê resûlê Babê Qasim

1152. Yek ʿEbdîşems yekê dî Newfel
Yek Muṭṭelibê cewan û ecmel

**D/د Quṣey Bîn Kîlab (Quṣey Kuṛê Kîlabî)**

1153. Mezinê Mekehê Quṣey bû taze
Emma bi kemalê serfiraz e

1154. Nav Zeyd e li cê xû namidar e
Êkek bû ji mîrseran bijare

1155. Çwar kuṛ wî hebûn di law û rengîn
Her êk ji xû mazinek bû sengîn

1156. Du ʿEbdîmenaf û ʿEbdîʿuzza
Navê du ṣenem di pîs û exza

1157. Yek ʿEbdêquṣey bi nav dîyar e
Ew yê dî dîyar e ʿEbdêdar e

1158. Zengîn û gelek xudanê mal bû
Piṛṛ dan û sexa û piṛṛ kemal bû

1159. Ew bûye ji Keʿbe ê kilîldar
Zadê hecîyan û av ewî kar

1160. Nedwe ku cihê qise w meşûret
ʿAîd bi wî bû bi nav û şuhret

1161. Ala bû şeṛan ku wan dibestî
Ev cumle hemû Quṣey bi destî

1162. Wî xirvekirin hemû xizim çak
Qurtar wî kirin li ḥalê napak

1163. Rizgar wî kirin li dest neyaran
Asûde kirin bi tazekaran

1164. Lewṛa divîya heman gelek zûr
Dewrê wî ji bû ewan wekî nur

1165. Her ew bû binakirê bi hîmmet
Nedwe ji bû meclîs û meşûret

1166. Mazin bû dema Quṣey bibû pîr
Wî danî bû ʿEbdîdarî tedbîr

1167. Bêçare bû ew ḍeʿîf û jar e
Babê wî didanê çen ji kare

1168. Ger ʿEbdîmenaf û ger bira bûn
Ew cumle bi mal û ḥal di ṣa bûn

1169. Ew Ḥers̱ê hunerwer û bi cehwer
Her êk ji xû mazinek bû mîrser

1170. Bêçare bû ʿEbdîdar û bêkar
Lew babî tinê dikir kilîldar

1171. Zadê hecîyan û av û ala
Gel nedwe hemû ji bû wî vala

1172. ʿAdet bû ji Mekkeyê hemû sal
Wan xirvedikir ji milletî mal

1173. Bû weqtê hecê bû nan û şîvan
Bû herçî dihête Mekke mêvan

1174. Ev şule hemû ji dil bijare
Wî dan bi tinê bi ʿEbdêdare

1175. 1- Qewmek Benîşeybe yên gelek zûr
Ewladê di ʿEbdêdarê meşhûr

1176. Ta nuke ji beytê dergevan in
Ew pakekilîl bi destê wan in

1177. 2- Ala jî bi destê wan bû hemram
Ḥetta ku gehişte dewrê îslam

1178. Hem gûtine peyẋemberê şirînkar
Alayî bidev me her wekî car

1179. Îslam gûtî dînekê berîn e
Ala ji bû ẋeyrî wi çu nîne

1180. 3 û 4- Zadê hecîyan û av jî her we
Ew jî he bi destê wan çu nedwe

1181. Kuṛ ʿEbdîmenaf çuwar bi kûmel
Ew Haşim û ʿEbdîşems û Newfel

1182. Gel Muṭṭelibî bi kar û bare
Bûn naḥezê neslê ʿEbdîdare

1183. Gûtin me divêt biden di gave
Ew her du weẓîfe zad û ave

1184. Meʿlûm e ewan nekir qebule
Nêzîk bû mezin bibît ve şule

1185. Axir mezinan bi ray û tedbîr
Sulḥek dikirin bi rêz û teqdîr

1186. Gûtin me heman li nik cewan e
Ew her du bila bibin bû wan e

1187. Xizmatî ye pê nevêt neyarî
Ney dilreşî û ne pîsekarî

1188. Raḍî bûne neslê ʿEbdîdare
Ew her du didane wan neçare

1189. Wan qurʿe kirin li beynê xû çak
Ew bûne neṣîbê Haşimê pak

1190. Paşî wî bû Muṭṭelib xudane
Ta Şeybe dibû xudanê şane

1191. Paşî wî Bûṭalibê şirînkar
Ew her du ji bû wî bûne xûş bar

1192. Emma nê feqîr bû ew quṣurḥal
Mecbur bû ku deyn biket hinek mal

1193. ʿEbbasî bi qer didanê pare
Vî karî ḥeta biket îdare

1194. Ew çendî dihat feqîreḥal bû
Deynê ku li ser dilê wî tal bû

1195. Axir wî didan birayê ʿEbbas
Ew her du libatî deynê ḥeqnas

1196. Paşî wî ji bû kuṛê wî piṛṛ cah
Ew ʿalimê taze ʿEbdê Ellah

1197. Paşî wî ʿElî ji paş Muḥemmed
Dawudê sipî dil û şirîn qed

1198. Ew mane li du wî bû Suleyman
Xir bab û kuṛ in bi ʿeḥd û peyman

1199. Axir dikevin bi destê Menṣur
Ta çen xulefa ji neslê piṛṛ nur

1200. 5- Nedwe he bi destê wan dîyare
Ta ʿÎkrîmeyî firut bi pare

1201. Wî dabû Muʿawîyey ji canî
Wî jî bû emîrî kirbû xanî

1202. Axir ku mezin kirin ḥerem pak
Ew jî dikirin ji mizgeftê çak

**T(ت) el-Kîlab Bîn Murre Bîn Keʿb Bîn Luey (Kîlabê Kuṛê Murrey Kuṛê Keʿbî Kuṛê Luey)**

1203. Meşhûre Kîlab bi nav Ḥekîm e
Yan ʿUrwe bû ew pesindê şîm e

1204. Babê wî ye Murre neclê Keʿb e
Weqtê xû emîrê ehlê Keʿb e

1205. Keʿbê ku kuṛê Luey çu durr e
Sê kuṛ wî hebûn ʿEdî û Murre

1206. Yê dîke Huṣeyṣê nav û nîşan
Meznê Mekehê bû Keʿbê piṛṛ şan

1207. Qedrê wî gelek mezin bû taze
Nik xir ʿereban bi ʿîzz û naz e

1208. Her sal wî li weqtê ḥeccê rengîn
Wî xuṭbe dixwand pesind û sengîn

1209. Mizgînî didaye qewmî yekser
Êkek ji kuṛêt me dêt peyember

1210. Navê wî Muḥemmed e w şirîn e
Dînê wî ḥeta ebed mubîn e

1211. Her çî ji we geşte ew resûle
Dînê wî divêt biket qebûle

### W(و) Luey Bîn Ẋalib Bîn Fîhr Bîn Malik (Luey Kuṛê Ẋalibî Kuṛê Fîhrî Kuṛê Malikî)

1212. Ẋalib puserê Luey ye meşhûr
Mazin puderê resûlê piṛṛ nur

1213. Babê wî ku Ẋalibê şirîn nam
Babê vî ye Fîhrê ispehî kam

1214. Sê kuṛ wî hebûn Lueyyê ekrem
Yek Qeys e ewê dî Teymê Edrem

***

1215. Fîhrê kuṛê Malikî ji wan e
Meznê Mekehê bi ʿîzz û şan e

1216. Ḥeft kuṛ wî hebûn bi kameranî
Yek Ẋalib e her wekî te zanî

1217. Ḥerṣ̱ û Eṣed û Cewin Muḥarib
Ta ʿEwf û Ziib bira ne Ẋalib

***

1218. Weqtê wî bû hate Mekke Ḥessan
Meznê Yemenê birayê şeyṭan

1219. Gel Ḥîmyerîyan ku çenʿeşîret
Hate Mekehê bi pîsesîret

1220. Wî fikr e bigêrî Keʿbe wêran
Bew kîbr û ẋurûr û zûrê mêran

1221. Damezrî li Nexleyê bi ʿesker
Ba leşkerekê ʿeẓîm û şeṛker

1222. Fîhrê ku mezin li wê nuwalê
Ṣaḥib hunerê ji piṛṛ kemalê

1223. Wî gazî kirin gelek ʿeşîret
Kardîde ewêt xudanê ẋîret

1224. Ev şexṣe gûtî wekî dibînin
Dê Malê Xudê ji bin derînin

1225. Ev kare ji dil gelek me tal e
Êdî me nevêt ḥeyat û male

1226. Ev kare Xudê neket bibîtin
Namus me ḥeta ebed diçîtin

1227. Em lazim e şeṛ bikeyn tebayî
Ser Beytê ʿEtîq bi canfîdayî

1228. Ḥerbek bû mezin şedîd û tal e
Ḥîmyer direvin bû layê male

1229. Wan kirbîye şeṛ bi tîr û şîran
Ḥessanî diken ji wan esîran

1230. Ew mave esîr li wêrê sê sal
Axir xû kirî ewî bi çen mal

1231. Ew kefte rîya Yemen zemînê
Ew mir li rîyê xudanê kînê

### (Z/ز) Malik Bîn Neḍr Bîn Kînane Bîn Xuzeyme (Malik Kuṛê Neḍrî Kuṛê Kînaney Kuṛê Xuzeymey)

1232. Malik ku te zanî babê Fîhr e
Babê wî bi navê Qeys û Neḍr e

1233. Ev Neḍr e Qureyş e bab Kînan e
Serhing e bi heybet û cewan e

1234. Wî xirvekirin ʿereb bi ser êk
Xeṣlet wî hemû cewan û çen rêk

1235. Meznek çi bi şewket û celîl e
Duşmin wî hemû kirin ẕelîle

1236. Meşhûr e gelek xudan cemal bû
Ṣaḥib kerem û ʿeşîr û mal bû

***

1237. Êkê dî ji sîlsîlê Kînan e
Babê wî Xuzeyme xûş zuban e

1238. Ewladê di nêr hebûn çuwarde
Law çakê Neḍir ji wan zîyade

1239. Melkan û Neṣîr û ʿEmr û ʿAmir
Ẋezwan û Cîdal û Ḥerṣ̱ê mahir

1240. Malik û Ẋenem û ʿEwf û Cîrwel
Gel Mexremeyê û Seʿdê eşhel

**Ḥ (ح). Xuzeyme Bîn Muḍrîke Bîn Ilyas Bîn Muḍer Bîn Nizar (Xuzeyme Kuṛê Muḍrîkey Kuṛê Ilyasî Kuṛê Muḍerî Kuṛê Nizarî)**

1241. Meznê Mekehê Xuzeymeyê çak
Babê wî ye Muḍrîkeyê şeṛefnak

1242. Sê kuṛ wî hebûn bijil Kînane
Hewn û Esîd e û Eṣed bizane

1243. Her ew bû Hubel ṣenem ku danî
Ser banê wê Keʿbeyê ʿeyanî
***

1244. Ew Muḍrîkeyê ku bab e Îlyas
Îlyas e kuṛê Muḍer Xudê nas

1245. Fermuye peyemberê şefîʿ e
Ger çî Muḍer e eger Rebîʿ e:

1246. “Ew her du hebûn temam musulman
Nek carê civîn biden bi yek wan”

1247. Meşhûr Muḍerê kuṛê Nizar e
Du kuṛ wî hebûn ji dil bijare

1248. Yek ew bû te zanî pake Îlyas
ʿEylan e ewê dî nav ku Îlnas

**Ṭ.(ط) Nizar Bîn Meʿd (Nizarê Kuṛê Meʿdî)**

1249. Êkê dî ji wan mezin Nizar e
Babê wî Meʿeddê bextiyar e

1250. Çwar kuṛ wî hebûn hemû di hişyar
Mazin Muḍer û Îyad û Enmar

1251. Ew yê dî Rebîʿe nav di xûş in
Ew cumle bi ʿeql û fam û huş in

1252. Fermuye peyemberê şirîn nam
Ew bûn Muḍer û Rebîʿe îslam

1253. Roja ku mirin Nizarî ḥal bû
Ew zêde bi serwet û bi mal bû

1254. Wî xirvekirin kuṛêt xû her çwar
Weṣyet diketin ewan di guhdar

1255. Malê xû li wan diket belave
Her êkî bi tiştekî bi nave

1256. Ev çadire gû ku çermê ṣur e
Malek çi bijare ye çi zûr e

1257. Ew bû Muḍerî bibît mubarek
Pîrûz bî li wî hemû bi carek

1258. Ev xîvetê ṛeş ku taze mal e
Ew jî ji Rebîʿe bît ḥelal e

1259. Ev carîye ku me xidmekar e
Ew jî bû Îyadî pişk û bar e

1260. Ferşê me li ser ku taze meḥfur
Enmarî ewîş neṣîbeka zûr

1261. Eḥyane we pêk nekir li ser mal
Bedkarî neken gel êk û bedḥal

1262. Efʿî heye curhumî li Necran
Pusyarê bi wî biken ji dil can

1263. Wan bab dimirît di gav Nizare
Wan pêk nedikir ji mal û pare

1264. Rabûn û biçin bû layê Necran
Ser emrê Nizarê ten di qebran

1265. Ew çûn li rîyê bi keyf û şaye
Dîtî Muḍerî hinek gîyane

1266. Ew ḥêştirê ev gîyane xwarî
Yek çav e gûtî bi ẕatê Barî

1267. Hem lenger e gû Rebîʿeyê yar
Bê kilk e gûtî Îyadê hişyar

1268. Enmarî gûtî revuk nîşan e
Zûr pê nediçû dihat xudan e

1269. Pirsîbû ji wan ziman şirîne
Engûçi şutur li rê nedîne

1270. Gûtî Muḍerî şutur te yek çav
Gûtî şile yeş Rebîʿe dergav

1271. Bê kilk e gûtî Eyadê kuke
Enmarî digû şutur revok e

1272. Gûtin me nedîne ey birader
Emma ku dihêt xudanê bawer

1273. Ḥêştir ku çewa dibên we reng e
Zu bin ji me ra bibên direng e

1274. Bê fayde bû çendî gûtî wane

Gû wer dê biçîn bû karedane[1]

1275. Vêkra dimeşin hemû bû Necran
Efʿa dê biket şeṛîʿetê wan

1276. Wî qîṣṣe dema bû gût temame
Gû hûn çi dibên ji bû zelame

1277. Gûtin me şutur bi çav nedîne
Bawerke meger nîşan û şwîne

1278. Gûtî Muḍerî ji kum gîyayî
Layek me dî xwarbû yê dî mayî

1279. Min zanî lewa di fikrê hur e
Çavek ku ji ḥêştira wî kuṛ e

1280. Lew min gû Rebîʿe payê leng e
Şûn pê me ji wê didîn du reng e

1281. Hindek di diyar û hin nîhan bûn
Ev çende tinê me jê nîşan bûn

1282. Hem gûtî Îyadî lew me zanî
Bê kilk e şutur li yêk nîşanî

1283. Kişpil wê bi kûm me dîn bi çave
Ger ew we neba dikir belave

1284. Enmarî digût me zanî der an
Serşêt û revok e beste ezman

1285. Çen carê gîyayê taze û xûş
Hêlabû cihê gîyane lê bûş

1286. Her êkî dema we got şirîn zar
Ḥêştir gû evan nebirye ey yar

***

1287. Wî pirsî ji ḥalê wan ve taze
Navê xû dibên digel nîyaze

1288. Babê me hu gût li mergê cane
Hatîn ji me ra bikey beyane

1289. Gû hûn eve bin bi ray û fame
Ḥacet we nebû bi gûtina me

1290. Ev renge bi fam û huşê can in
Gû engûmeramê bab nizanin

1291. Zadek wî cewan bû wan dianî
Qedrek lê dena bi ʿîzz û şanî

1292. Zadê xû ewan ku xar temame
Wî gûtî ji bû ewan merame

1293. Gû: Qubbe û zêr û ḥêştirêt şur
Ew bû Muḍerî ne pişkeka zûr

1294. Ger çadir û hesp û ger dewar in
Her çî ku ṛeş in Rebîʿe bar in

1295. Ew carîye serbelek nîşan e
Pê rûyê belek Îyad xudan e

1296. Raêxe eger çî ʿerḍ û xanî
Enmare ji wan diket xudanî

1297. Raḍîbûne xir bi ew qerare
Her wek wî gûtî bi pişk û bare

**Y(ى) Meʿd Bîn ʿEdnan (Meʿdê Kuṛê ʿEdnanî)**

1298. Mazin bû Meʿeddê namidar e
ʿEdnan e wî bab û kuṛ Nizar e

1299. Ewladê di wî çuwarde kuṛ bûn
Ew cumle ji şuhretê di piṛṛ bûn

1300. Serdarê ewan heman Nizar e
Bapîrê resûlê namidar e

1301. Ḥerbek li zemanê Buxtûneṣṣer
Wî Necd û Ḥîcaz kirin mukedder

1302. Ew hat ʿereban bi leşkerek zûr
Meydan wî kirin li xunê wan ṣur

1303. Bê ḥed wî kirin ji derdeḥalan
Çen mal û biçûk birin bi talan

1304. Barî dihinart bû Ermîyayî
Peyẋember û qaṣidê Xudayî

1305. Meşhûr e Xiḍir ku Ermîya ye
Ta nûke xudan heyat û maye

1306. Her wek wî bû Berxîya peyember
Hun her du herin bû Mekke yekser

1307. Nîv mêr e Meʿeddê neclê ʿEdnan

[1] Kesê ku karî dide ji Xwedê tê gotin

Pakij neseb e ji malemeznan

1308. Qurtar wî biken li ḥerb û kujtar
Nesla wî didem resûlê muxtar

1309. Serdarê peyẋemberan û xatem
Xûşevyê me ew li cumle ʿalem

1310. Lez kirbû ewan bû Mekkeya pak
Ew hêj ku nehatî merdê seffak

1311. Wan gel xû birin Meʿeddê piṛṛ şan
Bû layê Necef bû gundê Ḥerran

1312. Damezrî li nik ewan bi xuşḥal
Piṛṛ qedr û buha ḥeta du yek sal

1313. Înaneve ew bû Mekke ya pak
Ku cumle bira çûyên Yemen xak

1314. ʿEdnanî bira du Nebt û ʿAmir
Şeş kuṛ wî hebûn xudan mefaxir

1315. Reys û ʿEden û Ubeyy û Ḍeḥḥak
Law çakê Ẋenî Meʿeddê dilpak

1316. Ev sîlsîleya ji dil bijare
ʿEdnanî ji wê ve ney dîyar e

## 2. MÎLADUHU WE ÎRHASATUHU (JIDAYÎKBÛNA WÎ Û NÎŞANÊN WÎ YÊN PÊŞÎ)

1317. Ellah mezin û xudan kemal e
Piṛṛ ḥîkmet û reḥmet û cemal e

1318. Qedrê wî bilind û qudreta wî
Karê wî pesind û ḥîkmeta wî

1319. Çavek wî bi reḥmetê neẓer kir
Reḥmek ji bû ʿalem û beşeṛ kir

1320. Ḥetta ku nehat resûlê Eḥmed
Ev ʿaleme berbela bû bê ḥed

1321. Dunya bû tejî ji şîrk û kufrê
ʿAlem bû pirî ji cewr û ẋedrê

1322. Her kes bidîya cîhan li ew dem
Dabînî xerab e mal û meitem

1323. Nageh ji Xudê îrade ṣadir
Bû da bidetin resûlê axir

1324. Hem ṛehber û rehnumayê ʿalem
Hem nûr e wekî çirayê ʿalem

1325. Ev nûre ḥeta ku ew nîhan bû
Kufr û neḥeqî tijî cîhan bû

1326. Ew hat û bi hîmmet û dîrayet
ʿAlem bire ser rîya hîdayet

1327. Ev ʿerḍe tinê jinû bi can hat
Roja ku peyemberê zeman hat

**Zewacu Ebîhî ʿEbdîllahî (Zewaca Babê Wî Ebdullahî)**

1328. Şeybe ku Nebî dibîte bapîr
Ṣaḥib hunerê bi ray û tedbîr

1329. Ḥîna ku ewî temam dizanî
Qurbanî qebul bû lew cewanî

1330. Hizrêt xû kirin digûtî lazim
Ez bû jineka cewan bixwazim

1331. Emma li Qureyşîyan bî bê çûn
Nazik beden û şirîn û xatûn

1332. Eṣl û neseb û xuliq pesindî
ʿEql û edeb û bejin bilindî

1333. Wî kes nedî laîqê s̱enayê
Wî ẋeyrî şeṛîfe Amînayê

1334. Babê wê Weheb bi nav û nîşan
Meznê hemû zuhrîyan bû piṛṛ şan

1335. ʿUmrê wî gehişte bîst û çware
Wî Amîne lê ku kirbû mare

1336. Ev lawe cewan û newresîd e
Ew kiçke şirîn û kes nedîte

1337. Ev pakekiçe bi naz û şeng e
Ew lawe dilêr û taze reng e

1338. Daxwazî kirin bi resm û ayîn
Lê mare kirin miwafiqî dîn

***

1339. Fermuye peyẋemberê mubarek
“Nêzîk me nebû zîna çu carek

1340. Ez bûm li nîkaḥ durist û ṣaẋlem
Hel min ku ḥeta biçîte Adem”

1341. Weqyek du li zêr zîvî mare
Babê wî ji bû kirin dîyare

1342. Ev ʿeqde ewan kirin tedarek
Ṣed car ku li wan bibît mubarek

1343. Ew xanî dibît bi xêrê ava
Ew her du cewan ku bûk û zava

1344. Heyva Recebê tebaẋ meh bû
Wan xanî li geliyekê Mekeh bû

1345. Ew gelye li wê bi nav e meşhûr
Geliyê Ebûṭalibê şeṛef zûr

1346. Ev kavledinê jinû bû ava
Ew ʿEbdê Xudê dema bû zava

1347. Ev kevnedina we pîr û fanî
Nubuve bi zînet û cewanî

1348. Nêzîk e cîhan bibî munewwer
Ev ʿaleme ron bibît seranser

1349. Rojek bi helêt ji kuncê reḥmet
Vê ʿalemê ron biket bi ḥîkmet

1350. Ev sale bû lê bi taze qîlan
Hatin Mekehê xudanê fîlan

1351. Ey dûsto eger tu jin dixwazî
Xaṣma tu eger şeṛefnewazî

1352. Hişyar bî neẓer nekey li malî
Yan lawînîya bi bê kemalî

1353. Çakan tu binêre yêt bi şuhret
Paşî tu bikey bi dûst meşûret

1354. ʿEql û neseb û ḥeseb bixwaze
Dîn û şeṛef û edeb bixwaze

1355. Hişyar bî li pey wî bî ḥeyayan
Zînḥar li cewan û nasezayan

**Qiṣṣetu Eṣhabîl Fîl (Çîroka Xudanên Fîlan)**

1356. Bapîrê resûlê îns û canan
Meznê Mekehê bi ʿîzz û şanan

1357. ʿUmrê wî gehişte salê ḥeftê
Ew piṛṛ şeṛefê wekîlê beytê

1358. Ew Ebreheyê bi kerb û pîlan
Hatin Mekehê suwarê fîlan

1359. Ew Keʿbe ku qîblegahê ummet
Ew hat û xirab biket bi quwwet

1360. Keʿbe ku qedîm bi nav û nîşan
Nav wan ʿereban bi ḥurmet û şan

1361. Beʿḍek neḥezan li wan nexûş hat
Agir ji ḥesed li wan bi cuş hat

1362. Ẋessan ku ʿeşîretek bi nava
Beytek kiribûn li Ḥîre ava

1363. Hem Ebreheyê berî ji behr e
Mezinê Yemenê bi cewr û qehr e

1364. Neccaşî li wêrê kirbû walî
Nakes biçeyê li xêrê xalî

1365. Ava diketin bi kar û bar e
Beytek çi mezin bi ṣed nîgar e

1366. Ṣenʿa ku çi şarekê cewan e
Ew beyte li wê dikir beyane

1367. Çendî wî hebû şiyan û ṭaqet
Xemlandî belê bi zêr û zînet

1368. Wî gûtî ʿereb dihên bi panî
Bû ḥecc û ziyareta vî xanî

1369. Gava ku dî bê rewace nik wan
Ew rabû belê bi kerb û ʿudwan

1370. Ew hat û bi quwwet û bi tundî
Gel kîn û gef û difinbilindî

1371. Ba leşkerekê cewane mêran
Da beytê biket xirab û wêran

1372. Ḥîna ʿereban xeber we zanî
Agir li ẋeman gehişte canî

1373. Ku êk Ḥebeşî bi navê ʿAmil
Vê Keʿbeyê ew bigêrî kavil

***

1374. Meznek li Yemen xudan ʿeşîret
Rabûye şeṛê wî ew bi ẋîret

1375. Navê wî diyar e Ẕûnefer bû
Ew nav ʿereban xudan huner bû

1376. Şerkir bi hemû kes û ʿeşîran
Axir dibitin ji wan esîran

1377. Her kes ku şeṛî neket li ser dîn
Bê şek dê li wî nexûş bibî jîn

1378. Ev jîne bila nebît bi ḥîzî
Emma bi mirî digel ʿezîzî

1379. Bimrî tu bila bi can nemînî
Nek dînê xû nacewan bibînî

1380. Êkê dî wesa li ser riya wî
Lê rabû şeṛî û naşîya wî

1381. Navê wî Nufeyl e şehreyar e
Meznê du ʿeşîretêt bijare

1382. Çendî xebitî bi ḍerb û şîran
Ew jî dibitin li wan esîran

1383. Ew gel xû dibet leʿîn bi zûrî
Da bibite delîlê rahê dûrî

1384. Nêzîk bû li Mekkeya şeṛîfe
Ew pîsexeyalê dil ji cîfe[1]

1385. Êkek wî hinart li wan suwaran
Talan biketin li wan kinaran

1386. Talan wî kirin bû bûşeleşker
Garan û mer û dewar û ḥêştir

1387. Bapîrê resûlê mey mubarek
Ṣed ḥêştirê wî birin bi carek

1388. Melʿun ku dema gehişte Ebṭeḥ
Rabû Mekehê jinû biket seḥ

1389. Qaṣid wî hinarte Mekke dergav
Meznê Mekehê ewê xudan nav

1390. Bêjê me nîye xeyalê kuştin
Xwînê li feqîr û jarî rêjtin

1391. Gel ehlê Mekê ne ez bi kîn im
Bes Beytê ʿEtîq li bin derînim

1392. Şeybeyî ku dema xeber we zanî
Ew rabû bi çustî û cewanî

1393. Hindek li kuṛêt xû yêt bijare
Ṣaḥib huner û cemal û kare

1394. Hindek mezin û bijare yêt şar
Kardîde xudan kemal û kiryar

1395. Wî gel xû birin bi tazekarî
Bû layê neyarê sîne ṭarî

1396. Çûn urdîgehê û şehinşînê
Dîn Ebreheyê xudanê kînê

1397. Her êk bû ji wan wekî emîrek
Her êkî bi destî çake şîrek

1398. Ger şîr û rim in eger kivan in
Meşhûr e çek û sîlaḥê wan in

1399. Rûniştî xudanê kîn bi ʿîzzet
Gel çen mezinan bi zêr û zînet

1400. Şeybey digûtî bi rêz û nîşan
Wek şêxê ʿereb selam li dîwan

1401. Ew çendî bi şewket û cewan bû
Du hinde bi heybet û bi şan bû

1402. Wî gû neferek bi tercumanî
Bêjê çi kesî çi şûl tu anî?

1403. Wî gû mezin im di vê nuwalê
Cîranê evê şeṛîfemalê

1404. Hatîme çi qed te anî talan
Da tu bideyev xudanê malan

1405. Nê ʿeyb e ji serwer û emîran
Destê xû dirêj biken feqîran

1406. Ḥîna ve bihîst xudanê kînê
Ew kefte sema û pêkenînê

1407. Gûtê tu dixwuy ẋemê ji malî
Tu çake bû Keʿbeyê binalî

1408. Xir mal te biçît ne wek bibînî
Bê qedre muqeddesek li dînî

1409. Vî ceyşî bibîn û quwweta min
Dê Keʿbe bikem temam serûbin

[1] Cesedê mirî, laşê rizîyayî, mirî.

1410. Şeybey gûte wî û ew girnicî
Carek tu bidev me mal bi qencî

1411. Ev male henuke em xudan în
Vê Keʿbeyê bê xudan nizanîn

1412. Tu red bikeve ji bû me malî
Hel te û xudanê beytê ʿalî

1413. Ew Keʿbe wekî ne bê xudan e
Ṣed ceyş ewê heyîn nîhane

1414. Wî gû bi ẋurûr û xûdperistî
Malê we didemve nîne qeydî

1415. Emma sibehî meger nemînim
Dê beytê ʿetîq li bin derînim

1416. Lew hatime ez bi leşkerê zûr
Da malê Xudê we ez bikem kur

1417. Melʿûn dixwûrî bi kîn û kerbê
Ageh ne li kar û barê ẋeybê

1418. Wî Keʿbe didî ku bê xudan e
Lew wî dihusîn li wê didane

1419. Xurtan tu dibînî zûr ji caran
Ẓilmê ku diken feqîr û jaran

1420. Ew çunke di bê kes û di jar in
Lew serserê wan çu gurgê har in

1421. Her çî tu bibînî ew bi pişt e
Ew nik mezinan bi qedr û qişt e

1422. Ew çunke li gel Xudê neyar in
Lew hinde bed in di pîsekar in

1423. Lew dilreş û dilreq in ji ʿîşyan
Ew çunke diken gudarê şeyṭan

1424. Wan serve ḍeʿîf û jar dibînin
Lew serserê wan bi kerb û kîn in

1425. Ev ṭebʿe ne taze ye li mîran
Xurtî ku diken li wan feqîran

1426. Nê şeṛm e li wan eger ku mêr in
Bê pişt û kesan bi wan bi wêr in

***

1427. Hişyar bî bila tu xurtî taze
Pîçek bû Xudê mezin bi saze

1428. Guhdar be Xudê te agedar e
Ser ḥeqqê feqîr û jarî yar e

1429. Her çen mezinî dixwuy ʿezabê
Roja ku Xudê diket ḥîsabê

1430. Al qisse ku roj li wan helatî
Rabûne kesê ecel wî hatî

1431. Karê xû dikir bi zêr û zînet
Mexrurê bi ʿesker û bi quwwet

1432. Ew ser supehî ne tazekar e
Tim bûye li fîlê xû suwar e

1433. Wan rokire wê niḥalê Mekke
Dê Keʿbe xirab biken ne şekke

1434. Qemçî ku li fîl didan suwaran
Wan dest dikire hewar hewaran

1435. Hemyan bi zubanê ḥal nîda kir
Ẓilma te qîyameta me rakir

1436. Wan lew nedikir îtaʿeya wan
Wan ew didîtin bi cewr û ṭuxyan

1437. Her hinde dikey îṭaʿeya mîr
Ḥetta ku mezin nebît Xudêgîr

1438. Nê ferḍ e bikey gudarê sulṭan
Madem bi te ew ne bêjî ʿîşyan

1439. Hişyar bî nekey bû wan çi kare
Ku Barî li gel te bît neyare

1440. Ev kevnecîhane bê beqa ye
Hişyar bî ji ṭaʿetê Xudaye

1441. Ew fîle hemû çeqîn li meydan
Naçin bû Mekê bi zecr û lêdan

1442. Çendî ku kirin neman çi hîvî
Rokirine Yemen ji bû nişîvî

1443. Ew da kene xar ku wan di canî
Zur bîn bi revîn li vî mekanî

1444. Wan ber ku dida bû layê Şamê
Da bêy verisîn li qeyd û damê

1445. Bû layê Mekê didane ber dar
Ew da dev û dev kevin bi hawar

1446. Êdî tu mezan çi hate ser wan
Her wek ji me ra dibêjî Qurʾan

1447. Nabînî çi lê kirin xudan fîl
Leşker wî hinarte wan ebabîl

1448. Hatin di demî birek ji ṭeyran
Hindavî serê ewan bi dewran

1449. Her êkî du sê berek digel bûn
Ew leşkerê şahê lem yezel bûn

1450. Ṭeyyare çi ṭeyrekêt biçukan
Wan bumbe temet bi nîsk û nokan

1451. Ev ceyşe dema ji wan bi derkeft
Her êkî berek bi tuqê serkeft

1452. Têkda sikitîn û çûn helakê
Roreş ji Xudê xû çûne xakê

1453. Hatin bi ẋeḍeb ewan nezanî
Ẋafil ji qeḍayê kun fekan î

1454. Her kes ku ji dil Xudê nenasî
Axir dikevîte vî kirasî

1455. Şeybe mezinê ewê niḥalê
Şev xew nedihat li wê xeyalê

1456. Bû qewmê xû wî xeber hinarî
Evro hemû biçne der li şarî

1457. Ger pîr û cewan biçin çiyayan
Ew xir li Xudê biken recayan

1458. Ev beyte eger bibît xerabe
Dê cerg û dilê me bin kebabe

1459. Ev duşmine dê bihêt bi tundî
Nek gel we biken bi napesindî

1460. Ew çu bi reca û dad û tewbe
Tim girtî der û xezêmî Keʿbe

1461. Ey her me tu yar û piştevanî
Duşmin te gehişte dergê xanî

1462. Ya Reb tu dizanî ḥal çi renge
Ṭaqet me nîye bi van bi cenge

1463. Ṭaqet me nîye bi vî leʿînî
Êdî tu dikey wekî dibînî

1464. Ew çûne di nav şkeft û geliyan
Ew bûn li ẋem û elem ne ḥelyan

1465. Xir dev bi duʿa û dil ḥezîn in
Nek malê Xudê xirab bibînin

1466. Şeybe ku pitir j’ heman ḥezîn e
Aram ji dil û ji can wî nîne

1467. Ew çu sibehî bi yek hevale
Da beytê bibînîtin çi ḥale

1468. Wî Keʿbe ku dî durist e dergav
Rondik li xûş peşîn li du çav

1469. Ṣed carê dikir wî şukr û minnet
Ev beyte Xudayî kir selamet

1470. Ew çûn fikirîne ceyşê duşmin
Têkda temirîne xir serûbin

1471. Ew leşkerê hu cewan û perlaẋ
Ew qewmê hituve ehmeq û baẋ

1472. Ew fewce bi cundî û qumandan
Têkda ku bûyîne ar û bendan

1473. Wî zêr û silahê wan cema kir
Ḥetta ji xû ra xizîne dakir

1474. Ew male ji bû wî bûye serwet
Ḥetta wî ʿumr gehî nîhayet

1475. Ev male ne laîqî heman e
Laîq bi xudanê nan û dane

1476. Şeybe ku xudan sexa û qenc e
Pîrûz bî li wî ve mal û gence

1477. Wan paşî li reʿiyetê nîda kir
Duşmin ku werin Xudê fena kir

1478. Hatin digerîn di nav meʿesker
Paşmayê ewan birin serûber

1479. Hem duşminê wan Xudê fena kir
Hem malekê zûr bi wan ʿeṭa kir

1480. Roja ku Xudê birin fenayê
Peyẋemberê me di zik bû dayê

1481. Baʿis bi kemal û qedrê wî bû
Ev kare wî kir ku kes nedîbu

1482. Wî zûr e Xudê li nik te xaṭir
Ya Reb bide xaṭira wî Ṭahir

**Wefatu Ebîhî Ebdîllah Bîn Ebdîlmuṭṭalîb (Mirina Babê Wî Ebdullahê Kurê Ebdulmutelîbî)**

1483. Babê wî dema dikir teehhul[1]
Ba pirs û meşûret[2] û teemmul[3]

1484. Wî ʿeqdê xû best bi Amînayê
Ṣaḥib şeṛefê xudan ḥeyayê

1485. Heyva recebê kirin tedarek
Ev ʿeqde li wan bibît mubarek

1486. Zava ye xudan kemal û hîmmet
Ev bûke xudan cemal û ʿîffet

1487. Eṣl û neseb û ḥeseb li wan bû
Lew fexrê hemû ʿereb li wan bû

1488. Du sê mehekan bi keyf û şayî
Gel êk bûne ew bi canfîdayî

1489. Gel êk bûne ew bi dilviyanî
Ḥubbek çi şirîn ji cerg û canî

1490. Paşî bi sefer diçîte Şamê
Da ew biketin ji kesbê ṭamê

1491. Serbestî bijît bilan bi talî
Karek biketin ji bû ʿeyalî

1492. Her kes ji xû ra neket çi karan
Nagehte murad û pişk û baran

1493. Nê şeṛm e ji wan cewane mêran
Wan çav hebitin li nanê xêran

1494. Daran tu bi pişta xû bikêşî
Nek tu bi sualê dil biêşî

1495. Ḥemmalî bikey ne wek bixwazî
Xaṣma tu eger şeṛefnewazî

1496. Ger dê te divê bijî bi serbest
Tu helke li şulî bask û dest

1497. Karek tu bike ḥelal û taze
Dê bî du cîhan tu serfiraze

1498. Kiryarî[4] bikey gelek pesinde
Tuwçînî bikey du hin bilinde

1499. Ṣinʿet ji xû ra bikey cewan e
Hem dîn û ʿîbadet û jiyan e

1500. Ev lawe diçîte karewanî
Da xû digerêtve kî dizanî

1501. Destûrî ji wan heman dixwazî
Ya Reb tu muʿîn û karîsaz î

1502. Gel qafîlekê diçîte Şamê
Wî pişt bi Xudê bû wê meramê

1503. Geryave dema li gel hevalan
Gû çak e serî bidem li xalan

1504. Xalêt xû li mêje min ne dîne
Çak e qederek biçim Medîne

1505. Ev duresefer me kir lez û bez
Dê çim bû Medîne bên bidem ez

1506. Tiştê xû hinart li gel hevalan
Batî me selam biken li malan

1507. Ew çu bû Medîne wî nezanî
Ku ew dê li wê sipêrî canî

1508. Çen rojê li wê nexûş û mandî
Ta emrê Xudê bi cê gehandî

1509. Babê wî dema xeber ku zanî
Naxûşî gehişte newcewanî

1510. Ḥariṣ ku li xir kuṛêt wî meztir
Derḥal wî hinarte wê wî lezkir

1511. Ta geşte Medîneyê birayî
Canê xû sipartibû Xudayî

1512. Kes nîne nexwut evê şeṛabê
Wey bû mirinê digel ḥîsabê

1513. Geryave bira bi gir yû zêmar
Pişta me şikand birayê nazdar

[1] zewicîn
[2] şêwr
[3] Hizirîn, fikirîn
[4] tîcaret

1514. Ev roje belê li min bû ava
Can daye Xudê wî tazezava

1515. Şînî kete Mekkeyê bi carek
Bû lawê şirîn qed û mubarek

1516. Babê wî bi bû gelek keserdar
Zêde ḥerema cewan û dildar

1517. Vî lawî ji ʿumrî ber nexwarî
Ev yare me têr nedî bi yarî

1518. Ev kavledinê ku bê beqa ye
Bû kes ne dibit bû kes nemaye

1519. Mîrate nema li paş wî zêtir
Çendek li merî û pênc ji ḥêştir

1520. Gel carîyeka emîn û şîrîn
Axir ku Nebî dibîte dayîn

1521. Meşhûr e bi navê Ummû Eymen
Ew pakedila dilêr[1] û rewşen

1522. Ṣed ah û esef bû Amînayê
Bû wê keserê li wê cudayê

1523. Malxuyê wê çu di emrê Barî
Ev şewqê cîhan li wê bû ṭarî

1524. Dunya wê li paş wî tirş û tal e
Pirgende li wê bû mal û ḥale

1525. Ev yare dema li wê nîhan bû
Hemlê wê serê du sê mehan bû

1526. Daxû bi çi ḥal ḥeta ku bûrîn
Ew çen mehê may li hemlê şîrîn

1527. Dem dem wê didî di tazexewnan
Nîşanê di çak bi çendî lewnan

1528. Çen car wê didî ji wê dibû der
Nûrek wê cîhan dikir munewwer

1529. Çendan li xewê didayê mizgîn
Ku dê te bibît kuṛek çi sengîn

1530. Navê wî divê bikey Muḥemmed
Ew dê bi Xudê me bît mûeyyed[2]

1531. Peyẋember û qaṣidê Xuda ye
Hem ṛehberê dîn û hem çira ye

1532. Bû cumle beşeṛ dibît peyember
Peyẋemberê xir cîhanê yekser

1533. Nêzîke xirab biket bi çustî
Mala ṣenem û ṣenemperistî

1534. Ha weqte ṣelîbî sernixûn ket
Agirperisî ceger bi xun ket

1535. Încîl e eger Zebûr û Tewrat
Mensûẋ diketin bi neṣṣê ayat

**Exbaru'l-Kehenetu ʿen Mecîʿih ʿEleyhî's-Selam (Xeberên Xêvzanka di Derbarê Hatina Pêxemberî Silav li Ser Bin)**

1536. Peyda nebû hêj resûlê ummet
Derḥeq wî hebûn gelek ʿelamet

1537. Çen kahin û çen ji dûrebînan
Îxbar ji wî dan ji dil yeqînan

1538. Ger Şafiʿe ger Seṭîh û Şeqqî
Beḥsê vî Nebî dikir bi ḥeqqî

1539. Nêzîke bihêt dinê peyember
Vê ʿalemê êk biket munewwer

1540. Ew dê bî ji neslê Neḍreê ṭahir
Dînê wî dimînî ta ba axir

1541. Zur kes ji cû û felan ji eḥbar
Da bên dê bihêt resûlê muxtar

1542. Încîlê xeber didan seḥîḥî
Mizgînî bi wî ku day Mesîḥî

1543. Ew ṛast û durust û taze Încîl
Hêşta ku kesê nekirbû tebdîl

1544. Kar û ṣîfetê wî xir bi carek
Wê taze beyan dikir mubarek

1545. Elqîṣṣe - hebûne zûr ji nîşan
Nêzîk e bihêt resûlê ẕîşan[3]

[1] Destvekirî, wêrek
[2] Zexmkirin, harîkarî dan
[3] navdar

1546. Ḥetta te digûtî ew zeman e
Bû hatinê wî xudan zubane

**Mîladuhu ʿEleyhî’s-Selam**
**(Jidayîkbûna Wî Silav li Ser Bin)**

1547. Neh mahê ji Amînayê bûrîn
Roj roje ji wê dibûye şayîn

1548. Ḥetta ku bi xêr ji wê bû peyda
Ṭîflek bû hemû cîhan bû seyda

1549. ʿErḍ û felek û semak bi carek
Hemyan ji wî ra digût mubarek

1550. Ev kevnedinê jinû bû ava
Gava ve biçûke dît bi çava

1551. Heyva ku bi nav rebîʿê ewwel
Peyda bû belê resûlê ekmel

1552. Dûşembî bû meh gehê deh û dû
Pîrûz bî seḥer ku tê weled bû

1553. Ew dabû Xudê li eṣlê fiṭret
Sunnet kirî û bi taze ṣûret

1554. Xûş fesl e buhar û mahê nîsan
Ku hate cîhanê fexrê însan

1555. Fermuye Nebî bi qewlê meʿlûm
“Deyka mi didî dema ku ez bûm

1556. Wê dî bi du çav ji wêve rabû
Nûrek we ji bû wî Şam xûya bû”

1557. Lew roje Xudê numandî[1] nîşan
Ev ṭîfle ku dê bibî xudan şan

1558. Dê ron biketin cîhanê ṭarî
Qurtar diketin ji puçekarî

1559. Bapîrî dema gehiştî mizgîn
Buka te kuṛek nê bûye rengîn

1560. Ew rabû pîyan bi dil semayê
Çubû mezela wê Amînayê

1561. Wê gûte xezurî her çî dîtî
Her çî li xewê bi wî digûtî

1562. Nûrek me nihû didî bi çavan
Navek bi me gû ne wek çi navan

1563. Navê wî gûtin bikey Muḥemmed
Xûşev ye li nik Xudayî bê ḥed

1564. Şeybey ku didît ve taze mindal
Wî rakir û bir bû Keʿbe derḥal

1565. Navê dikir diyare dergav
Nevyê me Muḥemmed e şirînnav

1566. Pirsî bû Qureyşîyan ji canî
Navek me nedî çira te danî

1567. Navek te neyî ji bab û bapîr
Ev ʿadete bû digêrî teẋyîr

1568. Wî gûtî emel bi wî me zûr e
Mazin bibitin li jêr û jûre

1569. Mazin bibitin li nik Xudayî
Meḥmûdê hemû kesek tebayî

1570. Ev ṭîfle eger çi şîrexûr e
Emma me ûmêd bi wî çi zûr e

1571. Ḥetta ku li ser diburî ḥeftî
Yek ḥêştirê çak bûy vekujtî

1572. Ḥaḍir diketin ʿecîb zîyafet
Bû qewm û biraderan bi deʿewet

1573. Nandan xû eger çî wî nîşan e
Ev care tinê ʿeqîqê can e

1574. Her çen me keser ji babê wî ne
Ev kuṛke digû me ẋemrevîn e

1575. Xaliq bi me ra ku ev kerem kir
Wî defʿê hemû ẋem û elem kir

**Numuẓecun Mîn Îrhaṣatîhî Bîmîladîhî**
**(Nimûneyek ji Îrsahên Wî yên Jidayîkbûna Wî)**

1576. Roja bi weled bû ev peyember
Ev ʿaleme bû jinû munewwer

1577. Tewḥîdê Xudê xudan ẓefer bû

[1]Nîşan dan, temsîl

Lê kufr û ḍelal xû ker bi ker bû

1578. Xûşî û ʿedalet û emînî
Ṛastî û durustî û evînî

1579. Ew taze vejîn bi sunneta wî
Her baqî dibin û di ummeta wî

1580. Ew roje eger çî piṛṛ xurûş e
Emma çi li kafiran nexûş e

1581. Çendî li dinê mulûk û sulṭan
Ew ehlê ḍelal û kufr û kufran

1582. Nageh şuluqîn nexuşeḥal bîn
Wê rojê hemû ji xû ve lal bîn

1583. Ev kare gûtin me qeṭ nedîne
Bê sir nîye lê belaş we nîne

1584. Lazim dibitin li vê cîhanê
Tiştek li me dê bibet jiyanê

**Înşîqaqû Eywanî Kîsra (Tîkbûna Eywana Kîsray)**

1585. Kesra ye serûkê qewmê fursê
Ew zêde ketî di lerz û tirsê

1586. Ṣaḥib huner û ʿedaletê ew
Şêrwan e xudan ḥukûmetê ew

1587. Zanayê xudanê mulk û ʿesker
Dunyaperisê reʿîyyeperwer

1588. Îmdadê dihê xudan neyaran
Daxwazegehê feqîr û jaran

1589. Her çendî ku ew hebûye kafir
Navê wî bi çak dimînî axir

1590. Ev ʿedl û emane çen cewan e
Ew Şeʾnê me ye ne Şeʾnê wan e

1591. Nîşane bû ummeta Muḥemmed
Her dîne ewan diket mueyyed

1592. Ṭaqek wî hebû çi taze eywan
Yek bû ji ʿecaîbêt di bûnyan

1593. Panî û dirêjî û bilindî
Ṣed gez bû bi karê ʿeqilmendî

1594. Avakirî bû di bîstesalan
Ba her çî ewî di ḥal û malan

1595. Ṣed neqş û nîgar û zêr û zînet
Esbabê di puxte û bi qîmet

1596. Gulzar û çemen li çan û xwaran
Cûbar û burk li çwar kinaran

1597. Çen muḥkem e ew du hin şirîn e
Eywan e belê çi şehinşîn e

1598. Akincî bû ew bi ḥukimdarî
Ageh ne li kar û barê Barî

1599. Ḥukmê wî çil û du sal bû ew dem
Peyda bû wekî resûlê ʿalem

1600. Peyda bû bi xêr delîlê îman
Lew roje du şeq bû qesr û eywan

1601. Mîn cumle li bîst û çwar ḥewalan
Çwarde herifîn û ketne çalan

1602. Ev kare çiku bi emrê ḥeq bû
Lew roje binaẋê kufrê leq bû

1603. Nê hate cîhan resûlê xatem
Hem ṛehber û rehnumayê[1] ʿalem

i. ***

1604. Ew ṭaqe çi mazin û ʿecîbe ye
ʿIntîke û taze û ẋerîb e

1605. Çen mêje ye ew ʿecîbe kûşik
Ta nuke hinek he maye bê şik

1606. Ev sale me dî ve kavleeywan
Lew şarê bi navê Pake Selman

1607. Ew ṭaqê bilind û pan û çen çak
Bara pitirê ketîbû nêv xak

**Înṭîfau Narî Faris (Vemirîna Agirê Fursê)**

1608. Ey dûsto eger dikey tu pirsê
Agirperisan çi dî li fursê

1609. Roja bi weled bû canê canan

[1] Yê ku rêyê nîşan dide

Karek dî nedîbû ṣed zemanan

1610. Agirek hebû wan Xudê nenasan
ʿEbdînî ji bû dikir bi asan

1611. Ev qewme hemû gedaw ekabir
Wan secde dibir bû pêtê agir

1612. Ew agire çen şedîd û kel bû
Mîqdarê hizar ji sal bû hel bû

1613. Lewṛa nekesan digût bi yaran
Ev agire venamirî çu caran

1614. Nageh ṛeşimî li wan vemirya
Şun û eṯera wî ta vebirya

1615. Wan gûtî belaş nîye ve kare
Sîrrek bû heye û nadiyar e

1616. Tirsa me heye ku êk helistî
Eḥwalê me têk bidet durustî

**Nûḏûbû Buḥeyretî Sawetî (Hişkbûna Gola Saweyê)**

1617. Çik bûye beḥrikê Sawe gava
Dunya bi Muḥemmedî bû ava

1618. Ew hinde mezin bû ṣed gemîvan
Tê da dimeşîn di ḥînû gavan

1619. Beynê Hemedan û Rey hebû ew
Çik bû we dibêjî qeṭ nebû ew

1620. Ev kare gûtin çi renge kar e
Ev beḥre hişik nebûy çi care

1621. Sîrrek heye lê belê nîhan e
Her çendî niza çî ye w çewan e

1622. Wan bêxeberan nekir binêrin
Ey ew çi qeder nezan û hêr in

1623. Nê hate cîhan resûlê axir
Êdî ku dijîn ʿîbadê agir?

1624. Dê ḥeşrê li butperistî raket
Meznêt di cîhan tera bera ket

1625. Ew dê dete xaçperistî janê
Dê înî bû ẕaliman qiranê

1626. Tayê digehînte qewmê gûlê
Kafir dê hemû biken nuzûlê

**3.**
**REḌAʿUHU WE TERBÎYETUHU (Şîrdan û Xudankirina Wî)**

1627. Xûzmey li kesê Xudê ku dayê
Şîr daye biçukê Amînayê

1628. Ṣed xûşî bû wê jinê û mizgîn
Bû serwerê dîn ku bûye dayîn

1629. Çen jin bi sebeb wî behrewer bûn
Ew her du cîhan di xêrê wer bûn

**Muraḏîʿuhu ʿEleyhî’s-Selam (Şîrderên Wî Silav lê Bin)**

1630. Deyka wî diyare şîr didayê
Wê pêşî heman bi keyf û şayê

1631. Ew Bûlehebê wî bab e Şeybe
Caryek wî hebû bi nav Ṯuweybe

1632. Pêlek ewê şîr didayê taze
Piṛṛ şay û evîn û ʿîzz û naze

1633. Şîrê kuṛekê cewan û memduḥ
Meşhûr e bi navê taze Mesrûḥ

1634. Şîr dabû li pêş wî mamê Ḥemze
Hem Bûselemê bi rêz û ṭerze

1635. Şîr dayê ḥeta ku ḥeyyê bê çûn
Ev behre wî da Ḥelîme xatûn

1636. Mazin bû Ṯuweybe nik peyember
Hem nik ḥerema Xedîce dilber

1637. Qedrê wê digirt bi tazekarî
Şîrînxeberî û xûşdîyarî

1638. Çen carê xeber dikir rewane
Bû Bûlehebî Xedîce xane

1639. Bifrûşe ewê bi çendî qîmet
Ez dê bikirim ewê bi ḥurmet

1640. Bû xaṭirê vî resûl û yarî
Aza dê bikem di rahê Barî

1641. Nê ew Bûleheb gelek mirar bû
Ew kefte cenê neber qerar bû

1642. Paşî ku resûlî kirbû hîcret
Aza diketin nepakesîret

1643. Car car li Medîne yarê Barî
Bû wê dihinarî çen dîyarî

1644. Roja ku xeber gehî peyember
Geryave dema li cengê Xeyber

1645. Ku emrê Xudê bi cê gehandî
Ew tazedila resûl ḥebandî

1646. Pirsî ji birayê şîrî Mesrûḥ
Pêş dayê gûtin wî daye hem rûḥ

1647. Fermûy: "Çi xizim Ṣuweybe mane"
Gûtin: Çi kesek nemay bi cane

**Îrḍaʿu Ḥelîme Bîntî Ebî Ẕûeyb es-Seʿdîyye (Şîrdana Ḥelîma Kiça Zûeybê Seʿdî)**

1648. Meʿlûm e Qureyşîyan bû ʿadet
Xaṣma xû ewêt xudanê serwet

1649. Ewladê di xû didane dayîn
Ḥetta ku mezin dibûn û şîrîn

1650. Ḥetta ku mezin dibû du sale
Dayînê xudan diken bi male

1651. Ṣed xidmet û çakî û dîyarî
Gel wan dikirin bi tazekarî

1652. Newbet ku gehişt Ḥelîme xanê
Şîrî bidetin Şehê Cîhanê

1653. Wî gûtî bi Ḥerşê malxuyê çak
Em çake biçîne Mekkeya pak

1654. Ṭîflek ji xû ra qemî bihînîn
Xêrek ji xudanê wî bibînîn

1655. Ev sale qewî nexûş dîyare
Em belkî bi wî bibîn îdare

1656. Salek çi nexûş û nanşirîn e
Xaṣma me di malê ḥal çu nîne

1657. Ew nav ʿereban hebûn bi şuhret
Seʿdê kuṛê Bekrî wan ʿeşîret

1658. Meşhûr e ewan xudan ziman bûn
Ew piṛṛ bi feṣaḥet û beyan bûn

1659. Rabûne li gel hinek hevalan
Hatin Mekehê ji bû tefalan

1660. Ew sale li wan kirêt û ṛeş bû
Wê ro li giranî ser bi heş bû

1661. Ney dan û dikak[1] û şîr bû înan
Ney pûş û pelex bû beste ezman

1662. Ketbûne ẋeman bû qût û nanî
Çen tal û giran e salgiranî

1663. Geryabû şepirze zûr Ḥelîme
Nevyabû Muḥemmedê yetîme

1664. Lew her çî biçukê bab nemaye
Dayîn ne li ser bi keyf û şaye

1665. Lew raḍî nebû bi wî û rabî
Geryabû yekê bi day û babî

1666. Çendî xebitî Xudê we ḥez kir
Kes des neket û ji bû wî lez kir

1667. Wê gûtîye mêrî ez ḥezîn im
Ez çake ewî yetîmî bînim

1668. Ez şeṛmê dikem ji wan hevalan
Bê bar vegerîm bû layê malan

1669. Wî gûtî bihîne bê quṣûrî
Belkî bereket me bêt bi zûrî

1670. Ew bû bi qenaʿeṭa xû dilpak
Ev behre bi wî bû Ṣahê Lewlak

1671. Her kes bi Xudê ji dil sipêrît
Ṣed dad û meded ji wî dinêrît

1672. Geryave ji bû biçukê dildar
Da ew nebitin ji xû ve bê bar

1673. Wergirtî ewê li Amînayê
Ew menbeʿê behcet û buhayê

1674. Dana bû di kûş û ber cema xu
Memkek didetê digel ẋema xu

[1] Zad, dexil

1675. Memkê xû ḥeta biçûk dimêjît
Ḥeqqê xû ji wan temam dibêjît

1676. Ew dayke Ḥelîme ya we bê şîr
Şîr hate meman bi emr û teqdîr

1677. Bê şîr şuturek ewan li gel bû
Şîr hate guhanê wê û bel bû

1678. Wê her çî gûtî gûtin bilanê
Bapîrê wî ye xudanê danê

1679. Xaṣma bû kuṛê ku bab nemayî
Dûr nîne bibexşî mal tebayî

1680. Memkê xû Muḥemmedî xelaṣ kir
Memkê dî ji bû birayî xaş kir

1681. Lew dem bi wî da ʿedil Xudayî
Memkê dî nexwar ji ber birayî

1682. Ew memke biray dixwar bi têr e
Dê hu bî heval hevalê xêr e

1683. Wî xew ne dihat li birsê pêşî
Ew wê şevê têr nivist bi xûşî

1684. Geryaneve bû qebîle û mal
Ew taze xudanê bext û îqbal

1685. Ḥers̱î he digût li rê dizanî
Ṭîflek çi bi xêr me bû xû anî

1686. Dayînê digût me hîvî zûr e
Barî bidetin me jê sirûre

1687. Ev şev me ji wî ve dîne nîşan
Ev ṭîfle mubarek û xudan şan

1688. Bê şîr ez û ḥêştira lewaze
Şîr hate mem û guhan me taze

1689. Ew geştine mal bi keyf û şayî
Hem mal û fexir bû dan Xudayî

1690. Ma bes nîye wan li piṛṛ kemalê
Serdarê rusul ewan di malê

1691. Ev behre Xudê we kirbû teqdîr
Bû dayke Ḥelîmeya xudan şîr

1692. Wan du sê hebûn biçûk di malê
Êk ew  kuṛê şîrexûrê salê

1693. Du kiç jî Enîse û Cuẕam e
Şeyma eve ye xudan du name

1694. Wan taze hebûn birek sipî mer
Emma di şir û lewaz û laẋer

1695. Ney pûş û pelex aqar û pawan[1]
Ney şîr di pez û şutur hebûn wan

1696. Gava ku ewan gehîne menzîl
Xêr û bereket ji wan bû nazîl

1697. Şîr hate merî ewan bi bûşî
Her rojê ji xû du car diduşî

1698. Wan çan û rex û ʿeşîreta wan
Peşkek di merî nebû bû derman

1699. Ev luṭfe lewa Xudê bi wan kir
Wan xidmetê serwerê cîhan kir

1700. Ew bûn ji wî ra bi xêrê karî
Helbet bereket bû wan dibarî

1701. Barî ku xudanê luṭf û dane
Ṣed feyḍ û kerem diket bi wane

1702. Ber xûşevî û çirayê ʿalem
Dê çakî bi wan biket dema dem

1703. Luṭf û kerema Xudê nîhan e
Bê ḥed didetin hizar kesane

1704. Zengîn diketin hizar gedayan
Bê ṛenc û ʿemel didet ʿeṭayan

1705. Ṭahir te Xudê feqîr û jar e
Muhtacî kesê nekey çu care

1706. Dilzînde bikey bi nûrê ʿîrfan
Vî bendeyê piṛṛ gunah û ʿîṣyan

1707. Ev ṭîfle ku ṛehberê cîhan e
Dayîn vî demî Ḥelîme xan e

1708. Her çen ewê şîrê xav didayê
Şeymayê du hinde çav didayê

[1] Cihê qedexekirî, pejan

1709. Geh landikê bû bi naz hijandî
Lay layê digût û ta nivandî

1710. Ew bigrî eger wê dil diêşa
Ger bêşî li ẋem wê can dikêşa

1711. Dayîn ji wî ra çi qed bikar e
Dadûk nê du hin bikar û bar e

1712. Geh bû dil û can dikir di cûlan
Geh wê dibire deran û kûlan

1713. Wê car dikire milê xû taze
Car care li piştê xû bi naze

1714. Dem dem wê dibir bû nav hevalan
Dem larî li gel dikir li malan

1715. Ger ew digirî bi naz û ẋencan
Ṣed car xû dikir fîda çu qencan

1716. Elqîṣṣe li nik heman şirîn e
Meḥbûbê dilan û nazenîn e

1717. Meşhuûr e wekî diken rîwayet
Barî ku bi wî dikir ʿînayet

1718. Hêşta ku di landikê tefal bû
Ew zêde bi ḥurmet û delal bû

1719. Çen car bi tinê dema dihêlan
Ew bû digirî di mehd û cûlan

1720. Landik melekan bi emrê Barî
Bû wê dihijand bi tazekarî

***

1721. Çen car bi tibil dikir îşaret
Bû layê mehê bedel ʿîbaret

1722. Ev heyve dibû bi emrê bê çûn
Wek wî divîya bi hatin û çûn

1723. Ew nûke bi emrê wî guhdar e
Ew dê sube şeq bitin dûbare

1724. Eṣḥabê di wî xudan dîrayet
Pirsîbû ji wî ʿeceb rîwayet

1725. Wî gûtî “belê bi luṭfî Barî
Min pê dikirin ji bû xû larî

1726. Hawîş dikirim ji ber girînê
Dilxûş dikirim wê ẋemrevînê”

1727. Ev xûşevîyê Xudayê ekber
Ev xelke ji ber wî daye êkser

1728. Elbet didetê ji bû şehamet
Ṣed muʿcîze û hizar keramet

1729. Ev ṭîfle li nik ewan bi naz e
Mazin bûye hêdî hêdî taze

1730. Ew gunde ku dilguşad û çak e
Du hinde sivik hewa û xake

1731. Meʿlûm e hewayê çûl û gundan
Saẋtir li hewayê şar û buldan

1732. Ew nav ʿereban hebûn bi şuhret
Ezman di feṣîḥ û piṛṛ belaẋet

1733. Ew gunde li wî gelek bi xêr bû
Ezmanê şirîn li wêrê fêr bû

1734. Ḥetta wî bi xû we daye ferman
Çêtir we xiran me zanî ezman

1735. Ewwel qureşî nijad û s̠anî
Ezman li Benîbekir me zanî

1736. Teqṣîr ne dikir ewan ji xidmet
Roj roje mezin dibû bi surʿet

1737. Ger gazî dikir: Belê bi qurban
Daxwaz bivîya didanê der an

1738. Şeyma xû ji wî gelek bû hişyar
Çêtir ji birayê xû du ṣed car

1739. Gav gave dibir bû dûrê malan
Car care bû sergir û nûwalan

1740. Ẋafil nedibû ji wî çi gavan
Her maçî dikir li rû û çavan

1741. Ḥetta ku du sal diçûn bû bispûr
Şîrîn qed û dêm wekî gula şûr

**Reddûhû Îla Ûmmîhî Beʿde Seneteynî (Vegerandina Wî bo Dayika Wî ya Piştî Du Salan)**

1742. Weqtê ku du sal diçûn li ser wî
Ew zêde ḥezîn dibûn li ber wî

1743. Şîrdan wekî muddetê du sal e

Nê lazime ew bibenve male

1744. Rabûye Ḥerṣ digel Ḥelîme
Wan daẋ û keser di dil elîm e

1745. Ger xuşk û bira û bab û dayîn
Ber ahê fîraqê bûn cegerxwîn

1746. Hilgirtine ew serê şefayê
Bû layê Mekê û Amînayê

1747. Wan xuşk û bira xû lê bû şînî
Dê kêve biben vî nazenînî

1748. Zîmar dikirin bi ah û fîẋan
Ku dê li me ten bimînî bê can

1749. Ev taze bira me hin vîyayî
Ew ku li me dê biket cudayî?

1750. Ev puçedinê ne ew çi mal e
Karê wê cudayî û zewal e

1751. Lêk durketina ji dil hevalan
Cê êş û ẋeman û ah û nalan

1752. Ey pîredinê tu piṛṛ fîraq î
Ney dûstê kesî bû kes ne baqî

1753. Her çî tu bivêy ji dil nezan e
Bê mal e ewê wî mal cîhan e

1754. Her cennete lê meqamê xûşî
Ya Reb tu bidey feqîrê Şûşî

1755. Zanî ku ewan fîraq e êdî
Rabûne ser û du çavê êk dî

1756. Wan xuşk û bira bi daẋeka zûr
Wan taze li yêk dî xwastî destûr

1757. Gû ey serê xûşî û nîyaza
Ṣed car ji me gerdena te aza

1758. Wan taze yek û du maç kirin têr
Ser çavê me dê biçî li gel xêr

1759. Gerçî tu du sal li nik me bûyî
Her wek me nedî dema tu çuyî

1760. Gel xeyrê biçî li ser du çavan
Naçî tu ji ber me ey çu gavan

1761. Ya Reb tu biçî bi xêr û şayî
Yarê te Xudê bî ta tu mayî

1762. Madem ku Xudê we kirye teqdîr
Nê ẋeyrî ṣebir me nîne tedbîr

1763. Ger ṣebrî nedet Xudê bi reḥmet
Dê ḥal me çi bî bi êş û zeḥmet

1764. Her ṣebr e tinê şîfa û derman
Her ṣebr e belê ʿîlac û derman

1765. Ev Ḥerṣe digel Ḥelîme rabûn
Her çen ji Nebî di canfîda bûn

1766. Emma ku du sal li ser wî bûrîn
Rabûn bireve resûlê nûrîn

1767. Hatin bû Mekê bû layê dayê
Her wek ku qul kirîn berayê

1768. Daykê li cîhan ku bes hebû ew
Dûr nîne li fîrqetê nehêt xew

1769. Xaliq xû dizanî ḥal çi ḥal e
Deyka ku ceger nedî du sale

1770. Ḥîna digehîne ber derê mal
Şa bûne ji hatneva wî derḥal

1771. Deykê û xidamê Ummû Eymen
Têr bûse kirin li çav û gerden

1772. Ey tu ji me xûşî û ḥeyat î
Tu ser serê dayka xû hatî

1773. Wey ṣebr û dil û rûnayê çavan
Nê tu me ji bîr neçûy çi gavan

1774. Bapîrî ku dîtî ev gula şur
Şa bûye ji qelb û can gelek zûr

1775. Hilgirtbû ew li ser milê xû
Têr maçî dikir ji bû dilê xu

1776. Ey nûrê du çav û canê min tûy
Ey serwerê xanedanê min tûy

1777. Madem ji me ra Xudê tu dayî
Babê te me jê çi ẋem nemayî

1778. Memnûn ji te her ez im Ḥelîme
Çen taze mezin bû ev yetîme

1779. Ew taze xelat kirin şirînkar

Laîq bi ewan çi mal û dînar

**Îstîrcauʿhû Helîmete Merreten Sanîyeten (Carê Duyê Vegerandina Wî bo Helîmayê)**

1780. Deyka wî bi wî ku çendî şa bû
Dayînê du hinde dil nema bû

1781. Lewṛa ku ewan didît bi zûrî
Xêr û bereket li wan dibarî

1782. Ḥers̱î û Ḥelîmeya şirînkar
Gûtin: Erê Amîna keserdar

1783. Ey ba ḥeseb û neseb temîz î
Carek dî bidevme vî ʿezîzî

1784. Ṣed xêr û xûşî me jêve dîne
Em xir bi sebeb serê wî jîne

1785. Carek dî bidevme tu Muḥemmed
Memnûnê te dê bibîn muebbed

1786. Meḥbûb e li nik me nazenîn e
Em xir hemû dem fîdayê wî ne

1787. Ew bêteve nik me çendekê dî
Ew dê me biketve zînde êdî

1788. Gerçî ji te ye ve beçkeşêr e
Emma me ji wî nebûyne têre

1789. Em xir ji wî xadim û emîn în
Her rojê tu hezbikey dihînîn

1790. Ba çendî ji hîvî û recayê
Ta davê dubare Amînayê

1791. Ṣebrê min e gerçî ev cewane
Qedrê we li nik me zûr giran e

1792. Ez çendî digel wî piṛṛ evîn im
Emma dilê hingû naşikînim

1793. Ṭîflê me nedîtî têr çi gavan
Ez dê bidemev we ser du çavan

1794. Gel iznê xezîrê piṛṛ kemale
Wê davê Muḥemmedê du sale

1795. Ew Ḥers̱ û Ḥelîme taze şa bûn
Wan çendî duʿa kirin û rabûn

1796. Geryaneve ew bi keyf û xûşî
Ey her bi vî ye me ʿeyşê nûşî

1797. Gava digehin bû derkê xanî
Şa bûne hemî ji qelb û canî

1798. Wan xuşk û bira ku dil dişûtin
Têr maçî diken ji can ve gûtin

1799. Ey ruḥ û rewanê xir welatî
Tu hatî li ser serê me hatî

1800. Em xir ji te ra di canfîda yîn
Şeyma û bira û bab û dayîn

1801. Minnet ji Xudê me çav dubare
Ron bûn bi birayê nazdare

1802. Carek dî Muḥemmedê Qureyşî
Damezrî li wê bi keyf û xûşî

1803. Gav gave diçûn nûwal û zûran
Gel xuşk û bira li jêr û jûran

1804. Car care li malê rewşê xan e
Roj roje li çûlî berxevan e

1805. Seyran dikirin li gel hevalan
Gavê li derê û gav li malan

1806. Her çendî li nik heman bû dildar
Şeyma bû li wî xudan û hişyar

1807. Xidmet wê dikir li wî wekî çav
Her çî bivîya didayê dergav

1808. Meḥbûb e li nik heman şirîn e
Nazdar û cewan û ẋemrevîn e

**El-Qiṣṣetuş Ṣaqîş Ṣadrîhîş Şerîf (Çîroka Vekirina Sîngê Pîroz)**

1809. Paşî du sê heyvekan li vê car
Karek dî Muḥemmedî ʿeceb kar

1810. Rojek bi viyan û keyfê canî
Ew bûye li çûl bi berxevanî

1811. Larî dikirin li gel hevalan
Geh ser gir û dem li nav nûwalan

1812. Ev kûmebiçûke çen cewan in
Hem larî diken û hem şivan in

1813. Nageh ku didîn du sê zelamek
Hatin ne çi gûtin û selamek

1814. Êk ṭest û mesîn digel di zêrdar
Sîkar bû di dest yekî çi sîkar

1815. Piṛṛbûne Muḥemmedî ku hatin
Tirsîn û biçûk hemû helatin

1816. Ew cumle revîn binê nuwalê
Gû dê vekujin xudan cemalê

1817. Şeyma û bira bi dilnewazî
Ew taze li wan dikirne gazî

1818. Ey şebhî we kes çi car nedî me
Zînhar nekujin ku ew yetîm e

1819. Bû çî dikujin ve newcewan e
Kiçkûk e şeṛîf e xanedan e

1820. Ey tu mezinî li wan zeʿîmî
Kîna te çî ye li vî yetîmî

1821. Nê şeṛm e li ser we ger we mêr in
Hun bew sebîye nefam biwêrin

1822. Axir ku nekir reca li wan kar
Wan rokire mal bi dad û hawar

1823. Ey babe hewar û day Ḥelîme
Zû werne birayê haşimê me

1824. Hatin me du sê kesek ji ẋeflet
Piṛṛbûne ewî negût û muhlet

1825. Sîkar me didî di destê wane
Zû bin bi ʿecel werin rewane

1826. Zû bin dê bigehne vî ẋerîbî
Nek ew vekujin me can ḥebîbî

1827. Guhdarî kirin ku ev heware
Zû Ḥeṟs û Ḥelîme tên bi ẋare

1828. Ew zûme hemû xişîn bi carek
Hawarê Muḥemmedê mubarek

1829. Ḥetta ku dihên ewan ẋerîban
Nê zik lê dirandî wek ṭebîban

1830. Day bab wî li pêş gehiştibûn ser
Ew şûrgule wek helalê bûy zer

1831. Her çî ku dihat dibûsî yek yek
Ev ṭîfle digûtî dîn bû bê şek

1832. Dabêjî: Nexêr ne dîn û har im
Ageh me li xû ye hûşîyar im

1833. Gava we digûtî gûtî dayîn
Ney ney kuṛê min bihûş e ney dîn

1834. Her çen we digût he lê ditirsin
Bû rahetê can ji wî dipirsin

1835. Ey em hemû dem ji bû te qurban
Tu bû çî hutûve maye ḥeyran

1836. Baʿis çî ye rengê huy zerê te
Tu bêje çi hate ser serê te

1837. Wî gûtî belê du sê zelaman
Hem xûş xeber û şirîn kelaman

1838. Ṛazandî me ez yekî bi hêdî
Amûr xû deranî bûn yekê dî

1839. Min dîtî ewî çequ bi destî
Wî zik li me şeq dikir durustî

1840. Min jêve nedîn çi xun û êşan
Ha wer tu bibîne şûn û nîşan

1841. Hûstayî ku dil li min deranî
Wî taze kelaşt wekî dizanî

1842. Parçek jê deranî û fiṛêda
Muhrek wî ji paş me dî ku lêda

1843. Wan şuştî dil û hinavê min çak
Bew avê ṭezî û ṣafî û pak

1844. Ṭezyatî gehişte min ji mûrê
Min dil bû tijî ji feyḍ û nûrê

1845. Wî dest bi zikê me danî êdî
Rakirmeve paş bi hêdî hêdî

1846. Gûtin me: Netirse ger bizanî
Xêrek ji Xudê me bû te anî

1847. Karek we bi te me kirye ev gav
Ta mayî te ron dibin bi wî çav

1848. Destûrî ji min dixwast û ew çûn
Ew çûn û me dî bi ẋar dihên hûn

1849. Day babê di wî ku qîṣṣe zanî
Wan taze tirs gehişte canî

1850. Wê gavê ewan dikir milê xu
Înaneve malê bû dilê xu

1851. Çendan digûtin lewanê mazin
Vî ṭiflî biben bû layê kahin

1852. Ew belkî ji wî cewan xeber det
Ew derdê heye li wî ku berdet

1853. Rabûn û birin bû layê kahin
Wî gûtî li paş bi xêr we hatin

1854. Meṭleb we çî ye li min beyan ken
Sîrra di dilê xû hunʿeyan ken

1855. Wan gûtine wî çi hate ser ew
Gût: Ew xû bila bidet xeber ew

1856. Çêtir ji we ew ji xû dizanî
Bêjît ji me ra bi xûş zimanî

1857. Gava ku Muḥemmedî xeber da
Kahin xû gudare ser di ber da

1858. Paşî qederek bi hizr û texmîn
Bê dîn ne timam dibêjî mizgîn

1859. Gûte bikujin evî tefalî
Min jî bikujin digel bi talî

1860. Ev ṭîfle eger mezin bibîtin
Dînê me heman li dest diçîtin

1861. Ew dê ṣenemêt me hûr û mûr ket
Dê taze cîhan tejî ji nûr ket

1862. Gava we digû digûtî dayîn
Ey ku li kuṛê me tûy pitir dîn

1863. Tu xû bikuje eger dixwahî
Em ku dikujîn vî bê gunahî

1864. Rabûn û dihên bû layê male
Wan dil bi xeyal û ah û nale

1865. Fikra xû kirin gûtin ditirsîn
Ev ṭîfle Xudê neket bibît dîn

1866. Gel çendî ji hîvî û recayê
Ḥetta bi me dave Amînayê

1867. Em lazim e wî bibeyn ku zû ye
Hêşta ku sere û hîç nebû ye

1868. Rabûn bi ʿecel birin di ḥînê
Bû layê Mekê bû day ḥezînê

1869. Wan xuşk û bira dikirve zîmar
Bû taze birayê pak û dildar

1870. Ṣed daẋ û keser ji bû birayî
Evro li me dê biket cudayî

1871. Tirsîn bimirîn û em nebînîn
Carek dî evî biray nebînîn

1872. Ev kavledinê nê bê beqa ye
Dem vêkketin e û dem cuda ye

1873. Carek dî birin bû layê dayê
Daykê ku didî digirtî şayê

1874. Ey ku çi li mêje çav li rê me
Bû ṣebrê dil û ji bû kuṛê me

1875. Ey nûrê dilî û rohnîya çav
Ey bêy te ṣebir nebû me her gav

1876. Serdarê dinê me her tu hey bes
Ma bes nebî tu li destê her kes

1877. Ev çende ʿumir ḥeta me maye
Dê gel te bibem bi xêr û şaye

1878. Nê min tu yî bîbîya du çavan
Ey min cegera dil û hinavan

1879. Ez rojê du car te maç bikem têr
Ser darê dinê me hîç nevê xêr

1880. Pirsî bû li wan ku Amînayê
Gel xûş xeberan û merḥebayê

1881. Bû hingû kuṛek ji xû ve anî
Nê hingû divêt pitir ji canî

1882. Ba ṣed ji reca û dalevayê
Wê carê bi we ḥeta me dayê

1883. Reḥmet li we bî bibên xû xêr e
Înave çira ve beçkeşêre

1884. Wan gûtî belê tu wek dibînî
Mazin bîye ew bi nazenînî

1885. Ev çende jîye li nik me taze
Êdî tu bigir bi ʿîzz û naze

1886. Bêy dîtinê wî tu natewanî
Lewṛa ji xû ve me bû te anî

1887. Wê gûtî nexêr me nayê bawer
Ṛastî ji me ra bibên serûber

1888. Ṛastî ye serê seʿadet û jîn
Nagehte muradê çi dirûhîn

1889. Ew lêve nebû ḥeta xeber dan
Çî hatîye ser resûlê ʿerdan

1890. Gava ku ji bû dikir ḥîkayet
Wê gûtî bi ḥîkmet û dîrayet

1891. Ṭîflê me mubarek û şirîn e
Şeyṭanî çi rê li ser wî nîne

1892. Ez sûndê dixwum bi navê Ellah
Ev ṭîfle ku dê bibî xudan cah

1893. Min jêve didîn gelek ʿelamet
Bê şek dibitin xudan keramet

1894. Navê wî lewa me kir Muḥemmed
Ûmêde mezin bibît mueyyed

1895. Hûn êdî herin bi xêr û şayî
Bêy wî nedijîn vî ʿumrê mayî

1896. Ez rojê du car ewî nebînim
Bes bû me bijît bila nemînim

1897. Bapîr wî dema dihat ji wê ve
Ṣed bûse kirin ji wî ji rê ve

1898. Ey ruḥê min û rewanê bapîr
Babê te ji ber te dê bikem bîr

1899. Tu kar û kes î tu şunewar î
Ger yar bî Xudê tu bexteyar î

1900. Kes nîne dilê te bêlî carek
Em xir ji te xadim în tedarek

1901. Wî gûtî bi Ḥerşî û Ḥelîme
Min zûr we divên Xudê ʿElîm e

1902. Ḥeqqê we heman li ser me zûr e
Mazin we kirin ve şîrexûre

1903. Car care divê bihên serêdan
Nabî we ji bîr bikeyn ji îḥsan

1904. Her kes ku xudanê eṣlê pake
Ew çakî çû car ji bîrê nake

1905. Peyẋembere dergehê wefayê
Her ew bû xizîneya sexayê

1906. Car care dihat Ḥelîme dayîn
Hêşta li Mekê bû serwerê dîn

1907. Qedrê wê digirt ji dil vîyanê
Kabanî wesa Xedîce xanê

1908. Erzaq e eger lîbas û pare
Da den bi Ḥelîme car bi care

1909. Dayîn e belê li şûnê da ye
Bîr naçî Nebî ḥeta ku ma ye

1910. Nê ḥeqqe li ser kesê xudan ray
Ew çakî ji bîr neket ḥeta may

1911. Îḥsan e serê kemalê însan
Însan nîye çî ji bîr çu îḥsan

1912. Ger êk ji te ra bikar e carek
Ṣed kar ji wî ra bikey mubarek

1913. Her kes ku nebî ji xelkî memnûn
Memnûn nedibî ji Heyyê bê Çûn

1914. Her çen ku cuwan e şukrê esbab
Ṣed hinde dikey bû rebbê tewwab

1915. Hêşta ku nebûye fetḥê Mekke
Ev dayke Ḥelîme mir ne şekk e

1916. Roja ku fetih dikir ve şehre
Peyẋemberê piṛṛ ʿeṭa û behre

1917. Xuşka wî dihate nik wî şîrîn
Pirsî wî ji ḥalê taze dayîn

1918. Wê gûtî bi can nemaye ev gav
Rondik wî xişîn li du belek çav

1919. Daxwazî dikir ji wî ʿeṭa ye
Her çî divîya bû wê wî daye

**Ḥeyatuhu Mînel Erbeʿ îlel Erbeʿîn Fî Kefaletî Ceddîhî ʿEbdulmuṭṭelib (Jîna Wî Ji**

**Çar Saliyê Heta Çilê li Bin Çavdêriya Bapîrê Wî ʿEbdulmuttelibî)**

1920. Şeybe mezinê ewê nuwalê
Ṣaḥib şeṛefê xudan kemalê

1921. Zûr xûş divîya ve nazenîne
Ew serwerê Mekke û Medîne

1922. Ber dergehê Keʿbeyê dirûnişt
Maqûlê bi ser bîsaṭeka qişt

1923. Ewlad û xizim li çan û xwaran
Nêzîk cihê wî nebûn çu caran

1924. Çen carê dihatve ṭîflê bispûr
Biste diçû rexve ser wî mafûr

1925. Destê wî digirt kuṛan ku rabe
Rex babê me ku mezin cenab e

1926. Şeybey digû lê gerin bilanê
Raḍî me ku pê li ser me danî

1927. Destê xû bi ser serî dimalî
Larî bû dikir ḥeta ku lalî

1928. Çen lawe digûtî çen temîz e
Nazdar e li nik me zûr ʿezîz e

1929. Ew her çî biket şirînekar e
Xûşevyê min e û şunewar e

1930. Nubuve dinê li Amînayê
Ew taze gehişte xêr û şayê

1931. Bes ev kuṛe hey li xir cîhane
Hem ruḥ û rewan e hem giyan e

1932. Her çî ku hebûn li ehlê malê
Şa bûne hemû bi vê cemalê

1933. Zêdey li heman xû Ummû Eymên
Ew pakedila dilêr û rewşen

1934. Ev ṭîfle ḥeta dibû di xanî
Her kes wekî canê xû dizanî

1935. Gava ku diçû bû nav biçukan
Zêrîn bû wekî kuṛê mulûkan

1936. Car care dibir li gel xû bapîr
Gel zêde viyan û rêz û teqdîr

**Wefatu ummîhî fî's-Senetî Sadîsetî mîn ʿUmrîhî (Mirina Dayika Wî di Şeş Salîya Wî da)**

1937. ʿUmrê wî ḥeta gehişte şeş sal
Mazin bîye lalî dayê xûşḥal

1938. ʿEql û edeb û feṣîḥzimanî
Fêr bûye bi taze û cewanî

1939. Dayik bi biçûkê xû çi şaye
Ageh li cîhan bizan nemaye

1940. Hîvî li Xudê ye zûr bimînî
Vî ṭîflî ciḥêl û pîr bibînî

1941. ʿUmrê wî dema gehişte şeş sal
Deyka wî dibet ziyareta xal

1942. Gû rabe biçîn ji bû Medîne
Xalêt te li wê me hêj nedîne

1943. Ceddê te hene gelek li wêrê
Xalêt bi şeṛef ji ehlê xêrê

1944. Babî te wekî li wêrê medfûn
Dê ser lê bidem bi cergê pirrxun

1945. Çendek ji dîyarîyan bi teqdîr
Wan gel xû birin bi iznê bapîr

1946. Pakîze xidamê Ummû Eymen
Xûş ṣebr û heval e gel xû dê ben

1947. Ev qende Xudê ku çen şirîn e
Du pakejin û şehê Medîne

1948. Ew çûne bi hêdî hêdî taze
Ta şehrê Medîne serfîraze

1949. Hetta ku li menzîlê peya bûn
Ew cu le bi wê lîqayê şa bûn

1950. Ehlê keremê ne xûş qûnaẋ in
Merdar û xudanê qeb û baẋ in

1951. Ey gû we gelek bi xêrê hatin
Ser çavê me hûn li wêrê hatin

1952. Çendî ku dihên Medîne mêvan
Wek hingû me kes nedî bi çavan

1953. Xwarzayê me çen şirîn e ya reb
Laîq bi şehê Medîne ya reb

1954. Babê wî ke çî wefat bû lêre
Ya Reb tu ji vê bidey me xêre

1955. Çen rojê li wê veman bi ulfet
Her rojê pitir bi qedr û qîmet

1956. Her kes ku didî ve canê canan
Medḥêt wî dikir bi ṣed zubanan

1957. Rojek gûtî rabe Amînayê
Serbarê dilî û cergê dayê

1958. Babê te li vê derê wefa bî
Em çake biçîn bû qebrê babî

1959. Babê te çi newcewan bû dildar
Deyka te ḥeta ku may keserdar

1960. Ew çubû bi ʿadetê ku carî
Ser gorê ewî bi girî w zarî

1961. Ey lawê me têr nedî bi çavan
Ṣed car li te ez dikem silavan

1962. Kerbek çi mezin tu çûy geha me
Dunya me li paş te lê ḥeram e

1963. Ey lawê Mekê ẋerîbê êre
Paşmayê te ye ve beçkeşêre

1964. Perwerde dikem bi ʿîzz û naze
Ûmêde bijît bi serfiraze

1965. Dunya ne çi xûş meqam û war e
Her çûn e bû kes ne dûst û yar e

1966. Bû kes ne dibî bû kes nemaye
Her baqî Xuda ye her Xuda ye

1967. Gîrbûne mehek li malê xalan
Geryaneve ew bû layê malan

1968. Êk êke ji wan vexwastî destûr
Rokirne kinarê Mekkeya dûr

1969. Deyka wî eger bi çûnê lez kir
Ageh ne ji wê Xudê ku hez kir

1970. Mabeynê Meke û Medîne gundek
Ebwa ye dibên Ḥeccûne hindek

1971. Deyka wî li wê digirtî tayê
Ta ḥal bû ecel ji Amînayê

1972. Wê gûtî di ḥînê can separî
Çen taze xeber bi gir yû zarî

1973. Kes nabî ebed bi can bijîtin
Nû kevin dibît û dê biçîtin

1974. Ez dê bimirim di ḥîn û gave
Navê me dimînî taze nave

1975. Paşmayê min e ve newcewane
Min hîvî ye ron biket cîhane

1976. Ev gûte kirin ji canê piṛṛ ah
Canê xû siparte ẕatê Ellah

1977. Wan taze li wê derê veşarî
Geryaneve ew bi şîn û zarî

1978. Ta nuke eger çi bab nebû vî
Nê ṣebr û qerar bi day hebû vî

1979. Evroke ne bab û daye ya reb
Êdî tu dizanî raye ya reb

1980. Înabuve Ummû Eymena çak
Ev ṭîfle yetîm û sêwî yû pak

1981. Paş dayê dibîte day û dayîn
Mazin diketin resûlê şîrîn

1982. Peyẋemberî nê digûtî her car
Paş dayê tu dayê min şirîn kar

1983. Gava ku xeber gehişte bapîr
Naxûş xeberî bi jan û tesîr

1984. Agir wî xû berbîye dilê wî
Bû vî weledê yetîm û sêwî

1985. Şûlêt te Xudê giran buha ne
Her karê dikey gelek cewan e

1986. Malik bi hemû kesan ʿElîm î
Nê her tu xudanê vî yetîmî

1987. Wî ev sefere ji bîr vemabu
Çen carê digût ku ew çewa bû

1988. Çen şûl wî dihatine bîrê taze
Ḥîna li Medîne bûy bi naze

1989. Fêr bûm meleyî gûtî şirîn zar
Nêv bîrê ʿEdî ji neslê Neccar

***

1990. Dayka wî ḥeta ji bû wî bû ṣaẋ
Bapîrî ji wî ne ẋem bû ney daẋ

1991. Evroke neman ne day û babe
Lew tal bû ji nû wî xurd û xuwabe

1992. Evro bîye ẋem li ser milê wî
Lew zêde şirîn bû ber dilê wî

1993. Zêde hemû car wî çav didayê
Ḥetta wî ʿumir gehî nîhayê

**Wefatu Ceddîhî (Mirina Bapîrê Wî)**

1994. ʿUmrê wî gehişte heşt sale
Dîsanê cîhan li wî bû tale

1995. Bapîr wî gehî dehan û ṣed sal
Wî pîrî ecel li wî dibû ḥal

1996. Meʿlûm e Muḥemmed ê şirînkar
Ẋemgîn bû bi mirnê Şeybe êk car

1997. Ew bû wî çi qed muʿîn û yar bû
Du hinde ji bû wî harîkar bû

1998. Mirna wî ne bes bû wî ḍerer bû
Bû xir Mekehê qewî ḍerer bû

1999. Meznê Mekehê bû pur ji tedbîr
Ṣaḥib kerem û xudanê şimşîr

2000. Çavê wî li wan feqîr û jaran
Ew pişt û muʿînê her neçaran

2001. Her çen ji Muḥemmedî xudan bû
Ev kare tinê ji rebbê can bû

2002. Kes ẋeyrî Xudê eger çu nîne
Nê ev sebebeş hemû ji wî ne

2003. Esbab di ker û di kor û lal in
Bêy emrê wî xir ʿemel beṭal in

2004. Xaliq derekî eger bi ḥîkmet
Bigirît vedket dîger bi reḥmet

2005. Ḥetta ku ji bû wî ṣaẋ bû bapîr
Bû xidmetê wî nebûn çi teqṣîr

2006. Roja wî ʿumir gehî temamî
Nevyê xû cewan suparte mamî

2007. Şeybey wî demî hebûne çen kuṛ
Ṣaḥib hunerêt ji şewketê pur

2008. Êk wî li heman hebû cewan bext
Laîq bi supah û reʿiyet û text

2009. Gava mirnê wî kir bû weṣiyet
Gû: Ey Ebû Ṭalibê bi hîmmet

2010. Teslîmî te bît ve newcewane
Hişyar bî li wî ku bê xudan e

2011. Teqṣîr bû nekey ḥeta ku tu may
Ey têr ku bijîn bi xûşî û şay

**Fî Ḥîmayetî ʿEmmîhî Ebî Ṭalîb (Li Jêr Çavdêriya Mamê Xwe Ebû Ṭalibî)**

2012. Bûṭalibê piṛṛ kemal û tedbîr
Elḥeq bû Nebî nekir çi teqṣîr

2013. Ṭebʿê keremê ewî nîşan bû
Ta mabû lewa bi rêz û şan bû

2014. ʿEbbasî eger çi xûşîḥal bû
Emma nê gelek muḥîbbê mal bû

2015. Ṭebʿê keremê me zan bi malî
Çen kes di sexîn e dest di xalî

2016. Lewṛa nevîya bijil sîqayet
Bûṭalibî behre bû rîfadet[1]

2017. Wî yeʿnî di dest bû avê zemzem
Vî nan û xîwan[2] û dane her dem

2018. Emma nê feqîr bû ew quṣûrḥal
Mecbûr bû ku qer biket hinek mal

2019. ʿEbbasî bi qer didan dirave
Vî karî ḥeta biket bi nave

2020. Her çendî dihat û her feqîr bû
Ew deynê li ser wî her bi bîr bû

2021. Axir wî dida biray ve kare
Batî wî ḥeqî çi mal û pare

---

[1] Harîkarî dan

[2] Sifreya xwarinê ya dewlemend

2022. Bûṭalibê piṛṛ bi reḥm û çakî
Navê wî lewa diçît bi pakî

2023. Ew çunke bi çakî û kerem bû
Lew mazinê Mekke û Ḥerem bû

2024. Elḥeq wî nekir quşûr çi care
Der ḥeqqê resûlê namidare

2025. Xûştir divîya li xir biçûkan
Gel xû dibire cemat û sûkan

2026. Day bab wî eger neman û bapîr
Vî mamî ji bû nekir çi teqşîr

**Ewwelu Esfarîhî Îla eş-Şam Meʿe ʿEmmîhî Ebî Ṭalîb fî Senetî es- Şanîyetî ʿEşere mîn ʿUmrîhî ʿEleyhî's-Selam (Yekem Sefera Wî bo Şamê digel Mamê Wî Ebû Ṭalibî di Duwazde Salîya Wî da)**

2027. Bûṭalibê piṛṛ sexa û mêvan
Muḥtacî zexîre bû ji bû ban

2028. Rabû dê biçît bû layê Şamê
Qûtek bikirît bû nanê ʿamê

2029. Peyẋemberî jîn bû neh ji sale
Nîvmêr e welê çi piṛṛ kemal e

2030. Gû dême sefer li gel te ey mam
Çake tu bibey me bû rexê Şam

2031. Meiwayê peyẋemberan nê Şam e
Lewṛa wî bi dîtinê meram e

2032. Wî gûtî erê tu nurê çavan
Bêy te ne dijîm eger çi gavan

2033. Ev rêke wekî me zanî dûr e
Naxûşî û talîya wê zûr e

2034. Min zûr tu divêy eger bizanî
Ku ez te didem bi ṛencê canî

2035. Peyẋemberî kir ṭeleb dubare
Gû dê te bibem me nîne çare

2036. Ew çûne di gelî û çul û şeḥra
Ḥetta digehîne şarê Buṣra

2037. Şarek bû li jêrî Şam zemîne
Piṛṛ suk û firutin û kirîn e

2038. Ev Şame wekî cîhan biḥeşt e
Çen xuşe du hin şirîn û qişt e

2039. Xûş xak û hewa bi baẋ û gulzar
Piṛṛ fêqî û av û dar û robar

***

2040. Ev care yek e sefer ji bû Şam
Gel mamê Buṭalibê nîkunam

2041. Hem vê seferêş didî Beḥîra
Ew ṛehberê huşîyar bi wî ra

2042. Navê wî şirîn û xûş e Cercîs
Durbîn e xudanê huş e Cercîs

2043. Zur mêje li wê hebûne ruhban
Zana bi peyẋemberê xudan şan

2044. Gava ku gehiştibûne wêrê
Ev rehbene bû li jurî dêrê

2045. Wî durve didî ve karewane
ʿEvrek diketin sihê li wan e

2046. Hatin qederek li wê peya bûn
Bin darekê bêhneka xû dabûn

2047. Wî dîtî bi çavê ser ku darê
Ṭayêt wê nevî dibûn bû xwarê

2048. Wê darê bi qudreta xudanî
Sêber ku dikir li newcewanî

2049. Rehben ku we dî dihêt bi xare
Ev kare nedîbû qeṭ çu care

2050. Wî dîtî di nêv wî karewanî
Nîvmêrekê zûr şirîn ji canî

2051. Carek wî ji dil berê xû dayê
Ser ta bi qedem bi fikr û rayê

2052. Nîşanê peyẋemberê dumayê
Êk êke ji wî didîn tebayê

2053. Wî taze neẓer dikir bi dîqqet
Ḥetta ku dî xatema nubûwwet

2054. Derḥal wî gûtî: Bibêje ey mam
Pîrûz bî bi hatina we xir Şam

2055. Ev lawe çi yê te ye we taze?
Tu bû me bibêje min niyaze

2056. Wî gûtî: Kuṛê minê şirîn e
Nazdar e li nik me nazenîn e

2057. Wî gûtî: Nexêr vî lawê rengîn
Ney bab û ne day nemayne ev ḥîn

2058. Mamê wî gûtî bikeyf û şaye
Ev lawe ji min kuṛê bira ye

2059. Bê şek we ye her wekî te zanî
Day bab wî li mêje bûne fanî

2060. Wî gût eve ye Xudê di Încîl
Beḥs̱ê wî ji bû me anî tefṣîl

2061. ʿÎsayî bi vî ku daye mizgîn
Ṣed şukir me dî cewan û rengîn

2062. Eḥmed dê bihê bi paş me taze
Peyẋemberekê bi ʿîzz û naz e

2063. Roja ku dibî bi ḥeq peyember
Serşîn e ewê neînî bawer

2064. Ey mamu tu zu be zu bibey mal
Min tirse cuy wî biken nexuşḥal

2065. Belkî tu nizanî ew çewa nin
Dê wî bikujin eger bizan in

2066. Ev qewme tijî ji mekr û kîn in
Ew duşminê wî ne ta di mînin

2067. Wî paşî gûtî bi wan: Kerem ken
Bû meʿbedê min şirîn qedem ken

2068. Hun evro li min bibin bi mêvan
Dê ron bî me dîdeyê du çavan

2069. Mêvan me nedîne qeṭ çu carek
Wek hingû di mazin û mubarek

2070. Ew rabû bi çustî û cewanî
Çî hey bû ḍiyafetek bû anî

2071. Piṛṛ fayde kirin belê peyember
Wî vê seferê ne zêr û zîwer

2072. Belkî ʿelimî bi ṛencê rêwbar
Ḥalê seferê ku tal e naçar

2073. ʿUrbanê ʿereb didîn di kûçer
Wan ḥêştir û mer dikir bi perwer

2074. Çen cê wî didîn çi çul û meʿmûr
Wek Wadî Qura û Medyena kuṛ

2075. Dîtin wî hinek ji qewmê rome
Gel dîn û ʿeqîdeêt di şume

2076. Ew xûş xeberêt gûtî bi wî ra
Ew pake mesîḥîyê Beḥîra

2077. ʿUmrê wî keçî duwazde sal bû
Emma nê bi ʿeql û piṛṛ kemal bû

2078. Ruḥek mezin û dilê tijî nur
ʿEqlek sipehî zekaweta zûr

2079. Lew rojê ewî dizanî millet
Kuṛ in li ḥeqî li ser ḍelalet

2080. Ger butperisin eger çî agir
Wer qewmê ṣelîbî xir di kafir

**El-Îstîsqaîhî ʿEleyhî's-Selam Eyyamîn Ebî Ṭalîb (Baran Xwastin bi Wî (s.l.w.) di Dema Mamê Wî Ebuṭalibî da)**

2081. Salek li Mekê û çan û xwaran
Kêm bûne bi emrê Barî baran

2082. Nêzîk bû li wan bibît giranî
Çen tale bela nebûnê nanî

2083. Nê kulb e ẕelîl diket emîran
Her birs e xirab diket feqîran

2084. Memnun e xudan ku fiṭre arî
Wê rojê bihêt bi ser mirarî

2085. Erzanî ye dergehê viyanê
Êmnahî ye her serê jiyanê

2086. Ya Reb tu nedey me derdê birsê
Dûr bêxî ji me bela û tirsê

2087. Ehlê Mekehê ketin gumane
Nek Barî biket xelayê nane

2088. Ew cumle bi dil diken recayê
Kiçke û meznan bi dest duʿayê

2089. Ya Reb xû tu ḥalê van dibînî
Hawar tu nedey me naşirînî

2090. Ṭengavî ḥeta nebînî însan
Nêzîke biket ẋurûr û ʿîṣyan

2091. Her merdê dibînî hêc û har e
Wê rojê dibînî kulewar e

2092. Nefsa xû eger te dîtî birsî
Mizgîn li te hîç li wê netirsî

2093. Emma jê emîn nebî çi saʿet
Ger kefte xûşî û naz û nîʿmet

2094. Vê nefsê ḥeta nekey tu jêrdest
Bê fayde nekey bilindîyê qest

2095. Ev nefse heçî ji xû şiyayê
Rizgar e li vê cîhan belayê

2096. Ya Reb me nekey bi nefsê meẋrûr
Dil merd e ḥeta nebîne zil kuṛ

***

2097. Elqîṣṣe mekî bibûn perîşan
Wan hîvî dikir ji murde ewsan

2098. Wan hîvî dikir ji kûlkedarî
Baran ku bi wan bû wan bibarî

2099. Axir hinekan bi fikrê ṣaîb
Çûn gûtine mamê wî Buṭalib

2100. Tedbîr me we ye bibey Muḥemmed
Bû dergehê Keʿbeyê şirîn qed

2101. Meʿṣûm e gelek bi ʿîzz û naz e
Baranê bi zarê wî bixwaze

2102. Rabû di demî nekir çi sustî
Çu bû ḥeremê wî dest bi destî

2103. Gû: Ey tu ruḥ û rewanê mam î
Meşhûr î tu qenc û nîkunam î

2104. Destan tu bilind ke rend û taze
Baran li Xudê mezin bixwaze

2105. Wî dest bi duʿa dikir ji Barî
Ḥetta ku li ʿerḍî av bû carî

2106. ʿEsman wî demî çi pak û samal
Barî kire ʿevr û Barî derḥal

2107. Ser xaṭirê wî biçukê piṛṛ şan
Qewmê wî nekir ji dil perîşan

2108. Ya Reb wî li nik te zûr e xaṭir
Bû xaṭirê wî ʿefûke Ṭahir

**4.**
**EZ-ZEHRETU RABÎʿETU (KULÎLKA ÇARÊ)**
**ḤEYATUHU FÎ ŞERḤÎ ŞEBABÎHÎ ʿELEYHÎ'S-SELAM (JÎNA WÎ DI GENCÎYA WÎ (S.L.W) DA)**

2109. Gel mamê xû bû bi kar û ṛence
Ḥetta wî ʿumir bû bîst û pênce

2110. Her karê ewan dikir dikir wî
Wî çust û cewan pitir dikir wî

2111. Çen sal bû ewî dikir şivanî
Emma bi kemalê dilviyanî

2112. Xûzmey li merê ku ew şivan bû
Mizgîn li ṣeyê wî pasevan bû

2113. Wê hatî xeber ji yarê enwer
Ku kirye şivanî her peyember

2114. Ev fexre bes e ji bû şivanan
Serdefterê wan e canê canan

2115. Evro ji merî diket şivanî
Ew dê sibe bît bi ḥukimranî

2116. Ew evro şivan e beste ezman
Nêzîke bibît delîlê îman

2117. Ḥetta ku şivan bû ew li çulî
Ev fikr û xeyale bûn mijulî

2118. Vî kewte merî divêt şivanek
Vê ʿalemê ku nevêt xudanek?

2119. ʿAîd bi min e ve parçe ḥeywan
Seẋbêrî bikem bi av û çerwan

2120. Pêtîv ye belê ve ʿalemîne
Rebbek bi kemalê ʿîlm û şîn e

2121. Vî qewmî wekî ku min dibînim
Hêrtir li pez û bizin dibînim

2122. Ev qewme Xudê çi nadurust in
Ku dar û beran bi can peristin

2123. Ger tu bidiya ve newcewane
Ger kasib e ew eger şivan e

2124. Nîvmêr e eger xû new ciḥêl e

Ew pak e li kîn û mekr û ḥîle

2125. Ṛastî û durustî û emînî
Royê geş û nermî û evînî

2126. Ṭebʿê keremê û serbilindî
Maqûlî û seng û huşimendî

2127. Eşla nedibû hevalê xwaran
Nakesbeçeyan û pîsekaran

2128. Ney şiʿr û miqam û reqs û larî
Ney mestî û puçî û nekarî

2129. Ferman kirîye bi xû şirînzar
Qurbanî dibim her rojê sê car

2130. Ṣed şukir ji min nebû çi caran
Meyla ṭerebê meger du caran

2131. Carek me gûtî heval şivanî
Ev şev tu li pez ke pasevanî

2132. Ez dê çime nik ewan cewanan
Guhdarî dikem li nexmexwanan

2133. Ta çume kinarê şehrê bûşe
Dengek me gulêbû piṛṛ xirûşe

2134. Êk bendê miqam û êk ciwab e
Geh çeng û ney e û dem rubab e

2135. Min pirsî gûtin ji bû me ṛastî
Ew bûk e filan kesî guhastî

2136. Ez mame li dûr bikem gudarî
Dil girtî xewê bi emrê Barî

2137. Ez mame di xew bû roj helatê
Xaliq hu didaye min necatê

2138. Carek dî hituve min vîyayî
Lê ḥîḏze kirim wesan Xudayî

**Îla Suqey ʿUkaz we ẕîl Ḥîcaz Meʿe ʿUmmîhî Ebî Ṭalîb (Ber bi Suka ʿUkaz û Ḥîcazê digel Mamê Xwe)**

2139. Çar mahê ḥeram ʿereb dihatin
Hem weqtê hec û gehê cematin

2140. Da xirbineve bû çen niyazan
Nêv sûqê ʿukaz û zîlmecazan

2141. Pisyar û xeṭabet û meşûret
Eşʿar û muʿamele û tîcaret

2142. Gel mamê xû ew diçû gelek car
Bû seyrê evan cihan bi dildar

2143. Guhdarî dikir muʿelleqatan
Bew taze belaẋet û nukatan

2144. Hin beḥiṣ dikir ẋeram û ʿîşqê
Hin medḥê mey û qîmar û fîsqê

2145. Fexra neseb û sexa û serwet
Talan û şeṛ û şîqaq û hîcret

2146. Guhdarî dikir li wan dizanî
Wan heçî nedigû bi heq cewanî

2147. Hem cuy û felan didan xeṭabet
Her êk ji xû paş dikir dîyanet

2148. Ger cuy û fele û ṣenemperistin
Wî dizanî hemû di nadurist in

2149. Rebbê wî belê wekîlê wî bû
Bû layê ḥeqî delîlê wî bû

**Qitalu Fî Ḥerbî el-Fîcarî we ʿUmrîhî (15) ʿAmen (Di Pazdesalîya Xwe da Beşdarbûna Wî ya Cenga Fîcarê)**

2150. ʿUmrê wî gehîbû pazde salan
Ew pêşeṛewê xudan kemalan

2151. Qewmî bû şeṛek bi pîsekarê
Navê wî dibên şeṛê fîcarê

2152. Berraḍê kînanî bû serê kar
Çar sal bûye şeṛ bi her çî kuştar

2153. Gava bû şeṛî diçûn Qureyşî
Gel mamê xû bûye êk ji ceyşî

2154. Beḥṣê vî şeṛî dikir wî caran
Paşî ji rîsaletê bû yaran

**Menşeu Ḥerbî Fîcar (Sedema Cenga Fîcarê)**

2155. Eşlê vî şeṛî ku kûṛ û dûr e
Nuʿman hebû ye mezin li Ḥîre

2156. Çar mahê ḥeram li her mekanan
Wan suk li wekî ʿukaẓ didanan

2157. Da xirbineve ji bû tîcaret
Hem keyf û siyaḥet û xeṭabet

2158. Karwan wî virêdikir hemû sal
Ger mîsk e eger giran buha mal

2159. Bû suqê ʿukaẓ û zîlmecaz e
Pê gurê dikir bi malê taze

2160. Malê Yemenê qumaşê zergeş
Dîbace çi eṭlesê muneqqeş

2161. Berraḍê qebîleya kînanî
Gû ez dê biçim vî karewanî

2162. ʿUrwe ku Hewaznî ʿeşîret
Gû mêr he ez im xudanê ẋîret

2163. Vê qaflê gûtî bi min sipêre
Dê zêde ji min bibînî xêre

2164. Nuʿmanî bi destê vî siparî
Berraḍî ji kerbê çav bû ṭarî

2165. ʿAciz bû gûtî meger nemînim
Dê ruḥê ji ʿUrweyî derînim

2166. Ez mêrekê hu bi nav û nîşan
Yan ez nexû ʿUrwe dê bî bêcan

2167. Gel bûṣekê xû di rê veşarî
ʿUrwey dikujît bi ḥîlekarî

2168. Pê zanî hewazinan bi kare
Ew karê weku nebûy çu care

2169. Xun rêtî ewî bi karê ẋedrê
Xaṣma di meha ḥeram û qedrê

2170. Rabûn bi gef û bi gule gule
Da zu vebiken wî xun û tule

2171. Lagîrê evane bûn Qureyşî
Ta tul vebiken ji karê weḥşî

2172. Qeysî bû kînane bûn ṭerefgîr
Çar sal dibû şeṛ bi tîr û şimşîr

2173. Gel mamê Muḥemmedê we nazdar
Ew çubû şeṛî belê hunerkar

2174. Wek fêr bû kesabet û şivanî
Bazar û uṣûlê karewanî

2175. Bû fêrî sîlaḥ û şîr weşandin
Rumbazî û fennê tîr ṛeşandin

2176. Nê ʿîlmê çek û sîlaḥ û ḥerbê
Sekvanî û zûrê teʿn û ḍerbê

2177. Pêtîv ye ji bû cewan û pîran
Bel ferḍ e li ser şivan û mîran

2178. Xaṣma vî demî li ser musilman
Ey qewmê bijare ehlê îman

**ʿEqduhu fî Ḥîlfîl Fuḍûl (Peymana Wî Ya Ḥilful Fudûlê)**

2179. Paşî vî şeṛî şeṛê fîcarî
Xû dîtî Qureyşîyan bijarî

2180. Desge û tedareka ji pêşîn
Nik duşminî wan neman di ew ḥîn

2181. Ney quwwet û şewketa ku caran
Ney seng û ṣehim li nik neyaran

2182. Pêşan bi hemû ve êk xeber bûn
Lew hinde bi heybet û huner bûn

2183. Evruke ji xû ve belave bûne
Lew bê huner û hinave bûne

2184. Ney Şeybe û Haşimêt di caran
Ney ṛehber û ḥakimêt he caran

2185. Her milleteke ku lêk belav in
Ta mayne di bê buha û nav in

2186. Ew jar û ḍeʿîf û ber bela ne
Her kes bû xû dê bişête wane

2187. Ger çust û çeleng û êk xeber bin
Ser êk bi cewab û piṛṛ ceger bin

2188. Sengîn dê bibin gelek şirîn ew
Merdane dijîn ḥeta dijîn ew

2189. Wer seyr û temaşeyê werîsî
Sistî û ḍeʿîfîya wî rîsî

2190. Ew pêkve hemû ku bûne davek
Lêk dî ne cuda dibin çi gavek

2191. Qed nabî bi fîl û kerkedanan
Napirçî bi zûrê pehlevanan

2192. Mamê wî Zubeyrî kirne mêvan
Çen mezne Qureyşîyêt hunervan

2193. Cumle fikirîn bi huşimendî
Tedbîrê ḥeyatê serbilindî

2194. Hemyan bû xû taze sund dixwarin
Ku cumle bû yek dî harîkar in

2195. Em harî xudan ḥeqî dimînîn
Ḥeqqê wî ḥeta ji bû sitînîn

2196. Qurtar dê bikeyn feqîr û jaran
Nêv pencê emîr û xurt û haran

***

2197. Şulêt hu gelek ji dil şirîn in
Dergahê kemal û keyf û jîn in

2198. Peyẋemberî jî bi taze ferman
Tim bestî ve ʿeḥd û pakepeyman

2199. Ta mabû Nebî wî car bi care
Wî behsî dikir ve sund û kare

2200. Ew sunde digû li nik me çêtir
Lew malê ʿereb ku ṣureḥêştir

2201. Ev kare nihuş biba dikir min
Şulêt di cewan fer in li ser min

2202. Ev şule ḥeta di kar bimînin
ʿAlem dê bikar û bar bimînin

**Seferuhu îla eş-Şamî fî Tîcaretîn lî Xedîcetî we ʿUmrîhî (25) ʿAmen. (Sefera Wî bo Şamê digel Karwanê Xedîcayê di 25 Salîya Xwe da)**

2203. Mamê wî didîve newcewane
Çen mêje ji bû wî ew şivan e

2204. Qunaẋ e bi xû xudan ʿeyal e
Xûşnande ye lê feqîreḥal e

2205. Wî kir bi Muḥemmedî meşûret
Çak e ji me ra bikey tîcaret

2206. Ew kesbe gelek bi xêr û pak e
Ger tu ji me ra bikey çi çak e

2207. Tedbîr eve ye ku ez dizanim
Malî didetin Xedîce xanim

2208. Werbigre ji wê rewace malan
Bû Şamê here digel hevalan

2209. Meʿlûm e tu ṣadiq û emîn î
Ûmêd e ji bû me xêr bibînî

2210. Ṛastî û dirustî û emanet
Asas e bû şîrket û tîcaret

2211. Gû “ez we dikem wekî dizanî
Karwanî dikem wekî şivanî

2212. Nê ez te li cayê bab dibînim
Emrê te çi carê naşkînim”

2213. Mamê wî gûte Xedîce xanê
Mêrek me heye cihê emanê

2214. Nêv ehlê Mekê wekî wî nîne
Malî bidevê ku çen emîn e

2215. Nazdar e Muḥemmedê dilêre
Zana ye çi zîrek û çi mêr e

2216. Wê gûtî bila didem wî zêtir
Bû xelkî du bû wî çar ji ḥêştir

2217. Ew çuve bû karewanê Şame
Gel wî bûye Meyserê xulame

2218. Hem tacir û hem emîn û xadim
Bû taze dila Xedîce xanim

2219. Wan tey dikirin çiya û ṣeḥra
Ḥetta digehîne şarê Buṣra

2220. Dubare ewî didît Beḥîra
Dilxûş bibû çen gelek bi wî ra

2221. Geryaneve ew bi xêr û şayî
Faydek çi mezin bi wan gehayî

2222. Wî taze kirî ji bû Xedîce
Çî malê li Mekke piṛṛ rewac e

2223. Her meṭlebeka bi wî siparî
Wî cumle kirîn bi tazekarî

2224. Meşḥûr e sefer wekî mehek ew
Wî Meysereyî vîya gelek ew

2225. Exlaqê di wî didîn di ʿalî
Wî qewl û ʿemel di rend û ʿalî

2226. Hel çûnê ḥeta di hatne male
Wî nasî ku ew çi piṛṛ kemal e

2227. Wî dibin du melaîket bi çavan
Sêber lê diken ji germ û tavan

2228. Nêzîk bû dema bi gehne male
Gût Meysereyê ku xuşheval e

2229. Gûtî tu here li gel te mizgîn
Mijde bibe bû Xedîce zengîn

2230. Em behrewer în û faydekar în
Em vê seferê di bextiyar în

2231. Lezkirbû Muḥemmedê şirînxun
Mizgîn wî dida Xedîce xatûn

2232. Gava wê bihîst ji wî ve mizgîn
Ba xuşxeber û zimanê şîrîn

2233. Mesrûr bû gelek bi wê cemalê
Zêdey bi tîcaretê û malê

**Zewacuhu mîn Xedîce bîntî Xuweylîd we ʿUmruhu (25) ʿAmen (Di 25 Salîya Wî da Zewaca Wî ligel Xedîca Kiça Xuweylidî)**

2234. Nazdar e Xedîce xan bi ʿeyşî
Babê wê Xuweylidê Qureyşî

2235. Ew çakejina cewan û şîrîn
Ew tazedila bi ʿeql û zengîn

2236. ʿEql û edeb û kemal û ʿîffet
Naz û şeṛef û cemal û serwet

2237. Wê cumle hebûn bi rêz û rengîn
Lew çen mezinan wê bûne xwazgîn

2238. Her çen wî demî ʿumir di çil bû
Emma ji cemalê şebhî gul bû

2239. Gerçî kiribûn du mêr li pêşan
Lê çen kesî bû keser dikêşan

2240. Bû her kesî ew ku sergiran bû
Wê bextê sipî şehê zeman bû

2241. Paşî vê seferê Xedîce xanim
Gû çendî dibînim û dizanim

2242. Min paşî Muḥemmedê emîne
Meyla çi şîya ji bû mi nîne

2243. Ṣaḥib şeṛef e xudan kemal e
Ew ṛast û durust û şîrḥelal e

2244. Xûş tebʿ e wekî şirîn ziman e
Law çak û lebîb û newcewan e

2245. Bejna wî dibêm niḥalê ʿerʿer
Zarê wî dibêjî şehd û şeker

2246. Ev çende ʿumir ḥeta me mayî
Dê gel wî bibem bi ser dumayî

2247. Malek çi mezin ku min li bale
Dê pêkve bixûyn ve çende sale

2248. Behrek bû mezin Xudê kerem kir
Bû serwerê dîn yekem ḥerem kir

***

2249. Lewṛa wê hinart Nufeyse taze
Bû lalî Nebî bû ev niyaze

2250. Çu gûte Muḥemmedê şeṛefnak
Bû çî tu jinek naxwazî çen pak

2251. Wî gûtî “Nê ez feqîrêḥal im
Bê mehre û bê kuzût û mal im”

2252. Wê gû ji te ra cemal û zînet
Hem ʿeql û kemal û mal û qîmet

2253. Gûtî “kî ye” gû Xedîce nav e
Ḥubba te di nêv dil û hinav e

2254. Wî gûtî “bila gelek cewan e
Ev şule me çê ji ṭîbê can e”

2255. Zu rabî Nufeyse mijdedar e
Bû lalî Xedîca nazedare

2256. Derḥal wê hinart bihên tedarek
Ev ʿeqde ḥeta bibît mubarek

2257. Mamêt wî hemî li gel çi rengîn
Hatin bû Xedîceyê bi xwazgîn

2258. Babê wê li pêş şeṛê Fîcarê
Deh sal bû wî can bi ḥeq siparî

2259. Yek xuṭbe Buṭalibî vexwundî
Emma bi cewanî û pesindî

2260. Meʿlûm e Muḥemmedê şeṛefnak
Piṛṛ ʿeql û kemal e piṛṛ ji îdrak

2261. Kes nîn in di qebîleya Qureyşî
Ev renge kivanê wî bikêşî

2262. Her çen di demê feqîreḥal e
Nê mal ne ʿelametê kemale

2263. Wî hey di Xedîce arezûye
Hem wê jî ji wî ve meylê şû ye

2264. Mamê wê ʿEmir dida cewabe
Ev kare gûtî çi piṟṟ ṣewab e

2265. Ev lawe belê li jûr meqam e
Her meṭlebeka bivêt temam e

2266. Wî ʿEmrî ku ew ḥukim bi destî
Ev ʿeqdê mezin şirîn dibestî

2267. Bîst ḥêştirê çak kirin diyare
Bû marehîya wê xir bijare

2268. Gûtin hemî meclîsê bi carek
Ev her du li yêk bibin mubarek

**Îla Beytî Xedîcetî (Bo Mala Xedîcayê)**

2269. Ew taze neqil dibû şirînkar
Bû xaniyê Xedîceya guherdar

2270. Hem çakejin e û xûş heval e
Piṟṟ ʿeql û kemal û mal û ḥal e

2271. Maqûl û cewan û pak e bê ḥed
Laîq bi hevalîya Muḥemmed

2272. Elḥeq- wê jinê nekir çi teqṣîr
Ger mal e çi xidmet e çi tedbîr

2273. Her karê dikir wî emr û ferman
Derḥal wê digû belê bi qurban

2274. Ḥaḍir nê ez im di xidmeta te
Piṟṟ behrewer in bi ṣuḥbeta te

2275. Gava li derê di hate xanî
Ber emrê wî bû bi ruḥ û canî

2276. Kabanîyeka şirîn û taze
Hem xuşxeber e bi ẋenc û naz e

2277. Ṟastî û kemal û kardiristî
Ṣebr û kerem û xudaperistî

2278. Piṟṟ rêz û ṭerz bû zûr emîn bû
Lew zêde li nik wî piṟṟ evîn bû

2279. Raḍî bû ji wê ji ʿeql û dînan
Ta mabû çi jin bi ser neînan

2280. Ewwel kes e ew ku anî îman
Roja ku Nebî dihatî Qurʾan

2281. Piṟṟ feḍl e li nik cenabê Barî
Bes nîne ji bû selam hinarî

2282. Cibrîlî gûtî bibêjê mizgîn
Qeṣrek didetê Xudê çi rengîn

2283. Qeṣrek ji durrê di baẋê cennet
Pîrûz bî li wê bi naz û nîʿmet

2284. Ew paşî kiça xû Faṭîmayê
Efḍeltir e lê ji ʿAîşayê

2285. Fermuye peyemberê emîne
“Çêtir me ji wê çi jin nedîne

2286. Roja wê bi min dianî îman
Xelkî dikirin ji kufr û ʿudwan

2287. Ḥîna dikirim ewan diruhîn
Wê her digûtî tu ṟast î ser dîn

2288. ʿAlem ne dida me nurye nane
Xir malê xû da me wê ji cane

2289. Ew mabû li gel wî bîst û pênc sal
Ta mabû Nebî bi keyf û xuşḥal

2290. Êdî ne ẋema ʿeyal û nanî
Bes fikrê ḥeqî û karedanî

2291. Her rojê didîn wî qewmê nadan
Ew pîseṣenem peristîya wan

2292. Wî fikrê li ḥalê wan bû her dem
Ta Barî kire resûlê ʿalem

**Ewladuhu mîn Xedîcetîl Kubra (Zarokên Wî yên ji Xedîcaya Hêja)**

2293. Ewladê di wî ji wê ne du kuṟ
Çar taze kiçêt cewan û dêm durr

2294. Serdefterê wan e Qasimê pak
Paşî wî bû Zeyneba şeṟefnak

2295. Paşî bû Ruqeyye ya cemîle

Paş wê bûye Faṭîma celîle

2296. Peyda bû ji paşî Ummu Kulṯûm
ʿEbdullah li du heman e meʿlûm

2297. Ṭeyyîb leqeba wî ye û Ṭahir
Ṭahir bi fîdayê wan e axir

2298. Ev her du kuṛe ku çendikuk bûn
Ew her du mirin xû hêj biçuk bûn

2299. Şebhî wî kuṛê ji Marîya bû
Ew jî bi biçukî lê wefa bû

2300. Ev çar kiçe nazenîn û dildar
Mazin bûne dane şuy wî her çar

2301. Ellah me bibîte piştevane
Dê paşî bibêm ji ḥalê wan e

**Terbîyyetuhu îbn ʿEmmîhî ʿElîyye îbn Ebî Ṭalîbîn. (Perwerdakirina Pisamê Wî ʿElîyê Kurê Ebû Ṭalibî)**

2302. Xaliq bi ʿElî gelek kerem kir
Pakij ji ʿîbadetê ṣenem kir

2303. Hêşta xû biçuk bû anî îman
Roja bû Nebî dihatî ferman

2304. Hêşta nebibû Nebî Muḥemmed
Babê wî feqîr bibû çi bêḥed

2305. ʿEbbas wî demî gelek bû zengîn
Peyẋemberî gûte wî çi rengîn

2306. Bûṭalibê me xudan ʿeyal e
Mêvan piṛṛ e û feqîrêḥal e

2307. Çarek fer e lê bikeyn henûke
Em batî xudan bikeyn biçûk e

2308. Xizmatî diyar dibîte hingî
Xizmê te ku ket deravê ṭengî

2309. Çûn gûtinê tu feqîrêḥal î
Em bû te xudan dikeyn ʿeyalî

2310. Wî gû ji me ra ʿEqîl û Ṭalib
Ḥubba me ji wan di qelbî ẋalib

2311. Ha bû we ʿElî û taze Ceʿfer
ʿEbbasî ve bir ʿElî peyember

2312. Mazin bû li nik resûlê nûrîn
Ew hêj wî demî biçuk bû şîrîn

2313. Hîcret ku dikir ji bû Medîne
Ew bûye li cê wî nêv nivîne

2314. Çen rojê li paş resûlê ummet
Wî daneve her çî hey emanet

2315. Ew paşî diçû Medîneya pak
Hêj ew li Quba bû yarê lewlak

**ʿEmeluhu Eleyhî-s Selam Meʿe Qureyşîn fî Bînaîl Keʿbetî we Teʾrîxû Benaîha (Digel Qureyşan di Avakirina Keʿbê da Karê Wî (s.l.w))**

2316. Nazdar û Muḥemmedê guher senc
ʿUmrê wî gehiştibû sîh û penc

2317. Ava kireve Qureyşîyan çak
Ew beyte ʿetîq û Keʿbeya pak

2318. Ta hingî bi gûtina kîtaban
Keʿbe ne gelek bilind bû bê ban

2319. Nêv beytê hebû ye malekê zûr
Nêv bîrekê şeş gezan hebû kuṛ

2320. Her malê dihat ji wan dîyarî
Ew da kene nêv di rahê Barî

2321. Êk rabû dizî ve genc û male
Mîn cumle du ṣafî zêr ẋezale

2322. Îsbat bû li nik Duweyk e nave
Destê wî birîn ewan di gave

2323. Meznêt di Qureyşîyan vecemyan
Tedbîr dikirin ji xû ve hemyan

2324. Em lazim e malekî cemakeyn
Da beytê bi carekê nibakeyn

2325. Ev Keʿbe nê maleka qedîm e
Qedrê wê li ser heman ʿeẓîm e

2326. Miḥtac e xirab bikeyn seraser
Carek dî bina bikeyn serûber

2327. Emma nê ji heybetan ne wêran
Kes Keʿbe bi dest bi gêrî wêran

2328. Rabûye Welîdê bab Muẋîre

Ṣaḥib cegerê mezin ʿeşîr e

2329. Ez Keʿbe gûtî dikem xerabe
Êdî çi bibît Xudê ḥîsab e

2330. Hindek wî xirab dikir ji dîwar
Guhdayê heman ji karê Qehhar

2331. Aya çi dihêt bi ser Welîdî
Kes ev nekirî meger Welîdî

2332. Ew şev hemuyan di întîzarê
Da xû çi ʿezab bû dête xwarê

2333. Dîtin ṣibehê ku ṣaẋ e wek car
Ew taze li gel wî keftibûn kar

2334. Wan xirvekirin ber û keriste
Her êk ji xû ve bi kar û çust e

2335. Barî wî demî we kirbû teqdîr
Gemyek ketibû li Cudde êxsîr

2336. Pirsîn li xudanê wê yekê rom
Yek tacir e ew bi navê Baqum

2337. Rabûye Welîd bi çen suwaran
Çûn Cuddeyê ew bû dar û baran

2338. Ew gemye kirî ji wî xudanî
Husta bû bi xû li gel xû anî

2339. Husta ye belê û şareza ye
Ava kirî Keʿbeya Xudaye

**Fîtnetun Yutfîuha en-Nebîyyu ʿEleyhî's-Selam (Vemirandina Arîşekê ji Alîyê Pêxemberî (s.l.w))**

2340. Wek her kesekî Nebî bikar bû
Nav wan ʿemelan çu meh diyar bû

2341. Wan taze bina kirin bi ṣinʿet
Ḥetta bû bilind qeder bi qamet

2342. Gava ku dihat gera[1] berê ṛeş
Nêzîk bû li wan bibît şeṛê ṛeş[2]

2343. Ger rayê Nebî neba şirînkar
Bê dê li wan bibaye kuştar

2344. Lewṛa ku digûtî her qebîle
Her yek dixurî bi qal û qîle

2345. Em dê vî berî li cê wî danîn
Êdî mineta çu kes nizanîn

2346. Her êk divîya ji bû xû xêre
Gef lêk dî kirin çi nêr e şêr e

2347. Xaṣma du qebîleyêt di duşwar
Des kir bi gef û giran bi kuştar

2348. Çar roj û şevan ʿemel beṭal bû
Ḥalê Mekehê çi tirş û tal bû

2349. Ta rabû Ebû Umeyyeyê pîr
Zanayê xudanê ray û tedbîr

2350. Reyek ku heye me guh bidêrin
Reyêt mezinan gelek bi xêr in

2351. Lewṛa çî neket guhdarê meznan
"Dê pêve bihên wî şaxê biznan

2352. Lew dergê ṣefa sibeynê her kes
Pêşî hemîyan bihêt ḥekem bes

2353. Lew kare ewî dikeyne qazî
Em cumle bi gûtina wî raḍî

2354. Ḥacet nîye hîç şeṛ û şîqaqe
Ser beytê bibîne natifaqe

2355. Ew her çî bibê dikeyn qebûle
Êdî bû Xudê dikeyne şûle

2356. Raḍî bûne bew qerare yekser
Ew man û sibe kî bêt ji ew der

2357. Wan dî ku Muḥemmedê şirîn hat
Ey babû çi ṣadiq û emîn hat

2358. Zana ye belê çi huşimend e
Karê wî hemû pesind û rind e

2359. Wan qîṣṣe ji bû dikir beyane
Wî gûtî belê şekir zubane

2360. "Sanahî ye zûr ve karê taze"
"Nê hûn hemîyan s̱ewab nîyaz e"

---

[1] dor

[2] Şerê şermezarîyê, şerê dijwar

2361. “Danên vî berî di nêv ʿebayek”
“Her mazinekî ji bû wî layek”

2362. “Hun pêkve bilind biken bikar e”
“Da kes nebî bê neṣîb û bare”

2363. Ew çuye bi destê xûy mubarek
Wergirtibû ber ji wan bi carek

2364. Danabû bi destê xû çi ustad
Ew ber li cihê xû taze dilşad

2365. Ew fitne bi destê wî vemirya
Şukranî kirin ji bû wî hemya

2366. Ey her tu bijî bi xêr û şayî
Ku raḍî kirîn te em tebayî

2367. Evro tu nebay Xudê dizanî
Da xû çi dikir me nacewanî

2368. Evro ji me ra tu bûye reḥmet
Bextê te sipî bî dûr ji zeḥmet

2369. Lê wan nedizanî ey nezanan
Şeʾnê vî resûlê îns û canan

2370. Ew reḥmet e lê bû ʿalemînan
Hem ṛehber e bû cîhan û dînan

2371. Evroke ke bûye ṛehberê wan
Ew dê sibe bît peyemberê wan

**Keyfîyyetu Bînaîhîm el-Keʿbete**
**(Awayê Avakirina Keʿbê ji Alîyê Wan ve)**

2372. Wan Keʿbe bina kirin çi taze
Çendî ku şiyan bi dil niyaze

2373. Her çendî ke hişke ber bû dîwar
Muḥkem bû gelek şirîn û dildar

2374. Du ḥêsîle bes kirin bû xanî
Êk ruknê ṛeş e û êk yemanî

2375. Layê dî bina kirin xir û xir
Mîqdarê bi bejnekê kirin pir

2376. Dergê wê lewa bilind kirin zûr
Bêy wan ta çi kes neçît ji bû jur

2377. Ta hingî nebîne Keʿbê bane
Dergê wê li ʿerḍî bûy cewane

2378. Derkê wê hebû li rojhelate
Wan jêvekirin ji ew welate

2379. Wan kiçke kirin bi ray û fikrê
Şeş gez vebirîn li layê ḥîcrê

2380. Wan hejde gezan bilind kirîne
Çen muḥkem e ew du hin şirîn e

2381. Du rêzesitun çiqandî wane
Her rêzekê sê situn bû bane

2382. Danan derecek di nav bû banî
Banê wê ji dar kirin wî xanî

2383. Surkek bû kirin li layê ḥîcrê
Bejnek jê kirin binayê ḥîcrê

2384. Dergek bû kirin ji darê taze
Xemlandî wekî ewan niyaze

2385. Danan hubelê ṣenem di navê
Meşhûr e bi baş ṣenem di gavê

2386. Ev renge bîna kirin Qureyşan
Ev Keʿbe tijî ji ʿîzzet û şan

**Tarîxu Bînaîl Keʿbetî (Dîroka Avakirina Keʿbê)**

2387. Ev care binayê Keʿbeya pak
Meʿlûm bû ji bû te muxteṣer çak

2388. Ava bûye Keʿbe yazde caran
Gel çendî şiyan û tazekaran

2389. Ewwel melekan bi emrê Barî
Ava kiribûn bi tazekarî

2390. Paşî ku dibên cenabê Adem
Ava kirî keʿbeya muʿeẓẓem

2391. Paşî wî kuṛê wî Şît peyember
Paşî wî belê Xelîlê Azer

2392. Ew renge ʿEmalîqan û Curhum
Lê paşî Quṣesyê pakemerdum

2393. Paşî wî Qureyşiyan ve xanî
Avakiribû wekî te zanî

2394. Paş wan bû kuṛê Zubeyrê ʿEwwam
Ḥeccacî ji paş wî ew yê bednam

2395. Ava kiribû dumayê sulṭan
Meşhûr e Murad ji alê ʿUs̱man

2396. Sulṭanê mezin Muradê Çarê
Reḥmet hemû dem bû bête xarê

2397. Car car dê ji wan bikem beyane
Bijlî ʿemelê Qureyşîyane

**a/أ Bînau Îbrahîm ʿEleyhî's-Selam**
**(Avakirina Îbrahîmî (s.l.w.)**

2398. Pêş nuke bi çar hizar ji sale
Ava bîye Keʿbeya delale

2399. Her wek ji me ra dibêjî Qurʾan
Du ehlê kemal û ʿîzzet û şan

2400. Yek hezretê Îbrahîm Xelîl e
Yê dîke kuṛê wî Îsmaʿîl e

2401. Hustayî dikir ewî bi ṣinʿet
Vî harî dikir bi kar û quwwet

2402. Ava kirî ser binaẋê Adem
Gel hişkeberê cewan û muḥkem

2403. Ḥetta qederek bulund bû dîwar
Westa bû li ser berek bi naçar

2404. Westa bû belê li ser meqamî
Pêt wî tê niqu bibûn temamî

2405. Du pê wî belê tê çûne xware
Ta nuke jî şun li wan diyar e

2406. Her çendî bilind bûye dîwar
Ew ber jî bilind dibû ʿecebkar

2407. Du ḥêsîle bes ji bû wê danî
Yek ruknê ṛeş e û yek yemanî

2408. Mabeynê di wan eger dibêjî
Wî kirine sih û du gez dirêjî

2409. Layê dî wekî kivan diyar e
Neh gez bû bilindî çar kinare

2410. Dîwarê cinubî ʿerḍ û panî
Gez bîst û yek in ewî ku danî

2411. Dergê wê li rojhelatê lay e
Ser ʿerḍî fireh bû piṛṛ buha ye

2412. Kûṛkek bû dikir di nêvcewane
Bû keʿbe dîyarî ew xîzane

2413. Bû ḥîcrê wekî kivanê dîwar
Ava kirî bejnekê şirînkar

2414. Hêlabû hu Keʿbeya xudan şan
Bê derge û dergevan û bê ban

**b/ب Bînau ʿEbdîllah bîn ez-Zubeyr**
**(Avakirina ʿEbdullahê Kuṛê Zubeyrî)**

2415. Ew ʿEbdê Xudê ji dil nîkunam
Meşhûr e kuṛê Zubeyrê ʿEwwam

2416. Hîcret digehişte şêst û çarî
Reḥmet hemû dem bû bête xarî

2417. Wî kirbû ji Barî îstîxare
Da keʿbê xirab biket dubare

2418. Zanîbû ewî ji ʿAîşayê
Ew xalet û menbeʿa ṣefayê

2419. Her wek ji me ra dibêt Buxarî
Reḥmet li me û li wan bibarî

2420. Peyẋemberî gûte ʿAîşayê
Qurbanî dibim bi bab û dayê

2421. "Qewmê te neban dinû Xudênas
Min keʿbe xirab dikir ji asas"

2422. Ser taze binaẋeyê Xelîle
Ava me dikir ve çen celîl e

2423. Du derge me dê ji wê vekirban
Ew derge me dê bilind nekirban

2424. Yek şeṛqî dibû ewê dî ẋerbî"
Çen taze ye keʿbe ger du der bî

2425. Gel vî xeberî ji yarê rogeş
Hem ṣûtibû ji beytê ew kujî ṛeş

2426. Lew Îbnû Zubeyrî qeṭ nebestî
Beyʿet bû Yezîdê milşikestî

2427. Qaṣid wî li du hinart Medîne
Ew çu Ḥerema Mekê emîne

2428. Leşker wî hinart bi cewr û ḥîddet
Ta qewmî ewa li Ḥerre fîtnet

2429. Ew ya kirî şamîyan ji bedkar
Gel ehlê Medîneya nebîwar

2430. Nazanî eger tu her mezane
Ey çen li dilan bi êş û jan e

2431. Ta çûne kuṛê Zubeyrê ʿEwwam
Wan Mekke ḥişar dida bi nakam

2432. Dûr Keʿbê hebûne çen ji çadir
Havête ewan bizutê agir

2433. Ta şutî ji Keʿbeya munewwer
Hem perde û Ruknê Ṛeş seraser

2434. Axir verevîn ve ceyşê bêqam
Wan zanî ku mir Yezîdê bednam

2435. Lew rabû kuṛê Zubeyrê serdar
Wî Keʿbe xirab dikir bi yekcar

2436. Avakireve bi gêçê[1] muḥkem
Gêça Yemenê wî anî der dem

2437. Ta hingî kujî du bûn diyare
Çarguşe kirin bi tazekare

2438. Panî û dirêjî wek te zanî
Pêş nuke ji Îbrahîmê banî

2439. Wî taze bulund dikir cewane
Mîqdarê bi bîst û ḥeft geza ne

2440. Du derge kirin ji bû wê çen çak
Yek şeṛqî ewê dî ẋerbî ser xak

2441. Her derge kirin du ket yeqîne
Ba dar û depêt ji dil şirîne

2442. Danî derecek di nav bû banî
Neqşandî bi zêrî wek dizanî

2443. Banek bû kirin ku wî niyaze
Surka wê li layê Ḥîcrê taze

***

2444. Gava ku temam bû Keʿbe yekser
Nîva wê ṛeşand ji misk û ʿenber

2445. Perdek bû kirin ji payê tatac
Ew perde belê ji şafî dêbac

2446. Rabûye kuṛê Zubeyrê pêxas
Gel çen ji Qureyşîyêt Xudênas

2447. Bû mizgetî ʿAîşeyê bi tenʿîm
ʿUmrek bû Xudê kirin bi teʿ ẓîm

2448. Ew roje çi roj bû piṛṛ ji şayî
Bû ehlê Meka mezin tebayî

2449. Zur pez bû Xudayî ser birîne
Zur kule ji bû wî ḥur kirîne

***

2450. Avayê kuṛê Zubeyrê mêrçak
Ev renge bû wek te zanî serpak

2451. Karek bû wî kir ji bû Xudaye
Ya Reb bi deyê tu zûr cezaye

2452. Ṭahir wî ji xadiman nexûş e
Hem şaẋ ke bi luṭfê hem bipûşe

**c/ج Benau el-Ḥeccacu es̱-S̱eqafî**
**(Avakirina Ḥeccacê Seqefî)**

2453. Hîcret digehişte çar û ḥeftê
Ḥeccacî dikir binayê Beytê

2454. Ew ẓalimê hu bi qehr û qeswet
Çen kar wî kirin ne karê mirwet[2]

2455. Hate Mekehê bi xêr nehêtin
Bê sûç û sebeb çi xwun wî rêtin

2456. Çen rojê kuṛê Zubeyrê ʿEwwam
Wî xiste ḥişar û ṛencê bê qam

2457. Axir wî şehîd dikir li wêrê
Ew dilreşê bê pişk ji xêrê

2458. Kaẋez wî hinart bû Îbnû Merwan
ʿEbdulmelîkê li Şamê sulṭan

2459. Meʿlûm bî kuṛê Zubeyrê ʿEwwam
Mazin kiriye wî Keʿbe bêqam

2460. Mazin kirîye li layê ḥîcrê
Du derge ji bû kirîn bi fikrê

2461. Ger emrî bikey bi kar û bare
Ez Keʿbe dikem wekî he care

[1] kirêc

[2] camêrî

2462. Ser weqtê Nebî çewa bû Keʿbe
Ez dê we bikem bi her çî teʿbe

2463. ʿEbdulmelîkî xeber we dayê
Keʿbê tu bigêre wek berayê

2464. Derḥal herifand li layê ḥîcrê
Ya Reb nedeyê çi xêr û ecrê

2465. Ava kireve şîmalê dîwar
Şeş gez vebirîn ewê sitemkar

2466. Derge wî digirt li layê ẋerbe
Dagirteve wek hecar bi kerbe

2467. Dergê wê li rojhelatê danî
Çarguşe dikir ewîş ve xanî

2468. Hel bin derî ta digehte xake
Ew jî ji binayê ew nepake

2469. Danî derecek ewîş di nave
Banê wê xirab nekir di gave

2470. Baqî çi hebû ji Keʿbe dîwar
Avayê kuṛê Zubeyrê dildar

2471. Çen paşî ku zanî Îbnû Mirwan
Karê wî kirî ne karê merdan

2472. Zanî bû Resûlî gût temame
Her wek ji Buxarî hat peyame

2473. Zanî ku kuṛê Zubeyrê pirseng
Wî Keʿbe belaş nekirbû ew reng

2474. Ew hingî bibû gelek peşêman
Ta nuke nezanî min ve ferman

2475. Wê rojê eger me ew dizanî
Min hu nedikir bi nacewanî

**d/د Benau es-Sultan Murad er-Rabiʿ (Avakirina Sulṭan Muradê Çarê)**

2476. Hîcret digehî çil û hizaran
Ava bûye beyt dumayê caran

2477. Salek li we pêş bi emrê Barî
Baraneka zûr mezin dibarî

2478. Lêmişte ji wê niwalê gur bûn
Ḥewşa ḥeremê û Keʿbe piṛṛ bûn

2479. Dîwar ḥerifîn du Keʿbeya pak
Yek şeq bû ewê dî kefte nêv xak

2480. Lew emir dikir cenabê sulṭan
Meşhûr e Murad ji alê ʿUs̱man

2481. Sulṭanê mezin Muradê çarê
Ṣed feyḍ û kerem bû bêne xarê

2482. Wî çêkireve cewan û muḥkem
Wek pêşî wî Keʿbeya muʿeẓẓem

2483. Malek wî mezin di rahê Barî
Lê ṣerf dikir bi tazekarî

2484. Hel hingî ḥeta digehte ev dem
Hu mayeve Keʿbeya muʿeẓẓem

2485. Ya Reb tu bidey min û Muradî
Daxwaz û mirad û keyf û şadî

2486. Ûmêd e bi reḥmetê bipûşî
ʿEybêt me ku rûsiyah e Şûşî

**5.
EZ-ZEHRETUL XAMÎSETU (KULÎLKA PÊNCÊ)
ḤALU QEWMÎ YEWMEÎZÎN WE ḤALU EL-ʿALEMÎ EL-MUCAWÎRÎ WE TEXUṢṢUHU BÎXARÎ ḤÎRAÎ (REWŞA MILLETÊ WÎ Û REWŞA CÎHANA DEWR Û BER Û MANA WÎ DI ŞIKEFTA ḤÎRAYÊ DA)**

**a/أ Ḥalu Qewmî Yewmeîzîn (Rewşa Milletê Wî)**

2487. Ey meẓherê reḥmeta Xudayî
Wey her ji bû reḥmetê tu dayî

2488. Rebbê te tu çêkirî bi pakî
Da bibye delîlê xêr û çakî

2489. Ḥetta tu nehatî vê cîhanê
Îman me nedî digel emanê

2490. Exlaqê di taze xir nîhan bûn
Kiryarê di pîs li ʿerḍî pan bûn

2491. ʿAlem ketibû binê niwalê
Bê bar ji seʿadet û kemalê

2492. Ev cewherê hu bijare însan
Ku dayî Xudê bi ʿeql û wîcdan

2493. Çêkirye Xudê bi ṣunʿêkarî
Ew zêde ji xelqê xû bijarî

2494. Ev ʿerḍe û aseman seraser
Ev ḥîkmet û ev wicude yekser

2495. Ev roj û heyv di asemanî
Ev beḥr û ber û çiya û kanî

2496. Ev dan û dikak û mêwe piṛṛ seng
Ev dar û giya û gul hizar reng

2497. Ev naz û neʿîm û ev meqame
Ev ḥîkmet û reḥmet û nîẓame

2498. Ḥetta ku biçît hizar hizaran
Van nîʿmet û luṭf û tazekaran

2499. Barî bû beşeṛ kirîn bi carek
Ḥetta ku beşeṛ bijît mubarek

2500. Ḥetta ku Xudê binasî taze
Ta her du cîhan bî serfiraze

2501. Ev cewherê kes nedîtî însan
Nêzîk bû biçîte rêzê ḥeywan

2502. ʿAlem wî demî nexûşeḥal bû
Ewḥalê ji wan çi tirş û tal bû

2503. Qewmê wî bizir bibûn di gumrah
Ney guh li ḥeqî hebûne agah

2504. Efkarê di wan di nadurust bûn
Bes nîne hemû ṣenemperist bûn

2505. Ummî ne hemû ne xwundewar in
Nazan û bed in ne huşîyar in

2506. Dûr in ji rîya seʿadetê ew
Kuṛ in ji rîya hîdayetê ew

2507. Cahil bi hemû ṣeṛîʿet û dîn
Ẋafil ji mezin xizîneya jîn

2508. Têk da hemû dilreş in di dilreq
Her karê dikir hemû bi naḥeq

2509. Çî jar û feqîr li nav di jar bûn
Mazin hemû şibhî gurgê har bûn

2510. Geh karê ewan revan û talan
Geh cengê giran di çendî salan

2511. Ew hinde di dilreq in di baẋî
Wan kiç di qebir dinan bi ṣaẋî

2512. Exlaqê di wan çi pîs û bed bûn
Şulêt ne ji reng ne karê ḥed bûn

2513. Kufrî û delal û butperistî
Ḥîzî û dizî û nadurustî

2514. Xwarî û ḥesûdî û xiyanet
Serxûşî û larî û ṣefahet

2515. Bazarê direw nîfaq û ḥîle
Xûş bû wî demî di her qebîle

2516. Her qewmek û her ʿeşîretek wan
Ew serbixû bûn bi ḥukm û sulṭan

2517. Ew çunke di bêser û belav bûn
Lew hinde di bê buha û nav bûn

2518. Ḥeyf e beşeṛê giran buhaye
Dûr bît ji rîya kemal û raye

2519. Neyxasim e ʿereb bi wê nijadê
Ew renge di weḥşîet û fesadê

2520. Ew huteve bûn û hêj xirabtir
Barî ku hinart resûlê axir

2521. Behrek çi mezin Xudê bi wan kir
Fexrê du cîhan ewî ji wan kir

2522. Ev qewmê te dîn çi kar û reng e
Nu paş tu bibîn bi nav û deng e

**b/ب Ḥalu el-Alemî’l-Yemeîzîn (Rewşa Cîhanê Wê Serdemê)**

2523. ʿAlem wî demî eger bizanî
Bê behre bibûn ji zîndeganî

2524. Ev huş û dilêt Xudê bi nîʿmet
Dabûnê ji wan bibûne nîqmet[1]

2525. Lewṛa çi kesê ji ḥeq bû gumrah[2]
Ev jîne wî jehremar e wellah

[1] Ceza, tol

[2] Yê ji rê derketî

***

2526. Meşhûr wî demî hebûn du dewlet
Her du çi bi şewket û bi ṣewlet

2527. Yek rom e qeralê wan bû qeyṣer
Kîsra bû serûkê fursê yekser

2528. Romiyan xû ḥisêb dikir Mesîḥî
Emma ne Mesîḥîya seḥîḥî

2529. Ew dînê li ser bû Îbnû Meryem
Nik wan nebû bijlî nav di ew dem

2530. Ew dînê li nik Xudê ke îslam
Têk da bû ewan qeşan bi nakam

2531. Încîl ku Xudê ji bû hinarî
Têk da bû qeşan bi ḥîlekarî

2532. Wan destê xiyanetê ku keftê
Încîl dikirin pitir ji ḥeftê

2533. Çen car qeşe û mezin vecemyan
Teftîş dikirin bi reyê hemyan

2534. Încîlê durist ji naduristan
Lêk ferq kirin çi pê diwestan

2535. Axir dikirin tifaq li ser çar
Ev çare durist û êt dî xir xwar

2536. Halbukî eger tu van bibînî
Bê şik dê ʿeceb ji wan bimînî

2537. Ev çare ku wan ji dil bijarî
Her çar di piṛṛ in ji ʿeyb û xwarî

2538. Ew carê diken Xuday xû ʿÎsa
Gel hindê diken fîday xû ʿÎsa

2539. Carek dî diken kuṛê Xudê ew
Carek dî diken wî êk ji sê ew

2540. Ev gûte li nik heman diyar e
Ew bûye bi dest cuyan qinare

2541. Da bibte bû wan fîda û qurban
Qurtar biketin ji sûç û ẕenban[1]

2542. Ta nûke mezin diken ṣelîbe
Ev xaçe bi yadîgar ḥebîb e

2543. Qurʾan ji me ra dibêjî ferman
Ev gûte ji wan diru ye buhtan

2544. Romî di ʿeqîdeyê di hu bûn
Emma bi ʿemel nepirse ku bûn

2545. Rabûne ji wan gelek ji qeyṣer
Daîm bi şeṛ û şîqaqê yekser

2546. Geh ẓilme digel feqîr û jaran
Geh cenge digel mezin neyaran

2547. Gava ku diçûne ḥerb û kujtar
Xun da çî ji her du la bi cubar

2548. Çî ẍalibe yê dî nehb û talan
Bedkarî li gel ʿeyal û malan

2549. Çen carê diçûne cengê fursê
Ew her du ṭeref diketne tirsê

2550. Gava diketin di ḥerbê ʿame
Da têk şiliqin ʿÎraq û Şam e

2551. Wan jêk dikirin ji ẓilm û ʿudwan
Şulêt ne ji rengê newʿê însan

2552. Nazanî eger tu ḥalê Furse
Ḥezkey tu were ji min bipirse

2553. Qewmek di berî ji mezheb û dîn
Agirperisî ewan bû ayîn

2554. Wan pîşe hemî ḍelal û ṭuxyan
Daîm bi fesad û fisq û ʿîṣyan

2555. Gavê şeṛ û şor û xun rijandin
Talan û dizî û mal revandin

2556. Gavê bi ficur û fisq û mestî
Gavê bi ẍurûr û xudperistî

2557. Lewṛa ketibûn binê nuwalê
Bê bar ji hîdayet û kemalê

2558. ʿAlem wî demî li her kinaran
Çêtir nebû yîn di dîn û karan

2559. Hindan digû çêl û gaperist in
Hin ʿabidê roj di nadirist in

---

[1] Guneh, sûç

2560. El qise - hemû cîhan temamî
Ketbûne delalet û nekamî

2561. Yekser bi ḍelaletê gehîbûn
Bû ṛehberekî çi pêtivî bûn

2562. Miḥtac bû hemû kuṛey zemîne
Bû murşîdekê bi ḥeq di dîne

2563. Bû cumle beşeṛ bibîte ustad
Da bînte derê ji kufr û îlḥad

2564. Da bînte derê ji ṛenc û ṭarî
Wan fêr biketin bi dînê Barî

2565. Ta ew du cîhan bi dilnewazî
Dilzînde bijîn bi serfirazî

2566. ʿAlem ketibû wî ḥalê naxuş
Ney age ji rahê ḥeq bû ney huş

2567. Nageh wê li Mekke hat peyember
Ev ʿaleme xir dikir munewwer

2568. ʿAlem bireser riya kemalê
Rizgar wî kirin ji wê ḍelalê

2569. Exlaqê di taze û bijare
Adabê pesind û namidar e

2570. Esbabê bilindî û ḥeyatê
Disturê ʿedalet û necatê

2571. Wî bû beşeṛî bi zarê tenzîl
Yekser wî kirin beyan û tefṣîl

2572. Ta ew du cîhan bibin şirînkar
Têkda bigehin riḍayê Ẋeffar

2573. Serkêl dê bijîn bi ʿîzzeta wî
Yekcar dê biçin di cenneta wî

**Tehennuṣuhu Bîxarî Ḥîraî Bîcelebî Nûr (Vemana Wî di Şikefta Hîrayê li Çiyayê Nûr)**

2574. Ey serwerê cumle wuldê adem
Ey tacê serê cemîʿê ʿalem

2575. Ey meẓherê reḥmeta Xudayî
Wey her ji bû reḥmetê tu dayî

2576. Barî bi me dan hizar ji nîʿmet
Roja tu kirî delîlê reḥmet

2577. Hêşta tu nebûy resûlê ʿalem
Daîm te di dil bû şulê ʿalem

2578. Qewmê te çewa ṣenempersit in
ʿAlem xû pitir di nadurist in

2579. Daîm te xeyalê dil bû ta key
Van murdedilan Xudê diket ḥey

2580. Nê her çî li gel Xudê neyar e
Ev jîne li wî xû jehremar e

2581. Her çî ku ji dil nenasî Barî
Ev jîn û cîhan dibît wî ṭarî

2582. Roja wî Xedîce kirbû mare
Ḥacet wî nema bi kesb û kare

2583. Asûde bû dil bi ẕewq û leẕẕet
Gel wê ḥeremê bi taze ʿuşret

2584. Rotî[1] bû bedel bi dewlemendî
Wî serif dikir bi serbilindî

2585. Ew pîrê keçî yetîm û bêḥal
Evruke xudanê mal û mindal

2586. Dunê bû dikir ewî ṣivanî
Ew nuke xudan xîwanê nanî

2587. Gava dî di kesb û kar û ṛence
Vê gavê şukir wî ḥalê qence

2588. Car care dibû digel hevalan
Guhdarî dikir ji qîl û qalan

2589. Karê ṣenem û ṣenemperistan
Rêka biziran û naduristan

2590. Fikra ku li ser ji kufr û kufran
Karê ku dikir ji ẓilm û ʿudwan

2591. Sal sale diçû bû wan dikanan
Çen mahê hecê ewan didanan

2592. Wek sûqê ʿukaz û  zîl mecazan

[1] Feqirî

Da xirbineve bû çen niyazan

2593. Hin ariş û wêrişî diken hin
Xutban û qesîdeyan dixwunin

2594. Guhdarî dikir li wan bi texmîn
Ya Reb ve çi mezheb in çi ayîn

2595. Vî qewmî Xudê nezan dibînim
Wan dûr li ḥeqî ʿeyan dibînim

2596. Elqîṣṣe - ewî di bîst û pênc sal
Her dem wî xeyal û fikrê ev ḥal

2597. Şûlek bikira ewan şirîn şul
Gel wan dibû ew bi kar û maqûl

2598. Têkhel nedibû bi wan di nadî[1]
Ḥîna ku diçûn ṣefa û şadî

2599. Gava ʿereq û xirûş û mestî
Şehwetperisî û xûdperistî

2600. Wan secde dibir demê bû latî
Qurban dikirin ji bû menatî

2601. ʿUzza û hubel bi zêde îʿzaz
Wan ku dikirin ji wanve daxwaz

2602. Ew lat û hubel ke kulkedar[2] bûn
Ew çen jidilî bû secdekar bûn

2603. ʿUzzayê ke destkarê neccar
Çawa dikirin Xudayê Ẋeffar

2604. Çendî wî didît delal û qeswet
Wî zêde dibû ji wan ve nefret

***

2605. Car care lewa diçû çiyayî
Fikra wî di ṣinʿetê Xudayî

2606. Ev dar û ber û çiya û çule
Dehbe û beşeṛ û giya û gule

2607. Ev ʿerḍe bi her çî berr û beḥran
ʿEsman xû bi van sitêr û seyran

2608. Meʿlûm e divêt mezin xudanek
Zana û xudan şiyan û şanek

2609. Çen car wî li ser çel û şikêran
Wî çav bi vî newʿî her digêran

2610. Qewmê xû didît di wê ḍelalê
Aluz bû lewa ji wê xeyalê

2611. Çen car we dibû diçû şikeftan
Rojek di vema ḥeta ku ḥeftan

2612. Xaşma remeḍan di kullî salê
Yek şev nedimave ew li malê

2613. Daçîte derê li Mekkeya bûş
Ew taq û tinê digel dilê xuş

2614. Gel xû dibirin wî zad û nane
Daçîte şikefteka beyane

2615. Îşkeftê Ḥîra çi tazeẋar e
Ta nuke mubarek û diyar e

2616. Lew taze çiya Çiyayê nûr e
Jurî Mekehê gelek ne dûr e

2617. Cumley remeḍan diçû wê ẋarê
Ḥetta weḥî bû dihate xwarê

2618. Ya Reb te ezê feqîr û jar im
Şermende ji tu gunahkar im

2619. Bû dergehê tu ji nuve hatim
Luṭfa du cîhan bidey necatim

2620. Min hîvî bi reḥmeta te zûr e
Ya Reb tu ji Ṭahirî bibure

2621. Şûşî te eger çî piṛṛ xeṭa ye
Aza ke bû cahê Muṣṭefa ye

## TEMHÎDU RAWḌATUS ṢANÎYETÎ (PÊŞGOTINA MÊRGA DUYÊ)

2622. Ey dil were da biçîn bi canî
Bû çîmenê du bi şademanî

2623. Peyẋemberê mey ḥebîb û serwer
Ḥalê wî çi bû ku bûy peyember

2624. Hel ewwelê bîʿṯeta şirîn e
Ta hîcretê wî ji bû Medîne

2625. Ḥalê wî çi bû di ṡêzde salan

[1] Gazi, dawet, cihê civînan

[2] Senemperist

Gel wan nekesan û bedsugalan

2626. Ger yar bî Xudê dikem beyane
Her çendî me quwwet û şiyane

2627. Ya Reb me ruḥ û giyan bi tu ye
Her dem meded û şiyan ji tu ye[1]

[1] Di destxetê da piştî vê beytê Şuşî bi erebî nîşeyek nivîsandîye. Di vê nîşeya xwe da dibêje ku eve heft sal e tuşî nexweşîyek gelek giran bûye û hêdî neşêt baş li ser nivîsa xwe bisekine, can binivîse û bixemlîne.

**ER-RAWḌETÛ’S- SANÎYETÎ (MÊRGA DUYÊ)**
**Mîn Buʿs̱etîhî Îla Hîcretîhî ʿEleyhî’s-Selam (Ji Dema Bûyî Peẋember Heta Mişextbûna Wî)**

BÎSMÎLLAHÎRREḤMANÎRREḤÎM
Wema Erselnake Îlla Reḥmeten Lîl ʿalemîn(*Hey Muḥemmed!) Me tu şandî bes da ku tu ji heyînan re bibî rehmet. (21-Sûreye Enbîya (107)*)

**EZ-ZEHRATU’L-ÛLA (KULÎLKA ÊKÊ)**
**Fî Matlaʿîr Rîsaletîhî (Di Despêka Pêxemberîya Wî da)**

2628. Meḥbûbê Xudê resûlê ʿalem
Serdarê peyẋemberan û xatem

2629. ʿUmrê wî dema gehîbû çil sal
Ew pakedilê bijare efʿal

2630. Wî ʿeql û edeb gehîn kemalê
ʿAlem ku gehiştibû ḍelalê

2631. Xulqê wî eger çî her ji ewwel
Şîrîn pesind û pak û ekmel

2632. Emma li çilê gehîn du hinde
Raêk û bijar e û pesind e

2633. Çen şûl tu wekî dikey eger ciḥêlî
Vî ʿumrî bi xû bi cê dihêlî

2634. Ew ʿumre ḥeta ji wî diburî
ʿAdatê dinê wî dîn bi zûrî

2635. Geh bûn û gehê nexuşeḥalî
Dem xûşî demêdî tirş û talî

2636. Dîtin wî gelek ji pîr û gencan
Nasîn wî gelek ji xwar û qencan

2637. Dunya ku ji xwe bi ṛenc û tal e
Ta hingî wî dîn gelek ve ḥale

2638. Ew fêr bû bi karê dunyedarî
Laîq bi giran e barê Barî

2639. Meʿlûm e ji sîret û ji exbar
Ḥalê vî resûlê pak û muxtar

2640. Axir wî nebû berê çi şulan
Ẋalib diçû bû çiya û çulan

2641. Xaṣma remeḍan di kullî salê
Wî ber li çiya bû pişt li malê

2642. Da çîtve şikefteka çiyayî
Meşhûr e Ḥîra bi xêr û şayî

2643. Ṣebrê wî dihat bi kevr û daran
Tenha be newek di nêv neyaran

2644. Car care dihat ḥerem serayê
Zad bû xû dibir ḥeta dumayê

2645. Ellah ji ezel bi wî kerem kir
Fexrê ʿereb û hemû ʿecem kir

2646. Ḥîna ku Xudê îrade ṣadir
Bû da bidetin resûlê axir

2647. Peyẋemberê axirê zemanan
Ew ṛehberê cumle îns û canan

2648. Dunyayê tijî biket ji nurê
Ta rojê ku pif diken di surê

2649. Wî dabîye wî dilek çi sade
Nura xû di wî dikir ziyade

2650. Ew dil bû wî kirbû gencê raze
Xewnêt wî dibûn durist û taze

2651. Xewna wî didît didît cewan e
Teşbîhî sipêde û beyan e

***

2652. Roja ku weḥî bû hate xware
Ew bû li Ḥîra tinê li xar e

2653. Hevdê remeḍan bû rojê duşem
Barî ku kire resûlê ʿalem

2654. Rebbê wî hinarte nik wî Cibrîl
Mizgîn tu Nebî ji bû te tenzîl

2655. Cibrîl ku wî yarekê emîn e
Gûtê: “Ji me ra hinik bixwîne”

2656. Wî gûtî “nê ez nexwundewar im”
“Ummî me li nik heman diyar im”

2657. Ḥîna we digût bi wî Muḥemmed
Ew ragivişî emînî bê ḥed

2658. Wî dest di Muḥemmedî werandî
Quwwet ku ḥeta ji wî birandî

2659. Berdave û gûte wî dubare
Dê zube bixwîn bi pakezare

2660. Di ya gûtî “min ḥerf nexwundî”
Hem ragifşîve ew bi tundî

2661. Ev renge dikir li gel wî sê car
Dil piṛṛ bû ji tirsê yarê hişyar

2662. Axir wî digû ji bû te mizgîn
Barî tu kirî peyemberê dîn

2663. “Îqra” tu bixwun bi navê Barî
Xellaqê mezin bi tazekarî

2664. Qudret wî piṛṛ e ʿeceb şiun e
Însanî didet li parçe xune

2665. Gel vî beşeṛî gelek kerem kir
Ew fêrê bi xwandin û qelem kir

2666. Ev sûrete xwand ji bû wî der dem
Ḥetta digehişte lefẕî yeʿlem

2667. Ev çende gûtî û ew nîhan bû
Peyẋemberî ṣaf tijî giyan bû

2668. Cibrîl wî demî ku lê bû berze
Geryave belê bi tirs û lerze

2669. Geşte ḥerem û ḥerem serayê
“Binxêve gûtî me girtî tayê”

2670. Paşî qederek ji lerz û tirse
Wî kir bi Xedîce ray û pirse

2671. “Ey xûş ḥerema me hem nişînî
Hem xûşî û hem ẋem û emînî”

2672. “Nabêjî çira tu huy perîşan
Karek me dî evru zûr ʿeceb şan”

2673. “Min dî li Ḥîra ʿeceb nîşane
Tirsek me qewî gehişte cane”

2674. Qîṣṣa xû hemû digût serûber
Bû wê ḥerema zuban çu şekker

2675. Derḥal digûtî Xedîce xanim
Hîç xewfê nekey tu ruḥ û canim

2676. Mizgîn li te bît bi ẕatê Barî
Ew gel te neket xerabekarî

2677. Meʿlûm e: Tu çav didey li xizman
Ṛastî te tinê dihêt ji ezman

2678. Bê çare û bê kesan muʿîn î
Mêvanî gelek bi xêr diînî

2679. Her karekê baş tu harîkar î
Ey yarê tebît cenabê Barî

2680. Ew her çî te dî durist e taze
Ellah dê biket te serfiraze

2681. Bawer pê diket ji qelb û canî
Îman wê ji pêş heman dianî

2682. Gûtî were da biçîn bipirsîn
Bû nik Wereqey me mamê durbîn

2683. Pîrek bû li mêje bûy Mesîḥî
Încîl wî dixwund digel seḥîḥî

2684. Fama û zekî bû piṛṛ dîrayet
Ew kuṛe bibû li jînê ẋayet

2685. Gava qise kir bû wî peyember
Derḥal wî dikir ji dilve bawer

2686. Wî gûtî ewê te dî di ẋarê
Şek nîne melek bû hate xarê

2687. Namus e ew e ku hat bû Musa
Nê her tu yî mijdedayê ʿÎsa

2688. Min bawere tu resûl î taze
Rebbê te diket te serfiraze

2689. Ez xwuzî bibam cewanemêre
Roja ku te der diken li êre

2690. Xaliq bidetin ḥeyatê muhlet
Ez dê ji te ra bikem çi nuṣret

2691. Peyẋemberî gû: “Kî der diket min”
Gûtî neḥez û neyar û duşmin

2692. Her kes ku bihêt bi dînê Barî
Îlla dê li gel biken neyarî

2693. Paşî qederek diket wefatê
Ser dînê Xudê digel necatê

***

2694. Rojek li Ḥîra dihatve malê
Ev yarê Xudê di nêv nuwalê

2695. Nageh kesekî dikir bi gazî
Peyẋemberê ḥeq bi ʿîzz û naz î

2696. Çendî fikirî li çar kinaran
Qet kes wî nedî ji dûst û yaran

2697. Wî rokire layê asemanî
Cibrîl e ku ew bi şadimanî

2698. Roniştî li beynê ʿerḍ û ʿerşan
Ser textekî ew bi rêz û piṛṛ şan

2699. Gava ku we dî resûlê ummet
Geryave bi lez bi lerz û heybet

2700. Razabû şirîn di nêv nivînê
Dapûşî Xedîce nazenînê

2701. Wê gavê dihête nik wî Cibrîl
Gû: Rabe bû deʿwetê bi teʿcîl

2702. Muzemmîl û muddeṯîr du suret
Înan bû resûlê taze ṣuret

***

2703. Ev care Nebî ku dîtî Cibrîl
Paşî jê qeṭʿi bû weḥ yû tenzîl

2704. ʿAciz bû gelek resûlê muxtar
Ev weḥye tinê ji bû me du car

2705. Ḥetta li ẋeman diçû çiyayî
Da xû firedet biçît fenayî

2706. Her carê diçû serê firakey
Cibrîl wî didî digû nekey wey

2707. Bê şek tu bizane ey Muḥemmed
Peyẋemberî tu dibî mûeyyed

2708. Gava wî didî mezin emîn e
Bihna wî dihat ji can evîne

2709. Çen mudde hituve mabû ẋemgîn
Lewṛa ku weḥî nehat bû çendîn

2710. Ḥetta gelekan ji muşrikan gût
Gûtek ku Nebî ji wê ceger ṣut

2711. Mewlayê Muḥemmedî diyar e
ʿAciz bîye lê digel neyar e

2712. Lewṛa diçû çulî wek berayê
Da çîte şikeftê xû Ḥîrayê

2713. Dil piṛṛ li ẋeman çav li reḥmet
Barî neketin li gel wî zeḥmet

2714. Ta Barî hinarî yarê Cibrîl
Gel suretê (weḍ ḍuḥa) bi tefṣîl

2715. Ez sundê dixwum me tu nehêlay
ʿAciz nedibim ji tu ḥeta may

2716. Nubuve Nebî bi keyf û şayê
Minnet bû Xudê digel ṯenayê

2717. Êdî wî neman çi fikr û texmîn
Ẋeyrî bû Xudê belav biket dîn

**Ewwelu Şeyʾîn Furîde ʿEleyhî's-Selam (Yekem Kar Ferz Bûy Li Ser Wî (s.l.w.)**

2718. Gava ku weḥî bû hate xware
Da ew bi Xudê biket qerare

2719. Ku êk e Xudê wî ney heval in
Ew pîseṣenem hemû beṭal in

2720. Ewwel wî dikir li ser feriḍ kar
Du rekʿe nivêj sihar û êvar

2721. Rojek bû li jurê mekkeya pak
Cibrîl digehişte şahê lewlak

2722. Gû Barî ji tu diket selame
Her rojê bikey nivêj temame

2723. ʿErḍek wî bi destê xû vekulî
Avek dibû der bû wan li çulî

2724. Cibrîlî gûtî binêre taze
Şibhî me bişû tu desnumaze

2725. Pêş çavê wî desnivêje şuştî
Du rekʿe kirin ji paş bi qiştî

2726. Fêr bûye ji wî resûlê piṛṛ xêr
Geryave jinû Xedîce kir fêr

**Ewwelu Men Amene Bîhî ʿEleyhî's-Selam (Yekem Kesa Bawerî bi Wî (s.l.w.) Înay**

2727. Ewwel kesekê dihate ser dîn
Kabanî Xedîce xan e şîrîn

2728. Ev dîne dema bû gût peyember
Derḥal wê tijî ji can bû bawer

2729. Îslam li pêş heman li mêran

Bûbekrê mezin hevalê şêran

2730. Îslam bîye pêş hemû biçukan
Kuṛmame ʿElî serûkê kukan

2731. ʿUmrê wî gehîbû yazde sale
Ew bûye bi dîn xudan kemal e

2732. Îslam bû ji pêşî cumle ʿebdan
Xûş yar e Bîlalê şêre merdan

2733. Zeydê kuṛê Ḥariṯeyî nîkunam
Ew pêşî mewalîyan bû îslam

**El-Muʾmînûn-es Sabîqûne (Bawermendên Pêşiyê)**

2734. Ḥîna bû emir dihat ji Cebbar
Tu rabe ji bû Xudê bi înzar

2735. Gazî bike ummetê bi dînî
Emma çi bi nermî û şirînî

2736. Peyẋemberî nê hebû hevalek
Şîrînxeber û mezin xîṣalek

2737. Dûstek bû çi laîq û şirîn e
Hem ṛast û durist û hem emîn e

2738. Bûbekrê kuṛê Ebû Quḥafe
Teymî ye sipî ḍemîr[1] û ṣaf e

2739. Lewṛa ku Nebî ji pêşî hemyan
Bû taze dibêjî dîn û Qurʾan

2740. Gû: "Ey ji me ra tu yar û yawer
Ez yarê Xudê me ger te bawer"

2741. "Peyẋemberek Xudê hinarî
Bû rahê durist û tazekarî"

2742. "Ew êk e belê wî ney heval in
Ev cumle ṣenem hemû beṭal in"

2743. "Her bûye ezel ebed dimînî
Nadan e kesê wî ney ḥebînî"

2744. Ev sirre dema bû gût peyember
Bûbekirî ji dilve kirbû bawer

2745. Me qeṭ ji te ra xilaf nedîne
Her çî tu bibêjî min yeqîne

***

2746. Bûbekrê mezin ku hate ser dîn
Îman tijî qelbê wî bû şîrîn

2747. Da gehte heval û hemseran ew
Gûtna wî mîṯalê cewheran ew

2748. Dabêjî bi nermî û cewanî
Îman gelekan li ber wî anî

2749. Îslam bû bi gûtina wî ʿUṯman
Wek Ṭelḥe, Zubeyr û ʿEbdê Reḥman

2750. Seʿdê kuṛê Malikî bi hîmmet
Her şeş ku mubeşşir in bi cennet

2751. Ewwel jineka ku bûye îslam
Paş dayke Xedîceya nîkunam

2752. Lê Ummul Feḍl bû bûy Xudênas
Kabanî bû mam Îmamê ʿEbbas

2753. Esma jî kiça xelîfê ewwel
Kabanî bû ew Zubeyrê Efḍel

***

2754. Îslam bû ji paş Ebû ʿUbeyde
Wek Bûseleme Seʿîdê Zeyd e

2755. Jinka wî digel ku Faṭîma ye
Xuşka ʿUmerê giran buha ye

2756. ʿUṯmanê bi navê Babê Meẓʿun
Gel her du bira li dînê ḥeq bûn

2757. Êk ʿEbdê Xudê ye êk Qudam e
Wek lawê ʿUbeyde xûş zelam e

2758. Kuṛmamê resûlê pak û ekrem
Wek Erqemê navê Babî Erqem

2759. ʿEmrê û ʿEbes e digel Ebûzer
Wek Xalidê bab Seʿîdê mîr ser

2760. Her sêne ji mûmînanê pêşîn
Zu hatine ser ḥeqîqeta dîn

2761. Ḥetta gûtîye Buzerrê pîre
Rojek me ḥeta nihu bibîre

2762. Îslam bûne pêşî min bi defter
Bûbekir û Bîlal û ḥeq peyember

---

[1] Qelb, dil.

2763. Ev çen kesene bi nav û nîşan
Zu bûne bi dînê ḥeq xudan şan

2764. Ta maye cîhan bi nav dimîn in
Ṣaḥib huner in ji sabiqîn in

2765. Îslam bûne paşî wan kit û cut
Roj ruje li muşrikan ceger ṣut

2766. Her çî ku li wan dihatî bawer
Da hêt bi ʿecel bû nik peyember

2767. Wî fêr dikirin bi rahê dînî
Emma çi bi ḥîkmet û şirînî

2768. Kafir nê ji wan gelek neyar bûn
Ew çunke bi dînê ḥeq diyar bûn

2769. Ew zûr in û ev bi wan newêrin
Helbet xû divêt ji wan veşêrin

2770. Lewṛa çî eger ji wan vîyayî
Bû kirnê nivêj di çûn çîyayî

2771. Nav gelî û şikeftik û nuwalan
Da ken bû Xudê bi her çî ḥalan

2772. Dem dem bû Nebî dihatî Qurʾan
Wan zêde dibû ji nurê îman

2773. Êk êke dihatine ser vî dînî
Emma bi duristî û evînî

2774. Wan her çî dikir bi dînî îqrar
Da çît li dilê wî ḥubbê kuffar

2775. Ger bab û bira û day û xizm in
Derḥal wî hemû dibûne duşmin

2776. Wan zûr divîya peyẋemberê dîn
Çêtir ji giyan û canê şîrîn

2777. Ev yare kesê ji can vîyayî
Êdî wî nevêt cîhan tebayî

2778. Çen carê peyemberê Xudayî
Gel wî bû ʿElî diçû çiyayî

2779. Da mîneve muddeka dirêje
Da ket bû Xudayê ḥeq nivêje

2780. Her rojê bi dizî dihêt û çîtin
Ta carê Buṭalibî didîtin

2781. Pirsî ji Nebî ku ev çi dîn e
Gû: “Dînê Xudayê ʿalemîn e”

2782. “Dînê melek û peyemberan e”
Ev dîne serê ḥeyatê can e

2783. “Hem dînê wî Îbrehîm xelîl e
Bapîrê me yê qedir celîl e”

2784. “Mewlayî ezê kirîm peyember
Bû cumle beşeṛ delîl û ṛehber”

2785. “Çêtir hemîyan eger bizanî
Tu çake qebûl bikey ji canî”

2786. Wî gûtî: Nê dînê bab û bapîr
Ḥubba wî ezê neşêm bikem bîr

2787. Emma tu ji min yeqîn bizane
Ḥetta me giyan bi ruḥ û cane

2788. Ez dê te ḥifiẓ bikem wekî car
Kes nabî biket li gel te bedkar

2789. Rujek ji ʿElî diket suale
Babê wî erê te ev çi ḥal e

2790. Gû babû ji min yeqîn bizane
Îman bi Xudê me piṛṛ ji can e

2791. Bawer bi Muḥemmedê peyember
Min anîye dil me bi wî munewwer

2792. Ez gel wî dikem bi keyf û şayî
Her rojê nivêj ji bû Xudayî

2793. Gû: Ey tu kuṛê me nazenîn î
Ney hêle Muḥemmedu’l- Emînî

2794. Yek carê me jê nedîne xwarî
Wî bigre bû xû bi tazekarî

**Qureyşûn wel Muslîmûne (Qureyş û Musilman)**

2795. Ev dîne ku dîn ji paş wî nîne
Peyda bû di Mekkeya şirîne

2796. Çendek ji Qureyşîyan bi dilxwah
Ew bûn bi wî ra heval û hemṛah

2797. Meznêt Mekehê û çan û xwaran
ʿAciz bûne zûr li van bijaran

2798. Ev dîne gûtin eger helistî
Dînê me heman diçît ji destî

2799. Emma digûtin ji xû ve gav gav
Ev dîne ne dê bibî xudan nav

2800. Zur naçî ewanê bûn musilman
Dê xir vegerên û bin peşêman

2801. Dê hêneve ser vî dînê mey pîr
Dînê mezinan ji bab û bapîr

2802. Ev Lat û Hubel bi cumle eṣnam
Ew her dê mezin bibin xudan kam

2803. Wan hûn dibû dil bi van qisane
Ageh ne ji karê kar nîhane

2804. Car care ji xû ve wan digûtin
Ḥîna ku ji wan ve can diṣutin

2805. Ger ney zivirneve wek he care
Gel wan dê bikeyn hizar nekare

2806. Dê deyne berê ʿezab û talî
Ṣed ṛencê dil û nexuşeḥalî

2807. Ta xir digerên di bê kes û jar
Bê şek di gerênive cumle naçar

2808. Ev gûte ewan dikir tijî can
Ageh ne ji kar û barê Deyyan

**Emrullahî bîîzharîd Deʿwetî Fîl ʿAmîr Rabîʿî Mînel Buʿṣetî (Fermana Xwedê ya Aşkerekirina Deʿwê di Sala Çarê Pêxemberîyê da)**

2809. Meʿlûm e ji ewwelê nubuwwet
Peyẋemberê ḥeq nîhan bû deʿwet

2810. Da bêjte ewan kesêt dizanî
Vî dînî bi nermî û nîhanî

2811. Ṣindîd[1] û serûke êt Qureyşan
Ew êt ku ji wî ceger diêşan

2812. Mecbur nebû ew bibêjte wane
Ta emrê wî hat ji asemane

2813. Sê sal ku diçûn li ser peyember
Ferman bû hinarî şahê ekber

2814. Ey Qaṣidê min ji bû te ferman
"Înzarê bide ʿeşîr û xizman"

2815. Ev dîne ḥeta nihu nîhane
Dê rabe bike jinû ʿeyane

***

2816. Ev emre dema bû hate xware
Ew rabû piyan bi kar û bare

2817. Ehlê Mekehê ku çendê baẋ e
Neyxaṣme ʿeşîret û ucaẋ e

2818. Ew rabû durust dikir ẕîyafet
Wî gazî kirin xizim bi deʿwet

2819. Gava wî vekir zubanê şîrîn
Dil fêr biketin bi dîn û ayîn

2820. Derḥal Bûleheb digût zelaman
Rabin ji gudarî van kelaman

2821. Rabûne hemû bi canê ṭarî
Ev weʿẕe kesê nekir guhdarî

2822. Ḥaḍir kireve li rojê paşî
Zadek dî bû wan bi rêz û başî

2823. Wî gazî kirin bû malê dîsan
Xizmêt xû ewan pelîd û pîsan

2824. Zadê xû ewan ku xwar temame
Peyẋemberî da şirîn peyame

2825. Kes nîne gûtî wekî me xêrxwah
Nêv qewmê ʿereb bû ṛastîyê rah

2826. "Bû her du cîhan we ez delîl im
Bû her du seʿadetan kefîl im"

2827. "Ez bû we dibêm bi emrê Barî
Kî dê ji we bît me harîkarî"

2828. Qeṭ êkî ji wan cewab nedave
Kirbûne hemû bi şoreçave

2829. Fikrîn ku biçin çu ḥîzemêran
Tim rabû pîyan ʿElî çu şêran

2830. Her çendî ku hêj nebûy zelame
Emma bi dil û ceger temam e

---

[1] Kesên hêzdar, serhişk, an jî zordest

2831. Wî gûtî : “Eya resûlê Barî
Ez bû te dibêm bi harîkarî

2832. Mewlayê min î ḥebîbê min tuy
Dê ser bibirim çi yê bi fermuy

2833. Babê wî kenî digel hemane
Rabûn û bi wî kirin tiṛane
2834. Ḥîna ku we dî resûlê nûrîn
Xizmêt wî nekir qebulê heq dîn

2835. Gû “çak e ew li ser me lazim
Ehlê Mekehê heman bixwazim”

2836. Ew rabû jêhel bû ser Ṣefayê
Bû xir Mekehê biket nîdayê

2837. Ew gazî diket bi dengekê hêl
Ey qewê Qureyşî pîr û cahêl

2838. “Ey xirve bibin me mam û pismam
Ey cumle Benî Menafê piṛṛ kam”

2839. “Ey Zuhrî û Teymîyan û Mexzûm”
Ey cumle Benî Eṣed bibin kum”

2840. Cemyane gelek ji wan ʿeşîran
Dûr beytê mezin ji la û pîran

2841. Peyẋemberî gût bi dengekê xuş
“Ger bû we bibêm gelî xudan huş”

2842. “Hespek yê heye li ser çiyayî”
Teṣdîq me diken erê bira yî”

2843. Wan gûtî belê tu wek me nasî
Dûr î ji diruẋ û kêm û kasî

2844. Wî gûtî “Peyẋember û nezîr im
Peyẋemberê Xaliqê Qedîr im”

2845. “Emrê me diket Xudayê Cebbar
Ez hingû bikem bi dînî hişyar”

2846. “Nefʿê we neşêm bidem çi carek
Ḥetta ku ne bi dînî mubarek”

2847. “Her êk e Xudê wî nîne hemser
Ev cumle ṣenem çi nîne yekser”

2848. Gava ku we gût resûlê maqûl
Rabuve Ebû Leheb zuban rol

2849. Yek qarî dihêjit ewî leʿînî
Wî gûte resûlê ḥeq: Nemînî

2850. Her hinde bû em te xir kirîn kum
Ew nabî ewa te gûtî meʿlûm

2851. Rabûne kesê neanî îman
Ew qewmê we dil sîyah û nadan

2852. Peyẋemberî ẋem gehişte cane
Neyxaṣme ji gûtina girane

2853. Zur pê nediçû cenabê Barî
Nifrîn bû Ebû Leheb hinarî

2854. Ey Bûlehebê leʿîn û kafir
Ey xanexirabê xaneagir

2855. Her tu yî xisar û qur bi ser tuy
Malê te çi nîne her dema çuy

2856. Dê biçye cehennemê muebbed
Têr ṭamke cezayê karê xûy bed

2857. Jinka wî digel pelîd û pîs e
Iṣṭu dikevîte nêv werîse

2858. Çen ture bû Bûleheb bi ḥîddet
Gel cumle Qureyşîyan bi şîddet

2859. Ev dîne wekî Xudê xudan e
Dê ser bikevît li kerbê wane

2860. Hîç roj nediçû bi emrê Reḥman
Îlla dê hinek biban musilman

2861. Ev dîne digirt ji dil ṣefayî
Wan guh ne ji talî û cefayî

**Îcmaʿû Qureyşîn ʿEla Muʿadatîhî (Tifaqa Qureyşîyan Bo Dijayetiya Wî)**

2862. Teqṣîr nedikir Nebî ji îʿlam
Wan gazî diket bû dînê îslam

2863. Her çî digehiştê bû Xudayî
Bû dînî dixwazit bi hustayî

2864. Gel nermî û xûşîy û cewanî
Deʿwet dikirin bi xûş zibanî

2865. Teqṣîr nedikir ji deʿweta ḥeq
Derḥeq ṣeneman ji gûtina req

2866. Beḥṣê ṣenem û ṣenemperistî
Bê tirs û quṣur dikir duristî

2867. ʿUzza û Hubel Menat û Late
Wan bûn ji Nebî civîn xelate

***

2868. Rabûne Qureyşî piṛṛ ji kînan
Dê ku ṣeneman bidey civînan

2869. Lewma me û dînê bab û bapîr
Carek dî bikey dikey xû êxsîr

2870. Carek dî bi wan bidey civînan
Ṣed ḍerba dixwî di gav û ḥînan

2871. Mamê wî Buṭalibê dilawer
Wî zanîve wan çi gût peyember

2872. Gû: Kî heye dest dirêjke carek
Bû layê Muḥemmedê mubarek

2873. Ta maye me ruḥ di vî giyanî
Kes nabî li gel biket nezanî

1.

2874. Zanî ku Qureyşîyan yeqîn e
Mamê wî ji wî belarevîn e

2875. Ew êk e ji mazinan bijare
Ṣaḥib şeṛef e û îxtiyar e

2876. Mumkîn nîye gel bikeyn bi germî
Em çake digel bikeyn bi nermî

2877. Rabûne hinek ji wan bijare
Her çî ku bi nav û şan diyar e

2878. Ew çûn ji Buṭalibî vecemyan
Serdefterê wan heman Bûsufyan

2879. Bûcehlê kuṛê Hîşamê bedkar
Derḥeq bi Nebî şibî şeyê har

2880. Wek ʿUtbe û Şeybe êt şenîʿe
Nakesbeçe êt kuṛêt Rebîʿe

2881. Gel wan e Welîd kuṛê Muẋîre
ʿAsê kuṛê Waîlê ḥeqîre

2882. Bûlbûxûrîyê kuṛê Hîşamî
Eswed kuṛê Muṭṭelib bi ʿamî

2883. Rabûne digel cemaʿetek bûş
Bû layê Buṭalibê xudan hûş

2884. Gûtin nê tu jî li ser vî dînî
Nê tu jî Muḥemmedî dibînî

2885. Her gavê didet hizar civînan
Bê qedir diket butan û dînan

2886. Ev kare çu ca me qeṭ nedîne
Bimrîn bi hemû ne wek ve jîne

2887. Nê ber te nebît ku tu xudan î
Em tembî dikeyn bi yek nezanî

2888. Bûṭalibî gût: Temam wesa ne
Ez bû wî dibêm bi ʿaqilane

2889. Dê bêjmê çu ca wetuv[1] nebêjît
Ew avê royan li dîn nerêjît

2890. Her gavê dibêm kuṛê bira yî
Emma nê divêt bi hûsitayî

2891. Red kirneve wî wekî dizanî
Ev care bi nermî û cewanî

***

2892. Bûṭalibî gerçî ew xeber gût
Peyẋemberî her li wan ceger ṣut

2893. Ew paşve neçu ji deʿweta ḥeq
Wî pişt bi Xudê muʿînê muṭleq

2894. Xaşma ku didî wî mamê sengîn
Ser wî diketin şirîn û rengîn

2895. Ser karê xû zûr bi kar û bar bû
Ev dîne ḥeta bi aşikar bû

2.

2896. Zanî ku Qureyşîyan yeqînî
Mamê wî çu ca wî naşikênî

2897. Wan kîn û kerb di can bû ẋalib
Carek dî diçin bibên Buṭalib

2898. ʿEmmarê kuṛê Welîdê dildar
Misḻê wî nebûn bi ʿeql û kiryar

2899. Lawek bû gelek cewan û taze

[1] wesa

Ew gel xû birin bû pîs niyaze

2900. Gûtin ji te ra ve law û gence
Tu bû xû xudan bikey çi qenc e

2901. Hem bû te kuṛ e û xûş muʿîn e
Bes bû me Muḥemmedî tu bîne

2902. Teslîmî me ke ji canî daẋdar
Em dê bikujîn li batî ʿEmmar

2903. Gava we gûtin ewan neyaran
Bûṭalibî huş neman li qaran

2904. Ev ʿeql e gûtî li ku we anî
Kuṛkê we xudan bikem çu canî

2905. Teslîmî we kem vî canê mamî
Ez ku dê bikem ve qed nekamî

2906. Rabûn bi xisaretîve dîsan
Ew bê huner û pelîd û pîsan

3.

2907. Carek dî diçin welê bi ḥîddet
Nik mamê Nebî bi kerb û şîddet

2908. Gûtin wî: Belê tu şehriyar î
Ṣaḥib şeṛef î û îxtiyar î

2909. Qedrê te me girt heman tebayî
Da menʿe bikey kuṛê birayî

2910. Avayî nehêjt ewî ji bû me
Gazinde ji tu diken ʿumume

2911. Meʿlûmî te bît ji paş ve çende
Êdî ne dikeyn qebul xû hinde

2912. Ev kare çî ye diket Muḥemmed
Aciz kirîne wî cumle bê ḥed

2913. Bes nîne me lêk diket bi duşmin
Ser dînê me çûn ḥeta weku jin

2914. Her rojê hinek diçin li ser dîn
Êdî me nevêt ḥeyat û ev jîn

2915. Lewma me diket bi bab û bapîr
Dînê me neman çi rêz û teqdîr

2916. Bû van ṣenem êt me piṛṛ evînan
Rojê didetê hizar civînan

2917. Yan dê tu meniʿ bikey şirîn kar
Nek em dê li gel te keyne kujtar

2918. Xir suç ji te ne tu jê xudanê
Keyfa te ye êdî tu dizanî

2919. Wan ev gefe kir ji wî bi tundî
Rabûn û diçin bi derdemendî

2920. Bûṭalibî ev ji wan ku zanî
Ew kefte ẋeman ji cerg û canî

2921. Pê xûş nîye wî ji ray û huşî
Gel xizm û kesan biket nexûşî

2922. Hem dest ne diçû ji zêde ẋîret
Hu bêlî resûlê pakesîret

2923. Duşmin dihusîn ji wî didanan
Dê ku we bihêlî canê canan

2924. Çendî dikirin wî hizr û texmîn
Axir wî gûte resûlê nûrîn

2925. Meʿlûmê te ye tu çak dizanî
Min zûr tu divêy ji qelb û canî

2926. Emma tu dibînî van neyaran
Derḥeq te diken çi reng nekaran

2927. Gava dî gûtin me wan deq û deq
Tehdîd û gef û gelek qisêt req

2928. Ez meṣlehetê wesa dibînim
Ger xû te divêt û ez bimînim

2929. Tu hindî nekey ji qewmî şîddet
Barê me nekey ji zêde ṭaqet

2930. Gava ku resûlî kir gudarî
Gû “Mamu qesem bi ẕatê Barî

2931. Min rojê biken di ṛaste destî
Heyvê jî di destê çep duristî

2932. Ez nabî ji dînî waz bihînim
Ta ser dikevît meger nemînim”

2933. Fikrê tu nekey ku bê xudan im
Ez Xaliqî bes tinê dizanim

2934. Ev gûte wî kir bi zarê şekker
Rabuve bi kizgirî peyember

2935. Agir digehişte canê mamî
Gû: “Ey tu ruḥ û rewanê mamî

2936. Her çî te divê bibêje taze
Dê harî te kem bi ʿîzz û naze

2937. Ez ser te dikem şeṛî çu şêran
Ḥetta ku dibim ji can sipêran

2938. Ney dûst e kesê li weqtê nîʿmet
Medḥan û gefan biket ji hîmmet

2939. Yarê te ew e di gaveṭengan
Harî te biket wekî pilingan

2940. Mezinan gûtîye: Ku yarê parî
Naket ji te ra çi harîkarî

2941. Derḥal wî xizm dikirne gazî
Ey bû we divêt me serfirazî

2942. Ey hûn me hemû ucaẋ û yar in
Ger hûn ji me ra ji dil guhdar in

2943. Ez ser vî Muḥemmedî dikem her
Her çendî biçît li ser wî min ser

2944. Hemyan gûtî em te harîkar în
Her emrê bikey ji can gudar în

2945. Bes Bûlehebê leʿîn û ẋeddar
Ew gel hemû muşrikan bi bedkar

2946. Elḥeq: Ebû Ṭalibê dilawer
Teqşîrî nekir ji bû peyember

2947. Westa bû li sîngê wan tebayî
Wek Rosteman bi canfîdayî

2948. Ta mabû ji wî dikir xudanî
Emma bi duristî û cewanî

2949. Her çî wî dikir dikir bi pakî
Peyẋemberî bîr neçu ve çakî

2950. Kes ẋeyrî Xudê eger çi nîne
Nê ev sebebeş hemû ji wî ne

2951. Gava ku Qureyşîyan we zanî
Xir Haşimî lê diken xudanî

2952. Cumle lê dibûn neyar û dilreş
Ser vî xeberî dibûn muşewweş

2953. Ev kare jinû nexuşêḥal bû
Dunya ji şeḥabeyan xû tal bû

2954. Dest heldikirin ewan xiraban
Bû qehr û ezîyeta şeḥaban

2955. Dem pîsecivîn û dem tiṛane
Geh cewr û cefa ye geh qutane

2956. Şed karê ne laîq û ne hemwar
Neyxaşme bi wanê bê kes û jar

2957. Emma nê ewan bi dîn we şabûn
Ageh ne ji talî û cefa bûn

2958. Baxuyiyê[1] mezin tinê dizanî
Wan êş û elem çi geşte canî

2959. Ḥezkey tu were ji bû nimûne
Ev mebḥeṣê têt ji dilî xwûn e

## EZ-ZEHRATU’Ṣ- ṢANÎYETÛ (KULÎLKA DUYÊ)
## Fî Teʿzîbîl Mustaḍʿefîne Wel Welmustaḍʿefat (Ṛencdana Belengazan)

2960. Eşḥabê resûl ji paş ve çend e
Piṛṛ gende bûyîn û derdemende

2961. Wan muşrik û duşminêt Xudayî
Rabûn bi fîdayê wan tebayî

2962. Her çî ku ji wan xudanê pişte
Wan ḥed nebû gel biken çi tişte

2963. Emma çi kesê ḍeʿîf û jar e
Wan gel wî kirin hizar nekare

2964. Xaşma li ewan ku ʿebdê wan bûn
Ew zêde ji wan bi derd û jan bûn

2965. Enwaʿê cefa û derd û êşan
Her rojê ji destê wan dikêşan

2966. Geh da digirin tinê di xanî
Nabî bidenê ne av û nanî

2967. Geh zivrî û tendî û civîn in

[1] Xwedê.

Gavê ji qutan di nêv nivîn in

2968. Car car dibirin bi bê temîzî
Ser piştê dirêj diken di xîzî

2969. Kerba di dilê xû ta biken der
Ser sîngî ewan tijî dikir ber

2970. Elqîṣṣe çi ya ewan vîyayî
Wan gel dikirin bi bê Xudayî

2971. Bêkes nê hebûn di wan gelek zûr
Wan zêde duwazde kes di meşhûr

**1. Bîlalu Ḥebeşîyyî (Bîlalê Ḥebeşî)**

2972. Zanî te Bîlalî ḥal çi ḥal bû
ʿEyşê wî ji destê wan çi tal bû

2973. Ew ʿebdê Umeyye yê Xelef zad
Melʿunê tijî ji kufr û îfsad

2974. Çen carê dibir di germerojê
Germa Mekehê şebîhî dujê

2975. Serpiştê dirêj dikir Bîlale
Ney geh li feqîrê piṛṛ bi nale

2976. Ew da çî berek mezin dianî
Sersîng û zikê wî tim didanî

2977. Dabêjî heru evê dibînî
Ḥetta tu li ser wî dîn bimînî

2978. Ḥetta bi Muḥemmedî te bawer
Hal dê eve bît te ta diçît ser

2979. Dabêjî Bîlal bi cergê ṣutî
Ew nabî ebed ewa te gûtî

2980. Bûbekrê mezin dî yek li rojan
Ew renge bi ṛenc û zeḥmet û jan

2981. Wî gûte Umeyyeyê leʿîne
Ma dîn çûne murwetîj te nîne

2982. Ev ʿebdê hu bêkes û neçar e
Karê tu digel dikî ne kar e

2983. Wî gûtî: Belê diyare her tûy
Ev ʿebde li min te kirye bedxwûy

2984. Bûbekrî gûtî bizan şirîne
ʿebdek wekî te me hey nedîne

2985. Emma çi zelamekê bikar e
Bû şulê yek e ji wan bijar e

2986. Ez dê deme te bi vê Bîlalî
Raḍî bû Umeyye xane xalî

2987. Bûbekrî hituve kirbû rizgar
Azade kirîş di rahê Ẋeffar

2988. Yarek mezin e Bîlalê şîrîn
Zur xûş divîya resûlê nûrîn

2989. Mêrçak û dilawer û emîn e
Deng xûş û mûezzinê Medîne

2990. Ew ma bû ḥeta wî kir bû hîcret
Rebbê wî didanê ʿewn û nuṣret

2991. Bû her şeṛekî diçû peyember
Ew gel wî dibû çu şêrê şeṛker

2992. Hîcret li dinê ku kir Bîlalî
Hîcret digehişte bîst salî

2993. Wî merqedê pak li şehrê Şam e
Ta maye cîhan bi qedr û nam e

2994. Ṭahir bû lîqayê wî dinalî
Ya Reb bide xaṭira Bîlalî

**2 – 3 – 4. ʿEmmarun we Walîdahû (ʿEmmar û Deybabên Wî)**

2995. Sê kes dî ji wan ḍeʿîf ṣeḥaban
ʿEmmar e bi her du day û baban

2996. Deyka wî Sumeyye bab e Yasîr
Ṣaḥib şeṛefêt di piṛṛ mefaxîr

2997. Wan zêde didît li dest neyaran
Ṣed cewr û cefa û ṣed nekaran

2998. Çen car dibirin bû ebṭeḥa kûṛ
Rojêt di germ ʿezab didan zûr

2999. Zur êş û elem ewan dikêşan
Lew ḥalê li wan bû zûr perîşan

3000. ʿEmmarî bila ku newcewan e
Ṭaqet wî tijî geh û giyan e

3001. Emma dê çiken wî day û babe
Ew her du di pîr û ev ʿezabe

3002. Rojek digehîte wan peyember
Her sê di ʿezabê bê ser û ber

3003. Agir wî gehişte cerg û canî
Ya Reb tu dibînî tu dizanî

3004. Vê ṛencê dixun tinê li ser te
Wan her tu hey û xudan xû her te

3005. Ferman kire wan resûlê Ṭahir
“Ṣebrê xû bikêşe alê Yasîr”

3006. Dunya çi nîye ne cayê man e
“Cennet min û hingû xûş ji van e”

3007. Yasîr di ʿezabê ma bi jarî
Ḥetta bi Xudê xû can siparî

3008. Rojek digehît Sumeyyeya pak
Bûcehlê xudan ẋurûr û bê bak

3009. Bew pîrejinê diket tiṛane
Pîr lê zivirî ji daẋê cane

3010. Bê ḥed wê nelaîq û civîn dan
Bew ehmeq û kafiṛê leʿîn dan

3011. Bûcehlê tijî ji kîn û kerbe
Ḍerbek wî li wê dida çi ḍerb e

3012. Qeṭ şeṛim nekir ewî pelîdî
Wî ev jine kujt digel şehîdî

3013. Ewwel kese ew dihate kujtin
Ser dînî ku xun lê hate rijtin

3014. Serdefter e ew bû xir şehîdan
Ya Reb me bikey ji wan seʿîdan

3015. ʿEmmarê me ma di nêv ʿezab e
Ser dîn mirin wî day û babe

3016. Ta hingî çewa ḍeʿîf û jar bû
Wê gavê du hinde kûlewar bû

3017. Lê zêde kirin ewan neyaran
Îşan û elem pitir li caran

3018. Carê dibirin bi fiʿlehîzî
Ev lawe dirêj dikir di xîzî

3019. Serpiştê dirêj diken hinek hel
Sersîngî diken gelek berêt kel

3020. Çefya wî di gerdenê diken car
Lê peytê diken ji canê daẋdar

3021. Em gel te gûtin gelek bi kîn in
Ev reng e te dê bixendiqînîn

3022. Yan dê bimirî di gav û ḥîne
Yan bêje Muḥemmedî civîn e

3023. Wî gû di dilê xu: Ya îlahî
Mewlayê min î tu padişah î

3024. Min su nîye şibhî day û baban
Ger ez bimirm di van ʿezaban

3025. Emma me ûmêd e ger bimînim
Ez can ji giyanê van derînim

3026. Meʿlûmî te ye xû qelb û canim
Qehrê tu nekey ji ber zubanim

3027. Naçar wekî wan gûtî civîn gût
Emma wî dil û ceger nihîn ṣut

3028. Berdave ewan ve besteşêre
Lezkir bû çu nik resûlê xêre

3029. Aluz wî dibînî yarê muxtar
Gûtî te çi ye hevalê ʿEmmar

3030. Gû: Ez çi bibêm resûlê nûrîn
Karek ji me bûye zûr neşîrîn

3031. Kir qîṣṣe ji bû Nebî cewane
Wî gûtî: “Bilan te dil çewa ne”

3032. Wî gûtî qesem bi zatê Reḥman
Min qelb û demax piṛṛ in ji îman

3033. Wî gûtî: “Bide min civîn tu her gav
Her carê wesa tu kirye ṭengav

3034. Ev gûte ji ḥîkmetê temam e
Ṭengavî ḥelal diken ḥerame

3035. ʿEmmarî qetand bi her çî ḥale
Ev renge ḥeyate çen ji sale

3036. Ew ma bû ḥeta gehişte xûşî
Ser dînê Xudê bi ʿeyşê nuşî

3037. Xir şeṛ wî kirin bi pehlevanî
Gel fexrê cîhan û ruḥ û canî

3038. Ew yek bû ji kujtiyanê ṣiffîn
Ew layê ʿElî bû lê bi dilvîn

3039. Peyẋemberê ḥeq we da bû ferman:
“ʿEmmar çi dema dibîte bê can”

3040. “Qewmek dikujin ewî di baẋî”
Ew qewme bû şamîyêt di ṭaẋî

3041. ʿUmrê wî gehişte nuṭ û çar e
Barkir li kevin cîhan û ware

**5. Xebbab-ubnu el-Erettî (Xebbabê Kuṛê Erettî)**

3042. Xebbabê kuṛê Erettî dîsan
Bê ḥal bû li dest neyar û pîsan

3043. Wan dane berê ʿezabeka zûr
Karê wî ṣebir bû ew cefa xur

3044. Çen car dikirin bi rot û qutî
Nav xîzê gerim wî can diṣutî

3045. Ew qewmê Xudê nenas û hin baẋ
Çen roj bi berêt gerim dikir daẋ

3046. Çen zêde kirin ji qehr û azar
Ew belkî ji dînê ḥeq bihêt xwar

3047. Xebbabî bijil ji ṣebrê kêşan
Qeṭ guh nedida cefa û êşan

***

3048. Berṭengî eger çî zûr di tal in
Emma nê di kuṛt û ser zewal in

3049. Her leḥẓe didet xudan cefayan
Barî ji kerem hizar ʿeṭayan

3050. Xaşma tu bixwûy li ser vî dînî
Bê ḥed keremê ji wî dibînî

3051. Sîrrek mezin e gelek nîhan e
Dûstêt te Xudê ku berbela ne

***

3052. Xebbabê kuṛê Erettî carek
Çu gûte peyemberê mubarek

3053. Razabû di nêv ʿebayî taze
Bin sêberê Keʿbeya bi naze

3054. Ey min bi fîdayê nazenîn î
Ḥalê me xû tu cewan dibînî

3055. Xûşî me neman li dest neyaran
Ew gel me diken hizar nekaran

3056. Gavê bi civîn û dem tiṛane
Rojê bi ʿezab û geh qutan e

3057. Xebbabî dema we gûtî bû yar
Rabuve bi royê ṣur çu gulnar

3058. Ew tore bû lê ji vî kelamî:
“Ey dûstê me gûtî bûç nefam î”

3059. “Pêşî me hebûn hinek peyember”
“Ser dînê Xudê dibûne bê ser”

3060. “Hindek dî ji wan bi kelbetanî”
“Gûşt jê dikirin li ser giyanî”

3061. “Beʿḍek bi mişarî kirine du şeq”
Ba çendî cefa û karê naḥeq

3062. “Ew qeṭ nedibûn ji dîn peşêman”
Ta can dikirin fîdayê îman

3063. “Bêhna xû dirêj ke dê bibînî”
“Serbest û xudanê şan vî dînî”

3064. “Xaliq ji me ra bi harîkar e
Ew bess e me piştevan û yar e”

3065. Rojek tu eger bixwuy cefayê
Ṣed roj dê buxwuy di dil ṣefayê

3066. Her çendî ṣebir li canî tal e
Axir dibitin şirîn û ʿale

3067. Xebbabî ji xû qetandî taze
Ta dînê Xudê bû serfiraze

3068. Çen carê diçû xeza û kujtar
Peyẋemberê me digel bû ev yar

3069. Axir bû li Kûfeyê muqîme
Ḥetta diçû cennetu’l- neîʿme

3070. Hîcret di sîh û şeşê bû Xebbab
Barkirbû lîqa Xudayê tewwab

**6. Ṣuheyb-ubnu Sînan-ur Rûmîyyî (Ṣuheybê Kuṛê Sînanê Romî)**

3071. Êkê dî ji bêkesêt di ẋemnak
Meşhûr e Ṣuheybê rûmî yê pak

3072. Eṣla ʿereb e Nemir qebîl e
Rûmyan bi sebî bû kir ẕelîle

3073. Wek ʿebdî kirîbû êk ji kuffar
Gel wî dikirin gelek ji azar

3074. Çen mudde ewîş xudan cefa bû
Ḥetta ku ji duşminan reha bû

3075. Roja ku derik vebû bû hîcret
Wî bû xû ji wan nedît çi derfet

3076. Her rojê hinek diçin Medînê
Miskînî meniʿ diken li çûnê

3077. Wî xirvekirî bi her çî ḥale
Bew çendî ewî hebûy ji male

3078. Êkek ji bijareyan Ṣuheybe
Feḍla wî ne cê guman û reybe

3079. Peyẋemberî gût wî: “Babê Yeḥya”
Hêşta ku nebûy cenabê Yeḥya

3080. Roja ku ʿUmer dibît birîndar
Wî batî xû kir îmam şirînkar

3081. Bû karê xîlafetê ji bû dîn
Şeş kes di bijare helbijarîn

3082. Ta êkî ji xû diken diyare
ʿAîd bi te ye gûtê ve kare

3083. Axir li Medîneyê wefa bû
ʿUmrê wî bi ḥeftê sal geha bû

3084. Hîcret digehî sihê û heştê
Wî kirbû sefer ji bû biḥeştê

**7. ʿAmîr-ubnu Fuheyretî (ʿAmîrê Kurê Fuheyrey)**

3085. ʿAmir ku dibên kuṛê Fuheyr e
Mêrek mezin e xudanê xêr e

3086. Ew ʿebdê Ṭufeylî bû bi naçar
Bê ḥed wî didanê qehr û azar

3087. Wan çendî kirin bibît peşêman
Her zêde dibû wî nurê îman

3088. Bûbekrî didî ve newcewane
Bê çare ye zûr ji destê wan e

3089. Wî jî dikirît wekî Bîlalî
Aza diketin bû Ẕulcelalî

3090. Ẋalib wî ji bû dikir şivanî
Emma bi duristî û cewanî

3091. Ḥîna ku resûlî kirbû hîcret
Wî yarê Ebû Bekir di xidmet

3092. Ew her du veşartî bûn di ẋarê
Ev ʿAmire bû he rojê carê

3093. Wî pez dibire ewan kinaran
Da şîrî bibet bû van du yaran

3094. Weqtê ku diçin ji bû Medînê
Gel wan diçîtin bi dil evînê

3095. Du şeṛ dikirin digel peyember
Bedr û Uḥudan cewanî şeṛ kir

3096. Roja çu şeṛî li Bîr Meʿûne
Ew şur bû bi ḍerbekê di xune

3097. ʿUmrê wî dibûye çil temam e
Ew bûye şehîdê nîkuname

**8. Ebû Fukeyhetî (Babê Fukeyhey)**

3098. Efleḥ bû Ebû Fukeyhe meşhûr
Kêşa wî ji destê wan cefa zûr

3099. Ṣefwanê kuṛê Umeyyeyê xwar
Ew êk bû ewî ji ʿebdê kiryar

3100. Îslam bibû ew digel Bîlalî
Bê ḥed wî didîn nekam û talî

3101. Yek rojê Umeyye napesind e
Ew bestî bi her du pêt wî tunde

3102. Ser piṣt dixiṣînî jarê Efleḥ
Ḥetta bire nêv niwalê ebṭeḥ

3103. Ney tirsê Xudê ne guh li şeṛme
Havêtî wesa di xîzê germe

3104. Carek dî şidand werîs di gerden
Gû: Nabî çi kes ebed te berden

3105. Gel wî bû bira Ubeyyê bedkar
Gû zêdeke lê ji qehr û azar

3106. Ta bêt Muḥemmedê wî yare

Qurtar biketin bi sîḥrekare

3107. Wan dane berê bi pên û miste
Ta şir bû ji wanve pê û deste

3108. Nageh dimeşît ji wêrê kêzek
Hêj mabû di nêv leşê wî hêzek

3109. Gûtbû wî Umeyye: Ey feqîro
Ev kêze nebît Xudê te îro

3110. Efleḥ xû digel hemû ʿezabe
Zu da ve leʿînî xûş cewabe

3111. Gû rebbê me pak e bê heval e
Bê ʿeyb û zewal e Ẕulcelal e

3112. Piṛṛ qedr û kemal û qudret û cah
Rebbê min û tew ve kêz e Ellah

3113. Gava we digûte wan neyaran
Dubare didan bi ḍerb û daran

3114. Wan zêde kirin ji ṛenc û êşan
Ḥetta digehişte ruḥê kêşan

3115. Rabûn û diçin li wan yeqîn e
Êdî dimirît di gav û ḥîne

3116. Hişyar dibitin ji jan û ṛencan
Nageh wê dihêt serûkê qencan

3117. Bûbekrî ku dî di êş û jan e
Agir wî gehişte cerg û cane

3118. Gel xû dibetin bû nik xudanî
Ew jî dikirît vî newcewanî

3119. Qurtar diketin ji destê kuffar
Aza diketin di rahê Ẋeffar

3120. Bûbekrê kerîm û ehlê xêr e
Bû vî ʿemelî ji mêje fêr e

3121. Efleḥ me nemir bi xêr û şayî
Hîcret wî dikir bi canfîdayî

3122. Hêşta ne bibûye şeṛ li Bedrê
Wî kir bû sefer bû kaxê ḥeşrê

**9. Lebînetu (Lebîne)**

3123. Wan bes nebû qewmê xanewêran
Ev cewr û cefa dikir bi mêran

3124. Ḥetta bi jinêt ḍeʿîf û jare
Gel wan dikirin çi qed nekare

3125. Her kes ku ne murwet û ne dîne
Dûr nîne ji wî ve qehr û kîne

***

3126. Êk bûye ji wan Lebîneya pak
Bêçare ji destê wan bû ẋemnak

3127. Caryek bû ewan belê nîkunam
Pêşî ʿUmerî bibûye îslam

3128. Çen car ʿUmerî quta Lebîne
Ew belkî bihête xwar ji dîne

3129. Ew çendî ẕelîl dibû diêşa
Wê her bû Xudê ṣebir dikêşa

3130. Ta mandî dibûʿezab didanê
Wê bê meferê û bê giyanê

3131. Dabêjî heroj te ḥal dê hu bî
Ḥetta tu li ser vî dînê xû bî

3132. Dabêjî Lebîne ey dilawer
Ger tu jî ji dil neînî bawer

3133. Dê tu jî biêşî wek diêşim
Vê ṛencê dikêşî wek dikêşim

3134. Ṣebrê bike zu bi çav dibînî
Serbest û xudanê nav vî dînî

3135. Ger yarê me bî xudanê ʿalem
Dunya dê li we bikeyne matem

3136. Ev gef dikirin ewî bijarî
Wî çunke qewî bû pişt bi Barî

***

3137. Mezinan gûtîye şirîn zimanan
Ṭengavî zîrek diken xudanan

3138. Nabînî kitik dibîte naçar
Gel şêrî diket bi pencekujtar

***

3139. Bûbekrî didît di êş û nal e
Wê jî dikirît bi her çî ḥale

3140. Aza diketin di rahê Ellah
Ya Reb me bikey digel wî hemṛah

**10. Zînnîretu (Zînnîre)**

3141. Zinnîre jinek ji wan jinan e
Zûr dîtî ji wan cefa û jane

3142. Zêde ji duyan çi derdeser bû
Carê Ebû Cehle car ʿUmer bû

3143. Bê ḥedd û ḥisêb wê talî kêşan
Ḥetta weku kuṛe bû ji êşan

3144. Bûcehlî digûte wê bi nûre
Lat û Hubelî tu kirye kuṛe

3145. Ev dînê kevin ji bab û bapîr
Hêla te lewa tu kirye êxsîr

3146. Zinnîre digût ji cerg û canî
Ey çen mezin î û çen nezan î

3147. Ageh çi heye ewan ji karan
Ev kare ne karê kulkedaran

3148. Ev kuṛeyî bû me xûş xelat e
Bêşek ji Xudayê ḥeq ve hate

3149. Qudret wî piṛṛ e kerem wî zûr e
Çavêt me tijî biket ji nûre

3150. Wî ev qise kir ji nurê îman
Meqbul bû li nik Xudayê Reḥman

3151. Rabûve sube ji xew nivistî
Çavêt wê ku ron bûyîn duristî

3152. Wan zanî dema Qureyşîyêt bed
Siḥrek bû gûtin kirî Muḥemmed

3153. Ev cariye jî wek mezin Lebîne
Bûbekrî ji bû Xudê kirîne

3154. Qurtar diketin ji ṛenc û jarî
Aza diketin di rahê Barî

**11 – 12. En-Nehdîyyetu we Ummu ʿUbeysîn (Nehdîya û Deyka ʿUbeysî)**

3155. Her we li jinan hebûn du carî
Dunya ku ji wan dikirne ṭarî

3156. Ek Ummû ʿUbeyse piṛṛ ji qedr e
Nehdîye ewa dî piṛṛ ji ṣebr e

3157. Wan dîne ji destê wan neyaran
Çen cewr û cefa hizar ji caran

3158. Bûbekrî ewîş wekî hevalan
Her du vekirîn bi her çî ḥalan

3159. Aza diketin di rahê Barî
Reḥmet hemû dem ji wî bibarî

3160. Meʿlûm bû wekî me kir beyane
Bûbekrî ewêt kirî ji vane

3161. Ḥeft in jin û mêr wekî te zanî
Ya Reb bideyê hizar emanî

3162. Mesʿûdê ebed bikey di cennet
Ṭahir wî bikey heval bi minnet

**EZ-ZEHRATU'Ş- ṢALÎṢETÛ (KULÎLKA SÊYÊ)**
**Fî Zîkrî el-Mustehzîîne we Men Kane Eşedde Ezen Lînnebîyyî S.ʿA.W. (Tiṛaneker û Xirabkarên Derḥeqê Peyẋemberî (s.l.w.)**

3163. Ya Reb tu tinê bi xû dizanî
Ey her tu xudanê ʿîzz û şan î

3164. ʿEbdê te serûkê murselînan
Serdarê cemîʿî mûmînînan

3165. Dîtin wî ji destê wan neyaran
Ṣed cewr û cefa û ṣed nekaran

3166. Ser dînê te ew wî can diêşa
Ser emrê te bû cefa dikêşa

3167. Ev ḥale ji vî beşeṛ ʿeyan e
Bew cumle Nebî diken tiṛane

3168. Her qewmekê bû dihat peyember
Îlla jê dibûn neyar û bedker

3169. Zur kes ji Qureyşîyan ji xizman
Bedkarî dikir bi dest û ezman

3170. Ezman di dirêj û dil di qasî
Ey qur bi serê yê ew nenasî

3171. Ev newʿe xirab û pîszuban e
Ewêt bi Nebî dikir tiṛane

3172. Zur bûn di qurîşîyan yeqîn e
Ḥezkey bû numune van bibîne

3173. Ev nuzde kesêt xirab û xasir
Bed navê cîhan diçûne agir

## 1-2. ʿEmmuhu Ebu Lehebîn Wemraetuhu Ummu Cemîlîn (Mamê Wî Ebûleheb û Jinka Wî Ummû Cemîl)

3174. Ser defterê wan Ebû Leheb bû
Derḥeqqê Nebî çi bê edeb bû

3175. Jinka wî ji wî gelek xirabtir
Ew pîrejina qebir ji agir

3176. Nav Ummucemîl e pîszubanê
Bê bar ji qiyamet û cîhanê

3177. Wek babî divêt hebin hemû mam
Ev mame çewa xebîs̱ e bêqam

3178. Zêdey ji heman ku wî leʿînî
Aciz wî dikir delîlê dînî

3179. Carê bi devî û car bi destan
Gavê bi xû gav bi butperistan

3180. Meẋrûr e gelek zubandirêj e
Karê wî kirî ku her nebêje

3181. Cîran bû serê sîyeh ḍemîran[1]
Ṣed tif li ruyê ve renge cîran

3182. Car bûye dibir leʿînê ebter
Pîsatî bû ber derê peyember

3183. Dem îstîriyan û bêngenî dem
Da ket di rîya resûlê ʿalem

3184. Da bêjî resûlê ʿalemê ʿam
“Cîranî çima husa ye ey mam”

3185. “Ma ḥeq eve ye dikey digel min
Ev renge çira tu bûye duşmin”

3186. “Karê tu dikey çi naşirîn e
Ma kes eve gel kesê kirîne”

3187. Lê fayde nebûn gile w neṣîḥet
Wî her dikirin bi wî feḍîhet[2]
***

3188. Rujek diçî ew serûkê pîsan
Pîsî bireve derê wî dîsan

3189. Ḥemzey li wî karî çav dibîtin
ʿEqlê wî tinê ji ser diçîtin

3190. Wî girt û gwî kir bi ser serê wî
Pîrûz bî tacê rengizê wî

3191. Carek dî ku ez te hu bibînim
Çavan li serê te derdiînim

3192. Gava ku we dît leʿînî zanî
Ḥemzey ẋeḍeba gehiştî canî

3193. Wî zanî eger bidet cewabê
Ḥemze didetê gelek ʿezabê

3194. Wî ew gwî li ser serê xû malî
Ew çu tehisî wî dil bi talî

3195. Carek dî nekir bi xû ve kare
Tirsa wî birayê bextiyare

3196. Emma wî digût ewêt ji dil bed
Vî karî biken digel Muḥemmed

3197. Roja ku xeber dihat ji Bedrê
Qewmê wî revîn wî girtî qehrê

3198. Derdek wî gehiştbû giyanî
Halla wî cuda bû tin ji canî

3199. Sekṭûpe dibît ne dîn û îman
Gurzêt di cehennemê wî pê man

## 3. Ebu Cehlîbnî Hîşamîl Mexzûmî (Ebûcehlê Kurê Hîşamê Mexzûmî)

3200. Bûcehlê leʿîn hevalê iblîs
Derḥeqqê Nebî gelek zuban pîs

3201. Nek bes bi zubanî hem bi destan
Carê bi xû car bi butperistan

3202. Duşmin bû gelek digel peyember
Gel pakeṣeḥabeyêt wî yekser

3203. Şulêt wî kirî gelek di xwar in
Bê ḥedd û ḥisêb û bê jimar in
***

3204. Wê hat ji rîwayeta Buxarî
Ey reḥmetê ḥeq ji wî bi yarî

3205. Carek bû dikir nivêj peyember

[1] Kelb, dil reş

[2] Bêedebî, rezîlî

Nêzîkî ji Keʿbeya munewwer

3206. Çendek ji Qureyşîyan cema bûn
Ewêt ku ji ber wî ḥal nemabûn

3207. Gûtin kî xû piṛṛ huner dibînît
Pisdanekê ḥêştirê bihînît

3208. Xû bigrî di secdeya nemaze
Ew danîte ser serê wî taze

3209. Rabûye ji wan ewê şeqîtir
Ew karê çi car nebû y ewî kir

3210. Ser ma ve Nebî di wê sucudê
Ew ẋerqe di lez̤z̤eta şuhudê

3211. Ta zanî kiça wî Faṭîmayê
Ey min bi fîdayê bab û dayê

3212. Wê taze li ser serî hilanî
Wê dane ewan civîn çi zanî

3213. Ḥîna wî nivêj dikir temame
Nifrîn wî dikir ji çen zelame

3214. "Ya Reb bigirî tu ʿEmrê bednam
Bûcehlê kuṛê Hîşamê nakam"

3215. "Hem ʿUtbe û Şeybe êt şenîʿe
Nakesbiçe êt kuṛê Rebîʿe

3216. "ʿUqbey kuṛê Bumuʿeyṭê naşad
Gel pîse Umeyye yê Xelef zad"

3217. "Hem bigre ʿUmare kuṛ Welîd e
Gel ʿUtbe peder Welîd pelîd e"

3218. Fermuyî cenabê Îbnû Mesʿûd
Ez sundê dixwum bi ḥeyyê mewcud

3219. Êk êke me dîn di kaxê Bedrê
Kujtîne keleş di axê Bedrê

3220. Paşxiş dikirin bû nîvê bîre
Leʿnet pê dima di bîrekwîre

3221. Meqsudê cenabê Îbnû Mesʿûd
Ekser wî didîn di bîrê mewcud

3222. Meʿlûm e çiku Umeyyeyê bed
Ew bel bibû nêv zirî çi bê ḥed

3223. Wan kir li zirî bihête der ew
Neyhate derê bû ker bi ker ew

3224. Naçar dikirin bi jêrî axê
Da bêngenî jê ne kefte kaxê

3225. ʿUqbe li Bedir dibît esîre
Ney kujtî li wê Nebî munîre

3226. Geryave dema Nebî ji bû mal
Wî jînê cîhan li wî dikir tal

3227. Ferman diketin resûlê muxtar
Bû ʿAsimê Sabitî ji enṣar

3228. "Ser bibire evî mirarê hûy bed"
Melʿunî digûtî ey Muḥemmed

3229. Ger min bikujî kî bû tefalan
Agir gûtî ey te qûr bi ḥalan

3230. ʿAsim li serê wî dabû şîre
Wî ruḥ di cehennemê meṣîr e

3231. Hem bijlî kirî Welîd ʿUmare
Ew bû li Ḥebeş zemîn mirare

### 4. Eswedubnu ʿEbdî Yeẋûs (Eswedê Kuṛê ʿEbdî Yexûsî)

3232. Eswed xû me pê çi newʿe kes bû
Kuṛxalê Nebî bû lê teres bû

3233. Wî zûr dikirin bi wî tiṛane
Bişkên ku ji wî dev û didane

3234. Da bêjî ṣeḥabeyan bi larî
Wî çunkî didîn di kêm û jarî

3235. Engûne erê dibin cihangîr
Kîsra û qeralê rom we êxsîr

3236. Engûdikirin ji wan xezînan
Bew kerx û nîşan û şeṛʿ û dînan

3237. Zur pê dikirin ve ṭerze larî
Ageh ne ji kar û barê Barî

3238. Eswed diçitin bi rav û nêçîr
Wî bayê gerim gehiştê teqdîr

3239. Ew ṛeş dibitin li ser zemînê
Geryave bû mal di gav û ḥînê

3240. Reş bûye serê wî kut bi xasî

Der lê venekirbû kes nenasî

3241. Sewdayî bibû gelek muşewweş
Geryave bû çulî ew şeva ṛeş

3242. Geryabû gelek çu har û dînan
Ḥetta dimirît ṛeş û ji tênan

3243. Hawar ji kesê ecel gehiştê
Bê bar ji seʿadeta biḥeştê

**5. El-Ḥers-ubnu Qeysî es-Sehmîyyî (Ḥarisê Kurê Qeysê Sehmî)**

3244. Ḥarṣ̱ê kuṛê Qeysî ger nezanî
Duşmin bû peyemberê zemanî

3245. Larî dikirin bi wî gelek car
Zêde bi ṣeḥabeyan ewêt jar

3246. Dabêjî Muḥemmedî evane
Îẋfal diketin bi xûş zubane

3247. Wek engûmirîn dibinve ṣaẋe
Dê gehne xûşî û qeṣr û baẋe

3248. Vî ʿumrî ji we diket xisaret
ʿUmrê belaş neden bi xaret

3249. Her çî ku heye û ney cîhan e
Xelkî dikujît tinê zeman e

***

3250. Ev Ḥerṣ̱e bû ku didît berek qenc
Ew da perisît ji canê piṛṛ ṛenc

3251. Êkê dî eger didît çi taze
Da vî perisît ji yê dî waz e

3252. Derḥeqqê vî bû dihatî ayet
Ayate dîyeyê bê dîrayet

3253. Mexirurê cîhan xudan hewa ye
“Ê kirye hewayê xû Xudaye”

***

3254. Ser mergê dixwar Xudê nenasî
Yek parçeyê swîr ji gûştê masî

3255. Hin av wî vexwar ḥeta ku bel bû
Tayê digirît û ḥal ecel bû

3256. Roreş wî diçû li vê cîhanê
Ḥetta bi ebed dikêşî janê

**6. El-Welîd-ubnu’l-Muẋîretî (Welîdê Kurê Muẋîrey)**

3257. Êkê dî tiṛaneker Welîd e
Emma tu nezane çen pelîd e

3258. Her dem wî dikir xebat û hîmmet
Bû ṛencê dilê resûlê ummet

3259. Teqṣîr ne dikir ji qehr û azar
Derḥeqqê wî û ṣeḥabeêt jar

3260. Wî xirvekirin Qureyṣ̌î carek
Bû wan ji Nebî dibêjî çarek

3261. Gû: Ey we hemû bijare mêr in
Reiyek me heye ku guh bidêrin

3262. Emrê vî Muḥemmedî bû meşhûr
Zanîne ḥeta qebîleêt dur

3263. Meʿlûm e dihêne ḥec hizaran
Nêv qewmê ʿereb li her kenaran

3264. Dê bên hewe ew ki ye ji hingû
Rabûye jinû bi dînekê nu?

3265. Karê wî çi ye û ew çi reng e
Ev gûte çi ye çi nav û deng e

3266. Hindek ji me dê bibên ku dîn e
Ḥeq bêjî miruv nê dîn we nîne

3267. Hindek dî dibên yê bûye şair
Hin kahîne hin yê bûye saxir

3268. Hindek dî dibên ku ḥîlebaz e
Ev zûr xeberî bi min ne taze

3269. Em lazim e xir bikîn tifaqê
Ser yek xeberî û yek siyaqê

3270. Ev muxtelifî bi min ne baş e
ʿAlem jê hituve naçne paşe

3271. Meʿqultirînê evan qisane
Ew saḥirekê siḥir zuban e

3272. Her kes vê qisê neket yeqîne
Bêjnê tu Muḥemmedî bibîne

3273. Ger pîşeyê saḥiran tu fêrî
Ew dûr diketin jinê ji mêrî

3274. Saḥir nê hu ye w dê her husa bî
Dilreş diketin kuṛî ji babî

3275. ʿUmrê wî gehişte nuṭ û pence
Roja sikitî bi derd û ṛenc e

3276. Êkek ji Xuzaʿiyan ʿeşîr e
Hustayî dikir kivan û tîre

3277. Nik ra bihurî Welîdî yek car
Tîrek di pîyê Welîdî çu xwar

3278. Wek îstîriyê wî pê bi xun bû
Emma wî felek jê sernixun bû

3279. Ev tîre me zan bi emrê Barî
Lazim jê diket cîhanê ṭarî

3280. Roj roje mezin dibû birîne
Çendî ku diken dewa çu nîne

3281. Sê meh ku diçûn ji paşî hîcret
Sekṭup dibitin bi ah û ḥesret

**7-8. Umeyyetu we Ubeyy-ubna Xelefîn (Umeyye û Ubey Kurêt Xelefî)**

3282. Du kuṛ Xelefî hebûn di bedkar
ʿAciz dikirin resûlê muxtar

3283. Nav êkî Umeyyeyê leʿîn e
Yê dîke Ubeyyê dil bi kîne

3284. Ew bûne xirabtirîn ji wan e
Derḥeqqê Nebî çi pîszuban e

3285. Rojek dî Ubeyyê dûr ji îman
Serdarê rusul dixwunî Qurʾan

3286. Ew hat bi ẋurur û xudperistî
Wî hestiyekê rizî di destî

3287. Hur hur diketin li pêş peyember
Wî gûtî: Erê te kirye bawer

3288. Carek dî bibin xudanê cane
Can kîve ji axê hestiyan e

3289. Ferman dikirî resûlê mey pak
“Dê teş wekî wî bigêrîtin xak”

3290. “Dê ṣaẋ biketinve tu dubare”
Dê ket te di agirê xû jare

3291. “Qudret wî piṛṛ e ʿeẓîmê şan e
Emrê wî bizane “kun fekan” e”

3292. “Nabî tu neẓer bikey bi çave
Yê day tu ji yek ji pişke ave”

3293. “Hêşta tu dikey ʿînad û înkar”
Ey ʿumrê te bûrî hêj ne hişyar

3294. Barî wî demê hinarî Cibrîl
Bû vî xeberî kîtab û tenzîl

3295. Axir diçitin Umeyye bê bar
Roreş diçitin lîqayê Qehhar

3296. Kujtin li Bedir bi ḍerb û talî
Du bazî Xubeybî û Bîlalî

3297. Bêbextê bira Ubeyyê nadan
Cengê Uhûdê dibîte bê can

3298. Havêtê Nebî dema bû ṭengav
Yek ḥerbe cuda bî can wî dergav

**9.Ebul Qeys-îbnîl Fakîh (Babê Qeysî Kurê Fakihî)**

3299. Bûlqeysî wekî gelek neyaran
Da ket bi Nebî hizar nekaran

3300. Carê bi civîn û car tiṛane
Carê bi wî car ṣeḥabeyane

3301. Çen car wî dikir Bûcehlê ebter
Dujwar wî li ser serê peyember

3302. Teqṣîr nedikir çi ya şiyayî
Derḥeqqê peyemberê Xudayî

3303. Ḥemze dikujît di cengê Bedre
Agir wî tijî di gur û qebre

**10. El-ʿAs-ubnu Waîlîn Walîdu ʿEmr-ubnu’l--ʿAsî (ʿAsê Kurê Waîlî Babê ʿEmrê Kurê ʿAṣî)**

3304. ʿAsê kuṛê Waîlê ẋerezdar
Derḥeqqê peyemberî sîyehkar

3305. Bedkarî dikir Xudênenasî
Ezman wî dirêj û dil çi qasî

3306. Her ew bû dema ku mirbû Qasim
Ewwel kuṛê fexrê alê haşim

3307. Ew ebter e çakedûr ji xêre
Najîn ji bû wî biçukê nêre

3308. Derḥeqq wî hinarî şahê ekber
Ew sûretê xûş bi navê Kewser

3309. Her nahezê tu ye ebter û bed
Dê biçte cehennemê muebbed

***

3310. Rojek li kerî dibît suware
ʿAsê ji qeder ne agedar e

3311. Kir lê bû ji rengê kuṛemarî
Pê wî digezît bi emrê Barî

3312. Pê lê werimî bû roj bi roje
Ḥetta diçitin di gur û duj e

3313. ʿUmrê wî gehişte pênc û heştê
Wî heş bi serê ecel gehiştê

**11.Nedr-ubnu'l- Ḥers-îbnî ʿElqemetî (Neḍrê Kurê Ḥerisê Kurê ʿElqemey)**

3314. Neḍreê kuṛê Ḥarisî nezan e
Çen dane resûlî ṛenc û jane

3315. Bê ḥed dikirin ji pîsekaran
Derḥeqqê wî û heval û yaran

3316. Melʿunî ji xû ve xwundewar bû
Bû nameyê fursê agedar bû

3317. Car car diçû nik cwî û felane
Tiştek wî dizanî dînê wane

3318. Da bêt ji Nebî neken gudarî
Nabêĵî bijil qisêt diburî

3319. Derḥeq wî gelek dihatne xware
Ayet ji Xudayê kirdigare

3320. Ev Neḍre di cengê Bedrê taze
Mîqdadî esîr dikir çu baze

3321. Gava zivirîn ji bû Medînê
Ev Neḍre dibît berî ji dînê

3322. Kujtîne Upelê xûş nuwalê
Nêzîkî Medînetel Kemalê

3323. Peyẋemberî gût ʿElîyê zîrek
Vî duşminî ser bibir bi şîrek

3324. Teqṣîr ne dikir li ziddê dîn e
Ḥeqqê wî ye evro ser birîne

3325. Rabûye ʿElîyê taze nav e
Şîrek li serê wî da di gave

**12 - 13. Nubeyhun we Munebbîhun Îbna el-Ḥeccacî (Nubeyih û Munebbih Kurêt Ḥecacî)**

3326. Ḥecacî hebûn du kuṛ di bedkar
Derḥeqqê Nebî şibî ṣeyê har

3327. Nav êkî Nubeyhê piṛṛ ji kîne
Yê dîke Munebbihê leʿîn e

3328. Ro bi ro bi Nebî zuban dirêĵ bûn
Zur eve gil û di hezrebêĵ bûn

3329. Da bêĵnê çima Xudayê ekber
Ẋeyrî te nebûn biket peyember

3330. Çen kes me hene hemû di sengîn
Mazintir û ṣed pitir te zengîn

3331. Her kes ku kesek nevêt ji canî
Ser ta bi qedem bi ʿeyb dizanî

3332. Buẋḍ û ḥesed e eger ẋurur e
Çav ṣaẋ î belê digerî kuṛe

***

3333. Roja li Bedir dibîte cenge
Dunya ji Munebbihî bû ṭenge

3334. Mêrçakî ʿElî serûkê merdan
Şîrek li serê wî da li meydan

3335. Hem ṣutî ʿElî ji wî hinave
ʿAṣî kuṛê wî dikujt di gave

**14. ʿUqbetubnu Ebî Muʿeyṭî (ʿUqbe Kurê Babê Muʿeyṭî)**

3336. ʿUqbe kuṛê Bumuʿeyṭê ẋeddar
Êkcar bi resûlê dîn ḍererkar

3337. Bê rêzî dikir digel peyember
Zêde bi ṣeḥabeêt munewwer

3338. Carek dibetin leʿînê bê dîn
Pîsî bû derê resûlê nûrîn

3339. Çav lê bû Ṭuleybê piṛṛ ji hîmmet
Kuṛmet bû resûlê pakê ummet

3340. Gava ku we dî gelek bû ṭengav
Wî girt û gwî bi ser ser û çav

3341. Lê radikişît guhan wekî ker
Carek dî hu key dikem te bê ser

3342. ʿUqbe gileyî diket ji daye
Erwa tu mezan te kuṛ çewa ye

3343. Meʿlûm bî Ṭuleybê tu çi nîne
Piṛṛ can bû Muḥemmedî muʿîn e

3344. Erwayê gûtî meta peyember
Ma kî heye wî ji min pitir fer

3345. Ger kal û serê me xir bi carek
Qurbanî serê wî yê mubarek

3346. Rojek bû Nebî dikir nemaze
Nik keʿbe di nêv sucûdê taze

3347. ʿUqbe diçitin bi nacewanî
Wî pê xû seristṭûyê wî danî

3348. Wî pê xû li ser şidand temame
Bişkên û dev û didan û lame

3349. Ta hatî Ebû Bekir di gave
Jê defʿe kirî ṣeyê gilave

3350. Carek dî gehişt resûlê serwer
Bê rêzî kirin nezanî ebter

3351. Çefya wî dikir di gerdena pak
Bêbextî şidandî lê ji dil çak

3352. Bûbekrê mezin dihêt bi ser da
Balzûr wî ḥeta ji destî berda

***

3353. Ev ʿUqbe li Bedrê bû esîre
Meʿlûm e ḥeqê wî evro şîre

3354. Ferman dikirî resûlê muxtar
ʿAsim kuṛê Sabitî ji enṣar

3355. "Ḥeqqê wî bidê wekî me lazim
Şîrek li serî bidey tu ʿAsim"

3356. Wî gûte Muḥemmedî di gavê
Ger min bikujî di vê deravê

3357. Kî dê bî xudanê wî ʿeyalî
Agir- gûtî ey te qur bi ḥalî

3358. Tu bimre here şeqîy û bedḥal
Şula te nebît bi mal û mindal

3359. ʿAsim dibirêt serê wî taze
Her wek ku peyemberî niyaze

3360. Fermuyî qinareken[1] dubare
Ewwel kese wan kirî qinar e

**15. Zuheyrubnu Ebî Umeyyetî (Zuheyr Kurê Babê Umeyyey)**

3361. Êkê dî hebû ji wan nezanan
Nahez bû resûlê îns û canan

3362. Navê wî Zuheyr e merdê meẋrûr
Babê wî Ebû Umeyye meşhûr

3363. Her çen wî didan resûlê dînî
Çen naxûşîy û çi naşirînî

3364. Emma wî dikir ji bû wî karek
Ser kafiriya xû çen mubarek

3365. Ew êk bû ji pênc cewane merdan
Roja ku ṣeḥîfe hate têkdan

3366. Beḥṣê wê ṣeḥîfeyê giran e
Ṣebrê xû bigir dikem beyane

3367. Mirna wî Zuheyrî nîne Meʿlûm
Tarîxê gelek xeber kirîn kum

3368. Hindan gûtîye ji bû Bedir çu
Ta mirnê gehiştê bû qebir çu

3369. Hindek ji Bedir dibên esîr bû
Çakiya wî peyemberî bi bîr bû

3370. Berdave resûlê cînn û însan
Îḥsan e tinê cezayê îḥsan

3371. Ḥîna digehişte Mekkeya pak
Çu der ji cîhan şeqî ji bû xak

**16. El-Eswed-ubnu'l- Muṭṭelîbî (Eswed Kurê Muttelibî)**

[1] hilawîstin

3372. Eswed kuṛê Muṭṭelib ji wan e
Derḥeqqê Nebî bi qehr û jan e

3373. Larî dikirin bi wî û yaran
Carek ne xebîs̱î zûr ji caran

3374. Her carê didîn dikir îşaret
Da bêjî bi larî û ḥeqaret

3375. Seyrê kene van feqîr û jaran
Sulṭanê cîhan û ḥukimdaran

3376. Wan fikre ji xû dibin muẕeffer
Ser dewletê furs û mulkê qeyser

3377. Meẋrûrê ku hêj ʿezab ne dîtî
Çen carê didan resûlî fîtî

3378. Çeple diqutan li du peyember
Ew kafiṛê piṛṛ cefa û ebter

3379. Nifrîn lê dikir dema bû ṭengav
"Ya Reb tu bibey jê nûrê du çav"

3380. Cergî bişujî ji vî leʿînî
Mergî ji kuṛê xû ew bibînî

3381. Roja li Bedir dibûye cenge
Ev panecîhan li wî bû ṭeng e

3382. Gel wî bû kuṛê wî hate kuştin
Wî cerg û hinav di gav birijtin

3383. Şîrek lê dida Ebû Ducane
Meşhûr e ji rostemêt zeman e

3384. Nevyê wî wesa ku Hers e der gav
Ew jî dikujît ʿElî ji pêş çav

3385. Nevyek dî ʿUteybe êk ji gencan
Ḥemze û ʿElî diken wî bê can

3386. Axir bi xû jî dibîte kuṛe
Ew bê hunerê ji xêrê dûr e

3387. Roja bû Uhûd diçûn bû kuştar
Naṣaẋ bû wî tên didan kes û yar

3388. Taya mirinê gehişte canî
Bû agirî çu bi pêşemanî

**17. Muṭʿîm-ubnu ʿEdîyyu (Muṭʿîm Kurê ʿEdîy)**

3389. Muṭʿîm bû kuṛê ʿEdîyê ebter
Ew bed ʿemelê digel peyember

3390. Melʿunî didanê zûr civîne
Nifrîn dikirin ji kerb û kîne

3391. Zu rew bû dirêj guh û zubane
Neyxaṣme bi wan ṣeḥabeyane

3392. Emma nê ewîş wekî Zuheyr e
Karek bû Nebî dikir çi xeyr e

3393. Ew êk bû ji pênc kesan şirînkar
Têkdabû ṣeḥîfeyê we dujwar

***

3394. Bê dîn li Bedir dibît esîre
Ḥemze dibirît wî ser bi şîre

3395. Heçya te kirî li ziddê dînî
Gû: Nuke cezayê xû dibînî

3396. Ew ya wî kirî ne ḥeddê ejmar
Lew ew ji ʿefû nebû xudan bar

**18. Malîk-ubnu'l-Ṭulaṭîletî (Malikê Kurê Ṭulaṭîlihî)**

3397. Malik bû kuṛê Ṭulatîlê bed
Talî digehandine Muḥemmed

3398. Nadan û sefi ye û bê edeb bû
Çen duşminê serwerê ʿereb bû

3399. Çen zûr e û lewçe û ẋerezdar
Xaṣma bi ṣeḥabîyêt şirînkar

3400. Wî hinde kirin ḥeta peyember
Nifrîn lê dikir ji şahê ekber

3401. Êş kefte serê wî piṛṛ ʿezab bû
Ta ṭupî bi nalî û ʿezab bû

**19. Rîkanet-ubnu ʿEbdîyezîd (Rîkane Kuṛê ʿEbdîyezîdî)**

3402. Êkê dî ji duşminan Rîkan e
Bab ʿEbdê Yezîd e zûr nezan e

3403. Ew rostemê piṛṛ bi zûr û quwwet
Duşmin bû bû cewhera nubûwet

3404. Rojek li çiyayî dît peyember
Gû: "Bû çî bi min te nîne bawer"

3405. Elḥeq - gûtî hîç diru çi caran
Derḥeq te nedîn me bû çi karan

3406. Îman bi tu naçeqî di dil min
Zuranê ḥeta nekey digel min

3407. Ba zûrê milan bi min şiyayî
Bê şek tu peyemberê Xuda yî

3408. Hêşta me nedîne yek ji merdan
Pişta me bidet di kax û meydan

3409. Peyẋemberî gût bi navê Barî
Wer kaxê belê bi tazekarî

3410. Wî pişt bi Xudê ʿeẓîmê şan e
Wî girt û li ʿerḍî da Rîkane

3411. Ḥêlê niye gût Rîkane yekcar
Sê car wî li ʿerḍî da şirînkar

3412. Dîsan wî gûtî me nîne bawer
Dara he ḥeta li cê xû bêt der

3413. Gazî kire wê resûlê pake
Ew hate derê sivik li xake

3414. Ew hat û çeqî bi serfiraze
Pêş destê ḥebîbê piṛṛ bi naze

3415. Wî gûtî ḥeta ve gav û ḥîne
Siḥrêt hu mezin me qeṭ nedîne

3416. Dê bêjevê da biçîtve wek car
Wî gût û çu ew li cê xû çu xwar

3417. Dîsan wî digû ji jengê cane
Ev siḥre çi mazin û giran e

3418. Axir dibitin ji ehlê îslam
Êkek ji ṣeḥabîyan nîkunam

***

3419. Ev nuzde kese xirab û bedker
Bê rêzî dikir digel peyember

3420. Ẋeyrî ji ewan hebûn gelek zûr
Emma wekî van nebîne meşhûr

3421. Hindek dî hebûn ji nuve bednam
Fetḥa Mekehê dibûne îslam

3422. Wan her çî kirî ji wan ʿefu ye
Îslam dibetin çi pêşî xû ye

3423. Dû ji wan e bi navê Babê Sufyan
Bab Ḥerṯ e ewê dî Ḥerb û ṭuxyan

3424. Her wek Ḥekemê kuṛê Ebû ʿAṣ
Merwan e kuṛê wî yê ne mêrxaṣ

3425. Wek ʿEbdê Xudê ji alê mexzûm
Babê wî Ebû Umeyye Meʿlûm

3426. Ew bûn bi hîdayetê xudan bar
Wan her çî kirî bi ʿefwê Ẋeffar

3427. Ya Reb tu ʿefu ke min di meḥşer
Ṭahir bide xaṭira peyember

**EZ-ZEHRATU'R-RABÎʿETÛ (KULÎLKA ÇARÊ)**

**Fî Hîcratîl Esḥabîl Îlel Ḥebeşetî el-Hîcretu'l-Ûla Fîs-Senetîl Xamîsetî Minel Buʿṯetî (Her Du Koçên Sehabîyan bo Ḥebeşê Koça Êkê di Sala Pêncê ji Pêxemberîyê)**

3428. Hîna ku didîn peyemberê pak
Eṣḥabê di wî di jar û ẋemnak

3429. Ewwel bi Xudê û paş bi mamî
Wî zûr nedidîn ji wan nekamî

3430. Ferman kire wan şirîn hevalan
"Her çî ku bişêt çî di ḥalan"

3431. "Herne Ḥebeşê wekî me zanî
Meznek heye wan bi ḥukimranî"

3432. Neccaşî ye mazinê ʿedil zûr
Kes nik wî ne dê bî jar û mexdûr

3433. Her çî ku bivêt biçîte wêrê
Ta bû we vebît derek ji xêrê

3434. Hîcret ku li nik Xudê bi qedr e
Her ew xû dizanî çen bi ecr e

***

3435. Hindek ji ṣeḥabîyan helistan
Îman qewîyan û ḥal di sistan

3436. Pênc kes li jinan û deh li mêran
Roj ew ro neba hemû çu şêran

3437. Mîn cumle li wan hebûn du ʿUṯman
Yek ew beṭelê wî babe ʿEffan

3438. Gel wî bû ḥerem kiça peyember
Nazdar e Ruqeyye xan û dilber

3439. Meznê hemîyan emîrê mazun
ʿUs̱man bû wî navê babî Meẕʿun

3440. Êkê dî ji wan Ebû Ḥuzeyfe
Babê wî bû ʿUtbe piṟṟ ji ḥeyf e

3441. Gel wî bû jina wî Sehle xan e
Babê wê Suheylê nacewan e

3442. Êkê dî ji wan Zubeyrê ʿEwwam
Muṣʿeb jî kuṟê ʿUmeyrê piṟṟ kam

3443. Bûşebreyê Bûruhîm jî meʿlûm
Jinka wî digel bû Ummû Kuls̱ûm

3444. Hem Bûseleme digel ḥerem wî
Ummû Seleme xudan kerem wî

3445. ʿAmir ku kuṟê Rebîʿe meşhûr
Leyla wî digel jina di dil nur

3446. Wek Îbnû ʿEwf kuʿ Ebdê Reḥman
Beyḍa puserîş ku Sehle gel wan

3447. Ew çûne bi her çî ḥal û ṟence
Heyva Recebê bû sal xû pence

3448. Ser xatrê dîn diçûn bû ẋurbet
Serdeftere ev sefer bû hîcret

3449. Ser dînê te ye Xudê dizanî
Ya Reb nê tinê tu puştevan î

3450. Her êk ji Nebî dixwazî destur
Ey ger me nebayne zêde mecbur

3451. Ḥalê me dibînî qehr û kerban
Ey em hemû dem ji bû te qurban

3452. Nê ev sefere dirêj û dwîr e
Car car ji duʿa nekey me bîre

3453. Ey ku te fîraq me zûr giran e
Emma çi bikeyn ji bedkerane

3454. Peyẋemberî bû heman duʿa kir
Ey yarê we bî Xudayê Qadir

***

3455. Ew çûn ji Mekê bi xêr û şayî
Wan pişt û meded bi wî Xudayî

3456. Wan ṭey dikirin çiya û çule
Ṣeḥrayêd gerim û bask û dûle

3457. Ḥetta digehin Yemen bi tirs e
Xaṣma wî zemanî her nepirse

3458. Ew çûne bi her çî ḥal û renge
Geştîne Ḥebeş zemîn çelenge

3459. Ev rê û sefer diyare dûr e
Meʿlûm e cefa birîne zûr e

3460. Gava digehin Ḥebeş bi şayî
Geştîne serwerê can tebayî

3461. Mesrûr bû bi hatina ewane
Neccaşîyê piṟṟ ji xêr û dane

3462. Ey hingû hemû xudanê bext in
Ser çavê me bên ku xûş mişext in

3463. Bawer we hebît neken çu fikrê
Kes nîne biket li hingû ẋedrê

3464. Ger xanî û qut û tişt û mişt in
Ew cumle hemû bi min gehiştin

3465. Ta rujekê nik me hûn bimînin
Ger yar bî Xudê dê xêr bibînin

3466. Hun hatne nik me hin qeder dur
Qedrê we li ser me ferḍ e lê zûr

3467. Wî gûte ewan ji kîş zemîn in
Hun kî milet in li ser çi dîn in

3468. Gûtin Qureyşî ʿereb nijad în
Ehlê Mekeh în bi wê di şad în

3469. Dînê me şukir diyar e îslam
Dînê hemû enbiya ne ew ʿam

3470. Peyẋemberê me Muḥemmedê pak
Ew meẕherê xûş xîṭabê “lewlak”

3471. Tewḥîdê Xudê me ruknê îman
Fermanê Xudê ji bû me Qurʾan

3472. Wî gûtî hemû bi xêrê hatin
Ser çavê me her ji wêrê hatin

3473. Mabûn du mehan bi ʿeyşê nuşî
Her rojê pitir bi qedr û xûşî

***

3474. Axir xeberek gehî guhê wan
Înane gelek Qureyşî îman

3475. Îslam bûye piṛṛ ji ʿîzz û qedre
Kes êdî neşêt biket çi ẋedre

3476. Pirsîn li emîrê xû yê sengîn
Meẓʿun puserê bi ray û rengîn

3477. Emrê te çi ye tu ku dizanî
Bû vî xeberê me xûş ji canî

3478. Ger ev xebere we bît temam e
Ma em çi dikeyn li ev meqame

3479. Ba reyê heman gûtin we çak e
Em xir vegerîn bû Mekke xake

3480. Geryaneve ew di ʿeynî salê
Ser wê emelê û xûş xîyalê

3481. Bes ew du mehan li wêrê mane
Her rojê pitir bi qedr û şane

3482. Gava digehin kinarê Mekke
Wan zanî ji şûl û karê Mekke

3483. Ew taze dibin ji xû ve piṛṛ ẋem
Em dê çi bikeyn bû kê diçîn em

3484. Ya Reb çi diru bû ew me zanî
Em hu zu dihêyn li ew mekanî

3485. Neccaşî ji bû me piṛṛ kerem bû
Ẋurbet nebiya me ney çu ẋem bû

3486. Evro Qureyşî ku çen di har in
Ew zêde ji me di daẋidar in

3487. Ya Reb tu muʿîn û piştevan î
Çarek bike bû me tu dizanî

3488. Wan çendî kirin xeyal û texmîn
Gû ev du wene me çare ev ḥîn

3489. Yan dê bi dizî biçîn bi berze
Meʿlûm e belê bi tirs û lerze

3490. Yan bextî divê ji wan bixwazîn
Belkî qederek digel bisazîn

3491. Her çendî ku muşrikan ne bext e
Emma çi bikeyn ma ḥalê sexte

3492. Ser bextê Ebû Uḥeyḥe ʿUs̱man
Daẋil Mekehê bû Îbnu ʿEffan

3493. Ya rebbî Ebû Ḥuzeyfe şa bî
Êmin bû ewîş bi bextê babî

3494. ʿUs̱manê dûwê ku Îbnu Meẓʿûn
Ser bextê Welîdî bibye meʿmûn

3495. Zu paşî gûte Welîdê nakes
Yar û beṛevan Xudê ye min bes

3496. Bextê te ne taze ye ji bû min
Lewṛa çi bext bû nîne duşmin

3497. Êkek ji Benû Muẋîre carek
Nakes biçeyek çi kînedarek

3498. Mistek wî ji dil gehande çave
Nageh wê dihêt Welîd di gave

3499. Gava we didîtî çavê ʿUs̱man
Meẋrûr dikenî ji şayê piṛṛ can

3500. Helbigre gûtî bû xû vî ḥalî
Wî gûtî bila bû Ẕulcelalî

3501. Vê qehrê ji bû wî ez dikêşim
Min fexr e ji bû wî ez biêşim

3502. Carek dî gûtî bidem te bextî
Kes gel te neket nekar û sextî

3503. Wî gûtî ḥeta bi ruḥ û can im
Ez ẋeyrî Xudê xû kes nizanim

3504. Seʿdî ku bihîst kirî Bûweqqaṣ
Girtî ẋeḍebê ji dîn û îxlas

3505. Çu merdê qutayî Îbnû Meẓʿûn
Difna wî şikand û lê xişî xun

3506. Derḥal wî vekir ji bû wî tule
Ya Reb tu bikey ji wî qebû le

3507. Ev xune bû ewwelî di îslam
Rijya bû ji kafiṛêt di bedkam

3508. Bes derge vebît bi emrê Barî
Cuwebar dê ji xunê wan bî carî

**El-Hîcretus̱ S̱anîyetî îlel Ḥebeşetî (Koça Duyê Bo Ḥebeşê)**

3509. Mabûn qederek Ḥebeş muhacir
Roj roje ʿezab li wan bû zêtir

3510. Wan çendî şebir dikir ji hîcret
Wan zêde dibû cefa û hesret

3511. Ṭengav bûne ew gelek di naçar
Pirsîn ji peyemberê şirînkar

3512. Ey can me heman fîdayê tu ye
Ḥalê me tu nê dibînî ku ye

3513. Emrê te li ser hebît dubare
Dê çîneve bû Ḥebeş neçar e

3514. Ey ku me fîraqê tu çi tal e
Emma çi bikeyn ji derdeḥale

3515. Ferman kirî qaṣidê Xudayî
Ya Reb we biçin bi xêr û şayî

3516. Her çî ku divêt û ew dişêtin
Min izn e bila bi xêr biçîtin

3517. Mecmuʿê muhaciran ve care
Tarîx ji me ra diket jimare

3518. Heştê û du kes temam ji mêran
Gel hejde jinan ji daykeşêran

3519. Pazde jê ew in ku çûyne ewwel
Êt dîke hemû dinû ne ev hel

3520. Serdarê heman vê carê Ceʿfer
Babê wî Buṭalibê muʿemmer

3521. Gel wî bû ḥerem wê dil tijî nur
Esma ye kiça ʿUmeysê meşhûr

3522. Hem yek bû ji wan ku çûyne taze
Mîqdadê cewan û serfiraze

3523. Hem Îbnû Ceḥş ʿUbeydê Ellah
Jinka wî digel heval û hemṛah

3524. Ew Ummû Ḥebîbeya xudan şan
Babê wê diyar e, Babê Sufyan

3525. ʿUs̱man vê helê jî êk ji wan e
Hem gel wî ḥerem Ruqeyye xan e

3526. Hem çûbîyeve Zubeyrê ʿEwwam
Meşhûr ji mubeşşirêt nîkunam

3527. Êt dîke ku ez fîdayê wan im
Vê gavê esef ku ez nizanim

**Sefaretu Qureyşîn Îlen Neccaşîyyî fî Reddîl Muhacîrîn (Qasidê Qureyşîyan bo Necaşî ji bo Vegerandina Koçberan)**

3528. Zanî ku Qureyşîyan yeqînî
Muʾmîn di qewîne ser vî dînî

3529. Her çendî kirin bi her çî kare
Ser dînê xû ew nehatne xware

3530. Gûtin me çi kir netîce axir
Ew çen kese xir dibûn muhacir

3531. Ev ṣed kese çûn Ḥebeş zemîne
Dûr nîne biçîte wê ve dîne

3532. Neyxaṣme me zanî ew bi bext in
Neccaşî li nik wî xûş mişext in

3533. Wan qedr û şeṛef li nik wî zûr e
Axir ku bibît ji wan ne dûr e

3534. Ev dîne eger li wê bibît faş
Seʿiya me belaş diçît jinû paş

3535. Dûr nîne ewan bi her çî ḥîle
Ba siḥrê ziman û ṣed delîle

3536. Neccaşî biken bû xû muʿîne
Bêtin bû şeṛê me piṛṛ ji kîne

3537. Ew bêt Mekehê bi leşkerek zûr
Bêşek me heman diket di xun ṣur

3538. Em çak e bikeyn ji bû xû çare
Çendî ku dişêyn bi mal û pare

i. ***

3539. Meznan gûtîye: Heyîn gelek şul
Ewwel dimeşin bi yek qise û pul

3540. Ger tu qederek vehêlî ew kar
Nabî bi du ṣed reca û dînar

3541. Dara tu jinû bi dest biçînî
Dêşêy bi tinê ji bin derînî

3542. Ger ew qederek bihête hêlan
Der nayê li cê xû ew bi fîlan

3543. Bertîl ku dibên çi xûş delîl e
Ṣed karê mezin diket ẕelîl e

3544. Her kes tu dibînî tund û germ e
Bertîlê bidê digêrî nerme

3545. Bertîlekê em bi navdîyarî
Em çak e bideyn ji bû vî karî

3546. Laîq bû wezîr û padişahan
Gel yek du kesan ji şarezayan

3547. Bû şahê Ḥebeş sivik binêrîn
Da em bû netîce guh bidêrîn

3548. Ew belkî li nik xû der biket wan
Naçar di gerênve piṛṛ bi ẋem û can

3549. Kes ẋeyrî wî nîne wek me zanî
Bê fayde ji wan biket xudanî

**Sefîra Qureyşîn îlen Neccaşîyyî (Her Du Qaṣidên Qureyşîyan bo Necaşî)**

3550. Rabûne Qureyşî dil di pîsan
Bû cewrê muhacirêt me dîsan

3551. Du kes ji bijare û xebîran
Ew çûn bû Ḥebeş wekî sefîran

3552. Gel wan bû dîyarîyek girane
Bû şah û wezîr û peṭrekane

3553. Yek ʿEmr e wî ʿAs e bab Şenîʿe
Yek ʿEbdê Xudê ye bab Rebîʿe

3554. Maqûl e dîyarî serfiraz e
Ser wan vepeşin şirîn û taze

3555. Gûtin melîkî eger dipirsî
Ey ku te dewam bî text û kuṛsî

3556. Hindek ji me wan sefîh û jaran
Derçûyne ji dînê xû ji qaran

3557. Ney hatine ser vî dînê paşay
Dînek dînû ye xû pê diken şay

3558. Hatîn me bi gûtina serûkan
Bihnêrîve van ʿeqilbiçukan

3559. Nik xû bike der tu van feqîran
Laîq nîye ew ji bû te cîran

3560. Wan fikrê we bû melîk nezane
Îẋfal dibitin bi van qisane

3561. Neccaşî ku mîrekê mehûl e
Ev reye ji wan nekir qebûle

3562. Gû: bû me muhaciran bixwazin
Ew nik me gelek bi qedr û naz in

3563. Ez ta ku ewan heman nebînim
Raza dilê wan temam nexwînim

3564. Ez dê ku hituve der bikem wan
Êdî ji me dê çî nav û nîşan

3565. Gava ku dihêt emîrê mêrser
Ceʿfer digûtî bi zarê şekker

3566. Ger izn e melîk dikem beyane
Ḥalê me digel ewan çewa ne

3567. Qewmek me hebîn di nadirstî
Dînê me tinê bû butperistî

3568. Mestî ye eger mirare xwar in
Feḥşî ye eger ne tazekar in

3569. Bê reḥmî û bedʿemel bi cîran
Berṭengî ji bêkes û feqîran

3570. Xurtêt me şebîhî gurgê har bûn
Lew zêde feqîr û jar di jar bûn

3571. Em hutive bûy ne hêj xirabtir
Nageh bû me hat resûlê axir

3572. Navê wî Muḥemmedê emîn e
Nêv qewmê ʿereb wekî wî nîne

3573. Barî ji me van hinart peyember
Merdek ji kemalê kanê cewher

3574. Qurʾan ji wî ra dihête xware
Bê mîs̱l e şirîn e namidar e

3575. Exlaqê di wî gelek di taze
Wî nefʿê vê ʿalemê niyaz e

3576. Ney wî temeʿe ne dunyedarî
Bes karê wî deʿwet e bû Barî

3577. Eṣlê wî Qureyşî û şeṛîf e
Meşhûr e bi ṛastî û ʿefîf e

3578. Her kes vî Nebî cewan bibînî
Bê destê xû medḥekar dimînî

3579. Emrê me diket bi dîn û îman
Tewḥîdê Xudê Reḥîm û Reḥman

3580. Ṛastî û duristî û emanet
Çakî û ʿedalet û dîyanet

3581. Nehyê diketin ji butperistî
Her çî ku ḥeram û nadiristî

3582. Xun rêtin û feḥşî û nekamî
Ew cumle necaîz in temamî

3583. Ger ferḓê nivêje rojî sunnet
Emrê me diket resûlê ummet

3584. Ta zûr ji umûrê dînê îslam
Tim gûtine Ceʿferê nîkunam

3585. Ev dîne dema wî kir beyane
Bawer me kirî ji cerg û cane

3586. Wî her çî gûtî ji bû me taze
Em radigirîn bi ʿîzz û naze

3587. Xizmêt me keçî te ew ne dîne
Rabûn ji me ra bi kerb û kîne

3588. Wan dane me ṣed şikil ʿezabe
Zêdey ji tiṛane û ʿîtabe

3589. Peyẋemberê me pitir diêşî
Ṣed cewr û cefa ji wan dikêşî

3590. Neyxaṣme di ẓerfê van du salan
Em zêde di ṛenc û ah û nalan

3591. Bêhna me ewan ku kiribû ṭenge
Ḥalê me ji destê wan ve reng e

3592. Em bû xû ji ber ewan helatîn
Meḥṣuṣ me li wê bû nik te hatîn

3593. Navê te li wê wekî me zanî
Tu piṛṛ bi ʿedalet û eman î

3594. Neccaşî gûtî erê te Ceʿfer
Zanayê ziman te şibhî şekker

3595. Tiştek tu eger dizanî Qurʾan
Zeḥmet nebî tu bixwîne der an

3596. Ceʿfer ji bû wan dixwunî der dem
Ser sureteka bi navê Meryem

3597. Wî xwundî di gavê çar ji ayet
Emma çi şirîn û taze ẋayet

3598. Neccaşî bi şewketa emîran
Derḥal digirî digel wezîran

3599. Gûtin: Eve wek kelamê ʿÎsa
Ew her du yek in bi namê ʿÎsa

3600. Derḥal wî digûte wan sefîran
Nademve ebed evan feqîran

3601. Ev ehlê ḥeq in feqîr û jar e
Hun ẋedrê ji wan diken diyar e

3602. Rabûne muhacirêt me taze
Piṛṛ şayê dil û di serfiraze

3603. Wan gûtine yek du du sefîre
Naḥeq me bûyîn li nik emîre

3604. Hatîn bi cefa ji rahê çen dûr
Vî Ceʿferî em kirîne serşûr

3605. Ḥîlek dî gûtin me dê bi qatî
Bawer pê biket şehê welatî

3606. Rabûn ṣubehî bi karê nemmam
Wan nik melîkî biken di bednam

3607. Gûtin wî tu ey şehê siyasî
Tu belkî evan temam nenasî

3608. Derḥeqqê Mesîḥî ew dibêjin
Gûtek ji wî qîmetê dirêjin

3609. Neccaşî gûtî dubare bînin
Çendek ji muhacirêt şirînin

3610. Wî gûtîye Ceʿferê feṣîḥe
Fikra we çi ye bi ḥeq Mesîḥe

3611. Wî gû: Ji me ra Xudayê ekber
Tim gûtîye beḥs̱ê ev peyember

3612. Ew ʿebd û peyemberê Xuda ye
Rûḥek ji wî ye giran buha ye

3613. Wî daye bi Meryema betûle
Bê bab e eger biken qebûle

3614. Wî suretê Meryema xû dîsa
Xwundî bû ḥeta ku beḥs̱ê ʿÎsa

3615. “Gûtbûne bi Meryema ji ʿÎmran
Ev kuṛ te ji kî ve anî ey can”

3616. “Bû çunke durist nebû ʿîbaret
Bû layê vî ṭiflî kir îşaret”

3617. “Gûtin: ku li gel dikeyn kelame
ʿÎsa bi ziman dihêt temame”

3618. “Gû: ʿEbdê Xudê me ez ḥeta mam
Wî kirme peyemberek nîkunam”

3619. “Wî day me kîtabeka muʿeẓẓem
Ta may me mubarek û mukerrem”

3620. “Weṣiyet diketin me ta ḥeyate
Bew ruknê nivêje hem zekate”

3621. Deyka xû digel bibem bi îḥsan
Ney kirme şeqî û ehlê ṭuxyan”

3622. Reḥmet ji me ra tê gel keramet
Hel bûn û wefatê ta qiyamet

3623. Ceʿfer ku li vî meqamî kirbu
Meclîs te digû ji nurê piṛṛ bû

3624. Neccaşî xû darikek hilanî
Wî gûtî tijî ji cerg û canî

3625. Her wek te digûtî ey şirînzar
ʿÎsa niye zêdetir ji ev dar

3626. Peṭrek dinêrin ji ev kelame
Gû her binêrin ku ew temam e

3627. Wî gûte muhaciran bizanin
Hun nik me gelek bi qedr û şan in

3628. Ḥetta we neṣîb li nik me maye
Ger yar bî Xudê dibin bi şaye

3629. Kes nabî dilê we bêlî carek
Meʿlûm bû we qewmek in mubarek

3630. Pê xûş niye min ji zêr çiyayek
Emma bigehît we êş û ayek

3631. Hem gû di demî bi wan sefîran
Nademve evan bijare cîran

3632. Her çî ji me ra dîyarî anî
Hun bû xû bibenve piṛṛ ji canî

3633. Ḥacet me niye bi van dîyarî
Laîq me niye netazekarî

3634. Rîşwet ji me wernegirtî Xaliq
Ger ez ji we wergirim çi laîq

3635. Nê şeṛme xiṣuṣ ji bû emîran
Bû rîşwetê sil biken feqîran

3636. Bû çendekî mal û çen ji pare
Ḥukmî bi neḥeq biken çi xwar e

3637. Geryaneve ew sefîr ji bû mal
Bê behre û sernixwun û bedḥal

3638. Ger yar e Xudê çu fayde nîne
Ṣed hutive ḥîle û kemîne

3639. Ev pake muhacrêt di mazin
Hêşta li Ḥebeş zemînê sakin

3640. Rabûye ji wî ṭeref emîrek
Ṣaḥib sipeh û qewî û zîrek

3641. Wî fikrî we bû bi ceng û zûre
Neccaşî biket ji mulkî dure

3642. Neccaşî ji can û dil helista
Ba leşkerê xû çi pê diwesta

3643. Ew çûne şeṛî ji xîreta can
Bû defʿê wî duşminê bi ʿudwan

3644. Îslam ketibûn xemê ji canî
Ya Reb tu dibînî tu dizanî

3645. Neccaşî çi qed ji bû me baş e
Çakiya wî Xudê nekey belaşe

3646. Ya Reb tu ji bû wî harîkar bî
Ser duşminê xû ẓefer diyar bî

3647. Ceʿfer dihinerî yek ji îslam
Bû layê şeṛî Zubeyrê ʿEwwam

3648. Seḥke melîkî wî ḥal çewa ne
Işkestîye yan ê kameran e

3649. Em cumle di ʿacizîn li ber wî
Em lazime şeṛ bikîn li ser wî

3650. Gel wî we nekir biçîne kujtar
Em ser wî çira nebîne xemxwar

3651. Qaṣid ku gehişte kax û meydan
Neccaşî xudan ẓefer çu merdan

3652. Geryave digel wî taze mizgîn
Dilxûş bûne ew hemû xudan dîn

3653. Her kes ji feqîr û jar muʿîne
Xaliq wî dibît muʿîn yeqîne

3654. Çakî dibetin bela û derdan
Neyxaṣme digel bijare merdan

3655. Mabûn li Ḥebeş muhaciran ew
Dilxûş û emîn û kameran ew

3656. Ḥetta ku ṣeḥabe û peyember
Hîcret bû Medîne kirbû yekser

3657. Geryaneve çen ji wan şirîne
Bû layê peyember û Medîne

3658. Ceʿfer bi ʿeyal û çen hevalan
Ew man li Ḥebeş bû çen ji salan

3659. Geryave Nebî dema ji Xeyber
Geryave ji bû Medîne Ceʿfer

**Hîcretû Ebî Bekrî eṣ-Ṣiddîq (Koça Ebû Bekrê Ṣiddîq)**

3660. Ṣêxê me Buxarî ew dibêjî
Zar ʿAîşeyê bi şekre rêzî

3661. Ḥîna li Mekê hebûn musilman
Piṛṛ gende ji duşminêt neîman

3662. Teqṣîr nedikir ewan neyaran
Derḥeq me bi her nerêzekaran

3663. Peyẋemberî da izin bi hîcret
Bû ʿerḍê Ḥebeş heçî di qudret

3664. Çûn bû Ḥebeşê gelek musilman
Babê me neçu ji Mekke gel wan

3665. Bê ḥed diviya resûlê enwer
Ṣebrê wî nebû bi bêy peyember

3666. Her çendî ewî ṣebir dikêşa
Her rojê pitir ji wan diêşa

3667. Axir ku neman mecal û çare
Çu gûte ḥebîbê nazidare

3668. Ey min bi fîda bi bab û daye
Hîcret dê bikem eger te raye

3669. Her çen bi fîraqê natiwanim
Emma tu dizanî ḥal çewanim

3670. Maniʿi wî gûtî ji min çu nîne
Ew çu dê biçît Ḥebeş zemîne

3671. Ḥetta digehî qebîleya Qar
Meznê wê ji mêje wî bibû yar

3672. Îbnû Dexîne bi nav û nîşan
Êk bûye ji mêrserêt xudan şan

3673. Gû: Xêr e Ebû Bekir tu hatî
Min qeṭ tu nedî li vî welatî

3674. Gû: Ez direvim ji Mekkeya pak
Qewmê me kirim neçar û ẋemnak

3675. Hatim bigerêm di ʿerḍê Barî
Ṭaʿet bû bikem bi tazekarî

3676. Îbnû Dexîne dibêjî ey yar
Miṯlê te ku derbider dibin jar

3677. Merdek mezin î giranbuha yî
Meşhûr î bi çakî û sexayî

3678. Qedr û şeṛefa te nik me zûr e
Nabî li cihê xû bibye dure

3679. Rabe dê bihêm digel te bû mal
Rebbê xû li wê binase xûş hal

3680. Kes nabî biket digel te xwarî
Dê tembî bikem bi iznê Barî

3681. Ew hat Mekehê bû ev niyaze
Îbnû Dexîne dibêjî taze

3682. Meznanê Qureyşîyan bizanin
Hun nik me gelek di piṛṛ viyanin

3683. Emma we li nik bibît yeqîne
Bûbekrî heval me wek wî nîne

3684. Meḥbûb e li nik me piṛṛ bi seng e
Mêrek mezin e gelek ji reng e

3685. Ew şexṣê husa bijare efʿal
Kes nabî bibêjtê yek qisa tal

3686. Meznan gûte wî çi qeydî nîne
Ser xatirê tu dibît emîne

3687. Şeṛtê me eger biket qebule
Êdî nedikeyn ewî melûle

3688. Bêjî çi diket nivêj û Qurʾan
Nêv xanî biket ne wek li ser ban

3689. Tirsa me heye ku ew dixwînît
Mindal û jinêt me helxirînît

3690. Dengê wî gelek bi suz û xûş e
Guhdarî diken ji wî ji huşe

3691. Vî şeṛtî qebûl biket temamî
Êdî nedikeyn bi wî nekamî

3692. Raḍî bû Ebû Bekir bû mecbur
Îbnû Dexîne diçûve mesrûr

3693. Ew ma qederek bi şeṛtê wan e
Qurʾan û nivêj dikir nîhane

3694. Axir nedikir ji dil qerare
Dengê xû bilind dikir dubare

3695. Çen xûş e di mizgeftê ʿîbadet
Lew zêde dikir ji şeṛt û ʿadet

3696. Nêzîkî ji malê mizgeftek çak
Ava wî dikir bi qelbekê pak

3697. Her dem diçû nav bi dil ḥezînî
Qurʾanê bi dengê hêl dixwînî

3698. Guhdarî dikir jin û cewanan
Teisîrê diket di qelb û canan

3699. Bûbekrê mezin ku piṛṛ girîne
Dengê wî nebêje çen ḥezîne

3700. Dîtin ku Qureyşîyêt neîman
Bûbekrî şikandî ʿeḥd û peyman

3701. Zu qaṣidekî diken rewane
Îbnû Dexîne yeqîn bizane

3702. Dûstê te nema li ser qerare
Dînê xû diket bi aşikare

3703. Îbnû Dexîne dihêtve wek car
Bûbekrî ne wek biken qehirdar

3704. Gûtin wî Qureyşîyêt bi kîne
Ser xaṭirê tu me kir emîne

3705. Emma xû negirt li ser qerare
Ta çendê dî zêdekir ve care

3706. Ger dê bidizî di nîvê xanî
Ṭaʿet biketin ji dil nîhanî

3707. Ser xaṭirê tu wekî he caran
Em gel wî nekeyn netazekaran

3708. Karê wî gelek me pê diêşîn
Ṭaqet me niye ṣebir bikêşîn

3709. Îbnû Dexîne dibêjî ey yar
Emrê te çi ye tu ey şirînkar

3710. Waz bîne gûtî ji min birader
Bes ser me bibe bi can mukedder

3711. Yarê me bese cenabê Barî
Memnun ji te me ji pakeyarî

3712. Êdî me nevêt eman ji her kes
Bûbekrê te puştevan Xudê bes

3713. Êdî nedikem ji Mekke hîcret
Her çen me biken he rojê ʿîbret

3714. Rûḥa me peyemberê Xuda ye
Êdî nedibim ji wî cudaye

3715. Her rojê ewî du car bibînim
Min bess e ji vê ḥeyat û jîn im

3716. Ew mave di Mekkeya şirîne
Ta gel wî diçît ji bû Medîne

3717. Ṭahir te Xudê ḍeʿîf û jar e
Tu xuşke bû cahê yarê xare

3718. Piṛṛ sûç û xeṭa ye piṛṛ quṣur e
Bû xaṭirê wî ji min bibure

## EZ-ZEHRATU'L-XAMÎSETU (KULÎLKA PÊNCÊ)

### Fî Îslamî Ḥemzetu ʿEmmîn Nebîyyî We ʿUmer-îbnîl Xettabu We Muʿcîzetu Înşîqaqîl Qemerî (Musilmanbûna Ḥemzey Mamê Peyẋemberî û ʿUmerê Kuṛê Xeṭṭabî û Seyra Şeqbûna Heyvê)

### 1.Îslamu Ḥemzete (Musilmanbûna Ḥemzey)

3719. Ew Ḥemze serûkê pehlevanan
Yarê rim û şîr û tîr kivanan

3720. Sekvan û siwar û şêremêr bû
Ser rav û nêçîrê mêje fêr bû

3721. Rojek bû li ravê ew dilawer
Bûcehlê leʿîn didî peyember

3722. Roniştîbû ew li nik Ṣefayê
Ew menbeʿê ḥîkmet û buhayê

3723. Ew duşminê kerb û kîn tijî can
Haşey wî gelek civîn bi wî dan

3724. Peyẋemberî hîç cewab negûte
Lew ehmeqî bes cewab sukût e

3725. Bûcehlê mirar diçîte nadî
Ew piṛṛ ji ẋurur û piṛṛ ji şadî

3726. Jinkek xeberan diket gudarî
Ew Ḥemze diket bi agedarî

3727. Zur pê neçu ew dihêt li ravê
Wê gûtê ewa ku bûy di gavê

3728. Ew tale xeber dema wî zanî
Girtî ẋeḍebê ji cerg û canî

3729. Wî gû di dilê xû ez nemînim
Van tuxme ṣeyan ku ney çiẋînim

3730. Gava digehî leʿînê bedkar
Ḍerbek wî li wî dida çi duşwar

3731. Yekcar wî kivanê xû weşandî
Wî tuqe sera wî lê şikandî

3732. Gû: Ey tu xebîs̱ê pîsê bê ḥed
Dê ku tu civîn bidey Muḥemmed

3733. Carek dî wesa te ez bibînim
Çavan ji serê te derdiînim

3734. Mexzumî hinek li wêrê ḥaḍir
Wan dilbû Mekê biken bi agir

3735. Hatin bi cewab li ser leʿînî
Dê ku mezinê me ser şikînî

3736. Bûcehlî eger viyabû derḥal
Dê bîte şeṛek ji dil ṛeş û tal

3737. Fikrêt xû kirin xebîs̱ê bedkar
Ger tu lêvenekey dibîte kujtar

3738. Gû xizm û kesan: Ez im yê naḥeq
Min dane Muḥemmedî qisêt req

3739. Suça min e her ji min xeṭa ye
Ḥemzey çi kirî bi min riḍa ye

3740. Ḥemze wî demê li nik leʿînî
Îman bi Muḥemmedî dianî

3741. Derḥal diçû xidmeta peyember
Gû: Min bi te û Xudaye bawer

3742. Îslam bû belê bi serbilindî
Westabû li royê wan bi tundî

3743. Mêrek bû dilawer û bi şewket
Îslam bû li paşî wî bi quwwet

3744. Bîʿs̱et wî demî di salê şeş bû
Ḥemze ku bi dînî dil wî geş bû

3745. Ḥemze ku bi xêr dibîte îslam
Îslam dibitin jinû xudan nam

3746. Fikra xû diken Qureyşî taze
Ev dîne dibît bi serfiraze

3747. Ḥemze diketin şeṛî li ser dîn
Lew menʿe dibin ji çen neşîrîn

3748. Kêm kêm dikirin ji qehr û bedkar
Ber tirsê vî Ḥemzeyê cegerdar

3749. Xirbûneve rojekê musilman
Em lazim e kul bikeyn dilê wan

3750. Kî dê ji me çît fîdayê dînî
Qurʾanê bû wan bi hêl bixwînî

3751. Rabuve piyan kî Îbnû Mesʿûd
Merdek ji bijareyan bû meʿdûd

3752. Gûtin wî neçe tu ney ji wan î
Bê xizm û ucaẋ û piştevan î

3753. Tirsa me heye ewan neyaran
Zêde te biden bi ḍerb û daran

3754. Wî gûtî Xudê me bes muʿîn bî
ʿEbdê wî dê can fîdayê dîn bî

3755. Ew çubû ḥeta gehişt meqamî
Dengê xû bilind diket temamî

3756. Ew sureteka bi navê Reḥman
Wî taze vexwundî xir ji bû wan

3757. Geh lê bû Qureyşîyan ji nadî
Wan şadî bedel dibû neşadî

3758. Wan çeni bezîne wî bi kulman
Wî qetʿe nekir kelamê Reḥman

3759. Ḥetta ku xilaṣ dibît ji suret
Xun lê dimeşît ewî ji ṣuret

3760. Geryave sivik bû nik hevalan
Ḥalê wî tinê hewar bi ḥalan

3761. Gûtin: Me neGû te ey dilawer
Duşmin te diken hu bêserûber

3762. Wî gûtî qesem bi dawerê[1] min
Evro me ẕelîl dî taze duşmin

3763. Hezken sube jî diçim dubare
Wek evro dibim ji wan qerare

3764. Gûtin: Te bes e ve karê taze
Pêk hat me ji dînî ev niyaze

3765. ʿIzzet ji me ra bû hêdî hêdî
Tirsa me ji wan nemaye êdî

**Axîru Muḥaweletî Qureyşîn Meʿen Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam Fîl Keffî ʿen Deʿwetîhî (Dumahîk Bizava Qureyşîyan digel Pêxemberî (s.l.w.) bo Hêlana Deʿwê)**

3766. Çendî ku Qureyşîyanê bednam
Bedkarî dikir bi ehlê îslam

3767. Ger lewm û civîn e wer tiṛane
Ger cewr û cefa ye wer qutan e

3768. Teqṣîr nedikir ewan miraran
Carê bi Nebî û car bi yaran

3769. Her rojê dideyn ku em musilman
Her zêde diken ji ṣebr û îman

3770. Pêş çavê heman diken nivêjan
Ney guh ji cefa û hezrebêjan

3771. Meznêt di Qureyşîyan vecemyan
Tedbîr dikirin bi rayê hemyan

3772. Gûtin me neman ʿîlac û çare
Wî raḍî bikeyn bi cah û pare

3773. ʿUtbe diçitin kuṛê Rebîʿe
Bû wan ku bibîte xûş şefîʿe

3774. Êk bû ji Qureyşîyan bijare
Çu gûte Nebî wî ev qerare

3775. Gûtê: Tu bi xû temam dizanî
ʿAlî neseb î mezin mekan î

3776. Qewmê xû çira te hu belav kir
Nav ʿalemê bed fîʿal û nav kir

3777. Ez bû te dibêm tu guh bidêre
Min bû te divê kemal û xêre

3778. Ger ṭalibî tu bû zêr û malî
Dê deyne te zûr j dil ḥelalî

3779. Wer serwerî ye ku tey merame
Dê deyne te em reîs meqame

3780. Her emrekê tu bikey rewa ye
Her karekê tu bikey wesa ye

3781. Yaxud te ecine têne lalî
Xurtî ji te ra diken vî ḥalî

3782. Bes tu bi serê zubanî ferman
Dînîn ji te ra ʿîlac û derman

3783. ʿUtbe ku ji vî kelamî ber bû
Peyẋemberî dil di nurê wer bû

3784. Gû "ʿUtbe eger tu huşiyarî
Tu guhde hinek kelamê Barî"

3785. Secde wî ji suretan temamî
Bû taze dixwund di wî meqamî

3786. ʿUtbe fikirî ji dilve zanî
Ney mal wî divê ne şehcîhanî

3787. Age li xû ye ne har û dîn e

[1] Sembol,nîşan

Qewlê wî çu şekirê şirîn e

3788. Geryave bû nik Qureyşîyan ew
Wî bûye nerim dil û giyan ew

3789. Gûtî ji we ra dibêm temam e
Dûr e ji temeʿ xû ev zelame

3790. Reiya me we ye ji wî biken waz
Çî gel ʿereban biket bi dilxwaz

3791. Ger qewmê ʿereb bibin muẓeffer
Em dê jê rihet bibîn seraser

3792. Wer ew bibitin reîsê wane
Fexrek dibitin me van hemane

3793. Ev reye ewan nekir gudarî
Ew paşve neçûn ji pîsekarî

3794. Her kes ji kesê jidil bi kîn e
Çen medḥe bikey çi fayde nîne

3795. Bû çakî û başîyêt wî kuṛe
Heybêt wî dibînî dûr bi dûre

**2. Îslamu ʿUmer-ubnu'l- Xeṭṭabî (Musilmanbûna ʿUmerê Kurê Xeṭṭabî)**

3796. Çen carê Nebî duʿa dixwînî
"Ya Reb tu ʿezîz bikey vî dînî"

3797. "Ya Reb tu bigêrî harîkare
Bû dîn ʿUmerê ji wan bijare"

3798. "Bûcehlî nexû kuṛê Hîşamî
Bû dînî jidil biket ẋulamî"

***

3799. Meʿlûm e ʿUmer cewanemêr bû
Nav meʿrekeyan[1] şebîhî şêr bû

3800. Ew çendî bi quwwet û ceger bû
Du hinde bi ḥîkmet û neẓer bû

3801. Zu tore dibû ji zêde ẋîret
Piṛṛ şehm û deha bû taze sîret

3802. Meyla wî hebû bi ẋemr û larî
Ta dîn wî nebû tijî ji xwarî

3803. Ew ya wî dikir digel şeḥaban
Nagehte çi defter û ḥisaban

***

3804. ʿUmrê wî sîh e ḥeta sîh û pênc
Şeş salî ye dîn ʿUmer xû hêj genc

3805. Rojek fikirî di ḥalê millet
Ev tefrîqe û silî û hîcret

3806. Wî çendî kirin xeyal û texmîn
Ev şexṣe gûtî bela ye bû jîn

3807. Ez ta nekujim Muḥemmedî zu
Ev qewme rihet nedêbî bû xu

3808. Ew rabû biçît bû xanyê Erqem
Çen mudde li wê ye yarê ekrem

3809. Nêzîkî çilan ji ehlê îslam
Bûbekir û ʿElî û Ḥemzeyê mam

3810. Ew roj e li dor wî ew sitêr in
Wî xir heres in şebîhî şêr in

3811. Lezkir ʿUmerê me şîr bi deste
Girtî ẋeḍebê çu şêrê meste

3812. Nageh li rîyê gehişt Nuʿeymî
Îman bi dizî hebû ji qewmî

3813. Gû kêve diçî tu hin lez û bez
Alûz î tu wek neẓer dikem ez

3814. Wî gû: Ji Muḥemmedî bi kîn im
Min fikr e wî ten ji can derînim

3815. Ta ew di Mekê bi canve maye
Qewmê me he dê bî labelaye

3816. Tim gûtî Nuʿeymê berzeîslam
Ev reiye kê gû te ey nîkunam

3817. Ger wî bikujî tu ey dilawer
Bê şek tu dibî di gavê bê ser

3818. Nabînî ku haşimî çi zûr in
Xuna wî ebed ne jêdiburin

3819. Ger mêrî here tu Faṭîmayê
Xwîşka xû tijî ji can ke tayê

3820. Belkî tu nezanî ey şirînkam

[1] Ceng, şer

Gel mêrî nîhan bûyîne îslam

3821. Lew ev qise kir Nuʿeymî taze
Wî dîtî ʿUmer di bed niyaze

3822. Ger bêt û biçîte Faṭîmaye
Ser Eḥmedî dê biçît belaye

3823. Gava ʿUmerî we zanî ḥale
Derḥal dibezîte wan li male

3824. Ew çu biqutît derî ji xanî
Qurʾanê ewan dixwûnd nîhanî

3825. Xebbabê kuṛê Erettî car car
Ew fêr dikirin kelamê Cebbar

3826. Dengê ʿUmerî ku wan beyan kir
Xebbabî xû zu bi zu nîhan kir

3827. Lewḥê ku bi destê wan ji Qurʾan
Wan ew jî veşarî ber wî der an

3828. Pirsî ʿUmerî we ḥal çi renge
Tiştek me gulêbî ew çi deng e

3829. Min zanîye hûn ji dînî der çûn
Dê kîve biçin ji destê min hun

3830. Zavay wî gûtî Seʿîdê enwer
Ew êk e ji deh kesêt mubeşşeṛ

3831. Bû wî xeberî esil çi nîne
Rabûyê ʿUmer bi kerb û kîn e

3832. Xwîşkê we dî çav dibûne ṭarî
Rabû beṛevan û harîkarî

3833. Ḍerbek ʿUmerî weşand ẋeḍebkar
Xwîşka xû di gavê kir birîndar

3834. Ew her du qutan hinek bi dare
Wî taze nerim dibûn demare

3835. Xwîşkê digûtî ji kîn û kerban
Her çendî bikey ji kerb û ḍerban

3836. Meʿlûmî te bît me bûyne îslam
Tabiʿ bi Muḥemmedê nîkunam

3837. Gava wî bi xun dî Faṭîmaye
Derḥal wî ẋeḍeb neman ji caye

3838. Reḥmet wî gehişte can û îman
Ew ya wî kirî dibît peşêman

3839. Gû: Kanê ṣeḥîfe bû me bîne
Xwîşkê gû: Dikey tu naşirîne

3840. Wî gûtî qesem didemve çake
Wê gûtî: Belê te leş nepak e

3841. Leş pîs î tu muşrik û neyar î
Ku dest dikeye kelamê Barî

3842. Rabuve ʿUmer di dem bi çustî
Wî taze leşê xû şuşt duristî

3843. Gava wî ṣeḥîfe xwund bi dîqqet
Girtî ʿecebê ji ʿîlm û ḥîkmet

3844. Ew bû li xewa ḍelalê hişyar
Ev qewle gûtî çi xûş e dildar

3845. Derhat wî demê ji xanî Xebbab
Mizgîn wî dida bi Îbnû Xeṭṭab

3846. Gû ey tu cewan û pehlevan î
Bawer ke ji min eger bizanî

3847. Peyẋemberê me diket duʿayan
Red nake ji wî Xudê recayan

3848. "Ya Reb tu bigêrî êk duwane
Bû dînê xû canfîda ji cane"

3849. Yanê ʿUmerê bi nîkunamî
Bûcehlî nexû kuṛê Hîşamî"

3850. Min hîvî ye lê ji şahê ekber
Ev behre ji bû te bît muyesser

3851. Derḥal wî gûtî: Heliste Xebbab
Nîşa me bide resûlê mehtab

3852. Ta evro gelek neyarê wî bûm
Na raḍî ji kar û barê wî bûm

3853. Evro me çi qed fikir bû alûz
Emma me nihu ji can tijî suz

3854. Min evro divêt bibim musilman
Piṛṛ can bi Muḥemmedî me îman

3855. Nêzîk bû ji derkê malê Erqem
Eṣḥabe gûtin resûlê ekrem

3856. Bû êre dihêt ʿUmer bi çustî

Şîrî wî bi berve nek bi destî

3857. Ḥemzey gû bila bihêt ʿUmer ew
Ger pakedil e xû behrewer ew

3858. Fikra wî eger xû nacewan e
Bê can digerît li wî giyane

3859. Pîçek biketin resûlî naşad
Şîrê wî ji wî dikeyne cellad

3860. Gava ku gehişte derkê xanî
Rabuve Nebî ji karê danî

3861. Ber çêl digirît li wî şirînzar
“Ta key tu ʿUmer dibî hu bedkar

3862. “Nawestî ḥeta ku Ẕulcelale
Qehrek biketin ji tu çi tal e”

3863. Gûtî ʿUmerî: Ji bû te mizgîn
Tu êdî nekey ji min çi texmîn

3864. Hatîme belê ji kakila can
Ser destê te ez bibim bi îman

3865. Ta nuke heçî me kir ji bedkar
Dê tul vebikem Xudê bibît yar

3866. Peyẋemberê me ji şay û tebşîr
Bû ẕatê Xudê wî gûtî tekbîr

3867. Ta nuke tu bûy bi naduristî
Evroke şukir tu ḥeqperistî

***

3868. Îslam bû ʿUmer ji nuve îslam
Roj roje dibît bi ʿîzzet û kam

3869. Ta hingî nivêj di wan nîhanî
Evroke ji paş diken ʿeyanî

3870. Rabûye ʿUmer wî şîr bi destî
Gel wî bû cemaʿetek bi çustî

3871. Wan kirbû nivêj li durê Beytê
Dan duşminê dîn şeṛabê mewtê

3872. Mêrçak e ʿUmer çi newcewan e
Nakêşî kesek ji wî kivane

3873. Sengîn e ʿUmer giran buha ye
Bû dînê Xudê çi canfîda ye

3874. Peyẋemberê ḥeq wî xûş wezîr e
Rojek nefer e rojek emîr e

3875. Ḥetta ʿUmerî ne anî îman
Bê bak ne bûyîn ji wan musilman

***

3876. Îslambû dema ʿUmer ji canî
Çu layê Ebû Cehil di xanî

3877. Gû: Xêre tu hatî ey birader
Gû: Min bi Muḥemmedî bû bawer

3878. Der jê venekir ji kerb û kîne
Gûtî here tu şeṛef çu nîne

3879. Wî gû şeṛef û kemal û ẋîret
Dûr in ji te ey siyahê sîret

3880. Ger yar bî Xudê û ez bimînim
Çavan ji serê we derdiînim

3881. Xidmet dê bû serwerê beşeṛ kem
Dê piştê ji duşminan du ker kem

3882. Ya Reb tu bi ḥurmeta ʿUmer key
Ṭahir tu di reḥmeta xû werkey

3883. Îslam bû dema ʿUmer ji cane
Gûtî: Kî belav diket qisane

3884. Gûtin wî: Cemîlê bab e Meʿmer
Zo gûtî were tu ey xeberber

3885. Meʿlûmî te bît ku bûyme îslam
Gazîke bû ehlê Mekkeyê ʿam

3886. Pêşkeftî Cemîl û kir heware
Çu bû Ḥeremê ʿUmer bikar e

3887. Lê xirve bûyîn gelek zelame
Wan kirbiye şeṛ şeṛek neqame

3888. Ta roj digehişte nîve ro ye
Mandîbû ʿUmer ji cengê xû ye

3889. Ew yek bi tinê û ew di zûr in
Piṛṛ kîn û ʿedawet û ẋurur in

3890. Roniştibû ew demek bi naçar
Kum bûne li ser serê wî nayar

3891. Wî gû çi biken dikem qebûl e
Ger yar bî Xudê dikem ve tûle

3892. Nageh dê ji wêve ʿAsê Sehmî

Ev ḥale dema wî dît bû wehmî

3893. Gû: hûn çi diken bi vî zelamî
Dê bên we Benû ʿEdî bi ʿamî

3894. Berden ji ʿUmer berukê taze
Ew nazivirît ji her niyaze

**3. Muʿcîzetû Înşîqaqîl Qemerî (Mucîzeya Kerbûna Heyvê)**

3895. Peyẋember û nurê xir enamê
Yek şev bû di mescîd-el ḥeramê

3896. Royê wî çu meh temam û nûrîn
Xulkê wî wekî royê wî şîrîn

3897. Yek heyveşevî û meh temame
Ba seyrê felek li jûr meqame

3898. Ageh ne ji kar û barê ḥeq ew
Nazanî ku dê bibîte şeq ew

3899. Nazanî ji bû resûlê enwer
Dê ev şeve ew bibîte du ker

3900. Ev şev dê jinû ve behrewer bî
Der xidmetê serwerê beşeṛ bî

3901. Cemyane ji muşrikanê meşhûr
Wan keç neẓeran bi can û dil kuṛ

3902. Yek pîr e Welîdê bab Muẋîre
Bûcehlê Hîşamê can ḥeqîr e

3903. Eswed kuṛê Muṭṭelib siyehkar
Neḍreê kuṛê Ḥarisî ẋereḍdar

3904. ʿAsê kuṛê Waîlê mirare
Emsalê di wan gelek bijar e

3905. Gûtin bi resûlê îns û cane
Daxwaze ji te me yek nîşane

3906. Ger ṛaste Xudê tu day peyember
Heyvê ji me ra bigêre du ker

3907. Wî rokire dergehê miradan
Ey dadiresê reca û dadan

3908. “Ev muʿcîze wan ji min meram e
Ya Reb tu du kerke meh temame”

3909. Wan mezneQureyşîyan hemane
Lê bûn ji dilê xû piṛṛ tiṛane

3910. Ṭaqet kê heye gûtin di canî
Teisîrê biket di asemanî

3911. Nê meṭlebê wî ji şahê ḥeq bû
Ew mahe bi qudreta wî şeq bû

3912. Meʿlûm e dibêjî Îbnû Mesʿûd
Ez bûm wî demî li wêrê mewcûd

3913. Min dîtî kerek li ser çiyayî
Hindavî Mîna demek vemayî

3914. Hemyan dî Ḥîra ji beynê du ker
Wê gavê digûte wan peyember

3915. Xû engûbi çavê ser dibînin
“Wêca ji me şehdekar bimînin”

3916. Bawer pê biken ve taze nîşan
Înkarê neken dibin perîşan

3917. Ew kume Qureyşî bûn belave
Ew ṭarîdila û kuṛ du çave

3918. Xir ḥeyrî ji vî mezin nîşanî
Wan kufr û ʿînad tijî ji canî

3919. Wan gûtine êk dî her di ḥîne
Ev newʿe siḥir me qeṭ nedîne

3920. Hindan we digû ji huşiyaran
Ḥeddek heye siḥrê siḥirkaran

3921. Ger wî ji me kirbî siḥr û ḥîle
Natanî biket ji her qebîle

3922. Rêvîngê dihên biken jê pisyar
Karwançî û ehlê rê û rêwbar

3923. Ev heyve du şeq bû ger we bîtin
Lazim hemû şahid in bidîtin

3924. Hatin Mekehê gelek seferkar
Pirsî ku ji wan hemû xeberdar

3925. Pisyar jê kirin ji mahê du ker
Gûtin me dîye bi çavê du ser

***

3926. Pênc sal ku dibên di man bû hîcret
Ev muʿcîze bû ji destê qudret

3927. Meʿlûm e di Muslîm û Buxarî

Qurʾan xû dibêt kelamê Barî

3928. Neqla wê tewatir û yeqîn e
Kî bêt we niye neyarê dîn e

**Sualun we Cewabûn (Pirs û Bersiv)**

3929. Ev kare eger bibêy ʿeceb reng
Nav ʿalemê ku nedaye wî deng

3930. Ew mah e belê li aseman e
Meʿlûm e çirayê xir cîhan e

3931. Lazim bû kuṟey zemîn bibînin
Ta nuke vegêrin û bixwînin

3932. Walḥal li cîhan nebûye meşhûr
Înkarê diken gelek cihêt dur

3933. Îşkal e eger te ev merame
Guh bigre tu taze şeş kelame

3934. Wek bû me dibêt Melayê Meşhûr
Seydayê me cumle ṭalibêt nûr

3935. Ustaẕê mezin Seʿîdê Wanî
Meşhûr e bedîʿê vî zemanî

3936. 1-Ewwel eve ye: Tu wek dibînî
Metleʿ ne hemû yek in yeqînî

3937. Roj dê bi helêt ji şeṟqê piṟṟ tav
Hêşta ku şev e li ẋerbê ew gav

3938. 2 - Ev kare bi şev bû wek diyare
Dûr nîne nebîte aşikare

3939. 3 - Xaşma ku li paş ʿîşa bibû ew
ʿAlem ku ṭexer diken serê xew

3940. 4 - Ney xalî ji ʿevre asemane
Helbet dibî mahê şeq nîhane

3941. 5 - Xaşma ku dewam nekir ve kare
Ẋalib nedibin pê agedare

3942. 6 - Meʿlûm beşeṟî di wî zemanî
Newbet nedigirt ji asemanî

3943. Ew mahe du şeq bibû ji ẋeflet
Lewṟa nedîye gelek ji millet

3944. Meʿlûm e gelek ji karewane
Dîtbûn li Ḥîcazê bê guman e

3945. Pirsîbû ji wan neyarê dînî
Wan gûtî belê me dît yeqînî

3946. Mecbûr bûne ew neyar ji înkar
Gûtin eve siḥr e lê ʿecebkar

3947. Ger kîbr û ʿînade ger ẋurure
Însanî diken li ḥeqqî kuṟe

3948. Her kes dibî kuṟeyê riya ḥeq
Nabînî meha ku bûye du şeq

**EZ-ZEHRATU'S-SADÎSETÛ (KULÎLKA ŞEŞÊ)**

**Fî Emrîş Şeḥîfetî we Neqḏîha we Ẋeyru Ẕalîke îla Mewtî ʿEmmîhî we Zewcîhî Eleyhîs Selam (Beḥṯê Peymana Qureyşan û Têkdana Wê û Beḥṯî Mirina Mam û Jinka Wî Silav lê Bin)**

**1. Emruş Şeḥîfetîl Meşʾunetî ʿAmu (7) Mînel Buʿṯetî (Beḥṯê Peymana Kirêt a Qureyşîyan Sala 7ê Pêxemberîyê)**

3949. Dîtin ku Qureyşîyêt di bedkar
Piṟṟ cehd e bû dîn resûlê muxtar

3950. Mamê wî ji wî diket xudanî
Emma ji kemalê cerg û canî

3951. Ger em we nekeyn bi ah û ṟence
Nahêlî Muḥemmedî hu qence

3952. Xaşma ʿUmer û wî mamê Ḥemze
Îslam bûne ew bi rêz û ṭerze

3953. Ev dîne bi wan dibît ʿezîze
Karek dî bikeyn çi natemîze

3954. Em lazim e wan bikeyn perîşan
Ta bêne mecalê ruḥê kêşan

3955. Ta nuke digel me aşinayî
Evroke dikeyne duşminayî

3956. Werne ji wî her diken xudanî
Dînê xû belav diket bi panî

3957. Tedbîr dikirin şebîhî iblîs
Bû karekê bê ḥisab û ḥed pîs

3958. Gûtin hemiyan bi îttîfaqe

Em lazime qed bikeyn ʿelaqe

3959. Çî Muṭṭelibî û neslê Haşim
Ta her çî muʿîn bû Babê Qasim

3960. Nêzîk me nebin weke ḥe caran
Têkel me nebin ji her çî karan

3961. Em nabî bideyne wan jinane
Kes nabî bihînî jin ji wane

3962. Gel wan jinû paş ḥeram bî bazar
Hem qerz û dîyarî û kirêbar

3963. Ew ger bimirin bû çengê arî
Nabî bidenê bi sermirarî

3964. Meznêt di Qureyşîyan bi carek
Cemyan bû vî karê namubarek

3965. Ev renge ṣeḥîfeyek nivîsî
Mur kirbû heman bi ẓilm û pîsî

3966. Ew yê ku nivîsî ev kîtabe
Menṣûrê qebir tijî ʿezab e

3967. Destê wî dumayê lê hişk bû
Ew her du cîhan xû bê pişk bû

3968. Wan paş bi hewa vekir ṣeḥîfe
Bê perde di Keʿbeya şeṛîfe

3969. Ev kare ku kes nedî çi caran
Ev renge kirin bi van neyaran

3970. Bîʿs̱et wî demî di ḥeft sal e
Ev kare ewan dikir çi tale

3971. Wê gavê xeber dibît belave
Zanî mekîyan heman di gave

3972. Ev kare ewan ku kir temame
Kûm bûne du ew qebîle ʿame

3973. Buṭalibî gût reîsê piṛṛ şan
Em taze ji wan dibîn perîşan

3974. Tedbîr eve ye wekî me zanî
Em xirvebibîn li yêk mekanî

3975. Madem eve kir digel me xizman
Nageryê digel me wan çi ezman

3976. Helnayê bi wan me êdî çave
Em lazime der biçîn ji nave

3977. Ev qewme hemû me bûne nayar
Xir ber vî Muḥemmedê şirînkar

3978. Meʿlûm bî ji wan ḥeta bi canim
Ez bû wî muʿîn û puştevan im

3979. Her karê nexûş dikem qebûle
Bes ew nebitin ji wan melûle

3980. Xirbûneve ew li gelyekê kuṛ
Gelyê Ebûṭalibî bû meşhûr

3981. Bes Bûlehebê leʿîn û ẋeddar
Gel xizm û kesan nebûye ẋemxwar

3982. Nê şeṛm e gelek bû şêremerdan
Xizmêt xû bihêlitin di derdan

3983. Ger mêrî dikey tu îxtiyar î
Ser xizm û kesan di rojê ṭarî

3984. Wan her çî hebû ji qût û malî
Vêkra dê bixwun ji dil ḥelalî

3985. Mabûn di gelî di ḥalê bedḥal
Ew her du qebîle ta du sê sal

3986. Gel ṛenc û cefa û ṣed nexûşî
Gel birs û nebûn û ẋuṣṣenuşî

3987. Lê kirbû Qureyşîyan bi yaṣaẋ
Tiştek bû neçu meger bi qaçaẋ

3988. Çen carê diçûn ṣeḥabe naçar
Gava ku dihatne sukê tuccar

3989. Belkî bikirin çi cilk û qute
Bû birsê ʿeyalê xû yê rute

3990. Ew Bûlehebe dihate suke
Bişkên ku ji wî du kab û çuke

3991. Dabêjî bi xizm û taciran ew
Hun tiştî ji wan biken giran ew

3992. Ez dê deme hingû xir xisaret
Bes ew bikevin bi dil meraret

3993. Naçar digerênve ew ṣeḥabe
Bê behre wî dil şibî kebabe

3994. Carek bû Ḥekîm kuṛê Hîşamî

Hîmmet diketin bi nîkunamî

3995. Wî zanî meta xû zûr perîşan
Ew pake Xedîceya xudan şan

3996. Zengîn bû belê di derdemendî
Wê mal vepeşî bi serbilindî

3997. Hindek genimî dibet nîhanî
Bû wê ji viyan û suzê canî

3998. Çav lê bû Ebû Cehil nemayî
Gû kîve dibî wî sivkeṭayî

3999. Gû Çen genim e ji bû meta xu
Ez bû wê dibem ji hîmmeta xu

4000. Bûcehlî gûtî çewa dibey tu
Karê me nevêt çewa dikey tu

4001. Nazanî ji wan me kirye qatî
Nabî bû bibey bi navê Latî

4002. Bûlbûxtrîyê kuṛê Hîşamî
Guhdarî diket ji wî nefamî

4003. Gûtê: Te çiye ve qare qare
Nazanî meta wî bûye jare

4004. Ew çak e Xedîceya xudan mal
Gel pake Muḥemmedî di bê ḥal

4005. Waz bîne ji wî ku ḥeq bi deste
Ew karê diket ji dil duriste

4006. Bûcehlî gûtî: Tu çen nezan î
Dêbêjî di dil tu yarê wan î

4007. Memnû ʿe biçît bû wan çi qute
Êdî te çi ye ve gûte gûte

4008. Bûlbuxtirîyê me girtî ḥîddet
Ḍerbek wî li wî dida bi şîddet

4009. Rakirbû dibin pîyê xudanî
Wî têr vequta ji kînê canî

4010. Ḥemzey we didî ji dûr bi dûre
Wî piṛṛ bû giyan ji ber sirûre

4011. Her wek vî Ḥekîmê piṛṛ ji wîcdan
Êkê dî hebû Hîşam ji merdan

4012. Ḥêştir ji zexîreê dikir bar
Bû layê gelî dibir şeva ṭar

4013. Da jêveketin ji wê leẋave
Ḥêştir bû gelî diçû di gave

4014. Wî hu ji bû wan dikir muʿînî
Emma bi dizî û naemînî

4015. Minnet vî Hîşamî ser me zûr e
Têkdanê ṣeḥîfe wer bi nûre

4016. Dîtin hemiyan gelek nexûşî
Ṣed cewr û cefa û ẋuṣṣenuşî

4017. Neyxaṣme peyemberê emîn e
Gel yar û ṣeḥabeyan çi dîne

4018. Deʿwet wî dikir bû dînê Barî
Her roj bi dizî û aşikarî

4019. Zêde hemû sal di çwar mehane
Mahê di ḥeram li her mekan e

4020. Nav Suqê ʿUkaz û Ẓilmecaz e
Ev dîne belav dikir wî taze

4021. Wan çunke didît Nebî perîşan
Zêde di ʿezab û ṛenc û êşan

4022. Gel hindê wesa diket xebatê
Ney guh li nexuşeya ḥeyatê

4023. Wan zêde dibû ji dil yeqîne
Ku ḥeqq e belê ve şeṛʿ û dîne

4024. Ehlê Mekehê û çan û xwaran
Roj roje bi dîn dibûn ji yaran

**2. Muʿadatu Qureyşîn Bîddîʿayetî (Dijminîya Qureyşîyan bi Propagandayê)**

4025. Zanî ku Qureyşîyan yeqîn e
Roj roje belav dibît ve dîne

4026. Lê fayde nekir digel evane
Ney zecr û civîn û ney tiṛane

4027. Ney kîn û kerb ne qehr û tirs e
Ney kirneder û ne kulb û birs e

4028. Ew her çî diçîte ser vî dînî
Ney meylê cîhan di dil dimînî

4029. Bak nîne bi rexne û ʿîtabê

Waz nadene ẋurbet û ʿezabê

4030. Qet pêve neçu xudanê Qurʾan
Ev ṛenc û cefa û he roj û her an

4031. Raḍî nedibît bi zêr û male
Ney mîrserîya di piṛṛ celale

4032. Her rojê li Mekke û kinaran
Tabiʿ wî dibin ji can gudaran

4033. Xaṣma di mehêt ḥeram û taze
Nêv sûqê ʿukaz û zîl mecaze

4034. Serbestî nesîḥetan dibêjît
Emma çi şirîn ku dadirêjît

4035. Em çake bikeyn diʿaye her car
ʿAlem ku dihêne ḥecc û bazar

4036. Guhdarî neken evî zelamî
Bew zîrekî û bi xûş kelamî

4037. Hindek dê bikeyne dîn û saḥir
Hindek dî feṣîḥ ziman û şaiʿr

4038. Em ger hu nekeyn ewan nizanin
Ew sadedil in di ṣafî can in

4039. Dûr nîne ji wî biken bi bawer
Em êdî dibîn bi can mukedder

**El-Welîd-ubnu'l-- Muẋiretî (Welîdê Kurê Muẋîrey)**

4040. Guhdêre wekî ji pêş te zanî
Karê vî Welîdê xwar ji canî

4041. Meşhûr e wî navê bab Muẋîre
Hem merdê meşûret û emîr e

4042. Wî xirve kirin Qureyşî carek
Da ew ji Nebî bibêjî çarek

4043. Navê wî eger bibît belave
Dînê me ji dest diçît di gave

4044. Meʿlûm e dihêne ḥec gelek zûr
Ḥetta ji gelek qebîleêt dûr

4045. Ḥalê wî diken ji hingû pisyar
Her yek dê qisek bibêjî naçar

4046. Ger yek qise em nebîn seraser
Kes êdî ji me ne dê ke bawer

4047. Min ev qise pê gelek cewan e
Ew saḥirekê siḥir giran e

4048. Her kes vê qisê neket yeqîne
Bêjnê were karê wî bibîne

4049. Mêrî ji jinê diket cudaye
Jêk dêxî kuṛî ji bab û daye

4050. Saḥir hû diken siḥir hûsa ne
Nêzîk wî nebin şirînzuban e

**Dîʿayetu Neḍr Îbnî-l Harîs (Propagandaya Neḍrê Kurê Harsî)**

4051. Teqṣîr nedikir ewan neyaran
Derḥeqqê Nebî ji pîsekaran

4052. Ev newʿe keçî û giftûgû ye
Ev renge dîʿaye û diru ye

4053. Neḍrê kuṛê Ḥariṣê Qureyşî
Bû ḥerbê dîʿaye êk ji ceyşî

4054. Zanîbû li Ḥîreyê temame
Ew mezhebê furs û şahiname

4055. Çîrok û şiʿir gelek dizanîn
Tên dabû Qureyşîyanê bê dîn

4056. Her meclîseka biçît Muḥemmed
Tu paş wî bike xebatê bê ḥed

4057. Tu jî bû bibêje çî dizanî
Emma bi feṣaḥet û cewanî

4058. Ez bû we dibêm kelamê şîrîn
Exbarê mulûk û qewmê pêşîn

4059. Çêtir ji Muḥemmedî yê fêr im
Wîj ev qisene ne guh bidêrin

4060. Ev renge dîʿaye wan peyapey
Teqṣîr nedikir çi ṭaqeta hey

**Cebr-un Neṣranî (Cebrê Neṣranî)**

4061. Şexṣek li Mekê hebû ji tuccar
Navê wî Cebir mesîḥî dîndar

4062. Car car diçû nik resûlê Barî
Bû tiştî eger bi nasiyarî

4063. Her çen ʿecemî bû ev zelame
Dîsan Qureyşî diden peyame

4064. Gû: Cebre wî fêr diket bi dîne
Guhdarî neken ku ew çu nîne

4065. Ev renge dikir ewan dîʿayet
Ta Barî ji bû hinarî ayet

4066. Meʿlûm e ku ew ʿecem ziman e
Ev jî ʿerebî ye piṛṛ beyan e

**Et-Tufeyl-ubnu ʿEmrî ed-Dewsîyyu (Ṭufeylê Kurê ʿEmrê Dewsî)**

4067. Mazin bû Ṭufeylê Dewsîyê wan
Êk bûye ji şaiʿrêt di rehwan

4068. Ew hatibû Keʿbeya mukerrem
Bû ḥecc û ṭewaf û rukn û zemzem

4069. Meznêt Mekehê ji dil vecemyan
Tedbîr dikirin ji bû xû hemyan

4070. Ev şexṣe Muḥemmedî bibînît
Guhdarî biket ʿeceb dimînît

4071. Dûr nîne bi wî bihînî îman
Zur kes dê bi wî bibin musilman

4072. Êka we bikeyn ku ev Ṭufeyle
Bû layê wî qeṭ neket çi meyle

4073. Xir çûne bû nik Ṭufeylê Dewsî
Ew karê Nebî ji wan dipirsî

4074. Ev şexṣe çi ye hu bûye meşhûr
Ḥalê wê çi ye çi kêm eger zûr

4075. Wan gûte Ṭufeylî ger nezanî
Pirsê neke lew siḥirzubanî

4076. Meʿlûm e tu saḥiran dibînî
Babî li kuṛî diket yeqînî

4077. Mêrî diketin neyar digel jin
Ew cute bira digêrî duşmin

4078. Hin çake ewî tu qeṭ nebînî
Guhdarî nekey ne wî ne dînî

4079. Rojek diçitin bû Keʿbeya pak
Qurʾanê ku êk dixwunî bê bak

4080. Ew piṛṛ ji dilî dibît guhdare
Bê xaye kelamekê bijar e

4081. Her çendî ku şaiʿr im zubanzan
Ev qewle nekarê cîn in û însan

4082. Wî pirsî Muḥemmedê peyember
Nîşa me bide tu ey dilawer

4083. Peyẋemberî gû: "Bi xêr tu hatî
Navê te çi ye ji kî welat î"

4084. Gû: Ey tu xeber şirîn û qudsî
Ez şaiʿrek im Ṭufeylê Dewsî

4085. Ferman kirî: "Tu dikey guhdarî
Ez bû te bibêm kelamê Barî"

4086. Gû ez nê tinê ji bû wê hatim
Ez xû bû xû ṭalibê necat im

4087. Çendek bû dixwunî taze tenzîl
Emma bi cewanî û bi tertîl

4088. Guhdarî dikir Ṭufeylî piṛṛ can
Derḥal bi Nebî diînî îman

4089. Geryave dema bû nav ʿeşîret
Ew seʿiyê diket ji can û ẋîret

4090. Raḍî dikirin bi karêdanî
Îman gelekan bi wî dianî

**3. Keyfîyyetu Naqdîş Şeḥîfetî ʿAmu (10) Mînel Buʿs̱etî (Awayê Têkdana Wî Rûpelî li Sala Dehê Pêxemberîyê)**

4091. Sê sal di gelî di man bi her ḥal
Wan bûrî ʿumir bi ʿeyşekê tal

4092. Bîʿs̱et ku di geşte deh ji sale
Barî dê ji wan bedilke ḥale

4093. Lew taze Xudê hinarî Cibrîl
Mizgîn bide Eḥmedî bi tebcîl

4094. Tu bêje ewan şeḥîfeyê şum
Çîxwareyê xwarî mirkî meʿlûm

4095. Neyhêjtîye ẋeyrî navê Ellah
Ev sîrre wî gûte mamê piṛṛxah

4096. Her gûtineka dikir peyember

Mamê wî bi can dikir bi bawer

4097. Ew çu ḥeremê bi keyf û şaye
Gû: Yê hu dibêt kuṛê biraye

4098. Ev gûte eger we bît temame
Hun gel me di naḥeq in bi ʿame

4099. Wer ew bi diru bibît diyare
Em musteḥeq în bû her nekare

4100. Wan anî şeḥîfe mirkî[1] xwarî
Ney maye ji ẋeyrî navê Barî

4101. Buṭalibî gûte wan bi şîddet
Her engûne ehlê ẓilm û ḥîddet

4102. Ew rabû diçîte malê tûre
Meznanê Qureyşî ser yê şûr e

4103. Wan paşî gûtin: Te kuṛ birayî
Siḥran nedihêlî ta ku mayî

4104. Emma vê qisê gelek hunerkir
Ta der dilê çen kesan eṯer kir

4105. Pênc kes ji xudan dilêt bi wîcdan
Her çen ne bûyîn ji ehlê îman

4106. Fikra xû kirin ku ew şeḥîfe
Karek ne durist û na neẓîf e

4107. Ew hin di xûşî bi kameranî
Wan hinde nexûşî û giranî

4108. Çen mêje ewan we derdemendî
Hu derdeser in di qelʿebendî

4109. Gûtin: Bi xûşî eger bi talî
Em lazime têk bideyn vî ḥalî

4110. Yan em dê sube bi can nemînîn
Yan dê wê şeḥîfeyê dirînîn

***

4111. 1-Serdefterê wan heman Hîşam e
Ṣaḥibceger e çi xûş zelam e

4112. 2- Çu gûte Zuheyrî ey cegerzur
Babê wî Ebû Umeyye meşhûr

4113. Deyka wî meta peyemberê pak
Lew ser wî wesa dibîte ẋemnak

4114. Ev ḥale çi ḥale em dibînîn
Xizmêt xû di derd û ẋem dibînîn

4115. Tu têr û tijî û têr bipûşî
Xalêt te wesa di ḥal nexûşî

4116. Ez sundê dixwum eger ewane
Xal ban bû Ebû Cehil bizane

4117. Wek tu nedikir ve ḥal qebûle
Ev şule bi qelbê min ne şûl e

4118. Wî gû: Çi bikem tu min dibînî
Bes bû me bibêje yek muʿînî

4119. Ez gel xû yekê dî mêr bibînim
Vî karê kirêt dê helweşînim

4120. Wî gûtî: Ez im digel tẹ ḥaḍir
Her karê bibît welew ku agir

4121. Zur baş e gûtî tu bes yekê dî
Peydake me paş bibîne êdî

4122. 3-Rabûye Hîşam bi ray û tedbîr
Ew Muṭiʿimî tîj biket wekî şîr

4123. Gû: Ey tu kuṛê ʿEdîyê meşhûr
Şulek me heye giran qedirzur

4124. Ey can tu çewa dikey qebûle
Ew her du qebîle bûn melûle

4125. Nê ger tu bizanî ey birader
Bêbextî ye bû heman seraser

4126. Wî gûtî we ye wekî te gûtî
Vê şulê li mêje can me ṣutî

4127. Emma bi tinê ne min dibare
Vî karî divêt heval û yare

4128. Wek min bi tinê welew çu şêran
Ku dê çî şeṛê hizar ji mêran

4129. Peydake ji bû me yek bijare
Dê kem wê şeḥîfe pare pare

4130. Gû: Ez ji te ra muʿîn û yar im

[1] kurmik

Ser vî xeberî çu gurgê har im

4131. Muṭʿîm gû: Yekê dî ger hebaye
Gû: bû te Zuheyrê canfîda ye

4132. Êkê dî gûtî ji bû me bîne
Ev şule di ṭaqeta me nîne

4133. Xû bigre gûtî Hîşamî ẋemxwar
Peyda dê bikem bi iznê Cebbar

4134. Hem rabû Hîşam bi rêz û ṭerze
Êkê dî durist biket bi berze

4135. Wî gût bi uṣûl û xûş kelamî
Bûlbuxtirîyê kuṛê Hîşamî

4136. Ba çen qise û şirînzubanî
Qanʿi diketin wî newcewanî

4137. Wî gû: Bi tinê xû ez dibînim
Gû: Ez bû te canfîda muʿîn im

4138. Gû: Yek dî gûtî: Zuheyrê ẋemxwar
Gû: yek dî gû Muṭʿîmê şirînkar

4139. Em her sê li piştê tu diwestîn
Ger yar bî Xudê çu şêrê mestîn

4140. Peyda ke gûtî tu yek dî taze
Vê şulê dikeyn bi serfiraze

4141. Ev şule divêt bi ray û tedbîr
Çen merdê di canfîda bi şimşîr

4142. Ḥetta ku bişên Qureyşî meʿlûm
Ew têk nediden ṣeḥîfê meşûm

4143. Dîsa diçitin Hîşamê qence
Êkê dî biket hevalê pence

4144. Zemʿe ku li mêje wî heval bû
Bab Eswed e lê çi şîr ḥelal bû

4145. Gû: Ey tu xudan ceger diyar î
Ey merdê deravê ṭeng û ṭarî

4146. Xizman tu dibînî rût û birsî
Carek te nekir ji wan bipirsî

4147. Laîq te niye eger tu merd î
Tu xûş û ewan di derdemendî

4148. Şîrîn e serêt me ker bi ker bin
Nek ew hu di jar û derdeser bin

4149. Zemʿeyî ku gûte wî Hîşamî
Agir wî gehişte can temamî

4150. Gû: Kes dî heye eger dizanî
Ẋemxwarê me bît ji ḥubbê canî

4151. Wî gûtî: Belê bijil te çar în
Her çar di xudan ceger diyar în

4152. Bûlbuxtirî û Zuheyrê xuşmêr
Gel Muṭʿîmî her yek in şibî şêr

4153. Gû: Baş e belê filan mekan e
Ev şev me heman ewê jivan[1] e

4154. Xirbûneve xir li wî jivanî
Tedbîr dikirin heman ji canî

4155. Ew sundê dixwun bi şahê ekber
Em yek xeber în welew biçît ser

4156. Em dê ṣubehî ṣeḥîfeyê xwar
Par pare dikeyn welew bi kujtar

4157. Tim gûtî Zuheyrî ez li pêşan
Dê wan sube dil bikem bi êşan

***

4158. Rabûn ṣubehî ve pênc cewane
Vêkra ji bû nadîyê rewane

4159. Ew xir di dilê xû daẋidar in
Ser vî xeberî çu gurgê har in

4160. Gava ku Zuheyrî kir ṭewafe
Wî gûtî belê ne şeṛm û ṣaf e

4161. Ey hûn mezinêt li êre kum in
Bû hinde bed in bû hine şum in

4162. Em ḥeqq e bibîn bi kam û xûşî
Ew her du qebîle ẋuṣṣenuşî

4163. Karê we kirî digel ewane
Hîç kes nekirî li ser cîhane

4164. Wellah dibî ku ez nemînim

[1] Hevdîtina plankirî, randevu

Yan dê wê ṣeḥîfe heldirînim

4165. Naraḍî kî ye bila bibêjî
Ev şîre divê wî xun birêjî

4166. Bûcehlî gûtî: Te kir diru ye
Şeq nabî ṣeḥîfeyê me hu ye

4167. Zemʿey gûte wî kuṛê Hîşamî:
Ey her tu diruker û nefam î

4168. Bûlbuxturî hem li du dibêjî
Daẋa di dilê xû lê dirêjî

4169. Muṭʿîm li dura dibêjî taze
Paş rabû Hîşam bi serfiraze

4170. Ew dê bî ewa Zuheyrî gûtî
Naraḍî dibît bi cergê ṣutî

4171. Bûcehlî gûtî wesan diyar e
Ya bûyî bi şev ve pîsekare

4172. Zanî hemîyan kirîne tedbîr
Her pênc li şeṛ in bi ḍerb û şimşîr

4173. Gû qeydî nîye ku hûn cewan in
Karê xû biken wekî dizanin

4174. Muṭʿîm dibezît ṣeḥîfeyê jar
Bara pitirê ku bûy mirikxwar

4175. Wî taze dirandî çî ku mayî
Ev nave bû wan bû ta dumayî

4176. Seyrêke bira ve pênc kesane
Rabûne çewa bi cerg û cane

4177. Gel ṛastî û xebatê taze
Ew bûn bi niyazê serfiraze

4178. Meznanê di xû kirin melûle
Bêbextî ewan nekir qebûle

***

4179. Pênc kes nê eger ji dil bibin êk
Ṣed naḥeqîyan dişên biden têk

4180. Ṣed ḥeyf û esef di nav me kuṛdan
Millet bûye jar û ser bi derdan

4181. Axa ne beg in çi mîr û xan in
Ew ser serê wan ẋedir giran in

4182. Xurtan tu dibînî wek ṣeyê har
Ṣed suxre bi wan diken her û car

4183. Her yek xû dibînî bê hevale
Naçar dê qebûl ke ḥalê tale

4184. Pênc kes nê ji wan bibin fîdayî
Neyxaṣme bû canibê Xudayî

4185. Wek şêrî li sîngê wan helistin
Axayî şebîhî ṣeg dibestin

4186. Qûlbestî diken began û mîran
Serbestî dijîn hizar feqîran

4187. Peyẋemberî ma nekirye ferman:
Ey cahê wî ye şîfa û derman

4188. “Harî bike tu birayê dînî
Meẓlûm e çi zulimker dibînî”

4189. Gûtin wî me ey fîda û qurban
Meẓlûmî bila di qehr û kerban

4190. Em ẓalimî ku bibîn muʿîne
Hindê dî zulim diket yeqîne

4191. Ferman kirî: “Çî kesê sitemkar
Destê wî bigir ji ẓilm û azar”

4192. Çen kes ku li sîngê wî helistin
Bê şubhe dê destê wî vebestin

4193. Hem ew dibitin ji ẓilmê dure
Hem dil ji feqîrî piṛṛ sirûre

**4. Wefatu Zewcîhîṣ Ṣîddîqetî We ʿEmmîhîl Bar (Mirina Kabaniya Wî Xedîcayê û Mamê Wî yê Çak)**

**a. Xedîcetu Bîntî Xuweylîdî ʿAmun (10) Mînel Buʿṣetî (Xedîca Kiça Xuwelîdî Sala Dehê Pêxemberîyê)**

4194. Bîʿṣet digehişte deh ji sale
Ḥalê wî jinû dibîtne tale

4195. Kabanî Nebî Xedîce xan e
Çu der li evê kevincîhane

4196. ʿUmrê wê gehî bi şêst û pence
Ew geşte meqamê pak û qence

4197. Şek nîne gelek dikir ji xidmet
Bû serwerê dîn bi rêz û ḥurmet

4198. Ew mabû li gel wî bîst û pênc sal
Ta mabû Nebî bi keyf û xuşhal

4199. Piṟṟ ṣebr û teḥemmul û evîn bû
Ta mabû ji bû wî xûş muʿîn bû

4200. Her ca ku Nebî dihate xanî
ʿAciz ji neyarê dîn ji canî

4201. Ew bû wî dibûye ẋemrevîne
Şîrînxeber e zubanşirîn e

4202. Elḥeq ji wî ra nekir çi teqṣîr
Ba mal û bi xidmet û bi tedbîr

4203. Maqûl û cewan û pak e bê ḥed
Laîq bi hevalîya Muḥemmed

4204. Sengîn û qedirgir û emîn bû
Lew zêde li nik wî piṟṟ evîn bû

***

4205. Piṟṟ feḍle li nik cenabê Barî
Bes nîne ji bû selam hinarî

4206. Cibrîlî gûtî bibêjê mizgîn
Qeṣrek didetê Xudê çi rengîn

4207. Ewṣaf ji dûr e di baẋê cennet
Meḥsuṣ e bû wê bi naz û nîʿmet

4208. Ew paşî kiça xû Faṭîmayê
Efḍeltir e lê ji ʿAîşayê

4209. Ta mabû resûlê piṟṟ bi naze
Beḥṣ̱ê wê dikir şirîn û taze

4210. Raḍî bû ji wê ji ʿeql û dînan
Ta mabû çi jin bi ser neînan

4211. Ewladê Nebî ji wê bibûn şeş
Her şeş di cewan wekî gula geş

4212. Ew Qasim û Zeyneb û Ruqeyye
Hem Faṭîmeya ji dil neqîyye

4213. Paşî wê hebûye Ummû Kulṣ̱ûm
Ew ʿEbdê Xudê dumaye meʿlûm

4214. Tertîbê wîladeta ewan e
Her wek me digû temam bizane

4215. Ger yar bî Xudê me dê jinû paş
Beḥṣ̱ê hemîyan dikem qewî baş

4216. Ewlad û jin û metan û maman
Dê neẓim bikem bi xûş kelaman

4217. Vî mebhesî ger dixwunî qenc e
Seyrêke tu çîmena me penc e

**b. Wefatu ʿEmmîhî Ebî Ṭalîbîn (Mirina Mamê Wî Ebû Ṭalibî)**

4218. Mamê wî Buṭalibê şirînkar
Ta mabû Nebî nebûye ẋemxwar

4219. Wî zêde muʿîn û piştevan bû
Lew ber wî emîn ji destê wan bû

4220. Zêdey wî di malê tazekaban
Ew pake Xedîce ya xudan şan

4221. Meʿlûm e bi çûnê van duwane
Piṟṟ gende dibît Nebî ji cane

4222. Bîʿs̱et wî dema gehî bû deh sal
Mamê wî dimir di mahê şewwal

4223. ʿUmrê wî bibû pitir li heştê
Buṭalibî ku ecel gehiştê

4224. ʿAciz bû gelek ji bû peyember
Hem yawer û piştevan û ṟehber

4225. Nîşan wî gelek hebûn bi îman
Her çendî nekir qerar bi ezman

4226. Nêzîk bû dema ecel Buṭalib
Cemyan mezinêt Qureyşî ẋalib

4227. Naṣaẋ bû gelek di nav nivînê
Dê ser lê biden bi dil evînê

4228. Gûtin tu dizanî ey dilawer
Piṟṟ qedr î li nik heman me yekser

4229. Ḥalê me digel Muḥemmedî dizanî
Çarek tu bike ḥeta bi canî

4230. Bêjê neketin çi car jinû paş
Beḥṣ̱ê ṣenemêt me ew bijil baş

4231. Nageh li derî dihêt peyember
Gû “Ey gelî mazinan û mîrser

4232. “Hun yek xeberî biden me taze
Mazin dê bibin bi ʿîzz û naze”

4233. “Ḥukmî li ʿereb diken bi ʿîzzet
Dê bû we ʿecem bibin reʿîyet”

4234. Bûcehlî gûtî: Ne yek xeber bes
Ta deh xeberan dideyn muqeddes

4235. Gû: “Şehde biden Xudê ku êke
Karê du cîhan we dê bî rêke”

4236. Hun terik biken ṣenemperistî
Hun taze digehne ḥeq duristî

4237. Wan gûtine yek du ev zelame
Ḥerfek nedidet me mey merame

4238. Buṭalibî gût di gav û ḥînê
Ey ez eve me di nêv nivînê

4239. Weṣiyet ji we ra ji can dibêjim
Ez jî qederek ʿumir dirêjim

4240. Meʿlûm bî ji min biken yeqîne
Bê mîs̱l e Muḥemmedê emîne

4241. Ew ṛast û durist û piṛṛ deha ye
Nêv qewmê ʿereb giranbuha ye

4242. Ew hatî bi dînekê duriste
Ney ṭalibê cah e ḥeqperist e

4243. Ev dîne me xûş dihêt ji canî
Her çen me girane ser zubanî

4244. Ez sundî dixwum ji min diyar e
Tabʿi wî dibin feqîr û jare

4245. Axir dê hemû bibin cîhangîr
Meznêt di Qureyşîyan jî êxsîr

4246. Wî cumle ʿereb dibin bi hemṛah
Xûzmey li kesê ji xû bi agah

4247. Ey hûn Qureyşî xudanê eṣl in
Fexrê ʿereb in bi cah û feḍl in

4248. Hun bû wî bibin bi harîkare
Dînê wî he dê bî serfiraze

4249. Ger ez nemirim bi iznê Settar
Jê defʿe dikem neyar û bedkar

4250. Ev weṣiyete kir bi tazekarî
Wî paş bi Xudê xû can siparî

4251. Ney weʿẓê Nebî ne qewlê mamî
Qet fayde nekir ji wan temamî

4252. Wan zêde bû belkî kerb û kîne
Derḥeqqê resûlê nazenîne

4253. Ta nuke metirsiyek ji mam bû
Vê gavê meramê wan temam bû

4254. Meʿlûm e Nebî ji paşî mamî
Dê bînî ji duşminan nekamî

4255. Ta hingî ji ber wî şehsûwarî
Neşyan qewî gel biken nekarî

4256. Her çen ʿUmer û Îmamê Ḥemze
Îslam bûne ew bi rêz û ṭerze

4257. Emma çi diken li ṛast hizaran
Wan duşminê dîn û kînedaran

4258. Xaṣma ne mecalê şîr û ceng e
Da ew jê biken cîhanê ṭenge

4259. Kabanî ji bû wî çen gelek bû
Ṣuret beşeṛa ṣîfet melek bû

4260. Şek nîne ji paşî wan peyember
Ḥalê wî dibîtve bêseruber

4261. Xaliq bi wî dan ji kanê ḥîkmet
Beynê du mehan du tal musîbet

4262. Her çî tu bikey Xudê şirîn e
Karê tu bikey çi rexne nîne

4263. Karê te Xudê giranbuha ye
Her çî tu bikey me pê riḍa ye

4264. Dîtin wî ji paşî wan gelek car
Ṣed karê ne laîq û ne hemwar

4265. Car pîsî dibir bû ber derê wî
Car ax dikirin bi ser serê wî

4266. Wek bû te me gûtî ney ji mêje
Karê Ebû Cehlê guh dirêje

4267. Ḥîna ku Nebî di nêv sucûdê
Ew xerqê di lez̠z̠eta şuhûdê

4268. Pisdanekê ḥêştirê wî anî
Bêbextî li ser serê wî danî

4269. Ta Faṭîme hat hilanî taze
Ṣed dane civîn bi bûz beraze

4270. Hem ya ku dikir wî ʿUqbe yê har
Derḥeqqê Nebî ji karê bedkar

4271. Mîn cimle wî ser di secde carek
Pê danîbû ser serê mubarek

4272. Carek dî çi ẋem bi wî gehandî
Çefya wî di gerdenê şidandî

4273. El qiṣṣe çi kir evan û wane
Paş mamî dikir bi nacewane

4274. Peyẋemberê mey bi ḥêl û zûr e
Ṣaḥibcegerê bi can cesur e

4275. Ev ḥale qebul dikir ji canî
Ney carê ji bû xû dest helanî

4276. Bê şek ne ḍeʿîf û tirsinuk e
Emma çu izin wî nîne nuke

4277. Rojek heye dê bixuy tu talî
Her çendî bi zûrî têr ji malî

4278. Nê hîç nîye ev kevincîhane
Ẋalib bi cefa û derd û jan e

4279. Zêde ji kesê wî dîn meram e
Xûşî we bizan ji wî ḥeram e

4280. Neyxaşme kesê bi ḥeq peyember
Rawestî li sîngê qewmê yekser

4281. Qewmê wekî qewmê wî di cahil
Vî dînî ḥeta bigêrî kamil

4282. Lazim dê bixwut gelek cefayê
Helbet dê bibînî zûr belayê

4283. Ey dûstu eger tu hur dibînî
Der karê Nebî ʿeceb dimînî

4284. Ew ya wî kirî di wî zemanî
Nav qewm û ʿeşîreta te zanî

4285. Karek ne di ṭaqeta çi kes bû
Ew muʿcîze lê ji bû wî bes bû

4286. Seyrêke kesê nexwundewar e
Ney quwwet e wî ne harîkar e

4287. Westa di deraveka xeter pir
Westabû li sîngê ʿalemê xir

4288. Wan dînê ji can ʿezîztirîn e
Wî beḥs̱ dikir bi naşirîne

4289. Wan çendî kirin ji cewr û êşan
Ew her xebitî bi ṣebrê kêşan

4290. Nek ḥalekî ṣed nexuşeḥalan
Nek salekê belkî sêzde salan

4291. Qeṭ paşve neçu bi ṛenc û talî
Qeṭ raḍî nebû bi cah û malî

4292. Ev dîne wî hêdî hêdî taze
Bû xelkî digût bi serfiraze

4293. Bew ṣebr û teḥemmul û îdare
Bew xulqê di taze û bijare

4294. Nav qewmê wesa pelîd û bedkar
Exlaqê di wan di pîs û dujwar

4295. Ew hinde di weḥşî û di dilreq
Çen mêje li ser ḍelal û naḥeq

4296. Wan qewl û ʿemel bi nadiristî
Wan dîn û ʿeqîde butperistî

4297. Hindan şeṛ û şur û ẓilm û talan
Hindan bi fucûr û pîs fîʿalan

4298. Axir nê bi ṣed ʿezab û ṛencan
Îman bi wî anî pîr û gencan

4299. Bû xûşeviyê heman bi dilvîn
Xuştir diviya ji canê şîrîn

4300. Exlaqê di wan hemû bedel bûn
Ispî dil û ispehî ʿemel bûn

4301. Ta dunê di weḥşî û di dilreş
Evroke di şareza û dilgeş

4302. Yek şuʿle ji rewneqa peyember
Ew cumle kirin bi dîn munewwer

4303. Ta dunê ewan dikir şivanî
Wî kirine mezin bi ḥukimranî

4304. Wî danî bû wan binaẋê dewlet
Emma bi kemalê ʿîlm û ḥîkmet

4305. Ev dîne û dewlete di sîh sal
Wî şeṛq û xerib kirin şirînḥal

4306. Paytextê vê dewletê Medîne
Çu Endelusê ḥeta ku Çîne

4307. Wî xiste cîhanê înqîlabe
Ma kes heye şibhî ev cenabe

4308. Karê wî kirî ʿecîbê şan e
Ney ṭaqetê cumle îns û can e

4309. Her dem li ruḥa wî têr bibarî
Luṭf û kerem û selam ji Barî

4310. Hem ser ḥerem û biçuk û alan
Ser cumle ṣeḥabe û hevalan

4311. Ṭahir wî ji xadimêt di jar e
Şermende ye zûr gunahkar e

4312. Ya Reb tu ʿefu bikey di meḥşer
Bû xatirê vî resûlê serwer

**EZ-ZEHRETU'S-SABÎʿETÛ (KULÎLKA HEFTÊ)**
**Fîl Îsraî wel Mîʿracî Beʿdel Beʿs̱î bî Xemsî Sînîn (Îsra û Mîʿrac Piştî Pêxemberîyê bi Pênc Salan)**

4313. Ey xûşeviyê Xudayê ekber
Peyẋemberê xir cîhanê yekser

4314. Ey serwerê cumle enbîyayan
Ser ḥelqeyê ẕikrê ewlîyayan

4315. Ey heft felek te bûne pabus
Wey sîdre te deʿwegahê Quddûs

4316. Barî tu ji ʿalemê bijarî
Da bibiye delîlê dînê Barî

4317. ʿAlî ḥeseb û neseb pesind î
Nik Barî gelek qedir bilind î

4318. Bê mîs̱l î belê ji ʿalem î tu
Bê sir niye lê ku xatem î tu

4319. Barî bi te dan ji kanê reḥmet
Çen muʿcîze çen hizar keramet

4320. Ey nurê cîhan sîracê wehhac
Bû kê dî bijil te bûye mîʿrac

4321. Wey sîdreyê munteha te dîwan
Bê perde digel Xudê xeber xwan

4322. Dîtî te Xudê bi çavê ser ew
Her çendî ji weṣfetê beder ew

4323. Ev behre ji bû te bûye her bes
Bû kes nedibî nebû ye bû kes

4324. Ḥîna tu ji duşminan çi dil ṭeng
Her roj te ji wan cefa hizar reng

4325. Wan gel te dikir cefa bi zûrî
Barî tu birî meqamê jurî

4326. Wî date ji beḥrê xulletê cam
Da keşf û şuhudê ḥeq bikey ṭam

4327. Dê bîrve biket ʿezab û ṛencê
Çî geşte ewî meqam û gencê

4328. Ev behre kesê bibîte bare
Paşa ye welew geda diyar e

4329. Bê bar me nekey Xudê ji wêrê
Bû cahê resûlê reḥm û xêrê

4330. Mîʿracê eger dibêy ẋerîb e
Nik ʿeqlê beşeṛ gelek ʿecîb e

4331. Emma bi neẓer xudanê qudret
Zur sehl e eger te ḥur e dîqqet

4332. Ew ṣaniʿê ʿalem û xudan e
Emrê wî dibînî kun fekan e

4333. Qudret wî piṛṛ e ne karê ʿeqlî
Wî her çî divêt dibît bi sehlî

4334. Wer seyrê bike di karê Barî
Zanayî eger tu huşiyarî

4335. Ew yê ku tu day ji pişke avê
Mîʿracê dişêt biket di gavê

4336. Şulêt wî hemû gelek ʿecîb in
Ewêt di kiçik pitir ẋerîb in

4337. Ew yê xeliqandî mêş û pêşik
Dê fîlî bişêt bigêrî bê şek

4338. Piṛṛ ḥîkmet e ew xudan celal e
Gavek wî bivêt dibîte sale

4339. Nabînî demek di xew nivistî
Xewna te dî çendî sal duristî

4340. Ku Bestê Zeman bû ewlîyayan
Helbet dê bibît bû enbîyayan

4341. Xaṣma bû resûlê pak û dildar
Serdarê peyemberan û muxtar

***

4342. Îman me heye bi karê dawer
Bir sîdreyê menteha peyember

4343. Ew bir bi ruḥ û giyan temame
Bû Qudsê û bû bilind meqame

4344. Meʿlûm e wekî diken rîwayet
Eṣḥabê Nebî di piṛṛ dîrayet

4345. Menqul e ji bîst û şeş ji wan e
Yek wan Enesê qedir giran e

4346. Peyxemberê xû bi luṭf û yarî
Bir jurî meqam bi tazekarî

4347. Bû Beyte Muqeddesê ji ewwel
Paşî ji bû aseman û jêhel

4348. Hel Keʿbê ḥeta Qudus diyare
Ew bûye li ser buraq suware

4349. Hem zîn û leẋaf kirî çi taze
Ew lê bû suwar bi ʿîzz û naze

4350. Tim girtî rikêb emînê Cibrîl
Mîkalî celew digirt bi tebcîl

4351. Hel wêrê ḥeta bû asemanî
Pêstirkekê zûr ʿecîb bû danî

4352. Bû Sîdreyê Munteha serê jur
Bû beytê semayê beytê meʿmûr

4353. Paşî bû gelek ḥîcab helanîn
Nahêne jimar û karê zanîn

4354. Meʿlûm e Xudê ku bê mekan e
Ev kare hemû ʿuluwê şan e

4355. Barî bi xû lê diket selame
Bê perde digel diket kelame

4356. Ba qedr û şeṛef dibet huḍurê
Dil zînde diket bi wê sirûrê

4357. Nîṣa wî didan gelek ẋerayib
Hem cennet û agirêt ʿecayib

4358. Çen karê ʿecîb wî dîn bi çave
Wî bû me beyan kirin di gave

4359. Geryave bi şev bû nav nivînê
Dil piṛṛ ji ji ṣefa huḍur û dînê

4360. Weqtê bû sube resûlê enwer
Ev qîṣṣe bû wan digût seraser

4361. Ew her çî di muşrik û di dilreş
Hindê dî bûyîn bi can muşewweş

4362. Her çî ku ji dil hebûye îman
Bawer pê dikir ji kakila can

4363. Bûbekrî ku hêj xeber nezanî
Yek duşminê dîn bû gût nîhanî

4364. Zanî te erê çi gût Muḥemmed
Gûtek çi mezin ʿecîb e bê ḥed

4365. Gû: Çum bi şevêdî asemanî
Bawer kî diket ji wî ji canî

4366. Bûbekrî gûtî: Bi dil me bawer
Ew her çî dibêjî ḥeq peyember

4367. Bawer wî dikir bi can û teḥqîq
Lew rojê bû nav lê danî ṣiddîq

4368. Ekṯer we dibên ji ehlê sîret
Mîʿrac bûye salê deh ji bîʿṯet

4369. Zuhrî gûtîye ji tabʿînan
Zatek mezin e bi ʿîlm û dînan

4370. Pênc sal bû tinê diçûn ji bîʿṯet
Barî bi Nebî dikirve reḥmet

4371. Şêxê Newewî ku ez fîda me
Ev qewle dibêt bi min temam e

**1. Nebzetû ʿEn Keyfîyetîl Mîrʿacî bî Rîwayetîl Buxarî bî Zîyadatîn Yesîretîn Mîner Rîwayatî (Kurteyek li Ser Çawaniya Mîʿracê ji Zarê Buxarî digel Çen Rîwayetên Zêde)**

4372. Şêxê me Buxarî piṛṛ dîrayet

Bû me ji Enes diket rîwayet

4373. Fermuye peyẋemberê Xudayî
Ev qîṣṣe ji ser ḥeta dumayî

4374. “Ez bûm şevekê ji bû meramê
Razayî di Mescîd ul Ḥeramê

4375. “Nageh me kesek dî hate lalî”
Şeqkir li me zik ne êş û talî

4376. “Hel nafkê ḥeta seravê sîne
Şeqkir wî ji min di gav û ḥîne

4377. “Qelbê me ewî ji bin deranî
Ṭestek wî ji zêrê zer bû anî”

4378. Wê gavê ne zêr û zîv yeqîn e
Hêşta ku ḥeram nebûn di dîne

4379. “Ew ṭeste tijî kirin ji îman
Pê şuştî ji min mekanê şeyṭan

4380. Wî şeqkirve dilê me wek car
Piṛṛ kir ji yeqîn û feyḍ û enwar

4381. Wî paşî li cê xû danî şîrîn”
Ney êş û elem ne peşkeka xwîn

***

4382. Meʿlûm e te zanî hêj du sal ew
Nik dayke Ḥelîme dî ve ḥal ew

4383. Dîsan ku ji nû dibû peyember
Nik ẋarê Ḥîra ve kare hat ser

4384. Her çen ku Nebî ji qelbî taze
Ev kare ji bû wî ʿîzz û naz e

4385. Xaṣma bû kesê biçît lîqayê
Lazim bi ṣefa û zûr behayê

4386. Ba qelbekê pak û piṛṛ ji nurê
Ew çak e biçît ji bû ḥuḍurê

***

4387. Paşî gû ji bû me hat dewarek
Hem zîn û liẋavkirî tedarek

4388. Meşhûr e buraq cewan û mehweş
Ew zîn û liẋav hemû di zerkeş

4389. Rengê wê sipî çu qendê şekker
Navincî ji beynê hêstir û ker

4390. Xûş ro ye gelek firin wê pêngav
“Pêngavê di wê bi ḥukmê du çav”

4391. Ḥaḍir bû ji bû me ev deware
“Ez taze dibum li wê suware”

4392. “Cibrîlî rikêb digirt şirînkar
Mîkalî bi destî bûye hevsar”

4393. Çum Beyte Muqeddes û munewwer
Cemyane li wê hemû peyember

4394. Wî pêşî peyemberan temamî
Du rekʿe ewî kirin îmamî

4395. “Mîʿrac bû me çêkirin bi teʿcîl
Serkeftime gel birayê Cibrîl”

4396. Yek yek derece ji zîv û zêrî
“Min wek wê nedîne çen me nêrî”

***

4397. “Ḥetta me gehîn vî asemanî(1)
Dergeh diquta ji dergevanî”

4398. “Gû ew ki ye ha ez im gû Cibrîl
Kî gel te ye gû xudanê tenzîl”

4399. “Xûşevyê Xudê Muḥemmedê pak”
Ṣaḥibşeṛefê xîṭabê lewlak

4400. “Dergey tu veke cenabê Barî”
Ba ʿîzz û kerem li du hinarî

4401. Ey gûtî gelek bixêrê hatin
Hun ser serê min ji wêrê hatin

4402. Gûtî: “Ku gehîm vî asemanî
Min dîtî kesek ji dil cewanî”

4403. Min lalî wî dîn li du kinaran
Du kum ji ṛeşatî bê jimaran

4404. Her carê dinêrî ṛastedestî
Ew pê dikenî ji can duristî

4405. Bû layê çepê eger neẓer dar
Derḥal digirî ji canê ẋemxwar

4406. Min gû ve kî ye û ev çi ḥal e
Cibrîlî gûtî ku xûş heval e

4407. “Ew babê te ye cenabê Adem”
“Dê ser wî selam” ke ey tu xatem

4408. Emma du ṛeşatîyan dibînî

Ewladê di wî ne xir yeqînî

4409. Ev kume ji layê ṛastê çak in
Ew ehlê biḥeşt in û di pak in

4410. Kuma dî belê cehennemî ne
Roreş ji Xudayê ʿalemîn e

4411. Dilxûş e dema ku van dibînî
Bû yêt he ji dil ḥezîn dimînî

4412. Min kir bi edeb selam li ser wî
Wergirtî selam û xûş xeber wî

4413. "Wî gûtî bi xêr tu hatî" ser ser
Ey tu kuṛê ṣaliḥ û peyember

4414. "Em paşî diçîn semayê s̱anî(2)
Bew gift û guwa nihu te zanî"

4415. "Dîtin me du kes li wêrê dîsa
Yeḥyayê Nebî ewê dî ʿÎsa"

4416. Ew her du Nebî xudan celalet
"Gel yek dî dibin kuṛêt di xalet"

4417. "Dîsa me selam dikir li ser wan
Ba reddê selamê xûş xeber wan"

4418. "Ey bêt û bi xêr birayê ṣaliḥ
"Peyẋemberekê emîn û nasiḥ

4419. ʿÎsa me didî bi bejin û qamet
Navincî bû genc û piṛṛ şehamet

4420. Rengê wî şirîn sipî û şur e
Pirça bi serî siyah û şur e

4421. "Her we me diçîn bû aseman sê (3)
Dergê wê qufil kirîne asê"

4422. "Bew gift û giwa ji pêş te zanî
Der bû me vekirbû dergevanî"

4423. "Nageh me kesek dî law dilber"
Royê wî çu meh bejin çu ʿerʿer

4424. Lawêt di wesa cewan çu nîne
Ev bejin û cemale kes nedîne

4425. Cibrîlî gûtî eger nizanî
Ew Yusif e bew şirîn cewanî

4426. "Gava me dikir ji wî selame
Wî redkireve bi xûş kelame"

4427. "Ehlen tu bi xêr bihêy li ser ser
Ey pakebira û hem peyember"

4428. Jêhel me çuyîn wekî ḥe care (4)
Ta gehiştîne asemanê çare

4429. "Ta derge vekirbû dergevanî
Idrîs me didî di wî mekanî"

4430. "Min ser wî selam dikir di gave
Wî redkireve bi merḥeba ve"

4431. "Ey hatî bi xêr bi keyf û şayî
Tu pake peyember û bira yî"

***

4432. Em her we çuyîn ne teʿb û ṛence (5)
Ta geştîne asemanê pence

4433. "Harûn me didî di vî asemanî
Ba reddê selam û dil ṣefayî"

4434. "Esmanê şeşê ku em gehîne"(6)
Musa me dî naṣiḥ û emîn e

4435. Min taze selam dikir li ser wî
Wî redkireve digel keser wî

4436. Musa me didî bejin bilind e
Reng esmer û leş wî têr û tund e

4437. "Paşî ji selam û merḥebayê
Ez çum û wî kizgirî gehayê"

4438. "Pirsîbû ji wî melek di gave
Bû çî digirî bi her du çave"

4439. "Wî gûtî çira nekem girînê
Sûzek me gehişte can di ḥînê"

4440. "Çen sal bû Xudê ʿezab me kêşan
Ser deʿwetê dîn bi ṛenc û êşan"

4441. "Paşî me Xudê hinart zelamek"
ʿAlî şeṛef û mezinmeqamek

4442. "Etbaʿê di wî ji ummeta wî
Ew peyrewê şeṛʿi û sunneta wî"

4443. "Dê biçne neʿîm û baẋê cennet
Sed qat ji me zêdetir bi ummet"

4444. Ev ḥuzn û girî û ev keser wî
Haşa ji ḥesed ku bêne der wî

4445. Belkî ji esef ku çen ji sale
Bû dîn xebitî bi her çî ḥale

4446. Qewmê wî gelek neanî îman
Xêra wî ne wek bibîte nuqṣan

4447. Lewṛa dê Xudê bidet peyember
Hindî hemû tabiʿêt wî yekser

4448. Dana wî ne karê ḥedd û ejmar
Her kes ji xû ra divêt gelek bar

4449. Peyẋemberî gû: “Me çûyne der dem (7)
Ta geştîne asemanê ḥeftem”

4450. “Bew pirs û cewab û xuşzubanî
Der bû me vekirbû dergevanî”

4451. “Cibrîlî gûtî ku xûş delîl e
Ev babê te Îbraḥîm Xelîl e”

4452. “Min kir bi edeb selam li ser wî
Wî redkireve bi xûş xeber wî”

4453. “Ey hatî şirîn ku serwerî tu
Hem xûş kuṛ û xûş peyemberî tu”

***

4454. “Em paşî diçîn bi qedr û ḥurmet
Ta sîdreyê munteha di cennet”

4455. Wê ber temetî cerêt hecer bûn
Ew çen di cewan du hinde ter bûn

4456. “Belgêt wê şibî guhêt di fîlan”
Weṣfêt wê ne ḥeddê qal û qîlan

4457. Ew sîdre kesê nedî nizanî
Bew ẋeml û bilindî û cewanî

4458. “Min dîtî bi çavî çar ji robar
Dertên ji binê wê taze her car”

4459. “Du berz û du bi aşikarî
Min pirsî ji wî heval û yarî”

4460. “Ev kewser e gû ve selsebîl e
Ew êt di diyar furat û nîl e”

***

4461. Em paşî diçîne Beytê Meʿmûr
Her rojê dihêne nav melek zûr

4462. Tên ḥeftê hizar he rojê piṛṛ şay
Newbet ne digehtê ta cîhan may

4463. “Paşî ji me ra dihên sê bade”
Her sê di cewan û dilguşad e

4464. “Yek mey bû ewêt dî şîr û hingvîn
Wergirt me ji xû şîr bi dilvîn”

4465. “Cibrîlî gûtî gelek te baş kir”
Sirrek bû nîhan nihu te faş kir

4466. “Ev şîre nîşanê dîn û fîṭret
Ya tu li serî û pake ummet”

4467. Zur çak bû te camê mey nenuşî
Ummet te dê baẋ biban bi bûşî

4468. “Paş Barî dikir bi ferḍ û taze
Pêncî ji me roj û şev nemaze”

4469. Peyẋemberî gû: “Dema vegeryam”
Ta geştime nik birayê piṛṛ kam

4470. “Musayê digûtî ey birader
Emrê wî çi bû ji bû te dawer”

4471. Min gûtî: “Belê bi emr û ferman
Fer kir li min û li ser musilman”

4472. “Em pêncî nivêj bikeyn duristî
Her roj û şevê xudaperistî”

4473. “Wî gûtî wekî dikem teemmul
Ummet te neşên biket teḥemmul”

4474. “Min tecrîbe kir ji pêş te çen sal
Qewmê xû bi her çî ṭaqet û ḥal”

4475. “Zu be tu herev lîqayê Barî
Da bû te sivik biket vî barî”

4476. “Ser xaṭirê wî û ummeta xu
Geryameve cayê heḍreta xu”

4477. Min gûtî Xudê tu agedar î
Zana bi xefî û aşikarî

4478. Ṣaḥib kerem î xudanê reḥmet
“Vî emrî sivik bikey ji ummet”

4479. “Wî gûtî bila wekî tu hatî
Deh jêvekirin me wek xelatî”

4480. “Geryameve ez bû nik wî dîsa
Pê raḍî nebû birayê Musa”

4481. “Dubare divêt biçî lîqayê”
Vê carê gelek bikey recayê

4482. “Hêşta ku sivik biket vî barî”
Nê xêr e ji bû te hîvîkarî

4483. “Carek dî diçûm lîqayê ekber”
Ser xaṭirê ummetê bi mehder

4484. “Her we wî dehêt dî danme xaṭir
Geryameve nik birayê şaṭir”

4485. “Min qîṣṣe ji bû dikir beyane
Hem raḍî nebû ji qelb û cane”

4486. “Elqîṣṣe: Dirêj me kir recaye
Pênc car li du êk diçûm lîqaye”

4487. “Her carê wî deh di danme xaṭir
Ta pêncî wî kirne pênce axir”

4488. Hin car bû diçûm recayê husa
Hem raḍî nebû birayê Musa”

4489. “Emma me digû dibînî ey yar
Mehder ji Xudê me kirye çen car”

4490. Ez zêde ji wî dikem ḥeyaye
Ev çen me bes e digel riḍaye”

4491. “Gava me ji wî dixwastî distur
Dengek me gulêbî lew serê jur”

4492. “Ferḍa me temam bi cê te anî
Bû ummetê hem sivik li canî”

4493. Şeʾnê me ye her ʿeṭa û qencî
Pênc in bi jimar û xêr bi pêncî

4494. Geryameve ez digel me Cibrîl
Ta geştîne Keʿbeyê bi teʿcîl

**2. Eyḍan Rîwayetul Buxarî (Dîsa Rîwayeta Buxarî)**

4495. Hem gûtî îmam li zarê Cabir
Guh lê bû me gû: Resûlê axir

4496. “Ev qîṣṣe wekî me kir beyane
Bû beʿze Qureyşîyêt nezane”

4497. “Gûtin ve ne karê ʿeql û bawer
Ev gûte hemû diru ye yekser”

4498. “Gûtin te eger temam beyane
Tu bû me bibêje yek nîşane”

4499. “Ew Beyte Muqeddesa me bînay
Weṣfan ji me ra hinek bi fermay”

4500. “Ez bûm wî demî di ḥîcrê Keʿbe
Wan pirsî ji min ve karê ṣeʿbe”

4501. “Rabume piyan bû ev niyaze
Ya Reb tu bikey me serfiraze”

4502. “Derḥal ji me ra cenabê Barî
Ew beyte ji bû me kir dîyarî”

4503. “Bû xanîyê wî ʿEqîlî anî
Min taze didît û wan nezanî”

4504. “Ez mame di wê temam neẓerdar
Weṣfêt wê hemî kirin me ejmar”

4505. Bawer dikirin kesê musilman
Kafir di dilê xû mane ḥeyran

***

4506. Fermûyî bi wan Nebî dubare
Ez yek dî nîşan dikem diyare

4507. Min dîtî serê ku têm bû malê
Karwan we di nêv filan nuwalê

4508. Nav gûtî ji çen kesêt di meʿlûm
Ehlê Mekehê qebîle mexzûm

4509. Rabûn ji xewê bi dil şepirze
Yek ḥêştirê wan bibûye berze

4510. Min taze selam dikir li ser wan
Ew mane ji vê selamê ḥeyran

4511. Min gû şutura diyare nîne
Nîv wadî Nexil me dît yeqîne

4512. Hindan we digû ji canê pirṛ huş
Ev dengê Muḥemmedî bû hin xuş

4513. Pêş qafîle ḥêştirek çeleng e
Reng esmer û cil siyahreng e

4514. Wê bar du ẋirare zûr giran in
Hun guh bigirin ku xûş nîşan in

4515. Dê hênve filane rojê Mekke
Xû bigre kesê di qelbî şekke

4516. Peyẋemberî ku digûte wane
Wê rojê di hêtve karewane

4517. Weṣfêt wî kirî ji ḥêştir û bar
Êk êke ewan didîn bi ejmar

4518. Çî dîtî şevê wî karewane
Bû ehlê Mekê kirin beyane

**3 Rîwayetul Beyheqîyyî (Rîwayeta Beyheqî)**

4519. Zanî me ji Beyheqîyê enwer
Ḥîna diçû aseman peyember

4520. Ewwel digehîn cihek gulistan
Piṛṛ xurme û qesb û baẋ û bîstan

4521. Cibrîlî gûtî: Peya be lêre
Du rekʿe nivêj dikey ku xêr e

4522. Gûtê ku nivêj dikir temame
Ev ʿerḍe Medîne xûş meqame

4523. Her we digehin cihek sipî xak
Hem lêre gûtî nivêj dikey çak

4524. Ev ʿerḍe gû Medyena delal e
Musa bû li vêre çen ji sale

4525. Dîsa digehîne Beytê Leḥme
Hem gûtî nivêj dikey ne zeḥm e

4526. ʿÎsa ye di vî mekanê xûş xak
Peyda bû ji dayke Meryema pak

**4 Eyḍan Rîwayetul Beyheqîyyî (Dîsa Rîwayeta Beyheqî)**

4527. Hem Beyheqî ye şirîn dibêjî
Ṣed reḥmê Xudê bi ser birêjî

4528. Ḥîna ku diçûn bû Beytê Meqdes
Peyẋemberî dî di rahê çen kes

4529. Ewwel digehin jinek şir û pîr
Westa bû li dev rîyê bi tedbîr

4530. Pirsî ve çi pîr e gûtî Cibrîl:
Pirsê neke da biçîn bi teʿcîl

4531. Her we qederek diçin ku nagah
Şexṣek dî yê pîremêr li ser rah

4532. Gazî dikete resûlê muxtar
Raweste bikem digel te guftar

4533. Cibrîlî gûtî Şirîn guzer ke
Royê xû nekê ne lê neẓer ke

4534. Çûn ta digehin du sê zelame
Wan taze ji wî dikir selame

4535. Ey ser te selam ḥebîbê haşir
Fexrê du cîhan resûlê axir

4536. Cibrîlî gûtî Selamê vane
Werbigre belê ji ṭîbê cane

4537. Ew her sê peyẋemberêt celîl in
Musa û Mesîḥ û bab Xelîl in

4538. Ew pîrejine eger nizanî
Temsîlê cîhan e warê fanî

4539. Texmîn ke ewê ʿumir çi maye
Her hinde cîhan xudan beqa ye

4540. Nazanî eger wî pîremêre
Şeyṭan bû ewê ku dûr ji xêre

4541. Ger dê te cewab bida jina jar
Ummet te dibû cîhan ṭelebkar

**5. Rîwayetut Ṭeberanîyyî wel Bezzarî (Rîwayeta Ṭeberanî û Bezzarî)**

4542. Şêxê Ṭeberanî şîhî Bezzar
Gûtin ji Ebû Hureyreyê yar

4543. Xûşevyê Xudê sîracê[1] wehhac[2]
Ḥîna bi şevê diçûye mîʿrac

4544. Raburî bi qewmekî di nêv kar
Ṭuvçînî diken ji rengê cûtyar

4545. Zistanê xelik diken bi havîn
Ta dête durwîn û gêz û cuxîn

[1] Çira,qendîl

[2] Pir birqî

4546. Ev qewme di rojekê diçînin
Ew roj didurwîn û dê helînin

4547. Çendî di durwîn ji yek qerare
Derḥal dê perêz bibît tebare

4548. Peyẋemberî gûte xûş hevale
Ev qewme kî ye û ev çi ḥale

4549. Cibrîlî gûtî ji min bizane
Ew ʿesker û leşkerê Xuda ne

4550. Ṣaḥibceger in bi can di ẋazî
Ta dîn he bijît bi serfiraḍî

4551. Ser dînê Xudê di canfîda ne
Xêrek ji ewan bi hefṣeda ne

***

4552. Paşî digehin cemaʿetek zûr
Ser ber keviran ji wan dibû kur

4553. Her ca serê wan dibû birîne
Da çêbîteve di gav û ḥîne

4554. Wan ḥal bi dewam ve êş û talî
Hem pirsî eve ji wî hevalî

4555. Gû vane dikir bi xûş giyanî
Ew ferḍe nivêj bi sergiranî

4556. Her kes ku ji dil neket nivêje
Bê fayde ye bû me her nebêje

***

4557. Hem dîtî hinek di ṛenc û êşe
Ser wan du pinî ji paş û pêşe

4558. Ew tên û diçin di gêj û ḥeyran
Her wek diçerin li çulî ḥeywan

4559. Çêranê cehennemê di wan xwar
Zeqqûm û zerîʿe tîj û dujwar

4560. Pirsî ji hevalî ev çi zatin
Gû roreş û maniʿêt zekat in

4561. Ev hinde nê suçê wan e her bes
Barî ne zulim diket ji her kes

4562. Lew her çî nedet zekatê malî
Bê şek dê bixwut ʿezab û talî

4563. Paşî digehin cemaʿetek bûş
Karek dikirin ne laîqî huş

4564. Pêş destê di wan bi dil niyaz e
Dîzek[1] ku tijî ji gûştê taze

4565. Hem çevr û qelew bi ṭam û leẕẕet
Hem taze kelî bi kamê şehwet

4566. Dîzek dî li wê ye pîs û nasaz
Piṛṛ gûştê genî û lak û lawaz

4567. Wan ew ne dixwar ku xûş û xavîn
Wan ev he dixwar ku pîs û çirkîn

4568. Pirsî eve kî ne ey dil û can
Ew hinde di weḥşî û di nazan

4569. Gû qewmek e ew ji ummeta te
Guhdarî nekirye sunneta te

4570. Gû wan hene jin ḥelal û taze
Kabanî di malê ẋenc û naze

4571. Ew terkê diken evan ḥelalan
Dê çin bi zîna bû pîsemalan

4572. Her we ku jinêt xudanê mêr in
Nik mêrê ḥelal di xûş û têr in

4573. Ser mêrê xû ra diken ṣefayê
Gel ẋeyrî kesî diken zînayê

4574. Ew paşî gehîn zelamekê jar
Wî xirve kirîne gurzeka dar

4575. Ew çendî diket neşêt helînît
Pir gende ji ḥalê xû dimînît

4576. Mil mil he di zêdeket ji dare
Da bîbi sivik giranebare

4577. Hindî dî giran dibît li ser wî
Ev renge şepirze dil keser wî

4578. Pirsî ve ki ye wekî nezan e
Ew hinde ji ḥalê xû bi jan e

4579. Gûtî eve şexṣek e ji ummet
Wî xirve kirîne zûr emanet

---

[1] Amanên ku ji herîyê hatine çêkirin.

4580. Ṭaqet wî niye li ser edayê
Ew hêj diketin pitir belayê

4581. Barek mezin e eger bizanî
Ew barê emanetê li canî

4582. Paşî digehin hinek miruvan
Wan can di ʿezab û dil bi kuvan

4583. Wan lêv û dev û dirêjzubanan
Ku lê ve diken bi kelbetanan

4584. Her carê bi kelbetan dikêşin
Wan can û ceger digel diêşin

4585. Dê çêbineve ew wekî he care
Dê jê ve biken ji êk qerare

4586. Hem pirsî Nebî ji xûş hevalî
Ev kî ne bi vê ʿezab û talî

4587. Gûtî: Eve waʿiz û xeṭîb in
Ew nik dilê ʿalemê necîb in

4588. Emma çi xetîb di fîtnegahan
Weʿẓan dê biden bû mîr û şahan

4589. Bû karê xirab û bê Xudayî
Weʿẓan dê biden bi canfîdayî

4590. Xû bes niye ʿalema musilman
Dê ser rê biben ji dîn û îman

4591. Hem dî kuneka kiçik bi menḍer
Gayek çi mezin ji wê dihat der

4592. Wî gayî dikir bi her çî ḥale
Da biçteve jurê lê meḥale

4593. Wî pirsî gûtî ku ev zelame
Bê fayde dibêt mezin kelame

4594. Ew paşî ji dil dibît peşêman
Nahêtve qise ku çu ji ezman

4595. Ew paşî gehîn nuwaleka pan
Bayek jê dihat çi xûş li ser can

4596. Bayek çi tezî û bêhneka xuş
Awazekê xûş ku can biket guş

4597. Peyẋemberî gûte xûş hevale
Ev denge çi ye çi ev nuwale

4598. Gûtî ve biḥeşt e ew bi gazî
Bû baregeha wî karisazî

4599. Yad bêjî îlahî piṛṛ ʿeṭa yî
Ser weʿdeyê xû xudan wefa yî

4600. Ya Reb tu dibînî ez çewan im
Piṛṛ mêrg û kulîlk û bustan im

4601. Min baẋ û ḥedîqe[1] zûr cewan in
Min av û derav gelek rewan in

4602. Minnet ji te ra ku çen temîz im
Remla me ji mîsk e dûr ji xîz im

4603. Piṛṛ qeşr û sera û kuçk û dîwan
Piṛṛ text û nivîn û ḥûr û wîldan

4604. Text û qenepe çi mêz[2] û kuṛsî
Xir sîm û zer in çi yê dipirsî

4605. Raêx û nivîn ḥerîr û dîba[3]
Ev dûşek û balge nerm û zîba[4]

4606. Ḥullêt di cewan û nazik û xûş
Îstebreq[5] û sundus[6] in çi armûş

4607. Ez piṛṛ ji çekêt dirr û mirarî
Ṣed newʿê di wan bi zernîgarî

4608. Yaqut û ʿeqîq û dirr û mercan
Berdaẋ û mesîn û cam û fincan

4609. Ew bade di taze û di zêrîn
Du hinde şeṛab tezî û şîrîn

4610. Av û mey û şîr û hingvîn in
Piṛṛ lezzet û ṭam û dil ḥebîn in

---

[1] Baxçe
[2] Mase
[3] Cureyek qumaşê ku bi zêr û zîv hatiye xercîkirin
[4] Spehî,xweşik
[5] Qumaşekê stur
[6] Cureyek armûşê ye ku di nav da benikên zêr û zîv hene

4611. Tesnîm[1] û rehîq[2] û selsebîl[3] e
Kafur[4] e mîzac û zencebîl e

4612. Nayab[5] û ʿecîb e hewzê kewser
Hem ṣar û sipî şirîn çu şekker

4613. Bê ḥed ji ṭeʿamê xûş û mêwe
Ṣed ṭam û bêhn hizar ji şêwe

4614. Dil her çî bivêt di ḥîn û gavan
Lez̲z̲et çi divêt dil û du çavan

4615. Ya Reb te hituve[6] day me taze
Ṣed hîvî bikey me serfiraze

4616. Weʿdê ku te day bi min bidey tu
Ey çî te viya Xudê dikey tu

4617. Barî we dida cewabê cennet
Ez piṛṛ kerem im xudanê minnet

4618. Min date heçî dibît musilman
Ba qewl û ʿemel wî anî îman

4619. Îman bi min û peyemberêt min
Bawer bi kîtab û defterêt min

4620. Bew rojê qiyametê wî bawer
Karê qederê çi xêre ger şeṛ

4621. Bawer biketin melek me zûr in
ʿEbd in di mutîʿ û ṣaf çi nûr in

4622. Her çî me gûtî bi ʿîzz û naze
Ṭaʿet biketin cewan û taze

4623. Emrê me biket ji kakila can
Neşkênî ji min ḥudûd û percan[7]

4624. Ew her çî biket bi dil ṣefayî
Bê ʿucb û ẋurûr û bê riyayî

4625. Ew şîrkê neket ku bê şeṛîk im
Bû her du cîhan he ez melîk im

4626. Her çî ku ji dil ji min bitirsît
Her kes çi bivêt ji min bipirsît

4627. Êmin wî dikem ji her neyaran
Reḥma xû bi ser dikem çu baran

4628. Ez dê bidemê çi ya wî daxwaz
Dil zînde dikem bi ʿîzzet û naz

4629. Heçyê biketin digel me qerḍ e
Deh qat wî ceza ji feḍlê ferḍ e

4630. Her kes bi tewekkule li ser min
Ez bû wî bes im binasî her min

4631. Ẋeyrî me çu nîne ez xudan im
Sulṭanê mezin bi ʿîzz û şan im

4632. Her weʿdê me da wefa yeqîn e
Ḥukmê me ebed çi red bû nîne

4633. Rizgar dibitin kesê bi îman
Her ez mezin im xudanê ferman

4634. Ellah ku we da cewabê cennet
Cennet gû: Hizar ji bû te minnet

4635. Raḍîme gelek ji luṭfêkarî
Memnun me bes e ve xûş dîyarî

4636. Paşî digehin nuwaleka kuṛ
Bêhna wê nexûş û germeka zûr

4637. Awazekê zûr nexûş li canî
Hem gûtî hevalî ger nezanî

4638. Ev dengî cehennema şedîd e
Daxwaz wê ji Xaliqê mecîde

4639. Ev renge dibêjî ey Xudaye
Min têr ke bi weʿdeyê te daye

4640. Her wek me dibînî bûymẹ ḥaḍir
Bew ḥeft ṭebeqêt tijî ji agir

4641. Bew panî û kwîrî û kirêtî
Bew ṭupiz û gurz û duyî û pêtî

4642. Piṛṛ qeyd û kelamçe piṛṛ ji zincîr

---

[1] Rûbarek e ji nav bihêştê
[2] Meya herî xweş û zelal
[3] Kanî û rûbarekê boş ê biheştê ye
[4] Vexwarineka biheştê ya bêhnxweş e
[5] Bijare, gelek baş
[6] Hosa, wiha
[7] pejan

Pịṛ dul û nuwal û xendek û bîr

4643. Zeqqûm û ḍerîʿê kûm li ser kûm
Ẋessaq[1] û ḥemîmê[2] gûm[3] di ber gûm

4644. Ew çendî li germiyan li cuş in
Ṣed hinde di tal û bên nexûş in

4645. Ya Reb te hu çêkirim neşîrîn
Ka weʿdeyê tu li rojê gûrîn

4646. Barî we dida cewabê cehnem:
"Hîç ẋem te nebî ḥeqê te dê dem

4647. Ha bû te kesê ne dîn û îman
Guhdarî nekirye emr û ferman

4648. Her çî bi hewayê nefsê meẋrûr
Bew kavle cîhanê bûye mesrûr

4649. Ev şeṛʿê şeṛîf nekir qebule
Dê wan di te da bikem melûle

4650. Ger ẓalime ger wî harîkarin
Ser jar û feqîrî xurt û harin

4651. Dê ḥeq bi temamî jê sitînim
Gel wan ku gelek bi qehr û kîn im"

4652. Dûzeẋ[4] we dibêjî ey Xudaye
Raḍîme bes e me ev ʿeṭaye

4653. Ew paşî diçûn bi şay û unse
Ḥetta digehîne Beytê Qudse

**6. Rîwayetul Beyheqîyyî Eyḍan (Rîwayeta Beyheqî Dîsa)**

4654. Hem Beyheqî ye diket rîwayet
Ya Reb tu bûy bikey ʿînayet

4655. Yê gûtî Ebû Seʿîdê xuşkes
Ḥîna ku Nebî çu Beytê Meqdes

4656. Gû gazî kirê li ṛaste bale
Êkî gû biweste min sûal e

4657. Min cab nedida li layê çep hem
Yek gazî me kir bi lez diçîn em

4658. Nageh me jinek dî qedbilind e
Wê heldikirîne dest û zende

4659. Çî zîneteka Xudayî dayî
Wê cumle li ser hebûn tebayî

4660. Raweste gûtî bû êk ji pisyar
Havrî veneda me her wekî car

4661. Cibrîlî gûtî zelamê pêşî
Dellalê cûya bû dil bieşî

4662. Yê dî yê filan bû xaçperistan
Ew her du di xwar û naduristan

4663. Ger dê te bida cewabê wane
Ummet te dibûne ew bizane

4664. Ew jin ku te dî çi pịṛ cemal e
Ew kavlecîhan e ser zewal e

4665. Hem dîtî hinek xîwan û sufre
Ew pan û sipî şebîhî befr e

4666. Pịṛ gûştê kelî û çevr û taze
Ney kes jê dixwu ne kes niyaze

4667. Hindek dî qirêjî pîs û napak
Pịṛ gûştê genî û laẋer[5] û lak[6]

4668. Cemya bûne ser hinek zelame
Ev gûşte dixwar gelek bi ṭame

4669. Cibrîlî gûtî tu van nenasî
Ew nan di ḥeram û dil di qasî

4670. Wan ew nedixwar ḥelale male
Da bin ji ḥerame malî pale

***

4671. Hindek dî me dîn di nêv cefayê
Ew zik dewulê çu ṛeşkekayê

4672. Pịṛ gende şebîhî dîn û har in
Dê rabneve gêj û ew niqar in

4673. Ew çendî diken neşên helistin
Dêbêjî di mest û ew ne mest in

4674. Ḥalê ku ji wan gelek perîşan

[1] Ava genî
[2] Gerim
[3] Behra 'edavê
[4] Dojeh, cehnem
[5] cangiran
[6] Xwarina kûçikan

Hem pirsî me ew jiyarê piṛṛ şan

4675. Ser qewmekê dî ewan guzer kir
Lumbûrê di wan li mîzê ḥêştir

4676. Wan agir û pel dixwar bi çerwan
Da xwun û li jêr dihate der wan

4677. Wan can û ceger digel diêşan
Ew ḥalê li wan gelek perîşan

4678. Dîsa ji hevalî kir sûale
Ev ḥale çi ye bû hinde tale

4679. Gûtî tu bihêle wan leîman
Ew ẋedirker in li wan yetîman

4680. Ew malê hebû  ji wan dixwarin
Evro di ʿezabê lew di jar in

4681. Ew batî xudan biken bi xuşhal
Bê pirs û tirs ji wan dixwun mal

***

4682. Dîsa digehin hinek jinane
Ew zêde bi jan ji cerg û cane

4683. Ew bew memikan bibûn qinare
Ew çen pê di şa bûyîn he care

4684. Wî gû: Eve kî ne ey birader
Gû: Ḥîzejin in ewêt zînaker

***

4685. Her we digehin hinek di ṛencûr
Piṛṛ êş û elem gelek cefaxwûr

4686. Gûştî jê diken bi kelbetanî
Her carê elem digehte canî

4687. Xurtî jê diken bi qehr û azar
Wî gûştî divêt bixwun bi naçar

4688. Her carekê gûştê xû dikujin
Wan can û ceger digel dişujin

4689. Hem pirsî ji Cibreîlê yare
Ev qewme ki ye û ev çi kare

4690. Gû: Rexnegir in di ḥêc û ẋemmaz
Ew ʿeybeker in sefîh û lemmaz

4691. Wan her dikirin bi wan tiṛane
Wan dil dişikand ji wan birane

4692. Wan batî evîn û dilnewazî
Gel wan dikirin ne tazebazî

**7. Rîwayetul Beyheqîyyî Eyḍan (Rîwayeta Beyheqî)**

4693. Hem Beyheqî ye dibêjî taze
Yê gûtî resûlê mey bi naze

4694. Min dîtî li aseman herê jur
Paldabû Xelîlî Beytê Meʿmûr

4695. Li ew çak û xudan weqar û sengîn
Qewmê wî hinek li nik wî rengîn

4696. Min gûtî selam cewab didave
Nageh me du fîrqe dîn di gave

4697. Fîrqek bû ji wan cilik kej û pak
Fîrqa dî cilik qirêjî napak

4698. Gûtin me ve her du ummeta ten
Ew peyrewê şeṛʿi û sunneta ten

4699. Lew beytê dema diçûme jure
Gel min bûye fîrqeya bi nûre

4700. Min kir bû nivêj û wan temamî
Fîrqa dî li derve man bi ʿamî

4701. Ew lew ne diçûne jûr digel ew
Ew çunke hebûn di bed ʿemel ew

**8. Rîwayetut Ṭeberanîyyî (Rîwayeta Ṭeberanî)**

4702. Şêxê Ṭeberanî wek dibêjî
Ya Reb tu kerem bi ser birêjî

4703. Peyẋemberî dî li derkê cennet
Pîrek bi cemal û qedd û zînet

4704. Ser kuṛsiyekê bi ʿîzz û naze
Qewmek wî li dûr cewan û taze

4705. Qed ʿerʿer û dêm çu mahê nûrîn
Cilkêt hemiyan sipî û şîrîn

4706. Qewmek dî ne wek evan dila û çak
Hem rengê nexûş û hem di ẋemnak

4707. Wî dî di demê sê pakerobar
Her yek diçû nav ewane yekcar

4708. Her êkî ku ew diçûne navê
Pîçek dê cewan biban di gavê

4709. Robarê sîyê ku jê dihên der
Wan ro dibû şibhî mahê enwer

4710. Pirsî ji heval û yarê ẋemxwar
Ev qewme çi ne û ev çi robar

4711. Wî gûtî ve Îbrehîm Xelîl e
Ceddê te peyemberek celîl e

4712. Ewwel kes e ew li ser zemîne
Muyêt wî sipî bûyîn şirîne

4713. Ger muyê sipî weqar û şane
Ewwel ji wî ra bû ev nîşane

4714. Qewmê he tu hin cewan dibînî
Bew bejn û cemal û bew şirînî

4715. Ew ew kese ne bi dîn û îman
Şîrîn ʿemel û bi ḥeq musilman

4716. Ew çûyne bi şeṛʿi û ṛasterahe
Nêzîk nebû ta ku man gunah e

4717. Qewmê he dibînî reng zer û jar
Car çakî dikir ewan guneh car

4718. Ew tewbe diken ji axirê jîn
Bûn tewbe qebûl ji ṣaḥibê dîn

4719. Robar ev e her sê piṛṛ ji nîʿmet
Êk nîʿmet e yê dî nehrê reḥmet

4720. Yê dîke tijî ṣefa û nûr e
Çen pake şeṛabeka ṭehûr e

**9. Rîwayetun ʿEn Enes-îbnî Malîkîn (Rîwayetek ji Enesê Kurê Malikî)**

4721. Hem gûtî Enes li zar peyember
Min dîtî şeva lîqayê ekber

4722. Nageh dimeşîn di baẋê cennet
Cê lezzet û xuşiyan û nîʿmet

4723. Robarekê pak me dît û nadir
Hildabû li ser rexêt wî çadir

4724. Xîvet[1] nê çi xîvet in kit û cut
Hin durr û zeberced in çi yaqut

4725. Bir bir me didîn ji wan kinaran
Ṭeyrêt di cewan bi ṣed nîgaran

4726. Rengê wî gelek sipî û nûrîn
Ava wê ṭezî û ṣaf û şîrîn

4727. Nisbet nîye şîr û hingivînî
Bew rengê sipî û bew şirînî

4728. Berdaẋ û peyale dûr wî bê qam
Ya Reb tu bidey ji wî me yek cam

4729. Çen taze ne ew du hin temîz in
Yaqût û zumurrudê wî xêr in

4730. Pirsî wî ji Cibrîlê enwer
Robarê bi nave gûtî kewser

4731. Kewser eve ye ji bû te mizgîn
Barî bi te da di baẋê rengîn

4732. Camek me vexwar ji wê çi came
Ṭamek me dikir belê çi ṭame

4733. Şîrîntir e ew ji hingivînî
Bên misk e bi kamê dil evînî

**10. Rîwayetul Beyheqîyyî (Rîwayeta Beyheqî)**

4734. Hem gûtiye Beyheqî di sunnet
Zar Xidrê Ebû Seʿîd e şuhret

4735. Ferman diketin resûlê ekrem
Gava digehîn semayê ḥeftem

4736. Min sîdreyê munteha dî taze
Çen şeng û bi ẋeml e serfiraz e

4737. Yek belgê ji wê bizan bi xûşî
Vê ummetê cumle da dipûşî

4738. Yek kanî me dî ku selsebîl e
Dê bîte du parçe çen cemîl e

4739. Yek kewser e piṛṛ xûşî û nîʿmet
Robarê dî ew bi navê reḥmet

4740. Ez çume şirîn di nîvê kanî
Min şuştî leşê xû têr ji canî

[1] Kon, çadir

4741. Barî bi me kir çi luṭf û başî
Xûş bû ji gunahê pêş û paşî

4742. Ez paşî diçûme nîv biḥeşte
Pêş min ve dihat keçik çi qişt e

4743. Balayê bilind û royê taze
Lew ḥûrî biḥeştê piṛṛ bi naze

4744. Min gûtî: Tu pak î gû şirînzar:
Zeydê kuṛê Ḥarisey te xûş yar

4745. Nîşa me didan ji paş cehennem
Cê qehr û ceza û ẋuṣṣe û ẋem

4746. Ew piṛṛ ẋeḍeba Xudayê Qehhar
Çen germ û şedîd e hinde duşwar

4747. Pula û beran biken di navê
Dê xwut û ḥelînîtin di gavê

4748. Çen pan û dirêj e hinde kuṛ e
Hawar li kesê biçîte jure

4749. Min dît û ḥuzin me geşte canî
Derḥal dikirin ji min nîhanî
***

4750. Ya Reb te feqîr û jar e Ṭahir
Qurtar ke bi day û bab ji agir

4751. Gel xwîşk û bira û xizm û yaran
Gel şêx û melan di tazekaran

4752. Gel her çî wekî me bûye naxûş
Wan cumle bi reḥmeta xû dapûş

**11. Rîwayetu Îbnî Macehe (Rîwayeta Îbnû Mace)**

4753. Hem gûtîye Îbnû Maceyê pak
Yê gûtî Enes ji yarê lewlak

4754. Min dîtî li ser derê biḥeşte
Yek xeṭṭê çi zer nîgar û qişte

4755. Min pirsî ji wî mezinhevalî
Ev xeṭṭe çi ye we çak û ʿal e

4756. Meʿlûm bî gûtî ji bû te mujde
“Xêr yek bi deh e û qer bi hejd e”

4757. Min pirsî: Ji bû çî qer wesa ne
Ḥîkmet ji me ra meger nîhan e

4758. Wî gûtî belê dibît belengaz
Ser ḥal û hebûn diçît bi daxwaz

4759. Emma çi kesê diket qeran ew
Hîç çare nemaye ew bizane lew
***

4760. Xêrek mezin e birayê dînî
Wî dest bigirî bi can evînî

4761. Destê wî bigir bi mal û pare
Harî wî bike Xudê te yar e

**12. Rîwayetut Tîrmîẕîyyî (Rîwayeta Tirmiẕî)**

4762. Zanî me ji Tirmizî şirînkar
Ferman diketin resûlê muxtar

4763. Min dîtî Xelîl di baẋê cennet
Gû batî[1] me tu selam ke ummet

4764. Ev baẋ û biḥeşte çen di xûş in
Piṛṛ ẕewq û ṣefa û piṛṛ xirûş in

4765. Her kes bû Xudê zikir bixwînin
Dê dar û dirextî bû biçînin

4766. Her çî bû pitir diket gudarî
Nîʿmet dê pitir bidet wî Barî

4767. Nê ẕikrê Xudê gelek bi xêr e
Xûzmey li kesê bi ẕikrî fêre

4768. Neyxaşme li vane çar qisane
Êkcar nê li nik wî piṛṛ buha ne

4769. Subhan ji Xudê ku çen pesind e
Ḥemda wî dilan digêrî zînde

4770. Ẋeyrî te Xudê Xudê çi nîne
Ey çen mezin î me can yeqîn e

**13. Rîwayetûn ʿEn Ehlîl Ḥedîs̱î (Rîwayetek ji Ehlê Ḥedîs̱ê)**

4771. Hem ehlê ḥedîs̱ diken rîwayet
Wan bû me ji qaṣidê hîdayet

4772. Peyẋemberî da di asemanî

[1] Şûna me, pêş me ve

Mazin melekê wekîlê canî

4773. Ew hinde mezin bû beynê du çav
Bû ḥeftê hizar qunaẋ bi çar gav

4774. Her gavê melek li nik wî meʿmûr
Ber destî diken bi quwwet û zûr

4775. Defter wî li pêş qelem bi destî
Karê xû bi ser diket duristî

4776. Ev taze dibît û çen dijîtin
Ev key dimirît û ku diçîtin
***

4777. Hem dî melekek bi gir yû zêmar
Bû ḥalê ewan kesêt gunehkar

4778. Yek dî ji melek ʿecîbê şane
Nîv agir e nîv befir giya ne

4779. Bê ḥed wî melek li çan û xwaran
Ẋafil ne ji ẕikrê ḥeq çi caran

4780. Ey ṣaniʿê piṛṛ celal û Qadir
Ey pêkve kirin te befr û agir

4781. ʿEbdêt xû wesa kirin musexxer
Ser ṭaʿet û sunneta peyember

**14-15. Rîwayetanî ʿEn Îbnî ʿEbbasîn (Du Rîwayet ji Kurê ʿEbbasî)**

4782. Enware dibêjî piṛṛ meṭalib
Gût Bûlhesenê wî bab e Ẋalib

4783. Zar Îbnû Sebʿi di nêv wê name
Meşhûr e Şîfa Ṣudûr temame

4784. Du taze ḥedîs̱ ji Îbnû ʿEbbas
Ew pakeṣeḥabîyê Xudênas

4785. Paşî ku dikir şirîn zubane
Ser mebḥes̱ê ev sefer beyane

4786. Ferman diketin resûlê piṛṛ nûr
Ez paşî ku çume Beytê Meʿmûr

4787. Min qeşde jêhel biçim bi teʿcîl
Min dî ku vema cenabê Cibrîl

4788. Min gû: Tu çewa bi cê dihêlî
Dûstê xû di vî mekanê ʿêlî

4789. Wî gûtî qesem bi la mekanî
Her yek ji me ḥeddê xû dizanî

4790. Ger tê biperim di vî meqamî
Min per diṣujin bi nûr temamî

4791. Peyẋemberî gûtî: Ey biraye
Ḥacet te çi ye li nik Xudaye

4792. Gû: bû me bike reca û mehder
Izna me bidet di rojê meḥṣer

4793. Wê rojê bibim di xidmetê tu
Ser cisr û pirê bû ummetê tu

4794. Ez her du perêt xû çak bikem pan
Ummet te li ser biçît bi rehwan

4795. Peyẋemberî gû: Gûtin: Bibure
Ez hatme niqûkirin di nûre

4796. Ez ḥeftê hizar ḥîcab bi defter
Her yek ne wekî ewadî çum der

4797. Ta geştime yek meqamê evraz
Ney ins û melek çi deng û awaz

4798. Derḥal me ṣehim gehişte canî
Dengek me gulêbû lew mekanî

4799. Wek dengê Ebû Bekir temam e
Raweste gûtî di ev meqame

4800. Hindek ji s̱enayê ḥeq bibêje
Vê gavê Xudê diket nivêje

4801. Ez mame ʿeceb di yarê xêre
Aya li me pêş gehişte êre

4802. Nageh me nîda ji şahê ekber
Wer hêve tu çêtirîn peyember

4803. Wer hêve tu ey ḥebîbê Eḥmed
Nêzîk me bibe tu ey Muḥemmed

4804. Nêzîk xû kirim wekî di Qurʾan
Vî beḥs̱î şirîn diket bi tibyan

4805. Nêzîk bûme ez ji bê mekanî
Nêzîktirî du serêt kivanî

4806. Wî pirsî ji min bi xûş xîṭabe
Ṭaqet me nema li ser cewabe

4807. Wî destê xû danî nav milê min

Ṭezyatî gehişte ser dilê min

4808. Ew dest ne şibihî destê xîlqet
Ew deste tinê bû destê qudret

4809. Qelbê me di gavê girt ser û rî
Min dil bû tijî ji ʿîlm û nûrî

4810. Wî da min ʿilûmê pêş û paş
Bê ḥed ji ʿilûmê dî bi baş

4811. Hindek ji ʿilim we da me ferman
Bes bû te tinê bi ʿehd û peyman

4812. Hindek dî ezê kirîm muxeyyer
Qurʾan xû nîşa me da wî yekser

4813. Her carê ji bû me anî Cibrîl
Min da te ve bi pirê ew bi tefṣîl

4814. Hindek ji ʿilim ji min dikir fer
Bû xelqî divê beyan bikim her

4815. Min paşî digû cenabê Barî
Zana bi xefî û aşekarî

4816. Ez pêşî bihême ev meqame
Wehşet me gehişte dil temame

4817. Nageh me gulêbû deng û awaz
Wek dengê Ebû Bekir me hemraz

4818. Raweste Xudê diket nivêje
Ez mame ʿeceb ji wî nebêje

4819. Ev yar û bira û çakemêre
Aya li me pêş gehişte êre

4820. Hem min bû guman di qelbî carî
Ma pêtivîyê nivêj e Barî

4821. Wî gûtî: Eya ḥebîbê sengîn
Paşa he ez im ẋenîy û zengîn

4822. Ku dê bî nivêj bikem ji bû kes
Min karê nivêjê reḥmete w bes

4823. Subhanî dibêm bilindê şan im
Sulṭan û xudanê du cîhan im

4824. Ḥezkey tu vê ayetê bixwîne:
“Rebbê te ew e reḥim berîn e”

4825. “Gel hingû reḥim diket bi îʿzaz
Ba cumle melek ji wî bi daxwaz”

4826. “Da hingû bihênte der ji ṭarî
Bû nûr û peristina wî Barî”

4827. Emma ji kelamê yarê ẋar e
Ṣebrê te bi wî dihêt diyare

4828. Hun her du ji yek qurê me dane
Ew ṣebrê te ye di du cîhane

4829. Weḥṣet te dema gehişte canî
Wek dengê wî yek melek me anî

4830. Ta nik te nemînî tirs û heybet
Ta taze fehim bikey ji ḥeḍret

4831. Musa ku me dî di ṣehmê maye
Ṣebrê wî hebû bi ew ʿeṣa ye

4832. Min gûtî: Çi ye te ew bi destî
Ta ṣebrê dilê wî bêt duristî

4833. Heybet wî nemînî nêv fuade
Da fehmê biket temam mirade

4834. Wî paşî digût bi rêz û tebcîl
Pa kanê sualê yarê Cibrîl

4835. Min gû: Tu dizanî ey Xudaye
Wî gû: Me qebûl e ew recaye

4836. Emma bû kesê tu çak viyayî
Ew gel te bûye bi canfîdayî

***

4837. Hem yek ji rîwayeta wî şîrîn
Ferman diketin resûlê nûrîn

4838. Jêhel me diçîn şirîn rewane
Cibrîl me li du dihêt cewane

4839. Ḥetta digehîne jêr ḥîcabe
Pîçek di hejînî ev cenabe

4840. Gûtin me: Wekî negûtî Cibrîl
Ha bû te Muḥemmedê ʿereb cîl

4841. Derḥal wî digû: Xudaye ekber
Destê xû ji perdeyê îna der

4842. Wê gavê ji perde birme jure
Pênṣed bi mesafe sal siture

4843. Wî gû: Here pêş tu ey Muḥemmed

Jêhel me diçîn bi lez çi bê ḥed

4844. Ta em digehîn ḥîcabê s̱anî
Lû lû bû çi qed şirîn bi canî

4845. Hem taze hejandî gûtî hûn kîn
Gû ṣaḥibê perdeya di zêrîn

4846. Ha bû te Muḥemmedê peyember
Deʿwetli ye ew ji şahê ekber

4847. Destê xû ji perdeyê deranî
Wek berqê birim bû ew mekanî

4848. Ev renge diçûm ḥîcab ḥîcabe
Ta ḥeftê ḥîcab me kir ḥîsabe

4849. Pênṣed sene her yekê di estûr
Refref bû me anî lew serê jûr

4850. Refref xû bîsateka çi kesk e
Ez ser wê diçûm şibî birîske

4851. Ta geştime ʿerşî  her di gave
Tiştek çi mezin me dî bi çave

4852. Her çî ku nedîtî ew nizanî
Weṣfêt wê ne karê hîç zubanî

4853. Peşkek me jê kefte ser zubanim
Xuştir ji wî tiştekî nizanim

4854. Min dil bû tijî ṣefa û nûre
Nîşa me di an ʿilûm çi zûr e

***

4855. Ya Reb çi sera ye ev çi dîwan
Xellaqê hemû cîhan e sulṭan

4856. Serdarê rusul emînê raz e
Ser ʿerşê Xudê bi ʿîzz û naz e

4857. Westayî li ser bîsatê unsê
Dil zînde bi cilwegahê Qudsê

4858. Gel yek dî kirin gelek xîṭabe
Laîq bi meqamê du cenabe

4859. Yarî bi reca û dadixwazî
Barî bi ʿeṭa û dilnewazî

4860. Ya Reb çi bilind e ev meqame
Ev behre ji ʿalemê te da me

4861. Raḓî me gelek ji bû te memnûn
Ey Xaliqê bê mekan û bê çûn

4862. Tenha yî Xudê tu bê heval î
Mazinṣîfet î tu Ẕulcelal î

4863. ʿEbdê te ez im di emr û ferman
Ey navê te ye şîfa û derman

**16. Ferzbûna Nivêjê**

4864. Meʿlûm e wekî li pêş te zanî
Ew şev ku Nebî çû asemanî

4865. Ev rukne ku pênc nivêj bûyîn fer
Ser Eḥmed û ummeta wî yekser

4866. Lazim nebû wê sipêdeyê lew
Meʿlûm nebû dê çewa biken ew

4867. Yan Barî wesa dikir bi ferman
Nîvro ku bibîte ser ji bû wan

4868. Lew taze hinart cenabê Cibrîl
Nîvro biketin beyan û tefṣîl

4869. Pêş çavê Nebî wî şuştî taze
Gû: Wek me bişû tu desnemaze

4870. Nik dergehê Keʿbeya muʿeẓẓem
Cibrîl bû îmamê yarê ekrem

4871. Nîvroje nivêj dikir ji ewwel
Gû: Wek me bike ji dil mukemmel

4872. Her pênc bi cewanî û temamî
Gel weqtê di wan kirin bi ʿamî

4873. Gel cumle şirut û rukn û sunnet
Fêr kir wî Nebî ewî jî ummet

**A (ʾ) Qîble**

4874. Ta ma li Mekê ve ʿalîcahe
Wî Keʿbe hebûye qîblegahe

4875. Ḥîna çu Medîneya munewwer
Meʿmûr bû bi Sexreyê bidet ber

4876. Ser xaṭirê culekan ku ulfet
Peyda bî ewan bi dînê fîṭret

4877. Ta Barî bû xaṭira Muḥemmed
Berdave bû Keʿbeyê muebbed

4878. Çunkî wî keser bû ew di canî
Çavnêr bû gelek ji asemanî
***

4879. Yê hatî belê ji Îbnû ʿEbbas
Deryayê ʿilûm û ew xebernas

4880. Ta salek û çar mehan ji hîcret
Wî sexre bû qîbleya bi şuhret

4881. Emma li Mekê wesa diwesta
Hem Keʿbe dikefte pêş bi qesta

4882. Pêş cengê Bedir bi du mehan ew
Nîvrojê Nebî îmamê wan ew

4883. Barî bû weḥî hinart di gave
Wî rokire Keʿbeya bi nave

4884. Mêran û jinan bi bê kelame
Ṣeffêt xû bedil kirin temame

**DIST BIKARIYA NIVÊJÊ Û NIHÊNIYÊT WÊ**

4885. Serpişkê ʿîbadetan nivêj e
Dergahê seʿadetan nivêj e

4886. Fihrist û nimûneya kemal e
Mîʿracê lîqayê Ẕulcelal e

4887. Xermanê xûşî û xêr û çakî
Derman û celayê[1] qelbê pakî

4888. Hem rojî ye hem zekatê jîn e
Hem ḥeccê Xudayê ʿalemîn e

4889. Her roj û şevê tu defʿe penc e
Dê rokeye dergehê wî qence

4890. Cilkê te wekî leşê te xavîn
Qelbê te bi şewq û leẕẕet û vîn

4891. Gavê ji piyave ṛadiwestî
Gel tirs û edeb te dest bi destî

4892. Navê wî bi dilxûşî diînî
Qurʾanê bi tazehî dixwînî

4893. Peymanê digel Xudê dibestî
Ku her wî bi nasî û peristî

4894. Her karê te hey ji wî dixwazî
Ey her tu Reḥîm û karisazî

4895. Gavê te bejin du ta ji pêve
Ẕikrê wî dikey bi can û lêve

4896. Ey çen mezinî û çen pesindî
Ḥemda te dikem bi serbilindî

4897. Weqtek bi viyan û tirsê canî
Royê xû bi royê xak didanî

4898. Ey çen tu bilind î piṛṛ celal î
Bê çûn û zewal û bê heval î

4899. Gavê bi fena tu der sucudê
Gavê bi s̱enatu der quʿudê

4900. Ev zikir û s̱ena û ev huzure
Dê qelbî tijî biken ji nûre
***

4901. Ger merdê Xudê tu huşiyarî
Dê ron bibitin te qelbê ṭarî

4902. Bew renge nivêje subh û êvar
Qelbî diketin tijî ji enwar

4903. Lew serwerê dîn dibêjî ferman
Derḥeqqê nivêjkerê musilman

4904. "Ḥîna di sucudê rû li ser xak
Nêzîktir e ew ji Xaliqê pak"

4905. Her roj û şevê eger tu zanay
Pênc car dê biçî lîqayê Mewlay

4906. Mîʿrac e wekî ji bû musilman
Hem nûr û cela û cewherê can

4907. Her kes ku biket nivêj bi çakî
Bê şek digehîte qelbê pakî

4908. Lewṛa bi nivêjê merdê hişyar
Dê zêde binasî şahê Ẋeffar

4909. Qelbê wî ji bû dibît emirber
Heçya wî gûtî ji canê bawer

4910. Distur û şeṛîʿetê Xudayî
Guhdarî diket bi canfîdayî

[1] Cîla, rewneqî

4911. Per canê Xudê xû naşikênî
Pawan û tuxwîbî nabezînî

4912. Exlaqê di wî dibin pesinde
Dê her du cîhan bî serbilinde

4913. Dê taze bijît ḥeta li ev war
Serbest dê biçît lîqayê Ẋeffar

4914. Ferman diketin Xudê di Qurʾan
Her kes hu nivêj diket bi îman

4915. “Dê wî dete paş nivêj li munker
Feḥşî û gunah û pîsî yekser”

4916. Lewṛa çi kesê te dît gunehkar
Gel hindê nivêj diket hemû car

4917. Helbet we nekirye wek me gûtî
Lew fayde neda ji xaneṣutî

4918. Fermanê peyemberê nîkunam
“Istun e nivêj bû dînê îslam

4919. Her kes biketin temam û taze
Ev dîne wî kir bi serfiraze

4920. Her çî neketin binaẋê dînî
Her wek ku bi destê xû derînî”

4921. Karek çi şirîn û piṛṛ buha ye
Deʿwetgehê hezretê Xuda ye

4922. Lew ḥeqq e li ser kesê musilman
ʿIşqa vê nivêjê der dil û can

4923. Erkanê di wê nekarê ejmar
Piṛṛ remz û îşaret û bi esrar

4924. Şêxê ʿErebî di nêv fituhat
Gûtîne ji wan gelek îşarat

4925. Feḍla vê nivêjê zûr dirêj e
Ṣed tuf li royê neket nivêje

**Nihêniya Nivêja Cumʿê û Cemaʿetê**

4926. Ger cumʿe ye ger nivêj cemaʿet
Ta her çî Xudayî kirye ṭaʿet

4927. Piṛṛ ḥîkmet û piṛṛ ji sir nîhan in
Çî fehmê neket ji dil nezan in

4928. Êkek ji cewanîya nivêj e
Gel tirs û edeb bikey dirêje

4929. Erkanê di wê temam bihînî
Xwundin bi qîraet û cewan bixwînî

4930. Êka dî ew e bikey di mizget
Êka dî bikey digel cemaʿet

4931. Çî kes hu nivêj biket bi kûmel
Meʿlûm wî nivêj dibît mukemmel

4932. Sîrrek mezin e eger bizanî
Vêkra ku nivêj biken ji canî

4933. Lewṛa wekî xirvebûn musilman
Neyxaşme di mizgetê bi îman

4934. Xir şibhî bira bi canfîdayî
Bê ferq û ʿedawet û cudayî

4935. Serdar û nefer geda û zengîn
Têkel hemû dêne rêzê rengîn

4936. Pêş destê Xudê xû radiwestin
Ber emrê wî cumle dest bi destin

4937. Royê hemîyan li yek mekan e
Gûtna hemîyan bi yek zuban e

4938. Ew êkî dinasin û dizanin
Her bû wî gudarê qelb û can in

4939. Ew cumle dibin çu ṭaqê dîwar
Yek dî digirin hemû şirînkar

4940. Her yek bû heman dixwazî mehder
Ya Reb tu evan ʿefû ke yekser

4941. Binvîse heman ji piṛṛ kemalan
Min jî bide xaṭira hevalan

4942. Faydey diketin her êk ji yaran
Zêtir ʿemelê xû ṣed hizaran

4943. Lewṛa we dibêt resûlê ummet
“Her kes biketin nivêj cemaʿet

4944. Xêra wê bi bîst û ḥeft û hêj e”
Gel yê bi tinê diket nivêje

4945. Terka vê cemaʿetê gunah e
Îlla bû kesê ʿuzir penah e

4946. Muslîm ji Nebî we daye ferman

Ey em hemû dem fîda û qurban

4947. Gû hate nikê zelamekê kuṛ
Mala wî li mizgetê hinek dur

4948. Gû: Ey tu peyemberê Xuda yî
Her rojê du ca bibim fîdayî

4949. Ez kuṛe me lew ji ḥalê piṛṛ êş
Bû mizgetê min çu nîne deskêş

4950. Ruxset me heye eger di xanî
Ferḍêt xû bikem ji cerg û canî

4951. “Madem we ye gû çi qeydî nîne”
Ew rabû biçîte mal di ḥîne

4952. Gazî kirevê Nebî :“Erê yar
Guhdarî dikey tu bangî her car”

4953. Wî gûtî: Belê, gûtî peyember
“Pa lazim e bêy cemaʿetê her”

4954. Madem bû evî nebûye ruxṣet
Bû terkê cemaʿetê di mizget

4955. Pa ew çi dibên di xûş û çav ṣaẋ
Roniştî di xanî û rez û baẋ

4956. Wan guh li muez̠z̠inî durist e
Ew dibne keleş giran û siste

4957. Şeyṭan xû dibît hevalê wane
Nahête cemaʿetê ji cane

**Ḥukmê Nivêjnekerî**

4958. Meʿlûm e di Muslîm û Buxarî
Ferman kirîye resûlê Barî

4959. “Emrê me diket Xudê bi kujtar
Gel ʿalemê ta bi dînî îqrar

4960. Ew şehde biden bi z̠atê ekber
Bawer jî biken ku ez peyember

4961. Ew ferḍê nivêj biken bi kame
Ew malê zekat biden temame

4962. Her kes we biket dibît emîne
Êmin ji ser û ji mal û xwîne”

4963. Istun e nivêj bû dînê îslam
Hem cisr e zekat bû jînê îslam

4964. Lew ser dibirît şeṛîʿtê pak
Her çî neket û nedet ewan çak

4965. Yek ferḍî kesê neket bi qestî
Ta weqtê cemʿi diçît duristî

4966. Nîvro ku mesel ḥeta bi êvar
Hem weqtê çu nekir siyehkar

4967. Dê bêjne wî tewbe ke ve care
Carek dî newek bikey ve kare

4968. Êka dî nekir wî xanewêran
Dê ser bibirin ji wî bi şîran

4969. Sulṭan dikujît bi ḥedd cewanî
Ger ew neketin ji leş giranî

4970. Wer ew neketin ji rahê înkar
Dê wî bikujin ku êk ji kuffar

4971. Her kes ku terik biket nivêje
Ya Reb wî ʿumir nebît dirêje

4972. Qedrê wî kesî ne wek bizanî
Ṣed tuf wî li çav û ruḥ û canî

4973. Bes nîne dibêt resûlê piṛṛ şan
Beynê me û kafiran çi nîşan

4974. “Ma beynê zelam û şîrk û kufr e
Nê terkê nivêj e” hur bifikre

4975. Hindek we dibên ewêt ʿilim purr
Zur ʿaṣî ye ew nekafirek ḥurr

4976. Malik we dibêt şirîn kelam e
Teiwîl niye kafirek temam e

***

4977. Ṭahir bi serê qelem bibêje
Raweste ve qîṣṣe zûr dirêj e

4978. Mîʿracê resûlê pak û enwer
Nahête ḥisêbê neẓm û defter

4979. Ev çende bes e eger qebûle
Nek qarî ji wê bibit melûle

4980. Min rahê kitêb dirêj û dûr e
Zehrek dê bibêj Rîyaḍê Nûr e

**EZZEHRETUS̱ S̱AMÎNETU (KULÎLKA HEŞTÊ)**
**Fî Ẕîkrî Nîkahî Sewdete We ʿAîşete We ʿErḏî Nefsîhî ʿEla Qebaîlîl ʿErebî (Beḥs̱ê Înana Sewde û Aîşayê û Gehandina Deʿwa Xwe bo Hozên ʿEreban)**

**1. Nîkahû Sewdete Bîntî Zemʿetî (Zewaca Wî li gel Sewdeyê)**

4981. Çen paşî Xedîceya şirînkar
Mabû bê ḥerem resûlê muxtar

4982. Mala wî derê ʿeṭa û mêvan
Çen mudde ne servegêr û kaban

4983. Bê rewş e eger ji min dizanî
Kabanî eger nebît di xanî

4984. Lew ew fikirî divêt bihînim
Yek jin dî muʿînê jîn û dînim

4985. Pirsî li jinek bi ray û kare
Sewde kiçe Zemʿe bûye bare

4986. Ew bêwe jinek bû piṟṟ dîrayet
Laîq bû peyemberê hîdayet

4987. Ew yek bû ji ewwelê musilman
Wek mêrê kevin bi navê Sekran

4988. Hîcret kirî her duyan yeqîn e
Cara duwê bû Ḥebeş zemîne

4989. Ḥîna digerênve Mekke xake
Sekran dimirî bi canê pake

4990. Peyẋemberî marekir şirînkar
Paş dayke Xedîceya guherdar

4991. Deh sal bû ji hîcretê yeqîn e
Ev ʿeqd û zewace bûn şirîne

4992. Ew mabû digel peyemberê dîn
Piṟṟ qedr û kemal û ḥurmet û vîn

4993. Ta Sewde dibît ḏeʿîf û pîre
Kabanî peyemberê beşîre

4994. Hîcret digehişte pêncî û çar
Canê xû siparte şahê Ẋeffar

4995. Merqed di beqîʿe warê reḥmet
Ey ser wê hizar hizarê reḥmet

**2. Zewacû ʿAîşetu Bîntî Ebî Bekr (Zewaca Wî ligel Aîşayê)**

4996. Paş ʿeqdê nîkahê Sewde daye
Wî bestibû ʿeqdê ʿAîşa ye

4997. Pak ji ḥeseb û neseb bijar e
Kiç êkexelîfe yarê ẋar e

4998. Bûbekrê mezin yekem musilman
Deyka wê bi navê Ummû Rûman

4999. ʿAlî şîfet e çi ʿalî şan e
Ew êk ji bijareêt jinan e

5000. Piṟṟ ʿeql û kemal û piṟṟ hîdayet
Piṟṟ husn û cemal û piṟṟ dîrayet

5001. Meḥbûb e li nik wî piṟṟ evîn e
Nazdar e belê çi nazenîn e

5002. Hem gencê ʿilum û mahê taban
Êk bûye ji ʿalimêt şeḥaban

5003. Çendan ji şeḥab û tabʿîne
Wergirtine jê ḥedîs̱ û dîne

5004. Ḥafiẕ bû kelamê şahê Ẋeffar
Ḥafiẕ bû ḥedîs̱ê yarê muxtar

5005. Peyẋemberî marekir di Mekke
Şeş salî bû wî demî ne şekk e

5006. Wî xwastî û marekir di şewwal
Bû hîcretê hêj di mayî sê sal

5007. Wê mehr e ji dirheman çuwar ṣed
Sala dehe bîʿs̱eta Muḥemmed
***

5008. Sala du ji hîcretê yeqîn e
Taze veguhazt li pak Medîne

5009. Neh salî bû hêj ne ḥînê bûkan
Hêj larî dikir digel biçukan

5010. Ew mahe wesa bi navê şewwal
Ew taze gehişte bext û îqbal

5011. Zur xûş diviya resûlê ummet
Piṟṟ naz û ḏelal û rêz û ḥurmet

5012. Peyẋemberî hîç nekirye mare
Kiç bijlî ji ʿAîşa bijare

5013. Neh sal bû digel Nebî ḥeyate
Wê hejde bû sal wî kir wefate

5014. Hejdey remeḍan bû mir yeqîne
Merqed di beqîʿê nêv Medîne

5015. ʿUmrê wê gehişte şêst û şeş sal
Bû pêncî û heşt hîcreta ʿal

5016. Ṣed reḥmet û ṣed hizar riḍaye
Ser ruḥ û rewanê ʿAîşa ye

**3. ʿErḍu Nefsîhî ʿElel ʿErebî (Gehandina Deʿwa Xwe bo Hozên ʿEreban)**

5017. Meʿlûm e Nebî ji paşî mamî
Bûṭalibî zûr di dîn nekamî

5018. Ta mabû li piştî wî çu şêran
Lew kes bi wî keçrewî newêran

5019. Paşî ku diçû li vê cîhanê
Muşrik ji wî tal diken jiyanê

5020. Dîtin wî demî ku bê xudane
Furṣet ji xû ra didît ji cane

5021. Eṣḥabê di wî çi hey ne hindin
Ew hin jî hemû di derdemend in

5022. Ḥemze ûʿ Umer eger çî şêr in
Emma ku bi qewmekî diwêrin

5023. Xaşma ke nebît emir bi kujtin
Ku tirsê ji wan diken hu duşmin

5024. Hindek li Ḥebeş muhaciran ew
Ew her çî hebin nẹ ḥaḍir in ew

5025. Elbet dê biken digel peyember
Bê rêzî kesê neyar û bedker
***

5026. Qewmê wî hituve dil di qasî
Ew lazim e ẋeyrî kes binasî

5027. Mecbûr bû lewa li wan kinaran
Bû çen mezinan û harîkaran

5028. Lew çu bû hinek qebîle meşhûr
Ew belkî bibin bi dînî piṛṛ nur

5029. Her çendî Xudê bi xû muʿîn e
Nê ev sebebej hemû ji wî ne

5030. Madem ku cîhan e darê esbab
Bû dîn û cîhan neçar e esbab

**Xurucîhî Îleṭ Ṭaîfî (Çûna Wî bo Ṭaîfê)**

5031. Rabûye Nebî bi ray û texmîn
Bû wan ṭerefan bû deʿweta dîn

5032. Peyda bike belkî harîkarek
Bû Ṭaîfê ew diçît mubarek

5033. Zeydê kuṛê Harîs̱ey heval e
Wî nuṣretê dîn ji wan xeyal e

5034. Mazin sê hebû ne ehlê tebcîl
Mesʿûd û Ḥebîb û ʿEbdu Yalêl

5035. Peyẋemberî gût bi xûş zubanî
Ev dînê mubîn wekî dizanî

5036. “Tewḥîdê Xudê esasê dîn e
Tenha ye çi kes heval wî nîne

5037. Emrî diketin bi ʿedl û çakî
Caîz niye ẓilm û her nepakî

5038. Ez bû we dibêm ji bû Xudayî
Hun bibne muʿîn bi canfîdayî

5039. Feḍla we gelek mezin dibîte
Navê we ebed bi çak diçîte

5040. Xûş furṣet e ey seqîf ʿeşîret
Ey ehlê ceger xudanê ẋîret

5041. Xaliq didetin we xêr û ecre
Mazin dibitin we nav û qedre”
***

5042. Gava ku xilaṣ bû ev xîṭabe
Wan dave belê nexûş cewabe

5043. Êkî digûtî me nîne bawer
Barî ku tu kirbî pak peyember

5044. Êkê dî dibêt zuban şikestî
Ey tu bi neẓer me nadirust î

5045. Bijlî te nebûn Xudê me hîç kes
Îlla te biket peyember û bes

5046. Yê dîke dibêt bi ẕatê Barî
Nakem ji te ra ne medḥ û larî

5047. Ger dê we bî tu peyemberek ḥeq
Ḥeddê me niye bikem qisa req

5048. Wer tu we nebî ji dil temame
Ḥacet xû niye bi hîç kelame
***

5049. Peyẋemberî çen digût şirîne
Wan zêde dibû ʿînad û kîne

5050. Îman çi kesê bi wî neanî
Ney mêr û jin û ne pîr û canî

5051. Ew qelbê tijî ẋurur û qeswet
Zur zeḥmet e piṛṛ bibît ji ṣefwet[1]

5052. Hîvî ku neman resûlê piṛṛ nur
Rabuve biçît dixwazî distur

5053. Gûtî “We bi dîn neanî îqrar
Pa berze biken ji bû me ev kar”

5054. “Ehlê Mekehê ne wek bizanin
Ew zêde ji min bi kerb û jan in”

5055. “Hindê dî dibin bi dîn nebane
Hindê dî bi min diken tiṛane”

5056. Wan dave cewabê zivr û tunde
Wan gel wî kirin çi napesinde

5057. Berdanê biçuk û kerzelaman
Nakesbeçeyan û nanḥeraman

5058. Wan dane bi ber beran peyember
Ḥetta ku li Ṭaîfê kirin der

5059. Zeydê kuṛê Harîs̱ey heval e
Xû bû wî dikir wekî meṭale

5060. Wan dane berê li çar kinaran
Bew şêlkeberan çu ṭavî baran

5061. Bew renge ḥeta ji gundî çûn der
Zeydî li du sê cêyan şikest ser

5062. Peyẋemberê xûşevî û nazdar
Ew bû li du gûzekan birîndar

5063. Neʿlêt wî kirin ji xwunê ṣur e
Bê rêzî digel kirin çi zûre

5064. Ew lêvenebûn bi ṛenc û azar
Ta çûne rexê rezek bi naçar

5065. Baẋê du biran di xûş tebîʿ e
Ew ʿUtbe û Şeybe bab Rebîʿ e

5066. Çav lê bû ewan ku wan nefaman
Ev renge dikir bi van zelaman

5067. Lê kirne hewar ve hûn çi karan
Nakesbeçeyîn xû hu ne har in

5068. Ew her du diçûn kinarê bîstan
Bin sêbere mêwekê bêhin dan

5069. Roniştibû ṛehberê hîdayet
“Ya Reb me li nik te ye şikayet”

5070. “Quwwet me eger ḍeʿîf û jare
Esbab me eger di kêm û çare”

5071. “Pêş çavê kesan eger z̠elîl im
Min bess e tu naṣir û delîl im”

5072. “Ya Reb tu pitir heman Reḥîmî
Agahî bi ḥalê min ʿElîm î”

5073. “Her tu yî xudan feqîr û jaran”
Her tu yî şîfayê derd daran

5074. “Ya Reb bi çi kes dê min sipêrî
Bal duşminekî bi min biwêrî

5075. “Yaxud bi kesek biyanî û dûr
Qedrê me nezanî” ew ji ḥeq kûṛ

5076. “Bes tu bi riḍa bikey neẓer min
Guh nademe her çî tête ser min”

5077. “Emma me li ser dilî şirîn e
Xûşî tu bidey” di dîn û jîne

5078. “Bew nurê royê te ye me parêz
ʿAlem weku ronkirî dilawêz”

5079. “Karê du cîhan bi wî bikam e
Qehr û ẋeḍebê nekey li ba me”

5080. “Ney ṭaqet e ney çi ḥewl û quwwet
Îlla bi te ey xudanê seṭwet[2]
***

[1] Pend, şîret

[2] Xwediyê heybet, xwediyê mezinahî û hêzê.

5081. Ya Reb tu tinê dizanî ku ye
Behra ku te day ḥebîbê xû ye

5082. Ev gûte di vî deravê ṭeng e
Ev ṣebre û ev cefa ve reng e

5083. Ev ruḥe giranbuha û hîmmet
Ev cehde bi bêkesî û quwwet

5084. Ya Reb tu tinê dizanî çake
Kî laîqî ev meqamê pake
***

5085. Gava du biran we dît nefaman
Bedkarî digel evan zelaman

5086. Nazan û sefîh ji wan kirin dûr
Gûtin bi ẋulamê xû yê bispûr

5087. Rabe tu hinek ji tiryê taze
Bû vane bibe bi ʿîzz û naze

5088. Mandîne li bin siha vê darê
Bew renge me dil hate xwarê

5089. Rabûye ẋulam bi navê ʿEddas
Ew merdê ẋerîb û hem ẋerîbnas

5090. Hindek ji tirî cewan gehiştî
Bû wan dibetin ṭezî û şuştî

5091. Dana bi edeb li pêşî wane
Gûtî dê bixwun ji ṭîbê cane

5092. Des dayê peyemberî bi dilxwah
Wî gûtî “Bi navê pakê Ellah”

5093. ʿEddasî gûtî bi fehm û taze:
Ev gûte nîye di nêv Ḥîcaze

5094. Wî gû: “Tu ji gundê merdê çakî
Yunis kuṛê Mettî” piṛṛ ji pakî

5095. Girtî ʿecebê û gûtî ʿEddas
Yunis tu li kîve wî dikey nas

5096. Peyẋemberî gût: Bi zarê şekkir
Em her du birader în peyember

5097. ʿEddasî dema ji wî ve zanî
Bawer diketin ji cerg û canî

5098. Ew dest û piyan ji wî dibusît
Bew navê peyemberî dinasît
***

5099. Geryave bû nik xudanê baẋe
ʿEddasî j nuve bûye ṣaẋ e

5100. Çav lê bû ewan dema şirînkar
Têr maçî dikir wî destê nazdar

5101. Êkî he digût birayê xû ye
Ez bêm xelitand ẋulamê tu ye

5102. Gava digehişte nik ewane
Wan gûtê bi şeklê teʿnedane

5103. Bû hinde nezan û hin nefam î
Bû bûsî te dest û pê zelamî

5104. Bawerke gûtî ji min bizane
Çêtir wî niye li ser cîhane

5105. Peyẋember e ew ji bû Xudayî
Îman me heye bi canfîdayî

5106. Gûtin wî: Çira te zu bi zukir
Dînê te li dînê wî çi çêtir

5107. Gûtî çi dibên şukir ku ʿEddas
Ez bûme bi dînê ḥeq Xudênas
***

5108. Geryave Nebî bû Mekkeya pak
Wî dil bû ji Ṭaîfê çi ẋemnak

5109. Zanî ku Qureyşîyan xeber ew
Hindê dî dibûne derdeser ew

5110. Gû: Bes nebû Mekke çu kinaran
Em lazim e şil bikeyn bi daran

5111. Hu zanî dema resûlê Barî
Du Muṭʿîmê bab ʿEdî hinarî

5112. “Ser bextê te gû dihêmve male
Ta deʿwetê dîn bikem kemale”

5113. Gûtê tu kerem ke serfiraze
Kes nabî çi bêjite tu netaze

5114. Muṭʿîm şubehî diçît şirîne
Gel pake peyemberê emîne

5115. Gel wî bûne çen kuṛ û biraza
Xir piṛṛ ji çek û sîlaḥ û aza

5116. Ta çûne bû Mescîdu’l- Ḥerame
Geştîne xirabtirîn zelame

5117. Bûcehlî digûtî rûḥ nemayî
Tu bû çî li gel wî canfîdayî

5118. Tu tabʿî yan xudan emanî?
Wî gûtî: Xudan eman ji canî

5119. Gû qeydî niye ji bû te xaṭir
Em dê çi nebêjine Babê Ṭahir
***

5120. Ev şev ku Nebî dihate male
Paş vê sefera çi tirş û tale

5121. Bû nîveşevê ji xew helista
Pêş destê Xudê xû radiwesta

5122. Qurʾan di nivêjê ew dixwînî
Bew dengê we xûş û bew şirînî

5123. Ḥeft kes ji ecinne êt Niṣêbîn
Guhdarî kirin peyemberê dîn

5124. Guhdarî kirin hinek ji Qurʾan
Wê gavê heman dianî îman

5125. Çubûn Yemenê ji bû ziyaret
Wan vê seferê çi kir tîcaret

5126. Bû qewmê xû ew diçûnve rengîn
Guhdarî gûtin biken ji mizgîn

5127. Guhlêbume van ʿeceb kîtabek
ʿAlî luẋet û mezin xîṭabek

5128. Qet kes nediye kitêb di hûsa
Nazil bîye ew ji paşî Mûsa

5129. Emrî diketin bi ʿedl û pakî
Deskêş e bû rahê ṛast û çakî

5130. Ser zarê peyemberek munewwer
Ron kir wî jinû cîhan seraser

5131. Her kes bi wî bawer û ʿemeldar
Bê şek du cîhan dibîte qurtar

5132. Bawer çî neket ji xû xisar e
Ew ḥeşrê ẕelîl û şeṛmezar e

5133. Evroke ye weqtê kar û îman
Bê fayde ye wê rojê peşêman
***

5134. Carek digû Bûcehil bi larî
Ey ʿEbdî Menafî ken gudarî

5135. Peyẋember e ev ji bû we taze
ʿUtbeî gû: Belê bi serfiraḍî

5136. Kê pê nexûş e ji ma helistî
Peyẋember û hem melîk duristî

5137. Pê zanî peyemberê şefîʿe
Wî gûtîye ʿUtbe yê Rebîʿe:

5138. “Ew gûte te kir ji ẋîretê can
Bû xû bû ne bû xudanê Reḥman

5139. Bûcehl û qesem bi ẕatê Barî
Dûr nîne dibit cîhan te ṭarî

5140. Pîçek dikenî gelek bi zêmar”
Roreş dê biçî lîqayê Qehhar

5141. “Ey cumle Qureyşîyan bizanin
Pê naçî gelek we hêj bi can in

5142. Ger hingû nevêt ji dil ve şule
Dê xûş û nexûş biken qebûle”

5143. Wek gûtî peyemberê ename
Xir hatine cê ji wan temame

**Îla Beʿḍî Qebaîlîl ʿErebî (Ber bi Çend Hozên ʿEreban)**

5144. Ev renge resûlê piṛṛ feḍaîl[1]
Geryabû di nêv gelek qebaîl

5145. Carek diçî nêv qebîle Kende
Mazin bû Melîḥê derdmend e

5146. Çendî bû dixwunî piṛṛ hîdayet
Ger weʿẓ û neṣîḥet in çi ayet

5147. Lê fayde nebû bû wan nezanan
Îman çi neanî murdecanan[2]
***

5148. Her we diçitin qebîle Kelbe
Ew qewmê siyeh zemîr û qelbe

5149. Çendî xebitî resûlê serwer
Her êkî tinê nekirbû bawer
***

---

1

[2] Bi mecazî mirîyan

5150. Dîsa diçitin bû ev weẕîfe
Bû qewmê xirab Benû Ḥenîfe

5151. Çendî digûtî bi zarşirînî
Hun bû me bibin muʿînê dînî

5152. Behrek mezin û giran buha ye
Çî evru ji bû me canfîdaye

5153. Nê fayde nebû ne weʿẓ û Qurʾan
Vî qewmî kesê neanî îman

5154. Belkî wekî wan nebûn çi kes ew
Gel wî di zuban dirêj û zûrew

***

5155. Axir diçitin resûlê ummet
Bû nav Benû ʿAmiran bi deʿwet

5156. Ey gûtî ez im bi ḥeq peyember
Mizgîn ji kesê bi can wî bawer

5157. Qurʾan ji me ra Xudê hinarî
Dunya kete ruḥnîyê ji ṭarî

5158. Bawer çi kesê bi wî bihînî
Dê her du cîhan mezin bimînî

5159. Fexrek mezin e eger bizanin
Ger evro bû dînê ḥeq xudan in

5160. Êkî gû ji wan resûlê mextar
Ger em ji te ra bibîn fîdakar

5161. Ḥetta tu dibî xudan merame
Paşî xû didey me ev meqame?

5162. Wî gûtî: "Ve ʿaydî Xuda ye
Her ew bi xû ye" xudan ʿeṭa ye

5163. "Ez ʿebd û peyember im Xudê bes
Ez weʿde neşêm bidem ji bû kes"

5164. Pa gûtî ewan nekey xeyale
Em sîngî ji xû bikeyn meṭale

5165. Gel cumle ʿereb bikeyn neyarî
Bes da tu bijî bi şehreyarî

5166. Madem me nebît li paş te kare
Bû helbigirîn giranebare

***

5167. Her salê di weqtê ḥecc peyember
Da bêt ʿereban geda û mîrser

5168. Ev dîne bi ḥeq digûte wane
Ew belkî qebul biken ji cane

5169. Lê fayde ne bû wî çen digûtî
Bû qewmê nezan û xaneṣutî

5170. Mamê wî Ebûleheb hemû car
Dabêjî ji paş resûlê muxtar

5171. Guhdarî neken çi kes Muḥemmed
Seḥḥar û diruker û ʿemel bed

5172. Wî fikr e terk biken Menatî
ʿUzzayê giranbuha û Latî

5173. Her we dihinarte nav qebîlan
Ev renge diru ji mekr û hîlan

5174. Ṣed tuf li kesê dibîte dellal
Bû karê bed û ḥeram û îḍlal

## EZ-ZEHRETU'T-TASÎʿETU (KULÎLKA NEHÊ)

### Fî Ewwelî ʿErḍî Nefsîhî ʿEleyhî's-Selam ʿEla Enṣarî We Beyʿetî ʿEqebetî (Yekem Xwepênaskirina bo Enṣarîya û Her Du Peymanên ʿEqebê)

### 1. Suweyd-ubnuş Ṣamîtî'l-Ewsî (Sûweydê Kurê Ṣamitê Ewsî)

5175. Meznek ji Medîneya bi qedr e
Hate Mekehê bû ḥecc û ʿumre

5176. Meşhûr e Sûeydê Ṣamitê çak
Yek bûye ji ewsiyan şeṛefnak

5177. Hem law û xudan neseb bû ʿaqil
Meşhûr bû di nav ewan bi kamil

5178. Peyẋemberê dîn pesind û ʿalî
Bû deʿwetê dîn diçîte lalî

5179. Gûtê: "Tu bihîne ger bi rayî
Îman bi min û bi ḥeq Xudayî"

5180. Ev dîne cewan û zûr pesind e
Îslam e gelek qedir bilind e

5181. Her kes ku bihête ser vî dînî
Bê şek du cîhan ẓefer bibînî

5182. Guhdarî dikir Sûeydê hişyar
Peyẋemberî zûr bi cênegiftar

5183. Gû belkî ewa ku tu dizanî
Nik min hebitin digel cewanî

5184. Ew gûtî çi ye resûlê Reḥman
Gû ḥîkmet û ʿilmê pake Luqman

5185. Gûtî “Ji me ra hinek bixwune
Guhdarî dikem ji bû nimûne”

5186. Guh dayê dema gû: “Taze pend e
Nik min heye tazetir du hinde”

5187. “Qurʾan e çi muʿcîzu’l- beyan e
Hem nûr û çirayê du cîhan e”

5188. Gûtî ji me ra bixwun Sûeydî
Guhdarî bikem bi huşimendî

5189. Peyẋemberî bû hinek dixwunî
Emma bi çi lehce û şirînî

5190. Gava ku xilaṣ bû gût bi îman
Ev qewle şubihî qewlê Luqman
***

5191. Geryave Medîneya munewwer
Zur pê nediçû li wan dibît şeṛ

5192. Xwundarî bû beynê Ews û Xezrec
Çen mêje di ḥalekê qewî keç

5193. Rujek li Buʿas dibîte kuştar
Xezrec dikujin Sûeydê dîndar

5194. Xizmêt wî digûtî şek me nîne
Îslam bibû ew ji dil yeqîne

**2. Ebul Heyser Enes-îbnî Rafiʿîn el-Ewsî (Babê Heyserî Enes Kurê Rafiʿê Ewsî)**

5195. Hem hate Mekê di van deravan
Meznek bi xudan miruv û navan

5196. Bûlḥeyserê Ewsîyê bi ṭaliʿ
Navê wî Enes bû babe Rafiʿ

5197. Hindek wî digel ji pîr û gencan
Yek bûye ji wan Îyasê qencan

5198. Hatbûn ji Qureyşî yêt di gumrah
Ser duşminê Xezrecî mededxwah

5199. Çu lalî[1] peyemberê welatî
“Ey mamê Enes bi xêr tu hatî”

5200. Gûtî “Bû çi şûl tu hatî êre”
Gûtî: bû filan merame xêr e

5201. Gûtî “Te nevêt ji ew merame
Çêtir ji we ra bû xaṣ û ʿame”

5202. “Mizgîn ji ucaẋê ʿEbdê Eṣhel
Peyẋemberê ʿalemê me mursel”

5203. “Dûmayê peyemberan û hatim
Dellalê hîdayet û necat im”

5204. “Evro bû we ferset im bi dilxwaz”
Furṣet ku dihêt li ser neden baz

5205. “Bawer ku biken bi dînê îslam”
Ew dînê Xudayê pak û ʿellam

5206. “Xêra we gelek mezin dibîtin
Navê we li du cîhan diçîtin”

5207. Qurʾanê hinek bû wan dixwunî
Guhdare Îyas bi ser nixwunî

5208. Fama û bi ray û newcewan e
Wî dave cewab li pêş hemane

5209. Wî gûtî: Belê me ev meqame
Ṣed çêtir e lew kiçik meram e

5210. Bawer diketin bi ʿeqilmendî
Şehde didetin bi serbilindî

5211. Bûlḥeyserî çenge xîz hilanî
Havête Îyasê nûr di canî

5212. Şula te niye gû ev cewabe
Ney hatîne em bû ev ḥîsabe

5213. Geryaneve bû Medîne yekser
Zur pê neçu mir Îyasê enwer

5214. Xizmêt wî di dîn ku can siparî
Tekbîr he digût û zikrḛ Barî
***

5215. Her nuke diyar e qewmê Enṣar

[1] Def, nik

Dilnerm û xeberxûş in di hişyar

5216. Ney kelle req û xudan ẋurur in
Ney wek Mekîyan ji ḥeq di kuṛ in

5217. Ehlê şeṛef û şeṛefguzîn[1] in
Ṣaḥib kerem in ẋerîb hebîn in

5218. Peyẋemberî her bi van du caran
Hîvî hebû ew bibin ji yaran

**3. Îmanû Cemaʿetîn Mînel Enṣarî ʿAme (11) Mînel Buʿs̱etî (Bawerîînana Komeka Enṣarîya Sala Yazdê ji Pêxemberîyê)**

5219. Hatin Mekehê hinek ji Enṣar
Ew cumle di Xezrecî şirînkar

5220. Yek wan bû kuṛê zûrare Esʿed
Yek ʿEwfê kuṛê Ḥeris̱ şirînqed

5221. Ew her du hebûn ji neslê Neccar
Xal in ji bû Şeybe ceddê muxtar

5222. Rafʿi kuṛê Malikê şeṛefnak
ʿAmir kuṛê ʿEbdî Ḥaris̱ê çak

5223. Ewladê zûreyqî ev zelam in
Her du di xudan şeṛef meqam in

5224. Qutbe kuṛê ʿAmirî ji wan e
Nesla Selemey ewî nîşan e

5225. ʿUqbe kuṛê ʿAmirê hunerwer
Êk bû ji Benî Ẋenem çi mîrser

5226. Cabir bû ji wan xudan cih û cah
Babê wî bi navê ʿEbdê Ellah

5227. Êk bû ji Benî ʿUbeyde ew yar
Her ḥeft ji xezrecîyan bi ejmar

5228. Pîrûz bû sefer li wan bi carek
Bew dîtinê Eḥmedê mubarek

5229. Peyẋemberê dîn bi ʿîzz û naz e
Wî gazî kirin bû dînê taze

5230. Çen carê cwîyan[2] digûte wane
Ha weqtê peyẋemberê zeman e

5231. Nêzîke bihêt mezin peyember
Em dê bine peyrewêt wî yekser

5232. Dunya me dibît bi keyf û kam e
Dê tul ve bikeyn ji hûn temame

5233. Engûdikujîn bi dilmiradî
Wek qewmê S̱emud û qewmê ʿAdî

5234. Peyẋemberî kir ji wan neṣîḥet
Guhdarî dikir bi ray û dîqqet

5235. Gûtin: Eve dê bî ew peyember
Beḥs̱ê wî ji bû me cwî diken her

5236. Em çak e bi vî şirînzubane
Îqrarê bikeyn li pêş hemane

5237. Derḥal hemîyan dianî îman
Mesrûr bû Nebî û çî musilman

***

5238. Wan gûte peyemberî şirînkar
Qewmê me dewam bi ceng û kuştar

5239. Em Ewsî û Xezrecêt Medîne
Çen mêje şeṛr û nîzaʿi û kîne

5240. Pêk bînî eger Xudê bi reḥmet
Ser xaṭirê tu bi can meḥebbet

5241. Bê şek tu dibî li nik me sengîn
Pîrûz û giranbuha û rengîn

5242. Geryaneve ew ji bû Medîne
Her yek ji xû qaṣidek bû dîne

5243. Bû qewm û ucaẋê xû çû dellal
Beḥs̱ê vî Nebî gehişte her mal

5244. Êk êke ji wan dibûn musilman
Ta sal zivirî belav bû îman

**4. Beyʿetul ʿEqebetîl Ûla Senete (12) minel Buʿs̱etê (Beyʿeṭa ʿEqeba Êkê Sala Duwazdê ji Pêxemberîyê)**

5245. Ya Reb tu ḥekîm û piṛṛ kemal î
Qadir he tu yî tu Ẕulcelal î

5246. Zana bi xef î û aşikar î
Aga bi diyar û nadîyarî

[1] Xwedî rûmetên bijarte

[2] Cihû

5247. Şulêt te hemû bi ḥîkmet in ew
Lew hinde bi rêz û qîmet in ew

5248. Karê te ʿecîb û hur e ya reb
Navek te tinê şebûr e ya reb

5249. Her şulê ji bû derav û gavek
Her yek sebebek digel bizavek

5250. Dergek bigirî eger bi ḥîkmet
Êkê dî tu dê vekey bi reḥmet

5251. Çen mêje li Mekke çen ji sale
Ez dîne di ṛenc û ah û nale

5252. Her rojê peyember û ṣeḥabe
Ser dînî dixwun hizar ʿezabe

5253. Sengîn e eger çî zûr ve dîne
Emma li Mekê rewac çi nîne
***

5254. Gava ku Xudê îrade hatê
Bû dînî veket derê necatê

5255. Bîʿs̱et digehî duwazde sale
Bû Yes̱ribîyan bû ev kemale

5256. Dahateve mahê ḥecc û ʿumre
Cemyane ʿereb bi zumre zumre

5257. Hatin ji Medîneya munewwer
Enṣarî duwazde êt bi cewher

5258. Deh bûne di Xezrecî bi ejmar
Bes du ne ji Ewsîyan hunerdar

5259. Yek Esʿedê bab zûrare name
Meşhûr e bi nav Ebû Umame

5260. Hem ʿEwf û Muʿaẕ ku du şebab in
Efraw û Ḥeris̱ bi day û bab in

5261. Rafʿi kuṛê Malikî û Ẕekûwan
Babê wi ye ʿEbdê Qeysê bê can

5262. Ṣamit puserê ʿUbade meşhûr
ʿEbbasê kuṛê ʿUbade piṛṛ nur

5263. Êkê dî Yezîd xelîfê wan e
Wî S̱eʿleb e navê bab bizane

5264. ʿUqbe kuṛê ʿAmirê bijare
Quṭbe kuṛê ʿAmirê bikar e

5265. Ev her dehe Xezrecî ne yekser
Piṛṛ nav û nîşan û cah û cuher

5266. Bûlheys̱emê bab wî Teyîhan e
Ṣaḥib huner û qedir giran e

5267. Êkê dî ʿUweymê Saʿîdey pak
Ev her du ji Ewsîyan şeṛefnak
***

5268. Peyẋemberî dîn ku ev zelame
Nik ew ʿEqebe cihek bi nam e

5269. Pirsî: We çi ḥal e ey birayîn
Wan gûtî şukir bi keyf û şay în

5270. Sayey serê tu me bûyne îslam
Barî bi me da çi cah û înʿam

5271. Înayne derê ji wê ḍelalê
Dilzînde kirîn bi vê kemalê

5272. Em ber te di ʿaciz în di ẋemgîn
Muştaqî lîqayê tuy ne her ḥîn

5273. Em gel te dikeyn ji nurê îman
Beyʿet bi qerar û ʿeḥd û peyman

5274. Destê xû bi def me her di gave
Emrê tu dikey bi ser du çave
***

5275. Peyẋemberî kir digel hemane
Beyʿet wekî beyʿeṭa jinane[1]

5276. Yeʿnî: Ku Xudê di fetḥê Mekke
Wî beyʿetê ew dibît neşekk e

5277. Ew renge bû wan digût peyember
Bendêt wê beyan kirin serûber

5278. Wî gûtî “Bibên bi qelb û zarî
Em şirkê nekeyn bi ẕatê Barî”

5279. “Ney dizî û zîna ji pîs fîʿalan

[1] Bîata jinan. Di dîroka Îslamê de, "Bey'et-un Nîsa" (Bîata Jinan) navekî taybet e ji bo sondxwarina jinan a ji Pêxember re ku tê de hin şertên taybet hebûn.

Em qeṭ nekujîn ji xû tifalan”

5280. “Ney karê diru ne îftîrane
Nik xuve me çî nekeyn qisane”

5281. “Her emrê bikey eger durist e
Em taze bikeyn ji can û çuste”
***

5282. Peyẋemberî gû: Ji paşî beyʿet
“Her kes vê biket ji bû wî cennet”

5283. “Her çî ku bi vê neket wefaye
Emrê wî tinê li nik Xudaye”

5284. “Ger ḥez biketin ʿezab û ṛenc e
Wer ḥez biketin ʿeṭa û genc e”
***

5285. Pêẋemeberî gel ewan hinarî
Muṣʿeb puserê ʿUmeyrê qarî

5286. Qurʾanê ḥeta bû wan bixwunî
Wan fêr biketin uṣûlê dînî

5287. Muṣʿeb diçitin ji bû Medîne
Ewwel kese bûyî sefîrê dîn e

5288. Ya Reb çi pesind e ev sefîre
Bû neşrê vî dînê ḥeq beşîr e

5289. Ew çuye bi emrê pakê Eḥmed
Mêvanê kuṛê zûrare Esʿed

**5. Îslamu Seʿd-îbnî Muʿazîn we Useyd-îbnî Ḥuḍeyrî Seyyîdey Benîl Eşhelî (Musilmanbûna Seʿdê Kurê Meʿazî û Useydê Kurê Ḥuḍeyrî Mezinên Benî Eşhela)**

5290. Ev dîne ji paşî beyʿeṭa pak
Nêv ehlê Medîne pan[1] dibît çak

5291. Her yek ji cemaʿeṭa te zanî
Bû dînî xebat diken ji canî

5292. Esʿed diçitin digel wî Muṣʿeb
Bû xaniyê Benî Ẓefir şekir leb

5293. Kumbûne li wê hinek musilman
Muṣʿeb bû dixwunî weʿẓ û Qurʾan

5294. Pê zanî du mazinan ji ewwel
Her du ji ucaẋê ʿEbdê Eşhel

5295. Yek Seʿdê Meʿazê piṛṛ ji xêr e
Yê dîke Useydê bab Huḍeyr e

5296. Ew her du di mazin û bi ezman
Hêşta ku nebûyne ehlê îman

5297. Seʿdî digirît ẋeḍeb ji canî
Çu gûte Useydî nek nîhanî

5298. Zu rabe here evan zelaman
Lê têkde cemaʿet û kelaman

5299. Kuṛxaletê min nebaye Esʿed
Ez da bi xû çim bi wan ʿemel bed

5300. Rabûye Useydê dest bi şîre
Çubûye wê meclîsa munîre

5301. Gût Esʿedî bêje ev çi mêr e
Bû çî tu bi xû dihînye êre

5302. Hun fikrê we ye feqîr û jaran
Ser rêkê bibin bi ḥîlekaran

5303. Zu rabe herin li vî meqamî
Wer ne dê bidem we zûr nekamî
***

5304. Muṣʿeb gûtî bew zubanê şîrîn
Dê ronê demek emîrê mêrîn

5305. Guhdarî bike ji min cewane
Hindek ji Xudayê min qisane

5306. Pê xûş bû eger te nûr ʿela nûr
Wer ne ji te dûr û tu ji wan dûr

5307. Wî gûtî gelek cewan dibêjî
Ronîştî Useydê piṛṛ bi mêjî

5308. Muṣʿeb bi feṣaḥet û beyane
Berda bi beyanê dîn zubane

5309. Çendek wî digû kelamê Barî
Emma bi uṣʿûlê weʿẓikarî
***

5310. Gava ku Useydî ew di guh kir
Îman di dilê wî taze cih kir

5311. Gû taze dibêjî ey nîkûnam
Min bawer e ez ve bûme îslam

---

[1] belav

5312. Zu bû me bibêy nîşanê dînî
Gû: Şehde bi zarê dil bihînî

5313. Ẋusla xû bike bi cilkekê pak
Du rekʿe nivêj bikey ji dil çak

5314. Her wek wî gûtî diket di gave
Îslam bû tijî dil û hinave

5315. Rabû gû diçim bi her mekane
Seʿdî ji we ra dikem rewane

5316. Mêrek we ye ger bihênî îman
Xizmêt wî hemû dibin musilman
***

5317. Hel dûr ve Useydî wek dibînî
Ew sundê ji bû ewan dixwunî

5318. Wê hat û belê li dûr diyar e
Rengê wî ne şibhî rengê car e

5319. Seʿdî gûtî: Ha çi kir te ey yar
Gûtî: Me nedî ji wan çi yê xwar

5320. Wan fikrî cewan û karşirîn e
Wan ʿeyb û quṣurî qeṭ çu nîne

5321. Emma tu here ku min bihîstî
Qewmê Benû Ḥariṡî duristî

5322. Wan fikr e biçin bi kar û bar e
Esʿed bikujin kuṛê zûrare

5323. Rabuve Seʿid didem lez û bez
Gû: Ku we dibît meger nebim ez

5324. Derḥal wî çek û sîlaḥ û dibestî
Ew çu di hewarê wî bi çustî

5325. Ew çu ku ewan bi keyf û şa ne
Gû: Ḥîle Useydî kir nîhane

5326. Wî gûtî bi Esʿedê dilêre
Ger ber te neba nedatim êre

5327. Gûtin me dihên şeṛê te nayar
Lew hatîme ez bi lez di hawar
***

5328. Muṣʿeb gûtî: Ey emîrê sengîn
Dê ronî demek li nik me rengîn

5329. Ger başî te dî tu bigre taze
Wer xwarî te dî tu qeṭ nexwaze

5330. Ew bû wî dibêjî wek dizanî
Vî dînî bi çakî û cewanî

5331. Çendek bû dixwunî taze Qurʾan
Ta Seʿdî nerim dibît dil û can

5332. Gûtî me nezanî ta ve ḥîne
Ev dîne hu taze û şirîn e

5333. Ez taze ji wî dikem şirînṭam
Ez fexrê dikem bi dînê îslam

5334. Gû ez çi bikem bibêjî êdî
Wî gûtî wekî digût Useydî
***

5335. Geryave bû qewmê xû di nadî
Ḥaḍir bû Useydê dil bi şadî

5336. Wê gavê li qewmî kir bû gazî
Emma bi sirûr û serfiraḍî

5337. Gû ez çi me bû we ey ʿeşîret
Gûtin: Mezinek bi nav û sîret

5338. Pa[1] gûtî kelam ji min ḥeram e
Gel hingû çi kiçke û zelame

5339. Ḥetta ku neken ji canî bawer
Îman bi Xudê û bew[2] peyember

5340. Rawî ku dibêt: Bi ẓatê Ẋeffar
Wî qewmê ku hêj nebûye êvar

5341. Ney mêr û jinik neman di nêv wan
Ew taze hemû dibûn musilman

5342. Muṣʿeb zivirî digel wî Esʿed
Bû xanîyê xane xû yê emced

5343. Evro bi sebeb wî merdê hişyar
Îslambûne Eşhelî bi yek car

5344. Ew hat û bi xêr ji bû Medîne
Xêr û bereket bû wan yeqîne

5345. Ya Reb tu bidey wî luṭf û xûşî
Ser xaṭirê wîj ʿefû ke Şûşî

[1] Nexwe,îcar

[2] Bi vî

***

5346. Muṣʿeb li Medîne mave taze
Bew qedrê giran û ʿîzz û naze

5347. Karê wî neṣîḥet û nîda ye
Bû dîn û şeṛîʿetê Xudaye

5348. Ta sal zivirî bi ʿewnê[1] Settar
Îslambûne çen gelek ji Enṣar

5349. Ḥetta ku neman çi xanî xalî
Bê peyrewê dînê pak û ʿalî

5350. Bijlî sê qebîleyan seraser
Yek wan bi tinê neanî bawer

5351. Yek wan bi Benî Umeyye meşhûr
Waîl wekî Waqifî ji dîn kuṛ

5352. Guh dabû ewan nezanê millet
Bûqeysê bi navê babê Eṣlet

5353. Ew mane li ser wî dînê naḥeq
Ta Bedr û Uḥud diçûn û Xendeq

***

5354. Muṣʿeb ku ḥeta nihu sefîr e
Wêca digerêtve ew bi şîre

5355. Desturî dixwast ji Ews û Xezrec
Geryave li pêşî mewsimê ḥec

5356. Mizgînî didaye ḥeq peyember
Piṛṛ dîn bû Medîneya munewwer

5357. Ehlê wê hemû giranbuha ne
Derḥeq te belê çi canfîda ne

5358. Nêzîk e bihên bû xidmeta te
Çendek bû meramê beyʿeṭa te

**6. Beyʿetul ʿEqebetîs̱ S̱anîyetî Fîssenetî 13 Mînel Nubuwwetî (Beyʿeta ʿEqebeya Duyê li Sala S̱êzdeyê Pêxemberîyê)**

5359. Ḥîna ku belav bû dînê îslam
Nêv ehlê Medîneya nîkûnam

5360. Rabûne hinek ji qewmê Enṣar
Çûn Mekke bû nik ḥebîbê muxtar

5361. Çen kes ji bijareyêt di piṛṛ şan
Emma bi dizî li bed Qureyşan

5362. Ew çûn Mekehê ku ḥeccegahe
Pîrûz bî ewan ve çûn û rahe

5363. Peyẋemberî dîn bi keyf û şayî
Gel xuşxeberî û merḥebayî

5364. Gûtin me bi fîda resûlê dîn în
Me divê bi tinê te em bibînîn

5365. Wî gût: “ʿEqebe me xûş jivan e
Nîva şevekê li van şevan e”

5366. “Mîʿadê min û hewe bi teḥqîq
Ew şev ku du ye li rojê teşrîq”

5367. “Emma bi dizî ku kes nezanî”
Lewṛa çi pesind e sirnîhanî

5368. Ger bêt û Qureyşî ew bizanin
Aluzî diken ḥeta ditanin[2]
***

5369. Rabûn wê şevê hemû şirînkar
Her êk bi çi ḥîlekê bû qurtar

5370. Ew çûn ʿeqebe ku wan jivan e
Çavnêrê peyemberê zeman e

5371. Ḥeftê û sê kes ji wan zelam in
Du pakejin in di kameran[3] in

5372. Yek Mazenî ye Neṣîbe yar e
Babê wê Keʿb bi nav diyar e

5373. Esma ye ewa dî navşirîn e
Wê ʿEmrê ʿEdî ye kuṛ yeqîn e

5374. Xirbûneve xir durist û çustin
Da beyʿetê gel Nebî bibestin
***

5375. Mamê wî xeber ku zanî ʿEbbas
Her çendî ku hêj nebûy Xudênas

5376. Emma wî dizanî wefdê Enṣar
Hatîne bû beyʿetê fîdakar

[1] harîkarî
[2] Karîn, şîyan
[3] Bextewer, dilşad

5377. Pê xûş bibû kuṛbirayê dilber
Ev kare bibît meḥellê bawer

5378. Lew hat û digel Nebî bi naze
Vî ʿeḥdî ḥeta bibînî taze

5379. Peyẋember û mam digel nîhanî
Çubû ʿEqebe li ser jivanî

5380. Enṣarî hemû li wêrê cemyay
Ey hatî bi xêr ḥebîbê mewlay

5381. Ladabû gelî bû ev merame
Ev ʿeqde ḥeta bibît temame

5382. Ev beyʿete ger bibît temîze
Îslam dê jinû bibît ʿezîze

**Ewwelu Men Yetekelleme Huwel ʿEbbasu ʿEmmun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam (Yekemîn Axiftinker ʿEbbas Mamê Pêxemberî (s.l.w.)**

5383. Ewwel qiseker cenabê ʿEbbas
Wî danî ji bû meramê asas

5384. Gû: Ey gelî Ewsîyan û Xezrec
Ya Reb ku çi car nebin ʿemel keç

5385. Meʿlûm e li nik we ev Muḥemmed
Qedrê wî li nik me zûr e bê ḥed

5386. Em gerçî bi dînê wî nebanîn
Emma me ji dil ji bû xudan în

5387. Her kes ku digel wî fikrê xware
Wer babê me bît me ew neyar e

5388. Ya ez jê xeyal dikem yeqîne
Pê xûş e ewî bihêt Medîne

5389. Ger engûxudan xeber dimîn in
Her weʿdê diden bi cê dihînin

5390. Pîrûzî we bît ve yarê dildar
Fexrek mezin e bû qewmê Enṣar

5391. Wer engûdi dil di xav û sist in
Ezman di şirîn û nadurist in

5392. Hun evro biken ji bû wî teklîf
Ḥetta ku biket bû nik we teşrîf

5393. Roja dikevît deravê ṭenge
Hun ser wî neken dîfaʿ û cenge

5394. Ḥetta bikevîte dest neyaran
Wê rojê dibin ji şeṛmezaran

5395. Her evru neden çi ʿeḥdu peyman
Mêr şeṛm e ji qewlê xû peşêman

**Cewabul Enṣarî (Bersiva Enṣaran)**

5396. ʿEbbasî dema xilaṣ bû giftar
Gûtin: Tu cewan dibêjî Enṣar

5397. Wêca tu bibêje ey peyember
Her emrekê tu bikey li ser ser

5398. Her çî te bivêt bû xû bixwaze
Her çî te ji bû Xudê niyaze

**Kelamun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam (Axiftina Pêxemberî Silav lê Bin)**

5399. Peyẋemberî gût bi zarê şîrîn
Medḥêt evî dînê pak û nûrîn

5400. Ser dînî micid kirin ji canî
Bew weʿẓ û neṣîḥetê dizanî

5401. Çendek bû dixwunî taze Qurʾan
Ta ron ji ewan heman dil û can

5402. Wî paşî digût bi pakezarî:
"Enṣarî hemû biken gudarî"

5403. "Beyʿet dê digel we kem ve renge
Hun ser me biken dîfaʿ û cenge"

5404. "Ser mal û jin û biçuk cewane
Hun ser me divê biken wesane"

5405. "Beyʿet hu divê bibît temame
Hun taze neẓer biken kelame"

**Ewwelu Men Yeteqeddeme lîl Beyʿetî (Yekem Kesê bo Beyʿetê Diaxivît)**

5406. Peyẋemberê ro şirîn û ezman
Beḥṣê wî tinê şîfa û derman

5407. Gava ji kelamê taze ber bû
Ew meclîse xir di nurê wer bû

5408. Meznê meḥelê Berayê Meʿrûr
Destê wî digirt ji canê mesrûr

5409. Wî gûtî Qesem bi wî Xudayî
Ez batî heman dibêm tebayî

5410. Ku cengê dikeyn bi kerb û kîne
Ser ehl û biçuk û mal şirîn e

5411. Dê ser te bikeyn bi canfîdayî
Ḥetta di giyan me canê mayî

5412. Beyʿet bike gel me ey mubarek
Wellah me şeṛker în bi carek

5413. Navê me çuyî bi serfiraḍî
Em ehlê şeṛ în û nêzebazî

5414. Kerxa[1] me li nêv şeṛan diyar e
Duşmin me hemû ḍeʿîf û jar e

**Kelamu Ebîl Heyṯem-îbnît Teyyîhan (Axiftina Babê Heyṯemê Kurê Teyîhanî)**

5415. Bûlheyṯemê bab wî Teyîhan e
Zarê xû vekir bi xûş zubane

5416. Ey Qaṣidê Xaliqê cîhan tûy
Peyẋemberê axirê zeman tûy

5417. Izna te li ser bî ez bibêjim
Sirra di dilê xû da birêjim

5418. Her wek tu dizanî ey peyember
Peyman me digel cwîyan e yekser

5419. Em taze dê têk bideyn bi îman
Ew kevneqerar û pîsepeyman

5420. Ser xaṭirê tu û xaṭirê dîn
Ḥetta tu bihêy Medîne şîrîn

5421. Tu hatî eger bi ʿîzz û naze
Ḥetta tu bi wî bi serfiraze

5422. Maqûl û qewî bi quwweta xu
Tim giştî mirad û deʿweta xu

5423. Dubare bihêtve Mekkeya pak
Van yar û bira bi hêlî ẋemnak

5424. Meʿlûm me dibîn bi ah û ṛenc e
Çen talî û çu ji dest me gence

**Cewabun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam (Bersiva Peyẋemberî Silav lê Bin)**

5425. Ev gûte dema bihîst bi qencî
Peyẋemberî gût û ew girnicî

5426. Ma hûn ku xeyal dikem ji ḥalim
Ger yar bî Xudê we xûş heval im

5427. Ta mayme dibim di nêv Medîne
Xwuna min û hingû ferqe nîne

5428. Hun xir ji min in e jî ji enṣar
Dê pêkve bijîn Xudê me bît yar

5429. Dûstê we ki ye bi dûst dizanim
Duşmin we ki ye neḥez ji canim

**Kelamul ʿEbbas-îbnî ʿUbadetî (Axiftina ʿEbbasê Kurê ʿUbadey)**

5430. Gava ku Nebî veʿeḥd û peyman
Der hat ji zuban û dil bi îman

5431. ʿEbbasê kuṛê ʿUbade der gav
Yek bûye ji şareza xudan nav

5432. Ev beyʿete gû di dil nîhan e
Ger ser bigirît çi qed cewan e

5433. Ez çake bikem qisek pesinde
Vî ʿeḥdî bikem du hinde tund e

5434. Wî rokire wan heval û yaran
Gûtek me heye gelî gudaran

5435. Ey hûn hemû şareza bikar in
Zana û bi ray û huşîyar in

5436. Vê beyʿetê hûn çewan dibînin
Fikra xû biken cewan vexwînin

5437. Şulek mezin e eger bizanin
Ger hûn xû xudan xeber dizanin

5438. Peymane tinê bi ḥerb û kuştar
Gel qewmê ʿereb ji qewmê kuffar

5439. Ev kare eger nebû mubarek
Malê we telef biçît bi carek

[1] Çav tarî, bê hîsbûn.

5440. Ẋalib bibitin li ser we duşmin
Meznêt we hemû jî bêne kujtin

5441. Wê rojê ji wî bibin peşêman
Her evro digel neken çu peyman

5442. Şeṛmek mezin e tinê li nik min
Wê rojê biden bi destê duşmin

5443. Wer hûn xû xudan xeber dibînin
Şewqek di dil û ceger dibînin

5444. Mizgîn li we bît bi karê taze
Dê bin du cîhan bi serfiraze[1]

### Cewabul Enṣarî we Tetabîʿuhum ʿElel Beyʿetî (Bersiva Enṣaran û Beyʿeta Wan)

5445. ʿEbbasî ku dave xûş xîṭabe
Hemyan ji dilî ve gût cewabe

5446. Vî ʿeḥdî dikeyn ji canê germe
Her karê bihêt bila bi ser me

5447. Emma çi dibêjî ey peyember
Ev ʿeḥde eger me girt ser û ber

5448. Barî çi didet me ew bi reḥmet
Peyẋemberî gû: Neʿîmê cennet

5449. Hemyan digûtî ji dil di gave
Destê xû bide ku hîç nemave

5450. Êk êke digû bi navê Reḥman
Beyʿet dikirin bi ʿeḥd û peyman

5451. Ewwel kesê girtî destê Eḥmed
Serdare kuṛê zûrare Esʿed

5452. Ḥeftê û sê kes zelam bijare
Ta her du jinêt di namidare

5453. Pîrûz bî li wan ve cah û fexre
Ya Reb bide wan hizar ji ecre

### Neqbaul Enṣarî (Rêberên Enṣarîyan)

5454. Beyʿet ku temam bû piṛṛ ji kame
Hem gûtî peyemberê ename

5455. Çen kes me divên neqîb û serdar
Piṛṛ cah û kerem bû qewmê enṣar

5456. Dubare qisek dibêm bi wane
Ev ʿeḥde ḥeta bibît cewane

5457. Hun bû me ji xû biken diyare
Vê gavê duwazde kes bijare

5458. Yek gûtî ve ez Berayê Meʿrûr
Esʿed jî kuṛê zûrare meşhûr

5459. Yek Seʿdê kuṛê ʿUbadeyê pak
Ṣamit puserê ʿUbade mêrçak

5460. Rafʿi kuṛê Malikê xudan cah
Gel Îbnû Rewahe ʿEbdê Ellah

5461. Bûlheys̱emê bab wî Teyîhane
Munzîr kuṛê ....... ji wan e[2]

5462. Êkê dî Useydê bab Ḥuḍeyre
Wek Seʿdê Muʿaẕê piṛṛ ji xêre

5463. Ferman kirî serwerê ḥebîban
“Ey hûn gelî mazin û neqîban

5464. Ser qewmê xû hûn me xûş emîn in
Ser ʿehdê xû ta ku hûn bimînin

5465. Vî emrî ji min biken gudarî
ʿÎsa bi ṣ îfet me hûn ḥewarî

5466. Hem bû we e jî emîn kefîl im
Bû xûşîyê du cîhan delîl im

5467. Hemyan digûtî bi êk zubanî
Ey xir me fîda bi ruḥ û canî

5468. Ev weʿde me da bi iznê Barî
Her emrê bikey dikeyn gudarî

5469. Ser bûn û nebûn û xûş û naxûş
Emrê te ji can û dil bikeyn gûş[3]

5470. Bû emrê Xudê xû guh bidêrîn

---

Şuşî di destxetê da dîyar dike ku ev dere di dîroka 10.03.1381h (22.08.1961m) da nivîsandîye.[1]

[2] Di destxeta li ber destê me da ev dere ne hatiye nivîsîn lê di pirtûka hatiye çapkirî da wiha hatiye nivîsîn: “Êt dî me nezanî navê wan e”

[3] Guhdarîkirin, cîbicîkirin

Guftarê ḥeqî çu ney veşêrîn

5471. Kêmasî nekeyn di dîn çu caran
Bê tirsî ji lewmê lewmekaran

5472. Ser çavê me ye ve ʿeḥd û peyman
Ser destê te lê ji can û ezman

**ʿÎlmu Qureyşîn Bîşeyʾîn Mînel Beyʿetî (Pêhesyana Qureyşîyan bi Beyʿetê)**

5473. Ev beyʿete wan dikir nîhanî
Nik wan we ye kes bi wan nezanî

5474. Vê nîve şevê di gelyekê kuṛ
Ew çen ji Mîna û ʿalemê dur

5475. Hêşta we bizan temam nebûye
Ev razê nîhan û guftûgû ye

5476. Nageh kesekî li wan kinaran
Têtin ʿEqebe bû her çî karan

5477. Guhdarî diket hinek ji şulê
Wî gazî dikir bû ehlê dûlê

5478. Ey cumle Qureyşîyan hewar e
Hun werne Muḥemmedê neyare

5479. Kum bûne li dûr wî çen zelamek
Wan bestî li beynê xû kelamek

5480. Peyman dikirin hemû fîdakar
Ser ehlê Mekê bi ḥerb û kuştar
***

5481. Vî bangî dema diken gudare
Ew Ewsî û Xezrecêt bijare

5482. Gûtin bi Nebî nekey xeyale
Em sundê dixwûyn bi Ẕulcelale

5483. Vî ʿeḥdê mezin me naşkînîn
Ḥetta me bi can û hêz bimînîn

5484. ʿEbbasê kuṛê ʿUbade gûtî
Emma wî bi can û cergê şûtî

5485. Ez sundê dixwum bi ẕatê ekber
Ew yê tu fiṛêkirî peyember

5486. Ḥezkey ṣubehî bi iznê Cebbar
Em dê li Mîna bikeyne kuştar

5487. Ger yar bî Xudê bi tîr û şîran
Dê ser bibirîn bi tîr û şîran

5488. Ferman kire wan resûlê xêrê
Emrê me niye nihu bi vêrê
***

5489. Ḥîna bû sube li nêv Mînayê
Rabûn qureşî digel cefayê

5490. Hatin bû kinarê qewmê enṣar
Têkhelbûne ehlê dîn û kuffar

5491. Wan gûtî gelî bira û yaran
Ey ehlê Medîne û kinaran

5492. Zanî me şevê dî ev peyame
Îslambûne hûn hemî timame

5493. Anî bi Muḥemmedî we îman
Bestîn digel wî ʿeḥd û peyman

5494. Hun dê bene nik xû bû Medîne
Harî wî diken li ser ve dîne

5495. Cengê me diken bi can û male
Aya we ye ev peyame tale

5496. Meʿlûm e nê hûn hemî dizanin
Hun nik me gelek bi ʿîzz û şan in

5497. Ser canê me zûr giran e êkcar
Em gel we bikeyne ḥerb û kuştar

5498. Cab dave ewan ji cerg û canî
Ew yêt ve peyame hêj nezanî

5499. Vê gûtê gûtin eṣil bû nîne
Bûn raḍî Qureyşîyêt bi kîne

5500. Zivrîn bû Medîne ehlê beyʿet
Bew ʿeḥdî we piṛṛ buha û qîmet

5501. Ûmêde ewan ji şahê ʿalem
Helbî di Medîne mahê ʿalem

5502. Ẕulhicce diçît meha muʿeẕẕem
Hem burî ṣefer ji paş muḥerrem

5503. Rojêt di serê rebîʿê ewwel
Hîcret dê biket resûlê ekmel

***Hîcretul Eṣḥabî Îlel Medînetî (Koça Sehabîyan bo Bajarê Medîneyê)***

5504. Zanî ku Qureyşîyan yeqîn e
Îslambûne zûr di nêv Medîne

5505. Fikra xû kirin di qewmê enṣar
Ew dê bû Nebî bibin fîdakar

5506. Dûr nîne dumayê biçte wêrê
Gel yar û bira digehne xêrê

5507. Dubare divêt bi qehr û êşan
Eṣḥabê di wî bikeyn perîşan

5508. Girtin ẋeḏebê ji canê ṭarî
Deshavête ve nexuşekarî

5509. Wan zêde kirin ji ṛenc û azar
Vê carê nerengê ewwelî car

5510. Çen sale hinek ji ẕilm û kîne
Hîcret kirîye Ḥebeş zemîne

5511. Evro dê çi ken ṣeḥabe dîsan
Ber destê ewan pelîd û pîsan

5512. Yan ew dê qebul biken ve kare
Yan dê bû xû bar biken neçar e

5513. Her rojê pitir diken ji şîddet
Ew qewmê wesa bi kîn û ḥîddet
***

5514. Peyẋemberî zûr kirin xeyale
Bû ḥalê nexuşê wan hevale

5515. Wî zanî Medînî piṛṛ bi dîn in
Ehlê kerem û ẋerîbḥebîn in

5516. Wî gûte ṣehabîyêt şirîne
Çî ḥezke bila biçît Medîne

5517. Êk êke herin newek bi kûmel
Ta fikrê neken Qureyşî yek hel

5518. Çûna xû ji wan biken nîhanî
Belkî ku çi kes ji wan nezanî
***

5519. Ewwel ji kesêt diçûy bi hîcret
Ew Bûselem e ji pêşî bey῾et

5520. Paşî wî diçît kuṛê Rebî῾e
῾Amir çi zelamekê şecî῾ e

5521. Leyla wî digel heval û kaban
Bûḥeṣme bi navê babê bê can

5522. Paşî wî xû çubû ῾Ebdê Ellah
Babê wî bi navê Ceḥş e hergah

5523. Bûeḥmedê nav bira hevale
Gel cumle biçuk û ehlê male

5524. Dergê xû kilîl diden dûmayî
Ew çûn û meded li nik Xudayî

5525. Cut cute û kit kite diçin der
Bû layê Medîneya munewwer

5526. Paş çu ῾Umerê ji dil şecî῾e
Gel wî bû ῾Eyaşê Burebî῾e

5527. Bûcehl û Ḥeṟṣ ku du bira ne
Ew gel wî bira ne bab cuda ne

5528. Çûn Yesrîbê ew li du ῾Eyaşî
Deyka te gûtî ji tu ve paşî

5529. Ser min bî ḥeram li şey bidem ser
Ney şuştin û cilk û berg û sêber

5530. Geryave ῾Eyaş bû xaṭira day
Çen mudde ji bû dilê wê ew may

5531. Ev renge diçûn ṣeḥabe naçar
Her rojê hinek li wê diken bar

5532. Ew yêt ku çuyîn Ḥebeş zemînê
Ew jî zivrîn ji bû Medînê

5533. Gîr bûye biçin kesan ve Ce῾fer
Ḥetta verevî bû cengê Xeyber
***

5534. Bûbekrê mezin xû kir bû ḥaḏir
Hîcret biketin ji erdê kafir

5535. Peyẋemberî gûte wî ku zanî
Ṣebrê xû bikêşe yarê canî

5536. Min hîvî heye li feḏlê Barî
Em pêkve biçîn bi tazekarî

5537. Bûbekrî gûtî li ser serê xu
Wey bibme hevalê serwerê xu

5538. Lewṛa du dewarê kuk bi dilxwah
Ragirtibû çar mehan ji bû rah

5539. Ḥîna ku diçûn ji bû Medîne
Yek jê dikirî resûlê dîne

5540. Xêra wê ḥeta bibît temame
Ew nûr û peyemberê ename

**7. Muameretu Qureyşîn ʿEla Qetlîn Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam (Pîlana Qureyşîyan bo Kuştina Pêẋemberî Silav lê Bin)**

5541. Fikrîne Qureyşî piṛṛ ji kîne
Eşḥabe ṭeẋer[1] ku çûn Medîne

5542. Dûr nîne nebîj biçîte wêrê
Bê şek dê ji wan bibînî xêrê

5543. Axir bibitin bi ʿîzzet û şan
Ḥalê me heman diket perîşan

5544. Çarek lê bikeyn bi fikr û raye
Furṣet me ḥeta bi destî maye
***

5545. Xirbûneve çen ji wan bijare
Çarek lê biken temam vecare

5546. Kumbûne li Darê Nedweya pîs
Meznêt di Qureyşîyan çu Îblîs

5547. Meznêt di qebîleyan vecemyan
Serdefterê wan e Babê Sufyan

5548. Bûcehlê kuṛê Hîşamê meşûm
Wek ʿUtbe û Şeybe êt di bêyum[2]

5549. Gel Îbnû ʿEdî Tuʿeyme nam e
Muṭʿîm puserê Ḥebîb temam e

5550. Yek Ḥerṣ e bi navê Babê ʿAmir
Yek Neḍr e wî Ḥerṣ e babê kafir

5551. Bûlbûxturîyê kuṛê Hîşamî
Hem hatî Ḥekîm kuṛê Ḥîzamî

5552. Kuṛ Eswed e yek Rebîʿe meşhûr
Wek Îbnû Xelef Ubeyyê dil kuṛ

5553. Ḥaḍir bû Munebbhê ẋereḍdar
Gel wî bû bira Nubeyhê bedkar

5554. Çendêt dî ji muşrikan bijare
Xirbûneve xir di daẋedare

5555. Şeyṭanê mezin dihate nadî
Ustadê xirabî û fesadî

5556. Şûret beşeṛ e û pîremêr e
Gû: Necdî me evro hatme êre

5557. Min zanîye hûn bi şûl ceman e
Lew hatime meclîsa girane

5558. Pîrek mezin im bi ray û tedbîr
Nêv ray û meşûretan bûyîm pîr

5559. Meclîs kemilî ji ehlê xuburet
Wer seyrê bike tu pîs meşûret
***

5560. Wan gûtî: Eger bihêt Muḥemmed
Ew biçte Medîneyê şirînqed

5561. Eşḥabê di wî li wê di zûr in
Enṣarî ji bû di bê quṣur in

5562. Bestîne digel wî ʿeḥd û peyman
Dê ser wî biken ji can û îman

5563. Xaşma wekî ew me nasî çak e
Ezman wî şirîn û ro çi pak e

5564. Çen ṣabr e çen pişîdirêj[3] e
Xûş naṣiḥ e lê çi tazebêj e

5565. Dûr nîne ku Yesrîbî bi carek
Bên bû şeṛê Mekkîyan tedarek

5566. Zanîne ewan me gel Muḥemmed
Çen cewr û cefa me kiriye bê ḥed

5567. Ew bên bû şeṛê me hu fîdakar
Nê tul li me dê veken hizar car

5568. Her hîç nebî ew diken me nakam
Rêkê digirin li ser me bû Şam

5569. Her wek me digel peyemberê wan
Lê kirbîye kulb û qatîya nan

5570. Wî ʿEḥdê Şeḥîfeyê bibîre
Çen sal bû di nêv gelî feqîre

5571. Çen daye me ber wî ṛenc û birse
Du hinde diden me birs û tirse

[1] Bi meʿna hemû pêkve
[2] Bêqidoş, bêoxir
[3] Bêhnfireh

5572. Em çak e bi ray û guftûGû ye
Çarek lê bikeyn ḥeta ku zu ye

**Reʾyu Ebîl Buxturî (Nêrîna Buxturî)**

5573. Bulbûxturî gû me zanî tedbîr
Dê hebis bikeyn bi qeyd û zincîr

5574. Nêv xanîyekê ku der vebestî
Ḥetta bi ebed ne can û hestî

5575. Necdî gû: Evê neken gudare
Lewṛa we dibîte jehremar e

5576. Xizmêt wî di pêhesin bi naçar
Dê bînine derê eger bi kuştar

***Reʾyu Hîşamîn (Nêrina Hîşamî)***

5577. Hem gûtî Hîşamê dûr ji xêre
Ya çak we ye der bikeyn ji vêre

5578. Bû ʿerdekê dûr bila biçîtin
Qewmê me ji wî xilaṣ dibîtin

5579. Hem gûtîye Necdîyê mehûle
Ev reiye jî min ne pê qebûl e

5580. Ew dê biçitin bû yek qebîle
Dûr nîne li wê bibît celîle

5581. Xaṣma we dibên ku xûş zubane
Piṛṛ ʿeql û kemal û piṛṛ beyane

5582. ʿAlem dê ji wî biken gudarî
Mazin dibitin bi ḥukimdarî

**Reʾyu Ebî Cehlîn (Nêrîna Ebû Cehlî)**

5583. Bûcehlî digû şebîhî iblîs
Reiyek me heye bi cayê teqdîs

5584. Çare eve ye biken diyare
Her qewmekî lawekê bijare

5585. Her êkî bi destî şîrekê çak
Pêkve bikujin bi kes neken bak

5586. Xuna wî belav dibît di gave
Nav cumle ʿeşîreêt bi nave

5587. Xizmêt wî neşên şeṛê hizare
Dê raḍî bibin bi xun neçare

5588. Em taze dibîn ji wî ve rizgar
Dînê me ʿezîz dibît wekî car

5589. Reiya xû dema wî kirbû teqrîr
Necdî eve ye gû ray û tedbîr

5590. Her çare ew e wekî te gûtî
Lazim dê biken bi cergê ṣutî

**Îcmaʿuhum ʿEla Reʾyî Ebî Cehlîn (Razîbûna Wan li Ser Nêrîna Ebû Cehlî)**

5591. Derḥal hemiyan vebestî peyman
Derdê me bijil vê nîne derman

5592. Çen law û ciḥêl dihel bijêrin
Wê gavê li du heman dinêrin

5593. Ev lawe hemû bi keyf û şayî
Tim weʿde diden bi canfîdayî

5594. Em vê şevê dê biçîn bi kîne
Dê wî bikujîn di nêv nivîne

5595. Dilxûş bûne xir bi ev niyaze
Şula me gûtin temam bû taze

5596. ʿUmrê wî diyare bûy temame
Ev şev diketin ji mergî ṭame

5597. Dînê wî digel di kefte kaxê
Dê pêkve biçin ebed bû axê

5598. Naçar digerênve xir muhacir
Dê hêneve ser vî dînî axir

5599. Dubare dibîn Qureyşîyêt car
Ser dînê kevin bi quwwet û kar

5600. Dê Lat û Hubel bibinve ẕîşan
Wek pêşî dibîn bi rêz û nîşan

***

5601. Eṣḥabê sîyer di piṛṛ dîrayet
Ev qîṣṣe diken temam rîwayet

5602. Mîn cumle ji Beyheqî xebernas
Wê hatî xeber ji Îbnû ʿEbbas

5603. Enfale ji ṣûretan dibêjî
Ev qîṣṣe bi kuṛtî û dirêjî

5604. Iblîs ne muḥal e bêt eger ew
Wek Necdî di ṣûretê beşeṛ ew

5605. Carek dî jî çu bû nik Qureyşan
Ta xistine ḥalê zûr perêşan

5606. Ḥîna li Bedir dibûye cenge
Ew çubû bi çustî û çelenge

5607. Wek Mudleciyek bi nav Suraq e
Piṛṛ ḥîle û mekir û piṛṛ nîfaq e

5608. Hun herne şeṛê wî qewmê nayar
Kes nîne bişête hûn bi kuştar

5609. Ez bextî didem li xir Kînane
Êmin we bibin ji mal û cane

5610. Roja bû Bedir diçûn seraser
Du leşkerê wan dibûn beraber

5611. Şeyṭan direvî di kax û meydan
Hêlaneve ew di ḍerb û lêdan

5612. Wî gûtî çi şûl bi hingû nînim
Nej hingû diyar e ya dibînim

5613. Ney zanî kesê ji wan di ḥîne
Îblîs bû ne Mudlicî yeqîn e

5614. Ḥetta ku hinek dibûn musilman
Wan piṛṛ bû dil û ḍemîr ji îman

5615. Ev ayete wan digût ji Enfal
Wan zanî jinû ḥeqîqeta ḥal

**Îxbarullahî Teʿala Nebîyehî bîhazîhîl Muameretîd Denîyyetî (Agehdarkirina Peyẋemberî ji Alîyê Xwedê Derbarê vê Pîlana Pîs)**

5616. Ev care ewan dikir ji ṭarî
Ageh ne ji kar û barê Barî

5617. Neyzanî ewan Xudayê ʿalem
Ev ẕate kirî çirayê ʿalem

5618. Her ew wî xudan û harîkar e
Bê fayde ne mekir û ray û çare

5619. Wî her çî bivêt dibît yeqîne
Emrê wî çu ca çu red bû nîne

5620. Reiya xû dema kirin muekked
Ku ev şeve dê kujin Muḥemmed

5621. Cibrîlî bi lez dianî ferman
Tedbîre Qureyşîyan û peyman

5622. Ew da te girêbiden di xanî
Ḥetta tu dibî berî ji canî

5623. Yan da ji weṭen te derbider ken
Yan dê bi şîrî kerbiker ken

5624. Ev şev nenivî di nêv nivîne
Çare te bijil revînê nîne

5625. Emrê te diket Xudayê ekber
Hîcret bû Medîneya munewwer

**Xîtamur Rawḍatîṣ-Ṣanîyetî (Dumahîka Mêrga Duyê)**

5626. Ey pakebirayê xwundeware
Piṛṛ ʿîşqê xû nameya bijare

5627. Ev “Rewdeê Du” cewan te zanî
Wer Çîmenê Sê bibîn ji canî

5628. Ev çîmene çen ji dil şirîn e
Seyrangehê can û ẋemrevîn e

5629. Jîn û eṯera resûlê ummet
Dê bû te bibêm ji rojê hîcret

5630. Karê wî di nêv Medîneya pak
Ẋezwêt wî digel wî qewmê naçak

5631. Hel hîcretê ta bi fetḥê Mekke
Vî neqdî didem cewan li sikke
***

5632. Ya Reb tu bi deyme zûr yeqîne
Nazil bi dilê me key sekîne

5633. Luṭfê tu bikey bi harîkarî
Da neẓmê bikem durr û mirarî

5634. ʿEwnê tu bidey digel sirûre
Da taze bibêm Rîyaḍê Nûre

5635. Ṭahir te ḍeʿîf û piṛṛ gunah e
Eḥmed me şefîʿ û ew penah e

5636. Ûmêde ʿefû bikey bi reḥmet

Ser xaṭirê vî resûlê ummet[1]

[1] Qismê duyêm ê Riyadê Nur temam bûye. Niha dê qismê ji hîcretê heta fetha Mekehê destpê bike.

**BÎSMÎLLAHÎRREḤMANÎRREḤÎM**
Huwellez̄î ersele resûlehu bîl huda we dînîl heqqî lî yûẓhîrehu ʿeled dînî kullîhî we kefa bîllahî şehîda (*Ew e, yê ku Pêxemberê xwe bi hîdayet û dînê heq şandiye, da ku dînê wî bi ser hemû dînan bixe. Li ser vê yekê Xweda bi şahidî bes e. (48-Sûreyê Fetih (28)*)

**ERRAWḌATUṢ S̱ALÎSETU (MÊRGA SÊYÊ)**[1]
Mîn hîcretîhî îla fethî Mekkete el-Mukerremete we fîha ʿîddetu ezharî (Mişexta wî ji mekehê û çen kulîlk tê da ne)

**EZ-ZEHRETUL ÛLA (KULÎLKA ÊKÊ)**

**Fî Hîcretîhî (Koça Wî)**

5637. Ya Reb tu xebîr û karedan î
Şulêt te tijî sirr in nîhanî

5638. Şeʾnêt te hemî bi ḥîkmet in ew
Bû ehlê dilan bi ʿîbret in ew

5639. Emrê te eger çî kun fekan e
Ṣebrê te gelek dirêj û pan e

5640. Şulan tu dikey bi bên dirêjî
Emrê me bi ṣebrî her dibêjî

5641. Bê sir nîye bê te ev nîẓame
Karê du cîhan bi wê bikam e

5642. Dunya ku te daye darê esbab
Naçar e ji bû me karê esbab

5643. Her çendî ṣebir li nik me tal e
Nê ʿaqîbeta wê pak û ʿal e

5644. Rojek tu ṣebir dikêşî mecbur
Rojek bi meramê dil çi mesrûr[2]
***

5645. Peyẋemberê mey bi ʿîzzet û şan
Çen mave li Mekkeyê perîşan

5646. Çen cewr û cefa û çen nexûşî
Çen qehr û bela û ẋuṣṣenuşî

5647. Wan çendî jê tal dikir ḥeyate
Hindê dî bû dîn dikir xebate

5648. Dîtin wî gelek ji karê bedkar
Êk êke ji bû dibûne tezkar[3]

5649. Dûstê xû ji duşminê xû nasî
Xizmêt xû didîn pitir di qasî

5650. Lêdan û civîn e ger tiṛane
Çen carê didîn ji destê wane

5651. Salêt di şeḥîfeyê nepirse
Çen dabûne ber wî ṛenc û birse

5652. Eşḥabê di xû didîn bi çavan
Asûde[4] nebûn ji wan çi gavan

5653. Nek salekê belkî sêzde sale
Burandî belê bi derdeḥale

5654. Ev ḥal e peyemberan qedîme
Ew Şeʾnê Xudayê mey ḥekîme

5655. Behrek mezin e peyemberînî
Elbet dê gelek cefa bibînî

**1. Sebebu Hîcretîn Nebîyyî (Sedema Koça Wî Silav lê Bin)**

5656. Ḥîna ku Xudê îrade hatê
Peyẋemberê xû bidet necatê

5657. Rizgar biketin ji dest neyaran
Qurtar biketin bi cumle yaran

5658. Hindek wî kirin bû dîn fîdayî
Ser zarê peyemberê Xudayî

5659. Ev behre dema ku bexşî Settar
Wî dabû ezel bi qewmê enṣar

5660. Wan besse li du cîhan ve fexre
Pîrûz bî li wan heman ve behre
***

5661. ʿEḥdê xû Qureyşîyan vebestî
Ev şev dikujin Nebî nivistî

---

[1]Berîya vê beşê Şuşî dîyar dike ku ev mêrga duyê 12.2.1381h (1961 miladî) da hatiye qedandin. Şuşî dîyar dike ku nexweşiya wî gelek giran bûye û halê wî gelek nexweş e.

[2] Dilşa, bikêf
[3] Bîranîn
[4] Aramî, rehet

5662. Çen law û ciḥêl ji her ʿeşîrek
Kumbûne hemî di peyt û zîrek

5663. Ba zûrê ciḥêl û rayê pîran
Gû: ser dibirîn ewî bi şîran

5664. Emma neghîne pîsmeram e
Derḥal bû Nebî dihat peyame

5665. Ev şev nenivî di nêv nivîne
Hîcret ke nîhan ji bû Medîne

**2. Keyfîyyetu Seferîl Hîcretîl Meymunetî (Awayê Koça Wî)**

5666. Şêyxê me Buxarî piṛṛ buha ye
Rawî bû dibêt ji ʿAîşa ye

5667. Rojek me di mal di nîve rojê
Ew rojegerim ji rengê dujê

5668. Nageh[1] me dî hate derkê xanî
Peyẋemberê axirê zemanî

5669. Babê me digû: Ji min yeqîn e
Hatina wî nihu belaş nîne

5670. Wî gûtî izin heye bû jurê
Babî gû: Belê çirayê nurê

5671. Mizgîn li te gû: Heval û yar e
Izna me bi çûnê hate xware

5672. Bûbekrî gû: Ey ḥebîbê mehtab
Ey min bi fîdayê tu bi day bab

5673. Dê min jî bikey ji bû xû hemṛah[2]
Xidmet ji te ra bikem bi dilxwah

5674. Harî te bikem bi can û malî
Ey êdî nebînî ṛenc û talî

5675. Wî gûtî belê welê nîhanî
Karê xû bike tu wek dizanî

5676. Babê me gûtî bi navê Ellah
Ragirtîne min serê çuwar mah

5677. Du kuke dewar di ṭewl û xanî
Bû vê seferê ji ḥubbê canî

5678. Yek bigre ji bû xû ey peyember
Bû rahê[3] Medîneya munewwer

5679. Gû: “Gerçî tu min xezur û yar î
Bê pare ne dê bibem dewarî”

5680. Ḥêştir jê kirî bi pare der dem
Ta hîcretê ecr û xêr nebît kem

5681. Ḥaḍir dikirin bi lez di gavê
Zadê seferê û dêmkê avê

5682. Ev şev dê biçin bi iznê Barî
Ya Reb tu tinê bû harîkarî
***

5683. Girtin bi kirê kesek ji kuffar
Zana û emîn bi rê û rêbar

5684. Navê wî cewan e ʿEbdê Ellah
Babê wî Ureyqîṭê bû gumrah[4]

5685. Du ḥêştirê xû didane destî
Rojek bû diyar kirin duristî

5686. Paşî sê şevan li pêş beyanî
Bû Ẋarê Ṣewir bihêy nîhanî

5687. Bûbekrî hebû emîn zelamek
Guhdar û şivan û xûşẋulamek

5688. ʿAmir bû kuṛê Fuheyre meşhûr
Ew merdê te nasî dil tijî nûr

5689. Her rojê merê xû bîne xwarê
Meḥsuṣî bû çan û xwarê Ẋarê

5690. Xû gîrke ḥeta dibîte ṭarî
Tu pez biçerîn li wî aqarî[5]

5691. Zêde bi dizî û cehdê kûşî[6]
Her şev ji me ra tu şîr bidûşî

5692. Bûbekrî kuṛê xû kirbû agah
Meşhûr e bi navê ʿEbdê Ellah

5693. Zana bû gelek bi fam û hişyar

[1] Ji nişka ve
[2] rêheval
[3] Rê
[4] Bereket, feyiz
[5] Zevî
[6] Ki ked û hewldaneka zêde/mezin

Her şev bi dizî bihêy ji bû Ẋar

5694. Kiryarê Qureyşîyan û tedbîr
Da bû me bikey beyan û teqrîr

5695. Emma tu bihêy wekî dizanî
Zêde ji hemû kesek nîhanî

5696. Ev renge digû kiça xû taze
Esma ye gelek bi xenc û naz e

5697. Her şev ji me ra tu bîne zadî
Emma bi dizî ji ehlê wadî

5698. Vê sirrê hemû biken nîhane
Her çen we biden bi ḍerb û jan e

5699. Kes pê nedizanî bijlî kaban
Zeyneb bû digûtinê Ummû Rûman

5700. Gel her du kiçêt giranbuha ye
Esma ye ewadî ʿAîşa ye

5701. Du ʿEbdê Xudê ku êk ji kuffar
Girtin bi kirê delîlê rêwbar

5702. ʿAmir ku ẋulam e hem şivan e
Kuṛmam ʿElî ye qewî kivan e

**Fî Leyletîl Hîcretî (Şeva Derketinê)**

5703. Bestîne[1] Qureyşîyan çi peyman
Ev şev dikujin resûlê Reḥman

5704. Çen law û ciḥêl bi kînê canî
Nûbê digirin bi şev li xanî

5705. Ew şev ku Nebî dikir tedarek
Pêncşembî ye rojeka mubarek

5706. Wî gût bi dizî ʿElîyê pismam
Sirrek me bi tu ye ey nîkunam

5707. Ev şev dê biçim ji bû Medîne
Batî me bi niv di nêv nivîne

5708. Duşmin te di nêv cihî bibînin
Bawer dê biken emîn dimînin

5709. Ev tişte emanet in li ba me
Her êkî bidey xudan temame

5710. Ew rabû şevê penah[2] bi barî
Bû xaniyê Ebû Bekir bi ṭarî
***

5711. Fermudeyê Îbnû Murdeweyhî
Ey - reḥmetu rabbena ʿeleyhî

5712. Neqlê diketin ji Îbnû ʿEbbas
Şîrînxeberê çu durr û elmas

5713. Ḥîna ku Qureyşîyêt Xudê gîr
Ser ṛehberê dînî kirbû tedbîr

5714. Çen kes bi çek û sîlaḥ nîhanî
Hatin ji Nebî bi zêrevanî[3]

5715. Wan fikr e bi nik ewan yeqîn e
Dê wî bikujin di nêv nivîne

5716. Derkeftî bi nîve şev peyember
Kuṛ bûne ji wî bi emrê dawer[4]

5717. Wî ax kire ser serê hemane
Qet kes nedî ew şehê zemane

5718. Peyẋemberî xef dixundî Yasîn
Neh ayetê ewwelî çi şîrîn

5719. Yek hatîye lalî zêrevanan
Gû hûn çi diken li van mekanan

5720. Gû: Munteẓirî[5] Muḥemmedî ne
Ev şev dikujîn di nav nivîne

5721. Wey wey gotî ew ji mêje çu der
Her yek ji we ax dikir bi ser ser

5722. Wan ser ji xû seḥ kirin temame
Ku ṛastî dibêjî ew zelame

5723. Qurtar bû Nebî ji mekr û ẋedrê
Ṭupîne[6] ewan di kaxê Bedrê
***

5724. Carek dî biçîn bi tazekarî
Bû taze rîwayeta Buxarî

5725. Bûbekr û Nebî bi şev nîhanî

---

[1] Pêkînan
[2] Pişgirî
[3] Nobedarî, çadêrî
[4] Dadwer, Ellah
[5] Bendewazî
[6] Sikitîn, mirin

Desturî dixwast ji ehlê xanî

5726. Bûbekrî çi hey di anî pare
Dirhem bi jimare pênc hizare

5727. Êkcar bi dizî li Mekke çûn der
Bû layê çiyayê Ṣewrê enwer

5728. Dê çin bû şikeftka çiyayî
Êdî bi tewekkula Xudayî

5729. Bû layê Yemen diçin temame
Halbukî sefer bû layê Şam e

5730. Peyẋemberê piṛṛ ji huş wira ye
Ev reiye didî giranbuhaye

5731. Da belkî xeyal neken neyaran
Kêm bêne bû layê Ṣewr û ẋaran

5732. Reiyek dî wesa dikir diyar e
Sê şev divê gîr bibîn neçare

5733. Meʿlûm ṣubehî Qureyşîyêt har
Rêyan digirin bi xû bi pisyar

5734. Ew dê bigerên li du me çuste[1]
Bê hîvî ḥeta bibin duriste

5735. Her çen ku tinê Xudê ḥesîb e
Emma di fer in ve newʿe lêbe[2]

5736. Lew merdê neşareza û nadan
Şulêt wî neçêdibin bi asan

5737. Nê fayde niye te zûr û şimşêr[3]
Ger tu nebî şareza bi tedbîr

5738. Roja tu ketî deravê ṭenge
Çarek tu bû xû bikey ve renge
***

5739. Bûbekrî dema li Mekke çûn der
Gavê dimeşît li pêş peyember

5740. Ḥetta ku bi nurî rêk çewane
Nek şexṣekî tuş bibin nîhane

5741. Gavê dimeşît li du çeleng e
Duşmin neku bên li du bi cenge

5742. Ḥetta digehîne dergehê ẋar
Gû: Ṣebrî bike ḥebîbê dildar

5743. Ez pêşî te seh bikem temamî
Nek têve hebît ji her nekamî
***

5744. Enware dibêt ji wan rîwayet
Nêv mebḥeṣê muʿcîzat û ayet

5745. Ḥîna ku diçûne jurê ẋare
Bûbekre Nebî çu nûbedar e

5746. Ser danî di kuşê xuşhevalî
Pîçek dinivît ji ṛenc û talî

5747. Bûbekrî kunek li qunebane
Wî girtî bi panîya piyane

5748. Tiştek ji kunê piyê wî gestî
Ew qeṭ ne livî ne kir çi sistî

5749. Rondik wî ḥeta ji çav xişîne
Bû royê muhacirê Medîne

5750. Hişyar bû ji xew resûlê mehweş[4]
Gûtî: “Te çi ye tu bûy muşewweş?”

5751. Gû min bi fîda bi bab û daye
Gestîme ji vê kunê ji paye

5752. Peyẋemberî tifkirê di ane
Êdî çi neman ne êş û jane

**Teftîşû Qureyşîn we Xeybetuhum (Lêgeryana Qureyşîyan û Şermezarîya Wan)**

5753. Zanî ku Qureyşîyan yeqîn e
Eḥmed revîye ji bû Medîne

5754. Rabûn di şepirze û perêşan
Wan dil ji kerb bi jan û êşan

5755. Wan kirne hewar û guftûguye
Rabin ku Muḥemmedê me çuye

5756. Çen law û ciḥêl ji her ʿeşîran
Rabûne bi dest ʿeṣa û şîran

5757. Ew bûne belav li çar kinaran
Ewwel dibezin bû rê û baran

---

[1] Çeleng
[2] Hîle

[3]
[4] Wekî heyvê

5758. Hindek dipeşîn li nîvê malan
Her çî digehin diken sualan

5759. Pirsîn ji ʿElî ewan ji rêve
Yarê te li ku ye çuye kêve

5760. Gû: Ez jî wekî we hîç nizanim
Dilşujê fîrqê wî ji can im

5761. Bûcehlê bi kîn û xwudperistî
Çu xaniyê Ebû Bekir bi çustî

5762. Gû: Kanê Ebû Bekir bibêjin
Xwuna xû bi destê min nerêjin

5763. Esmayê digû: Bi zarê tale
Derkeftiye mêje ew ji male

5764. Melʿunî şeqek weraweşandî
Derḥal li guhî guhar firandî

5765. Çen gef wî kirin bi napesindî
Wê her vedida cewab bi tundî

5766. Ey çen mezin î û çen nezan î
Nê şeṛm e bi şeṛ digel jinanî

5767. Kabanîyê mal û ehlê xan în
Tiştek ji Ebû Bekir nizanîn

5768. Elqîṣṣe diçûn çiya û çulan
Nûrîne nuwal û gelî û dulan

5769. Işkeft û kun û kujî û bin ber
Êk êke di seh kirin serûber

5770. Pirsîn li şivanekî li nik ẋar
Ew ẋare li jurê Eḥmed û yar

5771. Her çendî çu kes nedî şivanî
Vê ẋarê gû seh biken ji canî

**Nesîcul Enkebûtî We îwaîl Hemmameteynî we Tedellîyîş Şeceretî (Tevinbîrk û Her Du Hêlîn û Şorbûna Darê)**

5772. Hin guh didene ewî şivanî
Ezman wî şikestî gel didanî

5773. Serkeftine hin ji wan di gavê
Bû layê şikeftê ew di navê

5774. Ey cerg û hinav jê bêne xwarê
Ger ew bigehin bû derkê ẋarê

5775. Nêzîk bûne lew şikeftê dîtin
Nîşangehê çulî jê diçîtin

5776. Dîtin li derê wê ẋarê dapîr[1]
Raçandiye tevnê xû bi tedbîr

5777. Du kûtirê kûvî ser derê ẋar
Hêlîn bû xû çêkirîn şirînkar

5778. Ew kutire dûr ji avedan[2] in
Kê bawere wan du dergevan in

5779. Zêdey hemîyan ewan dî darek
Şîn bûye li derkê ẋar mubarek

5780. Ṭayêt wê belav bi vê qiyasê
Wê derkê şikeftê kirye asê

5781. Hindan gûtî: Êk herin bû jure
Cab dave Umeyye piṛṛ ẋurure

5782. Yek tevne ji dapîruk[3] diyar e
Pêşbûnê Muḥemmedê fîrare

5783. Neyzanî ewan ji çav û dil kuṛ
Roniştî li jurê menbeʿê nûr

5784. Bûbekre digel bi keyf û şay e
Hem ṣaḥibê rêye canfîda ye

**Keyfe Kane Halen Nebîyyî Esnae Teftîşûl Xarî (Rewşa Pêxemberî di Şikeftê da Dema Lêgeryana Qureyşîyan)**

5785. Napirsî ji min tu ey birader
Ḥalê wî çi bû resûlê serwer

5786. Gel yarê xû ew di jurê ẋar e
Kafir digerên li çar kinare

5787. Ger bêt û Xudê neket bibînin
Dê can ji giyanê wan derînin

5788. Serkeftine hin ji wan miraran

[1] Tevinbîrk
[2] Çêkirî
[3] Tevinbîrk

Bû layê şikeftê van du yaran

5789. Bûbekrî dema gulêbû denge
Wî zer dibû her di gavê renge

5790. Xir muyê leşê wî bûne niştir
Ber tirsê ḥebîbê şahê ekber

5791. Peyẋemberê pir̤r̤ ji can yeqîn e
Ew xerq e di zikir û fikrê dîne

5792. Çu rexve bi xef dibêjî ṣeddîq
Duşmin eve ye dihên bi teḥqîq

5793. Ew nuke bihên bû dergehê ẋar
Em dê çi bikeyn ji destê bedkar

5794. Wî gûtî “Ne tirse yarê ẋare
Barî ji me ra heval û yare”

5795. Carek dî dibêjî ey peyember
Ey min bi fîdayê royê enwer

5796. Ew hinde dihên û çin neyaran
Ser banê şikeft û çan û xwaran

5797. Ber pê xû neẕer biken bi çave
Bê şek dê me seh biken di gave

5798. Peyẋemberî gûte wî dubare
Xaliq ji me ra muʿîn û yar e

5799. “Ẕenna te çi ye bi ev duwane
Yê sê bî Xudê” bi ʿîzz û şane

5800. Ev newʿe qisêt di pir̤r̤ bi seng e
Neyxaṣ di ewan deravê ṭeng e

5801. Nîşanê cesaret û kemal in
Hem tekye bi luṭfê Ẕulcelal in

5802. Sakin bû Ebû Bekir dilê wî
Barê wî sivik bû ser milê wî

5803. Emma wî ṣehim di can heman e
Ber yar û peyemberê Xuda ye

**Fî Leyalîl Ẋarî (Şevên Şikeftê)**

5804. Peyẋember û yarê pak û ṣiddîq
Sê şev di şikeftê man bi teḥqîq

5805. Ew ʿEbdê Xudê kur̤ê vî yarî
Her şev lê dihate ẋar bi ṭarî

5806. Wî karê Qureyşîyan dizanî
Bû serwerê dîn digût rewanî

5807. Damînî li wêrê ta sipêde
Daçîtve digel nîhanê zêde

5808. Kes pê nedizanî wan neyaran
Sirran dibetin bû yar di ẋaran

5809. Esma xû kiça wî çen çeleng e
Şîvê dibetin bi şev ve renge

5810. ʿAmir çi şivanekê cemîl e
Her şev dibetin pezî bi ḥîle

5811. Zêde bi dizî wî şîr didûşî
Peyẋember û yarî têr dinuşî

5812. Lew beynê Qureyşî wek ṣeyê har
Geryan li hemû çiya û rêwbar

5813. Pisyar dikirin ji her kesane
Rêvîng e eger li çul şivan e

5814. Qet kes nedigû ji wan ve şûnek
Ney hîç eṯerek ne hat û çûnek

5815. Bê hîvî dibûn Qureyşî bê bar
Êdî dê biçît resûlê muxtar

**3. Muẋaderetuhul Ẋarî Îla Medînetîl Ensarî (Derketina Wî ji Şekiftê bo Bajêrê Enṣaran)**

5816. Ḥîna ku şeva sêyê seḥer hat
Ew ʿEbdê Xudê xudan xeber hat

5817. Ew hate şikeftê pêş beyanî
Ser weʿdeyê xû digel nîhanî

5818. Her çen wî demî ṣenemperist bû
Emma bû wefayê dildurist bû

5819. ʿAmir ku şivanekê bi rêz e
Pez dabû li durê mal hevêze[1]

5820. Ew wê şevê çu ji cerg û cane
Da ew sube bêt hevalê wane

[1] Hewşî

5821. Esma wê şevê ku şîv dianî
Ew jî vedima ḥeta beyanî

5822. Peyẋember û sê heval bi carek
Rabûne li pêş seḥer mubarek

5823. Êdî dê biçin penah bi settar
Bû layê Medîne piṛṛ ji enṣar

5824. Wan zadê rîyê û qurbê avê
Hatin dê girêbiden di gavê

5825. Emma çi nebûn werîs û bendik
Esmayê meger li piştê şutik

5826. Derḥal diketin du ker duristî
Yek zad û yekê dî av vebestî

5827. Wê gavê Nebî didayê mizgîn
Ellah du kemer didet te rengîn

5828. Lew rojê wê bûye navê taze
Ṣaḥib du kemer bi ʿîzz û naze

5829. Xuşrêberê wan e ʿEbdê Ellah
Zana ye û şareza bi her rah

5830. Peyẋember û yarê ẋar suwar in
Ew yêt dî bû pêt xû zûr bikar in

5831. Ew çûn û bi xêr li pêşî fecrê
Rêber çu rîya kinarê beḥrê

5832. Ew rêke ne zûr bi hat û çûn e
Ûmêde neken ji wan çi şune

5833. Çul berdibetin neçar ewan e
Her cayê kinarê avedan e

5834. Ev rêke ji ẋarê ta Medîne
Lê Îbnû Hîşam dibêt şirîne

5835. Çen carê li çul û çen di rêyan
Navêt di nuwal û gund û cêyan

5836. Ger dê te merame çak bizanî
Seyrê ke wê sîretê ji canî

**Suraqetubnu Malîkîl Mudlîcîyyî Fî Ṭelebîhîm**
**Suraqe (Kurê Malikî li Dûv Wan da ye)**

5837. Muşrik çi qeder meşîn perêşan
Teʿqîbê peyemberê mezinşan

5838. Çen çul û çiya û gund û rêwbar
Wan seh dikirin bi çendî pisyar

5839. Qeṭ jê nekirin çu şun û sûraẋ[1]
Hindê dî tijî dilî bû wan daẋ

5840. Bê hîvî dibûn neman çu çare
Gazî dikirin bû her kinare

5841. Her kes bikujît Muḥemmed û yar
Yan bû me esîr biket bi ejmar

5842. Bexşîşî dideynê ṣed ji ḥêştir
Her yek bî li ya dî çak û çêtir
***

5843. Ew Mudlecîyê bi nav Suraqe
Malik puderê di dil nîfaq e

5844. Ev gûte ji mekkîyan ku zanî
Agir ji ṭemeʿi wî berbû canî

5845. Roniştibû ew di nêv cemate
Nageh ku kesek bi lez dihate

5846. Gû: Çen ji zelam ji dûr me dîne
Qelbê me dibêjî wek yeqîne

5847. Hindek di peya û hin suwar in
Ew yar û Muḥemmedêt fîrar in

5848. Gava wî xilaṣ bû ev peyame
Wî geşte dilî yeqîn temame

5849. Emma wî digû di dil nîhanî
Êka we bikem ku kes nezanî

5850. Ez çak e bikem ji rêve tedbîr
Da bû me tinê bibît ve nêçîr

5851. Wî gûtî: Nexêr ewan e ew nîn
Min pêşî te ew bi çavê ser dîn

5852. Min dîne fulan kes û fulan in
Meqṣed ji filan cih û mekan in

5853. Ew mabû hinek li wê bi qestî
Paşî dibezîte mal bi çustî

[1] Bi soranî, esera birînê

5854. Wî gûte kiça xu: Ey kiçulê
Hespê me bibe fulane dûlê

5855. Des daye ruma xû çu nîhanî
Yek ehlê wê zûmê pê nezanî

5856. Çu geştiye hespê piṛṛ bikar e
Ew taze li wî dibît suware

5857. Nêzîk bû ji wan bi emrê Barî
Yek ṣetme bi wî dikir dewarî

5858. Wî des bire çendika xû taze
Falek ve dikir bû ew niyaze

5859. Înaye derê wî yek ji Ezlam
Wî nurê ne ew bû ya ewî kam

5860. Çavê wî ṭemeʿi we kir bû ṭarî
Fala xû wî qeṭ nekir gudarî

5861. Hespê xû dida li ẋar û tave
Bû ṣed şuturan bû kûr ji çav e

5862. Nêzîk biyeve bi emrê Cebbar
Ta çukî dewar di axê çu xwar

5863. Ew bû serûser dirêjî ʿerde
Ew çak e suwarê ser bi derd e

5864. Dubare deranî bûn wî ezlam
Hem hatî ewa nexûş û bê ṭam

5865. Wî taze hewar dikir: Eman e
Westa bû peyemberê zemane

5866. Bû xwastî duʿa ji kirdigare
Derhatî digel dukel deware

5867. Ev muʿcîze ta nedî bi çave
Ew ney bû ji pîs xeyalê xave

5868. Ev care suwar bû ser dewarî
Hat bû ṭerefê resûlê Barî

5869. Wî zanî di dil xû ev peyember
Axir dibitin emîr û serwer

5870. Wî gûtî: Tu ey mezin nîşan î
Luṭfa me ʿefûke min nezanî

5871. Wî gûte Resûlî: Qewmê tey bed
Çen serte ẋem û xebate bê ḥed

5872. Her kes te esîr biket çi bê can
Ṣed ḥêştirî ew diden bi erzan

5873. Engu[1] çi divêt ji tişt û zadî
Dê bû we bidem bi can û şadî

5874. Peyẋemberî gû: “Ne pêtivîn e
Bes navê me bû çu kes neîne”

5875. Gû: Baş e belê me yek niyaze
Namek ji eman bidey me taze

5876. Ger engûbûyîn bi ḥukimranî
Êmin me biken bi mal û canî

5877. Peyẋemberî gût hevalî ʿAmir
“Binvîse ji bû ji kevlệ ḥaḍir

5878. Ha bigre bû xû kîtabê rengîn
Hem bû te Suraqe pakemizgîn

5879. Rojek dê bihêt tu xûş û xendan
Du bazinê kîsrewî di zendan”
***

5880. Ew çûne bi çustî û nîhanî
Geryave Suraqe kes nezanî

5881. Her çendî Suraqe dîtî nîşan
Emma wî demî neanî îman

5882. Emma bi wefa bû ew zelame
Ney gûte çi kes wî ev peyame

5883. Paş Ẋezweyê Ṭaîfî yeqîn e
Ron bûne wî can û dil bi dîne
***

5884. Bûbekrî digû şirîn bi zare
Ḥîna ku me derketîn ji ẋare

5885. Ew şev me çuyîn bi lez bi tirse
Ta nîvru gehişt me ṛenc û birse

5886. Min dîtî çi sêberek li bin ber
Ferwê xû me danî bû peyember

5887. Razaye demek serûkê qencan
Pîçek dinivît ji germ û ṛencan

[1] Hewe

5888. Meşhûr e bi ʿilmî tenduristî
Xew lew demî bû giyan û hestî

5889. Zur baş e kesê bigêrî ʿadet
Her çen bî bilanê nîvê saʿet

5890. Nageh me didî li wê şivanek
Şexşek Qureyşî bû newcewanek

5891. Min gû: Tu kuṛê kî? Gû: Fulanî
Yek bû ji Qureyşîyan me zanî

5892. Min gû: Tu dikey bi can û xûşî
Hindek ji me ra tu şîr biduşî

5893. Evruke bûyîn ji bû te mêvan
Wey gûtî bila bi ser du çavan

5894. Şîr duşî bi destê xû di gavê
Hindek me ji avê kir di navê

5895. Min bir bû resûlê pakê Barî
Em gel wî heman me têr vexwarî

**Lîqauhum ez-Zubeyre Fî Rekbîn Mînel Muslîmîn (Dîdara Wan Digel Zubeyrî di Nav Komeka Musilmanan)**

5896. Paş nîvro diçûn li wî mekanî
Zur taze delîlê rê dizanî

5897. Gavê li rêyan û gav li çûlî
Ey ḥeq jê ḥelal bî wî delîlî

5898. Geştin li rêyê Zubeyrê ʿEwwam
Yê têteve lew tîcareta Şam

5899. Pîrûz bî li wan ve karewane
Geştin di rêyê ḥebîbê cane

5900. Gû: Kî ve diçî tu min bi qurban
Gûtî: bû Medîne şehrê xuban

5901. Hindek ji sipî libasê rengîn
Wî daye resûlê pak û sengîn

5902. Gel çendekî av û zad û nanî
Ew zadê ewî li Şamê anî

5903. Gû: Ey tu bi ḥeq peyemberê min
Tu taze biçî li ser serê min

5904. Paşî te ṣebir li wê nemane
ʿErdê tu nebî li min ḥeram e

**4. Îla Beytî ʿAtîketî Ummu Meʿbedîn el-Xuzaʿîyyetî (Ber bi Mala ʿAtîka Xuzaʿî)**

5905. Mabeynê Meke û Medîne zûr e
Lew ev sefere li wan bû dûr e

5906. Dîtin di rîyê gelek nexûşî
Talî û cefa û ẋuṣṣenûşî

5907. Wan gavê ji duşminêt xû tirs e
Gavê li çiya û çûlî birs e

5908. Rojek digehin Qudeydê gunde
Mandîn e wekî dipirsî hinde

5909. Çûn ber derê malekê edebkar
Zadek bikirin eger bû rêwbar

5910. Kabanî di malê Ummû Meʿbed
Ew piṛṛ bû ji ray û famê bê ḥed

5911. Wê ʿAtîk e navekê esîl e
Meşhûr e Xuzaʿe wan qebîle

5912. Wî gûtî: Qesem bi Ẕulcelal e
Tiştek me niye ṭeʿam di male

5913. Gerdê me heba bi ser du çavan
Qedrê wî li nik me zûr e mêvan

5914. Bêhna xû biden li nik me gave
Malxuyê me mêje çuye rave

5915. Peyẋemberî dî pezek di ṛeşmal
Girdar û lawaz û jar û bê hal

5916. Wî pirsî ji wê bi ʿîzz û naze
"Tu raḍî eger miha lawaze

5917. Ez taze bi destê xû biduşim
Hun nûşê diken e jî dinuşim"

5918. Gû: Min bi fîda bi bab û daye
Çen mêje çu şîr di wê nema ye

5919. Bînin bû me gûtî pirkemalî
Destê xû bi ser guhanî malî

5920. "Bînin ji me ra gûtî tirarek"
Wî piṛṛ kir û wan vexwar bi carek

5921. Wî paşî vexwar li du hemane
Hem piṛṛ kireve ji ew guhane

5922. Wan taze vexwar û wî dubare
Wî piṛṛ kireve bi lêv tirare

5923. Kabanî ji dûr cewan dibînî
Dil piṛṛ ji ʿeceb ji wan dimînî

5924. Bêhna xû diden li wêrê êdî
Rabûn dê biçin bi hêdî hêdî
***

5925. Desturî dixwast û wan wexer kir
Bû layê Medîneyê guzer kir

5926. Bûmeʿbedê malxû hat ji nêçîr
Aman wî didî di malê piṛṛ şîr

5927. Gûtî: Ve çi şîr e ev çi kar e
Ney bû me di malê şîrdare

5928. Wî gûtî: ʿEceb me dî bi çavan
Yek evro li min cewan bû mêvan

5929. Wê qîṣṣe ji bû dikir cewane
Bû Meʿbedî guh dida ji cane

5930. Weṣfêt wî gûtî bibê çi reng e
Kabanîyê gût bi taze denge

5931. “Ew zate me dî cewan bû bê ḥed
Navincî bû qameta şirînqed

5932. Çavêt wî di ṛeş biru kivan bû
Dêmê wî xire çu meh cewan bû

5933. Ney zûr qelew e ne zûr ḍeʿîf e
Şiklê wî diyar bû ew şeṛîf e

5934. Şîrînxeber e şekerzuban e
Piṛṛ xende[1] ye şibhî durdidan e

5935. Simbêl û ser û ridîn di şebreng
Rengê wî spî û ṣur e xûş deng

5936. Gerden spî û dirêj û taze
Sîngê wî çi pan e gencê raz e

5937. Gava kire piṛṛ weqar û sengîn
Gava qiseyan cewan û rengîn

5938. Gûtina wî ne kuṛt e ney dirêj e
Emma çi cewan e her nebêje

5939. Her kes wî ji ẋefletê bibînî
Heybet dikevîte can yeqînî

5940. Her çî qederek digel biwestî
Ḥubba wî dikefte can û hestî

5941. Royê wî wekî zuban şirîn e
Xûş tebʿ û dil e ne deqşikîn e

5942. Yarêt wî ji dil di emr û ferman
Her emrê dikir belê bi qurban

5943. Êdî çi bibînim ji wî mubarek
Weṣfêt wî neşêm bibêm bi carek

5944. Ez hinde ji wî xeber didem bes
Nabît û nebû ye şibhî wî kes”
***

5945. Bûmeʿbedî taze kir gudarî
Wî gû bi kemalê huşiyarî

5946. Ev şexṣe dibî bi ẕatê ekber
Nu rabî ji Mekkeyê peyember

5947. Ger min bidiya me danî îman
Ez gel wî diçûm ji kakila can

5948. Rabe dê biçîn ji bû Medîne
Bêy wî me nevêt cîhan û jîne

5949. Ew çûne Medîneya munewwer
Piṛṛ behre bi ṣuḥbeta peyember

5950. Wan ew peze ma bi xêr û xûşî
Her rojê du car bû xû diduşî

5951. Wan ew bereket he ma di xanî
Ta ʿeḥdê ʿUmer xelîfê ṯanî
***

5952. Seyrê ke bira çi baş e ṣefwet[2]
Çen tal û ṛeş û giran e qeswet

5953. Dilpakî ye dergehê kemalê
Dilpîsî esas e bû zewalê[3]

5954. Ev ʿeqlê Xudê ku daye însan
Ḥeyf e ku nebît delîlê îḥsan

---

[1] Ken, girnijîn
[2] Paqijî, zelalî
[3] Ziyan, zerer

5955. Ger çav û guh in eger zuban e
Nêv cê xû şerif nekey ziyane

5956. ʿÎbret bigirî bi şunʿê Barî
Bawer te hebît bi huşiyarî

5957. Her kes ji te ra bibêjî pende
Guhdarî bikey eger pesinde

5958. Seyrê ke di karê Ummû Meʿbed
Ev çende gehişt lîqayê Eḥmed

5959. Bes pîremerra[1] xû dît bi şîr hat
Îman bi selahê wî bi bîrhat

5960. Bûmeʿbedî hêj nedî bi çavan
Îman wî gehî dil û hinavan

5961. Bûcehlî mesel didît hemû dem
Eḥwalê resûlê pak û ekrem

5962. Exlaqê di wî cewan û rengîn
Çen weʿẓ û neṣîḥetêt di sengîn

5963. Çen muʿcîze jê didîn ʿeyanî
Îman bi çi ṭerzekî neanî

5964. Bê fayde ye bû mirovê dilreq
Her çendî mehê ji bû bikey şeq

**Îla Qebîletî Benî Sehm (Ber bi Hoza Benî Sehim)**

5965. Çen germ e Ḥîcaz di ḥeddê ẕatî
Wek duje gerim di wî welatî

5966. Havîn bû dema peyemberê dîn
Hîcret kirî bû Medîne şîrîn

5967. Ev deşt û çiya û gelî w dule
Eẋleb dimeşîne çul bi çule

5968. Ḥeft roj û şevan diçûn vî ḥalî
Wan dîne gelek ji ṛenc û talî

5969. Ḥetta digehin qebîleyek çak
Meşhûr e Benû Sehim şeṛefnak

5970. Meznê wê dihête pêş peyember
Ey hatî bû nik me tu li ser ser

5971. Şêxê ʿereban Bureyde nav e
Teklîf bû kirin gelek di gave

5972. Mêvan dikirin bi serbilindî
Qedrê wî digirtî gel pesindî

5973. Gû xewfê nekey tu êdî taze
Qurtarbûyî tu bi serfiraze

5974. Rêka te bizan gelek nemaye
Zu dê çî Medîne piṛṛ bi şaye

5975. Peyẋemberê piṛṛ ji ʿîzz û cahê
Wî gûtî li wê delîlê rahê

5976. Êdî bigerêve tu bû male
Ṣed car ji te ra bî ḥeq ḥelale

5977. Ev renge bi rahê dûr te anîn
Minnet ji te ra gelek dizanîn

**5- Întîẓarû Ehlîl Medînetî we Îstîqbalûhum (Jivana Xelkê Medînê û Pêşwaziya Wan)**

5978. Zanîbû Medînîyan yeqîn e
Peyẋemberê têt bû lay Medîne

5979. Her rojê diçûne der li şehre
Çavnêrî ḥebîbê piṛṛ bi qedr e

5980. Ṣutîne hemû ji dilfîdayî
Bû ṣuḥbetê qaṣidê Xudayî

5981. Meʿlûm e hinan ku hêj nedîne
Ew nûr û çirayê xir zemîne

5982. Ney dîtî xû ʿaşiqê cemal in
Dilṣutî bû şeṛbeta wîṣal in

5983. Her rojê di man û çav li rah e
Dê kengî helêt ji wan ve mahe

5984. Ḥetta ku li wan dibûye ṭehre[2]
Naçar digerênve mal ne behr e

5985. Yek rojê cwîyek li ser serê zûr
Dîtî ku hinek dihên li rê dur

5986. Wan bergê spî di ber bû taze
Hêdî dimeşin bi ʿîzz û naze

[1] Miha pîr

[2] Kelegerma havîna ya dijwar

5987. Bêy destê xû wî dikir heware
Ey qewmê ʿereb werin bi ẋare

5988. Çen roje ewêt we çav li rê ne
Ew yêt hene hêdî hêdî dêne

5989. Rabûne hemî bi ḥubbê canî
Bû pêşî peyemberê zemanî

5990. Têk da bi çek û sîlaḥ û şîr in
Da ron bî du çavê serwerê dîn

5991. Ber kafir û duşminan helatî
Qeṣda me kirî di wî welatî

5992. Fexrek mezin e gehame ya reb
Behrek mezin e te da me ya reb

5993. Ḥerre ku cihek li wê diyar e
Geştîne li wê resûl û yar e

5994. Ey hatî bi xêr li ser serê me
Pîrûz bî li me peyemberê me

5995. Xaliq xû dizanî çen di şa yîn
Ey em hemû bû te canfîda yîn

5996. Ger yar bî Xudê bi gût û kiryar
Çavêt te dê ron bibin bi enṣar

5997. Her bes tu bibî ʿezîz û dilşad
Qurbanî te yîn bi mal û ewlad

**Nuzûlun Nebîyyî bî-Qubaî fî Benî ʿEmr-îbnî ʿEwfîn (Gehiştina Peyẋemberî li Qubayê di Nav Benî ʿEmr b. ʿEwf)**

5998. Enṣarî dema gehîn resûle
Ladabû bû ṛastedestê dûle

5999. Nêv qewmê Benî ʿEmir di piṛṛ şan
Cê wan bi Quba ye nav û nîşan

6000. Ew heyv e belê rebîʿê ewwel
Ew roj e duşembî bû mufeḍḍel

6001. Roniştî Nebî bi rêz û seng e[1]
Bêhna xû didet ne gût û deng e

6002. Bûbekrê mezin bedel Muḥemmed
Westa bû li ser piyan şirînqed

6003. Çîn çîne[2] dihên ji ehlê enṣar
Bû dîtinê ev resûlê nazdar

6004. Heçyê ku nedîtî hêj peyember
Nik wan we bû yê ji pêve serwer

6005. Ta ṭav digehît peyemberê wî
Sêber wî dibir bû ser serê wî

6006. Ragirtî ʿebayê xû li hindav
Ḥetta li ḥebîbê can nedet ṭav

6007. Wan taze dizanî serwerê dîn
Roniştîye ew bi naz û şîrîn

**Meqdemu ʿElîyyîn (Hatina ʿElî)**

6008. Hêj ew li Quba neçûy Medîne
Wê hatî ʿElîyê nazenîn e

6009. Çen rojê li paş resûlê ummet
Wî daneve her çî hey emanet

6010. Ew hat û peyade bê heval e
Ta geşte Quba bi her çî ḥale

6011. Nazdar e çi newcewan û genc e
Dîtin li rîyê gelek ji ṛenc e

6012. Ew şev li rîyê dihat şirînkar
Rojê xû nîhan dikir bi naçar

6013. Pêt wî tijî peq bibûn bi êşan
Ḥalê wî gelek bibû perêşan

6014. Mêvan bibû ew li yêk jina pîr
Nêv qewmê Benî ʿEmir bi teqdîr

6015. Pê zanî dema peyemberê pak
Gû: Bêjnê bihêt ʿElyê şeṛefnak

6016. Gûtin: Nê neşêt bihêt bi paye
Kulbûne wî pê çu tê nema ye

6017. Çu nik wî bi xû peyemberê ḥeq
Dî mandîye her du pê tijî peq

6018. Des havête gerdena wî taze
Ey hatî bi xêr bi serfiraze

[1] Giranî

[2] Kom kom

6019. Wî tifkire destê xûy mubarek
Pê malî bû her du pê bi carek

6020. Çêbûneve ew bi emrê zîşan
Ta mabû çi car wî pê neêşan

**Ewwelu Mescîdîn Ussîse ʿElet Teqwa (Yekem Mizgefta ku li ser Bingeha Teqwayê Hatîye Avakirin)**

6021. Ew ma li Quba bi ʿîzzet û naz
Nêzîkî du ḥeftîyan bi dilxwaz

6022. Mêvanê kuṛê Hedîm bû Kulṣûm
Ew yek ji Benî ʿEwif bû meʿlûm

6023. Mêvanî Xubeybî bûye Ṣiddîq
Babê wî bi nav Îsafe teḥqîq

6024. Avakirî wî li wêrê mizget
Teqwa ye binaẋê wê bi şewket

6025. Barî jê xeber didet şirîne
Avaye li ser esasê dîne

6026. Tê da dikirî nivêj cemaʿet
Pêş qewmekê pak û piṛṛ şecaʿet

**6. Duxûlun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam el-Medînetel Munewwerete (Gehiştina Pêxemberî Silav lê Bin ya Bajêrê Medînê)**

6027. Mabû li Quba du ḥeftî taze
Dê çît bû Medîne piṛṛ bi naze

6028. Ew bûye li ḥêştirê suware
Enṣarî diçin li her kinare

6029. Ew roje ku eynî bû mubarek
Bû nîvro gehîn qebîle warek

6030. Ew qewmê kuṛêt di Salimî nav
Ron bûn bi cemalê wî li wan çav

6031. Ewwel cumuʿe dikir resûle
Nêv mizgetê wan di nîvê dûle
***

6032. Meʿlûm e nivêj û cumʿe vêkra
Fer bûne di Mekkeyê di îsra

6033. Nê cumʿe nekir ewan çi caran
Neşyan nê ji heybeta neyaran

6034. Yê cumʿe kirî di wî welatî
Hêşta ku resûlê ḥeq nehatî

6035. Esʿed bû bijareyê lebîban
Yek bû ji duwazde wan neqîban

6036. Nêv qewmê Benû Beyaḍe meşhûr
Lew gundê Neqîʿe yê tijî nur
***

6037. Roja ku Nebî dihat Medîne
Wek ewro Medîne qeṭ nedîne

6038. Ev şehre tijî ji keyf û şay e
Vî qewmî ji can û dil sema ye

6039. Ev xelqe di rêk û derk û banan
Wê têne temaşê canê canan

6040. Awazê di wan bi keyf û şayî:
Wê hat eve qaṣidê Xudayî

6041. Hindan he digû bi şiʿr û taze
Hasilbû ji bû me ev niyaze

6042. Wê hat ji Ṣenîetul Wedaʿe
Peyẋemberekê ji can muṭaʿe[1]

6043. Ṣed ḥemd û hizar şukir bû Barî
Ev behre ji bû me bes hinarî

6044. Lawan bi çek û sîlaḥê rengîn
Bû keyfe dilê resûlê sengîn

6045. Meznêt di Medîneyê seraser
Şîrîn dimeşin digel peyember

6046. Her kes wî digeşte ber derê mal
Dabêjî keremke ey ṣîfet ʿal

6047. Nav qewm û ʿeşîret û zelaman
Nav xidmet û ʿizzet û meqaman

6048. Peyẋemberî her digûtî taze
Ey hûn he bijîn bi serfiraze

6049. Zanim hewe zûr e xaṭira min
Emma ne bi xû ye ḥêştira min

6050. Meʿmûr e bi emrê ḥeq xudanî

[1] Yê ku emrên wî tên cîbicîkirin

Dê çîte cihê Xudê dizanî

6051. Ev ḥêştire her diçît bi lence
Enṣarî li du diçin çi qenc e

6052. Nêzîk derê xanîyê Bûeyyûb
Nixbu[1] şutura resûlê meḥbûb

6053. Nixbû li cihek bi qesb û gulzar
Milkê hinekan ji neslê Neccar

6054. Çendî kirî ranebû di kaxe
Iṣṭu wê dirêj dikir di axe

6055. Peyẋemberî gût bi zarê şekker
Qunaẋ eve ye bi emrê dawer

6056. Ew taze peyabû her di gave
Westa bû li wê hinek piyave

6057. Ev ʿerḍe yê kê ye kî xudan in
Gûtin du yetîm fulan fulan in

6058. Rafʿi puser in Suheyl û Sehl in
Nik Esʿedê piṛṛ ji cah û Feḍl in

6059. Gû: “Kanê ewan bira û yare
Da ez bikirim ji wan bi pare”

6060. Wan gûte Nebî: Xudê dizanî
Qurbanî serê tey în ji canî

6061. Em dê ku bi deyne tu bi pare
Pêşkêşî te ye me milk û ware

6062. Hîvya me ew e Xudê bi îḥsan
Xêrê bidetin di ḥeşr û mîzan

6063. Qeṭ raḍî nebû resûlê muxtar
Ḥetta wî kirî bi deh ji dînar

6064. Wî gû: Me divê bikeyne mizget
Bû Barî cihê nivêj û taʿet

**Îla Beytî Ebî Eyyube Xalîdîbnî Zeydîn el-Ensarî (Bo Mala Babê Eyyubê Enṣarî)**

6065. Ḥîna li şutur dihate xware
Gû: “Ey gelî van bira û yare”

6066. “Nêzîktir e kî li vî mekanî
Tiştêt me bila bibet bû xanî”

6067. Xalid kuṛê Zeydî nav bû Eyyûb
Gû: Ez bi fîda cemalê tey xûb

6068. Ev xanîye min evej derê mal
Qurbanî tey în bi mal û mindal

6069. Gûtî “Bû me çêke yek meqame
Mêvanî tey în me çen heyame”

6070. Xalid dibezîte malê derḥal
Kabanî were ku hat me îqbal

6071. Peyẋemberê axirê zemanî
Dê ron biketin me ṭarî xanî

6072. Ûdek wî beṭal dikir di gave
Raêx wî belav kirin di nave

6073. Peyẋember û ew heval û yare
Roniştîne ew di nazidare

6074. ʿAlem dimeşin li nêv Medîne
Ew têne lîqayê çîn bi çîne[2]

6075. Nêzîkî ji ḥeft mehan seraser
Mêvanê wî bû resûlê serwer

6076. Ta mizget û xanî bûn temame
Bû xanî neqil bû nîkuname

**Îslamû Ebdîllah-îbnî Selam (Musilmanbûna ʿEbdullahê Kurê Selamî)**

6077. Ew ʿEbdê Xudê kuṛê Selam bû
Nêv qewmê cwî ʿalimek temam bû

6078. Fêqî diçin li nav rez û baẋ
Guhlêbû Nebî gehişte qunaẋ

6079. Ew hatî bi lez bizanî ku ye
Ev keyfe çi ye çi hay û hu ye

6080. Çu xanîyê xanûxûy Bueyyûb
Ew durve dibînî ro gelek xûb

6081. Roniştîye piṛṛ weqar û sengîn
Enṣarî li dûr cewan û rengîn

6082. Guhlêbû digû şirîn kelame

[1] Rûniştina hêştiran

[2] Kom, ref

“Ey qewmû belav biken selame”

6083. “Zadî bidene feqîr û jaran
Zur çakî biken bi xizm û yaran”

6084. “Rabin ji bû şevnivêj bi çustî
Gava ku xelik di xew nivistî”

6085. Bê fexr û rîya û ʿucb û minnet
“Mizgîn li we dê biçîn bi cennet”

6086. Gûtina wî es̱er diket di canî
Çu lalî peyemberê zemanî

6087. Gû: Ey tu eger we bî peyember
Pisyar me hene sê piṛṛ ji cewher

6088. Kes bijlî peyemberan nizanî
Ger zanî te bawerî me anî

6089. Ewwel ji ʿelametêt qiyamet
Ewwel çi ye dê bixun di cennet

6090. Hem bû çî biçûk dibît wekî bab
Carê wekî day çi sirre nayab[1]

6091. Peyẋemberî gû: “Li pêş te Cibrîl
Her sê ji me ra gûtin bi tefṣîl

6092. “Nîşanê qiyametê ji ewwel
Agirek dê ji rojhelatê bît hel”

6093. “Dê ʿalemê xirveket duristî
Ḥetta ku di mexirbê dipestî”

6094. “Ew zadê te gûtî ṛast me nasî
Ew zêdehî ye bi cergê masî”

6095. “Kî pêşî bihêt ji day û bab av
Dê wek wî biçûk bibît” di hergav”

6096. Peyẋemberî ta kelam temam bû
Îman di dilê kuṛê Selam bû

6097. Gû: Bawere min peyemberî tu
Bû ʿalemê nûr û ṛehberî tu

6098. Nîşan te ji ṛastî yê diyar in
Bawer kî neken ji xû xisar in

6099. Bihnêre li du cwîyan nîhanî
Hêşta ku bi ḥalê min nezanî

6100. Meʿlûm e li nik ewan yeqîn e
Başʿalimê wan ez im ve ḥîne

6101. Em wan mezin în bi bab û bapîr
Medḥêt me diken bi rêz û teqdîr

6102. Qaṣid wî fiṛêkirin peyember
Meznêt di cwîyan bihên seraser

6103. Xû taze veşart kuṛê Selamî
Ev qewme ʿînad diken temamî

6104. Wî gûtî: “Gelî cwîya biken fam
Zînhar ji ʿînadê hûn neken ṭam”

6105. “Meʿlûmê we bî peyember im ez
Bû cumle cîhanê ṛehber im ez”

6106. “Hatîme bi ḥeq eger bizanin
Bawer bi me ken bi qelb û can in”

6107. Wan gûtî nexêr me pakecan în
Emma bi Nebî te em nizanîn

6108. Wî gû: çi kes li nik we ʿamî[2]
Ew Ebdê Xudê kuṛê Selamî

6109. Gûtin hemiyan bi yek zubane
Meznê me ye ew qedir girane

6110. Baş ʿalim e ew di vî welatî
Navê wî te yê bihîstî qatî

6111. Ferman kirî: “Ger we dît bi çavan
Îslam bûye ew jidil hinavan”

6112. Haşa digûtin ve qeṭ we nîne
Ew nabî bihêlî kevnedîne

6113. Carek dî we gû resûlê muxtar
Wan her we digû ji zêde înkar

6114. Wî gû: “Were ey kuṛê Selamî”
Ev qewme ʿînad diken temamî”

6115. Ew hate derê û gûte wane
Min sund e bi Xaliqê cîhane

6116. Peyẋember e ev we xir dizanin

---

[1] Bijare, gelek baş

[2] Giştî, gelemperî

Emma we ʿînad di qelb û can in

6117. Piṛṛ canî yeqîn me anî bawer
Peyẋemberê xir cîhan e yekser

6118. Êdî çi neken ji paş û pêşan
Bawer pê biken bi rêz û nîşan

6119. Gûtin tu diru dikey we nîne
Rabûn teḥisîn di ser nuxwîne

6120. Peyẋemberê ḥeq we daye ferman
Ey medḥê di wî şîfa û derman

6121. Çen kes ji cwîyan ji ehlê raye
Ger wan bi me bawerî hebaye

6122. Cwî cumle dibûn ji dil musulman
Dilzînde dibûn bi nurê îman

**EZ-ZEHRETUS SANÎYETU (KULÎLKA DUYÊ)**
**Fî Zîkrî Makane Mînel Umûrî Ewwele Senetîn Mînel Hîcrîyyetî (Ew Bûyerên di Sala Êkê Koçî da Qewimîn)**

6123. Peyẋemberê piṛṛ kemal û îqbal
Qurtar bû ji Mekkîyan bi her ḥal

6124. Ew geşte Medîneya munewwer
Enṣarî ji bû wî xir emirber

6125. Xizmêt wî çi qed ji wî di bêzar
Enṣarî du hinde bû fîdakar

6126. Babet niye her kesî gula geş
Kerṭebʿî nevêt ji ẋeyrî kerbeş

6127. Her kes ne dinasî durr û cewher
Lew zêrî nenasî bijlî zerger

6128. Peyẋemberê pak û nazenîn e
Ḥîna digehişte nêv Medîne

6129. Dana wî binaẋê dînê îslam
Emma çi bi ṣinʿet û çi îḥkam

6130. Çen karê mezin bi destê ḥîkmet
Danan bû ḥeyatê dîn û dewlet

**1. Bînau Mescîdî Quba (Avakirina Mizgefta Qubayê)**

6131. Meʿlûm e wekî li pêş te zanî
Mizgeft li Quba şirîn wî danî

6132. Serdefterê mizgeftan hema ne
Medḥêt wê Xudê diket beyane

**2. Bînau Mescîdî-hîş Şerîfî (Avakirina Mizgefta Pêẋemberî)**

6133. Wer karê peyemberî bibîne
Ewwel çi diket di nêv Medîne

6134. Ava diketin bi tazekarî
Yek mizgetê ew di rahê Barî

6135. Ew ʿerḍê lê nixbûyî deware
Meʿlûm wî kirî ji wan bi pare

6136. Peyẋemberî gûte qewmê enṣar
Karek me divê bikeyn şirînkar

6137. Libnan[1] bibirin cewan bi şewket
Dê êre bikeyne pakemizget

6138. Enṣar û muhaciran bi ʿamî
Pêkve dikirin ʿemel temamî

6139. Zêdey hemîyan libin dikêşan
ʿEmmarê te nasî ew li pêşan

6140. Ḥîna ku we dî resûlê serwer
Medḥêt wî kirin bi zarê şekker

6141. "ʿEmmar e li nik me piṛṛ evîn e
Wek çermê li beynê çav şirîn e

6142. ʿEmmarê me zûr çeleng û çust e
Hindek dikujin di nadurist e "

6143. Peyẋemberê piṛṛ ji ʿîzz û naze
Gel wan wî ʿemel dikir çi taze

6144. Wî jî wekî wan libin dikêşan
Bû mizgetê ew bi ʿîzzet û şan

6145. Libnan vedikêşî ew bi dilxwaz
Dabêjî bi dengê xûş û awaz

[1] Qalibên ji herrîyê hatine êkirin, tuxle

6146. “Bar her eve ye nebarê xeyber
Ev kare Xudê çi pak e piṛṛ ber

6147. Xêr her ew e rojê ḥeşr û mîzan”
Xûzmey li feqîr û diltemîzan

6148. “Ya Reb tu birêjî subh û êvar
Ruḥmê bi muhaciran û enṣar”
***

6149. Enṣar û muhacirêt şeṛefnak
Danabû binax̂ê mizgetê çak

6150. Ṣed gez ji dirêjî ṣed ji panî
Dîwar bû kirin bikarê danî

6151. Ser emrê peyx̂emberê zemîne
Sê derge ji bû kirin şirîn e

6152. Yek xaṣê resûlê pakê ummet
Êkê dî bi navê dergê reḥmet

6153. Derkê dî li paşîyê bû mehtab
Bû Beyte Muqeddesê bû mîḥrab

6154. Istun bû kirin ji xurmedarî
Banek bû kirin çî wan diqarî

6155. Sergirtî nekir hemû di gave
Ev laye sih e ewê dî ṭav e

6156. Ev renge ewan dikir temam e
Ser emrê peyemberê enam e

### 3. Bînau Buyutîhî ʿEleyhî’s-Selam (Avakirina Xanîyên Wî Silav lê Bin)

6157. Her we bû peyemberî ji canî
Sê ûde bînakirin cewanî

6158. Yek ûde dibît bû Aîşayê
Yek bû kiçe Zemʿe Sewde dayê

6159. Êka dî li beynê wan bi şewket
Derge dê li wê biçîte mizget

6160. Ew xanî bi mizgetêve taze
Ava dikirin wî ku niyaz e

6161. Ew xanî dikefte roj helat e
Tê dabû ḥeta ku ber ḥeyate
***

6162. Ew xanî û mizgeta mubarek
Ḥîna ku temam dibûn bi carek

6163. Zeydê kuṛê Ḥariṯey ji yaran
Meşhûr e ji rostem û bijaran

6164. Gel ʿebdê peyemberî Buarfʿi
Bû Mekkê hinart resûlê şafʿi

6165. Ta mal û biçukê serwerê dîn
Bînin bû Medîneyê çi şîrîn

6166. Sewde ḥerema bi rêz û nîşan
Gel Faṭîmeya betul û piṛṛ şan

6167. Gel kiçketirîn kiçêt wî meʿlûm
Ruḥa me fîda ye Ummû Kulṯûm

6168. Gel dayeşirînê Ummû Eymen
Gel pake Usameyê şekerken

6169. Înan hemû ehl û mal bi carek
Bû şehrê Medîneya mubarek

6170. Bûbekrî kuṛê şeṛîf û piṛṛ cah
Navê wî te zanî ʿEbdê Ellah

6171. Gel ehl û ʿeyalê babê taze
Gel wane dihên bi ʿîzz û naze

6172. Her çî ji muhaciran vemayî
Zu zu bi Medîne tên bi şayî
***

6173. Peyx̂emberê pak û piṛṛ kemal e
Ḥîna digehişt Medîne mal e

6174. Ew taze neqil dibît bû xanî
Ew taze rihet dibît ji canî

6175. Pîrûz bî li wan ve nuseraye[1]
Gel xêr û xûşî û keyf û şaye

6176. Nîv sale pitir resûlê meḥbûb
Mêvan bûye Xalidê Bûeyyûb

6177. Xûzya li kesê dibîte mêvan
Şun pê wî bibusîtin bi lêvan

6178. Bêhnek ji cemalê wî biket xuş
Camek ji wîṣalê wî biket nuş

---

[1] serkeftin

**4. Ferîḍatû Selatîl Cenazetî (Ferzbûna Nivêja Mirî)**

6179. Ev sale nivêj bû ser mirî fer
Ew ferḍe kîfayeta muqedder

6180. Pêş bête Medîne menbeʿê nûr
Heyvek bû mirî Berayê Meʿrûr

6181. Ser qebrî nivêj dikir yeqîn e
Ew serwerê Mekke û Medîne

**5. Meşrûʿîyetu el-Cemaʿetî wel Azanî wel Îqametî we Zîyadetu Rekʿeteynî ʿEla Selatîl ʿEsrî (Binechkirina Nivêja Cemaʿetê û Bangî û Qametê û Zêdekirina Du Rekʿeṭa ser Nivêja Êvarê)**

6182. Ger bang û cemaʿet in çi qamet
Ev sale Xudê didane ummet

6183. Ew pêkve nivêj giranbuha ye
Nik Şafiʿî sunnetul kîfaye

6184. Ev bang e eger çî çen ṣeḥaban
Dîtin di xewê mezin cenaban

6185. Emma bi weḥî bû hate xware
Damezrî ve gazî û heware

6186. Ger bangê nivêj û qamet in ew
Bû êkî tinê di sunnet in ew

6187. Ser kûmelê sunnet in kîfayet
Yek bess e biket ji bû cemaʿet

6188. Ew her sê şîʿarê dînê îslam
Her çî neketin sefîhe bednam

6189. Çî sustî bi wan biket bi zane
Îman wî ḍeʿîf e ew nîşane

6190. Ev sale bû zêde bûn ji Ẋeffar
Du rekʿe li ser nivêjê êvar

**Sîrrul Azanî wel Cemaʿetî (Nihêniya Bang û Cemaʿetê)**

6191. Seyrê ke bira tu hur bibîne
Ev bange gelek di dîn şirîn e

6192. Pêncar bû nivêj biken heware
Neyxaṣme eger li ser me nare

6193. Yek neẋmeşirîn bi dengekê xuş
Dilzînde diket kesê xudan huş

6194. Seyrê ke tu tîpeyek[1] ji ʿesker
Ḥîna ku belav bûyîn li her der

6195. Nageh ku bibûrî kirne gazî
Zu xirvedibin ku dil dixwazî

6196. Her yek digirî cihê xû derḥal
Bew ṭerz û nîẓamê taze û ʿal

6197. Ev bangê Muḥemmedê peyember
Ṣed carê ji wê pitir eṯerker

6198. Pênc defʿe di roj û şev bi ferman
Ew gazî diket bû ehlê îman:

6199. Dê werne nivêjê çêtirîn kar
Ew karê bi wî dibin we rizgar

6200. Seyrê ke ewan li çar kinaran
Şîrîn dimeşin xudan weqaran

6201. Endam û dil û cilik temamî
Wan cumle di pakij in bi ʿamî

6202. Ser emrê Xudê dihêne mizget
Wan dev bi ṯena û dil bi xeşyet

6203. Rêz rêze dibin cewan û pîre
Zengîn û geda şivan û mîre

6204. Vêkra ji Xudê mirad dixwazin
Yek zar û dil in bû yek niyaz in

6205. Sirrek mezin e gelek şirîn e
Ev bang û cemaʿetêt di dîne

6206. Ew xir di gerên ji rengê dîwar
Êk dî digirin bi canfîdakar

6207. Her yek bû heman dixwazî mehder
Pêş baregeha Xudayê ekber

6208. Mewlayê me yî muʿînê mey tu
Ser ṛasterîyê me lanedey tu

---

[1] Tîm, kom

6209. Binvîse heman ji piṛṛ kemalan
Min jî bide xaṭira hevalan

6210. Lew gûtîye serwerê me ummet
“Her kes biketin nivêj cemaʿet

6211. Xêra wî bi bîst û ḥeft û hêje”
Gel yê bi tinê diket nivêje

**6. Îslamu Selman-el Farîsîyyî (Musilmanbûna Selmanê Farisî)**

6212. Ey çendê bulendeşane Selman
Piṛṛ feḍl e qedirgiran e Selman

6213. Zur xûş divîya resûlê lewlak
“Selman ji min e ji beytê mey pak”

6214. Eṣlê wî ji şehrê Rame Hurmiz
Babê wî ji farisanê dînsiz

6215. Agirperisî ewan dizanî
Emma wî bi dil nebû nîhanî

6216. Lew rabû ji day û bab helatî
Ser xaṭirê dîn çu dûr welatî

6217. Ew hatî ji bû ʿÎraq û Şame
Ḥetta ku dî rahibek temame

6218. Çen mudde li nik wî bû bi ḥurmet
Bû taze dikir ji canî xidmet

6219. Wî rahibî ku dikir wefate
Çu nik yekê dî di ew welate

6220. Ew jî ku di mir bi emrê Barî
Êkê dî didî bi huşiyarî

6221. Çen mudde li nik vî bûy şirîne
Wî gûtî ji min bizan yeqîne

6222. Yek nav ʿereban dihêt peyember
Dê cumle cîhan biket munewwer

6223. Ew xatemê xir peyemberan e
Nêzîk e bihêt û hat bizane

6224. Selman diçitin ʿereb zemînê
Ḥetta wî neṣîb diçît Medînê

6225. Karwanî li wê diken çi bêgar
Wek ʿebdî firutibûn bi bazar

6226. Nêv Wadî Qura kesek ji cwîyan
Selman wî kirî ji hezreguyan

6227. Ew hate kirîn pitir li deh car
Her wek wî bi xû digût şirînzar

6228. Axir dikirît cwîyek Medînî
Ew çen ji mehan li nik dimînî

6229. Çavnêre dewam peyemberê pak
Ta hate Medîne şahê lewlak

6230. Selmanî ku dî di dîn ʿelamet
Nîşanê nubûwet û keramet

6231. Bawer pê diket tijî ji canî
Îman bi resûlê ḥeq dianî

6232. Çen ṛenc û nexûşî dîn e Selman
Ev renge ḥeta ku bûy musulman

6233. Peyẋemberî gûte wî şirîn zar:
Tu xû vekire ji cwîyê bedkar

6234. Pêkhatî li gel cwîyê Medîne
Çil weqye ji zêrî bû me bîne

6235. Çil dirhem e her weqî diken ʿed
Mecmuʿê di wan dibîte heş ṣed

6236. Sê ṣed bine xurmeyan bi ejmar
Tu bû me bijîne lê şirînkar

6237. Şeṛtê me ve ye bikey temame
Aza te dikem bi keyf û kame

6238. Peyẋemberî gût heval û yaran
“Bêşek bû biray biken ji paran”

6239. Rabûne gelek ji qewmê enṣar
Parê wî eda kirin şirînkar

6240. Gel wî bû Nebî bi destê xûy pak
Sê ṣed bine xurme çandibûn çak

6241. Qurtar bû ji destê cwîyê bednam
Dilxûş bû bi dînê pakê îslam

6242. Roja li cîhanê çuy bi qencî
ʿUmrê wî du ṣed ji sal û pêncî

6243. Hîcret bi sîh û şeşê geha bû
Selman di Medîneyê wefa bû

6244. Merqed wî di meqbera beqîʿe
Ya Reb tu bikey bû min şefîʿe

**7. El-Muaxatû Beynel Muhacîrîne wel Enşarî (Birayîniya Navbera Muhacir û Enşaran)**

6245. Pênc mahê diçûn ji paşî hîcret
Hêşta ku temam nebûyî mizget

6246. Peyẋember û qaşidê Xudayî
Fikrî ji kemalê huş û rayî

6247. Dana wî binaẋeyek bû dînî
Emma bi pesindî û şirînî

6248. Îslam ku hemû bira ne elbet
Gel êk dî ji can û dil bi ulfet

6249. Bê ferq û cudayî ew şirînkar
Êk dî digirin ji rengê dîwar

6250. Bû êk dî hemû bi harîkarî
Xaşma di deravê ţeng û ţarî

6251. Bû emrê Xudê bi canfîdayî
Vêkra dê bijîn bi xêr û şayî

6252. Nê yek keleş in hemû musilman
Yek bêşî ji wan hemû diken jan

6253. Yek birsî bibît û rot û jar e
Her yek ji xû ra wî harîkar e

6254. Îslam niye ger tu ŗast dipirsî
Ew têr û birayê dîn wî birsî

6255. Ḥetta te divêt ji bû biray dîn
Her çî te divêt bû xû bi dilvîn

6256. Meʿlûm nedibî ji ehlê îman
Peyẋemberî nê we daye ferman

6257. Ev renge Xudê me daye îslam
Lew ew du cîhan ʿezîz û piŗŗ kam
***

6258. Peyẋemberê piŗŗ kemal û ḥikmet
Dana wî binaẋê dîn û dewlet

6259. Bê ferqî û ŗastî û evînî
Wî kirne binaẋe bû vî dînî

6260. Çendek ji muhaciran di bê mal
Ber duşminî êt revîn bi her ḥal

6261. Ney mal e ewan ne cê û xanî
Ya Reb tu bi ḥalê wan dizanî

6262. Şed kes ji muhaciran û enşar
Her cwînekê pêncî kes bi ejmar

6263. Cut cute kirin bira ji canî
Emma bi kemalê dilvînanî

6264. Selman wekî rawî jê xeber da
Wî kirbû birayê Babê Derda

6265. Bûbekrê ḥebîbê şahê lewlak
Danabû birayê Xarîceyê pak

6266. Danabû ʿUmer xelîfê ṯanî
ʿÎtbanî bibît bira ji canî

6267. Kuŗ ʿEwfê bi navê ʿEbdê Reḥman
Gel Seʿdê kuŗê Rebîʿî pêk man

6268. Elqîşşe: Wî pêncî kes bi ejmar
Wî kirne bira bû qewmê enşar

**Feḍlû Ensarî we Mezayahum (Senga Enşariya û Çakîya Wan)**

6269. Enşarî xudanê cah û fexr in
Enşarî li nik Xudê bi qedr in

6270. Şaḥib huner in di namdar in
Bû dînê Xudê çi harîkar in

6271. Minnet piŗŗ e wan li ser me yekser
Ew bûne muʿînê ḥeq peyember

6272. Peyman ku digel wî tim vebestî
Weʿdê xû bi cê gehand duristî

6273. Westane hemû bi ruḥ û male
Ber emrê resûlê piŗŗ kemale

6274. Milkeç[1] bû peyemberê Xudayî
Emma bi dil û bi canfîdayî

6275. Piŗŗ şebr û teḥemmul in bi seng in
Merdêt di şeŗ û deravê ţeng in

[1] Teslîmbûn, radestbûn

6276. Kardîde ne lê cewanemêr in
Nêv meʿrekeyan dibêjî şêr in

6277. Ehlê kerem in xudan sexa ne
Xuşteb῾ û emîn û piṛṛ wefa ne

6278. Dilnazik in û ẋerîbîyar in
Zêde bû kesê feqîr û jar in

6279. Piṛṛ feḍl û buha ne piṛṛ ji enwar
Lew bûne bi navê taze enṣar

***

6280. Peyẋemberî ma nedaye ferman
“Enṣarî kesê bivên ji îman

6281. Nîşan e ji bû yeqîn û bawer
Nevyanê ewan nîfaq e” yekser

6282. “Ew her çî bivên Xudê divêtin
Her çî ku nevên Xudê nevêtin”

6283. Hem gûtiye wan bi şekkera zar
“Rebbê me dizanî qewmê enṣar”

6284. Min hingû pitir divên ji yaran
Yarê we Xudê bî cumle caran

6285. “Enṣarî biçin bû her nuwale
Gel wan dê biçim bi xeyrêḥale

6286. Çêtir hemiyan ji qewmê enṣar”
Piṛṛ feḍl û buha ne neslê neccar

6287. Paşî bere babê ʿEbdê Eşhel
Paşî Benû Ḥerṣî ew di efḍel

6288. Paşî Benû Saʿîden di xêrdar
Xêr û bereket di cumle enṣar

6289. Yê gûtî wesa resûlê ummet
“Bû her kesî ummetê weṣîyet

6290. Bêdiliyê neken ji qewmê enṣar
Xûşevyê min in emînê esrar

6291. Elḥeq çu nekir ewan quṣûrî
Bû xidmetê dîn bû layê jurî

6292. Wan ez bi muhaciran ḥewandîn
Yekser bû Xudê ji dil ḥebandîn

6293. Bû dînî quṣûr nekir ji nuṣret
Wan maye tinê dixulê cennet

6294. Nek paşî me lê biken çi ẋedrê
Wan bîrveneken ji xêr û behrê

6295. Hun çakî ji wan bi çak vexwînin
Naçakî eger bû çav quçîn in

6296. Ew keç ye eger li ḥed di dûr in
Ser xaṭirê me ji wan biburin

***

6297. Gûtbûye Nebî Useydî carek
Ey pake peyemberê mubarek

6298. Nakey tu çira me jî bi ʿamil
Emṯalê fulan kesêt di faḍil

6299. Gûtî: “Tu ji min cewan bizane”
Piṛṛ qehr û cefa ye ev cîhane

6300. “Çen şûl dê li paşî min bibînin”
Piṛṛ canê şirîn bi ẋem dimînin

6301. “Hindek dê li ser we bin bijare
Bû karê cîhan ku pîsmeram e”

6302. “Hişyarê xû bin ṣebir biken her
Ḥetta ku digehine min li kewser”

6303. Dunya çu niye nexwun çi qehrê
Her cennet e cê xûşî û fexrê

6304. Ya Reb tu bi cahê cumle enṣar
Azake vî Ṭahirê gunehkar

6305. Hem xeste ye hem ḍeʿîf û jar e
Yek xadime wan e kulewar e

**Husnu Senîʿîhîm Meʿel Muhacîrîne (Çakiya Wan Gel Muhaciran)**

6306. Roja ku peyemberê şirînkar
Çendek ji muhaciran û enṣar

6307. Wî kirine bira bi ḥubbê îman
Teqṣîr nekirin ewan ji îḥsan

6308. Çêtir ji birayê ḥeq viyane
Xidmet dikirin ji ṭîbê cane

6309. Enṣarî gûtin ji bû peyember
Dabeşke tu van rezêt me yekser

6310. Mabeynê me û muhacir û yar
Her wek tu dizanî ey şirînkar

6311. Peyẋemberî jê nekir qebûle
Wan gûte muhaciran ve şûle

6312. Rezvanî biken ji bû me taze
Hun gel me şeṛîk bi serfiraze

6313. Hemya digûtî gelek cewan e
Raḍî bû peyemberê zemane
***

6314. Elḥeq nekirin ewan çi teqṣîr
Qeṭ çakîyê wan ne dê bikeyn bîr

6315. Belkî ji Buxarî ev te zanî
Yê gûtî Enes şekker zubanî

6316. Bab ʿEwfê bi navê ʿEbdê Reḥman
Gel Seʿdê kuṛê Rebîʿî îxwan

6317. Seʿdî gû: Bira ji min bizane
Ḥubba te ji min di nîvê can e

6318. Du jin mi hene û mal û bîstan
Dê gel te bi nîvî kem bi destan

6319. Cab dave muhacirê bi raye:
Ey raḍî ji tu bî ḥeq Xudaye

6320. Pîrûz bî ji tu jin û rez û mal
Ya Reb tu nebî çu car nexuşḥal

6321. Bes tu me binêre suk û bazar
Bû karê tîcaretê me hişyar

6322. Ez kiçke birayê tu me elbet
Şulek me divê bikem ji babet

6323. Nê çî neker û nezan û tenbel
Ew her du cîhan dibît muʿeṭṭel[1]

6324. Çendek ji diravî[2] bû me bîne
Nê kesbê ḥelal gelek şirîn e

6325. Gû: Emrê te ye te ku meram e
Bê emrîyê tu li min ḥeram e

6326. Her rojê diçû bû suk û bazar
Bazarê penîr û ronî wî kar

6327. Gel murwet û ṛastî û duristî
Wî fayde he roj dihate destî

6328. Zur pê neçu dîtî ew peyember
Zavaṣîfete ji dil muʿeṭṭer[3]

6329. Nîşan jê didîn digût bi ferman
"Ha ev te çi ḥal e ʿEbdê Reḥman"

6330. Gû: Ey bi fîday te bim hero car
Jinkek bû xû anî min ji enṣar

6331. Wî Bab Enesê wî bab e Rafʿi
Gû: Xêr e resûlê pak û ṣafʿi

6332. Çen daye ji mehreyê te ey yar
Pênc dirhemê zîvî gû bi ejmar

6333. Peyẋemberî gû: Bikey ḍiyafet
Her ne pezekî vekuj bû ulfet

6334. "Zadek tu durist bikey şirînkar
Deʿwet bike çen birader û yar"

6335. Lew rojê welîme bûye sunnet
Ser zarê resûlê pakê ummet
***

6336. Yê gûtî Ebû Hureyreyê pak:
Mêvan bû kesek resûlê lewlak

6337. Her ew bi xû bû çi bûye birsî
Peyẋemberî bû ji zadî pirsî

6338. Wî gûte heman ji ehlê xû ye
Wan bijlî ji avê hîç ne bûye

6339. Ferman dikirî: "Erê xudan xêr
Mêvanê me kî dibit biket têr"

6340. Buṭelḥe gûtî ji pakeenṣar:
Ez ey bi fîday te bim hero car

6341. Wî gel xû dibir bû mal û xanî
Vêkra dê bixun çi hey ji nanî

6342. Wî gûte jinê nîhan di lêvan
Mêvanê peyemberî me mêvan

6343. Zu rabe bi çustî û çelenge
Zadek ji me ra bihîn direng e

6344. Wê gûtî me zad di malê nîne

[1] Betal,eware
[2] pere
[3] Bêhndar,bêhnxweş

Bes bessî biçukê min yeqîn e

6345. Buṭelḥe gûtî bi keyf û şadî:
Zu her çî heye durist ke zadî

6346. Tu helke çiray û mal bimale
Binvîne biçûk bi her çî ḥale

6347. Zadê xû bihîne zu bi çustî
Zad bîne çiray bikuj bi qestî

6348. Ew mave ku çê biket çirayê
Zadê xû ewan dixwar bi şayê

6349. Ew mane wesa di xanî ṭarî
Ew zadî dixun digel wî yarî

6350. Xwarin niye lê meker bi qestî
Ba danê dev û xişînê destî

6351. Mêvanî ḥeta ku têr dixwarî
Ew jî dinivin ne xwar çu parî

6352. Weqtê sibehê diçûye mizget
Gût bû wî resûlê pakê ummet

6353. "Mizgîn: Dikenî şevê dî Reḥman
Bew karê te kir bû qedrê mêvan

6354. Barî ji me ra hinarî ayet
Enṣarî xudan sexa ne x̣ayet

6355. Hêşta tu nehatî wan dianî
Îman bi Xudê bi qelb û canî

6356. Ew ḥez ji muhaciran diken zûr"
Dilṣafî ne piṛṛ wefa û piṛṛ nur

6357. "X̣eyrî xû divên bijîn bi xûşî
Her çen bi xû rot û x̣uṣṣenuşî"

6358. "Her kes ne çirwîk û destmiçî ne
Qurtar e li du cîhan yeqîn e"

6359. Ya Reb tu tinê bi xû dizanî
Enṣarê peyemberê zemanî

6360. Fexrek ku te daye wan bilind e
Ecrek bi deyê mezin du hinde

***

6361. Wek bû me Buxarî xûş xeber da
Selman bû birayê Babê Derdaʿ

6362. Carek diçitin bû mal birayî
Jinka wî didît ne zûr bi şayî

6363. Wê cilk û berg di bê serûber
Ney pakij û şuştî û muʿeṭṭer

6364. Selmanî digû: Çira tu husay
Ney karkirî û ne piṛṛ dilî şay

6365. Wê gûtî: Birayê tey Buderda
Destê xû li vê cîhanê berda

6366. Nageh wî bira dihate xanî
Nav çav di geş û şirînzubanî

6367. Roniştiye ew bi xuşkelamî
Zu gûtî jinê bihîn ṭeʿamî

6368. Gûtî: Tu kerem ke ey şirînxûy
Selmanî gûtî: Çima tu naxwûy

6369. Gûtî: Tu bixwu binuşê cane
Ez evro bi rojê bum nîhane

6370. Ḥetta tu nexuy digûtî Selman
Ez nabî bixum ḥeta bû derman

6371. Mecbur bû ji ber dilê wî xwarî
Şev hat û demê xewê bû ṭarî

6372. Her yek diçû nav nivîn ji canî
Rabuve xudanê mal nîhanî

6373. Selmanî gû: Dê çi key bi ṭarî
Gûtî: Qederek bi ẕikrḙ Barî

6374. Gû binve hinek dî hêj ku zu ye
Ev weqtê xew û giyanê tu ye

6375. Gavek dî xû kir dikir bi naçar
Hem rabû piyan bû karê her car

6376. Dubare digûtî binve Selman
Ṣebrê xû bikêşe ey musulman

6377. Nêzîk bû ḥeta sipêde xûş dem
Weqtê kerema Xudayê eʿzem

6378. Ew weqtê nivêj û ẕikrḙ Barî
Daxwaz û reca û girî û zarî

6379. Ew gave nîşanê merdê hişyar
Ew gave kilîlê gencê esrar

6380. Gû: Rabe nihu eger tu zanay

Karek tu bike nîhan bû mewlay

6381. Nê nuke ye weqtê şevnivêjan
Qurʾan û duʿa ji ẕikrebêjan

6382. Çendek dikirin nivêj û taʿet
Ḥetta ku bi hev diçin cemaʿet

6383. Selmanî gûtî ji min bizane
Zanî me evej ḥebîbê cane

6384. “Rebbê te li ser te ḥeq çi reng e
Nefsa te wekî jina çeleng e”

6385. Ger dê te riḍayê ḥeq niyaz e
Her êkî bidey ḥeqê wî taze

6386. Enṣarî dihête nik peyẋember
Gû: Hu bi me gû birayê enwer

6387. Gûtî: We ye wek dibêjî Selman
Selman ji me ye ji dil musilman

**Ewwelu Mewludîl Muhacîrîne (Jidayîkbûna Yekemîn Zarokê Muhaciran)**

6388. Esmayê kiça xelîfê ewwel
Piṛṛ feḍl e bi zarê yarê ekmel

6389. Ew bû ḥerema Zubeyrê ʿEwwam
Ew yek ji bijareêt nîkunam

6390. Gû: Ev jine bû xudanê ḥeml e
Bew ʿEbdê Xudê ku kanê feḍl e

6391. Hîcret ku me kir ji bû Medîne
Neh meh me temam dibûn yeqîne

6392. Ḥîna digehîme nêv Qubayê
Ew ḥemle me danî piṛṛ ji şayê

6393. Min anî bû nik resûlê dîne
Min danî di kuşê wî şirîne

6394. Gû: Qesbekê bîn ji bû me çak e
Wî taze dicwî bi zarê pak e

6395. Wî tifkire nav zuban û zarî
Ewwel wî tifa wî bû dixwarî

6396. Ew paşî ji bû duʿan dixwazî
"Ya Reb vebijît bi serfiraḍî”

6397. “Ya Reb tu bikey ji dil mubarek
Karê vî biçûkî xir bi carek"

6398. Ewwel eve bû biçuk yeqîne
Ewladê muhacirêt Medîne

6399. Nuʿmanê kuṛê Beşîr ji enṣar
Ewwel bû ku hat resûlê muxtar

**8. Bînaun Nebîyyî ʿEleyhî’s-Selamî Bîʿaîşete Bîntî Ebî Bekrîn (Veguhaztina Aîşaya Kiça Ebû Bekirî bo Pêẋemberî Silav lê Bin)**

6400. Paşî ku Nebî dihat Medîne
Ḥeft meh dî hilatibûn yeqîn e

6401. Ew pakeḥerem ku ʿAîşa ye
Bû xû veguhazt bi xêr û şay e

6402. Paşî remeḍan bû mahê şewwal
Pîrûz bî wî newresîde neh sal

6403. Pakij ḥeseb e neseb bijar e
Kiç êke xelîfe yarê ẋar e

6404. Bûbekrê mezin yekem musilman
Deyka wê digûtinê Ummû Ruman

6405. ʿAlîṣîfet e çi ʿalîşan e
Ew yek ji bijareêt jina ne

6406. Meḥbûb e li nik wî piṛṛ evîn e
Nazdar e belê çi nazenîn e

6407. Jin gencê ʿilûm û mahê taban
Êk bûye ji ʿalimêt ṣeḥaban

6408. Çendan ji ṣeḥab û tabʿîne
Wergirtine jê ḥedîs̱ û dîne

6409. Zur xûş diviya resûlê ummet
Piṛṛ naz û ḍelal û qedr û ḥurmet

6410. Peyẋemberî kes nekirye mare
Kiç bijlî ji ʿAîşa bijare

6411. Neh sal bû digel Nebî ḥeyat e
Wê hejde bû sal wî kir wefate

6412. Hevdê remeḍan bû mir şeṛefnak
Merqed di beqîʿe meqbera pak

6413. ʿUmrê wê gehişte şêst û şeş sal
Bû pêncî û heşt hîcreta ʿal

6414. Ṣed reḥmet û ṣed hizar riḍa ye
Ser ruḥ û rewanê ʿAîşa ye

**Mîn Huneynîn el-Muhacîrîne İla Mekketel Mukerremetî (Ẋerîbiya Muhaciran bo Mekkeya Pîroz)**

6415. Ferman dike ʿAîşa şirînkar
Nazik ḥerema resûlê muxtar

6416. Ḥîna me gehîn Medîne pake
Ewwel ji me xûş nehatî xake

6417. Babê me digel Bîlalê meşhûr
Ta wî bûne ew ji canê ṛencur

6418. Ez çum dê serê bidem ji wan e
Eḥwalê hewe me gût çewa ne

6419. Bûbekrî dema digirtî tayê
Ev şiʿre digût bi aye ayê

6420. Her kes lê dibîte roj di male
Nêv xizm û kesan di cê û pale

6421. Nêzîktir e lê mirin ji pêlav
Hîvî bi ḥeyatê nîne her gav

6422. Ev renge digût di ta Bîlalî
Ber sûzê weṭen bi ah û nalî

6423. Ya Reb dê bibît ku ez dubare
Binvim di nuwalê Mekke ware

6424. Nêv çîmenê Îẕxîr û Celîlan[1]
Çav ron bî bi Şam ew Ṭefîlan

6425. Geryameve ez bû nik peyember
Min qîṣṣe ji bû digût seraser

6426. Wî gût bi duʿa ji ẕatê Barî
Ya Reb tu xebîr û agedar î

6427. "Şîrîn bike nik me ev Medîne
Çêtir ji wê Mekkeya şirîne"

6428. "Tu xak û hewayê wê bikey xuş
Xêr û bereket di wê bikey bûş"

6429. Tayêt wê bû Cuḥfe[2] key rewane
Wê rojê bû meskenê cwîya ne

**9. Ewwelu Lîwaîn ʿEqedehu ʿEleyhî's-Selamî Lîʿemmîhî Ḥemzetî (Alaya Yekemîn a ku Pêẋemberî Silav Ser Bin bo Mamê Xwe Ḥemzeyî Girêday)**

6430. Damezrî dema resûlê serwer
Nêv ehlê Medîneya munewwer

6431. Îxlasê muhaciran çewa ne
Enṣarî du hinde canfîda ne

6432. Ev dîne belav dibît yeqînî
Naraḍî divê bi can nemînî

6433. Ayet ji Xudê bû hate xware
Hun cengê biken digel neyare

6434. Peyẋemberê piṛṛ buha û seng e
Rabû bi kemalê dîn bi ceng e

6435. Wî nijde fiṛêkirin bi tedbîr
Kardîde[3] bi cengê tîr û şimşîr

6436. Çen carê bi xû bû ḥerbê çuye
Wî şeṛ dikirin bi destê xû ye

6437. Wî cumle ẋeza me wek bihîstî
Kiçke çi mezin çi ḥeft û bîst in

6438. Ew yêt ku bi xû di wan dikir şeṛ
Neh bûn Uḥud û Huneyn û Xeyber

6439. Ṭaîf, Benû Muṣṭeleq ji wan e
Eḥzab û Bedir di bê guman e

6440. Gel cengê Benû Qureyẕe nam e
Fetḥa Mekehê dibin temame

6441. Nijdêt[4] ku peyẋemberî hinarî
Ew ḥeft û çil in me wek jimarî

6442. Ev nijdeye pêş heman bi defter
Sernijde ye Ḥemzeyê dilawer

[1] Îzxîr û celîl du nebat in ku li Mekkeya Mukerrem baş tên zanîn. (Ev jêrenota Şuşî bi xwe ye)
[2] Cihê miqatê ku kesên ji Misir û Sûriyê ji bo hecê yan jî umrê tên Mekkê dikevin Îhramê.
[3] Şolzan, bi tecrûbe
[4] serî

**Serîyyetu Ḥemzetîbnîl Muttelîbî (Serîya Ḥemzey)**

6443. Hîcret digehişte mahê heşt e
Alayekê kej dibestî qişt e

6444. Alayê wî bestî pêş hema ne
Bû mamê xû Ḥemze pehlevan e

6445. Sih mêr ji muhaciran bijare
Kardîde hemû di namidar e

6446. Bûmurs̱îd e lew heman ʿelemdar
Ferman kire wan ḥebîbê muxtar

6447. "Karwanê Qureyşîyan bû Şam e
Rêkê bigirin ji wan" temame

6448. Lê qeṭʿe biken rîya welatî
Zad belkî li wan dibîte qatî

6449. Çûn ta digehîne karewane
Bûcehlê leʿîn serûkê wan e

6450. Wan dîn li kinarê behrê ṣure
Sê ṣed wî digel ji dîn di kuṛe

6451. Mecdî ji Cuheynîyan ku zanî
Ew bû beṛevanê wan ji canî

6452. Ger ber wî neba îmamê Ḥemze
Da gêrî serê rîyêt wî berze

6453. Zivrîneve bû Medîne taze
Bê ḥerb û ẋenîme bê niyaze

**10. Serîyyetu ʿUbeydet-ubnu'l- Ḥarîs̱î (Serîya ʿUbeydê Kurê Ḥarîs̱î)**

6454. Ev sale bû her ku wî dibestî
Alayekê dî bi pakedestî

6455. Bû lawê ʿUbeyde yek ji pismam
Hilgirtibû Mîsṭḥê nîkunam

6456. Şêst kes ji muhaciran xudan nav
Çûn qafîla Qureyşîyan biken rav

6457. Rabuẋ li Ḥîcazê yek nuwal e
Ew geştine karewan û male

6458. Serdarê du ṣed kesane hemyan
Bab Ḥerb e bi navê Babê Sufyan

6459. Wan havêtîye êk tinê bi tîran
Ney bûye mecalê ḍerb û şîran

6460. Hindan ji xû karewan revandî
Hindan bi şeṛî xû gêzirandî[1]

6461. Mîqdadê kuṛê ʿEmir ji merdan
Wek ʿUtbe bi navê babî Ẋezwan

6462. Îslam bûne ew nîhan nîkunam
Wê rojê digehine ceyşê îslam

6463. Ew Seʿdê bi navê babî Weqqaṣ
Havêtî li pêş heman bi îxlas

6464. Ewwel ew e tîr di rahê Barî
Havêtîye duşmin û neyarî

6465. Qurtar bûye karewanê wa ye
Wan bêk nebirin ẓefer çu laye

6466. Geryaneve bû Medîne ʿal e
Ney kujtin û ney ẋenîme mal e

**11. Serîyyetu Seʿd-îbnî Ebî Weqqaṣîn (Serîya Seʿdê Kurê Babê Weqqaṣ)**

6467. Hem bestî ʿelem bû yarê mêrxas
Ew Seʿdê wî bab e Babê Weqqaṣ

6468. Gel bîst ji muhaciran fîdakar
Mîqdadê ji Eswedî ʿelemdar

6469. Wî taze hinarte layê Ebwa
Emma çi nedîn neyar û eʿda

6470. Ew sal wî demî gehîbû neh mah
Bê ceng û ẋenîme kir ewan rah

**12. Ẋezwetu Weddanî Wehuwe Ewwelu Mexazîhî Sellellahu ʿEleyhî We Sellem (Yekemîn Ẋezwa Peyẋemberî Silav lê Bin Ẋezwa Weddan)**

6471. Ev sale[2] dema digeşte axir
Derkeftî bi xû resûlê faxir

---

[1] xapandin

[2] Destpêka sala hîcretê meha Rebîʿul Ewwelê (jêrenote Şuşî ye)

6472. Ew çu di şefer ji bû ẋezayê
Bû wan neḥezêt Xudê nedayê

6473. Şêst gel xû birin ji wan bijare
Bû qafle Qureyşîyêt neyare

6474. Wî danî li cê xû nîv Medîne
Ew Seʿdê ʿUbade nav şirîn e

6475. Ew çubû ḥeta digeşte Weddan
Karwanê Qureyşîyan nedî wan

6476. Meşhûr e Benû Ḍumre êt Kînane
Mexşî kuṛê ʿEmrî mezinê wan e

6477. Dûstînî digel dibestî taze
Bê şeṛ zivirî bi serfiraze

**13. Wefatû Hazîhîs Senetî (Mirinên vê Salê)**

6478. Ev sale bû mir hevalê meʿlûm
Bab Ḥedmê bi navê taze Kulṯûm

6479. Ew yê li Quba resûlê ummet
Mêvanê wî bû bi qedr û qîmet

6480. Esʿed jî kuṛê zûrareyê yar
Ew mezn û neqîbê Neslê Neccar

6481. Xirbûneve ew li nik peyember
Ey gû bi fîdayê tuy ne yekser

6482. Esʿed li me çu neqîb û serdar
Êkê dî ji bû me danê dildar

6483. Peyẋemberî gût şirîn zubane
"Ez hingû neqîb û hûn bira ne"

6484. Gûtin hemîyan: Me tu ḥebîb î
Zêtir me nevê ku tu neqîb î[1]

**EZZEHRETU'Ṣ-ṢALÎSETU (KULÎLKA SÊYÊ)**

**Fî Ḥewadîsîs-Senetîṣ- Ṣanîyetî Mînel Hîcretî (Bûyerên Sala Duyê Koçî)**

6485. Ev sale ji hîcreta wî du ye
Pîrûz bî li wî ku bûyenû ye

6486. Peyẋemberê piṛṛ kemal û îqbal
Ḥetta ku ji hîcretê çu yek sal

6487. Wî danî ʿeceb binaẋe bû dîn
Emma bi kemalê ray û zanîn

6488. Çendek ji muhaciran û enṣar
Wî kirne bira bi canfîdakar

6489. Karek bû kirî ji kanê ḥîkmet
Nîşanê siyaset û şehamet
***

6490. Wan Ewsî û Xezrecan ji enṣar
Kirbûne li pêş wî çen ji kuştar

6491. Evroke bûyîn bi dînê îslam
Gel yekdî di dil xûş û xudan kam

6492. Xû zêde muhacirêt Xudayî
Wan bûne bira bi canfîdayî

6493. Rêkkeftî ji bû resûlê serwer
Îslamê bigêrî êk û êkser

6494. Ev ḥal e munafiqan nexûş hat
Bûxḍ û ḥeseda di dil bi cuş hat

6495. Neyxaṣme serûkê wanê gumrah
Ew neviyê Selûlî ʿEbdê Ellah

6496. Emma tu bibîn ḥebîbê muxtar
Bew ʿeḥdê muhaciran û enṣar

6497. Der girtî li ser munafiqînan
Piṛṛ can ẋerez û xudanê kînan

6498. Lewṛa ku hebû mecal bi herḥal
Vî ḥalê şirîn û pak û biken tal

6499. Wî kişte werîsê dîn biken xav
Ev ḥalê munafiqan e her gav
***

6500. Ev kare wekî wî kir duristî
Hem ʿeḥdî li gel cwîyan dibestî

6501. Lew rojê hebûn di nêv Medîne
Cwîyêt Benû Qeynuqaʿ bi kîn e

6502. Ewladê Qureyẓe nêv Fedik bûn
Ewladê Neḍîrî wan li nik bûn

6503. Xû jurî Medîne şehrê Xeyber

[1] Cîgirê serok

Çen qelʿe tijî cwî bûn seraser

6504. Wek taze dihat resûlê dîne
Ew bûne li gel wî zarşirîn e

6505. Wan hîvî hebûn bi her çî ḥale
Bû dînê cwîyan biden wî pale

6506. Neyxaşme didîn ku qîble îslam
Ew Beyte Muqeddesa li lay Şam

6507. Peyẋemberê meʿdena wefayê
Ustaẕê siyaset û dehayê

6508. Bew xulqê evî û ṭebʿê şîrîn
Bew ʿeqlê selîm û canê nûrîn

6509. ʿEḥdek wî digel cwîyan vebestî
Peymanê ṣedaqet û duristî

6510. Her kes ji me ser ʿeqîde û dîn
Gel yek dî durist û ṛast û rengîn

6511. Wî her we ji rayê piṛṛ ṣewab e
Bû wan dinivîsî yek kîtabe

6512. Ma beynê muhaciran û enṣar
Ta mayne bibin heval û hemwar

6513. Hem danî di vê kîtabê taze
ʿEḥdek bû cwîyan ku wan niyaze

6514. Ser dîn û ʿeqîde û cih û mal
Madem ku neken çi pîseefʿal

6515. Êmin bû jinû resûlê ummet
Bew karê kirî ji ʿeḥd û weḥdet

6516. Êk dest bû Medîne piṛṛ buha ye
Wêca dê bi xû biçît ẋezaye

6517. Peyẋembere serwerê ename
Serʿesker e hem bi xû îmam e

6518. Ger yar bî Xudê bi harîkarî
Vê ʿalemê dînte der ji ṭarî

**1. Ẋezwetu Buwaṭîn (Ẋezwa Buwaṭê)**

6519. Ev sale bû meh rebîʿê ewwel
Çubûye buwaṭ resûlê ekmel

6520. Ew yek ji çelêt Cuheyne nave
Nêzîk e ji Yenbûʿê du gave

6521. Leşker du ṣed in mişext û enṣar
Yekser bû resûlê ḥeq fîdakar

6522. Ala wî bi destê Seʿdê Weqqaṣ
Kardîde û qehreman û mêrxas

6523. Wî danî li cê xû nîv Medîne
Ew Sʿedê kuṛê Muʿaz emîn e

6524. Karwanê Qureyşîyêt di bednam
Wê têteve lew tîcareta Şam

6525. Ser qafîle wan Umeyye bedkar
Gel pên ṣed û du hizar şutur bar

6526. Wan zanî eger kesek bû gûtî
Îslam dê bihên bi cergê ṣutî

6527. Rê gurî neçûne bû rîya ʿam
Qurtar bûne ta ji destê îslam

6528. Ṭalʿi negehişte karewanî
Geryave peyemberê zemanî

**2. Ẋezwetu ʿUşeyretî (Ẋezwa ʿUşeyre)**

6529. Hem rabû diçû ʿUşeyre nam e
Yek cwî ye ji Yenbûʿê temam e

6530. Ev sale gehî Cumadê Pêşî
Rê bigrî ji qafileya Qureyşî

6531. Wî Bûselemê emîn û sengîn
Dana li cihê xû taze rengîn

6532. Ala wî bi destî mamê Ḥemze
Ṣaḥib hunerê bi rêz û ṭerz e

6533. Leşker wî digel du ṣed zelam in
Kardîde ne xir di nîkunam in

6534. Ḥetta digehin ʿUşeyre gah e
Rabûrî bû karewan di rahe

6535. Hatin Benû Mudlecî ʿeşîret
Bû nik vî resûlê taze sîret

6536. Dûstînî digel wî çak dibestî
Ew ʿeḥdê emînîy û duristî

6537. Hîvî ku neman li wan neyaran
Geryave serûkê şehreyaran
***

6538. Ev her du sefer ji rengê Ebwa
Bê ḥerb û xenîme bûn ji eʿida

6539. Emma wî tirs gehande wane
Wan can û ceger bû piṛṛ ji jane

6540. Wan gûtî yeqîn e ev zelame
Dê bigrî li ser me rahê Şam e

6541. Wan bîr nedihat ji cîfeyê can
Ew karê kirî şeḥîfeyê wan

6542. Wan kirne gelî pitir du salan
Çen dîtî ewan ji taleḥalan

6543. Peyẋemberê piṛṛ kemal û ḥîkmet
Barî ku hinarî bes bû reḥmet

6544. Pîşê wî niye ne ẓilm û bedkar
Ney ẋaret û rêgirî û kuştar

6545. Ew her çî diket ji bû Xuda ye
Ger sulh û eman e ger ẋeza ye

6546. Lazim bû li ser ewan binêrin
Ger ew ne di kuṛefam û hêr in

6547. ʿEḥdek ji xû ra digel bibestî
Ew gel wî durist û ṛast biwestî

6548. Xurtî çu niye di dîn çi care
Çakî û xirabî bûn diyar e

6549. Her kes neketin gudarê şeyṭan
Bawer bi Xudê biket ji îman

6550. Destê wî gehişte çimbilî çak
Dê her du cîhan bibî şeṛefnak

**3. Ẋezwetu Bedrîn eş- Şuẋra (Ẋezwa Bedra Biçuk)**

6551. Geryave li ev ʿUşeyre rahe
Deh roj dî bizan ne çûn ji mahe

6552. Kuṛzê kuṛê Cabirê perêşan
Êk bûye ji tabiʿêt Qureyşan

6553. Gel çen kesekan ji bed sigalan
Mala tê Medînê bir bi talan

6554. Çendek ji merr û ji ḥêştirêt çak
Ta zanî xeber resûlê lewlak

6555. Rabûye bi leşkerek temame
Belkî ku xilaṣ nebît zelame

6556. Zeydê kuṛê Harîṯey yeqîn e
Wî danî li cê xû nêv Medîne

6557. Ala wî bi dest ʿElî ji alan
Ew çuye bi lez li duvê talan

6558. Ta geşte nuwalê nav lê Sefwan
Nêzîkî Bedir çi kes nedî wan

6559. Ew kuṛze xilaṣ bû gel hevalan
Geryave Nebî bû layê malan

6560. Ev ẋezwe bi navê Bedrê pêşe
Bû Bedrê mezin ṣebir bikêşe

**4. Serîyyetu ʿEbdîllahîbnî Ceḥşîn (Serîya ʿEbdullahê Kurê Ceḥşî)**

6561. Ev sale bû meh Cumadê ṯanî
Yek nijde Nebî hinart nîhanî

6562. Wî gûte Ebû ʿUbeyde mêrçak
Meşhûr e emînê ummeta pak

6563. Karê xû bikey bi tîr û şîre
Bû nijdekê dê te kem emîre

6564. Ew rabû pîyan bi kar û bar e
Gel heşt ji muhaciran bijare

6565. Rabûn dê biçin ji ber evînê
Ber şahê Medîne girt girînê

6566. Peyẋemberî zanî ḥal çewa ne
Êkê dî bedil dikir rewan e

6567. Ew ʿEbdê Xudê ji can cegerzur
Babê wî bi navê Ceḥş e meşhûr

6568. Yek name ji bû nivîsî taze
Bû taze beyan dikir niyaze

6569. Paşî du rojan vexwîne name
Paşî we bikey ku min meram e

6570. Bû hemrehê xû bibêje ku ye
Her çî ku nehêt bi keyfê xû ye

6571. Ser emrê Nebî vekir kîtabe
Emrê wî diket bi xûş xîṭabe

6572. Lazim tu biçî bû Nexlegahê

Da bigrî ji Mekkîyan tu rahê

6573. Mabeynê Mekê û Ṭaîfî ew
Yek dul e bi rêwbar û rehrew

6574. Bû leşkerê xû dikir beyane
Raḏîbûne xir ji ḥubbê cane

6575. Ew çûne hemû bi canfîdayî
Bijlî du kesan ji wan vemayî

6576. Yek Seʿdê wî bab e babê Weqqaṣ
Ẋezwan puserê dî ʿUtbe mêrxaṣ

6577. Wan her du hebûye yek deware
Her carê dibûye yek suware

6578. Wenda bû neçûn ji ber dewarî
Leşker dimeşît meded ji Barî

6579. Ew çûne nuwalê Nexleya kuṛ
Karwanê Qureyşiyan dihêt zûr

6580. Ser qafîle wan kesek gilav e
ʿEmrê kuṛê Ḥeḏremî bi nav e

6581. Newfel wî digel birayê ʿUs̠man
Yek dîj ḥekemê wî babe Keysan

6582. Merdek ji ṣeḥabeyan xudan cah
Waqid ewê bab e ʿEbdê Ellah

6583. Tîrek didete serûkeyê wan
ʿEmrî diketin di gavê bê can

6584. ʿUs̠man û ḥekem dibûn esîr e
Newfel direvît ji bayê tîre

6585. Ev kare kirin ji layê xû ye
Heyva recebê jî tazenû ye

6586. Pêncêkî gûtî dideyne serwer
Hêşta ku nebûye ew di dîn fer

6587. Ewwel eve bû ẋenîme anî
Îslamê bi hîmmet û cewanî

6588. Ew ʿEbdê Xudê reyisê nijde
Geryave bi sefiraz û mijde

6589. Êxsîr û dewar û mal dianî
Bû xidmetê serwerê zemanî

6590. Peyẋemberî gût emîrê leşker
Kujtin di meha ḥeram te bû kir

6591. Bû çî tu dikey nebûyî karek
Kes des nekene ẋenîme carek

6592. Lewma wî kirin heval û yare
Ew ma di dilê xû şeṛmezare

6593. Derbuve ji bû Qureyşîyêt bed
Derḥeqqê ṣeḥabe û Muḥemmed

6594. Ew mahê ḥeram diken ḥelale
Xun rêt û birin esîr û male

6595. Her we bû cwîyan mecal vebûye
Wan zûr dikirin ve guftûGû ye

6596. Îslam xû gelek dibûne ẋemgîn
Ta Barî ji bû hinarî mizgîn

6597. Ayet bû Nebî dihate xware
Ṣabûne hemî heval û yare

6598. Fermanê Xudê bi neṣṣê tenzîl
Pisyarê diken ji tu bi tebcîl

6599. “Şeṛ ku ye di nêv meha ḥeram e
Tu bêje gunah e zûr zelam e

6600. Emma nê menʿi li rahê Barî
Lew dînê Xudê bi ḥeq hinarî

6601. Lew Keʿbe û Mescîd-el ḥeram e
Hem ehlê wî der biken bi ʿame

6602. Mazintir e ew li nik Xudayî”
Êk êke nexaṣme xir tebayî

6603. Kuştin xû eger çî zûr gunah e
Neyxaṣme di van ḥerame mahe

6604. Emma çu niye digel ewan ew
Vî karî ewê diken ji can ew

6605. Madem weku muşrik û Qureyşî
Ev karê ewane paş û pêşî

6606. Ney lewme ne ʿeybe ney gunah e
Xunrêjî di van ḥerame mahe

6607. Ḥîna ku dihatî taze ayet
Dilxûş bûne ehlê dîn ne ẋayet

6608. Wergirtî ẋenîmeyê ḥelale

Ew her du esîr wî dan bi male

6609. Lewṛa vekirîn esîr Qureyşan
ʿUs̱man digerêtve mal perîşan

6610. Ew maye li ser ne taze dîne
Ḥetta sikitî bi derd û kîne

6611. Îslam bû Ḥekem ji ṭîbê canî
Ser destê peyemberê zemanî

6612. Ew ma li Medîneyê seʿîde
Lew Bîrê Meʿûne bûy şehîde

### 5-6. Ferḍuş Ṣîyamî we Ṣerfûl Qîbletî Îlel Keʿbetî (Ferzbûna Rojiyê û Wergêrana Qîblê bo Keʿbê)

6613. Ev sale du ye di mahê şeʿban
Rojî biye fer li ser musilman

6614. Heyva remeḍan bi xêr û bar e
Her kes çu ʿuẕir nebin neçar e
6615. Şeʿban digehişte nîvî ev sal
Qîble kete layê Keʿbeya ʿal

6616. Lewṛa weku fer bûyîn nemaze
Nê qîble Qudis bû çak û taze

6617. Ta salek û nîv ji paşî hîcret
Ev mijde bû hat ji şahê qudret

6618. Lewṛa ku resûlê pak û piṛṛ nur
Hîvî li Xudê hebûye çen zûr

6619. Dagêrî du çav di asemanî
Ya Reb tu miradê min dizanî

6620. Qîblê bike Keʿbeya ʿeẕîme
Ew beytê we mazin û qedîm e

6621. Ew nik ʿereban gelek bi qedr e
Nazdar e cihê kemal û fexr e

6622. Ûmêd e ku qîble ew bibîtin
Îman bi te û bi min bihêtin

6623. Her gavê di dil bû ev niyaze
Ḥetta ku Xudê dida wî taze

6624. Gava bû weḥî dihate xware
Ew bûye di nêv nivêj diyar e

6625. Sêşembî ye nîvru nîvê şeʿban
Neslê Selemey bû mizgeta wan

6626. Ew mizgete piṛṛ ji hevv û bar e
Ew Mizgetê Qîbleteyn diyare

6627. Du rekʿe kirin resûlê serwer
Wî paşî didaye Keʿbeyê ber

6628. Ger mêr û jin in li du wî meimûn
Ṣeffêt xû bedil kirin bi meʿlûm

### 7. Ẋezwetû Bedrîn el-Kubra (Ẋezwa Bedra Mezin)

6629. Mahê remeḍan di salê s̱anî
Çu Bedrê peyẋemberê zemanî

6630. Bû hevde ji meh ẋezayê Bedr e
Ew cengê bi nav û piṛṛ bi qedr e

6631. Ger yar bî Xudê ʿeẕîmê şan e
Dê bin di Bedir di kameran e
***
6632. Karwanê Qureyşîyêt di bednam
Geryave bi bûşî ew li lay Şam

6633. Karwanekê bûş û malekê zûr
Gel sîh kesekan di ḥêc û meẋrûr

6634. Ser qafîle û serûkê hemyan
Ew Ṣexre bi navê Babê Sufyan

6635. Cibrîlî dida resûlî mijde
Dabiçîne berayê wan bi nijde

6636. Peyẋemberî gûte wan bi ferman
“Ellah didetin we weʿd û peyman”

6637. “Dê yek ji du ṭaîfêt di Mekke
Bû hingû dibîte bar ne şekk e

6638. Yan qafîle dê ji wan sitînîn
Yan dê ji hewarê kam bibînîn

6639. Pê xûş e we karewan ji canî
Ew dê bî ewa Xudê dizanî”

6640. Ew rabû piyan bi kar û bar e
Gel sê ṣed û s̱êzde kes bijare

6641. Têkhel ji muhaciran û enṣar
Gel wan du suwar hesp bi ejmar

6642. Mîqdadê kuṛê ʿEmir xudan kam

Yê dîke dibên Zubeyrê ʿEwwam

6643. Gel ḥeftê şutur bû wan bi carek
Her sê kes û çar kesî dewarek

**Tecehhuzu Qureyşîn Lîl-Mesîrî**
**(Xweamadekirina Qureyşîyan bo Cengê)**

6644. Ser qafîleyê Qureyşîyan ew
Ger zanî eger ji huşê can ew

6645. Serdarê muhaciran û enṣar
Dê hête berayê ḥêştir û bar

6646. Ḍimḍim wî fiṛêdikir bi ẋare
Zu bêje Qureyşîyan heware

6647. Rabin ku Muḥemmed û hevalan
Karwanê me dê biben bi talan

6648. Qaṣid ku gehişte nêv Qureyşan
Rabûne bi can û dil perêşan

6649. Rabûn bi çek û sîlaḥ û kare
Nêzîkî hizar kesan suwar e

6650. Ṣed hesp û şutur dibûne hef ṣed
Gel nan û ẓexîreyê çi bê ḥed

6651. Hatin hemû mazinan seraser
Bes Bûlehebê leʿîn û bedker

6652. ʿAsê kuṛê Haşimî wî qerdar
Batî xû rewane kir siyehkar

6653. Nêzîk bû neçît Umeyyeyê pîr
Ta çuye wî ʿUqbeyê Xudêgîr

6654. Mecmer wî tijî ʿiṭir bû anî
Gû bigre tu jî ji wan jinanî

6655. Naçar bû diçû ji kîbr û fexre
Nazanî ecel di kaxê Bedr e

6656. Ew çûne hemî ji cerg û cane
Pîçek hebû xewfê wan Kînane

6657. Lewṛa ku ji mêje wan ʿedawet
Wan tirs e ne wek bihên bi furṣet

6658. Şeyṭan çu bi şiklê kak Suraqe
Şula wî ji mêje her nîfaq e

6659. Gû herne şeṛê Muḥemmed û yar
Kes nîne bişête hûn bi kuştar

6660. Hun fikrê neken ji yek Kînane
Ez bextî didem we piṛṛ ji cane

6661. Ew êdî diçin bi kar û bare
Bû layê Bedir ji bû heware

**Xurûcun Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam Îla Bedrîn**
**(Derketina Peyẋemberî Silav lê Bin bo Bedrê)**

6662. Peyẋemberê ḥeq bi tazekarî
Ew şembîyê çu meded ji Barî

6663. Dana li cihê xû yarê mêrçak
Meşhûr e Ebû Lubabeyê pak

6664. Alayê mezin bi destê Muṣʿeb
Yê kiçke bi dest ʿElî mucerreb

6665. Ew çûne bi xêr û şayî vêkra
Ḥetta digehî nuwalê Ṣefra

6666. Ḥîna digehişte ev meqame
Casus wî hinarî du zelame

6667. Nav êkî Buseysê piṛṛ wefa ye
Yê dîke ʿEdîyê canfîda ye

6668. Geryaneve gûtî: Karewane
Nêzîkî Bedir bûyîn ewane

6669. Sê kes dî hinartibûn ji pêşan
Bû layê hewarê wan Qureyşan

6670. Ew Seʿd û Zubeyr û şêr ʿElî ne
Ew çûne du kes ji wan ve dîne

6671. Pursîbû ji wan resûlê piṛṛ şan
Avkêşî dikeyn gû bû Qureyşan

6672. Gû: "Çen hene ew suwar zelame"
Wan gûtî neşêm bibêm temame

6673. Çen ser dibirin gûtî ji ḥêştir
Her rojê bû meṭbexa xû leşkir

6674. Roj ḥeft e gû roj deh in bi ejmar
Zêde me li nik çu nîne exbar

6675. Peyẋemberî gû: "Ji min diyar e
Neh ṣed hene ta dibin hizare"

6676. Gû: "Baş e nihu li ku ye leşker"

Nêzîk e gûtin li paşî ev gir

6677. “Kî hatiye gû ji wanê serdar”
Wan pazde kiṛin ji wan bi ejmar

6678. Mîn cumle Umeyyeyê pelîd e
Bûcehlê şeqî digel Welîde

6679. Wek ʿUtbe û Şeybe êt Rebîʿe
Gel Ḥariṯ û Zemʿe êt şenîʿe

6680. Bûlbûxturîyê kuṛê Hîşamî
Serhengê Ḥekîm kuṛê Ḥîzamî

6681. Peyẋemberî gûtî: “Mekkeya pak
Havêtî ji bû we cerg û mêlak”

**Îstîşaretuhu ʿElehîs Selamî Bîeşḥabîhîl Kîramî (Şêwra Pêẋemberî Silav lê Bin li gel Hevalên Hêja)**

6682. Peyẋemberî gû: “Gelî şeḥaban”
Ey engûxudan reî ṣewaban

6683. Fikra xû ji bû me hûn bibêjin
Sirra di dilê xû da birêjin

6684. Bûbekrî gûtî û xûş xeber da
Her we ʿUmerî bi lêv şekker da

6685. Mîqdadê kuṛê ʿEmir helista
Pêş destê peyemberî diwesta

6686. Gû: Ey tu resûlê ḥeq ji Barî
Bû wî tu here bi tazekarî

6687. Wek qewmê cwîyan digûte Mûsa
Wellah ne dê bibêyn me hûsa

6688. Gûtin here gel Xudê xû bû şeṛ
Em lêre bêhin dideyn seraser

6689. Em belkî dibêyn penah bi Ellah
Tu gel wî here şeṛî bi dilxwah

6690. Em gel hewe xir di canfîday în
Dê cengê bikeyn ḥeta ku mayîn

6691. Bû her cihê tu biçî bi cenge
Wellah digel te yîn ve renge

6692. Dilxûş bû Nebî bû wî duʿa kir
Carek dî gûtî: Bibên gelî yar

6693. Ew Seʿdê kuṛê Muʿazê mêrser
Tim rabû piyan li pêş peyember

6694. Ez bêm gû tu beḥsê mey ve enṣar
Peyẋemberî gût: Belê şirînzar

6695. Wî gûtî: Belê me anî îman
Paşî me didate ʿeḥd û peyman

6696. Êdî tu here bi keyfê canî
Bû emrê Xudê tu wek dizanî

6697. Wellah biçî bû nîvê beḥre
Em gel te dihêyn ji can û fexre

6698. Ger medḥe nebî me ehlê ceng în
Nêv meʿrekeyan bi can û cerg în

6699. Ger yar bî Xudê di gavê kuştar
Dê çav li te ron bibin bi enṣar

6700. Êdî tu here meded ji Barî
Ew bû me bese bi harîkarî

6701. Dilxûş bû resûlê piṛṛ ji qedr e
Ew rabû diçû bû layê Bedre

6702. Ferman kire wan resûlê sengîn
“Ey bû we li nik Xudêve mizgîn

6703. Weʿdê wî ji bû me hate xware
Du ṭaîfe yek me dê bî bare

6704. Ez sundê bi ẕatê ḥeq dixwînim
Dê bêjî cê mergê wan dibînim”

6705. Çu geşte serê nuwalê Bedre
Bû ûrdîgehê demek xû bigre

**ʿÎru Qureyşîn we Nefîruhum (Karwanê Qureyşîyan û Derketina Wan)**

6706. Ser qafîleyê Qureyşîyan ew
Zanî ku Nebî dihête wan ew

6707. Lada ji Bedir bû layê beḥre
Ta geştîye Cuḥfe dî çi qehr e

6708. Wî zanî ji wan gû bûye qurtar
Qaṣid wî hinarte Mekke ev car

6709. Qurtar bû me karewan bi carê
Ḥacet niye kes nehên hewarê

6710. Bûcehlî digû kuṛê Hîşamî
Wellah me dê biçîn temamî

6711. Ḥetta me diçîn nuwalê Bedre
Sê roj dê li wê bibîn bi fexre

6712. Sê roj dê li wê bikeyne şîlan
Meynuşî û keyf û qal û qîlan

6713. Guh lê bî ḥeta ʿereb hemane
Tirsa me bikefte canê wane

6714. Exnes gû kuṛê Şeṛîqî taze
Ey Zuhrî me bû we yek niyaz e

6715. Qurtar bû me karewan û male
Em çak e biçînve bê zewale

6716. Geryaneve Zuhrîyan temamî
Gel wan ʿEdewî bi nîkunamî

6717. Ṭalib ku biray xelîfê çar e
Hem hatibû ew bi canê ṣare

6718. Mabeynê wî û kesek Qureyşî
Bû ʿacizî û qisêt nexûşî

6719. Wî gûtî li mêje tu me zanî
Tu layê Muḥemmedî nîhanî

6720. Geryave ewîş bi xêr û şayî
Ew yêt dî hemû diçûn tebayî

6721. Ta geştine ew binê nuwale
Pîrûz nebî wan ve cê û pale

6722. Ba emrê Xudê dibarî baran
Zur Barî li ser ewan neyaran

6723. Neşyane li cê xû rabibin ʿam
Kêm Barî ji ûrdîgahê îslam

6724. Ew remle çi ron e şibhî av e
Req bûye bû wan hinek di gave

6725. Ḥetta ku Nebî bihête xwarê
Ser axirê bîr biket qerarê

**Teheyyîetu en-Nebîyyî ʿEleyhî's-Selam lî Meʿreketîl Qîtalî (Xweberhevkirina Pêẋemberî Silav lê Bin bo Cengê)**

6726. Ḥîna dî resûlê piṛṛ kemale
Hatin Qureyşî binê nuwale

6727. Ew rabû ji pêşî wan bû avê
Ta geşte berayê bîr di gavê

6728. Wî fikre bigêrî ûrdîgahe
Tim gûtî Ḥubabî[1] piṛṛ ji cah e

6729. Aya eve emre hat ji Barî
Yan ḥîle ye fennê ḥerbikarî

6730. Wî gûtî: "Nexêr ve mekr û ḥîle
Gû: "Min bi fîda vî cêy bihêle

6731. Rabe dê biçîn bû axirê av
Da bêne derê ji dujminan çav

6732. Dê ser bigirîn evêt dî bîran
Wêca dê biçîne wan bi şîran

6733. Guhdayê peyemberê zemane
"Reiya te gûtî gelek cewan e"

6734. Hem Seʿdî digûtî: Ey peyember
Keprek bû te çê dikeyn bû sêber

6735. Tu ronê di navê nazidare
Dê nik te girê bideyn deware

6736. Em êdî diçîn bû kaẋ û meydan
Çendî me dişêyn bi ḍerb û lêdan

6737. Ger em dibûyîn xudan ẓefer ew
Xû ew me heman meram e her ew

6738. Ger yadî Xudê neket bibînî
Lazim bû Medîne baz helînî

6739. Hindek nê hene li wê te eḥbab
Her gavê fîdayê tun bi day bab

6740. Ger zanîba wan dihêy bû cenge
Da hêne şeṛî ji dil çeleng e

6741. Ew bû te hemî di canfîda ne
Nuṣret dê bibînî tu bi wan e

[1]Ḥubab bîn  Manzur (jêrnota Şuşî ye)

6742. Peyẋemberî gû: “Xudê te yar bî
Ta mayî xudanê bext û bar bî”

6743. Ḥîna wî didîn Qureyşî bedkar
Hatin bi çek û sîlaḥ û duşwar

6744. “Ey gûtî Xudê tu çak dizanî”
Min her tu muʿîn û piştevan î

6745. “Hatin qureşî di piṛṛ ẋurûr e
Bû cengê min û tu bê quṣûr e”

6746. “Ew weʿdê te daye min şirîn e
Evro tu helakê wan bihîne”

6747. Peyẋemberî ʿUtbe dî digel wan
Kardîde bû ew gelek reîzan

6748. Gû: “Yê he suwarê ḥêştira ṣur
Bû çakî û qencî ney gelek dur

6749. Ger ew ji wî ra biken gudarî
Nahête rîya ewan çi xwarî”

6750. Hatîne hinek ji tênîyan ew
Bû kaniyê peyemberê zeman ew

6751. Peyẋemberî gû: “Bila vexwune”
Wan têr divexwar û paşî çûne

6752. Wan her çî ji bîrê av vexwarî
Wê rojê cîhan li wî bû ṭarî

6753. Bes yek ne Ḥekîm kuṛê Hîzamî
Qurtar bû dema revîn bi ʿamî

6754. Axir dibitin ji ehlê îslam
Ser dînê Xudê diçît nîkunam

**Emru Qureyşîn Beʿde Nuzulîhîm bîl ʿUdwetîl Quswa (Karê Qureyşîyan Paşdabezîna Wan li ʿUdwa Nêzîk)**

6755. Damezrî dema resûlê serwer
Ser axirê bîr û kir meʿesker

6756. Buş leşkerê muşrikêt di bednav
Ew man li binê nuwalê bê av

6757. Wan girtî li wî cihî qerare
Bû cengê peyemberî di hare

6758. Yek çakesuwar dikir rewane
Gû: Seyrê ke leşkerê ewane

6759. Ew ʿEmrê kuṛê Weheb bi nave
Ew çubû meramê her di gave

6760. Geryabû li dûrê ceyşê Eḥmed
Nêzîke gûtî bibin bi sê ṣed

6761. Emma gû wekî ewan dibînim
Ez zêde bi cerg û can dibînim

6762. Hatîne dibêjî ew bû merge
Bêqam dê biken digel me cenge

6763. Wan nîne hewar ji ẋeyrî şîran
Binbir dê biken me law û pîran

6764. Her yek dê yekî bigêrî bê can
Ka paşî dihête kuştin û yan[1]

6765. Hun êdî biken wekî dizanin
Ey hûn hemî ehlê huşê can in
***

6766. Rabûye Ḥekîmê bab Hîzam e
Çu lalê serûkê ʿUtbe nam e

6767. Gû ey tu xudanê fehm û ray î
Ger her te divê bijî bi şayî

6768. Nêv qewmî bi rêz û muʿteber bî
Ta mayî bi nav û behrewer bî

6769. Gel leşkerî tu bizivre male
Vî ḥalê şirîn negêre tale

6770. Ew ʿEmrê ji Ḥeḍremî te yar e
Xuna wî bide bi tazekare

6771. Wî gûtî dibêjî zûr cewan e
Ew rabû piyan û da beyane

6772. Gû: Ey gelî xizm û mazin û yar
Em bû çî bikeyne ceng û kuştar

6773. Ew ʿEmrê digel me sundixwar e
Xuna wî didem çi mal û pare

6774. Ger em bi Muḥemmedî şiyane

[1] Anku: yan ne. Jêrenota Şuşî ye)

Gel yek dî dibîn neḥez ji cane

6775. Vî kuştî ji vî bira û mame
Wî kuştî ji yê he bab temame

6776. Helnayê me yek dî çav bi çave
Axir me dibîn ji yêk belave

6777. Ez rayê husa cewan dibînim
Lew ʿEmrê Hîşamî naemîn im

6778. Min tirs e Ebû Cehil bi bedkar
Dubare bigêrî leşkerî har

6779. Çu gûte wî ew Ḥekîmê kuke
Gû: ʿUtbe çi qed bû tirsenuk e

6780. Ez sundê dixwum bi ẓatê yezdan
Em nazivirîn li nîvê meydan

6781. Geryaneve min li ser ḥeram e
Ta tûl venekeyn ji wan temame

6782. Derḥal digû ʿAmr ê cegersuz
Wer ʿUtbe bibîn bi karê alûz

6783. Ney tûlê birayî tu niyaz e
Wî fikr e biçîtve Mekke taze

6784. Derḥal wî dikir bi ḥêl heware
Way ʿEmrê birayê nazidar e

6785. Ey hûn we xudan ceger li ku ne
Evroke deravê tul vebûne

6786. Nêv leşkerî wî didaye denge
Ta ṣur bû didem ṭenûrê cenge

**En-Nuzulu Îlel Meydanî wellahul Musteʿanî (Dabezîna Musilmana bo Meydanê bi Harîkarîya Xwedê)**

6787. Rabûye bi kînê canî Eswed
ʿEbduleṣed wî babê wey bed

6788. Sundxwarî: Diçim bû kanîya wan
Her çendî bibim li wêrê bê can

6789. Ew rabû hicum dikir di gave
Ḥetta digehî kinarê ave

6790. Ḥemzey li wî da çi ḍerbe şîrek
Pêyek lê firandî merdê zîrek

6791. Emma xû xişandî newcewanî
Bû sundê wî av vexwar ji kanî

6792. Şîrek dî li ser dida di gavê
Ṭermê wî kete kinarê avê
***

6793. Paş hatine kaxê sê suware
Ew Şeybe û ʿUtbe êt bijare

6794. Yê dîke Welîdê ʿUtbe bab e
Wan xwastî qebû ji wan ṣeḥabe

6795. Derḥal çûnê sê suwar ji enṣar
Ew ʿEwf û Muʿewwiz êt hunerdar

6796. ʿEfrayê du kuṛ ew in di piṛṛ cah
Gel Îbnû Rewahe ʿEbdê Ellah

6797. Gû: Engûkî ne? Gûtin: ji enṣar
Gûtin: Hewe hember in şeṛefnak

6798. Ḥacet me nîye bi engûyekser
Xizmêt me bila bû kaxê bên der

6799. Geryaneve ew bi bê merame
Peyẋemberî gûte sê zelame

6800. Ḥemze tu heliste ey nîkunam
Ey tu ʿElî yû ʿUbeyde pismam

6801. Ḥemze diçû Şeybe têz û germe
Zûr pê neçû ew dikirye ṭerme

6802. Ew renge ʿElîyê şehsuwar e
Zu kuştî Welîdê namidare

6803. Ney bayê ʿUbeyde bû ne ʿUtbe
Her êkî li yê dî daye ḍerbe

6804. Ḥemze û ʿElî diçûne harî
Ta ʿUtbe feqîrî can suparî

6805. Înaneve wan heval birîndar
Pêyek wî nemane merdê hişyar

6806. Wî gûte peyemberê mecîde
Ma ez nebûyîm bû xû şehîde

6807. Wî gûtî belê resûlê Barî
Zur pê neçu canê pak suparî

**Îltîqaʾul Cemʿeynî (Vêkketina Her Du Layan)**

6808. Hatin qureşî bû layê meydan

Piṛṛ kîn û ẋerez bi ḍerb û lêdan

6809. Bûcehlî dikir duʿa ji dawer
Ya Reb ji me kî pitir di bedker

6810. Vê rojê ewî bibey fenaye
Bê ʿeqlî ji xû dikir duʿaye

6811. Peyẋemberî gûtibûye yaran
"Bêy min ne biken hicûm çu caran

6812. Nêzîk hewe bûn eger bi şîran
Hun paşve biben bi tavê tîran"

6813. Gel wî bû Ebû Bekir di kepre
Wî dev bi duʿa û dil bi ṣebr e

6814. "Ya Reb tu tinê bi ḥeq dizanî
Ev ehlê te ne" ji cerg û canî

6815. "Vê kumelê ger bibey helakê
Namînî Xuda perist di xakî

6816. Ew weʿdê te daye min şirîn e
Evruke Xudê bi cê bihîne"

6817. Bûbekrî digû ji gencê îman
Daxwaz te didet Xudayê Reḥman

6818. Peyẋemberî çav diçûne ser êk
Hişyar bû gûtî: Tu ey ʿemel nêk

6819. "Hat neṣrê Xudê ku dil dixwazî
Cibrîle suwarê espê tazî

6820. Ayet ji me ra dihate xware
"Ha bû we melek hizar suware"

6821. Derkeft û gûtî "Ve qewmê zişte
Êdî direvin diden me pişte"

6822. Tên dane ji nuve wî musilman
"Ez sundê dixwum bi ẕatê Reḥman

6823. Evro çi kesê bibît şehîde
Piştê nedete evêt pelîde

6824. Çavê wî hebî ji luṭf û reḥmet
Îlla dê Xudê bibet bi cennet"

6825. Rabûye ʿUmeyrê bab Ḥemame
Enṣarî ye merdê nîkunam e

6826. Çengek ji qesb ewî didestî
Havêtî û çuye kax bi çustî

6827. Wî şeṛkirî ta dibûy şehîde
Hem kuştine Ḥariṯey ʿegîde

6828. Ew Mehceʿê koleê ʿUmer ew
Wî jî dikujin bi tîre ser ew

**El-Hucûmu (Hêriş û Despêka Şeṛî)**

6829. Êdî bû hicum li her kinare
Bû yek dî diçûn di daẋedare

6830. Şîran şeqe şeq diçît bi denge
Lê rim bi meṭalî ringe ring e

6831. Çendan tu dibînî serfirandî
Du hinde dibînî zikdirandî

6832. Eṣḥabe hicum diken çu şêran
Dunyayê xirab diken ji mêran

6833. Kuṛ ʿEwfî digûtî ʿEbdê Reḥman
Hat nik me di kaxê yek musilman

6834. Wî gût bi dizî: Tu ey birader
Nîşa me bide Bûcehlê bedker

6835. Min gûtî: Çira? Gû: Pakeweʿd e
Min daye digel Xudayî ʿeḥd e

6836. Ez bêt û Ebûcehil bibînim
Dê wî bikujim meger nemînim

6837. Êkê dî li layê çep wesa ne
Ev pirse ji min dikir nîhane

6838. Min nîşê didan û çûn bi ẋare
Rijyan çu seqir bû ew mirare

6839. Ew ʿEwf û Muʿewwiz êt hunerdar
ʿEfraê ew in du kuṛ ji enṣar

6840. Wan dane berê ji can û cerge
Ḥetta kire multeqayê merge
***

6841. Ḥîna ku Umeyye dît Bîlalî
Yê xwarî ji wî nebêje talî

6842. Ez gûtî nebim xudan necat e
Ew êdî eger xudan ḥeyat e

6843. Wî gazî kire heval û yaran
Werne şeṛê kufr û pîsekaran

6844. Gel çen kesî kir hicume dergav
Kuştîne digel kuṛî ʿElî nav

6845. Kuştîne belê bi ḍerb û talî
Du bazî Xubeybî û Bîlalî

6846. Hem kuştî ʿElî serûkê welyan
Ew Ḥenẓeleyê kuṛê Bûsufyan
***

6847. Nêv kaxê Zubeyrê mey ʿegîd e
Ew geşte ʿUbeyde bab Seʿîd e

6848. Nîvzirî û kilavzirî[1] bikar e
Dapûşî meger du çav diyar e

6849. Gûtî: Tu kî? Gû: ʿUbeyde meşhûr
Wî rum diweşande çavê meẋrûr

6850. Wê ḍerbê dikir gelek huner ew
Derkeftî ḥeta ji paşeser ew

6851. Ḥella wî cuda bû tin ji can e
Ruḥ çu bû cehennemê rewan e

6852. Gû: Pê xû bi serserê me danî
Ḥetta bi kutek me jê deranî

6853. Ew rum çi qeder qewî bi cewher
Xwar bûye ji wê ruma me du ser

6854. Jê xwastî ve rum resûlê nûrîn
Wî dayê belê ji canê şîrîn
***

6855. Hem kuştî ʿElîyê namidare
Ew mezne Munebbihê mirare

6856. Eswed kuṛê Muṭṭelib ji wan e
Wî jî dikujît Ebû Ducane

6857. Pêş çavê wî kuṛ lê hate kuştin
Wî cerg û hinav di gavê ṣuhtin

6858. Nevyê wî wesa ku Ḥeris nav e
Wî jî di kujît ʿElî di gave

6859. Nevyek dî ʿUteybê law û genc e
Ḥemze û ʿElî dikuştî qence
******

6860. Elqîṣṣe: Li çar kinarê kaxê
Êk êke keleş dikevne axê

6861. Peyẋemberê axirê zemanî
Çengek wî ji xêr û ax hilanî

6862. Havêtîye kafiran di gave
Her êkî hinek çu nîvê çave

6863. Gû: Êdî hicum biken mubarek
Işkestine ew revîn bi carek

6864. Eṣḥabe li du bi ḍerb û şîre
Hindan dikujin hinan esîre

**Beʿdel Hezîmetî (Piştî Şikestinê)**

6865. Hatbûne Qureyşî çen bi fexr e
Evroke revîn di kaxê Bedr e

6866. Ser şor û bi cergê pare pare
Bû layê Mekê diçûn bi ẋare

6867. Ḥeftê jê diçûn bi tîr û şimşîr
Ḥeftê jê temam dibûne êxsîr

6868. Ew Seʿdê Muʿaẕî merdê meşhûr
Ew bûye li nik resûlê piṛṛ nur

6869. Wî dîtî ku nakujin esîran
Pê xûş bû ku qed biken bi şîran

6870. Rengê wî didî digût peyẋember
Şeklê te diyar e ey birader

6871. Ev ḥale bi can û dil te nîne
Wî gûtî: Belê te gût şirîn e

6872. Ev tazeşeṛ e ji wan nekaman
Lazim bû qir biken zelaman
***

6873. Peyẋemberî zu digûte wan e
Bûlbûxturî dûr neken ji can e

6874. Eḥya ne eger bibît esîre
Min Neqdê Ṣeḥîfeê bi bîre

6875. Ḥîna ku dibû esîr dilawer
Çu mujde didayê kak Mucezzer

6876. Peyẋemberê me we daye ferman
Kes tu nekujît ji mey musilman

[1] Kulavê asin.

6877. Wî gûtî: Digel me yek heval e
Gû: Bes bû te ye ve behre ʿale

6878. Wî gû: Me nevêt jîn ve renge
Nêv ehlê Mekê bibîte denge

6879. Dûstê xû di nêv deravê ṭarî
Hêlaye ḥeta wî can siparî

6880. Ey jîn ku nebî bi çavê şûre
Serkêl tu here bû qebr û gure
***

6881. Hem gûtibû ṣeḥabe Babê Qasim:
"Êxsîr nekujin ji neslê Haşim

6882. Hatîne ṭexer ji wan bi zûrî
ʿEbbas jî wesa ne wek me nurî"

6883. Pê zanî digû: Ebû Huzeyfe
Ev gûte ewî nebû bi keyf e

6884. Gû: Em bikujîn bira û babe
ʿEbbasî nedeynê hîç ʿezabe

6885. Wellah eger ewî bibînim
Ez dê wî bi şîrî serfirînim

6886. Pê zanî peyemberê zemanî
Wî gût ʿUmerî: Erê dizanî?

6887. Ew dê kujî Bûḥuẕeyfe nam e
ʿEbbasê peyemberê we mam e

6888. Ev zanî Ebû Ḥuẕeyfe derḥal
Zur xwarî esef li ser qisa tal

6889. Gû: Ev guneh e çi qed pelîd e
Ranabî meger bibim şehîde

6890. Roja dibû Weqʿeya Yemame
Ew bûye şehîdê nîkunam e
***

6891. Bûlbusrî ku çen zelamekê hwîr[1]
ʿEbbasê qelew wî kir bû êxsîr

6892. Peyẋemberî gû: Ku pê diwestî
Vî ḍexme zelamî qûl bibestî[2]

6893. Gû: Yek dî di bû me harîkar e
Hûw hû bû me ew nedî çi care

6894. "Ew gûtî melek bû zûr kerîm e"
Hatîne li nik Xudê ʿeẕîme
***

6895. Bûdawûdê Mazenî gû: Yek car
Bû kafirekî diçûm çi daẋdar

6896. Hêşta me negeştî şîr cewanî
Wî ser difirî ji ser giyanî

6897. Hem Sehlê Ḥenîfî daye teqrîr
Gû: Yek ji me dahejînî şimşîr

6898. Min dîtî bi çavê ser neẕerker
Ney geştîyê şîr û dafirî ser

6899. Lewṛa melekan ji can û pîran
Istukr[3] û tibil didan bi şîran
***

6900. Ḥîna verevî ji Bedrê cenge
Çî kuştî û çî esîr reng e

6901. Peyẋemberî gû: Kî bû me dînî
Eḥwalê Ebû Cehil yeqînî

6902. Mesʿûd puser e diçît di gave
Ta geşte leʿînî zil du çave

6903. Wî pê xû didanî ser serê wî
Hur wek ṣeyekî li ber derê wî

6904. Ey gûtî: Tu duşminê Xuda yî
Dê hilgireve bi keyf û şayî

6905. Gû ma çi bîye bi min ne ʿar e
Qewmê me biken me pare pare

6906. Wî pirsî: Erê erê kî bûn ẕeferwer
Wî gûtî Xuda û ḥeq peyember

6907. Gû: Ey tu ḥeta duhî şivanî
Evroke ku çûyî jûr mekanî

6908. Gû: Ser dibirrim ji tu bi şîre
Zur kule gû serbirrîn ji mîre

6909. Ya min ji heman pitir bi şeṛm e
Evro ew e tu bikey me ṭerme

6910. Bû nakujî min kesek bijare

---

[1] biçûk
[2] Girtin, girê dan

[3] Stu,gerden

Ṣaḥibşeṛefek di namidare

6911. Ser mergê were tu vî bibîne
Çen piṛṛ ji ẋurûr û kîbr û kîne

6912. Şîrek wî li ser dida dumayî
Wî bir bû peyemberê Xudayî

6913. Gava ku serê wî dît peyember
Bir secdeşukir bû şahê ekber
***

6914. Peyẋemberî gûte wan bi ferman
"Bînin ji serûkeyane ṭerman"

6915. Êk êke ewêt di namidare
Havêtîne bîrê bîst û çare

6916. Ew çûne Umeyyeyê siyeḥkam
Ew nav zirî bel bibû çi bê qam

6917. Par pare bû ta dihate der ew
Kumek ji gilî dikirne ser ew
***

6918. ʿAdet bû resûlê piṛṛ hunerdar
Her carê dibûye ew ẓeferdar

6919. Sê şev vedima di kaxê cenge
Paşî digerîtve mal bi senge

6920. Ewwel şevê xew nehat bi çave
Mamê xû didî di qeyd û dave

6921. Gûtin tu çira ve hinde hişyar
"Ber mamê xû gû di qeydê bêzar"

6922. Berdaneve wan Îmamê ʿEbbas
Ser xaṭirê serwerê hemî nas[1]

6923. Şeṛ ku verevî di kax û meydan
Kum kirbûne malê wane çendan

6924. Gû: bû me ye êt dikirye kume
Ê şeṛ dikirî gû: Her ji bû me

6925. Ê nûbe digirt ji ḥeq peyember
Gû: Ber wî neba me danî yekser

6926. Hat emrê Xudayê Ẕulcelale
Teslîmî peyemberî ve male

6927. Wî taze pişik dikir bi carek
Ser cumleyê Bedrîyêt mubarek

6928. Bû heşt kesî wî pişk didanî
Ney hatibûne cengê şeş me zanî

6929. Yek pakexelîfê sê ye ʿUs̱man
Ney hate Bedir bi emr û ferman

6930. Naxûş bû ḥerem Ruqeyye nav e
Bû xidmetê wê li malê mave

6931. Bû Ṭelḥe û bû Seʿîdê meşhûr
Bû qafilê hinartibûn rehê dur

6932. Hem danî ji bû Ebû Lubabe
Danabî li cê xû xuşxîṭab e

6933. Bû ʿAsimê bab ʿEdîy yeqîn e
Danabî ewîş li jûr Medîne

6934. Bû Ḥaris̱ê Xaṭibî mehûle
Nartî[2] bû Benî ʿEmir bi şule

6935. Bû Ḥaris̱ê Ṣemmeê li çûne
Işkestibû şîr û şîr nebûne

6936. Xewwatê Cubeyrî hem we reng e
Işkestibû şîr di nîvê cenge
***

6937. Roja verevî bû şeṛ ji Bedre
Axir remeḍan bû piṛṛ ji qedr e

6938. Ḥîna wekunû bû ser ji şewwal
Qaṣid wî fiṛêkirin ji bû mal

6939. Gû Îbnû Rewahe merdê sengîn
Bû jûrî Medîne her bi mizgîn

6940. Hem Zeydê ji Ḥaris̱ey emîn e
Mizgîne bibe bû jêr Medîne

6941. Ḥîna digehî Medîne pake
Ispartibu[3] wan Ruqeyye xake
***

6942. Sê roj ku diçûn û ew di Bedre
Rabûye resûlê piṛṛ ji qedr e

6943. Ew çuye şirîn bû ser derê bîr
Gazî kire qewmê wey Xudêgîr

---

[1] 1.4.1381h. (jêrenota Şuşî bi xwe ye)
[2] Virêkiri, hinartî
[3] Emanet kirin

6944. "Ey engûme bûne pîs ʿeşîret"
Bednavîyê du cîhan we sîret

6945. "Ey engûdigûte min diruhîn
Bawer bi me ʿalemê bû şîrîn"

6946. Ey ʿUtbe û Şeybe û Umeyye
Bûcehlê serûkê kufr û ẋeyye

6947. Gû: Ey tu fulan kuṛê fulane
Ta gûtî ye bîst û çar ji wan e

6948. Aya hewe dî çi gel we gûtî
Rebbê hewe ey we xane ṣutî

6949. "Wergirtîye çenku min temame
Çî Barî bi weʿdeyê xû da me

6950. Eṣḥabe gûtin resûlê muxtar
Ku gel mirîyan dibî xeberkar

6951. Ferman kire wan resûlê Barî
"Ew zêde ji hûn diken gudarî"

6952. Guh lê ye ewan cewan xîṭabe
"Emma nedişên biden cewabe"

6953. Ḥîna we digû resûlê nûrî
Rengê wî Ebû Ḥuẕeyfe gurî

6954. "Ez bêm gû di dil te pê nexûş e"
Ber babê xû ey xudanê huşe

6955. Wî gûtî: Nexêr bi ẕatê Barî
Min nasîye ew bi kufr û xwarî

6956. Ber ʿeql û ḥilim wî piṛṛ esef mam
Min hîvî hebû bibîte îslam

6957. Ev renge şirîn cewab wî daye
Peyẋemberî bû dikir duʿaye

**Însîrafuhu ʿEleyhî's-Selamî Îlel Medînetî (Vegeryana Wî Silav lê Bin bo Medînê)**

6958. Geryave Nebî bi keyf û şayî
Gel yar û ṣeḥabeyan tebayî

6959. Ê bûne ji wan şehîdê Bedr e
Ew çarde ne piṛṛ ji xêr û ecr e

6960. Şeş bûn ji muhaciran bi ejmar
Ḥariṯ puserê ʿUbeyde dildar

6961. Yek ew bû ʿUmeyrê Îbnû Weqqaṣ
Yek ʿAqilê bab Bukeyre mêrxaṣ

6962. Êkê dî digûtinê Ẕuwalşimaleyn
Ṣefwan e yekê dî piṛṛ dilî zeyn[1]

6963. Yek Mîhceʿe kuleyê ʿUmer ew
Ev şeş kese bûne behrewer ew

6964. Heşt in ji şehîdê Bedrê enṣar
Seʿdê kuṛê Xeyṯemê hunerdar

6965. Gel Bîşr û Yezîd û gel ʿUmeyre
Wek Rafʿi û Ḥariṯê bi xeyr e

6966. Du yêt dî Muʿewwiz û Muʿaz in
ʿEfrayê du kuṛ ji rengê baz in

***

6967. Neḍreê kuṛê Ḥariṯê Xudêgîr
Yek bûye ji wanê ḥeftê êxsîr

6968. Peyẋemberî gût ʿElî hunerdar
"Şîrek li serî bidey şirînkar"

6969. Hem ʿUqbe kuṛê Muʿeyṭê meşhûr
Gût ʿAṣimî: Ten ji can bikey dûr

6970. Wî gûte Muḥemmedî di gavê
Ger min bikujî divê deravê

6971. Kî êdî heye bû wan tifalan
"Agir" gûtî - Ey te qur bi ḥalan

6972. Hem Sehlê kuṛê ʿEmir ji wan e
Înan bû peyemberê zemane

6973. Reiyê gû ʿUmer wesan dibînim
Êk êke ji wî didan derînim

6974. Derḥeq te çi qed wî xuṭbe gûtin
Evruke divê cezay bixwutin

6975. Gû: "Bêle ʿUmer ji paş dibînî"
Rojek wî xeṭîbê çak bû dînî

6976. Peyẋemberî ev digût ji ẋeyb e
Gûtna wî ne cê guman û reyb e

[1] Rindatî, zînet

6977. Roja ku wefat dikir peyember
Bû zêr û zeber cîhan bi yekser

6978. Nêzîk bû Mekî bibinve kafir
Ev Sehle li wî xeṭîbê mahir

6979. Ey gûtî Qureyşîyan bizanin
Ey hûn hemî piṛṛ ji rayê can in

6980. Zînhar xû neken dumayê îslam
Pêşî hemîyan bi kufrê bednam

6981. Ez sundê dixwum bi bêmekanî
Dînê xû diket bi kameranî

6982. Min dîtî peyẋemberê ename
Westabû digût di ev meqame

6983. “Hu şehde biden şirîn û taze
Bê şubhe dibin bi serfiraze

6984. Dê bû we bibin ʿereb emirber
Dê gehne we gencê furs û qeyser”

6985. Ev çende we dîtî bûyî muyesser
Ya dî jî dibî bi şahê ekber

6986. Hişyar bûneve bû dînê pake
Bew weʿẓê dixwundî Sehlî çake
***

6987. Peyẋember û ṛehberê zemîne
Ḥîna digehişte pak Medîne

6988. Eṣḥabê dihatine nik bi carek
Ey hatî bi xêr û rê mubarek

6989. Çen mêje ji bû tu çav li rah în
Ber derdê fîraqê dil bi ah în

6990. Rebbê te ji bû te harîkar e
Işkandî te duşmin û neyare

6991. Gûtî Selemey kuṛê Selame
Ey nûr û çirayê xir ename

6992. Çen pîrejinek ne pirçê ser may
Teşbîhî bi ḥêştirêt girêday

6993. Geştînê bi şîr û rum di mehtab
Ser jê me kirin ji rengê qeṣṣab

6994. Peyẋemberî gût û ew girnicî
“Ew bûn ji Qureyşîyan birincî”

6995. Ferman kire yar û dilpezîran
Hun çakî biken digel esîran

**Neʿyu Qureyşîn Bîmeîsatî Bedrîn (Şîna Qureyşîyanan bi Şikesta Bedrê)**

6996. Pêşî hemîyan çu Ḥeysemane
Bû ehlê Mekê biḥal beyane

6997. Gûtin: Çi heye li paş te kare
Leşker gû şikest û çûn bijare

6998. Kuştîne Umeyye, ʿUtbe, Şeybe
Ḥeccacî du kuṛ wesan ne reyb e

6999. Wek Bûlḥekemê kuṛê Hîşamî
Ta gûtibû bîst û çar temamî

7000. Piṛṛ bûye Mekê ji girî û zîmar
Her xanî û her meḥelle hawar

7001. Yê bab lê nemaye yê biraye
Yê cerg û ceger wî kuṛ nemaye

7002. Çen rojê ewan dikirye şînî
Axir digûtin ji kîbr û kînî

7003. Şînî bes e çî me çuyî çi may
Hindê dî Muḥemmedî neken şay

7004. Êxsîr vekirîn nekir qebûle
Ḥetta ku dibûn bi can melûle

7005. Ewwel vekirî Ebû Wedaʿe
Kuṛ Muṭṭelibê bi dil xîdaʿe

7006. Gûtin bi serûke Babê Sufyan
Emrê kirî xû vekir çu hemyan

7007. Gû: Kuştine Ḥenẓeley delal e
Hem kuṛ çu hem biçît me male

7008. Gû navekirim ji kerbê wan e
Ew kuṛ jî bila biçît wesane

7009. Ta Seʿdê bi navê Babê Nuʿman
Bû ʿUmre çu girtî Babê Sufyan

7010. Enṣarî Benî ʿEwif şirînkar
Wan qîṣṣe dikir bû yarê muxtar

7011. ʿEmrî bide me di vê deravê
Da Seʿdê me bête der ji davê

7012. Peyẋemberî dabû wan hinarî
Geryave Seʿid bi tazekarî
***
7013. Peyẋemberî gûte mamî taze:
"Xû bikreve tu bi ʿîzz û naze"

7014. Gel her du kuṛêt biray şirîne
Gel ʿUtbeê ʿEmrê sundexwîne

7015. ʿEbbasî gûtî: Ve çende pare
Bîst weqiye ji zêrî ber jimare

7016. Hun bû me ḥisêb biken buha ye
Cab dave peyemberê Xudaye

7017. "Ew maleke bû me day Xudayî
Belkî te dirav di malê mayî"

7018. Wî gûtî: Çi dî me nîne pare
Gû: "Ṛast bibêje mam bi zare"

7019. "Gava tu dihatiye der ji xanî
Sirrek te gû day feḍil nîhanî"

7020. "Ha bigre bû xû ve çende male"
Da ṣerif bikey ji bû ʿeyale

7021. ʿEbbasî gûtî: Qesem bi Barî
Ê tu bû beşeṛ bi ḥeq hinarî

7022. Ev sirre te gû ji dil nîhanî
Nê bijlî min û wê kes nizanî

7023. Elḥeq - Tu peyemberê Xuda yî
Bû cumle beşeṛ bi rehnuma yî

7024. Wî xû vekirî û du biraza
Yek pake ʿEqîl e merdê aza

7025. Ḥariṣ puder e ewê dî Newfel
Gel ʿUtbe hemî kirîn mukemmel
***
7026. Hem bûye esîrê Bedrê Ebûlʿaṣ
Zengîn û emîn û merdê mêrxaṣ

7027. Zavayê Nebî bû Zeynebê mêr
Xarzayê Xedîceya xudan xêr

7028. Hêşta bû weḥî nehatî xware
Ser xaṭirê wê lê kirbû mare

7029. Ḥîna ku Nebî dibû peyember
Neşya ku jê wergirît gula zer

7030. Roja ku esîr kirîn Qureyşan
Zeyneb jî kiça resûlê piṛṛ şan

7031. Gerdenliẋeka Xedîcedayê
Gel wan dihinêrî bû fîdayê

7032. Gava ku didî Nebî bi çavan
Ṣutin digehî dil û hinavan

7033. Nê ew ji Xedîce yadîgar e
Serdarê hemû ḥerem bijar e

7034. Peyẋemberî gûte ehlê Bedre
Şulek me heye gelek bi ecr e

7035. Êxsîrê kiça me ber biden hun
Gerdenliẋê jî bi ser biden hun

7036. Wan gûtî belê li ser du çavan
Ey em bi fîda he roj û gavan

7037. Peyẋemberî gûte merdê Bûlʿaṣ
Şeṛṭek me heye qebul bikey xaṣ

7038. Gava tu bi xêr di çuyî bû mal
Zeyneb tu virêbikey bi herḥal

7039. Zeydê kuṛê Ḥariṣey şirînkar
Gel yek dî emîn ji pake enṣar

7040. "Hun her du herin ji dil emîn in
Da Zeynebê bû me gel xû bînin"

7041. ʿEḥdê xû bi cê dikir di ḥîne
Zeyneb wî hinarî bû Medîne
***
7042. ʿEmrê kuṛê Wehbî ger nizanî
Duşmin bû peyemberê zemanî

7043. Êxsîr bibû wî bira di Bedre
Hindê dî tijî bû dil ji qehre

7044. Ṣefwanê kuṛê Umeyye gûtî
Bab kuştî li Bedrê can wî ṣutî

7045. Paş wanê li Bedrê çûn nehatê
Xûşî me neman bi vê ḥeyatê

7046. ʿEmrî gûtî: Ez çi kem ji ḥalî
Qerdar û xudanê vî ʿeyalî

7047. Werne dê biçim ji bû Medîne
Piṛṛ ḥîle û mekr û piṛṛ ji kîn e

7048. Ḥetta dikujim bi her desîse
Lew qewmê Muḥemmedê reîse

7049. Ṣefwanî gûtî: Eger tu dê key
Ser min te biçuk û deyne çî hey

7050. Rabûye ʿEmir bi canfîda ye
Şîrê xû husî û jehrî daye

7051. Ew çuye Medîneyê bi kîne
Peyẋemberî gût: ʿUmer bihîne
7052. Jê girtî ʿUmer wî deste şîre
Wî bir bû peyemberê munîre

7053. Peyẋemberî gû: Tu bû çî hatî
Gûtî: bû esîrê vî welatî

7054. Gû: ṚastÎ bibêje ey cewane
Dubare ewî digût wesan e

7055. Peyẋemberî gûte wî: We nîne
Ṣefwanê digel te ʿeḥdixwîne

7056. "Tu hatî tinê bû kuştina min
Êdî weye yan ne gûtina min"

7057. Wî şehde dida ji dil di gave
Ev sirre gûtî nebûy belave

7058. Bijlî min û wî kesek nizanî
Min zanî peyemberê zemanî

7059. Peyẋemberî gûte wan şirîne
"Fêrken vî birayê xû bi dîne

7060. Nîşa wî biden hinek ji Qurʾan"
Îman wî tijî dilî bû der an

7061. Bû berdeneve esîr biraye
Berdaneve wan ji bû Xudaye

7062. ʿEmrî gû peyemberê ename
Emrê te eger li ser timame

7063. Ez dê vegerêm bû Mekkeya pak
Wan zêde dikem ḥezîn û ẋemnak

7064. Min çendî kirîne gel ṣeḥaban
Sê hinde bi wan didem ʿezaban

7065. Dê gazî bikem bû dînî taze
Min pişt bi Xudê bi serfiraz e

7066. Raḍî bû Nebî ji rayê ʿEmr e
Geryave digel biray bi fexr e

7067. Geryave bû Mekkeyê xudan kam
Ew bûye xeṭîbê dînê îslam

7068. Zur daye neyarê dîn ʿezabe
Çen cewr û cefa û çen ʿîtabe

7069. Îman gelekan bi wî dianî
Dilzînde bûyîn bi nurê canî
***
7070. Peyẋemberê piṛṛ buha û qedr e
Ferman kire çen esîrê Bedre

7071. Ê xeṭṭ û qelem ewan dizanî
Xeṭṭ kêm bûye nê di wî zemanî

7072. "Her kes ji we deh biçuk bi ejmar
Ger fêrî xeṭî biken şirînkar

7073. Dê hingûʿefû bikem temame"
Wan fêrkirin û gehîn merame

7074. Karek bû Nebî kirî bi ḥîkmet
Zur pêtivî ew bû dîn û dewlet

7075. Nê xeṭṭ û qelem me pêtivî ne
Bû jînê cîhan û neşrê dîne

7076. Bû karê muhîm qelem delîl e
Bû sirrê nîhan qelem wekîl e

7077. Bê ḥed bi wî pêk dihên merame
Karê du cîhan bi wî temame

7078. Qurʾan û ḥedîṯ û şeṛʿ û eḥkam
Tarîx û ḥisab û karê îslam

7079. Nê cumle dibin bi xeṭṭ û xwundin
Ew çen di fer in du hin pesind in

7080. Xeṭṭ pêtivî ye di vî zemanî
Bû dewlet û dîn û ḥukimranî

7081. Ney bes bi tinê me xeṭṭê îslam
Belkî xeṭṭê cumle dewletan ʿam

7082. Seyrê ke peyẋemberê zemîne
Ḥîna digehişte nêv Medîne

7083. Ferman kire yek ṣeḥabe û yar
Zeydê kuṛê Sabitî ji enṣar

7084. “Xû fêrî xeṭṭê cwiyan ke taze
Ḥetta jê bizanî sirr û raze”

7085. Ger xeṭṭ  û qelem eger zubane
Zur pêtivî ne me ev zemane

**8. Meşruʿîyyetu Selatul ʿÎydîl Fîtrî (Binecihbûna Nivêja Cejnê û Remezanê û Zekata Fitrê)**

7086. Mahê remeḍan ku çen bi qedr e
Rojek du di man bû ʿîdê fitre

7087. Ser fitre wekî bû fer ji ummet
Ew renge nivêjê ʿîd bû sunnet

**9. Ferḍîyyetu Zekatîl Malî (Ferzbûna Zekata Malî)**

7088. Ev sale du ye di mahê şewwal
Hem fer bû di dîn zekat li ser mal

7089. Sirrek mezin e kesê biket fam
Ev ferḍe zekat di dînê îslam

7090. Xaliq bi kemalê ʿîlm û ḥîkmet
Wî danî esasê jîn û ulfet

7091. Zengîn û geda û xurt û jare
Bew ruknê zekatê kirne yare

7092. Yê gûtî resûlê piṛṛ ji qedr e
Îslamê zekat ji rengê cisr[1] e

7093. “Danaye Xudê li nik xudanmal
Têra wî feqîr û jarî her sal”

7094. Ger bêt û zekat wekî he caran
Der ken bû ewan feqîr û jaran

7095. Ḥacet ne dimînî wan temamî
Vêkra dê bijîn bi nîkunamî

**10. Ẋezwetû Benî Qeynuqaʿîn (Ẋezwa Benî Qeynuqaʿê)**

7096. Peyẋemberê piṛṛ kemal li îqbal
Çu Ẋezweê Qeynuqaʿê di şewwal

7097. Lewṛa ku dihatve ew ji Bedrê
Rabûn ji ḥesed cwî piṛṛ ji ẋedrê

7098. Rabûyeve Ṣaḥibul Şefaʿe
Wî xirvekirin di Qeynuqaʿe

7099. Wî gûte cwîyan bi ray bimînin
Hun ḥalê Qureyşîyan dibînin

7100. Hun çake bi min biken bi bawer
Hun zanîye ḥeq ez im peyember

7101. Wan gûte nebî: Nekey gumane
Bû cengê ne em ji rengê wan e

7102. Em ehlê şeṛ û deravê ṭeng în
Nêv meʿrekeyan bi nav û deng în

7103. Çendî bû digûtî pak resûle
Ev weʿẓe ewan nekir qebûle

7104. ʿEḥdê xû bi cêve nagehandin
Wan pêşî hemû cwîyan şikandin

***

7105. Yek jin ji Medîneya munewwer
Çu nik cwîyekî bi karê zerger

7106. Nageh wê dihê cwîyek çu haman
Sinceq wî li piştê da bi daman

7107. Rabûye jinik dema diçîte
ʿEwret ji jinê diyar dibîte

7108. Çav lê bû kesek ji ehlê îslam
Wî kuştî di gavê cwîyê bednam

7109. Lê xirve bûyîne cwî çu dergav
Kuştîne zelamê mey xudan nav

7110. Pê zanî peyemberê mubarek
Xû aṣê kirin ewan bi carek

7111. Wî danî Ebû Lubabe rengîn
Wek cengê Bedir li cê xû sengîn

7112. Ala wî bi dest Îmamê Ḥemze
Gel leşkerekê bi rêz û ṭerze

7113. Wî dan li ḥiṣarê çarde rojan
Ta dil bû ji tirsê wan tijî jan

7114. Naçarbûne ew dihatne xware
Ser ḥukmê resûlê namidare

[1] pir

7115. Qulbestî[1] kirin resûlê serwer
Wî fikre heman bigêrî bê ser

7116. Ew ʿEbdê Xudê ku bab Ubeyye[2]
Meşhûr e serê nîfaq û ẋeyye

7117. Wî gûte peyemberê ename
Ez mêjeye sundxwarê wa me

7118. Dê ku bikujî me dûst û yaran
Ḥef ṣed kesî xir ji wan bijare

7119. Gû çak e heman bidey me xaṭir
Qeydî nîye gû resûlê ṭahir

7120. Wê gavê reî we dît cewane
Leʿnet bi ruḥa wî û ewa ne

7121. Çî malê hebûye wan dianî
Serleşkerî pêş kirin ji canî

7122. Wan neybû rez û durext û dare
Zêringirî wan dikir ji kare

7123. Peyẋemberî kirine der li wêrê
Ew çûne Ẕîbabê[3] dûr ji xêrê

7124. Axir xû diçin bû Eẕrîʿatê[4]
Ḥetta ku li wê diçin mematê

**11. Serîyyetû ʿUmeyrîbnî ʿEdîyyîn (Seriya ʿUmeyrê Kurê ʿEdî)**

7125. ʿEṣmaê bi navê babî Merwan
Yek jin bû çi guhdirêj û ezman
7126. Wê gavê civîn e gav tiṛane
Daket bi resûlê îns û cane

7127. Peyẋemberî gût ʿUmeyir nave:
"Tu her bikuje jina" gilave

7128. Rabûye ʿUmeyrê bab ʿEdîyye
Êvarî wî şîr ji dil hûsîyye

7129. Ew çu bi şevê bi rahê dure
Wî kirbîye jin di xwunê ṣure

7130. Geryave Medîneya munewwer
Kir ṣubhe nivêj digel peyember

7131. Mizgîn wî dida xudan ṣeḥabe
Ew gunde gûtî dibît xerabe

**12. Ẋezwetul Kudrî (Ẋezwa Kudrê)**

7132. Hem rabû wesa di mahê şewwal
Bû Kudrê diçû resûlê mîfḍal

7133. Lewṛa ku dizanî ḥeq peyember
Kumbûne Benî Selîm ji bû şeṛ

7134. Derkeftî bi leşkerek nîkunam
Ala wî bi dest ʿElîyê pismam

7135. Danabî li nêv Medîne meʿlûm
Ew merdê wî daye Ummû Mektûm

7136. Ew geşte Kudir ku ew revîne
Wan anî pezê ewan çi dîne
7137. Geryave ji bû Medîne taze
Gel yar û ṣeḥabe serfiraze

**13. Serîyyetû Ẋalîbîbnî ʿEbdîllahî el- Leys̱î (Seriya Ẋalibê Kurê ʿEbdullahê Leys̱î) r.158**

7138. Paş vê seferê dikir rewane
Ew Ẋalibê Leys̱î newcewan e

7139. Ew bû Ẋeṭefan û wan hinarî
Gel çen kesekan bû helbijarî

7140. Geştîne ewan cîhan bû ṭenge
Kuştîne gelek di nîvê cenge

7141. Sê bûne şehîde wan mubarek
Anîne mer û şutur bi carek

**14. Serîyyetu Salîm-îbnî ʿUmeyrîn (Seriya Salîmê Kurê ʿUmeyrî)**

7142. Ew Salimê bab ʿUmeyre meşhûr
Wî narte cwîyek xirab û meẋrûr

7143. Navê wî Ebû ʿEfik diyar e
Derḥeqqê Nebî çi pîsekar e

7144. Gav şiʿir digû li zem[5] peyember

[1] Girêdan, bi fikar bûn
[2] Navê babê wî Ebî Bîn Selûl (jêrenota Şuşî bi xwe ye)
[3] Navê cihekî ye(jêrenota Şuşî bi xwe ye
[4] Navê cihekî ye li Şamê(jêrenota Şuşî bi xwe ye
[5] Def, cem

Gav tên didetin cwîyêt di bedker

7145. Salim diçû ew ji cerg û canî
Ta kuştî Ebû ʿEfik nîhanî

**15. Ẋezwetu Sewîqîn (Ẋezwa Sewîqê)**

7146. Ew Ṣexrê dibêjinê Babê Sufyan
Paş Bedrê reîs bû Mekke hemyan

7147. Cergê wî diṣutî paşî Bedre
Wî ser xû dikir bi ferḍ û nezre

7148. Ta neçme Muḥemmedê me zanî
Bênxûşî nekem neşum giyanî

7149. Ew hatî bi leşkerek çi duşwar
Şev geşte Medîne merdê bedkar

7150. Çu lalî cwîyek reîs û mêrser
Jê pirsîye ḥalê pak peyember

7151. Mîşkem puderê bi navê Sellam
Ew meznê Benî Neḍîrê bedkam

7152. Wan ḥalê peyemberî ku zanî
Çûn jêrî Medîneyê nîhanî

7153. Wan ṣut ji ʿErîḍê[1] baẋ û bîstan
Kuştin du ṣeḥabî nêv gulistan

7154. Zivrîneve ew bi napesinde
Nik wî we ye ser nemaye sunde

7155. Ta geşte peyemberî heware
Ew çu bi du ṣed kesê bijare

7156. Nêzîk bûne ta ji wan Qureyşan
Tirsê dikirin gelek perêşan

7157. Pûxîn bûye zadê wan ṭexer ew
Havêtine du xû çen qeder ew

7158. Ew belkî sivik dibin bû ẋare
Pê gîru bibin resûlê yare

7159. Bê hîvî bû ew negeşte wane
Geryave peyemberê zemane

**16. Meşruʿîyyetu ʿÎydîn Nehrî wel Uḍhîyyetî (Binecihbûna Cejna Qurbanê)**

7160. Ẕûlhîcce bû salê du bi ferman
Sunnet bû nivêjê ʿeydê qurban

7161. Qurbanî wesa Xudayê ʿellam
Danayî şirîn di dînê îslam

7162. Xêrek mezin e ji bû xudanî
Ecra wî tinê Xudê dizanî

7163. Peyẋemberî nê we daye ferman
Ey ez hemû dem fîda û qurban

7164. "Qurbanî bû xû biken bijare
Dê bû we di ḥeşrê bin deware"

7165. Hun dê jê suwar bibin cewane
Ser cisrê cehennemê rewane

7166. Peyẋemberî kir nivêjê ʿeyde
Gel pake ṣeḥabeêt seʿîde

7167. Qurbanî vekuştî du beran ew
Ew her du qelew di dungê pan ew
7168. Hem gel wî vekuştî Ẕulyesarî
Bêş kirne li ser feqîr û jarî

7169. Ev ʿeyde gelek bi rêz û qedr in
Ew her du tijî ji xêr û ecr in

7170. Ev her du ne ʿeydê cumle îslam
Ya Reb me bikey bi wan nîkunam

7171. Fermanê peyemberê zemîne
"Hîcret ku me kir ji bû Medîne

7172. Her salê hebûn du ʿeyd ewane
Newrûz e ewa dî mîhrecan e

7173. Tê da dikirin sema û larî
Gurîne ji bû me her du Barî

7174. Çêtir ji ewan du rojê taban
ʿEydê remeḍan û ʿeydê qurban"

**17. Tezwîcuhu ʿEleyhî's-Selamî Faṭîmetez Zehraî mîn Seyyîdîna ʿElîyyîn K.W. (Zewaca Faṭîmayê bi ʿElî Raḍîbîna Xwedê li Ser Bît)**

---

[1] Navê erdekî ye.(jêrenota Şuşî bi xwe ye)

7175. Serdarê peyemberan û xatem
Fexrê du cîhan û nurê ʿalem

7176. Ev sale bi axirî geha ye
Daşûye kiça xû Faṭîmaye

7177. ʿUmrê wê digeşte şazde sale
Wî daye ʿElîyê piṝ kemale

7178. ʿUmrê wî digeşte bîst û pence
Ev lawê giran buha û genc e
***

7179. Bûbekrê mezin hevalê ẋar e
Ewwel diketin ṭeleb ji yare

7180. Wî gûte Nebî bi dilevînî
Min meyl e eger tu ray bibînî

7181. Pê xûş e me ger bibît neṣîbe
Kiçka te ku Faṭîma lebîbe[1]

7182. Ez ger çî ne laîq im bi wêrê
Emma tu dizanî karê xêrê

7183. Peyẋemberî hîç neda cewabe
Vî zanî ṭeleb ne ber ṣewabe
***

7184. Çu gût ʿUmerî bi dilnewazî
Çen çak e tu Faṭîmey bixwazî

7185. Min xwast û bi min neda peyember
Tu rabe bû xû bixwaze gewher

7186. Derḥal diçitin ʿUmer nîhanî
Daxwaz diketin ji yarê canî

7187. Wî serwerî hem cewab nedave
Geryave nikê ʿUmer di gave

7188. Gûtî bi me hem neda çi guftar
Ney bû te ne bû me bûye ev bar
***

7189. Ew her du diçin bi karêdanî
Gûtin bi ʿElî tu kameran î

7190. Zu rabe tu Faṭîmey bixwaze
Babet bi te ye ve pak niyaze

7191. Êk êke me kir ṭeleb neda me
Laîq bi te ye ve jurmeqam e

7192. Rabûye ʿElî bi dilviyanî
Çu ḥucreyê serwerê zemanî

7193. Ew dî bi tinê li pakemal e
Gûtî bi edeb me êk suale

7194. Ey min bi fîdayê tu me hergav
Dê dey bi me Faṭîma şirînnav

7195. Ger emrî bikey me arezû ye
Êdî tu dizanî karê xû ye

7196. Peyẋemberî gût û ew girnicî
"Ey hatî ʿElî bi xêr û qencî

7197. Meḥbûbê min î tu nazidar î
Dê dem bi te ez bi emrê Barî

7198. Ellah ji me ra rîsale hu ye
Ez Faṭîmeyê bidem bi tu ye"

7199. Peyẋemberê piṝ kemal û naz e
Lê mare dikir bi ʿeqdê taze

7200. Xuṭbek wî dixwundî zûr şirîne
Xir medḥê Xudayê ʿalemîn e

7201. Wî mehre ji dirheman bi ejmar
Ney zêde çuwar ṣed in bi exbar
***

7202. Pirsî ji ʿElî resûlê serwer
"Bêje çi heye" te ey dilawer

7203. Gû: Ḥêştirek û dewarekê çak
Ey meẓherê xuşxîṭabê lewlak

7204. "Hespê te gû eṣlî ye keʿêl[2] e
Ew pêtivî ye bû xû bihêle"

7205. "Bifrûşe şutur ji bû merame
Parey ji me ra bihîn temame"

7206. Rabûye piyan ʿElî şirînḥal
Ḥêştir wî dida bi destê dellal

7207. Nerxa wê gehişte çar ṣed û çar
Bîst dirhemê zîvî ew bi bazar

7208. Înan di demî hemû bi carek

---

[1] Jîr, biaqil
[2] kihêl

Pêş destê peyemberê mubarek

7209. Çendek jê hilanî piṛṛ kemalî
Wî gûte muezzin û Bîlalî

7210. "ʿÎṭrek[1] bikire bi ev dirave"
Ger misk e çi ʿenber û gulav e

7211. Bênxûşî pesind e bû heman ew
Bû bukê pitir heman cewan ew

7212. Wî gû di demî bi ehlê male:
"Min dayeşu Faṭîmey delale

7213. Meḥbûbe li nik me nazenîn e
Min daye ʿElîyê navşirîne

7214. Pakîzejin[2] e çi newcewan ew
Serdarê hemû jinêt cîhan ew"

7215. Nûrîndil e ew ṣîfethemîd e
"Parçek ji min e ve newresîd e"

7216. Talʿisipî ye xudanê bext e
"Karî bû biken nivîn û texte"

7217. Bû taze durist kirin cîhaze[3]
Her wek ku peyemberî nîyaze

7218. Textek bi şeṛîṭ û dar û bizmar
Neccarî durist dikir şirînkar

7219. Balîf bû kirin cewan û nerme
Piṛṛ pwîş û pelex bû ru ji çerme

7220. Serdarê hemû jinêt zemînê
Ev çende cîhaz bû nazenînê
***

7221. Ey dil were ger te fam û raye
Ev kavledinê ne ber beqa ye

7222. Yekser ji fesad û piṛṛ ẋurur e
Piṛṛ fîtne ye mekr û ḥîle zûr e

7223. Piṛṛ derd û bela ye ser li çûn e
Lew her çî viyayî sernixune

7224. Her çî ku viyayî ev cîhan pîr
Bê ʿeql û kemal e dûr ji tedbîr

7225. Wê xûşî netîce ṛenc û tal e
Bê fayde ne zêr û genc û male

7226. Seyrê ke cîhazê Faṭîmayê
Ta dil bi cîhan nebey çi şayê

7227. Bew feḍl û kemal û ʿîzz û naz e
Ev çende bû mehre û cîhaze

7228. Ney baz in û ristik û guhar e
Ney cilk û çekêt di zer nîgar e

7229. Peyẋemberî ma nekirye ferman
Ey ez hemû dem fîda û qurban

7230. "Ew jin ji heman pitir bi behr e
Sanahîtirîn kizut[4] û mehr e"
***

7231. Ṣed daẋ û keser bû ev zemane
Bû karê diken li ser jinane

7232. Ekser tu dibînî xudperist in
Bû nav û nîşanî têz û çust in

7233. ʿAşiq bi riya û malê zûr in
Dûr nîne bibêm li dîn di dûr in

7234. Kiç nadene şu ḥeta neket mêr
Bû cilk û çekan ḥeta dibin têr

7235. Ew cilk û çekêt di vî zemanî
Piṛṛ keşxe ji bû ẋururê canî

7236. Nextî bidetin li pêş temam e
Gel çen ji xelatê piṛṛ bi ṭame

7237. Çendan tu lewa dibînî naçar
Ser xaṭirê jin dibûne qerdar

7238. Ekser ji ʿewamê nextexur in
Belkî ji bijareyan di zûr in

7239. Nik wan we ye wan ne qedr û bext e
Ger wernegirin xelat û nexte

7240. Belkî ji dilê ewan diyar e
Kiç ceḥşeker e diden bi pare

---

[1] Bêhna xweş
[2] paqijejin
[3] cihêz
[4] Bi kuṛdî cihêza bûkê (jêrenota Şuşî bi xwe ye)

7241. Ger babê kiçê ye ger bira ye
Piṛṛ şay e ku jin giranbuha ye

7242. Ger seyrê bikey bi çavê durbîn
Wezʿek tu dibînî zûr neşîrîn

7243. Pisyarê diken ji ḥal û male
Kêm kes ji kefaetê[1] suale

7244. Jinxwazî bila ne eṣl û dîn bî
Ney Feḍl û kemal û rûy şirîn bî

7245. Emma di demê xudan meʿaşe
Zengîn e nexû ji ḥalî baş e

7246. Nextî didetin bi keyfê babî
Dê jin bidenê bilan çewa bî

7247. Min xû dîye çen kesêt şeṛefnak
Jin daye binasiza[2] û napak

7248. Wan çunke didan diravekê zûr
Ew bûne li her du çav û dil kuṛ

7249. Jinxwazê neyî[3] bilan welî bî
Xû neslê îmamê mey ʿElî bî

7250. Piṛṛ werʿi û dîyanet û kemalî
Ṣaḥibhunerî xudan cemalî

7251. Emma ne te next û çak cîhaze
Xû mandî neke çi jin nexwaze
***
7252. Ḥîna ku temam kirin kizute
Peyẋemberî bû ʿElî digûte

7253. "Ev kare divêt ji bû welîme
Tu zadekî çêke ger çî kême"

7254. Gû: Min çi niye bi xû dizanî
Seʿdî gû: Pezek me hey di xanî

7255. Pêşkêşî ʿElî me kir bi dilxuş
Ta yar û bira bi can biken nuş

7256. Wî xirvedikir ji male enṣar
Yek fitre ji erzinî şirînkar

7257. Bû yarê ʿElî dikir ḍiyafet
Jê xwarî ṣeḥabeyan bi ulfet
***
7258. Peyẋemberî gût ʿElî nîhanî
"Gava te kiça me hate xanî

7259. Zînhar çi nekey ḥeta dihêm ez
Bû hucreyê hingû" ey muʿezzez

7260. Bû taze neqil kirin şirînkar
Pîrûzî li wan bî ey hizar car

7261. Ev bûke çi nazenîn û gulşen
Berbuke ji bû wê Ummû Eymen

7262. Ev bûke serûkeya jinan e
Zava ye ʿElîyê newcewan e

7263. Zava ye belê Îmamê Ḥeyder
Ev bûk e kiça resûlê serwer

7264. Ya Reb tu bi her du bûk û zavan
Ron key tu ji min dil û du çavan
***
7265. Peyẋemberê piṛṛ buha û raye
Çu lalî ewan ji paş ʿîşaye

7266. Şirîn li derî diket suale:
"Aya me biray ʿElî li male"

7267. Berbukê digû: Belê ji canî
Ez gurî te bim kerem ke xanî

7268. Ey min bi fîda bi bab û daye
Hem kiç dideyê û hem bira ye

7269. Wî gûtî: Belê resûlê lewlak
"Zava û bira ye ev şeṛefnak"

7270. Ronişṭî ye ew bi rêz û rengîn
Wî royê geş û zubanê şirîn

7271. Ew ûde bi nûrê rûy munewwer
Meclîs bi qisêt di xûş muʿeṭṭer

7272. Wî gûte kiça xû Faṭîmayê
"Avek tu ji bû me bîne dayê"

7273. Ew rabû bi nazikî û çustî
Yek bade tijî didaye destî

[1] Lihevbûna jin û mêran
[2] Nekêrhatî, ne layiq
[3] Feqîr (jêrenota Şuşî bi xwe ye)

7274. Peyẋemberê piṛṛ bi ʿîzz û naze
Qurmek[1] dikire devê xû taze

7275. Carek dî dikirve nîvê came
Gû: “Hêve were tu ey kiça me”

7276. Wî taze ṛeşandî ew bi carek
Sîne w ser û navmilêt mubarek

7277. Gûtî: “Bi te ey Xudayê Reḥman
Vê kiçkê ḥifiẓ dikem ji şeyṭan

7278. Wê gel hemû neslê wê temame
Durbêxî ji şeṛrê her nekame”

7279. Gûtî: “Tu here tu wer ʿElî nav”
Ev renge bi wîj dikir bi ew av

7280. Ew taze duʿa bû kir temamî
Rabuve piyan bi vî kelamî

7281. “Wêca ji te ra bi navê Ellah
Hem ʿuşr e û xûş heval bi dilxwah

7282. Ey her du bibin li yek dî pîrûz”
Şula we çi ca nebîte aluz

7283. “Barî bidetin we nesleka pak”
Maqûl û muṭehher û şeṛefnak
***
7284. Barî bi kerem bû ev betûle
Ev taze duʿaye kir qebûle

7285. Nesla wî tijî hemû cîhan in
Piṛṛ nav û nîşan û ʿîzz û şan in

7286. Bê ḥed ʿulemaʿ û pak û zahid
Çak û ṣulehaʿ û pîr û ʿabid

7287. Çen ṛehber û pêşrewêt şeṛîʿet
Çen ehlê ṭerîqet û ḥeqîqet

7288. Çen serwer û mêrserêt hunerdar
Çen hakim û beglerêt şirînkar

7289. Şêxêt di mezin xudan keramet
Xusersupehêt[2] xudan şehamet

7290. Çen quṭbê mezin xû Ẋewsê Beẋdad
Rabûne ji neslê wan eṣilzad

7291. Ruffaʿî bi nûr e şêxê Eḥmed
Eḥmed Bedewî bi cahê bê ḥed

7292. Seyrê ke Dusûqî Îbrehîme
Çen ʿalim û qutbekê ʿeẓîm e

7293. Emṣalê di wan ji namidaran
Zur in li dinê hizar hizaran
***
7294. Ya Reb bi peyemberê zeman key
Paşî tu bi cahê van heman key

7295. Ṭahir tu bikey hevalê wan e
Ṣaẋ key tu ji min giyan û cane

7296. Durbêxî ji şeṛrê nefs û bedkar
Qurtar ke ji vî zemanê duşwar

7297. Şermende nekey di kaxê meḥşer
Gel wan me bibey bi baẋê kewṣer

7298. Ferxunde bikey bi xû lîqayê
Dilzînde bikey bi wê lîqayê

**Ewladu Faṭîmatîz Zehraî mîn Seyyîdîna ʿElîyyîbnî Ebî Ṭalîbîn (Zarokên Faṭîmayê ji ʿElîyê Kurê Ebû Ṭalibî)**

7299. Ewladê ʿElî ji Faṭîmayê
Ew pakexezîneya wefayê

7300. Sê kuṛ bi buha û kanê quds in
Her du Hesenêt şeṛîf û Muḥsin

7301. Kiç du ne ji Faṭîmayê meʿlûm
Yek Zeyneb e ya dî Ummû Kulṣûm

7302. Muhsin ji ʿumir gehişte şeş mah
Canê xû siparte ẕatê Ellah

7303. Seyîd Hesen e eger Huseyn e
Dumayê dê beḥṣê wan bikeyne

7304. Kulṣûm ji ʿUmer xelîfê ṣanî
Lê mehre dikir ʿElî ji canî

7305. Zeyneb wî didaye ʿEbdê Ellah
Kuṛ mamê wê Ceʿferê xudan cah

[1] Firek

[2] Fermandarên artêşê, Xudan şehamet" tê wateya xwedî wêrekî

**18. Wefeyatul Hazel ʿAmî (Mirinên vê Salê)**

7306. Zanî te dumayê cengê Bedre
Ew mirbû Ruqeyye piṛṛ ji qedr e

7307. Babê wê peyemberê Xudê ye
Malxuyê wê ew xelîfê sê ye

7308. Ẕulhîcce bû mir bi emrê Reḥman
Meẕʿûn puserê bi navê ʿUs̱man

7309. Gel wî çu peyemberê şefîʿe
Şardar[1] dikirin di nêv Beqîʿe

7310. Ser gurî wî danî yek nîşane
Lew rojê dibûye kêl cewane

**EZ-ZEHRETU'R-RABÎʿETÛ (KULÎLKA ÇARÊ)**

**Fî Ḫewadîsîs̱ Senetîs̱ S̱alîs̱etî (Bûyerên Sala Sêyê Koçî)**

**A/ˡ Serîyyetu Muḥemmed-îbnî Meslemetî (Seriya Mihemedê Kurê Meslemey)**

7311. Keʿbî kuṛê Eşrefî çu haman
Cwîyek bû ji Ṭey ji neslê nebhan

7312. Paş cengê Bedir bû tijî jan
Lêda çû Mekê bû nêv Qureyşan

7313. Bû wanê diçûy ji Bedrê kuffar
Wî şiʿir digûn ji rengê zêmar

7314. Hindê dî wî riṣt kirin bû cenge
Hun lazim e tul veken direng e

7315. Geryave dema cihê xû bedker
Wî şiʿir digûn li ẕem peyember

7316. Car beste digûn bi pîseezman
Derḥeqqê ewan jinêt musilman

7317. Peyẋemberî gût heval û yare
"Aya kî ji hûn bikar û bar e

7318. Bû Keʿbê ji Eşrefî bi leʿnet
Wî daye min û Xudayî eẕyet"

7319. Bab Meslemeyê bi nav Muḥemmed
Ṣaḥibcegerê ji dil şirînqed

7320. Gû ez dê biçim penah bi barî
Bes iznê qisan bidey bixwarî

7321. Gû: "Bêje heçî tu ray bibînî"
Belkî tu ji Keʿbî can sitînî

7322. Ew rabû bi çar kesan bijare
ʿEbbadê Bîşir bû yek ji care

7323. Bûnaîleyê bi navê Selkan
Ḥaris̱ kuṛê Ewsî yek ji erkan

7324. Ev bûye li gel wî cwî biramak
Buʿebsê kuṛê Cebir çi mêrçak

7325. Ser nijde diçû bi her çî ḥale
Pîçek wî emîn biket di male

7326. Ew çuye nikê di nêv qelatê
Ger yar bî Xudê dibet mematê

7327. Wî gûtîye Keʿbî ger bizanî
Sirrek me heye ji dil nîhanî

7328. Hel hatîye nik me ev zelame
Ḥalê me nexûş bûyî temame

7329. Ew tiştê ji me dixwazî hergav
Bêhna me wî kuṛt kirîne ṭengav

7330. Emma me hinan şeṛim bi xû ye
Çî xwastî dideyn ji avê ro ye

7331. Hatîme bi qer bidey me zadî
Dê înmeve zu bi keyf û şadî

7332. Çen kes dî di gel me ev meram e
Dilreş bûne ew jî lew zelame

7333. Wî gû: Me negût we her ji pêşî
Dê hingû bi wî ve ser biêşî

7334. Gû: quti didem çu qeydî nîne
Emma m divêt ji hûn rehîne

7335. Gûtî: Çi rehîn wî gût ji cane:
Gurwanî divê biden jinane

[1] Veşartin

7336. Wî gû: Tu çi lawekê cewan î
Jin nabî e tu bi xû dizanî

7337. Pa gûtî kuṛan bikey rehîne
Hem gûtî: Nê şeṛm e dilkelîn e

7338. Gurwanî dideyn zirî û şîran
Tiştê sipehî ji bû emîran

7339. Raḍî bû cwîyê me piṛṛ ẋurur e
Geryave Muḥemmedê cesure

7340. Wî qîṣṣe dikir ji bû hevalan
Çûn cwîyê xû can biben bi talan

7341. Şev geştine ber derê qelatê
Hat xwarê cwîyê diçît nehatê

7342. Jinka wî gûtî: Bi şev neçu xwar
Bawer te nebît bi qewmê enṣar

7343. Zavayênû piṛṛ ẋurur û bê bak
Xuyî negûtî digel biramak

7344. Bûnaîle gût: Hevalê xû ye
Ez dê bigirim bi ḥîle cwîye

7345. Gava me gûtî werin seraser
Melʿunî biken bi şîrî ker ker

7346. Ew hatîye xwar çu dêwê meste
Bûnaîle çuye nik bi qeste

7347. Ey gûtî çi bên dihêt ji tu ye
Ev newʿe bêhnxûşî nebûye

7348. Gû:nû ji ʿereb jinek me anî
Mis̠lê wê çu nîne bû cewanî

7349. Raḍî gû eger te bên bikem têr
Gulya te bi ṛeş xelek wekî qêr

7350. Çu gûtî bêhnke qeydî nîne
Wî bênkir û girtî çak leʿîne

7351. Rabin gûtî ey cewane mêran
Mala wî biken xirab û wêran

7352. Ta kuştine ew xebîs̠ê bedkar
Ḥaris̠ kuṛê Ewsî bû birîndar

7353. Ta cwîyê xû wan kirîne bê hest
Şîrek bi pîyê wî keftî bê dest

7354. Ew êdî diçûn bû mal bi ẋare
Hilgirtine zamidar neçare

7355. Mizgînî didane ḥeq peyember
Dilxûş bû gelek ji canê enwer

7356. Ev kare dema cwîyan dizanî
Wan êdî tiris gehişte canî
***

7357. Peyẋemberî gûte wan hevale
Her kes bikujît cwîyan ḥelal e

7358. Mesʿûd puserê Muḥeyṣe nav e
Çu Îbnû Suneyne her di gave

7359. Ew êk bû ji tacirêt cwîyan e
Jê jêkve kirin giyan ji cane

7360. Pê zanî dema biray Ḥûweyṣe
Muşrik bûye hêj wî gût Muḥeyṣe

7361. Ku kuştî erê te yawerê ez
Ḥûrkê[1] te ji malê wî tijî bez

7362. Çen çake kirin digel me her ew
Bê nan û nemek tu hatye der ew

7363. Wî gûtî: Bira tu ku dizanî
Ez sundê dixwum bi bêmekanî

7364. Êkê we bi min dikirye ferman
Ger bêjî te jî dikem bi bê can

7365. Serdar û peyemberê zemîn e
Her emrê biket çu red bû nîne

7366. Wî gûte birayî piṛṛ ʿeceb mam
Çen çuye dilê te dînê îslam

7367. Tu min bikujî ku ḥeq bira me
Min bawer e dînê tu temam e

7368. Çu lalî peyemberê zemanî
Îslambûye ew ji cerg û canî

**B/ب Ẋezwetu Ẋeṭefan (Ẋezwa Ẋeṭefanê)**

7369. Ev sale peyemberê Xudaye
Çûbû Ẋeṭefan ji bû ẋezaye

---

[1] Yanî zik (jêrenota Şuşî bi xwe ye)

7370. Lewṛa ku peyemberî dizanî
Kum bûne bû cengê çen nîhanî

7371. Ew S̱eʿlebe û Muḥarib êt zûr
Serdarê ewan dibêjnê Duʿs̱ûr

7372. Rabûye Nebî bi kar û bar e
Gel xû birî çar ṣedêt bijare

7373. Dana wî li cê xû Îbnû ʿEffan
Zavayê kevin Îmamê ʿUs̱man

7374. Nêzîk bû dema ji wî welatî
Ew çûn bû çiya ji ber helatî

7375. Wan dîtî kesek bi navê Ḥîbban
Peyẋemberî gûtî anî îman
***

7376. Baranekê xûş ji wan dibarî
Ter bûn cilkêt resûlê Barî

7377. Ew çu cihekî ji wan nîhanî
Cilkêt xû didane ṭav ji canî

7378. Duʿs̱ûrî didî wesan ji dîw re
Çu ser serê wî bi destê şîre

7379. Gû: Kî tu ji min digêrî qurtar
Peyẋemberî gû Xudayê Qehhar

7380. Cibrîlî li wî didaye pale
Şîrê wî li dest peşî nuwal e

7381. Hilgirteve zû resûlê dînî
Gû: “Kî tu ji destê min derînî”

7382. Gû: Kes nîye ey tu ḥeq peyember
Wê gavê bi wî dianî bawer

7383. Bû qewmê xû ew diçû nîkunam
Wî gazî kirin bû dînê îslam

7384. Geryave Nebî ji bû Medîne
Wî vê seferê çu şeṛ nedîne

**C/ج Ẋezwetu Buḥranî (Ẋezwa Buḥranê)**

7385. Zanî ku dema resûlê serwer
Kûmbûne Benî Suleymî yekser

7386. Ew rabû diçît ẋezayê wan e
Sê ṣed wî digel di canfîda ne

7387. Wî danî di nêv Medîne Meʿlûm
Ew yarê wî daye Ummû Mektûm

7388. Nêzîkbû dema ji wan neyaran
Balabûne ew li çan û xwaran

7389. Bê şeṛ zivirî bû layê male
Ew pake resûlê piṛṛ kemal e

**D/د Serîyyetu Zeydîbnî Ḥaris̱etî (Serîya Zeydê Kurê Ḥaris̱ey)**

7390. Paş Bedrê Qureyşîyêt di bedkam
Wan gurî rîya tîcareta Şam

7391. Ew çûne rîya ʿÎraq û Necdê
Belkî ku reha bibin ji nijdê

7392. Pê zanî peyemberê enamê
Wan hateve karewan ji Şamê

7393. Zeydê kuṛê Ḥaris̱ey hinarî
Bû Qerde serûkê ṣed suwarî

7394. Ew geştine karewan li Qerde
Ew aveke nêv welatê Necde

7395. Serqafîle bûye Babê Sufyan
Gel cemʿekê yek ji wan e Ṣefwan

7396. Wan zîv bûye eks̱erê tîcaret
Anîne ewan çi hey bi ẋaret

7397. Yek bûye esîr Furat e name
Ew yêt dî hemû revîn temame

7398. Înane esîr û mal bi carek
Bû layê peyemberê mubarek

7399. Îslam bû Furat ji cerg û canî
Berdave peyemberê zemanî

7400. Pêncîkî ji malî bû Xudayî
Yê dî vepeşî ji wan tebayî

**E/ه Serîyyetu ʿEbdîllahîbnî ʿEtîk (Serîya ʿEbdullahê Kurê ʿEtîkî bo Kuştina Babê)**
*Lî qetlî Ebî Rafîʿ el-Yehudîyyî Sellamîbnî Ebîl Ḥeqîq (Ji bo kuştîna Rafʿiê Cwî Selamê Kuṛê Babê Huqeyqî)*

7401. Bûrafʿê cwî bi navê Sellam
Duşmin bû peyẋemberî çi bê qam

7402. Hindê dî di harkirin neyare
Bû cengê ḥebîbê namidare

7403. Peyẋemberî gûte çen ji enṣar
Hernê bikujin xebîs̱ê bedkar

7404. Serdarê ewan e ʿEbdê Ellah
Babê wî ʿEtîk e merdê piṛṛ cah

7405. Şev çûne kinarê wê qelatê
Ya Reb bide ferset û necatê

7406. Wî gûtî: Gelî heval mubarek
Hun lêre ezê diçim bû çarek

7407. Nêzîk bû ji dergehê ḥiṣarê
Xû dapûşî ew rûnişte xwarê

7408. Ser şiklê kesê diçîte destav
Çav lê bûye dergevanî dergav

7409. Nik wî wer e yek ji wan temame
Gazî kirê zu be ey zelame

7410. Derkî digirim nexû direng e
Wî lezkirî bû deravê ṭenge

7411. Çu jurê nezanî dergevanî
Wî derge kilîl da ji canî

7412. Ew çu bi hewavekir kilîle
Çav lêbû zelamê mey celîle

7413. Wî xû li cihek nepen veşarî
Xû girtî ḥeta ku şev bû ṭarî

7414. Wî dewre vekir derê qelatê
Ḥaḍir diketin ji bû necatê

7415. ʿAdet bû Bûrafʿê mirare
Şev da çine nik heval û yar e

7416. Meclîs wî li du ṭebeq bû taze
Zengîn û ciḥêl e piṛṛ bi naz e

7417. Xû girtî ḥeta ku çu l’ bû xanî
Ew çuyê belê ji dil nîhanî

7418. Her derge ji wî diçûye jure
Wî ser xû digirt kilîl û dewre

7419. Ger ehlê qelatê pêbiḥesyên
Da ew bikujît ḥeta ku ew dên

7420. Ew çu ku di ûdekê ve ṭarî
Wî gazîkire neyarê Barî

7421. Cab dave wî zanî ew li ku ye
Şîrek wî weşand û hîç nebû ye

7422. Melʿunî bi hêl dikir heware
Çu ber derî gûtî ev çi kar e

7423. Wî gûtî: Nemînî - hîç nema bû
Êk min bikujît ew kuca bû

7424. Dubare diçû didaye ber şîr
Ta piştê wî şeq dikir li wî ḥwîr

7425. Geryave bû xwarê her di gave
Wî çav di nexûş û heyveṭave

7426. Ew ser derecê dihête xware
Ber bû ve şikestî pê ji yare

7427. Çefya xû li pê xû tim şidandî
Ew çu xû bi derkê ragehandî

7428. Çu der ji qelatê xû veşarî
Mirna wî ḥeta diket gudarî

7429. Guh lêbû seḥer diken heware
Kuştîne Bûrafʿê bijare

7430. Ew êdî çu ta gehî hevalan
Qurtarbûne ew bi her çî ḥalan

7431. Geryaneve çûne nik peyember
Wî qîṣṣe ji bû dikir seraser

7432. Dilxûş bû gelek resûlê muxtar
Gû: Pê xû dirêj ke ey hunerdar

7433. Destê xû bi ser pîyê wî malî
Çêbuve bi emrê Ẕulcelalî

**F/و Ẋezwetu Uḥudîn (Ẋezwa Uḥudê)**

7434. Paş Bedrê qureşîyan bû tedbîr
Bû xun vekirin nekeyn çu teqṣîr

7435. Wan kuştîyê Bedrê her li pêş çav
Zêmarê diken bû wan hemû gav

7436. Ṣefwanê kuṛê Umeyye meşhûr
Gel ʿİkrîmeyê Bûcehlê dilkuṛ

7437. Gel çen kesekan di cengê Bedre

Wan bab û bira çuyîn bû qebre

7438. Çûn lalî serûkê xû vecemyan
Dê rabe bû cengê Babê Sufyan

7439. Wî gûtî li mêje min meram e
Da leşkerê xû bikeyn temame

7440. Çar kes wî hinarne wan kinaran
Da bên bi hewarê wan neyaran

7441. Hatîne Seqîf û bed Kînane
Kumbûne gelek dî yarî wan e

**Mesîru Qureyşîn Îla Uḥudîn (Çûna Qureyşîyan Bo Uḥudê)**

7442. Rabûne Qureyşî xir bi carek
Bû cengê Uḥud kirin tedarek

7443. Leşker digehişte sê hizar e
Du ṣed bûne wan esipsûware

7444. Çekdar e cemîʿî leşkerê bûş
Hef ṣed bûne wan tinê zirîpûş[1]

7445. Gel wan bûne sê hizar ji ḥêştir
Gel zad û ẕexîre tim bû leşker

7446. Gel pazde di kesk û sur kejave[2]
Her yek jinemeznekê di nave

7447. Mîn cumle serûkê ceyşî hemyan
Jin Hînd e digel bû Babê Sufyan

7448. Wek ʿÎkrîme Ḥariṯê Muẋîre
Ṣefwanê Umeyyeyê gizîre

7449. ʿEmrê kuṛê ʿAṣî ew guhersenc
Ṭelhey Ebû Ṭelḥe ta deh û penc

7450. Înane jinêt xû ṣuẋ û şeng e
Da leşkerî tên biden bû cenge

7451. Jin teʿnê dema diden ji mêran
Bê cergî diken ji rengê şêran
***

7452. Weḥşî hebû ʿebdekê Cubeyrî
Ber mamê xû wî cîhan lê ẋeyrî

7453. Kuştîbû li Bedrê şêrê Ḥemze
Wî gûtîye Weḥşî nek bi berze

7454. Ḥemzey bikujî di vê deravê
Êdî tu reha dikem ji davê

7455. Hatîne Qureyşî piṛṛ ẋurur e
Ba leşker û ba sîlaḥê zûre

7456. Dana li rexê nuwalê ʿEyneyn
Bû layê Medîneya tijî zeyn

7457. Gel wan bûye rahibek ji enṣar
Bûʿamir e navê merdê bedkar

7458. Gel pêncî kesan ji ewsîyan ew
Hindê dî Qureyşî tên di dan ew

**Îstîşaretûn Nebîyyî ʿEleyhî’s-Selamî bî Esḥabîhîl Kîramî (Şêwra Pêẋemberî Silav lê Bin li gel Hevalên Xwe)**

7459. Pê zanî dema peyemberê pak
Rabûye bû cengê çust û çalak

7460. Gûtî: “Me di xew dî çen ji gareş
Teiwîl me kirîne xêr û dilgeş

7461. Yek kevlî me dî di şîrê xû ye
Min destê di nîv zirîve çuye

7462. Teʿbîr me dikir bi pak Medîne
Xû lêre ḥiṣar bideyn şirîne

7463. Duşmin me eger li wê bimînin
Dê ḥesret û zeḥmetê bibînin

7464. Wer ew dê bihên me nêv Medîne”
Dê cengê bikeyn ḥeta me şîne

7465. Ew nevyê Selûlî duşminê dîn
Reiya wî digel Nebî bû şîrîn

7466. Çendan ji ewêt neçuyne Bedrê
Dilşutîn e ew bû xêr û ecrê

7467. Gûtin here nek dibên ewane
Ber tirsê nehatine der ji xane

7468. Muşrik li cihê xû man yeqînî
Çarşembî ḥeta digehte eynî

[1] Yên ku zirx kirîne ber xwe

[2] Çardar, darbest

7469. Peyẋemberî gût heval û yaran
Karê xû biken çek û dewaran

7470. Ziryê xû peyemberî diberkir
Bû cengê Uḥud wî kar sefer kir

7471. Ew yêt ku reî bi çûn bû hemyan
Wê gavê ji dil dibûn peşêman

7472. Wan gûte peyemberê zemanî
Şula xû bike tu wek dizanî

7473. "Caîz nîye gû bû her peyember
Gava bû şeṛî zirî dikir ber

7474. Carek dî çek û sîlaḥî danî
Ḥetta ku neçîte şeṛ ji canî"

**Xurûcuhu ʿEleyhî's-Selamî Îla Uḥudîn (Derkeftina Peyẋemberî Silav lê Bin bo Uḥudê)**

7475. Peyẋemberî cumʿe kir şirîne
Paş nîvro çu der li nêv Medîne

7476. Wî danî li cê xû merdê merhum
Ew ʿEbdê Xudê ji Ummû Mektûm

7477. Çav dabîye leşkerî peyember
Hindek di kiçik ji wan kirin der

7478. Wek Îbnû ʿUmer ku ʿEbdê Ellah
Zeydê kuṛê S̱abitê xudan cah

7479. Wek lawê Useydê bab Ẕuheyr e
ʿAzib puserê Berae bi xeyr e

7480. Bab Ews e yekê dî nav ʿErab e
Wek Xudrê Ebû Seʿîd cenabe

7481. Wî gel xû birin hizar di çekdar
Enṣar û muhacir û ʿemelxwar

7482. Bes du ne suwaresip bi hejmar
Bûbûrde û ḥeq resûlê muxtar

7483. Ew merdê serê nîfaqê wey bed
Zivrandineve di rêkê sê ṣed

7484. Ṣed bûne xudan zirî bi defter
Bijlî ji ḥebîbê şahê ekber

7485. Alayê muhacirêt nîkunam
Wî daye bi dest ʿElîyê pismam

7486. Munẕir puser e Ḥubabê hişyar
Bû Xezrecîyan dikir ʿelemdar

7487. Meşhûr e Useydê bab Ḥuḍeyr e
Ala çî bû Ewsîyan bi xeyr e

7488. Çu geşte Uḥud bi keyfeşayî
Wî ûrdî didanî bin çiyayî

**Teheyyuul Ceyşeynî (Xweamadekirina Her Du Leşkeran)**

7489. Peyẋemberê piṛṛ ji ʿîzz û naze
Eṣḥabê xû rêzkirin çi taze

7490. Wî danî serê çiyay bi xeyre
Ew ʿEbdê Xudê wî bab Cubeyr e

7491. Wî dane wî pêncî kes bijare
Bû karê kivan û tîr bikar e

7492. Gû: "Herne ewî cihê bilind e
Piştê bigirin ji bû me tund e

7493. Ger em dê bibîn xudan ẕefer ew
Wer em bişikên û derdeser ew

7494. Hun wî cihî ber neden bi başî
Duşmin ne wekî bihêt ji paşî"

7495. Çûn pêşî ṣeḥabeyan bi dilşad
Mam Ḥemze bi sersupah û Mîqdad
***

7496. Hem hatine pêş Qureyşîyêt bed
Daẋgirtî ji Eḥmedî ne bê ḥed

7497. Serṛaste pirî wî ceyşê napak
Xalid bû kuṛê Welîdê mêrçak

7498. Bû ʿÎkrîme layê çep ji meydan
Alaçî ye Ṭelḥe bab e ʿUs̱man

7499. Bazarê kejaveyan[1] li cuş e
Jin lawje dibên bi dengê xuşe

7500. Ma dengê ve newʿe neẋmexwanan
Hindê dî zîrek diken cewanan

---

[1] Darbest, çardara ku nexweş pê tên neqilkirin

7501. Hindan digû hin ji wan cewabe
Em taze kiç în di mahitabe

7502. Gerden me piṛṛ e ji durr û gewher
Bênxûş û bijun bi misk û ʿenber

7503. Ger sîngî ji duşminî ne berden
Em gel we dibîne dest li gerden

7504. Wer piştê biden bi wan neyaran
Hun êdî me nabînin çu caran

7505. Ey law ciḥêl û kal û pîran
Şeq şeq we bihêt ji ḍerbê şîran

7506. Ev renge ewan dikir heware
Muşrik dikirin çu gurgê hare

**En-Nuzûku îlel Meʿreketî (Dabezîn bo Meydana Cengê)**

7507. Muşrik wê dihêne kaẋ û meydan
Eşḥabe diçin ji can bi xendan

7508. Yek narî serûkê qewmê kuffar
Tu bêje bi qewmê taze enṣar

7509. Min nîne digel we kerb û nakam
Berden ji berûkê mam û pismam

7510. Enṣarî gûtin bibêje wan e
Meznê we çi mazin û nezan e

7511. Serdarê me ye resûlê dîn e
Em cumle fîdayê canê wî ne

7512. Wî ev qise kir meger nemînîn
Çavan ji serê wî derdihînîn

7513. Wê ʿÎkrîme hat û Xalidê şad
Ḥemze bû yekî çu yê dî Mîqdad

7514. Ew çûn bi hicum di daẋidare
Wan daneve paş bi tazekare

7515. Alaçî dihête pêş şirînqed
Gû ey gelî ṣaḥibêt Muḥemmed

7516. Engûne dibên çî bûy şehîde
Dê çîte biḥeştê ew seʿîd e

7517. Her çî ji me dê bibîte bê can
Dê çîte ʿezab û ṛencê dûjan

7518. Ger ev xebere ji hûn temame
Bû nahête kaxê yek zelame

7519. Bû çuye ʿElî îmamê ḥeyder
Şîrek diweşande ew dilawer

7520. Pê wî jê firand û kefte xware
ʿEwret wî di kaxê bû diyar e

7521. Çu ser serê wî ʿElî bi şîre
Ta can ji giyan bigêrî dwîre

7522. Gû: Tu bi Xudê û xwînê ûcaẋ
Ev hinde bes e bi hêle min ṣaẋ

7523. Peyẋemberî gû: Te bû nekuştî
Gû ḥal eve bû lewa me hiştî
***

7524. Wê rojê bi dest Nebî bû şîrek
Gû: “Kî heye nêv we merdê zîrek

7525. Wer bigrî ji min bi ḥeqqê xû ye”
Rabûye Ebû Dicane zu ye

7526. Ḥeqqê we çî ye gû: Ey şirînkar
Gû: “Şeṛ pê ḥetayî dibît xwar”

7527. Wergirt û çu kaxê ew hunerpiṛṛ
Ew hat û çu wek xudan tekebbur

7528. Ev çûne Nebî digû di gave
“Baş nîne meger di ev derave”

7529. Çî layê diçû Ebû Dicane
Daînî ji duşminan qirane

7530. Ḥemze xû nepirse çen mehûle
Çî layê diçû digêrî çule

7531. Xû şêrî ʿElî di kax û meydan
Meydanê li wan digêrî zîndan

7532. Eşḥabî hicum diken çu şîran
Ew ṭarî diken cîhan ji mêran

7533. Nuṣret ji bû wan Xudê hinarî
Işkandine leşkerê neyarî

7534. Eşḥabe li du diçin bi ẋare
Fîẋane jinan hewar heware

7535. Zivrîneve êdî ew bû malî
Wan xirvekirin ji dil ḥelalî

**ʿÎsyanu Emrîn Nebîyyî ʿEleyhî’s-Selamî (Neguhdana Fermana Pêẋemberî Silav lê Bin)**

7536. Wan pêncî kesan li ser çiyayî
Dîtin ji ṣeḥabe neṣr û şayî

7537. Hindan gûtî mazin û emîre
Dê em jî biçîn bû mal û pêre

7538. Ma gûtî nekirye hûn gudarî
Fermanê resûlê pakê Barî

7539. Kes nabî ku emrê wî şikênî
Ez nahêm û çî me gel bimînî

7540. Çil kes bûne wan dihatne xware
Deh man û emîrê şehsuware

7541. Xalid wê dibînî dûr bi dûrî
Berdane çiya û layê jûrî

7542. Gel ʿÎkrîmeyî bi çen suwaran
Zivrîn li çiyayî bi tîrbaran

7543. Kuştîne ewêt li ser çiyayî
Wê jûrda dihên bi canfîdayî

7544. Wan girtîye piştê ceyşê îslam
Zivrîneve hem li pêşî bê qam

7545. Wê hatine wan li paş û pêşan
Eṣḥabe kirin gelek perêşan

7546. Çen tîpe revîn bû lay Medîne
Gel Ḥemze gelek şehîd bûyîne

**Cerhun Nebîyyî ʿEleyhî’s-Selam (Birîndarbûna Pêẋemberî Silav lê Bin)**

7547. Bestîbûne pênc kesan bi peyman
Em dê bikujîn peyemberê wan

7548. Yek ʿEbdê Xudê kuṛê Şihab e
Wek ʿEbdê Xudê Hemîde bab e

7549. Îbnû Qemîyê leʿîn û bê bar
Wek beçke Xelef Ubeyyê bedkar

7550. Gel ʿUtbeyê bab e Babê Weqqaṣ
Ew cumle li nik xû law mêrxaṣ

7551. Hêşta li Mekê bû ew Xelefzad
Wî gûte peyẋemberî bi dilşad

7552. Hespek me heye keʿêl û taze
Ez taze xudan dikem bi naze

7553. Yek fiṭre ji erzinê bijare
Alîke he rujê sê ji care

7554. Nazanî ji tu çi daẋidar im
Dê tu bikujim li ser sûwar im

7555. Peyẋemberî gûte merdê bedxwah
“Ez dê te kujim bi iznê Ellah”
****

7556. 1-Wê hat bû Nebî kuṛê Şihabî
Şîr da enîya wî pakcenabî

7557. Qaîm bû kilavzirî peyember
Şîrê wî şukir nebû eṯerker

7558. 2- ʿUtbeî ku didî qedir girane
Hej durve wî daye ber berane

7559. Yek pêşî didanê jêr şikandî
Lay ṛastê digel wî lêv dirandî

7560. 3- Wê hatî kuṛê Ḥemîdê napak
Ew kuştî Ebû Dicane mêrçak

7561. 4- Hem kirbû hicum Ubeyyê daẋdar
Nêzek li wî da resûlê muxtar

7562. Geryave sivik bû nêv Qureyşan
Ḥalê wî di dil gelek perêşan

7563. Gûtin wî netirse zam[1] çi nîne
Gû ez dimirim ji min yeqîn e

7564. Wî gûtîye min ku hêj li Mekke
Gûtna wî belê ne cayê şekk e

7565. Ḥîna zivirîn li Ṣerfe[2] caye
Ew ṭupîye roreşê Xuda ye

7566. Seyrê ke evî ʿenûdê bedker[3]
Bawer wî dikir qisa peyember

---

[1] Peyvek farisî ye (jêrenota Şuşî bi xwe). Zam: Mezin
[2] Navê cihekî ye dikevîte di navbera Mekke û Medîneyê (Jêrenota Şuşî bi xwe ye)
[3] Kesê ku xirabîya dike û xwedî ʿînad e

7567. Gel hindê ewî neanî îman
Ew kuṛedil û ḍemîr û wîcdan

7568. 5- Beçkê Qemiye ku dît peyember
Işkandî kilavzirî li ser ser

7569. Şîrê wî çu tê nekirye kare
Berbuve Nebî li ser deware

7570. Berbuve dema di kefte kûrek
Kulda çuye çukê wî mubarek

7571. Royê wî şirîn dibû birîndar
Du ḥelqe kilavzirî tê çûn xwar

7572. Bazûrê didan ḥeta dihên der
Înanderê ʿAmirê mubeşşeṛ

7573. Yar dewre diden li yarê muxtar
Wî çarde li durê man bi ejmar

7574. Enṣarî ne nîv û nîv muhacir
Percanî dikir li Babê Ṭahir

7575. Muṣʿeb bû Nebî xû kir meṭale
Beçkê Qemiyey dikuşt li pale

7576. Nik wî ve peyember e wî kuştî
Kir ẋar û dikir hewar bi zeştî[1]

7577. Min kuştî Muḥemmedê ewan e
Bawer dikirin gelek ji cane

7578. Belkî ji ṣeḥabeêt kîrame
Bawer dikirin ve pîs peyame

***

7579. Ḥetta xû ʿElîyê şehsuware
Ḥîna ku nedî xezur û yare

7580. Geryabû nedî di nêv şehîdan
Aluz nebû lê şibî ʿegîdan

7581. Gû Barî di nêvme ew helanî
Ser karê kirî me gel nezanî

7582. Ez êdî dê şeṛ bikem ji cane
Ta maye me ruḥ di nêv giyane

7583. Ew çu bi hicum dibêjî şêre
Ta dîtî bi çav resûlê xêre

***

7584. Her we Enesê ji babê Neḍre
Bextê wî neçu bû Cengê Bedre

7585. Kir ʿeḥde digel Xudayê ekber
Ger biçme şeṛî digel peyember

7586. Dê bînî Xudê eger me yar e
Gel duşminî dê bikem çi kare

7587. Evro ku revîn gelek zelame
Hindek dî diḥeyrî lew peyame

7588. Ew geştîyeṬelḥe ûʿUmer ew
Gel çen ji kesan di piṛṛ keser ew

7589. Gûtî: We çira çeqîn bijarî
Kuştîne gûtin resûlê Barî

7590. Gû: Êdî çi xêr di man û jîn e
Wek wî bimirin di dîn şirîn e

7591. Wî êdî hicum dikir çu şêran
Kavil wî dikir cîhan ji mêran

7592. Axir dibitin ji wan şehîdan
Ya Reb bike me ji wan seʿîdan

7593. Dîtin di leşê Enes bi ejmar
Ḥeftê bûne şwînê şîr û sîkar

7594. Neynasî kesê zelamê wey qişt
Xuşka wî me ger bi xal û engûşt

***

7595. Keʿbê kuṛê Malikî li pêşan
Wî dîtî yeqîn resûlê piṛṛ şan

7596. Zu gazî dikir: Gelê musilman
Mizgîn eve ye ḥebîbê Reḥman

7597. Peyẋemberî bû dikir îşaret
Tu kirbe nihû ji ev bîşaret

7598. Eṣḥabe dema kirin gudarî
Hatîne bû nik ḥebîbê Barî

***

7599. Ḥîna ku Nebî dibûy birîndar
Xun vestirî bû li royê gulnar

7600. “Ev qewme gûtî ku dê rehab in
Ev renge digel Nebî xirab in

[1] Kirêtî

7601. Ez gazî dikem bû rahê Barî
Ew xunê diken ji roy me carî

7602. Buẋḍa wî gelek şedîd û tal e
Bû qewmî bi min diken ve ḥale

7603. Hem bû çi kesî bi dest peyember
Ruḥa wî li nêv giyan bi çî der”

7604. Gava ku dizanî Faṭîmayê
Ew hat bi girîve min fîdayê

7605. Şuştîne bi avê şar birîne
Lê qetʿe nebû bi avê xwîne

7606. Wê Faṭîmeyê bi ʿîzz û naze
Hindek ji ḥeṣîrê ṣutî taze

7607. Xulya wê didanî ser birînan
Westa bû belê di gav û ḥînan

7608. Ew xwune ḥeta dihate xware
Ew Malikê Bab Sînan wî bare

**Qetlu Ḥemzetebnî ʿEbdîl Muṭṭelîbî (Kuştina Ḥemzey Kurê ʿEbdulmuṭṭelibî)**

7609. Kuştibû di Bedrê Ḥemzeyê mam
Mamek ji Cubeyrê pîs û bednam

7610. Wî gûtibû Weḥşî ʿebdê xû ye
Ḥemzey bikujî xilaṣê tu ye

7611. Meşhûr bû bihavêtin bi sîkar[1]
Sekvan bû li ser vî karî yekcar

7612. Roja li Uḥud dibûye cenge
Çu kaxê Sîbaʿ qebû bi denge

7613. Ḥemze bû diçû ji rengê şêran
Mala wî di gavê kirye wêran

7614. Weḥşî wî dibînî çen hunerkar
Havêtî esef çi tîre sîkar

7615. Havêtîye zik li piştê çu der
Wê gavê şehîd bû ew dilawer

7616. Geryave Mekê digel hevalan
Îslambûye paşî çen ji salan

7617. Çu Ṭaîfê axirî ji cane
Bû qaṣidê wan dikir rewane

7618. Gûtin here tu bû nik peyember
Ew nagêrî qaṣidan mukedder

7619. Ḥîna ku didî resûlê Reḥman
Gû: “Weḥşî tu?” Gû: Belê bi qurban

7620. Gû “Ṛast e erê te kuştî Ḥemze?”
Ya bûyî gû karê wey neṭerze

7621. Peyẋemberî gû: “Eger ditanî
Royê xû ji min bikey nîhanî”

7622. Zu çuye derê li nêv Medîne
Ser emrê peyemberê zemîne

7623. Ew maye bi dilkeser temame
Ta qewmîye Ẋezweyê Yemame

7624. Wî gû di dilê xû her nîhan e
Şulek me kirî gelek giran e

7625. Ger bêt û li batî mamê Eḥmed
Bû xû bikujim Museylemê bed

7626. Belkî ji me aş dibît peyember
Roja ku diçim bû kaxê meḥşer

7627. Her çendî guneh diçin bi îslam
Nê karê me kir giran e bêqam

7628. Min dîtî dema leʿînê bedkar
Min havête sîngî ʿeynî sîkar

7629. Ew çuye derê li nêv milane
Ha der wî cuda bû ten ji cane

**Mîmma Kane Xîlalel Qetlî (Tiştên ku di Dema Cengê da Qewimîn)**

1.
7630. Neʿman puserê Qetade nav e
Tîrek wê rojê diçûye çave

7631. Wê gavê dihate nik peyember
Çavê wî li cê xû hatibû der

7632. Wî birve cihê xû dest bi malî

[1] rim

Çêbuve bi emrê Ẕulcelalî

7633. Rontir bû belê ji xû ji pêşî
Ger yê dî bieşî ew nedêşî

***

2.

7634. Ew ʿEbdê Xudê ku Ceḥiş bab e
Wî şîr diweşandî bê ḥisabe

7635. Şîrê wî şikest di nîvê cenge
Çu gûte peyemberî direng e

7636. Yek ṭayê qesip wî daye destî
Gava wî hejand bû şîr duristî

7637. Ev dare bi emrê şahê ekber
Bû şîrekê piṛṛ ji av û cewher

7638. Navê wî lewa dikirne ʿÛrcûn
Şîrek bû çi abdar û bê çûn

***

3.

7639. Ew Seʿdê bi cennetê mubeşşeṛ
Tîrbazî dikir li dûr peyember

7640. Tîr danê peyemberê Xudaye
Gû: “Pavê me day û bab fîdaye”

***

4.

7641. Ew Ḥenẕeleyê wî bab e ʿAmir
Ew geşte serûkê qewmê kafir

7642. Wî kirbû hicum bû Babê Sufyan
Wî gaz kire yek hevalî der an

7643. Şeddadê kuṛê Ewis bi nav e
Vî Ḥenẕele kuştî her di gave

7644. Derḥeq wî Nebî digûtî taze:
Şuştîne melek bi ʿîzz û naze

7645. Pirsîn li jina wî piṛṛ necabet[1]
Gû: Hat û li ser wî bûy cenabet

7646. Ḥîna wî hewar dikir gudarî
Ew hatbû şeṛî di rahê Barî

7647. Peyẋemberî gût heval û yare
“Lew şuştîne ew melek dîyare”

5.

7648. Roja li Uḥud dibûye kuştar[2]
Cwîyek hebû nêv cwîyan şirînkar

7649. Navê wî Muxeyrîqê dilawer
Wî gûte cemaʿeṭa xû yekser

7650. Nasîn we Muḥemmedê mubarek
Dumayê peyemberan bi carek

7651. Neşra wî li ser me fer yeqîn e
Wan: Şembî ye, Gû: Çu Şembî nîne

7652. Wî gûtî: Eger diçûm di cenge
Malê me Muḥemmedî bi çenge

7653. Teslîmî wî ye wekî dizanî
Bû harî wî ez diçim ji canî

7654. Des daye çek û sîlaḥ û çuye
Şeṛ kirbû ḥeta şehîd dibûye

7655. Peyẋemberî gûtî: Ev zelame
Çêtir ji hemû cwîyan temame

7656. Malê wî di gavê kirye ewqaf
Ḥeft rez wî hebûn di baş û ber av

6.

7657. Ger Ṯabitî Qeysê navgiran e
Ger Babê Ḥuẕeyfe nav Yemam e

7658. Danabûne şahê îns û can ew
Ber pîrî bi naẕirêt jinan ew

7659. Yek gûte hevalî: Ey birader
Bû em jî neçîne harî serwer

7660. Des dabûne şîr û çûne kaxê
Ṯabit zu şehîd bû kefte kaxê

7661. Hatin bû Yemanî çen şeḥabe
Neynasîne ew Huzeyfe bab e

7662. Wan kuşt û Ḥuẕeyfe kir heware
Babê min e kes nebûy gudare

7663. Wan gûtî: Me nenasî bew Xudayî
Gû: Ew li we xûş bibît tebayî

7664. Peyẋemberî gû: “Didem te xwîne”
Wî gûtî me xir ʿefûkirîne

***

7.

[1] Nîjadpakî, Eslî

[2] Komelkujî, qetlîam

7665. Mêrçakê bi nav û bang e Quzman
Wê rojê di leşkerê musilman

7666. Ferman dikirî resûlê axir
“Ew şexşe belê ji ehlê agir”

7667. Bê ḥed wî dikir ji kafiran ceng
Meydan wî dikir ji duşminan ṭeng

7668. Kujtîne çi ḥeft û heşt ji kuffar
Axir dibitin ji ten birîndar

7669. Paşî şeṛî birine ehl û malan
Mizgînî didane wî hevalan

7670. Wî gû: Bi çi hûn diden me mizgîn
Cengê me kirî ne pak û rengîn

7671. Ser xizm û kesan me kir çi bûye
Xêra me lewa belaş diçûye

7672. Axir wî birîn dibûye hare
Berda wî ji destî xwun demare

7673. Xû kujtî bi destê xû dumayî
Pê zanî peyemberê Xudayî

7674. Wî şehde dida bi ẕatê ekber
Gû: “Bawere min ji wîm peyember”

8.
7675. Hatbûne gelek jinik musulman
Avkêşî dikir bû ceyşê Reḥman

7676. Mîn cumle ji wan bû Ummû Eymen
Tîrek li wê da Ḥîbban li duhmen

7677. Berda kenîyê Ḥîbanê mêrxaṣ
Peyẋemberî gûte Seʿdê Weqqaṣ

7678. Tîr pavê neyarê wey ʿeqilker
Tîrek li wî da digût peyember

7679. “Tul Seʿdî vekir ji bû te daye
Ey Seʿd û bibî qebûl duʿa ye”

7680. Barî te biket bi ʿîzzet û şan
“Tîran tu bidey li nîvê nîşan”

**Beʿde Xumudîl Qîtalî (Piştî ku Şeṛ Verevî)**

1.
7681. Şeṛ ku verevî di kax û meydan
Dilxûş bûne duşminêt me çendan

7682. Îslam ji xû bûne derdemend e
Rabûne jinik serûke Hînd e

7683. Bê rêzî kirin ewan pelîdan
Jê kirne kep û guhêt şehîdan

7684. Hîndê kire ristikek bû gerden
Ew gerdene êş û jan ne berden

7685. Wê şeqkirî sîngê Ḥemzeyê mam
Mêlak ji wî jêvekir biket ṭam

7686. Her çendî dicuy neçuye xware
Avêtîye der ji dev neçare

2.
7687. Zu hatîye pêşî Babê Sufyan
Wî gazikire leşkerê musilman

7688. Sê car gû Muḥemmedê emîne
Ew maye xudan ḥeyat û jîne

7689. Peyẋemberî gû: “Neden cewabê”
Ew mave bi gazî û xîṭabê

7690. Bûbekr û ʿUmer erê bi can in
Gû qewmê xu: ke neman ji wan in

7691. Cab dave ʿUmer gû: ey diruker
Ey duşminê dîn şahê ekber

7692. Êt mayî eger Xudê me yar e
Têra te biken ẕelîl û jare

7693. Wî gûtî Hubel me bûy bilind e
Peyẋemberî gû: Bibên pesinde

7694. “Rebbê me bilindtir û celîl e”
Xûş naṣir e ew me xûş wekîl e

7695. ʿUzza gû me hey çu bû we nîne
Gûtin me Xudayê ʿalemîn e

7696. Paş gazîkire ʿUmer bi sûnde
Eḥmed bi ḥeyat e yan nezînd e

7697. Wî gûtî: Eger ji min te bawer
Guhdarê tu ye ḥebîbê enwer

7698. Wî gûtî: Belê te ṛast e guftar
Beçkê Qemiyey dibêt qisa xwar?

7699. Evroke gûtî libatê Bedre
Şeṛ carê nekam e car bi behr e

7700. Gû: Engûdikuştî yan dibînin
Karek ji wî piṛṛ ẋeḍeb dimînin

7701. Wellah ne raḍî bûm ne ẋemxwar
Ney min gû biken neken siyehkar

7702. Qewlê me digel we saleka dî
Bû avê Bedir me tên bi şadî

7703. Peyẋemberî gû :“Bibêjne wan e
Zur baş e Bedir” me xûş jivan e

7704. Ḥeftê ji şeḥabe bûn şehîd e
Wan jê çûne bîst û sê pelîde

7705. Êdî zivirîn bi milşikestî
Çul kirbûne urdîgah duristî
3.

7706. Peyẋemberî ḥeftê kes hinarin
Ka ew digerênve yan li ẋar in

7707. Wî gûte ʿElî serûkê wane:
“Tu leşkerê wan bibîn çewa ne

7708. Ger ew li şutur bûyîn suware
Bên dayne hesip diçin bû ware

7709. Wer ew li esip suwar bûyîne
Xû fikr e ewan dihên Medîne”

7710. Geryave ʿElî digût peyember
Ew çûn li şutur suware yekser
***

7711. Peyẋemberî gûte yek zelame
“Seyrê ke di kuştîyan temame”

7712. Wî Seʿdê Rebîʿî dît ji enṣar
Hêj ṣaẋ e gû: Bêje yarê muxtar

7713. Batî me selam ji wî bixwîne
Xêra wî Xudê bidet şirîne

7714. Hem bêje bi xizmê min tebayî
ʿEzrek we nîye li nik Xudayî

7715. Ezyet bigehîte ḥeq peyember
Madem di zil in bi çav di nêv ser

7716. Ev gûte ewî dikir ji canî
Canê xû siparte ḥeq Xudayî
***

7717. Seyrê ke bira tu van şeḥaban
ʿAlîhuneran mezincenaban

7718. Ew çen di emir berê Xuda bûn
Bû serwerê dîn çi canfîda bûn

7719. Wan can dikire fîdayî dînî
Bes Barî ewan bi yar bixwînî

7720. Ev renge şeḥabeêt nîkunam
Pankir li zemînê dînê îslam

7721. Ger dê me heba di vî zemanî
Pîçek ji şefayê wan di canî

7722. Ev renge nedê bibayne bê ḥal
Ḥalê me nedê biba ṛeş û tal

7723. Kafir neşiyan biken me ʿebde
Ev çende ji wan di derdemend e

7724. Nê şeṛm e bû ummeta Muḥemmed
Ev tefrîqe û şîqaqe bê ḥed

7725. Îslam nê hemû yek in bi Qurʾan
Ew cumle wekî bira û yek can

7726. Ma bû xû nekeyn bi dîn wekî car
Êkdî bigirîn ji rengê dîwar

7727. Pişta me bi ew Xudayê ekber
Da piştê ji duşminan bikîn ker

7728. Serbest dê bijîn bi ʿîzz û naze
Dîndar û di kameran û taze
***

7729. Peyẋemberî dîtî mamê Ḥemze
Ew renge bi wî kirîn ne ṭerz e

7730. ʿAciz bû gelek resûlê serwer
Ḥalê wî çi qed di dil eṯerker

7731. Gû: “Ger ne diba Ṣefîyye: ẋemgîn
Yan paş me bi ʿadetek ne sengîn

7732. Da hêlmeve wî di kax û meydan
Bû ṭeyr û tewal û bû durindan”

7733. Ferman dikire Zubeyrê ʿEwwam:
“Deyka xû nehêlî bête ser mam

7734. Wê zûr divîya birayê xû ye
Nek şukrî neket Xudayê xû ye”

7735. Ev gûte Zubeyrî gûte dayê
Gû: Ṣebrî dikem digel riḍayê

7736. Ev çende ji bû Xudayî kêm e
Êdî tu bibêy peyemberê me

7737. Çu gûte peyemberê ename
Gû: "Bêle bila biçît meta me"

***

7738. Hindan we digû ji dil niyazan
Dê beyne Medîne van cenazan

7739. Peyẋemberî gû: Li ev mekane
"Şardar dê bikeyne van hemane"

7740. Her carê wî Ḥemze gel nehan ew
Serwan wî dikir nivêj ji can ew

7741. Sê sê û du du dikirne gûre
Bew bergê di wan di xwunê ṣure

7742. Ew ʿEbdê Xudê ku Ceḥiş bab e
Gel Ḥemzeyê xalê ʿal cenab e

7743. Hem Îbnû Cemûḥê ʿEmir nam ew
Gel ʿEbdê Xudê kuṛê Ḥeram ew

7744. Nêv qebrekî gût biken peyember
"Ew bûn li cîhanê xûş birader"

7745. Ev renge ewan hemî veşarin
Reḥmet li me û li wan bibarin

***

7746. Peyẋemberî gû: "Ji van kefîl im
Wan rojê qiyametê delîl im

7747. Her merdê di rahê şahê Ẋeffar
Ser dînê Xudê biçît birîndar

7748. Dê rabî qiyametê bi xwûn ew
Rengê wî çi xwûn e misk e bûn ew"

***

7749. ʿEbbas puser e dibêjî taze
Fermanê resûlê piṛṛ bi naze

7750. "Roja li Uḥud dibûn şehîde
Çen kes ji birayê hun" mecîde

7751. "Barî çi kerem dikir digel wan
Nêv ṭeyrê kesik kirin ruḥ û can"

7752. "Nêv baẋê biḥeştê piṛṛ xirûş ew
Ser kewṯer û fêqîyêt di xûş ew

7753. Qendîlê di zêrî lîsê taze
Bin ʿerşê Xudê bi serfiraze

7754. Wan gûtî dema cihê xû zanî"
Ew xûşî û luṭfê cawîdanî

7755. "Xwuzya me birayê dîn bizan in
Nik Barî şehîd çi qed bi şan in

7756. Da sustî neken di ḥeq cîhade
Vê behrê li xû neden bi bade

7757. Barî gû: Ezê xeber bidem wan
Ayet wî virêdikir ji Qurʾan"

7758. Ya Reb me bikey şehîd temame
Luṭfa tu bidey me ev meqame

**ʿEwdu Resûlîllahî Îlel Medînetî (Zivirîna Pêxemberî bo Bajarê Medîneyê)**

7759. Şembî çu Uḥud resûlê dîne
Hem şembî dihatve bû Medîne

7760. Ḥemne digehişte menbeʿê nûr
Babê wê bi navê Ceḥş e meşhûr

7761. Ey gûtî bi xêr bihêy li ser ser
Mizgîn bi şehîdî da peyember

7762. Gû: ʿEbdê Xudê bira te çu ye
Gû: Baqî Xudê ye piṛṛ ʿefu ye

7763. Gû: Ḥemze bira te bûy şehîde
Gû Barî ʿef biket seʿîd e

7764. Muṣʿeb gû nemaye mêr û yar ew
Derḥal girî piṛṛ hewar hewar ew

7765. Lew gûtî peyemberê ename:
"Mêr nik jinê ew li jûr meqam e"

7766. Hem hatî jinek ji qewmê enṣar
Ew geştîye çen ṣeḥabe û yar

7767. Gûtin te bira û mêr nema ne
Gû: Baş e, resûlê ḥeq çewan e

7768. Wan gûtî: Şukir bi keyfî tu ye
Nîşa me biden gûtî li ku ye

7769. Çu geştîye serwerê Medîne
Gû: Paşî te her çî bûy çi nîne

7770. Mal û ser û xizm û kes bi carek
Qurbanî peyemberê mubarek

***

7771. Rabuhrî Nebî bi male enṣar
Ronîştîye jin bi girî w zêmar

7772. Rondik wî li çavê ṛeş xişîne
Bû Ḥemze gû: Şînîker çi nîne

7773. Lew Seʿdê Muʿaẕî çu nîhan ew
Çen jin di demê kirin rewan ew

7774. Bû Ḥemze herin biken bi şînî
Ser xaṭirê ew resûlê dînî

7775. Guh lê bû dema Resûlî zêmar
Gû: “Barî reḥim biket bi enṣar”

7776. “Ew yarê min in di xûş û naxuş
Bêjin bi jinan bi çinve piṛṛ huş

7777. Ev ẋezwe nihû me kir temame
Ser ruḥê peyemberî selame

## G/ز Ẋezwetu Ḥemraul Esedî (Ẋezwa Hemraê Eṣed)

7778. Şembî ji Uḥud Nebî dihat mal
Yekşembî diçûv ẋezayê derḥal

7779. Ba emrê wî yek dikir heware
Çî çuye Uḥud bihêt bikar e

7780. Derkeftî Nebî li du Qureyşan
Da fikrê neken ku bûn perêşan

7781. Çen kes di hebûn ji wan birîndar
Ser emrê Nebî diçûn şirînkar

7782. Hemrayê Eṣed cihek bi nam e
Sê rojê veman li wê temame
***

7783. Ew Meʿbedê wan Xuzaʿîyan mîr
Muşrik bû welê resûlê lagîr

7784. Wî gûte nebî: Eger bizanî
ʿAciz bûne bû te em ji canî

7785. Çu geşte serûkê muşrikîn ew
Wî fikr e bihêtve piṛṛ ji kîn ew

7786. Meʿbed digûtî: Eger te bawer
Wê hatî ji bû te ew peyember

7787. Wî kirye li paşî tu nefîr ʿam
Wê hatî bi leşkerek çi bêqam

7788. Ger tu biçî dê xisar bimînî
Dûr nîne esip suwar dibînî

7789. Reiya me eger dikey gudarî
Bû Mekke here tu wek diqarî

7790. Bawer jê dikir bû Babê Sufyan
Ew êdî diçûn û qeṭ negeryan
***

7791. Geryave peyemberê mubarek
Gel yar û ṣeḥabeyan bi carek

7792. Ew ʿEmrê kuṛê ʿUbeydê Ellah
Mabuve li wî cihî di nêv rah

7793. Weqtê xû bibû esîrê Bedr e
Çen hîvî kirin ji piṛṛ qedre

7794. Gû: Ez neyî[1] û xudan ʿeyal im
Min aza nekey hewar bi ḥal im

7795. Peyẋemberî gû: “Belê bi peyman
Carek dî nehêy şeṛê musilman”

7796. Hat cengê Uḥud ve bê qerare
Evruke reca diket dubare

7797. Hem gûte Nebî: Tu min ʿefû ke
Min tewbe ye êdî paşî nuke

7798. Wê gavê digût resûlê muxtar
Da ummetê xû bigêrî hişyar

7799. “Nahête gezîn kesê musilman
Du car ji kunek” ji huşê îman

7800. Peyẋemberî gû: “Li ser biden şîr”
Ev renge neyar e ger çî êxsîr
***

7801. Êkê dî Muʿawîyey Muẋîre
Ew jî dibitin şekil esîre

7802. Rê berze dikir negeşte xizman
Zivrî bi dizî çu male ʿUs̱man

7803. ʿUs̱manî gûtî: Tu ey xirab mal
Tu çuy e jî te kirime bê hal

[1] Anku feqîr (Jêrenota Şuşî bi xwe ye)

7804. Hêşta ku li mal bû ḥeq peyember
Wî zanî ku hat Medîne bedker

7805. Wî gûtî Muʿawîyê leʿîne
"Peydakeneve di nêv Medîne"

7806. ʿUs̱man wê diçî ji bû wî mehder
Guh lê bû ku hu dibêt peyember

7807. Înane derê ji male ʿUs̱man
Wî taze digû resûlê Reḥman

7808. Hatîme ji bû bikem recayê
Ser xaṭirê wî resûlî dayê

7809. "Sê roj gû bihêle nêv Medîne
Paş sê rojê hîç eman bû nîne"

7810. Ispêde helat li rojê çare
ʿUs̱manî gûtî: Tu her bi ẋar e

7811. Geryave dema ḥebîbê nazdar
Ferman kire Zeyd û yarê ʿEmmar:

7812. "Hun du wî herin eger we dîtin
Zînhar we neken bi can biçîtin"

7813. Kuştîne Muʿawîyê Muẋîre
Kuştin li Ḥematê[1] ew bi şîre

**H/ح Serîyyetu Ebî Selemete ʿEbdîllahîbnî ʿEbdîl Esedî (Serîya Babê Selemey ʿEbdullahê Kurê ʿEbduleṣedî)**

7814. Ew Bûselemê tijî ji qencî
Sernijdeyê ṣed zelam û pêncî

7815. Peyẋemberî bû Qeṭen[2] hinarî
Bû cutebiray neyarê Barî

7816. Nav êkî Ṭuleyḥeyê Xudêgîr
Yê dî Selemê ji rahê ḥeq dwîr

7817. Duşmin bûne serwerê zemanî
Wan fikre bihên wî her nîhanî

7818. Ew çuye çiyay Qeṭen bi nav e
Wan kes nedî xir bûyîn belave

7819. Geştîne merr û şutur di malan
Înane digel xû xir bi talan

**İ/ط Serîyyetu ʿEbdîllahîbnî Uneysîn (Serîya ʿEbdullahê Kuṛê Uneysî)**

7820. Bab Xalidekê bi navê Sufyan
Ew bûye li ʿUrne meznê hemyan

7821. Peyẋemberî zanî ew neyar e
Bû cengê Nebî di kar û bar e

7822. Wî kirbû rewane ʿEbdê Ellah
Babê wî Uneys e merdê piṛṛ cah

7823. "Belkî bikujî tu wî zelamî"
Wî fikre bidet me zûr nekamî

7824. Ew çu bi penahê şahê ekber
Ser jê birî anî bû peyember

**Î/ى Tezewwecuhu ʿEleyhî's-Selamî Ḥefsete bînte ʿUmer we Tezwîcuhu Umme Kuls̱umîn Mîn ʿUs̱manîn (Zewaca Wî Silav lê Bin bi Hefsa Kiça ʿUmerî û Daneşûya Kiça Xwe Ummû Kuls̱ûmê bi ʿUs̱manî ra)**

7825. Şeʿban bû resûlê namidar e
Wî Ḥefṣe ji xû dikirye mare

7826. Pêşî wî jina Xuneysî bûye
Îslambûne pêkve xû û şû ye

7827. Hîcret dikirin ji bû Medîne
Mêr paşî Bedir dimir di dîne
***

7828. Ev sale rebîʿêyek bû meʿlûm
Wî daşwî kiça xû Ummû Kuls̱ûm

7829. Lewṛa ku Ruqeyye kir wefate
ʿUs̱man bû jinek dikir xebate

7830. Peyẋemberî dil hebû bixwazî
Ḥefṣê ji ʿUmer bi dilnewazî

7831. ʿUs̱manî bi vêrê qeṭ nezanî
Çu Ḥefṣe ṭeleb biket nîhanî

7832. Pê zanî peyemberê me taze
Wî gût ʿUmerî nîhan niyaze

[1] Navê cihekî ye. (jêrenota Şuşî bi xwe ye)

[2] Li hermê Qayîdê navê çîyayekî ye(Jêrenota Şuşî bi xwe ye)

7833. “Nîşa te bidem kesek ji ʿUs̱man
Çêtir bî bigêrî wî ji xizman

7834. Hem bû wî ji dil dikem diyare
Çêtir ji te hem xezur û yare”

7835. Cab dave ʿUmer: Belê bi ser çav
Ey min bi fîdayê tu me her gav

7836. Gû: “Ḥefṣê bidey resûlê Reḥman
Kulṯûmê ezê bidem bi ʿUs̱man”

7837. Derḥal ʿUmerî digût: Bi ser ser
Pêşkêşî te Ḥefṣe ey peyember

7838. Wî Ḥefṣe ji xû dikirye mare
Kulṯûm[1] bû xelîfê sê ye bar e

7839. Hîcret bîye deh di mahê şeʿban
Ew jî çu derî ji cayê kerban

7840. Ḥîna ku evej wefa bû lew yar
Ferman dikirî resûlê muxtar

7841. “Ṣed kiç me heban bi navê Reḥman
Êk êke me dê bidane ʿUs̱man”

**J/ك Wîladetul Hesen-îbnî ʿElîyyîn R.ʿE. (Jidayîknûna Hesenê Kuṛê ʿElî Xwidê jê Razî Bît)**

7842. Mahê remeḍan ku piṛṛ buha ye
Peyda bû Hesen ji pakedaye

7843. Şeş roj ku diçûn ji bûn temame
Çu nik wî peyemberê ename

7844. Pîrûzî dikir ji wan ji canî
Wî gûtî “Çi nav ji bû we danî”

7845. Wan gûtî Ḥerb ji rengê gav e
Wî gûtî: “Hesen me danî nave”

7846. Du şek[2] bû ʿeqîqe dan di ḥîne
Dapîrkê bû ran fiṛêkirîne

7847. Wê rojê tiraşî muyê ser pak
Senga wî ji zîvî xêr kirin çak

7848. Her ew ro Nebî digût sunetker:
“Sunnet ke kuṛê me piṛṛ ji cewher”
***

7849. Seyîd Hesen e xudanê feḍlê
Ew menbeʿê ʿîlm û kanê ʿedlê

7850. Piṛṛ werʿi û dîyanet û teḥemmul
Piṛṛ huş û huner bû piṛṛ teemmul[3]

7851. Mêrçak û xudan sexa ji canî
Zahid bû di vê cîhanê fanî

7852. Çen carê Nebî ji bû dilê xu
Hêşta yê biçuk dikir milê xu

7853. Dabêjî: Me ev ḥebîbê cane
Ya Reb te bivêt ve newcewane

7854. Zur xûş divîya ḥebîbê enwer
Reyḥanê min e digût peyember

7855. Ev kuṛkê me seyîd û şeṛîf e
Nûrîndil û muṣlih û ʿefîf e

7856. “Ṣulhê diketin bi wî Xudê me
Mabeynê du ummetêt ʿeẕîme”

7857. Ev gûte Nebî dikir ji ẋeybe
Gûtna wî belê ne cayê reyb e

7858. Paş babî xelîfe bûye şeş mah
Wî paş xû ʿezil dikir bi dilxwah

7859. Wî kirbû Muʿawîye tenazul
Îslam da xirab nebît û dilkul

7860. Wî çunke didî dibît nexûşî
Ew her du bi şeṛ bibên bi bûşî

7861. Dê xwun birijî ji qewmê îslam
Duşmin dê bibin ji wan xudan kam

7862. Her kes di dile riḍayê Barî
Navêt wî cîhan û ḥukimdarî
***

7863. Bû bejin û cemal û reng û ṣûret
Ew şibhî resûlê pakesîret

7864. Înabûne nûṭ jinik bi defter
Meşhûr bibû lew Hesen ṭelaq der

---

[1] Ji bo ku li weznê bê peyva “umm” nehatiye nivîsîn. (jêrenota Şuşî bi xwe ye)

.[2] Navê cureyek pezan (mih) e

[3] Hizirîn, ramîn

7865. Babê wî digûte Kûfîyan lew
Kes jin nedenê dê ber bidet ew

7866. Wan gûtî çi ya divêt ji canî
Em dê denê êdî ku dizanî

7867. Ewladê di wî ji mê û nêrîn
Ew pazden e piṟṟ kemal û nûrîn

7868. Heşt kuṟ wî hebûn di piṟṟ buha ne
Wî ber ji duwan tinê vemane

7869. Yek ew Hesenê leqeb Muṯenna
Yek Zeydê bi Eblecî mukenna

7870. Hîcret digehişte salê pêncî
Çu der li cîhanê piṟṟ ji qencî

7871. Jinka wî ku Cuʿd e nav e Kendî
Wê dayê ji her bi napesindî

7872. Wê kuştibû neviyê ḥeq peyember
Ṣed tuf li rûyê tu Cuʿde xemser

**K/ك Teḥrîmul Xemrî Nîhaîyyen (Ḥeramkirina Meyê bi Êkcarî)**

7873. Şewwal bû di salê sê temame
Yekcarî dibûye mey ḥeram e

7874. Her wek ji me ra dibêjî tefsîr
Beyḍawî diket beyan û teqrîr

7875. Barî bi kemalê reḥm û ḥîkmet
Wî daye meyê dumayî ḥurmet

7876. Ḥîna ku di Mekke hate xware
Ayet bû resûlê namidare

7877. Çêken ji tirî û qesb şeṟab e
Bê perde vexwarî çen ṣeḥabe

7878. Ḥetta ʿUmer û Muʿaẕ û çen yar
Gûtin bi ḥebîbê şahê Ẋeffar

7879. Meʿlûm e ʿereq diyar bi çave
Ew mal û ʿeqil diket belave

7880. Ayet bû Nebî dihate xware
Ev ẋemre bi xêr û şer diyar e

7881. Emma wê guneh pitir ji xêr e
Çen çak e kesê xû neyke fêre

7882. Êdî hinekan jê çûne paşe
Emma ʿereqê biger bû aşe
***

7883. Ta rojekê rabû ʿEbdê Reḥman
Mêvan dikirin wî çen musilman

7884. Wî taze ziyafetek bû anî
Wan xwar û vexwar ʿereq ji canî

7885. Rabûne nivêjê yek îmame
Qurʾan wî dixwundî natemam e

7886. Ayet ji Xudêve hat dem û dest
Nêzîkî nivêj nebin ku hûn mest

7887. Kêm bûne ji paş ʿereq vexwûre
Emma hemû jê neçûne dure
***

7888. Ta carekê nêv Medîneya pak
ʿÎtban kuṟê Malikê şeṟefnak

7889. Mêvan kirî Seʿdê bab Buweqqaṣ
Gel çendî heval bi deʿwetek xaṣ

7890. Wan zadê xû xwar û mey dinûşî
Mest bûne hemî bi ẕewq û xûşî

7891. Şiʿrek gûtî Seʿdî mey ṭerebdar
Yekser ji civîn û ẕemmê[1] enṣar

7892. Enṣarî yekî bi destî hestî
Havêtî ye Seʿdî ser şikestî

7893. Rabûye Seʿd ji bû şikayet
Çu gûte peyemberê hîdayet

7894. Peyẋemberî qîṣṣeya wî zanî
Ḥaḍir bû ʿUmer di wî mekanî

7895. Wî xwast ji Xudê xû ev niyaze
Ya Reb tu ji mey xeber de taze

7896. Ayet bû Nebî dihate xware
Nêzîkî nebin mey û qimare

7897. Hun dûr bikevin ji karê wey pîs
Kiryarê ewî neyarê Iblîs

---

[1] dij

7898. Dê bêxîte nêv we bûxz û kîne
Manʿi ji nivêj û zikir û dîn e

7899. Şeṛrê ʿereq û qimarê zûr e
Aya we diçin ji her du dûre

7900. Wê gavê digût xelîfê s̱anî
Ya Reb me jê çûyne paş ji canî

7901. Ev renge Xudê bi ev nîẓame
Êkcarî wî kirye mey ḥerame

**L/م Meḍarul Xemrî we Exûha Qîmar (Ziyanên Mey û Qimarê)**

7902. Ger pîsemey e eger qimar e
Wan şeṛr û ḍerer bi çav diyar e

7903. Her kes bi yekê ji wan bibît fêr
Êdî tu xeyal nekey ji wî xêr

7904. ʿEqlî dibetin ji kelle mêran
Malan diketin xirab û wêran

7905. Exlaqê di taze jê diweryên[1]
Çî xulqê bed e dê tê ewuryên[2]

7906. Dil ṣar dibî ser nivêjê hergah
Dê bêlî dûmayê ẕikrê Ellah

7907. Qeswet digirît dilê bi jenge
Namînî li nik kesê çi senge

7908. Her wek ḍererê didet bi malî
Wêran diketin giyan û ḥalî

7909. Bû kumelê ummetê ḍererkar
Axir dibî yan feqîr û bêmar

7910. Zuran tu dibînî dewlemendan
Axir bûne xestexan û zîndan

7911. Hindan ji keser ji malê çuyî
Bedkarî hinan û ḥezreguyî

7912. Bê sir niye lê kesê bibînî
Barî ku ḥeram kirin di dînî
***

7913. Wê suç guneh gelek giran e
Guhdêre peyemberê zeman e

7914. Kes nake zînayê çî musilman
"Wê gavê meger nemaye îman"

7915. "Her we çi zelamê mey dixwutin
Îman wî demî li nik diçîtin"

7916. Ma bes niye meyxwurê nevîser
Leʿnet lê biket resûlê serwer

7917. Yê hatî ji Tirmzî ji exbar
Yê gûtî Enes ji yarê muxtar

7918. "Leʿnet dike ṛehberê ename
Ser deh kesî ser meya ḥerame

7919. Ew yê givişî digel xudanî
Ew yê ku vexwarî jehrê canî

7920. Helgirtî ewê bibet bû male
Gel ṣaḥibê malê qur bi ḥale

7921. Bû saqî: Ewê ku mey digêrî
Bû ew yê firutî ro çu qêrî

7922. Ew yê kirî û ji bû kirîne
Yê xwarî ḥeqê wê naşirîn e"
***

7923. Îslamê kesê bi çav bibînî
Vê gavê bi dil keser dimînî

7924. Dê bînî di van cewane şaran
Şuşêt ʿereqê dibê jimaran

7925. Bê perde di van dukan û sukan
Ney tirsê Xudaye ney serûkan

7926. Ew yêt xû ji dil mezin dizanin
Şeş pişkê ʿereqvexur ji wan in

7927. Ew çunke dixwûnve bê ḥemîyyet
Elbet vebû derge bû reʿîyyet

7928. Vê gavê eger heba dikare
Ew ḥeddê ʿereqvexwûrê har e

7929. Da kêm bî di nêv me mey bi yekcar
Namînî ʿereqvexwûrê bedkar

7930. Ew ḥeddê ku şeṛʿî kirye ferman
Vî derdî bijil wî nîne derman

[1] Her ku jê dikeve (jêrenota Şuşî bi xwe ye)

[2] Dê hête dîtin (jêrenota Şuşî bi xwe ye)

**M/ن Ḥukmu Şarîbîl Xemrî (Sizayê Ereqvexwerî)**

7931. Her kes bi dilê xû mey binuşî
Ew balix e piṟṟ ji ʿeql û huşî

7932. Sabit bû li ser eger bi îqrar
Yan qewlê du şahidan şirînkar

7933. Çil ḍerbe cezayê hur zelam e
Ger ʿebd e ḥeqê wî bîst temam e

7934. Hem caîz e bû îmamê ʿadil
Bû hurrî bigêrî ew duca çil

7935. Ew ḍerbe bi şivk[1] û neʿl[2] û mist e
Yan gurzeper û belê ne sist e

7936. Ev ḥedd e belê dibîte ʿîbret
Kes êdî xû nake ehlê leʿnet

**EZ-ZEHRETUL XAMÎSETU (KULÎLKA PÊNCÊ)**

**Fî Hewadîs̱îs Senetîr Rabîʿetî Mînel Hîcretî (Bûyerên Sala Çarê Koçî)**

**BÎSMÎLLAHÎRREḤMANÎRREḤÎM**

We înneke leʿela xuluqîn ʿezîm (*Birastîtu li ser rewiştekî (exlaqekî) mezin î. (68-Sûreyê Qelem (4)*)

**ER-REWḌETU'L- XAMÎSETU (MÊRGA PÊNCÊ)**

Fî Meʿrîfetî Resûlîllahî Ṣellellahu Teala ʿEleyhî we ʿela alîhî we Ṣeḥbîhî bî Beyanî, we Xuluqîhî we Feḍaîlîhî we Xeṣaîṣîhî we Ezwacîhî we Ewladîhî we Ẋeyre Zalîk (Derbarê niyasîna peyemberî da silav ser wî û kes û karên wî bin,bi diyarkirina çêbûn û rewşit û qencî û taybetmendî û jinik û zarokêt wî)

**We Fîha ʿîddetu Ezahîre (Çend Kulîlk Tê da Hene)**

7937. Ya Reb tu neṣîr û harîkar î
Ḥemda te dikem bi qelb û zarî

7938. Reḥmet tu biṟêje bê jimare
Ser ruḥê ḥebîbê nazidare

7939. Ser ruḥ û rewanê pakealan
Ser cumle ṣeḥabe û hevalan

7940. Ya Reb tu bidey me xûş giyanî
Nûrek bike nêv ḍemîr û canî

7941. Ezmanê me tu bikey guhersenc
Da rêk û rewan bê çîmena penc

7942. ʿEwnê bide da cewan bibêjim
Xaş beḥs̱ê resûlî da birêjim

7943. Bejna wî û reng û qameta wî
Xulqê wî û pakesîreta wî

7944. Çendek bû nimûne ʿal şemaîl
Hindek ji xeṣaîṣ[3] û feḍaîl[4]

7945. Tiştêt ku Xudê didayne wî bes
Şulêt wî ḥelal bû ney ji bû kes

7946. Ew karê li ser di fer bû çend in
Êt ser wî ḥeram û napesindin

7947. Çendek wî ji muʿcîzat nîşane
Çendî me di ṭaqet û şiyane

7948. Ewlad û jin û metan û mame
Ta xwuşk û birayê şîr temame

7949. Ta tiştê wî hey ji milk û malan
Ta cilk û çek û dewar û kalan

7950. Ger yar bî Xudê bi xêr û şayî
Gel çendê dî dê bibêm tebayî

7951. Ev name eger çî bûy dirêje
Lê xûş û şirîn e her nebêje

7952. Nê sîretê ḥeq peyemberê me
Çendî tu bixwunî hêj tu kêm e

**EZ-ZEHRETU'L-ÛLA (KULÎLKA ÊKÊ)**

**Fî Beyanî Xelqîhî We Ṣûretîhî ʿEleyhî's-Selam (Derbarê Şirovekirina Xwerûya Wî û Sûratê Wî Silav lê Bin)**

7953. Ey serwê bilindê baẋê unsê

[1] Şivtan, darikê ter û dirêj
[2] Pêlav, gurzeper

[3] Taybetî
[4] Qencî, başî,

Wey ṭuṭîyê murxuzarê qudsê

7954. Ey rewneqê neynika cemalê
Wey cewher û şeyqela kemalê

7955. Tuy şuʿleyê afitabê reḥmet
Tuy durrê giran buhayê ḥîkmet

7956. Bînahîyê çavê cumle ʿalem
Tacê serê cumle wuldê adem

7957. Ey destegulê ḥedîqeyê[1] raz
Wey bilbilê baẋê ʿizzet û naz

7958. Dellalê bilindî û keramet
Keşşafê xezîneya şehamet

7959. Ey kan û xezîneya edeb tuy
Fexrê ʿecem û hemû ʿereb tuy

7960. Rebbê te tu day bi taze ṣûret
Ṛazandî belê bi pakesîret

***

7961. Eṣḥabê ḥedîs̱ diken rîwayet
Ṣaḥib hunerêt di piṛṛ dîrayet

7962. Xelqê te û taze ṣûreta te
Xulqê[2] te kemal û sîreta te

7963. Ew bû me dibên bi tazekarî
Ṣed feyḍ û kerem ji wan bibarî

7964. Yê gûtî Ebû Hureyre sengîn:
Min wek wî nedîne law û rengîn

7965. Weṣṣafê cemal û bejin û bala
Wan pakeṣeḥabe û hevala

7966. Ḥeyrîne hemû di xîlqeta te
Nabên bi temamî weṣfeta te

7967. Husna te belê mîs̱alê husn e
Tîms̱alê qed û nihalê husn e

7968. Ḥeddê me nîye bibêm temame
Pîçek bû nimûne min meram e

***

7969. Ey çen mezin î du hin şirîn î
Xûşevyê min î tu nazenîn î

7970. Bejna te dibêm nihalê ʿerʿer
Şîrîn û cewan ji payî ta ser

7971. Ney kuṛt e û ney dirêj diyar e
Pîçek bû dirêjî meylêdare

7972. Navincîbû ger çî qameta te
Bê perde bû lê şehameta[3] te

7973. Gel her kesekî çi çuy çi westay
Balatir î tu bi bejn û balay

7974. “Ney zûr qelew î ne zûr zemîn[4] î”
Çen têr û piṛṛ î du hin şirîn î

7975. Dêmê te texre[5] çû bedre nûrîn
Rengê te sipî û ṣur e şîrîn

7976. Enya te geş e çi pan e mehweş
Tu sermezin î bi pirçeka ṛeş

7977. Ew çendî bi pirç û mûyê bûş e
Du hinde tijî ji ʿeql û huşe

7978. Bijyêt[6] xû demê qusand û paşî
Berdan û du şeq kirin bi başî

7979. Ew gulye ne piṛṛ xelek bû mişkîn
Ta perkê guhî dirêj û rengîn

7980. Çavêt te di ṛeş gelek cewan in
Ebru di zirav û ṛeş kivan in

7981. Mabeynê di wan sipî bû bê xeş
Piṛṛ mu ne wekî du çav mujey ṛeş

7982. Ew çave bi bê kilî di ṛeş bûn
Ew çendî di ṛeş du hin di geş bûn

7983. Pêrû[7] çi dema dikir jimare
Bû yazde sitêr dibûn diyare

7984. Her wek wî di dîli pêş bi başî
Wî taze di dîli layê paşî

7985. Wek rojê ewî didît bi ṭarî

---

[1] baxçe
[2] Taybetmendî, xeyset
[3]
[4]
[5] Wekî, mîna.
[6]
[7] Yusif Pêxember

Guhxûş bû gelek bi emrê Barî

7986. Difna te dirêj û nûr di dav e
Nîva wê bilind û ser zirav e

7987. Rûyêt te ḥulûy û ṛast û şîrîn
Her du di sipî û ṣur û nûrîn

7988. Simbêl di piṛṛ û cewan û şeb reng
Ey devmezinê şirîn û xûş deng

7989. Nê devmezinî bû mêr pesind e
Wek sermezinî feqet ne hind e

7990. Dengê te gire şirîn û xûş e
Rêdîn[1] te xir û piṛṛ ew çi bûş e

7991. Çar tible belê dirêj û rengîn
Ew çendî ṛeş e du hinde sengîn

7992. ʿUmrê te bi şêst û sê gehî bû
Nêzîkî ji bîst muyan sipî bû

7993. Ey lêv tenikê didan biçik fir
Rewneq wekî ṭerg û luilû û dur

7994. Rewneq vedida dema girnicîn
Gerden çi dirêj û law û sîmîn

7995. Kenya te girnicî bûye piṛṛ seng
Girya te tinê bi çav û bê deng

7996. Car car dikenî bi dengbilindî
Her wek me li sîreta wî xwundî

7997. Ey pan û dirêj te dest û zend in
Wey dest û pîyêt te têr û tund in

7998. Pan û fire bûn te pankedeste
Dana te çu baw xîzê best e

7999. Tiblêt te dirêj in û situr in
Baskêt te bi mu ne mu di zûr in

8000. Tîblêt di pîyan dirêjtirîn ew
Êt rex tibla beran yeqîn ew

8001. Pan û fire û cewan e sîne
Ew menbeʿê ḥîkmet û xizîne

8002. Piṛṛ feyḍ û zeka û ʿîlm û ḥîkmet
Piṛṛ ṣebr û ṣefa û hîlm û hîşmet

8003. Sîngê wî sê car ku şeq kirîne
Ta mabû li wî diyar bû şwîne

8004. Her we di şirîn û pan bû navmil
“Ṛast bûn zik û sîne û serê dil”

8005. Mabeynê milan bû muhrê xatem
Nîşanê nubûwwetê bû ʿalem

8006. Gûştek bû Xudê bi wî ve çêkir
Ṣur kuk e temet bi hêlkekutir

8007. Ew zend û mil û seravê sîne
Her wek ku bi mwî ne ew sipî ne

8008. “Hel sîngî ḥeta biçîte nafik”
Xeṭṭek ji muyan zirav û nazik

8009. Bê mu bû ji ẋeyrî wan hemû leş
Ey çust û çeleng û ey şirînmeş

8010. Ey şaẋ û selîm leş û giyanî
Wey ku tu bi quwweta çilanî

8011. Bû layê jinan û zûrê destan
Nê rostemî weqt î pê newestan

8012. Ta mabû peyemberê ename
Ney bawişî ney bû îḥtîlame

8013. Ey pakedil î ji ḥîkmetê piṛṛ
Ey pur ʿereqê ʿereq[2] wekî dur

8014. Lew Ummû Suleymê piṛṛ ji şadî
Ew xirve dikir bi dilmiradî

8015. Bêhna wê nekarê misk û ʿenber
ʿItrê xû bi wî dikir muʿeṭṭer

8016. Ew her du belek piçek zirav bûn
Panî di zirav bi şewq û ṭav bûn

8017. Kûṛayê binê pîyan beyan ew
Pîçek mezin û gelek cewan ew

8018. Gava tu diçûy diçûy bi çustî
Wek zîrek û rosteman durist î

8019. Ma wek te şirîn û taze kê dî

[1] rih

[2] Xuh

Ḥîna tu diçûyî bi hêdî hêdî
8020. Meylek te dikir çu serwê şengîn
Bû layê çepê û ṛastê rengîn

8021. Wî pêş xû didan heval û yare
Puşt bû melekêt di kirdigare

8022. Havrî vedida bikarê danî
Nek bes bi serî bi xir giyanî

8023. Maqûl û giranî ger tu kir bûy
Gava qiseyan tu kanê dûr bûy

8024. Ey xuşxeberê feṣîḥ û xûş deng
Gûtnêt te cewahir in di piṛṛ seng

8025. Her kes te bibînîtin ji ẋeflet
Derḥal dikevîte tirs û heybet

8026. Her çî ku ji dil ji bû te bû yar
Ma têr dibitin ji wesl û dîdar

8027. Dîdarê cemal û qameta te
Guhdarî kelam û ṣuḥbeta te

8028. Ekber kerem e ji paşî îman
Ya Reb bide min di baẋê îḥsan

8029. Gûtin te çi taze û şirîn e
Lehca te evî û ẋemrevîn e

8030. Ney kême ne zûr e piṛṛ beyan ew
"Ney zûr bi lez û ne zûr giran ew"

8031. Êk êke xeber şirîn û dildar
Guhdar dişiya biket bi ejmar

***

8032. Şîrînxeberî bi cê ne gûtin
Bê ḥed te durr û mirarî simtin

8033. Meʿlûm e wekî dibêjî Qurʾan
Her çî te gûtî li dîn û îman

8034. Xir weḥy e Xudê ji bû te narî
Da bû me bibêy bi tazekarî

8035. Her çî te gûtî ḥedîs̱ û ayet
Ew cumle di piṛṛ buha ne ẋayet

8036. Çendî hukema û ehlê qanûn
Ḥeyrîn di şeṛîʿetê te bê çûn

8037. Eḥkam û ḥîkem digel ḥeqîqet
Bû jînê cîhan û pak ṭerîqet

8038. Exlaqê di taze û bijare
Adabê bilind û namidar e

8039. Esbabê ḥeyat û dunyedarî
Dergahê lîqayê ẕatê Barî

8040. Yekser bi ḥedîs̱ û hem bi tenzîl
Bû me te kirin beyan û tefṣîl

8041. Ev şeṛʿe ḥeta cîhan bi jîne
Bû cumle beşeṛ li ser zemîne

8042. Bû cumle beşeṛ di her zemanan
Bû cumle milet di her mekanan

8043. Ney ḥacetî têkvedan û teʿdîl
Nahête serê çi xwar û tebdîl

8044. Xû çar ji mezahibêt celîl in
Bû ḥacetê xir cîhan kefîl in

***

8045. Her çî te kirî çi gûtî hercar
Yan dît û tu kirbûyî li her kar

8046. Eṣḥabê te ew ji dil hevalan
Ṣaḥibhuneran xudankemalan

8047. Piṛṛ fedl û zeka û piṛṛ dîrayet
Ew bû me ji tu diken rîwayet

8048. Eṣḥabê Sunen bi nîkunamî
Ew werdigirin ji wan temamî

8049. Ṣed feyḍ û kerem ji wan bibarî
Neyxaṣme ji Muslîm û Buxarî

***

8050. Ey pake peyemberê Xuda yî
Ey nûr û çirayê rehnuma yî

8051. Meddahê cemal û qameta te
Weṣṣafê kemal û xîlqeta te

8052. Ḥeyrîne neşên biken beyan ew
Nahête bi defter û zuban ew

8053. Pîçek me gûtî ji ṣûreta te
Çendek jê bibêm ji sîreta te

**EZ-ZEHRETU'S̱-S̱ANÎYETU (KULÎLKA DUYÊ)**

**Fî Xuluqîhî we Sîretîhî (Derbarê Rewşit û Jiyana Wî)**

8054. Ey serwerê xir peyemberan tûy
Serdarê cemîʿî ṛehberan tûy

8055. Serdefterê cumle eṣfîyayan
Serhelqeyê zikrê ewlîyayan

8056. Tu roj î ewan şubet sitêr in
Ew xir bi te nê di şuʿledêr in

8057. Deryayê ʿilûm û gencê ḥîkmet
Nê Barî tinê tu day bû reḥmet

8058. Barî tu ji ʿalemê bijarî
Da bibye delîlê dînê Barî

8059. Ellah tu kirî xizîneya raz
Şeʾnê te kirî bi ʿizzet û naz

8060. Her çî xuluqê bi qedr û qîmet
Barî bi te dan ji kanê ḥîkmet

8061. Ba van ẋem û ẋuṣṣe û nexûşî
Weṣfêt te cewan dibêjî Şûşî

**Serdu Şeyîn Mîn Şîyemîhîş Şerîfetî (Çendek ji Rewşitên Wî)**

8062. Exlaqê di taze û mubarek
Peyẋemberî xir hebûn bi carek

8063. Xûzmey li kesê ku çav li wî ket
Xulqê xû cewan û ispehî ket

8064. Lewṛa ku dibêjî şahê ekber
Hun baş e biken xû wek peyember

8065. Axret kê divê riḍayê Barî
Du pê wî herin bi tazekarî

8066. Çen xulqê Nebî ji bû nimûne
Guhdêre bi can tu wer bixwûne

8067. Ṛastî û ṣedaqet û emînî
Sehlî û îdare û şirînî

8068. Xuşṭebʿî û nermî û sexawet
Maqûlî û ẋîret û şecaʿet

8069. Şîrînxeber î û piṛṛ wefa yî
Dilnazik î û bi dilṣefa yî

8070. Pakî û şehamet û giranî
Çakî û keramet û cewanî

8071. Zuhd û kerem û kemal û raye
Şeṛmînî û perdeya ḥîcabe

8072. Piṛṛ ray û ʿeqil bi huşiyarî
Piṛṛ zikir û fikir di karê Barî

8073. Gel jar û ḍeʿîfî piṛṛ ji reḥmet
Piṛṛ ḥuzn û girî ji tirs û heybet

8074. Qelbê wî tijî ji nûr û fikr e
Ezman bi s̱enayê ḥeq bi ẕikr e

8075. Ḥetta ku bi çav nivistî her car
Qelbê wî bi age bûye hişyar

8076. Nêv ehl û xedem çi sehl û nerm e
Bû layê jinan çi piṛṛ bi şeṛm e

8077. Ney kîbr û hewa ye ney ẋurûr e
Ezman wî ji feḥşî an çi dûr e

8078. Ney lewme dikir nedan civîne
Ney rexnegir e ne deqşikîn e

8079. Ney tur e meger di karê xware
Bê şeṛʿî ne xaṭir e û ne çare

8080. Çî xwastî ji wî didayê zuye
Ney gûtîye ne bilan nebû ye

8081. Eẋleb digirnicî kêm şirînken
Car larî dikir bi royê rewşen

8082. Ba çav û biru nekir îşare
Havrî veneda bi ser çu care

8083. Ney xudpesinî bi medḥ û fexre
Sengîn û qedirgir û bi qedr e

8084. Çen car wî digûte xadimê xu
Şulek te heye bikem ji bû tu

8085. Ney bû qisepîs û ney civînder
Leʿnet li kesê nekir peyember

8086. Şulek bidîya eger dizanî
Ney karê muruwwet û cewanî

8087. Naba ku bibêjî ew deq û deq
Navê çi kesî bi gûtina req

8088. Wî belkî digû: "Çira hinek kes
Van tuxme qisan dibên biken bes"

8089. Her carê li meclîsê dironişt
Maqûl û çi nazdar û çen qişt

8090. Ew bedr e heval ji rengê ḥal e
Her yek ji xû canfîda wîṣal e

8091. Ew çen sivik e du hin giran e
Çen bê cilik e sê hin cewan e

8092. Gûtin wî dikir belê bi qurban
Emrek wî dikir sivik dikir wan

8093. Meḥbûbe gelek li nik hevalan
Çêtir li ser û biçuk û malan

8094. Gûtin wî çi taze û şirîn e
Lehca wî cewan û ẋemrevîn e

8095. Ney kêm e ne zûr e zûr cewan ew
Ney piṛṛ bi lez e ne zûr giran ew

8096. Weʿẓê wî di eynîyan cewan bû
Ney kuṛt û dirêj bû piṛṛ beyan bû

8097. Gûtin wî dikir ḥeta ku guhdar
Çak tê bigehît digûtî sê car

8098. Ew rêve diçû li du hevalan
Her çî digehiştê ta tefalan

8099. Ewwel wî selam dikir şirînkar
Ba çen qiseêt şirîn û dildar

8100. Her carê digeşte yek ji hemser
Destê wî digirt resûlê enwer

8101. Damînî bi pêve ṛadiwestî
Wî destê mubarekê di destî

8102. Da pirsî ji wî: Tu ser çi ḥal î
Keyfa te çewan e gel ʿeyalî

8103. Ḥetta ku hevalê wî li pêşa
Destê xû li destê wî dikêşa

8104. Mêvan bikira ḥeta ku ʿebdan
Bû nanê cehî diçû bi xendan[1]

8105. Her çen mezin e ne deʿiyekar e
Car bû li kerê xû ros suware

8106. Sê rojê eger ne dî hevale
Ewwel wî dikir ji wî suale

8107. Ger ew bû li mal diçû serêdan
Wer ew ne li male bû duʿa xwan

8108. Naṣaẋ bû kesek ji paşî sê ruj
Wî ser lê dida ji canê piṛṛ ṣuj

8109. Destê xû didanî ser serê wî
Ew dev bi duʿa û mehderê wî

8110. “Ya Reb tu Xudayê cumle nasan
Vê êşê li vî bibey” tu asan

8111. Bijlî te çu nîn bidet şîfayê
“Ya Reb tu li vî bibey vê tayê”

8112. Car car dikir û digûtî larî
Emma nedigû çi carê xwarî

8113. Her kes wî didî ku dengbilind e
Nik serwerê dînî neypesind e

8114. Her merdê didî nexuşenav e
Navê wî bedil dikir di gave

8115. Her çî ku li wî sipî dibû mû?
Dabêjî: “Tu reng bikey ji bû xû”

8116. “Bes rengê ṛeşî nedey muwane
Ger ṣur bi xenê bikey cewane”

8117. Ger carê diçû bi piṛṛ kemale
Bû malê birader û hevale

8118. Ḥeqqê edebî dikir beyanî
Nawestî bi ṛastî derkê xanî

8119. Belkî diçû yek li du kinaran
Dabêjî selam ḥeta du caran

8120. Ew sîng firehê bi ṣebr û nermî
Ger tore biba bi kerb û germî

8121. Curet nedikir kesê bi mehder
Bijlî ji Usame û ji Ḥeyder

8122. Ew tore nebû bû xû çu caran
Bû dînî meger ji xwarekaran

[1] Kenîn,girnicîn

8123. Ew bûye bi xulqê xûş û guftar
Gel wan ne kesêt xirab û bedkar

8124. Her çendî zelam bed û nezan e
Dê çêbît eger şirînzuban e

8125. Nê royê xûş û zubanşirînî
Ew dergê emînî û evînî

8126. Lew her kesê ro wî tirş û tal e
Bê qedr û îdare û heval e

8127. Ew yar û delîlê xêr û çakî
Daîm wî emir dikir bi pakî

8128. Lew ew bi dewam bijwîn[1] û xavîn
Nê pakijî ye binaẋe bû dîn

8129. Ava ye wekî wî gûtî îslam
Ser pakijîyê di ḥukm û eḥkam

8130. Her kes nebijwîn û pak û qişt e
“Ney ehlê seʿadet û biḥeşt e”

**Haluhu Fî Ehlîhî ʿEleyhî’s-Selam (Rewşa Wî di Mala Wî da Silav lê Bin)**

8131. Gava ku diçû ḥerem serayê
Ew yarê evînî û ṣefayê

8132. Ew dev bi tebessum û kenîne
Royê wî geş û xeberşirîn e

8133. Carek bikenît eger bi denge
Wî girtî bi destî dev ji nenge[2]

8134. Xuşṭebʿ û xeberxûş û şirînkar
Cilkê xû bi xû pinî dikir car

8135. Çen carê bi destî mer diduşî
Her karê heba dikir bi xûşî

8136. Ser axê we bû dixwar û ronişt
Neʿla xû bi xû diduryeve qişt

8137. Ew yar û delîlê ʿedl û îḥsan
Beynê ḥereman nekir çi neqsan

8138. Wî taze qesim dikir şirînkar
Ney ferq û cudayî ney ṭerefdar

8139. Da bêjî: “Xudê xû tu dizanî
Ṭaqet eve ye ku min di canî”

8140. “Lewma me nekey ji meylê can im
Ew ya bi te ye ne ez xudan im”

8141. Şek nîne resûlê nazenîn e
Gel wan dinivist di nêv nivîne

8142. Meʿlûm e wî şevnivêj li ser fer
Da rabî bû emrê şahê ekber

8143. Hem ḥeqqê jinê dikir edaye
Hem taʿet û ẕikrẹ̄ ḥeq Xudaye

8144. Her carê diçû sefer ji canî
Beynê ḥereman wî qurʿe danî

8145. Her çî ku bi navî qurʿe hatî
Da gel xû betin bû her welatî
***

8146. Ṣuḥbet wî dikir digel jinane
Car care ji bû sirûrê wan e

8147. Carek gûtê Aîşa bijare:
Wer da ez û tu bikeyne ẋare

8148. Pêşkeftî ji wî ḥerem du caran
Pêşkeftî dumayê yarê yaran

8149. Wî gût û kenî bi zarê şekker:
Ev care libatî wane yekser
***

8150. Carek bû Nebî bi keyf û şaye
Ronişţî di ûde Aîşa ye

8151. Ummû Seleme ji ḥubbê canî
Amanekê gûşt û nanî anî

8152. Peyẋemberî gû: “Bixwun vî zadî”
Wî xwar û ewan dixwar bi şadî

8153. Wê gavê bû Aîşa di kar e
Zadek wê durist dikir bû yar e

8154. Wê zad bi lez û bezî dianî
Pêş destê peyemberê me danî

8155. Amanê wê radikir bi tundî

[1] Paqij, pak

[2] Anku mutewazî, peyv farisî ye. (jêrenota Şuş^bi xwe ye)

Havêt û li ʿerḍî da şikandî

8156. Peyẋemberî gû: "Bixwun dubare
Dayka hewe tore bûy diyar e"

8157. Têr bûne dema wî kir bi ferman:
"Ummû Seleme bigir vî aman"

8158. "Ev ṣuḥfe libatî ya şikandî
Ev şîve libatî ya rijandî"

8159. Carek dî ve renge bûy temame
Wê kir bû digel Ṣefîye nam e
***

8160. Hem Sewde ji bû resûlê Barî
Înabûye şîv ji gûşt û arî

8161. Ew bûyî di xurfe Aîşa ye
Roniştî li beynê wan bi şaye

8162. Lê ʿAîşeyê digûte Sewde
Dê tu jî bixû digel me çende

8163. Sê car wê digû ewê nexwarî
Ew rabû ji wê bi torekarî

8164. Destê xû didanî şîv di gave
Pê malî ji Sewde ro û çave

8165. Ew pê kenî serwerê zemanî
Wî ʿAîşe bû digirt bi ranî

8166. Gû: "Sewde veke tu tûl wesa ye"
Wê jî we dikir bi Aîşa ye

8167. Hem pê dikenî şirîn resûle
Ev renge divê gû tûl bi tûl e

### ʿEqluhu we ʿEmeluhu ʿEleyhî's-Selam (ʿAqil û Pêzanîna Wî Silav lê Bin)

8168. ʿEqlê wî selîm û piṛṛ kemal e
ʿIlmê wî ji weḥy e bê mîs̱al e

8169. Ger seyrê bikey ji bû nimûne
Çendek tu ji ḥalê wî bixwune

8170. Wek zanî te ew ʿereb çewa bûn
Piṛṛ qeswet û weḥşîet û cefa bûn

8171. Exlaqsiz û bê kemal û bê bar
Ew hinde di têz û tund û duşwar

8172. Peyẋemberî ba kemalê hûşî
Gel çendî cefa û çen nexûşî

8173. Gel wan wî îdare kir bi her ḥal
Nek salekê belkî çen meh û sal

8174. Wan çendî digel cefa û êşan
Karê wî ji wan bû ṣebirkêşan

8175. Ḥetta wî kirin bi dîn emîn e
Exlaq jê bedil kirin şirîn e

8176. Ew yêt ku ji dil neyarê can e
Bûn yar û bira di canfîda ne

8177. Ḥalê wî husa ji ser bi pa ye
Nîşanê kemalê ʿeql û ray e

8178. Jîna wî digel heval û yaran
Kîna wî digel neyar û xwaran

8179. Karê wî di xûşî û nexûşî
Şeʾnê wî bi kêmî û bi bûşî

8180. ʿUmrê wî ji ser ḥeta dûmayî
Rabûhrî bi huş û ray tebayî
***

8181. ʿIlmê wî çima ne aşikar e
Wek rojê li aseman diyar e

8182. Deryayê ʿilûm û gencê esrar
Barî bi wî dan nekarê ejmar

8183. Qurʾan ku tijî ji ʿilm û ḥîkmet
Nîşa wî dida bi weḥy û ḥîşmet

8184. Çendî wî gûtî ḥedîs̱ê taze
Eḥkam û ḥîkem çi remz û raze

8185. Ev weʿd û weʿîd ev ḥîkayat
Ev zikr û duʿa û ev munacat

8186. Yek peşke hemî ji ʿilmê Qurʾan
Barî bi wî dan ji kenzê ʿîrfan

8187. Wî taze beyan dikir bû ummet
Ba qewl û ʿemel bi pakesunnet

8188. Wergirtine paş wî dest bû destî
Wan waris û ʿaliman durustî

### Ṣebruhu we Hîlmuhu ʿEleyhî's-Selam (Dilfirehî û Nermîya Wî Silav lê Bin)

8189. Kî wek wî heye bi ʿeql û rayê

Ka wek wî ṣebirkeşê belayê
Mecbûrê ṣebir diket xudanî

8190. Çen sal li Mekê wekî te zanî
Burandî ʿumir bi ṛencê canî

8191. Çen cewr û cefa û qehr û azar
Çen karê ne laîq û ne hemwar

8192. Wî çendî dikir xûşî û nermî
Wan her bi wî ra cefa û germî

8193. Berṭengî û zivirî û xeberdan
Bê ḥed wî di dîn ji wan nemerdan

8194. Wan çendî digel wî ṛenc û êşan
Şeʾnê wî tinê bû ṣebir kêşan

8195. Nê ṣebr e derê mirad û xêran
Her nermî ye Şeʾnê taqe mêran
***

8196. Roja ku çu Ṭaîfê te zanî
Çen êş û nexûşî geşte canî

8197. Cengê Uḥudê ku nuke çuye
Ḥalê wî te zanî ew ku bûye

8198. Çen êş û elem bi wî gehandin
Yek durre didan li wî şikandin

8199. Wê gavê gûtin resûlê nûrîn
Bû çî te nekey li vane nifrîn

8200. ʿUmrê te li gel ewan heder çu
Wan cewr û cefa li ḥed beder çu

8201. Wî gûtî: "Xudê ne ez hinarî
Bû qehr û bela û leʿnekarî"

8202. Ez belkî kirim delîlê dînî
Bû ʿalemê reḥmet û evînî

8203. Ya Reb tu bigêr ʿeşîreta min
Ser sunnet û pakesîreta min

8204. Ney nasîme wan û hêj nizan in"
Lew hu ji hîdayetê neban in

8205. Ma ṣebrê peyemberê me meḥbûb
Nisbet heye gel wî ṣebrê Eyyub

8206. Lew jan û bela li ser giyanî
Mecbûrê ṣebir diket xudanî

8207. Dê çibke eger ṣebir nekêşî
Her çendî bi nalî her diêşî

8208. Emma tu bibîne ṣaẋzelame
Bû quwwet û curetê temame

8209. Her rojê bibînî ẋedr û xwarî
Larî û civîn biket gudarî

8210. Nakesbiçeyek bi napesinde
Çefya wî biket di ḥefkê tunde

8211. Ew dest ne bi zêvî piṛṛ ji canî
Lukmek lê nedet li bin didanî

8212. Nê ṣebrê divêt ve renge şule
Ḥetta ku zelam biket qebûle

8213. Neyxaṣme wekî zelam bû ṭengav
Dê bînte derê li şêrî du çav
***

8214. Çen nerm û helîm e roşirîn e
Xulqê wî cewan û pakesîn e

8215. Neqlê ji Enes diket Buxarî
Ey feyḍ û kerem li wan bibarî

8216. Carek bû diçûm digel peyember
Burdek wî di ber bû piṛṛ ji cewher

8217. Min dî ku ji wêve yek ʿereb hat
Emma nepesind û bê edeb hat

8218. Wî girt û ʿebayê wî vekêşa
Ew rahijiyabû belkî êşa

8219. Ḥetta me dî mil ji Muṣṭefayî
Şun lê kirî ḥêşîya ʿebayî

8220. Paşî wî bi dengê ḥêl digûtî
Zu bîne ji bû me çen ji qûtî[1]

8221. Ew malê Xudê li nik te danî
Hindek bide min heçî te anî

8222. Wî havrî veda û pê girnicî
Ṣaḥib keremê xudanê qencî

8223. Wî gûtî biden bi ev zelame

[1] Zad, erzaq

Dubarê ji qesb û ceh temame

8224. Nê xulqê xûş û zubanşirîn î
Naçare ji bû cîhan û dînî
***
8225. Hakim ji rîwayetek dibêjî
Ya Reb tu reḥim bi ser birêjî

8226. Cwîyek çi mezin ji ʿaliman ew
Zeydê kuṛê Seʿne navgiran ew

8227. Dîbûn ji Nebî ṭexer ʿelamet
Çu tecrîbe ket li xûş ṭebîʿeṭ

8228. Çu gûte peyemberî şirînkar
Hatîme bikem digel te bazar

8229. Ez pare didem ḥeta fulan mah
Bû hinde qesip bidey derangah

8230. Hêj qewlê ne hatî çu bi tundî
Cwî gûte Nebî bi dengbilindî

8231. Berçêlkê[1] ji wî dikêşî: Ta key
Tu ḥeqnexûş î ḥeqê me nadey

8232. Wê gavê ʿUmer li wê bû ḥaḍir
Gûtî "Te çi qare qare kafir

8233. Zivrî ku dikey digel peyember
Rabim te bikem di gavê bê ser

8234. Peyẋemberî gût: ʿUmer bi nermî
"Ḥacet me nîye bi têz[2] û germî"

8235. "Ḥeqqê te neṣîḥetê cewane
Hem bû min û meʿlîmê cwîyane

8236. Bêje tu bidê heqê wî taze
Hem bêje wî jî: Cewan bixwaze"

8237. Rabe tu li gel wî her bi çustî
Ḥeqqê wî ji bû bidey durustî

8238. Bîst fitre ji bû bi pêve serbar
Tula ve qisêt nexûş û duşwar

8239. Zeydî ku dî ev xuluqşirînî
Îmanê ji cerg û can diînî

8240. Wî gûte ʿUmer: Nihû me zanî
Peyẋembere bû çi may zemanî

8241. Min taze bi wî dihatî bawer
Ez şehde didem: Ku ew peyember

**Sexauhu We ʿEṭauhu (Dan û Merdîya Wî)**

8242. Zuhda wî ji can e bû Xuda ye
Ṭebʿê wî ji dan û piṛṛ sexa ye

8243. Ger dê wî heba li danê piṛṛ bû
Werne nedigû ne belkî kir bû

8244. Her kes ji wî tiştekî bixwazî
Ew dê bidetê bi serfiraḍî

8245. Teşbîhî bi bayê ḥêl wî dane
Mahê remeḍan nekarê wane

8246. Ew kan û xizîneya kerem bû
Ney ṭalibê lîre û derem bû

8247. Neyhêjtî bû paşeṛoj çi tişte
Her çî bû dihat dibexşî qişte

1.
8248. Wê hatî ji Tirmzî ji exbar
Carek bû Nebî dihatî yek bar

8249. Dirhem bûye piṛṛ ji du ẋirare[3]
Ew bûn bi jimarê nûṭ hizar e

8250. Peyẋemberî gû: "Biben bû mizget"
Wî bexşî ḥeta nehêjtî yek ket

8251. Gava ku ji danê bû temame
Wê hat û dixwazî yek zelame

8252. Peyẋemberî gû: "Çi pare ney man
Zadî tu bikir li ser me ḥeq dan"

8253. Derḥal ʿUmerî digûtî ey yar
Tu bû çî li xû dikey giranbar

8254. Têkçûne bi vê qisê wî nav çav
Enṣarîyekî digûtî dergav

8255. Tu taze bibexşe ey peyember
Neytirse ku kêm ke şahê ekber

[1] Qirik, gewrî
[2] Dereceya herî bilind ya amadebûnê bo karekî
[3] Telîs, tûrik

8256. Dilxûş bû Nebî bi royê bedre
Gû: “Barî wesa li ser me emr e”

2.
8257. Yek merdê feqîr û derdemend e
Wî pez ji Nebî dixwastî çend e

8258. Gûtî: Bidenê resûlê lewlak
Kewtek[1] tijî geliyekî merrê[2] çak

8259. Ew çuve bû gundê xû bi îman
Gû: Êdî hemû bibin musilman

8260. Ew renge Muḥemmedî dibexşî
Natirsî ji feqr û ḥalnexûşî

3.
8261. Hem bû me neqil diket Buxarî
Ey reḥmetê ḥeq ji wî bibarî

8262. Hat carekê bû resûlê kewneyn
Malek çi mezin xeracê Beḥreyn

8263. Barek bû li ḥêştirê kirin bar
Hin zûr e ne karê ʿedd û ejmar

8264. Gû: “Xalî biken li mizgeta min”
Xûş xercîye hat bû ummeta min

8265. Ronişte berê û da di gave
Ḥetta wî nehêjtî yek dirave

8266. ʿEbbas wî demî dihat bi şayê
Ku hatîme ez ji bû ʿeṭayê[3]

8267. Ferman kirê serwerê zemîne
“Çendî tu dişêy bû xû helîne”

4.
8268. Meşhûr bû bi malşirînî Ṣefwan
Her dane bû van kesane derman

8269. Roja li Ḥuneynê şeṛ beṭal bû
Peyẋemberî zûr di destî mal bû

8270. Wî danê merr û şutur bi ṣed ṣed
Ḥetta ku tijî nuwalê bê ḥed

8271. Ḥîna we didî bi çavî Ṣefwan
Îslam bû jinû bû ehlê îman

5.
8272. Dîsan li şeṛê Ḥuneynê yek jin
Hat gûte Nebî: Nenasî ma min

8273. Wê gû bi şiʿir bû yarê xûş xûy
Min dîtî dema tu hêj kuçuk bûy

8274. Lew rojê ji tu me dîne nîşan
Mazin dibî tu bi ʿizzet û şan

8275. Evroke tu bûy xudanê ʿizzet
Min hîvî ji tu ʿeṭa û minnet

8276. Deryayê kerem resûlê mazin
Gû: “Mal bidenev jina hewazin”

8277. Zêdey merr û malê wan sitandî
Mazinkeremek bi wê gehandî

6.
8278. Yek jin ji ewêt xudan meḥebbet
Derḥeqqê resûlê pake ummet

8279. Wî kirbû bi destê xuʿebaye
Meḥṣuṣ bû peyemberê Xudaye
8280. Îna kire ber bi keyf û şayî
Muḥtac bû didem ji bû ʿebayî

8281. Çav lê bû kesek ji wan ṣeḥaban
Gû: Min bi fîda bi day û baban

8282. Çen taze ye ev ʿebayê rav rav
Dê dey bi me? Gû: Belê bi ser çav

8283. Ew kan û xizîneya sexayê
Wê gavê li ber xû kir didayê

8284. Wek rabû li meclîsê peyember
Lewma wî kirin heval û hemser

8285. Gûtin: Te çewa ʿeba ṭeleb kir
Karê te kirî te bê edeb kir

8286. Nazanî peyemberê mubarek
Red nake çu sailan çu carek

8287. Wî gûtî: Belê feqeṭ me nûrî
Ez bû xû diberbikem digûrî

---

[1] Birek,qimek
[2] pez
[3] Dan, bexşîn

8288. Ev cilke bi wî ku bûye pîrûz
Belkî ʿefu bim ji karê alûz
***
8289. Ev dane ewî dida bi zûrî
Bes wî bû riḍayê ẕatê jurî

8290. Car care dida bi wan feqîran
Wan kuṛ û şil û ḍeʿîf û pîran

8291. Carê wî dida bi wanê maldar
Ḥetta ku dikir bi dînî îqrar

8292. Gavê wî ṣerif dikir seruber
Bû şewketê dîn li ceng û ʿesker

8293. Ta mal me nebît û ceyş û quwwet
Ev dîne çewa dijît bi ʿîzzet

**Quwwetuhu we Şecaʿetuhu (Şiyan û Çelegîya Wî)**

8294. Meḥbûbê Xudê resûlê serwer
Mêrçak û bi quwwet û dilawer

8295. Xaliq bi wî dan ji kanê reḥmet
Mîqdarê bi çil kesan ji ṭaqet

8296. Şubhî wî bi ṭaqetê nekes dît
Ḥetta bû ṭeref jinan edeb bît

8297. Her wek ji Enes diken rîwayet
Çen taze resûlê piṛṛ ʿînayet

8298. Da geryê di gavekê nîhane
Ser yazde ji wa û dehêt jinane

8299. Wer seyrê ke ṭaqeta giyanî
Pîçek bi nimûne wek me zanî

1.
8300. Mêrek li Mekê bi nav Rukane
Meşhûr bibû rostemê zeman e

8301. Zur kes bû dihat ji dûr bi dûre
Ew yêt ku bi nav û piṛṛ ji zûre

8302. Ew hinde bi quwwet û bikar e
Pişta wî negeşte xak çu care

8303. Rojek digehişte wî peyember
Nêv gelyekî gûtî ey dilawer

8304. “Bawer te çira bi min neanî
Ta key dê ji dînî dûr bimînî”

8305. Gû: Kanê nîşanê tey nubûwet
Gû: “Bess e bişême tu bi quwwet”

8306. Wî gû: Tu eger bi min şiyayî
Îslam dê bibim li vî çiyayî

8307. Ew her du xû lêk diden li wêrê
Furṣet bû bi dest resûlê xêrê

8308. Wî ragivişî çu şêremerdan
Sê carê dixiste kax û meydan

8309. Ev gûtî Rukane: zûr ʿecîb e
Karek me nedîtî zûr ẋerîb e

8310. Paşî dibitin ji ehlê îman
Yek pakeṣeḥabe xûş musilman

2.
8311. Bûleswedê Cumḥî êk bû meşhûr
Nav qewmê ʿereb bi quwwet û zûr

8312. Ser çermekê gay we bû diwesta
Deh kes bû xû cer dikir bi desta

8313. Ev çerme li bin pîyan helizya
Ew rosteme qeṭ li cê nelivya

8314. Peyẋemberî car li wî qebû xwast[1]
Wî gû: Heye kes bişête min ṛast

8315. Ger ez te li ʿerdî dam bi peyman
Vê gavê bi tu dihêt me îman

8316. Wan her du çu rosteman xû lêk da
Peyẋemberî şuhreta wî têk da

8317. Wî girt û li ʿerdî da çu merdan
Îman wî neanî ser bi derdan
***
8318. Meḥbûbê Xudê resûlê mey pak
Ew rostem û zûrê dest û mêrçak

8319. Çen şeṛ wî kirin bi canfîdayî
Ser dîn û şeṛîʿetê Xudayî

8320. Ew çendî bi quwwet û ceger bû

[1] Daxwaza xwe lêkdanê

Du hinde bi şewket û huner bû

8321. Wek rojê diyar li nav suwaran
Wî pişt di şeṛî neda çu caran

8322. Bes nîne dibêt ʿElîyê ḥeyder
Ew şêrê Xudê bi cerg û cewher

8323. Çen carê ku şeṛ dibûye germ e
Duşmin bi hicûm dihat bû ser me

8324. Em da çîne pişt resûlê muxtar
Sîngê wî me dê bidaye kuffar

8325. Ew da çeqîtin[1] li sîngê hemyan
Duşmin wî li hijmetan[2] dihijyan

3.

8326. Yek şev li Medîne bûye hawar
Zu rabû pîyan resûlê nazdar

8327. Ew bûye li hespê rus suware
Şîrê xû bi destî çu bi ẋare

8328. Çerxek wî dida li dûr Medîne
Geryave gûtî: Çi tirsê nîne

***

8329. Roja li Ḥuneynê ceng û kuştar
Peyẋemberî nê diyar bû kiryar

8330. Layê şeqe şeq diçû ji şîran
Layê çepe çip dihat ji tîran

8331. Vî layî hicûm dikir suwaran
Tîr dan vî rexî çu ṭavê baran

8332. Kax ṣur e ji xwun û aseman tûz
Serdar me suwarê hêstira bûz

8333. Axir qederê we kir ṣeḥabe
Eẋleb direvîn bi naṣewabe

8334. Peyẋemberê me ji rengê şêran
Ew mave digel hinek ji mêran

8335. Wî şîr diweşand û her qebû xwast
Wî gûtî peyember im belê ṛast

8336. Her çî me nenasî nav û nîşan
Babê min e Şeybeyê mezin şan

**Zuhduhu we ʿÎşetuhu (Zuhd û Jiyana Wî)**

8337. Ey serwerê çak û ʿabidan tûy
Wey ṛehberê pak û zahidan tûy

8338. Barî tu kirî çirayê ʿalem
Peyẋember û rehnumayê[3] ʿalem

8339. Anîn te bi ser rîya durustî
Haşa ji te ev cîhanperistî

8340. Ney meylê riyaset[4] û meqaman
Ney ṭalibê lez̠z̠et û ṭeʿaman

8341. Ney cilkê di taze û bi qîmet
Ney mal û merr û ne zêr û zînet

8342. ʿAlem ku Xudê ji bû te bû day
Têr nanê cehî nebûy ḥeta may

8343. Xû nanî tenik te qeṭ nexwarî
Weqtê te nebûn mûxul[5] bû arî

***

8344. Hem zahid e hem sexa[6] wî kar e
Ney zad bû ṣube dihêşt ne pare

8345. Malêt wî dibû ḥeta du heyvan
Agir ne dikir bû nan û şîvan

8346. Pirsîne ji Aîşay şirînkar
Pa hûn çi dixwar û yarê muxtar

8347. Rawî gû: Şirîn cewab didave
Jîna me tinê bi qesb û av e

8348. Emma me hebûn hinek ji cîran
Enṣarî wekî me ḥalfeqîran

8349. Car care ji bû me şîr dianî
Ser xaṭirê serwerê zemanî

8350. Gava divexwar bi xêr û şayî
Da det bi me çî li paş vemayî

8351. Car bûye li birsê zik dibestî
Ba yek du berêt ṭezî bi qestî

[1] Çikilîn, rawestan
[2] Tirsa pirr, sehm
[3] rêber
[4] serokatî
[5] Bêjingên ku kunên wan hûr
[6] Destxweş, xizmetxweş

8352. Wî her çî heba ji dil dibexşî
Da jît bi feqîrîḥal nexûşî
***
8353. Hêşta xû li Mekkeyê bû carek
Bû hatibû emrekê mubarek

8354. Barî bû hinar: Te ger divêtin
Beṭḥa dê ji bû te zêr bibîtin

8355. Gû: "Min nevê mal û cah û kuṛsî
Belkî demê têr û dem dî birsî

8356. Ẕikrê te dikem bi têrî qûtî
Şukra te dikem bi birs û rotî"
***
8357. Nê malê dinê bela ye eẋleb
Ney xuzme kesê bi têrî meṭleb

8358. Însanî beter digêrî dilxuş
Meẋrûr û difinbilind û serxuş

8359. Bû bejn û zik û bû nav û nîşan
Bû medḥ û s̱enayê zûr perêşan

8360. Pirr gend[1] e bi karê dunyedarî
Ẋafil ji rîya riḍayê Barî

8361. Şuhretperisî û zikviyanî
Ney karê miruvê nûr di canî

8362. Dunya çi kesê bivêt şirîne
Dînê wî ḍerer dihêt yeqîne

8363. Lew bû me dibêt ḥebîbê muxtar
Ev malemezin bela ye zînhar

8364. "Pîçek te besî xû bît ji malî
Çêtir li gelek bi ṛenc û talî

8365. Her kes li dinê bi mal û zengîn
Dê bît li dema ḥisabê ẋemgîn

8366. Dê bêjî: Xwuzî he bam feqîrḥal"
Serdarê dinê ne ew qeder mal
***
8367. Ew pakepeyemberê munîr e
Da razê ṭexer[2] li ser ḥeşîre

8368. Carek ku diçît xelîfê s̱anî
Bû layê peyemberî di xanî

8369. Wî dîtî resûl û serwerê dîn
Werkeftî li ser ḥeşîrê şîrîn

8370. Wî kirbû selam li ser peyember
Wergirtî selam bi zarê şekker

8371. Rabuve serûkê xir welatî
Ey gûtî: Gelek bi xêr tu hatî

8372. Gava ʿUmerî li wî neẓer kir
Wî dîtî ḥeşîre rê tê es̱er kir

8373. Yek fiṭre tinê ji ceh di xanî
Derḥal wî ḥuzin gehişte canî

8374. Dilşujî tijî dil û hinavan
Rondik wî xişîn li her du çavan

8375. Peyẋemberî gûtî: Ey biraye
Bû çî digirî bi bê belaye

8376. Gû ḥalê te ev ku ez dibînim
Ez ku ji te xwunceger nemînim

8377. Ḥalê te çi ḥal e ey peyember
Kîsra di çi ḥal e yanê Qeyṣer

8378. Wî gû: "Te nevêt ji bû me cennet
Bû wan tinê ev cîhan bi zeḥmet"

8379. Ev kavledinê bû kes ne mal e
Xûşî di biḥeşt e bê zewal e
***
8380. Rojek li Medîneya munewwer
Derkeftî li malê yarê serwer

8381. Çu geşte du piṛṛ huner hevalan
Bûbekir û ʿUmer li derve malan

8382. Wî pirsî ji wan: We ḥal çewa ne
Birsîne gûtin: Me piṛṛ ji can e

8383. Wî gû: "Bi xudanê ʿerş û kuṛsî
Wek hingû e jî li mêje birsî

8384. Rabin dê biçîn bi dilevînî
Bû lalî fulan kesê Medînî"

8385. Gava digehîne derkê xanî
Kabanî gûtî ji ruḥ û canî

[1] Qirêj, pîs

[2] teqez

8386. Bê zehme: Kerem biken bû jurê
Xanî ji me piṛṛ biken ji nûrê

8387. Pirsîne ji wê: Te kanê malxu
Gû: Nuke dihêtve em fîday tu

8388. Enṣarî dema dihat û zanî
Peyẋember û du wezîr di xanî

8389. Gû: evru kî ye wekî me piṛṛ bar
Mêvanê me ye resûlê muxtar

8390. Tu hatî belê li ser du çavan
Ya Reb ji te dûr nebîn çi gavan

8391. Wî anî bi lez qesb bû paşê
Gûtî: Jê bixwun hinek jî paşê

8392. Ew rabû bi lez destê sîkar
Çav lê bû gûtî resûlê nazdar

8393. Ger bû me dikey bû têştê tedbîr
"Nek ser bibirî peza xudan şîr"

8394. Zur pê neçû çendî wan tewanî
Yek sînî çelavegûşt bû anî

8395. Peyẋemberî xwar û du hevale
Gel ḥemd û s̱enayê Ẕulcelal e

8396. Axir gûte wan du yar û yawer
"Ev zade xwurayî nîn di meḥşer

8397. Hatîn me hemû hinav di xalî
Têr zad me xwar ne ṛenc û talî

8398. Ev nîʿmete nê li ser me zûr in
Wan pirs û ḥisab di kuṛ û dûr in"

8399. Barî dê sual biket di meḥşer
Her çî me kirî û xwarî yekser

8400. Ya Reb tu bi qedrê yarê xû key
Wê rojê me pakij û ʿefû key

8401. Ṭahir te feqîr û jar e ya reb
Reḥma te wî pişk û bare ya reb
***

8402. Ey kan û xizîneya edeb tûy
Pakijneseb û mezinḥeseb tûy

8403. Zad wî bi du sê tibil dixutin
Destê xû li pêş û paş dişutin

8404. Pakij dikirin ji paşî çen qişt
Dalîsî bi dev xû tibil û engûşt[1]

8405. Ey ew li kevin bi zahidî fêr
Ger zad wî dixwar çu car nebû têr

8406. Lewṛa nepesind û baş e têrî
Bû ruḥ û giyanê pakemêrî

8407. Dabêjî: "Bes e bû merdê hişyar
Çen par wî bixwut li rojê yekcar

8408. Werne bike sê pişik hinavan
Bû xwarin û bû pişî[2] û avan"

8409. Ev qismet e ger bikey tu dîqqet
Sengîn e bi fennê ṭibb û ḥîkmet

8410. Ev qismet e lê celayê can e
Derman e bû xûşîya giyane
***

8411. Car bûye li ehlê mal dipirsî
Zadek heye ez li mêje birsî

8412. Ger wan digû ne gû: "Qeydî nîne
Evruke bi rojî bûm şirîne"

8413. Wer wan digûba Nebî digûtî
"Bîn in ji me ra çi hey ji qûtî"

8414. Wî zadê gerim di hate pêş car
Ṣebrê xû dikêşî ta dibît ṣar

8415. Pêş destê xû zad dixwar bi şadî
Ewwel neşikandî ser ji zadî

8416. Çunkî bereket dihête xwarê
Bû ser serê sifre û girarê

8417. Zadek wî eger bû pêş dihate
Dapirsî: Dîyarî ye, zekat e?

8418. Ger bûye dîyarî jê dixwarî
Gel her çî li wê bi tazekarî

8419. Rengîn e dîyarî piṛṛ evîn e
Car xwarîye car wî day şirîne

[1] tilî

[2] Anku: nefes, bêhn (jêrenota Şuşî bi xwe ye

8420. Wer ew bû zekat digût hevalan
Dê engûbixwun ve renge malan

8421. “Ev malê zekat qirêjê mal e
Ney bû min û alê min ḥelal e”

8422. Îslam kî hebî ji neslê Haşim
Bapîrê mezin bû Babê Qasim

8423. Gel Muṭṭelibî kuṛêt Menafî
Alêt wî ve ne di pak û ṣafî

8424. Roniştî dixwarî û vexwar ew
Puf nakete zad û av çu car ew

8425. Gava divexwar çi may bi qestî
Dadet bû kesê ji ṛastedestî

8426. Her çen li rexê çepê hebana
Mazintir û piṛṛ bi qedr û zana

8427. Ẋalib divexwar di kudeka dar
Gel navê Xudê şirîn bi sê car

8428. Ev kude dema ji wî şikestî
Şîrîn Enesî bi zîv vebestî

8429. Neccaşî digel mezin dîyarî
Berdaẋekê şûşe bû hinarî

**Zîkru Ma Sebete Ennehu Eleyhîs Selamî Ekelehu (Ew Tiştê Binecihbûy ku Pêxemberî Xwarî)**

8430. Eṣḥabê sunen diken rîwayet
Çî xwarî peyemberê hîdayet

8431. Wî xwarîye gûşt û qesb û nane
Ḥelwa ku ji qesb û şîr beyane

8432. Yê xwarî xebîṣeya şirîne
Ew: Are û ron û hingivîn e

8433. Nanê genimî û cehî û keşke
Gûştê şutur û merr û mirîşke

8434. Gûştê kerê kuvî û penîre
Nîvişk û tirî û av û şîre

8435. Silqêt dikelî digel ceh û av
Pîvaz wî dixwar kelîne wek xav

8436. Gundûre çi ḥerbize û xiyarî
Wek kundik û zeyt û sêk[1] wî xwarî

8437. Gundûr û xiyar gelêk dixwar wî
Wek ḥerbizeyî digel xiyar wî

8438. Meʿlûm e bi fennê ṭib diyar e
Gundûre gerim xiyarê ṣare

8439. Wî gûşt digirt bi destî hestî
Daxwut bi devî ne wek bi destî

8440. Wî xwarîye cerg û gûşt bijarî
Meʿlûm niye wî şeker ku xwarî

8441. Wî wîşiyê tirî digirt bi destî
Wî taze bi dev dixwar bi qestî

8442. Yê xwarî çilave gûşt bi nanî
Hem qesb û keşk bi nan ji canî

8443. Gulçêçik[2] û kulî ku pak diyar in
Wî şibhî bizinmijê nexwarin

8444. Ney xwarîye lê resûlê piṛṛ naz
Ney sîr û kuṛad[3] xave pîvaz

**Muştehîyatuhu Eleyhîs Selam Mîn Leẕaîẕîd Dunya (Ew Tiştên ku Pêxemberî Hejêkirî ji Xûşîyên Dunyayê)**

8445. Xuşavê ji hingivîn wî piṛṛ vîn
Ava ṭezî û şevî û şîrîn

8446. Wî şîr divîya û gûştê hestî
Xaṣma li merrî li pîl û destî

8447. Fêqî ku li nik wî xûşevî zûr
Qesbêt di ter in bixwut bi gundûr

8448. Ku şîr kesekî ji bû dianî
Da bêt bereket me hate xanî

8449. Nîvişk û qesib wî piṛṛ viyane
Kundik diviya gelek ji cane

8450. Pêş destê xû zad dixwar şirînkar
Bû kundikî dest digêrî her car

[1] sirke
[2] gurcîsk
[3] pirasa

8451. Wî sêk diviya û gûşt ji pê xwar
ʿEcwe diviya li xurmeyê zûr

8452. Bû çêdikirin nebîẕ xuşav e
Qesb in bi şevê diken di ave

8453. Ḥetta du rojan dixwar wî car car
Çî mave eger dirêt şirînkar[1]

**ʿÎbadetuhu we Mucahedetuhu (Peristin û Xwemandîkirina Wî)**

8454. Ey serwerê cumle ʿabidan ew
Serdarê feqîr û zahidan ew

8455. Çen bû xû dikir şirîn ʿîbadet
Daîm ji Xudê bi tirs û xeşyet

8456. Taʿet wî dikir bi tazekarî
Zur car digirî ji tirsê Barî

8457. Weqtê digirî bi suzê cane
Dîzik[2] dikelî wî sîng wesan e

8458. Mahê remeḍan dikir ʿîbadet
Zêdey ji heman bi cuhd û ṭaqet

8459. Neyxaṣme ji wê dehêt dumayî
Wî zêde dikir bi canfîdayî

8460. Naba ku bihêlî şevnivêje
Heşt rekʿe çi qed dirêj nebêje

8461. Ew hinde diwestî nêv nemaze
Ḥetta werimîn pîyêt wî taze

8462. Jê pirsî bû ʿAîşey ji canî
Bû hinde bi taʿetê giranî

8463. Bes nîne kerem peyemberî tu
Neyxaṣme li her xeṭa berî tu

8464. Nîʿmet bi te kir Xudê teʿala
Qedrê te kirî bilind û bala

8465. Wî gûtî “Çira xû ez nekem çak
Yek wan ji ʿîbadê şakir û pak”

8466. Ew hinde ji sunnetêt diyar e
Ew zikir û duʿa di bê jimar e

8467. Car bûye serêk bi rojî bûye
Da bên: Dê mehê xilaṣke hu ye

8468. Carê wî dixwar ḥeta dibêjî
Êdî vê mehê çi nagrî rojî

8469. Hêşta li Mekê resûlê ekrem
Rojî dibû rojê deh muḥerrem

8470. Hem gû bigirin ku hat Medîne
Ḥetta remeḍan bû fer di dîne

8471. Êdî wî gû: “Sunnetek bi xêr e
Wek rojê nehê bibin pê fêre”

8472. Heyva jê digirt pitir heman e
Şeʿban bû meha qedir giran e

8473. Yekşembî û şembîyan gelek car
Ew rojî dibû li reẋmê[3] kuffar

8474. Lê duşem û pênşeman bi zûrî
Ew rojî dibû bû ẕatê jorî

8475. Gûtin wî: Eya resûlê ekrem
Bû her digirî duşemb û pênşem?

8476. Wî gûtî: “Di wan ʿemel heçî hey
Dê ben bû lîqayê Qadirê ḥey

8477. Pê xuşe me lew bibim bi rojî”
Da reḥmetê dil bi min biṣujî

8478. Sê rojî digirt li nîvê her mah
Neh rojî li mahê ḥec bi dilxwah

8479. Şeʿban wê şeva dibûye nîve
Ew şev nenivist Nebî ji xû ve

8480. Wê hatî ji zarê Aîşa ye
Ey min bi fîda bi bab û daye

8481. Rabuve nebî dikir nivêje
Wî secde gelek dikir dirêje

---

[1] 8. 5. 1381 (H) (18.10.1961 M.) Jêrenota Şuşî bi xwe ye.

[2] Beroşa ku ji axê hatiye çêkirin, tê da xwarin tê çêkirin.

[3] Dij, zid

8482. Ḥetta me ji bû dihat guman ew
Peyẋemberî tê nemaye can ew

8483. Ḥetta me tibil ji wî hijandî
Derḥal wî ji secde ser hilandî

8484. Gava wî nivêj dikir temame
Wî pirsî ji min şirîn kelame

8485. “Ey ṣûrkele[1] ma te kirbû texmîn
Ẋedre ji te kir peyemberê dîn”

8486. Wê gûtî: Nexêr bi ew Xudayî
Emma me gûtî bi can nemayî

8487. Gû: “Ev şeve ma tu qeṭ nizanî”
Wê gûtî: Meger ḥebîbê canî

8488. Gû: “Nîvek e ev ji mahê şeʿban
Barî dê bihête jêre ʿesman”

8489. Reḥm û kerema wî dête wêrê
Dê bexşî gelek ʿeṭa û xêrê

8490. “Ev şev çi kesê biket recaye
Barî dê ʿefû biket xeṭaye

8491. Her kes keremê ji wî bixwazî
Ellah didetê bi serfiraḍî

8492. Bes ehlê ḥesed wesan dihêlî”
Ḥetta ḥesedê di can bihêlî
***

8493. Xûzmey li kesê di van şevane
Neyxaṣme li şevnivêj xudan e

8494. Rabît bi s̱ena û zikrê̱ Barî
Ba girî w fîẋan û dad û zarî

8495. Qurʾan seḥerê gelek bi xêr e
Mizgîn li kesê xû kirye fêre

8496. Her çendî Xudê mezin kerîm e
Dana wî di nêv şevan ʿeẓîme

8497. ʿEbdê xwu yê piṛṛ gunah û roreş
Wê gavê diket bi ʿefwê bê xeş

8498. Lew ehlê dil û xudan kemalan
Xew nayê seḥer bi her çî ḥalan

**Mîzaḥuhu we Ḍeḥîkuhu (Tirane û Keniya Wî)**

8499. Ew zûr digirnicî kêm kenî bû
Gava dikenî çu meh enî bû

8500. Larî dikirin wî car bi caran
Bû keyf û dilê heval û yaran

8501. Her çen dikir û digûtî larî
Emma nedigû çu car wî xwarî

8502. Wek rojekê pîrejin gehiştê
Gû bû me bikey duʿa biḥeştê

8503. Gû: Naçne biḥeştê pîre pîrê
Pîr dev bi girîve çu feqîrê

8504. Wî gûtî: Bibêjnê ew nezan e
Wî rojê hemû dibin cewan e
***

8505. Înabû kesek bi dil evîne
Çendek age ro ne hingivîn e

8506. Wî anî ji bû ji reng dîyarî
Dilxûş bû bi wî resûlê Barî

8507. Paşî qederek dihêt xudan deyn
Wî anî bû nik ḥebîbê piṛṛ zeyn

8508. Gû: Bîne ḥeqê feqîr û jarî
We diyare belaş e run te xwarî

8509. Peyẋemberî gût û ew girnicî
“Ḥeqqê wî biden temam bi qencî”

8510. “Min pê dixûş in vereng dîyarî “
Çen taze ne lê ve newʿe larî
***

8511. Carek dî kesek ji wan hevalan
Bê ḥal û feqîr û piṛṛ ʿeyalan

8512. Gû: Ey hemû dem fîdayê tu me
Şulek me kirî helake bûme

8513. Peyẋemberî gû: “Bibêj çi ḥal e
Gû: Ez çi bibêm ji karê tale

8514. Karek me kirî çi naşirîn e

---

[1] Tercumeya El Humaira (Jêrenota Şuşî bi xwe ye).
Ṣurkele: Gula sor, sıfata Hz. Aişayê

Çarek bike ey resûlê dîne

8515. Roja remeḍan evî zelamî
Gel ehlê xû cemʿe bûy temamî

8516. Peyẋemberî gû bi xûş ʿîbaret:
Lazim tu temam bidey kefaret

8517. Aza bike ʿebdekê musilman
Yan rojî bigir serêk du mahan

8518. Yan zadî bide bi şêstê miskîn
Her êkî bi misteqûtû rengîn

8519. Dermanê gunahê tu ve sê rêk
Helbigre ji bû xû êk li du êk

8520. Wî gû: Çi kesê wekî me bê ḥal
Kanê wî buhayê ʿebdekî mal

8521. Rojî du mehan ne min dikare
Ez ev şire û ḍeʿîf û jare

8522. Kulê te nê kulewar û rote
Ku qûtî bidem nê min ne qût e

8523. Nê ez ji xû piṛṛ feqîrêḥal im
Zêdey ku xudanê çen ʿeyal im

8524. Peyẋemberî gû bi du hevalan
Bînin me çi hey li cumle malan

8525. Piṛṛ bû ji qesib zelame zenbîl
Înane bû nik xudanê tenzîl

8526. Helbigre gûtî tu ey birader
"Dabeş ke li ser feqîr seraser"

8527. Wî gûtî: Qesem bi wî Xudayî
Lew layê Medîne ta vî layî

8528. Kes nîne ji min feqîr û fertir
Êdî tu bi xû dizanî çêtir

8529. Gava we digûtî yarê berbar
Berda kenîyê resûlê muxtar

8530. Feman kire wî resûlê lewlak
"Hilbigre bibe ji bû we ser pak"

8531. Pîrûz bû ji bû te ev ziyaret
Hem qût ji te ra bû hem kefaret
***

8532. Mêj nîne bira te zanî taze
Peyẋemberê piṛṛ ji ʿîzz û naze

8533. Ṣuḥbet wî dikir digel jinan ew
Car care ji bû serwerê can ew

8534. Car gûte wî ʿAîşeya bijare
Wer da ez û tu bikeyne ẋare

8535. Pêşkeftî du care Aîşa ye
Yek carê peyemberê Xudaye

8536. Her we te ji qîṣṣeya wê zanî
Day Sewdeyê zad bû wan ku anî

8537. Ku ʿAîşeyê digûte Sewde
Dê tu jî bi xû digel me çende

8538. Sê car wî digût û wê nexwarî
Ew rabû ji wê bi torekarî

8539. Destê xû didanî şîv di gave
Pê malî ji Sewde dêm û çave

8540. Ta pê kenî serwerê zemanî
Wî ʿAîşe bû digirt bi ranî

8541. Gû: "Sewde veke tu tûl wesa ye
Wê jî we dikir bi Aîşa ye

8542. Hem pê dikenî şirîn resûle
Ev renge divê gû tul bi tul e

**Teṭeyyubuhu we Teḥsînu Heyʾetîhî Eleyhîs Selam**
**(Bêhnxweşî û Cewankariya Wî Silav lê Bin)**

8543. Bêhna wî keçî nekarê ʿenber
Dem dem xû dikir cewan muʿeṭṭer[1]

8544. Nê bênê di xûş diden serî huṣ
Lew red ne dikir çi yê bihên xuṣ

8545. Hêşta ku ji durve wan dizanî
Bêhna wî ḥebîbê ruḥ û canî

8546. Ew menbeʿê ʿîṭr û hem beha yê
Zur xûş diviya gula xenayê

8547. Wî cilk û giyan di pak û xav în

[1]bêhnxweş

Qeṭ ney bû qirêj ḥeta bi havîn

8548. Çavêt wî wekî ji xû di ṛeş bûn
Kil tê diwerand du hinde geş bûn

8549. Pirça bi serê wî ṛeş bû mişkîn
Car care wî dun dida çi rengîn

8550. Çen carê misik dikir di destî
Pê malî birû w ridîn duristî

8551. Car car diquṣand bi çen cewanî
Carek li dirêjî car li panî

8552. Qebḍek bû dirêj cewan û sengîn
Ew çendî ṛeş e du hinde rengîn

8553. Bîst mû jê sipî bibûn eger wî
Car care didayê rengê zer wî

8554. Simbêl diquṣandî car bi care
Ta lêv ji wî ṣur dibûn diyare

8555. Şaşik xir û xir dibestî piṛṛ nûr
Lifka wê di nêv milan dikir şûr

8556. Royê wî çu meh bejin çu ʿerʿer
Neybûn wî li heyv û rojê sêber

8557. Ew ṛehberê tazehî û çakî
Daîm wî emir dikir bi pakî

8558. Ava ye wekî wî gûtî îslam
Ser pakijîyê di ḥukm û eḥkam

8559. Her kes ne bijun û pak û qişt e
Ney ehlê seʿadet û biheşte

8560. Wek cilk û giyan û tişt û xanî
Pakij ke demaẋ û qelb û canî

8561. Ya Reb tu wesan bikey me pake
Çirkîn me nebey bû jêrî xake

**Beqîyyetun Mîn Xuluqîhî we Adabîhî ʿEleyhî's-Selam (Çendek ji Rewşit û Cankarên Wî Silav lê Bin)**

8562. Gava ku dihat ji bû wî talan
Ew da vepeşî[1] ji wan hevalan

8563. Pişkek dê bida ewanê bê jin
Her çî bi jine didayê du hin

8564. Ew kanê ʿedalet û kemalê
Da det bi heman ji ehlê malê
***

8565. Ḥîna dinivist digût bi dilxwah
"Min jîn û mirin bi tu ye Ellah"

8566. Du ṣûretê "qul eʿûz" dixwundî
Gel ṣûretê "kafîrûn" bi rendî

8567. Ser ṛaste teniştê zûr nivistî
Da danîte bin royê xû destî

8568. Meʿlûm e di xew resûlê serwer
Wî pif dikirî bi zarê şekker

8569. Wek bû xewê ku dibûye hişyar
Wî taze sîwak dikir şirînkar

8570. Da bêjî ṣena û ḥemdê Barî
Ey Qadirê piṛṛ ʿecîbekarî

8571. Paşî mirinê te dave min jîn
Ḥeşra me li ba te dê bî şîrîn
***

8572. Şeṛmîn e gelek deravê şeṛmê
Çunkî sipehî ye navê şeṛmê

8573. Ḥetta ku şeṛim wî kirye nîşan
Bû ehlê Xudê û nûrê îman
***

8574. Her carê dixwar digel cemaʿet
Dumayê dixwar bi naz û ḥurmet

8575. Nik her kesekî wî zad dixwarî
Daxwazî ji bû duʿa ji Barî

8576. Carek kuṛê Busrî kirbû mêvan
Ew ʿEbdê Xudê bû her çî hey wan

8577. Çî zadê ku hey wî nuşî can kir
Wî destê duʿa di aseman kir

8578. "Ya Reb tu bû van bikey mubarek"
Her rizqê te daye wan bi carek

8579. "Her sûçê hebît tu wan ʿefû key"
Ferxwunde[2] bi sayê reḥmê xû key
***

[1] Belav kirin, dabeş kirin

[2] kêfxweş

8580. Roja ku li Seʿdî bûye mêvan
Ew bûye wesa bû wî duʿaxwan

8581. Gû: “Rojîgiran li nik we îfṭar
Çakan gû: Şukir li nik we zad xwar”

8582. “Hem bû we melek duʿan dixwînin”
Gel xêr û xûşî gelek bimînin

8583. Meclîs wî dewam gelek şirîn bûn
Guhdarê wî piṛṛ dilî yeqîn bûn

8584. Piṛṛ nûrê dibûn bi sunneta wî
Mesrûre dibûn bi ṣuḥbeta wî
***

8585. Meḥbûbê Xudê ḥebîbê dildar
Kes têr nedibû ji wî ji dîdar

8586. Her carê ji meclîsê ku rabû
Wî zarê şirîn tijî s̠ena bû

8587. Da bêjî: “Xudayê min tu pakî
Ḥemda te dikim dewam bi pakî”

8588. “Ẋeyrî tu çu nîn Xudê tu her hey
Min tewbe ye ger tu min ʿefû key”

8589. Her kes li cihê xû vê bibêjî
Barî gunehêt wî dê birêjî
***

8590. Gava fereḥê wî dêm bi nûr e
Ḥîna ẋeḍebê li durve ṣur e

8591. Karê wî ʿefû bû dilsitandin
Nek rexnegerî û dilşikandin

8592. Wî falê cewan hebûne car car
Meşûmî nebû li gût û kiryar
***

8593. Her kes li xewa xû dît ve yare
Dê bînî yeqîn ku huşiyar e

8594. Ew şibhî hemû peyemberan e
Qeṭ narizî wan leş û giyane

8595. Çî malê ewan ji paşve mayî
Ew xêr bû bû ummetê tebayî

8596. Hişyar bû bi dil dema nivistî
Lew ew bû bi desnivêj durustî

8597. Nazdar e gelek xudan weqar e
Mêş qeṭ nediçûne wî çi care

8598. Sêber wî nebû di heyv û ṭavan
Ẋafil ji Xudê nebû çi gavan
***

8599. Gazî çi kesî dikir eger wî
Lazim bû sivik cewab li ser wî

8600. Ḥetta di nivêjê ba musulman
Cabê didet û nivêj ne nuqṣan

8601. Şulek wî eger didît û kir bû
Ew şûl ji durustî têr û piṛṛ bû

8602. Çunkî nedurist e bû peyember
Xû kerr biketin ji karê munker
***

8603. Tayêt wî digû gelek giran bûn
Êşêt wî belê bi qed dûwan bûn

8604. Nê êş û nexûşî zûr bi xêr in
Lew ew bi miruvê baş di fêr in

8605. Lew Barî gelek ji êş û ṛencan
Wî dane peyemberan û qencan

8606. Ew çen di xûş in eger çî tal in
Miftaḥê xezîneya kemal in

8607. Bes nîne me fêr diken munacat
Ber dergehê ruḥmê qaḍî hacat
***

8608. Ger ʿacizîyek digeşte wî car
Da bît ji Xudayê xû duʿkar

8609. Destêt xû wesa bilind kirîne
Bin kefşê di wî sipî didîne
***

8610. Carek ku dinart wî yarekê xu
Bû layekî ew di karekê xu

8611. Da bêjî: “Bibî tu yarê mizgîn
Nek rexneger û civîn û nifrîn”

8612. Sehlî û şirîn kelam û nermî
Nek tundî û deʿyekar û germî

8613. Bû cengê diçû resûlê ekrem
Weqtê ṣubehê li rojê pênşem

8614. Bû her cihekî diçû ẋezayê
Navê wê ne dê bibêt berayê

8615. Pîçek wî bizir dikir ji ʿesker
Lew hu diketin kesê hunerwer
***

8616. Emrê me dikir: “Ku jin bihînin”
Nek wek rebenêt felan bimînin

8617. “Hun mare biken kiçêt xudan dîn
Wanê bi resen diyar biçukîn”

8618. Ta zêde bibît ji ummeta min
Ser paketerîq û sunneta min

8619. Her çendî Xudê ku dan peyember
Ba peyrewê wan heman sera ser

8620. Ez dê bi we meḥşerê bi şan bim
Ûmêde pitir ji wan heman bim

8621. Pê xûş nebû jin bihêt guhaztin
Bê keyf xûşîyê ji paşî xwastin
***

8622. Nê rahê ḥeyatê jinînan e
Asasê jiyanê xir cîhane

8623. Neyxaşme eger bi dîn û pak e
Guhdar û cewan û qenc û çak e

8624. Gel mêrê xû bî di xûş û naxuş
Ser mal û nefis emîn û piṛṛ huş

8625. Kuṛtin wê zuban û dest û çav e
Ney pîşedil û zuban gilave

8626. Xûş behre ye bû mirûvê dîndar
Bû dîn û cîhan muʿîn û xûş yar

8627. Jin ta ku nebin çewa dibin mêr
Mêrê ku di nêv ẋezayê wek şêr

8628. Ger ʿalim û ʿarif û peyember
Wer ʿesker û zabitin çi mêrser

8629. Ev renge ḥeta şivan û cûtyar
Asinger û bêneduz û tuccar

8630. Nê cumle ji wan hebûn û dê bin
Lew şeṛʿî ḥelal kirîne çar jin
***

8631. Ma bes niye jinkê ev weẓîfe
Neyxaşme eger bi dîn neẓîf e

8632. Mazin diketin kuṛ û kiçan ew
Ba xulqê şirîn çi ruḥ û can ew

8633. Kabanî di malê piṛṛ bi xêr e
Bû xêrê lewa hevalê mêre

8634. Mêr dê biçitin bi can ẋeza ye
Jin taze di malê piṛṛ wefa ye

8635. Mêr ṭarî şevê diçîte mizget
Jin bû xû li jurve dê nivêj ket

8636. Ew her du wekî yek in di xêrê
Mizgîn li jina wetuv bi vêrê
***

8637. Ger ew diçû Mekkeya mukerrem
Daînite Medînê avê zemzem

8638. Car care ewî dida bi dilxwaz
Ev ave bû yarê dûstê piṛṛ naz

8639. Nê gûtî ye serwerê enamê
“Vê avê vexwûn bû her meramê”

8640. Lew her çî ḥecî diden vê gavê
Ew xir neçûne bijil vê avê
***

8641. Xwun car li serî li nav milan car
Berda bû ji wî Buṭeybeyê yar

8642. Lewṛa wî ji bû me daye ferman
Derman e ve renge xwun bi berdan

8643. Yan hevde ji mahê yanê nûzde
Yan bîst û yekê wekî wî berde

8644. Sêşembîyê bernedey bi qestî
Yek leḥze di wê ye xwun newestî
***

8645. Ew bûye bi royê xûş û guftar
Gel wan nekesêt xirab û bedkar

8646. Her çendî zelam bed û nezan e
Dê çêbît eger şirîn zubane

8647. Nê royê xûş û zubanşirînî
Dergah e ji bû dinê û dînî

8648. Lew her çî kesê rwî tirş û tal e
Bê qedr û kemal û bê heval e
***

8649. Yek carê kesek dihate ber der
Wî xwastî izn bû nik peyember

8650. Ew dît û digûtî pakesîret
“Çen pîs û bed e biray ʿeşîret”

8651. Ronişt û Nebî digel wî xûş xûy
Gût: ʿAîşeyê dema ku ew çûy

8652. Pêş nuke te gûtî ew çewan e
Tu hinde digel şirîn zuban e

8653. Gû: “Kengî te dî me ez zubantal”
Gûtinreq û deqşikêne bedḥal

8654. “Ew merde xirabtirîn di meḥşer
Pêş destê cenabê şahê ekber

8655. Ew yê ku xeliq li wî diçin paş”
Rotirş û zuban bi pîsîyê faş
***

8656. Yê gûtî Enes şirînzubane
Min hey bû birayekê cewane

8657. Meşhûre bi nav Ebû ʿUmeyre
Niẋrek wî hebû ku êk ji ṭeyr e

8658. Ṣebrê wî bi wî gelek dihat ew
Ẋemgîn bû ku niẋrî kir wefat ew

8659. Pê zanî peyemberê zemanî
Ku dîtî gûtê bi xuşzubanî

8660. “Tu ʿaciz î ey Ebû ʿUmeyre
Ev renge bi tu çi kir neẋeyr e”
***

8661. Meḥmûd hebû yek biçukê qenc e
ʿUmrê wî gehişte salê pence

8662. Carek digehişt resûlê Barî
Wî gel wî kirin ji ḥubbê larî

8663. Zarê xû tijî dikir ji ave
Yek hel perijande rûy û çave
***

8664. Carek dî resûlê pak û ekmel
Ew bûye nîhan di karê meẋsel

8665. Zeyneb ku nevsiyeka biçuk e
Ew hatibû rexê wê hêdîluke

8666. Peyẋemberî piṛṛ divê xû av kir
Wî taze li dêmê wê belav kir

8667. Ev ave bi qudreta Xudayî
Bû avê cewanî ta ku mayî

8668. Ew mabû ḥeta dibûye pîre
Rewneq wî diyar bû dwîr bi dwîre
***

8669. Bû şulekê hatî yek birader
Ew lerzî ku dîtî ḥeq peyember

8670. Peyẋemberî gû: “Çi tirsê nîne
Ez ney melîk im bi qehr û kîne

8671. Ez kî me? kuṛê jinek ji Mekke
Xwarin wê ṭeẋer bû gûştê hişke”

8672. Ḥetta sekinî wî qelb û can ew
Şula xû jinû dikir beyan ew

8673. Peyẋemberî gûtî: Ey gelî yar
Yê hatî weḥî ji şahê Ẋeffar

8674. “Bû yek dî xû kêm biken ji îman
Ta ẋedrê li yêk neken musulman”

8675. “Kes ser kesê qeṭ neken çi fexre”
Bê kîbr û ẋurur û ẋedr û qehre

8676. “Hun cumle bibin ʿîbadê Barî
Yekser çu bira bi tazekarî”
***

8677. Her kes wî didî ku deng bilind e
Ew nik wî ne baş û ney pesind e

8678. Emma çi kesê ku deng nevî bû
Sengîn bû li nik wî xûşevî bû

8679. Her çî wî didî nexûşnav e
Navê wî digûrî her di gave

8680. Her kes ku ji wî spî dibû mu
Dabêjitê: Tu reng bikey ji bû xu

8681. “Bes rengê ṛeşî nedey muwan e
Ger ṣur bi xenê bikey cewan e”[1]

**EZZEHRETU’Ṣ-ṢALÎSETU (KULÎLKA SÊYÊ)**

Fî Zîkrîl Biʾsetî we Emtîʿetîhî we Dewabbîhî we Eslîhetîhî (Beḥṣê Cilk û Tişt û Dewar û Çekên Wî)

**1. Elbîsetuhu ʿEleyhî’s-Selam (Cilkên Wî Silav lê Bin)**

8682. Peyẋemberê piṛṛ ji ʿîzz û naz e
Wî cilk û berig şirîn û taze

[1] 12/05/1381 (22.10.1961 m.) Jêrenota Şuşî bi xwe ye

8683. Çî pêtivî bû giyan heba ye
Ney faxir e û giranbuha ye

8684. Ney kiçke bû ney mezin bû şaşik
Ser pan û sipî kulav wî bê şik

8685. Car bûye kulav li ser didanî
Tenha ku di ehl û mal û xanî

8686. Geh şaşê li ser kulav dibestî
Car şaş bi tinê dibest bi qencî

8687. Gava ku ji xanî hate derve
Şaşik wî dibest cewan bi serve

8688. Ger ger wî li ser dibest şirîne
Lifka wê di nêv milan yeqîne

8689. Carek bû ʿElî dibest ji canî
Lifka wî bi ṛastemil wî danî

8690. Wê hatî ji rengê şaşê mehweş
Eẋleb sipî carê zer bû car ṛeş

8691. Wî bûye kiras sipî û nûrîn
Wek keske rîdaʿ libasê şîrîn

8692. Ta nêv belekêt piyan di şûr in
Yek car li ẋurûr û kîbrê dûr in

8693. Qulêt di kirasî ta bi zendan
Car ta tibilan cewan bû çendan

8694. Burdê wî kesik bû çen bi seng e
Bavşur û yekê dî çen ji reng e

8695. Wî rengê kesik li nik şirîn bû
Bû rengkirinê çi zerḥebîn bû

8696. Carek wî hebû ye cubbekê rûm
Baskêt wî di ṭenge bûne meʿlûm

8697. Ḥullek wî hebû bi rengê ṣur e
Ta nêv belekêt piyan di şûr e

8698. Ger taze îzar e ger kîsa ye
Estur bûne her du piṛṛ buha ye

8699. Her carê dikir wî cilikê nu
Eynî ṣibehan dikir di ber xu

8700. Derpê wî dikiriye pê şirînkar
Wê hat ji Ebû Hureyre guftar

8701. Ḥîna ku Nebî diçûye sûke
Bû xû kirî derpîyek çi kuk e

8702. Ez bum wî demî şirîn digel wî
Ez çum ku dê hilgirim bedel wî

8703. Gû: "Çêtir e bû xudanî tişte
Helbigirî bû xû cewan û qişte

8704. Madem nebî ew ḍeʿîf û natan[1]
Ta harî biket biray musulman "

8705. Min gûtî peyemberê Xudaye
Ma derpîyê tu dikey di pay e

8706. Gû: "A di şevê û roj dewam e
Ḥalê sefer û ḥeḍer meqame

8707. Emrê me kirin bi dapûşîne
Bû hindê me çêtirîn nedîne"

8708. Gûstîl wî ji zîvî qaş wesan bû
Car qaş Ḥebeşî bû zûr cewan bû

8709. Ẋalib wî dikir di ṛastedestî
Qaşa wî bû pankedest bi qestî

8710. Gûstîl wî dikir çi destî çen qişt
Wî taze dikir qilîçê engûşt

8711. Gûstîl wî hebû ji rengê mûr e
Bû muhrê kîtab bû rahê dûr e

8712. Sê rêz bû neqiş kirin bi dilxwah
Navê wî digel resûlê Ellah

8713. Bûbekir ʿUmer ku bûn xelîfe
Êk êke dikirine dest leṭîfe

8714. ʿUṣmanî wesa ku bûy emîre
Ta keftî ji dest Erîsê pîre

8715. Meḥsik[2] wî hebûn di ṛeş di ṭarî
Neccaşî hinartibûn dîyarî

8716. Pêlav wî eger hebû ye neʿlek
Ser difnê di wan hebûn du qulpek

[1] Nekarîn, neşîyan

[2] binpêk

8717. Qulpek bû tila beranê êkcar
Tiblêt dî diyar bûne her car

8718. Ṭahir te Xudê fîdayê wan e
Xûş key tu ji wî giyan û cane

**2. Emtîʿetuhu ʿEleyhî's-Selam (Tişt û Mitayî Wî Silav lê Bin)**

8719. Peyẋemberê çav li cahê jurî
ʿUmrê xû bi zivrî radiburî

8720. Ney ṭalibê ev cîhan û xûşî
Dûşek wî kevil bû piṛṛ ji pûşî

8721. Wê hatî ji Aîşa şirînkar
Ev dûşeke dî jinek ji enṣar

8722. Çu dûşekeka hirî hinarî
Da ser binivît resûlê Barî

8723. Gava ku Nebî me hate xanî
Gû: Ev çi ye? Min bû gût nîhanî

8724. "Bihnêreve gû ji bû xudan ew
Ez sundê dixwum bi la mekan ew

8725. Ger min biviya ji ew Xudaye
Dên gel me ji zêr û zîv çiyaye"

8726. Razaye li ser ḥeṣîr ṭeẋer car
Ta şun li ṭeniştê wî dikir kar

8727. Raêx wî hebû zivir çu ber ew
Êka dî ji parçe kevlemer ew

8728. Mêj nîne bira temam te zanî
Qissa ʿUmerî digel di xanî
***

8729. Carek dî wesan diçûn beraber
Bûbekr û ʿUmer bû nik peyember

8730. Textek wî hebû ji batî zincîr
Raçandîbû piṛṛ kinif bi tedbîr

8731. Bûrdê ku dibên zivirgiya ye
Jê bûn kinif û şeṛîṭ tebaye

8732. Hem piṛṛ bû ji wî di gavê duşek
Royê wî qumaşê ṛeş bû bê şek

8733. Raza bû Nebî li ser wî textî
Nageh wê dihên xudanê bextî

8734. Wan taze ji wî dikir selame
Rabuve peyemberê ename

8735. Wan dîtî ṭeniştê serwerê dîn
Wê duşek û textî jê dikir şwîn

8736. Gûtin: Tu peyemberê zeman î
Ev renge dijî bi ṛencê canî

8737. Kîsra ye wekî dibên çi Qeyser
Armûş e ji duşekêt tijî per

8738. Peyẋemberî gû: "Nebên wesan e
Agir dibitin dumayê wan e

8739. Raêx me eger çî zivr û zişt e
Nê ʿaqîbeta me ew biheşt e"
***

8740. Meʿlûm wî hebû liḥêf bû dapûş
Balîf wî kevil bû hem tijî pûş

8741. Şek nîne peyemberê me yê pak
Zur carê dirêj dibû li ser xak

8742. Kûdek wî hebû dema şikestî
Taze Enesî bi zîv vebestî

8743. Sê kûdekê dî hebûn ji dar e
Mazin bûne ew bû car bi care

8744. Berdaẋekê şuşe wek te zanî
Neccaşî hinart bû ji canî

8745. Wî heybûye mencelek çi mencel
Çar çimbil û çen mezin bû xuşkel

8746. Mêvan çi dema ji wî dicemyan
Piṛṛ zadî diket bû wan û hemyan

8747. Amanê di av û şîv hebûne
Cilkêt ḥereman nizam çi gune

8748. Kildan û şe û sîwak û neynik
Şibhî miqeṣê dewam hebûn nik

8749. Her çen wî nebû ye êş û sustî
Ẋalib wî digirt ʿeṣa di destî

8750. Ṭeştek ji sifir hebû ye dildar
Ẋusla xû di wê dikir hemû car

8751. Amanekê ber yekê dî asin
Heybûn du ʿeṣa biçuk û mazin

8752. Yek xîvet û hîzelûkê run e
Amanê xen û ʿiṭir hebûne

8753. Ev tişte her êk xudanê nave
Wek Sadîre navê kunkê av e

**3. Dewabbuhu we Ẍenemuhu ʿEleyhî's-Selam (Dewar û Pezê Wî Silav lê Bin)**

8754. Hespêt wî bi ewwel û bi axir
Bîst in hemû eṣlî û di faxir

8755. Her carê li yêk dibûy suware
Her êkî bi navekî diyar e

8756. Hêstir jî wekî me zanî penc in
Ew jî di bijare û di qenc in

8757. Sê ker wî hebûn û sê ji ḥêştir
Her êke ji ya dî çak û çêtir

8758. Qeṣwa bû ku lê bibû suware
Bû hîcretê ew Medîne ware

8759. Bîst ḥêştirê şîrî ew xudan e
Heft heft ji merr û bizin wesa ne

8760. Ev ḥêştire bûn ku çûn bi ẍaret
Her wek me gûtî bi xûş ʿîbaret

8761. Yek dîkilî sipî dibên hebûye
Şek nîne wî çêl û ga nebûye

**4. Eslîḥetuhu ʿEleyhî's-Selam (Çekê Wî Silav lê Bin)**

8762. Neh şîr wî hebûn di piṛṛ buha ne
Her êke bi navekî beyan e

8763. Yek bûye bi navê Ẕulfîqar e
Nêv cengê Bedir wî bûye bare

8764. Ew bûye bi dest kuṛêt di Ḥeccac
Ta keftîye dest sîracê Wehhac

8765. Ṭamdayî bû ew bi zîv seraser
Ew piṛṛ bû ji rewneq û ji cewher

8766. Ḥeft in zirî yek Xudan Fuḍûl e
Ew nake çi ḍerbeyan qebûle

8767. Pwîlane wî sê mezin meṭal ew
Xir şîr û ruman diken beṭal ew

8768. Çar rum wî hebûne yek piling e
Çen tîj e di nav şeṛan bi deng e

8769. Şeş bûne kivan hemû di meşhûr
Tîrdan e belê bi navê Kafûr

8770. Qayiş û qewî bû ew kemerbend
Ew rex kirîbû bi zîvî her çend

8771. Sê ḥelqe jî zîv û qubbe yekser
Çen taze li pişt dibest peyember

8772. Wî nêze du ne di namidar in
Wî her du kulavzirî bikar in
8773. Zînê şuturan û car kejave
Bû cengê ḥerem dikir di nave

8774. Wî zînê esp gelek cewan e
Hefsar û liẍav di piṛṛ buha ne

8775. Alayê mezin wî rengê ṛeş bû
Alayê kuçuk sipî û geş bû

**EZ-ZEHRETU'R-RABÎʿETÛ (KULÎLKA ÇARÊ)**

Fî Ẕîkrî Şeyîn Mîn Fedaîlîhî we Xesaîsîhî (Çendek Ji Xaslet û Qencîyên Wî)

**1. Feḍaîluhu ʿEleyhî's-Selam (Fazîletên Wî Silav lê Bin)**

8776. Peyẍember û rehnumayê ʿalem
Ew tacê ser û çirayê ʿalem

8777. Ṣaḥibşeṛefê şirîn şemaîl
ʿAlîṣîfetê ʿecîb feḍaîl

8778. Meḥbûbê Xudê xudanê naz e
Ew xaṣ bû bi çendî karê taze

8779. Feḍlek çi mezin bi wî kerem kir
Fexrê ʿereb û hemû ʿecem kir

8780. Ewwel ew e Barî day peyember
Hêj Ademî qur bû can neçûy ber

8781. Wergirtî dema Xudayî peyman
Ser xelqî ji wî bû pêşî hemyan

8782. Pêşî hemîyan wî gût: Bela ye
Ser pişke ji xelqê Muṣṭefa ye

8783. Ey ʿerş û felek te bûne pabûs
Wey sîdre te cilwegahê Quddûs

8784. Ey meẓherê xûş xîṭabê lewlak
Tu sirrê bû secdegahê emlak

8785. Qedrê wî li nik Xudê giran e
Ew serwerê cumle enbiyan e

8786. Wergirtî Xudê ji wan ve peyman
Her çî ji we dî xudanê Qurʾan

8787. Bawer pê biken ku ḥeq peyember
Harî wî biken ji dînî ṛehber

8788. Ewwel ew e radibît ji gûrî
Ewwel ew e ser pirê diburî

8789. Ewwel dê biçîte cennetê ew
Paşî diçî harî ummetê ew

8790. Meʿlûm e ji pêşî xir peyember
Ew dê vebiket derî ji mehder

8791. Her yek ku dibêjî: Nefsî nefsî
Ew dê çîte baregahê qudsî

8792. Dê bû Xudê ser bi secde danî
Ta dêt bû nîda ji lamekan î

8793. Peyẋemberê min tu ser helîne
Çî bêjî didem tu ez di ḥîne

8794. Robarê biḥeştê yeʿnî kews̱er
Wek befrê sipî şirîn çu şekker

8795. Serkanê ji luilu û mirarî
Ew daye wî lê cenabê Barî

8796. Mewla dê bi wî bidet feḍîle
Balatirê rutbeyan wesîle

8797. Ala bû di kaxê ḥeşrê meʿqûd
Her ew dê biçît meqamê meḥmûd

8798. Qedrê wî li nik Xudê bilind e
Bes nîne bijîn wî xwarî sunde
***

8799. Wê hatî ji wan durustê exbar
Ferman kirîye resûlê muxtar

8800. “Barî bi me dan ji karê qence
Ney dane kesê wî dan me pence

8801. Wî her çî fiṛêdikir peyember
Bû qewmekî bes dikir bi ṛehber

8802. Rebbê me kirim resûlê xatem
Bû cumle beşeṛ ji neslê Adem

8803. Bes bû me ẋenîme bûy ḥelale
Tirsa me bû duşminan di bal e

8804. Pakij bû me kir zemîn seraser
Ummet me nivêj biket li her der

8805. Wî daye me ew mezin şefaʿet
Min danî bû ummetê qiyamet

8806. Wî day me fesaḥeta zubanî
Gûtin me lewa di piṛṛ meʿanî

8807. Dumayê hemî peyemberan ez
Ummet kî ye çêtirê heman ez

8808. Şibhî melekan me ṣef dibestîn
Ḥîna di nivêjê ṛadiwestîn

8809. Sûrey Beqere ku têt dumayî
Ew behr e bi ummeta me dayî

8810. Bîrçûn e eger xeṭa çu nîne
Ney barê giran di şeṛʿ û dîne

8811. Ẋufranê guneh çi çûyî çî may
Kews̱er nê Xudê tinê bi min day

8812. Şeyṭanê me bûy ji kufrê bedkam
Min bestî ḥeta ku bûye îslam”
***

8813. Caîz nebû kes bi dengbilindî
Gel wî qiseket çi cayê tundî

8814. Yan gazî biken ji paşî dîwar
Yan gazî biken bi navê dildar

8815. Caîz nebû  paş wefatê serwer
Bû şuştinê rut biken peyember

8816. Ger carî û jin wî nîkunam in
Paşî wî li her kesî ḥeram in

8817. Çêtir ji hemû jinêt cîhan ew
Bû xêr û şeṛan temet duwan ew

8818. Kes naba ji wan biket sûale
Paş perde meger şirîn û ʿale

8819. Caîz nebû ser kiçêt peyember
Ta mayne bijîn hewî bihên ser

8820. Roniştî eger dikir wî sunnet
Her wek bi pîyave ecr û qîmet

8821. Her kes ku Xudê neket çu care
Der dil wî nevêt ve pakeyare

8822. Yan bêjî civîne yan tiṛane
Îman wî diçît bi bê guman e

8823. Her kes di xewê bibînî rengîn
Bê şek ew e dîtî bêjê mizgîn

8824. Fermanê resûlê piṛṛ bi naz e
Her kes me di xew bibînî taze

8825. "Huşyarî jî dê me bînî her ew"
Yeʿnî li dinê bi çavê ser ew

8826. Ya Reb bi xudanê vê beyanê
Vê behrê bidey me ser cîhanê
***

8827. Elqîṣṣe feḍaîlêt peyember
Nahên bi me ber ḥisab û defter

8828. Ev çende me gû bi her çî ḥale
Wer seyrî xeṣaiṣêt di ʿale

**2. Xesaîsuhu ʿEleyhî's-Selam (Taybetmendîyên Wî Silav lê Bin)**

***a. el-Wacîbatu (Karên Fer)***

8829. Ew menbeʿê ʿilm û ḥîkmet û raz
Meḥṣuṣ bû bi çendî karê mumtaz

8830. Wacib bû li ser sîwak û qurban
Du rekʿe ku roj çû jurî ʿesman

8831. Du rekʿe wîtir du bû beyanî
Hem fer bûne şevnivêj nîhanî

8832. Wek ser wî ji ummetê jî hem fer
Bes salekê paşî bûn muxeyyer

8833. Ḥîna ku diçû şeṛê neyaran
Naba birevî li ber çu caran

8834. Wacib bû li ser nehî ji munker
Her çendî bi tirsî lew ruḥ û ser

8835. Her kes ku dimir feqîr û qerdar
Deynê wî divê bida bi naçar

8836. Çendî ḥeremêt di pak û piṛṛ naz
Lazim bû biket heman bi dilxwaz

8837. Her çî ji Nebî ji dil riḍa ye
Ew xûş ḥerem e bi keyf û şay e

8838. Heçya ku nevêt bila biçîtin
Wî ẋeyrî hevalê çak nevêtin

8839. Lazim bû li ser biket meşûret
Gel ehl û heval di pakesîret

8840. Her çendî zelam bi ray û fam e
Nê şûl bi meşûretê temam e

**b. el-Muḥerrematu wel Mekruhatu (Tiştê Ḥeram û Mekruh)**

8841. ʿAlîşeṛefê mezin meqam ew
Wî çendekê tişt li ser ḥeram ew

8842. Caîz nebû ew bibêjî şiʿiran
Yan werbigirît zekat û xêran

8843. Ger xeṭṭ û kîtabet û vexwundin
Bû wî ne durust û napesind in

8844. Carek wî eger zirî diber kir
Bû cengê çek û sîlaḥ beder kir

8845. Naba ku ji xû veket çu caran
Ḥetta ku neçît şeṛê neyaran

8846. Barî bi çi kes çi dabû nîʿmet
Naba ku bivêt resûlê ummet

8847. Her çî wî dida ji canê mesrûr[1]
Naba ku bidet ḥeta bihêt zûr

8848. Ew nabî bi çav biket îşaret
Ney wek wî bi devkirî ʿîbaret

8849. Roja wî ḥerem kirin muxeyyer[2]
Heçya ku ji dil viya peyember

---

[1] Dilşa, bikêf

[2] hilbijêrî

8850. Caîz nebû ew çi jin bihînît
Ser wê ḥeremê ḥeta bimînît

8851. Ev menʿe Xudê li ser wî axir
Ba feḍl û kerem li ser wî rakir

8852. Ew pakejinêt bi qedr û ḥurmet
Ḥetta ku neken li ser wî minnet

8853. Her kes ku ji wan ne ew viyayî
Lazim bû ji wê biket cudayî

8854. Ger carî ye ger çî jin kîtabî
Ba ʿeqdê nîkahê bû wê nanî

8855. Carî bi mulik çi nêv ẋenîm e
Caîz bû bû serwerê kerîm e

8856. Baş nîne bixwut resûlê dîne
Ew sîr û kuṛad eger kelîne

8857. Wê hat ji Budawidî ji exbar
Pîvazê kelî dixwar wî car car

**c. el-Mubaḥatu (Tiştê Durist)**

8858. Çen şûl wî tinê ji bû ḥelal in
Nîşanê bilindî û kemal in

8859. Ev şule keçî hebûn ji bû wî
Ekser nekirin belê bû xû wî

8860. Caîz bû ji bû wekî diyar e
Rojî li du êk bibî fitare

8861. Pêncêkî ji pişkê pênc ji talan
Ew bû wî durist e hem bû alan

8862. Her çî ji ẋenîme ger viyayî
Caîz bû peyemberê Xudayî

8863. Maqûl e dîyarî zûr şirîn e
Baʿis bi ṣedaqet û evîn e

8864. Lew her çî ji bû dihat dîyarî
Ew werdigirît bi tazekarî

8865. Caîz bû ji bû pitir li çar jin
Jin gel met û xaletê li nik bin

8866. Ew biçte Mekê nebestî îḥram
Yan şeṛ biketin li wê bû îslam

8867. Ew ḥukmî biket bi ʿilmê xû bes
Bû xû bû ʿeyalê xû bû her kes

8868. Gava ẋeḍebê çi qeydî nîne
Ḥukmî biketin di karê dîn e

8869. Ger tore ye ew eger bi şay e
Gûtina wî ḥeq e ji bû Xuda ye

8870. Pawan biketin eger aqarî
Caîz bû ji bû ḥebîbê Barî

8871. Caîz bû di mizgetê biwestî
Gel ḥalê cenabetê bi qestî

8872. Malê çi kesî bi bê xudanî
Çî lê biketin wekî dizanî

8873. Ger werbigirît çi qût û nanan
Lew pêtivîyan li wan xudanan

8874. Caîz bû eger biket peyember
Wacib bû li wan biden bi bê qer

8875. Minnet niye bû wî nan biden ew
Nê lazim e bû wî can biden ew

8876. Caîz bû jina nemêr û malxu
Bê iznê jin û welî bidet şu

8877. Çi li xû çi li her kesê viyayî
Ew mare biket bi xêr û şayî

8878. Barî bi wî dabû bes ve behre
Jin mare biket ji xû nemehr e

8879. Ney şahid û ney welî ne îʿlam
Her çendî hebin hemû di îḥram

8880. Her jin xû bi xû bidet resûle
Caîz bû eger biket qebule

8881. Barî li wî mare ket cewan e
Zeyneb nê lewa çi ʿalî şan e

8882. Ferḍa wî eger jinik viyaba
Lazim bû ji wê bi dil riḍa ba

8883. Ḥetta ku eger bi mêr hebaye
Wacib bû ji bû ṭelaq bidaye

8884. Ev tişte eger çî bû hebûye
Emma tu bizane qeṭ nebûye

### d. Ṭeharetu Feḍelatîhî (Pakijiya Bermayê Wî)

8885. Meʿlûm e ji sîret û ji exbar
Ewṣaf̣ê ḥebîbê pak û muxtar

8886. Pakij bû leş û giyanê şîrîn
Her tiştê li gel wî pak û xavîn

8887. Bû cayê edeb eger diçûye
Gel zêde ḥeya û perde bû ye

8888. Ew ʿerde du şeq dibûye her car
Her tiştê li wê di nav diçû xwar

8889. Ger bewl e çi xwun resûlê Barî
Yaran bi teberrukî dixwarî
***

8890. Malik bû xudanê nav û qedrî
Ew babê Ebû Seʿîdê Xudrî

8891. Cengê Uḥudê resûlê muxtar
Qurbanî wî bim ku bûy birîndar

8892. Xwun der bû li rwîy wî yê mubarek
Ew hat bi devî mirîst bi carek

8893. Xwun hêj di devê wî bû peyember
Gûtî: “Firede tu xwunê yekser”

8894. Wî taze vexwar û gût: Ne wellah
Behrek bû mezin me xwar bi dilxwah

8895. Peyẋemberî gût bi zar şirînî
“Kê meyle beheştîyek bibînî

8896. Ew bibêt bibînî ev Seʿîde”
Zur pê neçu ew dibûy şehîde
***

8897. Carek kuṛekê Qureyşî şîrîn
Berdabû Nebî bi Kundukî xwîn

8898. Gava li xû ber bû wî helanî
Bir bû nepenî biket nîhanî

8899. Wî havrî veda bi her du laye
Wî kes nedî wî vexwar bi şaye

8900. Geryave gûtî: Te xwun çi lê kir
Wî gû: Me veşar û cê bi cê kir

8901. Peyẋemberî gû: “Ne wek te xwarî”
Wî gûtî: Belê bi navê Barî

8902. Min çendî dikir me dest neçûnê
Nêv xakê bikem ve pakexwunê

8903. Mizgînî gûtê resûlê axir:
“Edî tu xilaṣ ji pêtê agir”

8904. Carek dî kuṛê Zubeyrê ʿEwwam
Ew ʿEbdê Xudê bi nav di îslam

8905. Berdabû ji bû wî xwun bi kundik
Çu da ku veşêrî taze kuṛzik

8906. Gûtê: Te çi kir? Gû: Min veşarî
Gû Baş e belê ne wek te xwarî

8907. Wî gûtî: Belê çituv diwêrim
Xwuna te yê pak di xak veşêrim

8908. Min taze vexwar bi dilviyanî
Êdî çi heye tu çak dizanî

8909. Gûtî: “Bû te mijde û keramet
Agir negehîte tu qiyamet”
***

8910. Her wek ku dibêjî Ummû Eymen
Ew pake ḍemîr û sînerewşen

8911. Carek li şevê Nebî bû hişyar
Wî dît li kejî şiklikê fexxar

8912. Destavê zirav di wî wî xûş kir
Rabum li xewê ji dil me nuş kir

8913. Têñyatî me zûr gehîbû canî
Min taze vexwar û min nezanî

8914. Gûtî seḥerê bi min peyember:
Işkelkê henê biṛêje ber der”

8915. Min gûtî: Qesem bi navê Barî
Ew taze şevê dî min vexwarî

8916. Ev zanî dema ji wê peyember
Berda kenîyê bi zarê şekker

8917. Mizgîn li te gûtî: Ey wekî day
“Êdî ji te zik neêşî ta may”

8918. Ya Reb tu bi ev xudanê cahe

Êşêt me bibey digel gunahe[1]

## EZ-ZEHRETUL XAMÎSETU (KULÎLKA PÊNCÊ)

Fî Beyanî Ezwacîhî we Ewladîhî ʿEleyhî's-Selamî (Babetê Xêzan û Zarokên Wî Silav lê Bin)

### a. Ezwacuhuṭ Ṭahîratî (Xêzanên Wî)

8919. Cumley ḥeremêt ḥebîbê enwer
Ew pazde ne piṛṛ ji feḍl û cewher

8920. Bes s̱êzde ji wan neqil kirîne
Ew yazde li nik wî xirvebîne

8921. Du mirbûne ew ku ber ḥeyat e
Neh mane ji wan ji paş wefate

8922. Şeş bûn qureşî ji wan jinan ew
Yek pêş hemîyan Xedîce xan ew

8923. Day Sewde û Aîşa û Hînd e
Day Remle û Ḥefṣe nav bilind e

8924. Heşt in ji ʿereb ji milletê çak
Yek muṣṭeliqî Ciweyrîya çak

8925. Du Zeynebê nav şirîn û ʿalî
Yek wan eṣedî bû yek hîlalî

8926. Yek ʿAliye bû wê bab e Ẓebyan
Esma jî bi navê babê Nuʿman

8927. Êka dî Ẋezîyye bab e Cabir
Bê dewletê ser bi qur bû axir

8928. Şenba yek e navê babî ʿEmr e
Hem hatibû jêr nîkah û mehre

8929. Meymûne belê hîlalî eṣl e
Yek ney ʿerebî nijad û nesl e

8930. Israîlî ye ji neslê Harûn
Ew pake Ṣefîye xan û xatûn
***

8931. Du ew bi feḍl ji wane zêtir
Her êke ji ya dî çak û çêtir

8932. Yek daye Xedîce piṛṛ buha ye
Yek şûx û şepal e Aîşa ye

8933. Ew yarê deravê tal û ṭeng e
Ev gencê cewahirêt bi seng e

8934. Ev kanê ḥedîs̱ û şeṛʿ û dîn e
Ew ewwelê cumle muʾmînîn e

8935. Ma feḍl û kemalê her di wan e
Qet têne ḥisab û tên beyan e

8936. Emma we dibên xudanê dîn ew
Şek nîne Xedîce çêtirîn ew

8937. Peyẋemberî piṛṛ li nik evîn bu
Paşî mirina wê zûr ḥezîn bû

8938. Ta mabû jibîr neçu peyember
Beḥs̱ê wê dikir çu şehd û şekker

8939. Ta gûtî ji xû ve Aîşayê
Ey min bi fîda bi bab û dayê

8940. Barî bi te zûre feḍlê xû ye
Çêtir ji Xedîce da bi tu ye

8941. Wî gûtî: "Nexêr bi ew Xudayî
Çêtir ji wê qeṭ bi min nedayî

8942. Weqtê bi me ʿalemê kufirker
Wê piṛṛ bû dil û demaẋ ji bawer

8943. Roja dikirim ewan diruhîn
ṚastGû dikirim ji canê nûrîn

8944. ʿAlem dikirim ji malî bê bar
Wê her çî hebû diday me yekcar"
***

8945. Meʿlûm e kiça wê Faṭîma ye
Ney hemberê day û Aîşa ye

8946. Yek parçe ye ew ji yarê ekrem
Serdarê jinan e bijlî Meryem

#### 1. Xedîcetu Bîntu Xuweylidî (Xedîca Kiça Xuweylidî)

[1] Li Şuşê di sala 23.5.1381 H.'da hatiye nivîsîn.v(jêrenota Şuşî bi xwe ye 2. 11.1961)

8947. Ewwel ḥereman Xedîce xan bû
Şîrînṣîfet û bi rêz û şan bû

8948. Meşhûr bû bi ʿîzz û naz û xûşî
Babê wê Xuweylidê Qureyşî

8949. Sengîn e gelek xudan kemal e
Zengîn e belê bi milk û mal e

8950. Piṛṛ ʿeql e tijî ji ray û famê
Laîq bi resûlê xir enamê

8951. ʿUmrê wê dema gehişte çil sal
Ew taze gehî kemal û îqbal

8952. Eşrafê Qureyşîyan gelek car
Xwastîbû ewê nedan çi guftar

8953. Axir sefera Nebî çu Şamê
Gel malê evê bilindenamê

8954. Faydek çi mezin gehî bi destî
Paş vê seferê Xedîce xwastî

8955. Ewwel wê hinarte nik peyember
Tu bêjê Nefîse ev xeber fer

8956. Ger ray li min e me arezû ye
Raḍî me bi wî bi yar û şûye

8957. Peyẋemberî marekir şirînkar
ʿUmrê wî bû bîst û pênc bi ejmar

8958. Wê mareyî bîst şutur bû ew dem
Yan çar ṣed û heştê zîvî dirhem

8959. Kirbûn wê du mêr li pêş peyember
Mir bûne di muşrik û nikûnser

8960. Nav êkî ʿUteyq e yek Buhal e
Wê hey bû ji vî kuṛek ḍelal e

8961. Meşhûr e kuṛê Buhale Hînd e
Sîret sipehî ʿemel pesind e
***

8962. Peyẋemberê mey qedir girane
Gava wî Xedîce hate xane

8963. Asûde bû can û dil temam e
Ney kar û ne karewanê Şam e

8964. Elḥeq ḥerema wî canfîda bû
Xidmet wê dikir ḥeta ku mabu

8965. Çî malê hebû bi dilevînî
Da destê Muḥemmedu'l- Emînî

8966. Her wek wî divê bidet bi yaran
Mêvan û feqîr û pîr û jaran

8967. Kabanî di malê piṛṛ dîrayet
ʿEql û edeb û kemal nîhayet

8968. Her emrê dikir belê bi ser çav
Her karê digû dikir wê der gav
***

8969. Roja ji bû hatî weḥî û Qurʾan
Pêşî hemîyan wê anî îman

8970. Piṛṛ ṣebr û teḥemmul û yeqîn bû
Elḥeq bû resûlê ẋemrevîn bû

8971. Her carê Nebî dibûye ẋemdil
Ber qehrê Qureyşîyêt di dilkul

8972. Ṛencîde ji dil dihate xanî
Kabanî ji rengê wî dizanî

8973. Ba xuşxeber û zubanê şekker
Dilxûş û beşûş[1] û dikir peyember

8974. Ta mabû resûlî xûş heval bû
Qedrê wê li nik şirîn û ʿal bû

8975. Qencî û menaqibêt wê zûr in
Êkek li jinêt serê di jûr in

8976. Bes nîne Xudê dinêrî Cibrîl
Bû qaṣidê şeṛʿi û dîn û tenzîl

8977. Mizgînî bide Xedîce nam e
Rebbê wê li ser wê zûr selam e

8978. Hem batî minîş selam bixwîne
Bêjê ji Xudayê ʿalemîne

8979. Qeṣrek didetê di baẋê cennet
Zêdey ji heman bi feḍl û minnet

8980. Ew qeṣre ji luiluek xulûr[2] e
Neqşê wê ji karê ʿeqlî dûr e

---

[1] devbiken

[2] Rewneq, biriqîn

8981. Rengîn e gelek şirîn û qenc e
Bê qarî û gût e gût û ṛence
***
8982. Ewladê Nebî ji wê ne yekser
Çar pakekiç û du kuṛ çu cewher

8983. Bes Marya Îbrahîm hebû ye
Baqî ḥereman çi jê nebû ye

8984. Qasim bû li pêşî paşî Zeyneb
Ya sêye Ruqeyye ya şekerleb

8985. Paş Faṭîme paşî Ummû Kulṯûm
Nav ʿEbdê Xudê duma ye meʿlûm

8986. Ger Ṭeyîbê navşirîn û Ṭahir
Her du leqeb in vî kuṛkê axir

8987. Ta ṣaẋ bû peyemberê me xuşhal
Jîn pêkve çi taze bîst û pênc sal

8988. Gel êk dî dijîn bi can evînan
Ta mabû çi jin bi ser neînan

8989. ʿUmrê wê gehişte şêst û penc e
Bar kir wê ji vê cîhan û ṛence

8990. Sê sal wî demî diman bû hîcret
Wê gûr li Mekê Ḥecûne şuhret

8991. Ṣed feyḍ û kerem ji ẕatê Barî
Ser ruḥê Xedîce her bibarî

**2. Sewdetu Bîntu Zemʿetî (Sewda Kiça Zemʿey)**

8992. Sanî ḥerema peyemberê pak
Sewde kiçe Zemʿe ya şeṛefnak

8993. Ew êk bû ji ewwelîn musilman
Wek mêrê kevin bi navê Sekran

8994. Hîcret kirî her duwan yeqîn e
Cara duwê bû Ḥebeş zemîne

8995. Zivrîneve ew bû Mekke xak e
Sekran dimirît bi canê pake

8996. Peyẋemberî marekir şirînkar
Paş pake Xedîceya guherdar
***
8997. Ew pîr bû li nik resûlê serwer
Hîvyê bû ku berbidet peyember

8998. Sewde ji xeber dema bû agah
Wê gûte resûlê pakê Ellah

8999. Min bernede ey te ez bi gurî
Min dane te lew meqamê jurî

9000. Ez xadimeka feqîr û jar im
Bê dîtinê tu neber qerar im

9001. Roja xû didem bi keyf û şay e
Bû xuşke ʿezîzê Aîşa ye

9002. Peyẋemberê piṛṛ ji rêz û teqdîr
Hêlave li nik xû Sewdeya pîr

9003. Hîcret digehişte pêncî û çar
Canê xû siparte şahê Ẋeffar

9004. Merqed di beqîʿe warê reḥmet
Ser Sewde hizar hizarê reḥmet

**3. ʿAîşetu Bîntu Ebî Bekrîn (ʿAîşa Kiça Ebû Bekirî)**

9005. Paşî ḥereman resûlê ummet
Day ʿAîşeya bi qedr û ḥurmet

9006. ʿAlî ḥeseb û neseb bijare
Kiç êkexelîfe yarê ẋar e

9007. Bûbekrê mezin yekem musilman
Deyka wê bi navê Ummû Rûman

9008. Şîrîn ṣîfet e çi ʿalî şan e
Ew yek ji bijareêt jinan e

9009. Meḥbûb e li nik wî piṛṛ evîn e
Nazdar e belê çi nazenîn e

9010. Piṛṛ ʿeql û kemal û piṛṛ hîdayet
Piṛṛ husn û cemal û piṛṛ dîrayet

9011. Jin gencê ʿilum û mahê taban
Yek bûye ji ʿalimêt şeḥaban

9012. Çendan ji şeḥab û tabʿîne
Wergirtine jê ḥedîṯ û dîne

9013. Ḥafiẓ bi kelamê şahê Ẋeffar
Bê ḥed ji ḥedîṯê yarê muxtar

9014. Peyẋemberî marekir di Mekke
Şeş salî bû wî demî ne şekk e

9015. Wî xwastî û marekir di şewwal
Bû hîcretê hêj di mayî sê sal

9016. Sala deh e bîʿs̱eta Muḥemmed
Wê mehre ji dirheman bû çar ṣed

9017. Yek sale ji hîcretê yeqîne
Ḥîna veguhaztî[1] nêv Medîne

9018. Neh salî bû hêj ne ḥînê bûkan
Hêj larî dikir digel biçukan

9019. Ew mah e wesa di mahê şewwal
Ew geşte kemal û bext û îqbal

9020. Zur xûş divîya resûlê ummet
Piṛṛ naz û delal û qedr û ḥurmet

9021. Wê hatî ji ʿAîşay şeṛefʿal
Min ʿeqd û perî di mahê şewwal

9022. Ez bû me li nik peyemberê dîn
Çêtir hemû jin bi naz û şîrîn
***

9023. Peyẋemberî gûte Aîşayê
Ey min bi fîda bi bab û dayê

9024. "Sê şev me didî di xewnê xûşe
Cibrîlî tu anî perde pûşe

9025. Armûşê sipî bû perdeya pak
Dabêjî bibîne ehlê xû çak

9026. Da perdê li ro yê tu helînim
Dabêjme birayê xûy şirînim

9027. Madem ji Xudê ye ev peyame
Bê şek dê Xudê biket temame"

9028. Peyẋemberî kes nekirye mare
Kiç bijlî ji ʿAîşey bijare
***

9029. Neh sal bû digel Nebî ḥeyate
Bû hejde Nebî dikir wefate

9030. Hevdey remeḍan ecel gehiştê
Merqed di beqîʿe bû biḥeştê

9031. ʿUmrê wê gehişte şêst û şeş sal
Bû pêncî û heştê hîcreta ʿal

9032. Ṣed reḥmet û ṣed hizar riḍa ye
Ser pakerewanê Aîşa ye

**4. Ḥefsetu Bîntu ʿUmer (Ḥefṣa Kiça ʿUmerî)**

9033. Ya çarê ḥerem ḥebîbê canî
Ew Ḥefṣe kiça xelîfê s̱anî

9034. Peyẋemberî dil hebû bixwazî
Ḥefṣê ji ʿUmer bi dilnewazî

9035. ʿUs̱manê mezin bi vê nezanî
Çu Ḥefṣe bixwazî ew nîhanî

9036. Lewṛa ku Ruqeyye kir wefate
Wî bû jinekê dikir xebate

9037. Emma ʿUmerî cewab nedavê
Wî zanî bû ew xeber di gavê

9038. Pê zanî peyemberê zemanî
Wî gût ʿUmerî bi razê canî

9039. "Nîşa te bidem yekê ji ʿUs̱man
Çêtir bî bigêrî wî ji xizman

9040. Hem bû wî ezê bikem diyar e
Çêtir ji te hem xezur û yare"

9041. Cab dave ʿUmer: Belê bi ser çav
Ey min bi fîdayê tu me her gav

9042. Gû: Ḥefṣê bidey resûlê Reḥman
Kuls̱ûmê ezê bidem bi ʿUs̱man

9043. Derḥal ʿUmerî digû: Bi ser ser
Pêşkêşî te Ḥefṣe ey peyember

9044. Wê gavê ji xû wî kir bû mehre
Kuls̱ûm bû xelîfê sê bû behr e

9045. Pêş hingî jina Xuneysî bûye
Îslam bûne pêkve xû û şû[2] ye

9046. Hîcret kirî wan ji bû Medîne
Mêr paşî Bedir dimir yeqîn e

9047. Salê sê ji hîcretê diyar e
Şeʿban bû wî Ḥefṣe kirbû mare
***

9048. Carek çi li ser hinek şîqaqê

[1] Bedil (Jêrenota Şuşî bi xwe ye)

[2] Hevjîn

Berdabû Nebî bi êk ṭelaqê

9049. Barî bû xeber hinarte xware
Ey yar û peyemberê bijare

9050. Ḥefṣêy tu bihînve jêrî deste
Zur rojîgir e xudapersit e

9051. Nûrîndil e ew li nik me qiṣt e
Ew êk li jinêt te nêv biḥeşt e
***

9052. Piṛṛ feḍl û kemal e piṛṛ dîrayet
Wê çen ji ḥedîs̠ kirin rîwayet

9053. ʿUmrê wê gehişte şêst salî
Ew çubû meqamê pak û ʿalî

9054. Şeʿban bû ji hîcretê çil û penc
Çu der li evê cîhan e piṛṛ ṛenc

9055. Ṣed xûşî û luṭf û reḥmeta pak
Ser ruḥê tu Ḥefṣe ya şeṛefnak

**5. Ummu Seleme Hîndubnetuhu Ebî Umeyyetî (Ummû Seleme, Kiça Ebî Umeyye, Hînd)**

9056. Ummû Selemey bi navê Hînd e
Peyẋemberî yek ḥerempesind e

9057. Wê Bûseleme hebû kevinmêr
Ew bûn bi du hîcreta xudan xêr

9058. Vêkra çûne bû Ḥebeş zemînê
Hem bûn ji muhacirêt Medînê

9059. Hîcret digehişte salê çar e
Wê mêr diçû xanîyê qerare

9060. Bûbekr û ʿUmer xû êk li du êk
Wan xwastî bû xû jina ʿemelnêk

9061. Emma wê neda çu wan cewabe
Ta xwastî resûlê ʿal cenabe

9062. Memnûn bû ji bû resûlê Ellah
Peyẋemberî marekir bi dilxwah

9063. Ew her wekî zêde piṛṛ cemal bû
Piṛṛ feḍl û buha û piṛṛ kemal bu

9064. ʿUmrê wê gehişte çar û heştê[1]
Çu der ji cîhan ji bû biḥeştê

9065. Hîcret bibû salê pêncî û neh
Avabû di nêv beqîʿê ew meh

9066. Ṣed reḥm û riḍa he rojê carê
Ummû Selemê bû bêne xwarê

**6. Zeynebun Bîntu Xuzeymetî el-Hîlalîyyetî (Zeyneba Kiça Xuzeymey)**

9067. Êka dî ḥerem resûlê ummet
Zeyneb bû tijî ji cah û hîşmet

9068. Babê wê Xuzeymeyê Hîlalî
Nik ʿEbdê Xudê bû piṛṛ meʿalî

9069. Cengê Uḥudê bi nav û deng e
Ew[2] hate şehîdkirin di cenge

9070. Salê sê ji hîcreta munewwer
Zeyneb ji xû marekir peyember

9071. Zur gel wî nema tinê du sê mah
Qebrê wê kete beqîʿê piṛṛ cah

9072. Ṣed feyḍ û kerem ji Z̠ulcelalî
Ser ruḥê tu Zeyneba hîlalî

**7. Cuweyrîyetu Bîntû Ḥaris̠î (Cuweyrîya Kiça Ḥaris̠î)**

9073. Êka dî ḥerem Nebî şeṛefnak
Kiç Ḥaris̠ e ew Cuweyriya pak

9074. Ew pakejina bi bext û talʿi
Wê mêrê kevin bû nav Musafʿi

9075. Ẋezwey Benî Muṣṭeleq şehîr e
Ew gel gelekan bibû esîre

9076. Hîcret wî demî di salê şeş bû
Ew xû jî çi newcewan û geş bû

9077. Bû behreyê merdê pak û hişyar
S̠abit kuṛî Qeysî yek ji enṣar

9078. S̠abit gûte wê ji bû me bîne
Çen pare te ḥur dikem yeqîne

9079. Çu gûte nebî: Me ger binasî

[1] 84 (nota Şuşî bi xwe ye)

[2] Ebdullah îbn3i Cehş (Jêrenota Şuşî bi xwe ye)

Kiç Ḥariṯe ketye vî kirasî

9080. Ez bûyme ji wan esîr û jaran
Bum behreyê Ṯabitî ji yaran

9081. Çen pare ewî ji min niyaza
Ew dê me bigêrî taze aza

9082. Hatîme bidey ji pêş me pare
Êdî tu dizanî çarêkare

9083. Peyẋemberî gû: "Te ger meram e
Xêrek ji te ra dibêm bikam e"

9084. Wî gûtî: Bibêje ser du çavan
Ez gurî te bim he roj û gavan

9085. Gû: Ez dê bidem li pêş te pare
Paşî te ji xû dikem bi mare"

9086. Gû: Keyfê te ye ji dilevînê
Peyẋemberî mare kir di ḥînê

9087. Pakîzejin e çi piṛṛ kemal e
ʿUmrê wê di gavê bîste sal e

9088. Pê zanî ku xazîyan û şeṛker
Mehre kirîye ji xû peyember

9089. Aza dikirin heman esîre
Ser xaṭirê serwerê beşîre

9090. Lê bûye sebeb Cuweyrîyey ʿal
Aza bûne cumle ehlê ṣed mal
***

9091. ʿUmrê wê gehişte şêst û penc e
Hîcret bibû pênc û pêncî qenc e

9092. Çu der li evê cîhane ẋemnak
Ṣed reḥme li ser Cuweyrîya pak

**8. Ummu Ḥebîbetî Remletu Bîntu Ebî Sufyanî (Ummû Ḥebîbe Remla Kiça Babê Sufyanî)**

9093. Yek jin dî peyemberê enam e
Ew Ummû Ḥebîbe Remle nam e

9094. Babê wê dibêjne wî Bûsufyan
Êk bûye ji maznêt Mekehiyan

9095. Ew pêşî jina ʿUbeydê Ellah
Îslam bûne pêkve piṛṛ ji dilxwah

9096. Cara du diçûn Ḥebeş zemîne
Mêrê wê li wê bû kuṛ ji dîne

9097. Ew bûbû fele ẋerîbê bê fam
Murted bû ji dînê pakê îslam

9098. Ew ṭûpî[1] li wê ji xêrê bê bar
Lê Remle bi dînê ḥeq bû hişyar

9099. Pê zanî peyemberê zemane
Wî ʿEmrê Umeyye kir rewane

9100. Neccaşî ji min selam bixwîne
Îslam bibû ew ji dil yeqîn e

9101. Mazin melîke bi ʿîzz û naz e
Tu Remle ji wî bû min bixwaze

9102. Neccaşî gûtî: Bi ser du çav e
Ew mehre dikir ji wî di gave

9103. Da mehre li batî yarê muxtar
Çar ṣed bi jimarê zêr ji dînar

9104. Gazî kire Ceʿferê serûke
Gel cumle muhacirêt di kuke

9105. Hatin bi temamî kuçk û dîwan
Ronştine ew bi rêz û nîşan

9106. Xutbek wî[2] vexwundî piṛṛ ji cewher
Xir medḥ û ṣenayê şahê ekber

9107. Tewḥîdê Xudayê pak û ʿellam
Îman bi resûlê dînê îslam

9108. Ev dîne dijî bi serbilind e
Her çî ne qebul e derdemend e

9109. Wî paşî digû bi xûş xîṭabe
Min dave peyemberî cewabe

9110. Ez Remle ji wî dikem bi mare
Pîrûz bî ji wî hizar ji care

9111. Mehra wê hemû di gav jimarî
Wê gavê bû Remleyê hinarî

9112. Rabûn dê belav bibin muhacir

---

[1] sekitî

[2] Anku Necaşî (Jerenota Şuşî bi xwe ye)

Gû: Ṣebrî biken demek bi xaṭir

9113. Adabê peyemberan qedîm e
Zadek dê bixwun bi nav welîm e

9114. Wî sufre kişande nîvê dîwan
Têr xwarî heman bi nuşê can wan

9115. Bû Remle dikir cîhazê taze
Wî paşî rewane kir bi naze
***

9116. Pakîzejin e xudan cemal e
Ew yek li jinêt xudan kemal e

9117. Hîcret digehişte sal çil û çar
Canê xû siparte şahê Ẋeffar

9118. Ṣed feyḍ û riḍa ji layê Barî
Ser ruḥê tu Remle ey bibarî

**9. Zeynebu Bîntu Ceḥşî (Zeyneba Kiça Ceḥşî)**

9119. Êka dî ji jin resûlê serwer
Ew Zeyneb e kiçmeta[1] peyember

9120. Ew êke ji wan jinêt qedir zûr
Babê wê bi navê Ceḥş e meşhûr

9121. Zeydê kuṛê Ḥariṯê bijare
Peyẋemberî dabye wî bi mare

9122. Dilnaxûşî ye eger şîqaq e
Paşî qederek wî da ṭelaqe

9123. Peyẋemberî ew dikir rewane
Tu bêje bi Zeynebê nîhane

9124. "Peyẋemberî kiriye beḥṯê tu ye
Êdî tu dizanî karê xû ye"

9125. Wê gûtî: Bibêy cenabê Barî
Hîç guftê neşêm bidem bi zarî

9126. Ta Barî hinarî yarê Cibrîl
Gel ayetê piṛṛ buha ji tenzîl

9127. Zeydî ku ji wê qetandî ḥacet
Ez mare dikem li tu bi ḥîşmet

9128. Ayet ji Xudê ku hate xware
Rabûye resûlê nazidare

9129. Çu xanîyê Zeyneba delal ew
Bê derge qutan û bê sual ew

9130. Ew sale ji hîcretê bû penc e
Barî ku kirî veʿeqdê qence
***

9131. Car bûye ewê bi şukrê can ew
Wê fexrê dikir li ser jinan ew

9132. Dabêjî bi wan heval û hewyan[2]
Hun mare kirîne bab û welyan

9133. Ev Zeynebe piṛṛ ji bext û şan e
Min mar e bi Xaliqê cîhane

9134. Bû medḥ û ṯenayê Zeyneba pak
Çen car digû Aîşa şeṛefnak

9135. Nebû ji me wek wê çak bi dîne
Piṛṛ ṛastî ye û di piṛṛ yeqîn e

9136. Teqwa wê gelek qewî bû îman
Zêde bi reḥim bi dûst û xizman

9137. Xêr zûr dikirin di rahê Barî
Xuşkên bû ḥeta wê can siparî
***

9138. Ewwel ḥereman li paş peyember
Zeyneb bû li vê cîhanê çu der

9139. ʿUmrê wê gehişte sê û pêncî[3]
Hîcret digehişte bîst bi qencî

9140. Her sal û meh û he roj û her şeb
Ṣed reḥme bi ser ruḥa te Zeyneb

**10. Şefîyetu Bîntu Ḥuyey el-Xeyberî (Ṣefiya Kiça Ḥuweyyê Xeyberî)**

9141. Êka dî ḥerem resûlê dîne
Piṛṛ feḍl e Ṣefiyye navşirîn e

9142. Kiç mazinê Xeyber û emîr e
Serkarê Qureyẓe û Neḍîr e

9143. Sal ḥeft e ji hîcreta peyember
Ew bûye esîr di cengê Xeyber

[1] Dayika wê Umeyye bînt ʿebdulmutalîb (Jêrenota Şuşî bi xwe ye)

[2] Hewî

[3] 53 (Jêrenota Şuşî bi xwe ye)

9144. Wê mêrê kevin bi nav Kînane
Ew bû di şeṛî berî ji cane

9145. Şeṛ ku verevî bi ʿîzz û nuṣret
Hêj wan nekirî ẋenîme qismet

9146. Diḥyey digû qaṣidê Xudaye
Caryek me divê eger te ray e

9147. Peyẋemberî gû: “Çu qeydî nîne
Caryek tu here ji bû xû bîne”

9148. Wî bû xû Ṣefîyye kir diyar e
Yek bû ji ẋenîmeyê bijare

9149. Yaran gû peyemberî bi dilxwaz
Yek carî te daye Diḥye mumtaz

9150. Kiç mazinê van qelatê Xeyber
Ney babetê kes bijil peyember

9151. Peyẋemberî gû: Bihête êre
Ku dîtî wî zanî piṛṛ ji xêr e

9152. Ferman kire Diḥyeyê xudan cah
“Caryek dî bû xû binêre dilxwah”

9153. Aza kir û marekir şirînkar
Pîrûz bî li wî ku ey hizar car

9154. Ew Ummû Selîm bû kir cîhaze
Karê wê dikir şirîn û taze

9155. Şev menzileka bi xêrê ava
Her wê seferê dibîte zava

9156. Ḥîna ku ṣube bû têştegah e
Ferman diketin xudanê cah e

9157. “Her kes çi hey li nik ji zadî
Bînin ji me ra bi keyf û şadî”

9158. Hin anî qesib hinek dî keşke
Hindek dî dianî ronê meşke

9159. Şîvek jê durust kirin serûber
Ew bûye welîmeya peyember
***

9160. Mahê remeḍan bû salê pêncî
Ew pake Ṣefîyye mir bi qencî

9161. Merqed di beqîʿê piṛṛ buha ye
Ser canê wê reḥmeta Xuda ye

**11. Meymûnetu Bîntu el-Harîṯî (Meymûna Kiça Hariṯî)**

9162. Meymûne jî yek ḥerem peyember
Kiç Ḥariṯ e ew hîlalî cewher

9163. Dil nazik û pak û piṛṛ reḥim bû
Wê mêrê kevin Ebû Reḥîm bû

9164. Hîcret gehî ḥeft e piṛṛ ji şan e
Kir mare di ʿUmretul Qeḍaye

9165. Hindek we dibên ve êk ji wan e
Xû daye peyemberê zemane

9166. Lewṛa ku resûlî xwastî taze
Ew bû li şutur suwar bi naze

9167. Wî gû: Şutur û suwar bi carek
Pêşkêşî peyemberê mubarek

9168. Peyẋemberî mare kir serê çûn
Wê gavê di menzila Serîf bûn

9169. Geryave dema resûlê îslam
Wî ʿumre kirî ḥelal ji îḥram

9170. Ew geşte şeṛîf qunaẋê ava
Pîrûz bî li wê dibîte zava
***

9171. Hîcret di gehişte pênce û êk
Çu der li cîhanê ew ʿemelnêk

9172. Lew cê ku Nebî li gel wê şa bû
Yeʿnî li şeṛîf mekan wefa bû

9173. Meymûne jinek giranbuha ye
Ser merqedê wê hizar riḍa ye

**12-15. ʿAliyetun Bîntu Ẓebyanî we Esmau Bîntul Nuʿmanî we Ẋezîyetu Bîntu Cabîrî we Şenbau Bîntu ʿEmrîn (ʿAliya Kiça Ẓebiyanî û Esma Kiça Nuʿmanî û Ẋezîya Kiça Cabirî û Şenba Kiça ʿEmrî)**

9174. Ew ʿAlîyeya wê bab e Ẓebyan
Esma jî bi navê babê Nuʿman

9175. Jin bûne peyemberê zemane
Paşî çûne nikê ṭelaqdane

9176. Esma wî didî ku leş belek ew
Mehra wê dida û mal kelek ew

9177. Kiç Cabir e ger Ẋezîye nam e
Hem mare kirî bi keyf û kam e

9178. Wê gûtî dema didît peyember
Perhêz[1] ji te min bi şahê ekber

9179. Peyẋemberî gûtê: Rabe zu ye
Êdî me nema çi meylê tuye

9180. Şenba jî kiça ʿEmir ʿemel bed
Hem hatibû jêr nîkahê Eḥmed

9181. Hêj ney veguhaztî ew welîme
Mir kuṛ ji resûlî Îbrehîme

9182. Wê gûtî: Eger heba peyember
Wî kuṛ nedimir çu ku mê cewher

9183. Peyẋemberî hem ṭelaqe daye
Ew rosîyeha ne ʿeql û raye

9184. Her kes nîye babetî gula geş
Kerṭebʿî nevê bijil ji kerbeş
***

9185. Hindek dî hene dibên wî xwastî
Hem marekirî veneyguhaztî

9186. Hindek dî wesa wî xwastibûn bes
Wî mehre nekir belê ji wan kes

9187. Ev gûte çiku me dî ne meşhûr
Ḥacet nîye bû beyan kem û zûr

**b. Serarîhî ʿEleyhî's-Selam (Carîyên Wî Silav lê Bin)**

**1. Marîyetu Bîntu Şemʿûnî el-Qibṭî (Mariya Kiça Şimʿûnî Ya Qibṭî)**

9188. Caryêt wî tinê bizane çar in
Emma du ji wan gelek dîyar in

9189. Yek Mariye ye ji dil fehîm e
Deyka weledê wî Îbrehîm e

9190. Gel çen ji giranbuha dîyarî
Bû taze Muqewqesî hinarî

9191. Hîcret digehişte salê heft e
Peyẋemberî ew bi destî kefte

9192. Xuşka wê digel bi navê Şîrîn
Ew her du gelek cewan û şîrîn

9193. Hessan ewê şaʿirê peyember
Şîrîn wî didayê pakedilber

9194. Roja mirî Marîyey delale
Hîcret digehişte şazde sale

**2. Reyḥanetu Qureẓîyetî (Reyḥana Qureẓî)**

9195. Reyḥane qureyẓî êk ji wan bû
Piṛṛ fedl û buha û newcewan bû

9196. Ew mir di ḥeyatê pak şefîʿe
Merqed wê di meqberê beqîʿe

**3 – 4. Îḥdahuma Hedîyetun wel Uxra Şebaha Fî Sebyî (Êk Dîyarî, Ya dî Bara Cengê)**

9197. Êka dî bû daye wî bi dilxwaz
Zeyneb eṣedî bi naz û îʿizaz

9198. Êka dî dibên wî bûye bar e
Carek ji ẋenîmeyê bijare

9199. Ṣed reḥm û riḍa û luṭfê Barî
Ser ruḥê ewan heman cewarî

9200. Ya Reb tu bi cumle day musilman
Dumahî me xêr bikey bi îman

**c. Ewladuhu ʿEleyhî's-Selam (Zarokên Wî Silav lê Bin)**

9201. Ewladê peyemberê mubarek
Heft in kuṛ û kiç hemî bi carek

9202. Şeş bûn ji Xedîce pakedayê
Yek bûye tinê ji Marîyayê

9203. Tertîbê wîladetê ewane
Mêj nîne me bû te kir beyane

**Ewladuhuẕ Ẕukurî (Zarokên Nêr)**

9204. Sê kuṛ wî hebûne wek te zanî
Yek Qasim e nûrê çav û canî

9205. Êkê dî bi navê ʿEbdê Ellah
Ew her du ji ew Xedîce piṛṛ cah

[1] Xwe spartin

9206. Ew Marîye carîya şirînqed
Wê bes hebû Îbrehîm ji Eḥmed

9207. Ew her sê kuṛe ku çen di kûk bûn
Ew Ḥerṣê mirin ku hêj biçûk bûn

9208. Emma wî kiçêt şeṛîf û dildar
Mazin bûne dane şu wî her çar

**Benatuhul Fuḍleyatî (Kiçên Wî yên Pirr Seng)**
**1. Zeynebul Kubra (Zeyneba Hêja)**

9209. Peyẋemberê piṛṛ buha û tebcîl
Hêşta bû nehatî weḥî û tenzîl

9210. Dabûne şwî sê kiçêt xû meʿlûm
Zeyneb çu Ruqeyye, Ummu Kulṯûm

9211. Zeyneb ku li xir kiçan mezintir
Bûlʿaṣî neṣîbê wî bû ew durr

9212. Ew hate esîr kirin li Bedrê
Zeyneb li Mekê dinêrî ecrê

9213. Gerdenliẋeka bi nav hebû wê
Bûlʿaṣî ku ber biden ji bû wê

9214. Gava ku nebî didît bi çavan
Dilşûtinê wî gehişt hinavan

9215. Bîrhateve wî Xedîce xane
Wî dabîye wê ji ḥubbê cane

9216. Peyẋemberî gûte wan hevalan
Eṣḥabê Bedr xudan kemalan

9217. “Ger berdeneve evî esîrî
Dê bîte nîşanê qedregîrî”

9218. Berdaneve wan belaş û taze
Her wek ku peyemberî niyaze

9219. Geryave dema bû Mekke Bûlʿaṣ
Gû: Izn e biçî bi şeṛṭekê xaṣ

9220. “Şeṛṭê me ewe dema tu çûy mal
Zeyneb tu fiṛêbikey bi her ḥal”

9221. Zeydê kuṛê Ḥariṯey şirînkar
Gel yek dî emîn ji qewmê enṣar

9222. “Hun her du herin digel wî taze
Bînin bû me Zeynebê bi naze”

9223. ʿEḥdê xû ewî bi cê gehandî
Zeyneb bû Medîneyê meşandî
***

9224. Pêş fetḥê Mekê diçît tîcaret
Geryave li Şam û geştê ẋaret

9225. Zur malê Qureyşîyan digel bû
Ew çunke emîn û çak ʿemel bû

9226. Nijdek ji Nebî gehiştibû wî
Talan dikirin çi ku hebû wî

9227. Ew xû bi tinê revî bû ẋemnak
Ta çu bi dizî Medîneya pak

9228. Wî xû bi şevê gehande yare
Ey Zeynebê ger bikey tu çare

9229. Min şeṛm e ji wan xudanê malan
Nav destê me xir biçît bi talan

9230. Zeyneb seḥerê dikir beyane
Bûlʿas ji me ra xudan eman e

9231. Peyẋemberî gûtî: Ey gelî yar
“Her çen me niye ʿilm bi ev kar

9232. Pê xûş im gelek me ev niyaze
Malê wî hemê bidenve taze

9233. Ger hûn we diken ji karê çak e
Wer ne ji we ra ḥelal û pak e”

9234. Wan gû: Me fîdayê serwerê me
Her emrê bikey li ser serê me

9235. Geryave bi cumle malî Bûlʿaṣ
Wî fikre bibî jinû Xudê nas

9236. Wî gûte Qureyşîyan: Jinû ve
Îslam dê bibim e jî ji xû ve

9237. Ev dîne me zanî piṛṛ durustî
Êdî nedikem ṣenemperistî

9238. Ew hate Medîne her di gavê
Ser ʿeqdê kevin jina wî davê

9239. Hîcret wî demî di ḥeft sal e
Bûlʿas jinû bû xudan kemale
***

9240. Yek kuṛ wê hebû ʿElîyê dildar
Hêj kiçke bû can siparte Ẋeffar

9241. Yek kiç jî hebû bi nav Umame
Xûşevye peyemberê enam e

9242. Ew bû ku Nebî ji bû dilê xû
Hilgirt di nivêjê ber milê xû

9243. Gava ku diçû rûkûʿi di danî
Wek rabû li secde da helanî

9244. Ev zerye li paşî Faṭîmayê
Înabû ʿElî bi keyf û şayê

9245. Hîcret bû duwazde çuye ber mal
Babê wê dimir di ʿeynî ew sal

9246. Hîcret digehişte salê heşt e
Zeyneb li cîhan çubû biḥeşte

**2 – 3. (Ruqeyyetu we Ummu Kulṡûmîn (Ruqeyya û Ummû Kulṡûm)**

9247. Êk êke Ruqeyye, Ummû Kulṡûm
ʿUṡmanî nîkah kirîne meʿlûm

9248. Meşhûr e li wan xudan du nûr e
Qedr û şeṛefa wê zûrê zûr e

9249. Peyẋemberî jîn gehî sîh û sê
Peyda bû Ruqeyye gencê qudsê

9250. Ewwel wî Ruqeyye dayê taze
Piṛṛ husn û cemal e piṛṛ bi naz e

9251. ʿUṡman ku diçûyî ew du caran
Bû nav Ḥebeşan li ber neyaran

9252. Her du seferan Ruqeyye xane
Ew gel wî bûye bi ʿîzz û şane

9253. Roja ku wefa bû kuṛte ʿumrê
Babê wê emîrê cengê Bedrê

9254. Sala du ji hîcretê yeqîn e
Bû bîst û sê sal wê ʿumr û jîne
***

9255. Ḥîna ku Ruqeyye kir wefate
ʿUṡman bû jinek dikir xebate

9256. Sê sal bû ji hîcretê bi meʿlûm
Peyẋemberî dayê Ummû Kulṡûm

9257. Hîcret dibû neh di mahê şeʿban
Ew çu li dinê bû baẋê îḥsan

9258. Weqtê eve jî li wî wefabî
Peyẋemberî gû şekker xîṭabî

9259. "Ṣed kiç me heban bi navê Reḥman
Êk êke me dê bidane ʿUṡman"

**4. Faṭîmetuz Zehraî (Faṭîma Zehra)**

9260. Sal du bû ji hîcreta resûl e
Wî daye şwî Faṭîmey betûle

9261. ʿUmrê wê digeşte şazde salî
Wî daye ʿElî û piṛṛ kemalî

9262. Ev lawe û şehsuwar û gence
ʿUmrê wî digeşte bîst û pence

9263. Ewladê ʿElî ji Faṭîmayê
Her wek ji te ra me gût berayê

9264. Sê kuṛ di şeṛîf û kanê quds in
Seyîd Hesen û Huseyn û Muhsin

9265. Kiç du ne ji wê betulê meʿlûm
Yek Zeyneb e ya dî Ummû Kulṡûm

9266. Muhsin ji ʿumir gehişte şeş mah
Canê xû siparte ẕatê Ellah

9267. Kulṡûm ji ʿUmer xelîfê ṡanî
Lê mehre dikir ʿElî ji canî

9268. Zeyneb wî didaye ʿEbdê Ellah
Kuṛmamê wî Ceʿferê xudan cah

9269. Her du Hesenêt qedir giran in
Ewladê di wan tijî cîhan in
***

9270. Piṛṛ feḍl û kemal e Faṭîma ye
Parçek ji resûlê Muṣṭefa ye

9271. Meḥbûb e li nik wî nazenîn e
Hember wê çi jin bizane nîne

9272. Nê gûtîye wê resûlê ekrem
Serdarê jinanî bijlî Meryem

9273. Ḥurî ṣîfet e melek suruşt e
Ser riştyeyê luiluêt biheşt e

9274. Wî çen divîya ve nazidare
Çen maçî dikir ji lêv û zare

9275. Çen carê zubanê xû didayê
Dabêjî: Bimêje Faṭîmayê

9276. Her ca çu sefer resûlê piṛṛ nur
Dumayê heman li wê bû destur

9277. Wer ew ji sefer dihate male
Pêşî hemîyan li wê sûale

9278. Zahid bû di vê cîhanê fanî
Ṭalib di kemalê cawîdanî

9279. Taʿet wê dikir gelek bi hîmmet
Ney ṭalibê mal û naz û nîʿmet

9280. Ney xudpesinî ne xudvîyanî
Ney ʿaşiqê xûşîya giyanî

9281. Bê nefs û hewa û bê ẋurur e
Karê wê ji vê cîhanê dûr e

9282. Her şulê heba dikir di male
Ney xadim û dûşek û ne pal e
***

9283. Meşhûr e ji wê diken rîwayet
Vêkra dikirin wê pênc ʿîbadet

9284. Destar wê dikir şirîn bi destî
Landik dihejand bi pê durustî

9285. Qurʾan wê dixwund digel şirînzar
Tefsîr wê dikir bi qelbê hişyar

9286. Dilṣuj digirî ji tirsê Barî
Rondik wê li çav dibûne carî
***

9287. Paş babî bi şeş mehan wefa bû
Sêzdey remeḍan bû piṛṛ ṣefa bû

9288. ʿUmrê wê gehişte bîst û şeş sal
Merqed di beqîʿe meqbera ʿal

9289. Peyẋemberî hîç ʿeqîb nema ye
Îlla ji kiça xû Faṭîmaye

9290. Ya Reb tu bi cahê ev peyember
Bû cahê jin û ḥerem seraser

9291. Paşî tu bi cahê van biçukan
Şûşî tu bikey ji çak sulûkan

**EZ-ZEHRETU'S-SADÎSETÎ (KULÎLKA ŞEŞÊ)**

Fî Eʿmamîhî we ʿEmmatîhî we Îxwetîhî we Exewatîhîr Rîdaîyyetî (Mam û Met û Xwîşk û Birayên Wî yên Şîrî)

**1. Eʿmamîhî (Mamên Wî)**

9292. Mamêt wî duwazde bûn bi ejmar
Bijlî du sêyan hemî di kuffar

9293. Ḥariṡ li heman mezintirîn e
ʿEbbas e kiçiktirîn yeqîn e

9294. Yek Ḥemze ye serwerê şehîdan
Yek Bûlehebê ji wan pelîdan

9295. Ẋeydaq û Quṡem digel Muqewwem
Yek ew Ebû Ṭalibê mukerrem

9296. Êkê dî Ḍîrar e yek Zubeyre
Yek ew Ḥecelê bi nav Muẋîre

9297. Êkê dî bi nav e ʿEbdê Keʿb e
Meşhûr bûne xir di qewm û şeʿbe

9298. Ger Ḥemze ye ger Îmamê ʿEbbas
Ew her du bi dîn bibûn Xudênas

9299. Bûṭalibî zûr hebûne nîşan
Neyxaṣme li pêş mirin bi îman

**a/أ ʿEmmuhu Ḥemzete (Mamê Wî Ḥemze)**

9300. Bîʿṡet bibû şeş wekî te zanî
Îman ku îmamê Ḥemze anî

9301. Qedrê wî li nik Nebî giran bû
Mamêt wî ve çêtirîn heman bû

9302. Ewwel ew e ku resûlê Barî
Sernijde bû duşminan hinarî

9303. Alayê ji pêş heman bi destî
Ew Ḥemze bû ku wî daye destî

9304. Derḥeq wî dibêt resûlê piṛṛ cah
"Ew şêrê min e û şêrê Ellah"

9305. Mêrçak bû gelek bi kar û bar bû
Kerxa wî li nêv şeṛan diyar bû

9306. Dilpak e bû dînî canfîda ye
Meḥbûbê peyemberê Xuda ye
***

9307. Du kuṛ wî hebûn di namidare
Yeʿle ye ewê dîtir ʿUmare

9308. ʿUmrê wî gehişte pênceh û neh
Ava bû li vê cîhanê ew meh

9309. Cengê Uḥudê wekî te zanî
Canê xû siparte ḥeq xudanî

9310. Serdar e ji bû hemû şehîdan
Ya Reb me bikey ji wan seʿîdan

**b/ب ʿEmmuhu ʿEbbasu (Mamê Wî ʿEbbas)**

9311. Bûlfeḍl e xudan meqam e ʿEbbas
Hem yar e Nebî û mam e ʿEbbas

9312. Mazintir e ew li yarê muxtar
Du sal nexû sê bi neqlê exbar

9313. Pêş fetḥê Mekî bibû musulman
Wê rojê xû kir diyar bi îman

9314. Zur xûş diviya resûlê ummet
Qedrê wî gelek digirt bi ḥurmet

9315. Peyẋemberî gût: “Qesem bi Barî
Îman di dilan ne dêbî carî”

9316. Ḥetta tu bivêy digel ʿeyalî
Ew bû min û bû wî Ẕulcelalî

9317. Wî paşî digûtî “Ey gelî nas
Dilêşî kesê biket bi ʿEbbas

9318. Bê şek li me ew xirabîkar e
Mam çunke ji babî şunewar e”
***

9319. ʿEbbasî dema ecel gehiştê
ʿUmrê wî gehişte heşt û heştê

9320. Ew mirbû dema xelîfe ʿUs̱man
Merqed di beqîʿe xakê îman

9321. Nesla wî tijî cîhan e piṛṛ cah
Lew Feḍl û cenabê ʿEbdê Ellah

9322. Meʿlûm e bi qewlê wan xebernas
Bapîrê me ye Îmamê ʿEbbas

**2. ʿEmmatuhu ʿEleyhî’s-Selam (Metêt Wî Silav lê Bin)**

9323. Şeş bûne metêt resûlê muxtar
Bê şek sê li wan hebûne kuffar

9324. Beyḍa û Umeyme ye û Berre
Ew çûne dumayê wan bi şeṛr e

9325. Îslam bû belê Ṣefîye xanim
Erwayê û ʿAtîkey nizanim

9326. Lewṛa ku heye xîlaf di wan e
Kî qewlê durust e ney beyan e
***

9327. Ṣefya xû li mêje bûye îslam
Ew day e ji bû Zubeyrê ʿEwwam

9328. Jin yek bû ji wan jinêt bijare
Dîndar û bikar û namidar e

9329. Meḥbûbê peyemberê Xuda ye
Qedrê wê digirt ji rengê daye

9330. Şeṛ kirbû ewê di cengê Xendeq
Wê rojê cwîyek dikujit muḥeqqeq

9331. Ḥeftê û sê bû wê ʿumr û jîne
Çu der li evê cîhan yeqîn e

9332. Weqtê ʿUmerî bû bîstî hîcret
Merqed di beqîʿe baẋê cennet

**3. Îxwetuhu we Exewatuhur Reḍaîyyetî we Muraḍîʿuhu (Xwîşk û Birayên Wî yên Şîrî û Dayînên Wî)**

9333. Heft xuşk û bira hebûn peyember
Ney ew di resen li şîrî yekser

9334. Şîr dabîye wî û Ḥemze mame
Gel Bûselemê S̱ûweybe nam e

9335. Şîrê kuṛê xû bi navê Mesruḥ
Hemʿumrê resûlê pak û memduḥ

9336. Kuṛ Ḥaris̱ê mamê wî Bûsufyan
Wî şîrê Ḥelîme xwar bi şayan

9337. Ew ʿEbdê Xudê kuṛê Ḥelîme
Hev ʿumrê peyemberê reḥîme

9338. Du kiç jî Enîse û Cuzame
Şeyma eve ye xudan du name

9339. Ger dayke Ḥelîme ger S̱ûweybe
Îmanê ewan di cayê reyb e

9340. Lew rojê Huneynê hat Ḥelîme
Bû nik wî peyemberê kerîme

9341. Rabuve li pêş wê piṛṛ ji canî
Wî taze ʿebayê xû bû danî

9342. Qedrê wê digirt bi ʿîzz û naze
Çen mal wî didayê pak û taze
***
9343. Hindek ji ṣeḥabe û hevalan
Ew çûne Hewazinan bi talan

9344. Şeyma jî digel ewan dianî
Wê gûtîye wan: Kesê bizanî

9345. Ez xuşke peyemberê zeman im
Nîşa me biden ḥebîbê canim

9346. Gava ku didît resûlê nûrîn
Qedrê wê digirt cewan û şîrîn

9347. Rondik wî xişîn li her du çavan
Dilṣûjî gehişt dil û hinavan

9348. Bîrhateve ʿumrê pêkve bûrî
Piṛṛ şewq û viyan li ḥeddê jurî

9349. Ferman kire wê resûlê piṛṛ nur
"Ḥez key tu li nik me bî qedirzur

9350. Bû qewmê xû ger te arezû ye
Manʿi nîye êdî keyfê tu ye"

9351. Gû: Qewmê xû min divêt ji canî
Îman wî demî bi ḥeq dianî

9352. Peyẋemberî danê çen merr û mal
Sê ʿebd û jinek jî cariyek ʿal
***
9353. Hêşta ku Nebî li Mekke xak e
Ḥîna ku li nik Xedîce pak e

9354. Her carê dihat S̱ûweybe daye
Bû lalî peyemberê Xudaye

9355. Qedrê wê digirt ji ḥubbê can ew
Neyxaṣme ḥerem Xedîce xan ew

9356. Paş hîcretê hem resûlê Barî
Car care dîyarî bû dinarî

9357. Ḥetta ku dimir S̱ûweybe nam e
Xeyber ku sitandibûn temame

**EZ-ZEHRETU'S-SABÎʿETU (KULÎLKA ḤEFTÊ)**

**Fî Kuttabîhî we Mueẕẕînîhî we Şuʿeraîhî we Xeṭîbîhî we Huddatîhî we Xedemîhî we Ḥeresîhî we Mewalîhî we Îmaîhî (Nivîser û Bangder û Hozanvan û Xuṭbexwîn û Beṛevan û Zêrevan û Sepan Kole û Carîyên Wî)**

**1. Kuttabuhuʿ Eleyhî's-Selam (Nivîserên Wî Silav lê Bin)**

9358. Katib wî hebûn di namidar e
Ew bîst û neh in heman bijare

9359. Her çar ji xelîfeêt peyember
Wek Ṭelḥe Zubeyreyê mubeşşeṛ

9360. Ew Seʿdê wî bab e Babê Weqqaṣ
Gel du kuṛê ew Seʿîdê bab ʿAs

9361. Yek Xalid e yê dî nav Eban e
Sabit kuṛê Qeysî êk ji wan e

9362. Hem ʿAmirê navê bab Fuheyre
Wek Ḥenẓele ê Rebîʿi bi xeyre

9363. Du yêt dî bi navê ʿEbdê Ellah
Bab Erqeme yê dî Seʿdê[1] piṛṛ cah

9364. Yek Ṣexirê Ḥerb[2] ku çen ṛeşîd e
Du kuṛ jî Muʿawîye û Yezîd e

9365. Zeydê kuṛê Sabitî di dil nur
Ew Xalidê bab Welîdê meşhûr

9366. ʿEmrê kuṛê ʿAṣî hem Muẋîre
Ê Şuʿbe bi navê bab Şehîre

9367. Kuṛ Ḥedremîyê ʿElae piṛṛ cah
Hem Îbnû Rewahe ʿEbdê Ellah

9368. Êkê dî Ḥuzeyfe bab Yeman ew
Kuṛ Keʿbê Ubeyyê navgiran ew

9369. Hem kuṛ Hesen e bi nav Şeṛeḥbîl

[1] Seʿd Îbnî Serʿi(Jêrenota Şuşî)
[2] Ew Ebû Sufyan Ṣexir bîn Ḥerb e (Jêrenota Şuşî)

Êk bûye ji katiban bi tebcîl

9370. Yek dû sê bû navê wî Muʿeyqib[1]
Yek ʿAmirîyê bi nav Ḥuweyṭib[2]

9371. Ḥaḍir bû çi kes ji van hema ye
Ew da pê nivîsî çî heba ye

9372. Ew Zeyd Muʿawîyê Bûsufyan
Nik wî bûne ew pitir ji hemyan

**2. Mueẕẕînuhu ʿEleyhî's-Selam (Bangderên Wî Silav lê Bin)**

9373. Çar in wî mueẕẕinêt di dengxûş
Her ḥez bû miruv ji wan biket gûş

9374. Yek wan Ḥebeşî Bîlalê meʿlûm
Yek ʿEmrê wî day e Ummû Mektûm

9375. Ew Seʿdê Qerẓ ku deng bilind e
Wî bang li Quba bû daye çend e

9376. Ewsî li Mekê bû car bi caran
Bû bange dida li nav neyaran

9377. Zêdey ji heman Bîlal e meşhûr
Merqed wî tijî ji reḥmet û nur

**3. Şuʿerauhu we Xeṭîbuhu ʿEleyhî's-Selam (Hozanvan û Xuṭbexwînên Wî )**

9378. Şaʿir wî hebûn feṣîḥzuban ew
Percanî dikir li dîn bi can ew

9379. Keʿbê kuṛê Malikî zubandar
Hessan kuṛê Sabitî ji enṣar

9380. Wek Îbnû Rewaḥe ʿEbdê Ellah
Hem taze ḥudî[3] digût bi dilxwah

9381. ʿAmir kuṛê Ekweʿî hunerdar
Pêş destê Nebî ḥudî digût car

9382. Malik puserê Berayê meşhûr
Her ca di sefer ḥudî digût zûr

9383. Wek Enceşeyê ku ʿebdereş bû
Gû pendî ḥudî bû dengê xweş bû

9384. Ṡabit kuṛê Qeysî kar ʿecîb e
Peyẋemberî ew ji dil xeṭîb e

**4. Xedemuhu we Ḥeresuhu ʿEleyhî's-Selam (Sepan û Zêrevanêt Wî)**

9385. Xidmet yê dikir bû car bi caran
Ew sêzde ne canfîda ji yaran

9386. Malik puderê Enes ji enṣar
Kuṛ Keʿbe Rebîʿeyê şirînkar

9387. Yek Eymenê day wî Ummû Eymen
Wek Esleʿê bab Şeṛîkê xûş ten

9388. Mesʿûd puserîş ku ʿEbdê Ellah
Buẕerrê Ẋîfarî yarê piṛṛ cah

9389. Ew ʿUqbe bi navê babê ʿAmir
Ummu Selema ʿebid Muhacir

9390. Hem ʿEbdê Ebû Bekir ku Seʿd e
ʿEbbasî wesa Ḥuneynê ʿebd e

9391. Bûlsemḥî bi nav Îyad e meşhûr
Yek eşlemî bû Nuʿeymê piṛṛ nur

9392. Ḥariṡ puderê Hîlalî nam e
Ev çende ne xidmekar zelame
***

9393. Pênc kes li jinan hebûne car car
Xidmet dikirin bû yarê muxtar

9394. Day Eymene yek ewa wî dayîn
Meymûne kiça Seʿd çi şîrîn

9395. Selma jî bi navê bab Bûrafʿi
Wek Xewle xudam resûlê şafʿi

9396. Hem Ummu ʿÎyaşê piṛṛ ji cewher
Carî bû Ruqeyye kiç peyember
***

9397. Wî bûne eger çi nûbedar e
Ḥeft in ji şeḥabeyan pijare

9398. Yek Seʿdê kuṛê Muʿaẕê piṛṛ nur
Meznê hemû ewsîyan bû meşhûr

9399. Kuṛ Meslemeyê bi nav Muḥemmed
Kuṛ Şuʿbe Muẋîreyê şirînqed

[1] Ew Îbnî ʿEbdulʿuzey e (Jêrenota Şuşî)

[2] Ew Îbnî Ebu Faṭim e (Jêrenota Şuşî)

[3] Stranên çêkirina motivasyonê bo şerî

9400. Yarê wî Zubeyrê bab e ʿEwwam
ʿEbbadê kuṛê Bîşir xudan kam

9401. Êkê dî Bîlalê namidare
Bûbekr e xû nûbedarê ẋar e

9402. Meʿlûm e bira di cengê Bedrê
Bûbekr e wî nûbedarê keprê[1]

**5. Mewalîhî we Îmauhu (Koleyêt Wî)**

9403. ʿEbdêt di peyemberê Xudayî
Ew hejde ne ser ḥeta dumayî

9404. Zeyd û kuṛê xû ku nav Usame
Bukebşe ji wan e Ewsî nam e

9405. Ṣaliḥ Ḥebeşî digûtnê Şuqran
Êkê dî Rebaḥe yek dî S̱uwban

9406. Êkê dî Yesare ê şivan bû
Babê wî ku Zeyd e hem ji wan bû

9407. Mîdʿem hebû ʿebdereş yeqîn e
Bûwaqid û Waqid û Sefîne

9408. Bûrafʿʿi û Enceşê te zanî
Şemʿun kuṛê Zeydî hem ji wanî

9409. Kuṛ Zeyde, Rîfaʿe ê cuẕamî
Mabûrê ji Qîbṭe nîkunamî

9410. Bûbekr e ji wan Nufeyʿi nam e
ʿEbdêt wî hemû ve bûn temame
***

9411. Carî wî hebûne heft bijare
Dûr nîne ji wan te zanî çare

9412. Reyḥane ji wan bû bê guman e
Wek Maryeya qedirgiran e

9413. Xuşka wê wekî te zanî Sîrîn
Day Eymene ya resûlî dayîn

9414. Selma jî jina Bûrafʿê çûy
Yê kûle bû ew resûlê xûb xûy

**6. Men Yeḍrîbul Eʿnaq Beyne Yedeyhî (Ewên Sizavan û Serbir)**

9415. Cellad wî hebûne şeş hunerwer
Wan ser dibirîn bi emrê serwer

9416. Yek ew bû ʿElî şehê nîkunam
Mîqdadê ʿEmir, Zubeyrê ʿEwwam

9417. Kuṛ Mesleme yê bi nav Muḥemmed
ʿAsim kuṛê S̱abitê şirînqed

9418. Sufyan puserê bi navê Ḍeḥḥak
Her şeş di bijare û di mêrçak
***

9419. Ger Seʿdê Muʿaẕê xûberû ye
Ew şibhî mudîrê şurṭe bûye

9420. Meʿlûm e Bîlalê nîkukar ew
Ew bûye li cê xezînedar ew

9421. Peyẋemberî gûtê: "Ey Bîlale
Tu taze bide çi hey ji male

9422. Ney tirsî çi ca şirîn bibexşe
Kêm nake xudanê ʿîzz û ʿerşe"

**EZZEHRETU'S̱-S̱AMÎNETU (KULÎLKA HEŞTÊ)**

Fî Beyanî Muʿcîzatîhî we delaîlî Nubuwwetîhî ʿEleyhîṣ Ṣelatu Wes Selam (Ronkirina Muʿcîze û Nîşanêt Peyemberatiya Wî Silav lê Bin)

**El-Muqeddîmetu (Berahîk)**
BÎSMÎLLAHÎRREḤMANÎRREḤÎM

9423. Subhan ji te ey Xudayê ekber
Çen ḥemd û s̱ena ji bû te yekser

9424. Ey Xaliqê piṛṛ celal û hîmmet
Wey ṣaniʿê piṛṛ kemal û ḥîkmet

9425. ʿAlîṣîfet î bilindeşan î
Bê ḥed mezin î û bê mekan î

9426. Ey reḥm û kerem te bê ḥisab e
Wey çen te şedîd û tal ʿezab e

9427. Dana te cîhan ji bû fenayê
Cennet te kirî cihê beqayê

[1] Sîwana ku bi karite û belgên daran hatine çêkirin

9428. Ev xelke te daye pirṛ nîẓame
ʿErş û felek û zemîn temame

9429. Cinn û beşeṛ û melek seraser
Mecbur te kirin bi emrî yekser

9430. Zêde ji heman beşeṛ bijare
Mazin te kirin bi hevẓ û bare

9431. Danê bi kerem te ʿeql û hûşe
Bê ḥed te ji nîʿmetêt di xuşe

9432. Bû wan te fiṛêkirin peyember
Her ummetê yek çirayê enwer

9433. Dînê xû te kir beyan bi wan e
Ev kare durust e ev ziyane

9434. Ev tişte ḥelal e ev ḥeram ew
Ev xêr e eva dî şeṛ nekam ew

9435. Ev rêke durust û ṛast û ʿal e
Ev kerxe şeqawet û ḍelal e

9436. Ev dergehê cennet û riḍayê
Xuşya ebedî bi ḥeq lîqayê

9437. Ev kerxe bi ṛenc û êş û pirṛ ẋem
Baʿis bi nexûşîya cehennem
***

9438. Serrişte peyemberan bû Adem
Ḥetta digehîte şahê xatem

9439. Bê perde kirin peyemberî wan
Ba her çî ku hate serserê wan

9440. Tu bûyî bû wan bi harîkare
Çen muʿcîze dane wan bijare

9441. Nadîde gelek ʿeceb nîşan e
Her êkî bi pêtivî zeman e
***

9442. Adem te birî bû jûr meqame
Esmaʿ te nîşa wî dan temame

9443. Jûrî melekan bi ʿîzz û naz e
Feḍla wî te kir beyan û taze

9444. Lewṛa ku te kir ji wan ve pisyar
Yekser dikirin bi cehlê îqrar

9445. Adem ku dikir beyan bû wan ew
Subhan ji te gûtî wan heman ew

9446. Ev çende Xudê me qeṭ nezanî
Ey ʿalim î tu bilindeşan î

9447. Her we ku te dayê feḍl û cah e
Bû cumle melek bi secdegah e
***

9448. Ṭufan te dida bû xaṭirê Nuḥ
Pê xendiqî kafiṛê siyehrûḥ

9449. Çêkir wî gemî bi xir xebatê
Çî gel wî hemû diçûn necatê

9450. Agir te di kirye xûş û ṣar e
Ser xaṭirê Îbrahîmê yar e

9451. Feḍla te pirṛ e bi kuṛ Xelîlî
Ew fîdye te dabû Îsmeʿîlî

9452. Musa bi ʿeṣa û destê nûrîn
Derya te bû kir bi rahê bûrîn

9453. Ḍerbek bi ʿeṣa dema wî danî
Derbûn ji berî duwazde kanî

9454. Asin te nerim dikir bû Dawud
Kuştî te bi bayî ʿAd ji bû Ḥûd

9455. Çen tiştê mezin te dan Suleyman
Ber emrê wî kir te ba bi ferman

9456. Yunis te xilaṣ dikir ji masî
Yeʿqûbî bînahî lew kirasî

9457. Yusif te dikir ji zelle[1] qurtar
Burhan te nîşa wî da bû hişyar

9458. Eyûb te ji paşî çendî salan
Gel çendî bela û êş û nalan

9459. Ew çêbîyeve bi aveka ṣar
Ṣaẋbuve giyanê wî wekî car

9460. Westandî bû Yuşeʿî te xurşîd[2]
Idrîs te bire meqamê temcîd

9461. ʿÎsayî te danê çen ʿecebkar
Ṣaẋ kireve bi tu mirî wî çen car

[1] Şaşî kirin, xeta kirin

[2] Tav , roj

9462. Ser gûr û bereṣ wî dest di malî
Çêbûne bi iz̠nê Z̠ulcelalî
***
9463. Xaṣma bi resûlê xûy Muḥemmed
Çen muʿcîze nê te danê bê ḥed

9464. Nîṣanê peyemberî ne yekser
Dilmurde[1] ye çî neînî bawer

9465. Nîṣanê nubûwweta wî zûr in
Kûmkirnê heman ji kar me dûr in

9466. Nê ṣêxê Zemexṣeṛî dibêjî
Ruḥma xû Xudê bi ser birêjî

9467. Ew newʿe xewariqêt[2] diyare
Geṣtîne jimarê yek hizar e

9468. Ger yar bî Xudê bi harîkarî
Çendek dê bibêm bi yadigarî

**a/ͥ Numûzecun mîn Muʿcîz̠atîhî es-Semawîyyetî (Nimûnek ji Muʿcîz̠atên Esmanî)**

**1. Kewnuhu Ummîyyen (Nexwendewariya Wî)**

9469. Peyẋemberê mey resûlê ʿalem
Serdarê peyemberan û xatem

9470. Meʿlûm wekî rojê ron diyar e
Ummî bû yeqîn ne xwundewar e

9471. Ney xwundî elîf ne sîn û ṣîn e
Ney zanî ḥerif ji ṣeṛʿ û dîn e

9472. Qewmê wî bi çan û xwarê Mekke
Hem ew jî nexwundewar ne ṣekk e

9473. Mazin bû li nîvê wan ṣirînkar
Ney kirbû sefer bû ʿîlmî yek car

9474. Încîl e eger Zebûr û Tewrat
Ney zanî ji wan çi sîfr û ayat

9475. ʿUmrê wî li çarê ta bi çil sal
Qewmê wî didît wî kar û eḥwal
***
9476. Nîvmêr e eger xû newcewan bû
Her dem li çel û çiya ṣivan bû

9477. Geh kasib[3] e ew di karê jîn e
Geh tacir e lê ku çen emîn e

9478. Carek du eger çu Ṣam ji canî
Karwanî bû wan heman dizanî

9479. Ger ew bû xudan jin û ʿeyal e
Ḥalê wî heman didît çi ḥal e

9480. Ger ew hemû roj diçûne nadî
Wan ṣiʿir digûn bi keyf û ṣadî

9481. Yek car neçû nik ewan yeqîn e
Ney xuṭbe digû ne ṣiʿirxwîn e

9482. Nageh wî ʿumir bû çil temam e
Ew bûye xeṭîbê xir enam e

9483. Wek beḥrê ʿîlim tijî ji mewc e
Her çî jê xeber didet çi qenc e

9484. Seyrê ke ji ʿilmê ew çewa ne
Navê wî tijî kuṛey cîhane

9485. Ta dunê çewa nezan bi exbar
Evruke çewa bû gencê esrar

9486. Çil sal bû çewa dibêjî lal e
Evroke ji nutqê bê mîs̠al e

9487. Ev ʿîlm e û ev kemal û ḥîkmet
Ev dîn e bi ev nîẓam û hîṣmet

9488. Ev hinde qîṣeṣ zemanê çûyî
Ev hinde xeber ku hêj nebûyî

9489. Nîṣan e belê gelek diyar e
Ney ṭaqetê kes nexwundeware

9490. Belkî ji Xudayê ʿalemîn ew
Xir weḥy e ji bû wî hat yeqîn ew

9491. Her kes bi heman neînî îman
Wer bêjê bi nûr e bes tu Qurʾan

**2. el-Qurʾanul Muʿcîz̠ul Beyanî (Qurʾana Piṛṛ Hiner û Aṣkera)**

9492. Êkê dî peyemberê me nîṣan

[1] dilmirî
[2] Muʿcîze, bûyerên awarte
[3] Ṣolker

Qurʾan e ewa ʿeẕîm û piṟṟ şan

9493. Bê şek qureşî di wî zemanî
Meşhûr bûne piṟṟ feṣîḥzubanî

9494. Ehlê qise û zuban rewan bûn
Guyînde bi xuṭbe û beyan bûn

9495. Ezmanê ʿereb cewan dizanî
Ba nukte û remz û ba meʿanî

9496. Eṣḥabê feṣaḥet û belaẋet
Bû fennê zuban xudan siyaẋet[1]

9497. Ustaẕê kelamê şiʿir û menşûr
Çen şaʿir û çen feṣîḥ di meşhûr

9498. Ems̱alê Welîdê Bab Muẋîre
Wek ʿUtbe Rebîʿe bab Şehîr e

9499. Peyẋemberî çen digûte wan e
Qurʾan ji Xudayê asemane

9500. Bê mîs̱l e kelamê xûy qedîm e
Ew gencê ʿilûme zûr ʿeẕîm e

9501. Ney ḥeddê min e ne ḥeddê her kes
Ev neẕm û beyan û şeṟʿê eqdes[2]

9502. Ger xirvebibin çi îns û can e
Şibhî wê neşên biken beyane
***

9503. Çen carê digût bi zarê Qurʾan
"Ger hingû bi wê çu îman"

9504. Qurʾan ʿerebî zuban e meʿlûm
"Çen şaʿir û piṟṟ zuban biken kum"

9505. Wan xudpesinan feṣîḥzubanan
Erbabê belaẋet û beyanan

9506. "Ger hûn hemîyan di xû dibînin
Yek ṣûretê wek wê bû me bînin

9507. Ger hûn neşiyan û hûn neşên her"
Hun çak e biken yeqîn û bawer

9508. Lazim nîye ev ʿînad û kîne
"Hingû digirît Xudê yeqîn e"

9509. "Hun lazim e jê gelek bitirsin"
Serhatîyê qewmê çûyî bipirsin

9510. "Ḥaḍir kirîye wî agirek har
Bû cumleyê kafiṟêt di bedkar"
***

9511. Her kes bi ṣefayê dil bibînît
Vê muʿcîzeyê cewan bixwînît

9512. Dê zanî ewan ṣenemperistan
Ser dînê xû ew di rişt û çustan

9513. Ew hinde xudan ʿînad û kînan
Derḥeqqê resûlê şeṟʿ û dînan

9514. Wan hinde hewl didan bi her ḥal
Qaniʿi wî biken bi cah eger mal

9515. Ta Lat û Hubel nebin nikûnser
Ew dînê kevin nebîte ker ker

9516. Ger wan hebiya di can şiyane
Ev şule tinê bi ser zuban e

9517. Ney ʿîlm e ne ṣinʿet û ne quwwet
Ney karekê hin ʿecîb bi dîqqet

9518. Ew bûn ji zuban li jûr meqamî
Ew bûn ji ʿeqil ʿeqil temamî

9519. Çen mezneʿeşîr û begler û mîr
Çen pîrê xudanê ray û tedbîr

9520. Wan çen dikirin he roj meşûret
Ger ew di şiyan bi êk ji suret

9521. Wan dest ne dida bi tîr û şîran
Wan xwun nedirêt ji can û pîran

9522. Şulek bi zuban bibît muyesser
Ḥacet niye gurz û şîr û xencer
***

9523. Çî fikrê biket bi huşiyarî
Vê muʿcîzeyê biket gudarî

9524. Yek muʿcîze bê mîs̱al e ekber
Nîşanê nubûwweta peyember

9525. Meʿlûm e li layê huşiyaran
Ḥetta xû li nik ewan neyaran

9526. Wan taze dinasî ṟasteGû ye

---

[1] Pispor

[2] Herî pîroz, herî mubarek

Qeṭ jê nedî xwarî û diruye
Dilxûş dê bijîn bi dilevînî

9527. Wî gûte ewan bi zarê Qurʾan
Ṭaqet we nîye bi karê Qurʾan

9528. Çen seʿiyê biken ḥeta bimînin
Yek ṣûretê hûn neşên bihînin

9529. Pişta wî eger gerim nebaye
Ev muʿcîze bes li nik Xudaye

9530. Ew ney dişîya bi aşikarî
Vê gûtê biket di nêv neyarî

9531. Her çendî zelam xudan kemal e
Ser karê xû nik xû bê mîs̱al e

9532. Nabêjî eger xû huşiyare
Wek karê me kes neşêt çi care

9533. Ma kî ji beşeṛ yeqîn dizanî
Wek karê wî kes ebed netanî[1]

9534. Çen cînn û beşeṛ biken xebate
Wek pîşeyê min ji wan nehate

9535. Ger ev qise ney ji şahê ekber
Nabêjî kesê ʿeqil tijî ser

9536. Neyxaşme resûlê pakê muxtar
Serdefterê ʿaqilan û hişyar

9537. Nêv qewmê we piṛṛ ʿînad û bednav
Daẋdarê şikandina wî her gav

9538. Ger ew dişiyan bi tazerenge
Ma wan ku dikir cîdal û cenge

***

9539. Yek rojê peyemberê enamê
Tenha bû di Mescîdul Ḥeramê

9540. Cemyane Qureyşî çen di nadî
Dilkul hemû ber resûlê hadî

9541. Bû ʿUtbe kuṛê Rebîʿe ḥadir
Zana bi kelamê siḥr û şaʿir

9542. Gû: Ez dê biçim bû nik Muḥemmed
Çen meṭlebekan ji bû dikem ʿed

9543. Ew belkî ji dîn me waz bihînî

9544. Çu gûte resûlê nazidare
Çen tişt ji te ra dikem jimare

9545. Wî gû: “Çi li nik te hey bibêje”
Daẋa di dilê xû çak biṛêje

9546. Gû: Çî te divê ji min bixwaze
Dê deyne te her çî tu niyaze

9547. Ger dê te bivê ji zêr û malî
Dê deyne te em ji dil ḥelalî

9548. Wer dê te divê bibî bi mîrser
Em xir ji te ra dibîn emirber

9549. Peyẋemberî gû: “Xilaṣ te guftar
Wêca tu ji min bi mîn e guhdar”

9550. Wî taze bi lehce û pesindî
Ser ṣûretê Fuṣṣîlet bû xwundî

9551. ʿUtbe bi dil û bi guh diket gûş
Medhuş ji ewî kelamê wey xûş

9552. Ḥetta digehişte secde ayet
Çu secdê peyemberê hîdayet

9553. Gûtê: “Xû cewan te kir gudarî
Ey babê Welîdê huşiyarî”

9554. Wî gûtî: Belê bi guşê canî
Ser karê xû be tu wek dizanî

9555. Geryave bû nadî piṛṛ heval e
Ey Babê Welîdî ḥal çi ḥal e

9556. Wî gûtî: Biken ji min ve bawer
Guh lê bû me jê kelamê şekker

9557. Husta me ji dil bi şiʿirê şaʿir
Zana me bi nirme nirmê saḥir

9558. Min dîne ji kahinêt zeman e
Wellah ne ew çi êk ji wan e

9559. Ey cumle Qureyşîyan temamî
Berden ji berûkê[2] vî zelamî

9560. Ez sundê dixwum bi navê Ellah

[1] Neşîya, nekarî

[2] berser

Ew dê bîbi serfiraz û piṛṛ cah

9561. Wî bû me vexwundî êk ji ṣûret
Ta geşte qisek bi tirs û heybet

9562. Gû: “Ez dê bidem we tirs û îẕnar
Yek baw û birîskê têz û duşwar

9563. Ku ʿAd û S̱emûd birin fenayê”
ʿÎbret bigirin ji huş û rayê

9564. Gava ku gehişte vî kelamî
Min taze digirt devê zelamî

9565. Em xizmê te yîn ji êk ʿeşîr în
Nifrîn ji me tu nekey ne şîrîn

9566. Meʿlûm e gelî Qureyşî û yar
Nabêjî diru ve şexṣe yekcar

9567. Min kefte dilî tirs tijî can
Xaliq bidetin me qehreka pan

***

9568. Carek dî Welîdê bab Muẋîre
Yek bûye feṣîḥzuban û pîr e

9569. Wî gûte resûlê navşirîn e
Qurʾanê hinek bû min bixwîne

9570. Peyẋemberê hatî bû hîdayet
Bû taze vexwundî êk ji ayet

9571. “Ellah e emir diket bi îḥsan
Çakî û ʿedaletê bi însan

9572. Gel xizm û kesan gelek bi çakî
Parêzê ji feḥşî û nepakî

9573. Her karê ḥeram û ẋedr û har e
Ev renge Xudê neṣîḥekar e”

9574. Ayet ku bû wî cewan vexwundî
Guhdayê belê bi huşimendî

9575. Carek dî gûtî bû min bixwîne
Dubare vexwundî çen şirîne

9576. Wê gavê Welîdî xwarî sunde
Ev gûte gûtî gelek pesind e

9577. Şîrîn e belê ji dil cewan e
Ney ṭaqetê cumle îns û can e

9578. Çu gûte Qureyşîyêt di kafir
Mis̠lê me çi kes we nîne şaʿir

9579. Wî bû me vexwundî êk ji ayet
Şîrîn û cewan û pak bû ẋayet

9580. Wê jêrî bi ṭerḥ[1] û ṭayê ter bû
Wê jurî bi fêqî û hes̠er bû

9581. Ev neẓme ne karê cîn in û îns e
Belkî ji Xudayê pak û quds e

9582. Ev gûte diçîte jûr meqamî
Dengek dê bihêt ji vî zelamî

***

9583. Elqîṣṣe çi piṛṛ kemal e Qurʾan
Yek muʿcîz e bê mîs̠al e Qurʾan

9584. Sengîn e gelek ji dil şirîn e
Rengîn e çi gencê ʿilm û dîn e

9585. Qanûn û şeṛîʿetê Xuda ye
Bû cumle kuṛey zemîn çira ye

9586. Bû çendî beşeṛ di her zemanan
Çî milletê hey di her mekanan

9587. Piṛṛ ʿilm û ḥîkem tijî ji esrar
Piṛṛ nukte û remz û piṛṛ ji enwar

9588. Ta maye bi canve ev cîhan pîr
Bin nayê ji wê ji ʿilm û tefsîr

9589. Neẓma wê feṣîḥ û ʿal e ẋayet
Deryayê ʿilûme bê nîhayet

9590. Çen şaʿir û lawjebêj bijare
Çen ehlê zuban di namidar e

9591. Wan çen dikirin bi can xebate
Yek sûretê kuṛt ji wan nehate

9592. Hel hingî ḥeta bi vî zemanî
Mis̠lê wê belê çi kes neanî

9593. Dê her we bî ta cîhan dimînî
Şibhî wê ebed çi kes nedînî

---

[1] Belavbûn, hes̠er: libên fêqîyan.

9594. Seyrêke hizar hizar kîtaban
Şiʿrêt di cewan û pan xîṭaban

9595. Ka êkî dibînî nav heman e
Nêzîkî ve muʿcizul beyan e

**3. Înşîqaqul Qemerî (Kerbûna Heyvê)**

9596. Peyẋember û nûrê xir enamê
Yek şev bû di Mescîdul Ḥeramê

9597. Royê wî çu meh temam û nûrîn
Xulqê wî wekî royê wî şîrîn

9598. Yek heyv e şevê ku meh temam e
Gel seyrê felek li jûr meqam e

9599. Ageh ne ji kar û barê ḥeq ew
Nazanî ku dê bibîte şeq ew

9600. Nazanî ji bû resûlê enwer
Dê ev şeve ew bibîte du ker

9601. Ew ev şeve dê çi behrewer bî
Der xidmetê serwerê beşeṛ bî

9602. Cemyan e ji muşrikêt di meşhûr
Wan keç neẓerêt bi can û dil kuṛ

9603. Wek pîre Welîdê bab Muẋîre
Bûcehlê Hîşamê can ḥeqîr e

9604. Wek Eswedê Muṭṭelib siyehkar
Neḍrê kuṛê Ḥarisê ẋereḍdar

9605. ʿAsê kuṛê Waîlê mirare
Emsalê di wan gelek bijare

9606. Gûtin bi resûlê îns û can ew
Daxwaz e ji te me yek nîşan ew

9607. Ger ṛast e Xudê tu day peyember
Heyvê ji me ra bigêre du ker

9608. Wî ro kire dergehê miradan
Ey dadresê xudanê dadan

9609. Ev muʿcîz e wan ji min meram e
Ya Reb tu du ker ke meh temam e

9610. Ger min bi te ye ve karê deʿwet
Her min bi te ye şiyan û quwwet

9611. Ew mezine Qureyşîyan heman e
Lê bûn ji dilê xû piṛṛ tiran e

9612. Ṭaqet kê heye gûtin ji canî
Teisîrê biket di asemanî

9613. Nê meṭlebê wî ji şahê ḥeq bû
Ew mah e bi qudreta wî şeq bû

9614. Wan dîtî heman bi çavê ser ew
Ew mahe temame bûyî du ker ew

9615. Wan dîtî Ḥîra li beynê du ker
Wê gavê digûte wan peyember

9616. Xû engûbi çavê ser dibînin
"Wêca ji me şehdeder bimînin"

9617. Bawer pê biken ve taze nîşan
Hun baş e biken qebulê îman

9618. Min bû we divê kemal û xûşî
Xêra du cîhan bi ʿeyşê nuşî

9619. Vî dînî kesê neket qebule
Dê bît di cehennemê melule

9620. Ew kume Qureyşî bûn belave
Wan ṭarîdilêt di kuṛ ji çave

9621. Ḥeyrîne ji vî mezin nîşanî
Wan kufr û ʿînad tijî ji canî

9622. Wan êk dî gûtin ku her di ḥîne
Ev renge siḥir me qeṭ nedîne

9623. Hindan we digû ji huşiyaran
Ḥeddek heye siḥrê siḥirkaran

9624. Ger wî ji me kirbî siḥr û ḥîle
Natanî biket ji xir qebîle

9625. Rêvîngê dihên biken jê pisyar
Karwanî û ehlê çul û rê û bar

9626. Geryaneve çen ji karewanan
Ehlê Mekehê ji dûr mekanan

9627. Pisyar jê kirin ji mahê du şeq
Gûtin: Me dîye bi çav muḥeqqeq

***

9628. Çendan ji şeḥabe piṛṛ dîrayet
Vê muʿcîzeyê diken rîwayet

9629. Çen rawî çu Muslîm û Buxarî
Reḥmet ji me û ji wan bibarî

**4. Redduş Şemsî ʿEleyhî's-Selamî we Ḥebsuha Mînel Xurûb (Vegeryana Rojê bo Pêxemberî û Gîrobûna Wê ya Avabûnê)**

9630. Yek dî ji nîşan resûlê dînî
Geryave ji bû wî roj yeqînî

9631. Şêxê Ṭeberanî ew dibêjî
Reḥma xû Xudê bi ser birêjî

9632. Ya gûtî jinek ṣeḥabe dilnûr
Esma ye kiça ʿUmeysê meşhûr

9633. Rojek bû Nebî li xakê Xeyber
Serdanî bû kuşê yarê Ḥeyder

9634. Meşẋûl bi weḥî bû date xware
Ta roj bû nîhan li xir diyare

9635. Gava ku xilaṣ bû weḥî û tenzîl
Wî gûte ʿElî bi qedr û tebcîl

9636. "Aya te kirî nivêjê êvar"
Wî gûtî: Ne ey te ez fîdakar

9637. Wî rokire layê asemanî
Ya Reb tu ʿElîm î tu dizanî

9638. "Ev bûye di taʿetê te şîrîn
Hem taʿetê qaṣidê te bû dîn"

9639. Carek dî vegêre rojê taze
Ḥetta ji te ra biket nemaze

9640. Esmayê digû: Me dît bi çava
Roj bû li ufuq temamî ava

9641. Carek dî li cê xû ew helate
Ronbuve dubare xir welate
***

*5.*

9642. Ḥîna ku Nebî çu asemanî
Ew qîṣṣe wekî temam te zanî

9643. Peyẋemberî gûte wan Qureyşan
"Ez ṛast dibêm ji bû we nîşan

9644. Min dîtî ji rêve karewane
Wenda bibû ḥêştirek ji wan e

9645. Min kirbû selam ji wan bi seng e
Wan nasî ji min ṣeda û denge"

9646. Gûtin wî: Eger tu ṛast beyan ew
Dê kengî bi hêtve karewan ew

9647. "Çarşenbî gûtî digehte êre"
Wê rojê dibûne çavenêre

9648. Êvar e û roj xû çuye xware
Ew qafîle hêj ku nadiyare

9649. Peyẋemberî kir duʿa ji Barî
Ey her te xudan û harîkar î

9650. Ragirtibû roj di asemane
Ḥetta ku dihatve karewane
***

*6.*

9651. Westa bû ji bû wî roj muḥeqqeq
Ḥîna ku ewan dikulî xendeq

9652. Meşxûl bûne xir bi ew şirînkar
Nêzîkbû biçît nivêjê êvar

**b/ب Tesbîḥut Teʿamî wel Ḥesa Fî Keffîş Şerîfî (Tesbîḥatî Zadî û Berka di Destê Pak da)**

*7.*

9653. Ew bû me neqil diket Buxarî
Ṣed feyḍ û kerem ji wî bibarî

9654. Yê gûtî ji bû me Îbnû Mesʿûd
Em bûyîne li nik resûlê piṛṛ cûd

9655. Zadek me dikir bi nuşê cane
Wî zadî zikir dikir ʿeyane

*8.*

9656. Şeyxê Ṭeberanî cayê bawer
Neqlê diketin ji zar Ebû Zer

9657. Peyẋemberê piṛṛ buha û piṛṛ nur
Kirbûne di destî ḥeft berêt hur

9658. Tesbîḥ jê dihat bi dengê ʿalî
Ḥetta me gulêbû kirne nalî

9659. Wî paşî kirin di destê Ṣeddîq
Tesbîḥ he dikir ewan bi teḥqîq

9660. Paş kirine di dest Xelîfê s̱anî
Tesbîḥ he dikir ewan ʿeyanî

9661. Wî paşî kirin di destê ʿUs̱man
Tesbîḥ me gulêbû her dikir wan

9662. Wî paşî kirin di dest me van e
Êdî çi nehatî deng ji wan e

***9.***

9663. Hem Qaḍî ʿIyaḍê piṛṛ buha ye
Gûtî di kîtabê xûy Şîfa ye

9664. Ceʿfer xû dibê ji bab û bapîr
Naxûş bû hinek resûlê tebşîr

9665. Cibrîl wî demî dihate xware
Îna ṭebeqek tirî w hinare

9666. Tesbîḥ he dihat ji mêweyê ter
Ser xaṭirê nûrê can peyember

***10.***

9667. Zar Cabirî hem dibêt Budawid
Vê muʿcîzeyê ji menbeʿê cûd

9668. Yek cwî jinê anî bû peyember
Gûştek bû tijî jehr di Xeyber

9669. Jê xwarî peyemberê Xudayî
Gel Bîşrî bi nav kuṛê Beraî

9670. Ew Bîşr e dimir di gav û ane
Wî destî ji gûştî da beyane

9671. Gût ey tu resûlê nav Muḥemmed
Piṛṛ jehre kirîme cwî jina bed

9672. Peyẋemberê pak û piṛṛ kemal e
Jî paşî jehr çuwar ji sale

9673. Car care ji ber giyan diêşa
Ta axirî canê pak jê kêşa

9674. Ya Reb bi fîdayê canê wî bim
Ta mayme ji xadimanê wî bim

**c/ج Teslîmul Ḥecerî ʿEleyhî's-Selamî we Ṭaʿetul Cemadatî Lehu (Silavkirina Bera û Ṭaʿetê Bêruḥa Ser Wî Silav lê Bin)**

***11.***

9675. Muslîm we dibê ji zarê Cabir
Yê gûtî resûlê pak û ṭahir

9676. "Yek ber heye nêv nuwalê Mekke
Ez taze wî nas dikem ne şekk e

9677. Her carê diçûme ew meqame
Wî taze ji min dikir selame"

***

***12.***

9678. Hem gûtîye Tirmizî ji exbar
Ev gûte ji zar xelîfeyê çar

9679. Ez bûme digel Nebî mubarek
Em çûyne derê ji Mekke carek

9680. Her dar û beran digût ji her gah
Ey ser te selam resûlê Ellah

***

***13.***

9681. Yê gûtî Ebû Nuʿeym û Bezzar
Ev gûte ji Aîşey şirînkar

9682. Fermanê resûlê nazidar e
"Ḥîna me weḥî bû hate xware

9683. Her dar û berêt diçûme nik wan
Da bên: Ji te ey selamê Reḥman"

***

**14.**

9684. Hem gûtîye Beyheqîyê piṛṛ nûr
Yê gûtî Ebû Useydê meşhûr

9685. Peyẋemberî gûte mamê ʿEbbas
Ey babê feḍl tu ey Xudênas

9686. "Tu der nekevî digel tefale
Ḥetta ku ṣube dihême male

9687. Ḥacet me heye bi hûn heman e"
Ew man ṣubehî hemû di xane

9688. Çu xanîyê wan resûlê enwer
Royê wî çu meh zuban çu şekker

9689. "Ey ser we heman selam û reḥmet
Ḥalê we çi ye çi reng e ṣiḥḥet

9690. Gû: Xirvebibin hemû tebayî"
Dapûşîne xir bi pak ʿebayî

9691. Gû: Rebbî tu pak û ʿalî şan î
"Ev mamê min e xû tu dizanî

9692. Ev alê min in heman tu dapûş
Dûr bêxe ji agirê we naxûş"

9693. Dîwar û der û berêt derazîn
Sê car hemîyan digûtî amîn

***15.***

9694. Gûtî ji Enes îmam Buxarî
Ey luṭfê Xudê ji wan bibarî

9695. Peyẋemberê piṛṛ buha û piṛṛ nur
Rojek çu Uḥud çiyayê meşhûr

9696. Gel wî bûne sê heval û yare
ʿUs̱man û ʿUmer çu Yarê Ẋare

9697. Lerzîbû Uḥud ji bin piyane
Lêda wî bi pê xû gût cewane

9698. Raweste Uḥud bigir qerar e
Ser tu ye peyemberek bijare

9699. Ṣiddîqek û du mezin şehîd in
Sê pakexelîfeêt seʿîd in
***

***16.***

9700. Hem Qaḍî di nêv Ṣîfa kîtabê
Ew bû me dibêt ve xûş xîṭabê

9701. Ḥîna li Mekê Nebî perêşan
Ḥalê wî ji destê pîs Qureyşan

9702. Carek bû li ser S̱ebîr çiyayî
Wî gûte peyemberê Xudayî

9703. Ser min tu here me tirse piṛṛ can
Ser min bikujin te qewmê nadan

9704. Xaliq diketin ji min ʿîqabê
Ber wan diṣujim di wê ʿezabê

9705. Gazî kire wî Ḥîra çiyayî
Bû ser me were bi xêr û şayî

9706. Kêmxadimek im bi min neẓer ke
Tu min bi pîyêt xû behrewer ke
***

***17.***

9707. Hem neqlê diket xudanê Enwar
Zar Fexr û Îmamê Razî guftar

9708. Def avekê bû resûlê mehtab
Hat ʿÎkrîmeyê Ebû Cehil bab

9709. Wî gûte peyemberê munewwer
Ger ṛast û durust e tu peyember

9710. Gazîke berê he bêt di gavê
Gel şeṛṭê niqû nebît di avê

9711. Gazî kirê qaṣidê Xudaye
Ber leqleqî hate der ji caye

9712. Ew hat bi melewî hişke pişte
Ew hat û li pêş wî westî qişte

9713. Bawer me heye gûtî ji canî
Peyẋemberê axirê zeman î

9714. Peyẋemberî gû: “Te hatî bawer”
Gû: Ta wekî xû biçîtve ew ber

9715. Peyẋemberî gû: “Heref cihê car”
Ber çuve bi ser wê avê kir ẋar

***18.***

9716. Beyḍawî dibêjî: Hat ji exbar
Mîn cumle ji Muslîmê xeberdar

9717. Roja li Bedir resûlê ekmel
Muşrik dî dihên li lay ʿEqenqel [1]

9718. Piṛṛ fexr û sirûr û piṛṛ ẋurûr e
Piṛṛ mal û çek û bi ceyşê zûr e

9719. Wî ro kire layê asemanî
“Ya Reb tu ʿElîm î tu dizanî”

9720. Muşrik ve dihên bi fexr û piṛṛ kîn
Peyẋemberê tu diken dirûhîn

9721. Ya Reb bide weʿdeyê te dayî”
Cibrîl wî demî hinart Xudayî

9722. Gû: Bigre tu çengekî ji axê
Pavêje Qureyşîyan di kaxê

9723. Ḥîna digehişte êk du leşker
Ew roj wî li duşminêt xû ṛeşkir

9724. Çengek wî hilanî piṛṛ ji xîze
Havêtîye qewmê natemîze

9725. Ev xîze bi qudreta Xudayî
Her êkî hinek di çav gehayî

9726. Her êk bû bi çavê xû perêşan
Lew cumle revîn bi ah û êşan

9727. Bedrî li du wan bi rumḥ û şimşîr
Hindan dikujin hinan jî êxsîr

---

[1] Navê cihekî ye(Jerenota Şuşî)

***19.***

9728. Hem gûtî Buxarî namidar e
Zar êkexelîfe yarê ẋar e

9729. Ḥîna me di rahê hîcreta pak
Nageh medî hat suwarekê çak

9730. Malik puserê Suraqe nav e
Kuṛ bûyî ji ṭemeʿi dil û du çave

9731. Ew hat bi çek û sîlaḥ û zûr e
Zîrek ji dilê xû piṛṛ ẋurûr e

9732. Nêzîkî me bû bi emrê Barî
Yek ṣetme bi wî dikir dewarî

9733. Rabuve pîyan deranî Ezlam[1]
Derkeftî ewa ji bû wî nakam

9734. Emma wî bi wan nekir gudarî
Dubare hicum dikir suwarî

9735. Nêzîk bîyeve bi emrê Cebbar
Ta çukî dewar di axê çu xwar

9736. Hem bû serûser dirêjî ʿerde
Ew gencesuwarê serbiderd e

9737. Carek dî înane der wî Ezlam
Hem hatî ewa nexûş û bê ṭam

9738. Wî taze hewar dikir: Eman e
Îna sekinî Nebî ji cane

9739. Bû xwastî duʿa ji kirdigare
Derhatî digel dukel deware

9740. Ev muʿcîze ta nede bi çav ew
Ew ney bû ji pîs xeyalê xav ew

9741. Ev care suwarbû ser dewarî
Ew hat bû rexê resûlê Barî

9742. Wî zanî di dil ku ev peyember
Axir dê bibît emîr û mîrser

9743. Wî gûte nebî: xû qewmê tey bed
Çen ser te ẋem û xebat e bê ḥed

9744. Her kes te biket esîr çi bê can
Ṣed ḥêştirî ew diden bi erzan

9745. Gû: hûn çi divêt çi tişt û zadî
Ez dê deme we bi keyf û şadî

9746. Peyẋemberî gû: "Ne pêtivî ne
Bes navê me bû çi kes neîne"

9747. Wî gûte resûlê ʿal cenabe
Binvîse ji bû me yek kîtabe

9748. Ger engûbûyîn bi ḥukimranî
Êmin me bibîn bi mal û canî

9749. Peyẋemberê piṛṛ kemal û xeyre
Gût ʿAmirê navê Bab Fuheyre

9750. "Binvîse ji bû kîtabê rengîn"
Hem gûte Suraqe: bû te mizgîn

9751. "Rojek dê bihêt tu xûş û xendan
Du bazinê kîsrewî di zendan"

9752. Ev weʿde çiku ji layê ḥeq bû
Kîsrayê me payê textî leq bû

9753. Ser ʿeḥdê ʿUmer xelîfê ṯanî
Ew weʿde dihate cê ʿeyanî

**d/د Kelamuş Şecerî Lehu we Selamuha ʿEleyhî we îṭaʿetuha Lehu (Axiftin û Silav û Guhdana Dara bo Wî Silav lê Bin)**

***20.***

9754. Ferman kirîye Îmamê Eḥmed
Zar Ṭelḥe[2] ṣeḥabîyê Muḥemmed

9755. Rojek bû Nebî li Mekke ẋemdil
Ber ṛenc û cefayê qewmê dilkul

9756. Wan dabîye ber ber û civînan
Çen carê ji leşê wî ṣûr ji xwînan

9757. Nageh ku dihate nik wî Cibrîl
Ew yar û birayê weḥî û tenzîl

9758. Wî gûtî: Erê te ḥal çi ḥal e
"Hal gûtî ji muşrikan me tal e"

[1] Cureyek falê ya bi tîran e ku di dewra cahîlîyê da ji bo dîyarkina kirin an nekirina karekî da dihate bikaranîn.

[2] Ṭelḥe bîn Nafiʿi(Jêrenota Şuşî)

9759. Gû: Ger te divê bû şebrê canî
Nîşa te didem çi êk nîşanî

9760. Dara he diyar e nêv nuwalê
Ew taze ter û bejin şepalê

9761. Tu gazî bikê bi zarê şîrîn
Wî gazî kirê resûlê nûrîn

9762. Ew dare bi emrê şahê ekber
Hat û sekinî li pêş peyember

9763. Wek xadimekî çu dest li ser dest
Westabû di xidmeta wî serbest

9764. Gû bêjê biçîtve ew dubare
Wî gût û di çuve şwîneware

9765. Peyẋemberî piṛṛ bû dil ji şayî
Gû: Min bes e ev li nik Xudayî

***21.***

9766. Hakim ji kuṛê ʿUmer dibêjî
Reḥma xû Xudê bi wan birêjî

9767. Em bûyne digel resûlê enwer
Wê hat ʿerebek bû nik peyember

9768. Nêzik bû ji wî dikir sûale
Bû kîve? Gûtî: bû layê male

9769. Gûtê: “Te heye ṭemeʿi di çakî
Îman bi Xudê bihîn bi pakî

9770. Ew êk e Xudê me bê heval e”
Piṛṛ ʿîzz û kemal e Ẕulcelal e

9771. “Ez ʿebdê Xudê me hem peyember”
Çak e bi dil û zuban te bawer

9772. Wî gû: Te çi hey nîşan bihîne
Dara he gûtî: Bi çav bibîne

9773. Ew dareşirîn li nêv nuwalê
Şengîn û cewan ji bergê salê

9774. Gazî kire wê resûlê nûrîn
Ev dare dihat bi lence şîrîn

9775. Çen sal bi qurim û reh di xak e
Ew xake wê şeq dikir çi çak e

9776. Westabû li pêş resûlê muxtar
Wî pirsî ji wê temamî sê car

9777. “Aya wetuve peyember im ez?”
Bû cînn û beşeṛ xeberber im ez

9778. Wê gûtî: Belê şirîn dizanim
Peyẋember î tu yeqîn dizanim

9779. Ew çuve cihê xû her di gave
Rêvîngê ʿereb didît bi çave

***22.***

9780. Hem Qaḍî di nêv Şîfa dibêjî
Ya Reb tu reḥim bi ser birêjî

9781. Yê gûtî Bureydeyê hunerwer
Wê hat ʿerebek bû nik peyember

9782. Peyẋemberî gûtê: Ey ʿereb zad
“Tu bû çî neyî bi dînê ḥeq şad”

9783. Wî gû: Çi heye li nik te nîşan
Ta ez pê bikem ji dil bi îman

9784. Dara he gûtî: Şirîn û şeng e
“Bêjê were nik peyemberê dîn”

9785. Wî gazî kirê bi ḥêledenge
Ew leqleqî hate der çelenge

9786. Hat pêşî peyemberê ename
Wê taze ji wî dikir selame

9787. Eʿrabî gûtî: Dubare bêjê
Da biçte cihê xû rih dirêjê

9788. Gûtê: Hereve tu ey şeṛefdar
Ew çuve cihê xû her wekî car

9789. Eʿrabî gûte xudanê cûdê
Ger izn e ji bû te bem sucûdê

9790. Peyẋemberî gût bi pakezarî
“Bû kes nîye secde bijlî Barî”

9791. “Ger emrî bikem kesek ji bû kes
Bû secde dibû bi mêr û jin bes

9792. Dabêjme jinê bû mêrê xû ye
Ew secde bibet bi xûbê ro ye”

***23.***

9793. Hem gûtîye Tirmizî Xudênas
Ev xuşxeber e ji Îbnû ʿEbbas

9794. Yek merdê ʿereb dihatî carek
Pirsî ji peyemberê mubarek

9795. Nîşan te çi ye ku ez bizanim
Peyẋemberî tu bi ruḥ û canim

9796. Rûniştbû wî demî bi xûşî
Bin darekê qesbê piṛṛ ji wîşî

9797. “Vî wîşî gûtî eger bikem gaz
Bawer tu dikey erê bi dilxah”

9798. Wî gazî kirê bi pakez̲atî
Ew wîşî bi hêdî hêdî hatî

9799. Ta keftîye pêş du destê ew yar
Carek dî gûtî: “Herev cihê car”

9800. Eʿrabî dema ve dît bi çave
Îman wî dianî her di gave

***24.***

9801. Şêxê Beẋewî ji zar ṣeḥabî
Yeʿla kuṛê Murre pak cenabî

9802. Gû em di sefer digel peyember
Dana me di menzilek bêhinder

9803. Çendek di nivist resûlê muxtar
Min dîtî dihat ji wêve yek dar

9804. Şaper wê ji xû hemî kirin şûr
Ser pakeleşê resûlê piṛṛ nur

9805. Sêber lê dikir bi ʿîzz û naze
Ew paşî diçû cihê xû taze

9806. Gava ku Nebî ji xew bû hişyar
Gûtin wî temamî qîṣṣeya dar

9807. Wî gûtî: “Belê bi iznê Ellah
Ew hat bû selamê min bi dilxwah”

***25.***

9808. Hem gûtîye Muslîmî ji Cabir
Em bûyne digel resûlê ṭahir

9809. Dana me li nêv nuwalê pane
Eḥmed çu ji bû cihek nîhane

9810. Ez hêdî li du diçûm bi sustî
Amanekê avê min bi destî

9811. Peyẋemberî hîç nedîn nîhanî
Wî dîn du teraş bi ẋeml û canî

9812. Çu girtî ji êkê ṭerh û ṭaye
Gû: “Wer tu bi iznê ḥeq Xudaye”

9813. Ew dare bi iznê lemyezel ew
Zu hate derê û hat digel ew

9814. Ya dî jî wesa dihat di ḥîne
Roniştî li beynê wan şirîne

9815. Gû: “Baş me sitir biken gelî dar”
Dapûşîne wan Nebî şirînkar

**e/٥ Ḥuneynul Cîzʿî Şewqen Îleyhî ʿEleyhî’s-Selamî (Nalîna Qurmê Darê bo Peyemberî Silav lê Bin)**

***26.***

9816. Şêxê me îmamê mey Buxarî
Ey feyḍ û kerem ji wî bibarî

9817. Neqlê diketin ji Sehl û Cabir
Nalînê situn bû Babê Ṭahir

9818. Xû Qaḍî dibêt bi dil tijî nur
Ew hat bi tewatir û bi meşhûr

9819. Yê hatî pitir ji deh ṣeḥaban
ʿAlîṣîfetan mezincenaban

9820. Du ʿebdê Xudê ji dil Xudênas
Yek bab ʿUmer e ewê dî ʿEbbas

9821. Sehl û Enes û Ubeyy û Cabir
Hem Xudrê Ebû Seʿîdê faxir

9822. Ummû Seleme Bureyde piṛṛ kam
Kuṛ babê Wedaʿ e Muttelîb nam

9823. Elqîṣṣe ku hêj resûlê enwer
Bû weʿz̲î nebûn ewî çi mînber

9824. Pala xû didaye êk sitwîne
Her carê dibûye xuṭbexwîne

9825. Ḥîna ku bûyîn miruv gelek zûr
Dengê wî ḥeta biçît ji bû dur

9826. Çêkirne ji bû wî mînberek dar
Gel banê serî derec dibûn çar

9827. Bû mînberê çu resûlê ʿalî
Wê gavê situn ji bû wî nalî

9828. Ew nalî wekî biçukê ẋemnak
Ta piṛṛ bû ji dengî mizgeta pak

9829. Nalên wê belê ji şewqê ḥeq bû

Lew ew ji ẋeman ji xû ve şeq bû

9830. Ta serwerê dîn nehate xware
Dest tê newerandî şibhî yare

9831. Ew kir nebû qeṭ ji nale nale
Ber ahê fîraqê piṛṛ kemale

9832. Peyẋemberî kir ji wê ve pisyar
“Pê xûş e tu şîn bibî wekî car

9833. Ez dê te bibemve nîvê baẋe
Carek dî dibî tu şîn û ṣaẋ e

9834. Ḥez key te kefîlekê emîn im
Ez tu di beheştê ʿal diçînim

9835. Dê fêqî bixwun ji tu musilman
Welyêt di Xudayê pak û Reḥman”

9836. Geh dayê resûlê pak û piṛṛ naz
Ka dê kê biket ji wan bi daxwaz

9837. Wê gû: Me bibe bi baẋê cennet
Ḥetta ne rizim ebed di nîʿmet

9838. Nêzîkî ewî çi hey zelame
Guh lê bû heman ji wê kelame

9839. Ferman dikirî ḥebîbê canî
“Wî baẋê ebed neda bi fanî”

9840. Hem xwarî qesem bi ẓatê bê çûn
“Ger min nedigirtibaye estûn

9841. Da nalî situn ḥeta qîyamet
Ber furqetê min resûlê ummet”

9842. Paşî gû ṣeḥabeêt ṣeṛefnak
“Estunê sitir biken di nêv xak”

***

9843. Ey dil were ger tu huşiyarî
Tê fikre cewan di kûlkedarî

9844. Ku nalî ji ber fîraqê dilber
Meḥbûbê Xudê şefîʿê meḥşer

9845. Ey Ṭahirê qurbiser ji bû xu
Ta kengî hebê xeber ji bû xu

9846. Nê bûyî ḍeʿîf û pîr û jar e
Hêşta te nekirye kar û bare

9847. ʿUmrê çil û pênc te çu bi talan
Karê te he wek ʿemel beṭalan

9848. Dê kengî bikey tu arezûye
Bû weṣl û lîqa ḥebîbê xû ye

9849. Ger meyle lîqayê wî di cennet
Tim bigre tu destê xû bi sunnet

9850. Karek tu bike bilan ne zûr e
Îxlas dê bigêrî piṛṛ ji nûre

9851. Ya Reb tu bi cahê ev peyember
Serşur me nekey di kaxê meḥşer

9852. Ṭahir te gunahkar e bê ḥed
Aza ke bû xaṭira Muḥemmed

**f/و Qelbul Eʿyanî Lehu ʿEleyhî's-Selam**
**(Guherîna Tişta bo Wî Silav lê Bin)**

***27.***

9853. Enware dibêt ji Îbnû Îsḥaq
Nêv cengê Bedir bi canê muştaq

*

9854. Şeṛ kir bû ʿUkaşe şîr bi destî
Ew şîre ḥeta ji bin şikestî

9855. Zu hatîye nik resûlê Barî
Gû: “Bigre bû xû vî ṭayê darî”

9856. Bû şîr wî dema hijandî der gav
Emma çi kej û dirêj û piṛṛ av

9857. Şeṛ pê dikirî xudan ceger ew
Ḥetta dibûyîn xudan ẓefer ew

9858. Ya Reb ve çi şîr e hinde xûş e
Ḥeddadekî ew nedaye cuşe

9859. Ev şîre li nik wî zûr bi seng bû
Navê wî ʿEwin bi nav û deng bû

9860. Ta ma bû çi şeṛ dikir ʿUkaşe
Hem destê wî bû ve şîrebaşe

***28.***

9861. Hem bû me dibêt xudanê Enwar
Roja li Uḥud ku bûye kuştar

9862. Ew ʿEbdê Xudê ku Ceḥiş bab e
Wî şîr diweşandî bê ḥîsabe

9863. Şîrê wî şikest di nîvî cenge
Çu lalî peyemberê bi senge

9864. Yek ṭayê qesib wî daye destî

Gava wî hejand bû şîr durustî

9865. Ev dare bi emrê şahê ekber
Bû şîrekê piṛṛ ji av û cewher

9866. Navê wî lewa dikirne ʿUrcûn
Şîrek bû çi bê heval û bê çûn

9867. Nik wî bû ḥeta wî can û hestî
Paşî diçûye dest bû destî

9868. Ta weqtê ku Muʿteṣim di Beẋdad
Bû xû dikirî Befayê dilşad

9869. Yek turkî emîrekê şeṛefdar
Qîmet wî demî du ṣed ji dînar

**g/ز Kelamul Ḥeyewanatî we Taʿetuha Lehu ʿEleyhî's-Selam (Axiftina Giyanewera û Guhdariya Wan bo Wî Silav lê Bin)**
***29.***

9870. Êka dî ji muʿcîzêt buzurge[1]
Meʿlûm e belê kelamê gurg e

9871. Hatî ji gelek ṣeḥabeyane
Xudrê Ebû Seʿîd ji wan e

9872. Yê gûtî ji wî Îmamê Eḥmed
Reḥmet ji min û ji wan bî bê ḥed

9873. Rojek bû şivan di nêv nuwalan
Gurgî jê dizî pezek bi talan

9874. Wî ẋarda li du û jê ḥirandî
Ta pez wî ji gurgê xû sitandî

9875. Ronişt û wî ro dikir şivanî
Natirsî gûtî ji ḥeq xudanî

9876. Ev rizqe Xudê bi min dibexşî
Te standî ji min bi karê weḥşî

9877. Wehmî bû şivan û gût: Gelî yar
Ev gurge qisan diket ʿecebkar

9878. Gurgî gûtî: Ez dibêm ʿecebter
Ev şahê Medîne pak peyember

9879. Gazî diketin bi dînê Barî
Ta kengî dibin bi can di ṭarî

9880. Guh dayê şivanî bûye hişyar
Ew çu bi pezê xû bû ṭeref yar

9881. Ew çuye ḥeta kinar Medîne
Kewtê[2] xû meẋel[3] dikir şirîne

9882. Çu geşte peyemberê zemane
Wî qîṣṣe ji bû dikir beyane

9883. Peyẋemberî gû: "Biken heware
Dê xirve bibin nivêjekare"

9884. Peyẋemberî gûte wî şivanî
"Tu rabe bibêje çî dizanî"

9885. Wî qîṣṣe dubare kir beyane
Îman bi Nebî dihate cane

9886. Qaḍî ji rîwayetek dibêjî
Ya Reb tu reḥim bi ser birêjî

9887. Yê gûtî Ebû Hureyreyê pak
Gurgî gûte wî şivanê bê bak

9888. Karê te ji min ʿecebtirîn e
Ev pake peyemberê Medîne

9889. Ta kengî li ber merî şivanî
Ta kengî ji rahê ḥeq nezanî

9890. Serdarê hemû peyemberan ew
Serriṣteyê cumle ṛehberan ew

9891. Hadîbeşeṛ e bû dînê îslam
Kafir bi wî dê bibîte bedkam

9892. Ew xû ye digel ṣeḥab û al e
Ser dînê Xudê di cengê tal e

9893. Dergahê di cennetê bûyîn taq
Ḥûrî bû lîqayê wan di muṣtaq

9894. Şek nîne peyemberê Xuda ye
Mabeynê wî û te ev çîya ye

9895. Wî taze gudarî kir şivanî
Hişyar bû ji xû ji qelb û canî

9896. Gû: Ez çi bikem bi vî pezê zûr

[1] Mezin
[2] Kerîyê pez (Jêrenota Şuşî)
[3] Cihê bêhnvedanê, bêhnvedan

Ta ez diçime lîqayê ew nur

9897. Gurgî: Ji te ra gû ez şivan im
Çavnêr û emîn ji cerg û can im

9898. Ḥetta tu dihêve ev emanet
Teslîmî me kir bi bê xîyanet

9899. Destûr wî dixwast û çu bi ẋare
Bû layê peyemberê bijare

9900. Elqîṣṣe çu nik şehê Medîne
Ew bûn di şeṛî bû ʿizzê dîn e

9901. Wî qîṣṣe digût ji bû peyember
Ser destê Nebî wî anî bawer

9902. Peyẋemberî gû: "Ji min bizane
Ew gurge ji bû te xûş şivan e"

9903. Zivrîve bû nik pezî di ḥîne
Ew gurge çi pasevan emîn e

9904. Wî anî pezek qelew qiyafet
Bû gurgî vekujt û kir ḍiyafet

***30.***

9905. Hem bû me dibêt Seʿîdê Menṣur
Fermanê Ebû Hureyre piṛṛ nur

9906. Gurgek me dî hate nik peyember
Kilka xû quta û kir nevî ser

9907. Pêş destê peyemberê me ronişt
Ew taze di xidmet û edeb qişt

9908. Ferman kirî serwerê Medîne
"Gurgan ev e qaṣidek emîn e

9909. Ew hatî ji hûn diket sûale
Da bû vebirin hinek ji male"

9910. Wan gûtî: Qesem bi navê Barî
Nadeyne ewan çi berx û karî

9911. Havêtê yekê berek bi zûre
Gurgê me revî bi lûre lûre

9912. Lew gûtî peyemberê buzirge
"Ev gurge nizanî ew çi gurg e"

***31.***

9913. Hem Îbnû Weheb diket rîwayet
Vê muʿcîzeyê bi piṛṛ dîrayet

9914. Carek bû li çulî Babê Sufyan
Gel Îbnû Umeyye nav wî Ṣefwan

9915. Gurgek dî ewan li du ẋezalê
Ta çu ḥeremê û pak nuwalê

9916. Gurgî ku didî çu nêv ḥerem ew
Yek pê dî neçu çeqî didem ew

9917. Wan gûte yek û du: Ev ʿecebkar
Wî gurgî digûte wan şirînzar

9918. Karê we ji min ʿecebtirîn e
Ew yê he Muḥemmedê Medîne

9919. Gazî we didet bû baẋê cennet
Hun gazî bû agirê bi şîddet

9920. Yê ewwelî gût bi Lat û ʿUzza
Ez sundê dixwum bi rêz û ṭerza

9921. Ev gûte biba di Mekkeya pan
Da gurî gelek ʿeqîdeya wan

***31-32.***

9922. Hem Qaḍî dibêt di nêv Şîfayê
Yê gût ʿUmerê xudan dehayê

9923. Em bûyne li nik resûlê piṛṛ nûr
Roniştî bû nêv cemaʿetek zûr

9924. Yê têt ʿerebek bi têz û çustî
Yek taze bizinmijik[1] bi destî

9925. Wî pirsî: Kî ye ve xûş zelame
Ev senge û qedir û ev meqame

9926. Wan gûtî peyemberê Xuda ye
Ew hate nikê bi keyf û şaye

9927. Nêçîr wî didanî pêş peyember
Wî xwundî qesem: Me nayê bawer

9928. Ḥetta ku nebîte ev bizinmêj
Bû deʿwetê tu feṣîḥ zubanbêj

9929. Ey gûtî Nebî tu beste ezman
Wê gûtî: Belê te ez bi qurban

---

[1] Margîsk

9930. Westay me bû emr û kar û xidmet
Ey çêtirê ehlê xir qîyamet

9931. Peyẋemberî gû: “Te kî Xuda ye”
Gû: Xaliqê ʿerḍ û çen sema ye

9932. ʿErşê wî belê li jûr meqam e
Ḥukmê wî li ser zemîn temam e

9933. Reḥmet wî piṛṛ e di cenneta ʿal
Qehra wî tijî cehennema tal

9934. Peyẋemberî gûtevê dubare:
Ez kî me bibê şirîn bi zare

9935. Wê gûtî: Peyemberê Xuda yî
Dumayî peyemberan tu mayî

9936. Her kes bi te ḥeq diînî îman
Dê geşte biḥeştê pak û rîḍwan

9937. Her çî bi te ew dimînî kafir
Bê şubhe ebed diçîte agir

9938. Gava ʿerebî ve dît û zanî
Îman ji dil û yeqîn dianî

***32 – 33.***

9939. Çen ehlê ḥedîs̱ê piṛṛ dîrayet
Vê muʿcîzeyê diken rîwayet

9940. Ummû Seleme dibêjî qiṣt e
Rojek bû Nebî li çul û deşt e

9941. Sê carê kesek dikir bi gazî
Ey qaṣidê ḥeq bi serfiraḍî

9942. Havrî ku veda resûlê mewlay
Wî dîtî ku mambizek[1] girêday

9943. Yek merdê ʿereb di xew nivistî
Ew mambize girtî û vebestî

9944. Peyẋemberî gûte wê ẋezalê:
Şula xû bibêje ey delalê

9945. Gû: Ey tu delîlê jar û êxsîr
Vî şexṣî eza kirîme nêçîr

9946. Du kar me hene di şîrexwûr in
Cê wan eve ye ne zûr di dûr in

9947. Min berbide şîr bidem bi wane
Ez dê vegerêm di gav û ane

9948. Peyẋemberî gû: Dihêve wek car
Wê gûtî: Eger nehêm digel ẋar

9949. Barî bidetin me qehreka tal
Ems̱alê ʿuşirçîyêt di bedḥal

9950. Berda û çu zû dihat ẋezale
Wî dî ku resûlê piṛṛ cemale

9951. Ey gûtî bi xêr ji bû me hatî
Şulek te heye bi min xû qatî

9952. Gût: “Berdeve tu ẋezalejare”
Ew çunke ḥezîn û ferxedar e

9953. Berdave ẋezal bû yarê muxtar
Ew çuye bi ẋar bû layê du kar

9954. Wê gûtî: Me dil ji piṛṛ yeqîn e
Kes ẋeyrî Xudayê ḥeq çu nîne

9955. Bawer me heye ku tûy peyember
Dumayê peyemberan û serwer

***34.***

9956. Eḥmed kuṛê Ḥenbel û Nesaî
Her du ji Enes dibên tebayî

9957. Malik ji Medîne qewmê enṣar
Heybû şuturek tinê ji bû kar

9958. Ew ḥêştire ʿaṣî bû ji wan e
Şekwa bire nik ḥebîbê cane

9959. Gûtin bi resûlê cînn û însan
Min hey şuturek di karê bîstan

9960. Avê ji me ra ji bîrê derdîn
Ew evro sil û nekam e wek dîn

9961. Bîstan û rezê me bûye tênî
Dê pwîç bî eger wetûv bimînî

9962. Peyẋemberî gût me çen hevalan
Rabin dê biçîn di pirsêḥalan

9963. Peyẋemberê piṛṛ ji ʿîzz û naz e
Çubû rexê ḥêştirê ve taze

[1] Xezal

9964. Enṣarî gûtî resûlê muxtar
Hişyar be ku bûye wek şeyê har

9965. Wî gûtî: “Ji bû me qeydî nîne
Ew bû me mutîʿe hem emîn e”

9966. Gava şuturê didît peyember
Lezkir wê bû nik Nebî nevîser

9967. Wê secde dibir ji bû wî der gav
Peyẋemberî girt ji wê ve nav çav

9968. Carek dî berev meqamê kar ew
Şula xû dikir pitir ji car ew

9969. Eṣḥabe gûtin xudanê nûr e
Ev beste zuban û bê şuʿûr e

9970. Ew bû te bibit bi vîn sucûdê
Em ku ji te ra ne çîn sucûdê

9971. Peyẋemberî gû: “Nebûy durustî
Ba secde beşeṛ beşeṛperistî

9972. Ew ger dê heba di dîn cewaze
Bû mêrî jinê dibir çi taze”

9973. Ew da çî bi secde bê quṣûre
Wî çinku li ser wê ḥeq çi zûr e

***35.***

9974. Şêxê Beẋewî ji piṛṛ dîrayet
Yeʿla kuṛê Murre kir rîwayet

9975. Em bûyne digel resûlê muxtar
Wî dî şuturek şeqî ji ber kar

9976. Gava wê didîtî ev peyember
Ew qorî bi wî nevî dikir ser

9977. Peyẋemberî pirsî: “Kî xudan e?”
Yek gûtî ez im fîda bi can e

9978. Bifruşe me gûtî ḥêştira jar
Pêşkêşî te ye gû: Ey şeṛefdar

9979. Ev hêştre milkê yek ji mal e
Wan bijlî ewê çi nîne ḥale

9980. Madem we ye wî digûte wane
“Ney birsî biken ne kargirane

9981. Miskînî ji bû me gût şikayet
Ew birsî û ḥalnexûş e ẋayet

***36.***

9982. Hem bû me dibêjî Îbnû Şahîn
Vê muʿcîzeyê ji serwerê dîn

9983. Gû: ʿEbdê Xudê yê bab e Ceʿfer
Ew Ceʿferê mam puser peyember

9984. Carek Nebî çu rezek ji enṣar
Wî dî şuturek di karê xû jar

9985. Gava dî xudanê cahê ʿalî
Rondik wê li çav xişîn û nalî

9986. Ew çuye bi destê xûy bi naze
Damalîye pişguhê wê taze

9987. Ta ew sekinî ji nale nalê
Ferman kirî menbeʿê kemalê

9988. “Ya kê ye şutur xudan wê kanê”
Enṣarî digûtî: Ez di anê

9989. “Natirsî gûtî ji şahê ekber
Ev bestezubane day te bû kar

9990. Nê ew diketin ji tu şikayet
Hem birsî ye hem xû mandî ẋayet”

***37.***

9991. Yê gûtî Enes: Resûlê muxtar
Carek çuye baẋê yek ji enṣar

9992. Enṣarî hebû di baẋî yek pez
Ew hat bû ṭeref Nebî lez û bez

9993. Wê secde dibir ji bû peyember
Gûtin wî: Erê resûlê enwer

9994. Ev secde bibet bi wê nezanî
Em bû ji te ra nebeyn ji canî

9995. “Caîz nîye gûtî bû beşeṛ kes
Ba secde kesê biket muqeddes”

***38.***

9996. Hem Qaḍî dibêt di nêv Şîfayê
Ya Reb bi min û bi wî riḍayê

9997. Ḥîna ku Nebî li xakê Xeyber
Yek hate nikê û anî bawer

9998. Emma wî digûtî: Ez şivan im
Çibkem bi pezê xû ez nizanim

9999. Gû serwerê piṛṛ ji ʿîzz û naze
“Çavan tu ji wan bibeste taze”

10000. Barî ji te ra dibit emanet
Her êk bû xudanê xû selamet

***39.***

10001. Nebhanî dibê di taze Enwar
Ṭebʿa ji xudan ḥedîs̱ û exbar

10002. Hîcret ku dikir resûlê Barî
Nêv ẋarê S̱ewir xû wan veşarî

10003. Ew hatine dergehê wê qence
Du kutirekuvî piṛṛ bi lence

10004. Hem hatibû dapîruk di gave
Tevnê xû dikir wê dav bi dave

10005. Hatin ji Qureyşîyêt di daẋdar
Nêzîkê ḥeta bi dergehê ẋar

10006. Hindan gûtî: Êk herin bû jure
Cab dave Umeyye piṛṛ ẋurûre

10007. Yek tevne ji dapîruk diyar e
Pêş bûnê Muḥemmedê fîrare

10008. Du kutrekuvî hem li wê ne
Naçin cihê bêt ji merdî bêne

10009. Neyzanî ewan ji çav û dil kuṛ
Ronîştî li jurê menbeʿê nûr

10010. Bûbekr e digel bi keyf û şay e
Hem ṣaḥibê ẋar e canfîda ye

**h/ح Nebʿul Maî Tuhurî Beyne Esabîʿîhîş Şerîfetî (Zêyîna Ava Bijûn di Nav Tiblêt Wî yêt Pakij da)**

***40.***

10011. Êka dî ji muʿcîzêt peyember
Av derbû ji dest û til çu kews̱er

10012. Yê hat ji ṣeḥabeêt Xudênas
Mesʿûd Puserî û Îbnû ʿEbbas

10013. Wek Cabirî ew Enes şeṛefnak
Erbabê ḥedîs̱ê jê dibên çak

10014. Ev muʿcîze zûr ʿecîbeşan e
Neybûye ḥeta di hîç zemane

10015. Mûsa bi ʿeṣa eger deranî
Wî av ji berî duwazde kanî

10016. Nê ʿadetê carî ye di her gav
Ber kan û xezîne ye ji bû av

10017. Emma me nezanî av çu caran
Ew der bî ji gûştî û demaran

***41.***

10018. Ferman dike Muslîm û Buxarî
Her luṭf û kerem ji wan bibarî

10019. Yê gûtî Enes: Resûlê muxtar
Carek di sefer bû weqtê êvar

10020. Gûtin bi peyemberê Xudaye
Bû weqtê nivêj û av nemaye

10021. Bînin çi heye gûtî ji avê
Înabû ewan çi hey di gavê

10022. Peyẋemberê piṛṛ ji ʿîzzet û şan
Destê xû wî danî nîvê aman

10023. “Hun gûtî bişûn bi dest nemaze”
Av der bû ji nêv tilêt wî taze

10024. Ḥetta hemîyan dişuşt temame
Ev ave dihat sipî bi ṭam e

10025. Gûtin Enesî we çen zelam bûn
Em cumle gû sê ṣedê temam bûn

***42.***

10026. Hem gûtî cenabê Îbnû Şahîn
Dîsa Enesî digûtî şîrîn

10027. Em bûyne di ẋezweya Tebûk e
Gûtin bi ḥebîbê pak sulûke

10028. Ney maye li nik me av di baran
Tênî bûne ḥêştir û dewaran

10029. “Bînin çi heye gûtî ji avê”
Wan anîye qîrbeyek di gavê

10030. Pîçek tê hebû kirin tirarek
Destê xû di nafnayî mubarek

10031. Min dîtî ji beynê tibledestî
Av der bû çu kanîyan durustî

10032. Têr av me kirin dewar temame
Paş gûtî peyemberê ename

10033. Hingû bes e xû çi kes nemaye
Gûtin: Belê ey me xir fîda ye

10034. Destê xû şirîn ku wî helanî

Çikbûneve kes nedîtî kanî

***43.***

10035. Ew Beyheqîyê xudan dîrayet
Dîsa ji Enes diket rîwayet

10036. Yarê me peyemberê Xuda ye
Carek me digel diçû Quba ye

10037. Înane ji malekê ji enṣar
Kudek çi kiçik belê çi dildar

10038. Tiblêt wî neçûne navê pence
Çar tiblê dirêj di çûnê qence

10039. Wî gûtî: “Gelî heval û yare
Hun werne şeṛabê tabidare”

10040. Min dîtî bi çavê ser di gavê
Der bûn ji tilêt wî cuyê avê

10041. Ḥetta hemîyan vexwar temame
Xûzmey li kesê wî kiriye ṭame

***44.***

10042. Hem hatî ji Muslîm û Buxarî
Reḥmet ji min û ji wan bibarî

10043. Cabir we dibê: Me bûn di ceng e
Ew cengê Ḥudeybîye bi deng e

10044. Pêş destê Nebî bû dolikek av
Cemyane nikê ṣeḥabe dergav

10045. Gûtin: Çu nemaye av di ceyşî
Bijlî ji eva te hate pêşî

10046. Ney avê nivêj û ney vexwarin
Êt tênî xû ḥêştir û dewarin

10047. Destê xû şirîn di avê danî
Av der bû ji nêv tilan çu kanî

10048. Ḥetta me heman vexwarî taze
Şuştî me ji avê destnemaze

10049. Gûtin wî: Çi qed hebûn ji yaran
Gû têrî dikir bû ṣed hizaran

10050. Emma me bûyîn hizar û pênṣed
Em leşkerê nav şirîn Muḥemmed

***45.***

10051. Hem gûtîye Muslîmî ji Cabir
Yek pakexeber durust û faxir

10052. Em bûyne di nêv Buwate cenge
Ferman kirî serwerê bi senge

10053. “Cabir bike gazî bû me avê”
Înabûne qîrbeyek di gavê

10054. Pîçek ku di qîrbeyî di maye
Feman kirî qaṣidê Xudaye

10055. “Bînin ji me ra di gavê ṭeste”
Dana wî şirîn di navê deste

10056. Min rête serê ve av cewan ew
Tiştek me nezanî gût nîhan ew

10057. Wî paşî digût: “Bi navê Barî”
Min av dî ji destî bûye carî

10058. Gû: “Avê werin biben ji êre”
Ḥetta me hemî dibûne têre

***46.***

10059. Ev qîṣṣe di nêv Ṣeḥîḥê mewcud
Hatî ji cenabê Îbnû Mesʿûd

10060. Em bûyne digel resûlê serwer
Hîç av me nema di cumle ʿesker

10061. “Bînin gûtî hûn çi hey ji avê”
Înan çi hebû hinek di gavê

10062. Wî gurkire nêv mezin tirarek
Destê xû didanî nav mubarek

10063. Min dîtî belê bi iznê Barî
Av bûye ji nêv tilêt wî carî

***47.***

10064. Hem hatî ji Daremî Xudênas
Yê gûtî cenabê Îbnû ʿEbbas

10065. Peyẋemberî gût Bîlalî nave
“Hindek ji me ra bihîne ave”

10066. Çu hateve gû: Çu av me nîne
Gû: “Qîrbekî tu ji bû me bîne”

10067. Destê xû dikir di nêv nîhanî
Av der bû ji destê wî çu kanî

10068. Lê têr jê vexwarî Îbnû Mesʿûd
Wan şuştîye desnivêj çî mewcud

**i/ط Tefcîrul Maî Bîbereketîhî Wenbîasîhî bî Messîhî we deʿwetîhî (Zêyîna Avê bi Bereketa Wî û Zêdebûna Wê bi Destkirin û Daxwaza Wî)**

***48.***

10069. Yê hatî ji Muslîmî rîwayet
Ku gûtî Muʿaẕê piṟṟ dîrayet

10070. Peyẋemberê mey şirîn selûl e
Gû: "Em dê ṣube gehîn Tebûk e

10071. Çî pêşî me geşte wî mekanî
Nêzîk Nebî ta dihêm ji kanî"

10072. Ḥîna digehîne ew meqame
Ferman kirî serwerê ename

10073. "Kes çuye seravê ey gelî yar"
Gûtin wî: Belê du kes bi ejmar

10074. ʿAciz bû ji wan û gûtî: "Bînin
Amanekî cumle av derînin"

10075. Pîç pîçe çi hey ji av di kanî
Wan taze bi emrê wî helanî

10076. Pê şuştî wî dest û çavê nûrîn
Dubare kir ev di kaniyê şîrîn

10077. Ev kanî me dî bi iznê Barî
Av der bû ji wê ḥeta bû carî

10078. Paş gûte Muʿaẕê piṟṟ evînî
"Tu belkî Xudê biket bimînî

10079. Avahî bi kefte êre xûş war
Piṟṟ dar û durext û baẋ û gulzar"

***49.***

10080. Yê gûtî ji Mîswerî Buxarî
Reḥmet ji me û ji wan bibarî

10081. Nêv cengê Ḥudeybîye me danî
Ser avekê kêm di nîvê kanî

10082. Gurbûne serê ṣeḥabe dergav
Ḥetta ku deranî çî hebû av

10083. Gûtin bi peyemberê Xudaye
Tênîne û kaniyê av nemaye

10084. "Bînin wî gûtî çi hey ji avê"
Înan çi hebû ewan di gavê

10085. Dubare kirin di nîvê kanî
Tîrek wî ji kîskê xû deranî

10086. Havêtîye nêv û kir duʿaye
Av der bû bi qudreta Xudaye

***50.***

10087. Hem hatî ji Muslîm û Buxarî
ʿÎmranê Huṣeynî merdê Barî

10088. Gû em di sefer digel peyember
Tênîne gûtin ṣeḥabe yekser

10089. Peyẋemberê pak û namidar e
Ew xû ji dewarî hate xware

10090. Wî gûte ʿElîyê canfîdaye
Gel yek dî bi nav Ebû Reca ye

10091. Hun her du herin ve çan û xwaran
Hun belkî bigehne av bû yaran

10092. Ew her du diçûn bi can gudar e
Geştin jinekê şutur suware

10093. Gel wê du kunik[1] hebûn ji avê
Înabûne nik Nebî di gavê

10094. Ew jin ji dewarî hate xware
Peyẋemberî gût heval û yare

10095. "Bînin ji me ra di gavê ṭeste"
Wî dev kunikan vekir bi deste

10096. Gûtê: "Dê vexwun û jê biben hun
Amanê di xû jî piṟṟ biken hun"

10097. Jin maye bi çavê ser dibînî
Ḥeyran ji dilê xû her dimînî

10098. Ev leşkere têr ji av dibûn xir
Kunkêt wê wekî berayê her piṟṟ

10099. Dev bestî ji wan Nebî bi şadî
"Bînin bû jinê gûtî ji zadî"

10100. Hin anî qesib hinek dî are
Hindek dî çi zadê hey di bare

10101. Wek pêşî suwar kirin durustî

---

[1] Tûrkên biçûk yên ku avê dikin tê da

Zadê wê hemî li pêşî destî

10102. Peyẋemberî gût şirînzubane
“Ava te me kêm nekir bizane

10103. Em belkî Xudê kirîne têr av”
Geryave jinik bû malê der gav

10104. Wî qîṣṣe bû wan dikir beyane
Ev şexṣe gûtî ʿecîbeşan e

10105. Yan saḥirekê mezin deha ye
Yan ḥeqq e peyemberê Xuda ye

10106. Îslam bû jinik dumayê taze
Gel qewmî hemê bi ʿîzz û naze

***51.***

10107. Muslîm xû ji bû me çak dibêjî
Reḥma xû Xudê bi ser birêjî

10108. Yê gûtî Ebû Qetade şîrîn
Xuṭbek bû me gût resûlê nûrîn

10109. Gû: “Evro diçin ḥeta bi êvar
Ev şev dê bi çin wesa şirînkar

10110. Ta ku ṣubehî di xûş bî ṭave
Hun dê bigehin ji bû xû ave”

10111. Em çuyne ḥeta bû şev direnge
Peyẋemberî gût bi taze denge

10112. “Em dê binivîn ḥeta seḥergah
Hişyar bû çi kes biket me agah”

10113. Ew cumle bû xew bibûne gêje
Hişyar nebû kes ji bû nivêje

10114. Kamil we dibê ve xew peyember
Ew bû sefera fetih bû Xeyber

10115. Pêşî hemîyan Nebî bû hişyar
Ku rojê li wê diyar e ruxsar

10116. Peyẋemberî deng dikir ji wan e
“Rabin dê biçîn ji ev mekane”

10117. Em çuyne ḥeta bû roj bilinde
Gûtî bi me wî ʿemel pesinde

10118. “Dêmkê xû ji bû me bîne taze”
Wî şuştî ji bû xû desnemaze

10119. Pîçek di binê wê maye ave
“Wê avê gûtî nekey belave

10120. Ev dêmke dibît giranbuha ye”
Nefʿek dê bidet me jê Xuda ye

10121. Wî paşî emir dikir Bîlalî
Bangî bide tu bi dengê ʿalî

10122. Du rekʿe kirin li pêşî taze
Wî paşî dikir ṣebaḥ nemaze

10123. Ew paşî suwar bû em suwar bîn
Ta nîvro meşîn ji tênê jar bîn

10124. Gûtin bi peyemberê me pake
Tênî ne me dê bibîn helake

10125. Gût: “Xewfê neken helake nîne
Wî gûte me: “Dêmkî hêve bîne”

10126. Wî rêt û mejê didaye yaran
Gurbûne serê ji çar kinaran

10127. Peyẋemberî gûtî: “Hêdî hêdî
Namînî çi kes we tênî êdî”

10128. Ḥetta çu neman ji wan ṣeḥabe
Bijlî min û ev mezin cenabe

10129. Wî gût me: Vexwu, me gû: Nexêr tu
Ew nabî ḥeta nebûyî têr tu

10130. Peyẋemberî gû: “Cewan bizane
Saqî dê vexwu li du hemane”

10131. Naçar me li pêşî têr vexwarî
Dumayê vexwar resûlê Barî

**j/ىTekṣîrut Teʿamîl Qelîl Bîbereketîhî**
**(Zedebûna Xwarineka Kêm bi Bereketa Wî)**

***52.***

10132. Hem hatî ji Muslîm û Buxarî
Ey feyḍ û kerem ji wan bibarî

10133. Cabir digû: Em di karê Xendeq
Birsîbû Nebî me dît muḥeqqeq

10134. Min xû vedizî bû layê male
Min gûte jina xû ev sûale

10135. Birsî me dîye resûlê enwer
Çî zadê me hey tu zu bihîn der

10136. Yek fiṭre hebû ji ceh me kir ar

Dabestiyeka[1] qelew jî bezdar[2]

10137. Min taze bi destê xû vekujtî
Qazan me tijî dikir ji gûştî

10138. Ez çumeve her bi lez bû Xendeq
Min hêdî gûte peyemberê ḥeq

10139. Dabestiyek e me jê kirî ser
Gel fiṭrekê arê ceh serûber

10140. Taze meregek me kir di mal e
Mêvan be digel hinek heval e

10141. Wî gazî dikir bi ḥêl peyember
"Ey çendî di xendekê ʿemelker

10142. Hun cumle werin bû malê Cabir
Sûrek ji me ra wî kirye faxir"

10143. Sûr farisî ye gû bû leṭafet
Yeʿnî: Ji me ra wî kir ḍiyafet

10144. Wî paşî digûte Cabirê yar
"Ta ez bû we dêm hevîr biken ar

10145. Ḥetta ku nehêm neken çi nanî
Qazanê ji kuçkî hem nedanî"

10146. Ew yarê mezin me hate jure
Min zêde bi can û dil sirûr e

10147. Ez evro Xudê çi bextiyar im
Mêvanê min e resûl û yar im

10148. Wî tif kire nêv hevîr û dîze
Ya Reb bereket di nêv birîze

10149. Wî gûte jinê resûlê Barî
"Yek jin dî bila te bête harî"

10150. Wan her du jinan di patî nane
Qazan he li ser kuçik cewan e

10151. "Dapûşe gûtî: Tu ser ji dîze
Jê bîne derê mereq temîze"

10152. Dest deste dihatine jûr bi xêre
Ḥetta ku hemî dibûne têre

10153. Ez sundê dixwum bi navê Barî
Ew bûn bi jimarê yek hizarî

10154. Rabûye Nebî li du hemane
Wek xû bû hevîr û şîv û nane

[1] Karik /gîsk

[2] Tawlî, qelew

# ENCAM

Şêx Tahirê Şûşî nûnerekê giringê edebiyata kurdî ya klasîk a sedsala 20em e. Di nav malbateke alim û edîban da mezin bûye û di medreseyan da perwerde bûye. Ew kesayetekê pirziman û piralî bûye ji bilî kurmancî, soranî, farisî, erebî û tirkî jî zanîbûye. Ji alîyekî ve berhemên edebî û zanîstîn nivîsandîne ji alîyê dî jî bi hunera xetê berhem çêkirîne.

Şûşî 5 berhemên serbixwe yên menzûm hene. Ji van berheman 3 lib bi kurmancî û 2 lib jî bi erebî ne. Dîsa bi kurmancî çend helbesten xweser û sê texmîs jî li ser helbesten Melayê Cizîrî nivîsandîne. Ji bilî van dîwana melayê Cizîrî du caran îstinsax kirîye ku ev jî dibe delîl ku Şûşî di bin bandora Cizirî da maye.

Berhema Şûşî ya *Pend û Şîret* dibe delîl ku Şûşî derbarê mijarên civakî da kesekê xemxûr bûye. Bi rêya vê berhemê dixwaze şîretan li gelê xwe û misilmanan bike da ku ew xeletîyên xwe sererast bikin. Dîsa bi kurdî nivîsandina *Gulzarê* nîşan dide ku Şûşî kesekê kurd û kurdîperwer bûye.

Şûşî, du berhemên menzûm, sê berhemên pexşan û gelek înstînsax, perwaz û şerh bi erebî nivîsandîne ku ev jî dibe delîl ku ew di erebî da gelekî şareza bûye. Dîsa wî bi farisî jî helbestek bo seydaye xwe nivîsandîye û di *Gulzarê* da gelek peyv û taybetmendîyên farisî hene ku ev jî dibe delîl ku ew di farisî da jî şareza bûye. Şûşî zimanê tirkî jî zanîbûye lê çi berhem an helbest bi tirkî nenivîsandîne.

Wekî destxet yek nusxeya *Gulzarê* heye û ew jî ji alîyê Hemzeyê Şûşî ve tê parastin. Şûşî ji ber wefata xwe ya zû neşîyaye *Gulzarê* bi temamî binivîse. Di *Gulzarê* da “Rewdeya Çarem” û beşa “Xatîmeyê” bi temamî, “Rewdeya Sêyem” ji sedî pêncî û “Rewdeya Pêncem” jî ji nêzîkî sedî bîst nehatiye nivîsîn. Bi vî awayî jî *Gulzar* ji 10154 beytan pêk tê ku bi vê hejmara beytên xwe ve dibe mesnewîya herî mezin a zimanê kurdî.

*Gulzar* li gorî qaliba erûzê ya “*Feʿlun feʿelun feʿel feʿûl un*” hatiye nivîsîn. Mînakên zîhaf, îmale, wesl, şeddeyê û hemû cureyên serwayê di *Gulzarê* da têne dîtin.

Alîyekê herî balkêşê yê *Gulzarê* jî tertîba wê ye. Şûşî di serê destxetê da planek ji bo *Gulzarê* danaye û *Gulzar* li gorî wê planê nivîsandîye û wefata wî ya zû nehêlaye li gorî planê hemûyê binivîse. Di tertîbê da beşa dîbaceyê gelekî xurt e. Şûşî du

sernavên sereke “*Qurana Bilind* û *Dînê Xwedê Îslam*” û di bin wan sernavan jî 13 sernavên jêrîn ku di dîbaceyên standart ên mesnewîyan da nînin li dîbaceyê zêdekirîne.

Di *Gulzarê* da taybetmendîyên devoka behdînîyê gelekî ber bi çav in. Ji bilî behdînîyê gelek hêmanên erebî û farisî jî di nav *Gulzarê* da hene. Ji alîyê rêbaz û teknîkên vegotinê ve *Gulzar* berhemeke gelekî dewlemend e. Di *Gulzarê* da şêweyên lîrîk, epîk, didaktîk û taswîrî bi hev ra tên bikaranîn ku ev jî hostayîya Şûşî ya hunerî nîşan dide.

*Gulzar* bi zimanekê sade û herîkbar hatiye nivîsîn lê ev nayê wê wateyê ku alîyê wê yê edebî lawaz e. *Gulzar* ji alîyê hunerên edebî ve berhemeke gelekî dewlemend e. Di *Gulzarê* da li gorî tespîta me 32 hunerên edebî yên hatîne bikaranîn û dibe ku çend hunerên me tespît nekirî jî hebin.

Alîyekê herî dewlemend ê *Gulzarê* jî naveroka wê ya xurt û berfireh e. Di *Gulzarê* da gelek ayet, hedîs, navên Xwedê, melekan, Pêxemberan, dînan, kesayetên giring, netewan, xwarinan, avan, nebatan, ajalan, çîyayan, cih û waran dibore. Dîsa di *Gulzarê* da bi awayekê gelekî berfireh behsa mucîzeyên Pêxemberî tê kirin.

Di *Gulzarê* da gelek peyvên resen, gotinên pêşîyan, biwêj, orf û edet, dua, nifîn, dijûn, gazinde û şîret derbas dibin. Ev yek jî nîşan dide ku *Gulzar* ne tenê berhemeke dînî ye, di heman demê da berhemeke xurt e ku dikare bibe mijara lêkolînên exlaqî, zimannasî, folklor û civaknasîyê jî. Aliyek dî yê giring ê berhemê jî rexneyên civakî yên Şûşî ne. Ew, parçebûna misilmanan, kêmbûna exlaqî û devjêberdana dînî bi wêrekî rexne dike. Bi taybetî, pendên wî li ser meyla vexwarina ereqê, qumar û materyalîzmê, ji bo civakên îro jî peyamên gerdûnî dihewînin.

*Gulzar*, ne tenê berhemeke dîrokî ya menzûm e, lê belê berhemeke zanistî ya xurt e ku li ser bingeheke akademîk hatiye avakirin û prensîbên saxlem ên kevneşopiya nivîsandina sîyerê bi awayekê resen dişopîne. Şûşî ji bo nivîsandina *Gulzarê* ji berhemên bingehîn ên wekî Quran, hedîs, tefsîr, pirtûkên bingehîn ên dîrok û sîyerê, pirtûkên şemaîl û mucîzêyên Pêxemberî, pirtûkên çend alimên serdema xwe û hwd. sûd wergirtîye.

# ÇAVKANÎ


Abrams, M. H. (1999). *A glossary of literary terms*. Heinle & Heinle.

Acar, H. (2016). Fiqihnameyeke menzûm di edebiyata Kurdî de: Rîsaletu sefînetu'l ekrad ila sebîli'r-reşad/Sefîna Kurdan ji bo ehlê bajar û gundan a Mela Ebdulcelîlê Botî. *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, 8(1), 376-435.

Acar, H. (2023). Nimêjnameyeke Kurmancî ya nivîskarekî mechûl ê serdema mîrektîyan. *Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, *15*(2), 702-717.

Acar, M. (2025). Lîteratura tecwîdên Kurdî. *Nûbihar Akademî*, (23 Hezîran), 1-22.

Açıkgenç, A. (2018). Said Nursi. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 35, ss. 565-572). https://islamansiklopedisi.org.tr/said-nursi

Adak, A. (2014). *Destpêka edebiyata Kurdî ya klasîk*. Weşanên Nûbihar.

Adak, A. (2015). Di edebiyata Kurdiya klasîk de cureyeke edebî: Zanistên Îslamî. *Nûbihar*, *132*, 5-9.

Adak, A. (2019). *Teşeyên nezme di edebiyata klasîk a Kurdî de*. Nûbihar.

Adak, A. (2020). Gulzara Şêx Tahirê Şoşî: Mesnewîyeke xweser a edebiyata Kurdî ya klasîk û taybetmendîyên wê yên avahîya derekî. *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, *12*(4), 1506-1533.

Aksoy, Ö. A. (1988). *Atasözleri ve deyimler sözlüğü 1*. İnkılap Kitabevi.

Alkaç, N. (2018). Goranî lehçesinde yazılan mesneviler. *Kovara Bîr*. https://kovarabir.com/13461/5018-2/

Altıkulaç, T. (1999). İbn Galbûn, Ebü'l-Hasan. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 19, ss. 499-500). https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-galbun-ebul-hasan

Amêdî, S. B. (1980). *Hozanvanên Kurd*. Weşanxaneya Kurî Zanyarî Kurd.

Arslan, H. (2021). Kürtçe mevlidler. A. Timurtaş & F. İdiz (Ed.), *Kürtçe'de İslami İlimler* içinde (ss. 155-213). Peywend Yayınları.

Aslan, M. (2021). Kürtçe fıkıh eserleri. A. Timurtaş & F. İdiz (Ed.), *Kürtçe'de İslamî Eserler* içinde. Peywend Yayınları.

Ay, Ü. (2007). *Münîrî (Öl. 1521?)'nin manzum siyer-i nebi'si Cilt.1 (İnceleme-Metin)* [Yayımlanmamış doktora tezi]. Marmara Üniversitesi.

Aydınlı, A. (1993). Dârimî, Abdullah b. Abdurrahman. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 8, ss. 494-495). https://islamansiklopedisi.org.tr/darimi-abdullah-b-abdurrahman

Aykaç, Y. (2015). *Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)* [Yayımlanmamış yüksek lisans tezi]. Bingöl Üniversitesi.

Aytas, G. (2006). Edebi türlerden yararlanma. *Milli Eğitim Dergisi*, *34*(169).

Azizove, E. (2012). Ukâz. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 42, ss. 61-62). https://islamansiklopedisi.org.tr/ukaz

Bakır, S. (2015). Orhan Kemal'in hikâyelerinde anlatıcı ve bakış açısı. *Türkiyat Mecmuası*, *25*, 31-60.

Bideki, H. (2018). İran kütüphanelerindeki bazı Kürtçe dinî ve lirik el yazması manzumelerin açıklamalı fihristi. (E. Ceylan & V. Başçı, Çev.). *Kadim Akademi SBD*, *2*(2), 208-231.

Bingöl, A. (2014). *Gotinên pêşiyan û biwej*. Weşanên Na.

Birışık, A. (2002). Kur'an. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 26, ss. 383-388). https://islamansiklopedisi.org.tr/kuran#1

Bolelli, N., & Ertekin, N. (2017). 'Eqîdeyên menzûm di edebiyata Kurdî de. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, *3*(6), 29-49.

Ceyhan, A. (2002). Hz. Ali'ye ait bazı güzel sözlerin mensur bir tercümesi: Tercemet-i kelâm-ı Alî radıya'llâhü [Anh]. *Külliyat Osmanlı Araştırmaları Dergisi*, *16*.

Çağmar, E. (2021). Seydayê Mele 'Elî û nirxandina wefatnameya wî ji alîyê hunerên edebî ve. *Kurdîname*, *4*, 25-45.

Çelebi, İ. (1998). Hızır. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 17, ss. 406-409). https://islamansiklopedisi.org.tr/hizir#1

Çetin, N. (2019). *Şiir çözümleme yöntemi*. Akçağ Yayınları.

Çetin, N. M. (1991). Arûz. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 3, ss. 424-437). https://islamansiklopedisi.org.tr/aruz

Çetişli, İ. (2004). *Metin tahlillerine giriş/2 hikâye-roman-tiyatro*. Akçağ Yayınları.

Çiçekler, M. (2006). Na't. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 32, ss. 435-436). https://islamansiklopedisi.org.tr/nat#1

Demirci, M. (1994). Desûkī, İbrâhim b. Abdülazîz. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 9, ss. 212-213). https://islamansiklopedisi.org.tr/desuki-ibrahim-b-abdulaziz

Demiryürek, M. (2013). Kurgusal metinlerde ikinci kişili anlatıcı ve bakış açısı. *FSM İlmî Araştırmalar İnsan ve Toplum Bilimleri Dergisi*, *2*, 119-139.

Dilçin, C. (2013). *Örneklerle Türk şiir bilgisi*. Türk Dil Kurumu Yayınları.

Duran, Y. (2021). Berawirda şîretên ku di helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî da derbas dibin. *Kurdiyat*, *3*, 101-117.

Durmuş, İ. (2000). İktibas. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 22, s. 52). https://islamansiklopedisi.org.tr/iktibas#1

Durmuş, İ. (2002). Kînaye. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 26, ss. 34-36).

Durmuş, İ. (2007). Reddü'l-acüz ale's-sadr. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 34, ss. 521-522).

Durmuş, İ. (2011). Tarsî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 40, ss. 110-111). https://islamansiklopedisi.org.tr/tarsi

Durmuş, İ. (2011). Teşbîh. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 40, ss. 553-556). https://islamansiklopedisi.org.tr/tesbih--edebiyat#1

Durmuş, İ. (2012). Tezat. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 41, ss. 58-60). https://islamansiklopedisi.org.tr/tezat--edebiyat#2-turk-edebiyati

Durmuş, İ., & Saraç, M. Y. (2003). Leff ü neşr. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 27, ss. 122-124). https://islamansiklopedisi.org.tr/leff-u-nesr

Duskî, M. (1989). Pênc huzan di destnivîseka pirr baha da. *Kovara Rewşenbîrî Nwê*, *124*, 72-83.

Duskî, T. Î. (1993). *el-Medxel li diraseti'l-edebi'l-Kurdî*. Cem'iyetu Ulemaî Kurdistan.

Duskî, T. Î. (2000). Eş-Şeyx Tahir eş-Şûşî: Muḥeqqîqen li dîwan eş-Şeyx el-Cezerî. *Kovara Metîn*, 140-145.

Duskî, T. İ. (2010). Ji çelengê şagirdên Rîsaleyên Nûr: Şêx Tahirê Şoşî û kitêba wî Gulzar. (A. Geverî, Çev.). *Kovara Nûbihar*, *112*, 45-47.

Duskî, T. Î. (2013). *Mîrên Kurd yên şair û rola wan di pêşvebirina edebiyata Kurdî de*. Bingöl Üniversitesi Yayınları.

Dündar, M. (2021). Ahlakla ilgili Kürtçe yazılan bazı eserlerin değerlendirilmesi. A. Timurtaş & F. İdiz (Ed.), *Kürtçe'de İslamî Eserler* içinde. Peywend Yayınları.

Efendioğlu, M. (2008). Saîd b. Mansûr. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 35, s. 562). https://islamansiklopedisi.org.tr/said-b-mansur

el-A‘zamî, M. M. (1992). Buhârî, Muhammed b. İsmâil. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 6, ss. 368-372). https://islamansiklopedisi.org.tr/buhari-muhammed-b-ismail#1

El-Bûtî, M. S. R. (2016). *Fıkhu’s siyre*. Dönem Yayıncılık.

El-Perwarî, ‘E. X. (2013). *Mewlûda sîyer*. Weşanxaneya Dua.

Ertaş, H. (2023). “Jiyana Pîroz” a Mela ‘Eladînê Kopî: Siyereke menzûm di edebiyata Kurdî de. *Kurdiyat*, *7*, 9-26.

Ertaş, H. (2024). *Dîwana Mela Hesenê Sofyanî: Metin û lêkolîn* [Yayımlanmamış yüksek lisans tezi]. Mardin Artuklu Üniversitesi.

Ertekin, N. (2024). Şi'ra muweşşeh ya Şêx Tahirê Şûşî û hunerên nuh yên edebî. *Mukaddime*, *15*(2), 459-477.

Ertekin, N., & Ertekin, Z. (2017). *Kurtedîroka mewlûdnameyên Kurdî*. Şarkiyat ICSS’17 Uluslar Arası Sosyal Bilimler Kongresi, Diyarbakır.

Ertekin, Z. (2015). Qelem di rewdinne‘îma Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî de. *Kovara Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê*, *1*(2).

Ertekin, Z. (2021). Kürtçe siyer yazıcılığı üzerine. A. Timurtaş & F. İdiz (Ed.), *Kürtçe’de İslami İlimler* içinde (ss. 119-155). Peywend Yayınları.

Ertekin, Z. (2022). *Kürtçe siyer yazıcılığı*. Siyer Yayınları.

Ertekin, Z., & Basuğuy, B. (2018). Pend û amojgarî di dîwana Şêx Ehmedê Xanî de: Helbesta Zahidê Xelwetnişîn wek nimûne. *2. Uluslararası Ahmed-i Hânî Sempozyumu (İslam Düşüncesinde İslam)*, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi.

Fayda, M. (1999). İbn Hişâm. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 20, ss. 71-73). https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-hisam

Fayda, M. (1999). İbn İshak. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 20, ss. 93-96). https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-ishak

Fayda, M. (2009). Sîyer ve meğazi. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 37, ss. 324-326).

Fayda, M. (2014). Siyer sahasındaki ilk telif çalışmalar. A. Demircan (Der.), *Bir bilim olarak sîyer ve kaynakları* içinde. Sîyer Yayınları.

Genette, G. (1980). *Narrative discourse: An essay in method*. Cornell University Press.

Gerdî, E. (1972). *Rewanbêjî le edebî Kurdîda* (C. 1).

Gezer, S. (2023). *Xusrew û Şêrîna Elmas Xanê Kendûleyî (Metın-Lêkolîn)* [Yayımlanmamış doktora tezi]. Bingöl Üniversitesi.

Görmez, M. (2010). Taberânî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 39, ss. 310-312). https://islamansiklopedisi.org.tr/taberani

Gündüz, H., & Seyhan, M. (2015). *Qurana pîroz û meala wê ya Kurdî*. Serokatiya Karûbarên Diyanetê.

Güngör, M. (1992). Begavî, Ferrâ. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 5, ss. 340-341). https://islamansiklopedisi.org.tr/begavi-ferra

Gürbüz, Z. (2021). Said-i Nursi düşüncesinde istibdat, geri kalmışlık ve medeniyet kavramlarına bakış. *Muhakemat Uluslararası Risale-i Nur Araştırmaları Dergisi*, *1*(1).

Güzel, Ş., & Ahmad, H. O. (2024). Destpêkek ji bo şêwazê di lêkolînên edebî yên kurdî de. *Kurdiyat*, *9*, 5-24.

Hacımüftüoğlu, N. (1992). Beyan. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 6, ss. 22-23). https://islamansiklopedisi.org.tr/beyan--edebiyat

Harman, Ö. F. (1991). Âsaf b. Berahyâ. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 3, s. 455). https://islamansiklopedisi.org.tr/asaf-b-berahya

Harman, Ö. F. (2013). Yûşa. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 44, ss. 43-45). https://islamansiklopedisi.org.tr/yusa

Hesen, Z. C. (2022). *Şêx Tahirê Şûşî (Jîyan û şi'r û berhem)* [Yayımlanmamış yüksek lisans tezi]. Koya Üniversitesi.

Hilal Görgün. (1998). Heykel, Muhammed Hüseyin. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 17, ss. 286-290). https://islamansiklopedisi.org.tr/heykel-muhammed-huseyin

Hîvîdar, M. E. (2021). *Rewdî'n-ne'îm (Şêx 'Ebdurrehmanê Aqtepî)*. Weşanên Dara.

Ilı, A. (2019). *Hunerên edebî di dîwana Hadî (Seydayê Licî) de* [Yayımlanmamış yüksek lisans tezi]. Mardin Artuklu Üniversitesi.

Jahany, P. (2020). *Berawirdkirina beyta Mem û Zînê ya Kurmancî (Varyanta Oskar Mann) û Mem û Zîna Mîrza ya Hewramî* [Yayımlanmamış doktora tezi]. Bingöl Üniversitesi.

Kallek, C. (1999). İbn Hacer el-Heytemî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 19, ss. 531-534). https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-hacer-el-heytemi

Kandemir, M. Y. (1989). Ahmed b. Hanbel. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 2, ss. 75-80). https://islamansiklopedisi.org.tr/ahmed-b-hanbel

Kandemir, M. Y. (1992). Beyhakî, Ahmed b. Hüseyin. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 6, ss. 58-61). https://islamansiklopedisi.org.tr/beyhaki-ahmed-b-huseyin#1

Kandemir, M. Y. (1994). Ebû Dâvûd es-Sicistânî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 10, ss. 119-121).

Kandemir, M. Y. (1997). Hâkim en-Nîsâbûrî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 15, ss. 190-193). https://islamansiklopedisi.org.tr/hakim-en-nisaburi

Kandemir, M. Y. (1999). İbn Mâce. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 20, ss. 161-162). https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-mace

Kandemir, M. Y. (2001). Kādî İyâz. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 24, ss. 116-118). https://islamansiklopedisi.org.tr/kadi-iyaz

Kandemir, M. Y. (2006). Müslim b. Haccâc. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 32, ss. 93-94). https://islamansiklopedisi.org.tr/muslim-b-haccac

Kandemir, M. Y. (2006). Nesâî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 32, ss. 563-565). https://islamansiklopedisi.org.tr/nesai

Kandemir, M. Y. (2007). Nevevi. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 33, ss. 45-49). https://islamansiklopedisi.org.tr/nevevi

Kandemir, M. Y. (2010). Şemail. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 38, ss. 497-500). https://islamansiklopedisi.org.tr/semail

Kandemir, M. Y. (2012). Tirmizî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 41, ss. 202-204). https://islamansiklopedisi.org.tr/tirmizi

Kandemir, Y. (1992). Bezzâr. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 6, s. 113). https://islamansiklopedisi.org.tr/bezzar

Kaplan, H. (2019). Mısrayı aruza uyduran bir şair: Zîver ve şiirlerinde aruz tasarrufları. *Eski Türk Edebiyatı Araştırmaları Dergisi*, *2*(1), 279-311.

Kaptan, Y. (1999). *Ahmet Paşa Divanında edebi sanatlar* [Yayımlanmamış yüksek lisans tezi]. İstanbul Üniversitesi.

Kara, M. (1989). Ahmed el-Bedevî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 2, ss. 47-48). https://islamansiklopedisi.org.tr/ahmed-el-bedevi

Kara, M. (1994). *Tasavvuf ve tarikatlar*. İletişim Yayınları.

Karak, S. (2023). Mela Yasînê Alikî jîyan û berhemên wî. *Kurdîname*, *8*, 79-109.

Kavaklıyazı, A. (2018). *Kastamonulu Yûsuf'un Muhammediye'si (İnceleme-Metin)* [Yayımlanmamış doktora tezi]. Selçuk Üniversitesi.

Koçkuzu, A. O. (1999). İbn Şâhin. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 20, ss. 367-369). https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-sahin

Köse, S. (1999). İbn Vehb. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 20, ss. 441-442). https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-vehb

Kurşun, Z. (2017). Hac ve iktidar: Haremeyn'de erken dönem Osmanlı imar faaliyetleri. *FSM İlmî Araştırmalar İnsan ve Toplum Bilimleri Dergisi*, *9*, 281-311.

Kutluer, İ. (1999). İbn Seb'în. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 20, ss. 306-312). https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-sebin

Küçükaşçı, M. S. (2013). Zemzem. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 44, ss. 242-246). https://islamansiklopedisi.org.tr/zemzem

M. Salih, H. K. (2016). *Runbêjîyê di helbestên Ehmed Muxtar Caf de* [Yayımlanmamış yüksek lisans tezi]. Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi.

Mertoğlu, M. S. (2013). Zürkānî, Muhammed Abdülazîm. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 44, ss. 579-580). https://islamansiklopedisi.org.tr/zurkani-muhammed-abdulazim

Mukriyanî, G. (1960). *Elfûbêy Kurdî*. Çapxaney Kurdistan.

Öncü, M. (2009). *Gotinên pêşîyan*. Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.

Öpengin, E. (2014). Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects. *Kurdish Studies Archive*, *2*, 171-212.

Öz, Ş. (2006). *İlk siyer kaynakları ve müellifleri* [Yayımlanmamış doktora tezi]. Ankara Üniversitesi.

Özaydın, A. (2000). İbnü'l-Esîr, İzzeddin. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 21, ss. 26-27). https://islamansiklopedisi.org.tr/ibnul-esir-izzeddin

Özdemir, E. (1994). *Yazınsal türler*. Ümit Yayıncılık.

Özdemir, E., & Binyazar, A. (2018). *Yazmak sanatı* (2. bs.). FOM Kitap.

Özel, A. (2019). Kürdî, Muhammed Tâhir. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (EK-2, ss. 110-112). https://islamansiklopedisi.org.tr/kurdi-muhammed-tahir

Özervarlı, M. S. (2006). Nebhânî, Yûsuf b. İsmâil. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 32, ss. 471-472). https://islamansiklopedisi.org.tr/nebhani-yusuf-b-ismail

Özervarlı, M. S. (2008). Reşîd Rızâ. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 35, ss. 14-18). https://islamansiklopedisi.org.tr/resid-riza

Özfırat, B. (2016). *15. yüzyıl şairlerinden Muhammed'in Sîretü'n-Nebî'si* [Yayımlanmamış doktora tezi]. Marmara Üniversitesi.

Özkan, H. (2010). Süyûtî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 38, ss. 202-204).

Özkan, M. (2016). İrhâsâtla ilgili rivâyetlerin metin ve anlam açısından değerlendirilmesi. *Şırnak Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, *7*(14).

Öztürk, M. (2015). Vekolînek derbarê gotinên peşiyan ên Kurmancî de. *Mukaddime*, *6*, 319-337.

Pala, İ., & Durmuş, İ. (2001). İstiare. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 23, ss. 315-318). https://islamansiklopedisi.org.tr/istiare

Salih, B. A. (2021). *Şêx Tahirê Şoşî (1917-1962) di edebiyata Kurdî de* [Yayımlanmamış yüksek lisans tezi]. Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi.

Saraç, M. A. (2019). *Klasik edebiyat bilgisi*. Türk Dil Kurumu Yayınları.

Sezer, M. (2016). Ji herêma behdînanê helbestkarekî pirziman: Seyfiyê Şoşî. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, *2*(3), 131-147.

Sönmez, N. (2018). Di nûbihara piçûkan da şîretname. *2. Uluslararası Ahmed-i Hânî Sempozyumu (İslam Düşüncesinde İslam)*, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi.

Şenel, A. (1999). İbn Merdûye. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 20, ss. 184–185). https://islamansiklopedisi.org.tr/ibn-merduye

Şenödeyici, Ö. (2005). Türk dilinde mecaz-ı mürsel. *TDAY Belleten*, 119-133.

Şeyholislami, J. (2020). Zimanê Kurdî (M. Yonat, Çev.). *Nubihar Akademi*, *4*(14), 83-106. https://doi.org/10.55253/nubihar.919979

Şirazî, S. (2012). *Gülistan*. Semerkand Yayınları.

Şulul, K. (2021). *Sîyer usûlü*. Sîyer Yayınları.

Şûşî, A. S. (2015). Vekulîneka dîrukî li ser gund û kelha Şoşê. *Kovara Dîrok*, *10*.

Şûşî, H. (2021). *Behdînan fî muzekkeratt eş-Şêx Tahir eş-Şûşî*.

Şûşî, H. (2023). Zana û nivîser û hozanvan û xetxoşê Kurd Şêx Tahirê Şûşî. *Kovara Badînan*, *2*.

Şûşî, H. T. (1997). *Şêx Tahir Şûşî pend û şîret*. Weşanxaneya Xebat.

Şûşî, H. T. (2008). Peyvên mezinan di hozana Şoşî da. *Kovara Peyv*.

Şûşî, H. T. (2011). Pênansîna şair Şêx Enwer Şûşî. *Kovara Sîpe*.

Şûşî, H. T. (2017). Dahênan û honermendî di hozanên Şêx Tahirî de. *Kulîja Zanistên Mirovayetî, Zankoya Duhok*.

Şûşî, Ş. T. (1987). *Rîyad el-Nor*. Weşanxaneya El Seqafet û el-Şebab.

Şûşî, Ş. T. (2012). *Gulzar*. (H. T. Şoşî, Ber.). Êkîtîya Nivîserên Kurd.

Şûşî, Ş. T. (2022). *Îsra û mî'rac û mu'cîzatên Pêxemberî*. (H. T. Şûşî, Ber.). Senterê Zaxo bo Vekolînên Kurdî.

Tek, A. (2021). Eskatolojî û jiyana piştî-mirinê: Di Kurdî de numûneyên metnên eskatolojîk û nûvaryanteke “Beyta sekeratê. *Nûbihar Akademi*, *16*, 15-43.

Tekin, M. (2022). *Roman sanatı 1 (Romanın unsurları)*. Ötüken Yayınları.

Tenik, A. (2015). *Tarihsel süreçte Kürt coğrafyasında tasavvuf ve tarikatlar*. Nûbihar.

Titiz, F. (2020). *El-Cewahîru'r Reşadîye fî sîreti'n-nebewîyye ya Mela Nûrûllahê Godişkî* [Yayımlanmamış yüksek lisans tezi]. Bingöl Üniversitesi.

Tok, V. A. (2011). *Edebi sanatlar ansiklopedisi*. Literatürk.

Topaloğlu, B. (1992). Bari. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 5, s. 73). https://islamansiklopedisi.org.tr/bari--esma-i-husna

Topaloğlu, B. (1995). Esmâ-i hüsnâ. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 11, ss. 404-418). https://islamansiklopedisi.org.tr/esma-i-husna

Tuna, Ü. (2018). Kinâye kavramının kapsamı. *Bayburt Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, *4*(8), 23-35.

Uzun, M. İ. (1998). Hilye. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 18, ss. 44-47). https://islamansiklopedisi.org.tr/hilye#1

Uzun, M. İ. (2009). Türkçe siyer kitapları. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 37, ss. 324-326).

Uzun, M. İ. (2011). Temih. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 40, ss. 408-409). https://islamansiklopedisi.org.tr/telmih#2-turk-edebiyati

Üzgör, T. (1994). Dîbâce. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 9, ss. 277-278). https://islamansiklopedisi.org.tr/dibace

Werqanisî, F. (2007). *el-Hemaîlu fî'ş şemaîl*. (Z. Zinar, Çev.). Doz Yayınları.

Yalar, M. (2009). İslami Arap şiiri ve Hz. Peygamber. *Uludağ Üniversitesi İlâhiyat Fakültesi Dergisi*, *18*(1), 61-88.

Yaman, A. (2009). Sîyer. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 37, ss. 316-319). https://islamansiklopedisi.org.tr/siyer

Yavuz, Y. Ş. (1992). Beyzâvî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 6, ss. 100-103). https://islamansiklopedisi.org.tr/beyzavi

Yavuz, Y. Ş. (1995). Fahreddin er-Râzî. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 12, ss. 89-95). https://islamansiklopedisi.org.tr/fahreddin-er-razi

Yıldırım, K. (2012). *Kürtçe dilbilgisi*. Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Yıldırım, N. (2008). Rüstem-i Zâl. *TDV İslâm Ansiklopedisi* (C. 35, ss. 294-295). https://islamansiklopedisi.org.tr/rustem-i-zal

Yıldız, A. (2017). *Hunera vegotina bedew a devkî û nivîskî -1-*. Lorya.

Yıldız, K. (2004). *Irak Kürtleri* (A. H. E. Urcan, Çev.). Uluslararası Yayıncılık.

Yıldız, Z. (2020). *Lêkolînek li ser dîwana Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî (Rûhî)* [Yayımlanmamış yüksek lisans tezi]. Bingöl Üniversitesi.

Yılmaz, H. (2019). *Dîwana Laxer Mela Umerê Aşiq (Metin û lêkolîn)* [Yayımlanmamış yüksek lisans tezi]. Mardin Artuklu Üniversitesi.

Zêrevan, A. (2004). *Melayê Cizîrî: Dîwana*. Nefel.

www.habous.gov.ma, 14.08.2025 (dîroka dawî ya têketina sîteyê).

Axiftinên Yasin Duran li gel Hemze Tahirê Şûşî:

24.01.2024. siet: 23:19 20dq 21s. (axiftin)

10.07.2025. siet: 12:51 46dq 37s. (axiftin)

18.07.2025. siet: 15:30 23dq 8s. (axiftin)


24.12.2022 – 25.07.2025 (Whatsapp – Peyam)

# PÊVEK

**Pêvek 1: Şêx Tahirê Şûşî (1917-1961)**



**Pêvek 2: Helbesta Şûşî ya bi Farisî**


کلمات زکیه فی مولد خیر البریة

دلا تا کی لباس حزن پوشی / شد آباد در تفریح کوشی

مگر دل غرقهٔ دریای مستی / و یا خود بند غفلت پای بستی

چرا از سینه آهی بر نیاری / دلی سیرانی گاهی گل نداری

برآمد آفتاب از برج شادی / بروز مولد مختار هادی

جهان پر نور از ماه جبینش / مشرف عالم از انوار دینش

لب او معدن گوهر فشانی / قد او سرو شوخی بوستانی

رخ او مطلع صبح صباحت / جمالش منبع حسن و ملاحت

مشک حیران شد از عطر مویش / سما دل خسته از حرمان کویش


عروس علم از فکرش قباپوش / نوای بلبل از ذکرش گهر در گوش

فلک از بهر دیدارش کمر بست / ملک در خدمت وی کمر بسته

به از گلشن باغ بهشت / زلال سلسبیل کاس حکمت

نیارد گوهری از وصفش سفتن / سر یک موی کار احسن گفتن

اگر هر موی من گردد زبانی
نگوید مدح شاهی داستانی



حضرة الاستاذ دام مجده

حروفی چند از کلکِ بیانم / بنزدِ شیخ و استادم رسانم

کنوزِ حکمت و دریای تدبیر / شفیق دادرس و مولی ملاذ پیر

مدارِ فضل و مصدرِ معانی / مدارِ قطبِ حق هر مبانی

عزیز و سرورِ مصرِ معالی / جمال یوسف صدق لآلی

اهنئکم بذی حل المزایا / برسم مولدِ خیر البرایا

و میبوسم عبیرِ خاکپایت / وسیلت خواهم از سیبِ دعایت

زطبِ صحت و شادیت سؤلم / وصال و روزِ دیدارت خیالم

نعالم گر سئول فرمائی یارا / بحمدالله سلامت هست مارا

ولی دل خسته از آهِ جدایم / چو قمری روز و شب ناله و جدایم

دریغا بخت سستم بخت آورد / طلوع اختر بدبختی آورد

محرومم کرد از خدمتِ تو / شکم آتش شد از بی رؤیتِ تو

حبیبی هست مرا یارب بپرهیز / از آسیب بلا و چشم بد ریز


لباب دوحهٔ فضل و امینی است / مسمّی با اسم فخر المسلمین است

غریقِ قلزمِ هجر و نخوشی

ازمیان لطهری محزون نشوشی

١٣٦٥ — ٩ / ٣

**Pêvek 3: Helbesta Şûşî bi Soranî**



تةخميسيَن شيَخ طاهريَ شوشى ل سةر هؤزانيَن مةلايىَ جزيرى

هؤزانا ئيَكىَ:

دلبةرا من ب دو موذطاناَ خو مةنقؤراَ كرين
باَ خةتا كرمة شةهيداَ خو دخؤناَ سوركرين
شبهى بلبل ب لةباَ غونضة تة مةجبؤراَ كرين
ئةز نزانم سةبةباَ ياراَ ضرا دؤراَ كرين
شةه وشيرين دهةناَ ئةم ذخو مةهجؤراَ كرين

---

وةك جةرةس نالة ذمن تيَن ذسةما طه وق وضةكان

دل ذمن بر ب غةدر غةمزةئىَ وان ضاظ بةلةكان
كةفتيمة دامىَ دو زولفان دقةيدو خةلةكان
شبهى طؤيىَ سةرو ثا بؤمة ذبةر زةرب وشةكان
لةو ب ضةوطانىَ جةفايا خو ذدل هؤريَ كرين
غةيرى دو خالىَ سياهىَ تة ض طالب نةبوئين
ضةند جةفا دامة ب غةمزا ذخو تائيب نةبوئين
خؤ ذبل كه وثةرىَ عيشقاتة ض شارب نةبوئين
دامة سةد جامىَ فيراقىَ ذخو غائيب نةبوئين
ذويصالىَ قةدةحةك دامة وومةخمؤرىَ كرين
نةغمةيا عؤدو نةيا لازمىَ مةيخانة كرين
ل مة حةى كر جةسةدو قةلبىَ تذى زام وبرين
ب فيداى سةروىَ جةمالا تة بتن جانىَ شرين
نؤرىَ ضةشمىَ مة كو عالةم مة ب ضةشميَن تة ددين
لىَ جةمالا خو تة وةك ديدةئىَ بىَ نؤرىَ كرين

مة ذغةيرى لةب ولةعليَت تة نةدين غونضة فةمةك
عيشقىَ رؤيىَ تةنة عالةم ذسةما تا ب سةمةك
مةتويى رؤح ورةوان غةيرى تة نينن ضو غةمةك

نـةفـةسـةك بيَتـة مة نـاضـى نـةدذين بـىَ تـة دةمـةك
ذتـة هات ئـةمـرىَ هـةمايـون وتـة مـةئـمـؤرىَ كرين
بـةندةئىَ حةلقة ب طـؤشـم هةضى ئةمـرىَ تـو بكةى

حـازرم طـةر ب بـرِى سـةر ض دةمـا ئـةمـرى بكةى
بىَ خةبةر هاتـمـة تةماشـةى لةبىَ خوش خةندة دكةى

مـة نـزانـى كـو تـو دىَ (عاقبــة الأمـر)ىَ ض كـــةى
لةب ولةعليَن شـةكـةرين ئاهىَ كو مةغرؤرىَ كريـن
جـانــىَ مـن سـؤتــى يـة جانـا تـة ب خـال فـلفلةكـىَ
عةقل و هؤشـيَـت مة تـة بر ئـةظـرو ب جـام وفـرِةكـىَ
وةصلىَ كر مـاضـىَ ذنـةخدانىَ تـو سـةر ثـا فـةلةكىَ
زةررةيــةك بــوم ب هـةوايـاتــة دويَــرانــةيــةكـــىَ
ميسلىَ رؤذىَ ب شـوعاعا خو تة مةشــهــؤرىَ كريـن
ب نيـطـةه ضـةشـمىَ عينـايـةت كو نـةزةرداريَ
بـوئيـن
ذخـةوا غـةفـلـةت وجـةهلىَ ذخـو هـشيـارىَ بـوئيـن
ب زةلالا قـةدةحـا عـيـشـقـىَ ثـرِ ئـةسـرارىَ كـريــن

ذ(أنـا الحـق) ب لـةبـىَ لةعلىَ خـةبــةردارىَ بـوئيـن
ب كولابـا سـةرىَ زولفا خو تـة مـةنـصـوورىَ كـريـن

مـن دطـؤ شـيَـرى تو (طاهـر) سةرى نـادةى ب طه لا
هـو ب سـةهلى كـةتـيـة داظـآ دوان بسـك وبــةلا
مـة نــزانــى تــة ذدل بــربــو دةمـا (قـالــو بـلـــى)
مونـصـةرف ما دبـويين ئـةم ب دوسـةد جارآ (مـةلا)
لىَ ب وآ كةسر و ئيضافآ ظـةخـو مةجـروورآ كريـن.

........................................................................

هـؤزانـا دووىَ :

1/ يـارا ذ فيـراقـاتـــة ذدل تــةنط نــةفــةسم ئــةز
دةر راهـآ طولان سينة تـذى خـار وخــةسم ئـةز
هـةر ضـةنـدى دكـؤشم كـو بـدا من ب رةسم ئةز
جـانـا ذجـةمـالا تـة موقـةددةس قـةبـةسم ئــةز
طـةر حـؤر وثـةريـزادة نـةزةركـةي تـةبـةسم ئـةز
2/ ئـةز هـنـدة كـةسـةردارم وتـؤ هـنـدة ب كـيـنـــي

سـةد طـةزمـة ل وان قـةوسـيَ هيـلالان درةشـيـنـــي
شـةهـزادة ووشـيـريـن قـةد ومـةيـخـانـة نشـيـنـــي

ميـثـلـيَ مـةهـي نـؤ طـةر تـة دظـيَـتـن مـة ب بينـي
ميَـزة بـكـة جـاميَ تـو دزانـي ض كـةسـم ئـــةز
3/ من جـان بـدة وان ضــةشـميَ سـيـاهـيَ تـة بـكل دا
ليَ سـةر ب فيـداي عةرعـةرو بـةذنـا شـل ومـل دا
نيَـضيـر تـة كرين غـةمزة ل جـةرطيَ مـة يـيَ كـول دا
يـةغـمـا ذمـة جـان كـر كـو تـةجـةللا تـــة ذدل دا
مـن رؤحـيَ دقـالـب تـويـي تـةنـهـا قـةفـةسم ئـةز

4/ وةك بـلبـلـيَ قـومـري ذفـيـراقـاتـــة دكــالـم
خـؤنـيَ ل رويـيَ خـؤيـيَ هـيـلالــي ظـةدمـــالـم
ديَـوانـةئـيَ زولفـيَـت خـةلـةك ورؤيـيَ ب خـالـم

حـوبـبـاتـة ب من رادهـةذيـنـيـت كـو ب نـالـم
شـةب تـا ب سـةحةر نالة ذرةنطيَ جـةرةسم ئـةز
5/ ئـــةي دل ض حــةزيـنـي ب دةوام طـريـــة وزاري
غـةمـنـاك وجـةطـةر سـؤذ وثـرِي شـــانـيـي وزاري
قامـة ت ضـو هيـلالي ض زةعيـفـي ئـو ض خـواري
من طـؤ مـةهي نـؤ ضـاشـنـي ليَ ئـةبـرويـيَ يـاري
طـؤ: من ض حةددة شـبـهةتـي نةعليَ فةرةسم ئـةز

6/ بـاري كـو نـةصيـب دا ذئـةزةل شـادة ب مـندا

قـةلبةك ل هةموؤ غلل و غـةشـان سـادة ب مـنـدا
غةيـري سـوبـولان عشـقيَ حةبيـب جادة ب
منـدا
ساقـي ذئـةزةل يـةك دو قـةدةح بـادة ب منــدا
حةتـتـا ب ئـةبـةد مةسـت وخومـار وتةلةسم ئـةز
7/ يـةك بـؤسة لةبـؤ عاشـقيَ سـةد حـةجـج وحةرةم بي
سـؤتـن ب غةما عـيشـقـيَ ضـو بـاغـيَ دئـيـرةم بـي
رةنجـيَ كو نةبـةي طـةوهـةرو طـةنجـيـنـة وغـةم بـي
جانـا تـويـيَ من جـان طـوليَ بيَـخـار ض كـةرةم بـي
مننـةت كـو نـةوةك بولبليَ ميحنـةت عةبـةسم ئـةز

8/ سـةودايـي كرم سـةرو وقـةديَ سست كةمـةريَ
تـة
سـيَ طـةردةنـيَ دل بر ذمـة ئـةي لةب شـةكةريَ تـة
بـيَ سـؤض وختةتا تيـر و غـةدةنط دان جـةطةريَ
تـة
سـةد جةور وجةفـا دةي ب مـة ناضيـن ذدةريَ تــة
يةكسـةر تـو نـةبـاتـي ئـو ل طـةبـعـيَ مـةطـةسم
ئـةز
9/ دل سـؤتيـمـة ئـولفيَ شـةبيَ وةصلاتـة يـة دةرمـان
زور ثيَ دخوشين ضةندي بدةي غـةمـزة وو ضـةربان
فـةرمـان دبـةرم حـازريَ دةرطـاتـة مـة قـوربـان
طـةر ديَ تـة دطيَـتـن ب بـرِي سـةر بكـة فـةرمـان
دا ظـيَ سـةعةتـيَ سـةر ب بـرِم خوش مةقةسم ئـةز
10/ مـن سـةر دري يا يـارة سـةر وجـان ب
فـيـدايــي


لةو شـبهـةتـى مـةجنـون دطريـم ديـن
وهـةوايـــى
دل خةستـةيـى (طـاهـر) ئـو ذ رؤحـا خـو
بـةلايـى
سـةر تا ب قـةدةم ئـةز ب سـوذم شـبهى
(مـةلايـى)
ثـةروانـة صيـفـةت سـؤتم وبـآ صـةوت وحةسم
ئـةز.
تةخميسـا سيـَيـى:
ثارضا ئيَكى:
دل ذدل عـاجـزة بـةر هيـجـر و خـةمـا خـال سيـةهآ
نـازك ولةب شـةكـةر وسـةر وقـةد بـآ شـــةبـــةهـآ
رووحـآ شـيريـن مـة ل ذيَرى قـةدةمـا خاكآ رةهـآ
ئـةى نـةسيمـآ سـةحـةرآ بـادآ مـةجـالا سـبـةهـآ
سـةد سـةلامـان ب طـةهينـآ ذ مـة وآ ثـادشـةهـآ

---


ثارضا ديماهيىَ:
ددةمـا (قـالو بـلـى) يـار ب مـة بـةخشـى فـةرةحـةك
لةو مة دل صةقفةتئـآ ئةلماسـة وةكى عشـقا مـةحـةك
ب مةرا داخ وطةهشت (طاهرى) قـةت نين تـةرةحةك
ذغةزةل حـةق ب (مةلـىَ) دايـة ذعشـقـآ قـةدةحـةك
تـا ئـةبـةد مةست وخـةرامين ذ مـةيـا وآ قـةدةحـآ

**Pêvek 5: Wêneyên Bergên *Gulzar*ê**





**Pêvek 6: Bi Xettatî Nivîsandina Bîsmîllahê**




**Pêvek 7: Rûpelê Duyem ê Destxetê.**



**Pêvek 8: Rûpelê Sêyem ê Destxetê**



**Pêvek 9: Dîyarîkirina Pirtûkê bo Telebeyên Nûrê**



# إهداء الكتاب

## إلى طلاب النور من أهل العلم والعرفان

الى الاخوان الأعزاء الأحباب الألباء الذين يشتاقون الى
رياض سيرة رسولهم الأكرم وأنوار تاريخ حياة منقذهم
الأعظم الرؤوف الرحيم ذي الخلق العظيم الهادي الى
الصراط المستقيم بهديه وجميل سنته .
الى الذين يستأنسون بالاطلاع على عظمة هذا النبي العربي
وما آتاه الله من الشيم والشمائل والخلق والفضائل وذلك
بمشاهدة جمال خلقه وصورته وكمال نفسه وشيمته وسمو دهائه و
حكمته وعلو جاهه وحشمته ومعرفة اهل بيته وعترته وحاشيته
وخصائصه وكمالاته ومعجزاته وارهاصاته وعجائب شأنه
وغرائبه

وغرائب دلائل نبوته .

الى الذين يتشوفون الى الوقوف على حياته الشريفة من مهده الى لحده : من ميلاده الى رضاعه وتربيته ، من شبابه الى تأهله وبعثته ، وما قاسى هو وأصحابه من قومه وعشيرته ، الى هجراتهم وهجرته ، وما فعله الأنصار في بيعته وايوائه ونصرته ، وبيان اسفاره ورحلاته ، وسراياه وغزواته ، وما فتح الله على يديه بكريم دعوته ، وعظيم همته ، وجميل صبره وجليل دهائه وسياسته .

الى الشائقين التائقين الى طعم زبدة من سير خلفائه الأربعة الراشدين ذوي الفضل والمفاخر والعدل والتقى والمآثر الذين تولوا بعده امامته ،

الى هؤلاء الأحباب الأنجاب - أقدم بكمال الادب هذا الكتاب ، راجيا منهم تصليح الخطأ بالصواب ، وإن ذكروني بدعاء او فاتحة فهو من وفائهم واحسانهم و « هل جزاء الإحسان الا الإحسان »

وختاما - أسأل الله لي ولهم العفو والغفران والرحمة والجنة والرضوان .

وسلام على المرسلين والحمد لله رب العالمين

**Pêvek 10: Di Destxetê Da Rûpela Plansazîya *Gulzar*ê**

# خلاصة محتويات الكتاب

## رتبنا هذه المنظومة على مقدمة وخمس رياض وخاتمة

**المقدمة** - في افتتاح الكتاب وثناء الله ورسوله وافادة المرام ونموذج من محاسن القرآن ومزايا الدين الحنيف .

**الروضة الأولى** - في ميلاد الرسول الى بعثته .

**الروضة الثانية** - من بعثته الى هجرته .

**الروضة الثالثة** - من هجرته الى فتح مكة .

**الروضة الرابعة** - من فتح مكة الى حجة الوداع .

**الروضة الخامسة** - في البحث عن خلقه وصورته وخلقه وسيرته وخصائصه وفضائله وكمالاته وشمائله ومعجزاته ودلائل نبوته ، ومعرفة اهل بيته وعترته وحاشيته وغير ذلك الى وفاته ونصب خليفته عليه السلام

**الخاتمة** - في خلاصة سير الخلفاء الاربعة الراشدين وتاريخ حياتهم الشريفة الذين تولوا بعده امر امته . ونشروا هذا الدين بكريم شيمهم وعظيم هممهم وكمال جهدهم ارضاء رب العالمين رضوان الله تعالى عليهم وعلينا بركاتهم اجمعين الى يوم الدين .

- ج -

**Pêvek 11: Rûpelê Çavkanîyên *Gulzar*ê**

## أهم مراجع رياض النور

١ - القرآن الكريم . ٢ - تفسير البيضاوي .

٣ - صحيح البخاري . ٤ - (الكامل) : تاريخ ابن الاثير .

٥ - (الانوار المحمدية) : للشيخ يوسف بن اسماعيل النبهاني

٦ - (حياة محمد) : للدكتور محمد حسين هيكل

وَمِنها بعض كُتُب وَرَسَائِل قيّمة اقتطِفُ منها اَحيانًا :-

٧ - (الجامع الصغير) : للشيخ جلال الدين السيوطي . ٨ - كتب الفقه الشافعي

٩ - (اشارات الاعجاز) : لخادم القرآن الملقب ببديع الزمان ملا سعيد النورسي

المشهور مؤلف رسائل النور واستاذ طلبة النور - امدّ الله في حياته نفعًا للاسلام .

١٠ - (مَنَاهِل العرفان) : للشيخ محمّد بن عبد العظيم الزرقاني ١١ - (الصواعق)

١٢ - (تطهير الجنان واللسان) : كلاهما للشيخ احمد بن حجر الهيتمي المكيّ .

١٣ - (الوحي المحمّدي) : لصاحب المنار الشيخ محمّد رشيد رضا . ١٤ - (مقام ابراهيم)


١٥ - (تاريخ القرآن وغرائب رسمه) ١٦ - (تاريخ الخطّ العربي) ثلاثتها

للشيخ محمّد طاهر الكردي المكيّ الخطّاط استاذي في فنّ الخطّ الساكن بمكّة المكرمة

رضي الله تعالى عني وعن مؤلفيها اجمعين وشكر سعيهم واسكنهم واياي في دار

نعيمه ولنعم دار المتقين بجاه سيّد المرسلين

**Pêvek 12: Rûpela Yekem a Beşa Muqeddîmeyê**


بسم الله الرحمن الرحيم

رب اشرح لي صدري ويسر لي أمري

واحلل عقدة من لساني يفقهوا قولي

المقدمة

وفيها ١٢ ازهار

"١"


الإفتتاح باسم ربي الأعلى الفتاح

(الله) كوچه ناڤكي شرينه گوتنا وي حياتي جان و ژينه

اي ناڤي ته يه (رحيم و رحمن) وي ذكري ته يه شفاو درمان

(٢)

**Pêvek 13: Rûpela Dawîya *Gulzar*ê**


٤٩٥

أو ياري حزن تو هات ژوره   من ز يده بجاه و دل سروره

أز أفرو خدي چه بختيارم   فيقاني منه رسول و يارم

وى تف كره نيڤ هقير و ديزه   (يارب بركت دنيڤ برێزه

وى گوته ژني ره ووكي بارى   (يك ژندي بلا ته بيته هارى)

وان هه ردو ژنانه دياتى نانه   قازان هه ليسر كچك جوانه

(دا پوشه گوتى تو سر ژ ديزه) (ژى بينه دري حرق) تميزه

ده ست دسته دهاتنه ژور بخيره   حتى كوهمى د بوونه تيره

أز سوندي دخوم بناڤێ بابي   أو بو نه بژمارى يك هزارى

رابوويه نبي لدو هماسه

وه ك خو بو هقير و شيفا و نانه

٤٥١٥

**Pêvek 14: Helbesta Şûşî ya Şêweyê Gulê (Moma Dilî)**



# KURTEJIYAN

## KİŞİSEL BİLGİLER

| | |
|---|---|
| **Adı Soyadı** | **Yasin DURAN** |
| **Doğum Yeri** | |
| **Doğum Tarihi** | |

## LİSANS EĞİTİM BİLGİLERİ

| | |
|---|---|
| **Üniversite** | |
| **Fakülte** | |
| **Bölüm** | |

## YABANCI DİL BİLGİSİ

| | |
|---|---|
| **İngilizce** | **KPDS (…..) ÜDS (….) TOEFL (….) EILTS (….)** |
| **…** | |

## İŞ DENEYİMİ

| | |
|---|---|
| **Çalıştığı Kurum** | |
| **Görevi/Pozisyonu** | |
| **Tecrübe Süresi** | |

## KATILDIĞI

| | |
|---|---|
| **Kurslar** | |
| **Projeler** | |

## İLETİŞİM

| | |
|---|---|
| **Adres** | |
| **E-mail** | **yasinduran30@gmail.com** |